


SAL 14
HEJMAR 1-28
1 NISAN 1942
ADAR 1945

RONAHI

ANNEE 14
NUMÉRO 1-28
1 AVRIL 1942
MARS 1945

SUPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



Mîr CELADET BEDÎRXAN
Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê



ŞAM - 1942-1945
ÇAPXANA SEBATÊ
ÇAPXANA TEREQIYÊ

BERHEVOK : ÇAPXANA JINA NÛ

SAL 14
HEJMAR 1-28
1 NISAN 1942
ADAR 1945

RONAHÎ

4L 598
ANNEE 14
NUMÉRO 1-28
1 AVRIL 1942
MARS 1945

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



INSTITUT KURDE DE PARIS
ENTRÉE N° 2344

Mîr CELADET BEDÎRXAN
Xwedî û Berpirsiyarê Kovarê



ŞAM - 1942-1945
ÇAPXANA SEBATÊ
ÇAPXANA TEREQIYÊ

BERHEVOK : ÇAPXANA JINA NÛ

**Çapxana Jina Nû : 3
Dokument 1
Tirmeh 1985**

ISBN : 91970747-05

Adres:

**JINA NÛ FÖRLAGET
Post Box: 240 12
750 24 UPPSALA**

JINA NÛ

Postgiro: 50 37 99-9

LI SER KOVAR Û XWEDIYÊ WÊ

Ev berhevoka destê we, ji hemû hejmarên kovara "Ronahî" pêk hatiye. Tevayiya hejmarên kovarê bîst û heşt in. Hejmara yekem di 1-ê Nîsana 1942-an de, ya dawî di Adara 1945-an de hatiye çapkirin.

"Ronahî" kovarek mehanî(*) bû. Di bin navê kovarê de bi Fransîzî hatiye nivîsandin, ku "zê-dayiya (law) Hawarê ya wênekirî ye". Xwedî û gerinendeyê berpirsyar, Mir Celadet Alî Bedir-Xan bû. Li Şamê der diçû. Ji hejmara 1-ê heta hejmara 12-an di "Çapxana Sebatê" de, ji hejmara 13-an heta hejmara 28-an ji li "Çapxana Teraqiyê" hatiye çapkirin.

"Ronahî" ji serî heta hejmara 22-an li pey hev her serê mehê derketiye. Hejmara 23 ji bo du mehan (Sibat-Adar 1944) der çûye. Hejmarên 24 û 25 cardin ji bo mehekê derketine, lê 26 û 27 li ser hev ji bo du mehan (ji bo Hizêran-Tîrmeh 1944 û ji bo Tebax-Îlon 1944) derketiye. Piştî wê, kova-

(*) Hemreş Reşo, di pêşgotina çapa nû (berhevok) ya Hawarê de dibêje, ku "Ronahî" ji heftê carek derketiye. Lê wek xwendevan ji di vê berhevokê de dibînin, ev yek ne rast e. Ya ku ji heftê carekê derketiye ne "Ronahî", Roja Nû ye. Roja Nû li Beyrûdê ji bal Kamûran Alî Bedir-Xan ve ji heftê carekê derdiket û ne kovar, rojname bû.

rê qasî şeş mehan nabên daye jiyana xwe. Hejmara 28-an di Adara 1945-an de der çûye. Jê pê ve ji bi temamî rawestiyaye.

Di hejmara 28-an de tu agahdarî li ser rawestandina kovarê nîne. Qasî ku mirov ji naveroka hejmara dawî têdîgihîje ji niyeta wê ya rawestandinê tune bûye. Lê xûya ye, ku hinek hoyan rê nedaye, ku kovar jîna xwe bidomîne û bi carekê de dawî lê hatiye.

Rûpelên hemû hejmaran ne wek hev in. Heşt hejmarên wê (hejmarên 1,2,10,11,13,14,21 û 22) şanzde rûpel, heft hejmarên wê (hejmarên 3,4,5,6,7,8,9) bîst rûpel, donzde hejmarên wê (hejmarên 12,15,16,18,19,20,23,24,25,26,27 û 28) bîst û çar rûpel û hejmarek wê ji (hejmar 17) sîh û du rûpel in.

"Ronahî", xwerû bi Kurdî (Kurmanciya jorîn) û bi tîpên latînî hatiye çapkirin. Ji ber ku di dema germiya Şerê Cihanê ye Duwem ketiye jiyana weşanê; giraniya naveroka wê li ser bûyerên şer e. Nûçeyên şer, pêşveçûna sinaiya şer û çekên nûderketî, jiyana pişt cephê a bi şer ve girêdayî, jiyana nûçeyên kar û bar û qehremaniyan ferman-darên leşkerî yên Mitefikan û h.w.d. di rûpelên "Ronahiyê" de cîyekî girîng girtine.

"Ronahî", di nav şer de, li dijî faşîzm û Nazîzmê rawestiyaye. Bi nûçe, gotar, çîrok û wêneyên xwe ve pesnê şerê cephaya demokrasîyê daye. Di propoganda dijî faşîzm û dijî Nazîzmê de bi piranî giraniya xwe daye ser welatên Ewropa Roja-

va. Lê carna di rûpelên wê de nûçe û pesnê şerê cêpha Sovyet ji tê xuyakirin. Nivîsên wê ji ruhê sosyalîzmê pirtir bi bîr û baweriya netawetiye hatîye strandin. Lê tu car rengê dijî sosyalîzmê an dijî komunîzmê di nivîsandinan de xwe nedaye der. Heta bi ruhekî pêşverûti, dostanî û dilxwazî ji sosyalîzmê û ji yana civata Sovyet re hatîye nîşandan. "Ronahiyê" di hemû nivîsandin û wêneyên xwe de pesnê azadiyê, û şerê azadî yê milletên ku li dijî dewletên Mihver (Cêpha Faşîzmê) şer dikirin, daye. Bi vî awayî, tim mesele anîye bi şerê rizgarîxwaz û azadîxwaz ê milletê Kurd ve girêdaye; xwestiye ewîna azadî, demokrasî û xelasiyê di nav gelê Kurd de gur û geş bike.

"Ronahî" li ser jiyana civata roava ya hevçerx rawestiye, bi nûçe û gotarên di vî warî de xwestiye haydariya li ser têkiliyê bir û baweriyên civat a roava di nav Kurdan de geştir bike. Li ser rola jinan di Şerê Cihanê yê Duwem de rawestiye û bi vî awayî xwestiye mesajekê bide jinên Kurd jî.

Wek me li jor jî nivîsî "Ronahî" di resmîyete de zêdayiya Hawarê bû. Gava mirôv li çend hejmarên pêşî (bi taybetî ji hejmara yek ta hejmara pênc) dinêre mirov dibîne, ku bi rastî ji kovarek wek magazîna nûçeyên şer xwe dide xuyakirin. Di hejmara yekê de ji bilî wênêkê (wêna grubek govenda Kurdî) hemû nûçe û wêne, li ser şer in. Hejmar didu, hemû li ser şer e. Di hejmara sîsiyan de, gotarek gazinî ya xwedî û berpirsaryê kovarê li ser nebûna behsa Kurda di hejmarên berê yê "Ronahiyê" heye. Xwediyê gotarê bi minakiyek jî jiyana nav mala xwe ve kêmasiyê dixe ber çav. Rûpelên din cardin hemû li ser bûyerên şer in. Kovar, heta hejmara pêncan her li ser vê rewşê dimeşe.

Lê ji hejmar pênc û pê ve, mirov dibîne, ku destpêdike hêdi hêdi rûpelên xwe raste-rast ji folklor û edebiyata Kurdî re vedike. Lê cardin heta hejmara donzde girani li ser nûçe û gotarên şer e. Kovar, bi rastî ji hejmara donzdan û pê ve wek kovarek Kurdî diyê xwe girtiye û piyê xwe daye erdê.

Xuya ye, di hejmarên pêşin de, xwedî û berpirsaryê kovarê fîrset an îmkân nedatiye, ku kovarê bi nivîsandin, nûçe û gotarên têvîl ên raste-rast li ser jiyana Kurdan derxe. Gelo sebêbên wê çî-ne? Em bi êşkereyî nizanin sebêbên wê çî-ne. Lê hin bûyer hene, ku mirov bi saya wan dikare wan sebêban texmîn bike. Her wekî xwendevan jî dizanin, kovar li Şamê der çûye. Wê gavê Şam di bin nîrê Îngîlzan de bû. Ji ber ku kovar, kovarek legal bû, êşkere ye, ku bi rêdana karbidestên Îngîlîz ên li Şamê derdiket. Wê demê, giraniya Şerê Cihanê bû, Rewş û îmkânên jiyane gelek dijwar bûn. Her tişt li gor pergala şer dihat amadekirin. Mudaxela, karbidestan û bi taybetî jî ya karbides-

tên leşkerî, her wekî li ser hemû aliyên jiyane li ser kar û barên rojnamegêrî û weşanê jî tund bû. Rojname yan kovarek jî bo karibe jiyana xwe bidomîne, kaxiz bi dest xe, nîya çapê bibîne û karibe bê belakirin, bivê nevê, pêwîst bû bîr û raya karbidestan bigirta ber çav, awirên wan yên xirab nekîşanda ser xwe. Û heta qet nebe piçêkî dilê wan xweş bikira. Xuya ye, xwediyê "Ronahiyê", di jiyana biyanîyê û bê îmkaniyê de wan niqtan hemû, kê m hindik girtiye ber çavê xwe. Hem jî bo Hawarê derbiçe û hem jî ji bo "Ronahî" û weşanên Kurdî yê din (wek pirtûk) bî çap-kerin, kovara "Ronahiyê", di serî de wek magazînek nûçeyên şer derketiye û bi gavên hêdî hêdî xwe ji nivîsandinên derheq jiyana Kurdan re vekirîye. Nûreddîn Zaza, di pêşgotina xwe ya ji bo çapa diduyan a kovara Hawarê de wiha dinivîse:

"Herwekî, dinya di şer de bû û di Rofîlata Navin de kaxiz pir bi zor dikete dest, Îngîlzan, bi comerdî, kaxiz didan Rehmetî Mîr Celadet Ewî jî hin ji wan kaxizan jî Hawarê re dihişt û hin jê di sûka reş de, bi bihakî bilind, difrot. Bi vî awayî, sê salan ewî dişa Hawar vejand." (Pêşgotina Hawarê. Berhevok) Vê yeka han jî dide xuyakirin, ku "Ronahiyê" çima giraniya hejmarên xwe yê pêşîyê daye jiyana şer û raste-rast li ser jiyana Kurdan nesekînye.

Ji bilî çend wênan, hemû wêneyên "Ronahiyê" jî yê şer û jiyana pişt cephê ya kesên welatên di şer de ne. Sedemê ve yekê, xwediyê kovarê bi xwe di kovarê de daye diyarkirin, ku jî bê mecaliyê bûye. Klîşên wêna yê li ser jiyana Kurdan di dest de tunebûne, loma jî kovarê rûpelên xwe bi klîşên rojname û kovarên Ewropîyan xemilandîye.

Di salên despêka şer de, Îngîlzan gelek dijwarî ji kovarê dernekestine. Loma jî kovar, her hejmar li ser hev çap bûye û di nav Kurdan de belav bûye. Sedemê ve jî ev e, ku Îngîlzan di destpêkê de dixwestin meyla Kurdan bi ser xwe ve bikêşin. Tirk di vê demê de, bi navê bêlayî, siyasetek dirûtî diajotin. Li dijî dewletên Mihver nedixwestin têkevin şer û piştta mîttefîkan bigirin. Ev yek pir bi dilê Mîttefîkan û herweha bi dilê Îngîlzan nebû. Loma jî Îngîlzan hinekî serbestir çav li xebata Kurdan digirtin. Lê nêzî xelasiya şer û piştî ku xuyabû wê dewletên Mihver tîk biçin, Tirkan jî xwest giraniya siyaseta xwe bi ser milên Îngîlzan ve bimeylînin. Ji alî din ve jî li Kurdîstana Iraqê Kurdan jî bo azadî û mafên netewî her ku diçû şer germtir dikirin. Ev şer li dijî Îngîlzan û karbidestên Ereb ên girêbendên wan bû. Îngîlzan di dawîya şer de hem siyaseta serdestiya xwe li ser Kurda jidand hem jî ji bo Tirk û Erebên her bi xwe de bikîşîne, rêya xebata kulturî û siyasî li ber Kurdan girt. Wê siyaseta han, tesîr li xebata Celadet Ali

Bedir-Xan û taybetî ji li ser jiyana kovara "Ronahiyê" kir. Hejmarên sala dawîn nikaribûn li pey hev derbicîn.

Heta, carekê şeş meh der neçû. Piştî vê rawestanê hejmarek derket û "Ronahî" bi temamî ji jiyana weşanî derçû, ciyê xwe di dîroka rojnamegêriya Kurd de girt.

Wek me li jor jî nivîst; kovarê di hejmara 12-an de esas ciyê xwe girtiye û jê pê ve wek kovarek kulturî tekûz jiyana xwe domandiye. Bi firehî li ser jiyana Kurdan, têkiliyên civakî di nav wan de; çîrok, stran û helbestên Kurdî çapkirine. Nivîskarên Kurd, destpêkirine bi îmza xwe tê de gotar û çîrok nivîsîne. Gelek înzayên heja û navdar li ser rûpelên "Ronahiyê" cih girtine. Celadet Alî Bedir-Xan, wek xwedî û berpirsyarê kovarê, gelek caran bê îmze û caran jî bi îmza Îvavê Cîngîd an Herekol Azîzan gotar nivîsîne. Pişt re di jiyandina "Ronahiyê" de barek pir mezîn li ser piştê welatparêz û şoreşgerê mezîn, nivîskarê heja, dilsozê welat Osman Sebrî bûye. Osman Sebrî, bi gotarên xwe, lêkolînên xwe, helbest û wergerên xwe ve ciyek gelek fireh di rûpelên kovarê de girtiye. Kesên wek Simainê Serhedî, Bişarê Segman, Mela Enwer û Hesen Hîşyar jî gelek çîrok, lêkolîn, werger û helbest nivîsîne. Şairê mezîn Cîgerxwîn jî bi helbestên xwe yê ruhê welatparêzî û şoreşgeriyê di rûpelên "Ronahiyê" de cî girtiye. Serokê Serhildana Sasonê Evdîrehmanê Eliyê Ünîs, li ser neçîra kewan nivîsiye. Serokê Serhildana Agirî Hîsan Nûrî jî gotarek heja di hejmarê dawî de nivîsiye. Gelek kesên din jî keda xwe xistine nav rûpelên "Ronahiyê".

Gava mirov li nivîsên "Ronahî"yê dinêre eşkere xuya dike ku ji alî ramanwerî ve kovar xwedî bîr û baweriyek netewî ye. Doza azadî û xelasiya miletê Kurd kiriyê. Li dijî bîr û baweriyê eşîrtî ya teng rawestiyê û yekîtîya hemû Kurdan a milî xwestiyê. Netewatîya kovarê ne netewatîyê hişk, kevneperest û kurtbîn bûye. Dostanî, hevkarî û biratîya hemû miletan xwestiyê. Di meselên çîmayetî de jî xwedî bîr û bawerîkî liberal bûye. Her çîqas xwediyê kovarê jî malbatek xanedan dihat û gelek nivîskarên wê serekeşer bûn jî lê disa rûpelên xwe ji doza çînen belengaz (karker û gundî) ên Kurd re vekiriyê. Cîgerxwîn û Osman Sebrî bi gelek nivîsar û helbestên xwe piştgîniya zehmetkêşên Kurdistanê kirine, li dijî derebegî, şêxîfî û eşîrtî rabûne û kovarê bi dilxweşî cî daye van bîr û baweriyên.

"Ronahî" di warê edebî û ziman de jî xwedî rûmetek bilind e. Gotar, çîrok, helbest û stranên te de di edebiyata Kurdî de cîyekî payebilind girtine. Bi kurtî "Ronahî" wek kovarek kulturî û niştîmanî, hem di dîroka têkoşerî ya Kurdistanê de hem di dîroka rojnamegêriya Kurdî de qozîyek a-

vahiyê ye. Serbilndahiya niştîmanperweriya Kurd e.

ÇEND GOTIN LI SER JÛYANA XWEDIYÊ KOVARÊ

Xwediyê kovarê; Celadet Alî Bedir-Xan di sala 1897-an de, li Îstanbul jî dayfk bûye. Ji malbatek welatparêz dihat. Di salên 1843-1846-an de Mir Bedir-Xan jî bo damezrandina Kurdistanek serbixwe li dijî Împaratoriya Osmanî rabû. Welat, heta Wan, Ûrmiye, Diyarbekir, Mehabad û Mûsilê hat rizgarkirin. Lê di 1847-an de, Osmanîyan, di bin serokatîya biraziyê wî; Yezdan Şer de tevgerê li dijî wî rakir. Bi alîkariya Yezdan Şer Ordiya Osmanî serhildan şikand. Malbata Bedir-Xan jî welat hat derxistin, surgûn bû. Di dewra Sultan Abdulhemît de surgûna wan hat rakirin, lê Sultan nehişt ew vegeerî welatê xwe. Malbata Bedirxaniyan anî Îstanbul, li bin destê xwe bi cî kir. Gava Celadet Alî Bedir-Xan hat dinê, malbatê hê jî li Îstanbul ciwarkirî bû.

Celadet, di malbatek têkoşerê niştîmanî de hatibû dinê. Herçî, tevgera wan hatibû şikandin, jî welatê xwe bi dîr ketibûn û di bin destê Abdulhamît de bûn jî dev ji xebata xwe ya niştîmanperwerî bemedabûn. Loma jî Celadet, bi ruhê niştîmanperwerî û têkoşerî hat gihandin. Bavê wî Emîn Alî Bedir-Xan, welathîz û ronakbîrêkî dîrdîf bû. Zarokên xwe, bi hemû îmkânên xwe da ber xwendinê. Celadet, xwendina xwe ya ewil û navîn li Îstanbul xilas kir.

Piştî ku mezîn bû, di nav tevgera "Tirkên Ciwan" de cî girt û jî bo vegeerîya meşrûtiyê de ku mafên hemû milletên bindestên li Împaratoriya Osmanî bîr dayîn li dijî mutlakîyeta Sultan Abdulhamît şer kir. Di vî şerî de Celadet, tevî malbata xwe hat surgûn kirin; wan sandin Yemenê. Piştî şoreşa "Tirkên Ciwan" ya sala 1908 ku Sultan Abdulhamît jî text hat daxistin vegeerîya Tirkîyê. Di Şere Cihanê Yê Yekem de, bi rutba serbazî di nav Ordiya Împaratoriya Osmanî de cîyê xwe girt û li Cepha Kafkasê şer kir.

Piştî Şere Cihanê Yê Yekem, ku Împaratoriya Osmanî tîk çû û împeryalîstan welat dagir kirin, li ser belêkirina Mistefa Kemal û hevalên wî, ku Kurd û Tirk bi hev re ketibûn şerê xilasiyê, Celadet jî di vî şerî de ciyê xwe girt.

Lê piştî ku tevgera rizgarîxwaziya Tirk di bin serokatîya Mistefa Kemal de bi serket, hemû mafên Kurdan hatin înkarkirin, serokên Kurdan ên ku ji bo mafên milletên Kurd şer kiribûn jî welat hatin bi dîrxistin, êrîşek tûj û tund çû ser milletê Kurd. Di vê demê de, di derheq Emîn Alî Bedir-Xan û her sê lawên wî de fermana dardakirinê derket. Emîn Alî Bedir-Xan û kurê wî Sureya Bedir-Xan çûn, li Misrê bi cî bûn. Kamûran û Celadet

ji çûn Almanya, dest bi xwendina bilind kirin. Celadet li wir dibistana bilind xîas kir û diploma doktoriya hukûkê wergirt.

Piştî wê, di 25.8.1930-an de vegeriya hat Şamê. Wê gavê Şam di bin destê Fransîzan de bû. Li wir dest bi xebata siyasî ya niştimanî kir. Di nav xebata Xoybûnê de wek endamêkî pêşeng çî girt. Di dema Serhildana Agirî de, di nav Xoybûnê de aktîf têkoşa. Gava serhildan li Agiriyê gur û geş bû, bi hinek Kurdên pêşketî, hişyar û serok-eşîran ve haziriya afikariya tevgerê kir. Bi hevalên xwe re xwest, ku ji Suriyê biçin Kurdistanê Bakur û di wir de serhildanê li temamê welat bela bikin. Bi dizî ji xetê derbas bûn, çûn Kurdistanê, lê ev tevger bi ser neket. Careke din vegeriya Şamê.

Li wir, Celadet dest bi xebata edebî û rojname-gêriyê kir û heta dawiya jiyana xwe wê xebatê domand.

Di 15.7.1951-an de li gundê Hêcanê (nêzî Şamê) mir.

Celadet Alî Bedir-Xan ji bilf zimanê xwe, bi Îngilîzî, Fransîzî, Almanî, Tirkî, Farisî, Erebî û Yunanî jî dizanî. Xebata wî ya ser zimanê Kurdî hê ji sala 1918-an de destpêkiribû. Ji wê demê de ji bo çêkirina elfaba Kurdî bi tîpên latînî kar dikir. Her çiqas, yê cara yekem li ser elfaba Kurdî bi tîpên latînî kar kiriye, Xelîl Xeyalî yê jî mirov dikare bêje, ku damezrînerê elfaba Kurdî bi tîpên

latînî Celadet Alî Bedir-Xan e. Ew hîmdarê rêzimana Kurdî ya tîpên latînî ye jî. Ewî di Hawar û "Ronahiyê" de û di xebata wekî din de esasê rêzimana Kurdî danîye. Celadet hem edîb û ziman-nasek mezin û hem jî welatparêzekî pêşketî yê Kurd bû.

Ji bilî xwedî û berpirsariya Hawar û "Ronahiyê" afirandinên wî yê hêja yê dîtir jî ev in:

- 1- Elifba Kurdî
- 2- Rêzimana Kurdî
- 3- Ferhenga Kurdî Bi Hemû Lehçên Navxwe
- 4- Rêzana Elfabeya Kurdî
- 5- Rûpelîne Elfabê
- 6- Dîbaca Mewlûda "Bîlîşa Pêxember"
- 7- Dîbaca Nivêjên Êzêdîyan
- 8- Mektup Ji Mistefa Kemal Paşeyê re
- 9- Ji Mesela Kurdistanê
- 10- Edirne Sukutunun İçyüzü (Rûye Esasî ye Roxandîna Edirne) Çapxana Serbestî. Istenbul. 1329. Vê kitebe Celadet Alî Bedir-Xan û Kamuran Alî Bedirxan pêkve nivîsîne.

Çapxana JÎNA NÛ

SAL 1
HEJMAR 1
—
ÇARŞEMB
1 NISAN 1942

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 1
—
MERCREDI
1 AVRIL 1942

SUPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



Balafirên ingilizi di peravên Norvêjê de bi ser vapo rên dijmin de girtine û ew dane ber bimbeyên xwe. Balaf iran hingafte vaporekê û ew bin av dibe.

ŞAM-1942
ÇAPXANA SEBATÉ

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

ELİSABÊT

XUDANTACA INGİLİSTANÊ

Qraliçe Elisabêt li rex mêrê xwe ê xudantac û digel miletê xwe ê dilqewîn ji bo zefer û serdestiya welat û kişwerê xwe bi her awayî û li her derê dixebite. Elisabêt her-çi civalên arikariyê ji bo şerevaniyên ingilîzî hene tê de ye û bi lebatên wan civalan re bi kar û wezifa xwe a milî mîna yeke ji xelkê radiibe. Dikeve destegahên ko tê de gore û kirasên hiri çêdikin; radihêje singikan, hiriyê dirêse û ev dayika dîlovan ji kurên xwe ên esker re goran çêdike.


Di resmê jorin de xudantaca Ingilîstanê, li Londrê, li ber deriyê xestexaneke frensîzên aza têtê ditin. Elisabêt ev xestexane digel serkanê Frensa aza û fermandarê hinerwer, general De Gol ziyaret kîriye. Qraliçe piştî ziyaretê, li ber derî sekiniye û bi general De Gol re dipeyive.



BALAFIRVAN

Di şerê Libyayê de piştî ko eleman di dora Xezalê de sekînine şerê balafirvan xurt bûye. Her du alî bi balafirvan li wargehên hev didin. Balafirvanên ko di resmê jorin de têne ditin bi ken li balafirvan dijmin dinîhêrin. Balafirvan dijmin bi ser wan de tên û dikin li wargehê wan bidin.

Piştî kêlikê balafirvanên ingilîzî û elemanî di ezmanan de ewê li hev xin.



Pışti şereki behrî vapor û filûqeyên ingilîzî nîzingî li noqareke talyanî dikin. Ev noqarê di wî şerî de birin bûye û bin av dibe. Ingilîz deryavanên wê noqarê dikin hêsir bigirin.




Ji mēj ve ye dora asêgeh û pêşîya xetên şer bi tîlên bi derzi digirtin û tê re derbas bûn ji mihaciman re îşekî dişwar bû. Lê niho ev tişt ne ewçend zehmet e. Eşkerên mihacim doşekine nerin tavêjin ser wan tîlên bi stîrih û di ser wan re diborin û dikevin çeper û kozikên dijmin.

LIBYE

Di eniya Libyayê de êriş ji her du aliyên herçend sist bûye ji tang û balafir her û her li hev didin.

Di wêna aliyê rastê de mîtralyozeke ingilîzî têtê ditin. Mîtralyoz bera balafirên dijminê dide.

Wêna jêrîn topeke taugşiken şanî dide. Topçî tavêjin tangên dijmin.



DI ENIYA ÛRIS DE



Bi nizingbûna Biharê şerê ûris hero xurtir dibe. Ûris bê etlahî dirêji elemanan dikin. Ûris dizanin ko eleman xwe ji bo Biharê kar dikin û bi Biharê ve ewê bavêjin xetên rûsi. Li gora jisporen eskerî ev êriş nemaze di qada nivro de wê xurt bibe. Eleman wê bixwazin di Qevqasê re dakevin Ecemistanê û jê dirêji rohelatê nizing bikin. Herçî ûris bîra vî tiştî dibin û ji lewre bê etlahî dirêji xetên elemanî dikin da ko firsenda karkirinê nekeve destê elemanan. Vê paşiyê şer nemaze di dora Xerkovê de germ bûye. Ûris gelek esker anîne vê qadê û pey hev radibin hicûmê. Dibêjin ko şer di dora bajêr de çêdibe û Xerkov li ber ketinê ye.

Eleman jî di midafehê de pê didin erdê û cehda xwe dikin ko xetên xwe ji dest nedin û xwe bi şûn de nekişnin. Jê pê ve eleman bi her awayî xwe kar

dikin. Li gora nûçeyên ejansan eleman û talyanan di navbera Triyestê û Odesayê de rêke timçibilan çêkirine û tê re esker û çek û cebîrxanê ditin eniya ûris. Ji aliyê din herçî trênen Mecaristan û dewletên Belqanê ne şev û roj û bi tenê eskerên elemanî hillinin; eskerên ko diçin eniya şerê ûris. Bi rasti di vê eniyê de şerine no û xwindar çêdibin. Dinya hemî çavê xwe berdaye vê eniyê û bi meraq lê temaşa dike. Gele kî zora kê wê bibe.

Herçî ingliz û emêrikanî di arikariya ûrisan de teqîr nakin. Vê paşiyê mirovdevleteki inglizî da zanin ko inglizan ji çek û çebîrxeniyên xwe ji nivî bêtir şandine Rûsyayê.

Resmê jorin di qada nivro de hate girtin. Zabiteki rûsî emrê agirkirinê dide topçiyên xwe.

ŞER Û ZAD

Nemaze di vi şerê mezin û xedar de mesela zêd bûye yek ji hêmanên zefarê. Dijmin hevûdû ne bi tenê di qadên şer de lê di metbexên hev de ji diêştin û dikin zora hev ne bi tenê bi çek û posatan lê bi nêz û birçinan ji bibin.

Dijminan ev tevdir berê - ji ji hevûdû re didîtin. Di keleşan de êkûdû mîhasere dikirin û av li neyarê xwe dibirin û dikirin ko asêgeh ji kêmbûna cebirxanê an ji birçinan teslim bibe.

Ev di bejê de ye. Di behran û avan de ji heçî ko serdestiya behran pê re ye welatê neyarê xwe bi stolê ebloqe



(1)

(2)



dike û nahile ko zad û her texlî teba bûne welatê dijmin.

Di vi şerî de û bi destpêkirina şerî ingiliz û frensizan welatê elemanan xistine bin ebloqe, û bi rêva hemî Ewrope ket bin ebloqa sondxwariyan. Ji ber ko elemanan piraniya erdê Ewropê vegirt û dewletin ji bûne hevatên wî.

Elemanan ji berebloqeyek îlan

kir û di behran de bi noqar û balafirên xwe dest bi xeriqandina vaporen

ingilizî û yê heval-
bendên wî kir. Vê ber-
ebloqeyê ingilîzan xi-
ste tengiyê. Ji lewre
ingilîzan îşê zad û
xwarinê kirine bin ni-
zameke xweser. Bi
vê nizamê heye ko
xwarina xelkê kêmbû.
Lê talûka birçiliyê ji
navê rabû û xwarinên
wezîr û palan, di In-
gilîstanê de bûne we-
kehev.

Ji bona vê yekê
ji Hikûmeta Ingilîterê
du tevdirên bîngêhin
ditîne. Reşma talûka
noqar û balafirên ele-

manî zad û nanê xwe ji derve anîn û ji aliyê din di hundirê welêt de çandiniyê bi her awayî xurt kirin.

Ingilîterê gelek mistemlike hene û di wan mistemlikan de her tişt peyda dibin. Ji van pêve Emêrike jî ji ingilîzan re, bi vaporan, her tiştî dişîne û ji welatên din jî dide şandin.

Ev vapor li Etlantikê derbas dibin û tî benderên ingilîzî û malên xwe dadixin wan benderan.



Herwekî di (sûret-1) de tîte ditin. Lê digel vî qasî li Ingilîterê jî her tiştî beha bûye. Ji lewre bi teşebîsa Qralîçe Elîsabet jî xelkê re bê pere xwarin tîte dayin. Sûret 2 an sifreyek jî wan sifreyên herwe şani dide. Xelk piştî bimbardimaneke balafirên elemani li her wê sifrê rûniştine û şorbeke germ dixwin.

Ji bo îşê welêt hikûmetê wezareteke



(3)

(4)


xweser çekiriye. Ev wezaret bi tenê bi vi işi mijûl dibe. Di vê wezaretê de ji bo her malê defterek tête çêkirin (sûret-3). Di vê defterê de mixdarê peyayên her malê û tayîna wan nivîsandî ne. Kebaniyên malan, serê sibehê bi wan defteran diçin dikanan û hürmûrên xwe dikirin sûret-4).

Me got ko ingilîzan ji aliyê din qeweta xwe dane cotkariye. Erdê Ingilîstanê ne erdekî bi nan e. Beriya şercotkari tê de kêmbû. Lê niho, hesêb, her derên Ingilîstanê diçînin û xelk bi tevayî bi cotkariyê mijûl dibin. Herçî beççeyên bajarên mezin in, çîçkên wan rakirine û ew kirine zeviyên ceh û genîm. Şekirê Ingilîstanê berrê û tev de ji derve dihat. Niho ingilîz



(5)

(6)



şewender diçînin û jê şeker çêdikin (sûret-5).


Erdê Ingilîstanê herweki me got ne berîstan e. Ji lewre di hin deran de trektor û makîne naşixulin. Di wan deran de xelk paleyiya xwe bi dêtên xwe diqedînin (sûret-6).

Emêrike herweki di mesala çek û posatan de ye; di mesala faşê de ji gelek arîkariya dê bide ingilîzan.

Ingilîrê dike. Emêrikê da zanîn ko îsal nivê pentrê xwe

BALAFIRÊN LÛKHÊD P. 38

Ev balafirên ha li Emêrikê têne çekirin û ji hemî balafirên dinyayê bileztir in. Ingilîterê ji van balafirên mixdareki mezin şîparîş kiriye. Ev balafir hin bi hin têne Ingilîstane.



GOVEND
TOFEK JI KURDMANCÊN DEŞTA HESINAN DI
BAZDANE DE



SÎWANVANÎ

Di vi şerî de şerevanî carina xwe ji ezmanan berdidin erdê. Ev şerevanî di balafiran de ne û gava balafir digehe erdê ko ew lê peya bibin siwanvanî siwanên xwe bi xwe ve dikin û xwe ji balafirê tavêjin hewayê û hêdî hêdî dadikevin erdê. Herwekî di wêneya aliyê rastê de tete ditin.



WÊNEYA JÊRÎN

Di vê wêneyê de balafirine R. A. F. tene ditin. Ev balafir di ser stola dijmin re difirni û dikin wê bidin ber bimbayên xwe.





BERIYA ÈRİŞË, SIWARINE FRENDA AZA, DI ÇOLËN EFRIQA ROAVË
DE, XWE KAR DIKIN.

ŞARL DE GOL (CHARLES DE GAULLE)

Li 22ê Hizêrana sala 1940i Frensê mitareke xwest, bêgav ma, teslim hû. Frensê reşa xwe girêda.

Di demên felaketê de xelk ji her wextî bêtir li hevûdin dipirsin. Di nav frensizên hizni de ji welê bû. Herkesi li mirov û peyayên xwe dipirsi û li wan digeriya.

Peyayên wezareta Frensê hejmartin. Zelamek jê kêma hû. Ew zelum çû bû kû? Ew çire çû bû û ewê çi bikira? Tukesî pê ne dizani.

Piştî çend rojan zelumê winda-bûyi bi xwe, ji ber mikrefona radyowa Londrê bersivên pirsyariyên jorin didan.

Ew zelum generalekî frensizi, generalê Frensê ê ciwantir De Gol, Şarl De Gol bû.

De Gol ji ber radyowa Londrê ji miletê xwe û ji hemî dinyayê re dida zanin ko heke di şerê de Frensê hati he ji çevandin zora Frensê ne çûye û Frensê ev ceng cenga mirin û heyî-nê winda ne kiriye; û Frensêke nû, Frensê ko ne ketiye bin lingên neyaran, Frensê Aza, di rex hevalbandê xwe, di rex Ingilîterê de, û heta zefera paşin ewê şerê dijminê xwe bike.

Frensizîne din gihan dore genêralê ciwan; hikûmet, ordû û stolek çêkirin û ev frensizên ha îro li her derê digel sondxwariyan û bi mêrani û qehremani şer dikin.

Genêral De Gol di sala 1891ê û di bajarê Lilê de ji diya xwe bûye. Bavê wî di wî bajari de seydayê felsefê bû. Gava kete Sensir, dibistana herbiyê,

GENERAL KETRÛ (LE GÉNÉRAL CATROUX)

Nimîndeyê Frensa Aza û kumîsêrê wê ê bilînd general ketrû nişanê bi singa kumandan Savey ve dike. Kumandan Savey kurûlizanekî wefakar û dostekî kurdmancan e. Xelkê Cizirê wi xweş nas dikin Savey mêreki qenc e ji. Savey gava xwe gihaudi bû ordiya Frensa Aza liyotnan bû. Salekê ne ajot bû kumandan. Di şerê Misawehê (Hebeşistan) de Savey berî herkesî kete bajêr û di benderê de bi serê xwe cenkeş-tiyeke talyani, zemt kir.



De Gol bist salî bû. Ji dibistanê bi ritba milazim derket û tayîni alaya 33an bû. Ev alay di bin kumanda Pêten de bû (Merçşal Pêten). Di şerê 1914-1918 an de De Gol sê caran birîndar bû û dawiyê hêşir ket. Piştî wi şerî kete dibistana erkanherbiyê; û gava jê derket dişa tayîni erkanherbiya Pêten bû.

De Gol berî herkesî bira şerê mîkanîkî biriye û di sala 1934an de di vê babelê de kitêbek ji nivîsandiye, kitêbeke hêja. Elemanan bi xwe ew wergerande zimanê xwe û gelek guh dane wê kitêbê. Heçî frensîz pê emel ne kirin.

Li 15ê Gulana 1940î De Gol bi genêral bû, fir-geke mîkanîkî pêk ani û qehremanane şerê ne-yaran kir.

Di wezaretê Rêno de De Gol misteşarê weza-reta ceng bû. Gava mîla-roke çêbû, herwekî me li jor got, De Gol hate Londrê û Frensa Aza ani pê.

Merkeza Frensa Aza di Londrê de ye. Di mer-kezê de meclîseke kumî-sêran heye. Ev kumîsêr berberê wezîran in û karê



ESKERÊN PIYADÊ DI ÇOLÊN EERÎQÊ DE XWE DANE
BER KENIRAN Ç AGIR DIKIN.

hikûmetê digerin. Frensa Aza di rohelatê nîzing de di nimîndeyê hene: General Ketrû û General Kolê. General Ketrû nimîndeyê Frensa Aza ê gelem-per û kumîsêrê bilînd e. Herçî General Kolê ye cem hikûmeta Sûriyê şandiyê kumîsêrê bilînd û nimîndeyê Frensa Aza ye.



WÈNA JORIN:


Topên cenkeştîyên ingilîzî berî siwarkirinê. Ev top gelek mezin in û heta bi 25 kilomêtiran tavêjin.

Keştîyên van topan di behrê de ne û top di behrê de li wan hêne siwar kirin.

WÈNA ALIYÊ RASTÊ:

Tangên ingilîzî ji textîlê Weletûnê n. 3. di ber qralê Ingilîstanê re diborin





Tang û balafirên inglizi, bi hev re, dirêji dijmin dikin.

Xwedi û gerinendeyê berpirsiyar: Mîr Celadet
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djéladet Aali
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 1
HEJMAR 2
—
IN
1 GULAN 1942

RONAHI

ANNEE 1
NUMÉRO 2
VENDREDI
1 MAI 1942

SUPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



GENÉRAL DE GOL NOQAREKE FRENSA AZA TEFTÎŞ DIKE.





ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÊ

HICÛMEN HEWAYÎ

Rojnameke Svêçî dibêje ko li gora pisporên elemanî 'lexistina bajaran bi balafirên piştî tecrîbeyên ko di vî şerî de kirine bi kêrî tu tiştî nayin. Ji lewre eleman dibêjin inglîz tîn li Berlînê didin lê em li wan venagerînin, ji ber ko bi xerabkirina bajaran tu tiştî nakeve dest.

Lê herçî pisporên inglîzî ne, ne di vî fikirê de ne. Ew dibêjin ev bîmbardîman erd xweş kirin e; ji bo roja ko eskerên me pê li erdê Ewropayê bikin.

Heke inglîz carîna mifrezeyîne piçûk derdixînin peravên Manşê û du sê saetan şerê elemanan 'dikin ew jî bi vî fikirê ye.



KLÎŞEYÊN TENÎŞTÊ:

1 — Genêral De Gol di Ingîlterê de piştî ko febrîkeke cebîrxanan ziyaret kiriye, li ber derî sekîniye û bi yekî jî ordîwa mîhafîzên welêt xeber dide.


2—Topçiyên inglîzî, topîne nû yê'n ko vî paşiyê jî febrîkan derketîne dîcerîbînî.

3—Rexma qewetên mîkanîkî ûrîs jî sîwarên xwe ên kevin, qezak, ne gerîyane. Dibêjin ko di şerê Zîvîstanê de ev sîwar gelek bi kêrî ûrîsan hatîne. Klîşe selefekî qezakan şanî dide.



KELEHÊN FIROLEK

Emêrikaniyan vê paşiyê balafirine gelek mezin çekirine. Ji wan re kelehên firolek dibêjin. Di van balafirên de ji mitralyozan pê ve top ji her.e. Ev balafir 4000 kilo bimbê hillînin û heta 41000 piyî bilind dibin. Rehma giraniya wan rîya 2000 kîlometrî bêko deynin bi şûn de dihîlin.



ÇEND BALAFIRVANÊN FRENSA AZA

Frensa Aza gelek guh dide balafirvaniyê jî. Hero balafir û balafirvanên nû tîn û dîkîvin sêfên ordîwa Frensa Aza. Di vê klîşê de balafirvanîne Frensa Aza digel balafirvanên îngilîzî tîne ditin. Xanîma di nav wan de rojnamevaneke emêrikani ye. «Local Home».

Ji van balafirvanan hinek vê paşiyê hîni balafirvaniyê bûne.

BALAFIRÊN BÊJ Û BEHIRÊ

Balafir du texlît in; yên bejê û yên behirê. Yên bejê nikarin deynin behirê û yên behirê nikarin deynin bejê. Lê balafrî ko di klîşê de tîte ditin—balafrîke emêrikani—dikare deyne bejê û behirê jî. Ji lewre ev dikare jî balafrîhîlgîrekê rabe û deyne paravekê.





DI BERISTANÊN EFRIQÊ DE ESKERINE FRENSA AZA ROJNAMAN DIXWÎNIN

KORÊGÎDOR

Piştî ko japonan niv-girava Balanê vegirt emêrikaniyan xwe di girava Korêgîdorê de asê kirîye. Korêgîdor ji giravên Filipînê ye û di-keve devê xelica Manilê. Korêgîdor wek Cebellariqê zinarek e û asêgeheke xurt e. Zinar ji şikeft û zivîngan tîji ye. Eskerên emêrikani tabiyên xwe di wan şikeftan de çêkirine û top û mitralyozên xwe ji tê de veşartîne. Ew şikeft di gelek cihan de qulêri hev in û bi elektrîkê ronikiri ne û di wan de sinema û tîyatroyê jî hene.

Di Korêgîdorê de balafirgeheke binerdin û depoyîne cebirxanê jî hene.



DI ENIYA ÛRIS DE TOPEKE TORPILAVÊJ

BIHUŞTA HEYWANAN

Ma bihuşta heywanan ji heye? Belê heye; û ew bihuşt ne li wê lê li vê dinê ye û di girava Seylanê de ye. Ev girav li nivroyê Hindistanê ye û bi- rektî wê tete hesêb.

Di hemî derên Hindistanê de gelek qedirê heywanan dizanin, nemaze ga û çêlek, û goştê wan naxwin. Lê herçî Seylan e, ji bo xelkê wê derê heywan hemî miqedes in û ew cem xelkê Seylanê an Xwedê an Niv-xwedê ne. Bes e jêko heybera candar heywan be lê ne insan. Tu heywan ji vê qeydê nayete awartin: kedi, kovi, rawir, cenawir; ji fil heta gêrikan.

Ji milê din Seylan bi tebi- eta xwe lîrdewseke insanan e ji. Seylan mistemlekeke ingilîzî ye û gelek dewlemend e. Çaya wê



Ji TOPÊN INGILÎZÎ YEKE HAWIN




SIWARINE FRENÇA AZA DI ÇOLÊN EFRÎQÊ DE

mezin hene. Di wan qışlan de bi hezaran esker digel çekên xwe cih dibin.

Ji ber ehemiyeta wê a eskerî balafirên japonî bi hezar kîlômêtiran ji wargehên xwe bi dûr ketin û çûn li Seylanê xistin.


gelek bi nav û deng e. Li Seylanê ji çayê pê ve kewçûk, riz, kekao û halînine din hene.

Li awirê eskerîyê ve ji Seylan gelek bi ehemiyet; di Behra-hindî de lixlişk Sengapor e. Kolombo bendereke mezin e û ev bender vapore mezin dikare bihewîne. Tê de depoyên benzîn û petrolê û balafirgehên nûjen û qışleyine



STOLA INGILZÎ DI DÛRAHIYA BEHİRAN DE

Di vi şeri de herçend balafiran ehemiyeteke mezin girti be ji stol chemiyela xwe bi tu awayi wînda ne kiriye; û bê stol tu dewlet nikare bibêje ko serdesti di destê wê de ye. Kişwerê Ingilîterê yê ko ji hev gelek belav e, helanî iro bi tenê di saya stolê de bi merkezê ve girêdayî maye. Heke vaporen ko ji Emêrikê radibin bi selamet digehin Londrê; ev xêra stolê ye.



BALAFIREKE INGILZÎ, JI TÎPEKÎ NÛ DIKE BI HEWA BIKEVE.

TOKYO

Tokyo payilexté Japonya yé ye. Bajar li ser girava Hondayé ye. Nifûsa payilexté japonan pênc milyon e. Navê wê ê kevin Yado bû. Di sala 1868 an de gava bû payilexté kurê rojê—imperatorê japonan—navê Tokyoyê lê kirine. Dema Tokyo bû payilext gundên dorê ji dane ser.


Tokyo ji sê tangên lêvel hatiye pê. Tanga ewropayî, ev tang eyn weke bajarên Ewropayê ye, rêne fireh, avahîne mezin û çûn û hatîneke boş. Tanga xelkê welêt; bajarêki şerqi. Tanga imperator. Ev tang di nav sûreha kevin «Siro» de ye. Qesrên imperator di nav bexçe û daristanên mezin de ne. Ibadetgah ji diwê Tangê de ne.

Sinhetên tiştên hevrişim û kaçaniyên çini di Tokyoyê de gelek pêş ve çûne. Ji van pêve febrîkeyên çaman berçavikan û sabûn û bihînan lê hene. Tokyo li perê behirê ye û di bendera wê de tersaneyên yaporan hene.


Li roavayê Tokyoyê bajareki din heye jê re Yokohama dibêjin. Yokohama bajareki nûjen û bajareki sinhetê ye. Lê tersaneyên mezin û febrîkeyên her texlît tekberên malê û alêtên mûsiqi, nemaze yên piyanoyê hene. Ji van febrîkan pê ve li Yokohamayê destgahên qimaş û tiştên kimyewî peyda dibin.



SEGMANINE INGILIZI DI NAV ÇEPERÊ DE



CENREŞTÎTÊN INGILIZI DI BEHIRA-SPI DE LI VAPORQEFLEYÊN DIJMIN DIGERIN




TANGINE INGILIZI YÊN ESKERÊN PIYADE

HERKES

Û HER TIŞT JI BOYÎ ŞER
JI BOYÎ KARKIRINA ŞER

Îro di jiyîna Ingilîterê a civaki û siyasî de bi tenê prênîspek heye û divêt herkes li gora wê prênîspê awayê jiyîn û adetên xwe saz bike, biedilîne û li wê prênîspê bîne. Ev prênîsp jî herwekî me di sernamê de lê îşaret kir, herkes û her tişt jî boyî şer, jî boyî karkirina şer û gîhaştina zefera paşîn e. Ji vê prênîsp û qeydeyê tukes, ne jin, ne



(1)

mêr, ne pîr, ne ciwan nayete awartin. Divêt herkes li gora hal û taqeta xwe bixebite û ayenda Ingilîterê û imperatoriya wê jî mehiwbûnê xelas bike û jî nîfşên ayendê re mîrata cilên borî weke xwe biguhêzîne. Ma Hitler gava şerê

(2)

Frensê dest pê kiri bû, jî eskerên xwe re ne goti bû ko bi zefera we ayenda Elmanyayê jî bo hezar salî dê bêtew sewgirandin.

Zefera Elmanyayê bê şik mehiwbûna Ingilîterê ye. Ji lewre ingilîz bi tevayîya qewetên xwe dixebitin da ko zora dijminê xwe bibînin. Ji ber vê yekê Ingilîterê xelkê xwe tev de seferber kiriye û herkes bi awakî jî xelasa welatê xwe re dixebite.

Ev zehmet hêjayî wê nîmetê ye, nîmeta ko di destê ingilîzan de ye.

Gotineke ingilîzan heye. Dibêjin: di kîşwerê 'qralê Ingilîstanê' de roj tucarana naçe ava. Ev gotin rast e. Ji ber ko ingilîzani di her derên dinyayê



de, li vi ù li wi rûyi,
erd hene.

Klişeyên rûpelên 8
ù 9an hin bergehên
xebata ingilizan şani
didin.

1— Zêringerên Lon-
drê ji ji bona zêfêra
Ingilterê dixebitin. Ji
van zêringeran 38 pe-
ya gihane hev ù des-
teguhên xwe, yên ko
berê tê de lacên qra-
liçeyên Ingilterê ù ris-
tik ù guharên jinên
lordan dihatin çêki-
rin, wergerandine des-
teguhên çek ù posat-
tan ù tro tê de gule-
yên topan çêdikin.



(3)

2— Keç ù jinên ingilizan ji di febrilkeyên çekan de dixebitin. Ji ber ko
ji vê xebatê re hinek sinhet divêt jinên ingilizi ji bo hinbûna vê sinhetê diçin
dibistanine ko ji bo vê yekê ù vê paşiyê hatine danin; herwekî klîşa me

(4)

şani dide.



3— Di vê klîşê de
motorek xuya dike.
Ev motor berê ya ti-
yatroyên guhêzbar bû.
Îro ev anine Londrê
ù pê xaniyên xesar-
diti hildiwesnin ù
kûçeyên Londrê ji nû
ve saz dikin.

4— Ji ber bimbar-
dimanan di Londrê
de gelek xani hilwe-
şiyane ù xelk bê se-
kan mane. Ji vî îşî
gelek caran geleş dike-
ve navbera cîranan.
Hikûmetê bi qazîkî
xisûsî ù bê pere wan
geleşan dide hel kirin.

Bi vî awayî îşê mehkeman sivik dibe ù memûrên mehkeman ji ji bo zefere
dixebitin. Heta vê derecê Ingiltere guh dide vî şerî. Ji ber ko herwekî mîster
Çorçil gotiye divêt Ingiltere vî şerî kar bike ù zora dijminê xwe bibe.

GENERAL KOLÉ
(LE GÉNÉRAL COLLET)

Ma kes li Sûriyê heye ko general Kolé nas nake. General Kolé ew eskerê frensîz e ko hi her awayî jiyina xwe têkîl jiyina Sûriyê kiriye û hinî zimanê wê jî bûye.

Kolé birekî ciwanîya xwe î mezin di navbera seray û qîşleyên Sûriyê de borandiye û emrê xwe di şerên Sûriyê de derbas kiriye. Di vî şerî de jî piştî ko balafirên elemanî di ser Sûriyê re firîyan û danîn balafirgehên Libnan û Sûriyê Kolé digel çerkesên xwe çû Felestîne, xwe gihande ordîwa Frensî Aza û hi ingilîzan re şerê Sûriyê kir û li 21ê Hîzêrana sala 1941ê wextê nivro ket Şamê û xelkê bajêr navê Fatihê Şamê lê kirin.

Ji vî awirî ve, hesêb Kolé frensîzekî sûrî ye. Belê general bi rîtha milazîm hate Sûriyê û tê de gîhaşte generaliyê.

Jina generêl banû Ane, vê paşiyê, kîtebek, bi navê « Riya Xelasê » nivîsandiye û tê de wesfê mêrê xwe daye. Em di van stûnan de rê didin xwedîya Riya xelasê û jê hevî dikin ko jî me re der heqê mêrê xwe hin tiştan bi kurdmancî bibêje. Ev e banû Ane dibêje:

« Di sale 1918an de hejdeh siwariyên frensîz



ESKERÊN HINDÎ DI KEMYONAN DE

zor didan deriyên Nablîsê. Serekê wan siwaran milazîna Kolê bû. Ev siwar tovên kişwerê Frensa di rohelatê nîzing de bûn. Ev Kolê piştre bi kepîtên, bi kumandan h.d. dibe û ji hingê ve navê Kolê têkili tarîxa kişwerê Frensa yê rohelê ye Em li Helebê bûn. Radyowa Rohelet da zanin ko eleman ketine Parisê. Çend saet ketin navê. Ji nişkekê ve Kulnêl rabû ser xwe; kulmên xwe şidandin, gonê wi guhêri, xwîn ji lèvên wi revin. Bi kê re xeber dida? Gelo bi Xwedê re dipeyivî? . . . Kulnêl xwe hilavêt û sond xwar ko wê bijî bi tenê ji bora ko elemanan ji Parisê derine . . .



ESKEREN INGİLİZİ DI PERAVÊN BRİTANYAYÊ DE


Ez li ber perwana timobilê rûniştî bûm; şiforê kulnêl Kolê. Mêrê min emirê xwe ê pêsîn da û gote min : « Ber bi pêş û î her bi rastê ». Mîn dîzanî ko rîya Şamê li milê çepê ye. Me berê xwe da bû erdê miqedes, her bi alên



sondxwariyan û her bi ala azahiyê Timobil bi lez diçû. Xewa min dihat. Ma wextê xewê bû. Ji bona ko xewê ji xwe birevinim mîn dest bi strandinê kir. Mêrê min gote min : Hedî pitê hêdî, heye ko ji Şamê dengê me bikin Axir em ketî bûn erdê Şerqilerdenê. Lê Kolê beriya ko zabî û eskerên xwe bibîne nikari bû bihua xwe bide. Dawiyê hatin. Heye ko xwendevanên min li min ecêbmayî bimînin. Lê ji ber ko ez zabîten mêrê xwe birayên xwe dihesibînim gava ez wan ji nû ve peyda dikim ez wan maç dikim General De Gol li Qahirê bû. Bi telefonê banî mêrê min kir. Jê re balafîrek rêkirin . . .

TANGINE INGİLİZİ DI TALİNGAHEKE BRİTANYAYÊ DE

Li Qudsê, em di salona otêlê de bûn. Wek brûskêkê nûçeyek belav bû : « Frensîzên aza keline Sûriyê ». Ez li xwe ecêbmayî diman. Çawan bû ko gava ji min xatir xwest ez pê ne hesiyan ko ji nû ve berê xwe dide cengê



DI CENKEŞTIKE INGİLİZİ DE TOPÊN PIRA PÊŞ



SEFERBERIYA JINAN
JINKEKE INGİLİZİ DI XIZMETA WELÊT DE

KENEDE

Kenede li bakurê Emêri-
kayê û dominyoneke ingilîzî ve.
Kenede welateki mezin û fireh
û dewlemend e. Ji destpêka vî
şerî ve Kenedê digel mistemlike
û dominyonên din ên ingilîzî
arîkariya Ingilîterê dike û stola
wê di Etlantikê de bera noqarên
elemani dide. Ji milê din febrî-
keyên Kenedê her texlît çek û
posatan çêdikin; nemaze balafî-
ran. Di Kenedê de ji bo balafîr-
vanan dibistanin hene. Di van
dibistanan de balafîrvanên in-
gilîzî jî hînî balafîrvaniyê dibin
û jê tîn welatê xwe û di eniya


roavê de dikevin şer. Ji aliyê din Kenede esker jî dişîne Ingilîterê. Klîşa me
birêkî wi eskertî şanî dide. Dibêjin ko kenedî mêrine qenc in.



JI BIMBAVÊJÊN INGILÎZÎ ÊN MEZIN YEKE SPÏTFAYER.

DI DEQÎQEKÊ DE
400 Lireyên Ingilîzî

Ewistralye welateki mezin û fireh lê welateki kêmnifûs e. Xelkê spi yanî jî nijadê ingilîz 7 milyon in. Herçî ewistraliyên esli gelek kêmbûne qedere 60000 peya. Dora Ewistralyayê 20000 kilomêtir e. Bi nîzingbûna japonan ewistralî digel emêrikaniyan jî bo midafeha welatê xwe xebateke zor dixebitin. Ji vê xebatê re jî ewçend pere divêtin. Dibêjin ko Ewistralye jî bona vê yekê di deqîqekê de 400 lireyên ingilîzî serf dike; li saelê 24000 û li rojê 576000 lire.



GENERAL LARMINE DI QERARGAHA XWE DE




TANGINE FRENZA AZA JI FIRQA YEKEMİN DI ÇOLÊN EFRİQA ROAVÊ DE.

QEWETÊN

Frensa Aza Ên Mekaniki

Herweki swende-
devanên me dizanin
di vi şeri de nemaze
qewetên mekaniki bi
kêr tî. Ji lewre Fren-
sa Aza di vi wari de
xebateke zor dixebite
û hero tabûrîne me-
kaniki ên nû dilîne
pê. Di kliša tenîştê
de kulnêl Engêlo tabû-
reke mekaniki ya
Frensa Aza teftîş dike.



BÎRMANYE


Bi şerê Pesifikê deng bi Bîrmanyayê ji ket. Ji xwe îro şer di zikê Bîrmanyayê de çêdibe. Bîrmanyayê ji aliyê rohelê deriyê Hindîstanê ye. Ji xwe berê, Bîrmanyayê wilayeteke Hindîstanê bû. Vê paşiyê îngilîzan ev jê veqetand û jê re istîqlaleke daxilî da.

Erdê Bîrmanyayê erdeki gelek dewlemend e. Tê de pêtrôl jî heye. Lê hatinên wê ên bîngêhî riz û texte ne. Nifûsa Bîrmanyayê 15 mîlyon e. Pîraniya xelkê bûdehî i.e. Welat jî heykelên Bûde tîjî ye. Heykela Şwîden-gon jî heykelên dewlemendîr tête hesêb. Quba wê tev de zêr e.

Di jiyîna civakî de xelkê Bîrmanyayê, li gora qanûnan, jî hin mîletên ewropayî jî pêşvetir in. Di Bîrmanyayê de jinan weke mîran heqên siyasî hene û jin di gerandîna îşên hikûmetê de rolîne mezin dileyîzin. Jî nê Bîrmanyayê di rohelalê dîr de jî nê spehitir in.

Rêl û çîyayên Bîrmanyayê zehf in û ew gelek xweşbergeh in.

Bîrmanyayê ji aliyê bakur dîgehe Çînê; Çîna ko di bin hikûmetê merêşal Çenkeyşek de ye. Ji lewre eskerên çînî digel îngilîzan şerê japonen dikin; şerê xurt û dijwar.



STOLA ÎNGILÎZÎ: TOPÊN ÇENKEŞTIYEKE MEZIN



TANGEKE BRÎTANÎ BERÎ ŞERÎ DJI TALÎMÊ DE



QEWETËN MËKANIKÏ YËN FRENSA AZA DI ÇOLËN EFERÏQAYË DE
Û BER BI QADA ŞËR

Küriyariya Ronahiyê: Li salê 500 qirûşên sûri.
Xwedi û gerinendeyê berpirsiyar: Mir Celadet
Ali Bedir-Kan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL. 1
HEJMAR 3
—
DUSEMB
1 HIZÊRAN 1942

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 3
—
LUNDI
1 JUIN 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



MISTER ÇORÇIL SEREKWEZÎRÊ INGILTERÊ LI TANGEKE NÛ TEMAŞA DIKE



ŞAM—1942
CAPXANA SEBATÊ

SINEMXAN

U RESMËN RONAHİYÊ

Hejmara Ronahiyê a dido-
wan biderketi bû. Min jê çend
nivişt ani bûn mal. Çavê Sinem-
xanê pê ket û ji min pirsî:

— Bavo ev Hawar e an Ronahî ye?

Min got: keça min ev Ronahî ye, Hawara nû heta çend rojan wê derkeve.

— Ji kerema xwe ka yekê bide min.

Min nivişteka da-ê. Sinemxanê Ronahiya xwe kire ber xwe û bi diqet li resimên wê temaşa kir. Piştî ko temaşa xwe qedand serê xwe hilda û gote min:

— Bavo! ev Ronahî ne qenc e, a din jê çêtir bû.

Min got: keça min, ji ber-vajî ve ev Ronahî ji a din qenc-tir e; resimên wê bêtir in û bi tevayî ji a nivîšta pêşin libev-

hatitir e. Sinemxanê li min vegerand û got: No bavo, ev Ronahî ne spehî ye. Resimên tê de hemî resimên apê inglîz û eskerên apê Lêzgo ne—yanî firensîz—tu resimên kurdmancan tê de ninin. Di a din de resimên kurdmancan hebûn; kurdmancan direqîsin.

Sinemxan hinek sekini. Qey dida eqilê xwe û xuya dikir ko qîma xwe bi vê Ronahiyê ne dianî û hêj dilê xwe li min rahet ne kiri bû. Careke din serê xwe hilda û gote min:

— Bavo, ji boyî Hawarê ga-va em ji te dipirsin tu dibêji: ev Hawara kurdmancan e, ma Ronahî jî ne Ronahiya kurdman-can e?

Ez kenim û min lê vegerand û got: Belê Sinemxan xebera te ye. Lê tu dizanî ko dinya şer e û her tişt giran bûye, em nikarin ji nû ve klîşan bidin çêkirin. Bi klîşeyên hazir û berdest em bes dikin. Kani resimên kurdmancan, ji xwe resimên kurdmancan li nik me ninin.



TOPEKE TANGŞKEN YA ORDÎWA INGLÎZÎ



JÎ ESKERËN FRENSA AZA HÊŞTIRSIWARËN BERIYÊ

Stuexanê nemerdi ne kir hema rabû çû, û resimeki xwe digel Çemşid anî û da destê min û got:

— Ev e ji te re resimeki kurdmancan, ma ez û Çemşid em ne kurdmanc in?

Çemşidê ko heta hingê têkili şêxaliyê ne dibû gava navê xwe bihist bêt ko bizane em qala çî dikin berê xwe da min û got:

— Belê bavo ez jî kurdmanc in; ez torinê mala Azizan in.

Zarowan zora min biri bû. Min nizanî bû ez jî wan re çî bibêjim. Heq di destê wan de bû lê min ne dikarî bû ez dâxwaza wan binim cil. Min resimê wan kire kûrika xwe û berê xwe da çapxane.



ESKERÊN FRENZA AZA LI EFRİQAYÊ

Eskerên Frensa aza herçend ne gelek bin ji di her derê û di her çekê de peyda dibin. Frensizên aza nemaze di şerên Efrîqayê yanî di eniyên Lîbye û Hebeşistanê de gelek bi kêr hatine. Klîşeyên vi rûpelî şanî wan didin.

KLÎŞA JORÎN: Frensizêki tihîj cewdikê avê bera ser xwe daye û avê vedixwe.

KLÎŞA JÊRÎN: Topeke talyanî e balafirşiken. Frensizên aza ev top ji talyanan standiye û niho bi vê topê bera balafirên talyanî didin.

DANËN

XELKË INGILÛSTANË

Ingiliz bi qasi bo-
tiki nexwin ji bivê
nevê bi qasi kurdman-
ceki adetî dixwin.
Wextê xwarinan ji bo
ingilizan wextê civat
û wensê yeji. Bi kurti
îşê xwarinê ji bo in-
gilizan îşekî girane ye.
Berê di sedsala hej-
dehan de ingiliz wek
parêvê kurdmancan
ga, golik dibiraştin.
Iro ev ne maye; nema-
ze di wextê şer de.
Digel vê hindê û rex-
ma tengiya şer ingili-



(1)

zên adetperest di wextê xwarinê de digehin hev û bi tama xwarinê jî tama civatê
ji zewqiyab dibin; herweki klîşeyên me ên jêrin şantî didin.

Bivê nevê hikûmetê wek her tiştî ev mesele jî saz kiriye û herkes li gora
rêzîka xwe jî vê nîmetê behredar dibe.

1 — Di vê klîşê de salona qesreke kevin dixuye ko tê de berê ziyafetine

(2)

(3)



mezin çêdibûn û jinên lordan direqîsin. Îro tê de xwehên dilovanîyê yê ko li nexweş û birindaran dinêrin xwarîna xwe dixwin.

2 — Saloneke belediya Londrê. Ev salon ji bo wextê şer vala kirine û sifre tê de danîne û ew kirine xwarinxaneke xelkê. Bê awarteyî herkes dikare here wê salonê û tê de bixwe.

3 — Herwekî me berê ji got ingilîz ne cotkar in û erdê wan ne erdekî binan e. Lê ji roja ko şer dest pê kiriyê ew gelek guh didin cotkariyê û bi encamî guh didin cotkaran ji. Wextê nivro metbexên guhêşbar zevî zevî digerin û ji cotkaran re xwarinên germ belav dikin; herwekî klîşa sîseyem şanî dide.

4 — Di vê klîşê de xwarinxaneke dibistanêke keçan têtê ditin (Saint-Brandon). Ji ber bombardimanên hewayî ev dibistan guhastîne derveyî Londrê û danîne qesreke kevuare. Wer dixuye ko kêçilokên Londrê di qesrê de gelek bikêf in; dixwin û dikenin.

5 — Di nav dibistanên Ingi-



(4)



(5)



(6)

Iterê de Kembrîç (Cambridge) gelek bi nav û deng e. Ne bi tenê inglîz; xelkê biyanî jî diçin û di wê dibistanê de dixwînin. Klîşa me: şagirtên Kembrîçê bi belgihên xwe ên dibistanî li ber sifra xwarinê rûniştî ne.

6 — Herçî ev klîşe rast bi rast bi xwarinê ve ne girêdayî be jî bi awakî nerêrest dîsa îşê xwarinê ye. Baniwek dara bexçeyê xwe dikezixîne da ko sala tê berên wê bi zêdahî bixwe.

ŞERÊ ÇINÊ

Çinê berê bi tenê jî bo parastina welatê xwe şer dikir. Lê jî roja ko japonan dirêjî inglîz û emêrikanîyan kir Çîn jî bo doza hevalbendan şer dike. Ji lewre eskerên Çenkeyşek daketin heta Birmanayê û li her japonan sekînine. Klîşa tenîştê ferman-dereki çînî şanî dide. Femandar li ser hespê xwe ye û êrişekê digerîne. Çîn welateki têrnîfûs e. Heke



çek bi dest kelin çînî wê gelek japonan biêşînin.



STIRLING
Ji bombavêjên inglîzî yeke Stirling. Di van balafirên de çar motor hene û ev balafir jî balafirên dinyayê jî ên mestir têne hesêb. Balafir di wargehê xwe de ye û lê bomban bar dikin. Ewê disau here û bombeyên xwe berde li ser wargeh û depoxaneyên neyar.

ŞER

MÊRANÎ Û CAMÊRÎ

Di şer de mêranî şertê pêşîn e. Me got û em hergav ji dibêjin. Mirov dikare bi ser ve zêde bike û bibêje ko mêranî di her tiştî de şertê pêşîn e.




Belê mêranî di her tiştî de qenc e û di her tiştî de bi kêr têt, di dema xeberdanê de jî. Yên ko dikarin bibêjin «no» mêrên qenc in. Herçî «herê» gelek caran pirsî mirovên pis û durû ye.

Lê mêraniya baş û sezayî pesn û şabaş ew nêranî ye ko ciwanmêrî pê ve ye û bêbextî dûrî wê ye. Mêrê qenc li dijminê xwe heta ko wî ji desthilanîne bêxe, dide. Lê gava dijmin ji dest hilanîne ket û teslim bû îdî li wî xistin ne mêranî lê bêbextî û nêmerdî ye. Heye ko vê qeydê jî wek her qeydê amarteyî hebe.

Klişa tenîstê a jorin çî lewheke spehî dinimîne. Balafirvanekt R.A.F. piştî ko dijminê xwe avêtiye behirê jê re filûqeke kewçûk daxistiye û jî mile din elam daye lezbotan ko bêne hawara wî. Balafirvanê neyar bi filûqa kewçûk xwe jî binavbûnê xelas kiriye. Lezbot jî dike wî jî behirê derîne û bibe çerargaheke hêstran.

Klişa didowan: Balafireke îngilîzî dike jî wargehê xwe bi firê bikeve.

Klişa siseyan: Li cenkeştike îngilîzî gule û cebirxanan bar dikin.



BISERHATIYA

SÊ BALAFIRVANÊN EMËRIKANI

Di rohelatê dûr û di şerê japonan de sê balafirvanên emêrikani ketine behirê û 34 rojan li rûyê behirê mane. Yekî ji wan biserhatiya wan roj bi roj nivîsendî bû. Bojnameke emêrikani ew rûzname belav kiriye. Veye rûzname:

Roja pêşîn — Ji nişkekê ve balafira me ji rêveçûnê ket û nizim bû. Gelek ne borî balafir noqî avê bû. Me filûqa kewçik jê xelas kiri bû; bêî ko em bikarin zadek jê hillin.

Roja 2 — Tihniyê zor dida me. Hevalekî me bi kêra xwe masiyek kuşt. Lê ji ber tihniyê pari di qirika me re ne diçû.

Rojên 3,4 — Em gelek birçî bûn. Lê me nikari bû em masiyê xwe bixwin.

Roja 5 — Ji tihni û nêzan me digot qey emê himirin. Ji nişkekê ve rehmeta Xwedê hate hawara me. Çend peşkên baranê. Piştî baranê xurt. Me têr vexwar û liştê ko ji ber masî ma me ew jî xwar.

Roja 6 — Pêlên behirê filûqa me a piçûk ewçened dihejand ko me nikari bû em di xew re biçin.

Roja 7 — Me masiyek bi 120 sentimêtir dirêj kuşt. Goştê wî gelek tamdar bû. Ji zikê wî du masiyên hûr derketin. Te digot qey ew di beroşê de kelandî bûn.

KLÎŞEYÊN VÎ RÛPELÎ

1 — Di ordiwa inglîzî de telêfon û telêgrafa çolê.

2 — Zabitên kenedî di mewnêrakê de. Bi Zabitên debançeyên timatik hene.



Roja 8 — Me goştê mési li ber tavê hişk kir. Héj çêtir bû. Baran ji dibarî.

Roja 13 — Ji dihi ve me tiştêk ne xwar; ne teyr ne masi xuya ne dikirin.

Roja 14 — Me teyrek kuşt û masiyek girt. Her du ji heywanine xerib. Lê goştê wan spehî. Baran ji datêt û em ji ber avê nakevin zehmetê. Herçî filûqa me bi hêlekanê li rojê 50-60 kîlômêtir diçû.

Roja 19 — Zadê me ne ma, lê peşkên baranê qut ne dibûn. Hevalekî me li rûyê avê tiştine girover dîtî. Em bi ser wan de çûn; ew gwizine hindî bûn. Rûyê me kenî, ev delêletêk bû ko bej nizing e.

Roja 24 — Gwizên hindî nema xuya kirin. Dixuya ko ji nû ve em dûri bejê keti bûn. Me teyrekt behirî kuşt û ew xwar.

Roja 27 — Cenawirekî behirî dev li tilike hevalekî me kir.

Roja 32 — Can û giyanê me sist bû bû; imîda me dihatê birîn.

Roja 33 — Cwizên hindî ji nû ve xuya kirin. Şevê pêde filûqa me di nav van gwizan re diçû. Gava li me bû ronî me bej dît. Piştî nivro me pê li erdê hişk kir.

KLİŞEYÊN VÎ RÛPELÎ :

1 — Balafîreke torpilavêj. Di van balafîran de torpillên behirî hene. Ev torpil gava digihin behirê bi perwana xwe wek torpillên noqaran, ji xwe ber, ber bi armancê ve diçin.

2 — Ji topên ingiltzî topoke peravtn 350 st. mezin.

3 — Du cenkeştîyên Frensa Aza.



FRENSA AZA Û STOLA WE

Ev gotin bi xwe, gotina « Frensa Aza » çi gotineke şêrin û cazîbedar e; nemaze ji me kurdmançan re.

Diyêt firensizên wê Frensê firensizine welê bin ko ji bindesti û zorkeriyê dikerixin û azahî û serbestiyê dixwazin. Piştî Xwedê perestoyê wan azahî ye; azahiya can û giyan e.

Belê Frenseke aza, ne Frenseke girti û bindest, ne Frenseke bêşan û şeref û bê rûmet. Firensizên aza Frenseke welê dixwazin ko tê de mirov bikare bêperwa xeber bide, ji qanûnê pê ve ji tu tişt û ji tu kesî netirse; serbest bigere û serbilind bimire; û gava mir ne bi tenê jiyîn lê mirin ji lê bigiri.

Tiştên ko em bi xwe, ji bona xwe û ji bona Kurdistanana xwe a eziz dixwazin.

Çi teşkilateke nefspîçûk, reşma ko ji gelek dewletên xudantac û şah xurtir e navê dewlet û hikûmetê li xwe ne kiriye.

Belê Eucîmena frenza aza û ne Hikûmeta frensa aza; Kumîsêrên frensa aza û ne Wezîrên frensa aza, Sergevazê frensa aza û ne Serekdewletê frensa aza.

Fransizên vê Frensê gava Frense bégav ma û çûkên xwe danî di riyên behir û hewayê re terka welêt dane û ji derve di bin ala serekê xwe ê hêja general De Gol de gihane hev û bi her awayî dest bi karê şer kirine.

Di vê navê de stol ji hebû. Diviya bû Frensa aza stola xwe ji hebe. Stol



çekên behirê, behir ji renza azahiyê


Gava mitareke çêbû wek hemî çekên firensî çekên behirê ji di nav du fikir û xiyalan de li xwe ecêbnayî ma bûn: guhdariya emirê hikûmetê bikin û çekên xwe deynin an guhdariya dengê dilê xwe bikin, rex û bostê xwe girêbidin û ji nû ve sîng û berê xwe bidin ber agirê top û gulan.

Yên ko li wan bihistiyan-rike hêj ziravtir hebû dengê dilê xwe kir û berê keştiya xwe di hêpivaniya dehiran de ber bi azahiyê da.

Emîral Mûsolyê «Musolier» di nav van ziravbihistiyanan de ê pêşin bû. Emîral digel çend keştiyan terka Mersilyayê da û hate cebeltariqê û jê çû Londrê û xwe gihande De Gol. Ev çend keştî bûne himê stola Frensa aza. Li ser vi himî û birêva stoleke tekûz şin bû.



LEZBOTEKE FRENDA AZA LI PEY NOQARÊN DIJMIN.



MÉRÊŞAL JOFR DI XIZMETA FRENDA AZA DE Merêşal Jofr vaporeke rêwingîyan bû. Iro di xizmeta Frensa Aza de û bi stolê re dixehite û çek û esker dibe qadên şer û di mehcetê de bi topên xwe ên hûr bera noqar û balafirên ji dide.

Iro di vê stolê de gir û hûr qederê sed keştî hene û ev keştî li rex stola ingilîzî û yê hevalbendan, li her derê û bi qehremanî şerê dijminan dikin û herweki medheloka kurdmancî gotiye destûra wan « Heta mirinê çav li kirinê » ye.



Kirdiyên van der-yavanên bênav gelek in. Gelek caran danezanên ingilîzî di nav xêzikan de pesnê van rewingiyên riya xelas û azahiyê didin.

VAPOR

Û EHEMIYETA VAPORAN

Ji bo karkirina vi şerî ji şerevaniyan re gelek tişt divêtin. Çekên bejê, çekên behirê û çekên he-wayî. Herçi çekên behirî ew jî du texlîl in di ser û di bin behirê re. Yên bejê iro bi tenê di ser axê re ne. Heye ko sibe di bin axê re jî çûn û hatin çêbibe.

Îşê vaporan, namaze jî bona sondxwariyan gelek bi ehemiyet e. Sondxwari gelek jî hev belav in. Navbera Ingillere û Emêrikê rîya hezar kilomêtiran e. Ji milê din Ingillere giravek e û jî mistemlikeyên xwe gelek dûr e. Jê re her tişt jî der ve têt. Ji milê din noqarên elemani jî peravên Ingilterê hela Emêrikê rê li vaporqesleyan digirin û dirêji wan dikin, û heke kês bi wan anîn li wan dixin.





Ji ber vê yekê her du dewletên behirî ên mezin Inigillere û Emêrike gelek guh didin çêkirina vaporan. Di vê navê de Kenede jî xebateke zor dixebite. Vê paşiyê destegahên Kenedê di lezbûnê de jî hemî destegahên hevalbendan derketîne û hewdê vaporekê di 80 rojan de çêkirine.

Klîşa me a jorin vaporekê li ser destegahê; a jêrîn jî topên cenkeştiyêke ingiltzî şantî dide.

TOPA BALAFIRŞIKEN

Eskerên ingilizi di çada Libyayê de topeke balafirşiken kaş dikin. Ewê wê di tabiyakê de cih bikin.



BALAFIREN BEHRI

Balafirên ingilizi ên behiri piştî ko ji febrîkan derketine. Ev balafir dê bêne ceribandin û paşê li eniyên şer dê belav bibin.


ÇAYA FIRAVINÊ

Ingilîz bêî çaya firavînê nîkarin. Ingilîz jê re çaya saet pêncan dibêjin. Di klîşa me de eskerên me jî eskerên nêr re tas las çaya firavînê didin.



PETROL Û BARÛT

Di vi şerî de petrol bû he-
vala barûtê. Herwekî berî
bê barût şer çenedibû, îro
jî bê petrol şer çenabit.
Agir bi her diwan jî zû
dikeve û dereng têtê temi-
randin. Ji lewre şerevani li
depayên petrol û benzîne
digerin û li wan didin
û agir bi wan dixin; mîna
ko klîşa tenîştê şanî dide.




ESKERÊN ÇÎNÎ

Çin welatekî bişûn-
demayî bû. Di van
salên paşîn de gelek
pêşve çûye û ordûke
nûjen aniye pê. Çînî
hin çekan bi xwe, di
welatê xwe de çêdikin.
Herwekî di klîşê de
tête dîtin eskerên
çînî yên ko bi kelekê
li avê derbas dî. In
bi her awayî wek es-
kerîne ewropayî ne.


JÎ ŞERÊ LÎBYAYÊ

Di eniya Libyayê de tan-
gên îngilîzî piştî bombar-
dimaneke hewayî dirêjî
xelên dijmin dikin.





TANGËN KENEDÛ PIŞTI KO JI FEBRIKAN DERKETINE DIÇIN TALINGAHË



TORPILËN BEHRI DI FEBRIKAKE INGILISTANË DE

Ev torpilên ha ji barûl, dînamit û ji her texlit madeyên teqandinê tijî ne. Noqar û torpiyoy wan lavêjin behirê û ew bi xwe wek vaporeke biçûk ber bi armancê ve diçin, lê dikevin û diteqin. Di resmê jorin û di torpila bitenekirî de perwana torpilê ji dixuye. Ev perwane digere û torpilê dimeşîne.



BALAFIRVANËN INGILZÏ PIŞTÏ KO LI BERLINË XISTINE Û VEGERIYANE
WARGEHË XWE LI BER BOMBAVËJEKË BIHNA XWE DIDIN



DI ENIYA ÛRIS DE ESKERËN POLONÏ BI BELGHËN XWE ËN ZIVISTANI


DE GOL

ÇAWAN JINA XWE NAS KIR

De Gol bû bû kepitên lê hêj ne zewicî bû. Di sala 1920an de dostekî wî ew ezimandî bû çayê. De gol ji piyan sekîni bû; fîncana çayê bi dest. Di vê demê de nasekî wî hat û destê wî guyaşt. Tasa çayê hejiba û çend dilop çay ketin ser fistanê xanima ko li rex De Gol rûniştî bû. De Gol ji vî îşî gelek aciz bû, zehf li ber xwe ket û çend caran efiwa xanimê hêvi kir. Bi vî awayî xebardan, di navbera wan de, çêbû û ew beta dawîya ziyafetê dom kir.

Piştî pênc mehan De Gol ew xanim yanî — Ivon Vandrû — mehir kir. Ivon iro banû De Gol e û jê sê zaroyên wê hene. Hemî xêra sê dilopên çayê yên ko ketine ser fistanê banû Ivon.

Iro xelkê mîala general De Gol li nizingî Londrê, di gundeki de dijîn.




KLÎŞA JORÎN — Topeke îngilîzî e mezin. Navê vê topê « Boche Buster » e. Topeke gelek mezin û dûravêj e. Dibêjin ko di dinyayê de jê mestir top nîne. Febrikeyên îngilîzî vê paşiyê ji van topan bi deste çêdikin.

KLÎŞA JÊRÎN — Biserhatiya torpilekê: Ev torpîla bêsûc piştî ko ew avêtine behîrê berê xwe daye vaporekê û dike lê bikeve. Ko lê ket ewê biteqê û bimire; lê divêt bimirîne jî. Şopa ko li ser behîrê hişliye heke pê re winda ne bû, di pey wê re jî gelek namne, digehe xwedîyan.



NÜZELAND

Nüzeland wek Ewistralyayê dominyoneke ingilizî ye. Girava Nüzelandê nizingî Ewistralyayê ye û xelkê wê wek ewistralyan ji nijadê ingilizî ne û bi ingilizî xeber didin. Di vi şerî de nüzelandî gelekî bi keri Ingilterê hatine. Di gelek deran de ji bo doza sondxwariyan şer kirine û iro jî dikin. Klişa tenîştê eskerên nüzelandî ên piyade şani dide.



LİBYE Û ŞERÊ BALAFIRAN

Vê paşiyê di qada Libyayê de şerê hejê heçko sekiniye. Hebe ji listîne bê ehemiyet, girtinheva pêşderan û hew. Lê herçi şerê balafiran, ev şer heye ko ji herê ji xurtir e. Her du alî bi şev, bi roj li wargehên hev didin. Klişa me di Efrîqê de qadeke serî şani dide. Ingilîzan balafireke elemanî avêliye erdê.

ESKERÊN

ÇINA NEVEGIRTÎ

Eskerên Çina nevegirtî xebateke zor dixebitin û ev pênc sal in ew bi pêsîya japonan sekinine û şerê wan dikin.



Eskerên ko di klişa me de ne eskerine çini ne-û di ser pîrekê re derbas dibin. Ev esker diçin hawarê Kwentlûngê.



NOQAR

Di vi şerê bêeman de du çekên nûjen hene ko rehma ko bi xwe kiçik in testra wan mezin e: noqar û balafir. Balafir di ser sere me re digerin û ji jor de li me didin. Herçi noqar heke em li behirê ne, di bin me re tèn û diçin û em wan nabinin. Lê ew bi dûrebinên ko di ser avê re diminin me dibinin, û heke kês li me anin dertên rüyê avê û bera me didin.

Ev aletên piçûk ji bo destgahên çekan û ji bo cenkeştiyan talûkene mezin in. Balafir an noqarek heke rê pê ket dikare cenkeştike bi 40000 tonî bi bombe an torpilekê bin av bike. Ev tişt di vi şeri de gelek caran qewimiye. Bi tenê balafir herçend bilez e noqar ewçend meşgiran e. Balafir di saetê de 400-600 kîlomêtir dikare bifire. Herçi noqar di saetê de ji 15-20 kîlomêtiran bêtir nikare here. Ji lewre noqar hergav nikarin vegerin wargehê xwe. Klişa me şani noqareke inglizi dide ko vegeriya wargehê xwe û çek û zadê xwe dibe ta ko ji nû ve vegere dûrahiya behiran û li dijminê xwe bigere. Jê re bi vinçê torpilê ji dadixin.



BERTORPIYOREK JI PÊNCI BERTORPIYORÊN KO EMERÎKÊ DANE INGLTERÊ



BOMBAVÈJEKE INGLÎZÎ JI TÎPÊ EVRO MENÇESTER

Ev balafira dêwendam gelek dûtger e. Bi çend ton homban tê û diçe Berlinê.
Ji her mezinahiya balafirê peyayên wê di bin baskê wê re wek mûriyan dixuyîn

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrî.

Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar : Mir Celadet
Alî Bedir-Kan . Şam—Sûriyê
Directeur Propriétaire : Emir Djêladet Aalî
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 1
HEJMAR 4

ÇARŞEMB
1 TIRMEH 1942

RONAHI

ANNEE 1
NUMÉRO 4

MERCREDI
1 JUILLET 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



KALO NE LI MAL E, PIRÉ RAHIŞTE WERISE MASIVANIYÉ Û LI KAR E.



ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÉ

EV KÎ YE ?

Belê kalo ki ye ? Ev-kalê mûsipî, rûqermiçi û porweşihayi ki ye ? Li hire çi işê wi ye ? Sûretê wi ma çire ketiye Ronahiye ?

Pa ew şah, sehmerşah, qral, imperator, reiscimhûr, serekdewlet, zana, pispor an qehremanek e ? No, ne yek ji ji van hemiyan. Kalo şagirdek e; şagirdekî dibistanê. Kalo ji xelkê Londrê ye û navê wi « Albert Arthur Lewis » e. Kalo 57 salî, inaldar û xudan zar û zêç e. Digel 57 salên xwe, kalo vê paşiyê ketiye ûniversita Londrê, yanî dibistana ko tê de diktori, mihendisî, kimyageriyê h. d. hîn dibin.

Ma çire ? Bi tenê ji bo zanistiyê, tenha ji her hezkirina zaninê.

Kurdino ! malnexibrabino ! ji kalo ibretê bigirin. Ez ji we re nahêjim bi 57 salên xwe ve bikevin ûniversitê. Lê beriya 57an hînî xwendin û nivisandina zimanê xwe bibin.



gulan û bomban, li hev xin. Ev işêki zehmet û ewçend ji bi talûke ye.

Ev her du xanimokên ha, ma ew ji ki ne ?

Ew ji dixwînin, ew ji di dibistanekê de ne. Lê ew ne 57 salî ne. Nemaze ya ko berê xwe daye me û kumikên du qeleman di ser bêriyan wê re dixuyin, keçlokeke 16 salî ye.

Belê ev keçika 16 salî dixwîne, dixebite da ko rast bi rast bikeve sefa berevanên welatê xwe. Ji ber ko îro mirov hêl ko bixwîne nikare, weke xwe, bi kêrî welatê xwe jî bêt.

Ev keçika ha li Londrê, di dibistaneke xweser de hîn qeydeyên kimyayê hîn dike. Ev ne bi tenê ye, hevalên wê zehf in. Ewê tev de di vê dibistanê de bixwînin û piştê wê herin febrîkeyên ko tê de gule tene çekirin û madeyên teqandinê yên ko dikiu wan

ELASKE

Bi hênceta şgrê Pesifikê, nemaze piştî ko japonan esker derêxiste hin giravên Elêûtenê, gelek caran çêl li Elaskayê dikan.

Elaske dikeve bakurê roavê Emêrikê û ew niygiravêk e. Di erdê Emêrikê de ji her derê bêtir Elaske nizingî Asya-yê ye. Behira Behreng dikeve navbera Elaske û Sibiryayê. Di vê behirê re Pesifik dikebe behira bakur a cemidi. Erdê Elaskê gelek fireh e. Rûyê erdê wê 1376292 kilômêtir çarçik e, bi qasî Frensê du car û niyan. Lê xelkê tê de gelek kêman; nagehin sed hezarî jî; eskimo û biyanî.

Elaske welatekî gelek sar e. Behra Behreng ya ko dor li niygiravê digire ji Ilonê heta Hizêranê dicemide. Xelkê kevin tev de eskimo ne. Ūris, piştî hin emêrikani jî çûn-ê û tê de cih bûne. Hatina welêt nemaze masivani û nêçira dehban e. Kurkine hêja û girandeha jê dertên. Di erdê wê de hin maden jî bene; wek zêr û komir. Lê ji ber xurtiya sermayê wan kanan nikarin weke xwe bişxinlinin.

Eleske, di sala 1741ê de Ūrisan keşif kiri bû û bû bû milkê wan. Di sala 1867an de hikûmeta Emêrikê, Elaske ji ber sebhên eskerî û siyasi, ji Ūrisan bi 7 200 000 dolari kiri. Heye ko di vî şerî de bi kêrî wê bêt. Ji ber ko di erdê Emêrikê de ji Elaskê bêtir tu erd evçend ne nizingî Japon û Rûsyayê ye.



BALAFIRVANÊN HÊSIR DIÇIN QERARGAHEKE HÊSIRAN



SÎWANVANIYÊN INGLÎZÎ DI TALIMGAHEKE INGLÎSTANÊ DE

CEBRAİL

HİTLER, STALİN, MUŞOLİNİ,
ÇORÇİL Ü MASİYÊ ZEFERÊ

Gelek çaran gava işê yeki hebe an tiştêki wî winda bibê diçe nik falçî an remildareki û li fala xwe dide nihêrtin. Ev jî bo mirovine adeti ye. Lê herçî serekên vî şerî nikarî bûn li xwe deynin û herin cem falçîkî. Ji lewre çûn ba Cebraîl û jê pîrsin; gelo kî jî me her çaran vî şerî wê bibê serî û bigehe zeferê.

Cebraîl di keviya bêrmekê de rûniştî bû û li masiyê ko di nav bêrmê de diçû dihat temaşî dikir. Milyaketê salxwirde, serê xwe hilda û gote wan:

— Yê ko ev masî girtî û jî avê deranî ewê zora hemîyan bibê û bigehe zeferê.

Muşolîni hema jî bindav de rabû, xwe şidand, mehmûzên çizmeyên xwe li hev da, û bi silaveke faşîstî qesta pêş kir û wek denekî xwe berda avê. Bêrm fireh, av kûr û masî jî mezin bû.


Dûçe li avê welê gêr bû ko li xwe wergeriya û her du lingên wî li rûyê avê xuya kirin. Bû

KLÎŞEYÊN VÎ RÛPELÎ :

1 — Tangeke îngilîzî li kemyonê siwar dikin.

1 — Eskerîne îngilîzî di welatên rohelatê dûr de.

3 — Du deryavanên noqareke talyanî û binavbûyî hildikişîn ser vaporeke îngilîzî.



Keftelefta wî. Ji Hitler ne biwa ew tê de difetîsî.

Dor gihastî bû Hitler. Réberê elemanan firehî û kûrahiya avê pîva, giraniya avê da weznê û di derenceyê re daket bêrmê û berê xwe da masî û ew ajot heta cihekî teng. Li wê derê bi her du baskên xwe li masî hate wer, ew xiste nav çemberê û girt. Hitler masî di himbêza wî de di derencê re bi hewa ket. Lê dema gihaste pêpinga paşîn lingê wî şemîtî, li xwe qelibî û masî ket avê.

Stalîn got ev îşê min e; hêz da, xwe û wek rawirekî li avê rapertî û dirêjî masî kir. Masî jê tirsîya, baskên xwe vekirin û wî jî ajote ser Stalin; bû şerê wan. Masi rahişte simbêlên Stalin û bi perçektî goşt nivê simbêlên Stalin rakir. Stalin destê xwe danî ser birina xwe û ji avê derket.

Her siyan li hev „nihêrt. Yekî got: Ma Çorçil li kû ye? Dor gihastiye wî bila ew ji xwe birçeribîne.

Lê geriyan. Çorçil di quncikekê de, xwe li keviya bêrmê pehin kiri bû û bi kulmekî xwe ava bêrmê vala dikir.

KLÎŞEYÊN VÎ RÛPELÎ :

1 — Bergehêk ji febrîkayên çek û cebîrxanan, yên Ingîlistanê.

2 — Di beristanên Efrîqayê de karwanekî kemyonan.






ZABITINE NOQARINE TAYVANI Û ELEMANI YÊN KO HËSÎR KETINE DESTÊN INGILIZAN,
ÇAVGIRËDAYI DATËN BENDEREKE INGILIZI.

JI STOLA F. A.

Stola Frensa Aza digel stolên hevalbandan şerê noqarên dij-
mîn jî dike. Klîşa me şani lez-
boteke stola Frensa Aza dide. Vê
lezbotê daye pey noqareke dijmin.





Kliša me bergelêki şerê beriyê şani dide. Herê dema ko di beristanên Efrîqayê de roj diçe ava; tangeke Firensa Aza berê xwe daye qedera xwe:

ŞERÊ BERIYÊ

Şerê beriyê hinek dimîne şerê behîrê. Dîvêt di navbera her du şerevaniyan de xelîne gelek sabit nîn bin û ew bêî ko bizanin bîkevin pêş û paşên hev.

Herweki îro di dora Birhaşimê de çêdibe.

Elemenan ji aliyê nivro berdaye ser baskê ingilîzan û li Birhaşimê wer hatine. Ji milê din di zeviyên torpilê re derbas bûne û ketine navbera belîr û Birhaşimê. Di Birhaşimê de eskerên Firensa Aza hene. Van eskeran du firqeyên telyanî perîşan kirine.



ETOMÎTRALYOZEKE RERIYÊ. EV ETOMÎTRALYOZ GELEK XURT Û BILEZ IN.

MIN

JI ROMEL RE ÇALEK KOLA

Vê paşiyê talyan û ingilîzan hin hêsir pev guhartine. Yekî ji hêsirên ingilîzî, Klîn Eskorç, birekî biserhatiya xwe bi awayê jêrin ji rojnamevanekî emêrikani re çise kiriye û gotiye:

— Li şeva 22ê Çiriya-paşin me di sehayê de rîya xwe wînda kiri bû. Şevê pê de, em bi texmin meşîyan. Bi şefeqê ve em rastî komeke tanga hatine. Ew tangine elemani bûn. Elemanan em hêsir girtin. Gava me nizingî li tanga kir me general Romel bi xwe dit. Romel li ser tanga xwe ji piyan sekini bû û êrişê bi destê xwe digerand.

Em kirin nav kemyonan de û em bi rê xistin. Tangajoyan welê guhdariya emirê Romel dikir, te digot qey ew li ser erdekî rast dimeşîyan û menawre çêdikirin.

Rojê pê de nûzêlendi û qewetên Efrîqa nivro gule û xumbereyên xwe li me dibarandin. Van bombardimanan hereketên dijmin diwarqilandin. Yên me gava bomberdimanên xwe dişidand, tangên elemani disekinîn û esker diketin nav çal û kortalan. Carekê guleke me ket nizingî kemyona ko em lê bûn.


Ein ji ji kemyonê peya bûn; me ji ji xwe re kortalek kola.

Romel li rex me bû. Bani min kir û gote min: « Ji min re jî kortalekê bikole ». Minê çî bikira, min ji Romel re jî çalek kola. Romel ket ê; lê ew ne eciband. Jê derket û gote min ko kortal ne bes kûr e; û teng e. Min ji nû ve dest hi kolana kortala Romel kir.

Wext ji bû bû nivro. Şer ji bi hewayê re germ dihû. Elemanan rahişte firça efrîqanî a pênçan.



NOQAREKE INGILÎZÎ DI BEHIRA SPÎ DE



VAPOREKE NÛ JI DESTEGAHÊ DATÊTE BEHIRÊ

Firqa me bi mëranti-li ber êrişa elemanan disekini û car caran radibû berhicûman ji û bera dijminê xwe dida.

Herçi em hêsir emiri me kirin ko em xwe bidin paş û xwe bigehînin piyadan. Herçi Romel weke berê li ser tanga xwe ji bejînan rep sekini, bi xwînsari emirên xwe dida; carina peya dibû û di navbera eskeran de diç û dihat, û xwe digihande herkesî.

Vê carê em kiri bûn timobilêke girtî; me dora xwe ne didit. Lê şer her û her germtir dibû. Gule û berik, pey hev di ber û di ser serê me re derbas dibûn. Demeke welê hat ko kemyona me sekini û em li ser zikê xwe, li erdê pehin bûn. Guleke me di ber me re bori û hingafte tangeke elemani. Tang wek qalîkê kisoki li xwe wergeriya, û beriya ko peyayên wê jê derkevin, ser hev de tepisi, şikest û çû... bû ax û xweli.



ESKEREKÎ RÛSÎ XWARINA HEVALÊN XWE ÇÊDIKE



HÊŞTIRSIWARÊN FRENSA AZA DI DORA TIDMIRÊ DE MENAWRAN ÇÊDIKIN

MÊVANÊKÎ

GELEK Î MEZIN E, JÊ RE DEH
KEÇIK DIVÊTIN

Adet û exlakê mîletan xerib in; ne wekehev in. Tiştê ko cem qewmekî qenc e, ev tişt hi xwe carina cem qewmekî din ne qenc e; xirab e; û ji ber vajî ve.

Di Pesifika nivro û di di nivrorohelatê Ewistralyayê de giraveke ingilîzan heye jê re Nûzêland dibêjin. Xelkê vê giravê melêzî ne. Di sala 1350î de qederê 700 melêzî bi hewdine adetî hatine vê giravê û ew vegirtine. Ji van 700 zilaman qewm û qebile çêbûn û piştê xelk bi eşiran lewa bûn û şer û berberî kete nav wan. Ev eşir adetên kevin bi xwe re hilanî bûn û di şeran de goştên hev dixwarin.

Çend caran hin ewropayîyan dil kir ko dakevin giravê. Lê xelkê giravê bera wan dida û ew bi şûn de vedigerandin. Di sala 1840î de ingilîzan daket giravê û ew vegirt.

Xelkê Ewropayê adetine xerib, di vî welatî de ditine. Lê ji hemîyan xerib-tir biserhetiya mibeşirektî ye. Mibeşir ji keşeyên




LI NORVEJÊ PIŞTÎ BOMBARANÊKÊ ŞEWATÊN BENZINÊ

protestan re dibêjin yên ko di dinyayê de digerin û xelkê li diyaneta Îsa pêxember bişyar dikin û dixwazin wan bikin tsewiyên protestan.

piştî ko ingilîzan girav vegirt keşekî englikan çû Nûzêlandê da ko xelkê bine ser rîya rast û ser rîya Îsa pêxember.

Keşe, keşekî tirtire û xef-tanekî bi xeml û xêz li ber bû. Herwekî di çîrokên de dibêjin; weşşiyên Nûzêlandê gava ew ditin, ji xwe re gotin, ev mêvanekî



«BLACKBURN BOWA» HÛPEK JI BOMBARÊJÊN INGILÎZÎ

vanekî ûde ye, Xwedê zane ji kû têt û kurê kîjan padişahî ye. Hema

rabûn jê re xwarineke padişahan çekirin. Seyekî avê kuştin, goştê wî kelandin û danin ber mêvanê xwe. Dora firaxê ji ji sedefên behirê tijî kirin.


Piştî xwarinê, qewm û qebile gihane hev; jê re strandin û reqîstn. Keşe jî bivê neyê kêfa xwe ji her tiştî re tani û serê xwe dihejand; heçko digot, min ji we gelek minet e.

Piştî ko roj çû ava û tariya şevê daket dinyayê rabûn û keşe birin koxikekê de û li gora adetên xwe jê re keçikeke delal ji rêkirin da ko bi şev xizmeta wî bike. Lê gelek ne hort keçik bi qtr û giri vejeriya û gote xelkê xwe: Mêvanê me e mezin ez bi der kirim.


Eqilmandên qebilê gihane hev û şîwrek danû û gotin: Qisûr ji me ye, ji mêvanekî evçend wezin re ne diviya bû em bi tenê keçikekê rêkin; mêvanê me ji lewre xeyidiye. Rabûn, vê carê ji mêvanê xwe re deb keçik şandin.

Lê piştî bihnêkê ev her deh keçik ji bi şûn de vegiriyân û gotin: Mêvanê me li me jî hate xezabê û em jî qewirandin.

Eqilmend dîsan gihan hev. Vê carê gotin mêvanê me mirovekî mezin e, lê t dîn e; dev jê berdan û nema xatirê wî zanin.



TOPÊN BALAFIREKE INGILÎZÎ AGIR DIXIN



EMÛRAL « D'ARGENLIEU » KUMÛSERÊ BILIND YA FRENSA AZA DI PESÛFÎKÊ DE

BALAFIR

Emrê balafiran ne pir î dirêj e. Ew riya salan di rojan de didin lê ev lezbûn bi wan re gelek dom nake. Wek teyrekî, heke xurdekek bi baskên wan ve bû zû dikevin erdê. Klîşa tenîştê yek ji wan balafiran şanî dide.



BOMBAVÊJ

Bomhanêjek ji bombavêjên îngiltzî. Ji vî texlîti re « Beam tîghte » dibêjin.

TOPÊN PERAVÎN

Îngiltêre dora girava xwe ji ber hîcûmeke elemanî gelek asê kiriye, û cih cih topine dûravêj danine peravên xwe. Klîşa me topçîkî şanî dide. Topçî bi dîrebînê nişanê digire.



REŞBELEK

JI KORT Û MÎRZAYÊN KURDISTANA
NÛRO, LI IRAQÊ

Yên ko ji Ronahiyê re ji Beşda, Hevlêr, Dihok, Amedi, Zaxo, Ranya, Şilêmani, Akire, Kerkûk, Etrûs û ji Rewandîzê nivisandîne:

Xort û mîrzayên delal!
Min kaxezên we girline û ez bi wan gelek kêfweş û dilşa bûme. Ji ber ko min nikarî bû li kaxezên we yeko yeko vegerînim, min ji we hêvi ye, van xêzikan li şûna bersiva (çihab) kaxezên xwe bigîrin.

Ronahî ji weke Hawarê her zarê kurdî dê belav bike; çî kurdmançî çî babanî.

Ji xwe Hawarî jî ji 15ê Nisana 1941ê û jî nû ve dest bi derketinê kiriyê û heta niho 19 hejmar belav bûne. Hejmara Hawarê a 45an li 20ê Hizêranê bi der çûye.

Ez jî we hêvî dikim nivisarên xwe bi tipên me ên kurdî, paqij û jihevçetandî binivîsin, da ko ez wan bikarim weke xwe bixwînim û têkîm Hawar û Ronahiyê.

Herçî kiriyariyên Hawar û Ronahiyê, jî bo Iraqê, kiriyariya heryekê, bi 750 fîlsan e.


XWEDIYÊ RONAHIYÊ

KLÎŞEYÊN VÎ RÛPELÎ:

1 — Bombavêjêke îngilîzî beriya ko bi firê keve.


2 — Li balafireke îngilîzî, jî tipê « Beau-fort » torpilekê siwar dikin.

3 — Du balafirên polonî di wargehekî îngilîzî de.



TORPİL

Torpil ew çekên behîrî ne ko jî noqar û torpiyoran têne avêtin. Ew bi xwe bi perwaneyên xwe her bi armancê ve diçin û dihingivtînin wê. Klişa me jî par re perwaneyên torpîlan şanî dide.



TANG

Klişa me tangeke îngilîzî, jî texlîtê Velentîn şanî dide. Velentîne berê xwe daye dijmin û di nav agir û dûmanê de telba pêş dîke.

RÛSYE

Klişa tenîştê menzerêk jî qada şerê ûrîs şanî dîke. Eskerên rûsî piştî şerêkî talan û yexlîrme dane hev û wan dijmerînin.





ZABITEKI RŪSI BERIYA ERİŞE NAV DI ESKERËN XWE DIDE



DI LİBYAYË DE ESKERINE INGİLİZİ LI TAMGEKE DIJMIN TEMAŞA DIKIN

JI REXDAYÊ:

YANEYI SERKEWTIN

Em cemiyele roji 1-4-1942 le Beşa kirayewe û heyeti tesisiyeyi nadî ibaret in le em zatane: Marûf Ciyawik beg, Mihemed Eli beg, Arif beg Pijderi, Ehmed beg Zehawî.

Heyeti azayi laze ibaret in le em zatane: Emin Zeki beg, Hisên Fewzi paşa, Eli Kemal beg, Evdilah Litfi beg, Seid beg Qezaz, Kerkûklizade Ehmed axa û Beşir Mişir beg.

Heyeti idare: Emin Zeki beg, reis. Marûf Ciyawik beg, mûtemed. Eli Kemal beg, mihasib û sendûqemini. Seid Zeki beg, sekretêri heyeti idare.

Şairê Soron, Goran di menzûmeke xwe de (Hawar: 10, rûpel: 5) dibêje:

Be komel bigirin gewî le

[Hawarî


Komel celb eka rîqetî barî

Ji komelê mexsed civat û yekbûn e. Civat û yekbûn xurtî, jihevûn qelsî û perîşanî ye. Ji lewre bi-çî awayî be gava kurd digehin hev xurt û gewî dibin. Yaneya Serkewtinê madam civatek e, di navbera kurdan de ew werisekî bihevîredanê ye. Ji lewre Ronahî vê civatê piroz dîke û jê re jiyîneke dirêj û emirekî kamiran daxwaz dîke.

KLÎŞEYEN VÎ RÛPELÎ:


1 — Eskereki çini xwe ji ber balafran bi çiqilên daran veşartîye.

2 — Di İngîlterê de fabrikeke silir.




TANG


Tang, ev çekên xurt digel xurtiya xwe kêmeş in. Ji lewre wan li kemyon û li fergonên rêhesinê siwar dikin û ji qadekê dibin qadeke din. Di klişê me de tangeke ingilîzî e giran li kemyonekê, siwar dikin.



B
A
L
A
F
I
R
Ë
N



E
M
Ë
R
Î
K
A
N
Î



TOP


Berê top du texlit hûn; topên bejê û yên behirê. Îro topên hewayî jî bi wan ve zêde hûne. Klişê me topine behirî şanî dide. Ev topên ha topên krewzorên ingilîzî Rodvey in.

ÇEKËN NÛ

Di vî şerî de her û her qala çekên nû dikin.

Piştî ko japon ketine şer qala noqarinê nû kirin; noqarinê japonî. Ev noqar gelek hûr in û wek balafiran van noqaran li vaporan siwar dikin. Vapor dema nizingî li armancê dikin noqarên xwe dadihelînin behirê. Noqar ber bi armancê diçin, bi karê xwe radibin û vedigerin vapore xwe. Di van noqaran de du torpil û du peya hene. Di pira noqarê de ji 150 kilo madeyên teqandinê hene. Piştî ko noqarê torpilên xwe berdand heke rîya vegeerê bi dest ne ket xwe li armancê diqelibîne, ew 150 kilo dinamît diteqin û noqar digel armanc û her du peyayên xwe berhewa dibe. Yanî ew her du peya intihar dikin.

Li gora nûçeyên ko ji Emêrikê tîn emêrikani ji bo guhastîna esker û çekên wan balafirine xweser çêdikin. Bedena van balafiran li şûna elûmînyom ji textê — kontrplakê — tete çekirin.



ESKERÊN BRITANÎ LI BER TRËNA EKSËRÊS

Ev balafir wê bikarin di salekê de di navbera Emêrike û Behira-spî de çil carî sefer bikin. Herçî vaporên barkêş îro di navbera van her du cihan de li salê ji sê caran bêlir nika-
mî sefer bikin. Heta salekê di destê Emêrikê de ji van balafiran ewçend wê hebin ko bikarin 12 mîlyon esker biguhêzinin.

Dî şerê Kerçê de elemanan bombêke nû bi kar êxist. Ev bombê ji balafiran tene avêtin.

Di bombê de madekî welê heye ko hekzojênê edim dike. Mirov di hewake bê hekzojên de nikare bijî; dev û difina wî xwîn dike û mirov dimire.



NORT Û KEÇÎNÊN DEWLETEN ŞEREVANÎ, LI LONDRE, DI ŞAHÎNLIÊ DE



TANGINE BRITANI DI TALİMGAHEKE INGİLİSTANÊ DE MENAWRAN ÇÊDİKIN.



DI RIYÊN TOBRIQÊ DE HÊSİRINE TALYANİ. EV HÊSİR DIÇIN AŞXANÊ.



TOPÈN BALAFIRSIKEN YEKE TALYANÌ AVÈTINE ERDÈ Û AGIR PÈ XISTINE.

HEJMARA HAWARÈ A 45AN LI 20È HIZÈRANÈ BELAV. BÙYE, LÈ BIGERIN

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûri.


Xwedî û gerinendeyê herpirsiyar : Mir Celadet
Ali Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire : Emir Djeladet Aali
Bedir-Khan. Damas—syrie

SAL 1
HEJMAR 5
—
ŞEMBI
1 TEBAX 1942

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 5
—
SAMEDI
1 AOÛT 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



VAPORQEFLEKE INGILIZÎ DI BIN HIMAYETA STOLÊ DE
BER BI BENDERÊN INGILÎSTANÊ



ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÊ

ÇIROK:

DİK Û KİSO

Carekê dik û kiso bûne şirikên hev yê cot. Dik nivê tov xwar. Kiso çaxê pê hesiya gelek enîrl, rabû misasek li dik da. Ba ji ber dik çû. Dik ji pencek li çavê kiso da; çavê wi peqand.

Kirin ne kirin dehwa xwe bêî hikimê qazi safi ne kirin.

Rabûn herdû çûn cem bûm, şerietê.

Kiso got: Ey bûm.

Ewl got: Ew navê min

Kiso got: Li ser tûm

Ewl got: Ew payitextê min

Kiso got: Em hatine cem te şerietê

Ewl got: Ew karê min û yê havê min

Kiso got: Ez û dik em bûne şirikên hev bi cot

Bûm got: We aqûbeti kir

Kiso got: Dik nivê tov xwar

Ewl got: Wi bènefsi kir

Kiso got: Min misasek lê da

Ewl got: Te neheqi kir

Kiso got: Ba ji ber çû

Ewl got: Wi bihinfirehi kir

Kiso got: Wi pencek li çavê min da; çavê min peqand

Ewl got: wi ji bêhemdi kir

Bûm rabû ser xwe û got:

— Bi eniya min, min xebera xwe got; dik û kiso nabin şirikên hev bi cot.



KLÎŞEYÊN VÎ RÛPELÎ:

1 — Bergehek ji destegahên Emêrîkê yên vaporan. Di van destegahan de emtrakani di meha Hizêranê de 700 000 ton vaporên barkêş çêkirine.

Emêrikani bin, îngilîz bin di çêkirina vaporan de xebateke zor dixebitin. Ji ber ko işê vaporan ji bo sondxwariyan gelek mihim e.

2 — Ji topên ordiwa rûsî yeke 750 milimêtir.

3 — Tang û kemyonên ewistrali ên petrolkêş di qadên şerî de.



SÊ GAMASÎ

Di wextê berê de di dûrahiya behiran de masî emên hev bûn û digotin masiyê mezin masiyê piçûk dadixwe. Lê ji roja ko ev şerê heeman dest pê kiriye ewçend vapor têne binav kirin ko biniya behirê ji mirovan teji bûye û mirov bûne emê masiyan.


Vê paşiyê di Etlantikê de sê gamasi rasti hev hatin û li halên hev pirsîn. Şexali ket ser zad û xwarinê. Her-eyki tiştêko wê rojê daxwari bû ji hevalên xwe re got. Di nav wan de yek ziknaxî hebû. Ewi got: Min îro elemanek daqurtand; dikim nakim mêrik nayête helandin.




DI ROHELATÊ DÛR DE ESKEREN ÇINI EN ÇETE

Ê didowan got: Min ji inglîzek daqurtand; lê mêrik ewçend qels bû ko gava di qiraka min re derbas bû bawer bikin ez pê ne hesiyam.

Ê sîsiyan wek nexweşê ko ji pesnan diştêxîle bi dengêki dewixî got: Herçî ez nesibê min talyanek bû. Mirato ewçend elimiye bazdanê ko di zikê min de ji xwe tev da. Tevdaneke welê ko ez pê gêj bûm û doxa min çû.



DI INGILÎSTANÊ DE FEBRIKEKE BA LAFIRAN DI KAR Û XEBATÊ DE



ESKERËN FRENSA AZA DI ŞERÊ LİBYAYÊ DE
KLİŞEYËN JORİN TOPINE BALAFİRŞİKEN ŞANİ DİDİN, FRENSİZINE AZA LI BER IN.


BISMARK

ÇAWAN BINA V BÛ

Herwekî xwendevanên me dizanin di Gulana sala 1041ê û di şerê behrî de zirehpûşa elemanî Bismark hatî bû bin av kirin. Yekî jî zabîten îngilîzî — Çak Norman — vê ko di wî şerî de hazîr bû di rojnamekê de benda jêrîn nivîsandîye û di vê habetê de gotîye:

Li şeva 18ê Gulana 1041ê zirehpûşa elemanî, Bismark digel zirehpûşa Prinz Ogen, ji peravên Norvêjê rabû û berê xwe da hû girava Îslandayê

Li 24ê mehê, wextê sibê, cenkeştîyên elemanî, rastî cenkeştîyên me hatin. Hûd 44 000 ton, û Prens of Wels. Cenkeştîyan li hev xist. Di rahiştinheva pêşîn de cankeştîya me Prens of Wels birindar bû, bégav ma, Hûd bi tena xwe lişt û terka qada şer da. Di pey re Bismark bi guleke xwe hingafte depoxana barûtê ya Hûd. Depoxane teqîya, Hûd bû du perçe, birê pêşîn bi serî ve noqî avê bû û birê paşîn da pey. Deryavanên Bismarkê ev zefêr şahînet kirin



REFEK JI BALAFIRÊN INGLÎZÎ EN BLENHHEYM



ESREREKÎ ÇINÎ LI BER TIFINGEKE TIMATÎK


kani derket û çav bi Bismarkê kir. Topên keştîyê en balafirşiken balafir jî xwe bi dûr xistî bûn. Lê balafirê Bismark keşif kirî bû. Li 27ê Gulanê bi şeqê ve refekî balafirên îngilîzî bi ser Bismarkê de girt û ew da ber bombe û torpîlên xwe. Torpîlek li Bismarkê ket; lê xesareke mezin ne gihandê. Di vê navê de cenkeştîke

me ji ji dūr ve xuya kir. Herçi êmiraliya elemani, ewê ji ji Bismarkê re dida zanin ko noqar û balafir têne hawara wê. Bismark xwe li hindava nivroroavê girti bû. Gava dît ko stol û balafirên me dirêji wê dikin berê xwe da peravên Frensê. Lê gelek ne hori refeki din ji balafirên me bi ser wê de girtin û torpîl û bombeyên xwe lê barandin. Çend torpîl û bombe lê ketin. Perwana keştiyê şikesti bû. Bismark nena dikari bû bi rê ve here û di cihê xwe de wek serxweşeki li xwe diziviri. Lê topçiyên wê ji desthilatinê ne keli bûn; topên xwe dişixulandin û bera me didan.

Wext dū bû nivê şevê. Stoleke me ji krewzor û torpiyoran dihevketi gihaşt qada şar û dor li Bismarka birindar girt. Guleyên keştiyên me wek hebên leyrokê lê dikedin. Bismarkê hêj şerê xwe dikir. Dinya hêj nû zelal bû bû. Du zirehpûşên me « Corc 5 » û « Rodney » ji hatin hawara me. Wan cenkeştiyên mezin ji çend guleyên xwe hingaftine Bismarkê. Digel vê hindê Bismark di cihê xwe de li xwe diziviri û bera me dida. Midekî; em di vî hali de man; hetani ko topên me hingaftin bircên Bismarkê û topên wê lal kirin. Bismark careke din li xwe ziviri û xwe li milê çepê xwar kir.



LI BER TOPA TANGEKE



TOPEKE ZIREHPÛŞEKE INGLİZI

Êdi ew bin av dibû. Zabit û deryavanan xwe tavêt behîrê. Vaporên ingilizi tev de çûn hawara wan. Me ew ji behîrê xelas dikirin. Ji 2500 deryavanên wê me qedere 1000 xelas kiri bûn ko noqaên elemani xuya kirin. Me deryavanên mayin di nav pêlên behîrê de hişt û me terka qada şer da.

Belê me Bismark ew keştiya fêris bin av kir û tola Hûda ko ewê xeriqandi bû jê hilanî. Bi Bismarkê stola elemani keştike hêja winda kir.



LI EMERIKE FABRIKEKE TANGAN

Xwendevanên Ronahiyê wê bibêjin ma ev ji kt ye, kurê ktjan mtr an padîşahi ye ko xwediyê Ronahiyê nav û bernav û hesel û neseba wî dûdirêj xistiye kovarê û ew kiriye sernama bendekê.

Xwendevaninol ez naxwazim we di mieraqê de bihtlim. Ji lewre tavil ez ji we re dibêjim ko Erefat ne mtr û pismir, ne ji axa an pisaaxa ye. Erefat gundiyeq feqr e, yek ji wan hezar gundiyeq kurdmanc.....

Berî çed rojan Hesen axa bi hezar û hin îşên xwe ve hati bû Şamê. Axê hero ji min dipirsî û digot: « ka Hewara nû hêj derneketiye; min a kevin sê caran xwendiyê ». Bi vê hêncelê, rojekê min jê pirsî:

— Hesen axa, çawan kurdmancên Cizîrê hinî xwendinê dibin û Hawarê dixwinin?

Hesen axa li min vegerand û got: Ma çawan naxwinin, nexasim herçi xort gelek eşqa wan lê heye. Wextekî min dersxaneyek vekirî bû û tê de dersa zarokan digot. Di nav wan

EREFAT

KURÊ BRAHÎMÊ EZEM JI MALA EMO REŞO AN XWENDEVANÊ DER COT

zarokan de yek hebû, ji domanan, kurê Brahmê Ezem; şagirdeki bi xêret û xebatkar bû. Carê ko ez diçim Tîbênspiyê, Erefat


hema ji min dipirse û dibêje: « Kanî Hawar; te ji me re Hawar anî? » û Hawar ji destê min digire û direve. Par di wextê cot de ez dişan çû bîm Tîrbênspiyê û di nav zeviyan de digeriyam. Çavê min bi colkareki ket. Ewî colkari tiştek bi dest ve hebû û ew tiş spî dikir. Bê hemtê xwê ez her pê çûm. Ez çî bibînim Erefat e, cotê xwe dike û Hawarê dixwine. Min got-ê: « Erefat tu çi dikî » Erefat bêt ko serê xwe ji xwendinê rake gote min « Ma tu nabînt ez cotê xwe dikim û Hawarê dixwinim ».

Kurdiinol ji Erefat îhretê bigirin û bizanin ko mir û axayên me yên ayendê yanî yên îstîqbalê ew in; ew Erefat in ko kovara xwe li her cot dixwinin û ne ew mir û axa, beg û paşa..... yên ko xwe mezîni dihesibînin, ji her ko bi lenê û bi lenê mîr, axa, beg an paşa ne. Lê herçi ji nav wan weke Erefat kir xwend û da xwendin û bi kêrî mîlet hat mirîli an axatî

ji wan re nabe bend ko ew ji li her çavên mîlet qedirgiran bibin û li mezinahiya xwe a zikmakî mezinahike rastin, mezinahiya destxistî zêde bikin.


Mirinol axîninol Îşê Erefêt, xwendevaniya ber cot destpêkeke hêman e. Libercotxwendina Erefêt di jiyina me a civakî de destpêka heyameke nû, heyama pêt û ronahiyê ye. Nîşên nû di siha vê ronahiyê de deneyên pûç û tiji ewê ji hev bigirin. Ji lewre mîr û axeyên min ên delal beriya ko wext li we bibore dest bi karê xwe ê mîlî bikin û bi awaktî bi kêrî xelkê xwe werin.

Axayên min, heke di vê nivîsarê de min kêm û zêde tiştek goti be ji li min megirin. Ez ji yek ji we me, û hon dizanin ko golikê malê ji gayê malê nafiya. Qenci û serefraziya we her û her ji min re mexsed e.



RONAVÊJEKE TOPÊN BALAFIRŞIKEN

Ronavêj çi ye? Ronavêj texlîtek fanos an çirayek e ko roniyê diçêhine heta deverine dîr. Herwekî di resmê jorin de têtê ditin ronahiya vê çirayê di nav kodeke hesinî de ye û ronî ji devê kodê belav dibe. Ronavêj di şerên şevî de têtê istîmal kirin û pê dîdevan esker, tang an balatî ên dijîmîni dibînin û ronavêjê li wan girêdidin. Bi vî awayî armanç li erdê bê li hewayê bê têtê ditin û topçî an yekînekên din bera wê didin.




BOMBAYÊJEKE FRENSA AZA PIŞTÎ HEMLEYEKÊ VEGERIYAYE WARGEHÊ XWE

MEKÎNA PÊŞDEST CAN Û BEDENA MIROW

Ji berê de gotine ko bedena însên ji mekîneyek e. Lê nekînekê welê ko çêkîroxê wê ê bilind û bêhemta ew bi waki welê çêkîriye ko li her wê yeke din wek wê nayête êkirin. Reşma pêşveçûna fen û zanîne di vê mekîne de sirîne velê hene ko zanîna mirowan hêj nikari wan êskere bikit.

Em dikin di vê bendê de hin tiştan ji wê mekîne ji wendevanên xwe re bidin zanîn.



QEWETINE FRENSA AZA ÊN MÊKANÎKÎ

Mîrov di tevayîya emrê xwe de çi qeder xwarin dixwe? Li gora hesabê ko zanayan çêkîriye mîroveki adeti heta bigehe heftiyî bi qasî giraniya bedena xwe 1400 carî xwarin dixwe. Bi texmîn 100 ton yanî 100 000 kîlo, bi rîtila kurdmançî 99999 rîtil, her rîtil şeş heqe. Gelo ji bo daqurtandina vî sed tonî çiqas wext divêtin. Ev ji hate hesab kirin. Jê re 41400 saet yanî pênc sal gerek in. Bi vî awayî mîroveki 70 salî divêt di emrê xwe de pênc salan ser hev çûti be.

Diî û xwîn — Gava dilê me ji hilavêtinê ket xwîna me nema digere û em dimirin. Teptepa dilê mirowan ji hejmartîne û ditîne ko dilê mîroveki adeti di rojekê de 103 680 carî lullavêje û xwîna wî di nav rayên wî de 300 000 000 Kîlomêtir dimeşe. Dîsan mîroveki adeti di rojekê de 23040 carî bihîna xwe dide û distîne.

Çav — Herçî çavên me gava em hişyar in ji em wan tim vekirî nahîlin. Em wan bêt ko bizanîn, yanî bê hemtê xwe digirin, qurç dikin. Zanayan ev ji hesab kir û dit ko em çavên xwe di deqîqekê de 25 caran qurç dikin û her qurçkirin pêncyekeke saniyê dom dike. Li gora vî hesabî şîforê ko çar saetan bi rê ve diçe û li saetê 90 kîlomêtir dimeşe timobîla xwe 58kîlomêtr çavgirtî dajo.

Xurtiya bedenê — Lebatên bedena me zehf in. Digel vê hindê hinek ji wan kêr bibin ji mirov dîsan dikare bi. Mirovin hene bê zirav, bê fateresk û bê kisikê mîzê dijîn. Dîsa mirov dikare

bedena me bi carekê de û bi hev re namirin. Hin lebatên me di pey me re ji dijîn. Piştî ko teptepa dilê me sekinî bi rêzê ve mejtî 10, wersele 20, çav 30 deqîqeyên din emir dikin.

Herçi guh di pey me re saeteke din, werseleyên mil û lîngan 4 saet, hebikên xwinê 18 saetên din dijîn. Di pey mirina me re di hestiyên me de 3 û di çermê me de 5 rojên din saxî dom dike. Lê ev saxî wek saxiya dara birî ye ko li erdê vozeliya ye û ter e; lê hew dikare ji piyan bisekine.

JAPON

ESKERÊN XWE DIKUJÎT

Ma kengê hatiye bihistin ko mîletekî an hikûmetekê eskerên xwe bila sebeb û bi destê xwe kuştîye?

Belê japon carina û di deverina de, eskerên xwe bi destên xwe dikujîn. Balafirvanekî ewîstrali ev tişt bi xwe bi çavê xwe dîliye û gotiye:

— Me di Pesifîkê de şerê balafirên japonî dikir. Agir bi yekê ket û balafir şewiti. Balafirvan bi sîwanekî xwe berda xwar û li rûyê avê sekinî. Gelek ne borî hevaleki

wî bi balafira xwe da pey û mitralyoza xwe lê girêda û ew kuşt ».

Ma çîre? Ji ber ko japon naxwazîan ko eskerên wan bikevin destê peyaran û bibin hêsir. Dinya ye te dit hêsir di




bi gurçileke bi tenê, bi niv meji û bi du litir xwin hiji (Bi adeti di bedena me de 6-7 litir xwin heye).

Mirin - Gava em dimirin her tiştên



nav şexaliyê de tiştêki welê got ko bi kêrî dijînin hat. Ji lewra japon, heke ji wan hat eskerên xwe dikujîn û nahîlin ko ew zindî bikevin destên dijînin.



BALAFIRGEHEK JI BALAFIRGEHÊN INGILTÊRE. DI PERAVÊN INGILTÊRE DE BI SEDAN JI VAN BALAFIRGEHAN HENE

14 TÏRMEH

BASTÏL, FRENSA ŐREEVANÏ, BÏRHEKÏM

14 TÏrmeh cejineke frensizan e; cejina wan ya xelas û azahiyê... Di tarixê de ixtilala Frensa a mezin bi nav û deng e. Ev ixtilal Őerê xelkê Frensê bi qral û zorkerên xwe re ye. Ev ixtilal bi salan ve ajot; hetani ko Frense ji nû ve û li ser himên azahî, brati û wekhewiyê hate saz kirin.

Ev ixtilal ne bi tenê ji bo Frensê lêbelê ji bo hemî dinyayê tarixeke birawend û di jiyina milet û dewletan de destpêka heyameke nû ye. Piŝti vê ixtilalê dewletên Ewropayê, bi gelemperî, qanûn û teŝkilatên xwe li ber qanûn û teŝkilatên Frensê ên nû girtine û yên xwe ji danine ser wan himên nû. Ev ixtilal bi salan ve ajoti bû û di vê riya cidalê de bi hezaran frensiz hati bûn kuŝtin. Gelo frensizan ji nav rojên wan salan ên bêhejmar, çire 14ê TÏrmehê neqandi bûn û ne rojêke din? Ji ber ko li 14ê TÏrmehê frensizan berda bû ser Bastilê û ew zemt û girtiyên wê azad kiri bûn.

Bastil di zikê Parisê de kelehek, hepisxaneyek bû, keleheke stiwar, bi top û xumbere. Girtiyên vê kelehê bê cirm û bê cinayet bûn; ne kuŝti bûn, ne ji dizi bûn. Ew zana, xwenda û welatparêzên Frensê bûn. Ewan girtiyan dixwest girtiyên abadîn bidin berdan. Qralên Frensê bijarteyên milet yên ko firkitrên azahî



GENERAL KÖNIG
FERMANDERÊ MIDAFIHÊN BÏRHEKÏMÊ
û wekhewiyê belav dikir tê de hepis dikirin.

Li ber çavên xelkê Parisê Bastil hepisxana heq û azahiyê bû. Ev her du nîmet, ev her du fezilet tê de girti bûn. Xelkê li 14ê TÏrmeha sala 1789an Bastil zemt kir, keleh hilweŝand; kevir li ser kevirî ne hiŝt. Îroli Parisê meydanaek heye jê re Bastil dibêjin.

Frensa Őerevanî. Frensiyan wek hersal, isal ji ev cejin ŝahînet kir. Lê isal di ŝahînetê wan de manayîne kûr û zelûl hebûn. Isal ji bo frensizan Frense bi



DI XELÏCA ECEM RE ÇEK û CEBÏRXANE BER BÏ RÏSÏYÊ


teyayi, Frense bi xwe Bastilek e. Bastileke welê ko bi peyayên xwe ên aza ketiye destê neyaran. Frensiz îro dirêji vê Bastilê dikin; dixwazin wê zemt bikin, lê bêî ko wê hilweşinin.

General de Gol, di vê çejinê de gotarek da û navê Frensa Aza guhart û li Frensa xwe navê Frensa şerevani kir. Frensa ko çekên xwe dananiye û şerê dijminê xwe dike. Şûrên Frensa aza ev nav di şerê Bîrhekîmê de kar kiriye.



LI EWISTRALYAYÊ TALÎMGARHA DIBISTANEKE BALAFIRVANAN

Bîrhekîm — Bastil di sala 1789an de. Bîrhekîm di sala 1942an de. Bastil di



LI EWISTRALYAYÊ FEBRÛRKEKE TOPÊN 37 SENTÎMETIR

zikê Parisê de kelehek; girtiyên wî frensîz, niha-fizên wê frensîz. Bîrhekîm di beristana Libyayê de mistek qûm û bîrek, lê ne bîreke mehîni, belko çalêke ziwa. Di wê qûmê, di dora wê bîrê de çend hezar frensîz 15 rojan li ber agir û rivîniya dijmin sekinîn. Wan xwe ne dida paş; hemîyan dixwest ko bimirin. Lê serfermandar ne hişt, got: êdî bes e. Şerevaniyên Bastila mezin xwe dan paş. Îro ew birinên xwe derman dikin, ji bona ko ji nû ve dest pê bikin.

Kurdinol wê ji Bastilek heye, Bastila xwe ji bir mekin. Ji xwe we dit, selk çî ji Bastila xwe dikin û çî jê dixwazin bikin..... Hîrmet û rûmet ji wan mirovan re ko ji bo azahî û serbestiya welatê xwe bêperwa dimirin.

LAWIK

Eli axa siwarê Dêro, dilê min rebenê, siwar bû
 [li gir filîli
 Şûr û merlalê rojkanî giran bû li hev herbilî
 Bira bavê min xêrê bikê wayê nebinê
 Çima ez ne dam Eli axa, siwarê Dêro xortê di hesena
 [û zîlan, heydera û badîka, torinê ber vi dilî
 Ez dame lawê Mûrad begê kelekvanê Mûşê
 Kelekê mûşê dixerinê
 Şevê nivê şevê bi çepilê min digire, min hildikişîne
 [banê jorî
 Darê tenbûrê li ser çoga xwe datîne
 Ji min dixwaze dilan û gevendê.

Şevê kanûna dirêj in, wek koçekê delûeliya mi li
 [banê qesrê ji xwe re direqisînê
 Ez koçer im, koçer im, bi hewala akinciya nizanîm
 Li ser bejna zirav akincî nabim.
 Ji bendê hetanî bendê şûr û merlalê rojkanî giran bû
 [kelî zendê
 Bira bavê min xêrê bike wayê nebinê
 Çima ez ne dam Eli axay siwarê Dêro, xortê di hesena
 [zîla, heydera, baulîka, zozanê jorîn, torinê ber vi dilî
 Ez dame lawê Mûrad begê kelekvanê Mûşê,
 Kelekê Mûşê dixerîne, qaççelêkê, qaçcongê
 Şevê nivê şevê, ji min dixwazê reqs û dilan û gevendê
 Rebena Xwedê li ser bejna zirav akincî nabim.
 Ez bi hewala akinciya nizanîm.

GELAWÊJ

(GULAVÊJ)

MA DIVIYA BÛ EV KOVAR BIKEVE TENGIYÊ?

Di hejmara Gulavêjê ya Kanûna-paşin 1942 de, bergerê kovarê xêzikên jêrin nivisandine:

Bo xwendewarên Gelawêj!

Ta êste çen carik tekaman le xwendewarên xweşewistî Gelawêj kird ke he hewi salî taze we aboneman bo hinêrin ta bitiwana Gelawêjî lêm wexte nazîke da pê bijînin.

Herçend hendî kes he dengeman we hatin we dest he û aboneyan bo nardî. Belam hêsta beşî zor ya le ber ewey ke ne perjawin ya le ber bê wasîteyî aboneyan la mawe.

Hennî sarezy ew çortane hen ke lêm wexte tengê da hatûte reyî Gelawêj we hestê berki ewane eken ke pêwey xerik in çî le layen mesarîfiyê we, çî le layen nûsne we. Le her eme zor be perêşewe teka ekên çen le tewanatana heye le yaryedani madî û mawewî dwa ne kewin. Çûnki herwek pêşinan wiliyane « Siwar bûn eybêk, dabezîn bu eyb ». Bo êmeş zor naşêrin e eger le ber bê pareyî ya le ber kemi nûsin dest lêm xizmete miqedese helgirin [1].

Midirî Idare

ELAEDÎN SECADÎ

Ji vê nivîsara bergerê kovarê dixuye ko Gulavêjî ji ber pere û ji ber nivîsaran ketiye tengiyê. Sed heyf, sed mixabin.

Herwekî me berê ji got (Hawar 27) kurdan

[1] Gelek heye ko gava min ev nivîsar ji tipên erebî wergerande tipên kurdancî tê de min xeletin kirine. Ez ji xwediyê Gulavêjê û ji xwendevanên we teka dikim bila li min negirin, ji ber ko ez bi zarê nivro yanî bi soranî nizanîm. Bivê nevé nizani dixelîte. Lê neke ev nivîsar bi tipên kurdancî bihata nivî-

heta niho kovarek weke Gulavêjê dernexistiye. Kovareke frensîzan hebû, nizanîm iro ji heye, jê re « Revue des deux mondes » yanî « Kovara her du dinyan » digotin. Bi min be Gulavêjî ji bo me kurdan « Revue des deux mondes » e.

Gulavêj ne bi tenê bi nixsarekî xwe, lê bi şikil û bergehê xwe ji kovareke hêja û tekûz e. Her hejmara wê 80-100 rûpel in. Û ev kovara hêja di nav zerfeke tenik de, navê kovarê lê çapkirî, ji toz û xweliya postê azade, wek bûkeke teze û serî kitankirî diqebe destên xwendevanan.

Li Iraqê milyonek kurd heye û di nav van kurdan de mirovên xwenda ji xwendevanên her derên kurdistanê, derên ko tê de zimanê kurdî ne hend e, bêtir in. Ji lewre kurdên Iraqê ne bi tenê Gulavêjek, lê diviya bû wan çend Gulavêjê hebîwan. Heyf e ko çendek nînin. Lê ya ko heye heke ew ji vemirî ne bi tenê heyf, lê ji me kurdan re sermeke mezin û kêmahîke giran e.


Hewekî bergerê Gulavêjê gotiye, kurd nemaze iro, ji her wextî bêtir, hewceyarî kovar û kitêban in. Ji ber ko sihe, gava mîletên dinyayê dehû û doza heyîna xwe bikin, yêk ko heqê mîletan lêk vekin, li kovar, kitêb û rojnaweyên wan ji dê bipirsîn.

Ji lewre em ji digel bergerê Gulavêjê dibêjîne kurdan, nemaze kurdên Iraqê: kurdîno! ne bi tenê bi çar lê bi çardê destan bi Gulavêjê bigirin û qedrê wê hizanî.

sandin, rexma ko ez bi vî zari nizanîm, min nikarî bû ez bixelîtim. Ji ber ko bi tipên me her tişt weke xwe têtê nivîsandin û welê ji têtê xwendin. Ji xwe qelsiya tipên erebî nemaze di vê de ye. Tiştê ko bi tipên erebî têtê nivîsandin, divê mirov wî seh bike û têtê bigehe da ko bikare wî bixwîne. Herçî tipên latîni, ji bervajî ve, tiştê ko pê hate nivîsandin, mirov dikare wî bêî ko mana wî bizane rast bixwîne û paşê bide eqilê xwe û di mana wî bigehe. Yanî bi tipên erebî beriya çawan mejî dixebite û xêra vê xebate çav dibînin û lêv dîlîvin. Herçî tipên latîni, di wan de çav rast bi rast û bêî mîhakena mejî dibînin, ziman digere û paşê mejî bi kêfa xwe dixebite û têtê digehe.

Ne bi tenê ji bo zimanê biyanîyan, lê ji bo zimanê erebî hi xwe ji tipên erebî ji vê dişwariyê ne hêsa ne. Ji lewre zanayên ereban ji bo bêjekê ya ko ji « elif » û « nûn » êkê hatiye pê, bi roj û bi mehnan ve didin ber hev û ji hev dipirsîn gelo ev bêje « in-ne » an « en-ne » ye.

Bi min be ne însaf e ko em ji bidin vê rê û gava « rê » yek daye pey « kaf » êkê em ji hev bipirsîn gelo ev bêje « awan » wê hête xwendin: « kir » « ker » an « kur » ?...



DI AVÊN CEBELTARIQÊ DE BALAFIREKE BEHRÎ

AV Û GERM

Di şerê Efrîqa bakur de şervani ji du tiştan aciz in: pira-hiya gerinê û kêmbûna avê. Nemaze eskerên ko di tangan, di wan kelehên hesinî de ne ji germê debar nakin. Ji lewre di tangên ko di wê qadê de tene şixulandin tertibatine welê hene ko hundirê tangê xêra van tertibatî honik e û mirov hetanî ko tê de ye bi germa derve nahese.

Di vê qadê de herçend germ zehf e ewçend ji av hindik e. Ji xwe çem û kani ninin; ava wan bîr e. Lê ew bîr ji ne nizingî



BALAFIRÊN INGILÎZÎ BI SEB BALAFIRGEHEKE DILMÎN DE GIRTINE

hev in. Berê, ava bîran bi kemyonan tanîn qadên şer. Lê ev av bi rê ve dikeliha, nivê wê dibû hîlim û winda dibû, nivê din ji bê qeşa ne dibate vexwarin. Ji lewre fro eskerên qadên Efrîqê bi pira-hi ya behirê vedixwin. Ma ava behirê ji tete vexwarin. Heke hate daweriwandin çire no. Ji bona vê yekê ji kemyonîne xweser çekirine. Ava behirê li wan kemyonan dikin. Di wan kemyonan de cîbazine welê hene ko bi rê ve, ji behirê heta qada şer, ava behirê dadiweriwînin û xweya wê dibin û ew dibe aveke şerî. Ji milê din cîbazine din, disan bi rê ve wê avê honik dikin û ev av gava dikeve cewdikên eskeran dibe aveke xweş û vexwarbar.



JÎ ENIYA ŞERÊ ÛRIS. DU HÊSÎRÊN ELEMANÎ YÊN KO KETINE DESTÊN ESKERÊN ÛRIS

MALTE

Hema hero danezanên elemani û talyanî dibêjin: Balafrên me bi ser girava Maltê de girtine û balafrgeh, pesarekên bendera Lavatê û vaporên tê de lengarendaz, dane ber bombeyên xwe. Ji milê din danezanên inglîzî, ew jî qala Maltayê dikin û dibêjin: Balafrên mihwerê dirêjî Maltayê kiriye; topên me ên balafrîşken heşt balafr avêtine erdê.

Ev bûne du sal halê Maltê û balafrên mihwerê bi vi kari ye. Belê di nav du salan de balafrên mihwerê jî 1500 carî bêtir dirêjî Maltayê kiriye û ew daye ber bombeyên xwe. Di vi mideti de 11000 balafrên neyar di ser giravê re firiyane; 5000 bombavêj û 6000 neçirvan [1].

Malte bi xwe ne erdekî fireh e. Rûyê erdê giravê 250 kilomêtr çarçik û nifûsa wê 237000 rûniştiman in. Lê Maltê ehemiyeteke ceşrafî û eskerî heye. Ji lewre inglîzîyan wek her nîçtîyên eskerî ew jî di wextê xwe de xistiye destê xwe. Di sala 1530î de Malte jî destê Şarîken keti hû destê şewalyeyên Rodosê. Di sala 1788an de Bonapart ew xiste destê xwe. Lê pişî du salan yanî di sala 1800î de inglîzîyan ew vegirt û di sala 1814an de bi miaheda Parisê britaniyan ew da ser kişwerê

[1] Balafrê, wê çeka hêman îro çend textil hene. Bombavêj û neçirvan gelek caran bi hev re dixebitin. Ên bombavêj bombeyên giran hildigirin û wan tavêjin armançên xwe. Herçî neçirvan ew balafrîne sivik in û hevaltiya bombavêjan dikin û wan

xwe ê cihandar û jî hingê ve ya wan e.

Malte di Behira-spi a navin de ye. Di navbera Sicilye, Tûnis û Trablîsxerbê de. Bi wê rewşê Malte hakimê her du milên Behira-spi ye; milê rohelê, milê roavê. Inglîzîyan di Maltê de ji bo stolê bendereke eskerî û balafrîgehine gelêr çêkirine. Ji roja ko şerê Libyayê dest pê kir Malte roleke mezin leyistiye. Talyan û eleman çek û eskerên xwe di rîya behirê re; jî Sicilyê diguhesînin Trablîsxerbê. Stol û balafrên inglîzî jî Maltê radibin û li vapor-qefleyên wan didin.


Herçî talyan û eleman hema hero, carina bi şev û bi roj li Maltê didin û karê stol û balafrîrên inglîzî xerab dikin an wan diwarqîlinin. Bivê nevé di van şeran de xesarîne mezin digehin ehalîyan jî.

Ji ber şerê balafran îro li Maltê du bajar hene. Bajare kevin, yê ko li rûyê erdê ye û bajare nû, yê ko li binê erdê ye, yanî zêr-zemînan. Lê ew zêr-zemînan welê hatine saz kirin ko tê de hemî tekberên malê hene û ew bi elêktîkê ronikîrî ne. Ko bû hawar xelk dikevin zêr-zemînan.

Lê rexîna van hicûman, Malte hêj di cihê xwe de ye û şerê xwe dike. Bi tenê elemanan xêra wan hicûman çek û eskeran derbas dikin Elfrîqayê û şerê inglîzîyan dikin.

ûhemînin. Ji ber ko gava bombavêjan nîzingî li armançên xwe kirîye neçirvanên dijînin bi hewa dikevin û dirêjî wan dikin. Hingê neçirvanên bombavêjan diçin pêşîya neçirvanên dijîni û nahîlin ko ew nîzingî jî bombavêjan bikin. Bi vi awayî gava neçirvan li

hev dixin bombavêj bombeyên xwe berdidin armançan. Ji van pêve balafrên torpilavêj, barkêş û ên bewanîma hene. Ên torpilavêj di ser behirê re dixebitin û torpilan berdidan vaporan. Ên barkêş çek, cebîrxane, esker hildigirin û wan jî qadekê diguhesînin qadeke din. Li van balafran top, kemyon û tengaw jî bar dikin. Herçî hewanîma di wan de alutîne hewayî hene û ew bi wan alutan guhêrbariya hewayê selî dikin û raporên xwe didin serfermandarê ordîwan.



BOMBAVÊJEKE FRENSA ŞEREVANÎ DI WELATÊN ROHELATÊ NÎZING DE

JIN Û MÊR TEVIR Û BIVIR

Belê medhelokê gotiye:
Jin û mêr tevîr û bivîr.
Yanî jin û mêr bi hev
nakin, ji hev ne razî ne û
her û her bi hev diçin.
Belê ev rast e. Lê divêt em
mîkur bèn ko ji hev ji
nabin; û bê hev ji nikarin.
Ji ber ko Xwedê jin ji bo
mêran, mêr ji bo jinan
afîrandine.

Lê heke carekê jin û
mêr ji dil bi hev biçîwan
diviya bû jinan bi piraniya
xwe zora mêran bibira. Ji
ber ko li dinyayê jin ji mê-
ran bêtir in; nemaze di hin
welatan de. Mesela di wela-
tên jêrin de berberî hezar
mêrî evçend jin hene:

Çin	1939	Fransa	1071
Rûsyê	1103	Elmanyê	1042
Ingiltirê	1088	Tirkîyê	1036


Di van welatan de kêf
kêfa mêran e; dikarin du
jinan, jin û nîvekê an jin
û çarkekê bînin.

Lê welatine din hene ko
tê de jin ji mêran kêmtir in.
Di san divêt em mîkur bèn
ko di wan welatan de jî
jinan kêf kirîye. Lê ew
welet hindik in û ferqa
mîkdarê jin û mêran ne
evçend mezin e. Mesela li
Emêrikê berberî hezar
mêrî 976 jin hene. Ferq 24
jin in. Tiştêki bê ehemiyet.


Li Îrlandê, Japon û
Bîxaristanê jî beherî
hezar mêrî 968 jin hene.
Piraniya mêran an kêmbûna
jinan nemaze di Kû-
bayê de ye. Belê li Kûbayê
berberî 1000 mêrî 884 jin
hene. Xwedê lukesî neêxî
wî welatî.



ZIREHPÛŞEK JI GENKEŞTIYÊN FRENÇA AZA



LI BOMBAVÊJEKE INGILÎZÎ TORPİLÊ BAR DIKIN



VAPORQEPLEYEK DI BIN HIMAYETA STOLÊ DE



ESKERËN FRENSA AZA DI ŞERË LİBYAYË DE
FRENZINE AZA DI LİBYAYË DE BI KISËN JI QÛMË DAGIRTI ÇEPERAN ÇËDİKIN

BEHIRA' AZOVÉ


Di şerê ûris de, nemaze bi hênceta eniya nivro gelek caran çel li behira Azovê dikin. Behira Azovê dîkeve nivroyê welatê ûris. Behira Azovê bi hin wesfên xwe ji behirên din bifêrç e. Ev behira ko 445 kilomêtir dirêj û 150 kilomêtir fireh e, ava wê gelek tenik e; ji hin gol û bîrman ji teniktir. Di tu deran de kûrahiya avê ne di ser deh mêtiran e.

Behira Azovê ji nivroroavê ber bi bakurê rohelê hin bi hin tengtir dibe û di Tagenrogê de xelicekê ditîne pê û li wê derê digehê dawiyê.


Di vê xelicê de çemê Don dikeve behirê. Don çemêki mezin û boş e. Ava çem şorahiya vê behira tenik ewçend diedilline ko di deverina de pez têne delavên wê û jê bi dilxweşî vedixwin.

Bejtenga Perekopê û avtenga Kerçê Azovê ji Behira-reş vediqetînin û Azov tê de wek golekê dimîne. Hewa Azovê ne wek ya Behira-reş e; gelek sarê. Ji Çiriya-paşin heta Adarê behir ji perevan heta deh milan dicemide û qeşa digire. Herçi xelica Tagenrogê bi tevayî dicemide û dibe qeşake yekwesle. Benderên behira Azovê ên mihîntir Birdiyansk, Meryepol û Tagenrog in. Di Birdiyanskê de febrikeyên balafir û çekan hene. Lê bejar bi xwe ne ewçend mezin e; 50 000 nîfûsa wî heye.

Meryepol bendereke mezin e; 200 000 nîfûsa wî heye û bendereke sinahi û ticari ye. Meryepol merkezeke sinhetê ye. Di dora bajêr de febrikeyên çek û cebîrxanan hene. Di van febrikan de fola tête helandin û ji bo balafirên depên fola têne çekirin. Ji milê din di vî bajêr de karxaneyên çerman hene; ji bo sol û çizmeyên eskerî.



ESKERÊN EWISTRALÎ DI KÛCEYÊN QUDSÊ DE



HÊSÎRÊN MIHWERÊ BER BI HÊSÎRGAHAN

TIRBA

KO DIPEYIVIN


Ma tirb ji dipeyivin. Tirb zane. Welê dixuye ko li Emîrîkê hin hene ko dipeyivin. Rojêke yekşembê çend biyani çû bûn gornistanekê û tirbên miriyan ziyaret dikirin. Tirbekê dest bi xederdanê kir û peyivî. Bivê nevê ew zilânên ha li xwe heyirî man û lîrsiyan. Mesela tirbê digot: Xwezî wê bizaniya axiret çîqas xweş e, çî rahat û hêsa ye; ne teşxêle, ne serêşanî ne tu tîşt.....

Piştî wan zilaman zani ko miriyê tirbê di saxiya xwe de li ber gremefonê peyiviye û dengê xwe li qewanê daye girtin û gava mir wesiyet kir ko qewanê

li gremefonekê siwar bikin û ew pê re di tirba wî de veşêrin. Mêrik mir, wesiyeta wî anin çih. Her roja yekşembê dergevanê gornistanê gremefonê ba dida û derziya wê lê siwar dikir. Bi mekina gremefonê ve têlek hebû, ew tîl di erdê dora tirbê de veşartî bû. Gava xelkê pê li ve erdê dikir gremefon dişîxuli û mirî dipeyivî.




TOPCIYÊN HINDÎ LI BER TOPÊN XWE



TANGEKE FRENSA AZA LI BIRHEKIMÊ, BERIYA ERIŞÊ



ESKERËN FRENSA AZA DI ŞERË LİBYAYË DE
KLİŞEYËN JORİN FRENSIZINE AZA ŞANİ DIDİN; YËN KO DI PIŞTENIYË DE XWIRINIYA XWE DIŞKËNININ



BOMBAVÊJ

Klişa me a jorin refek ji bombavêjên inglîzî şanî dide. Ev bombavêj, carina bi sedan di ser Manşê re derbas dibin û li bajêr, bender û febrîkeyên elemanî didin.

TANGÊN ŞIKESTÎ

Qadên şer ne bi tenê gornîstana mirovan in. Di wan qadan de gornîstana tang û kemyonan jî hene. Klişa me a tenîştê mirîke wan gornîstana şanî dide; tangeke şikestî.

HEJMARÊN HAWARÊ ÊN 46 Û 47 AN LI 10 Û LI 25Ê TÎRMEHÊ BELAV BÛNE
HEKE EW NE GIHAŞTINE DESTÊN WE, JI XWEDIYÊ HAWARÊ WAN BIXWAZIN

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qîrûşên sûrî.

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire : Emîr Djêladet Aalî Bedir-Khan, Damas—Syrie

SAL 1
HEJMAR 6

ŞEŞEMB
1 ÎLON 1942

RONAHI

ANNEE 1
NUMÉRO 6

MARDI
1 SEPTEMBRE 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



MA GEREK E EM JI WE RE BIBÊJIN EV KÎ YE, ÇI YE Û ÇI DIKE?...
BI DARÎ ÇAVAN E, KEÇI KEK E, SPEHÎ Û CIWAN E, DIKENE Û DIXEBITE.



ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÊ

ÇIROK:

ŞÊR Û KÊVROŞK


Şerek hebû, hikim li heywanên dora xwe hemiwan dikir û li ser her cisnekî jî wan şivek an taştêk ferz kiri bû ko jê re binin.

Dora kêvroşkan jî hat. Kêvroşk li hev gihane hev jî bo taştîya şêr peyda bikin. Kêvroşkekî şareza jî nav wan rabû û got: «Ezê taştîya şêr peyda bikim; qet îşê kesî jî we jê nebê».

Hemiwan got, mala te ava, û jî hev belav bûn. Kêvroşkê me ma sê rojan, bi ser şêr de ne çû. Roja çaran çû cem şêr. Şêr jê re got: Ma xwarina min ne li ser we bû; û ev sê roj in kes jî we bi ser min de ne hatiye û ez wilo birçî mam.

Kêvroşk jê re got: Ezbenî, roja pêşîn min xwarina te anî, lê heywanekî di weke te heye, xwarin jî min stand.

Şêr got: Gelo kesê di weke min heye ko hikim li heywanan bikê?



LEZBOTEKE TORPILAVÊJ DI BEHIRA MANŞÊ DE



INGILİZ XWE JI BO ŞÊRÊ EWROPAYÊ KAR DIKIN

Nemaze piştî ko ûris jî ber êrişa elemanan bégav man û xwe dane paş mesela emike nû jî bo sondxwariyan hûye meseleke heyatî. ûris dibêjin ko jî inglîz û hevalbendên wî re divê rojkê herî rojkê esker derînin beja Ewropayê û barê ordîwa ûris slîvîk bikin. Herçê inglîz û emêrikani xwe jî bo vê yekê kar dikin. Ji Emêrikê çek û esker lèn Ingilîterê û ev esker hero talîmine behîrî û beji dikin. Klîşa me birekî wî eskerî şanî dîde. Ev esker heçko jî balafirînan daketîne erdê neyar û dirêjî tabîye û depoxaneyên dijûnî dikin.

Kêvroşk got: Belê û heke te divê rabe, bi min re were ezê wî nişanî te bidim.

Şêr got: De hîde pêşîya min, em herin cem wî hakimî.

Kêvroşk da pêşîya şêr û çûn hela ko li ser devê birekê sekinîn. Kêvroşk gote şêr: Vaye hakimî di vir de ye.

Gavê ko şêr bi ser birekê de noq bû sûretê xwe di avê re dit; meyîzand ko şêrekî weke wî xwiya dikê. Hema jî devê birekê avête ser sûretê xwe.

Şêrê delal çû binê avê û heywan hemî jî zilma wî xalas bûn.

JIN Û DEREW

Medhelokeke japoni gotiye: « Heçî zane baxêve derewan ji dike ». Ji lewre divêt mêr jî derewan bikin, ji ber ko ew jî di zanin baxêvin. Kurdmancan jî gotiye: « Ji weynên jinan çiyayê Cûdî xwar bûye » Disan hero tete gotin: deken jinan, fenên jinan, dolabên jinan h.d... Bivê nevê ev tişt jî bê derew çênabin.

Li wextê berê tiştine holê ji xwendada û zanan dipirsîn. Lê îro van tiştan jî artîstên sinemayê dipirsîn. Ji ber ko ew rind dizanin maç bikin qey di her tiştî de jî şehraza ne. Îcar rabûn ji artîstêke sinemayê, Bolit Godard, pirs kirin: ma çire jin viran dikin. Artîstê gotiye:

Careke Çarlî Çeplen, ev jî artîstêki sinemayê lê yekî nêr, ji min pirsî bû, ma hon jin çire derewan li me dikin. Hingê min lê vegerand û goti bû: « Ji ber ko hon mêr derewan li me dikin ».

Lê îro ezê çêtir bizanim li vê pirsîyariyê vegerinim. Heke em derewan dikin ev ne sûcê me ye. Mêr bi xwe me bégav dihilin ko em derewan bikin. Guh bidin ezê ji we re bibêjim.

1 — Xort û keçikek rastî hev tèn û hejkirin di navbera wan de dest pê dike. Te dit xort ji keçikê pirsî: Ma ev evîna te a pêşin e? Beriya min te heji

kê kiriye? Te gelek hejî wi dikir? Bi serê xwe biki bêje: tu çêtir hejî min dikî an te bêtir hejî wi dikir?

Keçika reben wê çî bikit: ji bo xweşkirina dilê xortê xwe derewan dike.

1 — Te dit xortê te destgirtiya xwe bir seyrane; li tremwayê siwar bûne, di aşxaneke piçûk û netu de xwarine û ketine sinemake qerade. Keçikê dixwest bi timobilê derkevin, di aşxana otêleke mezin de bixwin û herin tiyatroyê.

Gava vedigerin mal xort ji destgirtiya xwe dipirse: Çawan tu kêfxweş bûyi? Keçika reben ji ber ko nikare rastiye bibêje, derewan dike û dibêje: belê gelek, ew çî seyraneke spehî bû...

3 — Cejina jinikê ye. Mêrê wê jê re çentekî destan aniye. Nik jinikê û li dolebê wek wi sê çenteyên din hene ko jinikê hêj dest ne daye wan. Mêrik ji jina xwe dipirse: Çawan kêfa te ji vê diyariyê re hat. Jinik dibêje: « Ji xwe min jî ji Xwedê hêvî dikir ko çentekî holê bikeve destê min » Ma çawan rastiye bibêje û dilê mêrê xwe ji xwe bihile.

Lê sibetir jinik diçe dikana ko çente jê hate kirin û wi bi tiştêki din diguhêrine.

4 — Me fistanekî nû wergirt; xelkê ew eciband û ji me pirsî: « Te ev ji kû kirî? » Heke me ji wan re rastî got te

dit xanimokên te tev de wê herin û ji wi fistanî bikirin û li xwe bikin û bi vî awayî fistanê me wê kêmqedr bibê. Ji lewre em disan derewan dikin û heke me ew ji cem hoste Melko kirî be jî em dibêjin me ew ji Parisê anî.

Hon niho dibinin ko heke em derewan dikin ne ji ber ko em ji derewan hez dikin lê ji ber ko em bégav dimînin û ji bona ko dilê mêran ji xwe nehilîn viran dikin.



ESKERÊN FRENŞA ŞEREVANÎ DI ROHELATÊ NÎZING DE
Eskerên ordiwa Frensa şerevani ên ihtiyat piştî menawrekê guhadriya kumandarê xwe dikin. Kumandar xeletên her yekinekê dide zanin û esker û zabitan li islên şer ên nû serwest dike.


HÊSÎR

LÊ XELASKARÊ HEVALÊN XWE

Zabiteki nûzelandî bi navê Locan, di şerê Misirê de, digel çend eskeran û bi kemyoneke zirehpûş derketi bû keşfê. Kemyona keşfê di nizingî xetên talyanî de keti bû ber tabiyêke dijmin û ji ber xurtiya û serdestiya neyar, Locan bégav ma û digel pênc eskerên xwe teslîm bû. Talyanan ew hêsir girtin û Locan, digel sih zabitên din ên inglîzî yên ko beriya Locan hêsir bû bûn, kirine kemyonekê û berê wan dane Tobriqê. Talyanan ew ji Tobriqê bi vaporan dê bişandana Italyayê.


Di tariya şevê de kemyona hêsiran gihasti bû dora Sidîberanê. Li hire mihafîzên talyanî hêstrên xwe ji kemyonê peya kiri bûn û ew ji levûdin re teslîm dikirin. Locan digel pênc zabitên din, xwe li destê mihafîzan xist û revî. Talyanan da be pey ji, ji ber ko dinya tarî bû zabitên brîtanî ji wan xelas bûn û berê xwe dan nivro û heta sibehê bi rê ve çûn.

Gava roj li wan hilat zabitên revoke ketin kortalekê de û heta êvarê tê de man. Bi tariya şevê ve ji nû ve bi rê ketin û rastî timobileke talyanî hatin. Tê de şifor bi tena xwe û nivîstî bû. Zabitan şifor di xew de girt û



DI BEHIRA-REŞ DE WARGEHÊ NOQARÊN RÛSÎ

ne hişt ko ew bide tîfinga xwe. Bi şifor re nan, elbikên konserve, av û cixare ji behûn. Zabitan xwar, vexwar û cixareyên xwe ji berdan. Lê timobil şikestî bû. Ji lewre brîtanîyan nikari bû lê siwar bibin û wê bimeşînin.



BALAFIRGEHEKE EMÊRIKANÎ DI BAKURÊ GIRAVA ÎRLANDAYÊ DÊ

Zabitan disan da rē ù di tariya sevè de winda b̄n. Şeva sisiyan britani rastī kemyoneke ingilizī hatin ya ko keti b̄ destē talyanan. Tē de du esker r̄nişt̄l̄ b̄n. Britani j̄ nişkekē ve li wan qelib̄n ù ew ziudī ḡitiñ ù bi tēlèn telēfonē yēn ko di kemyonē de diti b̄n ew pih̄l girēdan; li kemyonē siwar b̄n ù berē xwe dan xetēn ingilizī. Rēwingiyēn me li rē ve rastī kemyon ù timobiline şikestī dihatin; benzina wan dibirin ù awa ko tē de peyda dib̄ vedixwarin.




Britani gelek caran di ber kemyon ù timobilēn mihwerē re derbas di b̄n. Lē eskerēn mihwerē ew nas ne dikirin; j̄i ber ko wan şeq̄e,ine talyani kirī b̄n serēn xwe. Lē dawī ew hatine nas kirin ù du kemyonēn mihwerē dan pey wan. Lē britaniyan ē'i nizingī li xetēn xwe kirī b̄. Hevalēn wan ew nas kirin ù derketin* p̄şiyā wan ù beia

DI ENIYA ÜRIS DE TOPEKE TANGŞIKEN LI BER TALDEKÊ

ber du kemyonēn mihwerē dan ù ew bi ş̄n de vegeand̄n.

Bi viawayi Locan bi qehremaniya xwe, j̄i xwe p̄ ve p̄nc zabitēn britani ēn din ù kemyoneke ordiwa xwe xelas kir.



DI MINTIQA ÇEMÊ DON DE ESKERÊN RÛS ÊN İHTİYAT BER BI QADA ŞER

RİÇARD KÊSÎ

(RICHARD CASEY)

TÊCİR, RESAM, ZABIT, BALAFIRVAN

Belê yekî ewistralî, təcir, resam, zabit û balafirvan; iro di xizmeta kişwerê Britanyayê de diplomatekî mezin e. Mr. Kêsi iro li Misirê rûdine û yek ji lebatên kebîna şer ya Britanyê ye. Mr. Kêsi bi vî wesfî di welatên rohelatê nîzing de memûrê hemî sondxwariyan ê mezintir e.

Bi me be Kêsi beriya ko bigehe vî payê jî bi hiner û zanîna xwe miroveki mezin bû. Ji xwe herwekî me gelek caran gotiye mezinahiya mirov ne bi paye û ritba wî, lê hêj bêtir bi zanîn û hinera wî ye. Paye û ritbe wek xanî, qesiran timobilekê ne. Iro hene sibe ninin. Lê herçî zanîn her bi xwediyê xwe re ye; tucaran terka wî nade. Ji lewre kurdino, çavên xwe jî ritba û payan bêtir bidin hiner û zanîne; û bi zanîna xwe xizmeta welatê xwe bikin; herwekî Mr. Kêsi kiriye û iro jî dike.


Bavê Mr. kêsi miroveki dewlemend bû. Lê Mr. Kêsi bi mal û pere bes ne kir; rabû çû Londrê û ket Kembriçê,

yanî dibistana bilind, ûnîversîtê. Paşê bû zabit û gihaste heta kumandaniyê. Di şerê 1914-18 an de di Çeneqelê de şerê tirkan jî kir.

Piştî şerê 1914-18an jî Ingilîterê vegeriya welatê xwe û qederê pênc salan bi ticaretê mijûl bû û dîsan hat Londrê. Li wê derê di wezareta xariciyê da bû pispore îşên Ewistralyayê. Kêsi heft salan di vî wezîfê de jî ina û dîsan vegeriya welatê xwe. Kêsi di xortaniya xwe de hînfî resamiyê jî bû bû. Di wextên xwe ên vala de resim çêdikirin. Herwekî iro jî gava rê pê dikeve resimine delal cêdike. Diwarên mêvanxana wî bi lewheyên ko wî bi xwe çêkirine xemilandî ne.

Gava vî şerî dest pê kir Kêsi vegeriya xizmeta welatê xwe û di wezareten maliyê û îaşê de xebiti. Bertî du salan jî li cem hikûmeta Emêrikê bû bû setîrê Ewistralyayê. Ji Emêrikê jî berî şer mehan hate Misirê.

Kêsi gava dest hi balafirvaniyê kir 47 salî bû û jî xwe re balafirek kirî û jina xwe jî hînfî balafirvaniyê kir. Iro Kêsi balafira xwe bi xwe dajo.



DI ŞERÊ MISIRÊ DE ESKERÊN BRITANÎ DI SER QÛMA GERM RE
Û LI SEB ZIK BER BI DILMÎN DIXWIŞIN

ÇEKËN NÛ

Li 19ê Tebaxê gava eskerên hevalbendan daketîne Di-yêpê tangîne nû bi xwe re birîne, ew daxistîne bejê û pê şerê elemanan kirîne û bi vi awayî ev tang ji ceribandî. Êvarê dema ko eskerên hevalbendan ji erdê Frensê vege-riyan eskerên kene-dî ev tang şikandî da ko eleman li çêki-rîna wan serwest nebin.

Rojnamayên ingi-lîzî dibêjin ko ev tangên ha di riyên behîr û hewayê re dikarin bêne gu-hastî erdê Ewropayê; ji ber ko giraniya herhekê şeş ton e. Lê folayê wê xurt û stûr e. Sivikahiya wê ji ber pi-çûkbûna wê ye.

Şikilê van tanga çargoşe ye û wek tangên din birc û berûyên wan nîne; wek sendûqeke girtî ne. Tê de diajo û du esker rûniştî ne. Yek topê ê din mitralyozê dişixulîne. Xweseriya van tanga nemaze di sireta wan de ye. Di kijan erdê de behe ev tang di saetê de 65 kilomêtir dimeşin û wek timobileke adetî herê wan bi rahatî tete badan.

Ew tang di Emêrikê de hatine çêkirin û ji bo ceribandîne çendek anîne Ingilîterê;

Disan di Diyêpê de emêrkaniyan mitralyozîne nû bi kar êxistîne. Ev mitralyozên ha gelek sivik in û bêti ko bêne sar kirin ser hev pênc sed derb dikarin berdî.

TOPËN RONAVÊJ — Ev ji keşfeke emêrikamî ye û ev nemaze di giravên Silêman de gelek bi kêr hatîne. Fedayîyên japonî bi şev bi motosiklêtan dikevin



MÊRÊN ŞÛRAN ZEHF IN, LE SÛRKÊŞ Û ŞÛRBAZ NE WEKE HEV IN

qerargehên dijmin û bi behayê canên xwe depoxaneyên benzîn û cebirxanê berhewa dikin. Emêrkaniyan topîne welê çêkirîne ko ji devên wan şûna gulê ronahîke xurt bi der têt. Emêrkani van topan dikin ber taldan û gava motosiklîstên japonî, bi şev qesta qerargaha wan dikin devên topan li wan girêdidin. Ronahiya topan ewçend xurt e ko çavên dijmin nema dikarin li her wê bisekinin. Gelek caran motosiklîst ji her ko êdî rîya xwe nabinî dikewin çal û kortalan û tê de dimirin. Nemirin ji hew dikarin xwe bigehînin armancên xwe.

Bê ronahî mirov nabîne. Lê ji vê topê dixuye ko bi pirahiya wê ji mirov heçko kor dibe.

Vê paşiyê japonan ji da belav kirin ko cem wan ji ronahîke welê heye ko heke ew ronahî li mirovan ket wan bêhiş dike û heke li motorên balafirên ket wan di-sekinîne. Heke ev tişt rast e, gelekî hêja ye. Lê tiştîne holê ji sirên eskert ne. Ma çawan japon sirên xwe ên eskert ifşa dikin.




ÇEND

BERGEHÊN INGILISTANÊ

Klîseyên vi rûpelî û rûpelê nehan bin bergehên Ingilistanê şani didin: dar, devî, çem, çiya, gund, pez zevî, birc, halet, h. d. ...

Milet bi ziman, adet, nijad û meyl-dariyên xwe ji hev cida bin jî Xwedeyê wan yek û tebi'etî erdên wan kêm û zêde diçin ser hev. Ma bergehên welatên me jî ne holê ne. Heye ko

di hin deran de û bi hin tiştên xwe ji van spehîtir in jî. Spehîtir nebin jî biyê nevé bergehên Kurdistanê ji me kurdan re ji bergehên her derê delal û eziztir



in. Xwedê welatê van bergehên ji xwediyên wan re bihtle û wan pê şa bike; û me jî bigehîne yên me; yên Kurdistanê; Kurdistanî me a delal.

HITLER

BI ÇI A WAYI DIXWAZE LI
DINYAYÉ HIKIM BIKE


Radyowa Londrê vê paşiyê da zanin ko di eniya Misirê û di dora Sidibera-nî de wesîqeke mihim ketiye destê ingilîzan. Ev wesîqe di tabûra 175an a topçî de hate ditin. Vê tabûrê ev wesîqe ji Elemanyayê bi xwe re anî bû; da ko di nav eskerên elemani yên ko di eniya Misirê de şer dikin, bête belav kirin.

Li gora vê wesîqeyê piştî şerî Hitler ne bi tenê di Elemanyayê de lê di

hemî dinyayê de işê hikûmetê wê bêxe destê Gestapo, yanî polisa elemani a sirî û veşartî. Herçî peyayên vê teşkilatê ji ji nav eskerên yekinekên êrişê de bêne bijartin; ji eskerên ko di qadên şer de mêrani û fedakarî şani dane. Bi vi awayî qedera hemî dinyayê wê bikeve destên mirovîne ko di rayên wan de xwina elemani a xwerû digere. Ji xwe ji niho de vê teşkilatê, Gestapoyê dest daniye ser welatên Ewropayê, yên ko elemanan ew vegirtine an bi hênceta hevalbendiyê

ordiwa elemani ketê. Di wan welatan de hikim bi temami di destê elemanan de ye û hikûmetên wan welatan li ber emirê elemanan sekinîne û karê wan bi tenê bicihanîna daxwaza elemanan e. Êdi di wan welatan de ne istîqlal ne ji heqê heyinê maye.

Bi kurtî plana Hitler vegertina dinyayê, nemaze vegirtina Ewropayê ye. Hitler dixwaze di Ewropayê de nîzameke nû çêke û bi wê nîzame Ewropê bêxe destê xwe.



HİTLER

NIKARE Vİ ŞERİ KAR BIKE

Mr. Heri Hobkins di rojname NüYork Teymis de bendek belav kiriye û di wê bendê de, bi delîl û birhanan daye zanin ko Hitler nikare zora hevalbendan bibe û mizefer bihe. Mr. Hobkins nemaze dibêje:

« Hitler nikare vi şerî kar bike. Bi vê gotinê, bawer mekin ko ez qeweta Elmanyayê dixwazim bihindikinim; no. Lê kirdeyine welê hene ho nazî nikarin wan biguhêrtin û ev kirde elemanan ji zeferê bi dûr dixin.

Berî ewillî işê qewetên hewayî. Di destpêka vi şerî de di ezmanan de serdestî di destê elemanan de bû. Lê îro ev serdestî ji destê elemanan ketiye destê hevalbendan. Elemanan îro piraniya balafirên xwe li eniya ûris kom kiriye. Ji lewre di eniya roavê yanî di pêşberê Ingilîterê de Reyx di midafehê de ye. Ji ber vê yekê roja ko hevalbend di Ewropayê de enike nû vekin eleman ji ber kêmbûna balafirên bivê nevê wê bikevin tengike mezin.

Ji milê din miletê eleman bi qasî miletê




Jİ ÇEKÊN FRENSA ŞEREVANÎ TOPÊN BALAFIRŞIKEN

ingiltz ne dilqewin e. Roja ko balafirên ingilîzî û yên hevalbedan wê bi ser bajarên Elmanyayê de bigirin Hitler ji bo dilqewtîniya miletê xwe wê mecbûr bibe û bireki balafirên xwe ji eniya ûris wê bine eniya roavê.

Di çêkirina balafirên de îro peyorek yanî istihşala hevalbendan du caran bi qasî ya elemanan e û hero jî bêtir dibe. Ma gelo eleman çire di welatên vegirtî de febrîkeyên balafirên

zêde nakin. Ji ber ko ji çêkirina balafirên re emele-yên xweser û pîspor divêtin û ev emele di destên elemanan de nînin. Bi şerê ûris eleman bêgaman û gelek esker anîne ber silehê. Ewçend ko ji destpêka şerî ve ji bo cara pêşî di çekên elemanî ên hewayî de qelsî û kêmahtî hate ditin. Refên balafirên elemanî, li gora mehcetê di navbera eniya ûris û Behîra-spi de tîn û diçin. ûris xebateke zor xebitîne û ji balafirên elemanî çî neçîrvan, çî bombavêj bi hezaran avêtine erdê û ew xerab kirine. Li gora plana Hitler van balafirên piştî ko zora ûris bibiran




Jİ ÇEKÊN FRENSA ŞEREVANÎ LEZBOTÊN BEHRÎ

ewê wegeriyana ser Ingilterê û Ingilterê ji wê xirab bikirina.


Hêmanê diwim: qewetên hevalbendan ên behri. Hitler di vi wari de xeleteke mezin kiriye. Hitler bi xurtkirina çekên xwe ên hewayî bes kir û guh ne da qewetên behri. Hitler bawer dikir ko balafirên wî, febrîkeyên Ingilterê û noqarên wî vaporên kişwerê Ingilistanê wê zûka edim bikin. Herçend di destpêkê de plana Hitler çû he serî ji iro xuya dike ko hesabê erkanherbiya Hitler ne rast, lê xelet bû. Li Ingilterê, heta li Emêrikê ji peya behûn ko ji xwe dipirsîn û digotin gelo stolên hevalbendan wê bikarin li ber derba noqarên elemani bisekinin.

Ji xwe di şerê 1914-18an de ji rewşa behriya hevalbendan bi vi kari bû. Noqarên Keyser ji vaporên inglîz û emêrikani binav dikirin. Lê dawî inglîz û emêrikani xêrn peyorekên xwe serdest bûn. Îro disa serdestiya behiran çî li Etlantikê çî li Pesifikê, ji nû ve dikeve destên me.

Herçi madeyên hov yên ko di şer de ehmiyeteke mezin hene, di vi wari de ji hevalbend serdestî mihwerê ne.



JINÊN INGILISTANÊ DI ZEVIYAN DE LI ŞÛNA MÊRÊN XWE DIXEBITIN



ÇEK Û CEBIRXANE DI RIYA ÎRANÊ RE BER BI QADÊN ÛRS

Ingiltere û Emêrike bi tena xwe li salê 110 milyon ton pola derdixinin. Elemanye ji erdê xwe û ji erdê welaşên vegirti li salê bi zêdahi 42 milyon fola dikare derine. Nikel, yê me 11000 ton yê elemanan 2500 ton. Herçi sifir û zirêç di destê elemanan de bi tenê 1000 ton heye; herçi em ji van madan li salê 100 000 ton derdixinin. Bi tenê elûmînyomê elemanan bi qasî yê me ye. Lê eleman vi madeyi ji

ber kêmbûnê li şûna madeyên din ji istîmaj dikim. Herçi petrol û kewçûk me ji van madan depoxaneyine tiji hene. Lê nik elemanan ev made yekcar nînin û divêt wan ji derve bînin.

Hêmanê seym: Hitler di kitêba xwe de miletê xwe miletê dinyayê ê bijarte hesabandiye û miletên din, kîjan hebe, mijetên nizim. Ji lewre tukes nikare meydariya dewleteke welê bike ko bi çaveki xwar lê dinihêre.

Heri Hobkins di dawiya benda xwe de ditîne birê ko Emêrike ji tu şeri mexlûb derneketiye û vi şeri ji wê bibe serî.

JİYÎN

DI ZÊRZEMÎNÊN LONDRE DE


Gava hafafrên elemanı şev û roj li Londrê dixistin xelkê payitextê Ingilistanê diketin zêrzemînan û tê de xwe ji bombeyên neyar diparastin. Xelkê Londrê 7-8 milyon peya ne. Ji lewre hikûmetê di stasyonên rêhesinên binerdîn de ji xelkê re zêrzemînan çêdikirin.

Di vê navê de stasyoneke neteman-kirî hebû. Yanî cihê stasyonê di bin erdê re hati bû kolan; lê hêj avahiyên wê ne hati bûn çêkirin. Hikûmetê li wê derê û li gora mehçetê bajarekî binerdîn saz kir û tê de mezelen nivistinê, xwarinxaneyek, sinêmak, tiyatroke piçûk, û tiştine din ji dane çêkirin.

Di vê zêrzemîna tekûz de qedere 6000 peya cih dibûn. Di wextê tengiyê de cihê hinên din ji tê de peyda dibû. Reîsbelediyê taxa vê zêrzemînê, tê de kitêbxaneyek ji da bû çêkirin. Di wextekî kurt de 3000 kitêb di wê kitêbxanê de giha bûn hev. Kitêbên her celebî: tarix, cexrafîye, roman û kitêbên zarokan. Xelk li wê kitêbxanê ewçend lîn bûne ko piştî ko eleman ji bombardimana

Londrê gerîyan, dîsan ew kitêbxane ne girtin û iro ji xelkê çvarê diçin ê, tê de rûdînin û kitêbên xwe dixwînin.

Ingiliz mîleteki adelpereşt e û ji adetên xwe nagere. Ji lewre heye ko piştî şerî ji wê kitêbxana binerdîn neterikînin û weke xwe hilînin.



JÎ QADA ŞERÊ ÛRIS: TOPEK JI ORDIWA
RÛSÎ A ÇAPMEZIN

SË

BAJARËN BAKURË ROAVË QEVQASË

Bi pêşveçûna ordiwên elemani di welatên Qevqasê de navên bin bajaran gelek caran di danezanên şerëvaniyan de tene ditin. Wek: Kresnodar, Armavir, Novorosisk.


Kresnodar — Payitextê mintîqa Kûbanê ye û dikeve milê avê yê rastê. Kresnodar ji peravên Behira-reş ên rohelê 100 kilomêlir dûr e. Bajar di sala 1794an de hate danin û piraniya rûniştimanên wê qezaq in. Kresnodar bajarekî sinai ye û tê de tesfîyexaneyên petrolê hene. Di vi bajari de çar rêhesin, yê n ko welatên Qevqasê digehinin bakurê Rûsyayê, digehin hev.

Armavir — Armavir dikeve rohelatê Kresnodarê û jê 130 Kilomêtir dûr e. Armavir berî sed salî li ser kavilên bajarekî kevin hatiye avê kirin. Armavir ji bajarekî sinai ye û di dora wê de birine petrolê en mehîni hene. Jê pê ve dora bajêr de kanên komirê ên dewlemend peyda dibin. Di zikê bajêr de febrîkeyên hesin û fola ji hene. Di Armavirê re boriyên petrolê diçin heta Meykopê — ev ji bajarkî petrolê — û jê digehin Behira-reş. Ji milê din boriyê din petrola vê mintîqê digehinin Rostov û Trodovayê

Novorosisk — Novorosisk di Behira-reş de ye û piştî Sevastopolê wargehê stolê ye. Novorosisk di wextê yewnanan de

ava bûye. Tir-kangava ewwelat zemt kir di Novorosiskê de kelehek çêkiri bûn. Rûniştimanên bajêr bi qedere 110 000 peya ne. Ev der ji merkezeke petrolê ye. Ji milê din xelkê benderê di masivaniyê de xurt in. Rezên wan zehf in. Xelkê bajêr û yê dorê şerabeke xweş çêdikin û titinê diçinin.

Di vê hewêr-kê yanî mintîqê de nemaze birên petrolê yê Meykopê bi nav û deng in. Di petrola Meykopê de nexasim benzîn zehf e.



Ji BERGEHËN ŞERË ENIYA MISIRË

Herwekî xwendevanên me dizanin Romel keti be axa Misirê ji ingilîzan ew di xeta Elemeynê de sekinand û ne hişt ko ber bi pêş here. Ji hingê ve her du alî xwe kar dikin. Li gora nûçeyên paşin di karkirinê de ingilîz ji elemanan derketine. Disa li gora van nûçan ji ingilîzan pê ve qedere 50 000 eskerên emêrikani ji gihastine Misirê. Pisporekî eskerî dibêjin ko vê carê ingilîz wê dirêjt elemanan bikin. Ji xwe li 27ê Tebaxê welê hate bawer kirin ko êrîşa ingilîzan dest pê kiriye. Lê piştê xuya kir ko fermandarê nû general Elêksander hicûmeke keşfi kiri bû. Klîşa me qerargaheke yektînekeke ingilîzî şanî dide. Qerargah di bin erdê re, zêrzemlnek e.

ESKERËN

EMERIKANI DI BIN
ETLANTIKË RE

Di vî şerî de, berwekî di şerê 1914-18an de hebû, şerê noqaran îşekî girane ye. Di şerê Ewropayê de, iro hevalbendê Ingilterê e mezin Emêrike ye. Berê Emêrikê ji Ingilterê re bi tenê çek û posat rêdikirin. Lê ji roja ko Emêrike bi xwe ji kete şer Emêrike esker ji dişine Ingilterê. Ji rêkirina çek û eskeran re gelek vapor divêtin.



XELKÊ LONDRE BI XWE LI SER REHESINAN DIXEBITIN

Berî ewilî ji ber şerê noqaran vapor kêmbûne. Ji milê din ên berdest û yên ko lêne çêkirin di rîya Etlantikê de dikevin ber talûka noqaran. Ji lewre îngilîz û emêrikani didin eqilê xwe û dixwazin ji bo guhastina çek û eskeran

wasteke welê peyda bikin ko noqar û balafir nikanin dest bidîne wan. Li gora projeye emêrikani ji bo vê yekê balafirine xweser wê bihatana çêkirin (Ronahî H: 4. R: 8). Heye ko ev proje ji ne terikandine.

Lê vê paşiyê Mr. Simon Leyk projeye din berpeyî hikûmetê kiriye. Li gora wê projê Emêrike wê bikare eskerên xwe bi noqaran biguhêsine Ewropayê. Mr Leyk dibêje ko ji bona vê yekê divêt noqarîne bi 130 mêtirî dirêj bêne



EMELEYËN LONDRE BI BISIKLËTAN DIÇIN FEBRÏKAN

çêkirin. Li van noqaran 2500 peya wê bikarin siwar bibin. Ev noqar bi xwe ji bo baran ji wê bikarin bêne istimal kirin. Her noqar wê bikare 7500 ton bar hilgire.

Mr. Leyk mirovekî çeknas û tecrîbedîtî ye. Di şerê 1914an de noqara dûrger a paşin ya ko li Etlantikê derbas bû bû, ewî çêkiri bû.

ŞER

U VAPORÊN BARKÊŞ


Pisporên eskerî dibêjin: Ev şerê ko di reşahiyan de çêdide û yê ko di ezmanan de wê qerar bigire li rûyê behiran tête kar kirin. Belê çekirina top û tîfing û cebirxanan; tang û kemyon û balafran ehemiyetêke mezin heye. Lê divêt ev hacetên cengê ji welakekî heta welatekî din, ji qadekê heta qadeke din bêne guhastin. Ji guhastina wan re ji vapor divêtin. Ji

vi awirî ve tonaja vaporan di vi şerî de yek ji hêmanên zefere ên meztir e. Roja ko şer dest pê kiri bû tonaja vaporên dinyayê bi awayê jêrin bû:

Rûsye	1 300 000
Iswêç	1 600 000
Yewnanistan	1 800 000
Frense	2 950 000
Holende	2 980 000
Îtalye	3 500 000
Elmanyayê	4 500 000
Norwêc	4 900 000
Japon	5 600 000
Emêrike	12 000 000
Kişwerê Britanyayê	21 300 000
Dewletên mayîn	7 570 000

Li gora hesabê emiraliya britanî noçar û balafirên mihwerê ji vaporên hevalbendan salê 5 milyon ton vapor bin av dikin. Lê hevalbend di çekirina vaporan de hero zêde dikin. Li gora projeyên ko heta niho haline belav kirin heta dawiya sala 1942 an Ingiltere 4 û Emêrike 8 milyon ton vaporên barkêş wê daxin behirê, ji cenkeşti yani vaporên şer pêve.

Herçi sala 1943an, di vê salê de du caran bi qasî vi mixdari wê bûn çekirin.



BALALAFIRVANÊN INGLIZI LI BALAFIREKE « BE ANFORT » TORPÎLEKÊ SIWAR DIKIN

HISÊN BEGÊ TAKORÎ

Ez çûme Qoşqiranê li vi mîti
 Siûda havê min şikiyaye
 Kuçkê di bin havê min de nalebitin
 Kul hîkeve mala Hisên Begê Takorî
 Gulek li bejna havê min xisti bû
 Agir bi nava min ket kezela min şewitî
 Çûme Qoşqiranê bi ba ye
 Gurçikê havê min hesin e
 Cegera havê min pola ye
 Xwedê dinya alem zane
 Havê min di sinûlê ecemî de mêrpençe û yarim-
 [şa ye
 Çûme Qoşqiranê bi cê ye

Simbêlê havê min sor e, bi palike bi qeyde ye
 Şapikê havê min sor e, gulê wi narûce ye
 Kul hîkeve mala Hisên Begê Takorê
 Par vi çaxî Gogeqîn hespê havê min bû
 Îsal şandine Mexênna girtî ye
 Teresê Ermo ez xapandim
 Pêşiya eskerê havê min ji Qoşqiranê vege-
 [randin

Kul hîkeve mala Hisên Begê Takorî
 Gulekê li bejna havê min xisti bû
 Toximê zabîr û binbaşîyan
 Ji mala havê min qelandin
 Çûme Qoşqiranê li min bûye tarî
 Îro ji sibê de li ser kozika havê min
 Nola stêrkê Azmên agir dibarî.

DIFIN

Û GUHÊN XWE DANE JÊKIRIN

Daryûş, şahê Faris ji bîst mehan de Babil mihasere kiri bû. Dikir ne dikir midafihên kelehê bi tu awayî teslim ne dibûn û li ber xwe didan. Dawî, Daryûş qerara xwe da û got « Em ji emê weke Sîr-yûs bikin û li hêviya wê rojê biminin ko Ferat cowa xwe wê biguhêrine û di coke din re wê biherike ».

Lê ev tişt carina li serê du sê salan û carina ji di bîst an pêncî salî de carekê diqewimî. Zobîrûs fermanbareki Daryûş gote şahê xwe: — Ezbenî, em çawan karê xwe li hêviya şans û siûdê bihilin. Tu difin û guhên min bide jêkirin ezê heta çend rojan deriyên bajêr ji ordiwa te re vekim.

Daryûş difin û guhên Zobîrûs dane jêkirin. Zobîrûs di vi halî de çû Babilê, Xelk lê kom bûn û mesele jê pirsin. Zobîrûs ji wan re da zanin ko Daryûş lê hate xezebê û difin û guhên



DI FABRÎKEKE BRÎTANÎ DE GULEYÊN TOPAN

wî jêkirine û ji ber vê yekê ew ji hatiye cem babiliyan da ko heyfa xwe ji Daryûş hilîne.

Zobîrûs kumandareki bi nav û deng bû. Babilî bi hatina wî şa bûn û ew xistin şewra xwe. Zobîrûs ji wan re planek çêkir. Li gora wê planê eskerên Babilê wê ji kelehê derketana û dirêjt ordiwa Daryûş bikirina û ew bişikestana. Ev bi xwe, îşekî zehmet bû. Lê ji bo Zobîrûs hêsanî bû. Ji ber ko Zobîrûs rewşa ordiwa Daryûş bi her kiltîten wê nas dikirin.

Babiliyan serfermandariya eskerên xwe siparte Zobîrûs. Zobîrûs teqîr ne kir, ji ker ve, Daryûş li plana xwe serwest kir û şevêkê deriyên kelehê vekirin; lê li şûna ko babilî dirêjt ordiwa Daryûş bikin, Daryûş bi ordiwa xwe kete hundir û bi behayê difin û guhên kumandareki xwe î canfeda Babil zemt kir. Herçî Zobîrûs bi vê fedakiryê di tarixê de bû qehremanekî abadîn.




QEWETINE ÇÎNÎ EN MÊKANÎKÎ BER BI QADA ŞER.

HEVRÎŞIM Û KINCÊN JINAN

Nemaze di vi şerî de jin gelek bi keri şerevaniyan yanî mîran hatine. Ji xwe bergav bi keri wan tèn. Ma bê jin kengê mîr peyda dibûn.

Lê ji milê, din di vi şerî de mîr ji jin re xebateke zor dixebitin. Herwekî nas ê jin ji cilên hevrişim gelek hez dikin û dixwazîn ko canên wan ên nerm bi tenê bi hevrişim bête nixumandin. Lê di wextê şer de hevrişim ji bî madeyên cengî gerek in. Ji lewra mîr di kimyaxanan de ji alîki madeyên teqandinê çêdikin û ji milê din giyayên adeti tevî hev dikin, wan dikelinin û bi hevîrê ko dîtinin pê qimaşîne hevrişim saz dikin da ko canên xanîman ên uerm bi cawîne hişk neyîne eşandin.

Belê fistan, gore, kiras, hevalkiras tev de ji hevrişim: herwekî klîşeyên vi rûpelî şanî



didin. Bi tenê di van klîşan de yek heye ko dikeve her çavan û ew ne bi dil û kêfa me ye; klîşa goran û çîpan. Herhal xwedî bi van çîpan nikarin sêrbilind bigerin. Xwezî wan baçên peyên xwe bi şeltêkê hinek bişidandana û ew ziravtir bikirana.

MAÇIKA

DRANKER Û CEZAYÛ WÛ

Di salona mehkemê de. Reîsê mehkemê dosyan tev dide; gilîhvan Fehîme xanim digel bavê xwe Şewket efendî û gilîhlê dranker Ismet efendî bi evkatê xwe re li barê sekîni ne. Reîs piştî ko kaxezên dosyê xwendine, berê xwe dide dranker û jê dipirse:

— Te gotî bû ko Şewket efendî keça xwe Fehîme xanim ji bo dermankirina dranên wê şandî bû nik te. Ka bêje me Fehîme xanim çend caran hate cem te?

Dranker — Fehîme xanim hevdeh caran hate cem min. Min dranên wê derman kirin û çar lire heqê xwe jî jê standine.

Şewket efendî — Tu fehit ji naki, tu dibêji min dranên wê derman kirine; bêbext...

Reîs — (ji Şewket efendî re) Ji te hêvl dikim bihîna xwe fireh bike, ev der mehkeme ye. (ji dranker re) te got ko xanimok hevdeh caran hatiye cem te. Divêt tu ji mehkemê re bibêji di van hevdeh caran de te pê û pê re çi kir?

Dranker — Cenabê reîs, xelk dibêjin qey drankeri îşkî rahet e; lê ne welê ye, drankeri sinheleke kûr û hûr e; divêt mirov nexweşên xwe rind seh bike heta ko dermanên wan bikare peyda bike.

Şewket efendî — Hus be rezlî, tu bi maçkirinê wan seh diki û dermanên wan peyda diki?



TANGINE INGILÎZÎ LI ÇEMEKÎ DERBAS DIBIN

Reîs — Sehkirina te kengê wê xelas biwa?

Dranker — Li 15ê Ilonê, lê Şewket efendî ne hişt; karê me di nivê rê de birlî.

Şewket efendî — Hey bêbext! tu ji pêş min ve holê diştekillî. Cenabê reîs bavê wî dest-brayê min bû. Min ji xwe re gotî bû kurê dostê min jî bo dermankirina dranên keça min bivê nevé ji herkest çetir e.

Reîs — (ji Fehîmê re) Te di stînaqê de gotî bû ko tu çûyî cem dranker Ismet efendî û ewl te li ser devê te maç kiriye. Lê divêt tu ji mehkemê re her tiştî digel kitkîtan bibêji. Ka bibêje cara pêşin gava tu çûyî balê dranker bi te re çawan da û stand?

Fehîme xanim — (li erdê dinêre û dipeyive) Belê bavê min ez rêkirim cem wî, ji bona ko dranên min têsîhan. Cara pêşin gava ez çûm balê bi hîf û nezaket hat pêşiya min û ji min pirsî heke ez ji dranên xwe aciz im. Min got: « belê gelek têsîhan » Ewî gote min: « metirse, ne tu tişt e, ezê wan rahet bikim » Ez li ser kursi rûniştandim, destikê kursî bîda û ez heta bi bejna xwe bilind kirim....

Reîs — Tu çire disekîni, bêje... û paşê...

Fehîme — (Rûyê wê ji şermiyê sor) Paşê gote min: « Çavên xwe bigir û devê xwe veke » Min jî çavên xwe girtin, devê xwe vekir. Carê ko ez diçûm balê bi min re



holê dikir; min jî çavên xwe digirtin û devê xwe vedikir... dranker ji li ser devê min ez maço dikirim.

Şewket efendi — (ji dranker re) Hey şebav, tu bi min re van îşan diki?

Dranker — (bi keneki bi qerf) Ne bi te re, bi keça te re...

Reis — (ji Fehîmê re) Te çîre, ji roja pêşin de, ev tişt ne gotine bavê xwe?

Fehîme — Min nizanî bû. Min di dilê

xwe de digot qey ev **ESKERÊN FRENÇA AZA PIŞTÎ ŞERÊ BİRHEKÎMÊ XWE JI NÛ VE SAZ DIKIN** jî di drankeriyê de terz û isûleke nû ye; û êşa dranan bi vi awayî derman dikin. Lê gava min gote bavê xwe û bavê min enîri, lingê min zani îş çî ye.

Reis — Û êşa drananê te?

Fehîme — Hin bi hin sivik dibû.

Dranker — Ez hêvi dikim heytê mehkemê qenc gulî bidî. Fehîme xanîm dibêje ko êşa drananê wê bi dermanê min sivik dibû. Herçi bavê wê min itham dike û dibêje ko min şerefa wî şkandiyê û çar lîreyên wî hêl heq jê standine (berê xwe dide. Fehîme xanîmê û dibêje) Ma piştî hevdêh çawan êşa drananê te bi temami rahet ne bûye?

Fehîme — (bi şermiyê) Belê...

Dranker — Hon dibîbîsin, xanîm dibêje belê... dermanê min lê hatîye...

Reis dide zanî ko mihakeme gihastîye dawîya xwe û heyet diçe mizakerê. Piştî bih-



nekê heyet vedigere çihê xwe û reis qerara jêrin dixwîne:

« Ji ber ko Fehîme xanîm ji bo dermanîkirina drananê xwe qesta dranker Ismet efendi kirîye û hevdêh çawan çûye halê

Ji ber ko bijîşk û dranker ji bo rahetîkirina êşên nexweşên xwe di bijartin û îsimalîkirina dermanan de serbest û bi kêfa xwe ne

Ji ber ko nexweş Fehîme xanîm di pêşberê mehkemê de mikur hatîye û gotîye ko dermanê Ismet efendi lê hatîye û pê êşa wê rahet bûye


Ji ber ko di qanûnê de ji maçîkirina ko ne bi kotekî ye tu ceza nîne

Ji ber ko mehkeme nikare guh bide daxwazên mirovên gilîhvanîyan yê ko qanûnê ew cîm ne hesabandine

Ji lewre mehkeme bi yekdengiyê dranker Ismet efendi jî cîmê ko bi aliyê wî ve didin berî dide zanî û mesrefên mehkemê li gilîhvanîyan hikim dike».

Şewket efendi dirêj dranker dike û dike li wî hîde. Reis radibe ser xwe, dixwaze Şewket efendi bide girtin. Dranker berê xwe dide reis û dibêje:

— Xem nake cenabê reis halê dînyayê ev e; min êşa keça wî rahet kir; ew dixwaze min biêşîne.



CENKEŞTIYA INGİLİZLÎ « NEWCASTLE » DI BENBERA PLEYMÛTÊ DE

Li 15ê Tirmehê refeki balafirên ingilîzî bi ser girava Sicilyê de girti bû û armancên eskerî da bû ber homban. Li yekê ji wan balafirên tifaqek qewimî, motora wê sekinî û balafir nema dikarî. Bû li hewayê bisekine. Balafir bêgav ma û daket erdê neyar. Di balafirê de 4 nûzêlandî û du ingilîz hebûn. Tatyanan ew hêsir girtin; lê qedirê wan zannîn û destûra wan dan ko ji xelkê xwe re mektûban ji binivîsinin.

Hêsiyan mektûbên xwe nivîsandin lê ew ne dane talyanan, lê ew bi xwe bi destên xwe gihandine xelkên xwe. Ma çawan?

Piştî ko hêsiyan mektûbên xwe nivîsandin kumandare talyanî ji fermandariyê emîr

stand ko hêsiyan ingilîzî di balafirekê de bişîne Terantoyê, bajarekî İtalyayê.

Hêsir, mektûb di hêrikên wan de li balafireke talyanî siwar bûn û bi hewa ketin. Eskereki talyanî tifiingbidest li ber

XÊRA NÊXWEŞIYA NOBETDAR

wan nobet digirt. Bi rê ve nobetdar nexweş ket; dilê wî ji bir ve çû û bêhiş ket erdê. Hêsiyan ingilîzî çekên nobetdar jê kirin û ew avêtine behirê; û xwe gihandine mezela balafirvan, tifiing û şejderba nobetdar lê rast rakirin û jê

re gotin «Berê xwe ji Taran'oyê bade û bide Maltayê».

Balafirvanê talyanî ji ya hêsiyan kir û xwe li Maltê girt. Balafira talyanî gava gihaşte ezmanê Maltê balafireke ingilîzî dirêjî wê kir û mîtral-yozên xwe lê girêda. Talyan xwe jê da alî, lê ingilîz dev jê dernedida. Di vê navê de yekî ji hêsiyan kirasê xwe ê spi ji xwe kir û di pencerê re ew hejand, yanî teslîm û balafira talyanî bi selamet daket ba-



DI ÇINA NEVEGIRTÎ DE ŞAGIRTÊN BALAFIRVAN

lafirgeheke Maltê. Bi vî awayî hêsiyan ingilîzî ne bi tenê mektûbên xwe lê bi ser de balafireke talyanî û hêsiyan talyanî jî bi xwe re anîn û hêsir û xelkê wan pev şa bûn.

HEJMARA HAWARÊ A 48AN LI 15Ê
TÏRMEHÊ BELAV BÛYE LÊ BIGERIN.

Kiriyaariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrî.

SAL 1
HEJMAR 7
PENCŞEMB
1 ÇIRIYA PÊŞIN 1942

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 7
JEUDI
1 OCTOBRE 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



TOPEKE BALAFIRŞIKEN JI YÊN ORDIWA BRÎTANI



ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÊ

DAWETA KÊZÊ

Kêz ji tenahiye aciz bû. Terka mala xwe da û ji xwe re li méréki geriya. Rasti şivanekî hat. Şivan got ê: Kêzê, kêz-xatûnê, ji kû têl û bi kû da terî?

Kêzê gote şivani: Ez ji xwe re li méréki digirim; dikim bizewicim.

Şivan gote kêzê: Ev e ji te re mérék ma tu min nakî?

Kêzê: Ez te dikim; lê çaxê ko tiwê biqehiri, tiwê bi çi li min xîni?

Şivan got ê: Bi darê xwe

Kêzê: Ez debar nakim, darê te stûr e tiwê min bikujînt.

Kêzê da rê û çû; راستی می‌شککە hat. Mişkê jê pirsî: Kêzê, kêz-xatûnê, tu ji kû têl û bi kû da diçî?

Kêzê: Ez ji xwe re li méréki digirim.

Mişkê: Ev e ji te re mérék, ma tu min nakî?

Kêzê: Ez te dikim, lê çaxê bihina te ji min teng bû, tiwê bi çi li min xîni?

Mişkê: Bi boçika xwe.

Kêzê qailiya xwe pê anî û rabûn daweta xwe kirin.

Rojekê mişkê gote kêzê « Ka ji me ra xwarinekê çêke em mirov û pismamên xwe biezimînin »

Mişkê da rê û çû banî pismamên xwe bike, kêz ji kete methexê.

Gava mişk vegeriya mal çî bibîne kêz kêza ciwan ketiye dîza dan. Mişkê jî ji qehira xwe ariya agir bi ser xwe da kir û bi çolê ket. Pir çû hindik çû راستی qijikê hat. Qijikê gote mişkê:

— Ev çî halê te ye mişka xwellî ser?

Mişkê: Mişka xweliser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, ne ber e ne bistan, mane qelpikên serguhan

Qijikê jî per û pûrtên xwe weşandin. Darê lê nihêrî û got:

— Ev çî halê te ye qijika perweşin?

Qijikê got: Qijika perweşin, mişka xweliser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, neber e ne bistan, mane qelpikên serguhan

Darê jî pelên xwe dawêşandin. Çemê avê, di bin darê re, jê pirsî:

— Ev çî halê te ye dara pelweşin?

Darê got: Dara pelweşin, qijika perweşin, mişka xweliser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, ne ber e ne bistan, mane qelpikên serguhan.

Çem jî bû nivî av nivî xûn û bi ser garis da çû. Garis jê pirsî: Ev çî halê te ye ava nivî av nivî xûn?

Avê got: Ava nivî av nivî xûn, dara pelweşin, qijika perweşin, mişka xweliser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, ne ber e ne bistan, mane qelpikên serguhan.

Garis jî bû devnexûn. Xweyiyê garis jî zeviya xwe av dide. Xweyî gote garis: Ev çî halê te ye garisê devnexûn?

Garis got: Garisê devnexûn, ava nivî av nivî xûn, dara pelweşin, qijika perweşin, mişka xweliser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, ne ber e ne bistan, mane qelpikên serguhan

Mêrik jî mer da bin xwe û rûnişt ser. Qizika mêrik jî havê xwe re girar aniye. Qizikê gote havê xwe: Ev çî halê te ye havê merliqûn?

Mêrik got: Havê merliqûn, garisê devnexûn, ava nivî av nivî xûn, dara pelweşin, qijika perweşin, mişka xweliser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, ne ber e ne bistan, mane qelpikên serguhan

Qizikê jî girar bi ser xwe da kir û çû ba diya xwe. Dê pênbû dijent. Gava çav bi qîza xwe kir jê pirsî: Ev çî halê te ye qizika sergirar?

Qizikê got: Qizika sergirar, havê merliqûn, garisê devnexûn, ava nivî av nivî xûn, dara pelweşin, qijika perweşin, mişka xweliser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, ne ber e ne bistan, mane qelpikên serguhan.

Dê jî çek û kevan li xwe xist û rûnişt. Cirana jinikê jî hati bû agir. Gava ev hal dît ji cirana xwe pirsî:

— Ev çî halê te ye cirana çekliqûn

Jinikê got: Diya çekliqûn, qizika sergirar, havê merliqûn, garisê devnexûn,

GERMANISTAN

BI YAR Û NEYARÊN XWE RE

Ordiwên elemanı di qadên şerê ûris de, ne-maze di Stalingradê de, ketine deravine teng. Ji milê din serkarên nazi di hundirê welêt û di pşit eniyê de bi dişwarîne mezin pev diçin. Berî her tiştî ji nazîyan re divêt xelkê xwe bi xwedî bikin û ji wan re nanê gerek peyda bikin. Herçî zadê îsal, li Elmanyayê, ne baş e û li gora salên din kêm e. Lê elemanan di Ewropayê de gelek welat vegirtine û bi awayê hevalbendiyê ketine hinên din.

Niho eleman dixwazin zadê xwe ji wan welatan binin. Lê vî îşî ji nikarin pêk binin. Ji ber ko xelkê wan welatan naxwazin zadê xwe bidin elemanan. Di wan welatan de mamîkeke nû peyda bûye. Xelk ji hevûdin re dibêjin « Bi zadê xwe, zaroyên xwe bi xwedî bikin û ne xelkê dijmin ».

Ji milê din rêveçûna elemanan bi henalbendên xwe ji îşeki xerîb e. Di vê rêveçûnê de qeyda elemanan ev e:

ava nivî ava nivî xûn, dara pelweşin, qijika perweşin, mişka xwelîser, kêz kêza ciwan, ketiye dîza dan, ne ber e ne bistan, mane qelpikên serguhnan.

Ciran çû elam da xelkê gund. Mixtar û gundî li wan kom bûn, kêz ji dîza dan derêxistin, veşartin û herkos vegeriya mal û halê xwe. Dê û bav mer û çek ji xwe kirin; mişk û qizikê xewlî û girar ji xwe dawêşandin; dar û qijikê per û pelên xwe li xwe kirin; garis li xwe zivirî xwe kire serbejor, av ji daweriwî bû zelal; mişka reban ji ma bî.

WINDSÛN ÇORÇIL



Mr. Çorçil sehekwezîrê Ingîllere ê hêja gava ji Moskoyê vegeriya rîya xwe bi Misîre xistî bû. Resmî jorin gava serekwezîr li Misîrê bû hatiye girtin. Di vî resmî de ji Çorçil pêve Mr. Kêstî, nêminendeyê kebîna şer di welatên rohelatê nîzing de û Mr. Lampson sêfirê Ingîllere yê Misîrê jî dixuyîn.

herîştî standin lê tuliştî ne dayîn.

Di vê babetê de rewşa Romanyayê ji her dewletê xerabtir e. Heta niho xîsara romaniyan di navbera kuştî, birîndar û windabuyîyan de 500 000 mêr in.

Herçî mîletên wek Polonye, Yûgoslavîye û Yewnanîstanê yên ko bera elemanan daye ew bi awayîne din ji tene eşandin. Xulase mîletên Ewropayê dost bin dijmin bin bi awaktî ji rêberê Germanîstanê, Hitler, têsînin. Lê mîna medhelokê gotiye: canê şêrin xweş e wî merencînin.

Bi vî awayî eleman ne bi tenê neyarên xwe lê yar û hevalbendên xwe jî dixeyidînin. Ji milê din şer jî dom dike; û herçend şer dom dike demokrasî xurt dibin. Xurtbûna domokrasîyan jî bêşik qelsiya elemanan e.

Di rojên paşîn de dişa çel li eniya nû dikin. Nîminendeyê Mr. Rûzwelt piştî ko Rûsye ziyaretî kir pê dide erdê û dibêje eniya nû rojekê berî rojekê divêt bête vekirin. Ji milê din sondxwarî xwe jî bona vê yekê kar dikin.

ORDIWA

ELEMANI LI BER SÊ DERIYÊN QEVQASÊ

Di eniya nivro de ordiwa elemani, ji roavê ber bi rohelê. di Behira reş de, ji bendera Novorosiskê û di Armavirê re û di rohelatê vi bajari de, gihastîye bajarê Mozdokê.

Rêhesina ko ji Rostovê ber bi jêr dibe û di qûntarên çiyayên Qevqasê û di Armavir, Mozdok û Grosniyê re derbas dibe, ji Armavirê ve xwe li rohelê digire û di Mexaçqelê de li behira Qezwinê der dibe. Ev rêhesina ko rîya xwe bi bilindcihên çiyê naxe ji Mexaçqelê heta Bakûyê bi peravên behira Qezwinê ve diçe û xwe digihîne kanên petrolê.

Ordiwa elemani iro heta bi Mozdokê û hinek jê wê ve jî; gihastîye vê rêhestinê û daye pal û pesarên çiyê û dike lê biqelibe.

Di çiyayên Qevqasê de sê derî an derbend hene. Li roavê: Çiper 5470 mêtir bilind. Li ortê: Terek 2379 mêtir bilind. Li rohelê Bogoski 2392 mêtir bilind.



Roj Diçe Ava û Cenkeştike Ingilîzî Berê Xwe Dide Dûrahiya Behira

Di van her sê deriyan re tu rêne şose naçin. Bi tenê di deriyê Çiperê de rêke kevin heye ko di wextê çaran de hatiye çêkirin. Ev rê Veladiqevqasê digihîne Tiflisê, payitextê Gurcistanê. Herçî deriyên din di wan re şop û şiveriyên karwanan derbas dibin. Di dirêjahiya çiyê û di dora van deriyan de 1400 şîpan û kumqêşa hene; yanî girên berfê yê ko tucaran nahelin.

Çiyayên Qevqasê sê kimtên bi nav û deng hene: Elbirz (5647 mêtir) Qazbek (5043 mêtir) û Ararat yanî Agiriya Kurdistanê (5211 mêtir)

Ev e sed û benda Qevqasê ya ko eleman iro xwe lê diqelibînin. Zivistan ji bi ser de hatiye. Tu şik tê de nînc ko di wan deriyan re derbas bûn ne tişteki hêsani ye.

Lê ber bi aliyê rohelê çiyayên Qevqasê nizim dibin û ber bi peravên behira Qezwinê rast û deştên bi gir û kepez hene ko ji ber hev dikişin û diçin heta Bakûyê, kanên petrolê. Ji lewre gelek heye ko eleman li şûna ko xwe li bilindcihên çiyê biqelibînin xwe

li deştê bigirin; berê xwe bidin behira Qezwinê û behir behir qesta Bakûyê bikin; bidin pey rêhesina ko ji Mexaçqelê ve ber bi jêr dibe. Herçî aliyê rohelê Qevqasê ye, wer dixuye ko niyeta elemanan ev e.

Çiyayên Qevqasê herweki li aliyê rohelê digihin behira Qezwinê, li aliyê roavê jî xwe digihînin Behira reş. Herçî peravên vê behirê elemanan ji mêj ve ye dane van peravan û gihane Novorosiskê. Niho dirêjî Toapsê dikin. Toapse jî bendereke Behira-reş e.

MEDEGESKAR

Û SIÛDA MIROVËN KO DI ROJËN ÌN
Û SËSEMBË DE JI DIYËN XWE DIBIN

Medegeskar girav ù mistemlikeke frensizi ye. Me legeskar di rohelatê Efrîqayê de ye ù giravê ehemiyeteke eskeri heye. Ji lewre ingilizan li 5ê Gulana vê salê esker derêxisti bû giravê ù di bakurê giravê de bendera Di-yago-Swarês zemt kiri bû. Hingê ingilizan pê bes kir

Lê li 11ê Îlonê ingilizan ji nû ve dest bi hereketê kir ù vê carê ordiwa ingilizi daket bendera Majûngayê ù jê berê xwe da merkeza giravê, Tananarivê. Piştî şerine sivik ù li 22ê Îlonê ingilizan Tananariv ji zemt kir.

Berî 47 salan gava frensizan ji dikir giravê zemt bikin ew ji di vê riyê re keti bûn hundirê welêt. Lê hingê riyên çekiri nin bûn ù jiyina ewropayîyan tê de zehmet bû.



Dûka Kentê Li Ber Nexweşerebeyên Yewnani

Di Sibata sala 1895an de eskerên frensizi deketin bendera Majûngayê. Midafihên benderê yanî eskerên medegaskari beî ko dest hillnin xwe dan paş ù kişiyane heta çiyayên ko dikevin nivê giravê. Ordiwa general Dûşen,fermandarê frensizi,berê xwe da Tananarivê ù bê şer ù teq ù req pêş ve çû. Ordiwa pêşî ù kermêşan ya ko ji gol ù çiravên dorê radibû bi ser eskerên frensiz de girt ù bi wan veda. Eskerên frensiz bi tayê diketin. Piraniya ordiwê nexweş keti bû. Eskerên Dûşen ji ber ordiwa kermêşan baz da ù giraniya ordiwê berê xwe da Majûngayê.

Ji milê din dewaran ji esker têşandin Ordiwa frensizi ji bo kişandina ereban ji Sûriyê hêstirên barkêş bi xwe re birî bûn. Lê ji ber ko ew hêstir ne elimî bûn ereban gava ew kirin ber ereban hêstir vecûniqîn, e xwe dane ber pehinên xwe ù dev li eskeran kirin ù esker pê birin bûn Hinek ji wan eskeran bi birinên xwe ji ketin.

Frensiz veşeriyên Majûngayê ù ji Ewropayê hêstirên ereban anîn, xwe saz kirin ù ji nû ve qesta Tananarivê kirin. Lê hêstirên ewropayî ji bi kêr ne hatin. Ji ber ko ew erebe ji bo hêstirên welatên rohelat ên piçûk hatî bûn çekirin. Herçî hestirên ewropayî ên mezin ne diçûn nav darên beristo. Dûşen vê carê dev ji ereban berda; bar ù eskerên xwe li hêstiran siwar kir ù xwe gihande Tananarivê ù bajar da ber guleyên topên xwe. Gula pêşî li qesira melika Medegaskarê, Ratafaloyê ket. Gelek ne borî di ser qesirê re aleke spî xuya kir; melike teslîm bû.

Ji hingê ve frensizan li giravê rêne şosê gerandine ù vê carê ingiliz ji riyên ko frensiz tê re bi ker ù hêstiran derbas bû bûn, bi tang ù kemyonan derbas dibin ù pêşî ù kermêş ji bi wan venadin.

Medegaskar erdeki mezin ù fireh e; rûyê erdê wê ji Frensê mezintir e; 590 000 kîlometir çargoş e. Lê nifûsa wê

lindik e, 3 milyon. Ji zimanê wan re zimanê Hofa dibêjin. Ev ziman ji bêjeyên erebi, portûgali, inglizi, frensiz û holendi bihevketî ye. Lê bêjeyên van zimanan di devên malgaşan de şikilên xwe ên bingelûn bi gelekî guhartine û li gora denganiya malgaşan ketine şikilê din. Li gora zanayên zimanan zimanên Medegeskar û Melêzeyayê ên kevin ji yek esli ne û her du ji ji sanskrîta kevin hatine der.

Beriya ko frensiz Medegeskarê vegirin mezinê welêt hergavjinîkek bû û wê mîrê xwe dikir serêkwezîrê xwe û îşê hikûmetê dida destên wî.

Heta bi hatina frensizan, di giravê de, adetine hov û xerîb hebûn. Şopa van adetan hetanî îro jî, lê kêm caran, di gündine nependî de lête didin.

Yek ji van adetan ew bû ko malgaşan li gora isûl û nizamekê hin zarowên xwe dikuştin; zarowên kirêt û zarowên ko di rojên În û Sêşembê de ji diyên xwe dibûn. Lê medegeskariyan ew hê sebeb ne dikuştin; digotin:

Herçî kirêt: mirovên kirêt di dinyayê de bêsiûd in. Heke me zarowên kirêt ne kuştin gava ew mezin bibin ji bedhextiyê ewê biêşin, çêtir e ko himirin.

Heçî ko rojên În û Sêşembê ji diyên xwe dibin ew jî gava mezin bibin an diz an qatîl an ewê dîn bibin. Ji wan re jî heyf e û jî me re jî.

Felsefa medegaskariyan xurt bû. Bi vî awayî gul didan pakîya nîjadê xwe û bi tenê mirovên xudan şeref û rûmet û aqîl dihiştin ko bijîn.

Lê ev qeyde bi tenê li zarowên pêşin yanî li nûxuiriyên xwe dikirin. Herçî zarowên ko di pey wan re di rojên În û Sêşembê de dihatin dinyayê ew rast bi rast ne dikuştin û ew li ber lingên dewaran diceribandin.

Tecrîbe jî bi vî awayî çêdibû. Zarowê ko di yekê di van her du rojan de hati bûn dinyayê; bi roavê ve dibirin kokîka ga û gamêşan û şirmêjê reben rût û tazî li her deriyê kokîkê dihiştin. Serê sibehê dihatin ser û derî vedikerin. Garan jî kokîkê der dibû û di ser zarok re derbas dibû. Heke gan pê lê



DI QADÊN ŞER DE TELÊFONÊN GUHÊSBER

nekirana — tiştek ko kêman caran çêdihû — dê û bav digotin ko siûda zorok baş e. Zarok radi-kirin û tantî mal.

Ji xwe gan kêman caran pê li zarok ne dikirin û zarokên ko ji ber lingên gan difilitin wan jî gelek caran serma hiltanî û piştî çend rojan dimirin.

Îro malgaşan, piştî ko ev adet terikrindine dibînin ko zarowên kirêt û yên ko rojên În û Sêşembê ji diyên xwe dibin carina jî zarowên spehî û jî yên ko di rojine din de ji diyên xwe bûne bisûd û bi şeref û rûmetir in.

STRANA KUDRMANCI.

KERAN Û KEMBERAN

Kerani digote Kemberani emê biçî Amediyê
Emê ber û dermana rû ki ser kefiyê
Eskerê şaê Ecem wê hê emê rûni li pêşiyê
De em bistîni tola çilkeziyê.

Kerani digo Kemberani, keko em her du berayê hev î
Tu bide brayê xwe şûrê dudevî
Tu biçûk î, xêşim î, nezan î
Sibehê li gelyê Bendewarê tu çaw bîdî
Eskerê şaê Ecem xêbetê sor û rengin, jî pişt brayê
[xwe birevî.

Kemberani digo Kerani, keko solên te li min kun in
Wek berikên sarome li bin çengê min dikevin, disimin
Ji te we ye, tu bi tenê mîre î, xelk hemî jin in
Wehda Xwedê ez jî piş' te narevim
Heta li ser serê min bibê sûka hedada, xelk gêsne

[xwe li ser vejînin
Çikên êgir û hêsîn jê bifîrin.

Ne çlrok, ne dlrok,
ne ji efsane ye. Eyn
rastî û heqîet, biser-
hatiya xortekî kurd, xor-
teki kurdî heja ye.

Belê, ji bona ko
bikare hînl xwendin û
nivîsandina zîmanê xwe bihe, xwe ji bavê xwe
vedizi, bavê xwe xapand; ji gundê xwe rabû
û çû Amûdê.

Xwendevaninol gulî bidine min, honê bi-
blînin ko di van gotinan de tu mîbalexe, tu
zêdekirin nîne û ev xwerû rastî, rastiyeke rût
û tazî û dijwar e.

Ma dinya ne remezan e. Ez bi derengî
çû bûm çapxanê. Li çapxanê, ji zîlamên adeti
û heroyî pêve xortekî xerîb ji hebû. Xort li
ser kursîkî çapxanê liingskeşti û hesirdiriyayî
rûnişt bû; ji ber min ve rabû. Min silav li
xelkê xwe û li wî kir û min cihê wî ji nû ve
şanî wî da. Xortê xerîb rûnişt. Di çavên wî
de pêt û çirûskên jîriyê diçûnsin; di her hal û
lebtên de ew edeb û ferhiya kurdmançî a
zîkmakî dibate ditin. Min jê re got:

— Xortê qenc min tu nus ne kirî, tu ji kû yî?

— Ezbenî ez ji dora Dirbêsiyê, ji gundê
Tilêlûnê me.

Min hinekê din pê re xeber da. Min dit
ko zarê wî ne zarê beriyê ye. Dîsan min got ê:

— Tu dibêji ko tu ji Tilêlûnê yî, lê zarê te
ne zarê beriyê ye.

— Ezbenî xehera te ye, esilê me ji Wartoyê
ye ji gundê Qerekan, em bi xwe cibri ne.
Navê min Cengbazê cibri ye, kurê şêx Meh-
mûd. Ev bûne deh sal em ji welêt hatine.
Gava em ji welêt derketine ez neh salî bûm.
Bavê min seyda ye, di gundê Tilêlûnê de dersa
feqehan dibêje.

Min dîsan ji xortê xwe pirsî:

— Tu zanî bi kurdmançî bixwinî?

— Ma çawan nîzanî ezebenî. Hergav Ha-
war ji min re têt. Lê hetanî ko ez hînl xwen-
dina zîmanê xwe bûm min gelek zehmet dit.

— Ma çîre? Ji elfabeya me hêsanitir kê
elfabê peyda dibîn.

— Zehmet ne di elfabê de bû.

— Lê di çî de?

— Ezbenî heke tu dixwazî ezê çikora xwe
ji te re bibêjim.

— Ma çawan naxwazî, kerem bike bibêje .

— Ezbenî beriya niho ji gava Hawar der-
ketî bû ez pê hesiya bûm. Lê liingê ez piçûk
bûm û min nikarî bû ez ji xwe re tevdirekê

XWE

Jî BAVÊ XWE VEDIZÎ
TERKA GUND Û MALA XWE DA

DA KO HINI XWENDIN Û NIVISANDINA ZIMANÊ XWE BIBE

bibînim û hînl xwen-
dina zîmanê xwe bibim.
Xwedê fikira miliyetê,
ji berê de di min de
çêkiriye. Lê min zehf
dixwest yên ko bi vê
meselê dixebitin û pê

hesiyane ez bi wan re hevaltîyê bikim û feyde
ji wan bibînim. Lê helê ba me li gund yên ko bi
navê kurdîtiyê tenebau kirin û bi xwendina kur-
diyê dîzanî nînin. Hawar ji ji nû ve derkî bû.
Min seh kir ko li Amûdê hin ji vî qismî hene.
Ba me adet e feqeh di gundên xwe de dest bi
xwendina ilmê erebî bikin ji paşê diçin gund
û bajarine din. Ji ber ko dibêjin heger feqeh
ji mala xwe bi dût ket û çû xerîbiyê çêtir
dixwîne. Icar min çî kir, min izna xwe ji bavê
xwe xwest ko herim Amûdê û li cem Seydayê
Evdilhelîm ilmê erebî bixwinim. Lê mexseda
min tişteki din bû..

Min şexaliya xortê xwe li hire birl û jê
pirsî: Ma çîre ev derew. Te çîre ne got bavê
xwe ko tu herî Amûdê da ko hini xwendina
kurdîyê bibî?

Xortê min bi kenê xwe ê şerîn kenî û
got: Ezbenî min ji bavê xwe re rastî bigota
tucaran izna min ne dida. Ewê ji min re bi-
gota ma tu dixwazî kafir bibî. Axir serê te
neşînim, bi vê derewê ez çûm Amûdê û bûm
feqehê Seydayê Evdilhelîm. Rojê saetekê li cem
Seydayê xwe rûdinistim; ewî ji dersa min digot.
Wekî din temamî wextê xwe li nik hevalên
xwe ên kurd û kurdparêz dibihart. Li Amûdê
li ba Hîşyarê Lîcî bi kurdî elimim û gihastim
daxwaza xwe. Tu dibîn ezbenî çîre xwendina
kurdîyê zehmet e. Ne ji ber herfên wê lê ji ber
mezînen me.

Min gote xortê xwe: Niho tu bi xwe seyda
yî, seydayê kurdîyê. Di gund de xelkê xwe
hîni kurdîyê dikî?

Gelek hindik û dizîka. Xort dixwazî
hin bibî lê ji mezinan ditîrsin

— Ma ew mezin kî ne?

— Ma tu bi xwe nîzanî ezbenî, şêx û aza

Min şexallî li hire birl. Ji ber ko xortên
ko guhdariya vê şexaliyê dikir dest bi çêr û
dijûnan kirî bû.

Ez vê çîrok û hisertaliyê herpeyî şêx û
axayên xwe dikim û hew. Heçî zane ji xwe
zane, heçî nîzane...

Her bijî Cengbazê Cibri, Xwedê te bihtle
û yên wek te di nav mîletê kurd de zêde bike.

Ev jî, Erefat Hejmer 2

ÇARIÇIN

ÇAWAN BÜYE STALINGRAD

Navê Stalingradê ko iro tê de şerine xwindar çêdibin berê Çariçin bû. Çariçin bi mana jina çar yanî jina padişahê ûris e. Stalingrand nizingî devê Volgê ye û ji lewre vî bajari ehemiyeteke eskerî e mezin heye.

Di sala 1918an de rûsên gewr yanî rûsên ko bi belşevikiyê qail ne dibûn Çariçin ji xwe re kiri bûn niveka tevgera xwe. Hingê eleman di Ûkranyayê re dibatîn û herçî rûsên gewr, dikirin ji par re li ordiwa sor xin.

Di navbera gundiyan sor de peyayek hebû jê re Klémanti Voroşilov digotin (iro merêşal Voroşilov). Gundiyan ew ji xwe re kiri bû serek.

Lênin jî Stalin ji bo midafeha hewêrka Volgê rêkiri bû wê derê. Stalin û Voroşilov di Çariçinê de giha bûn hev. Stalin, keşeyê berê, plan çêdikirin; Voroşilov, emelê berê, ew tetbiq dikirin. Lénin û Stalin zora ûrisên gewr bir û Çariçin xistine bin hikimê xwe.

Ûrisên gewr ji paş re li wan vegeriyan û Çariçin mihasure kirin. Lê siwariyên Voroşilov ew şkenandin.

Lénin li Moskoýê li hêviya wan bû. Stalin serdest û mizefer vegeya Moskoýê û bi vî awayî Çariçin bû Stalingrad yanî bajarê Stalin.

Ordiwa sor iro bajarê serekê xwe bi mêranike ji her pesn û sitayişê der midafehê dike û bi cendekên xwe rê li dijminan digire.

Ma ji mêraniyê çêtir û spehitir li dinyayê tiştêk heye?



BALAFIREKE BRITANÎ A TORPILAVÊ TORPILA XWE BERDIDE ARMANGÊ

MAÇIKËN MADLËN HAYËR

Li Emêrîkê berkes bi awakt ji zefêr û serdestiya welatê xwe re dixebite. Di vê navê de artistên sinemayê ji xebateke zor dixebitin. Cwan Krawford ji bo parastina welêt 28000 dolar dane hev û ew herpeyî wezareta herbiyê kirine.

Herçi Hidi Lamar di mala xwe de cejinek çekir û dewlemendên welêt ezimandine cejinê. Hidi Lamar ji bo wê cejinê heqê kursiki kiri bû 5000 dolar. Bi vi awayî Lamarê pereki mezin daye hev û ew da kikûmetê.

Ji artistên sinemayê xanimek heye

jê re Marlên Hayêr dibêjin. Marlên artistîke ne ewçend dewlemend e ko bikare cejînan saz bike. Marlênê ilanek da belaw kirin û tê de got: Ez ne dewlemend im ko peran bidim ordiwê. Lê ez dikarim bi awakî din prikkariya eskerên me bikim. Herçi mêr bi maçikên jinan xurt û dilqewin dibin. Ji lewre ezê herim qerargahên eskerî û ezê hero 1000 eskerî bi maçikine ser maç bikim ».

Marlên Hayêr di Ketiiforniyayê de dest bi işê xwe kir û kete qerargahê û esker dane ber lîvên xwe. Hin ji rû, hin ji dev, hin ji ji serên wan maç dikirin. Lê Marlênê gava lê bû nivro dit ko di rojekê de maçkirina 1000 eskerî ne

tiştêki hêsantî ye û li şûna dev û rû esker ji pişt, zik û hêtên wan ji maç dikirin. Digel vê hindê gava roj lê çû ava Marlênê bi tenê 723 esker maç kiri bûn. Ji bo timamkirina hezari diviya bû hêj 277 eskeran maç bike.

Ji xwe yê ko Marlênê ew ji ser dev û ruyên wan maç ne kiri bûn dixwestin ji nû va bêne ramisandin û digotin, maçika li ser cilan ne lê ye.

Sebebke nû ji bona ko mirov here welatên Emêrîkayê.



DERYAVANINE STOLA FRENSA ŞEREVANÎ DI PERAVËN ROHELATÊ NIZING DE

RADYO

DI JAMA [1] DÊREKÊ DE

Di sefaretê rûsî ya Londrê de bi navê Çermanof, zabîtek hebû. Çermanof di şeva sersalê de di dêra Dorşirê de (gundekî Ingilîstanê) rasti keçîkekê hat û dilê wî pê ket. Navê keçîkê Şildon bû. Keçîkê jî kêfa xwe ji Çermanof re anî û di sala 1937an û disan û wê dêrê de mehira wan hate birin.

Çermanof piştî ko zewicî terka ordiwê da û ket dibîstana bijîşkiyê yanî tîbiyê. Xwedê jî wan re du zaro jî dan. Jin û mêr pev û bi wan şa bûn.

Di sala 1941ê de gava elemanan Ingîllere bombardiman dikir refekî balafîrên elemanî bi ser gundê Dorşirê de jî girt. Bombeyek ket xaniyê



DÛREBÎNERE TOFÇIYAN ARMANCÊ SEH DIKE

Çermanof jî. Jin û her du zarowên wî mirin û Çermanof bi xwe birindar bû.

Çermanof, piştî ko birnên wî sax bûn nema dikarî bû li Ingilîstanê bisekine, vegeriya welatê xwe. Elemanan hêj berneda bû ûrisan; destpêka Nîsana 1941ê. Çermanof vegeriya ordiwê û kete daîra istixbaratê û gelek ne borî li şopîne casûsîne elemanî hişyar bû. Ji xwe piştî midekî elemanan avête ser welatê ûris jî.

Çermanof di nîzingî Kiyêfê di qesîreke kevin de bi cih bû. Çermanof di



TOPEKE BALAFIRŞIKEN YA ORDIWA BRITANÎ

[1] Jam bi mana naqûsê ye. Heye ko jam bi xwe jî ne bi kurdmançî ye; lê ketiye zîmanê hin kurdmançan; nemaze kurdmançên dora Wanê.

odeke qesirê de rûdinişt û di odayên din de bihistokên telefônê bi cih kirin. Ji bo her casûsê wi telefonek hebû. Bi vi awayî Çermanof roj bi roj, saet hi saet li tevgerên ordiwa elemanî serwexl dibû û elam dida serfermandariya ordiwa Sovyêtistanê. Piştî ko ordiwa elemanî pêş ve çû Çermanof terka Kiyêfê da û jê digel her hacetên xwe çû Smolenskê û tê de bi cih bû.

Çermanof di Smolenskê de xebateke zor xebitî û nemaze gava elemanan dirêji Moskoyê kir istixbarata wi di sekinandina ordiwa elemanî de gelek bi kêr hat.

Di vê navê de xeher gihastiye Çermanof ko di Kalûgayê de tiştine ji adetê der çar dibin û şikeke xurt heye ko casûsiya elemanî tê de bi cih bûye.

Çermanof bi xwe çû Kalûgayê û digel berdestiyên xwe bajar seh kir. Piştî vê sehkirinê şik tev de li dora dera bajêr kom dibûn. Di jiyîna Çermanof de ev dera didowan bû ko rastî wi



KUMANDOSÊN BRITANÎ DI TALÎMÊ DE

dihat. Di a pêşin de dawela xwe şahînet kiri bû. Gelo di a didowan de çî hebû.

Di dêrê de sê keşe hebûn. Xelkê Kalûgayê didowên wan nas dikirin, ew ji mêj ve li Kalûgayê bûn. Ê sisiyan nû hati




ESKERÊN MEKSKÎ DI CEJINEKÊ DE DI BER FERMANDARÊ XWE RÊ DIBIRIN

bû. Ê nûhati digot, ez ji xelkên Kiyêfê me û piştî ko eleman ketine Kiyêfê min jê baz daye. Bi rasti ji zarê wi zarê Kiyêfê bû.

Digel vê hindê Çermanof dev ji dêrê û keşan bernedida. Zilamên Çermanof xwe di dêrê de vedîşartin û her sê keşe ji ber çavên xwe winda ne dikirin. Rojêkê yek ji zilamên wi bi lez hate cem Çermanof û jê re got: Min bi guhên xwe bihist ko her sê keşan bi elemanî xeber dida.

Rojêke din yekî din digot di quba jama dêrê de radyowek heye.

Ayineke nivê şevê bû. Her sê keşe bi ayinê mijûl bûn. Zilamên Çermanof xuristau û dolabên dêrê velo dikirin.



TOPEK JI TOPÊN BERTORPIYORÊN BRITANI

Çermanof bi xwe ji derveyî dêrê sekint bû. Di tariya şevê re zilamekî wi nizingî lê kir û çend pel kaxez dane destên wî. Çermanof di bin hewraniyê xwe re, li her ronahiya pilekê kaxez seh kirin. Ew şifreyên casûsiyê bûn. Keşe girtin; hilkişiyana quha jamê, radyo jî peyda kirin.


Keşe mikur hatin. Her sê keşe eleman û cacûsên ordiwa elemanî bûn. Didowên wan, jî mēj ve hati bûn Kalûgaye. Ê sisiyan piştî şerî bi talimatine nû xwe gihan di bû hevalên xwe. Keşeyan jî quba jamê bi radyowa xwe tevgerên ordiwa rûsî hemî jî serfermandariya elemanî re didan zanin. Her sê Keşe dane ber tifingan.



KUMANDOSÊN BRITANI DADIKEVIN REŞAHIYÊ



ESKERÊN BRITANÎ DI BERISTANÊN MISIRÊ DE DORA ÇEPERÊN XWE BI TÊLAN DIGIRIN



JÎ STOLA FRENSA ŞEREVANÎ ÇEND KEŞTÎ DI BENDEREKE BRITANÎ DE LENGERENDAZ

DOJEHA STALINGRADÊ

Tukest dojeh ne ditiye, heke diti be ji kes jê venegeriyaye û ji me re ne gotiye ew kana agir çilon e. Lê dibêjin ko ew çaleke kûr e, agir tê de agiri dikeline û di ser wê re pirek heyê, xelk di wê pirê re derbas dibin û yê gunehkar wextê jê diborin, pir diqelêşe û gunehkarên reben dikevin nav wi agirê ko agirî ji dişewitine.


Li gora vi wesfî Stalingrad tro dojeha vê dinê ye. Ev bûye qedere mehekê ko eleman gihastine kûçe û kolanên bajêr û şerê ûrisan di xanî û avahiyên bajêr de dikin.

Carina danezanên rûsl û elemanî dibêjin: me du xanî bi şûn de vegevandine, an me ji nû ve du xanî zemt kirine.


Ma ev îş çawan çêdibit û ûriş rexma ko dijmin ketiye hûndirê bajêr û di hin avahiyên de ji bi cih bûye çawan terka bajêr nadin? Ji ber ko ûris mêrên qenc in û dilê wan bi eviniya welêt û miliyetê hiltavêje û şerê xwe ji bi awayê ko emê niho bibêjin dikin.

Elemanan piştî ko xanikî kiçik xisti bû destên xwe, jê berda bû ser avahîke mezin; avahîke sê tebeq. Eleman bi êrişa xwe a pêşin keti bûn tebeqa ayahiyê a pêşin. ûris ji wê tebeqê kişiyên, an tê de hatine kuştin; bêt ko tebeqên din ji dest bidin. Avahiyê zêrzeminek ji hebû. Birekî eskerê ûris xwe tê de veşarti bû. Eskerên zêrzemînê ji jêr de berda bû tebeqa pêşin û şerê elemanan dikir. Herçî ûrisên ko di tebeqa didiwan de bûn wan ji bi werisan xwe dabelande tebeqa pêşin û li pencereyên wê tebeqê sekintn û piştî ko çendekê wan hatine kuştin pencereyek ket destên ûrisan. ûrisên mayn tev de û pey hev bi werisan dadiketn wê pencereyê, tê re derbas dibûn û radihişlîn elemanan. Qederê saetekê ûris û elemanan di odê û liwanên avahiyê de bi kêr û şejderban li hev dan. Eleman şikestin heyê ko tev de di wî xanî de mirin û avahî ji nû ve û bi temami ket destên ûrisan.

Ev e şerê mêran; şerê mêrên qenc.



ESKERE KLÎŞÊ
HILKIŞIYAYE SE-
RÊ DAREKÊ
Û DÎDEVANIYA
TEVGERA NE-
VAR DIKE.



ÊDÎNBÛRG JI CENKEŞTIYÊN STOLA INGLÎSTANÊ

4 PEYA

DI GIRAVEKÊ DE

Di Pesifikê de giraveke heye; jê re Hawlend dibêjin. Hawlend ji Haweyê 1000 kilomêtiri dûr e. Giraveke bêxêr; ne giya lê şîn dibin, ne ji heywan tê de dijin. Girav zinarekî hişk e. Bi tenê teyrên behirê yên ko di behiran de digerin rîya xwe pê dixin û zirçên xwe lê dihîlin. Bi wext û zemanan ve wan zirçan li rûyê giravê teweke nerm anîye pê û lê texlîtek şînahî wek kevziçê şîn hûye.

Heta sala 1935an tukesî pê li Hawlendê ne kiri bû. Di wê salê de hikûmeta Emêrikê di vê giravê de stasyoneke hewayî çêkir û çar peya xistin ê. Wan peyan guhêrbariya bayî bi bêtêlê ji vapor û balafirên re didan zanîn. Hikûmetê av û xwarina wan, heta roja ko Emêrikê ji kete şer, bi vaporên ko di navbera Emêrikê û Japonyayê re dişixulîn, ji wan re rêdikirin. Ji wan çar peyan, yekî, Tomas, biserhatiya xelkê Hawlendê gili kiriye û gotiye:



TOPEKE BALAFIRŞIKEN YA ORDIWA ÇINI

— Me hay ji tu tiştî nîn bû. Li 7ê Kanûna pêşin sala 1941 piştî ko me raporên xwe bi bêtêlê belav kirin û me

taştîya xwe xwar, em li ber radyowê rûniştin û me guhdariya nûçeyên dinyayê dikir. Ji nişkekê ve şandiyarê radyowa Bostonê da zanîn ko japonan bi ser Perharbûrê de girtiye û hikûmeta me ji ketiye ser. Me bawerî bi guhên xwe ne tani. Lê heta êvarê radyowên dinyayê ev nûçe tekrar kirin. Sibetirê em tev de derketi bûn derve û di peravên giravê de digeriyan. Hevaleki me got: « Ev in balafir, bi ser me de tîn ». Çardeh balafirên bomhavêj




DERYAVANÊN FRENÇA ŞEREVANÎ LI PEY NOQARÊN DIJMIN

bi ser me de dibatin. Bivê nevé ew balafirine neyar bûn. Em ji hev belav bûn. Ez û Malson em ketin kortalekê de û her du hevalên me ên din xwe di kortêke din de veşartin.

Balafirên qederê sib bombe berdane me û ji me bi dûr ketin. Em ji kortala xwe derketin û ber bi mal çûn. Balafirên japonî li xaniyê me û li stasyona bêtelê xisti bûn. Em li hevalên xwe geriyan. Bomban hingaftî bû wan û ew perampêrçe kiri bûn. Me çeniyên canên wan her hev kirin, dane hev û veşartin.

Deh roj ketine navê. Dijmin li me vegeziya. Lê vê carê ne bi balafirên, lêbelê bi noqarekê. Noqarê girava me da her guleyên xwe. Em ketin kozika xwe. Eskerên noqarê bî ko dakevin bejê vegeziyan.

Ji vê hîcûmê tu zerer ne gihaste me. Lê zadê me qediya bû. Herçi av, me ava baranê vedixwar. Lê xwarin? Em daketin qeraxa behirê û me teyrên



VAPOREK JI STOLA FRENSA ŞEREVANÎ

kuştî, yê ko di şeran de hati bûn kuştin û pêlên behirê cendekên wan aveli bûn peravan, dane hev. Me goştê wan teyrên kuştî dixwarin.

Mehêk di ser me re borî. Em keti bûn meha Kanûna paşin 1942. Li 5ê vê mehê çend balafirên japonî di ser me re firiyên û çend bombe berdane me. Li 25ê mehê bombavêjêke bi tenê hate ziyareta me û pênc bombe hera girava me da.

Em bi şev û bi roj di kozika xwe de diman. Me tê de dixwar, em tê de dinivistin û me tê de bi damê ji dilehist.

Li 31ê Kanûna paşin, bi sibehê ve me ji dûr ve bertorpiyorek dît. Me got vê carê japonî ji bo vegertina giravê hatine. Birek esker daketin bejê. Cihên ko bombe lê keti bûn seh dikirin. Ez û hevalê xwe em pev şewirin. Me qerara xwe da, emê teslim biwan. Em rabûn ser xwe û ji kozika xwe derketin. Me destên xwe rakirin jor û ber pê çûn. Gava em qedere 100 mêtiri nizingî wan bûn, me çi dît. Yê ko daketi dûn girava me ne japonî; lê emêrikani bûn; hati bûn hawara me. Me xatir ji girava xwe xwest û em ketin bertorpiyore.



KUMANDOSÊN BRITANÎ DI PERAVAN DE

İGİL

BALAFIRHILGIRA BRITANI ÇAWAN BINAV BÜYE

Li Tebaxé emeriliya britani da zautin ko balafirhiligira İgil di Behir spi de bi torpila noqareke elemani binav bûye. Mr. Norman ni-xabiré Royleré yê ko di İgilê de hazir bû di vê babetê de hendek nivisandîye û tê de gotiye:

Saet piştî nivro yek bû. Ez digel du zabitan di kebineke İgilê de bûm. Ji nişkekê ve û pey hev du teqin hatine bihistin û keştiya me welê hejha ko ez ji kursiyê xwe ketim erdê. Me berê xwe da derî û em derketin derve. Du teqinên din İgil ji nû ve hejand. Me qesta pira jorin kiri bû. Lê beriya ko em bigehin ê İgil xwe li aliyê çepê xwar kir û behir kete zikê vaporê

û avê avête heta ejnûyên me. Em li werisan aliyân û gihastin banê vaporê. Ez ketim keblna pêşî û min tê de zabitek dit. Wî zabiti tûrek dinepixand, piştî canxelas. Min jê pirsi: «Ma her tişt xelas bûye?» Zabiti hema serê xwe hejand û pê bes kir.

Ez disan derketim derve; deryevanan weris tavêtin behirê. Min bi yekî girt û min xwe gihande avê. Piştî min a canxelas qenc ne hati bû nepixandin. Bi carekê de ez noql avê bûm. Bi zor ez bi rûyê avê ketim. Qederê bîst mêtirî ji min dâr flûqeyek hebû. Min cehda xwe kir û ez gihastim ê. Deryevanan arikariya min kir û ez birim nav flûqê. Min bihina xwe da. Di pey min re yekî din nizingî li flûqê kir û got ko lingê wi şikestî ye. Me ew jî kişande jor.

Ez rabûm ser xwe, İgil ji me 200 mêtirî



Ji vi şeri re serê fen û kimyayê, şere qewet û hacetên mîkanîkî dibêjin. Bi rastî ji welê ye. Zana û hinerwer di fabrike û kîmyaxanan de li her maseyên tecrîbê rûniştî ne û herîo bi awakt, bi celebekî din çek û hacetên dewleta xwe dixwazin xurtir bikin û pê zora dijminên xwe bibin; herwekî kalo. Kalo kîmyagerokî inglîz e; di kîmyaxana xwe de rûniştî ye û bezar jehir û dermanî li hev dixê da ko tişteki nû û ji dijmin re nenas peyda bike û wî diyarîya ordîwa xwe bike.

dûr, xuya dikir, hej li rûyê avê bû, lê xwe yekcar li aliyê çepê xwîl kiri bû. Di vê navê de bertorpiyorek xuya kir û berê xwe da me. Me xwe gihande bertorpiyore û em hilkişiyân ser. Zabiti û deryevanan em birin hemamê da ko em ji mazûta ko bi me ve zeliqlî bû xelas bibin. Me cilû xwe ji xwe kirin û tiştên ko bi dest diketin, wek pêşgir û çarşevê me ew bi xwe ve dikirin.

Kumandarê İgilê bi melevamîyê xwe gihandi bû bertorpiyore. Du zabiten din jî bi vi awayî hatin. Heryekî bi rê ve zilamek kiri bû piştî xwe û bi xwe re anl bû

Ez li deryavanê ko lingê wi şikestî bû geriyam; wî jî xwe gihandi bû bertorpiyore. Ji peyayên İgilê zabiti û deryavan 929 peya hati bûn xelas kirin.

CILËN

JAPONË, MËRËN EMËRIKANI

Ji 7ê Tebaxê ve emërikanian esker derê-xiste hin derên giravên Silêman û şerê japonan dikin. Rojnamevanekî emërikanî bi navê Walter Strong yê ko bi eskerên pêşîn re daketiye giravên Silêman di heqê wê hemleyê de hendek nivîsandîye û tê de gotiye:

Nivê şevê bû; fermanarê hemlê emir da ko tabûra 19an derkeve ser pirê. Tabûr derkete jor, rêz bû û qor girt; ez ji bi tabûrê re. Serhengê alayê piştî ko tabûr teftîş kir emir da ko ji me re cilan bidin. Ma em tazî bûn. Lê gava cil dane me, hingê me zanî îş çi ye. Ji me re cilane japonî da bûn. Ji xwe eskerên vê tabûrê tev de ji nav mërên kinik bijarti bûn; yên ko kêr û zêde dirfê japonan bi wan diket.



BALAFIRVANÊKÎ ERENSA ŞEREVANÎ

Eskeran zanî ko fermanarê dixwaze japonan bixapine û xafil bi ser wan de bigire; herwekî japonan di Sengeporê de kiri bû û bi cilên inglîzî daketi bûn bejê.

Serhengê alayê ji eskeran re da zanin ko ewê dakevî giravên Silêman; û bi ser ve zêde kir û got:

— Hon niho eskerine japonî ne; lê çek û giyanên we emërikanî. Hetanî ko serbendê we emir ne daye we tîfingê hermedîn û heke hon bêgav mau bi kêr û qesatûrê li dijminê xwe bidin. Aucax bi vi avayî hemla me diçe serî.

Tabûra 19an li 7ê Tebaxê bi fecra sibê ve dakete bejê. Li qeraxê tu eskerên japonî xuya ne dikirin. Femandariyê erdeki welê bijarti bû ko ji her war û benderê dût. Heta ko mifrizê me gihaste zinarê pêşîn û hilkişiya ser, em rastî tûkestî ne hatin. Gava em hilkişiyar serê zinêr me ji dût ve gundek dît. Li ber hilmê gund nobetarek diçû wi serî û dihatê vi serî. Em ber pê çûn û me nîzingî lê kir. Nobetdar tîfinga xwe li me rast kir û ji me pirst:

— Hon ki ne?

Serdendê me bi japonîke xwerû lê vege-rand û got: « Em eskerên dewriya sibehê ne, her bijî Mikado ». Nobetdar tîfinga xwe danî, lê xuya dikir ko hêj di şikê de bû. Êdî di navbera me de 10-15 mêtir ma bûn. Nobetdar got: « Ka parolê bêjin » Heta hingê serbendê me gihaste nobetdar û lê sekînî. Serbend kulmek da erzîna nobetdar û ew xiste erdê. Me ew ji çek kir û pihêt girêda.

Gava em qederê sed mêtirî ber bi pêş çûn û ketin ser tehtekê me mifrizêke japonî dît. Eskerên mifrizê di dora agirekî de rûniştî; qey kêf dikirin. Ko çavên wan bi me ketin destên xwe hejandin û banî me kirin. Bi cilên me xapiya bûn û bawer kiri bûn ko em japon in. Me bala xwe da ew ji me bêtir bûn. Me meşa xwe kêr da ko hevalên me bigehine me. Û em hinek ji hev belav bûn. Di navbera me de bi tenê mesafa çend mêtiran ma bû. Serbendê wan li me hişyar bû û tiştê gote sekerên xwe. Japonî li erdê pehlî bûn û em dan ber tîfingên xwe. Me ji xwe da ber taldan û li silava wan li wan vegerand.

Pîştîmêrên me û yên japonan ji gihastîne erdê lihevxiştî û hemla giravên Silêman bi vê lihevxiştî dest pê kir.



ESKERÈN EWISTRALI DI WELATÈN ROHELATÈ NÌZING DE



TANGÈN ORDIWA MEKSİKÌ JI TÌPÈN NÙ DI TALÌM Ò MENAWRAN DE

Taştiya vi şêrt an şêrên ko emê çêl li wan bikin wer dixuye ko bi her awayî ji taştiya mireki bi gelekî qelwêtir û çêtir bû. Medhelokê gotiye: «Nan û dew taştiya bi derew; nan û mast taştiya bi rast, nan û şîr taştiya mîr».

Herçî şêrên me serê du -rojan carekê pezekê dixwin an pezek dixwarin.

Frensizan di roavayê Efrîqayê de mistemlikeyin hene. Vê paşiyê di wan mistemlikan de şêrewçend zehf bûne ko pez û dewarên gundiyan ji 1 da şêran roj bi roj kêmtir dibûn, diqelihan. Li gora hesabê gundiyan şêreki serê du rojan pezek dikuşt; ji ga û hêştiran pêve, yên ko şêran ji pezan kêmtir dirêji wan dikirin.

Ji bona şêr dibêjin ko heta mirov teng nekeve ser, dirêjî wi nakin. Lê welê dixuye ko şêrên wan welatan

ŞÊREK

Û SERÊ DU ROJAN PEZEK

şivanan ji mirovan nahişibinin. Ji ber ko ew şêrên ha carina dest didin şivanan jî.

Waliyê mintiqê Gaoyê rabû hêleke şêran çêkir. Hêle li ser erdekî 60kilomêtirî

dirêjî dibû û ew qedere şê rojan ajoti bû. Di vê hêlê de neçîrvan 27 şêr kuştin.

Li gora hesabê gundiyan, bi vê hêlê 2000 seri pez hatine xelas kirin. Ji ber ko ew 27 şêr ne hatana kuştin wan di salekê de 2000 pez wê bixwarana. Welê dixuye ko gundiyan hesabê berxan ne kirîye. Heke me berx ji hesab kirin kara gundiyan duta nebe ji nîzingî wê ye. Ji ber ko mihên van pezan li Bihare wê bizên.

Ev çî şêrine bextiyar bûn ko di vî wextê teng de ko carina weqiyek goşt bi destê mirovan nakave, wan hero niv pez dixwarin.



BORİZANÊN MEXSİKÎ SEFERBRIYÊ ÎLAN DIKIN

HEJMARA HAWARÊ A 49AN LI 15Ê ÎLONÊ BELAV BÛYE, LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

Tefsîra Qurane, Memozîna Xani, Civat, Kenediyê pêşin, Telqîna Êzdiyan, Marşa cenbêzaran, Li pêşberê yarê, Sê salên şer, Dîwana Melê, Ji Rastedar re, Şihîrên zarokan, Rewşa Dinyayê, Medhelokên japonî.

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrî.

SAL 1
HEJMAR 8


YEKŞEMB
1 ÇIRIYA PAŞIN 1942

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 8

DIMANCHE
1 NOVEMBRE 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



JI BERGEHÊN PAYÏTEXTÊ INGILISTANÊ TRAFALGAR SKWÉR



ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÊ

MIH Û ŞËR Û GUR

Carekê êleke koçera bar kir. Mihek li şûna wara ma. Mihê ji rê girt û çû, rastî mêrgekê hat; mêrgeke pir xweş. Mihê ji tê de warê xwe çêkir û za; du berxên mê anîn.

Rojekê mihê dit vaye şerek bi ser de hat. Şêr jê re got: Tu çima li vir î?

Mihê go: Bi saya serê te ko tu siltanê heywana yî, ez û berxikên xwe li vir di vê mêrgê de diçêrin

Şêr go: Qet tu hesaba meke ez li pišta te me, û şêr çû; mih ji ma.

Rojekê mihê dit vaye gurek hat. Gur jê re go: Ma tu nizani ko ev mêrga min e û tu bêt min hatiye û tê de diçêrî

Mihê go: Ev mêrg, mêrga şêr e

Gur gû, na ev mêrga min e û ezê her dû berxên te bixwim, ji dêla çêriya

xwe ve. Û rebû her dû berx xwarin û disa gote mihê: Careke din ez vegerim û te li vir bibiniim ezê te jî bixwim

Gur da rê û çû; şêr hat. Mihê haļ û hewalê xwe jê re gotin. Şêr go:

— Meyizê, ezê xwe di pišta vî kevirê ha de veşêrim. Gava ko gur hat û gote te ev mêrga min e. Tu bêje na ev mêrga şêr e. Heke go ne mêrga min e; tu bêje hema sê gavan ber bi vî kevirê ha bavêje û bêje vî kevirî ev mêrga min e, min qebûl kir.

Rabû şêr xwe di pišta kêvir de veşart. Gur hat û gote mihê, hêj tu li vir î? Ma min ji te re ne got ji vir here.

Mihê go, ev mêrga şêr e; wî go na. Axir mihê go, ji min re bi vî kevirê ha sûnd bixwe min qebûl kir.


Gur jî li tiştêkî wilo binêkar bû. Hema ber bi kêvir çû û go, ev gavek û du gav û sê gav. Li gava sisiyan çavê wî bi çavê

şêr ketin, destê xwe avête pêsira xwe û got: Bavo ez bextê xwe xera nakim, ev mêrga şêr e.

Çaxê wilo go, şêr jî pêl ve rabû û ber pê hat û jê re got: Belê guro ev bû mêrga min; ji ber ko te ez li pişt kêvirê ditim. Lê te gava berxik xwarin ev ne mêrga min bû.

Şêr heina lepek li qafê gur da û gur di cih de kuşt.

Çiroka me çû deştê dê û havên me çûn bihuştê.



JI ÇÊKËN CENGÊ LIKOMOTIV

Belê trêna û likomotiva ko wê dikişine ew jî ji hacetên cengê ne. Carina bi îşê du sê saetan aliyek zora aliyê din dibe. Ev du sê saet jî bi xurtî û piraniya westayên guhastinê bi dest dikevin. Klîşa me likomotiveke îngilîzî şani dide ji tipê « Pesifik 4-6-0 »

ZAD

Û SEBZE Û FÊKÎ

Xelkê Ingilterê ji bo karkirina vî şerî ne bi tenê di febrîkeyên çek û cebîrxanan, lê di her warî de ji xebateke zor dixebitin. Çi cotkari, çi cenani, çi bexçevanî.

Herwekî me berê jî goti bû erdê Ingilterê ne erdeki binan e. Beriya şerî, ingiltzanewçend guh ne dida cotkariyê. Lê piştî ko şer dest

pê kir ingilizan ehemiyeteke mezin daye cotkariyê û îro di bexçeyên xwe de li şûna çiçekan her texlît sebzân diçînin û li gora mehcetê mehsûlên xwe jî



bajarekî dişînin bajarine din. Klîşeyên vî rûpelî miayene û pakêtkirina wan mehsûlan şanî dide. Kîmyagerek li wan hûr dibe, hinan dikin sendûqan, hinên din jî kisikan.

JINIKA

KO DU CARAN HATI BÛ KUŞTIN

Dr. Tod kiri bû eqilê xwe ko jina xwe bikuje. Gelek ne bori qerara xwe bi cih ani û ew kuşt. Tukes pê ne hesiya û Dr. jina xwe di çaleke şeş pê kûr de veşart.

Dr. di gundekl, ji Londrê bi du saetan dûr de, rûdinişt. Dr. çala ko jina xwe tê de veşarti bû ji du emeleyên gundê xwe re da bû kolan. Polisê gund bi xwe ew çal diti bû û emelani jê re goti bû; me ev çal bi emirê diktora kolaye. Herçî Viyolêt, jina diktora di wan rojan de winda bû bû. Digel vê hindê tukest diktora bi kuştina jina wî itham ne dikir. Ji ber ko Dr. ew ne carekê, lê du caran û cara paşî bi awaki resmî kuştî bû, hêj bêtir jinik di nav xelkê de kuştî hati bû dtiin.

Viyolêt, jina diktora sezayî kuştinê bû. Viyolêtê gelek caran bi hênceta konferansan terka mala xwe dida û diçû Londrê. Viyolêt ji lebatên xaça sor, yanî civata arîkariyê ji bo nexweş û birindaran bû. Diçû Londrê û şîret li xelkê



Jinên Kurdmancan Kel û Şo Datînin û Li Ber Çem û Cowan Balava Xwe Dikin. Herçî Jinên Ingilîzî Ji Bo Vê Yekê Diçûn Destegah û Fabrikan

dikirin ko bi çi awayî xwe ji bombaranên hewayî biparêzin.

Ev hêncetek bû. Di rastiye de Viyolêtê li Londrê dostek hehû û diçû ba wî. Xortek bi heşt salan jê ciwantir.


Dr. bi xiyaneta jina xwe hesiya û da bû pey jinikê. Êdî tu şik tê de ne ma bû. Şevêkê,

weke hergav jina wî ji Londrê vegeriya bû. Dr. bi xwînsariyê ev gotin dane rûyê jina xwe:

— Viyolêt, tu bêhextiyê li min dikt, tu min dixapîni.

Viyolêt li ber xwe ne ket û vegerande mêrê xwe: Belê rast e, herweki tu dibêji welê ye, tiştê ko ji te têt ji min re teqîr meke.

Dr. gelek qehîrî, lê deng ne kir; çû metbexê û ji jina xwe re çayek çêkir. Viyolêtê çay vexwar. Gelek ne horî dilê wê li hev ket û jinikê xwe avêt ser textê mêrê xwe. Dr. lê temaşa dikir û li têsra jehirê hûr dibû. Belê ew, jehireke xurt bû. Viyolêt mir.



BERGEHEK JI TERSANEYÊN INGİLİSTANÊ

Dinya şevreş bû... ne hev, ne stêrk. Bert bi rojekê emelan di bexçê diktor de çaleke bi çar peyan kûr kola bû. Dr. dakete çalê û du peyên din kola û cendekê jina xwe avête çalê, ax berda ser û pê li axê kir. Çal vege-riya halê xwe ê berê; bi tenê çar pê kûr; ne kêm ne zêde.

Sibeterê emele hatine ser karê xwe û ji Dr. pirsin: Emê hêj bikolin?

Dr. li wan vegeand û got: no. Emelan dîsan pirst: Hingê emê çi tê de bikin?

Dr. emele anin hundirê mala xwa û ji pêş çavên wan ve xişr û xemlên jina xwe û herçî awaniyên ziv û zêr dane hev û ew kirin sendûqekê de. Dr. û emelan rahişte sendûqê û ew kirin çalê. Bi mer û bêran axa çalê vedigerandin ê. Di vê navê de polisê gund yê ko di ber wan re dilorî; li wan sekîn û pirst: Di vê çalê de çi vedîşerim?

Dr. got: Dinya ye, ji ber bombardimanan... ez zêr û zivê xwe lê de vedîşerim.

Emelan got: Xişr û xemlên madamê ji tê de...

Polîs kenî û got: Her bijt Dr. ji kû ev fikira qenc hate bira te...

Polîs piştî mîdekî dîsan pirst: Ev bûne du roj ez madamê nabînim?

Dr: Çayê Londrê.

Polîs: Ji bo konferansên xwe ne?

Dr: Ji konferansan pêve di wextê bombardimanan de bi derman- kirina birindaran ji mijûl dibê

Polîs: her bijt ma- dam... Emelan ji devê çalê bi axê tijî kiri bû û niho pê lê dikirin û ax dişidandin.

Dr. Tod di polisxanê de; digote mifetişê polîsê:

— Cenabê mifetiş ev bûne sê roj jina min çû bû Londrê. Ji hingê ve venege-riya. Herweki hûn dizanin jina min di xaça sor

û di civata midafeha ehaliyan de dixebite. Min ji te hevî ye tu ji min re ji merkeza civatê lê bipirst...

Tod vege-riya malê xwe. Wextê nivro xeber gîhaşte mala diktor: Bert sê rojan jina wî terka merkeza civatê da bû û çû bû aliyê bajêr yê bakur. Wê rojê dijmin Londre bom- baran kiri bû.

Dr. li trêne siwar bû û dakete Londrê; çû merkeza civatê. Jê re dan zanin ko jina diktor bert sê rojan çû bû bakurê bajêr û ji hingê ve venege-riya bû. Di wê tanga bajêr de sê xanî hilweşiya bûn û ji lebatên civata art- kariyê ji bo ehaliyan çar peya hati bûn kuştin. Di nava wan de du jin ji hebûn û yeke wan hêj ne hati bû nas kirin.

Polîsan Dr. bire ser cendekê jinika ne- nas. Rûyê jinekê di bin kevîran de welê peli- xi bû ko naskirina wê ne hêsani bû. Lê Dr. ew nas kir û bi kelogirî xwe avête ser cendekî û bi qtr û gîll got: Ax Viyolêt, ax...

Dotira rojê hikûmetê cendekê Viyolotê bi ayinine eskerî de veşartin Li ser tebûta wê nişana xaça şor diçirîsi. Lê herçî Viyolotê rastin di bexçê mêrê xwe, di bin sendûqa zêr û zivan de veşarti bû. Lê li ber çavê xelkê Viyolêt şehîd û qehremanek bû.



BACANÊ SOR Û KARTOL DI SÛRÊN LONDRÊ DE

LIBÉRYE

CIMHÛRIYETA REŞİKÊN AZADKIRI

Li 17ê Çiriya-pêşîn eskerên emêrikani derketine erdê Libéryayê. Lê ne bi koteki; lêbelê bi miwafiqeta hikûmeta Libéryayê. Li gora gotina xebardoxên emêrikani ev tevdiroke ihtiyati û ji ber ihtimala hin hereketên elemanan e.

Libérye di roavayê Efrîqayê, li pêşberê Emêrikê û li ser behira Etlantikê ye.

Di sala 1816an de piştî ko Emêrikê reşikên xwe azad kirin, hin emêrikani, gihane hev û ji bo vegevandina reşikên welatê wan ê eslî, Efrîqayê li tevdirina geriyên û reşikên xwe ber

bi erdê ko iro jê re Libérye dibêjin, şandin. Reşikên azadkiri berî ewilî li Monroyayê bi cih bûn û hêdi hêdi ajotin hundirê welêt. Lê reşikên welêt bi wan qall ne bûn û li wan hilatin; bû şer. Heta vê paşiyê reşikên emêrikani bi tenê di peravan de hikim dikirin.



SEGMANEKÎ INGILIZÎ BI ÇEK Û HACETÊN XWE

me, qehwe kewçûk û penbû ye. Hin kanên zêr û hesin ji tê de heue.



JINÊN MÊKSİKÎ DI FABRÎKAN DE LI ŞÛNA MÊRAN DIKEBITIN

Di sala 1847an de bi navê Cimhûriyeta Libéryayê hikûmeteke biserxwe îlau kirin. Di vê cimhûriyeta misteqil de işê hikûmetê nemaze misteqarên emêrikani digerin. Ji xwe Libérye digel îstiqalata xwe hêj bêtir dimine misteqilkeke emêrikani.

Mixdarê reşikên ko ji Emêrikayê hatine 12 000 peya ne. Herçî reşikên eslî 1700 000 in û di diyaneta xwe a kevin de ne; texlîtek pûtparêzi. Reşikên emêrikani tev de mesihî ne.

Hatinên Libéryayê xur-

BOMBE

Û YÊN KO PÊ NEXWEŞ KETINE


Di şerê Britanyayê de, yanî wextê ko balafirên elemanî bi şev û roj li Londrê û li bajarên Ingilterê ên din dixistin, ji xelkê gelek peya bi nexweşîne esebî dikiotin. Di nav wan de hin hene ko dîn bûne.

Bijîşkên Ingilîstanê ji alikî ew nexweş derman dikirin û ji aliyê din, ji wan nexweşan re li dermanîne nû digeriyan.


Vê paşiyê di bajarê Birmîngamê de bijîşkekî yanî hekîmekî ji bo wan nexweşan şiringeyek peyda kir û ew li ser çend nexweşan hate ceribandin. Welê dixuye ko ji wê şiringê feyde ne mezîna dîtin.

Ji wan nexweşan yek anîn — yekî ko dîn bû bû — şiringe li milê wî dan. Dilê mîrîk qederê çar qeqîqan ji bîr ve çû. Paşê dest bi xebirdanê kir û biserhatiya xwe got: balafir çawan hatin, xelkê taxê bi çî terzî ketine zêrzemîne û dîsan gava jê derdiketin çawan balafir li wan vegeriyan û bombeyek li rex wan teqîya... Nexweş gava qala teqîna bombê dikir, bi nobeteke xurt ket û qederê saetekê recifî û xwe li textê xwe da. Lê piştî ko nobel borî nexweş vegeriya halê xwe ê berê, hişê wî hate serî; dîn weke berê, bû mirovekî aqil û xelkê xwe ji nû ve nas kirin.

Heye ko bi wî dermanî ne bi tenê dînen



PERAŞÛTÎSTÊN MÊKSÎKÎ DI TALÎMÊ DE bombardîmanan lê dînine din ji aqil bikin.



DI ENIYA MISIRÊ DE SEGMANÊN ORDIWA INGILÎZÎ, LI PÊŞ WAN TANG, RADIBIN HICÛMÊ

JI Ê MËRTIR RE


Di bajareki welatê ûris de rojnaveyan biyanî fabrikeke çekan ziyaret dikir. Yekî ji wan di heqê wê ziyaretê de bendek nivisandiyê û tê de çiroka jêrin gotiye:

Gava ez gihastî bûm fabrikê wextê xebatê temam bû bû û emele di hewşê re derbas dibûn û diçûn avahiya pêşniqabil. Xwarinxana emelan tê de bû. Emele di ber me re wek çemekî boş diherikin. Bê hemî min çavên min bi xort û keçikekê ketin. Keçik, keçikeke delal, bi difîna xwe a ber bi jor tipê jinên rûsi dinimand. Hevalê wê xortekî esmer bû û cilên deryavanan lê bûn.

Xort lingê xwe ê çepê bi avakî neadeti datani erdê. Qey lingê wî bêt wî pê li erdê dikir; hêj bêtir wek darekî hişk diket erdê. Mihendisê ko rêberiya me dikir, wî jî li wan nihêrt û gote me: Reben dikule, lê çî gehreman e.

Mihendisî hinek sekini û paşê got: Vî xortî û vê keçikê çirokeke ecêb heye. Navê keçikê Klêva ye. Berî deh inehan keçik di xestexaneyên eskerî de dixebitî. Ne ko li nexweşan difedkirî; lê di defterxana xestexanê de bi nivisanê mijûl dibû.

Herwekî hon dizanin jinên me jî eskerên me yên ko di eniya şer de ne diyariyan dişinin. Îcar Klêvayê jî rojekê rabû pakêteke



ÊDWARD HÛWR DI DEFTERXANA XWE DE

diyariyê çêkir û ew jî eskerên eniyê re şand. Di san bûye adet, jinika ko diyariyê dişine resmekl xwe di pakête dîke û li rex resmê xwe nav û adrêsa xwe û jî eskerê nenas re çend pirsên şîrin jî dinivîsîne. Klêvayê jî li gora adetê resmê xwe di pakête kir û li rex nivisand: « Ji ê mærtir re » yanî jî wî eskerî re ko di şeran de jî hemiyar mærtir derketiye. Diyariya Klêvayê digel diyarîne din gihaste eniyê û di dema belavbûna diyariyan de ya Klêvayê bû neshê deryavaneke, bi navê Sarc.

Sarc pakête vekir, li resimê keçikê temaşa kir û lê heşmetkar ma. Lê gava tiştê li rex nivisandî xwend dudill pê re çêbû. Gelo, ew di nav hevalan de jî hemiyar mærtir bû. Sarc dida eqilê xwe û qalliya xwe pê ne tant. Dawiyê resim û pakête girtin; çû cen zabîte xwe û got ê:

— Ev pakête dane min; lê ez bawar nakim ko di nav hevalan de ê mærtir ez im; jî lewre...

Zabîte resim girt, lê temaşa kir; ew şani eskerên xwe da û jî wan pirst:

— Çawan, we ev keçik eciband

Deryavanan yekdeng û yekawaz got: gelek, gelek...

Zabîte got: Xwedîya wê dihêje ev resim jî ê mærtir re ye; ê mærtir kî ye?

Deryavanan: Ew keçik bi xwe.

Zabîte dîsan got: Lê di nav we de ê mærtir kî ye? Bila ew gaweke ber bi min ve were



DI ENIYA EFRIQAYÊ DE HÊSIRÊN ELEMANÎ

Li her vè pirsîya yê deryavanan xwe ker kir. Hemî mêr; hemî mêrine qenc bûn. Lê dîsan hemî wek her mêrê qenc nefspîçûk man.

Zabit bihinekê sekîni û dîsan got: Emê fro dirêji dijmin bikin, di vê êrişê de mêrtîrê we ezê bi xwe bibijêrim û resimê delalê bidime wi.

Zabit resim kire bêrika xwe û piştî saetekê deryavanan berda labyeke dijmin. Sarc di nav sefên dijmin re xwe gihande betariyên neyar û bi destbombeyên xwe bera topçiyân da û ew revandin. Hevalên wî gihane ser û betarî zemt kirin. Fermandariyê bi nîşanekê Sarc mikafat kir û zabitê wî resim da ê.

Sarc resimê delalê kire kûrtka xwe a çepê û ew li dilê xwe şidand. Sibelîrê tabûra Sarc dîsan rabû êrişê. Sarc vê carê hêj bêtir mêrani şantî da lê piştî êrişê darûbestekê ew vegerande qerargahê. Sarc birîndar bû bû. Birîna wi xedar bû. Ew guhaslîn xestexaneke ji eniyê dûr. Xestexana ko Klêvayê de dixebitî.

Klêvayê di destxanê de cilên birîndaran ji hev dikirin, tiştên di bîrîkên wan de seh dikirin û ew datanin resîkên dolaban.

Klêvayê di bêrika cilên Sarc de resimê xwe yê ko xwîna Sarc sor kiri bû peyda kir. Klêvayê gava ev dit ji xwe re got: « Ê mêrtîr birîndar bûye û fro di xestexana me de ye ». Klêva rabû, çû cem gerîndeyê xestexanê û jê destûr xwest koêdî di xizmeta nexweş û birîndaran de bixebite. Gerîndeyê destûra wê da û Klêva xwe gihande ber serê « Ê mêrtîr ».

Birîna Sarc xedar bû; dilê wî ji bir ve çû bû. Bi-jîşk bêgav man û lingê wî ê çepê jêkirin Sarc gava çavên xwe vekirin li her serê xwe xwedîya teswirê dit, roj bi roj ber bi xêr bû.

Klêvayê larka wi ne da û piştî ko Sarc ji xestexanê derket, bû jîna wi. Fro her du ji di vê fabrikê de dixebitîn. Sarcê yekling nema dikare çekan hilgire lê dikare wan çelke, jîna wî ji arkariya wî dike ».

Gotinên nihendis li hire qedîyan û em tev de ketin xwarinxanê. Bê hemtê xwe em li wan digeriyn. Dawiyê me ew peyda kirin. Bûk û zavê xwe da bûn alîkî û li rex hev rûniştî taxafîn û taştîya xwe dixwarin.


FÊKIYÊ DAREKÊ

Rojekê mirovek bi rê ve diçû, rastî darekê bat. Li ser darê tişteki sor û spî dikir. Mêrik utzîngî lê kir; çî bibîne fîstanê keçîkekê. Keçîkê xwe bi dar ve kiri bû û cendekê wê li ba dibû. Mêrik li şûna ko bigirî, kentî û got:

— Xwezî, sed xwezî fêkiyên her darê ji vî texlîti biwan.



QEWANA TORPİLĒKÊ



TORPİL BERÎ LI BEHIRÊ, JI QEWANÊ BI DER TÊT

DI BEHIRA SPÍ DE BI

VAPORQEFLEYAN RE

Mixabiré royteré, Con Nikson, biserhetiya vapor-qefleké bi awayé jérin dide zanin:

Balafir firiyan û bi lez bilind bûn. Xuya dikir ko me û dijmin meê li hev bixista.

Li ser cenkeştiya me çûn û batina zabît û der-yavanan şidiha bû. Lê gelek ne borî ev çûn û hatin sekini û hêdengiyek kete dorê. Herkes gihaştî bû şargeha xwe û li hêviya emirê agirkirinê dima. Vê hêviyê gelek ne ajot... bem... bem... bem...

Topên me ên dîravêj û balafirşiken, devên wan ber bi ezmên, dest bi lêxistinê kiri bû.

Piştî her derbê di singa ezmên a zelal de niqteke reş peyda dibû. Di piştê ew niqte vedibû, dibû gulok-kek, û paşê gulok ji hev de diket, li singa ezmên belav dibû û ewirine reş ji ber hev dikîşyan û rûyê ezmên digirtin.

Ji milê din bombeyên ko diketin dora keştiyê, singa behirê diqelaştin, birîn dikirin. Lê devên van birnan zû dihatin hev û behira kupiyayî ji nû ve radibû.

Ez di keştiya emîral de bûm. Me vaporqefleyek ESKERINE ORDIWA MEKSIKÎ ji Skenderiyê dibir Maltayê. Me hêj nû terka bendera misrî da bû ko balafirên dijmin bi me hesiya bûn û dirêjtî me kiri bûn. Balafirên dijmin da bû ber çavên



xwe bi kîjan fedakariyê hebe rê li qeflê bigirin û Maltayê bê zad û çek û cebirxane bihllin.

Zabîtê mesafepîv dida zanin ko ji Maltayê re hêj 160 ml mane; îşê çend saetan. Saet jî piştî nîvro dido û nîv bû.

Di vê navê de birca dîdevaniyê dida zanin ko ji dîr ve cenkeştîyên dijmin xuya dikirin. Emîral emirê xwe da û got: « Nîvê stolê ewê biqeflê re bimîne, nîvê din jî wê here pêşiya dijmin ». Keştiya emîral bi vî nîvî re wê biçîwa.


Me berê xwe da dijmin. Gelek ne borî me stola dijmin bi çavên xwe dit. Stola dijmin xurt bû. Me sê bertorpiyorên mezin



WENDEL WILKI NIMINENDEYE MR. RÜZWELT

ditin. Keştiyên mayin xuya ne dikirin. Dijmin dûveki qalind da bû dora xwe û di paş wi re xwe kar dikir. Di saet dido û çil û pênc deqlqan da dijmin dest bi lëxistinê kir. Di navbera me de bi tenê du mil ma bûn. Balafirên dijmin ji pardariya vi şerî dikir û geh li me, geh li qefle dixist. Topên me ên balafirşiken bera balafirên dijmin dida. Birekî wan bi şûn de vegeriya. Me yek xûste behirê.

Me û stola dijmin heta saet sisê û çarîk li hev xist. Di vi wextî de dijmin agirê xwe betal kir. An dijmin çavê xwe da bû revê an jî xwe da bû all û xwe pêk tant. Lê em jê ne geriyar û me dâ pey. Gelek ne borî krewzoreke talyanî xwe şani da. Krewzoreke mezin, jî ya me meztir û xurtir. Lê emfral gnh ne da mezinahiya krewzorê û em ber pê çûn û me bera krewzorê da. Dijmin li me ve gerand; bû teqîna topan û vingîniya balafirar. Ji nişkêkê ve keştiya me hejiha û bixêriya keştiyê ket erdê. Di dora me de hin tişt dişewitn, perçeyên cilên eskeran difirin. Li rex min deryavanek keti bû erdê



GENERAL DE GOL DI KÛÇEYÊN ŞAMÊ DE

û xwîneke boş jê diçû. Ez li emîral geriyam. Emîral li cihê xwe bû, wek heykelekî ji piyan sekini, bi tenê çavên wi dilivîyan.

Min digot qey krewzora talyanî hingafti bû me. Lê paşê me zani ko tiştê ko li krewzora me keti bû, bombeke balafirar bû. Balafirar bi vê hingafinê hes kir; rûyê xwe jî me badan û bi ser vaporen



GENERAL DE GOL DI BERISTANÊN EFRÎQAYÊ DE

barkêş de çûn. Kela ingilîzan rabû bû. Zabitan nav di der-yavanan dida û digot: « Wi talyanî ji dest merevînin, şanî wi bidin, hon ki ne». Emîral ji bi ser ve zêde kir û got: « Min ji krewzora talyanî re derbeke xurt divêt ».

Hêj deh deqîqe ne keti bûn navê ko bi derbekê de ji hemî deryavanan dengê rabû: her bijî... her bijî...

Ingilîzan krewzora talyanî hingafti bû. Krewzorê berê xwe ji me bada û çû. Diçû, diçû ko birina xwe dermanbike.

Sael bû bû şeş û çil û pênc deqîqe. Dijmin ji me geriya; agir û birûskên xwe betal kirin; roj jî diçû ava. Vê carê balafirên torpîlavêj bi ser me de girt. Torpîl diketin avê û bi hindava me de dihatin. Min bihîna xwe bi xwe de digirt û li wan temaşa dikir. Hin di rast, hin di çepê me re diborin. Balafir ji bi dûr ketin. Dinya ji bû bû tari, me xwegihande qêflê. Qefle di hezar xêr û selameti de bû.



Di beristanên Efrîqayê de nemaze tevgera balafirên xurt e. Topçiyên balafirşîken çavneriya wan dikin. Di klîşa me de didevanên topçiyên di dûrahiya ezmên de li balafirên neyar digerin. Ko ew ditin wê bera wan bidin.



DI ZIRTXANEKE LONDRE DE LEHISTIKA GOGÊ


GREMLİN

AN CIN Û PERİYEN BALAFIRAN

Heye ko hin dibêjin ko çiroka cin û periyân bi tenê di welatên rohelê de hene û ev ji ber nezaniya xelkê wan welatan e. Lê rasti ne welê ye û xelkê Ewropayê jî gelek caran qala van mexlûqan dikin.

Ji hemiyân xerîbtir ew e ko balafirvanên ingilîzî di ezmanan de jî ew mexlûq peyda kirine. Rorjîna meyên wan jî çelî li wan cinan dikin. Dibêjin ko ev cinên ezmanan di şikilê kévroskan de ne; bi tenê serî serê insanan e. Balafirvanên ingilîzî jî wan re Gremlîn dibêjin.

Balafirvanekî der heqê wan gotiye: Gremlîn jî nav ewran dertên û li baskekî balafirê siwar dibin; dikevin oda maktînan; bi wan dileyizin. Gava balafir datê û dideyne erdê Gremlîn li pişt



GENIM BÊR CI BENDERÊN WELATÊN ROHELÊ


balafirê têne ditin û destên xwe didin peywanê û piştî ko çerwane sekenî, wê jî nû ve digerin.

Dibêjin ko Gremlîn di welatên rohelatê nizing de peyda bûne û dane pey balafirên û çûne welatîna din jî.

Li gora balafirvanan Gremlîn jî wek cinên din du texlît in: rihên qene û rihên xebis. Ji lewre

heke işê balafirvanekî çû serî dibêjin Gremlînê wî jî ên qenc bû. Û heke tifaqek lê qewimî disan sîc bi aliyê Gremlîn ve didin û dibêjin ew jî yên xebis bû.

Gelek balafirvanan gotiye ko me cinên ezmanan ditîne û pê re rûniştîne lê tiwan yek jî wan; cinan ne girtiye û şanî hevalên xwe ne daye.



BALAFIRA ŞIKESTÎ Û BALAFIRVANÊ XELASKIRÎ

REŞÊ ŞEVÊ

SEFÎREKÎ INGILÎZÎ EW ÇAWAN DÎTIYE

Mebêjin ko reşê şevê an terşê şevê bi tenê di welatên me de hene û bi tenê em wan dibînin. Ev tişt li Ewropayê jî heye û carina mirovîne mezin jî wî dibînin, û dibêjin me ew dît. Ji ber ko jî wan re welê xuya bûye.

Lord Defrin diplomatekî ingilîzî, wextekî li Partîsê sefirê Ingilîstanê bû. Lord reşê şevê ditiye û hin civatên Londrê yên ko bi van tiştan mijûl dibin mîdektî dirêj bi çiroka Lord xerik bûne.

Lord bi xwe biserhatiya xwe bi awayê jêrîn qise kiriye û gotiye: « Rojekê dostekî min, Henri R. ez ezimandî bûm Irlandê, mala xwe. Min ezimeta dostê xwe qebûl kir û ez çûm cem wî. Piştî şivê mewanên din vegeyriyan malên xwe û ez jî çûm oda ko dostê min jî min re textisî kiri bû.

Dinya heyveron bû. Ez ketim nav cihan û zûka di xeweke giran re çûm. Şeş saet jî şevê çû bûn. Ji nişkekê ve û bi diltehgîkê ez lişyar bûm. Qey min sehiw girti bû, ez dilirsiyam, min digot qey lifaçek ewê li min bigewime. Min li ser diwaran sehvir û xeyaletine ecêb dîditin. Ji ber tava heyyê dinya bi ront bû. Digel vê hindê min çira jî vexist. Lê bêfêde. Dengine xerib bi guhê min diketin.



ŞER, HENEK Û RASTÎ. JI ROJNAMEKE INGILÎZÎ:


Hitler çar jî fermandarên xwe ezil kirin û kumên wan kirine serê xwe. Bi vî awayî Hitler bûye serfermandarek pênçserî. Lê digel vê hindê îşê xwe ne bire f.

Ez rabûm û ber bi pencerê çûm da ko bibînim ev deng jî kû dihatin. Di heyveronê de darên bexçê ên kevnare yeko yeko [xuya dikirin û dengê kirêt û xerib jî nav wan daran radibû. Ma ew dengê çî û kê bû? Di vê navê de min peyayek dît. Mêrik di nav daran re dihat û barektî giran di piştî xwe de hildigirt. Barê mêrik sendoqek bû. Gava min rind bala xwe da-yê min zanî ko ew sendoq tabûtek e. Min deng lê kir û got ê: Tu kî yî? Ev çî tabût e ko di vê şevê de hildigirtî? Tu wê dibî kû? Tu ins î, an cin î?

Mêrik ber bi min ve ziviri û hingê min rûyê wî dît. Çî rûkê kirêt û hewilnak. Bê hêmtê xwe min xwe jî pencerê, da paş. Digel vê hindê min dixwest ez bizanim ev çî ye. Ez daketim bexçê û min nîzingî li mêrik kir û got ê: Tu vê tabûtê dibî kû?

Mêrik li min veneğerand û digel tabûta xwe wînda bû. Ez ketim nav daran û lê geriyam. Min tu şop jê hilnani. Lê rûyê mêrik li mejiyê min hati bû neqîş kirin.

Sibeterê min jî xwe-diye malê zanî ko



JÎ BOMBAVÊJÊN INGILÎZÎ YEK BER BI DIJMIN

miroveki wêlê di wan doran de nîne û li wê rojê di taxa wî de kes ne miriye.

Heke tiştê ko ezê niho qise bikim li min ne qenimiya min mesela mêrik û tabûtê bi temami ji bîr dikir.

Belê, piştî çend salan hikûmetê ez kirim sefirê Parisê. Li gora adetê, wezaretê xariciyê di otêla mezin de ji şerefa min re ziyafetek da. Sefirê din û hin mirovdewletên frensizî ji lê hati bûn ezimandin.

Gava ez gihastim otêlê û min kir ez li esansorê [1] siwar bibim, bê hemtê xwe min xwe jê da paş. Ez ji ber mirovê ko esansor dişixuland revî bûm. Belê memûrê esansorê eyn ew mirov bi xwe bû ko berî çend salan di bexçê dostê min Henri B. de tabûkek kiri bû piştî xwe û ji nav daran li min derketi bû. Ma ew çire hati bû vê derê, li bire çî dikir û ew ki bû. Ma ne diviya bû ez van seh bikim. Ji lewre min berê xwe da oda gerinendeyê otêlê.




TANGÊK JI TÎPÊ HONEY DI QADA MISIRÊ DE


Lê beriya ko bigchim ê qirin bi otelê ket. Şirita esansorê qetiya bû û esansor ji qata pîncan keti bû jê. Peyayên tê de tev de birîndar bû bûn. Herçî mêrikê min mêrikê ko li Irlandê bi şev tabûtek hildigirt û li Parisê esansora otêlê dişixuland hati bû kuştin.

Me kir ne kir lê ne nizanî ew mêrik ki bû û ji kû hati bû.


[1] Esansor texlîtek odeyek e; lê siwar dibin û pê hildikişin qatên avahiyên bilind.



HIN SIWAR JI ALAYA MELIKÊ ÎRQÊ YA XAS LI PÊŞ SERA MELİK



DI BALAFIRGEHEKE BRITANYA MEZIN DE ÇEND BALAFIRËN FBANSA AZA..II TIPËN NÛ



VAPORQEFLËYËN BRËFANË REXMA NOÇAR Û BALAFIRËN DIJMIN DI BI KARË XWE RADIBIN

ÇEJINEKE ÇEKOSLOVAKAN


Miletê çek mileteki şerûdi û ciwanmêr e. Di tarîxa eskerî de fermandarê çek Yan Jijka gelek bi nav û deng e.

Di şerê 1914-18an de çekan çederê 150 000 esker da bûn hevalbendan. Ev esker tev de peyayên sivil bûn ko bi dilê xwe, xwe kiri bûn esker. Van 150 000 eskeran hingê di rex hevalbendan de şer kiri bû û bi kêrî wan hati bûn.

Di vî şerî de jî çekan, piştî ko welatê xwe ji dest dane, di welatên hevalbendan de gihane hev û bi wan re şerê mihwerê dikin.

Çekan di vî şerî de li Polonyê, Frensê, Rûsyê û di welatên rohelatê nîzing de gelek bi kêr hatine. Balafirvanên çek di şerê Britanyayê de bi balafirvanên britanî re şerê elemanan kirine. Di şerên Libyayê de jî çekan mêranî şanî daye.

Klişa me serfermandarê ordîwa çeki general Inger şanî dide. Inger bandêrekê dide eskerên xwe.



EV KLİŞE SÛRETÊ PLANA TERSANEKE EMÊRIKANI ŞANÎ DIDE. TERSANEKE NÛJEN

STRANA KURDMANCI:

ŞERÊ BESTÊ BELEKA

Miro; mala bar kir ji beriyê
 Dani li çemê Zihêriyê
 Derbas bin li keleha Rihaniyê
 Şahin axa bi sê denga li mir Sêvdin dikir gazi
 Digo, bi serê te û bavê te kim
 Mira asê bine li ber xerc û xeracê miritiyê.

Miro; dilê mi li ber waswasê
 Me diwan dani li ser banê vê kinyasê
 Şahin axa bi sê denga li mir Sêvdin dikir gazi
 Digo sê cara bi serê te kin
 Mira li ber xerc û xeracê me mane asê.

Mira siwar bine li va êrdêka
 Mi heyf û sed mirxabin
 Vê sibê kuştine Qasin axa dikê nav ordeka
 Me şeriko dani bi li pêşi mala
 Lawol şor bine li ber kendala
 Min heyf û sed mixabin
 Vê sibê kuştine Emerê Silêman, li bin Darên-xezala

Me şeriko dani li Qesra-kalê, li qwina çiyê
 Mir Sêvdin kaxezek rêkir pey eşirên Bihta
 Bila vê sibê ji geliyê Hesana daxweşikên bêne pêşiyê
 Lê lo mirof çi dinyakê li min bi dewran û kin e
 Hespna binin lê bikin rixtan û zin e
 Xwedê zêde bike dewleta Bedir-Xan begi, ya mir
 [Sêvdin e.

Lo lo mirof Havin e, dinya germ e
 Tu vê sibê rabe, solê bêxe, gore nerm e
 Vê sibê Hacıbêra terş û talan birin
 Me ji girgir û mirê hakimên cihê Bihta şerm e.

ŞERÊ KEHNÎQIRÊ

Mir siwar hû çû Cizirê
 Gelî xulamino bikin ra û tekbirê
 Me vê sibê şer e ser Kehniqirê.

Mir siwar bi li rêo
 Koma xulama li pêo
 Ra û tekbir bi des Xudêo.

Çi çadira zeng û zincarî
 Dûyê tîfinga çû erşê tarî
 Vê sibekê kuştine Qasimê zêbarî.

Çi çadira li hire rikini
 Dûyê tîfinga bi hevdu sekini
 Vê sibekê kuştine melekê Divinê.

Çi çadira li xabûro
 Dûyê tîfinga hûye tenûro
 Vî sibekê kuştine hacî Yeşmûro.

Çi çadira raserî mala
 Seid begî çeper çêkirin, gûşî mala
 Vê sibekê kuştine hacikî evdala.

Çi çadira li merxê da
 Seid begî xwe berda, li avê da
 Wey sed carî silhetnexweş be, Eli qalikan tîfing lê da.

Wey nayê sed carî nayê
 Xwişkê korê nemayê
 Mira mir qelandin ji dinyayê

Qutilkê Mir Miheme nefsîya
 Ma kê digo bi Xwedê kê mîr Miheme sêwîya
 Wey dayê ti min dayê
 Dayikê korê ne mayê
 Seid beg şer e, lew ne dihat rayê.

Ev her du stranên ha ji stranên cihê Bolan in û ji wextê hakimnan in. Her du ji îşaret bi hin kirdeyên tartal ev didin.

DEKAR

Di roavayê Afrîqayê de ji Cebellariqê heta Pozê-kapê ji Dekarê tekûztir bender in. Di sala 1761ê de Dekar mistemlekeke fransîz hate şan kirin. Piştî salekê fransîzan dest bi çêkirina benderê kir û di sala 1867an de bender ji çûn û hatina vaporan re hate vekirin.

Dekar di mistemlika Senêgalê de ye, lê ji her ehemiyeta xwe merkeza hemî afrîqa fransîz a navîn tête hesêb. Di sala 1887an de nifûsa wê 2500 pava bûn. Di sala 1940î de ev nifûs gihaştîye 7600î. Dekar bi cihê xwe ê cêxrafî gelek bi ehemiyet e. Piştî mîtareka Fransê gelek caran qala wê dikin. Dibejin ko eleman dixwazin bendera Dekarê bêxin destên xwe û wê ji noqarên xwe re bikin wargeh. Noqarên ko ji Dekarê rabin dikarin bi rahetî xwe bigehnin vaporoqfleyên emêrikani yên ko di Etlantîkê de digerin. Lê îngiltz û emêrikani lê guhdar in.




SALONK JI XESTEYÊN LONDRE YA EHALIYAN

TRAFALGAR SKWÈR
TRAFALGAR SQUARE

Xelkê Britanyayê bi adet n sinçiyên xwe ji hin miletên Ewropa navîn gelek biferq in. Berl hertişt yê ko di ingilîzan de dikeve ber çavên mirovan pesdengiya wan e. Di qehwexaneke ingilîzî de sed peya hebin ji tu dibêji qey bi tenê çend mirov tê de rûniştî ne û li şûna ko baxêvin bi îşaretan mexsedên xwe ji hevûdin re didin zanîn. Ewçend bêdeng û nîzîm diştexilin.

Ji milê din ingilîz hez nakin di cihên berdayl de li hev bigihin hev û xwe şanî xelkê hidin. Hêj çêtir hez dijin hêi ko hêne ditin bibinin. Digel vê hindê li Londrê li puyitextê Ingilîstanê meydaneke heye, jê re Trafalgar-Skwêr dibêjin. Ingilîz bi awarteyî di wê meydane



de tene ser hev û kom dibin. Di rojên xwes û bi tav de ji xelkê Londrê di wê meydane de digerin. Klîşeyên vi rûpelî û rûpelê pêşin hîu bergehên Trafalgar Skwêr şanî didin.

Pêrar gava balafirên elemani şev û roj li Ingilîterê dixistin bivê nevê ji balafirvanan re bi şev dîtina armancan navêjine wek yê elemanan çêkirin û ew zehmet bû. Elemanan jê re tevdîrek dît û bi vê tevdîrê balafirvanan bi şev ji dihatin. Ingilîznan di wextê hatina balafirvanan de ronavêjên xwe vêdixistin û xetên wan di ser zevî an erdên vala re digihandin xetên ronavêjên elemani. Bi vi awayî balafirvanên elemani gelek caran bombeyên xwe bera zevî û erdên vala didan.

Tevdîra elemanan ev bû: li peravên behira Manşê û ji hev dûr, du ronavêjên xurt danin. Bi şev ronavêj vêdixistin û bere wan didan armancê. Xetên bironî yên ko ji ronavêjan ber bi armancê ve diçûn di ser armancê re digihan hev.

Balafirvanan didan pey wan xetên û gava digihastin cihê ko xetê bironî digihan hev bombayên xwe berdidan û bêi ko wê bibînin dihingastin armancê. Vi halî ingilîz xisti bû telaşê. Bi vi awayî zerereke mezin digiha bajarên Ingilîstanê.

ARMANCÊN BALAFIRAN Û XETÊN BIRONÎ

Ingilîznan da eqilê xwe û ji vi derdê re dermanek peyda kir. Ingilîznan ji ronavêjên xwe vêdixistin û ew elemanan çêkirin û ew danin hindava ko balafirên neyar tê re dihatin. Ingilîznan di wextê hatina balafirvanan de ronavêjên xwe vêdixistin û xetên wan di ser zevî an erdên vala re digihandin xetên ronavêjên elemani. Bi vi awayî balafirvanên elemani gelek caran bombeyên xwe bera zevî û erdên vala didan.



KALO DI BEXÇEYÊ XWE DE DIKESIXÎNE

layih diman û bi kotekî riya xwe peyda dikirin û xwe digihandin wargehên xwe. Bi vi awayî ingilîznan gelek caran balafirvanên elemani şaş dikirin.

HEJMARA HAWARÊ A 501 LI 15Ê ÇIRIYA-PÊŞIN BELAV BÛYE, LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÎNIN:
Tefsira Qurane, Gramera Kurdmanç, Diwana Melê, Klêopatre, Memozna Xani,
Malikeke Hatiz, Marşa Felatê, Rewşa Dinyayê, Piroziya Cejinê.

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên stûri.

SAL 1
HEJMAR 9

SÊŞEMB

1 KANÛNA PÊŞÎN 1942

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 9

MARDI

1 DÉCEMBRE 1942

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



MÊRIK BI ŞAL Û ŞAP Û KUM Û DESTMAL, JINIK JÎ BI XEFTAN
Û KOFÎ BIWA, MEÛ BIGOTIA EV RESIM BERGEHEK JI BERGEHÊN
KURDISTANÊ YE. LÊ JI BER KO MÊRIK BI PANTOR Û JINIK
BI ÇAKÊT E, NE WELÊ YE. RESIM RÊLEKE INGILÎSTANÊ YE.



ŞAM—1942
ÇAPXANA SEBATÊ

ÇIROKA KURDMANCI:

KER Û HEFT GUR

Li dora gunda kerekî bê xwedî hebû; pir şepirze bû bû. Ji ber ko heçî fîyekî wî heba li wî kerî dikir. Ker jî sixrê xelkê hingî aciz bû bû hema ji xwe re bi navsera çiyayî ve hilkişiha. Bi rê de rastî rovîkî hat.

Rovî go: « Ha ker, tê çî kû? » Ker go: « Quzilquria havê ker ». Rovî go: « Lê ez bême çî? » Ker go: « Bê ker kurtanî zer, sênfk ceh li ber ». Rovî wilo got û go: « Ma tu min bi xwe re nabî? » Ker go « Ma çima ez te nabim ». Herdû bi hev re çûn; rastî beranekî hatin.

Berên jî go: « Ha ker tê çî kû? » Ker dîsa go: « Wilo mebê, bê ker, kurtanî zer, sênfk ceh li ber » Beran jî wilo go û bi wan re çû.

Bi rê de li dîkefî rast bûn. Ew jî bi wan re çû. Kîvroşkek jî giha wan. Ji xwe re çûn navsera çiyê, mêrgeke xweş dîtin û tê de man. Ker jî qelew bû û bitir bû. Ker gote hevalên xwe, go: Geli hevala, zira min hat, divê ko ez bizirim.

Hevalên wî jê re gotin: Malava tê çawa bizirî, û em di navsera vî çiyayî de ne: gurin

wê bi me bihesin; dê me hemiwan bixwin.

Ker go: Nabê ileh divê ko ez bizirim. Axir kirin ne kirin ker qatî ne bû. Kerê reş dest bi zirandinê kir.

Heft gur jî nêzîkî wan hene. Dengê kêr kirin. Her heftan jî hev re got: Gelo ev çî deng e tê. Yekî jî wan go: Ka ezê herim, dê ev çî ye. Hevalên wî go dê here.

Gur rabû, hat dît. Gava ker û hevalên xwe di mêrgê de ne; bê xwedî û bê xwedan. Hema kêfa gur hat û ber bi wan çû; jî cih xwe zer kire gunên kêr. Hema kêr her dû rehnên xwe li stiwê gur şidandin û beran jî piştê wê rabiwê bi poşan; dîk çû ser piştê kêr bang da: rovî erd kola û kîvroşkê da xapa. Bi vî karî berên gur bi poşan nehiş kir.

Paşî gur jî nav lepên wan lilitî, lê nîvmîrî çû giha hevalên xwe. Hevala jê pîrsî go, bira te çî dî; go bira çet deng mekin ez çûm min qewmek li wir dî; kes ne binê; go çawan; go çaxê ko ez çûm hema serê min kirine nava du latan û bi du mêkutan li nav piştê min dan û yekî jî wan yasî li ser min dixwendin û yekî dida xapa li kêfenê min digeriha û yekî jî tirba min dikola.

Hema her heft guran jî cih baz da. Gotin, gidî em ji lepên wan xelas bûne.



JÎ BÎRÊN HICÛMA DIYEPÊ

Gava inglîz û hevalbandan di peravên Fransê de dirêjî Diyepê kiri bûn tangên xwe di nav kelekên behrî de guhestî bûn û ew jî Ingilîterê anî bûn Diyepê, herwekî klîşa jorîn şanî dide.

8 KÎLO

SPIR Û ZERDIKA HÊKEKÊ

Ne ko me hêkên mezin ne ditine. Ma hêkên qaz û dîkên şami hûr in. Paşê di hin malañ de me hêkine fêris ditine; hêkên niaman. Û gava em wan dibînin li wan heşmetkar dimînin û dibêjin bi qasî serê zarokeki ye an bi qasî 25 hekên mirîşkan e.

Lê welê dixuye, li wextê berê, çaxê ko li dinyayê mirovên bi sê çar mêtiran dirêj hebûn teyirine welê peyda dibûn ko hêkine bi heşt kiloyan giran dikirin. Ji wan teyran re êpyornîs digotin. Her hêka êpyornîsan bi qasî 150 hekên mîrîşkan û 6 hekên niaman mezin bû.

Di sala 1850î de Adabî, kaptanê vaporekê, di girava Medagaskarê de sisê ji wan hêkan peyda kirin û ew anî Ewropayê. Zana li wan hûr bûn û gotin ko ev hêkên êpyornîs in; ji




YEK JI NEXWEŞERE BEYÊN EMÊRIKÂNÎ DI SÛRIYÊ DE

teyrên wextê berê. Reşikên giravê ji wan bi awayine tîvelîstîfîde dikirin û ew li şûna den, conî û dîzîkan îstîmal dikirin.

Zanayan di giravê de li hestiyên wî teyrî gerîyan, ew peyda kirin û hestî li hev siwar kirin û skelêtê wî anî pê. Skelêt, yanî teyîya hestiyên teyrî şanî dida ko êpyornîs penc û neperûşkine welê hebûn ko pê dikarî bû rahêje mirovekî û wî di nav pencên xwe de bişidîne û bixeniqtîne.

Vê paşiyê gava eskerên îngiltzî daketîne girava Medagaskarê wan ji yek ji wan hêkan peyda kir.



Jî BOMBAVÊJÊN EMÊRIKÂNÎ TÎPEKÎ NÛ


ZILAMË KO XERÏTE PË RE BÛ

Motorboteke emërikani ji Gwadel-kenalë diçû girava Floridayë. Bi deryavanên emërikani re xeritvekek hebû; diviya bû wê bigehinin fermandarê emërikani yê Floridayë. Bertopiyoreke japoni motorbota emërikani bi rê ve bin av kir. Digel vê hindê xerite gihaşte fermandarê Floridayë.

Yekî ji deryavanên motorbotê ev sefera xeternak bi awayê jêrin gîlf kiriye û gotiye:

Wê şevê, piştî şivê heta saet deh û nivan em di qelhwexanê de rûniştî bûn. Peyakî emiral hat û banî Blamey kir. Piştî bist deqîqan Blamey vegeriya û gote me ko di benderê de motorbotek li hêviya me ye û divêt heta nivê şevê em xwe kar bikin.

Li nivê şevê, li benderê em gihane hev. Bartî û Madar bi xwe re du şûşe wiski û mirişkeke braştî ani bûn. Mak Rolf jî digel kemeça xwe hati bû. Te digot qey em di behirê de diçûn geştê. Piştî ko em ketine motorbotê sêrcan Blamey jî me re da zanîn ko emê bi wezîfeke mihim biçin Floridayê û diviya bû beriya spêdeyê em bigihin ê. Ji milê din Blamey xeritak da min û jî min re got; lê qenc guhdar bibe, xeriteke gelek e mihim e.



DI STOLA INGILIZI DE TOPËN BALAFIRŞIKEN

Di vê navê de motora me bi rê ket. Sêrcan miroveki gelekî xweşçivêt bû; hin biserhatiyên xwe jî me re çise dikirin. Herçî Mak Rolf qala destgirtiya xwe dikir û digot ko dengê wê gelek spehî bû. Ji xwe kemeça bi xwe re ani bû da ko jî me re stranên ko destgirtiya wê jî wan hez dikir bilehtze. Bi rasti jî Mak dest bi lebestinê kir. Di vê navê de Mak strana hêvî jî ji me re strand: Hay lo dilo hêveke çardegavî li me hitat Hej zava ne kete gerdekê; şerê japonan [bi ser de hat

Wiskiye serê me hemiyan germ kiri bû. Em tev de rabûn reqişê û midekî xweş reqişin. Sael jî bû bû dido kêrn çarîk.

Didevanê me, jî nişkekê ve terka nêregaha xwe da û li me vegeriya. Didevan dida zanîn ko cenkeştîyekê daye pey me û heta sê milan ntzingî li me kiriye. Sêrcan emir da makinist ko hêj bêtir bilezine. Mak Rolf da kemeça xwe. Me tev de artkariya wî dikir û distrand. Didevan ditsan



TOPEKÊ ELFMANI DI DESTËN FRENSIZËN AZA DE

li me vegeriya û got ko bertopiyora japoni ji xwe lezandiye û her li pey me ye. Êdi xuya dikir ko dilê dijmîn heye li me xine. Sêrcan digot, ji Floridê re şeş kilomêtir maye, li xeritê gubadar bibîn.

Em ji hev belav bûn. Min dikir ez herim ser mitralyozê. Sêrcan got; divêt tu xwe biparêzî, xerite bi te re ye. Ez jê geriyam. Mak Roli kete ber tînga timattk. Hêj çend deqîqe ne keti bûn navê ko bertorpiyora japoni bera me da. Motora me bi hejeke xurt hejiba, lê ji rêveçûnê kêm ne kir.

Sêrcan digot: « Dê heyrîn dê ji Froridê re pênc kilomêtir mane ». Sêrcan hêj gotina xwe ne qedandi bû ko guleke din li paşya motorê ket. Em di nav dâ û dûmanê de ma bûn. Piştî ko dûman belav bû min li dora xwe



DI KÛÇEYÊN LONDRE DE ESKERÊN HINDÎ

nihêrt. Mak Roli di xwîna xwe de vedigevizi. Lê tu tişt bi kemeçî wî ne hati bû.

Motora me careke din hejiba. Min bala xwe da sêrcan ji keti bû erdê, dikir ko rabe lê nema dikari bû. Di vê navê de min dengê dîdevan kir. Dîdevan digot: keptan miriye, bila yek ji we bête şûnê; Floridê re dâ kilomêtir mane.

Guleke nû li orta motorê ket û dilê min ji bir ve çû û neina ez bi xwe hesiyam. Bi tenê hewqas dihate bîra min ko min destê xwe li xeritê şidandi bû.


Gava min çavên xwe vekirin, min di dora xwe de mirovên biyanî dtin. Lê tavil min zanî ko ew hemşehriyên min in, emêrikani ne. Min ji hemşehriyên xwe pirsî: « Kani Sêrcan Blamey? » Ewan li hevûdin mihêrt û mezinê wan gotê min, « Motora we ji Floridê bi dâ kilomêtiran dûr bin av bûye. Bertorpiyoreke me çû bû hawara we. Gava ew gihastê motorê ji te pêve tukes peyda ne kir. Hevalên te, tu xweş... »

Xerite hate bîra min. Ez rabûm ser xwe û ez lê geriyam. Xerite ne bi min re bû. Dîsan min ji wan pirsî: Ka xerite?

Mezinê wan li min vegerand û got: Xerite gihaye destên kumandan û kumandan ji himeta te gelek razi ye.

Ez bi xelasa xwe herçend şa dibûm ewçend ji li her windabûna hevalên canecan diketim. Strana Mak Roli hêj di guhên min de deng dida:

Hay lo dilo hêveke çardeşevî li me hilat
Hêj zava ne kete gerdekê serê japonan bi ser de hat.



LI LONDRE BEXÇEYÊN SEBZAN DI CAMEKANAN DE

FAS Û TÛNIS Û CEZAIR

Herwekî xwendevanên me dizanin li 8ê Çiriya-pêşin eskerên emêrikanî û piştre eskerên inglîzî daketîne Fas û Cezairê û di Tûnisê re berê xwe dane Trablîsêrbê. Bi vê hêncetê me dil kir em xwendevanên xwe li ser hin tiştên wan welatan serwest bikin.

CEZAIR — Ev welatê ha ne mistemleke ne ji welatekî binhimaye ye. Cezair di kîşwerê Fransê de ji erdên welêt têtê hesêb; wek yekê ji wilayetên Fransê ên

ewropayî. Ji xwe beriya şer di parlemana frensîzî de heft nîmînendeyên Cezairê habûn; wek nîmînendeyên frensîz.


Rûyê erdê Cezairê 847 500 kilomêtrî çargoşe ye. Nifûsa wê 6237432 rûniştîman in. Aljê merkeza hikûmetê ye. Li Aljê wali rûdine û cîmhûriyeta Fransê dinimîne. Ji ber ko Cezair wilayeteke frensîzî têtê hesêb, xizmeta eskerî têtê mecbûrî ye. Di ordîwa Fransê de siwarên Cezairê bi zînen xwe ên bi kewkeb bi nav û deng in. Frensîz ji wan siwarên re « sipahî » dibêjin.

Di peravên Cezairê de deştine bê-

pîvan hene. Di wan deştan de her texlît zad û rezin çêdibin. Li aliyê bakurê welêt rêl û daristan zehf in. Hatînen welêt nemaze genim, ceh, garis, kartol, titin, hevrişim û kendir in. Ji milê din darên fekiyan têtê de zehf in: xurme, hinar, moz, sêv, hejir.

Çaryeka rûyê erdê Cezairê daristan e. Ji lewre texte û keresteyê Cezairê jî gelek e.

TÛNIS — Tûnis di bin himayeta Fransê de ye. Li Tûnisê begêk heye. Ev beg hakîmî welêt têtê hesêb. Lê îş bi waliyê frensîzî diqede. Pêşiyên begên Tûnisê jî girava Girî-tê hatine û ji mala wan re mala Mihe-medê Eli Meznûn dibêjin. Di sala 1851ê de gava frensîzan Tûnis vegirt û ew




Ji IBADETXAYÊN HINDÛSTANÊ TACMEHALA BI NAV Û DENG

kire bin himayeta xwe, beg weke berê é de hiştin.

Rûyê erdê Tûnisê 48000 ml çargoşe ye û nifûsa wê digehe 3608315 rûniştimanan. Li Tûnisê ji ereb û bedewiyan pêve zehf cihî hene. Ji xelkên Ewropayê jî frensîz û talyan hene; nemaze talyan zehf in. Li Tûnisê jî wek cezairê xizmeta eskerî mecbûrî ye.

Bakurê Tûnisê çiyayên e. Li aliyê rohelê destin hene û erdê wî bi keri cotkariyê têt û tê de lêmûn û pirtiqalan jî diçin. Zeytûn zehf in; pez û dewarên wê jî boş in. Herçî aliyê nîvro erdekî sehrawî ye û tê de xurmeyine qenc çêdibin.

Xelkê Tûnisê di tevinê de jî xurt in. Qimaşine hiri û hevrişim çêdikin.



DI KENALA MANÇESTÊRÊ DE VAPOREKE RÊWINGIYAN

Sinheta debaxetê jî pêş ve çûye. Xêra ferensîzan hini çêkirina şerabê jî bûne û jê şerabine bijarte dertên.

FAS — Ji vi welatî re Merakiş jî dibêjin. Ji sala 1912an ve Fas di bin himayeta Frensê de ye. Birekî vi welatî di destên spanyolan de ye. Herçî erdê

frensîzî 213350ml çargoşe ye. Nifûsa wê 5874 888 rûniştiman in.

Li Merakişê erdên daristan zehf in û jê texteyine qenc çêdibin. Ji milê din xelkê wi welatî hespêna hêja bi xwedî dikin û hespên wan zehf in. Halinên welêt ceh, genim, garis, zeytûn, mehûj, behiv û fêkine din in. Frensîzên wan welatan jî 8ê Çiriya-paşin ve, şerê elemanan dikin.



PIYADEYÊN RUSÎ BER BI DIJMIN RABÛNE HICÛMÊ

BEHIRA-SPI

DİROKA WÊ Û ŞERÊN
KO TÊ DE ÇEBÛNE

Li gora sehkirina zanan û pisporên erdnîgariyê Behira-spi heri 30an4000salî, di heyama mirovên dêwendam de erdeki qelaç bû û tê de gol û gollikine bêqeder zehf hebûn û çêmin lê re diherikin û heywanine bejê lê peyda dibûn. Mirovên wê heyamê en hov, bejina wan bi sê çar mêtiran bilind ew heywan nêçir dikirin, goşlê wan dixwarin û postên wan li xwe dikirin û carina resinên wan rawir û cenawiran li diwanên şikeftên xwe dineqîşandin.

Ev qewmên ha hêdi hêdi di şaristaniyê de pêş ve ketin û ji hestiyarî xwe re nehik çêkirin û hlnî masivaniyê ji bûn. Bi xwe da bûn avê û jê ji istifade dikirin. Lê insaî ê hov ji wek insaî ê fro xwazekarê pêşveçûnê bû; wi ji dixwest daira hikimê xwe

ŞER Û SÛRET




Hilê di sala 1941ê de piştî ko ordîwa elemanan gihastî bû dora Moskoyê gotarek da bû û tê de gotî bû: Ordîwa rûsî ji hev de keliye nema dikare şerê me bike. Di dawîya sala 1942an de ev ordû hej şerê elemanan dike û weê dixuye go wê Zivîstahê ji par bêtir ewê elemanan bişênê. Ji xwe li gora nuçeyên paşin êrîşa Îrîsahî ya Zivîstanê ji nihîto de dest pê kirîye.

herçend heye ewçend fireh bike. Li lewre mirovê dêwendamî dixwest avê ji bexê destên xwe, li ser wê bisekine û tê re biçe ji. Ji bo wê yekê ji li qamişên golan peransûyên hewdekê çêkirin, eyarên dehan lê vegirtin û hi vi awayî flûqa pêşin anin pê û ew daxistin avê golan û dest bi derxaniyê kirin.

Disa li gora texmîna pisporan heri 15 000 salî dêvera ko iro jê re Çebeltariq dibêjin qelîşî û ava behirê dera ko iro jê re Behira-spi dibêjin vêgirt. Bi vi awayî Ewrope, Êfrîqe, Asye ji hev veqetiyar û herç çiyayên wî erdî tî wê behirê de giravine ko em fro dibîmin anîne pê.

Di peravên Behira-spi de medenîyetine mezîni rabûne. Gava Hemoyabî li Babilê hikim dikir di Sûr û Seydayê de medenîyeta fîntkiyan şin dibû. Medenîyetên Misir, Roma û Yewnanîstanê ji disan di peravên wê behirê de şin bûne.

Herweki nasê, medenîyet bi şerîne şin dibîn û bi şerînê dibî diqelîhin,



Balafirêk ji balafirên emêrkani yên ko çek û peyan ji qadekê diguhêsinin qadeke din. Di wê balafirê de 70 peya û du tangên hûr an çar topên navin çih dibin.

winda dibin. Ji xwe tu dewlet nîne ko doza medemiyetê kiriyê û ne ketiyê şerine no û mezin. Ji lewre di vê behirê û di peravên wê de, ji roja ko însanan kari bû li ser behirê bisekinin û lê derbas bibin, şerine mezin çêbûne. Pey hev yewnanan berda eceman, romaniyan berda qertacıyan, ereban berda romaniyan, dewletên ewropayî berda osmaniyan.....

Beriya mîlada İsa pêxember bi pênc sedsalan yanî esiran Selamsî di vê behirê destola Zerkîsê farîsî şikênan. Dîsa di sedsala beriya mîlada İsa de stola Oktavyos di cihê ko jê re Eksyom dibêjin, stola Antonyos perîşan kir. Di sala 1831ê de Lîbyanto di vê behirê de stola tirkî jî hev de xist. Dawî, dawî di Navarin û Ebûqîrê de stolên Mihemed Elî û Napoléon şikêstin.

Midekî Behîra-splî rahet ma. Di wî midetî de xelkê Ewropayê çavên xwe berda bû Emêrikê. Dewletên ewropayî ên kişwerkişîa tê de jî xwe re mîstenîlike çêdikirin.

Lê piştî ko kenala Swêşê vebû çavên xelkê jî nû ve li vê behirê vegehiyan. Behîra-splî ya ko bi tenê derfê hebû, bi vî awayî bû xudan du deriyan: Swêş û Cebeltariq. Bi Swêşê vapor bêt ko nivroyê Afrîqayê an bakurê Ewropayê li xwe badin, xwe digihan din Behîra-hindî. Ji dewletên peravînan her yekê digot Behîra-splî gola min e. Nemaze İtalya Mûsoltîni.

Lê İngîltera ko ne dewleteke Behîra-splî ye bêt ko bi bêje Behîra-splî gola min e mîfteyên her du deriyên wê jî mêj ve xistîne bîrîka xwe.

Gelo xwediyê xanîkî kî ye? Yê ko tê de girtî ye, an yê ko mîfta xênî pê re ye û bi kêfa xwe dikeviyê û jê diçe der.



Xelkê İngîlterê fro hesêb tev de seferber in, çî jin çî mîr. Herkes li awakî jî midafehe û parastîna kişwerê İngîlistanê re dixebete. Peyyên ko di klîçeyên vî rûpelî de têne ditin bi pirahî xelkê sîvilînan. Ev peyavên ka bi hin deryavanên resmî re li dora gravên İngîlterê û di bin behirê re tîl û toran vedigirin da ko çavên neyar nikarin tîzîngiyê li peravan bikin.



KELÉDONYA NŪ

Kelédonya-nū ji giravén Pestfika nıvro ye û dikeve rohelatê Ewıstralyayê. Ev girav mistemlekeke frensızı ye û ji ber cihê xwe ê cexrafi ehemiyeteke eskerî heye. Kelédonya-nū wek mistemlekeyên frensızı ên din di bin hikimê Vişiyê de bû. Lê bert çend mehan waliyê giravê digel peyayên xwe derbasî aliyê genêral de Gol bûye. Ji hingê ve stol û balafirên hevalbendan jê haviline mezin dikin.

Dirêjahiya giravê 400 û pehna hiya wê 60 kilomêtir in. Erdê wê çiya ye û di newalên ko di navbera çıyan re dirêj dibin ro û robarin diherikin. Ava wan çeman wek ya goltikên serê çıyan gelek zelale. Ewçend ko siha dar û deviyên çıyayên dorê tê de têne dıtın.

Hewa vê giravê dimine hewa Ewropayê; ne gelek germ, ne jî gelek sar. Hatınên giravê madenine tével in; wek nikel, krom, hesin û mengênêz. Di giravê de fabrikeyine mezin hene. Di van fabrikan de li salê 10 000 ton nikel û 100 000 ton hesinê krom têne helandin. Ev madeyên ha iro tev de diçın Emêrikayê û pê hacetên cengê çêdikin.

BANŪ RŪZWELT

Herwekî Mr. Rŭzwelt serekcimhŭrê Emêrikayê ji bo karkirina cenga cibanê xebateke zor dixebete, jina wî jî li rex mêrê xwe sekiniye û pardariya vê xebatê dike.

Banŭ Rŭzwelt ne bi tenê iro, di wextê şer de, lê berê, di wextê aşiyê de jî xwe ji xebatê bi dŭr ne dixist û nemaze di civatên pêşveketina jinan de dixebitî. Lê piştî ko şer dest pê kir banŭ Rŭzwelt berê xebata xwe her bi armanca nŭ badaye.

Reîzma emrê xwe ê mezin, banŭ Rŭzwelt vê paşiyê ji Emêrikê firî û hate Londrê û midekî dirêj di payitextê Ingilistanê de maye û bî diyarî qral û niroydewletên Ingilistanê ket. Ma jîmên me jî ne welê bŭn. Bi ferqa ko yên me, ji ber ko me fabrike nînin, li şûna ko li fabrikan hŭr bibiın, diketın piştî hespan, rex û bosatê xwe girêddan û li rex mêrên xwe şerê dijmin dikirin.

Ne bila sebeb e ko medhelokê gotiye: Şer şer e, çî mê û çî nêr e.



Li Kelêdonyayê bi tenê bajarek heye; bendera Nomyayê. Berê ev bender wargehê stola frensızı bû. Iro herçî vaporên hevalbendan û balafirên ayê ne jî vê benderê istifade dikin. Xera vê benderê vapor û balafirên ko ji Sanfransiskoyê radibin, dikarin bi rê ve ard ũyên di vî wargehî de xwe temam bikin.

Çıliyên Londrê di saloneke xwarivê de ava fekiyan vedixwin.

NE KUŞTÏ

NE JÏ BIRINDAR, LË DI NAV MIRIYAN DE

Di şerê Misir û Libyayê de mixêderê hêst-rên talyanî yên ko ketine destên ingilizan bê hed û hisab in; herhal ew ji qûm û kevîrên seh-rayê bi geleki bêtir in. Ji destpêka şerî ve bi tenê şest gênerâlên talyanî ketine destên ingi-lizan. Di şerê Elemeynê de gênerâlê talyanî Kermano yê ko miawîné merêşal Graçyani bû ew ji ketiye hêstiriyê. Mecerê ingilîzi Swald yê ko gênerâl hêstir girtiye çiroka jêrîn qise kiriye û gotiye:

Xeber gihaştî bû femandariyê ko qerar-gaha piyadeyên talyanî ji xetên me bi tenê bist kîlomêtiran dûr e. Li ser vê yekê ferman-dariyê emir da sîrqa me ko rabe hicûmê û ji her du aliyan bi ser girê ko qerargaha talya-nan lê bû, bigire. Firqê lez da xwe û qesta pêş kir. Ji ber ko dijmin dikîşiya. Dijmin çavê xwe da bû revê. Di qada şer de tang, kemyon û timoblên neyar bê xwedî û xudan li erdê bûn. Dijmin direvî û carina li me diziviri û şerê me dikir; lê şerêkî sivik. Em zû gihaş-tin dora gir û em rabûn êrişê. Talyanan qe-derê du saetan şerê me kir û teslîm bûn. 6000 hêstir ketine destên me. Bi sê gênerâlen talyanî ji em şa bûn. Lê min ne dizanî ko yekî din li hêviya me ye.

Tabûra min hêstir teslîm girtin, me dê ew bîbirana xetên xwe. Ji milê din meê kuştîyên dijmin bihejmartana û tiştên ko li qada şer ma bûn me ew jî bidana hev. Birekî eskerên min talan û yextirne ber hev dikirin. Birekî din jî kuştî dihejmartin.

Eskerekî min ji yên ko kuştî dihejmartin gote min: Eve zabiteklî bilîndpaye.

Min nîzingî lê kir û ez lê hûr bûm. Lê min nikart bû ez ritba wî bizanim. Ji ber ko singa wî ketî bû bin du cendekên din. Min kir ez cendekan rakim da ko ritba wî bibînim. Ji nişkekê ve qirinek ji ber lingê min çû. Min pê li milê mêrikî kirî bû. Mêrik li ser piştê xwe rabû. Ew gêneralek bû. Gênerâl şejderba xwe siparte min û bi ingilîzîke şikestî, lê fehim-bar gote min: Ez hêsirê te me.

Min lê vegerand û got: Tu birindar î gênerâl

Ewî: No, ez ne birindar im, min bêxe qeflê hêstran


Ne gerek bû ez jê bipirsim ko çire xwe di bin cendekan de veşarli bû. Mexseda wî eşkere bû. Gênerâl dikir xwe di nav cendekan de veşêre û piştî vegera me xwe bigehîne ordiya xwe. Lê ritbe û lingê min ew eşkere kir. Piştê min zanî ko hêsirê min gênerâlê talyanî Kermano ye.



BOMBAVEJNE EMËRIKANI DI HEWŞA FABRIKÊ DE LI REX HEV RÊZKIRI



Emêrîke ji bo zefera hevalbendan xebateke zor dixebite. Ji bona vê yekê Emêrîkê berî ewilî herçî fabrike-ê wê ên ticarî hene ew wergerandine ser fabrikeyên hacetên cengê. Herwekî fabrika emêrîkanî a bi nav û deng ford îro li şûna timobîlan tang û balafiran çêdike. Xelkê Emêrîkê ji alîkî berê xwe dane ordiwê û ji aliyê din bezîne fabrika nî îro tê de ji şerevaniyên xwe û ji yê hevalbendên xwe re çekan çêdikin.



DI KÛÇEYÊN LONDRE DE NÛ Û KEVIN

Gava mirov di kûçeyên Londrê de digere tiştên neadeti dibîne. Lê van tiştên neadeti adet û adet-perestiya inglizan ne guharlîne. Ingliz weke hergav xwirîniya xwê dikin û piştî nivro di saet pêncan de, çaya xwe, wê çaya bi nav û deng, ya ko jê re çaya saet pêncan dibêjin, vedixwin.

Lê herwekî me got di bergelê Londrê de gelek tişt guhêrin. Berî hêrtiştî ji ber bombaranên balafirên gelek kavi û xirbe dikewin ber çavah.

Iro di vi rûpellî de em ji bergehên kûçeyên Londrê du resiman betav dikin.


Herçî klîşa jorîn tiştêkî ziz û hezîn e. Kaloyê li ber erebê yekî çiçekfiroş e. Kalo beriya sih salî dest bi çiçekfiroşiyê kir û mîdeki

dirêj erebê xwe di kûçeyên Londrê re digeran; çiçekê xwe difiroşin û debara mala xwe dikin. Di sala 1935an de kalo di piyankoyê de, yanî yanesih, çend hezar

zêr kar kirin û pê jî xwe re dikaneke çiçekan saz kir. Ji hingê ve jiyîna kalo guhêrî bû. Kalo bû bû mirovekî dewlemend. Lê wê dewlemendiyê gelekî ne ajot; şer bi ser de hat û di sala 1940î de bombeyek li dikana wî ket û dikan xerab kir. Kalo vegebiya kûçê û jî hû ve li ber erebê xwe sekîn.

Klîşa jêrin: Li

Londrê hexçekî bi nav û deng heye, jê re Hayd-Park dibêjin. Berê di dora wî hexçê mezin de çaxîne hesinî hebûn û xelk di deriyan re diketin. Piştî şerî ew hesin jî dora hexçê rakirin û ew şandin fabrika, da ko pê top û tîfing û cebirxan çêkin. Herwekî klîşe şanî dide, iro dora hexçê berdayî ye û xelk di her derê re dikevin.



EMËRIKANI

DI ROAVË EFRIQAYË DE

Xwezûranên [1] me emërikani xwe tev didin; tevdaneke xurt. Ji Emërikê xwe zer kirine û daketine bakur-roavê Efrîqayê; gihastine erdê Tûnisê û tê de şerê talyan û elemanan dikin. Herçi frensîzên wan welatan jî, di bin serfermandariya emîral Davlan de, gihane wan. Ordiwa ingilîzan a pêşin jî bi wan re ye.

Romelê ko bi xwe agirê sehrayê bû û qîma sehrayê dişewitand iro ketiye navbera du agiran û dike bi xwe bişewite. Belê jî roavê frensîz, emërikani û ordiwa ingilîzan pêşin û jî rohelê ordiwa ingilîzan a heştan hera wî didin û dikin di Trablîsêrbê de bigehin hev.

Ev sefera ha jî bo hemî diuyayê nişke-gavlik mezin e. Ji ber ko herkesî digot ko emërikaniyan piştî ko li Ingilîstanê kom bûne ewê dakevin reşahiya Ewropayê. Ji ber vê yekê jî elemanan peravên Ewropayê yên roavê xurt kiri li bûn.

Vê paşiyê Mr. Çorçil ditrokiya vê seferê di meclîsê de eşkere kir. Ji gotara Mr. Çorçil xuya dike ko ingilîz û emërikaniyan jî mêj ve, ev sefer kar dikirin. Li meha Tîrmehê, gava ordiwa Romel gihastî bû Elemeynê û dikir berde Iskendîriyê Mr. Çorçil li Emërikê li nik Mr. Rûzwelt bû.

Rûzwelt di pêşberê weziyeta Misîrê de rabû jî Çorçil re ev sefer pêşniyad yanî teklîf kir. Rûzwelt dixwest zûka dest bi vê seferê bike û bi wî awayî di qada Misîrê de barê ingilîzan sivik bike. Lê Çorçil lê vegevand û got: em dikarin heta Pafzê bihîna xwe fireh bikin. Ji ber ko Romel ne ketiye Iskendîriyê û nakevê jî.

Li ser vê yekê her du serekan bant pisporên xwe ên eskerî kirin û mesele jî wan re gotin. Pisporan plan çêkir û li gora wê planê Emërikê eskerên xwe li Britanyê kom kirin û herwekî xwendevanên me dizanin eskerên emërikani li 8ê Çîriya-paşîn daketin erdên Fas û Cezairê û jê berê xwe dane Tûnisê. Çorçil vê Havînê gava çû bû Moskoyê Stalîn jî li ser vê seferê serwest kir.



Mr. Rûzwelt li Waşingtonê jî ber mîkrowa Qesira-spi jî dinya û alemê re dide zanîn ko qewetên emërikani di bin fermandariya genêral Eysenhawer de daketine bakur-roavayê Efrîqayê.

Herwekî me got ingilîz jî pardariya vê seferê dikin û di pey emërikaniyan re ordiwa ingilîzan a pêşin jî dakete erdên Tûnis û Cezairê. Lê serfermandariya wan qewetan tev de di destê genêralê emërikani Eysenhawer de ye.

Dibêjin ko Eysenhawer fermandarekî bi vên û qudrêt û gelekî heja ye. Eysenhawer di sala 1915an de jî dibistana herbiyê derketiye û di şerê 1914-1918an de gihastî ritba qeymeqam (jî lyotan kolonêl). Eysenhawer di vî şerî de hevaltiya genêral Mak Artûr kiriye.

Rûzwelt piştî ko digel Çorçil qerara vê seferê da, banî Eysenhawer kiriye û sefermandariya seferê daye destên wî.

Berî destpêkirina seferê bi heftekê Eysenhawer jî Londrê çû bû Waşingtonê. Rojnaman hingê nivisandî bû ko Eysanhawer jî bo şewirine mihim hatiye Waşingtonê. Rojnamevanan jî Rûzwelt pirsî: Gelo sebaba hatina Eysenhawer çi ye?

Rûzwelt li wan vegevand û got: Di wextê şer de ev pirsiyarî ne bisem e. Tiştine welê, jî sirên eskerî tene hesêb.

Lê piştî heftekê dengê top û tîfingan sebaba çûn û hatina Eysenhawer eşkere kirin.

[1] Heye ko hin xwendevanên me dibêjin; ma emërikani jî kengê ve bûne xwezûranên me. Belê jî roja ko axayê me Lezgîn axa jin kiriye, emërikani xwezûranên me ne. Ji ber ko bûka me jina axê, Floransa diya Ferzo emërikani ye.

XWEDÉ

TUKESÍ JI DEST Û LINGAN NEKIT

Belé; Xwedé tu kesi ji dest û lingan nekit. Ev gofîn herweki berê rast û dirist bû; iro ji ewçend rast û dirist e. Lê medeniyetê herwekl dermanên nexweşiyên hela niho nenas peyda kirine ji kêmlêhatiyê re ji tevdîrîn dîtine. Li wextê berê gava yek ji lingêkl xwe dibû darek didan destê wî an qey-sîkek dixistin bin çengê wî û ew bi vi awayî bi ling dikirin.

Lê iro fena nû ji wan mirovên seqel re dest û lingên darîn û hesinîn çêdike û ew mirovên ha gelek caran bi wan lebatên destkut yan sînhet bi karê xwe ê kevin radibin; di necarî, hesin-kerî û di sînhetneji wan ziravtir de ji dixebitîn û weke berê bi kêrî xwe û bi kêrî xelkê tî.



Nemaze bi destpêkirina şerî di sînhet lebatên destkut de tevgereke mezin heye. Şerrevaniyên ko di qadên şer de lebateki xwe wînda dikin, piştî ko birinên wan sax dibin xwe dikin ber destên hosteyên lebatên destkut.

Balafirvanekî inglîzî bi navê Dâglas Bedir yê ko 33 balafirên dijmin avêtî bûn erdê di serekî de lingekî xwe wînda kirî bû. Jê re lingekî darîn çêkirine û iro Bedir bi wî lingê destkut bi gokê dileyize û li hespêsiwar dibê.



GELO

XWE KUŞT AN HATE KUŞTIN

Gava mifetişê polisê Mr. Blêkar gihaştî bû kûça Têsdal hejmar 16 saet bû bû yanzdeh û çarîk. Jinikek li wê derê bû. Jinik digiri û digot:

— Xwell li serê min be; ezê din bibim. Mêrê min î reben, min çiqas jê hez dikir, ezê bêt wî çî bikim...

Mifetiş ji polisê nobetdar pirsî: Kanî cendek?

Polîs mifetiş bire metbexê. Cendekê mêrik li erdê dirêj kiri bûn. Mifetiş lê hûr bû; bi diqet ew seh kir; lê tişteki ji adetê der peyda ne kir. Bi tenê beristikê çakêtê wî ji par re spî dikir. Qey lê tozeke spî reşandi bûn.

Mifetiş ji metbexê derket û dest bi istintaqa jinikê kir û got ê: Ma gelo tu sebeb hebû ko mêrê te intihar bike, xwe di metbexê de bikuje?



DIAJOYÊ TANGEKE BRÎJANÎ DORA XWE TEFTÎŞ DIKE

Jinekê got: Ji mêj ve ye mêrê min bê kar û xebat e...

Mifetiş: Ma ji ber vê yekê li ber xwe diket, acizî şanî dida?

Jinikê: Gelek caran digote min êdî bes e, ez nema dikarim. Lê tucaran ne dihate bîra min ko vî îşî bike; xwe bikuje. Digel vê hindê Tom, mêrê min î reben mirovekî qels û bê vên û îrade bû.

Mifetiş: Li wextê xuri-niyê hon pev re bûn?

Jinikê: Belê cenabê mifetiş, me pev re xwar.

Mifetiş: Paşê we çî kir?

Jinikê: Paşê Tom ji min xwest ko ez jê re kiloran çêkim. Gelek ji kiloran hez dikir. Min jê re got, ma ne li ser serê min. Ez çûm sûkê da ko hûr mûran bikirim. Tom li metbexê ma û rojnameyên vê sibehê dixwendin.

Mifetiş: Û pistre...

Jinikê: Gava ez ji sûkê



ESKERÊN EMÊRIKÂNÎ DI TALÎM U MENAWRAN DE


vegeriyam deriyê metbexê girtî bû. Min jî derve deng kire mêrê xwe û got ê « Çawan te di rojnamê de tiştek peyda kir, yanî ilana xebatekê » Mêrê min li min vegerand û got: « Hêj nizanîm ». Min got ê: « Baş e, vapore vêxe ezê niho bêm » Tom li min vegerand û got: « Belê ezê vêxim ». Ez jî nû ve vegeriyam sükê, jî ber ko min nivîşk jî bir kiri bû.

Mifetiş: Û paşê...

Jinikê: Ez vegeriyam mal û min deng li mêrê xwe

kir. Li min veegerand. Min zor da derî û ketim metbexê. Ez çî bibînîm, mêrê min xwe dahelandiye ser tîfika gazê [1]. Şirikên gazê vekirî bûn. Ez bezim û min şirik girtin. Lê îş qediya bû. Mêrê min xwe nema tev dida. Min baz da û ez çûm polîsхане. (polîs şanî dîde û dibêje) Ev camêrê ha bi min re hat û gote min, heta ko mifetiş bê destên xwe mede tu tiştî. Cenabê mifetiş ev e tifaqa ko li min qewimî.

Mifetiş: Yanî piştî ko mêrê te keke metbexê û dest bi xwendina rojnaman



EV LOKOMOTIVA INGILIZI DIKARE HEZAR TONI BIKIŞINE kir te ew nema di, ne?

Jinikê: Belê cenabê mifetiş...

Mifetiş: Piştî mirina mêrê te, di metbexê de te destên xwe ne daye tu tiştî?

Jinikê: No bi tu tiştî...

Mifetiş: Ev şûşa wiskiya ko jî nîvî bêtir jê hatiye vexwarin çire li hire, li ser masa metbexê ye?

Jinikê hinek sekîni, da eqilê xwe û paşê got: Îro cejna min e, cejna navê min e. Me ev cejn şahînet bikira. Bawar bike mêrê min ev wiski vexwar, serxweş ket û hi vî awayî intihar kir.

Vê carê mifetiş hinek sekîni, da eqilê xwe û paşê gote jinikê: Mêrê te xwe ne kuştîye. Te ew kuştîye. Te jê re wiski da vexwarin û gava mêrik bi temami serxweş bû û dilê wî jî bir ve çû te serê wî da ber tîfika gazê û şirikên gazê. te lê vekirin.

Jinik ker û lal ma, di cihê xwe da hejiha û mikur hat. Ewê bi xwe mêrê xwe kuştî bû.

Ma mifetiş çawan ev zanî. Heke we ew tê dernexist fedkirin rûpelê paşin.




ESKERÊN JAPONÎ DI NÊREGAHEKÊ DE

[1] Ev gaz bi jehir e û heke mirov ew bibin kir û daqurtand pê dimire.


MÉRANI

Û DRANÊN MIROVÊN KUŞTÎ
Şerê giravên Silêman dom dike; nemaze di girava Gwadelkenalê de. Gwadelkenal di nav giravên Silêman de ê mezintir e. Rûyê erdê wê 6100 kilomêtir çargoşe ye. Ji milê din Gwadelkenal mifta giravên Silêman tete hesêb. Ji lewre emêrikanî bi her awayî zora xwe didin ê; japon jî pê didin erdê û naxwazin giravê jî dest bidin.




Deryavaneke spenyoli bi navê Mendana Gwadelkenal keşif kiriyê û ewropayî çûn ê. Xelkê giravê polinêz û melêzî ne. Lê bi zemanan ve her du qewim têkilî hev bûne û qewimekî nû anîne pê. Ev qewim jî biyanîyan hez nakin. Xelkê giravê bi çend eşîran leva bidin. Ev eşîrên ha her gav şerê hevûdin dikin û goştên hev dixwin. Belê herçî nexweş û peyayêu ko di şeran de

ESKERÊN INGILIZI DI BER QRALÊXWE RE DIBORIN hêsir bûne şerjê dikin û dixwin. Lê goştê insanên spî di ser goştê xwe re digirin û roja ko goştê insanên spî bi dest dikeve hevûdin diezimin şiv û taştiyê. Carina jî, ji goştê insanan qelt û pesdirmê çêdikin. Seyaheki emêrikanî hêt û parsiwên mirovan li ber koxên wan hilawistî ditine. Xelkê ew da bûn ber tavê û ev çeniyên goştê hişk dikirin.




JÎ ORDIWA EMÊRIKANÎ BALAFIRVANÊN ŞAGIRT

Ji milê din xelkê Gwadelkenalê dranên seh û insanan jî didin hev. Bivandranan jinên wan ristîk û gerdenîyan çêdikin û pê xwe dixemilintin. Di rojên cejîn û şahînetan de herkes kolêksiyona dranan bi xwe re digertine. Herçî ko pê dran zêde ne ew jî ên din mêtir tete hesêb. Yê ko di kolêksiyona wî de dran kêm in li cem xelkê kêmqedir e; ew ne mêreki qenc e.



DI TERSANEKE EMÛBİKANI DE JI SEDAN VAPOREKAN, YEK DAKETIYE BEHIFÊ



DI VÎ ŞERÎ DE JI BER ÊRÎŞA BALAFIRAN GELEK TIŞTAN LI BIN ERDÊ VEDIŞÊRIN

GELO

XWE KUŞTIYE AN HATIYE KUŞTIN

- Pişti ko we çiroka rûpelên 16 û
- 17an xwend vê nivisarê bixwînin

Mifetişê polîsê pişti ko jinik girt û bire polisxanê polîsê pê re jê pirsî:

— Seyda te çawan zanî ko jinikê mêrê xwe kuştiye?

Mifetiş hinek kenî û got: Ne tişteki zehmet e. Te ne dît li stikurê çakêtê mêrik tişteki spî dikir. Gava mirov lê qenc dinihêrt didît ko ew ard e. Ma ard çawan bi çakêtê mêrik ve bû bû. Jê xuya dikir ko jinikê pişti ko dest bi çekirina kiloran kiri bû venegeriya bû sûkê. Heke biçîwa sûkê destên xwe dişiştin û stikurê mêrê xwe bi ard spî ne dikir. Jinikê derew kir û got; pişti ko mêrê min kete metbexê min ew nema dît û di metbexê de min destên xwe ne da tu tiştî. Çire ev derew kirin. Ji ber ko destên xwe da bû mêrê xwe û ew bi gaza hewayî kuştî bû. Tu dibînt xêra şopa ard me her tişt zanî.

Ji xwe piştê di wextê mihakemê de xuya kir ko jinikê jî yektî din hez dikir û ji ber vê yekê herwekî mifetişê polîsê tederêxist mêrê xwe kuştî bû.

DI GUNDÛN DORA LONDRE DE



Ji ber bombaranên hewayî hikûmetê gelek tişt ji Londrê rakirine. û ew guhastine gundên dorê. Di vê navê de dibistana bijîşkan jî hati bû guhastin. Di klîşa jorinê de şagirtine wê dibistanê xuya dikin yê ko di gundekt de bi cih bûne û tê de dixwînin.

HEJMARA HAWARÊ A 51Ê LI 15Ê ÇIRIYA-PAŞIN BELAV BÛYE, LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

Tefsîra Qurane, Diwana Melê, Mir û Nêrçivan, Tiştên danezanan, Selahedin, Silav li sîfira hazir e, Warê min ne 1 kor e, Şûşa Dilan, Memozîna Xanî, Gramêra kurdmanct, Mezin û Mezinatî, Rewşa Dinyayê.

Kiryariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrf.

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Ali Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 1
HEJMAR 01

IN
1 KANÛNA PAŞÎN 1943

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 10

VENDREDI
1 JANVIER 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



ESKERÊN ÇEKOSLOVAK DI TALÎMGEHEKE WELATÊN ROHELATÊ NÎZING DE



ŞAM — 1943
ÇAPXANA SEBATÊ

ÇIROKA KURDMANCI:

XEZNA SÊ KOSAN

Sê heb kose hebûn. Her sê birayê hev bûn. Di welatekî xerib de ji xwe re dixebitin. Sendûqek zêrê wan hebû; danî bûn cem xanimêkê.

Kosekî din hebû ji bajarê Hindistanê. Ewî koseyî remil avêt di ko sendûqek zêrê her sê birayê kose heye.

Ew kose ji Hindistanê rabû, ket rê û hat cem xanimê. Ji xanimê re go: ka sendûqa zêrê me. Xanimê ew nas ne dikir. Kose mîna hev in; di dilê xwe da go; qey yek ji her sê biran e, hatiye pereyê xwe dixwaze; dayê.

Ëvarê her sê bira ji gîhaştî bûn bijarê xanimê.

Ë piçûk çû pere ji xanimê xwest. Xanimê go: birayê te hat û bir. Kose pirsî, yekî çawan bû?

Xanimê go: yekî hebilbilind bû.
Ë piçûk hat cem birayê xwe go: Pereyê me birine. Birayê mezin go, yê ko biriye çawan bû? go, yekî hebilbilind bû.

Birayê mezin go, madam ev îşaret heye rahat e, emê hesabê xwe bikin; pereyê xwe derinin.

Ë piçûk — hebil-bilind e
Ë mezin — hebil-kemal e.
Ë navîn — hebil kemal e,
keleme-diran e.

Birayê mezin disa pirsî:


— Xanimê çi gote te?

— Go hebilbilind e

Birayê mezin go:

— Hebil-bilind e, hebil-kemal e, kelme-diran e, navê wî hecî Remezhan e, Bajarê wî Hindistan e.

Her sê bira dan rê, çûn Hindistanê, perê xwe anîn.



STRANA KURDMANCI:

SADONÊ GERGERI

Konê Sadon xan e, bi min xan e
J' aliye stewlê li min xweş têt deng û şehîna hespan e
J' aliye koçkê li min xweş têt dengê coniyê qehwê
[û fîncan û zebran e
Mîncolê; bi sê denga li mamê Xidir axa dikir gazî
Digo, bêje Nûhê gergerî bila li Şeblayê siwar nebit
Şehla hêj piçûk e bi ehwalê şerî nizanî

Nûho, babo min û beriya jêrî çû têt nîne
Birek siwarê şemrî rikêb kiri ser çiyayê melasîna
Şade şûdê Nûhê gergerî gelek hene
Talan û tulan ji qîntara çiyayê Şingalê vedgerine
Nûbo Paiz e, dinya li min tazi ye
Giyayê zûra li min beyl
Nefela mîrga li min rizî
Nûho yê gergerî fro sê şev û sê roj in
Şer e ligel pêncsed siwarê şemrî.


MAÇIKËN

KO MIROV PË DINIVISTIN

Casûsek bi navê Onya Swig hebû. Onya jinikeke bedew û gelek cazibedar bû. Onya piştî ko mezin bû çûye Swîçreyê û di xestexanekê de bûye nexweşnêr. Onye casûseke welê bû ko ji her kesî re, ji wî re ko bêtir pere dida dixebitî. Ji xwe Onye jinikeke bêmiliyet bû. Kesî ne dizanî ji kîjan millet û welatî ye. Hînan digot ko Onye denmarkî ye, hinên din digot çînî ye. Lê kesî rastî ne dizanî. Onye ji ew rastî ne digote kesî. Vê paşiyê rojnamevanekî emêrikani çûye xestexana ko Onye lê ye û bi darî wê ketiye. Onyê tiştên jêrin gotine rojnamevên:


— Di casûsiyê de min ji her tiştî bêtir ji bedewiya xwe istifade kiriye. Lê carina rastî mirovine welê dihatim ko guh ne didan spehîtiya min. Hingê bi tep û hileyine din min zora wan dibir.

Carêkê diviya bû ez kaxezên casûseki



Ji çekên ordîwa emêrikani, topên balafirşiken li ser keştiyekê. Dîdevan bî dûrebînan dûrahiya behîrê seh dikin.

balqanî bidizim. Mêrik li Viyanê di otêleke mezin de rûdinişt. Ez çûm wê otelê; ez û xadîma otelê em li hev hatin. Keçikê cilên xwe dane min. Min ew li xwe kirin û ez bûm xadîmeke delal û bi vî awayî ez ketim oda mêrik. Min pê re bi îşwebazî da û stand. Mêrik ez himbêz kirim û dikir ew îş bi min re bikira. Min xwe hinek xeyidand. Mêrik li ber min geriya; em li bev hatin. Bi



TANGEKE EMÊRIKANI. JI TIPEKI NU. EV TANG DI AVÊ DE JI DIÇE

tenê min jê re got ko ji min re divêt ez hineki derkevim. Mèrikê min pê qail bû. Ez derketim derve. Min narkotîkek (benc) di lêv û hinarikên xwe da û ez vegeyriyam cem mèrikê xwe. Mèrik ez himbêz kirim û lêv û hinarikên min maç kirin. Gelek ne borî narkotîkê testra xwe şani da. Peyayê min bê biş kete erdê. Min hûr-mûrên mèrik tev dida û ez li kaxezan digeriyam. QEWETÊN FRANSA ŞEREVANÎ ÊN MÊKANÎKÎ DI EFRÎQA BAKUR DE



Bi carekê de min dengek bihst.

— Hey casûsa bêbext...

Mèrik di xwe ani bû der; da bû şejderba xwe. Du derb berdane min. Ez lê zivirim, li singa wî siwar bûm û vê

carê şûsa narotîkê bera devê wî da. Dilê mèrik bi تمامی ji bir ve çû. Min kaxez birin, cilên xwe guhartin û min xwe gihande timobîla ko ji derveyî otelê li héviya min bû ».

Disan Onyayê gote rojnamevên:

— Ji xwe gelek caran min kaxezên casûsan didizîn. Herwekî dizan ji dizan bidiziya. Belê carekê jî min da bû pey casûseki elemani. Mèrik di bajarekî Belçîqê de dixebitî. Ji xwe beriya min Polîsa sîrî hûr-mûrên wî seh kiri bû. Lê polîsê nikari bû tişteki peyda bike. Ji milê din ji min re goti bûn ko casûsê elemani gava vedixwe hin sîrên xwe dide der.

Ûcar ez rabûm û çûm bajarê ko mèrik lê bû û ez daketim xaniyê ko casûs bi xwe tê de rûdinişt. Di wî xaniyî de min jî ji xwe



JÎ FERMANDERÊN FRANSA ŞEREVANÎ GENÊRAL LARMÎNA

re odak girt. Dema ez gehstüm mal mèrik ne li mal bû. Piştî ko ez li oda xwe bi cih bûm digel gremofona xwe derketim salonê û min bi xwediya malê re dest bi reqsê kir. Piştî bihinekê casûsê elemanî hat. Min berê xwe da wî û bi elemanî got ê:


— Ev e mèrek hat, gelo dizane bireqise

Casûsê elemanî li min vegerand û got: Heke nizane jî ji bona te cehda xwe wê bike ko bizane.

Mèrik ev tişt gotin, ket bin çengê min û ez reqîsandim. Piştî çend rojan dan û standina me ewçend çûye pêş ko ez bi şev çûm oda mèrik. Me şerab vedixwar. Min ji mèrik re got ko ez ji torinên Nemseyê me û tifaqek li min qewimîye û min terka welatê xwe daye. Mèrik piştî ko çend qedeh vexwarin ji min re got ko li Belçîqê bi xebateke sirî mijûl dibe. Min jî jê re got ko ez jî li xebatekê digêrim û heke qebûl dike ez dikarin bi wî re bixebitim. Di nav şexaliyê de min jê pirst: Ma kaxezên xwe li kû vedişêrî?

Mèrikê min got: Li cihekî welê ko nayete bira tukesî. Ez kaxezên xwedî nav solên xwe de vedişêrim.

Ji xwe min jî ev diviya bû. Kela mèrik rabû bû; destên xwe dirêjî min dikir. Ez bihinekê derketim derve û min narkotik di lêv û hinariken xwe da. Gava ez



Emèrikani ev bûne sê meh di giravên Silêman de dirêjî japoniyan dikin. Klîşa kelekeke japonî şanî dide ya ko ketiye destê emèrikaniyan.

vegeriyam balê sebira elemanê min gihastî bû dawiyê. Hema ez kişandim himbêza xwe û ez bi maçikine germ maç kirim. Gelek ne borî mèrikê min bêhiş kete erdê. Dil jî bîr ve çû bû. Min dolab vekir û ez li solan geriyam. Di nav soline kevin de min kaxezên casûs peyda kirin.

Roja din min kaxez sipartin xwediyan û min ji wan mikafateke mezin girt.

Ev tişt hemî li Ewropayê çebûne. Lê Onye li Efrîqayê di nav reşikan de jî xebitiye. Di mistemlekeke Efrîqayê de xelkê cih ji xwe re çek û cebirxane tanîn. Xwediya mistemlekê, dewleteke ewropayî, pê hesiya bû. Wê dewletê dixwest bizane ew çek çawan dihatin mistemlekê. Dewletê kir ne kir lê tiştê ne bire serî û dawiyê qesta Onyayê kir. Onye rabû çû wê mistemlekê û dest bi sehkirinê kir. Onye di vê babetê de gotiye:

— Qederê sê mehan ez di nav xelkê de geriyam. Lê min tu şop hilnani. Şevêkê ez gihastî bûm konên reş. Wê şevê ez bûm

mêvanê serekê eşîrê. Yek jî jinên serekê avis bû û dikir biwelide. Jinik li ber dilê mêrê xwe gelek ezîz bû. Mèrik gava ez ditim kêfa xwe gelek ji min re anî. Jê ve welê ye ko jinikeke spî dikare bi her awayî arlkariya jina wî bike. Bi rastî jî jinik bi rahetî welidî û ez midekî xweş li cem jinikê mam û em bûn dostên hev. Şevêkê di nav şexaliyê de gava me qala çekan dikir jinikê gote min:

— Tu dizanî em çekên xwe çawan ditnin. Vaporeke elemanî bi şev tete nizingî filan gundî û sendûqên tîfing û cabirxanan tavêje keviya behîrê. Xelkê me diçin wan sendûqan di din hev û ditnin reşahiye. Sibetirê min terka wan da û ez vegeyîyam Ewropayê. Ne hewce ye ko ez ji te re bibêjim ko ji hingê ve tu çek ne gihastine reşikên wî welatî.

Xwende vaninol bi min be ji niho û pède heke we jinikek maç kir bert ewillêv û hinariken wê rind bidin şîştin.

KONIGŞTEYN KELEHA KO JIRO JÊ REVİ

Mişel Bernau, yekî frensîz yê ko di wextê mitarekê de ketî bû destên elemanan û bû bû yawerê emiral Löklerk; der heqê hêsiriya xwe û ferman-darên ko pê re di qerargaha hêsiran de bûn, bendek nivisandîye û tê de gotiye:

Qesira Turlavilê ji Şêrbûrgê bi çar kilomêtiran dûr e. Li 19ê Hizêrana sala 1940î de di wê qesirê de bûyerine tarîxî hatine pê. Qederê xwest ko deryavanên fransîzî yên ko berî du heftan di Dünkêrkê de şerê dijmin kiri bûn di Şêrbûrgê de bêî ko dest bibîne xwe, xwe bispêrin elemanan.

Deryavanên fransîzî di Turlavilê de li hev giha bûn hev û li lêviya hatina elemanan diman. Di nav wan de du emiral; emiral Abriyal û emiral Löklerk û çend zabitên bilindpeya bûn. Herkesî serê xwe kiri bû ber xwe û ker û lal li bendê dima. Deng ji miriyan dihat lê ji wê civatê ne dihat. Zengila telefônê ew bédengi ji hev de xist. Yê ko telefôn dikir waliyê Şêrbûrgê bû. Wali digot ko serhengêk (miralay) û çend zabitên din ên elemanî terka Şêrbûrgê dane û dihatin Turlavilê, da ko me teslim bigirin.



DERYAVANÊN EMERİKANÎ ÊN NÛ


Emiral Abriyal piştî ko bihistoka telefônê dani, şûrê xwe kire nav destên xwe, bi awirine ziz lê nihêrt, qey jê xatir dixwest. Emiral hinekî sekintî û pişê şûr da ejniwa xwe û ew şkênand. Herçi emiral Löklerk destê wî li şûrê wî negeriya; rabû şûrê xwe da min û got:

— Bernau ez di xwe re nabînim ko şûrê xwe bişkênîmin; ka ji te re tu bişkênîne.

Min şûr girt û ez dakelîm bexçê; min jê re kortek kola û ew tê de veşart. Min di dilê de digot heke rojekê ez û emiral di Fransê de gihane hev ezê şûrê wî ê mirl-zindî berpeyî wî bikim.

Gava ez vegeriyam qesirê, zabitên elemanî jî gihastî bûn ê û şertên teslimê ji emiral Abriyal re didan zanin. Di vê navê de emiral Löklerk ez bi tenê kirim û gote min:

— Tu dizani ko



DI PERAVÊN NORVEJÊ DE QUPA BOMBARANÊN INGLÎZAN

yawerê min hatiye kuştin. Elemanan destûr daye me ko her yekî ji me yawerek hebe. Dixwazi bibi yawerê min.

Min ji qebûl kir ko di hêstiriyê de bibim yawerê wî û bi wî awayt ez ji ketim qefla hêstran ya ko biçiya Königs-
troye, ji Drêsdene pêncî kilomê-
tîrî dîr.

Qefle ji deh timobîlan bi hevdû diket. Hestî ji bo hêstran, dido ji bo mihafîzan. Her du emîral, Abriyal û Löklerk ketin timobflekê. Min ev timobîl tajot. Di timobîla ko di paş me re dihat, zabîtek û neh eskerên elemanî bi cih bû bûn. Em di Şêrbûrgê re derbas bûn. Di kûçê û kolanan de ji hin eskerên elemanî pêve tukesî xuya ne dikir. Nizanim çawan bû û min li paş xwe nihêrt. Timobîla elemanan ne li paş me bû. Hingê min, gote emîralan:

— Ev e firsendek, timobîla elemanan ne li pey me ye; em dikarin birevîn liherin gundekî, cilên xwe biguhêrtin û xwe bidin alîkî.

Emîral Abriyal li min vegeşand û got: No, me soza xwe da...

Li Mayensê em sekinîn. Qefleke din giha me. Di vê qeflê de, min jenerâl Jiro nas kir.

Jiro ji Berlînê dihat. Em tev de ji timobîlan peya bû bûn. Zabîteki elemanî hat û ji me pirsî:

— Jenerâl Jiro kî ye?

NE YARÎ NE HENEK



Japonî ji emêrikaniyan re dixebitîn. Belê japonî gava ketine gîravanê Sîfeman; tê de hin rûyên petrolê xerab kirî bûn. Wêca emêrikani wan rîyan bi hêsrên japonî didin çêkirin.



JENERÂL DE GOL BER BI BRAZAVILÊ

Jiro gawekê qedimî. Zabît got ê: Jenerâl di heqê te de emîrê idamê heye.

Jiro lê vegeşand û got: Ez îro hêstrî im, çî dikarin bikim; bi tenê dibêjim ko hêsrên her bê payine kuştin.

Zabîte elemanî: Em te ne ji ber ko hêstrî dê bikujin; lê ji ber ko te elemanên sîvîl dane kuştin emê te idam bikin.

Jiro: Belê ew sîvîlên elemanî bi peraşûtan daketî bûn piştî xetên me. Dilê wan hebû xesarê bigehlnî me; ji lewre min ew idam kirin.

Zabîte elemanî serê xwe hejand û got: Baş e, bide pey min.

Jiro xatîr ji hevalên xwe xwest û da pey wî zabîti. Piştî bîstekê me ji terka Mayensê da û em bi rê ketin. Bi rê ve her du emîralan xwe ker kirî bûn, rûyên wan tîk ve çû bûn. Dawiyê em gihaştin Königs-
troye. Piştî du saetan çavên me


'bi luitina genèral Jiro' bi ronî bûn. Jiro b' serhatiya xwe jî heralên xwe re qise dikir û digot:

— Min jî zabîte ko ez istewab kirim, got: Heke te fransizine sivîl bigirtana yê ko daketi bûn piştî xetên elemani te çi jî wan dikir? Ma te ev idam ne dikirin?

Zabîti li min venegerand, çû okeke din û bi telêfônê bi mezinê xwe re xeber da û vegebiya cem min û jî min re da zanin ko qerara idamê hatîye rakirin.

Herçî keleha me, eleman ew bi çend biran leya kiri bûn. Herçî fermanîdar û zabîtên bilindpêye, jî wan re odene xweser texsîs kiri bûn. Herçî esker û zabîtên piçûk jî her panzdeh mirovan re odak da bûn. Ji roja pêşîn de serbendê kelehê jî me re da zanin ko sahûn hindik e û li serê şeş heftan carekê jî her hêstî re qalibek wê bihata dayîn.

Di kelehê de jiyîna me bi awayê jêrin bû. Serê sihelê li saet heştan em hişyar dibûn û me xwîrîniya zabîtên xwe dîhire wan. Piştî di hewşa kelehê de em li hev digihan hev û zabîtê nobetdar em yoxilne dikirin. Li saet dehan me odeyên xwe saz dikirin û diketin metbexê û me taştîya xwe çêdikir. Taştîya me jî kartol û masiyê bişk an jî kartol û goştên hespan bi hev diket. Piştî nivro em serbest bûn; em dinivistin an di hewşa kelehê de digeriyan.



BALAFIVANÊN EMERUKANÎ XWE KARÎ ERÎŞÊ DIKIN



PERAŞÛTISTÊN EMERUKANÎ DI TALÎMÊ DE

Elemanan mîaşên me, mîaşên ko me di ordiya fransîzî de distandin didane me. Bi wî mîaşî neferekî kotek çixareyên xwe dikirin. Ji xwe jî çixaran pêve me ulkarî bû jî derve tu tiştî bikirin.

Hej pênc roj ne keti bûn navê ko em gîlaşî bûn. Kûngşteynê ko min ecêbek dît. Rojêkê bişkojêke emral Löklerk keti bû erdê û li bin textê wî wer bû bû. Min xwe xwar kir û di bin textê re li bişkojê geriyam. Min bişkoj peyda kir, lê pê re min ecêbek jî dît. Di bin textê de bihistokek hebû. Elemanan tiştên ko me di nav hev de digotin tev de dibihistin. Emral gava dît ko ez lêbikime jî min pîst.

— Bernan çi li te qewimiye?

Min tiliya xwe bire ser lêvên xwe û li ser kaxezêkê nivîsand: « Di bin textê te de bihistokek heye ». Hingê emral bi dengêkî bilind

gote min: Bernan qehwa ko te ji min re ant sar e. Ji niho û pède bîla xwe bidê.

Gava em derketiñ hewşê emîral gote min: Ji rojan ko em hatine keletê ez her û her nîlîfan li Hitler dikim. Elemanan ev hemî bihistine.

Ûcar em li bihistokan digeriyan. Me yek di oda xwarinê, yek di oda genêral Jiro û yek di hexçê de peyîla kir.

Piştî ko mesela bihistokê peşîlî dizdarê Königsteynê genêral Gûnter diî kir ko yawerên fermendarên fransîzî bêxe destên xwe û wan bike cûsê xwe. Ev tevdir jî ewçend ne çû serî.

Rojekê jî rojan xeber gihastîye me ko genêralekî ingiltîzî antîne hêsiyagahê. Navê wî Con Rayt bû. Herçî em yawer, bi dor serê sibehê me qehwa genêralê ingiltîzî jê re dibir. Heçî ko qehwe jê re dibir bi silava « Herbijî Ingiltîre » silav lê dikir. Lê genêralê ingiltîzî xwe ntzingî fermanderên me ne dixist. Lê rojekê me dit ko genêralê ingiltîzî gava di bexçê de digeriya bi zabitekî fransîzî re xeber dida.

Ûvarê, li wextê şivê, wî zabîttî tîştên ko genêral Rayt jê re gotî bûn jî me re qise kir. Genêral gotî bû ko ingiltîzî jî fransîzan xeyidîne jî ber ko fransîz zû teslîm bûne. Digel vê hindê Ingiltîre jî ber ko gelek qels ketiye dike jî elemanan mitarekê bixwaze. Bivê nevé van gotinan em meyûs dikirin. Sibetirê min qehwe bîre genêralê ingiltîzî. Gava ez ketim oda wî min jê re « Roja te xweş » got û qehwe ber pê kir. Genêral bi ken li min vegeand û got: Welê dixuye ko tu jî Ingiltîrê hez nakî?


Min: Ma çîre genêral?

Genêral: Ji ber ko hevalên te her sibe gava jî min re qehwê ditînin navê Ingiltîrê hîlîdîdî û « Her bijî Ingiltîre » dibêjin.

Di vê navê de kirasê genêralê yê ko li ser kursî bû ket erdê. Ez lê tewihan û min ew rakir. Çavê min bî marka kirêş ketî hû. Markake Berlînê. Min ev gote emîralê xwe. Löklerk, gote min:

— Ji xwe min jê şik dikir. Niho ez ewla bûme. Merik jî gestapoyê ye, cûsîs e, xwe kirîye genêralekî ingiltîzî û ketiye nav me.

Piştî du rojan genêral Rayt terka hêsiyagahê



Balafirvanên ingiltîzî piştî ko bajarên Elemanyayê bombaran kirine vegeyîyane wargehê xwe û balafirên xwe dikin hangaran.


da. Heq di destê emîral Löklerk de bû. Ji xwe piştîre me zantî ko di ordîwa nîlîztî de bi vî navî tu genêral nîn bû.

Qederê salekê ez li Königsteynê mame û bi deşyavanên ko Hitler ew berdane vegeyîyam Fransê. Gava ez gebîştîm tixûb zabitekî elemanî gote min: Solên xwe jî xwe bike.

Ez lê ecêbinayî mam û min, li rûyê wî nihêrt. Hingê gote min:

— Ev sol jî te re di Königsteynê de dane. Ev malê Elemanyayê ye, divê vegere Elemanyayê.


Min sol jî lîngên xwe kirin û ez pêxwas ketim erdê welatê xwe.



Di vi şeri de ji q: 'ên adeti pëve qadeke din heye. Ew ji qada noqaran e. Eleman ji destpêka şeri ve di vë qadê de xebateke zor dixebitin û nemaze di Etlantikê de bera vaporên îngilizî û yên hevalbendan didin. Ji her vë yekê xesarine mezin gihastine vaporticarelên îngilizan. Dilê elemanan hebû û iro ji heye, bi vi awayî giravên İngilterê ji her tiştî mehrûm bikin. Lê plana elemanan ne çû şeri. Stolên îngiliz û emêrikani di duralahiya behiran de li noqarên elemani digerin û wan bin av dikin. Ji milê din tersaneyên îngilizî û emêrikani vaporên nû çêdikin û wan xesaran bi şûn de vedigerinin. Herçi tersaneyên emêrikani, herweki klîşe şani dida ne bi tenê bi roj lê bi şev ji dixebitin û di rojekê de du vaporan çêdikin. Ji her ko ji bajarên Emêrikê re talûka balafirvan nûne.



ZAROWÊN RÛSÎ LI SER TOPEKE ELFMANÎ YA KO ÛRISAN ZEMT KIRIYE



DI QADA ŞERE MISİRÉ DE TANGEKE ELEMANI YA KO BALAFIRÉN INGLIZI ŞKÉNANDIYE



BALAFIRVANÉN EMERİKANI DI QADÉN MISIB Ò TRABLIŞXERBÉ DE BERIYA ERİŞÉ

OHA

EV CENKEŞTIYA
JAPONİ MIN BIN AV KIR

Noqareke emêrikanî di meha Tîrmehê û di Pesîfikê de bertorpiyora japonî Oha bin av kiri bû. Naxuda yanî keptanê noqara emêrikanî di radyowa Nûyorkê de biserhatiya xwe qise kiriye û gotiye:

— Ev bû bûn pênc roj ko em di ber û di nav giravên Pesîfikê ên gir û hûr re digeriyan û em rastî dijmin ne dihatin. Li 8ê Tîrmehê me ji dûr ve vaporek dît û em noqî avê bûn. Ji binê avê bi dûrebinê me dît ko ew vapor yeke emêrikanî ye û em derketin rû û me silav lê kir.

Li 14ê mehê piştî nivê şevê memûrê bêtêlê ez hişyar kirim û telêgrafa jêrin da min: «Qefleyeke bertorpiyore japorî berê xwe daye bakur; li xwe guhdar bin». Min zabitên xwe dane hev û em bi hev şewirin. Me qerara xwe da; meê rê li qeflê bigirta. Me plana xwe çêkiri bû. Emê di navbera

MAK-ARTÛR DI GÎNA-NÛ DE



Genêral Dûglas Mak-Artûr, genêralê emêrikanî ê bi nav û deng, serfermandarê qewetên hevalbendan yên Nîvro-pesîfikê, di Gîna-nû de, di navbera eskerên ewîstrali de, wek yekî ji wan, çaya xwe vedixwe.


du giravan û di avtevgêkê de li hevîya qeflê bimana. Beriya spêdê em gihaştin avtengê û em qedere pênc mêtiran noqî avê bûn. Me dûrebîna xwe hilda rûyê avê û em sekinîn. Me her çar torpilên xwe li qewanan siwar kirin û berê wan da devê avtengê.

Dinya dest bi zelalbûnê kiri bû. Bertorpiyore me xuya ne dikirin. Eûtî دنیا bi temami zelaal bu bu. Ji dûr ve dûmaneke boz xuya kir. Vê carê me ew qefaltî bûn. Ji 15 kilonêtiran bertorpiyoreke japonî xuya kir. Di pey wê re pêncên din dihatin. Min a pêşin da bû ber çavên xwe. Ew Oba, bi xwe bû. Oha keti bû hikimê torpilê. Min emirê agirkirinê da. Her çar torpilên me bi hev re ketin avê û qesta Ohayê kirin. Ohayê torpil dîtî



DI BALAFIRGEHEKE EFRÎQA BAKÛR DE

bûn û dikir ji ber riya wan birave. Lê ji wê menawrê re wext ne ma bû. Torpilek li pêşiya keştiyê keti bû û keştiyê li ser pozê xwe ber bi jêr dibû û qûna xwe hildida. Me tşê xwe qedandi bû. Niho diviya bû em ji ber keştiyên din birevin. Me noqara xwe 120 mêtiran daxiste binê avê. Dilê min hebû, di bin avê re ji avtengê bi dûr bikevim. Lê vê carê siûdê artkariya me ne kir. Makîneyên



noqarê sekinîn. Niho bertorpiyoyên dijmin bombeyên xwe ên binavînan wê berdana me. An bombe-rast bi rast li noqarê biketana an di nîzingî wê de biteqiyana û em bêgav bihiştawa ko em derkevin rûyê avê. Li rûyê avê topên dijmin li hêviya me bûn ko me ji nû ve daxin biniya avê.

Mirin hemîna mirin e. Lê qet nebit me Oha bin av kiri bû. Ez di wan mitalan de bûm ko noqara me bi carekê de hezilha; carekê, du caran, sê caran...

Destegabên emêrikani ji bo bemî dewletên ko şerê mihwerê dikin re dixebitin. Ev in top û kemyonine emêrikani di welatê Çînê de.

Aletan şanî dida ko bombe ji me bi du kilomêtiran dûr diteqiyên. Lê siûdê dîsan arikariya me kir. Bombe diteqiyên, lê ji me bi dûr diketin. 3, 4, 5, 8... kilomêtiran. Aletê nêma xwe tev dida. An dijmin hew bombe berdidan; an gelek ji me bi dûr keti bû.

Qederê çar saetan em di bin avê de man û paşê me qesta rû kir. Ji nû ve û careke din me di nîya rihnikê dit.



Gelo ev her sê çêliyên heywanan çi ne? Ma namînan kutikên hirçan. Belê mirov wê bibêje qey ev kutikine hirçan in û di bexçêki heywanan de resimên wan hatiye girtin. Lê rastî ne wêlê ye. Ev ne kutikine hirçan; lê belê peyayine ordiwa emêrikani, cewrikine san in. Lê ne seyine adeli, cewrikên seyine fêris, wek seyên zozanên me, seyên senboyî û ên gurxênêk. Di ordiwa emêrikani de ji bona van seyan teşkilatine mezin hene. Ev teşkilat van seyan bi xwedî dikin û ev se di ordiwê de, wek çasidiyê, wezîfeyên eskeran dibînin. Nemaze gava berf dibare û rê tene girtin ev seyên ha di navbera çeper û qereqolan de hûr-mûr û kaxezan dibînin û ditînin. Carina ji heke kemyonek di berfê de teqînt se diçin qerargahê û elamê didin xwediyên. Cewrikên klîşê hêj çil-rojî ne.

DI GUNDEKI STALINGRADÉ DE

Şerê Stalingradê ev çendî û çend roj in dom dike û ûrisan di vî şerî de mēranîke ecêb şanî daye. Rojnamevanekî rûst bi navê Aleksî Morlof yê ko di wê eniyê de hazîr bûye der heqê şerên Stalingradê bendin nivîsandine. Morlof di bendeke xwe de gotiye:

— Bi mifrizeke keşfê û bi şefeqê ve em gîlaştî bûn gundeke Stalingradê. Gundeke vala; xelkê wî terka wî da bûn. Li ser herfê şopîne peyan xuya dikirin. Serbendê mifrizê got; xuya ye ko dijîmin carîna tēte vî gundî; divêt em xwe tē de veşêrin û li hēviya wî bimînin.

Mifriza me jî nîwazdeh peyan bihevketî bû. Mifrizê xwe di xanîkî de veşart. Gelek ne bori; saet bû bû heşt, mifrizeke elemanî jî jê ve



Xelkê Gîna-nû bi her awayî hevkarîya ordîwa emērikanî dikin. Herwekî klîşe şanî dîde kelkevaniyan timobîlek li avê derbas dikin.

xuya kir, hate gund; ew jî kete xanîkî, jî xaniyê mifriza me 50 mētirî dūr. Serbendê mifrizê emir dîda peyayên xwe û digot: Xwe tev medîn bihîna xwe di xwe de bigirin.

Eleman di derîyan re diketin xaniyan û di penceran re jî wan derdîketin. Karê wan eşkere bû, xanî lexem dikirin da ko eskerên me yê ko bihatana gund bi-ketana ser wan.

Eleman heta êvarê bi vî kartî mijûl bûn; xanî lexem kirin.

Ji şevê sê saet çû bûn; bi-rek zabitên elemanî hate gund. Zabit hati bûn ko îşê peyan seh bikin. Çawîşê mifrizê Kolski digote serbendê xwe Razof ko dirêjî wan bikin. Serbend pê qail bû bû. Lê gava hate bira wî ko wezîfa wan keşif bû û diviya bû bihînin bêt ko hênc dîtin jî nû ve emir da ko herkes di cihê xwe de bimîne û xwe tev nede. Lê piştî bi-hinekê gava nobetdar da zanîn ko eleman nîzingiyê li xaniyê me dikin herkesî da tîfîng û bombeyên xwe. Dinya şereş bû. Du elemanan bi pîleke elēk-trîkî pêşîya xwe bi ronî kirin û ketin hundir; li dora xwe fedkirin, herê xwe dan derîncê û hilkişîyan tayê jorin. Beriya wan eskerekî me derketî bû jor û rê li wan girtî bû.



XELKÊ LONDRE ROJÊN ÇEJÎNÊ DI GUNDÊN DORÊ DE DIBORÎNIN

Eskerê me şejderb bi dest, xwe di odekê de veşarti bû. Elemanan piştî ko odayên din seh kir deriyê oda nobetdar vekirin û ketin-ê. Nobetdarê me bi şejderba xwe her du jî li erdê dirêj kirin; bêt ko eleman hikarin dest bibine xwe. Deng bi gundi ket. Eskerên me jî penceran de agir dikirin. Elemanan kiri bû ko terka gund bidin. Lê piştî bihinekê li me zivirin, mîtralyozên xwe danin û bera xaniyê ko her du hevalên wan tê de hati bûn kuştin, dan. Ūrisan li wan vedigirand. Lê halê mifrizarûstî di xeterê de bû. Eleman jî wan bêtir bûn; çekên wan jî xurtir bûn. Ji aliyê din asêgeha Ūrisan berdayî bû. Di her derê re dijmin dikarî bû bikeviyê. Ji lewre Razof dixwest eskerên xwe jî wî xaniyî hikîşîne. Nizingl wî, xanîkî din hebû; bi diwarekî bilind û asê dorgirtî. Lê guhastina eskeran jî xaniyê ko ew tê de bûn heta xaniyê din, bi xwe xeterek bû. Ji ber ko rê di bin agirê dijmin de bû. Dijmin jî etlaht ne dida.

Çawîş Kolskî yê ko bi fikira serbendê xwe hesiya bû rexma agirê mîtralyozan da rê û xwe gihande xaniyê din. Eskerên din gava çav bi çawîş kirin wan jî namerdî ne kir û di bin barana berikên mîtralyozan de yeko yeko, dido dido dane rê û bi selamettî xwe gihandine çawîşê xwe, jî yekî pêve. Ew jî bi birîneke sivik jî lingê xwe birîndar bû bû. Dor gihastî bû serbendî Razof. Razof jî da rê; lê beriya ko bigehe xaniyê nû ket. Çawîş Kolskî ber pê çû. Lê Razof beriya ko çawîş bigehe wî rabû ser lingan. Tu tişt pê ne hati bû. Razof eskerên xwe li xêntî li bexçê belav kirin û şer jî nû ve xurt bû. Piştîmêrên elemanan dihatin. Rewşa Ūrisan zehmet bû. Elemanan dora xêntî digirt. Hin



BALEFIRVANÊN FRANSA ŞEREVANÎ DI EFRÎQA BAKUR DE

peyayên wan jî par re gihastî bûn ber dîwêr û dikirin hilkişin ser û dakevin hewşê. Dido ketin-ê jî. Lê şejderba Kolskî ew her du, di cih de bîrîb kirin.


Kuştiyên elemanan jî deltan bêtir bûn. Ji Ūrisan jî şeş peya hati bûn kuştin. Serbend Razof qerara xwe da bû ko jî gund bikîşe. Lê çawan û bi çî awayî. Razof plana xwe çêkiri bû. Birekî eskeran jî xêntî wê derketa û êriş berdaya dijmin. Birê din ewê di xêntî de bimaya û şerê dijmin bikira. Bi vî awayî qeweta elemanan jî wê bibiwa du birna. Birê ko di xêntî de bimaya di qula ko birê pêşin de vekira, terka gund bidaya.

Ji mifrizarûstî pênc esker, serbend û çawîş ma bûn. Serbend Razof û çawîş di xêntî de man û her pênc eskeran di tariya şevê de qesta pêş kirin.

Lê plana Razof ne çû serî. Ji ber ko eskerên ko jî xêntî kişiya bûn li her dîwarê xêntî li elemanan qelibin û rahiştine hev. Eleman xurt bûn. Razof û Kolskî gava ev hal dîtin begav man, ew jî derketin derve û çûn hawara hevalên xwe. Elemanin di ser dîwêr re daketin hewşê. Eskerên rûstî û elemanî di tariya şevê da tevî hev bû bûn; bi bombayên destan li hev dixistin. Ūrisan li her xwe dida û jî gund dikîşiyen. Heye ko piştî nîv kîlometirî ewê jî hev veqetiyana. Di vî navê de Razof ket erdê; çawîşê zivirî, ket bin çengê wî; lê bêfêde. Razof nema xwe tev dida. Razof miri bû.

Wextê çawîş û her pênc eskerên rûstî xwe gihandi bûn qerekona rûstî a pêşin elemanan cendekê Razof jî çek dikirin.

ŞAGIRTÛN DIBISTANA WESTPONTÛ



Westpont dibistana zabîten emêrikani ye. Li Emêrikê jî herweki li Ingilterê, xizmeta eskerî ne mecbûrî bû. Lê piştî ko Emêrike kete şer hikûmeta Emêrikê jî seferberî ilan kir. Ji hingê ve xelkê Emêrikê tev de xwe dane ber darê silêhê û kom kom qesta talîngehan kirine. Klîşa me hin şagirtên dibistana herbiyê şanî dide, yên ko di ber fermandarê xwe re diborin.



DI SEHRAYÛN EFRÎQA BAKUR DA QEWETÛN FRANSIZÎ

Piştî ko qewetên fransîzî yê Efrîqa bakur derbasî aliyê hevalbendan bûne, qewetên fransîzî di vî şerî de jî nû ve ehemeyîteke mezin girtine. Ew qewetên ha îro di bin fermadariya jenerâl Jiro de şerê eleman û talyanan dikin. Lê jî aliyê din wan qewetên bi çek dikin. Ji ber ko çekên wan kevin û bi kêrî şerê îro nayên. Welê dixuye ko ew qewetên ha piştî ko bi çek bûne ewê berdî elemanên ko li Tûnisê asê bûne. Gelek hevî heye ko ordîwa fransîzî ya ko li welêt şikestiyê û jî ber elemanan kişiyaye, li Tûnisê heyfa xwe jî dijminê xwe hilîne û dastanîne nû bi ser dastanên xwe ên kevnare ve zêde bike. Hevî jî Xwedê.

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrî.

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mîr Celadet Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye
 Directeur Propriétaire : Emir Djêladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 1
HEJMAR 11
DUŞEMB
1 SIBAT 1943

RONAHÎ

ANNEE 1.
NUMÉRO 11
LUNDI
1 FEVRIER 1943

SUPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



DI WELATÊN ROHELATÊ NÎZING DE BÎRÊN GENÉRAL DE GOL
Klişa jorîn sergevazê Fransa şerevanî genéral de Gol û nîmîmendeyê wî
genéral Ketrû şanf dide. Her du genéral di bendera Bêrûte de cenkeştiyêke
Fransa şerevanî ziyaret dikin.



ŞAM — 1943
ÇAPXANA SEBATÊ

DEHBE Û NÊÇÎRVAN

Nêçîrvanek hebû, hero diçû nêçîrê û kewekî xwe dikuşt û tanî, dixwar. Şîva wî ew bû. Carekê ji cara du kew kuştin û hate mala xwe, rûnişt da ko wa bibirêje û bixwe. Di rovikî da devê dêrî û got ê: « ez î birçî me ». Xwediyê malê rahişte kewekî û da rovi. Rovi kew xwar û li cem zelamê xwe ma.

Roja dîtir dîsa ew zelam çû nêçîrê û sê kewê xwe kuştin û hate mal. Yek ji wa da rovi û dido danîn ber xwe da ko bixwe. Di ji nişkê ve hirçekê da devê dêrî û gote xwediyê malê: « ez î hirçî me ». Xwediyê malê rabû kewek da wî ji. Hirçê şîva xwe xwar û li cem zelamê xwe di rex rovi de rûnişt.

Bû roja dîtir ew zilam dîsan çû nêçîrê û çar kew kuştin. Vegeriha, hat mal, yek ji wan kewa da rovi, û yek da hirçê û dido danîn ber xwe da ko şîva xwe bixwe. Di, şerekî da devê dêrî û gote xwediyê malê: « ez î birçî me ». Xwediyê malê kewek ji her du kewên xwe

danî ber şêr, û şîva xwe xwar .

Bû roja pêncê, sibehî şêr, hirç û rovi dane devê dêrî ko herin. Rovi ba kire wa û got: « Hon çîqas bê nan û xwê ne, divê em haltekê bidin vî camêrê ha, yê ko ev çend roj in, em hewandin ».

Şêr gote rovi: « Em çî xelatê lêkin? » Rovi go: « Emê jineke wî bînin » Şêr û hevalên xwe gotin: « baş e, ev tişteki hêsantî ye »


Vêca, paşî derketin ji derve, dîtin zelamek ciht dike, ber bi wî ve çûn û nîr û gêsînê wî jê standin û hatin anîn mala wî zelamî. Careke dîtir çûn rastî karwanekî hatin, rabûn mêlkê karwên hemîyan ji ber wan baz dan. Heywana, herçî mal û zengil û tiştê ko bi wî karwanî re hebûn, anîn mala wî zelamî.

Piştê rovi gote wa: da em herin keça hêkim ji xwediyê malê re, birevînin. Hevalê wî bi ya wî kirin. Rovi çîqas zingil hebûn bi xwe ve kirin û nîr û halet danîn ser milê şêr û hirçê û ew bû cihariyê wan. Bazihêkî mêlik hebû, ew jî di ser serê wan re difirî. Her çar ber bi bajarê hêkim ve çûn, xelk hemî hatin temaşa wan û keça hêkim derket serê banê xwe, da ew jî ve ecêba serê ecêba, bibînê.

Bazihê ko li banî difirî hate keçikê û ew li ser perê xwe kir û firî. Bi hevalên xwe ve batin cem zilamê xwe. Hêkim eskerek kom kir û çû ser wan da ko keça xwe bistîne û vegerîne û wa dehba hikuje. Esker hat û dora wa girt. Ew di hindirû da bûn.

Vêca rovi go: « Ezê ba kim roviya » şêr go: « Ezê ba kim şêra » Hirçê go: « Ezê ba kim hirça » Bazih go: « Ezê ba kim baziba » Heryekî ba kire miletê xwe û hemî hatin. Piştî ko hatin; vêca rovi çûn rext û qarîşê tîngîgê êsker xwarin.

Şêr çûne zelama, hirç çûn, zikê hespê êsker berdane erdê, bazih ji banî ve diçûn û serê êsker qul dikirin, dikuştin. Êsker hema baz dan çûn bajarê xwe. Dehban xatir ji xwediyê malê xwestin û berê xwe dan çiyê; xwediyê malê bi keça hêkim şa bû.



KELEDONYA NÛ

Keledonya-nû di Pastfi-kê de girav û mistemlikeke fransizî ye. Ev girav dîke-ve roavayê Ewistralyayê û bakurê Zêlanda-nû. Dirê-jahiya giravê 400 û pehna hiya wê 60 kilomêtir e. Girav nemaze ji berhatinên xwe ên madenî û cihê xwe ê ceşrafî bi ehemiyet e.

Piştî mîtarekê fransiz û eleman û japonan li ser madenên giravê hin imti-yaz xisti bûn destên xwe. Lê piştîre firensizên giravê qulbiriya xwe ji Vişiyê

kirine û derbastî tayê gene-ral de Gol bûne û bendera giravê dane bin emirê hevalbendan. Ji xwe di giravê de bi tenê bajarek heye, Nomya, û bender li ber wî ye. Bendera Noma-yayê, berê wargehê stola firensizî bû. Îro stolên in-giliz û emêrikani tê de lengerandaz in û herci balafirên avin yên ji San-fransiskoyê tèn lê datinin.

Emêrikaniyan gava dirêji giravên Silêman kir ev wargeh gelekî bi kêrî wan hat. Îro jî gelekî bi kêrî wan têt.

Di giravê de nemaze

ntkel, krom û manganêz zehf in. Li salê deh hezar ton ntkelê helandî û sed hezar tonî bêtir krom jê dertêt. Ev mademên ha îro, tev de diçin Emêrikê û di çêkirina hacetên cengê de têne istifmal kirin.

Av û hewa giravê ge-lekî xweş e. Bayê wê çî sar, çî germ e; wek bayê Ew-ropa nivro ye. Erdê wê çiya û naval in. Di wan newalan re çemine zelal diherikin. Ava wan çeman ewçend zelal e ko mirov sûretê xwe û yên zil û darên dorê tê de dibîne.



TANGÊN EMÊRIKANI LI BAKURÊ ÎRLANDÊ DI TALIMÊ DE

GIRAVÊN

BEHIRA — SIPI

Di hejmara Ronahiyê a 9an de (rûpel: 8) me qala Behira-spi kiri û û bi kurtî dîroka wê û şerên ko tê de çêbûne, goti bû.

Di vê bendê de ji emê çêl li giravên wê behirê bikin.

Behira-spi behireke girft ye. Li bakûr û li bakûr-roavê bi erdê Ewropayê, li nîvro û nîvro roavê bi Asyê û Efrîqê û li rohelê bi erdên Ewrope û Asyayê dorgirtî ye. Ev behir bi hin avtengan digehe behirine din. Bi Cebeltariqê digehe Etlantikê, bi Derdanêlê digehe Behira-reş û kenala Swîşê wê digehine Behira-sor û Behira-hindî. Rûyê vê behirê 3081850 ktlomêtir çargoşe ye.

Giravên Behira-spi ên bingehîn ji roavê ber bi rohelê ev in:

BALEAR — Balêar arxîpêlek e. (ji koma çend giravan re arxîpêl têtê gotin) Giravên vê arxîpêlê ên bingehîn Majorka, Mînorke, Keb-rêre, Formantêre û Kônîgêre ne.

Li wextê berê û berî herkesî fênîkiyan dest danî bû ser van giravan. Piştî fênîkiyan û bi rêzê ve yewnanî, kertacî, romanî, ereb û li



Eskerên fransîzî xwe ji nû ve û bi tevdaneke xurt tev didin. Di Efrîqa bakur de firqeyên fransîzî ji nû ve gihane dijunên xwe û şerê wan dikin. Klîşa jorîn eskerîne fransîzî şanî dide. Fransîz di ber emêrikaniyan re derbas dibin. Eskerên emêrikani gorgirtî sitavan li wan dikin.


dawiye spanyolan Belêar vegirtin. Hetanî fro girav di de tîn spanyolan de ye.

Di wextê romaniyan de girav gelek şên bû bûn. Romaniyan bajarê Palmayê danî. Hetanî fro Palme merkeza Balêaran e.

Nifû-a Balêaran 275 000 rûniştiman in. Ev girav dikevin navbera Fransê û Efrîqa bakur.

Ji lewre van giravan ehemiyeteke eskerî heye. Girava Majorkê ji Spanyayê 133 û ji Cezairê 240 kilomêtirî dûr e.

KORSİKE — Korsîke giraveke fransîzî ye û ji peravên Franê 160 kilomêtir e. Tê de 298 000 peya dijtn. Korsîke bi spehftiya bergehên xwe bi nav û deng e. Rêl û dehlên wê zehf in û xweşmenzer in. Xelkê Korsîkê nijdevan û mêrine qenc in. Herwekî sinheta kurdmanean di welatê xerbiyê de eskerî û silehşorî ye, xelkê Korsîkê ji gava diçin Fransê dikevin sinhetine welê. Dîsan heye ko xelkê Korsîkê



Ji Tangên Ingilîzî Tîpekî Nû: Çorçiltang

di welatê xwe de, wek kurdmancan, gelekî bi hev nakin; lê derveyî welatê xwe li piştê hev radibin û ji hev hez dibin.

Korsîke ya talyanan bû. Di sala 1768an de Lwîsê 15 granê Fransê ew jî granê Cenevê kirî. Piştî salekê yanî di sala 1769an de fermandar û imperatorê fransîzan ê cihangîr Napolyon di Ajaksiyoyê de ji diya xwe bûye. Ajaksiyoyê merkeza giravê ye.

SARDÊNÛYE — Sardênûye dikeve nivroyê Korsîkayê û ya talyanan e. Her du girav gelekî nzingî hev in. Avtenga Bonifaçoyê wan jî hev dîke. Rûyê erdê giravê 24 100 kilomêtir çargoşe û rûniştimanên wê 880 000 in.

Ev girav bi madenên xwe dewlemend e. Tê de zîv, hesin, zirêç, zeng û madenine din peyda dibin. Ji wan pê ve di Sardênûyê de kevîrên nihiêt û mermer jî hene.

Ev girav jî mîna giravên Behira-spi en din jî wextê fînîkiyan heta qraliyeta Sardênûyayê ketiye destên gelek mîletan. Berî yekîtiya Îtalyayê welatekî biserxwe bû û qralê wê ê cihê hebû.

SÎCILÛYE — Girava Behira-spi a mezintir e. Rûyê erdê wê 25740 kilomêtir çargoşe û rûniştimanên wê 4 200 000 peya ne. Sicilye dikeve nivro-roavê Îtalyayê û bi avtenga Misînê jê vediqete. Erdê Sicilyayê erdekî bi nan e; nemaze erdên dora tendûreka Êtnayê. Tendûreka Êtnayê 3313 mêtir bilind e. Ev tendûrek carina difûre û ji devê wê agir û arav diherike.

Xelkê Sicilyayê çelîyên fênîkî, kertaçî, yewnanî, romanî û ereban in. Tîpê ereb û yewnanan jî her tîpî bêtir li wan xuya ye.

Sicilye di sedsalên paşin de û piştî ko ji destên ereban derket, keti bû destên normandiyan, spaniyan û fransîzan. Di sala 1861ê de girav bû milkê Îtalyayê. Merkeza giravê Palêrno ye.

Di vî şerî de dewletên mihwerê jî vê giravê gelekî istifade dikin.

PANTÊLARÛYE — Giraveke piçûk û ya talyanan e. Talyanan piştî ko ev girav asê kirine dibêjin: « Me jî Malteyek heye ». Pantêlarye dikeve navbera Sicilye û Maltayê. Ji a pêsîn bi 96 û ji a paşin bi 76 kilomêtiran dûr e.

Rûyê erdê giravê 83 00 kilomêtir çargoşe û nifûsa wê 8000 peya ne. Hemî mîletên



Xelkê Gîna-nû hatina eskerên hevalbendî bi req û govendan şahînet dikin

kişwerkişayên ko di Behira-spi re derbas bûne şopa xwe li ser xelkê giravê hiştine. Lê şopa erebî û efrîqî jî her şopê bêtir li wan di xuye. Xelk bi zimanekî col xeber didin. Ev ziman jî erebî û ji hin bêjeyên talyanî bîhevketî ye.

MALTE — Malte dikeve orta Behira-spi 690 kilomêtirî li nivroyê Sicilyayê û 200 kilomêtirî li bakurê peravên Tûnisê yê rohelê. Dirêjahiya giravê 41 kilomêtir in; pehnahiya wê di hin deran de digehe 27 kilomêtiran. Rûyê erdê wê 275 000 kilomêtir çargoşe ye. Malte arxîpel e; digel giravên dorê mesaha wê digehe 370 000 kilomêtirî. Nifûsa wê digehe 250 000î.

Xelkê Maltayê jî ji nijadekî col in. Lê wê dixuye ko xwîna erebî di ser xwînen din re xwe şanî dide. Di zimanê xelkê Maltayê de bêjeyîne erebî boş in; di sedî de heftê.

Maltayê di dora wextê zemanan de gelekî teq û req dîtine. Ingilîzên ko chemiyeta Maltayê jî mej ve bîr biri bûn, di sala 1802an da dest danîne ser û bi mîhêda Parîsê ya sala 1814an Malte bû milkê taca Ingilîstanê.

Di vî şerî, di şerê Behira-spi de Malte roleke mezin lêhistiye.

GIRAVÊN YONÛYÊ — Giravîne yewnanî ne. Ev arxîpel jî heft giravan bi hev dikeve. Girav

li roavayê Yewnanistanê ne. Di sedsala dwanzdehan de ev girav di destên talyanan ce bûn. Di sala 1815an de ingilzan ev girav ji talyanan standine û di sala 1864an de Ingilterê ev girav ji Yewnanistanê re diyarî kirine. Xelkê giravan yewnan in. Di hin deran de bi talyanî jî dipeyivin. Nifûsa wê arxîpelê digehe 106 000î. Di wê arxîpelê de Korfû bi spehîtiya xwe bi nav û deng e.

GIRÎT — Girît giraveke yewnanî ye û dikeve nîvroyê Yewnanistanê. Di tarîxa kevin de ev girav merkezeke medeniyetê bû. Bi rêzê ve Girît ketiye destên romanî, ereb û tirkî. Di sala 1824an de Girît bi ser Misirê ve da bûn. Lê piştê dîsa bû malê Tirkîyê û di şerê Balqanê de vegehiya xwedîya xwe, Yewnanistanê. Rûyê erdê giravê 8580 kîlometîr çargoşe û nifûsa wê 386 000 peya ne. Xelkê wê yewnan in; tê de hin tirk hebin jî. Lew jî li yewnanî xeber didin.

Mîrê Botan, Bedir-Xan beg piştî ko hêsrî ketiye destên tirkîan qederê 14 salanî di wê giravê de menfî maye.

DODÊKANÊZ — Yanî dwanzde giravan. Ev giravên ha heta sala 1912an di bin hikimê Tirkîyê de bûn. Di wê salê de ketine destên talyanan û di sala 1923an de Tirkîyê bi hakimiyeta talyanan mikur hat û ew venasî. Di nav

van dwanzde giravan de a mezintir Rodos e. Rodos jî peravên Tirkîyayê 18 kîlometîran dûr e. Xelkê wan giravan yewnan in û qederê 120 000 peyayî ne.

Talyanan Rodos asê kiriye û tê de wargehên stol û balafrîan çekirine. Rodosê di tarîxa kevin de gelek teq û reş dîtine û tê de medeniyetîna rabûne.

QIBRIS — Ji aliyê mezinahiyê ve Qibris di Behira-sîf de girava sîseyan e. Dirêjahîya wê 220 û pehnahîya wê 60-80 kîlometîr in. Nifûsa wê digehe 350 000î. Di sala 1878an de Ingilterê Qibris jî tirkîan standiye. Li wextê berê Qibris wela-teklî bi ser xwe bû; fênkî û yewnaniyan tê de hikûmetîna çekirine. Miletên ko jî Asyê derbas Ewropayê bûne û yên ko jî Ewropayê avêtine ser Asyayê di wê giravê re derbas bûne. Nemaze di wextê ehlê selîbê de şevalyayên Qibris û Rodosê deng da bûn.

Xelkê giravê yewnan in. Tê de tirk jî hene. Girav dikeve devê xelca Skenderonê û nîzîngî peravên Tirkîyê û Sûriyê ye.

ELBA — Giraveke piçûk e, nifûsa wê 25 000 peya ne. Ev girav di sala 1814an de bû bû menfa Napoléon. Ji ber wê yekê wê giravê di tarîxê de deng daye. Ji sala 1860î ve girav di bin hikimê talyanan de ye.



DI INGILISTANÊ DE DEFTERXANEKE STATÎSTIKÊ, YANÎ HEJMARTINA PEYAN AN TIŞTINEDIN

ÇEK

Û WASITËYÊN GUHASTINË ËN NÛ

Gava xwendevanên me vê sernamê bixwînin ewê bibêjin gelo şerevaniyan dîsa çi hacetke nû îcad kiriye. Ew hacet vê carê li şûna ko li ezmanan bifire an di bin bihirê re here gelo ewê di bin erdê re biqeliqê?

Vê carê emê çêli wasiteke welê bikin ko li gora sernamê heye ko qet nayete bîra wan. Belê wasita ko emê îro qala wê bikin ga û gamêş in.

Herwekî xwendevanên me dizanin japonan birekî welatê çîniyan vegirtiye. Ji alîkî ordîwa Çankeysek û ji aliyê nijdeyên çîniyê re japonan dikin.

Nijdeyine çîni li çeraxa çelekê danî bûn. Eskerine japonî jî hatin û li milê golê ê pêşniqabil danîn. Japon bi çîniyan hesiyan; lê ewçend guh ne dan. Ji ber ko dizanin ko cem nijdan ne kelek ne jî fi-lûqe hene. Ji lewre çîniyan nikarî bûn xwe bigehînin japonan. Di bejê re jî, ji ber ko gol dirêj bû di navbera japon

û çîniyan de rîya du rojan hebû.

Ji ber vê yekê japoniyan li çeraxa avê bi tenê nobetdarekî danîn û raketin. Lê çîniyan beriya nivê şevê xwe gihandine japoniyan. Çawan û bi çi awayî.

Belê nijdevanên çîni gamêşên gundên dorê dane hev, li wan siwar bûn; mîtralyoz û cebîrxaneyên xwe jî li gamêşan kirin û dan avê. Çîniyên ko bi vî awayî li avê derbas bû bûn bi ser mifreza japonî de girtin û piraniya eskerên mifrizê kuştin.

GIRAVÊN FICÎ

Herwekî xwendevanên me dizanin emêrikanî xwe kar dikin û dikin rabin êrtîşê û tiştên ko di Pestîfikê de ji dest dane bi şûn de vegezinin.

Ji bona vê yekê jî emêrikanîyan di nivro Pestîfikê de wargehan saz dikin. Di vê navê de eskerên emêrikanî dake-lîne giravên Fici jî.

Ev girav dikevin bakurê Nûzelandê û nivroyê giravên Silêman û ji du sed giravî bi hev dikevin. Nifûsa giravan 210 000 rûniştiman in. Nivê wê nifûsê xelkê cih, nivê din hindistanî ne.

Erdê arxîpêlê erdekî bi nan e; nîmaze mozên wê bi nav û deng in û di tûderên din de peyda nabin. Lê heywanên wê ne ewçend zehf in. Bi tenê di rêlên wê de teyrine xerîb tene dîtin. Kaniyên wê boş in, hin germavên wê ên madenî jî hene.

Wextê ewropayîyan ev girav keşîf kirine seyahekî bi navê Delmût di heqê wan de kitêbek nivisandîye û tê de



ŞOPA BALAFIREKÊ YA KO JI SER QÛMÊ BI HEWA DKEVE

tiştine ecêb gotine. Mesela Delmût digot ko marên wê arxîpêlê direqesin, teyrên wê bi guhan in û çeliyên xwe dimêjînin; meymûnên wê xwende ne û ji hevûdin re mektûban dinivîsin; jinên wê bi sê çawan û mêrên wê bi çar destan in. Dîsa Delmût digot ko darên wan giravan bi roj şîn û bilind dibin û bi şey vedigerin ser kokên xwe.

Lê piştê hate seh kirin ko seyah Delmût jî Stenbolê wê ve ne çûye û kitêba xwe di otêleke Kenstantîniyê de nivisandîye. Ji lewre yên ko kitêba wî xwendin û piştê diçûn Ficiyê ev tiştên xerîb ne didîtin.

bù à topén wê hin ne dişuxultin. Lêbelê zirehpoşê lez da bù xwe û xwe li dengê topan girti bù. Di noqar û du bertorpiyoran ji da bù pêşiya Lenkolenê.

Ji nişkekê ve pêşiya vaporê reş bù; teqin bi dorê ket û stünine avin di rex noqarekê re rabûn. Balafirên dijmin bombe berda bûn noqarê; lê nikari bûn bihingêvin.

Lenkolenê ji dest bi agirkirinê kiri bù. Min li dora xwe dinihêrt lê tu tişt ne didit; bi tenê gumêna topan û vingêna gulan. Lê pîstre min zani ko dijmin li aliye bakur e û bi mijike sinai xwe ji me ve artîye. Hêj em ji hev bi deh milan dûr bûn.

Saet hêj ne bù bù sisê, sisê kêm çend deqîcan. Şer germ bù. Balafirên rûyê ezmên girt. Vê carê topên Lenkolenê ên balafirşiken ji xwe tev didan. Bombeyên dijmin dûri me diketin. Digel vê hindê Lenkolen li ser hewdê xwe dihejiha. Masa li ber min wergeriya û ji min bi dûr ket.

Dinya zelal dibû, min dora xwe çêtir didit, mîja japonan a sinhi ji belav bù bù. Bist û heşt cenkeşiyên japonî qewiswari qor girî bûn û şerê me dikirin. Çar zirehpûş di orta qewisê de bûn. Krewzoreke me e piçûk berê xwe da

bù qewisa dijmin û bêperwa diçû û bera keştiyên japonî dida. Di wê navê de keleheke me e frolek di ser krewzoreke dijmin re firiya û bombeyên xwe bera wê da. Bombek li krewzorê ket û krewzora bù du qet; wek zinareki şeqîti. Herçî krewzora me, ji nişkekê ve sekini û xwe li taniştê xwîl kir.

Dijmin ji nû ve xwe di paş perda mijê de vasart û keştiyên xwe xist nizameke nû. Keştiyên japonî ji hev belav dibûn û ji nû ve sisê sisê digihan hev. Lenkolenê ji nû ve lez da xwe û qesta neyar kir. Me li hev dixist. Qederê delî deqîçan topên her du aliyan bê etlahî agir kirin. Bertorpiyora ko Lenkolen dihemand birindar bù; lê bi birineke sivik. Min ji dûr ve du niqteyên reş diti bûn. Bawer bikin keptan ji ew diti bûn. Lenkolenê hêz da xwe û topên wê ên pêşin agir vedimistin. Niqte hin bi hin çêtir xuya dikirin; du bertorpiyoreên japonî bûn. Guleyên Lenkolenê li her diwan ketin. Yek di cih de bin av bù; a din xwe li ser milê xwe ê çepê xwar kir.

Piştî çarçek saetê kumandan Grant li deriyê kebîna min dida. Min destê kumandar girtin û guvaştin. Kumandar gote min: Her du ji bertorpiyorene giran bûn. Em gelek aciz kiri bûn; lê cezayê xwe ditiin.

Em ketin salona xwarinê û me parik nan xwar. Dijmin ji me ve bù bù. Mîjn ji kumandar pirsî:

— Tu xesar gihaye xelkê me

— Zabitêk û du der-yavan birindar bûne; lê birinên wan sivik in.

— Ez dikarim ji rojnana xwe re bidim zanin ko me şerê giravên Silêman kar kiriye?

— Herçend şer hêj ne qediya be ji tu dikari bolê bêji. Dijmin du caran şikest; lê disan wê bê û ewê li me bigere. Ū carê ko wê bê ewê Lenkolenê di pêşiya de peyata bike.

Lê dijmin li me venegeriya.



KURÊ GENÊRAL MARK ARTÛR DI NAV GULAN DE



BALAFIRANI KÏ FRANSA ŞEREVANÏ LI BER BALAFIRA XWE



Eskerên Çehistanê yê ko jî welatê xwe revîne û xwe gihandine erdên welatên hevalbendan, îro bi hevalbendan re şerê neyarên xwe dikin. Klîşa jorin topçiyane çek xani dide.

HËSİRËN KO

DIXWESTIN MIHAUZEN XWE HËSİR BIKIN

Mixabirê rojnama inglîzî « Deylî Eksprês » Mr. Alan Morhîd jî Efrîqê diçû Emêrîkayê. Di vapora ko Mr. Morhîd siwar bû bû de 1000 hêsîrên elemanî jî hebûn. Inglîzîzan ew hêsîr di qada şerê Misîrê de girti bûn û ew dişandin Emêrîkayê. Mr. Morhîd di bendeke xwe de qala wan hêsîran kiriyê û gotiyê:

— Gava hêsîr li vaporê siwar bûn, bi lingên wan ve solên sehayê û li serê wan şef eyên rojsîken hebûn. Tev de 1000 peya bûn. Stranek distrandin û digotin: « Em serê Inglîterê

dikin ». Biawinê keptan yê ko li rex min sekinî bû gote min « Tu dibînî çîşas bi rik in, wek serek û mezinên xwe ».

Me Behîra sor qedandî bû û em derketî bûn Behîra hindî. Yekî jî deryavanan, yê ko jî nivroyê Efrîqayê û jî nijadê elemanî bû gote keptan: « Mîn jî hêsîran sê peya ditîne ko bi hev re dişexvîln. Yekî digote hevalên xwe, piştî sê saetan emê jî hêsîriyê xelas bibin û mihaufîzen me wê bibin hêsîr ».

Li ser vê yekê keptan herçî jin, zar û zêç û rêwingiyên din tev de anîn salona xwarinê. Çend zabî û deryavan ketin nav hêsîran û ew û cihê wan velo kirin. Li cem hêsîran silehine neadeftî hatine ditîn: lingên kursiyân, rotîkên hesinî, kêrên xwarinê. Ji van pêve hêsîrên elemanî cûzanên jîlet jî kiri bûn nav



DI GIRAVEN SILEMAN DE PIYA DEYEN EMERİKANÎ

kartolan. Ev kartol jî wan re bû bû bombayên destan. Ji milê din hêsîran bêrikên xwe jî xwê û biber tijî kiri bûn. Dema pevçûnê de hêsîran ew li çavên mî şîzan de bîreşandana.

Di nav hêsîran de kumandarekî noçaran hebû. Ewî xerîta vaporê çêkiri bû û ew da bû serekên kewan. Li gora wê xerîtê her kewtê cihêkî vaporê wê vegirta.

Plana wan jî, ev bû: Bîrekî hêsîran wê dafta makînan vegortana û heçî makînist in de girêbidana. Bîrên din zabî û deryavan de hepis bikirana. Kumandarê noçarê wê bibiwa kaptan û berê vaporê de bidaya Medegeşkarê. Lîngê Medegeşkar bêj ne ketî bû destê hevalbendan û di bin bikimê Vîşiyê de bû.

Heke ew deryavane elmanînijad pê nehe. siya bû ya piştî du saetan wan hêsîrên elemanî

wê rahiştana zabî û deryavane vaporê.

Icar keptan rabû hêsîr jî hev cida, kom kom di enbarên vaporê de hepis kirin.

Piştî du rojan germê li me şidandi bû. Kaptanê emîr da û hêsîr bi dor derdixistin pîra vaporê da ko bihîna xwe bidin.

Nivê şevê bû. Ji nişkekê ve me dengê boriya talûkê kir. Vapor sekinî. Em hilkişiyân jor. 150 hêsîr yên ko li ser pîrê bûn, tev de xwe aveti bûn behîrê. Keptanê şîlûqa daxistin avê. Deryavanan ceħda xwe kir û jî vî 150 hêsîrî 49 peya xelas kirin. Ên mayîni di nav pelên behîrê de wînda bûn.



PEYAYËN KELEHERE FİROLEK BERİYA FİRİNÊ

MEVANDARIYA TALYANAN

Di serê Elemeynê de mifrizekî inglîzî, piştî eşayê derketî bû keşfê. Mifrizê ji heft nefer, çawşek û ji zabitekî bi hev diket. Mifrizê di tariya şevê de riya xwe wînda kiri bû û ketî bû ser qerekeke talyanî. Çawîşê mifrizê Con Roklî ji mixabirê Nyûz Kronikil re biserhafiya mifrizê jîse kiriyê û gotiye:

— Gava em bi rê ketin hêveke çardeşevî qûma sehayê wek pîpoqên şikesî dijirîsand. Me cilên eskerên elemanî li xwe kiri bûn. Digel vê hindê me xwe li erdê ramedandî bû û em bi zikiskî diçûn. Heta saet dehan dinya ewçend ronî bû qey roj hêj ne çû bû ava. Lê ji nişkekê ve ewiran rûyê ezmên girt û dinya bû tarî. Bi hevalekî me, Tom Klok re cihetnimayek hebû. Me hindava xwe pê rast dikir. Li ne bû bû nivê şevê û cihetnîma jî nena dişikullî. Hevalekî me xwe da ber û bû rêberê me. Jê ve welêye ko riyên sehayê nas dîke û dikare me vegerîne xetên me.

Me berê xwe da bû nivroava û qedere du saetan em bi rê ve çû bûn. Me bala xwe



KEÇIKÊN BRAZÎLÎ WEK ESKERAN DI TALÎMÊ DE

dîda û didit ko me nizingî li xetên xwe ne dikir. Em sekinîn. Zabîte me digot, ez ditirsim me riya xwe şaş kiriyê. Hêj zabîte gotina xwe temam ne kiri bû ko em bi dengekî hesiyân. Wî dengî bi talyanî digot: « Ew kl ye? ».

Me tev de xwe li erdê dirêj kir. Hevalekî me, Cîmfî, yê ko bi elemanî dizanî bû, digotê zabîte: « Heye ko talyan jî me bêtir in; me riya xwe jî şaş kiriyê; destûra min bide ez bi wan re bi elemanî baxêvim. Heye ko bi vî awayî em ji wan safî bibin ».

!erîya ko zabîte li Cîmfî vegerîne dengê talyanî jî nû ve rabû: « Hon kl ne, ezê mîtralozê li we girêbidim ».

Cîmfî bi elemanî li wan vegerand: Em beval in, heyl Hitler, heyl Dûçe.

Talyanî li me vegerand: Hon bi xêr hatine; kerem bikin werin ber vî agirî; em tev de parîk nan bixwin.

Em ber pê çûn. Talyanî di kortalekê de agir dada bû û li dorê rûniştî bûn. Ji ber me ve rabûn û cihî şanfî me dan. Em tev de rûnî tin û me cîxareyên ko talyanî jî me re da bûn, berdan. Talyan jî me bêtir bûn û di cihêkî asê de rûnî ti bûn. Diwîya bû em biş-texiliyana û me al û xatir jî hev bipirsîyana. Lê ji Cîmfî pê ev, tukesî bi elemanî ne dizanî bû. Heke yekî ji talyanîan hi elemanî bizaniya û bi me re xeber bidaya meê çi bîkîra. Zabîte me rabû bi zabîte talyanîan re bi fransîzî xeber da. Ji xêra Xwedê re ewf jî bi fransîzî dizanî. Bi vî awayî me ew talûke jî derbas kir. Me hin kilor û çîrok jî xwarin û qedere çil de îfan em li nik hev rûnî tin.

Di vê navê de çawşekî talyanî çavên xwe li me gerandî û got: Ecêb hevalên me jî elemanî bêtir dimînin inglîzîzan an xelkê Ewropa bakur.

Em tev de kenîyan; bi kenekî dirêj û bêptvan. Ne nikarî bû em tiştêkî din bikin.

Li ser vê gotinê me lez da xwe û me jî mêvandarên xwe xatir xwest û em bi rê ketin. Lê vê carê me riya xwe xweş nas dikir. Ji ber ko talyanîan gava zanî bû ko cihetnîma me xirab bûye; jî me re cihetmayek jî da bûn.



SERGEVAZ GENÉRAL DE GOL DI TEFÎŞÊ DE

SERMA KO CANÊ MIROV DIŞEWITINE

Rojnamevanekî swêçî di eniya şerê ûris de qada Qevqasê ziyaret kiriye û di vê babetê de, di rojnama xwe de bendin nivîsandine. Roj-namevên di bendeke xwe de gotiye:

Emê biçiwana gundekî welê ko çend caran xwediyê wî hati bû guhartin. Ew gund ji destê ûrisan keti bû destê elemanan û piştê dîsa vegeriya bû destên ûrisan.

Ji wî gundî re bi tenê riyek hebû. Ew rê ji di bin barana berikên dijmin de bû. Ji ber ko qesira raserî gund wê rojê di destên elemanan de bû. Rê cemedî û qeşa girti bû. Di ser wê qeşayê re çayîrî zehmet bû. Piştî mîdekî me terka rê da û em ketin zeviyên dorê. Heriya zeviyân ji qeşayê sivikîr bû. Di zeviyân de lexem jî hebûn; lê em ji wan ne ditirsyan. Ji ber ko ew bi tenê bi barekî 500 kiloyî an jê girantir ditirsiyan. Herçî em, di nav me de tu peyayê bi 500 kiloyî giran nîn bû. Ji lewre me bê tirs pê li cihên lexeman dikir.

Piştî çarîyek saetê em gihastine gund û ketin xaniyê pêşîn. Di wî xaniyê de zabitekî ciwan û çend esker hebûn. Ji derve û li nîzîngî xênî holikekê xuya dikir, holika dîdevan. Di bin holikê re zêrzemînek jî hebû.

Zabîtê kewtê digotê min: Tu dibînî niho rahetî û hêsahî ye. Hetanî ko dijmin xwe tev bide. Ev bûnc deh roj, em di wî gundî de ne. Di van deh rojan de, em saetekê jî di xew re ne çûne. Dijminê me ê pêşîn kênxewî ye. Mîna

ko em şerê elemanan dikin, şerê wê jî dikin û li hêviya wî kewtiyî ne ko wê bê û me biguhêrine. Te temaşa erdê kiriye. Her tişt di bin herf û qeşayê de nixumandî ye. Bi şev serma di bin sîfrê re digehe bîstan. Hîngê nobetdarên me nema debar dikin û li nobetê ji saetekê bêtir nîkarin bisekinin. Em di zanan ko di sermê de diranên mirov dirîkrikin. Lê cem me, ev tişt nema çêdibe. Ji ber ko argûşkên me ji sermayê dicemidin û venabin. Tiliyên me jî welê...

Zabît banî eskerekî xwe kir û got: Aleksî were hire.

Ji oda rex xortekî dirêj derket û li pêş zabîtê xwe sekînî. Zabît got ê: Ka destên xwe veke.

Aleksî destên xwe vekirin. Kefên destên wî cih cih reş dikirin. Te digot qey şewitî bûn. Beriya ko ez bipirsim zabît gotê min: Bivê nevê te şewata êgir ditiye. Belê agir bi canê mirov bikeve û canê mirov dişewete. Lê destên vî eskerî ne jî êgir lê ji sermayê şewitine. Şevdî Aleksî di wextê nobetê de sehwirek ditiye, rahîştiye tîfinga xwe û qedere sê deqîtan agir kiriye. Gava tîfinga xwe ji dest daniye, ditiye ko destên wî şewitine. Hesinê tîfingê ew çend sar bû ko wek perengekî destên Aleksî sotin.

Min destûra xwe jî zabît xwest û ez hilkişiyam holika dîdevan. Dîdevan bi min hesiya be jî deng ne kir. Min got ê: Kerem bike, bihêle ez jî bi dîrebinê temaşa bikim.


Nobetdar awirek da min û bédeng jî ber dîrebinê rabû; ez ketim şûna wî. Min li qesirê nihêrt. Li banê qesirê jî nobetdarekî elemanî hebû. Ew jî bi dîrebinê xwe li me dinihêrt.

Mîdekî xweş ez li ber dîrebinê mamî û min temaşa qesirê û nobetdarê elemanî kir.

Nobetdarê rûsî destekî xwe danî bû ser milê min û ji min re digot:

— Ji kerema xwe dîrebinê bide min. Dewriyeke elemanî jî qesirê bi der ketiye û ez wê nema dibînim.

Min dîrebinê da nobetdar û ez vegeyiyam nik zabît. Gelek ne bori me dengê tîfingan bihîst. Dewriye rastî hev hati bûn û li hev didan.



QEWETÊN EMÊRIKÂNÎ DI PESÎFÎKÊ DE DATÊN ERDÊ DIJMIN

KEÇIKA KO

JI EMELAN RE INÇIL Û TEWRAT
DIXWEND

10ê Hîzêrana sala 1942an bû. Midrê bercasûsiya emêrîkanî herçê gerîndeyên fabrîkeyên cengê hene anî bûn cem xwe. Midrê bercasûsiyê talimat dida gerîndandan û ji wan re digot ko: qenc guhdarî fabrîkeyên xwe bibin û nehêlin tu kesê biyanî pê li erdê fabrîkeyên we bike. Di nav gerîndandeyan de Mr. Kraft gerîndandeyê fabrîka wezareta herbiyê jî hebû. Di wan rojan de jî di fabrîka Mr. Kraft de motorên balafirên Libêrator çêdikirin; motorine nû, Mr. Kraft li dawiya hevalên xwe û gava ew û midrê bî tena xwe man; rabû û jê re got:

— Piştî gotinên te ez nûka li tiştêkî ko di fabrîka min de çêdibe hişyar bûme. Divêt ez wî tiştî jî te re bibêjin. Ev bû midwayê keçîkeke delal li heftê du caran têtê fabrîkê; jî emelan re inçil û tewratê herwe belav dîke. Carekê min jî guhdariya wê kir û jî dil ez li ber ketim; hindik ma ko es bigirîm. Lê ev bûne du hefte ko nayete fabrîkê. Dibêjin



ZABITÊN EMÊRÎKANÎ ESKERÊN ÇÎNÎ TALÎM DIKIN

ko nexweş e. Emele jî bêriya wê dîkin; li ber dîkevin, tu bê qey tiştêk wînda kirine.

Midrê li Mr. Kraft vegevand û got: Ka salîxa wê bide min:


Mr. Kraft: Porzer û çavheşin, bejinzirav, enîfreh, keçîkeke bêqeder bedew....

Midrê: Tu jê ketiyî şîkê?

Mr. Kraft: No, bi tenê ez dixwazim te serwest bikim. Heke te divêt jî niho û pêde ez nahilim ko ew bêtê fabrîkê

Midrê: No... jî ber-vajî ve, divêt keçîk têtê fabrîkê. Bi tenê min jî te divêt ko destûra min bidî ez du memûrên xwe di şikilê emelan de bexim fabrîkê.

Mr. Kraft vegriya fabrîka xwe û li hevîyê ma. Li 22ê mehê, piştî nivro keçîka inçilxwîn jî deriyê fabrîkê ve da û ahî bi koma emelan ket. Emelan dor lê girt û li siheta wê dipir-sîn. Keçîkê digot ko bi arsimeke xurt keti bû û jî lewre nikarî bû bihata fabrîkê. Îro jî hati bû da ko xatir jî mirîdên xwe bixwaze. Ji ber ko pi. tî çend rojan bi we-zîfa tehsîrê ewê biçîwa



DESTIGAHEKE FABRÎKA GULE Û OBÛSAN

Kalforniyê. Ji milê din Martayê — navê keçikê — dixwest resimê mirîdên xwe bigire û vê xatirê bi xwe re bihe. Ji xwe beriya hingê jî û di dema xebatê de resimê wan ne girti bû.

Emele pê qail bû bûn. Lê serhoste qail ne dibû û digot: li gora nizama nû di hundirê fabrikê de resim-girtin bend e.

Emele li serhoste rabûn û jê re gotin: Em jî bi wê nizamê dizanin. Lê ew nizam ne ji bomibe şiranê jî bo casûsan e.

Nemaze, bi aîkariya her du emeleyên nû, emelan zora serhoste bir, herkes li pa mekîna xwe sekîni û Marta bedew resimê emelan û yê fabrikê girtin.

Xeber gihasti bû Mr. Kraft jî. Ew jî ji defterxana xwe daket destegahê û tev de mibeşîra delal heta deriyê fabrikê derbas kirin.

Martê piştî ko jî mirîdên xwe xatir xwest li timobîlekê siwar bû û berê xwe da stasyonê. Her du emeleyên nû di vê navê de cilên xwe guhartî bûn û da bûn pey Martê.

Li stasyonê mirovêkî jî xwe hejkirî bi çavekî wî ve monokil, li hêviya Martayê bû. Marte û mêrik li trêwê siwar bûn. Piştî çarêk saetê Marte jê peya bû û trêw bi rê ket.

Her du emele jê ne digeriyan. Dema Marte gihaste derveyî stasyonê her du emelan nîzîngî li Martayê kirin û ew sekinandin. Martê hingê emeleyên xwe nas kirin. Çak Raft û Bob Mak, her du jî polîsên sirf.



VELKÊ GINA-NÛ DI FIZMETA HEVALBENDAN DE

Polîsan bi telêfônê elam da stasyona din û mêrik jî dane girtin. Her du jî casûs bûn. Di çentê mêrikê de fîlma ko Martê di fabrikê de girti bû dîtin. Ji fîlmê pê ve kaxezine din jî kelin destên polîsan. Mêrik di hepîsxanê de bi kêra ko di navrana xwe de veşartî bû intihar kir û sirên xwe ne dane der.

Herçî Marte mikur hati be jî bi gelek tiştan ne dizanî. Sir di mêrikê de bûn Marte dostika wî bû û li gora talimata ko jê distand dixebitî.

Marte jî bavekî iswêçî û ji dêke elemanî bû bû. Di nav kaxezên mêrikê de resimekî Marta delal jî peyda kirin. Di wî resimê de li destê Marteyê li şûna incilê cixareyek hebû. Di bin şortekî re (pantorekî kerî, heta bi ejnûyan) jî çîpên Martê ên delal xuya dikirin.



QEWETÊN FRANSA ŞEREVANÎ DIGEL ESKERÊN HEVALBENDAN DI QADA EFRÎ JAYÊ DE

160 HEZAR BIJÎŞK Û PÛNC MLYON BIRÛNDAR

Welatê ûris erdeki bÛpivan e û şeş-
yeka dinyayê tne pÛ. Di wi welatê
de qederê 200 milyon
peyêke dijîn. Wi we-
latt û wi xelki di vî
şerî de xariqeyin
şanî dane. Roja ko
elemanan digot me
ûris safî kir, sibetirê
ûris ji berê xurtir
derdiketin pêşiya ne-
yarên xwe û bi awa-
yine no şerê wan
dikirin.

Herweki xwen-
devanên me dizanin
êrişa Zivistanê dest
pê kiriye û ûris di
tevayîya eniyê de
elemanan bi şûn de





şvedigerînin. Lê ji her tiştî xeribtir ev
hejmar in ko vê paşiyê li Weşingtonê
hatine belav kirin.

Li gora hawirên rûsî yê Weşing-
tonê ji birindarên ûris 2 milyon peya,
piştî ko bîrînên wan
di xestexanan de sax
bûne, vegeeriyane
eniyê û ji nû ve
şerê dijminên xwe
dikin.

Ji milê din di xes-
texanan de 3 milyon
birindar hene, 160000
bijîşk yanî diktor
wan birindaran der-
man dikin û 500000
nexweşnêr; çî jin, çî
mêr li wan miqate
dibin.

Li ber van hej-
maran ma eqil çar-
wan naşekine.

KLÎŞA JORÎN BIREKÎ BELEDIYA LONDRE A BI NAV Û DENG ŞANÎ DIDE



HEJMARA HAWARÊ A 52AN LI 20ê KANÛNA PAŞIN BELAV BÛYE; LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÛNIN
Gawestiyayî, Civat, Heke te divêt te dost hebin, Keleha Şahîn, Diwana Melê, Pendname
Şahê Ecem, Mirêsan û Gawestiyên wan, Gelo Eem Ji Zêr e? Beyta Kewê, Heyat
Pira Cenderê, Marşa Keyanî, Rojên Derbasbûyî, Xanimêke Ciwan, Roviye Ker,
Le Mariage Chez Les Kurdes.

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrî.

Xwedî û gerinendeyê berspîsiyar : Mir Celadet Ali Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Dirêcteur Propriétaire : Emir Djêladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 1
HEJMAR 12

DUŞEMB
1 ADAR 1943

RONAHÎ

ANNEE 1
NUMÉRO 12

LUNDI
1 MARS 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



BIREK JI XORTÊN KURDÊN IRAQÊ ÊN XWENDA

Ev xortên ha birek ji xwendevanên me yên Iraqê ne. Van xortan ev resim bi hênceta cejineke mili ji çapxana me re diyari kiri bûn. Em vi resiml îro bi şahike mezin belav dikin. Xwedê wan zêde bike û ji milletê kurd re bihile.

Navên xotan ji milê rastê, ber bi çepê ve:

Rêza pêşîn: Mihemed Sidiq Tahir, Ehmed Mistefa Amêdî, Elaedîn Seîd, Şewket Ehmed, Mihemad Reşîd, Elî Hesen. — Rêza didowan: Smaîl Seîd Doskî, Ehmed Neman, Esker Şehbaz, Remezan Mihsin, Fazîl Seîd, Kemal Erbill.

Rêza siseyan: Ziya Xorşîd, Seîd Haçî, Izet Mistefa, Mihemed Seîd, Horşîd Hevlêrî, Ehmed Zeyno, Mistefa Brahmî, Hesen Haçî, Isam Hevlêrî, Hesen Hemîd.

DI VÊ HEJMARÊ DE

Roviyê şêr	Çirokbêj
Çetelê axê	Stranvan
Ji Honkongê	Silêmanê Ferho
Mehkema Hawarê	Ehmed Namî
Gelawêj	Ronahî
Mela Enwer	Ermeşanî
Min nizanî bû	Ûsîf Hecîhersan
Serbestî	Mela Enwer
Wa mîletê kurdî	Ehmed Namî
Mil û Zil	Herekol Azîzan
Nema dikarî bû	Cemîlê Tacdo
Gurê Pîr	Osman Sebrî
Tîştên rast	Hesen Hîşyar
Besta Welatî	Mela Enwer
Hinek ji Henek	Yarîker
Li Welatê Çînê	Osman Sebrî
Hindik Rîndik	Xeberguhêz
Mist-Awîk	Osman Sebrî
Çiroka Seyan	Nêçîrvanê Hawarê
Rojî	Bijîşkê Hawarê
Li şûna berêz	Hesenê Mistê

çavên wî sor bûn. Rojekê dît gava vaye rovik bi ser de hat ko ew ji we wî û wextê berê xerabtir.

Jê re go, bira tu çima wîlo séfil bûyî? Go, bira ma tu nizanî ko ev sala ha xêla ye. Go kuro, meyizê, tiştê ko ez ji te re bêjim li min vejerine. Go, belê ezbenî. Go, çavên min çawan in? Go, çavên te çavên roviya ne. Go, ne wîlo bêje. Go lê ez çî bêjim. Go, bêje çavên te çavên şêra ne; pûrta te pûrta wek singên di zirha ne....

Roviyê têr ew hin kir û wî ji mîna ê din gotî bû şêr jê re got û go serê te serê betla, lepên te lepên şêra ye.

Roviyê têr da pêşiyê ê séfil da pey, heta gihane mêrga selekûnê. Hema çawan gihan bergilê ewil, roviyê têr xwe zer kire paşiya wî. Go, belkî ewê weke şêr bergil bavêje erdê. Lê ne wîlo derket. Bergil hema pihînek li pêş çavê rovi da, ew li erdê dirêj kir. Hema roviyê di baz da û dûr ket û got: Wele bira mi dizanî bû tu ne şêr î, lê te xwe li ber çavên min dikire şêr. Min ji bi hêviya çênik goşt digot belê.

ÇIROKA KURDMANCI:

ROVIYÊ ŞÊR

Şêrek hebû. Carekê meyizand, gava, vaye rovik ji wê ve hat. Şêr jê re got, go rovik çima tu wîlo belengaz bûyî û pirça dûvê te weşihaye.

Go, ey siltanê heywana, ev sal xerab bi ser min de hat û ez wîlo şepirze bûm. Şêr go, gelo ko ez te têr bikim tu çî dibêjî. Go, pa tiştêk ji vê çêtir heye ko ez vê sala ha têr bixwim.

Şêr go, meyizne çî tiştê ko ez ji te re bêjim tu li min vejerine. Go, belê ezbenî. Go çavên min çawan in? Go, çavên te çavên şêran in. Go, pûrta min çawa ye? Go miwên te weke singên di zirhan sekinine. Go, serê min çawa ye? Go, serê te serê betla ye. Go, lepên min çawan in? Go, lepên te lepên şêran in.

Şêr go, de rabe bide pey min. Rovî da pey û çûn gihane mêrgêkê weke mêrga selekûnê. Malûm e ko hesp û hêstîrên hesinan lê de ne. Şêr bergilêk ji wan ên qelew eyîşand û lepek lê da, ji rovik re kire kerma goşt û gote rovik; go dê, vê carê rabe û bixwe û rûne û bixwe û herçî cara ko tu birçî bibî bi ser min de were. Rovî jî ke te ser goşt û xwar.

Rojekê, didiwan, siseyan, heta ko

STRANA KURDMANCI:

ÇETELÊ AXÊ

De lo lo lo

Hekîmo w' ez bi qurban ji dirziya Bîrîna bavê Mistê mede ber kêlan û derziya Bîra kwîr bi çaxê mixsî Mûradê malek şewîft Qûtf merhemê xwe hilant ji ber bîrîna bavê

[Mistê de reviya

De rabe siwaro, par n xweşo, sala tsal

[Bîrîndaro

Ji mi dixwaze tasek av, ji belekê herfê, ji ka-

[niya Stîmo

Zozan bişewite pir f saro

Hekîmo ji Helebê ji Hemaye

Bîrîna bavê Mistê xedar e, derman lê nayê

Ji fêza hetanî fêza

Bîrek malê me danfne zozanê jorî va bi rêza

Bîra ne Ferho be, ne zozan be, ne Silêv, ne

[Batîman be

Bîrîna bavê Mistê xedar e, dixwaze pelê pel-

[hewesê

Hey lê wayê!... bîrîna bavê Mistê xedar e, ji

[mi dixwaze dermanê vê dinyayê.

JI HONKONGÉ HETA BI NÜYORKÉ

Herwekt xwendevanên me dizanin Honkong li rohelatê Çîné giravek e. Ev girav mistemlike û di Pêşîfkê de wargehekî stola îngiltzî ye. Par japonan Honkong vegirt û herwekî adet e rajêr yanî tebeeyên dewletên dijmin, ên tê de, girtin. Di nav girtiyan de yekî emêrkani bi navê Jan Henrik Marsman hebû. Marsman xwe ji nav lepên japonan xelas kir û ji Honkongê revî. Marsman biserhatiya xwe di rojnama îngiltzî Saturday Evening Post de belav kiriye û gotiye:

Em hemî kiri bûn xestexanekê. Di nav me de rajêrên her dewletê hebûn. Di rojên pêşin de heçî biyanî, tev de girti bûn. Fermandariya japonî emir da ko herçî talyan, eleman, îswêçî, portigalî û xelkên giravên Filîpinê ne, serbest bişînin. Li ser pesteporta min moreke Filîpinê hebû. Min jî xwe re got, ezê carekê siûda xwe biceribînim. Min da xwe û ez çûm cem zabîtê japonî, yê ko peya jî hev dibijartin û hin serbest dihiştin.

Zabît gote min, tu jî xelkê kû derê yî?

Min lê vegerand û got, ez filîpinî me, jî kerema xwe fedkire mora pesteportê.

Zabît: Tu li kû jî diya xwe bûyî?

Min: Li Holendê, di Amisterdamê de

Zabît careke din li pesteportê fedkiri, da eqilê xwe, qey liştê ko min got serê wi girti bû. Paşê gote min:

— Holende şerê me dike, divêt tu herî Stanleyê (qerargeha hêşiran)

Min: Ez li te ecêbmayî diminim. Şevêdin kumandar gote min, jî ber ko ez filîpinî me divêt ez serbest bême berdan. Tu dixwazî min bişînl Stanleyê

Dawî, min zabît qanî kir. Hinek madê xwe kir lê westqak da destê min û got: Tiwê di nav bajêr de serbest bigert, lê di bin nezaretê de yî.

Pîştî saetekê min xwe gihande jînikê yê ko di mala xwe de ode kirê dikirin. Jînikê odak da min jî. Ez tê de cih bûm û li hevalên xwe ên çînlî geriyam. Hevalên min jî min re cilîne çînlî peyda kirin. Min hero ew cil li xwe dikirin û ez dixebitim xwe hînl wê girêdanê bikim û tê de wek çînikî xuya bikim.


Bi vî awayî ez gihastim 6ê Sibatê. Min dizanî bû ko heta çend rojan japonîyan di heqê me de qerareke qelî dê bidana û bivê nevê ez jî ezê vegeriyama hêşirgahê. Ji aliyê din sersala

çîniyan nîzing diot. Di rojên cejinê de çînlî jî cejinên xwe pêve bi tu tiştî mijûl nabin. Ji lewre diviya bû ez xwe bilezînim û rojêk bert rojêk bi rê bikevim.

Siûdê arlkariya min kir. Ez rastî çînlîkî welatjorî hatim. Camêr rabû ji min re 25000 dolar jî dan da ko bi rê ve arlkariya nijdevanî bikim. Min kir ne kir mêrik jî min senedek jî ne stand. Jê pêve mêrik gote min: « Tu xatircem be, ezê braziyê xwe bi te re rêkim; ewê te bigehîne selametê ».

Brazî jî wek mamê xwe camêr xuya dikir. Brazî plana rewa me jî min re da zanîn. Emê jî bajêr di rêke welê re derketana ko jî çînlî û japonîyan pêve jî herkesî re bend bû. Biyanîyê ko li ser wê riyê bihata ditin bi cezayê kuşînê wê bihata ceza kirin.

Li 10 Sibatê saet heşt û nîvan de brazî hate cem min. Min cilên xwe ên çînlî li xwe kirî bûn. Rêberê min brazî — ez wî holê bi nav dikim — li cilên min temaşî kir; ew binek edilandin, hewraniyê min li min şîdand û



Ji ber bégaviyên şer hikûmetê di Ingilterê de balavxaneyên herdayî çêkirine. Kebabî kincên xelkê xwe dibin wan balavxanan û tê de dişon.

em bi ré ketin. Bi timobleke postê em gihaştin derveyt bajêr û li wir em ji timobêlê peya bûn.

Qey rojêke zêwê bû. Xelk li hev giha bûn hev û təcirine çimê hûr-mûr difrotin. Em ketin nav xelkê û me li hûr-mûrên təciran temaşa dikir. Carê ko em di ber nobetdarên japonî re derbas dibûn me xwe xwar dikir û silav li wan dikirin.

Piştî saetekê em ji qerebalixê ji xelas bûn û derketin çolê. Me da riya çiyaki. Min dikir ez ji şahiyê bihina xwe bidim. Lê dengê motorekê kir, ko ez bihina xwe di xwe de bigirim. Kemyoneke eskerî da bû pey me. Me nizanî bû em çi bikin. Li milê rastê gornistaneke hebû. Me xwe bavêta gornistanê û me xwe di nav tirban de veşarta an me di rêveçûnê de dom bikira. Brazî qerara xwe da bû. Me xwe tev ne da; kemyon di rex me re borî. Em xelas bû bûn. No, min disan xwe lezandî bû. Kemyon ji nişkekê ve sekînt. Me nema dikarî bû lingên xwe ji ber xwe bavêta; çongên me şikestî bûn.

Em gelekî hêdî diçûn, lê disan me nîzîngî li kemyonê dikir. Rexma seqemê me xwêh dida. Êdî japoniya li me dimihêrtin; niho wê dest daniyana ser me. Ji nişkekê ve motora kemyonê şixult û kemyon ji ber çavên me winda bû. Me bihina xwe da.

Piştî sih kilômêtirî em rast kûlîkt (emleyên hindî an çîniyên ko li cem ewropuyîyan dixebitin) hatin. Piştî ko branzî pê re da û stand, me zani ko mêrik xwe di qelafeta kûliyan de veşartîye.

Kûlî da pêşiya me û di şiverêkê re berê me da çiyê. Piştî çend kilômêtiran em gihaştine avahiya dibistanekê. Ji bên pêve her derên avahiya xirab bû bûn. Brazî ji 25000 dolarên me hin pere dan wî kûliyt.

Li hire em rast Dr. King hatin. Dr. King piştî ko di Honkongê de xebitî û jiyîna hezaran esker xelas kiri bû, ketî bû destên japonan. Lê ewl jî wek min reyek peyda kiri bû û baz da bû. Ûrisekf jî xwe gihandî bû me. Min navê Sêrj li ûris kiri bû. Bi vî awayî digel hevalên me ên çimê em bû bûn şeş peya.

∴

Piştî roavê rêberê me, em bi ré xistin û ji nû ve me da pala çiyaki. Piştî ko em li wî çiyayî qelibîn; daketin perê behirê; delaveki, wek benderekê. Tê de çend flûqeyên mast-vanan xuya dikirin. Heta kubariya sibê em li qeraxa behirê man. Bi şefeqê ve rêberên me em birin û em xistin enbara flûqekê.



Medeniyeta aletan çiqas pêş ve here jî destxetên kevin çimeta xwe winda nakin. Herweki di klîşa jorin de tete ditin xortine ingilizî yên ko di tersaneyên Ingilterê de dixebitin, bi rewjokan hewêdê flûqekê dikolin.

Filûqeke teng û rêvîn. Ji me re gotin bi roj qet melivîn û bi tu avayî xwe şantî medin.

Balafrêna japonî di ser benderê re difiryan. Motorbotên wan di benderê de diçûn û dihatin. Her kari bûn utziyê, li me bikin û me biblûn. Lê ne dikirin; ji ber ko flûqa me vala dihesibandin. Cihê me ewçend teng bû ko heke yekî xwe tev bi daya, diviya bû em jî wek wî bikin û xwe tev bidin da ko bi hev nekevin.

Mirin jî vî halt çêtir bû. Me ne dizant deryavanên me çûne kû û ewê kengê vegezin. Dinya bû bû nivro. Me li qeraxê dîyek dt. Me di dilê xwe de digot ev deryavanên me ne; taştîya xwe dixwîn. Niho ewê bèn û emê bi ré bikevin. Heyhat, dî wînda bû lê deryavanên me xuya ne kirin.

Saet bû çar. Disan dîyekî xuya kir. Dilên me jî nû ve bi imidê hiltavêtin. Lê tukeş xuya ne kir. Bû êvar, deryevanekî jî me re beroşek riz anî. Me digot, piştî şivê emê êdî bi ré

bikevin. Me kir ne kir deryavên devê xwe venekir û li pirsiyariyên me venegerand.

Li me bû şev. Di vî cîhê teng de ma kê dikarî çavên xwe bigire û di xew re here. Bi vî awayî û di ezabekî giran de me xwe gihandê 12ê Sibatê. Êvarê beriya hingûrê jin û zarowên çerfîyên ko jî gundekî nzing revî bûn dihatin qeraxa behîrê û didan ber qîran. Ji me re dan zanîn ko ev xelk jî gundê xwe revî bûn. Ji ber ko japon keti bûn-ê. Brazî zor da xwediyê filûqê, mêrik çû heta bejê, vegeriya û ihmalkarane gote me:

— Japonî têne....

Me tev de da ber qîran û got: Zû lenger rakin.... divêt em herin....

Lê bêfêde. Serekê nijdan goti bû ko ne wextê birêketinê ye. Ma jî xwe çî qewimî bû; japonî keti bûn gundekî, jî me bi sê kîlometrîran dûr. Lê heçî gundiyan ko jî gundê xwe revî bûn, diketin filûqan û jî benderê derdiketin. Me li wan temaşa dikir.

Reşaliya şevê li me daketi bû. Çend nijde bi tîfîng û bombe û mîtralozê çekirî hatin û li filûqa me siwar bûn. Lenger rakirin û filûqa me a bimotor xwe tev da. Di vî demê de motorbotekê japonî jî deveyî benderê xuya kir û xwe li me girt. Li ser vî yekê kaptanê me filûqa me gihandê cihekî nependî û li wê derê sekînî. Lê motorbotê ne da pey me. Rôj li me hilat. Me sêzdehê Sibatê jî di vî cîhê teng de derbas kir. Lê hal di me de ne ma bû. Em li mihafîzên xwe rabûn û daketin bejê. Wê şevê me hinek bihîna xwe da. Sibetirê sersala çîniyan bû.

Brazî bi deryavanan re kete cedelege no. Lê dawiyê zora deryavanan hir û bi nîvê şevê ve em bi rê ketin. Ji nişkekê ve hehir rabû û filûqa me di nav pêlên behîrê de wek qalîkê gwîzekê radibû û dadihat. Kaptan digot, di vî fûrtinê de em nikarin herin. Mêrik hej gotina xwe ne qedandi bû ko deryevanan lenger avêt. Pêlên behîrê em avêtî bûn cihekî tenik; filûqa me keti bû ser keviran. Em tev de daketin

behîrê û heta navtengê noçî avê bûn. Me dehîf da filûqê û me ew jî keviran xelas kir. Ji şermê ava behîrê li me dicemidi; qey derzî di canê me ra dikirin. Di vî halî de em vegeriyan kuna xwe û wek çentîne qeliyê jî hev zeliqîn.

14ê Sibatê, serê sibehê, di saet pêncan de min nema dikarî.

Min xwe avête bextê brazî û jê lava kir ko jî me re tevdfrekê bibîne da ko em bi rê kevin. Axir me kaptan bertîf kir û bi roj em heyirîn. Lê vî carê mijekê ker û giran li me daketi bû. Me dengê motorbotên japonî yên ko di nzingî me re diborîn, dikirin lê wan em ne didîtin. Ji ber ko mijê em nixumandî bûn. Me herê xwe da bû riya xelas û felatê.

..

Gava em gihastin wî milê avê me xwe li erdê dirêj kir û me bihîna xwe da. Te digot qey em jî nû ve hati bûn dinyayê. Erdê ko em lê bûn bi xirbeyan dorçirti bû. Çîfî û japoniyan di van deran de li hev xisti bûn. Hej nû me hala xwe dida ko rihên me dirêj bû bûn û em di gemarê de fetisî bûn. Ev hemî ne ewçend bi ehemiyet bûn. Lê min didit ko ez hi zintariyê ketî bûm.

Pişî çend saetan em bi rê ketin. Car caran em rastî çetan dihatin, çeteyên ko şerê japonan dikir. Brazî nizingî li serekê wan dikir û pelekî sed dolari dixiste destê wan û



GUNDIYÊN INGILTÊRÊ ZADÊN XWE TÎNIN BENDERÊ

em li wan dadiborin.

Sevekê em gihastine gundekî nivxirabe. Çend gundî lê vegeriya bûn û şûv radikirin. Yekî ji wan dermanek da min û pê zintariya min hinek çêbû. Lê sibetirê gava me da bû ser bazdonekekê ez şemitim û lingekî min xeliha. Gozika peyê min verim. Dr. King digotê min, qet mesekine hema bimeşe. Min ji welê dikir û gava em disekinfn Dr. lingê min miz dida. Em hêj bi temami ne gihasti bûn selametê. Ji ber êşa lingê xwe ez bêdî diçûm û min meşa hevalên xwe jî kêr dikir.

Rojekê em li qeraxa çemekî rûnişt bûn. Me dît kelekekê çûn digel du peyan xwe hilpesarte qeraxê. Em û kelkvanî em li hev hatin û em derbasî kelekê bûn. Sê roj û nîvan em di kelekê de çûn. Keleka me li saetê 3 kîlometiran diçû. Bi rê ve Dr. lingê min derman dikir.

Sevekê em gihastine xanîkî nehilweşiyayî û welke xwe ava. Xwediyê xênf bi pere em hewandin û nau jî da me. Qederê çar saetan em di wî xaniyê de man. Ewçend em sist bû bûn ko canên me ji rahetiyê qey diheliyan. Sêrj yê ko ji me hemiyan çêtir li ber êş û ezêb disekinî, derketî bû derve. Gava vegeriya, rûyê wî dîkenî. Sêrj ji me re filîqeke bi motor peyda kiri bû.

Ji nû ve em li ser rûyê avê de diçûn. Lê serê du saetan carekê motora me disekinî û diviya bû bihata tamir kirin. Ji lewre rojê ji 30 kîlometirî bêtir me nikarî bû em pêş ve herin. Bi peyari me dikarî bû rojê em 40 kîlometirî bi rê ve herin. Ji ber vê yekê meterka filîqê da û dest bi rêvçûna peyari kir. Herçend me nîzingî li armanca xwe dikir, ewçend lingên me sivik dibûn. Êdl em bi diyari bajarên keti bûn. Bajarên ko di bin hikimê ordiwa çûn de bûn.

Di yekê di wan bajarên de, li her deriyê xwarinxanekê de, min dît yek banî min dike. Gava ez lê zivirim, min di wî mirovî de dostekî kevin nas kir. Yekî çûnî bû, ketî bû çalafeta kûliyan Li Emêrikê di ûnîvêrsîta



ŞAGIRTÊN « BIRKBECK COLLEGE » DI DERSXANÊ DE

Harwardê de xwendî bû. Min jê re Sûng digot. Sûng yekî bankêr bû. Sûng bi derbeke welê xurt li polê min da ko hindik ma ez jî hîr ve biçim û bikevim erdê. Sûng pere dane min û her textlî xwarin û vexwarin ji min re anfn. Piştî xwarinê Sûng gotê min ko sibe kemyonek wê biçîwa stasyoneke rêhesina Çonkingê. Û herçend kemyon tîji biwa jî dikarî bû tê de cihêkî min peyda bike. Rêwingiyên kemyonê tev de peyayên wî bûn. Wan jî xwe kiri bû çalafeta kûliyan.

Min ne dixwest ez jî hevalên xwe veqetim. Lê min dixwest êdî ji pêrîşaniyê xelas bibim. Sibetirê em li kemyonê siwar bûn. Dîsan ez ketim cihêkî teng. Di nav sendûq û hûrmûrên din de ez dipelixim. Em hildikişîyan çîyan; dadiketin newalan; di nav herfê re derbas dibûn, diçûn.


Piştî du rojan kemyona me gihaste stasyona rêhesinê. Bert her kesî min xwe jê zer kir. Piştî sê rojan ez gihasti bûm medeniyetê, bajarêkî welê ko mirov jê dikarî bû li balafirvan siwar bibe.

Di balafirgeha Nûyorkê de jin û zarowên min li bêviya min bûn. Min dida eqilê xwe û ez lê ecêbmayî dimam: Belê rîya Çonking û Nûyorkê ji reya Honkong-Çonkingê kurtir bû ».


Eve biserhatiya rojnamevanakî emêrtkanî.

Amedî: 4 Kanûna-paşîn 1943

SILÊMANÊ FERHO



TERSANEYÊN EMËRİKANI JI PÊŞIYA VÊ SALÊ VE HERO SÊ VAPORAN DADIXIN BEHİRÊ



TANGINE EMËRİKANI DI HEWŞA FABRÎKE DE. PIŞTÎ KO MIHENDISAN EW SEH KIRIN Û CERIBANDIN EV TENGEN HA BI VAPORAN DÊ BÊNE RÊKIRIN QADINE ŞER EN DÛR

MEHKEMA HAWARÊ

Û DEYINDARÊ ŞERMENDE

Di bîst û çarê Çiriya paşin de, şeva Çarşenbê pişîf eşayê min dest avête kovara Hawarê û çend rûpelên wê bi kêf û eşiq xwendin. Ta ko saet bû çarê erêbî û Hawar welê li ser sînga min û ez razeham.

Dor nîvê şevê, ez di xeweke şêrin de bûm. Min dît ko du canbêzar bi kincên şidandî û şeşagirê her yekî ji wan di ber tilê wan de û sîngo bi serê tivingan li ber min sekinîn. Yekî ji wan kahezêke sor ji qewlikê xwe derxist û got, kerem ke seydayê Namî, û da destê min.

Dema min kahezê sor dît ji nişkê ve dilê min ricifî û xwêbdan ji eniya min dilop dilop niquti erdê. Lewra min dizanî bû ko kahezên sor nîşanê gunehkariyê ne. Belê ji neçarî min dest avêt-ê û lê nihêrt. Berf her tiştî çavê min kete ser hinek tîpên gir.

HAWAR MEHKEMA LIHEVHATINÊ

Dawedar: Hawar Deyindar: Ehmed Namî

Ji vir pêve min da û ne da min nema kari bû bi xwendina wê ve herim. Ji tîrsan her du çavên min tarî bûn û ava germ bi kabokên min de hat. Wek miriyê nû, serê wî li leheda kevê.

Min zanî ko gunehê min deyindariya Hawarê ye û bê goman ketim pêşiya her du canbêzaran. Bi zêvûrî û perîşani wan ez birim pêşberê hikîmdarê mehkema Hawarê. Lê ji şermizariya xwe her serê min tewandî bû. Min di ji nava civatê dengek hat:

— Namî ev mehkeme ne bes ji bo te çêbûye. Belkî ji te û xêrî te re, kesê dibêjê ez kurd im û deyindar maye. Tenê hatina te fro dîsa bi camêrî û serfirazî ye; serê xwe bilind ke. Mehkema Hawarê fro mehkema lihevehatinê ye. Belê, rojek wê bê ko ji sedî not mirov bi xweşî ji vê mehkemê dernekevin. Paşê wê mirinê jî bixwazin û mirin bi destê wan nakeve. Lê ji ber ko te xwe nas kir û zanî ko deyindarê Hawar û Rohnahiyê yî û xwe dest û dawî mehkema Hawarê kir, mizgîn ji te re. Bê cewr û cefa mehkemê tu efû kirî. Bes divê deyinê xwe û lêçûyê mehkemê jî bidî.

Min deyinê xwe herdu nas dikirin. Belê lêçûyê mehkemê min nizanî bû çiqas e. Paşê ji min re gotin. Xerc 200 qirûş in. Min di dilê xwe de got, eger cezayê min ev bê, nexwe ez bi tiştêkî hêsani û hindik xilas bûm. Spas pêşkêşî Xudayê xwe kirim, zû zû deyinê xwe û xercê mehkemê jî danîn ser masa serekwan, çûme destê wî û min got:

GELAWÊJ

GOVAREKÎ EDEBÎ Û SEQAFÎ MANGÎ KURDÎ YE

Çar hejmarên Gelawêjê, di du bendan de, vê peşiyê gihastîne destên me. Em rûpelên her du bendan ên pêşin yê vê kovara heja bi tîpên kurdî diguhêsinin vê stûnê:

Jimare 9 û 10. sal - 3. Eylûl û Teşrîni yekem 1942

LEM JIMEREYE DA:

Kurdî be naw û bang	Emin Zekî beg
Dwanzde nawdarekan	Osman Ibrahim
Cexrafayî Kurdistan	Mistefa şêx Nîmetilah
Kirdeweyî lawik	F. Hûşyar
Naleyî hejarîk	E. Çalak
Tefsîrî Quran	Şêx Mîbemedî Xal
Diwani Gelawêj
Felsefeyî cemal irfan	Nûrî Mecîd Selim
Mêjweyî colanewey	Evdîsemed Mihemed
Posteyî Gelawêj	E. X.
Pê zanîni dil	Dilsûz
Le kon û qûjini	Nejad Evdilab
Çirokî jimare	N. E.
Ferhengî Gelawêj	Tewfîq Wehbi beg
	We geli basî xoştir exônînewe

Jimare 11 û 12. sal - 3 Teşrîni dewem û Kanûnî yekem

LEM JIMEREYE DA:

Kurdî be nav û bang	Mehmûd Xawer
Cexrafayî Kurdistan	Mistefa Şêx Nîmetilah
Xûlyayî sewikî behar	Hewrî
Derd û endîşeyî komel	F. Hûşyar
Tarix û eşxas	Pîremerd
Lapereyî tarix	Salih Qeftan
Tefsîrî Quran	Şêx Mihemedê Xal
Diwani Gelawêj
Nameyik	Yûnis Reûf
Sîqat mihakeme kira	Evdîlêfûr Dilşad
Çirokî jimare	N. E.
Ferhengî Gelawêj	Tewfîq Wehbi beg
	We geli basî xoştir exônînewe.

Xwedê mehkema hewe serfiraz, dûr û dirêj bihelê li ser heqiyê.

Serekê hikîmdaran li min vegerand û got: — Namî, binêre serbilindayî çiqas xweş û sernizmî çiqas çetin e. Di nav heval û hogiran de ber du jî ji destên mirovan têne serên wan. Sed heuf û mixabin li kurê camêran ko ji bo tiştêkî hindik û nehêja serên xwe bidin ber xwe; li pêşberê beval û hogiran, nemaze merfki kurd.

Hingê min zani mirovên comerd serbilind in û mirovên destgirtî û bexlî her sernexwîn û totak in.

Gelf hirayên guhdêr, ez ji hewe hêvî dikim
 Ji yêr nebihîstî re jî dibêjim; da weko hon ji
 wekî min sernizar û sernizim nebin. Ez kurek
 ji kurên Hawarê dihatim hesab kirin û min
 xizmetên gelekî mezin jî jê re kirî bûn. Lê ji
 ber ko min çend hivan deyinê xwe bi sûn de
 da bû, evçend fêtkarî hatin serê min.

Gelo lê çawa e? Kesê ko ji roja ko Hawar
 hatiye dinyayê û Ronahî jî li pêşberê wê hati-
 ye, hetanî îro hêj ew li xwe ne xebitîne û
 deyndarên Hawar û Ronahiyê ne. Halê wan
 wê çi bê; halê wan xirab e. Paşê wê bikevin
 ber dehwa û hisaban. Digel dayîna deyinê xwe
 jî bi zêde bûn. Mehkeme jî wê diwartir bê,
 yanî wê mehkema leşkerî bê.

Sertucandina mezintir û xwêhdana nîrinê
 wê gavê ye. Û bizanin ew roj jî pêşberê hewe
 tê. Honê poşman bibin û poşmani jî bi destên
 we nakevê. Herwekî hatiye gotin jî pêşiya de
 [bi xwe kira derman nîne] Deyinê we îro gelek
 hindik e. Çiqa bi sûn kevê hevqas giran û
 mezintir dibê û mirinê bi xwediyê xwe
 xweş dikê.

Eyî guhdêrên delal û xwendevanên serbilind,
 hevqas zehmetiyên ko hatine serê min giş di
 xewêde bûn. Gelo ko ew ne xewin bûya wî çiqas
 dijwar û çetin bûya. Piştî ko şiyar bûm min

nêrî-koçilê. min ji xwêhdanê bûne av û lehi,

Ma çîre em bi destê xwe, xwe tavêjin
 tehlûkê. Xudayê mezin di quranê de gotiye

(ولا تلقوا بأيديكم إلى التهلكة)

Kurdên hêja em tev birayên hev in ez
 zirara hewe naxwazim. Bi Tenê ez qenci û
 serîraziya we dixwazim û min navê tiliya
 yekî ji we hilpekê, biçûk û mezin. Lê di-
 xwazim hon ji benda comerdan bêne hesêb
 kirin. Ne ji benda bexflan. Çiko Xudayê
 gewre di quranê de tein daye bexflan û gotiye

(ولا تجعل يدك مغلولة إلى عنقك ولا تبسطها كل البسط)

(فتقدم مألوماً محسوراً)


Comerd nêzikî Xwedê ye, nêzikî xelkê ye
 û nêzikî cinetê ye. Heçî merikî bexlî e weke
 kerê ko barê wî ziv û zêr bê û xwarina wî
 ka bê. Hem jî dûrî Xwedê ye, dûrî xelkê ye
 û dûrî cinetê ye.

Gelo ji van her diwan kîjan xweştir e.

Ez hêvîdar im ji Yezdanê mezin ko kesekî
 sernizar û bê imid nekê.

Her bijîn comerd, her bijîn artîkarên Ha-
 warê, her bijîn xort, her bijîn Kurd û kurdistan,
 her bijî mehkema Hawarê.

EHMED NAMÎ



DI SER CENKEŞTIKE INGILIZI DE BATARIYÊN TOPÊN BALAFIRŞIKEN

MELA ENWER

Mela Enwer li sala 1913an li heyva Adarê di gundê Mayê de hatiye dinê. Maye nizingî Amediye ye. Enwer ji eşra Berwarî jorî ye. Navê bavê wî Şêx Mihemed Tahir e. Bavê wî yek ji zanayan demê xwe bû. Navê wî bi zanîne û teqwa diyanetê belav bû bû hemî Kurdistanê. Eslê mala Mela Enwerî ji pêş ve, ji mirên Mukriyan e.

Enwerî li Amediye li ber destê miftiyê Amediye Mihemed Şikrî efendî dest bi xwendinê kiriye. Enwerî sê salan ji li Dihok, Zaxo û Hevlêrê dersên şerîetê xwendine. Lê dawîya zanîna xwe li Amediye tawaw kir û li sala 1936an ji seydayê xwe Mihemed Şikrî icaza dwanzê wergirt.

Mela Enwer qedere du salan li Zîbarê di gundê Şerwanê de bû mamoste. Paşê wî dest jê herda, li gundê xwe rûnişt û şîret li xelkê eşra xwe kirin.

MIN NIZANÎ BÛ

KO RIHISTIN JÎ DIJMINÊ KURD E

Berê, ez li gundan kurdeki cotkarî bûm. Lê ev pênc sal in, ez hatime Amudê û bi îşê ticaretê mijûl dibim. Min xwendin û nivsandina kurdî ji nizanî dû. Hişyar, mala Xwedê û ya wî ava, ez hînt nivsandina zimanê xwe kirim. Ji hingê ve bêtir evîna welêt li min dijwar bû û li ber civatê ez bûme dozekar.

Lê tevayîya şêx û me- lan bûn neyarên min. Wek hevalên din ez jî guri bûm. Bi vê guri-bûna evîne disa diilgêş û hextiyar dibûm.

Di vê navê de û jî bo ticaretê ez cûm Helebê.

Lawikê min î dusallî hebû. Gava ez vegeyîyan mal min dit ko lawikê min emirê Xwedê kiriye. Wextê jî min re gotin

lawê te, tu xweş. Min got: Bila Kurdistan sax be.

Birayê min î sofî, zavayê min î mela ye. Her du hatin û gotin min:

— Tu dibînî tu bûyî kurd, te hevaltîya xortên kurd, kurdên welatparêz kir. Tu bûyî xwenda. Te kovar û rojname xwendin. Te bédîliya şêx û melan kir. Ji lewre lawê te mir.

Êdî sebira min ne ma bû. Ez xeyidim û min li wan vegeand û got:

— Malxirabîno! ma rihistin an Xwedê jî şêx û mela ne. Ma bi tenê kurd dimirin. Mirin tişteki tevayîyê ye. Qey rihistin jî roinî ye û bûye neyarê me. Ax jî derdê mirovên bêçav û bêguh.

ŪSIF HECIHERSAN

Bi rasti Mela di nav berwariyan de jî bo xwendin û nivsandinê xebateke çak dike. Mela Enwer melaki nûgeh e, bi fikir û hizrên xwe.

Par li wextê tatilê ez cûm gundê Mela Enwer. Ez bi wê çayinê gelek diilgêş bûm. Silî xortên kurd li dora melê civiya bûn. Mela li ser depê reş jî wan re dersên kurdî dida; bi tipên kurdî ên nû.

Min got melê: Seyda, ev tipên kurdî çên nû bi şerîet caiz in?

Melê li min vegeand û got: « Belê caiz in » û jî min re bi çend ayetên Quranê delil jî anîn. Paşê disan melê got: « Ezman bi çî awayî bihête nivsandin ew terz dirist e. Ū em dibînin ko kurdî bi van tipan jî tipên erebî xweştir dihêt xwendin û seh kirin ».

Paşê melê jî şagirdên xwe re got: « Xortino ev tipên ha jî me re ewlatir in. Çûnki kurdî bi tipên erebî xweş nahête xwendin. Jê pê ve mirov dikare bi van tipan lêsanilîr

ezmaneki ewropayî fêr bibe. Çûnki tipên me û yên wan teşbîhî hev in ».

Piştî ko darsa xwendina kurdî temam bû, melê jî şagirdan re bi kurdî tefsîra Quranê û hedîsên pêxember jî dane zanin. Di pex hebdan re jî melê darsa şerîetê vekir û jî şagirdên xwe re eqide jî bi kurdî got.

Li dawîya darsê min [dit ko şêx Mezher hate li nik me. Li destê wî de kitêba Tarîxa Kurd û Kurdistanê ya Emin Zekî begî hebû; ligel Hawarekê û hejmareke Ronahiye. [Şêx Mezher apê Mela Enwer e; şêxeki diinî û welatperwer e]

Şêx Mezher gote min: Er-mexanî, min zehî tertepelên kurdî ên din heyin. Lê jî he-miyan pêtir ez hej Tarîxa Emin Zekî dikim. Ewî jî bo miletê kurdî karekî çak pêk anî. Ev cara diidwan e ko ez vê tertepelê dixwinim.

Herçî tipên nû, Xwedê giyanê neviyên Bedir-Xan begî xweş bike. Min zehî hej xebata wan a nû kiriye, zêdebar bi tefsîra Quranê bi kurdî. Ev tefsîr hêjayî gelekî ye jî bo miletê kuref. Xudê heye jî

WA MILETÊ KURDÎ

Pêş kevin em, serfiraz in miletê kurdî
Yan mirin dê bibinin yan jîna kurdî
Wa miletê kurdî.

Bi xwendevan, xwendegahan, bi al û leşker
Dê bijîn, paşê dikarin rêçê bibin ser.
Wa miletê kurdî.

Heta kengê em bînin bin destê dijmin
Geh bi kuştin, geh bi sotin, tim tê bîra min.
Wa miletê kurdî.

Kurdistan êdî menale, lawên te hatin
Xwendevan in, xwin-firoşên axa welat in.
Wa miletê kurdî.

Mal, can û dil bi carek bo te fîda kim
Xwinên xwe ên paqîj dirêjin bendeyê nakin.
Wa miletê kurdî.

Ala rengin bo te dayînin ger ser bi der dîm
Ger nekim vê tu bizanê kî ez ne kurd im.
Wa miletê kurdî.

HMED NAMÎ

feqî û şagirdên me re fehîmkirina Quranê bi
vê tefsîrê wê gelek hêsantî bit. Ez gelek îlahî
dikim ko feqî zû zû fêrî van tîpên nû bibin
da ko bikarin di hejmarên Hawarê de, yên ko
ji min re dihên, tefsîra Quranê xweş bixwînin ».

Min jî şêx re got: Şêxê min tu çawan holê
xweş fêrî van tîpan bûyî?

Şêx li min vegerand û got: Ermexanî,
Xudê heye ez di nav du heyvan de fêr bûme.
Niho ez dikarim baş Hawarê bixwînim. Xudê
emirê Mela Enwer dirêj bike. Ewî gelek zeh-
met bi min re bir. Xudê anehê bîdet, ev tîp
di nav kurdan de belav bibin da ko kurd
bikarin bi ezmanê xwe binivîstin û bixwînin.

Ez jî gundê Mela Enwer bi dilekî geş
vegeriyam. Ev rûha nû ya ko di nav kurdan
de belav dibê. Şêxên me ên 50 salî jî hînî
tîpên kurdî dibin. Min zehf spas li Mela
Enwer kirin. Ji milê din min gelek tertepelên
kurdî bi tîpên kurdî pêşkêşî xortên wî kirin û
ez vegeriyam Amediyê.

Tîstên ko Mela Enwer heta niho nivîstine ev in:

- 1 — Diyarîya lawan. Pend û şîret li ser
jiyîna civakî û welatparêziyê
- 2 — Kitêba Gergorî, bi navê « Leylanka
spî » wergerande kurdîyê
- 3 — Mewlûdeke kurdî, menzûm
- 4 — Tertepêlake bawerîyê, menzûm
- 5 — Tertepêlake metelûkên kurdî, qedere
2000 metelûk tê de hene
- 6 — Dîwana Mela Enwer. Şihîrên welatin,
heyran û wesîf

SERBESTÎ

Divêtin em li vê rêkê nexwazin nav û serdari
J'dil û îman xebatê b'ken bi rastî em bikeyn kari
Divêtin em hemî pêkve li xwe b'zîvirin bikeyn tobê
Zikî paqîj bikeyn j'kinê devî taze bikeyn j'parî
Şev û rojan bikeyn şolî ji bo serbestiya kurdan
Qemf em xo bikêşin tev j'dev û lêvên evî marî
Hemî em sed hezar xûh û hezar xûnan vemalin j'xwe
Li nav şeraziya diya j' me naçit her perê tari
Bi xûh û xûn û kiryarî digin armançîa zêrin
Tu pavê nermiyê bigre, bi herdu desta dijwari
Kesê l'hêviya helatna roj bibît divê mikun bit l'ser
Giranî tehlîyên şev da heta sibhê jî êvarî
Fere em jî bi serbestî bi xoybonî bijin berdem
Bikêşin der ji van tirban jî xwe bavên evî barî
Çi xoşî hûn dibênin ma li vê jîna bi serşûrî
Geda bi ya xwe paşî bi tu yariya xwe xundikarî
Çi tamê seh dikin an jî ji vê jîna bi zîndarî
Şivan bi ya xwe gavan bi tu rûtî ya xwe îndarî
L'biheştê ger ko serbestî ne bit ya cak bihêlî wê
Bi çavşûrî ne jî cenda serê te pê bikin yarî
Heçî saxiyê ya li bin siha şîr û metalan da
Heta desta bi xûnê der nekey najî bi serbarî
Belê ger dest nivêjê b'şoy bi xûna cerg û mêlakan
Tu dê jî paşê hingê jîneke taze bi nazdarî
Li rêka jin bi xoybûnî hene zor biş û zor asteng
Piling û şer divêt canî bikeyn gori bi yekcarî
Çelengî zîrekî çakî bebitin an nebîtin te
Çi fayde jê girênadey eger kiryar neçit barî
Ji tîrsê jafî çed'btînin li kirnê xoşî û navê
Divêt em sed hezar cana tilêfin da biçin şarî
Hemî kurd xûnek û goşî in Hekari ya xwe Bidlîst
Cizîrî ya xwe Babanî çî Badîmî çî Berwarî
Çi Lorî bit çî Feylî bit çî Pijter bit çî Dersim bit
Çi Caf û Hewrenanî bin Bilûx bin ya xwe Şengarî
Hemî şer in bi rastî kî wekî wan ma heya ev ro?
Ew in serlûrka insanan jî Moxol Sainî û Arî
Divêtin em mikum bin her beta dighênê armançê
Çi saet me nebîtin hiç hemî gava bi hişyarî
Gelek şerm e geli lawan bihêlin vî cihê rengin
Ji destê te'siba û em bibin bê behr ji vî wari
Erê lawê çiyani em hemî pek ve li vê rêkê
Dê gori keyn ser û malî nizanin em çep û zarî.
Amediyê MELA ENWER

Mela Enwer leqeba xwe daniye Lawê Çiya.
Vê paşiyê Mela Enwer ji min re karteke cejinê
şandi bu û tê de goti bu:
Hon biken cejinê bi pirzûlî hemî gav û dema
Her bi serbestî û xoşî şahî û kêf û sema
Min jî lê vegerand û got:
Cejina me pîrûz bit bi dilekî şad
Welalê me herz bit qewmê me azad
Xudê emsalên mela Enwer ji bo pêşveçûna
kurdîtiyê zêde biket.

M. ERMEXANÎ

MIL Û ZIL

BIR Û ESASÊN EŞİRÊN KURDAN

Di hejmara Hawarê a 52an de du bend hene: Gawestiyayî û koçerên kurdan Qedri Cemil paça Mirdêsan û gawestiyên wan Osman Sebri

Di van bendan de xwedîyan li mesela gawestiyên hûr bûne û esasê wê gotinê xistine ber ronahiyê. Herçî axayê mirdêsan, jê pêve çiroka eşira xwe, nemaze ji awirê gawestiyên ve, bi ser û berê wê ve gotiye û rûpelekî tarîxa eşirên kurdan ji wînda-bûnê parastîye.

Herwekî ji wan bendan ji dixuye, li wextê koçeriyê û dema ko kurdan barên xwe li gan [1] dikirin, hin eşir, gava diçûn zozanan an jê vedigeriyan, ji ber ko gayên hinan diwestiyan, ew eşir bi xwe ji hev vediqetin û birê bişûndemayî di cih de dima, nema yedigeriya welatê xwe û ji xwe re warekî nû dibijart. Ji wî birî re gawestî digotin.

Piştre, ev gotin ji hemî birên eşirên re, yên ko bi sebebîne din ji jî koka xwe vediqetiyan, bû elem. Yanî ew bir jî bi wî navî hatine bi nav kirin.

Li wextê berê gava eşir ji hev de diketin ne bi tenê di cihekî de bi şûn de diman. Lê

[1] Hetanî îro li Serhedan û di nav eşirên Ecemîtanê de kurdin hene ko barên xwe li ga û gamêşan dikin.

carina di yekî bêtir waran de bi cih dibûn; wek eşira berazan.

Îro di sê derên Kurdistanê de beraz hene: Deşta Sirûcê, Serhedan û Welatê ecem. Lê di emî nizanin ev birên ha di yek seferê de an bi seferîne gelêr [mîteedid] û tével [mixtelif] de hatine pê.

Ji milê din birên bişûndenayî li gera boşiyê, carina bi navê xwe eşireke bi ser xwe tanîn pê, carina ji navê xwe hîltanên lê dibûn qebileke eşira ko li warê wê datanin.


Bivê nevé, ên bişûndemayî heke bi tenê ji çend konan bi hev diketin, xelkê wan konan di nav eşira xwedîya war de wînda dibûn.

Li gora misala azizan, carina wan çend peya bi serbendekî hêja malbateke hikîmdariyê jî tanîn pê û dibûn hakimê welat an eşirekê.

Tiştê ko ez dizanim, azizan di sê derên Kurdistanê de têne ditin: Serhedan, Beriya Mêrdînê û welatê Botan.

Azizan bi ser Heyderan ve dihesibinin. Lê bi xwe eşireke boşe û warekî wê li xweser heye û jê re welatê azizan dibêjin. Herwekî li welatê Serhedan ji komeke golan re jî golên azîzn tête gotin.

Aziziyên Beriya Mêrdîne qebileke kikan in û bi xwe dibêjin ko ji eşirên gawestiyayî ne. Welê dixuye ko ew aziziyên ha gava ji eşira xwe veqetiyan nikarî bûn eşireke bi ser xwe



B ALAFIRÊN BEHRÎ ÊN INGILIZÎ DI HEFADIYA PERAVÊN INGILISTANÊ DE



FIYADEYÊN BRITANÎ DI QADA TÛNISÊ DE PIŞTÎ BOMBARANA TOPÇIYAN RADIBIN HICÛMÊ

bînin pê, xwe dane ser kîkan û bûne qebîlak wê eşîrê.

Di dora kîkan de eşîrên din jî hene ko sedên wan digehîn se lên bîkan. Gelo van azîziyên ha çîre kîkan di ser eşîrên din re jîrtine û rajîriya wan kirine? Heye ko jî ber seheba mil û zil. Bi rastî kîkan jî wek azîzan silv in.

Herçî azîziyên cihê Botan, ew jî gawestiyayên ezîziyên serhedan in. Lê wan di cihê Botan de ne eşîrek aniye pê û ne jî bûne qebîla eşîreke l otan. Azîziyên cihê Botan mîrên Botan bi xwe ne.

Ilerçend di destên me de tu wesîqeyên tarîxî nîn bin jî, em dikarin bi rêzikên koçeriya kurdmancan ve herin, bidin ser şopa azîziyên Botan û texmînin li ser bikin.

Li deşta Mîsarê û li tixûbê jêliyan çîyayek heye, jê re Banê-Azîzan dibêjin. Heta vê paşiyê ev çîya koza dudêran bû. Ev çîyayê ko navê azîzan hildigîre divêt bi navê azîziyên gawestî hati be bi nav kirin.

Li gora vê texmînê, li wextê berê gava esîra azîzan di nav Kurdistanê de digeriya û piştî ko konên xwe li beriya Mêrdîn û deşta Hesinan vegertiye reya xwe bi deşta Mîsarê jî xistiye [1]. Li deştê gayên hinan westiyane. Ên gawestî li vê deştê mane û paşê hilkişiyane çîyayê rex û ew çîya kirine koza xwe. Ji ber vê yekê navê Banê-Azîzan li wî çîyayî kirine.

Ev azîziyên ha li şûna ko bibin qebîla eşîreke Botan çavên xwe berdane mezinahiya welêt û bi rêva bûne mîrên Botan. Ji xwe jî

[1] Ji xwe heta seferberiyê koçerên Botan di welatê Başqele û Colemêrgê re diçûn heta zozanên Wanê û jê wê ve jî.

mîrên Botan re hetanî îro jî mîrekên Azîzan dibêjin [1].

Ji vê biserhatiyê dixuye ko gayên van azîziyan westiya bin jî bi xwe qet ne westiya bûn. Westiya biwan ma kengê dikari bûn ve xebata zor bixebitîn û bibin mîr û hakimên welatekî.

Piştî ko me çavên xwe bi kurtî li mesela gawestiyayan gerand, em hên ser mesela « mil û zil ».

Herwekî jî her du bendên Hawarê û jî vê bendê dixuye eşîrên kurdan ji awirê war û tevdand ve bi du biran leya dibin: Eşîrên ko li ser warên xwe ên kevnare mane û eşîrên ko di wextê koçeriyê de ji giraniya eşîrên xwe veqetiyane û li warekî nûjen danine.

Lê di nav eşîrên Kurdistanê de jê biasatir teqsimêk heye. Ew jî birên Mil û Zil e. Mîna ko herkes pê dizane eşîrên kurdan bi bingehên xwe ve vedigerin du bend û cihderkan: Mil û Zil. Yanê herçî eşîrên Kurdistanê hene an mil an zil in. Ji zil re silv jî dibêjin. Mîrov jî kîjan kurdî bipirse, ewê tavil bibêje, ez mil im, an, ez silv im [2].

[2] Lê piştî ko mîrê Botan ê paşin Bedir-Xan Begê Azîzî bû hêşir û mirîtiya Botan wek mirîtiyên Kurdistanê ên din qelîha û mîrekên azîzan tev de jî welêt derêxistin -- ji Mihemed Begê ker pêve - di welatê xeribiyê de bernavê mire paşin Bedir-Xan ket şûna navê mîlhatê û xelkê jî mîrekên azîzan re Bedirxanî an Bedirxan-zade, got.

[2] Herwekî nas e îro jî li Kurdistanê bi van navan eşîrin hene: milan, zilfan, silivan. Lê em nîzannin esil ew in an pişrte ev nav bi wan ve bûne.

Li wextê berê gava eşiran şerê hev dikirin koma şerewaniyan li ser vî esasi bi hev diketin. Heçî mil di warekî de digihan hev. Zil ji li hev dicîvriyan hev û şer dikirin. Heke di nav du eşîrên mil, an zil de neyartî hebiwa ji gava şerê tevayiyê çêdibû ev neyartî ji bir dikirin; milan bi millan û zilên bi zilên re hevaltî dikirin.

Belê mil û zil welê bûn û fro ji carina guh didin vî esasi. Em tev de pê dizanin. Lê çîre? Mil çî ye? Zil çî ye? Mil kî ne? Zil kî ne? Divêt ev bête eşkere kirin.

Min gelek lê pirsî. Lê tûkêstî ne zanf bi bersîveke maqûl li min vegertine. Divêt peyayin hebin ko pê bizanin; lê mixabin ez rastî wan ne hatime [2].

Berî bîst û çar salan yekî — nik dilêmin yekî sindî — di vê babetê de ji min re çîrokek goti bû. Ez jî dikim wê çîrokek ji we re bibêjim.

Di sala 1919an de ez li Zaxoyê bûm. Digel çend axayên eşîrên dorê, em di civata Mihe-med aşayê rehmetî de rûniştî bûn. Min çêl li îşê mil û zil dikir. Piraniya civatrûniştiyan digot: Eşîrin hene mil in; eşîrin hene zil in.

Kalemêrêkî piştî ko da qelûna xwe û dev û difûna xwe ji dû û dûmanê tijî kir berê xwe da min û got:

— Ez ne î xwende me; min tu mekteb û medrese jî ne dftine. Lê carekê di vê babetê de ji yekî welatjorî min çîrokek bihîstîye. Ezê wê çîrokek ji we re bibêjim. Tu vî çîyayî dibî-nî (Cûdî şanf min dida) wî bigire û pê ve here, heta bakurê Wanê. Ew der dawîya çiyê ye. Cihekî asê û bilind e. (xuya dikir mexseda wî Agirî bû) Li serê çiyê ne fînsan ne heywan, tu tiştê bican nikare debar bike. Hema berf û çêşa ye.

Li wextê berê di wî çîyayî de mirovek dijt, gîremêrek; yekî dêwendam. Navê wî Kurd bû; Kurd bi mana mêrê qenc e. Mêrik xudan êl û eşîr bû. Rojekê berfendeyek, bi qasî çiyakî li warê mêrik gêr bû. Mêrik digel êla xwe di bin berfendê de mehiw bû. Ji zar û zêçên wî du kurên wî jê xelas bûn. Ew jî di wextê afetê de daketi bûn kûntara çiyê û li giyayin digeriyan, giyayine derman. Ma gerek e ez ji we re bibêjin ko hingê dîktor û eczaxane nîn bûn.

[1] Min ev bend beriya çapê ji nivîsevanên Hawarê jî minza Rastedar re xwend. Cenabê Rastedar gote min: Li deşta Mûşê eşîra belean heye. Şevêkê ez bû bûm mîwanê wan. Wan ji min re çîroka mil û zil gotiye; lê nayete bira min. Xelkê belean tev de pê dizanin. Tiştê ko tete bira min Mil û Zil birayên hev bûn, pev çûn û ji hev veqetiyan.

Ji wan her du lawan navê yekî Mil, navê ê din Zil bû. Mil û Zil gava vegeiriyan mal û ev hal dftin li xwe heyirî man; li şûr û kevanê bavê xwe geriyan. Berf kolan û şûr û kevan dftin û terka çiyê dan û daketin deştê û ji xwe re du keçîk revandin û zewicîn. Kurdmanc ji van her du biran peyda bûne. Ji lewre eşîr an mil an zil in. Lê tev de ji bavekî ne. Bavê hemîyan Kurd e, Kurdê ko di bin berfendê de mir ».


Çîroka ko min li Zaxoyê bihîstîye ev e. Êdî ez nizanîm kalo ev çîrok ji kê bihîstî bû. Belê ji yekî welatjorî. Welatjorî, ji kê bihîstî bû. Min ev tişt jî jê pirsî. Kalo hema kutebîr kir û gote min, ji pêşîyan....

Mîr Şeref di Şerefnama xwe de gava li esilê kurdan hûr dibê qala « mil û zil » nake. Lê bi awakî din li birên kurdan îşaret dîke û dibêje ko kurd tev de vedigerin du bavan: Bext û Becen.

Bi rastî Şerefxan gava qala mîrêkên Hesen-kêfê dîke, bi henceta vegera melîk Xelîlî — mîrê Hesen-kêfê jî Tevrlzê — çêl li Hisên begê becnewî dîke û dibêje: « Di heqê becnewîyan de xudansîqê riwayet dîkin û dibêjin ko Bext û Becen birayên hev û pismîrên hakimên Cizîrê bûn. Ji ber îşê hikûmetê gelsek kete nav wan û her du biran welat di navbera xwe de lêk vekirine. Cizîr bû para Bext, Hesen-kêf jî giha Becen. Li gora riwayeteke din talfeyên Kurdan, tev de zaroyên Bext û Becen in ».

Ez bi xwe dibînim ko min di vê bendê de tu ronahîke nû ne reşandiye ser mesela « mil û zil ». Bi tenê min hevî heye piştî ko min ev meselê bi vê bendê tev da yên ko serwest in çîra xwe bexîn ber mesela Mil û Zil û wê ji tartîyê xelas bikin.

HEREKOL AZİZAN



BERTORPIYOREKE EMÊRIKÎ NI DI HICÛMÊ DE

NEMA

DIKARİ BÜ BIREQİSE

Li 17ê Çiriya-paşın sala 1942an rojnameyên Arjantîne da bûn zanîn ko zabîtekî erkanherbiyê, bi navê Swarlo xwe bi şejderbê kuştîye û di mektûba ko di pey xwe re hiştî bû digot: Min xwe kuşt ji ber ko min xiyaret li welatê xwe kiriye.

Rojnameyên Arjantîne nema qala Swarlo kirine. Lê piştî midekî rojnameke emêrikanî Şikago Trîbyûnê çel li vîna dikir û digot ko Swarlo bû bû dostê artîsteke mecerî û wê artîstê jê xerîteyên erkanherbiyê dizî bûn. Gava Swarlo pê hesiya bû artîstê terka Arjantîne da bû; Swarlo jî ji ber wê yekê intihar kirî bû.

Bi rastî di meha Îlonê de artîsteke mecerî bi navê Mariya Kramenski hati bû Bwênês-Ayresê, payîtextê Arjantîne. Wê artîstê di gazînokê Bwênês Ayresê de dixebitî. Mariyayê gelek elêhdariya dewletên mîhwerê dikir û dijûn dida Hitler. Di nav mîsteriyên qazînoyê de peyayên mîhwerê jî hebûn. Wan peyan bû qal ne dibûn û li xwediyê gazînoyê radibûn.

Xwediyê gazînoyê û Swarlo gelek dostên bev bûn. Xwedî mesele gotî bû Swarlo û gazîno û Mariya xisti bûn bin himayeta wî. Bi vî awayî Swarlo Mariya delal nas kirî bû û Mariya bû bû dostika wî. Herçî Mariyayê pê dida erdê û elêhdariya mîhwerê dikir û digot Mecarîstan di bin hikîmê elemanan de mehîw bûye.

Lê piştîre xuya kir ko Mariya delal ne neyarê mîhwerê lê casûsa elemanan bû. Polîsên Arjantîne herçend da bin pey jî tu şop jê hilnanîn ».

Tîstê ko Şikago-Trîbyûnê gotîye ev e.

Piştî mehekê rojnameke Şîliyê [1] Ankayê nûçeyekê belav dikir û digot:

« Berî sê heftan artîsteke mecerî bi navê Anayê gîhaştî bû Santiyagoyê. payîtextê Şîliyê. Ana gelek spehî û xudan fen û sinhet bû. Gîregîrên payîtextê jî bo dîtina wê her şev diçûn gazîno Ramonayê. Wan gîregîran dida ber wasitayê da ko dostiyê bi Anê re gîrebîdîn. Lê Anayê rû ne dida tukesî. Ana bi yekî re dihatê gazînoyê, direqîstî û bîf ko bi tu kesî re xeber bide, digel mîrikê xwe vedigeriya otelê. Ji bo wî mîrikî herf ewilî gotî bûn mîrê wê ye. Piştîre digotin birayê wê ye. Xelk lê ecêbmayî diman; dikirin ne dikirin lê ne

[1] Şîlî û Arjantîn her du jî di dewletên Emêrika nîvro ne.

GURÊ PÎR


Dibên li nav Xidîrsor	Di binhêla Kawê jor
Gurek bû bû pîr û jar	Pê ne dibûn raw û kar
Dit gurekî piştîhişn	Şeng û oflaz û narîn
Piştî hal û xatiran	Şor kirin her du guran
Yê pîr digot: birazil	Tu mîrikê xêrxwazî
Rawekê bo me daxl	Sitra xwe li vir raxl
Ser û peyan bi xêr kt	Zîkê mamê xwe têr kt.
Tezlk da xwe gurê şin	Gotê: mamê dûrebîn!
Tu kalekî dilçak l	Malbata min nas nakt
Ger zani bî warê me	Keleşiya karê me
Em rêbir û mîrku jin	Xwîna neyar dimijin
Fermû were li pê min	Dê zani bî carek din
Şêpên gurê piştîhişn	Bi çavên xwe tu bibîn.
Rabûn her du bi rê bûn	Reya bajêr girtin çûn
Yê pîr bawer ne dibû	Lê ji şerman li pê çû
Bazirgaek li pêş din	Zer bû gurê Piştîhişn
Rast ajot nav dewaran	Peya hatine bi daran
Yê piştîhişn direvin	Giş li yê pîr dicivîn
Gîhêştinê di pa ra	Lexistin j'xwe û xwe ra
B'zora lîngan reviya	Xwe avêt nav deviya
Dema birin dibûn sar	Dest û lîng jê bûne dar
Welê ma bû nîvmîrî	Dil jê xav bû bihişt
Raste wî hat gurê zer	Hilmîştî û dîlawer
Li gurê pîr silav kir	Jê pîrî hal û xatir
Yê pîr çirok jê ra got	Dil û kezêb jî xwe sot
Derdê gurê piştîhişn	Hemî jê ra da zanîn..
Wî got: mamê bextereş	Ma te nînin eqil û heş
Çawan gurê piştîhişn	Yên wekî te dixapîn?!
Ger te divê bibi tîr	Li tevdrî min binêr
Ev e kalekî diçe eş	Kurtî maye, ker li pêş
Tu kurîyê hîrevîn	Hemin kalê te bibîn
Dema ew bê jî bo wê	Dê jî her kim tîrê dê
Gava bibîn vê derê	Wê veşerî ser kerê
Ûeya ew xwe bigîr ser	Dê biçin kurî û ker
Kalo dê bi destê tal	Zû veşer here mal
Hînga emê herin ser	Zîkên xwe tev bidin her
Gurê pîr got: afeztin.	Min ecîband û zanû
Tevdrê eih bihîne	Kalê bê ker bimîne
Hûn gurên zer çi şengin	Her dem bi nav û deng in
Rast jî bi wê tevdrê	Her du gur çûn neçîrê
Ker û kurtî dikuştin	Bar li erdê dihiştin
Kalo dikir barehar	Her du guran goşt dixwar
Gurê pîr zîk kir teşer	Bi tevdrîa gurê zer.

OSMAN SEBRÎ

dikarî nîzîngiyê lê bikin.

Cejîna îstîqlala Şîliyê bû. Di şeva cejîne de xelkê Ane di sefaretxana emêrikanî de dîtî bûn. Ane bi zabîtekî emêrikanî re direqîstî, li timobîlîa zabîtekî şîlî siwar dibû. Axir bi zabîtan re dida û distand.

Ma çî li Anê qewimî bû. Sibetîrê zabîtan di gazînoyê de dor li Anê girtî bûn. Anê digot ko gelek hejî esker û zabîtan dike. Gava jê



QEWETËN INGLËZÏ ËN MËKANIKÏ DI TALÏMGAHEKE INGLÏSTANË DE

pirsin çire. Anê got: Bavê min û her du birayên min di ordiwa mecerî de zabit bûn. Gava şerê ûris dest pê kir bavê min û birayên min qe bûl ne kirin ko herin şerê ûrisan bikin. Li ser vê yekê elemanan ew kuştin.

Li 11ê Kanûna-pêşîn midrê gazinoyê da bû zanîn ko Ane reqseke nû wê bireqise.

Giregirên Santiyagoyê û memûrên sefaretên biyanî tev de hati bûn temaşa Anê. Di locekê de memûrên sefaretên Arjantînê jî hebûn. Di nav wan de yekî bejinbilind çavên xwe li sehnê daçikandi bû.

Saet di dehan de perde rabû û Ana delal xwe şanî da. Xelkê qedere pênc deqîqan çepilk li hev dixistin û xuyabûna Anê şahînet dikirin. Di vê navê de mirovê bejinbilind yê ko di loca sefaretxana Arjantînê de rûniştî bû xwe jî locê zer kir û çû li her sehnê rûnişt. Qey dixwest Ana bedew jî nzingî bibîne.

Anê dest bi reqisê kiri bû. Lê piştî hihî-nekê xelkê didît ko reqîsa Anê ne weke xwe ye û lingên jînekê li hev dikevin. Herçî di rêzên pêşîn de rûniştî bûn didîtin ko gonê reqasê jî diçûmîsî. Ji xwe vî hallî gelek dom ne kir Anê jî temaşageran ezir xwest û xwe da paş. Midrê gazinoyê da zanîn ko doxa Anê çûye û ji lewre xwe daye paş. Lê piştî deh deqîqan bi reqiseke ecêb dilê temaşagerên xwe wê xweş hike.

Deqîqe bûne deh, bist, sih... Anê xuya ne dikir. Perde vebû û li şûna Anê midrê gezinoyê dîsan xuya kir û jî temaşageran re da zanin ko Ane gelek westiyaye û ji lewre çûye otêlê; lê sibe ewê disan bireqise û temaşager bi bilyêtên wê rojê dê bikarin bèn temaşayê.

Anê ne sibe, ne dusibe ne jî sê sibe xuya ne kir. Lê rasti piştî çend rojan xuya kir.

Mirovê bejinbilind yê ko di loca sefaretxana Arjantînê de rûniştî bû û piştîre daketi bû pêşiya sehnê midrê bîstehî yanî emnilama Arjantînê sinyor Kalamatî bû. Kalamatî da bû pey artîsta mecerî Mariyayê. Mariya ko bû bû sebaba intihara zabitê arjantîni. Kalamatî seh kiri bû ko ew Mariya bi xwe bi navê Anê di gazînoke Santiyagoyê de direqise.

Kalamatî hati bû Santiyagoyê û da bû pey Anê. Anê an Mariyayê Kalamatî jî Bwênês Ayrêsê xweş nas dikir. Wê şevê gava ew di nav temaşageran de dîtî bû zani bû îş çî ye. Ji lewre Anê xwe jî sehnê da bû paş û li timobila xwe siwar bû bû.

Li otêlê polisên şilî û arjantîni li hêviya wê bûn. Lê Ane ne çû bû otêlê. Heye ko jî nû ve di gazinoyine din de direqise û li zabitine din digere; nemaze yê n ko pê re xerite û planên eskerî hene.

CEMÎLÊ TACDO

TIŞTÊN KO

BI MIN RAST Û YÊN KO NERAST IN

Divêt rûpelên Hawarê ji her xortê xwenda re vekirî bin. Da ko xort bikari bin kanên heş û biraniyên xwe pêş teva welatparêzan bikin Nemaže divêt herkes bi şewa cihê xwe binivîse da ko pirsên zanakî bêne neqandin.

Divêt em li hemî deverên welêt agah bibin. Ji ber ko dîrok, çîrok, adet, bûyer û kirdeyên du eşîran ne wek hev in. Lê heke nivîsar ne hejant çapkirinê ne hingê gerinendeyê herpirsiyar dikare wê pûç bike. Ji xwe me jî divêt kêmasiyên me nayîne belav kirin. An ne Hawar ne qurban e ko merov li ser xwe bigerîne û li her xwe deyne. Lewre her xort divê jî xebata welêt pêmende nemîne. Herwekî mîrê mezin gotiye Hawar kursiyê mîlet e, herkes dikare hilkişê ser û bêje.

Mirovê welatperwer divêt di bêrika wî de du mîrê hebîn. Bi yekê li kêmaniyên xwe binêre û bi a din li xebata hevalan binêre bêt ko kêmaniyên hevdu bijmêrtne.

Tukes bê kêmant nîne. Heke em temam bûna, îşê me jî temam dibê. Belê, bi dilê min kesê ko paşgotiniya hevalan bike, çiqas xebata wî jî hebe ew têtê sotin. Ji lewre mirovê dilrast hayî jî xwarî û dilreşiyê nîne.

Herwekî hate gotin: dostê kubaran nîne. Divêt mirov jî xortên kurd re dilnêrm û dilovan be. Heke qencî nekê jî, bi gotinên xweş û bi xêrhatinê nav di wan bide, da ko dilê wan perwaz bide û hevîna wan dijwar be. Ne ko wan dilbirtin vegêrtne.

Behwer bibin, pir caran ez dixwazim diyarê hevalan bibim. Mixabin, ez ditirsim ko jî şexsên wan evîna min wê sar bibe. Ez qîmlîş xwe nakim, jî ber ko çend caran rast hatime. Hêvî dibe ko em vê jî nav xwe rakin. Nemaže ev ne karê mezinan e. Belê divêt em jî mezinan re sernexûn bibin. Lê divêt ew jî jî me re dilnêrm û dilovan bibin. Piçûk dest û lingên mezinan in.

Divêt em hevalên xwe ên welatparêz zêde bikin. Hevalên kevnedar dikarin wan li xwe bikîne bar; herwekî ferza nivêjê. Belê divêt em xortên nû bikin hogirên xwe û wan binin ser rîya welatparêziyê da ko ew jî wek me dilbirtin û dilşewat bibin.

Ji her kurdî re kêmasîke mezin e ko tipên xwe nehewise û xortên nû hînlî tipên kurdî nekê. Hinbûna tipên kurdî divêt şertê kurdîtiyê bête hesêb. Ma iro tu mîlet heyê ko ne xudan

BESTA WELEATI

Ey welat serbest bi herdem tu bijî
Bilind bit Alayê rengin bi hejî
Em hemî gorî te bibin tu hejî
Ey welat her bijî bijî
Kurdistan her bijî bijî.

Ey welat te hene zor şer û piling
Ey welat te hene Rostem û nehing
Dê revin neyarên bê cerg û çiving
Ey welat her bijî bijî
Kurdistan her bijî bijî.

Ey welat serhelin bi te roj helat
Pavêje şîniyê xorta bû xebat
Dê te paqîj ken dê te kin kelat
Ey welat her bijî bijî
Kurdistan her bijî bijî.

Hilo rabin ser xwe ey gencên delal
Helkêşin elmasa helavên metal
Derbêxin dijîmînl j' welatên şepal
Ey welat her bijî bijî
Kurdistan her bijî bijî

Me ne vêt çî cara jîna b'jengî
Here dijîmin zibe here bê dengî
Em hemî leşker in li roja cengî
Ey welat her bijî bijî
Kurdistan her bijî bijî.

Amêdiyê: 10. 8. 1942

MELA ENWER

tip û elfabê be. Heke hene, jî heyinê nestba wan nîne. Ev hinbûn jî divêt bi temaml çêbibe, xwendin û nivîsandin. Tiştê nivco jî kêman re ye. Kurdîtlî tiştên kêman qebûl nake.

Ji xortê xebatker re gerek e nebêje ev dibe ew nabe. Tiştê ko nabe Yezdan ne afirandîye û ew ne xistiye bira mirovan. Bi tenê tiştine zehmet, barine giran hene. Mêrê qenc divê xwe bide ber barên giran.

Li dinyayê binêrin. Xortên biyanî, jî bo welatê xwe bi stwanan xwe bera jêr, bera êgir didin, wek perwanan.

Heya nebînl rencê Meleyize bi şetrencê
Kesek nabe me piştîmêr Mirov nabe gur û şêr
Herçî tehlî dewa ye Şirantî tim bela ye.

H. HIŞYAR

RONAHÎ — Gotinên mirza Hişyar rast û gelek bi cih û semt in. Lê jî şîretkeran re divêt berî berkesî ew bi xwe bi şîretên xwe ve herin. Ji lewra me jî mirza Hişyar divêtin jî me re tarîx û teşkîlata eşîra xwe û yêr eşîrên ko pê dizane binivîsîne. Di Hawarê de di vê babetê de nimûneyek jî beye. [Ji eşîrên Botan jê liyan. Hawar: 34 rûpel: 4]

HINEK JI HENEK

DI DIBISTANÊ DE:

Mamoste — (ji şagirtan re)
Erd di dora rojê de digere.
Di dora erdê de çi digere?

Şagirtêkî: Ezbenî, seyah.

DI DAÎRÊ DE:

Memûrêkî piçûk hebû. Jina
wî dikir biweliide. Memûr çû ji
mezinê dairê izna xwe xwest.
Mezinê wî ji bo du rojan izna
wî da. Lê mîrik piştî çar rojan
vegeriya dairê. Midr jê pirist.


— Me izina te ji bo du ro-
jan da bû, tu çar rojan ne
hati dairê.

Memûr — Ezbenî jina min
ne yek lê du zaro anîne.

ARÎKARIYA BIÎŞKAN:

Mixtarê gundekî nexweş
keti bû; bi nexweşîke xedar.
Di vê navê de yekî bajarî çû
bû wî gundi. Bajarî gava bi
nexweşîya mixtêr hesiya gote
jina wî: Ma hon çire diktorekî
naynin ser

Jina mixtêr — Ji me re
çêtir e ko nexweşên me bê
arîkariya diktor bimirin.



JI BOMBAVEJEN EMERİKANI YEKE LÎBERATOR

BÎNAHIYA KORAN:

Du mirovên kor li ber de-
riyê dèrêkê li hev sekinî bûn
û xeber didan.

Yekî digote êdin — Min
lihtsiye ko tu diht keça xwe
bizewicî

Ê din — Belê min jê re
xortekî bijarte peyda kir.

Korê pêşin — Te ji xelkê
pirsî, hal û hewalê wî seh kir

Ê din — No, gava min çav
pê kir, hema min ew eciband.

DI MEHKEMÊ DE:

Evkat (ji qazî re) Mitehi-
mê ko li ber we sekinîye

sezayî rehîna we ye. Belê di
cizdanî de 1000 frengên din ji
hebûn, lê dest ne daye wan û
bi dizîya 50 frengî bes kiriye.

Mitehim dest bi girtî dike.

Qazî (ji mitehim re) Welê
dixuye ko tu ji emelê xwe poş-
mantî; li ber dikevt

Mitehim — Ma çavên min
kor bû bûn. Çawan bû ko min
ew 1000 freng ne dîtin.

HER DU JI ZEWICÎ NE:

Kumandarê tabûrêkê digel
jinikekê di ber çîşla tabûra
xwe re dibore. Yekî ji eskeran
li wan dinihêre û
dikene. Çawîş jê re
dibêje: Kuro ma çire
dikenî, her du jî zewicî
ne.

Esker — Ji kengê ve?

Çawîş — Ev deh sal
in kumandar zewicî ye.
Herçî jinikê ve paşiyê
zewicî ye; hêj ne bûne
şeş meh.

HER DU JI MEHRÛM:

Dê — (ji kurê xwe
re) Xuya ye te dolab
vekiriye û hingivîna xwa-
riye. Di taştîyê de ezê
te ji hingivîna mehrûm
bikim.

Kurik — Yadê tu
bi xwe jî tivê jê mehrûm
bibî; ji ber ko di sira-
xê de min tiştêk ne
hiştîye.



ESKERÊN BRITANÎ CEJINA MILADE DI ÇOLEN LÎBYAYÊ DE ŞAHÎNET DIKIN

YARÎKER

LI WELATÉ ÇINÉ

MEHKEMÊN WÊ ÇAWAN EDALETÉ BELAV DIKIN

Seyahê fransîzî dîktor Albêr Jêrviye pişti ko li welatê Çînê geriya, der heqê melkemen Çînê û edaleta wan da pir tişt nivîsîn. Ji ber ecêb bûna wan nivîsanan, me çendek gubastîu kurdinancî; da ko xwendevanên me agahî vê edaleta han a ecêb bibin.

Li bajarê Wan-şinê bi navê Çanc-lo-sen miroveki belengaz, li pêşberê qışla general Lo şirani difirotin. Rojekê serberzekî ji leşkerên general Lo sendûqa şiraniyê şikand û hemî xwar. Xwediyê şiraniyê di dergehê qışlê da sekint û bi çavên bi hêşir li benda hatina general ma. Gava general Lo hat û giliyê mêrik bihlst gelekî dilê xwe pê şewitand û bi xwe ra bir qışlê. Ji bo ko ê şirani xwarî nas bike. Hemî leşker qor kirin û gote mêrik dizê xwe nas bi ke.

Mêrikê şiranifiroş di ber qorên leşker ra çû û hat. Di wê navberê da li pêş serberzekî hinekl sekint. General bi dengêki xurt got ê:

— Ma ne ew e?

Bê ko şiranifiroş dizê xwe nasibe, bes ji bo ko generêl ne xeyidne serê xwe hejand; yanî ko ew e. Di ci da generêl emira kuştin û qelaştina zikê wî serberzî da; lê tu şirani di zikê serberzê kuştî da ne ditin.

Generêl rahişte milê şiranifiroş û di ber qorên leşker ra çû û hat. Digote mêrik: Divê, vê carê xwe şaş nekl û dizê xwe binasî. Di nişkava deng bi şiranifiroş ket û got: ew e ew e.

Rahiştine milê serberzê klî din û di nav hevalan da bi derxistin. Vê carê serberz li xw na û got: min kiriye.



Di Efrîqa bakur de balafirvanên inglîzî beriya ko bi hewa bikevin cebirxanên xwe dibin

Piştî ko general Lo emra kuştina wî serberzî ji da; vegertî ser şiranifiroş û pirsî ka heqê şiraniya wî çiyê, dema ko zani xisara wî du riyal in sekintî û got:

— Ez ji hemî kirên leşkerên xwe i berpirsiyar im. Şerme ko yek çavê xwe berde malê rebeueki holê.

Di berika xwe da du riyal bi derxistin û dane mêrik; lê paşê vegertî ser û got:

— Te heqê xwe stand; lê tu bûyi sebebê kuştina miroveki bêgûneh. Divê di ber wî va ji tu bêyi kuştin.

Bi şaretêkê ji destê general, serê şiranifiroşê reben bate jêkirin. Hingê zabî ber ve fermandarê xwe hatin û bi vê edaleta han pîroz kirin.

Di nava deh deqîcan da sê mirov ji bo çend perçe şiraniyên qirêj hatine kuştin, bê ko dilê kesî bi wan bişewite.

XWÎNIYÊN BI DEREWAN

Dîktor Jêrviye dibêje: Rojekê jineke inglîzî li ser rê hati bû kuştin. Hakimê Çînê ê eskerî, hema xwîniyê jinikê girt û bê mehkeme da kuşlin. Ji bo dilxweşiyê, ji qonsulê inglîzî ra got: heke bi kuştina xwîniyê jinikê dilê te rihet ne bûye, niho ezê çend hepsiyan çîni bitim û li pêş te bikujim...

Hin ji vê ecêbitî, carekê du keşeyên emêrikanî li êrdimeke Çînê hati bûn kuştin û xwîniyê wan ne hati bû nasîn. Ji bo ko qon sulê emêriklî nexeyide, hakimê eskerî ê wê êrdinê da zanin ko xwîni girtine û qonsulê emêriklî jî, ji bo dîtina mehkema wan. vexwan

Roja mehkemê sê merivên çîni aulne pêş mehkemê û wan jî bi devên xwe gotin: Me her du keşe ji bo dirav ên wan kuştin. Li ser vê gotinê her sê jî kujirandin

Piştî çend mehan xwîniyên bi rastî hatine nasîn û bi darve bûn.

Dem a li ser her sê merivên ko berê dabûn kuştin ji hakimê eskerî hate pirsîn; got: Ji bo ko qonsulê emêriklî ne xeyide, min sê feqîr anîn û pê ra bazara xwe birl. Da ko ew li pêş mehkemê bêjin me keşe kuştin û ez jî di ber wê va, cende kên wan di tabûtên giranbiha da veşêrim...

OSMAN SEBRÎ

HINDIK RINDIK

DI ROJEKÉ DE 174 VAPOR:

Emeleyên tersaneyên emêrîkanî, vê paşiyê (Labor-Day) yanî (Roja-xebatê) şaltînet kirine û di wê rojê de 174 vaporên nû daxistine behîrê. Di nav van vaporan de her textlî keştî hene, cenkeştî û keştîyên adetî, ji bo guhastina eskeran an aletên cengê, cehîrxane û tiştine din. Di nav wan de nemaze vaporên 10500 tonî hene ko emêrîkanî ji wan re « keştîyên serbestiyê » dibêjin. Disan di wê rojê de wan tersan-nan bi xwe hewdên 49 vaporên nû li taxokan siwar kirine.

TONÊLEKE JAPONYAYÊ:

Japonan ji mêj ve dixwest her du giravên xwe ên bîngêhîn Honde û Kiyocîyoyê bi toneleke binbehrîn bigêhînin hev.

Proja vê tonelê a pêşîn di sala 1897an de di meclîsa japonî de hati bû mîzakere kirin. Lê meclîsê ew proje bi tenê di sala 1918an de tesdîq kir. Mihendîsan piştî pênc salan dest bi kolandinê bikirina; lê zînzala sala 1923an ne hişt ko projaya wan here serî. Mihendîsan di sala 1936an de ji nû ve dest bi xebatê kir û di pênc salan de xebata xwe temam kirin. Tê de sê milyon emel xebitîne û 50 milyon ley lê çûne.

Dirêjahîya tonelê 19 kîlo-mêtr in. Japonan piştî ko tonelê kolan û tê de rêne ereban çêkirin, rêhesinek jî lê danin. Ev bûne çend meh, trenên rêwîngîyan tê re diçin û tî. 87 ZAR Û ZIMAN:

Mîbêşîrekî emêrîkanî bi navê Dr. Bilyê piştî ko hînt zîmanên ewropayî ên bîngêhîn bû bû, çû bû giravên Filîpînê û tê de bi cih bû bû.

Dr. Bilyê di nav 60 salî de hînt 87 zar û zîmanan bûye. Ji lewre yê ko bi heft zîmanan dizanin bila nebejin em bi gelek zîmanan dizanin.

ÇEKÊN NÛ:


Li 21ê Çîriya-paşîn 1942an gava êrîşa rûsî ya Zîvîstanê dest pê kir ûrisan da zanî ko mîtralîzozeke nû bi kar êxistîne û ew mîtralîzoz bi elêktrîkê dişîxule û di deqîqê de 2500 herîqî berdide.

Li 27ê wê mehê radyowa Berlînê da zanî ko qewetên mîhwerê di qada şerê ûris de mîtralîzozeke welê bi kar êxistîne ko ew tîmatîka-elêktrîkî di deqîqê de 3000herîkî berdide. GIRTINA HÊVÊ:

Li cem me gava hêv têtê girtin xelk li def û erebanan didin; tîfîngan berdidan. Çîre? Efsaneyê gotîye hêv têtê girtin ji ber ko hût dev lê kirîye û dike wê daqurtîne. Ji lewre xîrocîrê dîkin da ko hût dev ji hêvê berde.

Li bakurê Ewropayê wela-tek heye jê re Skandînavyê dibêjin (Iswêç û Norwêj). Fesana wî welatî dibêje ko li ezmanan du gurên fêris hene. Wan guran daye pey hêv û rojê. Dema ko gur gîhaştine yekê ji wan stêrkan; hêv an roj têtê girtin. Ji her ko ew gur dev li wan dîkin. Skandînavî ji wek me, dîkin qîrçîr hetanî ko gur dev ji hêv an jî rojê berdidin.

XEBERGUHÊZ



Îsal alûçeyên Ingîlîstanê gelek boş hatine. Ewçend ko piştî ko ên rîndîgîhaştî û hijarte di sûkan de fîrotine bi ên mayîn kirin ko riçal çêkin. Lê ên mayîn hînde zêde bûn ko tenekêyên berdest têra wan ne dikirin. Li ser vê yekê ên nîvxav bijatînjû ew xîstînin demîne mezin. Alûçeyên nîvxav heta Zîvîstanê gîhaştine û bûne fêkîne xwarbar. Xelkê Ingîlîstanê xêra vê tevdirê li vê Zîvîstanê fêkîne ter û taze dixwînin.

MIST - AWIK

Li Sêwerekê bi navê Bûcêx eşrek heye ko li bakur û roavayê bajêr di kûntara çiyê da rûdinin. Piştî ko di vê eşrê da mala Hec-Elî rabûn û mezînatîya eşrê girtin dest xwe, rîspî û pêşiyên eşrê bi arîkariya vê malmezîna nûh, hêdf hêdf ji kûntarên çiyayê Bûcêx bi derketin û berê xwe dane gundên destê ên fireh û têr erd. Kîjan mezin an rîspî ji ên Bûcêx gava ji çiyê derdiketin û dihatin di destê da ci digirtin, bi arîkariya malmezîna Bûcêx mala Hec-Elîyan destên xwe didane ser gundên dorhêlê û piştî demekî ew ji xwe ra dikirin mal. Bi ser da çend malên bûcaşan jî dixistîne nav xelkên gund ên binecl.

Vê yeka han bi carekê kêfa eşîrên destê revandî bû û bi çavêkî rihet li vê kira bûcaşan ne dinêrîn. Demekî dirêj ne ajot ko gund û eşîrên destê li ser bûcaşan bû bûn yek û ev yekîfî bi sond û peymanan xurt kiri bûn. Di vî deraxî da bû ko bi navê Mist-Awik rîspiyekî Bûcêx daketi bû deşta jêrîn û di ber Ferêd da bi navê Beremaniyê gundek ava kiri bû. Gund avakirina Mist-Awik di vê demê û wî cf da bi carekê eşîrên dorê rakiri bûn ser lingan. Piştî ko di navbera Mist-Awik û gundên dorê da çend şerên biçûk bû bûn. Rojekê di nişka va, gund û eşîrên dorê, bi qasî çarşed peyayî civandî bûn û bi ser Beremaniyê da girti bûn.

Di gundê nû da ji Mist-Awik û çar xulamên pê va, kes tine bû. Li pêş vê tevdfra neyar a bê eman, Mist Awik tevî xulamên xwe, derê hewşê li ser xwe dada û di xêf da asê bû. Neyaran dixwest berî ko gaziya Bûcêx xwe bigehîne ser Mist-Awik, şalê wî bindest bikin. Ji bo vê yekê, çav dabûn êrişan. Mist-Awik jî, ne mêrê ko bi êrişên neyar biqefiliya, ber çar xulamên jê ra tîfing dadigirtin û wî jî her bi singa neyarên êrişvanî da vala

dikirin. Bi qasî ko Mist-Awik mêrekî çê bû; ewçend jî nişandarekî xedar bû. Bi wê nişandariyê bû ko kes, ji êrişvaniyan negihandi bû xwe. Ya deverê di erdê ra dikirin û nema radi-bûn; an jî bi birfneke xedar li hevalên wî vedigerandin.

Wê rojê heya êvarê û bi şev jî heya sibê êrişên neyaran li pê hev bi ser Mist-Awik da diçûn. Lê tu êrişvanî ji sînorê hevalên xwe derbas ne dibûn û hemî raste dongiyêke kirêt dihatin. Dema şev ronî bû û tirijên royê xwe berdane ser xaniyê Mist-Awik, mîna ko keriyek pezê reş li dora xêfî meşel be, cendekên êrişvaniyan neyaran welê deverê ramediya bûn.

Hfngê halê Mist-Awik jî, ji yê neyarên wî ne pîr çaktir bû. Ji ber ko, herçar xulam hati bûn kuştin û bi xwe jî, bi deh gulên birfîdar bû bû. Lê, van birfînan ji dil û kezebê dût, ew gurê qol di ser lingan da ne xisti bûn. Wî her borîn bû û nav di xwe didan, bi vê serê neyarên xwe germ dikirin.

Kebera vî şerî giha bû Bûcêx û wan jî gaziya xwe dicivandin da ko Mist-Awik ji hesarê bi derxin. Neyaran şelpa bûcaşan dizani bû. Çi gava bigehîştana ser lecê, dê Mist-Awik xilaskirana û xwîna hinde mêrên wan li tinê biçûyana. Ji bo ko pîsiyêke wa ne gihînin xwe, dixwestin qene Mist-Awik bigirin. Li ser vê ramanê — dîrfî rêzana serevaniyan — agir berdane goma pêz, ya ko di rex xêfî da bû.

Piştî du saetan êgir çarmedorî xêfî girti bû û li ser banê xêfî serê Mist-Awik di nav gurik û dûmanê da dixweya. Wî dîsa wekî berê bi borîn û halan, şerê neyarên xwe dikir. Wê gavê serekên neyaran gazî Mist-Awik kirin û gotin ê:

— Bextê me ji te ra, bi derkeve, em te nakujin; lê emê te hêsr bigirin.

Mist-Awik bi dengêkî box li wan vegehand û got:

— Ma ji we ra ne şerm e ko hon vê reya teres didin ber minî. Ma kînga şêr bi xweşî hatine girtin, ko hon jî fro bigirin? Şewitîna di nav agir da, bi qasî ser-nîzmîya dîliyê ne dijwar e...

Lê sed mixabin ko gaziya Bûcêx di demê da ne gihîşte Beremaniyê û paşê di nav şewatê da li hestiyên Mist-Awik digertin.

OSMAN SEBRÎ



Jî BALAFIRÊN FRANSA ŞEREVANÎ YEKE BOMBAVÊJ

ÇIROKA

SEYÊN BIRÎNDAR


Vê Paizê me nêçira kotefiran di nav kendiran de kiri bû. Kendir gelek himbiz bûn û seya min gava tê re diçû qamişên kendiran li çavên wê diketin. Piştî çend caran çavên seya min kul bûn. Min ew bire eczaxana taxa me da ko ez jê re dermanekî binim. Xwediyê eczaxanê, Mihemed efendî Qenewatî, gava bi îşê min hesiya xwe da ber û gote min:

— Tu çire dermên bi xwe re bibî. Ez gelek heji seyan dikim. Hero seya xwe bine nik min ezê çavên wê derman bikim.

Mihemed efendî piştî ko ji dermanekî çend dilop niqitandine çavên seya min, ji nû ve gote min:

— Bi vê hêncelê ezê ji te re çiroka seyeki bibêjim. Bert şeş salan, hingê ez li jêr li Ernûsê dixebitim. Rojekê ez di eczaxanê de rûniştî me. Min dengê seyeki kir. Se ne diref lê dinall. Ez derketim derve. Seyeki birîndar li ber deri veketi bû. Timobilekê pê lê kiri bû; heywan dikulî. Min derman û penbû anî, birîna sê şîşt û pêçand û hinek naş ji da-yê. Qederê 15 rojan min seyê xwe derman dikir û nan dida-yê. Seyê min rabû ser xwe û li ser lingên xwe geriya. Min û seyê xwe bi vi awayî du meh bi hev re borandin. Rojekê min dît seyê min xwe winda kir û li min xuya ne bû.

Şeş meh ketin navê. Disa rojekê ez hatim eczaxanê vekim. Çi bibînim, seyê min e, seki din ji pê re ye. Seyê kevin dûvê xwe hejand, nîzîngî li min kir û sekini.



Keleheke firolek di destegahê de. Emelê li baskên wê siwar bûne û bin alet û hacetan lê siwar dikin.

Min bala xwe da, seyê min carekê li min dinihêre, çavên xwe ji min badide û li hevalê xwe temaşa dike. Qey dixwaze hevalê xwe şanî min bide. Ez bê hemtê xwe li hevalê wî hûr bûn. Çi bibînim; hevalê wî birîndar e. Ez ketim eczaxanê û bi şûşekê û hinek penbû li seyên xwe vegeriyan.

Seyê kevin gava çav bi şûşê û penbûyê kir, xwe avête ser min û destên min alastin. Eşkere bû ko seyê min hevalê xwe anî bû nik min da ko ez wî ji derman bikim. Birîna hevalê wî ne ewçend xedar bû; di nav çend rojan de sax bû.

Piştî çend rojan her du san xwe nebîhistî kir û min ew nema dît.

NÊÇÎRVANÊ HAWARÊ

Gandf sergewazê Hindîstanê ê bi nav û deng vê paşiyê û ji nû ve dest bi rojiyê kiriyê. Gandf carê ko dikeve hepsê dest bi rojiyê dike. Par wextê ko kongra Hindîstanê çêbû hikûmetê Gandf û hin hevalên wî girtin û ew kirin hepsê. Gandf herwekî berê dikir, vê carê jî, ji bona ko bête serbest berdan, dest bi girtina rojiyê kir. Lê dibêjin ko vê carê Gandf nema dikare, û ji rojiyê gelek teşe. Sergewazê Hindîstanê gelekî li xwe şkênandiyê û qels ketiyê. Lê Gandf rexma her tiştî di rojiya xwe de pê dide erdê û naxwe.

Di meqamê protestoyê de an bi sebebeke din rojî-girtin ne tiştekî nû ye. Ev adet ji mêj ve di nav mirovan de heye. Lê mirov zû zû ji nêz û birçînan namire.

Belê gelek caran tête bîhstînan ko insan an heywanin ji sermê qefillne û mirine. Lê di wextine adetî de kêm caran hatiye dîtin ko mirov ji nêz û birçînan mirine. Ji ber ko insan midekî dirêj bi tenê bi vexwarina avê jî dikare bijî.

Ji xwe li gora pisporan çarçeka tiştên ko em dixwin best me ye. Sê çarçekên din zêde ne û ew zêde li me nayê, em jê tu fêdê nahînin. Ji ber vajî ve zêde ji bedena me re zere e û jê nexweşiyin çêdibin. Lê pir-xwarin bûye adet [1].

Bedena mirov herçend tenik û zirav e ewçend jî xurt û qahîm e. Mirovê ko daye rojiyê hetanf ko ji bezê wî, ji sedî 97, ji kezêb û tihêla wî ji sedî 30 û ji wersele û edeleyn wî ji sedî 50 bilhelin dikare bijî û bi tenê bi windakirina van mixdaran dimire. Herçî dil û damar, rojî li wan

[1] Ji mêrê hotî ve yek car ne welê ye. Jê ve, ji xwe têr-xwarin nîne lê bes-kirin bûye adet!..

ROJÎ NÊZ Û BIRÇÎTÎ

hikim nake, ew heta dawiyê weke xwe dimînin.

Em bînan ser mirovên ko bi girtina rojiyê deng dane. Di nav wan de ê bi nav û dengtir û yê ko ji hemiyana bêtir nîzîngî wextê me ye Mak Swênî ye.

Mak Swênî, di Îrlandayê de waliyê Korkê bû. Di sala 1920an de xelkê Îrlandê li taca Ingîllîstanê rabû bûn û mixtarîyeta xwe dixwestin. Mak Swênî bû bû hevalê asiyan. Li 12ê Tebaxa sala 1920an hikûmetê Swênî girt û hepis kir. Mehkemê du sal lê hikim kirin. Mak gava ji mehkemê vegeriya bû hepisxanê goti bû: « Heta mehekê ezê ji vê hepisê an zindî an mirî bi derkevim ».

Ji wê rojê ve Mak dest bi rojiyê kir û tiştek ne xwar. Bijîştan şîret lê dikirin û digotin ko jiyîna wî di talûkê deye. Lê Mak guh ne dida wan û li ser gotina xwe disekin.

Malê Swênî roj bi roj xerabtir dibû. Xweha wî rabû û ji serekwezîr Mr. Loyd Corc re telêgrafa jêrîn şand: « Birayê min waliyê Korkê di hepisxana Brîkstonê de li ber xwe dide. Heke birayê min ji nêzan di hepisê de mir, milletê Îrlandî dê te û hikûmeta te ji mirina wî berpîrsiyar bizanin ».

Loyd Corc hingê li Swîçrê bû. Li xweha Swênî bi telêgrafa jêrîn vegerad: « Hikûmet nikar waliyê Korkê bi hênceta rojiya wî ji hepisê derfne. Ji ber ko heke me ev kir, hepsî tev de wê bidin rojiyê û wê bixwazin bi wî awayî ji hepisê derkevin ».

L 20ê Çiriya-pêşîn êdî Swênî ji bir ve çû bû û bi dora

xwe ne dihesiya. Bijîştan hinek ava goşt û çend dilop konyak dan-ê. Swênî pê bişyar bû û bi xwe hesiya û bijîştîk jî nik xwe'î der kirin. Li 25ê wê mehê yanî piştî 73rojen birçîtiyê, Swênî di hepisa xwe de mir.

Heriya mîlada İsa pêxember bi 323 salan Dîmokrîtîsê yewnanî 40 rojî rojî girti bû. Dîmokrîtîs di wî 40 rojî de nan û hingivîn bîhin dikir.

Carêkê hepsiyekî di hepisxana Tulozê de 63 rojan rojî girti bû û pê miri bû.

Disan Dr. Taz 40 û Elek-sendr Cak 50 û yekî talyanî bi navê Marlanî 50 rojî rojî girti bûn. Heçî mêrikê talyanî heriya ko dest bi rojiyê bike 5 kîlo goşt, qazek, mixdarekî boş heşinatî û kodek gwîz xwarî bûn. Jê pêve Marlanî di wextê rojiyê de jî av vedixwar.

Di nav mehkûmên îdamê de gelek peya tene dîtin ko piştî bikimê îdamê xwe ji xwarin û vexwarinê mehrûm dikin. Ji mehkûmên îdamê yekî emêrîkanî bi navê Edward Cons 35 rojan rojî girtiye. Landrûyê fransîz, yê ko deh-keçîk kuştî bûn wî jî piştî bikimê îdamê dest bi rojiyê kiri bû.

Lê vê paşiyê rojîke dîn baw bûye; rojiya derman. Yên ko wê rojiyê digirin di wextê rojiyê de wêk mêrikê talyan û li gora kêfa xwe avê vedixwin; lê tu zêd naxwin. Dibêjin ko bi wê rojiyê her texlîf nexweşî ne derman kirin.

Nûredîn Ūsîf, nîvsevanekî Hawarê ji ber êşêke rûdîyan, sê caran ev rojî girtiye: 11, 15 û 21 rojan.

Ji van pêve mirovin hene, ji roja ko bîrewer dibin, heta dawiya emirê rojiyê digirin. Lê dîvê rojiya wan ne ewçend çetîn bit. Ji ber ko ew bi şev bi qasî sê çar peyan dixwin, heta nîvro dinivîn û di wextê mayîn de rojiyê digirin. EJÛŞKÊ HAWARÊ

Herwekî li hemî Ewropa-
yê, li Parisê jî xelk ji ber zad
û çût di zehmeteke giran de ne.
Dibêjin ko xelkê Parisê di
mirîşkan û di nav xaniyan
de heywanine berêz ne dikir;
jê re xwedî dikin.

Di nav hinên
din de yekî mi-
hendis ji xwe
re kutikekî be-
razan peyda
kiri bû û ew
kiri bû hemama
xaniyê xwe û
ew bi xwedî
dikir. Kutik roj
bi roj mezin
dibû û mihen
dis kêfa xwe jê
re tanî. Belê
kutik wê bibiwa
berazekî fêris.
mihendis ew
şerjê bikira û
bi gostê wî
qelî û hişkegoşt
wê çêkira; çî
beytiyarî....

Kutik ewçend
mezin bû ko di
hemamê de ne-
ma debar dikir.

LI ŞONA BERÊZ JÊ RE SEKÎ FÊRIS ANÎ BÛN

Mihendis berazê xwe jî he-
mamê derxist! û ew berda
lîwanê; da ko bikare serbest
lîwan jî tîra
welê dixuye ko lîwan jî tîra
erdekî jê firehtir

DUK OF KENT



dîviya bû. Ro-
jekê berazê me
derî vekirî dît,
jê derket û çû
li erdekî fireh
bigere.

Mihendis gava
pê hesiya gelek
li ber ket û rabû
flanek di roj-
namekê de be-
lav kir. Mihen-
dis di flanê de
digot: « Min
heywanekî çar-
pê windakiriyê;
beçî ew peyda
kir û jî min re
anî ezê wî pê
re bi nivî par
ve bikim ».

Sibetirê zila-
mekî li deriyê
mihendis dida.
Bi wî zilamî
re seyekî fêris
hebû; heywa-
nekî çarpê.

HESENÊ MISTÊ

Dûkê kentê birayê qralê Ingilîstanê bû. Dûk wek piraniya mirekên Ingilîstanê zabîte deryavaniyê
bû. Dûk, berî çend mehan bi balafîreke behri diçû Îslandayê, da ko li wargehên giravê û li halê
balafîrvanên ingilîzî hûr bibe. Balafîra Dûk bi rê ve ket û Dûk emirê Xwedî kir. Miletê ingilîz
gelek li ber Dûkê xwe ket. Lê ji aliyê din pê iftixarî jî kir. Ji ber ko Dûk di xizmeta millet û
welatê xwe de miri bû.

ROJA NÛ

Xwendevanên delal mizgîniya me li we. Piştî
Hawar û Ronahiyyê honê bi rojnameke kurdî, Roja-nû
ji şa û kêfxweş bibin. Hejmara vê rojnamê a pêşîn
di van çend rojan de wê derkeve. Roja-nû wek Hawar
û Ronahiyyê ne bi tenê edebî û cûvaki ye. Lêbelê
Roja-nû rojnameke siyasî ye. Honê tê de ji her textil
nivîsaran pêve danezan û niçeyên şer ên dawîn jî
peyda bikin. Ji niho de hon dikarin kiriyarê Roja-nû
bibin. Ji bona vê yekê jî hema bi kartekê nav û adrêsa

xwe jî xwediyê wê re bidin zanîn. Eve adrêsa Xwedî:

Dr. Kamiran Alî Bedir-Xan

Xwediyê Roja-Nû — Avalîiya Ebû-Efîf

Meydana Bircê — Bêrût

Ji ho postê bi erebî, divêt holê bête nivîsandin:

الدكتور كامران عالي بدرخان

صاحب الجريدة الكردية « روزانو »

بناية ابو حنيف - ساحة البرج - بيروت

Kiriyariya Ronahiyyê : 500 qirûşên sûrî.


Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 13
PENCSEMB
1 NISAN 1943

RONAHI

ANNEE 2
NUMÉRO 13
JEUDI
1 AVRIL 1943

SUPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



ESKERINE HEVALBENDAN DADIKEVIN PERAVÊN EFRÎQA BAKUR



ÇABXANA TEREQIYE
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Roviyê Qut	Çirokbêj
Hesenê Mûsa	Stranvan
Xwe da dest	Sinaînê Serhedî
Tiştên Bikêr	Remildar
Kehanetên Feqîreki	Ronahî
Stalingrad	Dilawer Çarpine
Meji	Bijîşkê Hawarê
Tayek porê spi	Qedri Can
Sê milyon gur	Evdirehmanê Rojki
R. A. F.	H. Mistê
Seyên Şerevani	Xellî Genco
Bangê kurdan	Hesenê Hîşyar
Gewherên Betlemyos	Bişarê Segman
Trablîserb	Ronahî
Hindik Rindik	Xeberguhêz
Kerê dengbêj	Osman Sebrî
Xocê Nesredîn	Ronahî

ÇIROKA KURDMANCI:

ROVIYÊ QUT

Rovik hebû; hin bû bû, diçû mastê pîrekê dixwar.

Pir gelekî li ber mastê xwe diket û aciz dibû. Şevêkê pîr li ber mastê xwe vekat. Dor nivê şevê; dit, vaye rovi hat û keke ser mastê wê. Hema pîrê rahişte şonik û ew li rovi wer kir. Şonik li dûvê rovi ket; dûvê wi qut kir. Rovi baz da û çû.

Wextê ko bû sibê û roviyê te bi nav roviyan ket; heçî roviyê ko giha-yê, go: « ha quto mi di binê dûv kuto ».

Roviyê rehen di nav roviyan de şermî bû. Li xwe fikirî go, ez halo bê dûv bimînim, ez nikarim di nav roviyan de bigerim.

Roviyê me rabû qesta pîrê kir û çû cem; jê re got: Ez li bextê te me, tu dûvliçkê min bidî min. Lê ez nikarim derkevim nav hevalên xwe û ji dêla dûvliçkê min ez sewilek pere bidim te; min ew li çiyê di qulekê de ditiye. Bi min re were û wi ji xwe re bibê.

Pîrê da pey roviyê çû. Dit gava gotina rovi rast e. Kêfa pîrê gelekî hat. Pîrê gote rovi go, vê carê were ezê dûv bidime te.

Rovi bi pîrê re çû. Pîrê rabû dûvê rovi pê ve kir, weke berê û çend morik û zengilok ji pê ve kirin. Kêfa rovi pîr jê re hat. Hema da qevza û çû nav roviyan. Heçî çav lê kir go, ma bira te ev tiştê wilo xweşik ji kû peyda kir.

Rovi ji wan re got, bira ev pîr hêsani ye. Wan jê re got, bira ma tu karê dûvên me ji wilo çênaki? Go, belê

heçî ji we dixwazê dûvê wi weke yê xwe çêkim bila bêje.

Hemiwan go, me divê. Rovi go dê bidin pey min; û rovi kete pêşiya wan û çû ser golekê, ji van golên teji av. Dinya ji Zivistan û sar e.

Roviyê me gote wan, de hemî dûvên xwe heta bi nivî bikin avê, heta sibê dûvên we hemiwan dê weke dûvê min bibê. Roviyan rabû weke ko wî ji wan re got kirin. Şev çû nivê şevê û dinya li ser wan bû sayî. Ava golê bi dûvên wan cemedî û qeşa girt. Çaxê ko bû sibê şivan û gavan bi ser wan de hatin. Hem ji tîrsa rihê xwe, roviya xwe li wê qeşayê da. Dûvên temama di nivî re qut bûn.

Hema roviyê me bi nav wan ket û heçî giha-yê go, ha quto mi di binê dûv kuto. Bi vî awayî roviyê me heyfa xwe ji roviyan hilanî.

STRANA KURDMANCI:

HESENÊ MÛSA

Heywax, heywax, heywax mala min î
Tej û mehîrê mala bavê min qetiyane ji raxistinê
Oda mala bavê min xali nabe ji çûn û hatinê
Miqilka mala bavê min şewitiye ji hêka ji çelandinê
Heyf û xebînetê çavê reş û belek ax ketin ê.

Heywax, heywax, heywax mala min î
Hesen heyran li min hate ida haciya
Qiz û xortê gundê me kişiyani hîrmaziya
Ez û Hesnê Mûsa me ji xwe re kir henek û laqirdiya
Destê Hesnê Mûsa li morî û mercanê min geriya
Em ji xwe re qasekî rûniştin; pê bîliya
Carkê tîfngêk ji azmanê hefta teqiya
Stoyê Hesnê Mûsa li ser kaba min rebenê dixeliya
Minê carkê çavê xwe li dora beranê koviya gerandiya
Li tehtekê bi çongî rûniştiye reha qolîmê diqetiya.

Heywax, heywax, heywax mala min î
Heyf û xebînetê çavê reş û belek ax ketin ê
Mehra mîra li min heram be xeynî Hesnê Mûsa li dora
[dînê.

Heseno heyranî li min hate ida qurbanê
Xortê gundê me kişiyane berkozikê, ber nişanê
Keçkê gundê me kişiyane vê dawetê, vê dilanê
Ezê çavê xwe digerinim nagerinim
Hesnê Mûsa li nav xorta nabinim.

Heywax, heyway, heywax mala min î
Çi heyf û xebînetê e, çavê belek ax ketin ê
Hesno heyran li min hate ida haciya
Hesen heyran ji heştê heta heştê
Çilê wî bişon bavêjin teştê
Ji birina xelkê tê av û xwina
Ji birina Hesnê Mûsa, lawikê min rebenê xwina reş tê.

Heseno heyran Havin e, xweş Havin e
Li serê Hesnê Mûsa bikin baki baweşîna
Ji birina xelkê tê xwina reşa
Ji birina lawikê min Hesnê Mûsa tê kêm û xwina.

XWE DA DEST

Ji ber ko li goştê berêz pîrsî bû

Casûsên elemanı bi paraştan an bi motorbotan dadiketî peravên Ingilîterê û di nav gundan de digeriyan, hal û hewalê Ingilîstanê seh dikirin û ew xeber digihandin serfermandariya ordiwa elemanı. Bi wan casûsan re nîfûsên inglîzî jî hebûn. Ew tezkereyên sexte li Berlînê çêdikirin. Ji milê din wan casûsan bi qasî inglîzîkî bi inglîzî jî dizanin.

Ew casûsên ha di sala 1940f de di peravên Ingilîstanê de xebateke zor xebitî bûn. Lê hikûmetê jî wan re tevdrîne xurt dîlîne û sênc danî karê wan. Hikûmetê xelkê peravan bi çek kirin û jî wan teşkîlata mihalîzan çêkirin û jî aliyê dîn di peravan de qeokoline nû danîn.

Digel vê hindê carina casûsin dadikevin erdê Ingilîstanê û têkîli xelkê dibî. Vê paşiyê du casûsên elemanı, bi şev li gundên dora Dûvrê peya bûn û xwe di nav xelkê de wiinda kirin. Lê xelkê nikarî bû wan nas bike. Ji ber ko her diwan jî bi şîwa inglîzîyan, bi inglîzî xeber didan û bi her adet û nizamên inglîzî dizanin û bi rêzîka welêt ve diçûn.

Lê yek ji wan, bi navê Karl, dilê wî çû bû goştê berazan. Karl rabû çû dikanekê û jî xwedî 20 gram goştê berêz xwest. Gava xwedî êtîzar kir Karl di dilê xwe de got, qey li cem mêrik goştê berêz ne maye. Ji lewre jê re got:

— Hingê heqalekî dîn şant min bide, heye ko li cem wî goştê berêz peyda bibe.

Beqal hinek lê ecêlanayi ma û got-ê:

— Ma tu çî dibêji. Bawer bike te jî bîr kiriyê ko goştê berêz li heftê bi tenê sê caran tete tirotin û iro ne roja wî ye.

Karl bi xeleta xwe zauf û xwe danî jîbtrokeryê. Lê xwediyê dikanê piştî ko Karl çû; da eqilê xwe û di dilê xwe de got, ma iro li Ingilîstanê kes heye ko bi rojên goştê berêz nizane. Li ser vê yekê îlanên hikûmetê hatin bîra mêrik. Îlanên ko hikûmetê tê de digot, li casûsên elemanı yên ko bi şev dadikevin peravên me guldar bibin. Mêrik hema baz da ser telefonê û elam da qereqona nîzingîr. Ji milê dîn mîsteryiyê xwe jî peyda kir û bi hênceta ko ewê jê re goştê berêz peyda bike, ew jî anî dikanê û çû elam da mixtarê gund jî. Hikûmetê jî ehaliyan re da bû zanîn ko ew casûsên ha tucaran ne bi tena xwe ne û her hevallekî wan heye.

Mixtar û sê mihalîz li hevalê Karl geriyan. Mêrik li qeraşê rûniştî bû û temaşaya behirê dikir. Mixtar ew girt. Di vê navê de polis jî gihastî bûn dikanê. Karl hêj tê de û li hêviya goştê berêz bû. Polîsan jî Karl girt. Her du casûsan li cîrmê xwe mikur hatin. Bi wan re defterek jî peyda kirin. Casûsan li defterê tiştên ko didîtin diivîsandin. Lê hêj xeberên xwe ne gihandi bûn serfermandariyê.

SMAYNE SERHEDÎ



HÊSÎRÊN ELEMANÎ DI KÛÇEKE LONDRE DE Û BER BI HÊSÎRGAHEKÊ

TIŞTÊN BIKÊR

DRÊJAHIYA ŞEV Û ROJAN:

Di rojekê de 24 saet hene. Lê drêjahiya şev û rojan, li salê bi tenê carekê, li 23ê Adarê, li roja Newrûzê, weke hev dibin, her du ji dwanzdeh saet in. Ji vê tarîxê ve şev bi dirêjbûnê, roj bi kurtbûnê dikin. Lê herwekî lista jêrîn şanî dide roj tucaran bi qasî şevê kurt nabin.

	Saet	Deqîqe
Roja dirêjtir: 22 Hizêran	16	8
Roja kurtir: 22 Kanûna-pêşîn	8	11
Şeva dirêjtir: 22 Kanûna-pêşîn	15	49
Şeva kurtir: 22 Hizêran	7	52

Ji 22ê Kanûna-pêşîn ve roj dirêj dibin û hero saetekê û çend deqîcan bi ser ve zêde dikin:

	Saet	Deqîqe
Kanûna-paşîn	1	4
Sibat	1	38
Adar	1	30
Nisan	1	26
Gulan	1	23
Hizêran	1	19
Ji 22 Hizêranê ve roj bi awayê jêrîn kêm dikin:		
Tirmeh	1	2
Tebax	1	50
Îlon	1	46
Çiriya-pêşîn	1	40
Çiriya-paşîn	1	14
Kanûna-pêşîn	1	17

CEMRE

Cemre çi ye? Li gora pêşyan hêman yanî insirên dinyayê çar bûn (ax, av, hewa, agir) û tebiêt ji wan bi hev diket. Di nav wan çar hêmanan de ê xurtir agir bû. Carê ko agir digiha hemanekî din ji vê bûyerê re cemre digotin. Ji xwe (cemre) bi mana pereng e. Bi gotinên din bi keşîna her cemrê germî digehe hêmanekî din û wî divejine. Cemreyên

salê ev in:

- 1— 20 Sibat. Cemre dikeve hewayê û ba germ dibe.
- 2— 27 Sibat. Cemre dikeve avê; sira avê dişkê û av dest bi germbûnê dike.
- 3— 6 Adar. Cemre dikeve axê; germî di axê digere.

BARAN Û SAHÎ

Pêşyan bala xwe daye û ditiye ko heywan beriya fîsanînan bi guhêrîna ba û hewayê dihesin.


Delêletên sahiyê: Hacıreşk bilind difîrin; Pîrhevok di çêkirina tevnên xwe de pê didin erdê. Moz û mêş serê sibehê bi refan difîrin. Dûyê bixêriyan rast dertê û zû belav nabe. Roj di sînga ezmanekî zelal re diçe ava. Rengê heyvê zelal û zere ye. Ji bakur sîreke sivik têt.

Delêletên baranê: Hacıreşk nîzîm difîrin. Hesp dişîhin. Ga diborin. Beraz diorin. Dibe qurqura werdekan; werdek noqî avê dibin. Mêşhingiv ji kewarên xwe dernakevin. Pîrhevok nema dixebitin. Beran bi poşan dikevin hev. Pising dibihnişin û piştî guhê xwe dixurînin. Mêş bi rûyê mirovan digirin. Roj nema zelal e, rengêkî şeylo bi rûyê wê digere û êvarê di nav ewran re diçe ava.

KEHANETÊN FEQÎREKÎ HINDÎ

Li Hindistanê feqîr ji wan peyayan re dibêjin ko bi xeybê dizanin. Yek ji wan, Badek Bad Salihê wê paşiyê hatiye Misîrê û di civatên wezir û hakimanan de û li ser xeybê gelek tişt gotine. Di nav wan tiştan de kehanetîne welê hene ko herkes bi wan elaqedar dibe. Em wan kehanetan berpeyî xwendevanên xwe dikin:

- 1— Li Adara sala 1944an Îtalye wê mîlîtarekê bixwaze.
- 2— Dîsan di wê salê de û di meha Kanûna-pêşîn de Eflamanjê ji wê çekên xwe deyne û mîlîtarekê bixwaze.
- 3— Miaheda aşiyê beriya sala 1946 nayete imza kirin.
- 4— Şer, di Pefîfikê de, heta Gulana sala 1946an wê dom bike.
- 5— Hitler di destpêka sala 1944an û di qada şer de bi herikekî dê bimire.
- 6— Şerê Tûnisê heta meha Hizêranê wê dom bike. Romel û hin eskerên wî bi balafirên wê xelas bibin.
- 7— Tirkîye ji di destpêka sala 1944an de wê bikeve şer.
- 8— Ji meha Tebaxê ve şerevani dest bi îstîfala gazên bijehîr bikin. Berî herkesî ordîwa eflamanî di qada serê ûris de bi wan gazan dê emel bike.



DERYAVANINE F.Ş. LI VAPORÊN XWE SIWAR DIBIN

REMILDAR

STALINGRAD

ELEMANËN TË DE ÇAWAN TESLIM BÛNË

Dasilana şerê Stalingradê dûr û dirêj û ji şan û şeref û qehremaniyê tijî ye. Ordiwa elemani qederê pînc mehan dirêjî wê kir; kete hundirê bajêr, di avahiyan wê de bi cih bû. Ūris di kûçê û kolanan de man. Lê dev ji bajarê ko navê sergevazê wan lê ye, bernedan. Bi dest û ling û neynûkên xwe şerê neyarên xwe kirin û ordûke mezin, ya ko jî 300 000 peyayî bi hev diket lê de mehiw kirin û jiber-mayiyên wê ordiwê hêşir girtin.

Elemanên Stalingradê ne tev de, û di carekê de, lê yekinek yekinek teslim bûn.

Serfermandarê eskerên ko di qada Leningardê de şer dikirin merêşal von Bolos bû. Lyotnanê, rûsî Fëodor Yelşenko teslim bûna von Bolos bi awayê jêrin dide zanin:

« Gava merêşal qerara teslimbûnê da digel sê zabitên din keti bû zêrminekê. Me zûka cihê merêşal nasî û me qesta zêrzuimîna wî kir û me li derî da. Zabitek derket û gote me ko merêşal wê teslim bibe. Lê dixwaze bizane heke jî jiyîna wî di bin emniyetê deye. Mîn lê vegerand û got ko jî jiyîna wî re tu talûke nîne û em daketin zêrmîne.

Merêşal li ser textekî rûniştî bû. Şejderba xwe siparte me û ji piyan sekini. Me ew kirin timobilekê de û em bi rê ketin. Bi rê ve gendral von Şmit serekê erkanherbiya von Bolos gote min:

— Ordiwa sor bi mîranî şer dike. Me şer winda kir ji ber ko hon li me wer hatine. Me dikarî bû em çenberê mihasirê bişkênînin. Lê di vê babetê de emir ne da bûne me.

Ji milê din lyotnan Kûdriyaçef teslîna firça piyade a 297an qise kiriye û gotiye:

— Me û dijmin di gornistanekê de me li hev dida. Dijmin xwe da bû gornistanê û ji kêlên tirbau ji xwe re talde û çeper çekiri bûn. Fermandariyê ji me re yekînekine topçî rênekira vî şerî hêj bêtir dê dom bikira. Lê pistî ko topçiyên me çeperên dijmin bombaran kirin, di pişt kêlên tirbau re destin rabûn û destimaline spî li ha kirin. Dijmin dikir teslim bibe.

Pistî çend dejiyan xeberdoşê elemanan gihaşte xelên me. Zabitê elemanî ji me re da zanin ko yekînekên firqê ewê tev de teslim bibin. Li ser vê yekê major Tokayêf digel sê zabitên din çû qargaha firqa elemanî. Heftê zabitên elemanî di kovîkekê de li hêviya me bûn. Kumandarê firqê gendral von Greyber li ber masekê rûniştî bû û serê xwe kiri bû nav kêfên destên xwe.

Gava heyeta me kete hundir zabitên elemanî ji peyan sekinin. Tokayêf ji wan re şertên teslimê da zanin:

1— Herçî zabit di cih de ewê çekên xwe deynin [zabitên elemanî hemî şejderbên xwe danin ser masê]

2— Yekînekên firqa Greyber tev de agir û bruskên xwe wê betal bikin.

Von Greyber rahişte bihistoka telefonê û emir de hemî eskerên xwe ko ji agir kirinê bigerin. Li ser vê yekê Tokayêf tîla telefonê birî.

Greyber dema berê xwe da derî serê xwe hejand û bi elemanî çend pirs gotin. Me ji wan pirsan bi tenê ev seh kirin: « Ev çi şikestin... ev çi şikestin ». Gava me jê re got ko mihaserê Leningradê hate vekirin û ordiwa me Vorovêj bi şûn de veqerand; von Greyber digot; min ev her du xeber jî ne bihistî bûn.

Herçî yekînekên firqa 297an heta êvarê teslim bûn û bi vî awayî nivroyê Stalingradê ji dijmin hate paqij kirin ».

DILAWER ÇARPÎNE



PIYADEYÊN BRITANÎ BER BI QADA ŞERÊ TÛNISÊ

MEJÛ

NÛVMEJÛ ÇARYEKMEJÛ

— JI BIJÛŒKE MÛRAN RE —

TiŒtê ko hela niho me dizanî; mirovên jir û aqil, xudan ray û tevdîr di nav wan mirovan de dihatinc dîtin ko mejiyê wan ne çelqiyaye û wan mejiki mezin û tekûz heye.

Lê bijûŒkeki emêrikani di rayeke din deye. Jê ve welê ye ko xwediyê niv-mejiki jî xwediyê mejiki tekûz baqiltir e. Lê herçi xwediyê çaryek-meji, yekî eqilçelqiyayî, heçko niv-dînek e.

Belê Dr. Beyron Stokî, profesor di fakûlta tîbiya Nûyorkê de, dibêje ko mirov bi niv-mejiki dikare bes bike û nivê din bêsêde ye. Dr. Stokî ev tiŒt ceribandîye û nivê mejiyê mirovekî rakiriye û ditiye ko Œehrazalûiya wî mirovî piŒtî ko nivê mejiyê wî hate rakirin kêm ne kiriye û jî bervajî ve bêtir bûye. Dr. Stokî piŒtî ko ev netîce xiste destê xwe rabû teerîbeke din çêkir. Qehfê mirovekî din vekir û vê çarê li Œûna nivî Œçaryek-mejiyê mêrik rakir û di serî de çaryekeke hiŒt. Lê ev mirovê ha li Œûna ko Œehrazatir bihe kêm kiriye û meye jîydinekî.

Di vê bahelê de tiŒtek lête birê. Gelo Dr. Stokî teerîbeke din jî çêkîra û mejiyê mirovekî bi temamî derêxista gelo jî wî mirovê bê-nejî wê çî bihata pê.

BIJÛŒKE HAWARÊ



SEREKÊ ÇINA ŒEREVANÛ
ÇENKEY-ŒÊK Û JNA WÛ LI ÇEM GENÊRAL ŒINOL



DI QADA TÛNISÊ DE TOPEKE BRÛTANÛ A TANKŒIKEN



TOPEKE 75 AN YA F.S. DI PEY KEMYONEKÊ RE

TAYEK PORÊ SPI

« LI SER ŞOPA MENFELOTI »

Îro, sibehê di ber aynê re derbas dibûm. Min, di nav porê serê xwe de tayekî spî dît.. mîna brûska nav şeva tari, diçirisi..

Gava çavê min pê kel, veciniqim; mîna ko, ji nişkave, sûrek li serê min keve.. nola ko yek ji ezmên dakeve, û di deslê wi de aleke spî hebe û mizgina mirinê bide min.. Min fam kir ko derdeki bê derman e, yan ji tayek ji tayê kafen e..

Ey tayê spî! Min tu rengê spî mîna gewr-bûna te reş.. û tu nûr, qandi nûra te tari ne dît.. Te, her tiştê spî li ber çavê min reş kir; heta ronîya hêv û tavê.. heta ronîya her du çawan.. Ū te, her tiştê reş ji li ber çavê min spî kir; heta çijika reş.. heta hexl û dilê reş..

Ey tayê spî! Te, xwe di kîjan pencerê re avête ser serê min û te, di kîjan rê re xwe gihande cênika min?! Tu çawan di vê zeviya reş û tari de, tek û tenha, bê heval û hogir kari bimîni? Qet çavê te ji vê tariya reş natirse?!

Ey tayê spî! Ez nizamin xwe çawan ji te xelas bikim û çawan ji te birevim!!

Tu fêdeya wê ji min re nîne ko ez te ji cihê te hikiştûm yan ji te boyax bikim.. Ez naxwazim ko di nav du misêbetan de bimîni: misibeta derêwan û misibeta pîrbûnê..

Ey tayê spî! Ez, dibînim ko tu xwedî dek û ripî; tu, bêdîka, di guhê ciranê xwe de diki « kur û pis » û tu, wan dixapîni, ko ew ji mîna te bibin.. û cilên ko te li xwe kiriye ew ji li xwe bikin.. Tu dixwazi di nav vî diyarê bédeng û bê gir-gêç de, ceng û cidalekê çêbiki.. da ko her kes di bin lîngan de biperçiqe.. Tu, mîna insanê spî dikevi nav welatê reşikan û wan dixapîni û tu wan rebenan ji xwe re diki kole û bende..

Ey tayê spî! Tu ki yî, tu çî yî, kê tu şandîye û karê te li ba min çî ye? Heke tu mewanî, kanî izin û destûra ko min daye te? Heke tu bi hevalî hatîyî cem min, ez wi hevalê ko min bi xwe re bibe gorinê naxwazim.. Xwedê zane tu mîna wan maranî ko hêlînê her tebayî kuna xwe dizanin.

Ey tayê spî! Min pîr ji te gili û gazin kirin, lê ez dibînim ko ez ne rast im; disa tu ji her tiştî, ji her kesi bêtir li ba mim bi rûmetî, li ber çavê min bi qedrî dimîni.. Serê min ji te re zozan û pîroz be.. tu ji xwe re — mîna tu dixwazi — tê de vegezive.

Ez dizamin tu, rêberê mirinê yî, rêberê

SÊ MILYON GUR

RAHIŞTINE HEV Û LI HEV DIDIN

Ūrisan ji bo serê Zivistanê ordûke.xwê hêye. Elemanan ji welê. Hêv diwan ji, bivê nexê bêti ko bi hev şewirî bin, eskerên wan ordiwan bi yek navî bi nav kirinê û ji wan re « gur » gotine. Herçî fermahdarên wan ji navê « gurê mezîni » li wan kirine. Dengbêjeki me ev bibihîsta, hêye ko, ji wan fermandan re « gurê serê naxirê » bigota.

Li gora nûçeyên ko heta niho gihastine deslên me gurên her du aliyan bi qasî hev in. Heryekî milyon û nîvekê kur hene. Tev de, ūris û eleman sê milyon gur.

Serekê naxira gurên ūris jenerâl Çernikof e. Çernikof sagirtê jenerâl Stêrn e. Jenerâl Stêrn serfermandarê qewlên Sibêryayê ye.

Çernikof digel kulnêl Enayêl, eskerên xwe di Sibêryayê de di nav herfê de talim dike. Di hewêrke yanî mîntiqake welê de ko germî carîna dibin sifirê re dikeve heta 40î.

Herçî gurên elemanî di bin fermandariya jenerâl Dilet de talimê dibînin; jeneralekî fênlândî jenerâl Zama miawinê wi ye. Gurên Dilet di erdên Fênlândiyê û Norwêjê de tene talim kirin. Erdine welê ko salê pê de bi herf û qesayê nixumandî ne.

Dilet fatihê Narvêgê ye. Lê gava alpinistên fransîzî daketi bûn Narvêgê eskerên Dilet begav ma bûn û hilkişya bûn çiyê. Lê gava hevalbendan eskerên xwe ji Norwêjê kişandin Dilet vegeriya Narvêgê.

Ordiwên her du aliyan bi yek awayî talimê dibînin û her du ji bi çekine wêkhev çekiî ne. Her du ordiwan ji top û teng û mîlryozên xewser hene. Eskerên wan tev de her texlîl taxokan dizanîn bişîxulînin. Hesp û hêstîhên wan ji di herfê de tene bi xwedî kirin.

Her du Zivistanan şanî da ko gurên rûsî serdesfî gurên elemanî ne û gava li talana wan dixin gur û pez tev de direvînin.

EVDIREHMANÊ ROJKÎ

wê reyê yî ko tu rê lê na be.. Çima ruyê xwe ji tîrş bikim? Min ji xortaniya xwe tu xêr ne dît ko ji pîr-bûna xwe bitirsim.. Min şeraniya dinê tam ne kir ko talbana axiretê madê min tîrş bike..

Wey li ser seran û li ser çawan tu hatî. ey tayê spî!..

Cidêde 3-3-943

QEDRÎ-CAN

R. A. F. RWEYEL ÊR FORS

Ji balafirvaniya Ingilistanê « Rweyel Er Fors — Royal Air Force » dibêjin. Bi kurdmancl « Qewetên qral ên heywayi », Xelkê Ingilîterê ji her mîleti bêtir mihafezekar in û her tiştî bi aliyê qralê xwe ve didin û ji behriya xwe ve ji « Royal Navy — Rweyel Nevi » yanî « behriya qralî » dibêjin.


Me dikir em qala balafirvanên Ingilîstanê bikin. Bi rasti van camêran ji welatê xwe re xizmeleke mezin kiriyê û di sala 1940î de giravên Ingilîstanê wan xelas kiriyê.

Belê di tarîxê de ji bo cara pêşîn ordûke elemani li paravên Fransê ên bakur bi cih bû bû û ji sih û sê kilomêtiran temaşa Ingilîstanê dikir.

Piştî mitareka Fransê, Hitler dîda zantn ko di roavayê Ewropayê de şer xelas bûye. Lê Ingilîterê ji peyan disekint û şerê Hitler dikir.

Li her vê wezîyê Hitler banî Göring kir û je re emir da ko bi balafirên xwe dirêji Ingilîstanê bike. Belê diviya bû (R. A. F.) bihata xerab kirin da ko eskerên Hitler bikariyana pê li erdê Ingilîstanê bikin.

Balafirên Hitler sev û roj û bi heftan ve dirêji bajarên Ingilîstanê dikin. Hero bi sedan xanî tencê hilweşandin, bi hezaran peya tencê kuştin. Xelkê Londrê terka rûyê erdê didin û dikevin zêrzemînan û di bin erdê de dijîn. B.A.F. li her disekine.




Hero ji her du aliyên bi sedan balafirên winda dibin. Ingilîstan pê li erdê dide. Elmanyayê nema dikare, dev ji êrtşê berdide. Londre dihe xerabezar. Lê fabrikeyên Ingilîstanê di wê xerabezarê de dixebitin û mekîneyên nû çêdikin.

Du sal dikevin navê. Ingilîterê xurt bûye. R. A. F. dirêji Elemanyayê dike. Balafirên elemani di qada şerê ûris de ewçend mijûl in ko nema dikarin herin Ingilîterê. Bajarên Elemanyayê dibin sêpîla balafirên ingilîzî. Balafirên emêrikani ji bi ser de.

Klişeyên vi rûpelî keheleke firolek û bajarîne bombarankirî şanî didin. H. MISTÛ





SEYÊN ŞEREVANI

Her kes, her tişt, kedî, kovî tev de ji bo zefera bend û milletê xwe di xebatê de ne. Se jî di nav wan de.

Di şerên herê de jî, se bi kêr dihatin; pashani dikirin. Sellbiyan ji bo pashaniyê qazî ji bi xwedî dikirin. Lê di vî şerî de se bi kêrî gelek tiştan tên: pashani, postçiqî, kişandina têlên telêfonê û di deravên teng û gava xeta şer di bin bombarana dijmin de ye û piştî nîkarin nîzingiyê lê bikin se ji şerevaniyan re zad, cebîrxane û dermênjî dibin.


Emêrikaniyan di ntzingî Nûyorkê de ji seyân re qîşle û dibistanin çêkirine. Şagirtên wan dibistanan di qîşleyên eskerî, balafirgeh û fabrikan de wezifê dibînin. Tecrîbê şanî daye ko pashanekî bi seyekî ji şer pashanê bê-se çêtir e. Di şerê 1914-18 an de 75000 se di qadên şer de dixebîtin. Wextê ko japonan dikir dirêj Emêrikayê bikin, elemanan jî japonan re 25000 se rêkirî bûn. Elemanan bi xwe di nav deh salan de 200 000 se terbiye kirine. Herçî seyân rast birindarên ko di bin herfê de dimînin peyda dikin û taxokan jî dikîşînin. Ji milê din se wezifa keşifê jî dibînin û mîfrizeyên dijmin

weyên keşfê bi cih dikin. Di rex seyân mezin de seyân hûr jî bi kêr tên. Ev seyân ha jî her hişyariyên xwe zûka bi tevdanê dihesin direyin û elam didin mezinên xwe.

Se di vaporan de jî wezifê dibînin û lê de bi karê pashaniyê radibin û heke yektî biyanî kete vaporê bilhîna wî hiltînin, didin pey, direyin û wî didin girîtin.

Terbiya seyân bi gelemperî şer heftan dom dike. Piştî imtîhanê seyân ko şehadetnamê digirin qedere heftekê jî hînlî xwediyê xwe dibin û piştê bi karê xwe ê wetenî radibin.

XELÎLÊ GENCO



BANGÊ KURDAN

Gelî kurdan, nemaze xortên xwendevan. Ez ji we hevî dikim hon vê pêsteva min li her derê û li her civatê bixwînin; ji ap û pismanên xwe re; da ko ew, ji xewa temar hişyar bibin.

Carekê herkes li xwe varqilî. Yezdan em afirandine. Xwedê ji tevayiya însên re dane mejt. Belê, ser ji bo heş e. Çav ji bo dîtîne ye. Guh, ji bo bihîstinê ye. Dev, ji bo bersefê ye. Dest ji bo xebat, şer û parastina giyanê xwe û nijad e. Ne bi tenê ji bo nanxwarinê ye. Ling, ji bo rê û pêşveçûnê ye.

Piştî ko em di van azan de ne kêmtî kesî ne, çima em bindest û jar û pasdemayî-yên her nijadî ne. Em bindestiya hev qebûl nakin, xebat û havilên hev napesînin, arîkariya hev nakin. Heke ev kirde û bûyerên me li hember biyaniyan bûna kêmalîyên me temam dibûn.

Belê li her bankirinekê bihîstiyarekê lê godar di be. Îsal deh salên Hawarê ne û Hawar pirsêke kurdmançî ye. Li gora adetê hawarkirox çav-nêr û hevîdarê gaziye ye. Mixabin ji çend mineweran pêve hon xwe dihêvîşînin û nayin meydana camêrî û zanîne. Ma qey hon hevî ji xwe nakin; piştî ko hon kêmanişên piçûk ji hev re nakin.

Çawan çavên we bar dibe ko hon vê meydana rûmet û serbilindahiyê ji me bi tenê re beş bikin û xwe bi şûn da bidin.

Kekino, birano, apinol çavên xwe vekin û li dinyayê binêrin. Di rîya welat û nijad de li nik xelkê mirin çawan erzan û kêmbiha ye. Xelk xêz û tipên dîrokên xwe ji destên hev direvînin. Herçî em bi pênc peran hîni tîp û xwendina zîmanê xwe nabin. Ma ev ne şerme



MITRALNOZKÊŞÊ BALAFIREKE BRÎTANÎ

ko em û zarokên xwe tîp û zîmanê xelkê hîn dibin. «Pirsên pir û kûr ji dilê bi kul tîn».

Gava em li civatê rûdînin û mijûlahî çê-dibe, tev de dibêjin em kurd bi kêrî qewmî-yetê nayin. Xeynî me kes li bin destê neyar ne maye. Gava em holê dibêjin, meriv dibêje qey em tev de agah û pîspor in. Merivê ko bir bi kêmasî û nezaniyê bibe jê re têtê gotin bîrewer. Ya me, bi dev e.

Belê ji xelkê re comerd, ji xwe re neimêrd em in. Rojname û tertepelên biya-niyan em bi sed kaxezi distinin. Lê em Hawar û Ronahiyê bi deh kaxezan nakirin. Mitîrbek nav di me dide em bîst kaxezan didin wî. Kovarên me navtêda-na dwanzde milyon kurd e.

Ez hevî û gazin ji we dikim. Wek mîletên din arîkariya me bikin. Ma gunehên we jî bi me neyên.

Birano, di bin çadîra feleka reş de bi tenê em bindest û gerdexwar mane. Çîre, ji ber ko em nezan in; ji ber ko em li ber barên hev ranebin û xîz-meta mîletê xwe nakin.

HESEN HIŞYAR



BALAFIREKE BRÎTANÎ JI TIPÊ HERÎKEN

CIROKA TARIXI:

'GEWHERÈN BETLEMYOS

Melikè Misirè è yewnanî, Betlemyosè siseyan, ji qasidè qralè Spastè qral Kliyomînis re namak da û got-ê:

— Lezê bidê xwe û vê kaxezê bigehîne qralê xwe.

Name giha destên Kliyomînis. Betlamyos di nama xwe de digot:

« Birayê qral !

Bersiva mektûba te ye. Tu ji min mal û peyan dixwazi. Ez li ber te sekenî me. Bi tenê şertekî min heye. Hetanî ko eskerên min ji erdê welêt dûr û li ser erdekî biyanî ne divê girowekî te f giran li cem min hebe. Tişteki ko li ber dilê te ezîz e. Ji lewre min ji te divêt tu ji min re dê, jin û zarowên xwe bişîni. Roja ko ew dê bigehin Skenderiyê eskerên min berê xwe bidin welatê yewnanan û digel eskerên te şerê neyarên te bikin. Her ewle be ko ez her yar û dostê te f wefakar im ».

Kliyomînis qîma xwe pê ani. Bi awakî din nikarî bû bikira; bægav ma bû.

Piştî midekî girowên giranbeha gihaştin Skenderiyê û ordiwa Betlemyos bi rê ket: berê xwe da welatê yewnan.

Xelkê Spartayê reşma ko mîrine qenc û şerevanîne serdestê bûn bi mekedoniyân nikarî bûn. Kliyomînis piştî ko hawara wî ji Misirê hat plana xwe çêkir û dirêji dijmînên xwe kir. Lê mekedoniyân dişan ew şkenaud û li sala 222an beriya mîlada İsa pêxember, ordiwa Spartê di Spilazyayê de perişan bû.

Kliyomînis digel eskerên xwe ên perekende berê xwe da Misirê û bû mewanê dostê xwe

Betlemyosê siseyan, melikê Misirê è yewnanî Betlemyos qedirê dostê xwe zanî û xatirê wî girt. Dê û jin û zarowên wî lê vegerandin û jê re li rex qesira xwe û li perê behirê qesireke xweser xetisî kir.

Betlemyosê siseyan melikekî adil û xudan vên û qudret bû. Xelkê wî gelek jê hez dikir û jê re melikê qenciker digot. Herçî dijmîn piştî ko barê xwe li barê wî xisti bûn nema dixwestin pê re berberiyê bikin û gelek hisah jê dikirin.

Betlemyos melikeki kişwerkiya bû. Tiştên ko pêşiyên wî ji dest da bûn ew bi şûn de vegerandi bûn.

Betlemyos Sûriye û Asya roava vegirti bû û heykelên perestoyên misriyan yên ko Dara û Qimbîz ji Welatê-Nil biri bûn Ecemistanê, vegarandi bûn welatê xwe.

Lê ji ber bêsiûdiya Kliyomînis Betlamyosê siseyan piştî hatina qralê Spartayê bi çend mehan emirê Xwedê kir û kurê wî Betlamyosê çaran rabû ser textê Misirê.

Ji Botlemyosê çaran re « Filopater » yanî « yarê bav » digotin. Lê ne ji ber ko ji bavê xwe hez dikir. Belkî bi meeazî û ji ber ko hejî bavê xwe ne dikir. Ji xwe hinan goti bû ko wî jehir da bû bavê xwe.

Betlamyosê çaran ji Kliyomînis jî hez ne dikir. Roja ko bû melik rabû dostê bavê xwe digel peyayên wî da girtin û ew xistin hepîsê. Betlemyosê çaran hêncet dikir û digot: Kliyomînis dixwaze malbata me ji textê Misirê bêxe û li şûna wê bibe melikê Misirê.

Di nav peyayên Kliyomînis de peyaki hêja hebû, Pantiyos. Pantiyos ji wan sparteyiyan bû ko di navbera rîm û şûran bi qasî mirtalekê jî xwe tev ne dida. Ji milê din Pantiyos jî melikê xwe re xulamekî sadiq û wefakar bû.

Pantiyos jî nedîmeyên seraya Betlemyos keçi-keke delal nas kiri bû û dilê wî pê ketî bû. Keçik yeke yewnanî û bi navê Dimitriya bû. Dimitriya ji Betlamyosê siseyan re diyarîke xweha wî bû. Dimitriya se-wiya dê û bayan bû. Beruîsê qewilî li birayê xwe kiri bû ko di



serayê de xatirê wê bizanin.


Dimîtriyayê, ji hejî Pantiyos kir û pev re sond xwarin ko heta dawiya jiyînê xwe ji hev hez bikin û soz dane hev ko daweta xwe li Spartê roja ko Kliyomînis vegere welatê xwe bikin.

Lê felekê li wan geriya. Bellemiyosê çaran dil û xatir, her du pev re şkenandî bûn. Dimîtriyayê dikir nedikirîreyek ne dikel ber wî ko tê re xwe bigehîne aşiqê xwe.

Midreyek bi wî awayî borî. Rojêkê bi guhê Dimîtriyayê ve bû ko hin yewnaniyên Skenderiyê ji ker ve ji xelasa Kliyomînis re dixebitîn. Dimîtriyayê nîzingî li wan yewnaniyan kir û ket xelka xebata wan û bi her awayî arîkariya wan kir.

Tevdîra terefdarên Kliyomînis çû serî û melikê Spartayê digel peyayên xwe ji hepisê derket û da kûçeyên Skenderiyê. Terefdarên Kliyomînis pasbanên hepisxanê bertil kiri bûn.

Dimîtriya li ber deriyê hepisê sekinî bû. Pantiyos berê xwe da wê û ew di himbêza xwe de guvaşt. Dimîtriyayê hêdika digot-ê: Min



DERYEVANEKÎ FRANSÎZÎ TOPA XWE PAQIJ DIKE

her tişt pêk aniye. Min ji qesira melik ewçend cewahîr hilanîne ko piştî ko we qişleyên eskeran xistê destê xwe, hon bikarin bi wan mezinên bajêr tev de bikirin û li şûna dewleta kevin dewleteke nû deynin.

Her diwan da pey Kliyomînis û daketin kûçeyên bajêr.


Lê Xwedê ji wan re hez ne kiri bû. Qedera Kliyomînis her şikestin bû. Xelkê Skenderiyê yên ko bi piranî ticar bûn ji ya Kliyomînis ne kirin. Wan digot, wa kê dizane ko Kliyomînis ji melikê me çêtir e. Ma kengê mirov dewê xwe ê ceribandî bi mastê neceribandî dide.

Eskerên Bellemiyos zora peyayên Kliyomînis bir. Ji xwe gelekê wan di pevçûnê de hatine kuştin. Ên mayîn jî digel melikê wan û ji nû ve kirine hepisê.

Dimîtriya jî di nav hêşiran de bû. Ji ber ko ewê ji li rex Pantiyos şerê eskerên Bellemiyos kiri bû. Gava mihafîzan deriyên hepisê li spartiyatan girtin melikê wan Kliyomînis rabû ser xwe û gole wan:

— Hevalinol Xwedê ji me re hez ne kiriye. Qedera me her bi hezîmetê nivîsandiye. Ma kengê mirov qedera Xwedê guhartiye ko em jî fro bikarin wê biguhêrin. Ji lewre ez dibînim ko êdî di jiyîna de me tu feki ne mane. Mirin ji me re gerekîr e. Ji xwe Bellemiyos kengê dihîle ko em di hepisa wî de jî emir bikin. Ewê me an li ber lepên pilingan bidê dirandin an di bin lingên filan de mê bide perçiqandin. An celadên wî wê bèn û me di vê hepisê de û li ber çavên hev wek pezine

TRABLISXERB



Mûsolîni ji roja ko hikim xiste destên xwe êhemiyeteke mezin daye Trablîsxêrbê. Mûsolîni digot ezê imperatoriya Roma kevin vejînim. Ji ber vê yekê talyan di Libyê û Trablîsxêrbê de xebateke zor xebitî bûn û ew melat şên û ava kiri bûn. Lê ava kirin bes ne dikir; diviya bû ew welat bihatana perastin ji. Heye ko tiştine din ji talyanan tén. Lê şer ne karê wan e. Bi rastî ji talyan li ber êrişa ordîwa ingîlzan a heştan Trablîs midafehe ne kirin û bi eskerên Romel re berê xwe dan Tunîsê.

Xerîta jorîn bendera Trablîsxêrbê şanî dide.

belengaz şerjê bikin. Heke xulamkoleyên wî em ji ser bircên qesirê de li behirê gêr ne kirine. Ji lewre hevalên min ên delal ji me re çêtir û bi rûmetir e ko em bi xwe bi dest û zencera xwe tayê jiyîna xwe bibirin.

Peyayên melik li wê gotarê qet ecêbmayî ne diman û wek tiştêkî adetî guhdariya wê dikirin. Gava melik gotina xwe qedand Pantiyos rabû ser xwe û got:

— Herçî ko hakimê me kire ferman li ser serên me û li ser her du çavan. Ma kengê di bicihanîna emirên wî de me dudilî kiriye. Ma kîjan sparteyî heye ko qîma xwe bîne û di destên celadan de wek diz û xwînyan bimire. Sparteyî bi tenê di meydana şeref û rûmetê de bi destên neyarên xwe dimirin. Heke Xwedê emir kir û ew ji desthilanîne ketin, ji wan re divêt xwe bi xwe, bi destên xwe mirinê bidine xwe. Bi tenê hakimê me ê delal, min ji te hêviyek heye. Gelo ez dikarim bibêjim?..

Kliyomînis: Min ne adet e ko ez hêviyên Pantiyos bi şûn de bavêjim. Pantiyos bêje...

Pantiyos: Hakimê min, min divêt ko Dimitriya ji qerara intînarê bête awartin. Dimitriya ne sparteyî ye. Û heke qedera xwe bi qedera me re girêdaye û xwestiye ko xizmeta me bike ne laîq e ko em mirinê bikin mikafata wê.

Dimitriyayê rê ne da melik ko li Pantiyos vegevine. Rabû ser xwe û got:

— Pantiyos, gava tu bi vî awayî xeber didî û dixwazî kêmanîke mezin bi aliyê min ve

XEMLA KURDISTANÊ

Şax û daxên di welatê me pir e, şengê biya Çîçek û beybûn qol bi qol ket'ne çiya Nêrgizên serdigiran şermendeyê xemla te ne L'çîç'kên nazik û ter sinbil didin av û riya Sorgulên şimayê rengîn l'terzine girîf xunav Daşedar im bo benefşên xurmeyî l'ber kev-viya Çarnikarên kev-viyan sosin û sinbil xem-milfl Mêrg û başên di bihuştê didine ber çîkiya Heçî cûwa tu bivê hexçeyê ridwanê welat Baxê frem te hebî di bîdiye mizgîniya Hiriyê biyanî lê danî sê seva dê jîneve Her dema b'nêrî Bihar e kanê nojdar e giya Ax ji zêr e l'çiya binêre dur û elmas e hemî Çendî cewher cimle yekser wê ji nik me çûn

[çiya Kan û gencên di welatê me pir in, mil dane yek Sed hezar in, tev bi jar in makê kîmya ye giya Serwerê çendî cihan heq bê guman erdê me ye B'qurçeka avê ji dola sax dikit bê vêriya Heçî vê erdê bibîntî paşê jê bib'ne derê Sêt dibit hadir di gavê dîn û hor'hefte riya Bes bibêje kê m birêje xulwefî Masê ji mêj e Cih bihuşt e çiyau dest e av-heyat e l'kaniya.

XULWETÎ

bidî, ez bi guhên xwe ne barwer im. Ma tu qaîl dibî ko ez Dimitriya te, bi vê kêmaniyê rûyê xwe reş bikim û li şîna ko di mirinê de bibim hevala we, di jiyîne de bibim bêşîra neyaran. Min qedera xwe bi qedera we re girêdaye. Ez bi we re dimirim, bi we re diminin. Ten û can ma kengê ji hev dibin.

Bi tenê min divêt ji melik re sirekê eşkere bikim. Sira ko beta niho, ji te pêve, min tu kes lê agah ne kiriye.

Belê hakimê min gava min terka qesirê da min bi xwe re sendûqek anî bû. Di nê sendûqê de gewherên Betlemyosan ên giranbela hebûn. Gewherê ko şahê ecem Dara, taca xwe pê dixemiland û Betlemyosê siseyan ew ji welatê Faris anî bû, min ew ji kiri bû sendûqê.



NOQAREKE FRANSÎZÎ DI BENDEREKE EFRIQA BAKUR DE

Min ew sendûq avête behirê û di binariya bendera Skenderiyê de veşart. Bi heviya ko hon zora eskerên Betlamyos bibin, li şûna wî rûnin û bi gewherên wê sendûqê textê Spartayê bi şûn de veşartin. Lê Xwedê ji me re bez ne kir. Emê îro tev de bimirin. Û cihê sendûqê ji min pê ve tu kesê zindî nizane.

Hepsiyar qerara intiharê bi cih anî. Her-yekî xencera xwe di sînga xwe radikir û bêf ko ji qirika wî deng an axînek derkeve bihi-na wî li ber wî diçikiha.

Kliyomînis bi xwe dest pê kiri bû. Ên mayîn da bûn pey.

Pantiyos ji piyan sekînî bû û li hevalên xwe temasa dikir. Hevalên wî wek sinbîlên genim, carekê dihejihan û diketin ser kokên xwe. Dimitriya li rex wî rawestiya bû û hin bi hin teptepa dilê wê xurtir dibû.

Piştî ko tev de li erdê dirêj bûn Pantiyos xencera xwe ji kalanê wê kişand û got:

— Ey perestowa Spartayê tu bibe şahida


min ko min nemerdî ne kiriye. Lê min diviya bû li mirina hevalên xwe hûr bibim û bizanîm ko di tiwan de rih ne maye. Da ko peyayên Betlamyos bi ser de neyin, birindaran derman bikin û piştê wan bi ezabine giran bikujin.

Pantiyos xencera xwe yeko yeko di sîngên hevalên xwe rakir û gihaste ber cendekê hakîmê xwe. Cendekê Kliyomînis hêj xwe tev dide. Pantiyos bi derbeke xencerê ew ji sekinand û piştî ko amaniya xwe anî ko hevalên wî tev de mirine çavên xwe girt û xencer da fêdestê Dimitriyayê. Dimitriyayê zanî ko dora wê ye. Xencer ji destê Pantiyos girt û ew di sînga xwe rakir. Pantiyos xencer ji sînga Dimitriyayê kişand û ew hesinê ko hêj xwîna Dimitriyayê a germ jê dilop dikir kire dilê xwe.

Tarîx ji beriya mîlada Îsa pêxember 220 bû.

Melikên Misirê li gewherên Betlamyosan gelek geriyar. Lê tu şop ji wan hilnanin.

Dihokê: 15 Sibat 1943. BIŞARÊ SEGMAN



NOQARÊN IYGLÎZÎ PIŞTÎ KO DI DÛRAHIYA BEHIRAN DE BERA DILMINÊ XWEJANE
VEGERIYANE WARGEHÊ XWE Û ZAD Û CEBIXANÊ DIBIN

HINDIK RINDIK

PIŞTI KO BÛYE MËR:

Mehkema misri a şer'i, di van rojan de bi dawake hûr û kûr mijûl e.

Xanimêke misri, ji maleke mezin û dewlemend bi êşeke giran keti bû. Diktoran xanim bire xestexanê û ew seh kirin. Diktoran gava dest dida berzikê xanimê di bin çermê wê re bi tiştêki girover û dirêj dihesiyan. Diktoran qerara xwe da ko di zikê xanimê de girêkek çêbûye û ji lewra diviya bû zikê xanimê bête vekirin û girêk bête derêxistin.

Diktoran gava zikê xanimê vekir girokeke welê ditin ko li şûna ko wê bibirin ew anin derve û ew bi berzikê xanimê ve hiştin. Piştî emeliyatê xanima me bû bû mër.

Xanima kevin û mërîkê nû, da eqilê xwe ko gava mîrata havê wê par ve kiri bûn jê re niv par da bûn, ji ber ko hûngê mëraniya wê veşartî bû û jin dihatê hesêb. Lê niho ko mëraniya wê êskere bû diviya bû pareke tekûz distanda. Li ser vê yekê mërîkê me rabû dawa li birayên xwe rakir û ji mehkemê xwest ko mîrata havê wan ji nû ve par bikin û jê re ji para lawekî bidin.

MILYAREK DOLAR:

Milyarek dolar çi ye, çi qas e? Em tev de dîzanin ko tiştêki pir û mezin e. Îcar ji bona ko mirov bikare mezinahiya wî mişdarî di ber çavên xwe de bisekenîne, yekî hisabê jêrin çêkiriye. Mirovek hebiwa ji mîlada Îsa pê- xember ve, yanî ji berî 1942 salan ve, hero

1000 dolar serf bikira heta dawiya Tebaxa sala 1942an mesrefên wî mirovî digihaştin (709963000) dolarî yanî ji milyarekî (290 837 000) dolar kêm. Ji bona ko mesrefa wî mirovî bigihaşt milyarî diviya bû wî mirovî 796 salên din, yanî heta sala 2739an emir bikira. Hingê mërîkê me dê bikariya milyarek dolar serf bikira.

Piştî ko me ebemiyeta yek milyar dolarî zanî em çavên xwe li mesrefên Emêrikê ên herbî bigerînin. Emêrikê ji bo vê herbê heta niho (du sed û bîst û heşt mîlyar û heşt sed û yanzdeh mîlyon û du sed û sih û sê hezar û pênc sed û çil û du dolar) serf kirine.

Ji milê din ji roja ko Emêrikê çêbûye heta Hîzêrana 1940î mesrefa wê hikûmeta mezin tev de û bi tenê nivê mişdarê jorin e. Bi tenê ji vê hejmarê dixuye anglosakson di vî şerî de çî fedakarîne mezin hildigirin.

Di hisabî de dibêjin ko hejmar bê dawî û bê pîvan in. Heke vî serî çend salên din dom kir; tirs heye ko emêrkanî dawiya hejmaran jî binin.

QÎMETA QIRÛŞEKÎ:


Ma hêj qîmeta qirûşekî heye? Li gora sehkirina rojnamevanekî bêrûfî diyê hebe. Ew rojnamevan li 15ê Sibatê daketiye sûkê û li behayên zad û qatîsan hûr bûye û di vê babetê de listak çêkiriye. Li gora wê listê mirov îro ji bi qirûşekî dikare hin tiştan bikire. Lê ev tişt nema bi şêhnên adetî yên ko wekî, heqê û riililan şanî didin lê bi şêhnên eczexanan yên ko gram û sentîgraman şanî didin, diyê

bêne kişandin. Li gora sehkirina rojnamevên bi qirûşekî mirov î tiştên jêrin mişdarên li her nî ankîrî dikare bikire.

	gram		gram
Pîvaz	60	Gwîz	14
Nok	50	Gêzer	13
Zêr	45	Penîr	12
Rûnê giyan	37	Şîr	11
Çêr	30	Gostê pez	10
Mehûj	25	Hingivîn	9
Rîz	20	Rûn	8
Meqerne	19	Şerah	5
Kartol	18	Gostê	
Pirtîqal	17	mîrişkan	2
Nîvişk	16	Bîre	1
Bastêqê mişmişan	15		

Gava mirov li vê listê dinêre dibîne ko dîsan pîvaz ji her tiştî erzantir e. Ma ji xwe nan û pîvaz û vaxwesi çavreşî ye?

XEBERGUHÊZ



ZÎREHPOŞËN INGILÎZÎ DI NAV PÊLÊN ETLANTÎKÊ DE

KERÊ DENGÊJ

Dibêjin li nav Şerwan Hebû yeki bazirgan
 Wî hebûn hêştir û ker Tev bi hawid û semer
 Ji wan dido bû bûn jar Nema bi wan dibû kar
 Her du berdan dora gund Da biçêrin bibin rind
 Hêştir rabû gote kêr: Tu guh bide min camêr
 Were ji dest mirovan Em birevin nav govan
 Nema baran dikêşin Ji bona wan diêşin
 Çûn ciheki nependi Ne bazirgan û gundl
 Sereki tev çêriyan Dî newal û hêriyan
 Dema ko bûn xurt û têr Bû çirîna qula kêr
 Digot: birakê hêştir Ji mêjva mindeng ne kir
 Dilê min zor şa dibe Zirîn li min radibe.
 Hêştir got: ho kerê nêr Bi zor zikê me bû têr
 Tu hevaki neçaki Dê xelkê li me rakî
 Wê cihê me fêr bibin Hêştir tevi kêr bibin
 Dîsa lêxin bin baran D'para lêxin bi daran..
 Kerê nêr got: nizanîm Nema bi xwe dikanim
 Hêke niha nezirim Bê hiteqim biçirim...
 Bû zirîna kerê reş Hêştir got: sihet nexweş
 Ker ziri, bihist şivên Zû xeber da bazirgên
 Hatin her du birin çûn Jê herimîn war û şûn
 Bi rê va ker westiya Xûydan giha hestiya
 Bazirganê hlebaz Bir ne dibir west û naz
 Got: ev hevalên hev in Sûc û gunê wan tev in
 Divê çîkî biêşin Ew hev û din bikêşin.
 Rabû ker li hêştir kir Ji çiyê daxist û bir
 Vê-car hêştir westiya Can ji cendek kişiya
 Got: ho kerê guldirêj Roja ko tu bûy dengbêj
 Min ev dongî dizani Le te bi xwe nikanî
 Niha ji dor hate min Dê bidî canê şîrin
 Dikim bavêî tepikan Çîkî bidîî lotikan
 Kêr wê gavê bir dibir Ko b'zirîne neçê kir
 Digot: hewar û eman Dî min neki van tiştan
 Tu hevaleki zorî Dî sûcê min bîborî..
 Bû zarîna kerê reş Lê mixabin diçûn tewş
 Hêştir dida lotikan Hol bû dî ser kortikan
 Bar qulibî hate jêr Şikest dest û lingê kêr
 Hêştir çû ker li wir ma Bû xwarîna gur û sa
 Kesê bê dem bizire An jî bilind bifire
 Bi wê teqez nabe mêr Wê bigê dongiya kêr.

OSMAN SEBRÎ

XOCE NESREDÛN



Xoce li her radyowê rûniştîye û guldiriyê dike. Şandiyarê radyowê danezana elemantî dixwîne û dibêje: Balafrên inglîzî bi ser Berlinê de girtine û ew dane ber bombeyên xwe. Xesar gihiye dibistan, xestexane û herçî misesiyên yextiyar û feqîran

Xoce — Ev çî bajarekî ecêb e ko tê de ji dibistan, xestexane û misesiyên feqîran pêve tu avahî minin.

ROJA NÛ

Xwendevanên detal mizgîniya me li we. Piştî Hawar û Ronahiyê honê bi rojnameke kurdî, Roja-nû ji şa û kêfxweş bibin. Hejmara vê rojnameê a pêşîn di van çend rojan de wê derve. Roja-nû wek Hawar û Ronahiyê ne bi tenê edebî û civakî ye. Lêbelê Roja-nû rojnameke siyasî ye. Honê tê de ji her texlîf nivîsaran pêve danezan û nûçeyên şer ên dawîn jî peyda bikin. Ji niho de hon dikarin kiriyarê Roja-nû bibin. Ji hona vê yekê jî hema bi kartekê nav û adresa xwe ji xwediye wê re bidin zanin. Ewe adresa Xwedi:

Dr. Kamîran Ali Bedîr-Xan

Xwediye Roja-Nû — Avahiya Ebû-Efîf
 Meydana Bircê — Bêrût

Ji bo postê bi erebî divê holê bête nivîsandin:

الدكتور كامران علي بدرخان

صاحب جريدة « روجا نو » الكوردية

بيروت — صاحة البرج — بنابة ابو عفيف

HEJMARA HAWARÊ A 53an LI 15ê ADARÊ BELAV BÛYE; LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

• Tefsîra Qurânê. Gramêra kurdmancî. Evîn. Diwana Melê. Beydaxa Kurdî. Memozîna Xanî.

— La vie universitaire au Kurdistan —

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrî.


Xweu û gerîndeyê berpirsiyar : Mir Celadet Ali Bedîr-Xan . Şam—Sûriye
 Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Kban. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 14
—
ŞEMBÎ
1 GULAN, 1943

RONAHÎ

ANNÉE 2
NUMÉRO 14
—
SAMEDI
1 MAI 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



RÊHESINA LONDRÊ A BİNERDÎN

Di wextê bombarana Londrê de hin rêhesinên bînerdîn xerab bûn. Hingê hikûmetê li ber stasyonan koşkine istixbaratê çêkiri bûn. Xelk diçûn wan koşkân û li ser reyên ko rêhesin hêj tê re diçûn serwext dibûn. Klişa nie eskerine kenedî şani dide yên ko li ber koşkeke istixbaratê sekinîne.



ÇABXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Gur û Rovî	Çirokbêj
Lawik	Stranvan
Boketî heqê min e	Lawût
Xweşxwana çiyayî	Osman Sebri
Ew maldarên birçî	Cegerxwîn
Madenê behirê	Smainê Serhedî
Terşê Şevê	Osman Sebri
Gelawêj	Ronahî
Şêrek bi darekî	Osman Sebri
Eleman	Xelîlê Genco
Sehên zozanan	Qedrî-Can
Ziwaca şeş saetan	Cemîlê Tacdo
Ordiwa isvêçî	Qadirê Ferman
Di nav însanxweran de	Hesenê Mistê
Civata bêdeng	Hesen Hîşyar

CIROKA KURDMANCI:

GUR Û ROVÎ

Carekê gurek û rovik, bi hev re bûne heval. Wextekî bi hev re man. Rojekê gur birçî bû; gote rovi go ezê te bixwim. Rovi go: bira, ez û tu ji zû de heval in û me gelek nan û xwê bi hev re xwarine. Gur go qet fêdê nakê ezê te bixwim.

Rovi dênê xwe dayê fêde nakê, gur dê wi bixwe. Rabû fikirî go ko ez hilekê li gur nekim ez ji destê wî xelas nabim.

Rovi gote gur, go eva çare nîne tu dê min bixwi. Go belê. Rovi go ezê tişteki ji te bixwuzim; min divê ko tu wi bikî û paşê min bixwi. Go bêje. Rovi go ji zû de ye min tirih ne xwarîye. Ez hevî dikim tu min bibi nav rezekî ko ez têr tirih bixwim. Êdî min bixwe.

Gur go baş e, ezê vê bi te re bikim. Rabûn çûn ber bisênca rezekî. Rovi ji dîzanê ko xwediyê rezan çalîkan di neqebên rezan de dikolin. Ji bo ko dehbe bikevin-ê. Rovi ji hate ber neqeba rêz û gote gur, go bira de kerem bike. Çawa ko gur da neqebê, bi sêri ve keşe çalê. Hema rovi da qevza û gote gur, go ma qey te nizani bû ezê belakê ji te re binim.

Gur çav bi rovi ve kirin û keser berdand. Hêj rovi di wê kêfê de ye û gur di wê kulê de, carekê baki xurt rabû û li rovi da û rovi bi sêri ve kire çalê, ser gur. Gur go, wey tu geleki bi xêr hati.

Rovi gote gur, go niha ko ez te ji û xwe ji ji vê çalê xelas bikim tu çi dibêji. Gur go, tu ne yê ko mirov bi te ewle bibê; bêje bê te çawa me xelas bikî.

Rovi go pir rehet e. Gur go çawa? Go tu rabe ser lingê xwe ê paş û xwe bispêre diwarê çalê. Ezê bi ser milên te bi hewa kevim. Piştî ko ez derketim ezê destê xwe ji te re dirêj bikim û te derxim. Gur go ev xweş xeber e, lê min jê ne bawer e.

Piştî swind û wadan rovi gur qaîl kir; baz da ser milên gur û derket derve. Gur go bira de ka min ji derxe. Rovi go bira ez çûm bi xatirê te. Njha xwediyê rêz dê bê te derxê.

Roviyê gewr hilanî û çû. Bû sibeh, xwediyê rêz bat û gur di çalê de kuşt.

STRANA KURDMANCI:

LAWIK

Bihar e, xweş bihar e
Gundê bavê min hindik e, hezar û hefsed mal e.
Darê di ber de gulixwar, e,
Donzê pîsman e, ji bilî dê û bav e,
Cihê min gorinê bê nişan e;
Şeva nivê şevê, were ber deriyê mala bavê min;
Derî vebûnê nêrdiwanê deyne were xwar e.
Guhê min bi guhar e,
Pozê min bi xizem e,
Destê min bi bazin e,
Lingê min bi xitxal e.
Bixweşe ser sing û berê min weke marê tiyar e;
Heya milê sibê here serê ûinarê,
Bav û birê min pê bihesin, wê bân çi hat e,
Bibên mala Temir paşayê mîlî,
Şev yek e diz hezar e
Êvar e, xweş êvar e
Pezê bavê te gerane;
Kişiya Serhedê, belekê herfê, ji zozanê jorî, ava sar e.
Kuro tu ler û ciwan î, li canê xwe meke;
Roja qiyametê rojke giran e.
Min kengê, zû bêxî, memikê xwe kiriye bey û bazarê.
Dilê min qapson e,
Xemî û xeyalê min li dinyayê bela bûye;
Semedê çavê res, bejna zirav li dinyayê mehkûm û
[fermanlî nie.

Keça mir aliya,
Şarek ji te re bistinim bi sed û sê osmanliya.
Şara serê te qetiya,
Zerar li canê min e;
Çima ewqa kul û ewqa derd li gundiya.
Dilê min ji bajarê Mêrdîne,
Ji zozanê Hesenkêfê heta Şerevdîne.
Eger hawerîya te nîne, bawer nakî,
Çek û çolê xwe girêde;
Were şeva nivê şevê, min bi çavê serê xwe bibîne;

BOKETI HEQE MINE

« Eskereki İngiliz ev bend »
« nivisiye û holê dibêje »

Ez dibêjim belki heqê min heye ko bêjim ez boke me; ji ber talûkeyên ko min derbaz kirine.

1 — Keştiya ko ez lê siwar bû bûm, heşt caran kêlek da xwe ko binav be û ez î tê da bûm.

Pêşiya van boblatan di behra spi da dest pê kir. Ji min mepirsin ko çi li min qewimiye. Ji ber ko wê şevê ne dihat bira mirov ko talûke heye. Hingê keştiya me di nava qesleyê parastî da diçû. Me hew dit keştiya me bê hemî hejiya. Li ser rê û rêzikên keştiyan, em hilkişin ser piştê keştiyê. Hew me dit keştiya me bûye du keriyên û binav dibe. Lê kes ji hevalan ne mir; ji ber ko cenkeştiya di rex me da em hemî li ser rûyê avê rakirin, piştî du rojan em gihan Ingilîterê.

2 — Di rê da berve Maltê: Piştî heftekê dîsa ez î li ser piştê keştiyê barkêş bûm û di nav qeslekî parastî da diçûm Maltê, keştiya me çek û cebirxanê şer dagirtî bû. Deh ton ji tiştên ko diteqin tê da bûn. A rast barekî holê di behra spi da ne tiştêkî çak; lê gelek kirêt e. Berî em bigehin Maltê bi çend saetan,

noqareke neyar torpilek li keştiya me da.


Gelo ma we kesi teqîna erdê û çiyayên bi şewat bihistiye?! Ya ko min wê şevê dit, hew dizanim ez ber ve ezmên hol dibûm. Holbûneke wêlê kû bi qasî çend mînanan, di nav şewl û gurika agir da... Hew min çavên xwe vekirin ko di nav pêlên hebrê da li ber xwe didim. Saetek û deh deqîqan ez holê di nav avê da mam heya kelekêk (Zewreq) xelaskar xwe gihande min û ez bi derxistin.

Di vê keştiyê da em pêncî mêr hebûn. 35 mirin, em ên mayî filitin.

3 — Dema em li Maltê vegehin Cebel-Tariq, qeslê me diwazde keştiyên barkêş bûn û şex cenkeştî ji ji bo parastinê bi me ra bûn. Bi rê va hin noqarên neyar li me bi der bûn û sê keştiyên me bin av kirin. Ji van sisêyan bê şik yek keştiya ko ez î tê da bûm. Ji ber ko torpil li pêşiya keştiyê ketî bû; kêsa peya bûna kelekên xelaskar kete me.

4 — Di dawîya bihara 941an da ez danî bûm ser keştiyê barkêş e nuh. Bê serêşî em pê çû bûn emêrika. Di vegehin da li nîzingî Îrlandayê noqarekê torpilek avête qeslê me. Keştiya me sê caran di dor xwe ra viz bû û hêdî hêdî binav bû. Ji ber ko keştiyên mayî durtî me bûn, heya gihane ser me ji heftê mêrî ez û şanzde heval filî-tin û yên mayî binav bûn.

5 — Pistî vê yekê bi du rojan dîsa ez li keştiyê siwar bûm û berê me li rohelata navin bû. Bi rê va balafireke elemanî (Ştoka) li me bi derket û bombe avêtine qeslê keştiyan. Di nava wî qesleyî da keştiya me bi tenê hate hingaftin. Bomba ko li ser piştê keştiyê ketî, agirê xwe gihande enbara



XWEŞXWANA ÇIYAYIKÎ

« Ji Nûredin Üsil ra »

Gundê me biçik bi dar û ber
 Bihna min teng e qet nayê der
 Delalê, her tu daxwaza min;
 Gazinan dikî ji naza min!
 Ez im dîlketî ji dil û can,
 Derdên min pir in nayên kêzan..
 Çavên te belek dêmên te sor,
 Dil ji min sotin kezîyên mor.

Diçim ser çiyê şîkêr û best
 Sîng û beran dit ji min digest
 Bejna te bilind wek spîndar,
 Ji heş û inêjû kirim zîvar.
 Lêvên te tenik wek belkên gul,
 Livîn û ji min girêdan mil..
 Çavên te belek dêmên te sor,
 Dibim xulamê kezîyên mor.

Firîm di çiyê min da hêlan
 Bi hezkirna te ji xwe sot can
 Melezîn ji min, ha va me tèn;
 Bûme kiriyar bo bîsk û dêm.
 Vegre himbezê zerî çavreş,
 Mêvanê te me şeva te xwes..
 Çavên te belek dêmên te sor,
 Ez im pandiyê kezîyên mor.

OSMAN SEBRÎ

EW MALDARÊN BIBÇÎ

Birçî bûne serê xwe hildane ev çend sal in,
 Kurdên reben li hawir birçî mane bê mal in.
 Hin dewlemend û tîrmal û pîr-zêr û tîr-gund in
 Lê hin ji wan belangaz û reben û mîrdal in.
 Kurdên jor bi ser ên jêr de hilweşîyan tev tèn
 Xort û gedek û şîrmîj û keç û pîr û kal in.
 Dewlemendan kodik xistiye nav lingên xwe lê
 Guh nadêrin belengaz çawa li jor nal-nal in.
 Li alîkî xortên gerdengaz, ser dane qadê
 Hêstir ji çavên belek digindirin namalin.
 Li alîkî dinê zarok û şîrmîj diqîrin
 Ma xewa birçîyan çawa tê, hemî mendal in.
 Xuya ye ko kurd dijminê felekê ne her dem
 Her dem dijminê felekê ji xwe bê pîrgal in.
 Kes kesi b'xwedî nakê lê talanker in bo hev
 Li çolê hev dikujin hin Rostem, hin Zal in.
 Dext û danê me dinya tev da girt lê parsek
 Li ber diwaran reben û gerok û evdal in.
 Herçî maldar in tev bi mal û xwalfîk û xwal in
 Lê herçî bê mal in ji xwe, bê xwalfîk û xwal in.
 Herkes bi zanîn bûne xwedî tang û top û çêş
 Lê em parsek û reben bi xencer û kopal in.
 Şal û qîmasê me dijmin girtine lewra em
 Li cihan desteng û tazi mane, bê pertal in.
 Cegerxwîn xemhilgîr e li ser we dinalî tim
 Mal nine lê xem bi ser dilê wî de qerpol in.

CEGERXWÎN

çek û posatan. Çarde hevalên min hatine kuştin û ez, ji destê xwe bi birin bûm. Lê min guh ne didane birinên holê, her çavên min li felatê bûn; keştî binav bû lê ez fîlitim.

6 — Li ser vê yekê ez vegeerim Cebel-Tatriq û li wir li barkêşekê siwar bûm û berê me dane Îngîlterê. Di Atlantîkê da noqareke elemani barkêşa me ber hewa kir. Neh ji hevalên min hatine kuştin û ez û ên mayî li ser cenkeştîyekê ber bi girava Brîlanya diçûn. Berî ko em bigihin peravên welêt, balafirên elemani xwe gihandine me û em dane ber bomban. Cenkeştî binav bû; lê disa mirinê ez ji bir kirim û di nav xweşan da gihame reşiyê.

7 — Li ser barkêşeke petrolî: Di pêşiya sala 1922an da ez da bûm ser barkêşeke petrolê e mezin. Siwar bûna petroliyan di demên rihetiyê da ji ne tişteki çak e. Ji ber ko petrolî wek hepsê ne. Mirov

bi dilekî rihet nikare cigarê bikêşe. Ji vê pê ve siwarê barkêşên petrolî her dem mehkûmê şewat û binav bûnê ne. Çiko balafir û noqar tim çaven xwe berdidine wan.

Rojekê di behira Atlantîkê da keştîya me di nav qeflekî parastî da diçû. Noqareke neyar torpilek berda qefle. Ne hevweye ko bêjim; divê hûn zanî, bin ko li keştîya min ket. Hewî min dit ko ez di nava pêlên agir da li ber xwe didim. Barê keştîyê ko zêtgaz bû li rûyê behrê belav bû bû. Bi qasî çarşed metîr gurika agir li rûyê behrê radibûn. Bi sed renc û dijwari, li ser perçek texte min xwe gihande reşiyê. Lê vê car ez geleki wes-tiyam, heya ko min xwe bi hevalan da nasîn. Ji ber ko ser û çavên min tev da şewiti bûn.

Bi ser van boblatan da, ma ne heja ye ko ez bêjim « boketi heqê min e?.. »

LAWÛT

MADENÊ

KO JI'AVA BEHIRÊ DERTÊT

Zêr û ziv, hesin, fola tev de maden in û madeyin hişk in û hemî ji zikê erdê dertên. Madeyek heye jê re mengenêzyom dihêjin. Ev jî mîna madenên din hişk e, ew jî di zikê erdê de peyda dibe. Lê niho emêrikantî vî madeyî jî ava behîrê derdixînin.

Beriya vî şerî, wek gelek madeyên din, xelkê ewçend gulî ne dida mengenêzyom. Lê diştî şerî mengenêzyom ehemiyetêke mezin girtiye. Ji ber ko vî madeyî xewasine xweser hene.

Mengenêzyom jî hemî madenan sivikîr e. Ji milê din ev maden gava têtê hûr kirin û dibe toz, dibe sotebar yanî têtê sotin. Sotebariya wî gelek bi lez e. Li hewayê têtê sotin û rivîniyeke spiheşin jê diçe û agirê wî bi avê nayete vekuştin. Rivîniya wî ewçend xurt e ko çav li ber wî didelin û mirov nema dikare lê fedkîre.

Heta niho jî ber sivikahiye elûmiyom di çêkirina balafran de bi kêr dihat. Lê mengenêzyom jê jî derket. Ji ber ko 81 kilo mengenêzyom şûna 121 kilo elûmiyom digire. Ji lewre heçî balafîrên ko hin perçeyê wê li şûna elûmiyom jî mengenêzyom hatine çêkirin, jî giraniya xwe 160 kiloyî kêmtîke. 160 kilo giraniya du peyayên navîn an giraniya ewçend hacet û cebîrxane ye. Ji bo balafîreke her bî ev mîxdar tiştêkî mihim e. Mese' a relekî balafîran jî delî balafran bihevketî û yê ko benzînê dibe qada şer di saya mangenêzyom de 1600 kilo bêtîr dikare bar bike.

Emêrikaniyan gava ev nefce dîtzora xwe da vî madenî. Di sala 1939an de mengenêzyomê Emêrikê 4500 ton bûn. Di sala 1942an de ev mîxdar gîbaştê 56 250 tonî. Li gora texmînê îsal mengenêzyomê Emêrikê wê bigehe 180 000 tonî.


Lê bi çî awayî. Ji alikî di zikê erdê de li vî madenî gerîyan û kanîne nû vekirin. Lê

tiştê ko jî kanên nû dihat der nikarî bû vî mîxdarî bi dest bêxe. Lêbelê zana û kîmiyager dixebîstî û li vî madenî di madeyîne din de digeriyan.

Dawiyê kîmiyageran ew di ava behîrê de peyda kirin û li wan xuya kir ko di mêtîreke ava behîrê de 1275 gram mengenêzyom heye.

Li ser vê yekê li perê behîrê fabîrîkeyek çêkirin. Ev fabîrîke li salê 25000 ton mengenêzyom çêdike. Emêrikantî li gora mehcetê mîxdarê vanî fabîrîkan zêde dikin. Ma ava behîrê jî naqede.

Bivê nevê heta dawîya vî şerî naqede. Paşê Xwedê kerîm e. Lê ava ko mengenêzyomê wî jê hate standin nema bi kêr têt. Ji ber ko êdî tê de tu maden ne maye. Ji lewre ev av careke din li şûna ko jê hate kişandin nayet berdan. Ji ber vê yekê di wan fabîrîkan de jî bejê ber bi behîre ve borîne yan zeh kilomêtîr dirêj çêkirîne û ava bêkêr di wan borîyan re berdîdin cihine jî peravan dîr. SMAINÊ SERHEDÎ



STOLEKE INGILIZI DI BEHIRA-SPI DE XWE KARI ERISSE DIKE

TERŞÊ ŞEVÊ

— 1 —

Wekî her miletî di nav me kurdan da jî pîr û hindik efsane û derew bi cih bûne. Ji van derewên han; cin, şeytanqûnî û terşê şevê di qorê pêşin da dimînin. Ji ber ko liin mirov bi tiştên holê gelekî bawer dibin û heya zarokên xwe jî pê ditirsînin; me dil heye ko di wî warî da pîr, hindik ramana xwe hêjin. Min hêvî gelekî mezin e ko, herçî kesên van nivîsanan bixwinin, êdi bi tiştên holê bawer nebin.

Bi vê gotinê bila hinek, me bi înkariya cinan îtîham nekin. Mafr ko quran dibêje cin hene, em nabêjin ko cin nînin. Lê bi qasî ko em bi rêbirîya cinan bawermend bin jî ne dilxapî ne. Cinên ko quran dibêje hene, ew cismên letif in. Ne ew bi çavan têne ditin û ne jî têkiliya wan bi me heye. Bi tenê min divê xwendevanên xwe serwextî bikim ko, çirokên di wî warî da hatine gotin jî rûkî derew in û tu binatî jî wan ra nîne.

Berî her tiştî ya ko li min qewimiye dê bi ser û herê wê va hêjim û paşê yên ko min jî camêran bihistine jî yek bi yek, hejmar bi hejmar di Hawarê da belav bikim.

Di dema qewimîna şolên holê da heke mirov nelirse û hinekî xwe ragire, wê di dawiyê da agahî rastiyê bibê; lê tîrsa malkambax pîr çêran camêran şaş dîke û nahêle ko serwextî rastiyê bibin. Dema di halletên holê da mirov rasti ne nast, jî tirsê derew têne pê. Derew jî ne vir da wê da, derewên bi qoç û boç...

Di sala 1924an da min hevde sal jî emrê xwe qedandi bû û pê kiri bû hejdebana. Weke her sal, min benderên cotkar û milêbayên xwe bi xwe radikirin. Wê rojê diviya bû ez herim ser benderên xwe ên gundê Xêştûrê. Navhera gundê me Narincê û Xêştûrê saet û nîvek bû. Ez û serkarê xwe Mihemedê Eşîkê li hespên xwe siwar bûn û me berî da Xêştûrê. Wê rojê û roja dûtir me dawîya benderan bi dest xwe xist. Du xerbandeyan jî bi çar hêstiran zad li ser benderan dikêşandine gundê me. Roja didowan bi êvarê ra şolê me qedî û cihê ko em tevî xerbandeyê barkêş biçûna mal; li ser bergera gundiyan jî bo xwarina şivê em li Xêştûrê man.

Piştî ko me şiv xwar, em siwar bûn û bi rê ketin. Em gîla bûn nivê rê ko, me dengê zengilan û çargaviya lingên hêstiran bihist; lê çargaviyeke gelekî bêhemd. Hingê ez û Mihemed jî bo sekinandina hêstiran di devê rê da peya bûn. Hêstir bi kûranî direvin; ewçend ko, mirov hezra kest li ser piştî wan ne dikir.

GELAWÊJ

GOVAREKÎ EDEBÎ Û SEQAFÎ MANGÎ KURDÎ YE

Jîmare 1 Sal-4 Kanûnî dewem 1943

LEM JMA:REYE DA:

Gelawêj li salî çwaremeya	Elaedîn Secadî
Newrûz	Emin Zekî beg
Dêrnî Gwêje	Pîremerd'
Derd û endîşeyî komel	F. Hûşyar
Ceşrafayî Kurdistanî Iraq	Mîstefa Nînetîlîh
Tefsîrî Quran	Şêx Mihemedê Xal
Diwanî Gelawêj	
Emer Xeyam	Yûnis Reûf
Çekî kon û taze	Evdilmihsin Hûşyar
Kezey bay şemal	F. Mihemd
Çirokî jmare	Nûrî S.
Kelalayî ferhengî kurdî	Tewfîq Wehbî beg
We hendî basî	xoşîtir exônînewe

Bi vê hejmarê Gulavêj sala xwe a siseyan diqedine û pê li a çaran dîke.

Di van sê salan de Gulavêj di warên zanîne de xebateke zor xebitiye û reşma her dişwariyê di derketinê de dom kir û xizmetine mezin gîlaftîye edebiyala me.

Gava mirov li nivîsarên Gulavêjê temaşa dîke bi fexr û minetdarî dibîne ko Gulavêj di derca kovarên ewropayî de kovareke mezin û hêja ye.

Lê herwekî jî nivîsara gertnendeyê wê, mirza Elaedîn Secadî, dixuye Gulavêj jî ber dirhaz gelek zehmet kişandiye û heye ko îro jî ji ber vê yekê zehmetê dikêşîne.

Qedera hemî kovar û rojnameyên kurdî heya niha ev bû. Lê diviya bû Gulavêj jî vê qederê bihata awartin. Ji ber ko Gulavêj di welatekî welê de deretê ko lê de milyonê kurd heye û di wê yek milyonê de bi hezaran xwende hene.

Em jî hevala xwe re emirekî dirêj û miwe-feqiyetîne mezin hêvî dikin.

Di nizîkbûna hêstiran da, di pê ra bi lê barandîna kevîran me hêstir dane sekinandin. Osoyê xerbande li ser piştî hêstira pêşin hişk û birîng bû bû. Çiqas me deng lê dikir, hê feyde bû, li mê venedigerdan. Dawî me Oso li ser piştî hêstirê dani. Pel pel li çavên me dinêrî û zvanê wî ne digeriya. Min cigarek vêxist û dayê. Piştî çend gep dayê xurt, zmanê Oso bi ger ket; lê gotin bi temamî jî dêv bi dervediketin. Di pê pirsine dût û dirêj ra, bi tenê me ev gotin jî bihistin.

— Min ter.. şê şe.. şe.. vê di.

— Te li kû û çito di?

— Di.. di hew.. şo.. ye ziya.. reta Dar.. girê da.. î spl bû.. seri li ber ez.. ma... nan bû.

Dargir navê goristana gundê me Narincê

ye. Darên gelect mezin û kevin di wê goristanê da hene ko bi şev gelecti bi sulhin û tirs e.

Oso, ji çend salan da di xizmeta min da bû, min rojekê ji rojan derew jê ne diti bûn. Ji lewre ez bi rastiya wi bawer bûm, lê ne bi tersê şevê. Me Oso bi rê kir û em ji ber ve mal hatin.

Çiqas ko di biçkî da ez bi navê tersê şevê hati bûm tirsandin ji, diviya bû me serek lê bidana. Dema em gihêştin tala hewşoyê ziyaretê, me herdûyan tîfing li her xwe rakirin û berik ajotine dêv. Me xwe gihande ber hêwşo ji, hin tu tişt ne diyar bû. Herwekî ez çavên xwe veqelêşim, mi çak dinêri. Pênc saniye derbaz ne bû bûn ko, tersê şevê, herwekî Oso gotî xewinî; lê neşî bilindiya minarekê, bi lene bi bilindiya zilamekî dirêj...

Serê mihina min giha bû ser diwarê hewşo. Gava ters rabû devê tîfingê digehêste pisirê. Bê ko kêsê ji xwe derbaz kim, min berê tîfingê da qefsingê. Sed xêra Xwedê, heri ko lingê tîfingê bikişinim kaztin pê ket.

Dema deng pê ket, min tersê şevê nas kiri bû. Ji şerman destên min bi ber min da hatine berdan, tu nema ko tîfing di dest min da bikeve. Ji ber ko dengê hati min, dengê seyeki bû. Piştî ko min sed lanet li Oso xwend, em hatin mal.


Gundi li odê rûnişt bûn. Gava me bi serbatiya Oso û kazîna sê ji wan ra got, bîna em ji xelkê gund serwexti rastiye bûn.

Wê rojê seyeki biyani û mezin hatiye nava gund. Zarokên gund tevî san lê gihane hev. Ewçend zarokan lê daye û sehan vegewixandiye ko hal tê ne hiştine. Dema ji destê zarokan flitiye, di ber sêncên rezan ra xwe avêtiye hewşoyê ziyareta goristanê. Ji ber ko ji hêla goristanê ya din pez di mêxêl da bû û seyine gelecti no li cem bûn, seyê biyani nema dikare tê va derbaz be. Ji ber vê yekê, xwe avêtiye hêwşo; heya ko pez ji mêxêl rabe û ew ji berê xwe bide cihekî.

Çaxa Oso tê, ji ber ko haya wi ji tiştêkî nîne; ji bo xwendina fatihê li ber hêwşo disekine. Se ji di hêwşo da dengê çeq û reqa lingên hêstiran dibihîse û xwe datine. Gava Oso ji bo xwandina fatihê disekine, se di mêraqê da dimine û dixwaze serê xwe hilde, ka ew çeq û req kû da çû. Oso ji hingê çavên xwe berdane nava hewşo. Dema se destên xwe dide ser diwêr û serê xwe bilind dike, Oso ditirse û seyê bi dirêjîya peyaki bi bilindiya minarekê an hin bilintir dibîne.

Ev e tersê şevê yê Oso jê tirs bû. Xwedê hez bike di hejmara tê da ezê çiroka İwramê dirêj binivisim.

OSMAN SEBRÎ



TRÊNEKE SIBÊRYAYÊ. ÛRIS LI VAN TRENAN JI FABRÎKÊN ROHELÊ TANG Û HER TEXLÎT HACETÊN CENGÊ SIWAR DÛKIN Û WAN DITÎNIN QADA ŞERÊ ELEMÂNAN

ŞÊREK BI DAREKÎ

Herweki ji hemiyan ra nas e, şêr li welatê kurdan peyda nabin. Lê car-caran ji hêla Erebiştanê yek-yek riya xwe şaş dikin û ber ve welatê kurdan tî. Ev şêrên şaş bûyi di Kurdistanê da bi rojan dijîn, ne bi sal û mehan.. Pir mîkûn e ko herî bi cih bûna Kurdan di Kurdistanê da, şêr hebûne. Ji xwe çirok û meselokên kurdan ji wê texminê ji mirov ra çêdikin. Lê çi lède ko herweki kurdan gotiye: « serê du beranan di beroşekê da nakele » kurd û şêr ji di erdeki da najin. Ji her vê yekê ye ko şêr li welatê kurdan peyda nabin û yê ko bi rê şaşkirinê diçinê ji zûka têne kuştin.

Di sala 1930 i da li Barzan, min rehmêtî şex Evdîrehmanê garisi nas kiri bû û sereki dirêj bi rehmêtî ra bû bûm heval. Di nav çirok û meselokên ko ji min ra goti da, çiroka şêreki heye ko hêjayî gotinê ye. Di vê çirokê da ji mêraniyê pirtir nefsiyeta kurdan bi ser û berê xwe va xweya dike ko ezê vi alî, di dawiya bendê da serpillî binivisim. Şêxê garisi got:

« Di dema Bedir-Xan begi da şêreki riya xwe şaş kiri bû û hêti bû dora Cizîrê. Du-şê caran li ser riyan pez û dewar kuştî bû. Gava Bedir-Xan beg pê hesiya, birek siwar girt û derkete rawa şêr. Ji ber ko şêr dernakeve pêşberî qewetên ji hikmê xwe zêdetir, Bedir-Xan begi şêr bi cî ne kir. Piştî ko hêviya xwe ji ditina wi birt, di vegera mal da, holê delal dane ban kirin: Kî ko şêr bikuje mirê Botan dê wi perû bike.


Wê rojê, ji bo peydakirina mecdiyeki (dayîna mir) koçereki garisi dihat Cizîrê. Mêrikê koçerî bê çek bû; lê darekî zexmî bi dest da bû. Dema digihe êrdima ko şêr lê, di nişka va direndeyeki xurt li pêş xwe dibinc. Bert ko şêr xwe bavêje ser wi, koçerê camêr darê xwe di navçava şêr da lédixe. Şêrê reben weki rovtîkî li her lingê koçer bêcan dikeve erdê.

P'şî kuştina şêr, tişteki tê bira mêrikê koçer. Ew tişt ji, ko direndeyê kuştî seyê mir be.. Li ser vê texminê, ji bo ko gewriya xwe nede dest peyayên mîr; herî bîstekê ji wê êrdimê bi dîr dikeve û diçe Cizîrê.

Di pê koçer ra, botiyeki şareza: di wî cih ra derbas dibe. Gava şêr bêcan li erdê ramediyayî dibine, devê tîlînga xwe dide bin guhê şêrê bêcan û diteqîne. Paşê cendekê şêr li kerê dike û tîne Bîrca-belek nik mîr.

Gava çavên xulaman bi cendekê şêr dikeve, zûka haya mîr dikin. Mîr ji ji bo perûkirinê mêrik dixwaze nik xwe. Dema çav bi mêrik dikeve û hin pîrs jê dike. dizane ko mêrik şêr ne kuştîye. Di wê navberê da, xulam ji haya mîr dikin ko bûna şêr bi xwîn ne bûye. Li ser wê yekê, mîr careke din delalan di-te ban kirin; he ka yê şêr kuştî ki ye.

Di wê navberê da mêrikê koçer çiroka xwe û dirende ji yeki dikaçî ra dibêje û texmîna xwe ya ko seyê mir hesibandîye jê ra bi ser va zêde dike. Di wê demê da ye ko dengê delal dikeve guhên wan. Hînga dikaçî ji koçer dipirse, ka seyê mir ê ko kuştî i çawa bûye. Gava koçer jê ra salix dide, dikaçî tê dighê û dibêje: yê te kuştî ne seyê mir e, ew şêr e. De zû rahe here cem mîr û perhîya xwe bistîne.



VAPOREKE EMÊRIKÂNÎ LI SER TANOKÊ

Mêrikê koçer tê pêş Birca-belek û cendekê dîrende dibîne û ji yên dora xwe ra dîbêje: Heke ne ev birina li serê şêr bûna, min dikari bû bêjim ko min ew bi vi dari kuşt.

Xulaman gotinên mêrikê koçer gihandine mîr. Dema koçer birin pêşberî mîr û mîr dit mêrikê koçer çiqasî zexm e, hinekî bawerî jê ra çêbû ko ew mirov dikare şêrêki bi dareki bikuje. Li ser wê, ev axaftin di navbera wan da çêdibe.

Mîr — kuro te ev şêr kuşt?

Koçer — Ezbenî heke ne ev birina li serî bûya, min dê bigota erê min kuşt.

Mîr — De bêje, ka te çawan kuşt?..

Koçer — Ezbenî, herwekî tu şêr bi û ez ji ez bim, gava xwest xwe bavêje ser min, min va darê xwe holê rakir û di navçava wî da lê da (hîngê eger xulaman destê koçer ne girti bûna, ne dûr bû ko di navçava mîr da jî danina).

Hinga mîr got: Erê camêr te ev şêra kuştîye. De bêje, ka çî dixwazî ez bidime te.

Koçer — Ezbenî, bi saya serê mîr tiştêkî min îkêm tine. Bi tenê ez hewceyî mecdîdiyêkî me, ko ew jî jî bo berevkerê dayîna mîr e.

Mîr — Koçerê min, jî iro bi şûn da nema herevker dayinê jî te distîne. Ji vê pê ve tu çî

dixwazî?

Koçer — Mirim, min tişing heye, min pez û dewar heye û zad û xwarina min jî heye; jî van pêva jî min tiştêk navê.

Bedir-Xau begî çî kir, nikari bû tiştêkî bi mêrikê koçer bide xwestin. Dawî emîr da xulaman û koçer birin sûkê; jî wî û zarokên wî ra gelek cil û kinc kirin û şûr û tişingekê bi ziv tamandî jî dan-ê û koçer bi rê kirin ».

Ji vê çîroka han qenc xweya dike ko rûyê kurdan jî xwestinê pir diêşe. Ji vê pêva, mêrê kurd çî mêraniyêke mezin bike, pê dilgir nabe. Çima ko kirina tu tiştî jî mêran ra ecêb nayê-te ditin. Mafr ko di nav kurdan da jî bo mêran û mêraniyê ev raman heye, « tûya ko mên nîkarin nîn e » her tiştî û kirin wek-xwe dixweye. Bila jî vê gotina min neyête zanin ko kurd heqê mêraniyê nîzanin. Di vî warî da ramana kurdan jî hîkmetê ne dîr e. Mafr ko mên e; her tiştî dikare. Herwekî comerdî jî şahan ra nabe pesin; çima ko şah ne comerd (çikos) nabîn. kurd jî welê bê mêranî nabîn. Li nav gel û mîletên din jî bo mêraniyêk holê şîr û kîtehan dinivîsin; lême ku dan; heke ne şêxê garîsî bûna, ev çîrok jî wenda dibû.

OSMAN SEBRÎ



XAÇA EMÊRIKÂNÎ A SOR JI ESKERÊN ŞEREVANÎ RE DIYARIYAN DIŞÎNE


ELEMAN

RO DI ÇI HALÛ DE NE?
WEK HÂLÊ 1918AN

Vê paşiyê yeki biyanî ji ber lepên elemanan xwe xelas kiriye û hatiye Londrê. Vî zilamî tiştên ko li Berlînê û li bajarên Bayyêrayê û di Rênanîyê de dîline ji rojnamevanên Londrê re qise kirine.

Li gora wî zilamî piraniya elemanan ji zefereke tekûz û qehar re nema bawer dikin. Lê dibêjin ko Hitler wê bikare Elemanyayê bigehîne silheke maqûl. Yanî Hitler wê bikare Elemanyayê ji talûka bolşevîkan û ji îsflake anglosaksonan xelas bike. Ji lewre û rexma her tiştî manewiyela elemanan hetanî îro jî qenc dikare bête hesêb. Hitler li nik xelkê xwe hêj bi qedir e. Lê eleman nema bawer dikin — herwekî berî du salan bawer dikirin — ko Hitler layixtî ye; heçko texlîte Xwedê ye.

Eleman zilamî çend çaran bi elemanan re di heqê vî serî û dawîya Elemanyayê de da û standiye. Eleman dibêjin: « Hemî qewetên Elemanyayê di kelehê Ewropayê de wê bêne hesidandin. Ev keleh nayete zemt kirin. Ūris wê bizanin ko di xizmela anglosaksonan de bi tenê ew in ko şer dikin û xwîna xwe ji bona wan dirîjînin. Ji lewre ewê çîrşa xwe bisekinînin û nema çesta roavê bikin. Ji xwe heke Ūris dîl kirin ko derbasî xeta ko Hitler daniye, bibin hingê di pêşberê xwe de ne bi tenê Elemanyê û hevalben dên wê, lê hemî Ewropayê dê peyda bikin. Heye ko Ūris hevalbendên xwe anglosaksonan jî li ser vê



Jî FABRÎKEYÊN EMÉRİKÂNÎ YEK YA BALAFIRAN

reyê bibînin. Ji bêr ko anglosakson naxwazîn Rûsyeye mizefer bibînin. Ji ber ko ew jî bi talûka sor hesiyane ».

Ji van gotînan dixuye ko elemanên ko imîda zefere wînda kirine bawer dikin ko bi lihevhatînekê — an bi Ūris an bi anglosaksonan re — ewê bikarin xwe ji perîşaniyê xelas bikin.

Li destpêka Kanûna-paşîn bi rê va dikan û destgahên piçûk dilhatin girtin. Xwedî û emeleyen wan dikau û destgehên rêdikirin ordiwê an xîzmetine din. Zadê elemanan kêm bûye. Kûçeyên Berlînê rêvin in. Xelk cîline qerade li xwe dikin. Jin û mêr soline welê bi pê dikin ko pehniya wan jî dar in; texlîte qeqqab.

Îcar ev zilam dibêje ko halê elemanan dimîne halê wan yê sala 1918an. Lê manewiyat çêtir e. Ji ber ko di nav xelkê de sivil ne mane û herkes esker e.

Mêrikê me di bombaranên bajarê Klonoyê de hazir

bûye. Mêrik di vê babetê de dibêje: « Taxîne bajêr hebûn ko bi lemanî xerab dibûn. Lê xelk li ber disekine û tehemil dike. Carekê ez di zêrmînekê de bûm. Di nav peyan de du esker jî hebûn. Ev her du esker bi fzin hati bûn gundê xwe. Di dora me de xanî bildiweşîyan. Dengê bombeyên fêris guhên mirov ker dikirin. Di nav xelkê de jî herkesî bêlîr wan her du eskeran esebiyetê şanî didan. Ji ber ko ew cara pêşîn bû ko ew diketin zêrmîne. Ez bi xwe ne ewçend rahef bûm. Lê gava min eleman di ezêb de didîtin ez kêfxweş dibûm. Di wê bombaranê de fabrikeke elêktrîkê xerab bû bû ».

Tiştên ko mêrikê me di Elemanyayê de dîtine ev in. Lê hêf wî jî eşkere ye ko eleman bi xwe jî bir dibîne ko ew şer wînda kirine û Hitler nema dikare vî berî bibe serî.

XELÎLÊ GENCO

SEHÊN ZOZANAN

Nêçîrvanê Hawarê û çîroka sehê wî anî bîra min: Sehê zozanan.

Çîroka sehên zozanan ne derew e û ne tişteki xeyalî ye. Min, bi çavê xwe ne dîtiye, lê min bi guhê xwe bihiştiye. Yê ko ji min re gotiye ne meriveki tenê ye, dido ne.. yek jê, ji Zibdanê Salih begê Remedan e.. yê din jî, ji eşrafê Qunêterê Dawid efendi ye.. Min ji her diwan jî wisan bihîst:

Ji berê de, ji Kurdistanê pez tê Sûriyê, Feleşînê û carina diçe hetâ Misrê jî.. Pezên Kurdistanê li bazarên van welatan pir meqbûl e.. Jê re pezê mor dibêjin..

Carekê, tacirekî, ji dora Erziromê pezê xwe aniye Sûriyê û qederekî li Zibdanê maye. Zivistan pir sert hatiye, gelek berf bariyaye, nikarî bûye ji Zibdanê derkeve û pêş da here. Paşê mecbûr bûye, pezê xwe li Zibdanê firotiye, mêvandarê xwe.. Bi tacir re sehekî zozanan jî hebûye ko bi rê da pezê wî ji guran diparast.. Mêvandar, rû avêtiye ser wî û jê kûçikê wî xwestiye. Wî jî, ji ber heqê mêvaniyê fedî kiriye û sehê xwe ê qilçiq-şîn, bilind û sermezîn, gurxenêq pêşkêşî mêvandarê xwe kiriye û vegeiriyaye welêt: Erziromê..

Wê çaxê li Zibdanê rêl û deviyên bi histîri tiji.. hebûnê, ko wargehê gelek gur û hin tebayên din ên kûvî bûne; û tucaran eman ne, didan pezê wî welatî.. Lê piştî ko sehê zozanê Kurdistanê li wir xuya dibe, gur û tebayê din ne wêrî bûn nêzîkî pez bibin.. Sehê zozanan xwellî li serê wan dikir..

Piştî çend salan.. sehê zozana, êdî pîr bû hû. Carekê, di nav wan deviyên de, gur lê dicivin û wî gelek perîşan dikin. Gava vedigere mal, xwedî wî dibîne ko laşê wî giş birin bûye, û ji birînên wî xwîn diherike. Xwedî pir li ber ketiye; birînên wî girêdaye..

Sibetir seh wenda dibe, xwediyê wî pir lê digere, nabîne.. dibêje qey ji ber birînên xwe li cîkî ketiye û miriye..

Qederê du mehan derbas dibe, xwediyê wî dibîne ko sehê wî ji nişka ve xuya bû. Lê ne bi tenê; pê re du sehên din hene ko jî wî bilintir û gir û ji wî hêj ciwantir in. Ew ji di rengê wî de bûne: qilçiq-şîn Mêrik, pir kefxweş dibe, heke baskên wî hebiwana ewê ji kêfa bîfriya.. Ji mêvanê xwe re hema bi lez û bez berxekî serjê dîke û li ber wan datîne..

Her sê kûçik wê şevê xwe rehet dikin. Sibehê, sehê pir dikeve pêşiyê û her diwên ciwan didin dû wî.. Xwedî jî dizane ko hikmetek di wî işî de heye, ew jî pê wan dikeve..

Seh berê xwe dide nava deviyên.. wargehê guran. Cara pêşîn ew bi tenê diçe nav deviyên, her diwên ciwan xwe li paş vardiqlînin.. Vêcar gur dajon ser sehê pîr.. Hingî, her diwên ciwan mîna birûskê xwe dirêji ser guran dikin. Gur çel-penceyek hebûn. Şereki mezin di nav wan de dibe.. Lê seh, nazme her diwên ciwan zora wan dibin û guran yek bi yek dixeniqlînin.. û heyfa sehê pîr ji wan hîlînin.. Paşê, vedigerin mala mêrik.. xwîn, bi ser çav û guhê wan ve diherike.. Mêrik, dişa ji wan re berxekî serjê dîke û birînên wan derman dîke. Lê mixabin, sibehê gava xwedî ji xew radibe û li dora xwe dinêre her sê seh jî xuya nakin.

Piştî çend salan, mêrikê erziromî û mêrikê zebdanî hevdu li Sûriyê dibinin. Zebdanî çîroka sehê xwe, ji dostê xwe yê erziromî re dibêje.. Erziromî jî dibêje: Belê, xebera te ye.. Seh, pîr bû bû, bi guran nikarî bû û birîndar bû bû.. Rojêkê min dî ji nişkava xuya kir, piştî du-sê rojan ew û her du cewrên xwe wenda bûn û piştî mehekê dişa her sê jî xuya bûn. Her du sehên ciwan cewrên wê bûn.. Piştî du-sê mehan ew bi xwe mir, cewrên wê man..

QEDRÎ-CAN



DESTEGAHEK JI DESTEGAHEK EMÊRIKANÎ. EV DESTEGAH JI BO HEMÎ HEVALBENDAN DIXEBITN

ZIWACA KO ŞEŞ SAETAN DOM KIR

Di vî şerî de jin jî gelekî bi kêr tîn û di her kar û wezîfê de xizmetê dibinin. Yeke emêrikani, bû bû nexweşnêr û hati hû giravên Filîpîné; beri ko girav bikevin destê japonan. Nexweşnêrê biserhatiya xwe ji rojnemevanekî re qise kiriyê û gotiyê:

« Êvara roja ko em gihasti bûn Sentenbergê reisê klûba zabitan em ezimandî bûn şivê da ko em û zabitên kelehê hevûdin nas bikin. Dî nav wan zabitan de lyotnanek hebû, bi navê Emanoêl Engel. Li rex lyotnên keçikeke çeleng û spehî rûniştî bû.

Nizanim çire çavên min jî wî zabîtî ne dibûn û gava wî jî li min dinihêrt rûyê min sor dibû û dilê min bi awakî neadefî hiltavêt. Herçî keçika rex, keçika delal, min jê çet hez ne kiri bû. Ne ko bi tenê min jê hez ne dikir. Lebelê min dixwest xerabikê pê bikim. Ma çire?. Piştî min zani.

Herçî lyotnan, min jî bona wî digot, mirov di welatê xeribiyê de jî hemşehriyên xwe jî her wextî bêtr hez dike. Ma ên din jî ne hemşehriyên min, ma ew jî ne emêrikani bûn. Ma keçik, ew jî ne emêrikani, ew jî ne hemşehriya min bû?...

Qişla Emanoêl nîzingî xestexana me bû. Ji lewre me hevûdin her û her didtin û pev re derdikeîn gerê û di nav daristanên giravê de digeriyan û bi axaftinê xweş û cazîbedar me xwe jî bir dikir, me terka vê dinyayê dida û em diçûn dinyayên xewin û xiyalan. Dengê top û tîfîngan em jî wê xewinê hişyar dikirin; wî herê xwe dida çeperan, ez diçûn xestexanê.

Japoniyên hicûma xwe ewçend şidand ko tukesî nema dikarî bû xwe jî cihê xwe tev bide. Qederê du heftan em di vî hali de man û min û Emanoêl Engel nema hevûdin dît. Me terka keleha xwe jî da û em çûn girava Batanê. Min dikir ne dikir saxlûxa Emonoêl hîlnetanî. Lê xiyala wî terka min ne dida. Bi şev bi roj, gava min nexweşên xwe derman dikirin, ew her bi min re bû.

Min jî xwe dipirsî, gelo rojekê ezê wî bibînim. Xwedê bi me re rast hilanî. Emanoêl digel betariya xwe hati bû nîzingî xestexana ko ez lê bûm û saxlûxa min hilanî bu. Rojekê û jî nişkekê ve min Emanoêlê xwe li ber deriyê xestexana xwe dît. Ma Xwedê, jî vê hevûdîtinê meztir çî dikarî bû bidit min. Ji nû ve, li serê du sê rojan carekê be jî, ne hevûdin didî û jî yek piyanê û dilop dilop me şeraba evinê vedixwar. Lê hêj qanûn û şerîetê em bi hev ve girênda bûn. Me qerara ziwacê da û me daxwaza xwe gote keşan.

Li 9ê Sibatê di rêleke Batanê de mehla me birîn. Heçko me xwe jî mintîqa êgir dîr xisti bû. Digel vê hindê carina obûsekê şax û çîqilên daran dişkênand, sînga erdê diqelaşt û di nav axê de li yekî rişber digeriya.

Bûk û zava qederê şeş saetan em li cem hev man. Şer jî nû ve xurt bû û min nema mêrê xwe dît. Min hero çavên xwe li listeyên fermandariyê digerland. Rojekê min di listekê de navê mêrê xwe dît. Li rex navê mêrê min. ev gotin hebû « windabûyî » Li ser vê yekê li deftera xestexanê û li rex navê min jî nivîsandin: « Nexweşnêra bi ».

Lê dilê min jî min re dibêje ko Emanoêl wînda ne bûye û rojekê ezê mêrê xwe peyda bikim ».

CEMÎLÊ TACO



ORDIWA ÎSVEÇI

DI DESTÊN ÛKRANYAYÊ DE

Beriya niho ji li Ûkranyayê şerine mezin çêbûne û di reya Moskojê de ordûne mezin şikestine. Şerê ko em fro dikin qala wî bikin di sala 1709an û di wextê çarê rûsî Pêtroyê mezin de çêbûye. Neyarê Pêtro, qralê Îsvêçê Şarlê 12an bû. Pêtroyê mezin ji alîkî di hundir de xelk û welatê xwe ê bişûndemayî ber bi pêş dibir û ji aliyê din tixûbên kişwerê xwe saz dikir.

Ji ûrisan re di behira Baltîqê de benderek diviya bû. Ji ber ko erdê welatê ûris ne digi-haşte wê behirê. Peravên wê behirê di destên Îsvêçyan de bûn û hingê Îsvêç û Norvêj yek dewlet bûn û Îsvêç xurt bû.

Pêtroyê mezin ji Şarlê 12an bendera Norvayê an bendereke din xwesti bû. Qralê Îsvêçê ê ciwan Şarlê 12an qima xwe pê ne ani û ajote ser Pêtroyê mezin.

Di sala 1709an û di Norvayê de eskerên îsvêçî ên birçî û qelîlî barê xwe li barê ûrisan dan û ew şkêmandin û bi şûn de avêtin.

Lê Şarlê 12an li şûna ko bide pey eskerên rûsî ên şikesti berê xwe dide Polonyayê û wê saffî dike. Di vê navê de çarê ûrisan ordiwa xwe ji nû ve saz dike û li bêviya dijminê xwe dimine.

Şarl di ser çemê Vistûlê ê ceinidî re derbas dibe û dide pey Pêtro. Xelkê ko ji vewîniyên Pêtro ne razi bûn dikevin ordiwa Şarlê û ordiwa îsvêçî bi vî awayî xurtir dibe. Şarl dixwaze berê xwe bide Moskojê. Lê li ser şîretên nedimên xwe li Mohîlêvê disekine û berê xwe dide Ûkranyayê. Plana şarl ev e: di Ûkranyayê de giraniya ordiwa rûsî mehiw kirin û ûris bi vî awayî mecbûrî teslîmê kirin.



DI PESÎFÎKÊ DE KREWZOREKE EMÊRIKÂNÎ E BIRÎNDAR

Zivistana wê salê nemaze xurt bû. Teyrên ko di ezmanan de difirîn ji xurtiya sermayê diqeflîn, dimirin û diketin erdê. Ordiwa îsvêçî ji sermê û ji nêzan pêrîşan e. Eskerên îsvêçî di nav berfê de koxîkine xwe çêdikin. Lê îşê wan zehmet e.

Şarl çavên xwe berdide bajarê Potlavayê. Hingê Polltave keleheke piçûk bû; 8000 eskerên rûsî tê de hebûn. Şarl bi 18000 eskerên xwe û bi 15000 qezaqan li Polltavayê wer têt. Eskerên Potlavayê heta hatina piştmerên xwe li ber îsvêçyan disekin û terka keleha xwe nadin. Îsvêçî perîşan in.

Di vê navê de Pêtro digel 70 000 esker û topçiyên xwe digehê qada şerê. Ûris bi rê ve li karwanên îsvêçyan dixin û nan û cebirxaneyên wan dibin.

Şarl mîr û mérékî qenc û çavso e. Reşma her tiştî xwe nade paş. Li 8ê Tirmehê çarê ûrisan eskerên xwe dixê nizama cengê û ji kemînê derdikeve. 25000 esker û çar topên hesinî amadeyî hicûmê ne. Ûris agir dikin. Şarl î birîndar li ser darûbestekê ye. Ji darûbestê emirê xwe dide û siwarên wî radibin hicûmê. Şerekî no ye. Di bin fermanê rûsî Mençîkof de sê hesp tene kuştin. Siwarên îsvêçî sefa ûrisan diqelêşînin û wan ji hev de dixin.

Lê Pêtro dertêt pêşiya siwarên xwe ên perîşanbûyî, nav dide wan, wan dide hev û sefa xwe ji nû ve saz dike û berdide ser îsvêçyan.

Topên Pêtro ji agir vedimîzin ser eskerên Şarl. Îsvêçî nema dikarin. Ji milê dîna Pêtro bi birek siwaran re Mençîkof dişîne piştê xelên dijmin. Cebirxaneyên îsvêçyan ne mane. Digel vê hindê îsvêçî ji nû ve xwe pêk ditînin û berdidin ûrisan. Ûris li ber disekin.

Pêtro dixwaze dijminê xwe yekcar ji dest-hilanîne bêxe. Çar, eskerên xwe radike ber-hicûmê. Îsvêçî diskên, Mençîkof dide pey û wan tajo heta Dinyêpr. Şarl ji nû ve hîrîndar dibe; li çem dibore û digehê Oçekovê. Îsvêçî şikestine, Pêtro mîzef e.

Wê êvarê, Pêtro genêralên îsvêçî yên ko hêşir ketine destê ûrisan diezîmine şivê û şûrên wan bi şûn de vedigerîne.

Disa wê êvarê Pêtro ji peyakî xwe re mektûbek dinivîsîne û tê de dibêje: « Bi emir û artkariya Xwedê me kevirê Pêtrogradê ê pêşîn danî ».

Pêtro digehê peravên behira Baltîqê û lê bajarekî nû ava dike û navê xwe lê dike. Di wextê çaran de ew bajar, Pêtrograd, paytextê ûrisan bû. Piştî bolsêvîkiyê Lénin paytext gu-haste Moskojê û Pêtrograd bû Léningrad.

QADIRÊ FERMAN

DI NAV

MIROVÊN ÎNSANXWER DE

Çawîşkî ewistrali, bi navê Biter Bob, di Bwaderkenarê de û digel emêrikanîyan şerê japonan kiriye û ketiye nav mirovên ko goştê însên dixwin. Wî çawîşt biserhatiya xwe qise kiriye û gotiye:

« Piştî ko me balafirgeha Henderson bi şûn de vegerand fermandariyê qerara xwe da ko çarnikarên balafirgehê ji dijmin paqij bike. Bi rastî japonîyan piştî ko terka balafirgehê da bûn bi mifrizeyîne piçûk di dora balafirgehê de asê bû bûn. Fermandariyê em bi kewteyîne xwesar lêk vekirine û em şandine pey dijmin.

Min, digel kewteyê xwe berê xwe da bû bakur. Bi şev, di heyyeronekê de, me dirêjî dijmin kir. Dijmin beriya êrişê li me hişyar bû bû û li benda me dima. Japonîyan piştî ko çend tîfing berdane me, xwe dan paş; me da pey betanî ko dinya li me bû zelal. Me li dora xwe nihêrt, em ketî bûn rêlekê de; rêlek ji wan rêlên bê pîvan û bê dawî.

Min dikir ez kewteyê xwe bi şûn de vege-rtim û berê wî bidim balafirgehê. Lê hevalên

min qîma xwe pê ne anin. Bi vê rêveçûnê, bi rêveçûna di rêke nenas de kêfxweş dibûn. Me reya xwe wînda kiri bû û japonî ji peyda ne kiri bûn. Me berê xwe ji hindavekê dida hindaveke din, bê ko em bizanin em li kû derê ne. Me dida şiverêkê, bi hêviya ko em ji rêlê derkevin û xwe bigehînin cadê. Lê gava rêl diqediya çem an goltikek derdiket pêşiya me û em bi şûn de vedigerîyan.

Bi vî awayî rojên îne bûne dido û me tu şopa japonîyan hilnani û me reya xwe ji wînda kir. Bi îmidê ko em dijmin bi cihê xwe bilhe- sinin me çend derb berdane hewayê. Lê bê fêde; japonîyan xuya ne kir.

Em westiya bûn. Me xwe da şikeftêkê. Ji hevalên me Gloç û Frotî li ber dêri man û nobet digirtin. Herçî ez û hevalên xwe em hemî di xeweke giran re çû bûn.

Şev çû bû nivê şevê. Em bi teqîna bi du derbên tîfing hişyar bûn û me berê xwe da dêri. Me bawer dikir ko vê carê me japonî peyda kiri bûn. Glaç û Frotî jê ve dihatin û tiştêk bi erdê re kaş dikirin. Gava me nizingtî li wan kir me dit ko ew tişt meymûneki fêris e. Her diwan digot:

— Me got yekî japonî ye û di nav çîqîlên daran re li me temaşê dike. Di tariya şevê de çavên wî ji diçirîsin.

Em tev de kenîyan û ne- ma nivistin. Bi şefeqê ve me terka şikeftê da û me dest bi îşê xwe kir. Em li japonîyan digerîyan.

Rojên me bû bûn pênç; em rastî peyaki giravê hatin. Me pê re bi îşaretan xeber da. Mêrik digote me ko di mintîqa ko em lê bûn de peyayên însan- xwer hene û pêşiya me bi ava gol û çeman girtî ye û ji me re çêtir e ko em vege- rin batafirgeha Henderson. Lê hevalên min qîma xwe bi go- tinên mêrik ne tanin, pê didan erdê û dixwestin şopa japo- niyan peyda bikin.

Li roja şeşan zadê me xelas bû. Lê em li ber ne diketin. Ji ber kô cihê ko em lê bûn ji darên bifêktî û tey- ran tîjî bû. Herçî av, ji xwe gelek caran em di nav avê diçûn. Bi tenê tayê em dişan- din. Şeş ji hevalên me pê ketin.



PERWANA VEPOREKE BARKÊŞ

Tayê ewçend hikim li wan kiri bû ko ewan nema dikari bimeşin. Gava me dit ko jiyîna hevalên me di talûkê de ye me qerara vegeêrê da. Lê êdi reya vegeêrê ji bi dest ne diket.

Me bi dor nexweşên xwe hildigirtin û em li reya vegarê digeriyan. Rojêkê, ji nişkekê ve di nav daran re çend peyayên rût û tazi li me der bûn. Bê şik peyayên însanxwer ew bi xwe bûn. Porên wan gijgijî, çavên wan wek rejûya reş ya ko lêj nû agir pê ketiye çîşk vedimistin. Bi kenine xebis dikenin û li me dînihêrtin. Niyeta wan di kenê wan de xuya dikir. Me xwe da ber talûkan û me agir kir. Me dido ji wan kuştin û ên mayin baz dan. Bîvê nevê xelkê wan ewê li me bigeriyan û bi xwestana ko heyfa peyayên xwe ji me hilinin. Ji lewîa me berê xwe ji hindava ko peyayên

însanxwer jê xuya kirî bûn, bada û me qesta hindaveke din kir. Me dixwest em ji wan bi dûr bikevin.

Şev û rojêkê em bi rê ve çûn. Lê taqet di me de ne ma bû. Em hineki rûniştin û me fêkiyîn dane hev. Di vê navê de kêvroşkekê ji ber me baz da. Hevaleki me da pey. Piştî niv saetê hevalê me bi rûyekî bi ken vegeerîya, mizgînî da me û got: Me rêl xelas kirine; pêşiya me deşt e.

Me xwe ji cilê xwe tev ne da û şeva xwe lê derbas kir. Bi spêde ve em bi rê ketin û gihastin deştê. Desteke bê xêr, ne dar ne ji şinahi lê hene. Rojê pê de em bi rê ve çûn. Li me bû şev; şeveke sehrawî, şerma, seqem. Tu ardû bi dest ne ket. Fêkiyên ko me ji rêlê bi xwe re ani bûn me ew ji xwarin.

Sibetirê em li xwe heyirî man. Hin hevalên me digot, emê di vê deştê de ji tihinan û ji birçinan bimirin. Hinên din digot heye ko rê li pêşiya me ye. Herçi ez, min nema dikari bû ez qerarekê bidim. Em di vê şexşaliyê de bûn ko di ser me re balafirêk derbas bû. Me stêrkên wê dîtin; balafirêke emêrikani. Me destmalên xwe li ba kirin û îşaret dan balafirê. Balafir çond caran di ser me re gerîya û ji me re kaxezek avêt.

Balafirvanan di kaxezê de digot, me hon ditine lê divê em vegeerî wargehê xwe. Emê ji we re balafirîne dîn bişinin.

Piştî du saelan deh balafirên emêrikani hatin û em vegeerandin balafirgeha Henderson. Me ji balafirvanan zant ko japonî ji me bi tenê heşt kilomêtiran dûr bûne.



DESTEGAHEKE ZENCÎRÊN TANGA'N

HESENÊ MISTÊ

CIVATA BÊDENG

Di heyamên berê de pergala Ecemistanê ji hin bûyerên derve û ji bêtevdîriya hundir pergala wan hinek ji hev keti bû. Ji bo danîna awa û bîngehekî zanistî hin xortên xwende û welatparêz diva bû. Bi vê hêncetê çirûskên jîriyê di çavên hin xwendeyên wan de birûsk da û li bajarê Hemdanê civatek, bi navê «civata bêdeng» saz kirin. Pro-nivîsa civatê bi kurtî ev bû:

Civat ji sê deqan teva di-be. Libat sed in; ne kêm ne ji zêde. Awayê xebatê: Pir bi-fikirin û hindik binivîsin. Peyiv yekcar hindik.

Armanca civatê bi dengekî bilind di rohe-lat de bilav bû. Heçî pîspor û welatparêz ber bi vê bilingelê ve dibezîyan. Her kesî dixwest ko bi tîkiliya vê civatê bex-tiyar bibê. Yek bi navê bijîşkê Zîb berî ko xwe bigîne civatê reşbelekek ji wan re şand ko min jî bikin libatekî civatê.

Heya reşbelek giha wan libat timam bûn. Zîb qesta Hemdanê kir û çû. Gava gihîste wir bergiftêki (istiqbâl) mezin jê re girtin û paşê derbasî civinê bûn. Gava rûniştin libat, serek tev de ji Zîb felîdkar bûn. Çawa bersefa wî bi neqebûlîkirinê bidin.

Serek hûnek fikiri û digel libatan çû mezeleke din, cihê şewrê, da ko bi çi awayî

bidin rûyê xwe û bersefa Zîb bê dilmayîn bidin. Serek gote libatan:

— Zîb xwende û zanakî zor e. Taseke tije av bibin ko dilopek bikevê wê birije û day-nin ser masa ko li ber Zîb e. Ewê bizane ko cihê libatan ne maye. Wek serek got kirin; tase tije ev anîn danîn ber Zîb. Zîb lê nêrî û tavil tê derxist û çavên xwe li erdê gerand. Pelek ji kullîkên sor li erdê dît û ew rakîşê

jor de, danî ser ava tasê de. Yanî da zanî ko bi min civat xerab nabe her-wekî bi pelê gulê av ne riji-ya. Civatê mana qenc seh ne kir. Li ser kaxezekê hejmarê « 100 » î nivîsandin û dan destê Zîb. Zîb jî rabû li aliye hejmarê çepê sifrek danî « 0100 » yanî bi min jmarê we zêde nabe. Zîb xwe sifir hesabandi bû.


Gava civatê ev dilpaqijî û nefspişkî li ba Zîb dît bi hêstî-rên şahiyê giri-yan û rabûn ew sifir ji aliye çepê guhastin aliye rastê « 1000 ». Yanî Zîb bi « 900 » î

hejmartin û xistin civata xwe.

Divê em xwe sifir bijmêrinin da ko para me bigihê hezarî. Heke ji berê de me xwe hezar danî emê vegerin deqa vala. Ji xwe ne ji ber vê yekê ye ko em xwe nakin nefer û çavên me tev de di şerkaniyê de ye.

Amûde: 2/4/1943

HESEN HIŞYAR



BERGEHEK JI BIXÊRIYÊN FABRÎKEYÊN INGILÎSTANÊ

Kiriyariya Ronahiyê : 500 qirûşên sûrî.

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 15
SÊŞEMB
1 HIZÊRAN 1943

RONAHÎ

ANNÉE 2
NUMÉRO 15
MARDI
1 JUIN 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR



DERYAVANEKÎ RÛSÎ LI CIHÊ NOBETÊ

ÇABXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Sêlika Rovi	Çirokbêj
Dûvê Rep	Çirokbêj
Lawik	Stranvan
Dawiya seferekê	Xwediyê Ronahiyê
500 000 Fransiz	Ronahî
Gelawêj	Rouahî
Seyê ko gur tani	Osman Sebri
Veger	Silêmanê Terho
Meixwir	Smainê Serhedi
Cindiyê japonî	Dilawer Çarpine
Di eniya rohelê de	Ronahî
Beşbelek	Erefat
Amediyê û Sûlav	Salih Reşid
Migerv	Roja-nû
Cankêç	Bişarê Segwan
Ey keça kurd	Cegerxwîn
Ziyaret	Misênê Perixanê
Xebat	Mela Enwer
Ger nexwinin	Cegerxwîn
Zefera Efrîqayê	Îlya Erenbûrg
Qewetên Ewropayê	Hesenê Mistê

DÛVÊ REP

Şêrek û gurek û rovik gihane hev û bi hev re çûn; rastî hespeki hatin. Şêr lepek li hêsp da, kuşt. Gote gur go, bira tu goştê me par bike. Gur rabû herçî goştê nerm ji xwe re danî û hestî ji şêr re danîn û ûr û rovi ji rovi re danin.

Şêr ji vê parkirinê pir xeyidî. Hema rabû ser xwe û lepek li nav çavê gur da. Serê gur kete erdê û dûvê wî ma rep.

Şêr gote rovi go, rabe tu vi goştî li me par bike. Rovi rabû, herçî goştê nerm û bez li ber şêr danîn û herçî ûr û rovi li ber xwe danin.

Şêr go, rovi te ev eqil ji kû girtiye? Rovi go, min ev eqil ji dûvê rep girtiye.

ÇIROKA KURDMANCI:

SELİKA ROVÎ

Gurek û rovik hûne dest û birayên hev. Rojekê gur birçî bû; gote rovi go, ezê te bixwim. Rovi go, mal-ava ez û tu dest û birayên hev in, çawa tu dibêji ezê te bixwim. Go bira qet fêde nakê ezê te bixwim. Rovi go, nîha ko ez ji te re tişteki çêbikim ko tu bi roj herî nav keriyên mîh û berxan û kes te nebinê, tê min efû biki?

Gur go, heke tu tişteki wilo ji min re biki ez li dinyayê qenciya te ji bir nakim. Rovi go, de bide pey min.

Gur da pey û rovi berê xwe da serê çiyê û bi hewa ket, heta ko her du gihane serê çiyê. Hema rovi bi şivên ter ket û jêkirin, li ser hev kirine kom.

Paşê dest pê kir û selikek çêkir. Heta gihande nêvî gole gur, bira dê were lê de rûne. Gur ji hat tê de rûnişt û rovi pê ket. Hêdî hêdî devê selikê da hev, heta ko devê wê girt û qenc asê kir. Carekê dehfa xwe lê da û di kêş hema wer kir.

Gurê gewir bi selika xwe ve serjêrî nava gundekî bû. Se û zarokên gund li gur hatine hev û gur di selikê de kuştin.

STRANA KURDMANCI:

LAWIK

Ji Mûşê wê de zozan e
Pêçî û tiliyê xelkê delal mûm in şibhlî şemedan e
Ez terka çavreş û bejna zirav nadim
Heya qaz û quling vegevin deyniu ser Merganê
Çem û qemê bayê ava Mûradê ker û lal e, deng jê nayê
Li dinyayê dosta mirov rind be
Mirov rakeve çar sala di hepîxana Diyarbêkrê.
Eger felek dost e, Xwedê rast be tişt pê nayê
Xwezî mala me çuarê mala we biwa
Sibê heta êvarê çavê min li qamet û bejna te biwa
Çiya bilind e, bi ser me de weyleweyl kir
Qaz û qulingê deşta Mûşê
Serê xwe hilanî berê xwe berjêr kir
Rinditiya te a ewilî
Li ser xortaniya min zêde kir
Ezê biqrim tirba min bikole ji mala û wê de
Dibê şibak û pencera bihilî tê de
Herçî roja inê were
Ser merzelê sêwiyê ebdalê Xwedê de
Henek û yari mane di dinê de
Darê mazi kevnar nabî
Berfa serheda lê barî
Nêçira min û kewa gozel li ser nabê
Wetenê miral şêrin e, dest jê nabê
Ez terka çavê reş û bejna zirav nadim
Heya sîfyan û lircal rabê.
Tasa xezala min zivîn e
Tasek av ji kaniya mala bîne
Dixwim naxwim tihniya dilê min naşkê
Roja qiyametê ber mîzîna xêr û guneha dawaçî me

DAWIYA

SEFER Û IMPERATORIYEKÊ

ELEMEYN, BINGAZI, TRABLISSHERE, TÛNIS, BIZERT

Şerê Ewropayê li 1ê Îlona sala 1939an, di zikê Ewropayê de dest pê kir. Welê dixuye ko mizferên vî şerî ên pêşin, vî şerî di Efrîqayê, di erdeki ji Ewropayê 50 kilomêfiri dûr de, de winda bikin. Ji xwe winda kirin. Lê em dibêjin de winda dikin. Ji ber ko ew bi xwe hej mikur ne hatine; çekên xwe dananîne, keftelêftan dikin, di cankêşiyê de li ber xwe didin.

Li 8ê Gulanê danezanên hevalbendan da zanîn ko eskerên hevalbendan (ingilîzî, fransîz, emêrikani) ketine bajarên Tûnis û Fîzêrtê, talyan û elemanan ji ber baz daye; hin hêsir bûne, ên mayîni kişiyane nûvîrava Bonê. Lê ew ji kom kom xwe dispêrin hevalbendan.

Bi vê zefêra mezin sefera Efrîqayê ya ko ji sê salan de dom dike gihastiyê dawiyê û peravên Efrîqa bakur, peravên Behira-spî yên nûvro, ji Swêşê heta bi Cebeltariçê tev de ketine destên ingilîz û hevalbendan û Behîra-spî bû goletek ingilîzî. Pê dawîya imperateriyekê, imperatoriya talyanan ji hat.

Li 10ê Hîzêrana sala 1940î piştî ko eleman li bakur gihastîne peravên Mansê û li nûvro berê xwe dane Behîra-spî talyanên ko heta hingê,

ne keti bûn şer û bi gotarine pûç û bêar gef didan dinyayê, gava ditin ko Fransa reben şikêstiyê, wek teyrekî beratan xwe avêtin ser û qedêrê deh rojan şerê wê kirine. Fransa di wî hali de ji û bi tenê bi du sê firman li ber efrîqa talyanan sekinî û ne hişt ko ordîwa ariş û sazbandan derbasî erdên wî bibin. Li nav wan deh rojan de talyanan pîrek berhewa kir. Ew pîr di axa talyanan, di paşîya ordîwa talyanî de bû. Pê paşî li xwe girtin.

Îtalye li Efrîqayê xudan mistemlike û cîrana erdên Ingilîzan bû. Hebeşîstan, birekî peravên Behîra-sor, Lîbye, Trablîssêrb hemî erdîne talyanî bûn. Mûsolînî, rêberê Îtalya di li Lîbya û Trablîssêrbê eskerekî boş kom kirî bû.

Hevalbendên mîhwerê kar di nav xwe de lek vekirî bûn. Welê dixuya ko îşê Efrîqayê talyanan girtî bû ser xwe. Hitler Ewrope, Mûsolînî Efrîqe de fetih bikirana.


Talyanan di sala 1940î de dest bi şerê Efrîqayê kir û li 19ê Tebexê ajotîne Somalîstana ingilîzî û li 15ê Îlonê dirêji Misîrê kirine.

Gava şerê Efrîqayê dest pê kir, rojnamevanê talyanî ê bi nav û deng, xeberdoxê serêkê faşîstan, şînyor Geyda di « Cornada d'Îtalya » de bendek nivîsand û lê de gotî bû: (Bi vî şerî de xuya bibe heke Îtalye dikare bibe xwe-diyê imperatoriyeke).

Ji şînyor Geyda ve ev şer ji talyanan re îmtîhanek bû, îmtîhana kişwerkişîyîya talyanan.

Hingê li Efrîqayê hesêb eskerên ingilîz nîn bûn; ji polisên çobîdest pê ve. Talyan bi derba pêşin ketin axa Misîrê, çend kilomêliran pêş ve çûn; gihastin Sidî-Berani. Lê li wê derê sekinîn, bi xwe sekinin, ew ne sekinandin. Çîre? Heye ko bi xwe ji li xwe ecêbmayî ma bûn. Ma çawan derbasî erdeki neyar bû bûn?...

Ingilîzan, digel her tunebûnê talyanî bi şûn de vegeandin û ajotîni heta tixûbên



TOPINE CENKÊŞTÎKE INGILÎZÎ DIKIN AGIR BIKIN

500 000 FRANSIZ

JI BO SEFERA EWROPAYÊ DI BIN DARÊ SILEHÊ DE

Di zefera Efrîqa bakur de Fransizan pareke mezin heye. Di wê qada şer de Fransizan bi mirdaniya xwe en'ewi şer kiriye û bi temami ne be ji, kêr û zêde heyfa xwa ji elemanan hilaniye.

Ordiwa fransizi ya Efrîqayê di nav şeş mehan de ji 20 000i gihastîye niv milyone. Genêral Giro li 20ê Çiriya-paşîn 1942an li xeta şer 20000 esker hebûn. Li 15ê Kanûna-paşîn mîxdarê vi eskerî gihastîye 45 000i.

Di Kanûna sala 1943an a paşîn de eskerên Giro di xeta şer de bû bûn 50 000. Li 8ê Sibatê ev mîxdar gihastî bû 126 000i û li sîseyê Adarê bû bû 315 000. Li 1ê Nîsanê eskerên Giro gihastî bûn hejmara 410 000i. Li gora texminê ev mîxdar di van rojan de digel her sinif eskeran, bej, behir û hewayê, wê bigehin niv milyone.

Niv milyon esker di sefera vegirtina Ewropayê de ne tişteki hindik e. Ji xwe ev esker tev de fransizniyad biwan hingê qîmet û giraniya wan bi şehînine din diwiya bû bihata kişandin. Ji ber ko hingê ordiwa Giro dibû ordûke întiqamê. Ma ji mêrê ko diçe heyfa xwe ki xurtir e.

Trablîxerbê. Elemanan gava ev halê hevalbendên xwe dît, rabû ordiwek şand Efrîqayê û şerê îngilîzên kir. Îngilîz vegeyiran; eleman heta bi Elemeynê gihastin. Balafirên wan bi lîrtrek banzin digihastin Iskenderiyê.

Bihina îngilîzan fireh e; bişkên ji li ber xwe nakevin. Ji xwe ewle ne, li sebebên şikestîne digerin; tevdira wê dibînin; pê didin erdê û fêş xwe dibin serî.

Îngilîzan piştî ko mistemlekeyên talyanî yên Behira-sor vegirtin, zora xwe dan Libyayê, ordiwa Romel ya ko gihastî bû Elemeynê, dan pêşiya xwe û ew ajotin heta Tûnisê. Romel li Bizertê, Von Arnîm li Tûnisê asê bû bûn.

Îngilîz, fransîz û emêrikanî piştî êrîşeke no ya ko 36 saetan dom kir ev her du bender ji standin û şerê Efrîqayê gihandin dawiyê.

Şînyor Geyda, ji bo şerê Efrîqayê digot ko ev şer ji talyanan re fîmtihan e. Fîmtihan qediya û Îtalye ket.

Hitler piştî ko Ewrope vegirt; digot Ewrope

GELAWÊJ

GOVAREKÎ EDEBÎ Û SEQAFÎ MANGÎ KURDÎ YE

Jimare 2	Sal-4	Şubat 1943
Bo Pîremerd	M. Emîn Zekî beg	
Sewêkî nawqûpî	Pîremerd	
Natewawî jînatman	Evdilqadir Qezaz	
Mêjwî edebiyetî kurd	Gêwî Mukriyanî	
Emer Xeyam	Yûnis Reûf	
Tefsîrî Quran	Şêx Mihemedê Xal	
Diwanî Gelawêj	
Cexrafyayî Kurdistanî	Mistefa Şêx Nimetilah	
	Iraq	
Bîsarani	Tahir Haşimî	
Çîrokî jmare	Nacî Ebas	
Ferhengî kurdî	Tewfîq Wehbî beg	
We hendî basî	xoşîtîr exwênîne we.	

Jimare 3	Sal-4	Adar 1943
Zimani kurdî	Emin Zekî beg	
Newrâz	Pîremerd	
Beharî Kurdistan	E. Secadî	
Diwanî Gelawêj	
Sekalayek legel gul	Remzî Qezaz	
Benc û binawanî zimani kurdî	Tewfîq Wehbî beg	
Çîrokî jmare	N. E.	
We geli basî	xoşîtîr exwênîne we.	

Jimare 4	Sal-4	Nîsan 1943
Zimani kurdî	E. Rewandîzî	
Dwawanî zelm û tan-cemî	Pîremerd	
Eskerêkî dwanze salî	Şehab Mihê	
Reşe graneta	F. Mihemed	
Tefsîrî Quran	Şêx Mihemedê Xal	
Diwanî Gelawêj	
Benc û binawanî zimani kurdî	Tewfîq Wehbî beg	
Mihakemeyî Gelawêj	Govan	
Çîrokî jmare	E. N.	
We geli basî	xoşîtîr exwênîne we.	

Ji vê kovara hêja re abone bibin. Ebona wê ji bo salekê dinarekî iraçî ye, ji bo şagirt û feqehan bi tenê niv dînar e.

Adrês: Gelawêj, kovara kurdî
Mirza Elaadin Secadî
Xana Esterabadi — hejmar (14)
Cada Semoel — Bexda

keleha min e. Belê Ewrope keleha wî ye. Lê rêberê elemanan ne hakimê kelehê, lê girtiyê wê ye. Îro ji dor dora kelehê ye.

Gelo qedera girtiyê kelehekê çi dikare bibe Di bendeke din de emê qala wê ji bikin.

KWEDIYÊ RONAHİYÊ

SEYÊ KO GUR TANÎ FÊZA PÊZ

Di hejmarên berî vê da xwediyê Hawarê û hevalê delal Qedri Can yek çirokên san nivîstî bûn. Ev her du çirokên han jî bê şik hejrayî nivîsandinê bûn. Di vî varî da min jî çirokek heye. Heke bi xweşiya xwe, bi casî van her duyan mayî nebe jî, ez bawer im ko de xwendevanan dilteng neke. Ditiyê vê çirokê ez bi xwe me.

Di tebaxa sala 1923an da gurek hîmî keriyê pezê min bû bû. Derî adeîê, her du rojan pezek dîxwarin. Em ko di berê da xweyî pez in, tim seyên no û şivanên serwest bi xwedî dikin, tu caran tiştên holê li me ne cewimî bûn. Keriyê min ê ko sê şivan, serşivanek û çar sepandiyê wî bûn; dirêjîya salê di navhera 8 û 13 pezan da bi dev guran va berdîdan. Lê di meha tebaxa 1923 an bi tenê da nîzika bîst mihîyên çak bi dev gurekî va berdîdan.

Ji ber ko serwestiya şivan û nobûna seyên min li herkesî ra nas bûn; ev yeka han jî xelkê e fra me Mirdês ra ecêb dihat. Ji bo vê yekê, hin mehek kuta ne bû bû ko xelkê me navê min li gur kirî bûn. Herwekî, cihê ko bigotana «şev gur pezeke Osman Sebrî xwar» digotin: gurê Osman Sebrî pezek xwar, an li şilan cihî hate ditin. Êdîgur bû bû ye min û bi navê min dihate salîdan.

Çi roja serşivan serê peza kuştî bianîna, min dîr û dirêj jê dipirî û békêriya wî dîda rûyê wî. Li ser gotinên min ên giran, serşivên devê xwe dimizmi-zand û bê ko gotineke rast bide dest min diçû.

Rojekê di a em li odê ranişîf bûn ko xortekî digot: duh gurê Osman Sebrî herdaye keriyê Bîdosê (navê gundekî min e) û mihîyek biriye. I di çî gurê ko di wê êrdimê da pez dibîr bi navê min dihate xwendin. Vê yeka han ez gelekî kiz kirî bûm. Hin diltenî li ser min ne çû bû ko serşivanê min Mîslimê Qucûl kete hundir û serê mihîyeke kuştî li ber min danî. Di wê bîntengiyê da hatina serşivên û anîna serê mihîyeke nuh ez yekcar aciz kirî bûm. Mîna ko serşivan raste arê cinan were; bê xweragirtin, min hilmeyî ser camêr kir û got:

— Kuro Mîslim: êdî nema ez dikarim li ber vê pîsiya we şivanan xwe ragirim. Heke mihîyeke diu bête kuştin, divê hon her çar şivan jî terka pêz bidin û ezê her çar san jî bidim kuştin.

Mîslim xweşnasê e il û gotinên min bû. Herçiya min bigota, ez nema jê vedigerim û min tanîn cil. Li ser gotina min Mîslim serekî pênîjî û paşê serê xwe hilda û got:

Ê, ev tîfinga xwe bigire û were cem pêz, tu yê her tişî zani bî.

Pîştî vê gotinê rabû û bi derket çû. Mîslim, di şeran da mîrekî çak bû; hindik dîpe-yivî û pir dikir. Ji bo vê min gelekî rûn:eta wî digirt û golinên wî dibilistim.

Evarê pîstî şivan, min û sê peyan mo tîfingên xwe hildan û e n çane fêza pêz. Her çar şivan jî bi tîfing bûn. Di her çar helên fêzê da em dudû bi dudû rûn:tin. Mîslim di rex min da rûniştî bû û deng ne dikir.

Şev e tarî bû. Her çar se hîdfî hîdfî di dora pêz ra diçûn û dihatin. Hin çaryekeke şevê ne çû bû ko Mîslim hîdfîka gote min:

— Tu] zani? gur dike were.


— Tu ji çî dizani?

— Ev e, seyê mezin dike gaziyê ke.

— Ma qey seyê mezin î xiniz e?

— Erê, tu niha bala xwe bid-ê, ezê her tişî paşê jî te ra bêjim.

Li ser gotina Mîslim min bala xwe da-yê. Seyê mezin li pêz bi dîr ket û mina



JI QADA ŞERÊ TÛNISÊ

Ordiwa inglîznan a heştan di qada Tûnisê de xeta Marêto şkênandiyê û ordiwa Romel ber bi behîrê ajotiyê. Kîlîsa me çepê-rine wê xetê şanfî dide, yênu ko di nav zinaran de batine kolan.

torpeki sipl di nava tariya şevê da wenda bû û çû.

Çariyekêk saet ne borî ko dengê zûrîna sê hat û du sê dengan li pê hev zûriya. Hin cara paşin dengê sê ne hati bû birin ko di nîvêka çiyê da dengê zûrîna gur ji hat. Mîslim gote min:

— Te dengê gur ji bihîst?

— Erê, Ma hatina wî dê pir bajo?

— Niv saetê.

Di vê navberê da seyê mezin veşerî bû

cem pêz û herwekî ên din nobedariya hêlekê (hêla ko gur dê tê ra werê) li xwe girti bû. Piştî çariyekêk saet dengê reyîna san xurt bû. Jê xweya bû ko bêhna gur kirine û hatin nîzîk bûye. Çend deqîqeyên din borin; se yekcar har bû bûn û bi reyîne dinê bi serê xwe va kiri bûn. Mîslim hîdîka gote min:

— Qenc hişyar be, wê niha bê.

Ilîm Mîslim gotina xwe ne çedandi bû ko gurin kete pêz û li ser me rabû. Min tişteke ne diti bû. Mîslim bi destan salîka? min dida û digot:

— Ev e mi-hiyek bir.

Min li dîra destê Mîslim nihêrî, gur li stoyê mihiyekê siwar bû bû û dibir. Me her dîyan ç'a ser; lê ew ji me bezatir bû. Gava min dît xwe gihandin ne mîkûn e, me yek dest tîfing berdan-ê; gur mihi berda û revî.

Ez serwestî tevayîya rastiyê bû bûm. Seyê mezin gur tanîna fêza pêz û di hêla xwe va rê didanê. Dema gur pêz dibir, beyaseyên mayî dihatin, seyê mezin berê xwe didane hêleke din û sop li ser gur bi wendakirin dida. Si-betirê dida ser; opê û diçû ser bilata peza kuştî û têr dixwar. Hînga ez veşerîme ser Mîslim û min gotê:

— Ma ne seyê mezin gur tînye fêza pêz û arîkariya wî dikiyê!

— Erê ezbenî



MA EV XORTÊ DELAL JÎ KÎ YE?

Ev xortê ha yek ji hezaran xortên fransîz e ko terka welatê xwe ê vegirtî daye û xwe gihandiye sergevazê hêja genêral De Gol û di ordîwa wî de bûye balafirvan û bombayên xwe berdide ser serê neyar.

haya min ji vè yekê heye.

— Mafir ko haya te jê heye, te çima ji min ra ne digot?!

— Ez ditirsiyam ko tu sê bikujî, ji lewra min ne dîgo.

— Ma gelo tu bê ji vî seyê xiniz ra kuştin navê?!

— Belê divê lê ne niha.

— Pi ti ko pêz hemî bide gur û hînga em wî bikujî?!

— Ezhenî, ev se seyekî ecêb xurt û jêhatiye. Dêla me di van rojan da tê ye se. Min dil hebû ez carê, duduyan wî herdîm ser dêlê û pa ê te serwestî çirokê likim û hînga em wî bikujî. Lê herî ko daxwaza min çit bibîne, tu bi bêbextiya sê hesiyayî. Ji bo vè yekê min bê sebeb bîst mihiyên gewr bi dev gur va berdan; dem ne hat ko wî herdîme ser dêlê û çend cewrên baş jê bistînim.

Di wê navberê da herwekî seyê mezin zanî be ko em sora wî dikine, hatî bû pêş me. Hema min devê tîlîngê da bin çêng û ling kişand. Pi ti ko seyê xiniz heqê xinizîya xwe da, ez vegerîm ser Mîslim û min get-ê:

— Heke li hêviya ehme jiya te Lîmana, ji bo

tovê seyekî xiniz, dê te hîn gelek pez bidana der. Ma tu nizanî ko çî tinawirê xiniz çêliyên wî jî xiniz dibin. Çê ko dêl jî wî ne hate se, an na min ew jî dikuşt.

Mîslim ji wenda bûna bîst mihiyên po-man ne bû bû û gelîna min a ko çêliyên xinizan jî xiniz dibin bi serê wî ne diket. Wî dizanî ko ez jî kizbûna xwe wan gelînan dibêjim.

Lê a rast, bîngêhê ramana min li ser wê yekê bû ko: ji seyekî xiniz cewrine baş û rast çar nabin û mirrov jî welê...

Lîn ji çar caran ez diramim û dibêjim, ma gelo hej di destê Mîslim da bû?. I a çê tê bîra min ko Xwedê di çaranê da getiye:

« U Nû : get Xwedê, li ser erdê çêjil êkî ji Lafiran mehêle. Heke tu bihêlî wê ekdên te jî » ê bi derxin; ji ber ko ji gelacan bê çêliyên kafr ti tek çar rabe. » Sêreyê Nûh

Ji xwe tecribeyên ko min di warê jirê da dî, ev ramana han li nik min xurt kirîye. Ji çencan ne çenc, ji neçencan jî çenc kêm caran çar dibin. In mayî herwekî meseloka me kurdan dibêje: « Çî a li ser koka xwe li şîn dibe »

OSMAN SEBRÎ



GENÉRALÊN ORDİWA "İNGLİZ" DI KÜÇEYÊN TRABLİSHERBÊ DE SILAVÊ LI ALÊ DIKIN

VEGER

BI BASKEKI ŞEWITI

« AERIAL SPEECH: AIR RAID ON MUNSTER »

Hin balafirvanên inglîzî li her radyowa Londrê xeber dane û biserhatiyên xwe gotine. Ew gotar dane hev û bi wan kitêbek bi navê « Gotinên heWAYI » anîne pê. Me ji wê kitêbê biserhatiya jêrîn bîjartîye ew û berpeyî xwendevanên xwe kirîye.

« Tiştê ko ez dikim bibêjim di bombaraneke Mûnsterê de li min qewimiye. Lê çi bombaraneke hêsani. Çey di bin me re dijmin nîn bû. Çend ronavêj bi xetine spî-heşîn singa ezmên tev didan. Lê herçî topên berbalafir çey lal bû bûn û zimanê wan nema digeriya. Çend derb berdane me û hew.

Me bombeyên xwe bi rahetî bera armancên xwe dan. Şewatine welê çebûn ko ji rîvîniya êgir mirov di ezmanan de nema stêrk diditin. Beriya ko em berê xwe bidin reya vegeerê em careke din di ser bajêr re digeriyan û me tesîra bombeyên xwe seh dikirin. Ji nişkekê ve min balafirêke dijmin dît. Balafir ji bendêrê rabû bû û qesta me dikir. Min dil kir ez diajo pê bihesinim. Lê telefona me ne dişuxlî. Ji xwe di nav çend deqîqan de balafira dijmin xwe gihandî bû me û bera me dida.

Di vê navê de mitralyozkêşê me ê peş meserşmîlek avêtî bû erdê. Lê em bi wê jî ne

hesiya bûn. Ji ber xerabiya telefônê em ji h e qut bû bûn.

Topên berbalafir ji bera me didan. Diajo pozê balafirê ber jêr da û qesta behirê kir û em ji dijmin vebûn. Lê xesarîne giran gîhaştî bûn balafira me. Motora milê çepê hati bû hingaftin, dolabên daketiñê jî xesazede bû bûn. Bêtêla me jî nema dişuxlî. Herçî mitralyozkêşê me ê peş ew jî birindar bû bû. Berik li lingê wî keti bû. Ji her tiştî xerabtir agir bi baskê me ê çepê keti bû û borîke banzîne qul bû bû.

Me dida çilê xwe û me digot, tu tevdîr ne maye; emê bêgav bimînin û xwe ji balafirê bavêjin. Ji lewre me peraşûtên xwe (sîwan) bi xwe ve kirin.


Hinan ji me depê balafirê qul kir û aletên agirkuj bera şewatê da. Lê bêsêde; ji ber ko agir ji me dûr bû. Me av, çay û qehwa ko bi me re bûn, rijande ser êgir. Ev jî bi kêr ne hat.

Em gîhaştî bûn peravên Denîmarkê. Em perav perav diçûn û me temaşa şewatê dikir. Kumandar ji min pîrsî û got: Tu çi dibêji?

Min lê vegeerand û got: Bi min be şewat kêm dike.

Kumandar gote min: Ji min re çetîr e ko ez şevêkê li ser behirê bimînim, li şûna ko bîkevim destê elemanan û herim hêstîrgehê.

Kumandar holê got û rast bi rast berê xwe da Ingîlterê. Min careke din li şewatê nihêrt. Heke ez derketama derve û di ser



ESKERÊN RÛSÎ YÊN KO BERÊ: XWE DAYE QADA ÇEMÊ DON

bask re bixwişiyama û min xwe bigi-
handa şewatê, ma çi dibû. Heye ko
min ew vekuşt. Jo, mêkanistê me
digot, ma tu dîn bûyî?

Bi balafirê ve werîsek hebû. Me
flûqa kewçûk pê girêdida. Min ew
werîs gerande sînga xwe û serê wî da
destên hevalên xwe û ez derketim ser
baskê çepê. Peraşût hêj bi min ve bû.
Min dil kir ko ez jê xelas bibim da ko
bikarim çêtir bixebitim. Lê hevalan
ne hişt. Min bi lingê xwe kitanê bask
qul dikir û lingê xwe danî ser ca-
xên hesinî. Bi zikêşî ez ber bi şewatê
diçûm. Ba reya min dibirî û dikir min
ji baskê balafirê veke. Min xwe lê di-
şidand. "Ez û ba em bi hev diçûn. Bivê
nevê ba ji min xurtir bû û ez bi destekî
dixebitim. Min bi destê xwe ê din
xwe li bask dişidand.

Min xwe gihandî bû cihê ko di-
şewitî. Şewatê qulek çêkiri bû û tê re
li ber xwe dida û dikir bask tev de
bigire. Qapaxêke gir bi min re hebû.
Ez dixebitim qula ko agir jê derdike-
t bi wê qapaxê bigirin û bi wî awayî
şewatê bitemirînim. Lê dema ko min
dikir devê qulê bi qapaxê bigirim, bê
ew ji destê min firand. Ez li ber qula
êgir bûm. Lê min nikarî bû tiştek
bikira. Ez destvala ma bûm; min
nema dikarî bû agir bitemiranda.

Piştî wê zehmetê ji min re tiştekî
din ne dima, ji vegeerê pêve. Ji
neçariyê min welê kir. Gava ez ketim
hundirê balafirê midekî ez bê hiş
mam. Gava hiş hate serê min hevalan
şewat şanî min dida. "Bi emirê Xwe-
dê şewat vemirî bû.

Êdî me nîzingî li peravên Ingi-
lstanê kiri bû. Ji nişkekê ve agir
dîsa bi baskê çepê ket. Di bin bask
re banzîr diherikî. Lê ji xêra Xwedê
re gelek dom ne kir û vemirî.

Beja welatê me xuya kiri bû.
Niho me xema daketîne dixwar. Me
dolabên daketîne bi nepexeke ihtiyat
nepixandin. Lê taxoka daketîne xesar-
zede bû bû. Kumandar qerara xwe da
bû. Li şûna balafirgeha xwe emê daketena
balafirgeheke jê meztir.

Em gihastî bûn balafirgehê. Me telêgrafa
jêrin kişand: « Em hatine bombaran kirin.
Xesar gihastîye me. Digel wê hindê emê bala
xwe bidin ko meydana we xerab nekin ».



HÊŞTIRSIWAREKÎ ÛRIS

Balafirgeh ji me re bi ronî kiri bûn. Da-
joyê me bi meharetêke welê danî ko tu tiştê
neadefî ne qewimî. Bi tenê balafirê xwe da
telên biderzi. Lê tukes birindar ne bû.

Eve biserhatiya me ».

SILÊMANÊ FERHO

MERXWIR

Me çiroka jêrin di kovara fransîzi « En route, An Rût » de ditiye. Li gora kovarê ev çirok ne xeyalî lê heqîqî ye û ev tişt di Gulana sala 1942an û di gundekî Kemerûnê de qewimiye. Kemerûn di Efrîqayê de mistemlikeke fransîzi ye.

Herçî klîşeyên ko em bi çirokê re belav dikin ew jî yê kovara « En route » in.

Li Kemerûnê di gastîna gundê Ciligayê de sê zarok gîba bûn hev. Di dora wan de xelkê gund jî hevûdin re hûr mûr difirotin. Zarokan xwe jî bo nêçîrê kar dikir û li serikên îfran digeriyan.

Didowên wan birayên hev bûn. Mezinê wan Jamîla, jî gundîkî bi frengêki du hesinên tijî kirî bûn. Hesinîne welê ko pê birînine xedar çêdibûn. Jamîla dwanzde salî bû; xortekî qewin û bejinbilind; çavên wî bi ronahiya hişyariyê diçirîsin.

Recalî jê bi du salan ciwantir bû û ev bû bûn du sal ko bi birayê xwe ê mizîna re diçû nêçîrê.

Heçî Talamî ciranê wan û hêj heştalî bû. Ev cara pêşîn bû ko diçû nêçîrê. Ji kêfa Talamî re payan ne dihatê ditin. Talamî bi kêfa nêçîrê şevê pêde ne nivisti bû.

Gava zarokan daye rê hêj dinya zelal ne bû bû. Her siyan tîr-kevanên xwe bi milên xwe ve kiri bûn û xencer li ber wan bûn.

Jamîla da bû pêş û bû bû rêberê hevalên xwe. Talamî di meşê de jî hevalên xwe ne kêmîtir bû û bê dişwarî dida pey wan.



Her sê hevalan xwe ker kiri bû û tiwan deng ne dihat. Di sewgira sibê de wex sehwrîne reş di nav darên rêlên bêpivan re diçûn û carina destên xwe tavêtin pelên dargerîngan.

Dinyayê dest bi zelalbûnê kiri bû. Jamîla jî nişkekê ve sekîna. Bi tiştêki hesiya bû. Hevalên wî jî sekînin û lê nihêrtin. Her siyan kevanên xwe kar kiri bû. Hêdî hêdî dimeşîyan û di nav çiqilên daran re li pêş xwe dimihêrtin û li tiştêki digeriyan. Her sê zarok jî nû ve sekînin û vê carê nema xwe tev dan. Di her dareke kevnare re evokê veketi bû û vekêş tanin xwe. Hêj nû jî xew rabû bû. Her sê tîr bi hev re jî kevanan şilîtin. Evor bi du derbên xedar birîndar bû bû. Jamîla xencera xwe derêxist û serê wî jêkir. Xwîneke sor û boş jê diçû. Talamî jî kêfan da bû qevzan.

Zarokan bi benekî dest û lingên evor girêdan û darekî dirêj di lingên wî rakirin û bi kêf û şadînanî nêçîra xwe hilgirtin. Barê wan giran lê kêfa wan jê meztir bû. Bi vê kêfê barê wan sivik dibû û zarokan dida lotikan, distrand û diçûn.

Carina xwe di ser kortalan re zer dikirin û li çeman derbas dibûn. Wextê ko di ser kortaleke bi stîrî re xwe çeng dikirin stîrîki dirêj û hişk, bi qasî şûjînekê di peyê Talamî rabû. Xwîneke boş jî lingê Talamî hat û zarok pê gelek êşîya.

Karwanê nêçîrvanan sekîna. Jamîla lingê hevalê xwe şwişt û girêda. Ji nû ve bi rê ketin. Lê Talamî nema dikarî bi hevalên xwe re bimêşe û bi şûn de dima.

Wextekî welê hat ko Talamî yekcar jî rêveçûnê ket û rûnişt. Jamîla da eqilê xwe û qerara xwe da. Rabû birîna Talamî jî nû ve şwişt û pihê girêda da ko jê zêde xwîn neçe. Piştê jê re go tu li ber vê darê be, emê herin gund û ji te re darûbestekê bînin.

Talamî li bin darê ma. Jamîla û Recalî evorê xwe hilgirtin û berê xwe dan gund.

Sefara, bavé Jamfla ù Recall, di gund dé bi tena xwe diji. Xelké gund jê direvfn. Jê ditirsfn ù ji lewre jê re hirmet dikirin. Sefara yekf erüdf ù belafiro; bú. Rojê pé de di nav rélan de digeriya. Bi kéra xwe a tîj bedena darén xurmé diqelaşt ù şeraba wan vedixwar. Évaré vedigariya gund ù bela xwe dida xelké.

Gava kurén wf giha bün gund Sefara li ber koxika xwe veketi bú ù temaşa hawîrdoré dikir. Kalo wexté çav bi evor kir hema kéra xwe derêxist ù rahişte stîrihên wf. Dikir evor bigurine. Lê wexté zaroyên wf jê re biserhatiya xwe gotin ji evor geriya, xwe şidand ù gote wan; Ezê bi xwe herim ù Talamî sax ù salim binim.

Sefara beriya ko bi rê bikeve elam da mixtaré gund ù bavé Talamî. Tagara, bavé lêwik bi xwe, ewçend li ber ne ket. Ji ber ko hergav di rêlê de tifaqine welê li xelké diqewimfn ù birfndar bi lingên xwe vedigeriyan mal. Ji lewre Tagara ji xwe re digot ma ji Sefara çêtir heye?...

Sefara lez da bú xwe ù diçû hawara Talamî. Hingûra évaré daketi bú. Sefara Talamî peyda kir. Talamî gava Sefara difilxweş bú ù kent. Kalo ew dé xelas bikira. Sefara xwe lê xwar kir; herwekf ew bikira himbéza xwe. Lê gava kefa desté xwe é çepé, da erdê bi desté xwe é rasté kéra xwe kişand ù ew di qirika lêwik re derbas kir. Talamî bê deng mir.

Sefara pišta xwe vekir, cendeké kuré çrané xwe té péça, ew kire pišta xwe ù di rêne ji xelké re nenas re vegeriya gund.

Sefara çû ba mixtaré gund ù jê re da zanfn ko Talamî winda bûye. Jê ve welé ye ko dehbak bi ser Talamî de hatiye, ew kuştiye ù cendeké wf hilaniye.

Xelké gund ù qedere deh-panzdeh jenderme bi rêlê ketin ù li cendeké lêwik geriyan. Sefara



ji bi wan rê çû bú ù xêreteke mezin şanf da bú; lê bêfêde. Herkesî çîma xwe anf ko dehbak Talamî kuştiye ù cendeké wf biriye.

Lê Likibî, mixtaré gund baweriya xwe pé ne tanf. Likibî li Sefara guhdar dibû.

Sibetiré Sefara ji gund derketi bú ù da bú rêlê. Likibî da pey. Sefara qedereki çû ù piştse sekini. Li hawîrdoré fedkiri ù kete wan darine himbiz. Likibî nizingi li wan daran kir ù lê sekini. Sefara jê ve xuya dikir. Sefara çend kuç dane hev ù agîrek dada; di nav deviké de şîlêk derêxist ù ew da ser égir. Tiştêk di nav şîlê de dikeliya. Sefara desté xwe dikir şîlê, jê tiştêk derdixist ù dixwar. Sefara midêkî xweş bi xwariné mijûl bú ù pişt ko têr xwar li ser pišta xwe veket ù nivist.

Mixtar xwe tev ne dida. Sefara qedere du saetan nivist ù paşê hişyar bú. Sefara dîsa li dora xwe nihêrt ù piştse ji şîlê çênine goşt derêxistin ù ew kirin kincikekf de.

Pişt ko Sefara ji ber şîlê rabû ù da rê, mixtar hate ser ù xwe li şîlê xwar kir. Té de serikî fnsanan ù hin hestî hêj dikeliyan.

Hêq di desté mixtêr de bú; yê ko Talamî kuştî bú ne dehbeyek bú.

Jenderman Sefara girt ù ajole pêşberé mehkemé. Sefara nemia dikari bú fmkar bike; mikur hat. Bi fdamé lê likim kirin. Mèriké merxwir dane ber tîfngan ».

SMAINÉ SERHEDI

CINDIYÊ JAPONÎ

Li cem me, li Kurdistanê cindiyê botan heye û bi mirina xwe bi nav û deng e û jê re mirina botani dibêjin. Lê em iro dikin qala cindiki, din û mirina wî bikin: Cindiyê japonî û mirina wî. Diyaneta japonan diyaneteke ecêb e. Li nik japonan Mikado yanî împeratorê wan di yek wextî de Xudayê wan e jî. Ji bona wî dijin, ji bona wî û bi emirê wî dimirin.

Keplîtenekî emêrikanî yê ko di Gîna-nû de şerê japonan kiriye di heqê wan da tiştine xerîb gotine. Ev in goinên keplîten:

Li 23ê Sibatê mêcer Sirak bi birinîne sivik ji eniya şer vegeriya bû. Heta hingê min şerê japonan ne kiri bû. Min jî mêcer hin tişt li ser japonan pirsin. Mêcer li min vegerand û got:

Japonî şerevanîne dijwar in. Lê di îstîmala çekên nû de ne ewçend şehrâza ne.

Mêcer piştî ko jî min re wêsfê mêranî û nîzama eskerên me da, di heqê japonîyan de bi ser ve zêde kir û got: Japonî çîgas bikevin tengiyê jî teslim nabin. Gelek caran û gava cih pir li wan teng dibê destên xwe radikin an destmalîne spi li ha dikin. Lê jî vê mexsed disa ne teslimbûn e. Pê neyarên xwe dixaplînin û wan dixin dehfan.

Li 24ê Sibatê ferdandariyê ez rêkiri bûm keşfê. Me gelek nîzingî li xelên japonan kiri bû. Wezîfa me keşif bû. Ji lewre hetanî ko em ne hatana dîtin me agir ne dikir.

Li 27ê Sibatê deh japonî li me qelîbin.

DI ENIYA ROHELÊ DE ŞERÊ ZIVISTANÊ — Di eniya rohelê de şer li gora çax û mewsimê diguhêre. Li 22ê Hizêrana sala 1941ê elemanan dirêjt ûrisan kir û Havînê pê de şerê wan kirin, erdine mezin vegirtin û di qada nivro de ketine bajarê Rostovê jî. Lê bi hatina Zivistanê êrişa elemanan sekint û ya ûrisan dest pê kir.

Ûris li elemanan zivirin, Rostov bi şûn de vegeandin û di dirêjahiya eniyê de neyarên xwe bi şûn de avêtin û bireki erdê xwe jî destê wan xelas kirin.

Sal qulipî dinya bû Bihar, Havînê dest pê kir, êrişa elemanan jî pê re. Lê êrişa 1942an jî ya sala 1941ê gelek kêmtir û qelstir bû. Elemanan dixwest bi vê êrişê erdên Qevqasê tev de bistînin û dest deynin ser petrolên Bakoyê. Ne bi tenê ev pîlan ne çû serî, lê erdên ko elemanan bi vê êrişê xisti bûn destên xwe li gora par gelek hindik bûn.

Zivistana sala 1942an bi ser de hat. Elemanan sekintin. Dor gihaste ûrisan. Bolşevîkan di vê êrişê de zêde kirin û di dirêjahiya eniyê de eleman bi şûn de vegeandin û li gora par erdine fireh jî destê neyarên xwe xelas kirin. Yanî ûrisan zêde, elemanan kêmkir.

Herçî klîşeya me sefheke şerê Zivistanê şant dide. Eleman bi hezar dişwariyan û di nav berfê re, bi erebeyine adeti zad û çêbirxanê dikişînin.



Ew ji derketi bûn keşfê. Gava me çav bi wan kir em li erdê pehin bûn û beriya wan me dest bi agirkirinê kir. Bi japoniyan re tîfîngine timatik hebûn. Japoniyan xwe da ber daran û li me vegevandî. Min eskerên xwe xiste şikilê qewsekê û min dikir ez li neyarê xwe wer bêm. Piştî midekî qewsa me li wan teng bû bû. Japonî pê hesiyân û beriya ko em li wan yekcar wer bîn; terka taldeyên xwe dan û bi şûn de kişiyân.

Di bolikê de şeş motosikil û timobîleke zirehpêş hebû. Timobil piçûk lê bi mîtralayozekê çekirt bû. Timobil û-motosiklên me zûka bi rê ketin û beriya ko dijmin xwe ji me qut bike rê lê girtin. Em li japonan çarnîkar halî bûn. Hêv. Êdî min di dilê xwe de digot, japonî

bêgav mane ewê teslim bibin. Bi vê imdê qedere çarek-saet ez li hêviyê mam. Tu delêletên teslimê xuya ne kirin. Ji bervaî ve japoniyan agirê xwe xurt dikirin. Hingê min emir da û eskerên min bi destbombaran bera wan da. Japoniyan ji bi destbombaran bera me dida.

Piştî saetekê û ji nişkekê ve japoniyan xwe ker kir. Êdî me ne dizanî gelo tev de mirine, an dikin teslim bibin an dixwazin me bixapînin. Min du esker rêkirine pêş da ko halê japoniyan ji me re seh bikin. Gava ew esker bi şûn de vegeeriyân me zanî ko heşt japonî hatine kuştin; didowên mayînan dar û çilo didin hev û dikin cendekên hevalên xwe ên kuştî bişewitînin.

Li ser vê yekê em tev de ber bi japonan çûn. Wan gava em ditin qet deng ne kirin, dest ne birine xwe û bi agirê xwe mijûl bûn. Yekî ji wan bi inglîzî dizanî bû. Min jê pirsî û got-ê: Hon çi dikin.

Ewî got, em dikin cendekên hevalên xwe bişewitînin. Ji ber ko em nena dikarin wan bibin qerargaheke japonî.

Sêrjan Dûler ji van pirsî: We çire agirê xwe hetal kir?

Yê ko bi inglîzî dizanî got :Ji ber ko cebirxana me xelas bûye. An ne me ne dihişt ko hon werin vê derê. Lê bi me re herîkek jî ne maye.

Sêrjan: Gava cebirxana we qedîya ma ji we re ne çêtir bû ko hon teslim biwan?

Japonî, destên xwe li singa xwe girêda û got: No, teslimbûn fehêt û talûke ye. Eskerê ko teslim dibe giyanê wi diçe dojelê. Lê yê ko jî bo Mikado dimire, giyanê wi diçe.....

Japonî golîna xwe temam ne kir û li vê derê devê xwe girt. Me zanî ko japonî bê hemtê xwe şexilî bû û hêye ko tiştine zêde jî golî bûn. Sêrjan Bûler kir ko wan bajo û bide pêşiya me. Her diwan peyên xwe li erdê şidandin û ji me hêvî kirin ko heke me rê ne da wan ko hevalên xwe bişewitînin, em wan jî bigchinin kuştîyan.

Yê ko bi inglîzî dizanî gote min: Heke em jî wezifa solîna hevalên xwe bigeriyân, me karî bû em intihar bikin û nekevin destên we. Ji lewre, an me bikujin an berdin em hevalên xwe bişewitînin û wezifa xwe a dinî bi cih binin.

Neyar bin jî, dilê min bi wan ve ma û min destûra wan da ko wezifa xwe a dinî pêk binin.

Di vegeerê de em di eihê ko cara pêşî me li hev da bû re derbas dibûn. Li wê derê sê kuştîyên me hebûn. Em li wan sekinîn û me ew veşartin. Japoniyan, gava çav bi kuştîyên me kirin kenib. Vî kenî ez aciz kirim. Ez xeyidîm û bi erî min jî yê ko bi inglîzî dizanî pirsî: Ma hon çire dikentî.

Ewî got: Kenê me ne jî kêfê ye. Ji bervaî ve em li ber kuştîyên we dikevin. Ji ber ko ew ne ji bo Mikadoyê reb, lê ji bo peyaki mîna we, ji bo Rûzvelt xwe dane kuştin». DILAWER ÇARPINE



REŞBELEK

JI XWENDEVANÊ ME Ê BERCOT

Dîvê xwendevanên Ronahiyê çiroka « Erefat, kurê Brabimê Ezem, ji mala Emo Reş » ji bîr ne kiri bin. Heçî ji bîr kirine an ew bend ne xwendine bilê kerem bikim li hejmara Ronahiyê a pêcan rûpel: 7 fedkirin û wê ji nû ve bixwinin.

Ji ber xêrata wî, me ji Erefat re kolêksiyoneke Hawar û Ronahiyê diyari kiri bû. Erefat piştî ko ew kolêksiyon girt, rabû û ji me re, wek her mirovê medenî spasnameyek rêkir. Em wê spasnamê bi fexr û şikir belav dikin. Ev e spasnama Mirza Erefat:

Mirê min ê giran û dilovan!

Pêşî ez destê mirê xwe maç dikim. Mirê min bi şandina we ji min re civara Hawar û Ronahiyê ez nikarim çawan spasên xwe ji wê re pêşkêş bikim. Ji ber ko behayê wê li cem min geleki mezî e.

Bi wê civarê serê min di nav hogir û hevalên min de geleki bilind bû û gelk ji min hesidîn û çavên xwe li xwendina kurdî vekirin. Ji ber ko ditin ko min digel xebata xwe a hindik çî şerefî ji bin destê mirê xwe girt.

Mirê min ez dibêm ko hon dizanin ez ne meroveki dewlemend im û nikarim bihayê civarê pêk binim. Ji ber ko her pelekî wê li cem min hêjayî malê dinê ye; ji rojbilat heta rojava. Ji bilû wê ji ez nikarim bihayê wan her çend herfên ko li ser civarê hatine nivîsandin ko navê min pêk tinin, bidim.

Mirê min ez nizanîm ko axayê min Hesên axa malbata min ji we re daye zanin an ne.

Ez yek ji neviyên Emo-Reş im; ewê ko mirê Bota xwestî bû cem xwe. Ji ber ko mir bihistî bû ko Emo-Reş mêrekî pir î qenc e. Wextê ko Emo-Reş gotina mir bihist rabû kurê xwe şand cem mir û jê re got; gava mir ji te pirsî bêje ez im Emo-Reş.

Lawik çû cem mir. Piştî ko rûnişt; mîr jê pirsî ti wî Emo-Reş. Go belê mirê min. Mîr got-ê: Ma mêr li ser çî rûdînin?

Ewî go, mirê min mêr li ser çûna xwe rûdînin. Mîr lê nêrî û deng ne kir. Piştî demekê careke din jê pirsî, ma gêzer bi çî hildibin?

Ewî go; Mirê min gêzer bi qilçikan hildibin. Mîr got-ê: Bi eniya min tu, ne Emo Reş î. Tu here bila Emo-Reş bê.

Kurê Emo-Reş çû û her tiştî ji bavê xwe re got. Rabû Emo-Reş çû cem mîr.

Mîr disa ew pirs jê kirin. Emo-Reş cihab da, go: « Mîrê min mêr li ser dilê xwe rûdînin » û rabû ser kabekê û destê xwe bi ser mîr de hejand û go: « Mîrê min zerp gêzera hildikê ».

Mîr kenî û got: « Bi emiya min ti wî Emo Reş ». Mîr hewraniyek li Emro-Reş kir û destûra wî da.

Tirbên-Spl: 27/1/1943


EREFAT

Ji mirza Erefat re:

Mirza, herî her tiştî me ji te hêvî ye ko tu li me neqirî. Me reşbeleka te gelek dereng belav kir. Me ew di nav kaxezan de winda kiri bû. Bi hênceta halna Cemil axa em lê geriyên û me ew peyda kir.

Ê didowan, li nîk me awayê hiabûna te ji me re ji hezar îştirakî behatir e. Hema Xwedê yê nî wek te di nav nîletê kurd de zêde bike. Paşî tu ji me re sax û kamiran bi.

XWEDIYÊ RONAHİYÊ




DERYAVANÊN YEWNAÎ DI NÊREGAHA CENKEŞTİKÊ DE

HÊSIRÊN ELEMANÎ DI QADA ŞERÊ ÛRIS DE



Eskereke elemanî yê ko cih li wan teng bûye û bêgav mane xwe dispêrin ûrisan. Ji xwe isal ûrisan ji elemanan, nemaze di Stalingradê de gelek hêsir standine.

DI ETLAN ÎKÊ DE NOQAREKE ELEMANÎ E BIRÎNDAR



Balafireke inglîzî ev noqar bi bombeyên xwe birîndar kiriye. Li ser vê yekê noqare xwe daye rûyê avê û teslim bûye. Vaporine mihafîz noqare dibin bendereke inglîzî.

AMEDİYÊ Û SÛLAV

Layê jorî yê Iraqê, gelek çiya û çelixtê bilind hene. Li mabeyna van çiyân û çelixtan çiyayek heye dibêjin-ê Metina an Bişêş.

Ev Bişêşe gelek yê bilind e. Paşê hêdi hêdi nizim dibit û digehit geliyeki sox û can, dibêjin-ê geliyê Mizûrka.

Piştî hingê ev Bişêşe pehnati û dirêjahiya xo diraçnît heta digehite gireki gelek bilind. Li serê wî giri bajarê Amêdiyê dikevîte xar. Li dora wî bajari şuhreke mezin heye. Ev şuhre li berê hatiye çêkirin. Çu rê naçin-ê li bijli du dergehên asinî. Ji êkî re dibêjin-ê Dergehê Zêbarê. Ev şuhre gelek ya bilind e. Hindek rexê wê bi 30 heta 40 bejina ya bilind e.

Heta niho di nav çirokan û metelokan de dibêjin: Amêdiyê hatiye danan li berî Mihemed pexemberî bi sed salan.

Geliyê Mizûrka geliyeki can û sax û şepal e. Li binê wî geliyê rengin aveke boş û cemidî û zelal derdikevit; herwekî befrê ya tazi ye û wek şîrî ya spî ye. Dibêjin-ê (Ser û kanî). Paşê ew dê bête belav kirin li ser rez û başan.

Paşt hingê ev av dê kom biblê ve û dê çit ser rûyê erdî; bi dengê bilind û şîrin, bi çûneke çelek û delal, li mabeyna wan beran, bi dilekê xoş û çûneke can, herwekî bûkeke li şeva xenayê.

Paşê ev av li mabeyna giyayê kesk û darê xemilî dê gehite kevirekî zor bilind dibêjin-ê Sûlav.

Bilindahiya wî kevirî nêzîki sed bejînan bilind e. Wextê av li serê vî firokeyî dê bête xar, bi dengê bilind û dijwar, wekî dengê evrê Nîsanê li wextê Paizê.

Ewî wextî zozanî têne Sûlavê û berê xwe didine vî rengê entîke ko Xudê pêşkêşî xelkê vî bajari kirî.

Zozaniyên me vî demî req û hişk dibin, nizanin berê xo bidene: vê dîtina beheştin an hêlinê teyra, an dengê bil-bila, an xişexîşa belkê dara yên ko hewayê nazik didet. An ava tazi û sipî û zelal, an wan şêkêttê ko Xudê bi himeta xo diris kirin. Au tîroşkê rojê wextê beyana spêdê tê de derê serê çiyân û çelixtan. An dîtina keskesort wextê roj li Sûlava rengin didet.


Wê gavê ewî hiş ji xo namînit û her rehek li leşê wî xo dihelavêt li ber vê kêfê.

Ewî wextî ageh li xo namînit; herwekî ew li nav beheştê ye.

Eve ye Sûlava rengin, eve ye beheştê ser dinyayê.

Imêda min ya bi Xudê xoş e, bi wextekî kêm digehite mirad û meqûsda xo, dê gehite xoşî û lezetê xo.

Edî bijit Sûlav û Amêdiyê bo xoşiya Kurdistanê.



TOPÊN VEDÊTEKE EMERİKANÎ

MINERV

BISERHATIYA NOQAVEKE FRANSA ŞEREVANI

« LAVENTURE D'UN SOUS-MARIN FRANÇAIS LIBRE »

Minerv noqaveke Fransa şerevani ye. Wê noqavê di dîralîya peravên Norvêjê de vaporeke elemani e petrolkêş bi av kirî bû. « Roja-nû » rojnama kurdî ya ko li Bêrûtê dest bi derketinê kiriye biserhatiya noqavê li ser zîmanê kumandarê wê û bi fransîzi belav kiriye. Em wê biserhatiyê wertîgerînin Kurdmanciyê û berpeyî xwendevanên xwe dikin.

« Sact yanzedekê sibehê bû. Di hindava Stavangerê de peravên Norvêjê ji me ve şuya dikirin. Bi periskopê (tevlîkek dîrebin) me dan û zînar ji hev ferq dikirin. Perav ji me ne ewçend dûr bû.

Ji nişkekê ve min vaporeke petrolkêş dit. Bandêreke elemani lê li ha dihat. Vapor xweş hatî bû bar kirin. Petrolkêşê herê xwe dida peravê. Me lez da xwe û torpilên xwe hildan; yek... dido... me du torpil, pey hev berdane vapore. Her du ji tê kelîn. Di rûyê behîrê rê stûneke zîvî bi hewa ket û teqînek da pey. Minerv bi xwe bi vê teqînê hejîha. Agir bi vapore ketî bû. Me hingaltî bû orta keşiyê. Tu xêr lê ne ma bû.

Lê niho halê me bi xwe di xeterê de bû. Ji her ko gava di bin avê re du torpil têne berdan noqav giraniya xwe kêm dike, yanî siviktir dihe û telbeyî rû dike. Ji bona vê yekê isul ew e ko qewanên torpilan piştî ko torpil ji wan derketine, vekirî dihilin û behîr dekiyî.

Lê ev tişt hema zûka çênabe; jê re west divêt.

Minervê, ji sivikahiye, wek maslîk veciniql, di bin avê de xwe tev dida û bi hewa diket. Ji nişkekê ve me xwe li rûyê avê dit. Em li vaporeqellê elemani derketî bûn. Li aliyê me ê rastê, ji me bi çend metîran dûr, bertorpiyoreke elemani hebû. Jê hînek dûr vaporeke barkêş. Di ser me re ji bombavêjêke dijmin diîrîya.

Êdî, ez nizanim ki ji me ji ê din bêtir di heyretê de ma. Herçi vapor kêsa lîxistinê li me ne ani. Lê balafirê mîtralyoza xwe li me girêda. Berik li qalikê noqavê diketin, lê tê re ne diçûn. Ji xêra Xwedê re noqava me li rûyê avê gelek ne ma û herî deqîqelê neqî avê bû.


Dijmin piştî ko em ji her çavên xwe wînda kirin bi bombayên binavîn bera me dida Bombe diketin dora noqavê; lê ne dihangaftine wê. Me bombeyên pêşîn hejmartin. Di nav çil deqîqeyî de 40 bombe berda bûne me; li serê du deqîqan bombeyek.

Me xwe tev ne dida. Îşê me ma bû siudê. Bombe dibarin û em dihejandin; hin perçe li qalikê noqarê diketin. Lê ew yekear qul ne dikirin. Lê em ketî bûn ber xeterê din. Hewa noqavê a îhtiyat kêm dikir. Jê re tu tevdir nîn bû. Di vê navê de em di ser xwe re bi dengê perwanekê hesiyan û bombeyek li rex me teqîya. Me tev de xweh dida û hêlika bihîna xwe digirt û berda. Tu kest devê xwe venedikir û xeber ne dida da ko hêkzojên zû neyete serf kirin.


Em nihtaci hewayê bûn, ew hewa ko di ser me re bê pûl û bê pere bi dest diket. Sîngên

me teng bû bûn. Vaporên dijmin heta bi tariya şevê di ser me re digeriyan û carina bombe-yek berdidan avê.

Roj çû ava û reşahiya şevê daket. Em nema bi dengê perwanan dihesiyan. Hingê me da xwe û em derketin rûyê avê. Em xelas bû bûn. Hin xesar gîhaştî bûn noqavê. Digel vê hiudê em hê arîkarî vegeriyan wargelê xwe ».




DI BEHIRA SPÎ DE NOQAREKE TALYANÎ BIN AV DIBE



Noqareke talyani di ar cenke şike, ingilizi bide ber torpitan xwe û wê bin av bike. Lê hisalê malê li sêkê ne çu serî. Keştiya ingilizi ew firsiyê ne da neyarê xwe û beriya ko noqar li xwe bixebite biingalle wê û ew qul kir. Noqar bin av dibe. Fêlûqe en ingilizi çûne ser û deryavanên wê xelas dikin.

VAPORQEFLEYÊN INGHÎÎ DI PERAVÊN CEZÂÎRÊ DE



Vaporqeflekt ingilizi piştî ko di Cebellariqê re derbas bûye digehe Cezairê. Ev resim jî pira vaporeke balafirhêgir hatîye girtin. Li ser pira vaporê hin balafir xuya dikin.

CANKÊŞ

« LE DIABLE DE GUY DE MAUPASSANT »

Gundî li pêşberê bijîşk û li ber textê cankêşê ji peyan sekinî bû. Pîrê bédeng, lê hisyar û bi qedera xwe razî li van her du mirovan, yê ku pev re taxaftin, dinibêrî.

Pîrê dizanî ko wê bimiriya. Lê jê tu 'acizî şant ne dida. Wextê wê tamam bû bû; gifaştî bû not û didowan.

Di derf û pencereyên vekirî re tava Tirmehê bi pêlan diket hundir û tihina xwe a germ tavê le raxera genimgonî û bihevkefî. Raxera ko çar nişên gundiyan pê li kiri bûn.

Bihîna ko ji zevîyan radibû, bihîna giha, genim û pelên ko di bin germiya tava nivroyê de kizîf bûn, bi sureke germ digihîta: te oda cankêşê. Herçî kulî di ser giyan re di 'riyan, li wan datanîn, disan bi firê diketin û bi dengêf nizim çey dixwendin.

Bijîşk dengê xwe bilind kir û gote gundî: — Honorê, di vî falf de tiwê deya xwe çawan bi tenê bibîlî? Tu nabînî, dike temam bibe.

Honorê bi acizî lê vegerand û got: Lê divêt ez genimê xwe bikişînim hundir. Ev midêyek e çêza me li erdê ye. Dinya jî xweş e. (Berê xwe dide deya xwe) yadê tu çî dibêjî?

Pîra cankêş hêj di bin hikimê çavtengîya xweserî normanan de, bi çav û serê xwe fîaret li kurê xwe dikirin û digot: « helê »

Belê pîra cankêş, lê çikûz digot kurê xwe, tu here genimê xwe bikişîne hundir û min bi tena xwe bihîle, ne tu xem e.

Bijîşk enîrî, lingê xwe li erdê da û got: Tu hema dehbeyek î, lê ez nabîlim tu ji ya xwe bikî. Û heke herhal divêt ko tu genimê xwe îro bikişînî; here banî Rapê bike; bila ew li rex deya te a cankêş rûne. Tu dibihîsi, ez hoê dixwazim. Û Heke te ji ya min ne kir roja ko tu nexweş bikevî, ez li te miqate nabim û ezê to bihilim ko tu wek seyikî bimirî. Te seh kir?...

Honorê, gundîkî gir lê çels, bi erqa maldariyê û ji tîrsa bijîşkê bête qerar, dudil, devê xwe vekir û hêdika got: Gelo Rapê ji bo nexweşnêriyê çiqasî dibê?

Bijîşk, bi erin û bi dengêf bilind çîr kir û got: Ma ez ji kû zanim? Here pê re xeber bide û li ser icretê pê re li hev were. Tiştê ko ez dizanim divêt. Rapê heta saetekê li here bazar be.

Honorê hate ser qerarekê û got: Ev e ez digim, tu mexeyide mirzayê bijîşk....

Bijîşk jî pê re terka xênî dida. Lê beriya

EY KEÇA KURD

Ey keçê rabe bixwîne, da tu serbest her bijî Zû ji xew lu ser hilîne hes biminc bê mejî. Rêncêra hundir tu yi hes rind û jir û zane ye Bo te bêhtir her divêtin xwendevanî paqijî. Wa hevalên te li her der serbilind in pêş ve çûn Rabe îro ey keça kurd serbilind bimre tu ji. Ger bixwîni dê bîdi xwendin tu yê hundir teyan Ger nexwîni kes ji bo te eş û derdan nakujî.

CEGERXWÂN

ZIYARET

Ey serêkên bo velen, feda kirin canê xwe ji bo doza me kurdan, xirab kirin xanê xwe. Rehmet silav ji Xwedê, em ji we re dixwazim Ber rehet bê qelbê we, em şiyar in narazim. Li nav kurdan fidakar win nebejin ne mane, Çi b'kim felek qulibî, zeman ne ew zeman e. Dilê xwe neşewtinin nebejin kurd qeliyane Hene gelek qehreman ji her zilme heliyane. Taqeta me nagihê, tu fîret ji tunire Hemi tazi birçî ne, li deviya xwîni ne. Helbet wê bê rojekê, emê zendê xwe hildin Xortên kurdan wê rabin; zeri çawa wê kû diin. Emê bikin xêretê, xelk ecêba bibînin Emê heyfê sê sed sal ji neyara hilînin. Kurd wê bibin ala rengu biçikînin Kes neyarê me min, em li bi kin in. Tije kul in dilê me, ji bir nabin tuçara Ew kuştîyên şerîte: b'singo, living û dara. Îro di bin erdê de, bê şwedi û bê guman, Ew birin pîr xedar in, bê ilac û bê derman. Ey şhidê minewer, misterih bê qelbê we Emê çêkin wê rojê quba li ser tîrbên we. Emê li ser qubê we, ala kurdî li ba kin Win laiqî hurmetê, her sal bikin ziyaret Çeyiya we mezin e, ji bir nabê mielbet.

Qetrant: 7 Nisan 1943 İHSÊNÊ PERÎXANÊ

ko jê veqete gotê: Tu dizanî, gava ez dienirim henekan naqim.

Gundî gava bi tena xwe ma berê xwe da deya xwe û jê re got: « Madam ev mêrik dixwaze. ezê herim Rapê bînim. Efta hingê li canê xwe mi'ate be » û da rê.

Rapê, jîmikeke sere û bi sinheta xwe ûtiçî bû; kincên xelkê dikewandin. Jê pê ve notirvaniya nexweşên şîran û miriyan dikir. Di yek wextî de çîşo û mirisê. Ji xwe gelek caran piçîf ko mirî dikirin cawê ko nema jê derdikevin û devê wî didirût, dihat mal û bi hesinê xwe ê germ çar evên ko mirovên zindî li ser raketana an bi xwe dakirana, dikewandin.

Wek sêveke zinistani a par rûqermiçî, dexsok,

bi çavtengîtke bêeman çikûz, ji zora kewandinê movikên piş.a wê xwar û ji hev dûr, duta, navtengîkêstî; çey Rapê ji tema a cankeşiyê kêf-xwe; dibû. Gava di civalekê de rûdiniştî hema çala miriyan û awayê mirinê dikirin. Her texlit mirin û cankeşî dîti bûn. Pîrê ev tişt, wêk neçirvanê ko çêl li derbêna xwe dike, kit kit dikir û bi her ser û berî ve, digotin.

Wextê Honorê hat nik pîrê, pîrê di tasekê de. bi milê aveke hejin çêdikir. Pîrê bi vî avê beristîkên keçên gundi de bikewanda.

Honorê n zingî lê kir û got ê: Evara te xwe, halê te çi ye deya Rapê?.

Pîrê lê veçerand u got: Tu sax bî, tu çawan î?

— Her çî ez şikir ji Xwedê re. Lê deya min nec rahat e.

— Ma çi lê qewimiye?

— Bawer bike olçeka wê dar bûye

Li ser vî gotinê pîrê destên xwe ji avê kişandin. Ava nîreng di destên wê re diherîkin u di kûnikên tiliyên wê re dilop dikirin.

Pîrê, gava sebaba ziyareta Honorê zanî, bi bendewarîke xerib jê pirsî: Yanî imîd tê ne maye

— Belê. bişîşk digot, nema li ser pişt a xwe radibe... bê fêde...

— Hingê li ber mirinê ye?

Honorê hinek sekini, da eşilê xwe. Gundi dixwest ji pîrê re tiştine welê bibêje ko pê ditê wê nerm bike û îşê xwe bi erzani biqedîne. Lê tu tişt ne hate bira wî. Hingê rast bi rast gote pîrê:

— Min divê ko tu li ber serê wê rûnî û lê miqate bibi, heta... heta dawiyê... heta ko bimire. Tiwê ji min çi bistim? Tu dizanî ko em ne mirovîne dewlemend in. Tu dizanî, me nikarî bû em ji xwe re xadimekê ji binin. Ji lewre deya min bi not û du salên xwe ve bi qasî deh mirovan dixebitî.

Rapê bi giranî lê veçerand û got: Bazar dizane, notirvaniya rojê cihê, ya şevê cihê ye. Min du tariyê hebe. Ji dewlemendan re ji bo rojê pênc û ji bo şevê deh qemeriyan. Herçî feşîr he ê rojê sê û yê şevê şeş qemerî ne. Ji te re sisê û çey...

Gundi hinek sekini, da eşilê xwe. Ma deya xwe nas ne dikir. Jînik bi emîr mezin bû. Lê canê qewin lê hebû. Dikarî bû heft rojên din ji di cankeşiyê de bimîne. Ferz e, bişîşk gotî bû, dike hema bimire. Honorê qerara xwe da û li Rapê veçerand:

— No, em bazareke din çêkin, bazara ji bo heta dawiyê, ma ne çêtir e. Êdi her yek û

XEBAT

Xebatê b'ken geli lawan xebat her karê mîran e. Xwe hişyar kin hemî pêk va ne em nihtaci gencan e. Bişon çav û devên xwe ji vî xewa hon ji mêj ketinê. Bijh we ma kesek ev rûke hon dibinin di xew da ne. Bizanin ko guncakar in bi vî netrîşiya yêkerê Hewe natib cewabek l'nik Xwedê silnê li mîzan e. Li pêş we rakiri ev ro hemî luxmên li dinyayê. Ta her kes xod t'niyasitin le rojî luxmê kurdan e. Bikin şerînê ji xo bes e bikin şerînê ji xo hes e. Nê hon zendasin in pêk va hemî şerîn li bişan e. Xebatê b'ken xebatê b'ken xebatê b'ken geli lawan e. Xebatê b'ken geli şeran ko ev rû ko ne derman e. Dibêjin ez hewe şelî ji balê xo ne bûye çay. Ji her çar qurmeta ev rûke xelkê l'ser we ferman e. Ewan tekbr e ko tovê me birin in hay hewe jê ye. An ji bi wan bibin bendê bi reş û bendik û nan e. Biken gelwe çiya hes ken he bê tirs û he bê pîrs e. Kesek nebû dibêjin mixabin ew j'çî guntan e. Geli tawa de bin razi bi vî rengî bi vî terzî. Û bijh vî hewe sibhê de hajone li kolan e. Xebatê biken geli lawan bizavê b'ken geli xortan. U pêk va kar bibin rêkê bezin û b'ken ceddian e. Bu namûşî bijh an ji herin bimirin ji dinyayê. Çiya razi bi vî jînê li nik min ew ne insan e. Bineşta bi t'e'n tivil bit miravî ew ne vêtin hiç. Hêv dûgeh bisoje lê eger bê tivil û t'e'n e. Bi mîranî mirin çêre e bi sed cara ji vî jînê. Hezar qêda û tif ser vî jîna b'edebxane. Xabatê biken geli lawan bizavê biken geli gencan. Qemî hun ko bikêşin der ji bia van kulû û mîstan e. Divêlin hun bibin yek leş bibin yek dil bibin yek can. Û pêk va kar biken belki veken tûlê ji van sun e. Bi dengê lûn biken gazi bibên dijmin here da be. Çerîna te xelas bûye li nav van baş û mîrgan e. Hilû rabin geli lawan hilû rabin geli xorta. Bi elmasa herin meydane şer seyran mîran e. Ev e lawê çiya alaçî û pêş ve hemî gava n. Dê gûrî vî cihî ken ez hezar laş û hezar can e.

MELA ENWER

GER NEXWÎN

Destê şêx maçî nekîm ev şêx ne qutbê razî ye. Ev ne din e, dia mebe, din serxwebûna mî'el e. Ser mebin berlingên şêx, kengê Xwedê jê razi ye. Ma ji bo din şer dikin xortên Feransa, inglîz. Wa li Misrê xwin dirêjin bûn şehid û gazi ye. Ger nexwîn de beg û axa me tim talaw hikîna. Ev nezamî, ev giranî karekî nasa.f ye. Rêncêrê şêx û mela ye karkerê axa û beg. Ê hîna pêk anin e lê ê hîna cambazi ye. Ew kesê zana dîvê tim wêk Cegerxwîn bike qtr. Rast e wi zincîr di mil de tim bi qtr û gazi ye.

CEGERXWÎN

siûda xwe. Ji xwe bişîşk digot gelek dom nake. Heke gotina bişîşk rast derket tiwê kar biki. Lê heke heta sibê an jê bêtir dom kir siûcê siûda te ye.

Rapê li vî gundiya ecêbmayî dima. Heta niho tucaran bi vî bazarê, bi erebî—bazar

notirvaniya miriyan ne kiri bû. Ma ev ne textîtek qumar bû. Gelo Honorê dixwest wê bixapîne. Lê Rapê ne ew kes bû ko bihata xapandin. Hêdika li Honorê vegerand û got:

— Beriya ko ez deya te bibînim, nikarim tu tiştî bibêjim

Honorê got, Baş e were em herin....

Jinikê destên xwe ziwa kirin û da pey Honorê.

Bi rê ve çet xeber ne dan. Jinikê lez da bû xwe. Herçî Honorê gavine welê tavêtin çey di ser cowape avê re derbas dibû.

Çêlekên ko ji germiya nivroyê pelixi, li zeviyân pâl da bûn serên xwe hildidan û hêdika li wan diorîn. Qey ji wan giyane ter dixwestin.

Gava bi diyarî xênf ketin, Honorê ji xwe re digot: Heye ko heta niho saff bûye....

Lê pîr hêj ne miri bû.

Li ser pišta xwe veketi bû.

Destên wê ên jar di ser betanî re wek lingine kevcalan giha bûn hev û li hev hati bûn badan. Rapê nîzingî li textê cankêşê kir û mîdekî lê nihêrt. Destê xwe da nebzên wê, sînga wê seh kir; ew axivand da ko dengê wê bibihîse. Paşê derket derve.

Jê re qinyat çêbû ko pîr nagehe tariya şevê. Honorê jê pîrsî û got: Ka bêje....

Rapê got: Welê dixuye ko du rojan, heye ko sê rojan jî bajo. Têv de bîst qemirî.

Honorê: Bîst qemirî....

ma tu dîn bûyi. Îşê pênc şeş saetan maye....

Rapê û Honorê dan ber hev, hevûdin gerandin. Jinikê pê dida erdê; wext jî diborî. Honorê diviya bû genimê xwe bikişanda hundir. Honorê gava dît ko jinik dike here; got: Baş e, bila be, bîst qemirî... heta dawiyê, heta kefenkirinê, heta ko cendek bi rê bikeve.

Li hev hatin; Honorê berê xwe da cêza gêmî; Rapê çû mal hiri û singikên xwe anîn. Her holê dikir. Di nobetdariya miriyan de gore çêdikirin; an hiri diristin. Carina ev kar bi icret ji bo xwediyên cankêş jî çêdikirin.

Ji nişkekê ve nexweşnêrê ji nexweşa xwe pîrsî heke keşe hati bû ser. Fîrê bi îşaretan da zanin ko nû. Rapeya ko gelek dîndar û xudanteqwa bû hema baz da elam bide keşeyê gund.

Gava Rapê di gastîna gund re bi lez derbas dibû zarokên ko tê de dileyistin, lê nihêrtin, li hevûdin fedkirin û gotin ko herhal tiştêk qewimiye.

Keşê da rê. Lawikê lajebêj da pêşiyê. Bi destê lêwik re zingilek hebû. Lêwik ew dihe jand û ji xelkê re dida zanin ko rebaniyet di nav wan re dibore. Mirovên ko di zevîne dût de dixebitîn, berê xwe didan keşê, şefqeyên xwe ên pehin datanîn û hetanî ko hewraniyê spi di piştî koxikekê de winda dibû, xwe tev ne didan. Jinên ko xwe li zeviyân xwar kiri bûn û qesle didan hev li ser pišta xwe radibûn, xwe li hindava keşê digirtin û xaç li ser rûyên xwe dikişandin.

Mirêşkên dora xaniyan ji saqoşê keşê e spi bizdihayî bi hêtên xwe ên giran û qelew baz didin; çey digindirîn. Ci waniyek yê ko li mêrgekê girêdayî bû; ew jî ji heybeta keşê veciniqî di dora sîngê xwe de dibezîya û dida pehinan.

Lawikê lajebêj kutikekî sor li xwe kiri bû û bi lez diçû. Herçî keşe, stoyê xwe li ser milekî xwe xwar kiri bû, lêvên xwe hêdika tev didan, diayek dixwend û bi giranî dimeşîya. Rapê li dûvê karwên bû. Xwe yekcar xwar kiri bû, te digot çey wê here seedê. Destên xwe li ser sînga xwe girêda bûn; wê jî diayek digot.

Honorê, gava ji dût re ew dîtî jî paleyê xwe re ew digot: Ma keşeyê me diçe kû derê?

Paleyê wî lê vegerand û got: Rebaniyetê dibe deya te.

Honorê serê xwe hejand « Kî zane, heye ko » got û vegehiya ser xebata xwe.

Keşe ayîna xwe çêkir; cankêş teqdîs kir û digel lêwik vegehiya dêrê.

Rapê li ber textê cankêşê rûnişt û lê temaşa dikir. Gelo xapiya bû; cankêşiyê wê gelek dom bikira.

Roj nîzingî li erdê dikir û dizeriya. Sûra êvarê bi pêline honik diket hûndir û baskên perdan li ba dikirin. Qey ew jî wek giyanê deya Honorê dikirin bîfirin.

Deya Honorê bi çavine bel, bê tevdan û bi laçeydî li hêviya mirinê bû, mirina ko bi derengî keti bû. Nefesa wê a nizim, di qirîka



wê a şidandî de carina difikiya û dixirî. Ma ew ne xiraxira mirinê bû. Ev nefes niho wê bisekîniya û ji dinyayê jînikê wê kê m biwa û tukes li ber wê de ne keta.

Bi tariyê ve Honorê vegeyriya mal û li deya xwe fedkirî. Gelek caran bi vî awayî nexweş diket. Destûra Rapê da û jê re got: Sibe li saet pênçan.

Rapê: Sibe, li saet pênçan

! i rasti, bi spêdê ve Rapê hati bû. Honorê şorba ko bi xwe çêkiri bû dixwar.

Nexweşnêrê jê pirsî: Çawan deya te temam bû?

Honorê bi qerf got ê: No, ji bervajî ve çêtir e.

Honorê çû. Rapê bi awirine kûr li cankêşê nihêrt. Halê nexweşê çet ne guhêrî bû. Deya Honorê weke berê, bi çavîne bel, destên wî li ser lihêfê, bédeng radiket.

Nexweşnêrê êdî zanî ko vî îşî wê gelek dom hikira. Sê rojan, çar rojan... heye ko heftêkê jî. Rapê bi vî fikirê dilê xwe teng dikir û nîfir li Honorê dikirin ko ew xapandi bû. Û gava çav bi nexweşê dikir ewçend li wê jînika ko ne dimir, dihate xezebê ko ne dizanî çî jê bîke.

Rapê, ji bona ko erina wê deynê vegeyriya ser xebata xwe û rahişte singikên xwe. Lê çavên wê ji rûyê cankêşê ê qermîçî ne dibûn.

Nivro, Honorê hate mal, taşteya xwe xwar û vegeyriya ser cêza gênim. Honorê bi kêf bû.

Herçî Rapê ji erin û xezebê dikir ko biteqê. Her deqîqa ko diborî jê re wek wî pereyî bû ko jê didizîn. Gava li nexweşê dinihêrt qey dîn dibû û dixwest qirika wê pîra qerade, vî jînika enûd ba bide û wê nefesa ko wextê wê didizî bisekinîne.

Lê gava dida eqilê xwe, didît ko ev tişteki bi talûke bû: jê digeriya. Lê tiştine ecêb dihatin bîra wê. Dawiyê nîzîngî li cankêşê kir û jê re got: Te hêj şeytan ne dîtiye?

Nexweşê bi dengêkî nizim lê vegevand û got: No...

Lî ser vî yekê Rapê dest pê kir û ji pîrê re çirokine bitirs digotin û ew pê dibizdihand.

Jê re digot, beriya mirinê bi çend deqîşan şeytan li cankêşan xuya dibe. Şeytan di belgehekî xerfî de ye. Stîrihên wî hene, sivnikêke dirêj bi destî ve ye û gava xuyandîke dide ber qîran. Cankêş piştî ko şeytan diblîn nema xwe tev didin û hema dimirin. Bi tenê îsal min bi çavên xwe çend caran şeytan, gava wî li cankêşan xuya dikir, dîtiye. Navên miriyân hiltan û digot: Belê li cem Jozêfîn Lwazêl, Ûllî Rayê, Sofî Ponedgno, Seraffîn Grosprê....

Deya Honorê di nav cihan de diqeliqî, çavên xwe vedikirin û li dawîya odê dinihêrt; qey li ti-teki digeriya.

Rapê xwe jê vedizî û çû derve. Ji dolabê çarşevêk girt û xwe lê pêça; parzonêk bi rûyê xwe ve kir; dûstanek li serê xwe kir û lingên wê dane ber jor û rahişte destê sivnikêke dirêj. Ji dil ketî bû belgihê şeytên.

Rapê çend firax tev dan û ew dan erdê; şingîrî û reqîn ji wan çûn.

Nexweşnêrê ji deriyê nexweşê ve da û bi dengîne hişk û xerfî hilkişiya ser kursîkî û sivnîka xwe bi ser cankêşê de hejand.

Deya Honorê gava şeytan dît eqil jî serî çû, da xwe, kir ko rabe û jî ber bireve. Cankêş heta bi nivî li piştî xwe rabû, mil û sermilên wê xuya kirin. Nefesêke dudirêj ji singa pîrê çû û wek depeklî li ser piştî xwe ket. Her tiştî temam bû bû.

Rapê her tiştî vegevandin cihê wan; firax jî erdê rakirin û danin ser refikên melbexê û vegeyriya nik miriyê. Hêdîka nîzîngî lê kir, çavên wê yên ko kiri bûn ji kortikên xwe baz bidin, girtin; piyanek danî ser lihêfê û ava miqedes lê kir. Lî ser ejnûyên xwe rûniştî û dest bi xwendina dia miriyân kir.

Ëvarê gava Honorê vegeyriya mal û dît ko Rapê diayê dike da eqilê xwe, hesabê xwe çêkir. Di vî îşî de xesirî bû. Xesara wî pênç qemêrî bûn. Ji ber ko Rapê bi tenê du roj û tîvan xebitî bû ».

Dihok: 8 Gulan 1943 BIŞARÊ SEGMAŃ



ZEFERA EFRİQAYÉ

BI QELEMA NIVİSEVANEKİ ÜRIS


Rojnama rüsl « Stërka Sor » di heqê zefera Efrîqé a mezin de bendek nivîsandîye û bi kurtî tê de gotiye:

Beri çend rojan xortekî elemani di « Frank-fürter Zeytûng » de berndek nivîsandî bû. Wi zirtoleyî digot yekê Gulanê bi her awayî cejîneke elemani [1] ye. Belê ji bo bilbîlekî Gulan her Gulan e. Lê ji bo elemanan Biharên ko didin pey hev ne weke hev in. Nemaze Behara vê salê ji elemanan re ji Beharê bêtir Paîzek e, xezaneke Paizê ye.

Bi vegirtina Tûnis û Bizêrtê şerê Tûnisê diqede. Hitler Efrîqe ji dest da. Onbaşiyê tîrolî

[1] Yekê Gulanê ji mêj ve cejîna sosyalîstan e. Di vê rojê de, hergav di bajarên Ewropayê de nîmayîşin çêdibûn û emele û polîsan li hev dixist. Hitler piştî ko hikim xiste destên xwe yekê Gulanê li cejîneke nûlî e elemani. Ji milê din Gulana 1940î ji bo elemanan meheke zeferê bû.

JINÊN EMÉRİKANÎ DI KAR Û NEBATÊ DE



Klîşa me jinîne emêrîkanî şanî dîde yê n ko ji bona bîkevin xîzmeta eskerîyê hatîne û miraceetî hikûmetê dîkin.

xiyala zeferên Napolyon dikir. Lê onbaşî ne ket Moskoyê û eħramên Misîrê ji ne ditiş.

Sefera Efrîqayê sefereke girane ye. Mîlyonek singoyên mîlhwerê di vê seferê de şîkestîne. Belê bêtirê van singoyan yê n talyanan bûn; çekîne kêm. Herçî ji hebe çek çek e û miroveki bi çek zencîrkîrî şer bike jî, dîsa şerevaniyek tête hesêb.

Romel di rîchetê de çek û cebîrxaneyîne boş wînda kirîne. Hitler digot qey asêgehên Tûnisê êrîşa hevalbendan wê bisekinîne. Lê vê Gulanê gul ne dane Hitler. Di nav 36 saetan de hevalbend gihaştîne ber deriyên Ewropayê.

Tûnis hate standin. Talyanan ne bi tenê bajarek lê kîşwerek wînde kirîye.

Talyanan, di cankêşiyê de, dirêjî Fransê kir. Çi cezakî seza. Tûnis ji bo mîlhwerê bû mesîleke hêstîran; ji bo hvalbendan pêpêlûka zeferê.

Em silavan li zefera hevalbendên xwe dîkin. Me bi hev re mîcadele kir. Heke hevalbendan bi rêkirîna çek û

posatan arîkariya me kirîye; me ji bi du salên şer arîkariya wan kir. Em esker in. Qedîrê eskeran dîzanin.

Em silavan li ordîwa îngîlîzî a heştan dîkin. Em dîzanin, ya ko reya zeferê vekîriye ew e, ordîwa heştan e. Ordîwa emêrîkanî a ciwan jî bihîna barûtê bihîn kir.

Em bi kêfxweşîke mezin silavan li hevalbenda xwe a kevîn Fransê dîkin. Ji milê din me bi şahîke mezin seh kir ko eskerên genêral Leklêrk bi xwe ketîne Tûnisê. Ji bo Fransîzan Tûnis întîqama Parîsê ye.

Em dîzanin ko cidal wê sext û dijwar bibe. Dijmin ewê li ber xwe bide. Êdî destê wî de tiştek me maye ko wînda bike; ewê her tiştî bide ber çavê xwe ji bon ko kar bike. Em ji qîmet û hêjabûna hevalbendên xwe ewle ne.

Li Efrîqayê her tiştî saffî bûye. Niho dora Ewropayê ye.

ÎLYA ÊRENBOĞ

QEWETÊN

KELEHA EWROPAYÊ

Bi şikestina ordiwên mihwerê û bi zefera hevalbendan sefera Efrîqayê gihastîye dawiyê. Piştî ko ew sefer safî bû dinya alemê çavên xwe berdaye Ewropayê û li hêviya sefera Ewropayê, daketina hevalbendan beja Ewropayê ye. Mineqidekî çêk î eskerî, keptên Mikçet, di vê babê de bendek nivisandîye û tê de qala vê seferê û qewetên mihwerê yên Ewropayê kirîye û gotîye:

Beriya êrişa 1942an di bin emirê Hitler de 325 firçe hebûn. Ji van 325 firçan 195 firçe li eniya rohelê qerar girtî hûn. Bi wan re 38 firçeyên dewletên mihwerê ên din jî hebûn.

Firçeyên mayîn bi awayê jêrin lêk vedibûn: 6 firçeyên elemanî û 34ên talyanî di Balqanan de; 6 firçeyên xirwati, 3ên mecerî û 20ên birkari bi wan re disekinîn. Tev de 69 firçe. Qewetên Balqanê di bin fermandariya von List de ne. Ji van pê ve li Yewnanistanê 6 firçeyên din hene û ew di bin fermandariya general Hart de ne. Bi qewetên Balqanê re 375 balafirên giran hene.

Li gora texmînê li Fransê di bin fermandariya Rûndestût, de 36 firçeyên elemanî û şeş firçeyên talyanî hene. Li Îtalyayê di bin emirê Amriyoso de 40 firçeyên talyanî û 700 balafirên keyserling. Li Norvêjê di destê Falkenhorst de 10 firçeyên elemanî û 300 balafir.

Piştî hezîmeta Stalingradê eniya rûsî jî drêjahîya xwe kêm kirîye. Beriya êrişa 1942an Hitler di eniya ûris de 40 firçeyên ihtiyat hebûn. Wan eskeran di dora Kiyêv û Vaşovayê de qerar digirt. Hitler ev esker bê wext xistin xeta şer û pê şerê Stalingradê winda kir, bê gav ma û bi şûn de vegeiriya. Îro Hitler dixwaze bi 120 firçan û bi sibê din ên ihtiyat di eniya ûris de bisekine. Gelo ewê bikare?

Heke Hitler karî bi 150 firçan di eniya ûris de bisekine, bi qur'eyên nû û heta Hizêranê heye ko 80 firçeyên din ên ihtiyat saz bike. Lê bivê nevwê ew qewetên ha tucaran ne di qîmeta firçeyên mehiwbûyî de ne. Welê

dixuye ko erkanherbiya elemanî nêma imldê dîke ko bikare ordiwa ûris bi erîşeke Biharê jî hev de bêxe. Ji lewre planên wê hêj bêtir planîne midafehê ne.

Di keleha Eropayê de du dergelêhên vekirî hene: Spayne û Tirkiye. Ordîwên wan her du dewletan heta nîlo sirine vî şerî ne. Gelo ev her du ordû wê tiştêkî bikin? Heke kirin ewê çî bikin?..

Nema lête birê ko elemanî dirêjî van her du welatan bikin. Ji bona vê yekê wext boriye. Herwekî me got plana erkanherbiya elemanî tedeşîhî: midafeha keleha Ewropayê ye. Ji bo midafeha kelehê û di mehcetê de Hitler bi qewetên berdest, wê bikare 32 firçeyên ko di Fransê de bigeliîne 1001 û çîlên ko di Îtalyayê de ne wan jî bike sed.

Ji lewre dema ko hevalbend dirêjî Ewropayê bikin jî wan re qet nebit 120 firçe divêtin: 75 jî bo xeta pêşîn, 25 ihtiyat û 20 jî jî bo lehiwandina dijmin di qadine din de.

Îro qewetên mihwerê di Ewropayê de bi awayê jêrin heşidandî ne: Li Fransê 37 firçe. Li Belçîqe, Holende, Elmanyê 31 firçe. Di welatên Baltîqê de 7 firçe. Li Norvêjê 10 firçe. Li eniya ûris 232 firçe. Di Balqanan de 69 firçe. 40 firçeyên ko di Îtalyayê de ne divêt ew jî bi qewitine din hati bin zêde kirin.

Ev in qewetên ko roja ko hevalbend pê li beja Ewropayê bikin, divêt bera wan bidin.

HESENÊ MISTÊ

Vient de paraître
HISTORIQUE SOMMAIRE
DU
CHAR DE COMBAT
LE MAITRE DU CHAMP DE BATAILLE
par le
Commandant L. FOUQUET
des F. F. L.
Ouvrage édité et diffusé par les soins du
service de propagande des forces françaises
combattantes en moyen orient.
DANS TOUTES LES LIBRAIRIES

HEJMARA HAWARÊ A 54an LI 15ê GULANÊ BELAV BÛYE. LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

Tefsîra Quranê. Diwana Melê. Pêş kevin. Cejinepîrozî. Ji wan re. Sersala min. Mela Ehmed. Gramêra kurdancî. Memozîna Xanî. Pêloşî û sistî. Mela Evdîlmeçîd. Chansons.

Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc lîreyên sûrî — Ji bo welatên din lîrekt ingilîzî

Xwedî û gerîneşîyê berpirsiyar : Mir Celadet Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriya
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syria

SAL 2
HEJMAR 16
PÊNCŞEM
1 TÎRMEH 1943

RONAHÎ

ANNÉE 2
NUMÉRO 16
JEUDI
1 JUILLET 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

DERYAVANIYA BRITANIYAN



Xelkê girav û peravan bi pirani mela xwe didin deryavaniyê. Derya, wan ber bi xwe, ber bi bejine din, bejine ji bejên wan dewlemendir ve dikişîne. Britanya xêra deryevaniya xwe di her derên dinyayê de xudan - mistemlike ye. Di Ingilîstanê de deryevanî wek terîqetekê ye. Zaro ji piçûkahiye ve di dibistanine xweser de bi xwedî dibin. Herwekî klîşa me şani dide hêj deh dwanzdeh salî dîkevin behirê. Wek zarokên kurdmancan yên ko di vî emîrt de tîfingê hildigirin.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Curên Çalê	Çirokbêj
Şerîeta gur û bizinê	Çirokbêj
Lawikê Batmanê	Siranvan
Halan	H. Hişyar
Yên ko dizanin	H. Hişyar
Qanûn û Adet	Qaditê Ferman
Gulçin	Qedri-Can
Pirsa min ji Xwedê	-Mela Enwer
Birinc sefera Elriqayê	Silêmanê Ferho
Beraz û Berazî	Osman Sebri
Napolyon	Osman Sebri
Cejna kurdan	H. Hişyar
Bi qeslê ra	Xelilê Genco
Timsalê heftilî	Cemşid
Hindik rindik	Xeberguhêz
Sêhîrbaz	Smalê Serhedî
Hinek ji Henek	Yariker
Leklêrk	Ronalî
Girtiyê keleha Ewropayê	Ronalî

STRANA KURDMANCI:

LAWIKÊ BATMANÊ

Delil yadê, delil yadê, delil yadê....
Paşak rabû bi girani, eskerê xwe ji qocê Diyarbekra
[xopan bi der anî,

Li Batmana şewitî qur'e danî
Eliyê Mihemed firar bû, çitika reş deranî.

Batmana şewitî wa' bi sûr e
Eskerê Smail paşa girte bolik û tabûr e.
Mincan xatûn ban dikir Smail paşa ez ketim hextê te
[û Xwedê ye;
Te destê Eliyê Mihemed, lawikê Batmanê, çawa ji
[ber hilma me hilanî?...

Dilê min hêr e, sed 'car bi min hêr e,
Batmana xopan wa bi gêr e.
Mincan xatûn ban dikir, Smail paşa ez ketim hextê te
[û Xwedê ye
Te destê Eliyê Mihemed, lawikê Batmanê tê bi mista
[me de;

Heger tu dixwazî ezê bidim te elbek zêr e
Dellî balê lawikê Batmanê
Batmana şewitî wa bi rê ye.

Mincan xatûn ban dikir, Smail paşa ez ketim hextê
[te û Xwedê de
Tê destê Eliyê Mihemed lawikê Batmanê bi mista
[me de
Heger tu dixwazî ezê bidim te du elb zêr e.

Smail paşa banîdikir li Mincayê, lê xatûnê, lê hîrmetê!
Bejna te sêwl, sêwleke stûna qudretê
Xelk ê bibêjin Smail paşa derketiye, sermûşirê dewletê
Wê bibêjin Smail paşa ji Mincan xatûn dixwe wî
[bertilî wê rişwetê
Batmana şewitî bişewite wa bi mîrg û kanî.

Kula Helebê di mala Smail paşa, mûşirê dewletê danî
Te çawa destê Eliyê Mihemed lawikê Batmanê ji ber
[hilma me hilanî?..

Çûn cem qazî. Lê bizinê hebanek ji
şîrê xwe dagirt û bi xwe re bir. Gava
gilhauc cem qazî; bizinê hebanê şîr da qêzî.

Qêzî ji wan pîrî go, hon ji bo çî
hatine. Bizinê go, gur her du karên min
xwarin. Ez jê dipîrsim dide înkare.

Qêzî go, ezê şerîeta we bibirim.
Divê ko hon bi ya min bikin. Qazî rabû
dinanên gur hilkirin û go de rabine hev;
bê kê kanî bû kê heq di destê wî de ye.

Çawa ko gur û bizinê berdane mey-
danê; gur rahiştê bizinê, lê qet fêde ne
kir. Ji ber ko dinan ne bûn. Hema bi-
zinê stirihên xwe dane bin zikê gur;
ûrê wî berda erdê; her du kar ji zikê
wî deranîn.

ÇIROKA KURDMANCI:

GURÊN ÇALÊ

Carekê golîkek şevder ma. Du gur
lê rast hatin. Golîk ji tîrsa rihê xwe
baz da. Çalek li riya wî hat. Golîk kete
çalê. Her du gur li ser devê çalê seki-
nîn û li golîk meyizandin. Gur gelek
birçî bûn; xwe berdane ser golîk. Golîk
xwarin. Piştî ko tîr bûn û zikê xwe dagir-
tin, xwestin ko derkevin; lê nikarî bûn.

Bû sibê, xwe hildan û xwe danîn,
kirin û ne kirin, nikarî bûn derkevin.
Her diwan keffe da û bêhal bûn ji te'ba.

Yekî jê go, bira çiqasî germ e. Ê
din go, bira niha ne germ e; lê çaxê ko
xwediyê golîk bê ser me, wî çaxî germ e.

ŞERÎETA GUR Û BIZINÊ

Carekê bizinêk li şûna warekî ko-
çera ma. Bizinê za; du kar anin. Piştî
çend rojan gurek hat; her du kar xwarin.
Bizin ji çêreya xwe hat dit, gava her du
kar çûnê. Fêrn kir ko gur ew xwarine.

Bizin rabû telbeyî qula gur kir û çû
jê re got, te çima karên min xwarine?
Gur go, min karên te ne xwarine. Bizi-
nê go, bi min re were, em herin cem
qazî, ji min re swind bixwe. Gur go, baş e.

HALAN

Miñewerino ka ew welat *Ma tē dītin ew bē zebat*
Keç ū wort ū jin ū kalan *Hinarline hezar halan*
Binêrin hon li wan erdan *Dinalin ew ji ber derdan*
Pepkê ū jar ū dīl mane *Ne xwarin ū ne nan ū zad*
Li nav wan nîwe mistê ard *Mirin bo wan bûye dawel*
Jin bo me bûye qebhet *Li jêr ū jor ū çar alî*
Hemî kurd in di wî halî *Li hêuya me çavnêr in*
Şev ū rojan l'me guhdêr in *Me pal daye li bajaran*
Me dijmerin bi piştmeran *Bi armanca gur ū şêran*
Bi halan ū bi navdanê *Kesek nayête meydanê*
Belê hişyar tu pir dîu î *Dilê xoran diêşinî.*

HESEN HIŞYAR

Delîl halê lawikê Batmanê.

Batmana şewetî bişewite wa bi rê ye,
 Eskerê Small paşa hêdî hêdî pède tē ye
 Birâ Xwedê kulekê bēxe mala Small paşa mûşîrê
 [dewletê ye

Ezê rabûm, ji xewa nivê şevê ye.
 Mi dî nigê Eliyê Mihemed lawikê Batmanê qeyd
 [kirî li mirata qantirê ye
 Berê wî dan qoce Diyarbekrê ye.

Dilê min ebdalê Xwedê dilekî dē ye
 Mîncan xatûn berê xwe daye Birca-belek, dakiriye
 [guliye sorsosinê da ber meqesê firengî ye.
 Bedlek çekeke zabita li xwe kirîye
 Olaqek ji xwê re ji tewlê vekiriye
 Didaye pey Eliyê Mihemed, da ser rîya Diyarbekrê,
 [li zindanê ye.
 Dilê min ebdalê Xwedê, dil dibê ye

Mîncan xatûn xerîb ketî bû qonaxa Xwedê li xanê ye,
 Ū sibe ye ro biltê ye
 Mîncan xatûn inesiya sera dewletê ye
 Mîncan xatûn ban dikir, geli efendiya, binbaşiya,
 [ez ketim bextê we ū Xwedê ye.
 Xortekî di temtêla min de bû, li nav eskerê Small
 [paşa bû,
 Ez nizam rakirin berê wî dan kî derê ye?

Efendiya binbaşiya ban kir, xortê delal dilê min ebdalê
 [lē Xwedê dil dibê ye.
 Ew xortê tu dibê di temtêla te de bû; li nav eskerê
 [Small paşa bû
 Dû esirê rakirin berê wî dan iskela ber bi behrê ye.

Mîncan xatûnê pol, poşman berê xwe da xanê ye;
 Olaqê xwe vekir, da pey Eliyê Mihemed, Small paşa,
 [ket rîya iskela ber bi behrê ye
 Qonaxek hilanî, yek danî li çolê ye
 Belê şevkê di nivê şevê ye
 Mîncan xatûn xerîb ketî bû, qonaxa Xwedê ye
 Ū sibe ye ro biltê ye
 Mîncan xatûn meşiya sera dewletê ye
 Delîl halê lawikê Batmanê min bi tenê ye.

Delîl halê lawikê Batmanê, ban kir go geli efendiya
 [binbaşiya ez ketim bextê we ū Xwedê ye
 Xortekî di temtêla min de bû, li nav eskerê Small
 [paşa bû

YÊN KO DIZANIN

Û YÊN KO NIZANIN MA WEKE HEV DIBIN

Di heyamê medan de, bi navê Mihirdad xwendekarê hebû. Pir î hinermend bû; leqeba (şaheşa) havil kiri bû.

Di wî heyamî de pevçûna wan bi roman çêdibû. Weki hercar disa rîjandîna xwîn ber pê ū gumnan dibû. Li ser we yekê ji xwendekar re hin tevdîr diva bûn. Li gora ko ji her zemanekî re awayek heye hîa tecrîbe li ser heş ū pîsporiyê diviya bû. Ji bona ko ji neyar kêmtevdir nebîn.

Xwendekar xwest wezîrîn xwe zigafel bike. Rabû ji destgîrê xwe re got, here ba necar (40) kevçiyên darîn bide çêkirin, doxa her yekî gaz ū nivêkê. Çil kûrsî li dora masê deyne ū her çil kevçî li hember kursiyên ū xwarin ji li ortê. Her çil wezîrîn min ji vexwîne yelo ewê çawan bixwin.

Berdeq wek xwendekar got-ê kir. Her çil wezîr halin, rûniştin. Gava li kevçiyên varqiln ko bi gaz ū nivêkê dirêj in, nizanî bûn çî bikin. Bi serê dozê bigirin kevçî nayihê devê wan. Di ber de bigirin dox di çavê hevulê hember dē bikeve.

Wezîr ji neçarî dan xwe ū rabûn. Ji wan pirsin: Ma çîre we ne xwar.

Ji fedigan gotin: Wextê minjê hatiye ū em tēr in. Şermisar ū serlîber derketin ū çûn. Zad ma nexwarî. Xwendekar got: Herîa dibistanê ū ji min re mamhoste î çil şagirtan bixwînin. Çûn dibistanê ū gotin mamostê. Mamostê got: Li ser çavun, emê piştî çil deqîqeyî bîn.

Mamoste çil şagirt bijarîtin ū ew di heşşa dibistanê de rêz kirin ū gote wan: Xwendekar em xwestîne ū em nizanin çî ye. Li vir ji şîret nabe. Divê hon çavnêrê min bîn; min çawan kir hon ji welê bikin.

Şagirt ū mamoste çûn cihê xwarinê; bîst li wî reat, bîst li wî vaxî rûniştin. Masc di nav wan de ye. Mamhostê rabîştê aloxa kevçî ū da birinê ū dirêjî devê yê hemberê xwe kir. Wî ji dirêjî devê mamhostê kir. Her kesê ko humber hev bûn, dan devên hev, heya ko xwarin xelas kirin.

Xwendekar her çil wezîr ū her çil şagirt anîn hember hev ū gote wan:

— Geli wezîran! We şerdeki welatî dilîye ū xwendîye. Lê hon bi sistî mezin bin. Madan hon ji heqê xwarinê dernakevin, honê çawan sibe şerê mirnê dayax ū rêderiyê bikin. De zû piyegên xwe bidin wan xortên nah ū herin quncikên mîzgeftan.

Piştî ko şagirtên heşa hatin wezîrî bû şer ū medan ronî şikandin. **HESEN HIŞYAR**

Ji ecêbê dinyayê re nizam rakirin berê wî dan kî [derê ye.

Efendiya, binbaşiya ban kir xortê delal, xortê ko di [temtêla te de bû, li nav eskerê Small paşa bû
 Dû esir rakirin berê wî dan Stenbolê ye
 Mîncan xatûnê pol poşman berê xwe da mirata xanê ye
 Olaqê xwe vekir ji mirata xanê, da pey Eliyê Mihemed,
 [Small paşa, dikete rîya Stenbolê ye.

Qonaxek hilanî yek danî li çolê ye
 Şevkê nivê şevê ye
 Mîncan xatûn xerîb ketî bû, qonaxa Xwedê li mirata [xanê ye.

QANÛN

Û ADETINE ZIWACÊ

Di welatê Eskîmoyê de heke mêr li jina xwe xist, jinik dikare telaqê bixwaze. Heke jinikê deng ne kir diya jinikê dikare keça xwe ji mêrikê bide berdan.

Herçî çîni heke mêrik li jina xwe xist li gora adetê mirovên jinikê li pêş mirovên mêrikê ve heştê çowî li wî didin.

Hindiyên sor yêr Emêrikê herçî zarokê ko ji diya xwe li çûna ko bi serî ve bê, bi lingan ve hat dikujin. Ji wan ve ew zarok çift e.

Li gora qanûnên Estonyayê hepsî di hepsîxanê de dikarin bizewicin.

Xelkê Romanyayê gelek caran li hêviya roja dawetê namînî û beriya wê bi heftekê zava bûkê direvîne.

Di welatê Eskîmoyê de xelk dikarin jinên xwe pev biguhêrin. Mesela, yekî xudan zaro gava dike here sefrekê, jina xwe digel zarowan dide yekî bê zaro û jina mêrikê bê zaro bi xwe re dibe seferê û heta vegeerê pê emel dike. Ê din jî welê. Bivê nevé cih li é rêwîngî teng û li é din fireh dibe.

Li gora adetên reşikên Efrîqa navîn heke jinik nizane girarê çêke, mêrik dikare wê berde.

Li Ingilîterê mehkeme bi tenê di halê zîna-yê de kare bi telaqê hikim bike. Ji lewre carina mêr û jinên ko dixwazin ji hev bêne berdan sûcê zîna-yê bi derwan bi aliyê xwe ve didin.

Ji ber vê yekê di Ingilîterê de heçî jin û mêrên telaqxwarî tev de zînakirî têne hesêb û ji lewre jî kîjan malbatê bin jî nikarin li qesira qralê bêne ezimandin.

Li cem cihîyan, heke jinik pêş mêrê xwe ve dijûn kire xwezûrê xwe mêrikê dikare telaqê bixwaze.

Di hin welatên Emêrikê nivro de heke jinik sê caran ji bêrika mêrê xwe pere dizin mehkeme bi telaqê hikim dike û jinik nema dikare bizewice.

Li gora statîstîkan li welatê Mîrsîrê jinên bî ji mêrên bî bêtir in. Jê dixuye ko jinên misrî jî mêrên xwe bêtir dijîn.

Di Îsvêçê de heke jinikê telaq xwest û xwe jî mêrê xwe da berdan jî jinikê re divê heta ko mêrik jî nû ve bizewice jê re nefeqê bide.

Mîrsîrîyên kevin zaroyê xwe ê pêşin dikuştin. Ji wan ve welê bû ko bi kuştina wî zêdahîya malbatê boş dibû.

Di sî misrîyên kevin zaroyên ko piştî ziwaca keça jinikê dihate dinyayê ne dihîştin ko bijî.

Welê dixuye ko navên Zeyneb û Fatîmayê di Mîrsîrê de gelek bî rewac in. Li gora statîstîkê li serê heft jinan navên didowan Zeyneb û Fatîmayê.

Di welatê Tibetê de du bira jî xwe re jinekê ditînin. Herçî zaro li serê mezin têne hesibandin.

QADIRÊ FERMAN



DI DIBISTANEKE RÛSÎ DE ŞAGIRTÊN PIÇÛK

GULÇIN

Gulçin.. keça Newres begî bû.. nûxuriya dè û havê xwe bû.. Ji wê pêvê keç û kurên Newres begî tune bûn. Ji lewra pir bi detali û nazeninî mezin bû bû. Ji aliyê xweşikbûnê jî yekta bû. Bejinzirav.. porzeri.. çavkesk bû.. Salên wê nuh keti bûn hijjeyan. Xweşikbûna wê di nav êlê de bû bû dengîn. Gelek xort peresteskarê wê dibûn. Lê kesî ne wêri bû ew ji havê wê bixwesta.

Newres beg, ji giregirên bajarê Nolê û serekê êlê bû; merivekî pir xedar û xwînxwar bû. Her kes jî wî dilrês bû bû.. li her cihî paşgotîniya wî dihate kirin, ji bin ve jî wî re çal dikolan..

Dijminê wî ê bêeman Seydo axa.. jî serekên êlê bû, û hîmê êlê bi xwe bû. Yê ko gelek caran xewa Newres begî jî çavên wî difîrand, Seydo axa bû.

Newres beg jî, edin rind fam dikir ko text û bextê wî tê hejandin. Heke ev hal hinekî diin jî pêş ve biçe ne êl dimîne ne mîl. Diviya bû dermanckî jî wî derdî re bibîne. Bi şev û bi roj, dûr û dirêj difikirî.. paşiya paşîn çareyek qenc dit.. di dilê xwe de got: heke min Seydo axa jî xwe re kir zava; tîrsa min jî tişteki namîne.

Newres beg keça xwe.. Gulçîna nazeninî jî Seydo axa re pêşkêş kir. Seydo axa jî bi dil û can ew xwest. Leg û axa li hevdu hatin.. nişan bi Gulçînê ve kirin.. xeraniya wê vexwarin.. piştî sê mehlan jî ewê daweta wê biba...

Newres beg, jî zû da ye jî xewa şevan bê par ma bû.. piştî wê lihevhatinê, çara ewilî serê xwe danî ser balîfê, bê tîrs û perwa raket..

Lê Gulçin.. Gulçîna reben, çî bi serî dihat? Dinya li ber çavê wê tari bû bû.. di her tiştê de reşbûnek didit. Roj, hev.. her tiştê sipî û ronî jî wê re roş; xuya dikir.. Ewê çawan jî Seydo axa re biba jin? Seydo axa, jî pencehî salî ne mezintir ba, ne biqûktir bû. Rûyê wî bi xurî.. çavêki wî sipik li ser bû.. digel ve pîrbûn û kirêtbûnê sê jinên wî jî hebûn. Du sê kêçên wî berî Gulçînê bû bûn bûk..

Yê ko insanê natewan dijîne hevî ye. Hevî nebe, insan nikare jî ber kul û derdê dinê debar bike. Xwîniyê ko dibin ber sehpê, bi dar ve bikin û ben dikine qirika wî dîsan hevîyeke felatê heye.. cavê xwe digêrin da ko padişah jî bona efa wî fermanê bişîne..

Gulçin jî bê hevî ne ma bû. Dixwest jî xwe re çarekê bihîne û jî ve ênînvîsa reş, jî ve serencama dilşewat bihîlîte.

Li ber çavê Gulçînê hevîyek hebû: Pira Bêzê.. Pira Bêzê, pîrejineke sehîrhaz bû.. bi sehîrên xwe nişana gelek zavan şikandî bû.. dilê hezar xort û keçan xisti bû hev.. gelek jin û mîr jî hev da bû berdan.

Gulçin, rojekê xwe gihand pîrê, bi dawa wê girt û hejand, destê wê maçî kir û derdê xwe jê re got: Pîrê, ez di bextê te de me, min jî wî agirê dojhê xê'as bike. Tu çiqas pere bixwazî diya min ewê bide te. Diya min jî ve zewacê naxwaze.

Pîrê, qederekê dama, paşê jî wê re got: Keça min divê ez te bigihînim ba Şêx, şêx Şêşet, kane te jî ve gerdabê bîderxe.

Di nav xwe de rojek bijartin, ewê bi hev re biçûna nik şêx.

Berî ko herin cem şêx, pîrê çend şîret li Gulçînê kirin: Şêx, jî malbata pêxember e, divê herî ziyareta wî tu bi destnîj bî, paşê keça min, ew bi rûhê îns û cinan dizane, di her golîneke wî de bereket, di her pîrseke wî de qudsiyetê heye. Heke wî jî tişteki sipî re got rê e, bizane ko di vê gotinê de hikmetek heye. Divê dilê te jî aliyê wî de paqij be, da ko ew jî daxwaza te bizane û bîne cilt ».

Gulçin gotinê pîrê yek bi yek kire serê xwe.

Gava ketin hundirê xewletxana şêx, şêx got: Pira-Bêzî malava, ev bûn çend hefte, tu xuya nakî, tu li kû yî? çî bi te hatiye. Bi dilê min xweha te hati bû mîvaniya te, ne?

Pîrê, berî li şêx vegeftine çarekê li Gulçînê nêrî û serê xwe jê re hejand û paşê li vegevand û got: Ez gori, rast e, xweha Seyrê hati bû mîvaniya min, jî lewra ez ziyareta te kêman.

Şêx got: Nem nake, ma ev ne keça Newres begî ye?

Gulçin got: Belê ezbenî... û bi fedî destê şêx..

Şêx got: keça min, divê tu jî bona Xwedaê xwe, Xwedaê erd û ezmanan jî destmê bigrî û nîmêj biki, ne bi tenê jî bona hatina wê.

Pîrê, careke din li Gulçînê nêrî û bûna şîretên xwe dianî bîra wê, keçik jî heyran, heyran di hizûra şêx de diricifî.

Şêx got: Keça min, ne hewce ye ko tu serhatiya xwe jî min re derpêş biki.. ez, bi êş û birîna te dizanim, kesî jî min re ne gotîye û ez dizanim. Keça min, xem nake, bihna xwe fîre bike, ez havê te me, ezê te jî wî seyê çopir xelas bikim.

Şêx bi salên xwe ne di wê çaxê de bû ko

ji keçikeke mezin re bigota « keça min, ez bavê te me » salên wi sf an si û peñç bûn, yê ko ew dikir dewsa bavîtiyê şexîtiya wi bû, ji lewra ev pîrsên ha ji Gulçînê re giran ne dihatin. Mañir, di dilê wê da bawerî çêdibû.

Diviya bû pîr derkeve der. Pîrê şêx û keçik di xewletxanê de bi tenê hiştin û ew derket ber derî, da ko kes bê destûr nekeve xewletxanê, kes nebihîze ko Gulçîn bi wê re hatiye nik şêx.

Şêx, çend caran destê xwe di ser serê Gulçînê re bir û anî, paşê destê xwe danî ser êniya wê, hêdî, hêdî berjêr daxist, ser çavê wê, ser rûyê wê, bi çengên wê giri û hejand. Keçik ji mîna pûteki kevîrî sekîni bû, deng ne dikir. Dilê şêx gelek bi wê dişewiti, mîna bavê wê êniya wê maçî dikir, çavê wê radimisand, lêvên wê dimijand.

Gulçînê, ji ber dilovanî û mihribaniya şêx fedî dikir, nikarî bû çawan ji wî re sipas bike, deng ne dikir. Bê guman şêx ji wê re çare didî, ewê ji wê dojhê xelas bikira. Ji xwe ev tiştêkî hêsanî bû. Şêx kanî bû rûhê Seydo axa bikişîne nik xwe û jê re ferman bike, da ko ji rîya Gulçînê bi derkeve, keçikê li ber çavê wî reş bike.

Şêx, perçak kils kire destê xwe û li erdê êzek girover kişand, ew û Gulçîn ketin nav

û ji Gulçînê re got: Zînar, tu ji nav xêzê dernekevi, ezê rûhê wî sehî bikişînim vir û li vir bitevizînim.

Gulçîn ji wisan dikir, paşê şêx hinek bixûr avête nav agirê kuçik û çû paşê perdê, qedereki ma. Gava dûmana bixûrê hundirê xewletxanê tiji û tarî dikir, şêx jî, bi lez û bez toza fosforê di canê xwe dida. Êdî, hundir ji dûmana bixûrê rind tarî bû bû, tariyeke şîn. Gulçîn ji nav xêzê tev ne digeriya. Hingî şêx, bi dengêkî ecêb got: ya hûl û ji paşê perdê pekiya, ji rû û laşê wî nûr dibariya. Gulçîn ji ber vî kerametê şêx veciniqî û tirsîya, lê ji bona ko ji Seydo axa, ji wî agirê dojhê xelas bibe her tirs, her westandin her fedakariyê da bû ber çavê xwe.

Şêx hat, ket nava xêzê, xêz pîr teng bû, ji bona ko Gulçîn ji nav bi dernekeve, her du laş keti bûn qalibekî.

Şêx, destê xwe dirêji rûhê Seydo axa dikir û dikişand. Destê wî ê nûranî mîna birûska di nav şeva tarî de biçirise, ronî dida. Bi destê din jî Gulçîn di himbêza xwe de diguvaşt, da ko ji nav xêzê bi der nekeve û tilsim xerab nabe. Şêx, bi rûhê Seydo axa re dipeyivî û jê re emr û ferman dikir.



GUNDEKE TÛNISA KO JI QEWETÊN MIHWERÊ HATE PAQIJ KIRIN Û FRANSIZAN JI NÛ VE DEST DANÎ SER

Rûhê Seydo axa ji tu eksîfî ne dikir. Her tiştî di rê de bû. Ev mizgîna ko şêx dida Gulçînê, û ji kêfan keçîk di nav himêza xwe de diguvaşt, çav û rûyê wê maçî dikir, lêvên wê dimêt.

Gulçînê deng ne dikir. Paşê şêx got: Hadê keça min, hevalkîras, daxe.

Gulçîn di wê gavê de şîretên pîra Bêzê ji bir kir; mîna ji xewneke bi tîrs vecinîçe, bi xwe hesiya, li xwe mêze kir, li şêx nêrf. Şêx ji wê çî dixwest?! Gulçîn, ji bona ji wî agirê dojhê xelas bibe her fedakarî da bû ber çavê xwe, lê ne fedakîrîna namûsa xwe. Di nav du sê saniyan de ev rastiya tîrş û tal fam kir, devê xwe tijî xwezî kir û tû kir ser çevên şêx. Bê hemdê xwe, kire qîrîn, Pîra Bêzê li ber derî bihîst û ket hundir.

Şêx got: Pîra kemot, ev çî dînik e te ji min re aniyê?

Pîrê xwe avête ber lingên şêx û got: Ez-henî, tobe, tobe, estexfîrilah; paşê li Gulçînê vegebiya û got: Keça min te çî kir, zû tobe bike, ma min berê çî şîret li te kirin? Şêx dibêje ko derpiyê ko bi dîwêr ve darvekirî ye daxe jêr, da ko rûhê wî sehê çopîr tê de bitevîzîna û hepis bike.

Gava Gulçînê li dîwêr mêze kir, dît ko bi rastî derpiyek bidarvekirî ye. Hingî gunehê xwe fam kir xwe avête bin lingên şêx, tobe û û istîfîr kir. Lê şêx qet razî ne dibû. He-tanî Pîra Bêzê bi hezar hevî û lavayî ev guneh bi şêx da efû kirin.

Rûyê rasthatîyan reş bin. Gelek caran, gelek rasthatînf ji merivên sehîrbaz re arîkarî dikin..

Seydo axa, ji nişkave, ji mala Newres begî qut bû. Piştî ko nîşan bi Gulçînê da kiri bû, her roj dihat ziyareta xwezûrê xwe, Newres Begî. Lê gava ko êlê dît ko Seydo axa bi Newres begî hatiye xepandin, ji wî re jî bûne dij-min; şevêkê sê çar xortên fedakar xwe avêtin mala Seydo axa, ew dane tîrsandin, ji wî re gotin: ya Newres beg, ya el.

Seydo axa nikarî bû zû bi zû xwe ji êlê bike; çend rojan ji mala xwe bi der ne ket. Heke ji kuştîna xwe ne tîrsiya dibû ko dev ji êlê berda û Gulçîn mar bikira.

Qederek derbas bû; Seydo axa bi ser beg ve ne diçû.

Hêviya Gulçînê hati bû cih. Şêx ji wê re havileke mezin kiri bû, ew ji agirê dojhê

PIYADEYÊN RÛSÎ DI ENIYA ROHELÊ DE



Piyadeyên rûsî piştî ko tangên wan xetên elemanan şkênandine, rabûne, hiçmê û qesta çeperên dijmin dikin. Dîdevanekî wan hilkişiyaye serê darekê, bi dîrebîne xetên neçar keşîf dike.

xelas kiri bû. Lê diviya bû rûhê Seydo axa tim bê kişandin û tevizandin, da ko careke din li Gulçînê venegere. Ji bona vê yekê diviya bû Gulçîn ji li nik şêx hazir bibe; her ji çend rojan carekê. Her cara ko firset bidîta, teva Pirê diçû nik şêx, rûhê Seydo axa dikîşandin. Gulçîn, lavahiyeke din ji ji şêxî dikir. Dixwest rûhê wê û nivîsekarê bavê wê Serwer bigihîne hev.

Serwer xortekî pir çeleng û pir bedew bû, di dibistanên bilind de xwendî bû, wî û Gulçînê gelek ji li nik şêx dikirin. Lê ne ji zadeganan bû, ne hemberê Newres begî bû ko ji wî re bibe zava.

Şêx ev lavetiya Gulçînê ji qebûl kir, tim rûhê wan digihand hev.

Êdin bi her hawayî Gulçînê baweriya xwe bi şêx û kerametê wî dianî û xwe disparte wî, bi wî re rûdinişt, bi hev re dixelwetxanê de ava zemzem vedixwarin.

Şêx, rûhê dijminê wê ditevizand, rûhê wê ji dişand ba evînê wê Serwer. Gava laşê wê bê rûh dima dikire hêmêza xwe, di nav nûra xwe de vedigevizand. Gulçîn, bi dil û canê xwe ve bû bû mirîdek ji mirîdên şêx. Ji heftê du sê caran, her carê sê çar saelan li xewletxna şêx dima, bi şêx re kewser û zemzem vedixwar, bi wî re bi cezbê diket, rûhê wê ji laşê wê derdiket, bi rûhê şêx re bi per û basik dibûn, li ser bihuşt û ezmanan perwaz, perwaz difiryan.

Şêx heft meh derbas bû bûn. Di zikê Gulçînê de tiştêk diliviya, lê wê nizanî bû çî yel..

Ne dihate bîra wê ko gava Zemzem û kewser vedixwar, sermest û serxweş diket. hingî şêx, ji nûra xwe ji hinek jê re dida nûşin.

Şêx ji bi vî tiştî hesiya bû, êdin qenc dizanî bû piştî du, sê mehan ewê rûreştî xuya bike. Vêcar diviya bû nexweşa xwe derman bike, bi wî dermanê ko gelek nexweşên mîna Gulçînê da bû dermanê kirimîst, tozek ji teberîka kalikê wî... Hinek ji wê tozê dikir nav piyanek av, ew bi nexweşên xwe dida vexwarin.

Piştî ko Gulçîn ev derman vexwar, roj bi roj, mîna Reybanekê diçimîst, weke mûmekê diheliya, di nav du sê heftan de bi carekê ji taqet kel, ket nav nivînan û rojekê mîna çirakê ji nişkave vemirî.

Belê, Gulçîn mir lê hêj di hundirê wê de şêxekî biçûk, şêxekî bê guneş diliviya.

Ziwan: 30,3,943

QEDRÎ-CAN

PIRSA MIN JI XWEDE

Xudawendê pak û saxî û mîhrivan Dilovan f her dem ji bo me heman Hemû kar bi destê te ne bê şik e Çi ferman bikeyê dê bibîst bê veman Dizanîm digel kes te nîne çu kîm Dizanîm ji bo her kesek tuy Xudan Hemî dinya evro te kirye mirov Ji bo her kesî te kirî yar zeman Ji bo her kesî te kirî dost felek Ji bijî me kurdan nema bê jivan[1] Nê em ji sepan û bendên te ne Me hişyar ke ba xwê mezin ji xewan Çi gunhe heye me Xudayê bilind Çi suç me heye ey Xuda da bizan. Me hîne li ser rûkeke rast û rûn Ji piştî me bavê vî barê giran Tu aza bike vî welatê kimêd[3] Bikêşe derê wî dest tasiban[4] Da aleya rengî bihejîst kesk û sor Biriskîna roj li wî her deman. Verêke ji bo me kesek şehreza Tu xwendinê zor ke li welatê xuman Nê evro hemî kurd bibûne bendewa[5] Cih û mal û kodik lê bûyne wêran Cida bûn ji yek da ji yek bûn belav Ji xwişk û ji day û ji bav û bîran Ketîne li bin nîreşk-zor bi seng[6] Ketîne li barekî wek çîyan Bi xurtî cihê me ji me standiye Ji ber ko ne bû me kesek kamiran Berê xo diden me bi kêmî û sivik Hemî kes bi kurdan diken pêtrîan[7] Ji ber çî Xudal ev ji ber çî Xuda Heta kengê ma dê bibîst bê şivan. Heta kengê ma dê welatê şepal Bê pêjan bimînîst bê diwar û tan Heta kengê ma dê bi şîni bimîn Welatê me kurda li navî cihan Hemû cih bi keyfxoştî û serbilind Bi jin û jiyarek gelek rind û can. Hemû kes bibûn serferaz serbixo, Ji bijî me kurda nema kes neman. Mixabin li bo van baxçeyê kesk û sor Bi leyzina rûvî biken lê seman Mixabin ji bo van derav û cowan. Pê zêmar[8] û tazi bi roj û şevan Mixabin ji bo van kulîk û gulan, Li çavan pes in rondikên wek pelan. Mixabin ji bo van giran û çelan, Evan kûx û şax û dest û çîyan. Evan rezk û latan evan çîmenan. Evan war û kûstan û havîngehan Evan kan û gencan evan madenan. Bibêlin li destê qelan[9] û bûman,



FRANSIZÊN KO JI MARTÎNÎKÊ REVÎNE Û XWE GIHANDINE FRANSA AZA, DI TALÎMÊ DE.

Ji ber çi Xuda ev ji ber çi Xuda
Heta kengê ma dê bibin bê xudan.

CEWAB JI TEREFE XUDE

Erê bendê şet û zorê bi jar,
Ji haw ji hiş te çi girt û bijar
Ji xwendin û zanin te çi girtiye
Çi şol te kire ma te kirye çi kar
Çi berhef kir we ji welatê xwe ra,
Çi kirye we evro çi kirye we par.
Ji bijli xewa bin bi û bin tûya,
Ji welat ra çi kirye biken hûn jimar
Di gerhîn li kulan wekî serxweşan
Dikêşin, qelûna ne êk ne hezar
Mijûl in hemî -gav bi pûçatiya
Digel êk bi kîn in dirist gel neyar
Wekî her tixim nê me daye hewe
Hiş û eqil û fikr û ziman û zar
Da hûn jî xebat û bizavê biken
Bo tixim û nijadên xwe ra gov û cor
B'xebat û bizavan d'gehîr her kesek
Çi armanca hes ket çi baş û çi xwar
Me nişa we daye li quranê da
Ji we ra gotinek heq me kirye diyar,
Ko nine bo însanî il-la xebat,
Te evro heko çand sibehyê te xwar

Û dîsa mîna gofî însan ji pêş
Tu rabe b'te ra me, dibîm harîkar.
Çi hecet ne maye di gel min hewe
Çi ya baş ji bo we me got ne veşar
Hemû şol ji bo we me kir eşkera
Ji bijli me daye we hiş û eqil û çar[10].
Li paş vê çi maye li nik min hewe,
Çi gazind e ma we çi êk û çi çar.
Li dûv xebatê didem her kesek
Li dûv tav û baranê têtin Bihar.
Çi kîn û çi rik me digel kes niye
Çi paki[11] me nine bi xundkarê jor,
Ne xwendin heye, we ne heş wê diken
Ligel zarê xwe hon hemî bûn neyar
Cema min jî gote we ezmanê we
Li nik we bila reş bibît şibtî mar.
Nizanim gelî kurda nê hon ji mêj
Lewa ko nema we ne cih ne çi war
Çi yê wek hewe bê xebat û bizav
Dê minît heta her li bîn nîr û bar
Ne girin binasa[12] bi min bûn çi car
Li lebat[13] çi kêmî heye yan li dar
Çi ya ko bigihît we ji suçêr we ne
Li eş çi bi ken nê dê ew bîte ar
Bixwînin bizanin dê bin serbilind

BİRINE SEFERA EFRIQAYE

NAN Ç XWÊ:

Piştî ko eniya Tûnisê şikest fermandarên ordiwa mihwerê xwe dan paş û di çerargahên xwe de li hêviya qedera xwe diman. Mifreyên hevalbendan diçûn û ev hêr digirtin. Mifrizekî inglîzî yê ordiwa pêşin hate qerar gaha genêral Mês — serfermandarê qewetên talyanî — da ko wî teslîm bigire.

Genêralê talyanî li ordiwa mifrizê pirsî. Gava zanî ko mifrize ji ordiwa pêşin e ji serbendê mifrizê re got: Ez xwe teslîmî we nakim. Hon di hî ne pêr hatine. Ev du sal in em û ordiwa heştan şerên hev dikin. [yanî me nav û xweyên her xwarine] Ezê ji eskerên wê ordiwê re teslîm bibim.

Eskerên ordiwa pêşin kenîn û ji genêralê talyanî re çend eskerên ordiwa heştan anîn.

HER DU ALÎ JI DIKENIN:

Mifrizekî inglîzî bîn hêsrên talyanî da bûn hev û ew gihaudi bûn çerargahêkê. Ingilîz ji kêfan dikenin. Bala xwe dan ko hêsrên talyanî ji bi hev re daxevîn û ew ji dikenin. Ingilîzani ji wan pirsî:

— Ma hon çire dikenî?

Talyanan: Divêt em ji we bêtir bikenin û kêfxweş bibin. Hon dikenin ji ber ko hon mizefer bûne: lê hê şerê we ne qediyaye. Em dikenin, ji ber ko em şikestine, lê hêsr bûne, û bi vî awayî şer ji bona me xelas bûye û em nema dikevin şer û bê emirê Xwedê em nema dimirin.

NEFER Ç MEZINÊ KELEHE:

Eskerên genêral Leklêrk ji Çadê herê xwe da bûn Fizanê. Bi rê ve çend kelehên talyanî hebûn. Mifrizeyek dişînin ko kelehêkê zentî bîkin. Mifrize bi şev diçe dora kelehê û heta sibehê li hêviyê dimîne.

Bi sibehê ve topek berdîdin kelehê. Çelek nabore aleke spî di ser kelehê re li ba dibe. Kumandarê mifrizê lê gelekî ecêbmayî namîne. Ji bo talyanan teslîmîbûn ji her tişî hêsanîtir e. Kumandar diçêl çend zabit û neferan û bi aleke spî diçe kelehê.

Belay ken Gelawêj belay ken Hawar
Ligel yek de ra t bîn diçêl we me ez,
Ji bo mil-letê xwe nebin sist û xwar
L'hemî din me ev çarîn danîçê
Ji vî Lawê çiya ena hême xwar.

Amêdiyê: 10 121 912 MFLA ENWER

1. Çavdar, 2. xulam, 3. çepal, çawan,
[4] dijmin, [5] bêxweyî, [6] gran, [7] henek, [8] giyê ye
mîriyan, [9] çîqîk, [10] taqel, [11] tirs, [12] sûc,
[13] azayên bedanê.

Kumandarê kelehê yekî kulnêl bû. Kulnêlê talyanî gava fransîzan dibîne bi ken û qerf-
ji wan dipirse: Hon teslîm dibin?

Zabitê fransîzî: Em... we ala spî bi hewa xist.

Rengê kulnêlê talyanî wek ala wan spî dibe û ji fransîzan re dide zanîn ko wî tucaran emîr ne daye ko ala spî bi hewa bexin. Kulnêlê dertê hewşê û bi çavên xwe dibîne ko aleke spî di ser keleha wî re li ba dibe. Seh dike û dizane ko neferekî kelehê gava dengê topan dibihîse û peyayin dibîne ko berê xwe didin kelehê ewçend dibizdihê ko hêf tuxestî îşareta teslîmê dide.

Kulnêl meselê ji fransîzan re dibêje û bi ser ve zêde dike ko ew bi xwe şerefa talyanan dê midafehe bike û di vî reyê de bê perwa dê bimire. Fransîz jê re saetek mihlet didin û vedigerin cem eskerên xwe.

Piştî saetekê fransîz dişan topek berdîdin û li hêviyê dimînin. Li wan venagerinin. Ala talyanî dadikeve û ji nû ve ala spî bi hewa dikeve. Lê vî carê bi emirê kulnêl.

48 MİLYON BERİK:

Di şerê Efrîqayê û di nav 46 rojên paşin de eskerên inglîzî û emêrikani 38 mîlyon berik berdane. Li gora vî hesabî di deqîqekê de 60 û li serê saniyekê berikek dihatê berdan.

Emêrikê bi tena xwe 70 lokomotiv û 400 fergon hür-mür şandine Efrîqqa bakur.

Di vî seferê de eskeran 250 000 kilo sabûn îstîhlak kirîne.

Ingilîzan ji eskerên xwe re 450 mîlyon çîsare û 9 mîlyon pakêt çikolate şandine.

ME EN MÊS Ç ARNÎN:

Her du serfermandarên mihwerê Mêsê talyanî û Arnînê elemanî fro di nîzingî Londrê de di xanîne cihê de rûdînin. Hikûmeta inglîzî, herwekî îsul e, ji wan re mîaş dide. Ji Mês re 48 ji von Arnîm re 16 lîreyên inglîzî. Ma çire mîaşê Mês sê tayê mîaşê Arnîm e?

Ji ber ko Mûsolonî serfermandarê xwe berî hêsrîyê bi du rojan kiri bû merêgal.

Talyanan gava ev îşt bihîştîye gotiye: Te dît Mûsolonî ji tîlter camêrtir e.

EGËBA BÛ BATE SERÎ INGLÎZAN:

Yek hebû meyildariya talyanan dikir û carê ko talyan dişikestî û direvî diçêl xelkê:

— Ev hemî li gora planê ne; honê bibînin dawiyê talyan ecêbekê bînin serê inglîzî.

I îşt ko inglîzîzan Efrîqqa ji talyanan safî kir xelkê ji meyildarê wan pirsî.

— Kanî ecêba ko te diçot....

Mêrik li wan veçand û got: Ma bixwedîkîrîna ewçend hêsrînan rahet e? SİLÊMANÊ FERHO

BERAZ Û BERAZÎ

Di Kurdistanana roava da, eşira Bêzikan, di bakur û nivroyê Ferêt da bi cih bûne. Ji ên bakurê Ferêt ra bêzikê jorin û ji ên nivro ra ji bêzikê Omaşacê tête gotin. Bêzikê jorin mezinatiya mala Ûsif axa nas dikin. Ev mal di nav eşîrên dorhêla xwe da bi camêrî û mêraniya xwe hatine nasîn. Ûsif axa ê ko navê malbatê rakiriye ser xwe di sala 1880î da çûye rehma Xwedê.

Rojekê Ûsif axa du siwarên xwe rakirî bûn û çû bû nêçira berazan. Di kelekela nivro da culekî berazan li pêş wan rabû bû. Ûsif axa û hef du siwaran da bûne pey. Bi rê va ê yekane ji col veqetandi bûn û piştî ko bi du berikan bi birin kiri bûn da bûne ser şopê.

Ji wan her du siwarên Ûsif axa şulamê wî Hisên, yê ko heya şerê mezin 1911an sax maye ev çirok holê ji me ra gotiye:

Piştî ko me yekane bi du berikan bi birin kir û ji col veqetand, kete ser rîya Semsûr û Semsatê û bi teqla rê da çû. Ji germa Hlavînê hesp li pê berêz westî û di hal da ketî bûn. Ji hêla din xwe ne didan ser berêz. Navbera me û wî nîzîka çar sed mêtirî hebû. Hew me dît li pêş yekane bi kilometrekê peyakî eba xwe bi ser serê xwe da kiriye û diçe. Bê şik haya mêrik li berêz tine bû. Ferazê ko bi du berikan fî bi birin bû, çî gava bigehêstayê, dê bi şûflên xwe, ew bi du qetan kira. Ji her ko yekanyê bi birin çî bi berkeve bê lêdan jê derbas nabe.

Li ser vê bû ko Ûsif axa gote min, Hisên, haya vî rêwiyê han ji berêz nînc. Bê

şik wê lêde û em ji xwîna wî berpîrsiyar in.

Serekî dirêj bû ko em li pê berêz çargav dihatin. Ji westan sînga me nema tîje ba dibûn. Li bayê beza hespê min çend dengan han kir; bê fêde bû. Qey mêrik ne dibihîst ko li pişt xwe ne dinihêrî. Navbera mêrik û berêz niv kîlometir ne ma bû. Ûsif axa got: Hisên, xweya ye ko ev rêwiyê han nabihîse. Hespax xwe di rê da bi derxe, dererê bi çiftezengû bajoyê; şalê tu xwe berî berêz bigehîne. Li ser gotinê axê min hesp di rê da bi derxist û çiftezengû çûm. Berî ez xwe bigehînimê, berêz nîzîkî lê kir. Tîfing û tebançeyên min e vala bûn; ji neçarî min dîsa da qîran. Tevî ko navbera me 50 mêtir ne ma bû jî, mêrik ne dixwest dengê min bibihîse. Êdî min ji xwe ra digot, roja mirina wî hatiyê û ez sekinim da ko bala xwe bidimê; he ka beraz çawan wî bextereşî dike du qetan.

Berêz di pa ra xwe gîhandê û dilê min jî xwe da ber devê min. Hew min dît, bê ko camêrî li pişt xwe bizivire, destê wî li paş livî û şurê wî biriqî; beraz kete erdê. Lê ev giştik di nava du saniyan da bû û mêrik ne li xwe vesekinî û ne jî li paş xwe nihêrî. Herwekî tiştek ne bû be, bi rîya xwe da diçû.

Li pêş vê ecêba han ez di cihê xwe da hişk bûm. Ûsif axa, yê ko li pê min dihat, ew jî mat ma bû. Tu nema em hişyarî xwe bûn. Ûsif axa got: Hisên! divê tu vî zilamî jî min ra vegebin. Min serê hespê rakirî û bi çargav da pê û vegeand. Dema em hatin Ûsif axa li ser cendekê berêz peya bû bû. Derha şûr di navbera herdu pîlan û hêleke sto

da lêketî bû. Berazê yekane kiri bû du qetan. Gava sihna me bi ser Ûsif axa ket, serê xwe hilda û ev pîrs ji rêwî kirin:

— Tu fî kesî yî birazî?
— Ez fî berazî me ezbenî.
— Tu ji kû têfî û bi kû da diçî?

— Ez xwînfî bûme ji xwe ra li nik camêran li geştê digerin da ko xwîna xelkê bidim.

Ûsif axa mêrikê Berazî bi xwe ra anî mal û piştî ko sê rojan li cem xwe hişt, xwîna ko jê dihate xwestin bi temamî dayê û bi rê kir.

OSMAN SEBRÎ



TOPEKE BERBALAFIR DI NAV RÊLEKÊ DE

DİROKA JINA NAPOLYON

« Welatni bəjejeke welê ye »
ko ji ramanêke bilind tê »
Napolyon

PÊŞGOTINK

Ez dibêjim, tu xwande van nînin ko navê Napolyon ne bihîstine. Lê gelekê wan, dîroka jîna vî serdarê mezînanînan. Nemaze bi zarê me kurdmancî, der beqê Napolyon da bendek bile ne hatiye nivîsanadin. Ji ber ko ev dîroka han ji her kesî ra, xasma ji gelparêzan ra şîretnameyeke mezîne û xwediyê wê, ji ramana welatîniyê ra aleke bilind û heftreng e, min xwest di vî warî da çend bendan belav bikim. Erê ez dibêjime çend bendan; lê qesda min xulaseyeke dîroka jîna wî ye. Ew jîna ko di nav malbateke navîn da dest pê kir û gihêste navçava mezînatîyê. Û ji wî cihê bilind, çilo dakete hepis û sirgûnan!.. Berê çawan melîkên Ewropayê jê ra serî nizim dikirin û paşê kete çî halî ko heval û hogir jê direvîn, heya bi jîna wî. Dê vana yek bi yek; lê serpişkî binivîsim.

Navê Napolyon. Cara pêşîn bê şik min di kitêbên dibistanê da dîtîye. Ji ber vê yekê, hezkirin û ecibandina min a ji bo serdarê fransîz di wê gavê da dest pê dike. Lê paşê çiqas kês hatiye, di heqê vî sergevazê yekta da min hin hin nivîsarên dîroknivîsan xwendine. Ji ber ko di biçûkiya xwe da ez ji bibîstina çîrokan ra guhdarekî baş bûm, piştî mezîn bûnê, vê hezkirina han, berê min berve xwendina dîrokan bada. Di vê rê da bi qasî ko ji min ra lêhat, min dîroknê gel û sergevazan xwendin. Di nav dîroknê min xwendî da, du kitêban şopîne mezîn di canê min da hiştin û ramanîne nû existîne ber min. Bi vî awayî di rîya welat û welatîniyê da, min rê û rêzanîne xweser dane çav xwe.

Ji van her du kitêban yek dîroka Romayê ye. Ev dîrok di warên serfirazî û sernîzmî, camêrî û pîsî, mêranî û qelsiyê da dibe du biran. Birê pêşîn, di avakirina bajarê Romayê da dest pê dike, heye digehê demên Marîos û Sel-la. Birê diduyan, di serdariya Sel-la da dest pê dike, heya digehê dawîya Împeratoriya Romayê a rohelat. Ji van her du birên han, ê pêşîn çiqas fî qenc û çak e; ê paşîn jî ewçend



fî kirêt û qirêz e. Kitêba diduyan, dîroka jîna sergevazê bi nav û deng, serdarê qada şer, rêberê gelê fransîz Napolyon Bonapart e.

Dîroka Napolyon wek a Romayê jî hev nabe. Ev dîrok, wekî can a baweriya xwediyê xwe, zincîreke ji pola ye ko ji hev naqete. Dema em destê xwe davêjin vê zincîrê û heleqe bi heleqe dipalîkînin û pê da diçin, jiyîna Napolyon a biçûkî, a dibistanê, a zabîti, a serdarî, a sergevazî û a sirgûnê gişkî yek dibînin. Di van warên han hemîyan da ji mirov ra xweya dike ko Napolyon her ji bo mezînatî, serdarî û sergevazîyê hatiye afirandin. Herwekî min di benda xwe a (sergevaz) da goli bû, mirov di nav hemî kirên Napolyon da destê şîna Xwedê dibîne.

Dîroknivîsên hemî mîletan der heqê Napolyon gelek tişt nivîsanîne. Ji van dîroknivîsan heryekî Napolyon bi awakî şalîx daye. Bi çav hinekan, dêwekî welê zorzar bûye ko textên şah û padîşahan hilweşandiye; welat ser û bin wergerandine û bi mîlyonan mêr dane kuştin... Bi çav hinekan, melekek ji melaîkên Xwedê bû; ji bo ko fransîzan ji hela serxwerabûnê (sewre) bifilîtîne hati bû şandin.

Hinekan dîzanî ko ji bo danfina himên serbest û wekhevîyê, di destê şîna Xwedê da sûreki tûj bû û bê dilovanî li stoyên neqenc û zaliman diket.. Li nik hinekan, gurekî qol an direndeyekî bê eman bû ko tim agir û mal-kambaxî ji çavên wî dibarînl. Bi a hinan jî, Napolyon î wekî berxekî kedî xweşpeyiv, zarşîrî û rûbiken bû ko axaftinên wî di dilên guhdaran da cihê bilintir digirtl..

Dawî, gotinên ko li ser Napolyon hatine kirin nabin yek; heya bi ên xerxwazên wî. Ji bo vê yeka han, nivîsevanê hêja, Xwediyê kitêba (jîna Napolyon) Hesen Celal di pêş-gotinka kitêba xwe da mîsalek anîye ko gelekî bi cih e. Ji ber xweşîya wê min nexwest di xwe va derbas kim û min ew guhaste vir.

Dibêjin, çend kor û yekî bi çav bi riyekê da diçûn; filekî mezin kete pêş wan. Ê bi çav got: gelî koran, filekî mezin î li pêş we ye. Dema koran navê fil bihistin, bi meraqa dîtinê xwe deverû avêline ser fil. Her yekî di tala xwe ra bi lebatekî girt û ji hevalên xwe ra salîxa şiklê fil da. Ê ko bi bêvîla (xurtûm) fil girtî digot: filê ko dibêjin tev da î mîna ejderhayekî ye. Ê ko di rex wî da bi qîlê (didanê mezin) fil girtî digot: malkambaxî ma fil çawan î wekî ejderhan e? bi carekê î mîna şîlfê rîman e. Ê sîsiyan, bi guh girtî bû û digot: Xwedê çav ji we girtine, qey eqil jî ji we ne girtl.. filê ko dibênl tev da î mîna mertalan e. Ê çaran ko boça fit keti bû dîst, di dest xwe da dihejan û digot: gelî bê mêjûyanî hûn çî serê hev diêşînin; fil bê werîsekî hişk ne î mîna tişteki ye. Ê pîncan himbêza xwe di lingê fil wer anî bû û bi gotinên hevalên xwe dikenî û digot: fil, ji koka dara xur-mê pêve ne î wekî tişteki ye. Ê şeşan bi pîsîrê raste kêleka fil hatî bû û bi her du destan parxanên fil dipalmisand û digot: di nav we da ê ko zani be baş salîxa tiştan bide nîne; fil î wekî dîwarekî ye û kesek nikare min jî vê gotinê vegefrîne.

Ev filê han ê mezin, Napolyon û korên ko lê civiyayî jî dirokmiwîs in, her yekî bi awakî salîx daye. Eve, ez jî destê xwe dirêjê dikim; di nivîsandina vê kitêbê da, şalê xwandevan min jî di nav koran da ê heftan nebînin ».

Di vir da gotîna Hesen Celal kuta dibîye. Tevî ecibandîna kitêba camêr, min ew jî korê heftan jîmartîye. Hek hinek jî min jî bo van çend bendan korê heştan bihejmêrin di niha da min qîma xwe bi hikmê wan anîye. Li nik min, bê neyarên Napolyon herçîya di heqê

CEJINA KURDAN JI TACA INGILÎSTANÊ RE

Li 8ê Gulanê li gora dengê Radyowa-Rohelat sondxwariyan Tûnis vegirt. Bi vê mîzgîniyê kurdên Cizîrê têk we dîlxweş bûn. Kurdên Amûdê di roja dehê Gulanê de, roja Duşembê, bê şahîneteke kes-nedî ina pê. Mesref û awayê wê şahînetê bi kurtî û hindikî ev in:

Me du konên mezin vegirtin. Yek jê bi her û kulav û xalîçe raxistî. Ê di bi awakî bajarî, li hawîrdora masan kursî. Xwarin û vexwarîna efrencî. Mase bi gul û gulçîçekan xemilandî û bi yekcar zêweke kurdî.

Ën rûniştî jî ne piçûk bûn: Mêcer Lewrens, Mîstexarê Qamişlokê û Nûredîn; pê re kumandare jendermê, keptên Wîtir, lyotnanê Qamişlokê ê ingilîzî, keptênê ingilîzî ye Amûdê û gelekî zabîti û eskerên din.

Pîştî xwarinê xortê delal. Nûredîn Çûsif rabû û gotarek bi fransîzî da; û paşê bi kurdî. Spas û peyman pêş teva kirin. Berê xwe da axa û mix-taran, hin şîretên welatîni jî rijandin civalê.

Xortên me jî rêz bûn; neşide gotin. Seîd axa, serêkê deqoriyan jî nav di me dida. Her bînekê emîrê agirkirîna tîflîngan didan. Bi sedan brûskên tîflîngên me di ser konê mêvanan re pêti dida û zefera ingilîzî û sondxwariyan şahînet dikirin.

Eşîrên dorê tev de hati bûn. Her axa bi heftê siwaran ve.

Di vê şahînetê de (40) berx hatinê şerjêkirin. (20) olçek savarê bişîre, (5) teneke rûn û (4) telis acd hatine serf kirin. Segmanên me jî qederê (500) berik berdane.

Herwekî hatîye gotin, heskirîna dilan di dayîna destan de xuya ye.

Belê em kurd dostê dostan, dijminê neyarên in. Piştî hewçend belengaziye û bîndestîya neyarên em hînlî lihan ne hûne û nabin û tiştên çeq laîqî xwe dibînin. Ne bi tenê bi mal, lê di xûnrîjandinê jî camêriya me ne winda ye. Bi tenê xeta feleka reş li me hatîye pêçandin.

Ji gotara Nûredîn hin jê ev in! Ein kurd bi zefera hevalbendan dilgeş bûn. Ji her ko azadî, serxwebûn di dilê me de ye. Ji lewre em jî dostên xwe re dixwazin. Jîna me bi ya wan girêdayî ye. Çawan ko Çorçil û Rûzwêl gotîye di dawîya şer de heqê her nijadî wê bête dayîn. Bivê nevê kurd jî tê de.

Nûredîn di vê navê de wesfê Fransa Şerevanî jî da û gotara xwe gihande dawîyê.

Jê re gelek çepilk li hev xistin.

Li 11ê Gulanê bi navê kurdên Cizîrê me jî genêral Mongomerî re telêgrafek şand û zefera Efrîqayê me jê re pîroz kir.

Xortekî me di şahînetê de hin resim girtine. Bi posta tê emê wan jî wî we re bişîyar.

Amûdê: 11/5/1943

H. HIŞYAR

wî da hatîye gotin rast e. Çîqas ko pîraniya wan gotinan e dûrî hev bin jî rastbûna wan nîzîktîrî eqil e. Ji xwe di mirovên mezin da rûçîkên neyar (sifetên did) pîr çaran digêhan hev ko ew yeka han jî nişanên mezinatiyê ye.

OSMAN SEBRÎ

BI QEFLË RE LI SER RIYA MÛRMANSKË

Ingiliz ù emèrekani ji hevalbendê xwe ùris re, nemaza bi du reyan re, çek ù cebirxanan dijînin. Li nivro di xelîca faris re ù li bakur di bendera Mûrmanskê re. Noqav ù balafirên elemani li reya qellan dipên ù dirêji wan dikin. Zabiteki emèrikani, bi navê Norman Adams, yê ko çend caran bi wan qellan re çûye, biserhatike xwe gili kiriye ù gotiye:

Di hewake xweş de me da behirê. Tu talûke ù teşşele ne dihate bira me. Wek şagirtên deryavan qey em diçûn ger ù talimê. Gava em gihaştin avên Eyslandayê zabiteki ingilizi bi xwînsarî gote me ko ji hire ù wê ve me dikarf bû em bikevin ber nişkegaviyene nexweş.

Ji Eyslendê, ji bo hefadiya me çend bertorpiyor bi me re hatin. Kumandarê vapore gote me ko em xwe ji enbarên cebirxanan bi dîr xin.

Du rojan em bi selamet çûn. Roja siseyan îşareta xelerê dan. Di nav ewiran re balafireke elemani derket ù di ser me re geriya. Me xwe da bû ber topên berbalafir. Lê balafirê nîzingî li me ne kir ù vegeriya nav ewiran. Yeke din; dîsa yeke din... sê çarek di ser me re friyane; lê ne yeke ji dirêji me ne kir. Tev de balafirên keşifê bûn.

Gava hicûma pêşin dest pê kir ez di oda xwe de bûm. Sê balafirên elemani bi ser me de girti bûn ù bera me didan. Topên berbalafir li wan vedigerand. Deb balafirên din xwe gihandine wan. Ji bombeyên ko balafirên tavêt stûnîne avin di dora vapora me de radibûn.

Her du aliyan agir dikir. Ji aliyê agir bi hewa diket, ji aliyê din ber bi jêr dibû. Gava

ez li xwe zivirîm, min dît ko vaporeke qeslê me xwe li tanîştê xwîl kiri bû ù bin av dibû. Bombe bi temamî lê keti bû.

Piştî vê hingafînê dijmin çend deqîqe etlahî da ù bi sê balafirên dîsan li me vege-riya. Her sê balafirên rast bi rast dirêji vapora me kir. Di nav wan de yeke torpîlavê hebû. Torpîlek ù çend bombe gelek nîzingî me ketin; ji du mêtiran heta bi dehan...

Vapora me ser bev çend caran hejiha ù li gora aliye ko bombe lê diket xwe gah li aliye rastê, gah li aliye çepê xwîl dikir.


Dijmin dîsan ji me geriya ù qedere çar saetan xuya ne kir. Di vê navê de bêtêlê hebûna noqaran elam dida; lê me tiştêk ne dît.

Şev çû bû nivê şevê, îşareta xeterê dan. Ez di cihê dîdevaniyê de bûm. Piştî teqîna çend bomban ji vaporeke qeslê dakt bi tenî rabû, zimanekî sor tê re xuya kir ù vapora berhewa bû. Bombe zik lê çetandi bû. Vapora di nav du deqîqan de ji her çavan wînda bû bû. Hevalên min li kortala ko vapor tê de wînda bû bû temaşa dikirin ù li ber diketin. Ji bo sivikîrîna felaketê min got:

— Beriya ko bi talûkê bihesin çûn.

Me şev di sikûnê de bihart. Bi spêdê ve şeş torpîlavê xuya kirin. Torpîlên xwe li me reşandin ù çûn.

Li saet yanzeban pênc torpîlavêjên din bi ser me de hatin. Li dawiya qeslê barkêşeke rûsî hebû. Balafir rast bi rast bi ser ùris de çûn. Vapora rûsî kir ko nîzingî li bertorpiyorekê bike ù bikeve bin himayeta topên wê. Bi vê menawrê vapora rûsî ewçend nîzingî me bû ko di navbera me de bi tenê mesafa pênc mêtiran ma. Emê bi hev biketana. Me zûka berê xwe da hindaveke din ù em jê bi dîr ketin.



TİMSAHÉ HEFTILI

— ÇIROKEKE MISIRA KEVIN —

ESİLÉ ÇIROKÉ LI SER ÇERMÉ XEZALAN HATIYE NIVISANDIN
BERIYA İSA PEXEMBER BI 480 SALI

Serkahin bi pabûsi nzingi li meliké xwe Xefrah kir û got:

— Tacidaral ez dikim şev ji te re çirokeke ecêb bibêjim. Ev tişt di wextê bavê te, Nekbayê adil de çêbûye. Nekba çû bú ziyareta mabeda Betahê, rebê Menfisê.

Rojekê, melik piştî ko mabed ziyaret kir; bi xulam û berdevkên xwe ve çû mala debîr û remildarê xwe, Ebwaneer.

Çavê jina Ebwaneer, ji berdevkên melik, bi mîrekî ket û jinikê ew hebând. Jinikê cêriya xwe bi destek kincên şevê, rêkire nik mîrê çeleng. Cêrf vegeyriya, ba xatûna xwe, mîr ji pê re.

Du saetên din ketin navê. Dîdevanên me elam dida: « Ji dût ve şeş balafr xuya dikin; dimfin şûkan » Dîdevanên me hêj gotinên xwe temam ne kiri bûn ko balafrekê xwe gihande vapora rûsî û derhek lëxist û hingafte vapore; teqin bi vapore ket. Vapore xwe li me xwîl kir, disan em bû bûn nizingî hev. Em sekînin û man dawiyê; cihê xeterê. Bi restî, balafr hergav vapora ko li paşîya qeflê ye ji xwe re dikin armanc.

Sê şûka bi ser me de hatin û mîtralyozên xwe li me girêdan. Hin deryevanên me birîndar bûn.

Balafiran hingafte vapora ko li pêş me bû. Vapore xwe li milê xwe ê çepê xwar kir û dest bi binavbûnê kir. Deryavanên we diketin avê û dixeriqîn. Me nikarî bû em herin hawara wan; ji ber ko şûka di ser me re digeryan û berikên xwe li me direşandin.

Vapora sovyetî ji li ber çavên me bin av bû bêko em bikarin deryavanên wê xelas bikin.

Li roja pêncan me digot êdî talûke xelas bûye. Ji xwe hewa ji guhêrî bû, derece keti bû bin sifirê. Lê bi hingûra şevê ve balafirên dijmin ji nû ve xuya kirin û du vaporen din bin av kirin. Bertopiyoran wê carê piraniya deryavanên wan xelas kirin.

Roja şeşan, şeş noqavên dijmin dirêjî me kirine; lê bertopiyoran bera wan da û nikarî bûn tu zererê bigehînin me.

Li roja heftan qesleyê me gihafte Mürmanské. Bendera bakûr di bin berfêke xurt de nixumandî bû ».

XELILÉ GENCO

Remildar qesirêk hebû. Li .hewşa qesirê bêrmek hebû. Mîr gote jina remildêr heke bi te xweş e; rojekê em herin qesira ko lê bêrmek heye.

Jina remildêr gote xulamê kô li wê qesirê guhdar dibû; qesira ko bêrmê lê ye kar bike.

Xulam tiştê ko xatûna wî jê re goti bû kir. Mîr û xatûn çûn qesirê. Li wan bû şev. Mîr daket bêrmê û xwe şwişt.

Sibetirê xulam tiştê ko di navbera mîr û xatûna wî de çêbû bû, gote axayê xwe.

Serekê remildaran gote xulamê xwe, sendûqa ebanos digel kiteba sehîrê bîne.

Xulam sendûq anî. Remildêr sendûq vekir û ji şimayê tîmsahêkî bi heft tiliyan dirêj çêkir. Ji kitêbê diayin lê xwendin û gotê: Gava ew mîr kete bêrma min, wî bikişîne binê avê.

Remildêr tîmsah da xulamê xwe û jê re got: Gava mîr kete bêrmê, tu di pey wî re, wî tîmsahî berde avê.

Xulam, tîmsah di bêrika wî de diçû, xatûna wî lê der bû û got ê: Qesira ko bêrmê lê ye ji min re kar bike; bihîna min tê de dertê.

Xulam qesir kar kir. Xatûna wî digel mîrê çeleng hatin û xwe bi tenê kirin. Tariya şevê daket. Mîr ji ket avê. Xulam tîmsah berda. Rih bi tîmsah ket û bû tîmsahêkî bi heft gazan dirêj. Tîmsah rahişte lingê mîr û ew kişande binê avê.

Remildar heft rojan bi melikê xwe re di welêt de geriya. Mîrê çeleng ji heft rojan di binê avê de ma. Roja heftan melik vegeyriya mabeda Betahê. Remildêr gote melik: ecêbek li mîrekî melik qewiniye.

Remildêr melik bire keviya bêrmê û deng li tîmsah kir û got: wî mîrekî ji avê derfene.

Tîmsah da ru, mîr ji pê re. Remildêr gote tîmsah: Raweste

Tîmsah mîr avête ber lingên melik. Melik got: Çi tîmsahêkî fêris.

Remildêr dest da tîmsah. Ew heywanê fêris di destê wî de bû perçak şîma.

Remildêr tiştê ko mîr bi jina wî re kirî bû gote melik.

Melik gote tîmsah: Wî bibe, bila ji te re be.

Tîmsah rahişte lingê mîr û di avê de wînda bû. Her du ji nema derketin.

Nebayê adil jina remildêr anî û ew şande banê qesirê. Agir bi jinikê xistin. Jinik bû mistek xwêl. Ew xwêl bi rüyê bêrmê wer kirin. Ji lewre ava bêrmê hetanî fro şeylo ye.

CEMŞİD

HINDIK RINDIK

ZAROKÊ BÊXWEDI:

Gundikf mecerf, bi navê Zîlskf, ji zeviya xwe vedigeriya mal. Mêrik bi rê ve nûzayek peyda kir. Xwediyar zarok kiri bû nav paçeki de û ew li ser rê hişti bû. Dilê mêrik pê ve ma, zarok ji erdê hilani û bi xwe re anî mal.

Şêş zaroyên mêrik hebûn. Ji lewre jina wî ji wê diyariyê ewçend kêfxweş ne hû. Lê wê çî bikira; lînek enirî, bi qedera xwe razî bû, zarok kire hemamê, ew şîst û kire nav kumatekê de.

Bi stoyê zarok ve perçak kaxez hebû. Lînikê kaxez vekir û tê de bilêteke yanesîbê peyda kir. Piştî çend rojan yanesîb hate kişandin û bilêta zarokê birêhiştî 50000 freng kar kirin.

JÎ DENG BILEZTIR:

Deng di rêveçînnê de gelek bi lez e. Heta niho ne digot qey di rêveçînnê de jê bileztir tiştek nîne. Gava topekê berdidin em berî ewilî riviniya wê dibînin û paşê bi gumnêa wê dihesin. Deng di saetekê de û li rûyê behirê 1158 kilomêtiran bi rê ve diçe.

Vê paşiyê du balafirvanên emêrikanf, Harold Koistok û Roger Diyar, dema balafirên xwe diceribandin 10 500 mêtirî bi hewa ketin, di wê bilindahiyê de motorên xwe vemirandin û ber bi jêr bûn. Di vê daketinê de balafirvanan di saetekê de 1166 yanî ji deng 8 kilomêtiran bêtir bi rê ve çûne.

BOMBE ÇÎ GAMASÊ:

Di peravên Keliforniyayê de (Emêrike) vaporeke qerekolê digeriya û bi bombeyine bi qasî zebesekî piçûk, kûrabiya behirê dipîva. Ew bomba piştî midekî ditiqayan; pênc

BIREK JI STOLA BRÎTANYA MEZIN



Cenkeştiyên brîtanî piştî seferêkê di bendereke Ingilîstanê de zad û cebirxanê dibin.

deh an panzdeh deqîqan; li gora ko ew siwar dikirin.

Keptanê vapore bomyayek berda. Di dora vapore de gamasiyek hebû. Gamasî dirêjî bombê kir û ew daqurtand û li şûna ko jî vapore bi dûr bikeve çêtir nîzingî wê bû; lêvî dikir ko yekî din jî bavêjin; do ko wî jî daqurtine.

Bi vî awayî vapor keti bû talîkê. Bombe wê biteqiya, masî û vapor tev de wê berhewa biwan.

Aşbazê vapore jê re tevdirêk dît. Hema çû ji qefesa mirîşkan mirîşkek anî û ew

avête belirê. Mirîşka reben baz da; gamasî da pey û bi vî awayî jî vapore bi dûr ket. Ji xwe gelek ne borî bombe di zikê masî de teqiya, çeniyên wî bi hewa ketin lê tu xesar ne gîhaşte vapore.

IIIJÇÊN ZEFERÊ:

Di bexçê heywanan yê Fîladelîfuyayê (Emêrike) de hirçekê za û du kutik anîne. Midirê bexçê rabû navê yekî kire Rûzweît û yê ê din Çorçil û li ser sinngên wan îşareta (V) ye yanî zefere da kişandin.

XEBERGUHÊZ

SÈHIRBAZ.

Ji kovara fransîzî « En Route ». Klîşe ji yêñ Kovarê ne. Li gora kovarê çirok e heqîqî ye û ne e xeyalî ye. Brazavîl merkeza Kongovaya fransîzî ye. Brazavîl di tarîxa herêketa golîstan de meqamekî bîjarte heye.

Di dora Brazavîlê de gundek heye. Jê re Kîlambe dibêjin. Gund li ber çemekî zelal e. Ava çem ewçend zelal e ko şîjkên qûma biniyê tê re dixuyin.

Di gund de bîst koxik hene. Ev koxik ji dar û heriyê latine çêkirin. Di crta gund de navkoyek heye ko dîwarên wî sor dikin û ew ji koxikên din spehstir e. Ew mala kefxweyê gund e. Di xelaseka gund de koxikeke din dikeve ber çavan. Ew mala Pengaleyê sehîrbaz e.


Pengale di gundê xwe û di gundên dorê de bi nav û deng e. Xelk ji diyarine dûr tîn û pîrsa xwe bi Pengalê dixin. Şerab û şerbetên wî bi kêf û lezet vedixwin. Hin ji wan reş an reş

tevnade. Pi şev dikeve rêlê û dibêjin ko tê de bi xelkê şevê şewirina datîne. Hestiyên şikestî dicobirîne, nexweşiyên giran wek jan û cizamê derman dîke. Pengale, nemaze qenc dizane bi şeytên re bide bistîne. Herkes jê re hîrmêt dîke û jê dîlrse.

Pengale ji sehîrbazî û bîjîşkiyê pêve bi tu tiştî mijûl nabe. Sinheta wî a didowan tenbelî ye. Gelek caran rojê pêde xwe ji ser hesîra xwe tev nade. Pi şev dikeve rêlê û dibêjin ko tê de bi xelkê şevê şewirina datîne.

Hundirê koxîka wî ji morî, hestiyên hişk û ji şuşeyên gir û hûr tîjî ye. Di enîşka odê de giyayîne hişk dikevin ber çavan. Pengalê bi wan giyan elêksîrine welê çêdîke ko ew ji hezar derdî re dibin derman. Bi dîwêr ve eyarekî pilingan ber bi jêr hilawistî ye. Ji van pê ve di beltikên koxîkê de û li ser raxerê dranên dehan, perçeyên pîpoqan, çermên maran, simên gamêşan û firaxîne tîjî û vala û hawînî tîne dîtin. Karê her tiştî cihê ye. Yek nikare bikeve şûna ê din.

Pengale hindik dixwe. Qey rîyazetê dikişîne. Çiran jê re şorbeyekê çêdikin. Wî bi xwe, bi şev gava diçe nav daran, ji xwe re hin fêkiyên rêlê tîne û wan jî dixwe.



Tekane, kefxweyê gund xortekî sih salî bû; bejinzirav, bi dest û lep, xurt û qewîn. Kevankêçekî serdeste. Di kevankêşiyê de tu kesî pê ne dikarî.

Xelkê Kilambayê gelek caran goşte evor û gamêşên kovî dixwarin. Ev danên ha dibûn ziyafet; xelkê gund dixwarin, vedixwarin û direqîşin.

Tekane li gund xudanîfûz û bi xatir bû. Herçî memûrên dewletê wan jî qedirê wî dizanîn. Carê ko qeymeqam derdiket tefîşê û di gund re diborî, disekinî û destê Tekanê diguvaşt. Gundiyar gava ev tişt didît jî şahî û şadimaniyê dilerizîn.

Tekane tiştîne welê hebû ko ew li nik xelkê peyda ne dibûn. Wî saetek hebû ko bi derbîne hişk west dida zafîn. Belê saet ne ewçend rast bû. An li pêş an li paş dima. Lê çî xem; Tekane wextê xwe bi rojê rast dikir.

Jê pêve serbendê gund jî bo rojên cejin û şahiyê çakêtekî sor û şefîyêke bi du seriyar hebû. Tekane gava ew li xwe dikirin yekcar dibû mirovekî mezin.

Ëvarê jin û keçên gund gava di xew re diçûn, perîcar Tekane dibû xiyala xewîna wan.

Enîle, keça şivên wextê ko di her mala Tekanê re diborî meşa xwe kêr dikir. Û gava ew bi xwe didît dilê wê hiltavêt û singa wê hildibû. Lê bavê wê ew da bû Gursinî. Gursinî jî gundekî din bû, lê gelek caran dihat Kilambê. Gursinî jî bavê Enîlê re berxek jî şandi bû. Lê Enîlê bi xwe jî bavê xwe çêtir dizanî jî bona kê dilê wê hiltavêt. Herçî Tekane guh ne dida-yê.

Lê rojekê Tekane jî necîrê vedigeriya û çem çem dimeşiya. Ji nişkekê ve dengêk bi guhê wî ve bû. Yek dikênî û distrand. Tekane ber bi deng çû, hêdika pelên dar û qamişan jî hev kirin û li pêşiyê nihêrt. Enîle keti bû avê, bi tena xwe û tazî bû.

Tirêjên tavê yên ko di nav çîqilên daran



re diseridîn, li canê Enîlê ê esmer diketin û dilopên ko di nav gubanên wê re diherikîn, dixistin rengêkî zîvîn û di hin derên bedena wê de bi rengêkî helesor diçirîşin.

Tekane midekî lê temaşe kir û ber pê çû. Bi dengêkî bilind got-ê: Roja te xweş Enîle..

Keçikê lê vegezar: Xweşiya te li ser çavan.

Tekane: Tu dixwazî em bi hev re vege-
rin gund

Enîle: Belê..

Enîle jî avê dertêt, kincên xwe bi xwe ve dike û her du didîn rê. Midekî xwe ker dikin. Ji nişkekê ve Tekane dibêje: Enîle, dixwazî bibî jina min?

Enîle: Bavê min ez dame Gursinî. Ewî jî berxek da bavê min. Lê tu mezinê gund î. Bi bavê min re xeber bide.

Gava digehin gund her yek diçe mala xwe. Tekane xwe li ser hesirê dirêj dike û dide texmînan. Canê Enîlê î tazî yê ko di nav avê de û bi tirêjên tavê wêk misînekî sifr diçirî her li ber çavên wî ne.

Dinya dibe şev. Deşt û rêl ker û bêdeng in. Tekane bi xiyala Enîlê di xew re diçe. Lê ew xiyal jê re dibe xewineke bê dawî û bi nivê şevê ve Tekane hişyar dibe û nema

pinive, herê xwe dide mala Pengalê.

Heyveron e, pel û çiqilên daran sipî dikin. Avî daketiye, wek lûlûyan bi giyan ve bûye.

Pengale hêj hişyar e. Qedirê mêvanê xwe digire û wî li ser hesira xwe rûdinfne.

Tekane dibêje: Îşev min di xewina xwe de dît ko ez dibim mêrê Enilê. Tu ko* bi tiştan dizanî ka bêje min, ez çi bikim?.

Pengalê da eqilê xwe; rahişte şûşekê û jê aveneke tîr berda nav firaxekê û hinek ava zelal jî lê kir û firax tev da û lê hûr bû. Di firaxê de ber tişt lê xuya kiri bû.

Pengalê berê xwe da Tekanê û got ê: Tekane, li ser vê meselê divêt tu bi şeytên re xeber bidî. Ji bona vê yekê jî divêt tu di çalekê de du şev û du rojan hêf veşarlin. Ezê ji derveyf çalê zengilekê deynim û benekî pê ve girêbidim. Serê ben ewê bi te re bibe. Piştî ko te şeytan dît û îşê xwe pê re saz kir tiwê li bên bişidini zengil wê deng bide; em jî emê çalê vedin û te jê derêxfnin. Lê heke te divêt îşê te here serî herî şeva didowan li zengilê mede

Sibetirê Tekane gundiyan xwe gihandine hev û gote wan:

— Pengale her tişt dîtine. Ji bona Enile min bike divêt ez bi şeytên re xeber bidim. Ji lewre ezê xwe di çalekê veşêrim. Şeytan wê bête nik min û ezê pê bişewirim. Hetanî ko ez di bin axê de me divêt hon di gund de şahînetê bikin.

Herkesî çîma xwe pê anî û deng ne kir. Dongo, bavê Enilê jî bi wan re got herê.

Gundiyan çalek kola. Çaleke kûr. Li ser stûnekê jî zengilek danî bûn. Bizengilê ve benek hebû; diçû hundirê çalê.

Tekane bi cilên xwe ên resmî bi çakête xwe ê sor hate ber çalê; silav li xelkê kir, destê Enilê guvaşt û daket biniya çalê û xwe lê dirêj kir û benik xiste destê xwe. Hesîrek anîn û ew bi çar sîngan li ser Tekanê vegirtin da ko di bin axê de bikare serbest bihina xwe bide.

Pengalê kulmek ax avête ser hesrê û gundiyan çal bi axê dagirt. Dema çal diretimandin pengalê tiştin dixwendin û banî şeytên dikir.

Ji bo şahînetê, xwarin û vexwarin ber tişt hazir kiri bûn. Hema dest bi reqîs û strandinê kirin. Gundî di dora çala Tekanê de dirêqîsîn û ji şeref û siheta wî re vedixwarin. Enile diket pêşiya govendê.

Herçî Pengale, enterikî heşin li ber, li keviya çalê rûniştî difikirî û carina lêvên xwe tev dida û hin tişt digotin Enilê. Pengale bi şeytên re dipeyivî.

Şeva didowan destî pê kiri bû. Jin û mêr tev de sergerm û serxweş zor didan reqîs û şerabê. Enile ji herkesî bêtir bi kêf bû. Tekane piştî çend saetan ji çalê wê derketa û Enile bi izin û destûra şeytên wê bibiwa jina wî; destgirtiyê wî jî, ji ber wê derketa.

Stêrka sibê li wan hilatî bû. Pengalê emir kir û herkesî xwe ker kir. Zengilê wê lêdaya. Çavên herkesî lê hilawistî bû. Wext diborî tu deng ji zengil ne dihat. Dinya zelal dibû. Li rûyên gundiyan qermîçekên endîşeyê xuya dikirin. Pengalê dîsa emir da; çal vedan. Tekane xuya kir. Benê zengil nema bi destî ve bû. Serekê gund di nav çaketê xwe ê sor de perçiff bû. Rûyê wî ê reş wek diwarekî nivdüyî gewer bû bû. Pîpoqên çavênwî nema diçirîsîn.

Bêşik, Tekane şeytan dîtî bû û pê re axaftî bû. Lê kesî ne zanî ji hevîdin re çi gotî bûn. Ji ber ko serekê gund nema xeber da.

Li ber tirba Tekanê bi tenê Enilê û Pengale rûniştî bûn û digirin.

Pengale bi sûcê sêhîrhaziye ajotin pêşberê mehkemê. Mehkemê bîst sal lê bikim kirin.

SMAJ VE SERHEDI



HINEK JI HENEK

MA TU BI LINGÊN XWE DIXWÎ:

Du nêçirvan, ji nêçira werdekan vegeriya bûn bajêr. Xwediyê timobilê hevalê xwe gihandi bû mala wî. Gava ke tin hundirê xênî, xwediyê malê gote hevalê xwe:

— Kerem bike rûne ez ji te re çayekê çêkim û em pev re parik nan bixwin.

Xwediyê timobilê (çîştî ko çîzmeyên xwe ên bi herî şanî hevalê xwa da) Ma tu nabîni ez çîqas rêvin in; di vî halî de ez çawan nan bixwim.

Xwediyê malê (bi ken) Min nizanî bû ko tu bi lingên xwe dixwî.

SILAVAN LI MIHEMÊD BIKE:

Yek hebû nîyeta hecê kirî bû. Rastî hevalekî xwe hat û got ê: Ez dikim herim hecê, te ji Mekê tistek divê?

Hevalê wî: Silavan li Mihemed bike.

JINÊN AVIS:

Du hevalan der heqê eskeriya jinan xeber dîda. Yekî digote ê din:

— Gelo rast e ko di eskeriyê de jinên avis di ser ên din re digirin

Ê din — Belê rast e û mîaşê wan jî ji ên din bêtir e

Hevalê pêşin — Na sebeb çî ye?

Hevalê diwemîn — Carekê mîhafaza balafirgehêkê sipartî bûn eskerên jin. Balafirên dijmin bi ser balafirgehê de girtin û bi paraşûtan çend esker daxistin-ê. Mihafîzan dest bire xwe û teq û re jî çêbû. Di nav mîhafîzan de çend jinên avis hebûn. Bi teq û reqê ve jinên avis tev de zan û hemîyan kur anîn. Kurikan gava dît ko ser e û deyên wan lebikîne, dane xwe, rahişîne tiştingên deyên xwe, bera dijmin dan û ew safî kirin.

BÊ KIRAS Û DERPÊ:

— Bira delêletên qiyametê

dest bi xuyabûnê kirine.

— Çawan?

— Ma tu nabîni, jin di kûçan de çîprût û mîltazî digerin

— Ma ev jî tiştek e. Yekî gote min ko wî bi xwê jinikeke bê kiras û derpê dîtiye.

— Ji dil dibêji, an henekan dikî?

— Ji dil...

— Ma ew jinik kî bû, hêye ko yeke dîn

— Ne dîn, ne tiştek; jina mêrik bi xwe bû.

ZENGILÊ SAETÊ:

Yek bû bû mêvanê camêreki. Mêvan û xwediyê malê hela piştî nivê şevê rûniştin.

Xwediyê malê saetêke bizîngil hebû û her şev ew ba dida û li şeşan siwar dikir. Wê şevê jî welê kir û saet di oda mêvanê xwe de jî bîr kir. Scrê sibehê saetê li saet şeşan lêxîşt û mêvan hişyar kir. Mêvanê

kêmxew rabû û rûnişt. Piştî midêkî xwediyê malê hate cem mêvanê xwe û gava ew rûniştî dît jê re got:

— Te xêr e, tu çîre bolê zû hişyar bûyî?

Mêvan — Zengilê saetê lêxist; min çavên xwe vekirin û ez li hêviyê mam. Gava min dît ko kes jî we ne hat, min di dilê xwe de got ko we saet jî bona min siwar kiriye. Ji lewre ez rabûm û rûniştim.

TEMASA BELAŞ:

Mehkûmekî fdamê biri bûn ko bi dar ve bikin. Mêrik gava hilkişiya ser kursî û çavên xwe li xelkê dora xwe gerand di nav xelkê de jina xwe dît û got-ê: Kanîn, zaro li kû ne?

Jinikê — Li mal in

Mêrik — Ji xwe carê ko temaşake belaş heye tu zarowan bi xwe re nabî. YARÎKER



ŞAGIRTÊN KENEDÎ DI ZIYARETA OKSFORDÊ DE

Dasitana Fransa Şerevani, di şikestinê de zefer, di neynê de heynek e.

Li 24ê Hizêrana sala 1940î gava ordîwa

fransîzî çekên xwe danîn û qewetên elemanî ên mēkanî di ber Bordoyê re borin û gîhaştin tixûbên Spanyayê; herkesî got: Fransa mir.

Fransa jehrî bû bû. Dilê wê nema hiltavêt. Yê ko bi tenê bi çavên xwe didftin û bi tenê bi mejiyê xwe difikirin holê seh dikirin û holê digotin.

Lê piştî çendekê, dinya-alemê dît ko Fransa ne miri bû û dilê welatê Golan hêj hiltavêt. Peyakî, mirovekî bi tenê, yê ko li felaketa welatê xwe bi çavên dilê xwe dinihêrt û bi mejiyê dilê xwe difikirî, dengê xwe bilind kir

LEKLÊRK Û FRANSA ŞEREVANI

« LECLERC ET LA FRANCE COMBATTANTE »


û bi pêlên radyowê ji av û ax û ezmanan re da zanîn ko Fransê çerek wînda kiri be jî, zora wê, zora bazûyên çêliyên di wê ne çûye.

Ew zilam genêralê Fransê ê ciwantir De Gol bû.

De Gol di pêşberî miletekî teslimbûyî de zilamekî bi tenê bû; zilamê asê. De Gol ne ew yek bû ko li berberî hezarî ye. Lêbelê De Golew yek bû ko li berberî çil milyonî ye. Lê ew yek, ji wî çil milyonî xurtir bû. Wî çil milyonî goti bû « Belê ». De Gol digote « No ».

Gava çil milyon dibêje « Belê » ji wî yekî re ne hêsani ye ko bibêje « No ». Lê De Gol got. Ji xwe qedir û hejabbûna De Gol, di wê « No » yê de ye.

Piştî ko De Gol gote « no » ji « no » yê re



meyldarin çêbûn û ji Fransa teslîmbûyî der, Franseke din bate pê, Fransa Aza, Fransa Şerevani. Dilê xelkê Fransa teslîmbûyî jî bi dilê Fransa Şerevani re biltavê.

GIRTIYÊ

KELEHA EWROPAYÊ

Roj bi roj, beriya standina Tûnisê bi şeş mehan, qewetên emêrikanî û inglîzî daketin Efrîqa bakur. Elemanan digel talyanan berda Fransa nevegirti. Piraniya stola fransîzî di bendera Tûlonê de bû. Piştî çend rojan elemanan bêbextiya deryavanên Tûlonê kire behane û ajote benderê. Balafirên devê benderê bi torpîlan girt.

Stol lengerendaz û li bejê hilpesartî bû. Ne dikarî xwe tev bide û xwe li dûrahiya behirê bigire. Deryavanan bi tîfing û şeşderban şerê neyaran kir û gava bêgav man, digel keştiyên xwe, li pêşberê alê, dest li silavê, bin av bûn, mirin.

Belê mirin, bêt ko bera dijminan bidin....

Mirin bêt ko dijmin bera wan bide..

Mirin, bêt ko ji wan re bibêjin bimirin...

Mirin, bêt ko neyar li mirina wan bigere...

Mirin di demeke welê de ko dijmin xwazekarê jiyîna wan bû...

Belê mirin, ji bona ko çekên wan nekevin destên neyar....

Belê qîma xwe anîn ko xwe bispêrin mirinê. Lê çekên xwe ne spartine dijminan...

Giyanê wan şa, cihê wan bihuştin be.

Leklêrk... Ereb dibêjin ko navên mirovan ji ezmanan datên. Heke welê ye navê wî camêrî ji ezmanan danelatîye. Heke ji ezmanan dahati biwa Xwedê navê wî ne dikir (Leklêrk-rihbanî) Iê navê (Leklêrk-brûsk) Iê dikir û ev nav ji herkesî bêtir lê dihat.

Okinlêk baskê xwe ê çepê da bû teqanekê û Romel di deriyên Iskenderiyê de sekînanî bû. Mongomerî ordiwên milwerê da bûn pêşiya xwe û ew ber bi Trablîsêrbê tajotin.

Car-caran ajansan nûçeyek belav dikir û digot, qewetên jeneraal Leklêrk ji Çadê — merkeza Efrîqayê — rabûne û berê xwe dane Fîzan û Trablîsêrbê.

Nemaze di vî şerî de, bi derewan çavşkê-nandin — propagande — roleke mezin leyistîye. Xelkê gava ev nûçe dibihîstin, dikenî û di dilê xwe de digotin ev jî yek ji hezar awayên pragpandê ye.

Xebera wan bû. Ma Leklêrk ji Çadê wê çawan bihata Trablîsêrbê. Ma îmkana wê heye ko insan bê vapor li Elfanîkê derbas bibe. Bi hezaran kîlometir diketin navê; erdekî bêxêr, ne dar û ber, ne av û giha... Qûma bêpîvan, ji hev dikişiya....

Hinan goti bû ko Hitler Napolyon e, Napolyonê elemanî, Napolyonê sed sala bîstan. Hin dibêjin ko Hitler bi xwe jî di vî fikrê de ye, an di vî fikrê de bû. Ewî jî bawer dikir ko Napolyon di wî de vejîyaye.

Herçî tarîxa cengê dînyayê xwendine qenc dizanin Napolyon çî serdar, çî dehake eskerî bû.

Napolyon sê tiştên mezin da bûn ber çavên xwe.

1 — Ber bi rohelê fireh bûn û şikestina ordiwên rûsî

2 — Hakîmiyeta Behîra-spî bi dest xistin û vegirtina kêşwerê Misîrê

3 — Li behîrekê 35 kîlometîran dirêj derbas bûn û şikestina Ingîlistanê

Napolyon rexma her zehnet û dişwariyê gihaste Moskoyê; di xwana çarên ûris de şiv û taştê xwarin û di qesîrên wan de xew kir.

Napolyon derbasî Efrîqayê bû û beriya ko dirêjî Qahirê bike li ber ehramên firewînan sekinî û gava nav di eskerên xwe da got: Çil sedsal di ser van ehraman re li we temaşa dikin.

Napolyon stolek da çekîrin, berê xwe da

Lê ev nûçe rast bû. Kepîlênek, ji hezar kepîlênan fransîzî ên bextereş, ji yên ko di şerê Fransê de di keti bûn destên elemanan, ji hêşîngahê revî bû û piştî ko bi bisiklêtekî giha bû keviya behirê xwe gihandi bû Ingîlterê û gihasti bû mêrê ko goti bû « no ».

Ev kepîlên Leklêrk bû. De Gol ew şande Efrîqayê. Leklêrk bi çend hevalan re gihaste Kemerûnê. Wall û kumandarê Kemerûnê yekî kulenê û di bin emîrê Vîşiyê de bû. Kulnêl ji ya Leklêrkê kepîlên ne kir.

Lê Leklêrk ne ew peya bû ko vîna wî li ber şerîtan kulnêl bişkê. Kepîlên dudilî ne kir, xwe kire jeneraal û kulnêlê serhişk da girtin û ew hepîs kir. Jeneraal Leklêrk bû bû hakim û kumandarê mistemlekê. Leklêrk ne li hakîmiyeta mistemlikê lêbelê li hakîmiyeteke din digeriya: hakîmiyeta qada şer.

Jeneraalê dixwekirî xebitî, esker da hev, ew bi çek kirin, ew dan talîm kirin û ordûke nûjen anî pê. Ji merkeza Efrîqayê rabû di seh-rayê re derbas bû. Bi rê ve kelehên talyanî tev de zemt kirin û roja ko ordîwa heştan diketê Trablîsêrbê ala Leklêrk jî di ser wan re li ba dibû. Roja ko sondixwariyan berda Tûnisê dîsan Leklêrk ala xwe a serêngin dixiste cihê şan û şerefê.

RONAHÎ

Britanyayê; lê pê li erdê Ingilîstanê ne kir.

Welê dixuye ko Napolyonê nû jî ev her sê armancên mezin da bûn ber çavên xwe.

Napolyon, herçend piştîre bi pêrişanî jê vegeriya be jî, gihastî bû du armancan. Ketî bû Moskoyê, Kişwerê Misirê vegirti bû.

Hitler çi kir?

Piştî sefera Fransê merêşal Göring qerargaha xwe li peravên Manşê danî, plana ko li Berlînê hati bû çêkirin raxiste erdê û bi dûrebînê temaşa giravên Ingilîstanê kir. Plan û kirde li hev dernediketin. Ji xwe Napolyon jî nikarî bû derbasî Ingilîstanê bibe. Lê ceribandî bû. Hitler pîrsa xwe bi serdarên xwe xist û ji ceribandîna jî geriya. Bi bombaranên hewayî bes kir. Londre xerabazar bû. Lê can û giyanê ingilîzan ji piyan disekin.

Napolyon ketî bû Moskoyê. Li 22ê Hizêrana sala 1941ê bi sariya sibê ve Hitler emir kir eskerên xwe û got, armanca we Mosko ye.

Mekîna elemanan ya cengê a dojhîn xwe tev da. Ūris dişikestî; lê di şikestinê de jî li ber xwe didan. Elemanan barê xwe peyda kiri bû. Ordiwa Hitler a brûskî gihaste ber deriyên Moskoyê. Ūris lê vegeriyan û brûska Hitler di xwîna xwe de vekuştî; eleman bi şûn de avêtin. Hitler ne ket Moskoyê. Napolyon di textê çaran de xewînine tehl û şêrin diti bûn. Hitler lihêfa Stalin bi xwe danekir.

Napolyon li Sfenks û ehamên Misirê temaşa kiri bû. Hitler emir da serfermandarê Efrîqa-kor ko paytextê firewanan zemt bikin. Romel gihaste Elemeynê. Ji ber dengê topan xew li xelkê Skenderiyê diçû. Ingilîzan Romel bi şûn de veqerand; serfermandarê Efrîqa-kor ê bextereş piştî ko ordiwa xwe di qûma Efrîqê de hişt; bi balafirekê derbasî Îtalyayê bû. Hitler ava Nilê mibarek a şeylo tam ne kir.

Napolyontî bi kerî rêberê elemanan ne hat. Mosko bi dest ne ket, Hitler çav bi Qahirê û ebraman ne kir.

Henîbal ji Ewropayê vegeriya bû Efrîqayê û di Kertacyayê de asê bû bû. Hitler ji Efrîqayê vegeriya Ewropayê û di vê kelehê de asê bûye.

Belê Hitler ji Ewropayê re keleha min dibêje; çi keleheke mezin.....

Di dinyayê de fenine nû û kevin hene. Fena cengê jî her fenê kevintir e. Vê fenê qeydeyine welê hene ko ew bi guhêrîna hacetên cengê bi tu awayî nayîne guhartin. Belê ew qeydê û tarîxa cengê şanî me dide ko

şerevanî hetanî ko bêgav nemînin bostek erd jî ji dest nadin û dev jî êrişê bernadin. Bi tenê gava bêgav dimînin û riya êrişê bi wan nakeve hingê xwe didin esêgehê û li ber xwe didin.

Herwekî di her şerî de, di vî şerî de jî mêranî şertê pêşin e. Lê hacetên ko ji wan mêran re divêtin, fro ew jî her wextî bêtir û têvel in.

Dema ko eskerine silehbîdest di eniyan de şer dikin, di pişt-eniyê de eskerine çakûçbîdest di fabrikan de, xebateke zor dixebitin û ji wan re çekan çêdikin.

Îro her du aliyên şerevanî zora xwe dane çêkirina çekan û dikin di vî warî de jî hev derkevin.

Netîce jî niho de xuya ye. Yê ko berî dest pê kiri bûn îro li paş û yê ko paşî dest pê kirine li pêş in û jî niho û pê, de ewê her jî neyarên xwe derkevin.

Hitler jî roja ko hikim xistiye destên xwe dest bi karbûnê kiri bû. Fabrikayên elemanî jî hingê ve hacetên cengê çêdikirin. Roja ko şer dest pê kir, nemaze di sefera Fransê de mezinahiya haziriya elemanan xuya kir.

Di wê seferê de piraniya tang û balafirên elemanî ordiwa fransîzî şaş kiri bûn. Balafirvanên fransîzî, carina dehyeka yê elemanan bûn. Tangên elemanî gava xeta fransîzan neqeb dikirin û tê re derbas dibûn, gelek caran tangên dijmin bi qasî topep fransîzan ên bertang hebûn.

Herçî noqav. Noqavên elemanî li behîrên dinyayê belav bû bûn û bera vaporên sondxwariyan didan. Kêm caran qala noqavên sondxwariyan dikirin.

Eleman bi her haziriyê serdestê neyarên xwe bûn; jî stolê pêve.

Sondxwarî di gelek deran de dişikestî; li her derê kêmasiya baziriya wan xuya dikir. Lê sondxwariyan li ber vê rewşê jî alikî şerê neyar dikir, jî aliyê din jî nû ve û bi her awayî xwe kar dikir.

Eleman herwekî bi xwe jî mikur hatine, di Ūrisan de xapiyan. Heke Ūris jî elemanan bêtir nebe jî bi qasî wan karkirî derketin.

Xebata sondxwariyan jî mêt ve fêkiyên xwe dane. Ji niho û pê de ewê hero zêde bike jî, Herçî eleman nisbet bi hevalbendan hero kêm dikin.

Ji aliyê din divêt neyête jî bîr kirin ko fabrikeyên elemanî ev deh dwanzdeh sal in dixwebitin. Heye ko hin makîneyên wan ên

mak maşiyane û divêt bêne gubartin. Lê herçf yên hevalbendan, nemaze yên emêrkaniyan; dihi ne pêr hatine siwar kirin; hêj perdaxa wan li ser e.

Ji milê din sondxwarî di welatên xwe an di welatên dost û hevalbendên xwe de dixebitin û di gelek deran de, Emêrike seranser, ji hawîrê bombarana balafiran nependî ne.

Herçf elemanan di vê babetê de halê wan yekcar bervajiyî halê hevalbendan e. Berf ewilî fabrîkeyên elemanî tev de di bin hikimê balafrîn ingilîz û emêrikanî de ne. Ji aliyê din birekî fabrîkeyên elemanî di erdine neyar de ne û yên ko tê de ji elemanan re dixebitin tev de dijminên wan in.

Bidin eqilê xwe û binin ber çavên xwe, peyayên di bin 'tehdîda' singoyan de bi çî dilî û bi çî awayî dixebitin. Ew peya dizanin ko bi çekên ko ew bi xwe çêdikin; sibe neyarê wan bera dostê wan de bide.

Hitler dibêje « Hemî Ewrope ji min re dixebite ». Betê dixebite, lê bi vî awayî.

Em bèn ser keleh û girtiyê wê.

Belê Hitler dibêje Ewrope keleha min e; min ew asê kiriye; heta dawiyê ezê tê de rûnim. Herçf dixwaze û jê te, bila bê û barê xwe li barê me xîne.

Îro rêberê elemanan bi vî awayî zirtê xwe dide. Berî sê salan, piştî sefera Fransê, û piştî ko ji vegirtina Ingilîstanê aciz ma, bi awakî din dipeyivî û gava zirtê xwe dida digot: « Bila ingilîz di peravên Manşê de ji xwe re erdekî bineqînin. Ezê wî erdî ji wan re vala bikim, bila bèn eskerên xwe bi rahetî daxin wî erdî, tê de cih bibin û em şerê hev bikin ».

Lê me heq nîne em ji xelkê ji ber zirtan gazidan bikin. Hin hene gava zirtê xwe didin, dibêjin: « Ez tira kerê nêr im ».

Hitler dixwest zora dewletên mezîn bibê û dinyayê vegire. Gava jê ne hat di keleheke de asê bû.

Gelo wesfê Hitler di kelehê de çî ye? Jê ve hakimê kelehê ye. Di rastiyê di girtiyê wê ye.

Ordiwek wextê ko bêgav dimfne; di keleheke xwe de asê dibe û digel xelkê kelehê xwe ji êrîşa neyar diparêze. Lê keleha Hitler, keleheke ecêb e. Jê re divêt xwe ji êrîşa xelkê kelehê jî biparêze. Bi rastî piraniya xelkê kelehê bi xwe neyarên wî ne.

Îro Hitler bi qeweta singoyên xwe li xelkê kelehê kikum dike; lê nema dikare jê derkeve. Ji her alî rê lê hatine girtin û rêberê elemanan tê de asê û girtî maye.

Dil kir ko derkeve. Berê xwe da rohelat; çû heta ber deriyên Moskoyê. Lê şikest.....

Gelo di tarixê de qedera kelehan çî ye û çî bûye?

Tarîx şanf me dide; herçf kelehên ko dijmin lê wer hatine zû, dereng û bi awakî ketine an teslîm bûne. Carina ji kêmzadî, carina ji kêmbûna cebirxanê û carina jî bi hicûma cebirî.

Bi tenê kelehînan hatine dîtin ko kelehvanî xeta mihaserê qelaştine û xwe gihandine giraniya ordiwê. Lê keleh dîsan ketine destên neyar. Bi tenê kelehvanî ji hêsfriyê xelas bûne. Lê ev ihtimal jî bo keleha Hitler nayêta birê. Hitler di kelehê de digel giraniya ordiwa xwe girtî ye. Zilamê ko kiriye eqilê xwe berê qedera miletêkî di rîya tarixê de ba bide; diviya bû çêtir, bêtir, dûrtir û kûrtir bidîta.

Bê şik ko qedera keleha Ewropayê jî ev e; wê bikeve, fro.... sibe.... dusibe...

Bi me be rewşa elemanan di kelehê de wek telîsek genim di enbarekê de ye. Heke êrîşvanî enbar ne şkênan û telîs bi dest ne xist, mişkên dora enbarê telîs wê biqetînin û genimê wî hebo hebo de bixwin.

HEJMARA HAWARÊ A 55an LI 15ê HIZÊRANÊ BELAV BÛYE. LÊ BIGERÎN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

Tefsîra Quranê. Lwis Pastôr. Diwana Melê. Daylan. Memozîna Xanî. Diljarê Xemgîn.
Hawar e. Pênivîs. Şeytanqûnî.

Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc lîreyên sûrî — Ji bo welatên din lirekt ingilîzî

Xwedî û gerinendeyê berrpirsiyar : Mir Celadet Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Dîjêladet Aalî Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 17
—
YEKŞEMB
1 TEBAX 1943

RONAHI

ANNÉE 2
NUMERO 17
—
DIMANCHE
1 AOÛT 1943

SUPLÈMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

PALEYIYA INGILISTANÊ



Di vî şerê xwixwar de Ingilistan ne bi tenê di qadên şer de, lê di her warî de xebateke zor xebitiye; guh daye cotkariyê jî. Resimê jorîn gundîki ingilîzi şanî dide yê ko digel keça xwe şixra xwe dikiyîne. Lê welê dixuye ko ingilîz şixra xwe ne li ser ker û hêştiran jê li ser ereban dikişînin.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Sadê Hemê	Stranvan
Ehmed Çelebi	Çirokbêj
Mijo û Xane	Osman Sebrî
Yohanes Gûtenberg	Herekol Azîzan
Reşbelek	Bavê Cemşîd
Îgil çawan binav bûye	Cemilê Tacdo
Nêçîr	Osman Sebrî
Eşîra Zirikan	Hesen Hîşyar
Lempedûza	Evdirehman Rojki
Şêxê Barzan	Osman Sebrî
Gîrava Jinan	Evdileziz Metwar
Napolyon	Osman Sebrî
Hinek ji Henek	Yariker
Bî ser kelêhê de girtine	Ronahî
Rê ji ber wînda	M. Beşîr Hesenî

STRANA KURDMANCI:

||| SADÊ HEMÊ

Şade şûdê Ehmedê Elo gamêşê çiravê, qesabê mêra,
[qaçxûnê dewletê, şêrê zozana gelek hene.
Bi lopa maqûlê dêrikiya, bi şeş lopa, bi duwazde mitral-
[yosa, bi lopa Heska Remoya wê rojê ji newala meşkîna
[bi sê şopa kire der e.
Bira şerek daneketa li Meşkîna şewitî li ber warê.
Sadê Hemê dengê ba dikir, Ehmê Elo, lawo tu mîrekî
[çê be, bixêbite, pakêlê bavê dewê mirata enexdarê.
Megere li kuştîna nefera, bigere li kuştîna zabit û ku-
[mandaran,
Ma şalê tu îro hîlîni heyfa Hemê delalê.

De bira şerek daneketa li Meşkîna şewitî li kokê beriya.
Bira Xwedê teclata xerab bike mala maqûlê dêrikiya,
[binbaşî û ofendiya.
De çawa li ser serê bavê Şêxo, apê Cemil, qesabê mêra,
[qaçxûnê dewletê, şêrê zozana
Jê tê dengê topan û mitralyosa, şerqînê miralê çapliya.

De Çûço bi sê dengê ba dikir Sado bira, li me fer-
[man e, ferman e.
Fermana me rabû ji cem maqûlê dêrikiya ji xelkê
[diyarbekriya, ji kumsorê mîrdîniya
Fermana me rakirin berê me dan serê çiya
Weyla li min, berê me dan gulên û kuştînê
Paşiya me dan hikûmetê şewitiya mirinê.

Şerek daneketa li Meşkîna şewitî, li kokê kembera
Lî ser serê bavê Şêxo, apê Cemil, qesabê mêra, qaç-
[xûnê dewletê, şêrê zozana.
Jê tê dengê topan û mitralyosa, xirpênê miralê ma-
[wîzêra.
Sadê şûdê bavê Şêxo, apê Cemil, qesabê mêra, qaçxûnê
[dewletê wê rojê yelek hene
Gelek cara liçûm kir li ser kozikê negara bî xencera.

Dilê min evdalê Xwedê dil dibê ye
Bira şerek daneketa li Meşkîna şewitî, va bi rê ye

ÇIROKA KURDMANCI:

||| EHMED ÇELEBÎ

Carek ji cara rehmê li ser da û babê guhdara. . . .

Dibêjin carekê şivanê gundekî û gavanê gundekî ditir gelek dostên hev bûn. Heroj di çolê de digihan hevûdu. Rojekê gavan dit şivan bê kêf e. Gavan got-ê, ey bira tu çira bê kêfî? Şivan got, min şevêdî xewnek diye lewre ez bê kêf im. Gavan got-ê, bira Xwedê xêr bikî çî xewin e?

Şivan got, min dîtîye ez dirêş kirî bûm; roj li milê min ê rastê bû û hêv li milê min ê çepê bû. Du stêr li ser singê min dileyistî. Gavan got şivan, tu xewîna xwe nafiroşî min bi çêleka min. Şivan got, belê min daye te. Gavan got, min qebûl e.

Ûvarê gavan hat mala xwe got gundiya, li gavanekî ji xwe re bigerin, lewre riyek va min heye ezê biçim.

Sibehî rabû çû; berê xwe da oxurê, piştî xwe da felekê. Rojekê dema mexribê çû ber

De bira Xwedê teclata xerab bike mala qeynegamê Dê-
[rikê, mîleserîfê Mêrdîtû, waliyê Diyarbekrê ye.
De bira Xwedê xerab bike oxaxê eskerê nefîramê ye
Derbekê lêda li bejn û bala bavê Şêxo, apê Cemil,
[qesabê mêra, qaçxûnê dewletê ye.

Çûço bi sê dengê ban dikir Sado, keko li me ferman e
Fermana me rabû ji cem maqûlê dêrikiya, ji xelkê
[diyarbekriya, ji kumsorê mîrdîniya
Fermana me rakirin, berê me dan mirata Herêzmê ye.
De bira şerek daneketa li Meşkîna şewitî wa li kaşa
Li ser serê bavê Şêxo, apê Cemil, qesabê mêra, qaç-
[xûnê dewletê şêrê zozana
Jê tê dengê topan û mitralyosa, şerqînê heşalaşa.

Lo lo! hekîno tê mal ne bi xana Xwedê be
Te çawa canê bavê Şêxo, apê Cemil, qesabê mêra,
[qaçxûnê dewletê, şêrê zozana
Te da ber miralê qelemîtraşa
Keko ferman e, ferman e
Fermana me rabû ji xelkê diyarbekriya, ji kumsorê
[mîrdîniya
Fermana me rakirin ji Stenbolê, ji ba siltan e.

De bira şerek daneketa li Meşkîna şewitî bi mermer e
De bira Xwedê-teclata xerab bike mala maqûlê dêrikiya,
Bi şeş lopa, bi duwazde mitralyosa, bi eskerê nefîramê,
[bi roma, malek wêran wê rojê kişiya ser e.
Sadê Hemê dengêkî ban dikir Ehmê Elo lu bawî
Tu mîrekî çê be, bixêbite, hêla peya, alî forîna bera
[mede.
Megere li kuştîna nefera bigere li kuştîna zabit û
[kumandaran û binbaşiya.

dergehê Diyarbekirê. Derghevana derf girti bûn. Gavan ma li ber derî, sekinî. Gavan got ezê ji ber derf biçim li ber sûrehê bisekinim çêtir e. Gavan ber sûrehê ve çû, dît mirovek li wê derê razihaye; hespê wî jî li wê derê.

Gavan jî li nik wî rûnişt; hişyar ne kir. Demekê dirêş ma. Dengê jî serê sûrehê seh kir, got, bigire. Gavan rabû girt, dît xurcek tijî zêr in. Got, dane ser hespê, arî min bike, da ez jî bêm.

Gavan arî kir ew jî hat. Ew kî bû. Keça hakimê Diyarbekirê bû.

Keçikê got, siwar be; da em biçî. Gavan siwar bû, keçik li pişt xwe siwar kir; çûn. Heta bû roj. Keçikê dît ne mêrikê wê ye. Keçikê got min di xewna xwe de dîtiye ez bûme jina şivanekî; Xwedê bikê şivan bê, ne î gavan bê.

Paşê, demekê çûn. Keçikê di dilê xwe de got, ezê biceribînim. Keçikê got, xwezî ev mîrg û çîmena ha tijî pez biwa, tu li ber biwayî; du sey paş te hebûna.

Mêrikî deng ne kir. Jinikê di dilê xwe de got, gavan e, ne şivan e. Paşê, demekê çûn. Dîsa keçikê got, xwezî ev mîrga ha tijî dewar biwa; tu li ber biwayî, çawan dibû?

Gavan got, xwezî, gelek qenc dibû. Keçikê zanî gavan e, ne şivan e. Hema dey ne kir. Çûn heta gihan Mûsilê. Nanîk ji xwe re kirê girtin; mehra xwe kirin, rûniştin.

Navê gavan Ehmed bû; çelebî li ser zêde kirin, gotin Ehmed Çelebî.

Rojekê Ehmed Çelebî çû hemamê. Ji he-

mamê derket, zêrek da hemamçî. Hemamçî deriyê hemama xwe girt, çû mala xwe. Jina wî got-ê, tu çîre hatî ji hemama xwe? Got, tucar min wek fro kar ne kiriye; yek hatiye zêrek daye min.

Piştî du sê roja Ehmed Çelebî dîsan çû hemamê û zêrek da hemamçî. Hemamçî çû mala xwe, got jina xwe. Jina wî got-ê, ev zîlamê ha yan mirovekî zehf elmeq e, yan mirovekî zehf mezin e. Ezê sibehî taştê jê re çêkim. Tu wî bine mal da ez wî bibînim.

Hemamçî got Ehmed Çelebî, sibehî tu bêt mala me taştê. Ewî got, qenc e, lê mirovek yê min heye ezê jê pirs bikim.

Ehmed Çelebî çû ji jina xwe pirs kir. Jina wî got qenc e; here mala wî taştê. Belê tu jî wî dusibehî bine mala me taştê.

Ehmed Çelebî sibehî çû mala hemamçî taştê. Jina hemamçî taştê anî. Firaxek birinc, hinek nanê genim û firaxek nîsk, hinek nanê ceb.

Ehmed Çelebî du keşîk birinc xwarin, hinek nîsk xwar. Jinikê got, Çelebî çîma birincê naxwî? Çelebî got, ez jî birincê aciz bûme, yanî jê kerixîme. Jinikê got mirovekî mezin e, ne î elmeq e.


Dema Ehmed Çelebî rabû got hemamçî tu jî were mala min taştê. Hemamçî gelek dîlxweş bû biçê mala Çelebî bibîne.

Dema bû roj, hemamçî çû mala Çelebî. Dema çû dergêh, kuçkê çavê wî li jina Çelebî ket. Hişê wî çû, qe nikarî rûnît. Jina Çelebî got, tu birayê mîrê min î, an kurmamê wî, tu çîre mîrê min dibî taştê. Dest avêt darekî, rabû gelek li hemamçî da.

Hemamçî revî çû cem hakim, kir hawar. Got, mal jî min re, jin jî te re. Ji hakim re bi temamî got. Hakim got herin wî bikujin jina wî bo min bînin. Wezîr qebûl ne kir; got hakim, tiştêkî jê bixwaze ko nikarî dikit paşê wî bikuje.

Hakim Çelebî xwest cem xwe; got, Çelebî min hinek sêvên cenelê jî te divêtin. Eger tu jî min re neyînî ezê te bikujim. Çelebî çiqa hêvî kir hêviya wî ne borî.

Çelebî hat cem jinika xwe, xemgîr. Jinikê got, Xuda xêr bikit, çî li te dest da? Çelebî



BALAFIREKE INGILIZÎ PIŞTÎ ÊRÎŞÊ DI BALAFIRGEHA XWE DE

bo jina xwe temamî got. Jina wî got-ê, here nik haki nû bêj-ê mihleta çil rojan bide min, ezê biçim ji te re bînim. Mesrefa min û mala min ji kîsê hemamçî.

Çelebî çû cem hakim ev xeber gotin. Hakim got hemamçî zû peran pêk bîne, bibê mala Çelebî.

Çelebî zivirî hat mala xwe. Jina wî derket ser banî, got; Çelebî were ez hêjim te. Jinikê berê xwe da çiyayî û got mêrê xwe; tu wî heşinahîya henê dibînî. Abidek li wê derê heye, ibadet dikê û quranê dixwînit. Here cem wî, ewê sêva ji te re peyda bikit.

Ehmed Çelebî siwar bû, berê xwe da ewî cihî. Çû li wê derê; abidek dit quranê dixwîne. Gelek abidek îxtiyar e, pîr e.

Ehmed Çelebî silam kir, çû destê abid maç kir abid got-ê: Xuda xêr bikit Ehmed Çelebî, tu ji bo çî hatî?

Ehmed Çelebî got-ê; ez bi te, tu bi Xudê. Îşê xwe jê re got. Abid got-ê tu bi xêr hatî. Li aliyê qublê heşinahîyek heye gelek dûr e, tu dibînî yan nabînî? Ehmed çelebî got: belê ez dibînim.

Abid got: Sibe În e. Îşev here nizkî heşinahîyê, hespê xwe li newalêkê girêbide. Here nav heşinahîyê, ew rezê serdara periya ye. Birkek ya avê li nava rez de heye. Darek ya gula li ser birkê heye. Li nava dara gu'la de xwe xef bike. Dema bibê sibe, roj bilind bibê sê kevok wê bîn li ser dara sêva danin. Di dûyên wê biçin li nav rez yek wê bêt li ser birkê danit, kevelê xwe ji xwe hêxît, biçit nav avê de. Ew serdara periyan e; kevelê wê jê bidize, bîne cem xwe. Ew jî wê bigehê te, ewê sêva ji bo te bîne.

Ehmed Çelebî çû wek abid got-ê, we çêkir. Kevelê wê jê dizî.

Ewê got-ê: tu îns î, tu cin î, libasekî bide min ezê xwe pê setir bikim.

Ehmed Çelebî ebayê xwe da-yê. Ewê wer-girt, hat cem Çelebî got: bixwaze te çî divêt? Ehmed Çelebî got min hinek sêvên cenetê divên.

Ewê got Ehmed Çelebî, sêvên cenetê mi-hal in, lêbelê ezê ji baxê irem ji bo te bînim. Serdara periya ba kir hevaleyê ya xwe û got-ê: zûka keffk sêvên cenetê jî baxê irem bîne.

Perî çû û sêvên cenetê anin. Ehmed Çelebî serdara periya li pişt xwe siwar kir; ziyare a abid kir; hat mala xwe. Wê şevê serdara periya li xwe mehîr kir. Sibe hî sêv birin ji hakimî re. Xelkê hemîyan got ev sêvên cenetê ne.

Serdara periya jî hewiya xwe pîrs kir, got sebebê wî çî bî, mêrê min hat pê min ve?

Hewiya wê bi temamî jê re got. Serdara periya got Ehmed Çelebî, tu bi Xudê kif hemamçî bîne ez bibînim. Sibe hî hemamçî anî tastê. Dema hat derî de, dîsa hişê wî çû; ma sekîni. Her du jinên Çelebî her yekê destê xwe avêtin darekî, qenc li hemamçî dan.

Hemamçî dîsa revî çû cem hakim got: heta niha yek bû wêca bûne dido.

Hakim got, herin Çelebî bikujin, her du jinên wî ji min re bînin.

Dîsa wezîr qebûl ne kir, got ê: tiştêkî jê bixwaze nikarî bikit, paşê bikuje.

Hakim got ba kin Çelebî bila bêt cem min. Dema Çelebî hat, hakim got-ê: min ji te divêt tu îşev heta sibe hî qesirekê ji zêr û zîv li ser avê ji min re çêkî. Heke ne, ezê serê te bidim jêkirin.

Ehmed Çelebî gelek hêvî kir, hêviya wî ne borî. Çelebî xemgîr hat mala xwe. Jina wî ya serdara periya got-ê: Xuda xêr bikit çî li te dest da? Ehmed Çelebî bi temamî jê re got. Jina wî got-ê: here bêje hakim baş e, ezê çêkim. Lêbelê bila hemamçî bi nivê mesrefê arî min bikit. Ehmed Çelebî çû gote hakim.

Hakim ba kir hemamçî temamê malê wî jê stand, teslimî Ehmed Çelebî kir.

Jina Çelebî ya serdara periya misexerên wê ji cîna lehûn; emîrî wan kir got: îşev heta sibe hî min ji hewe divêt qesireke zêr û zîv, herwekî hakim got: li ser avê çêkin. Gotin, qenc e; çûn.

Sibe hî rabûn, dîtin qesîreke herwekî hakim gotiye çêkirine. Ehmed Çelebî rabû çû got hakim, rabe da em biçin qesira me çêkirî.

Hakim rabû, digel wezîrên xwe û digel hemamçî çûn nava qesîrê. Hemiwan ecêbmayî. man. Serdara periyan emîrî misexîrên xwe kir got: mêrê min digel wezîr ji qesîrê derêxin, qesîrê digel ên din hemiwan li avê de wînda bikin.

Misexîra weke wê got çêkirin. Wezîr kirin hakimê bajêr.

Ehmed Çelebî li mala xwe rûnişt heta Xuda du kur dan-ê, ji her du jîna.

Rojêkê Ehmed Çelebî xwe dirêş kiriye; serdara periya li milê rastê rûniştiye, keça hakimê Diyarbekirê li milê çepê rûniştiye, her du kurik li ser sîngê wî dileyizin. Ehmed Çelebî hemdê Xuda kir got: ev e xewina min ji şivan kirî temam bû. Her du jinan got: me xewina xwe dîti bû em bibînin jina şivanekî.

Çîrok çû destê, da û babên me çûn bihuştê.

MIJO Û XANE

Dema yek li vê sernamê binêre, di nîfsa pêşin da tiştêkî jê herde nake. Ji ber ko Mijo navê kurdekî gundî û Xane jî, jina Xanê Bidlîsê ye. Lê gava bixwînin, ez bawer im ko dê gelekî kêfa xwe jê ra bînin. Çima ko wê tê da gelek rûçikên kurdan ên qenc û delal bibînin.

Di sala 1841an da, piştî kuta bûna şerê karmilêhayê, xelkê Sasûnê zora leşkerê fermandarê romî Hafîz paşa bir. Hikûmeta tirk ji bo aşkirîna serxwerabûyan, di bin serekîya

Hemedoyê Birbo da geranêkê xweser (idare fî xisûsiye) da bû xelkê Sasûnê. Li ser vê geranêka xweser, çî gava tiştêkî di navbera hikûmeta tirk û xelkê Sasûnê da dibû; an hikûmetê peyayê xwe dişande nik Hemedo, an jî Hemedo diçû Bidlîsê û hevîdî ser wext dikirin. Ji ber ko Hemedoyê Birbo di çûyînen xwe ên Bidlîsê da pir peya bi xwe ra dibirin, hikûmetê jî bo vê yekê qesrek raxistî bû û hemî mesrefên wê mêvanyîyê jî xezinê didan.

Qesra ko hikûmetê jî Hemedo ra raxistî, li pêşberî qesra Xanê Bidlîsê bû. Rojêkê di van çûyînen Bidlîsê da, Hemedo tevî çend peyan bi derketî bû şehnîşîna (balkon) qesrê û li bajêr temaşe dikir. Hîngê Xane jî li pêşberî wan di ber pencera mezela xwe da rûdine, qelûneke qizqayî bi ser darekî yasemînî fî dirêj diêxe û bê ko hesabê peyayên pêşberî xwe bike, serîkê qelûna xwe di pencerê ra bi dîrê dixwe dikêşe û di jêr va li dîyê ko wekî kiloran jî devê qelûnê bilind dibe dinêre.

Êdî nizam ko haya Xaneyê jî heyîna Hemedo tîne bû, an jî ber nav û dengê mezin ê ko bi Hemedo ketî bû, wê dixwest bi vî awayî serekeşîrê kurdan ê ko leşkerê Hafîz paşa revandî qenc bibîne!. Li wan her du awan bi kîjanî dibe, li pêşberî Hemedo qelûnkêşana Xaneyê jî peyayên Hemedo xweş ne hati bû. Hînga bi navê Mijo yek jî wan dibêje Hemedo.

— Axal xweya yek ko Xane hesabê me nakîye û li pêşberî te qelûnê dikêşîyê. Heke destûra min bidî, ezê serîkê qelûna wê bi tîfîngê bihin-gêfim.

— Law Mijol kira Xaneyê li min jî xweş nehat; lê ditirsim tu li wê bidî, paşê dê ji me ra bibe şermeke giran û rûreşîyêke mezin!.



HÊSÎRINE JAPONÎ DADIKEVIN BENDEREKE EMÊRİKÂNÎ

— Na ezbenî. Heke bê serîkê qelûnê berîka min li cihêkî din ket, serê min î li ber te ye.

Çîqas ko serê Xaneyê jî dûşa serîkê qelûnê ne î dîr bû jî; ji ber ko Hemedo bi nîşandariya Mijo î bawer bû, rê dayê. Mijo bi berîka pêşin serîkê qelûnê hingaft. Dema Xaneyê bi teqîna tîfîng û vizîna berîkê ra firîna serîkê qelûna xwe dît; bê ko bitertile an di xwe bi derxe, herwekî tu tişt ne bû be, rabû ser xwe û çû serîkeke din anî dagirt bi ser darê yasemînî xist, kozek agîr da ser qelûnê, dîsa di cihê xwe da rûnişt û kêşa. Ev kira Xaneyê rasterê jî Mijo ra vexwandîneke ecêb bû. Mijo bi berîka dudûyan ew serîka jî hingaft. Xaneyê li xwe danenî ko darê xwe vala bi-hêle, an cihê xwe berde; çû serîkeke din anî bi ser darê xwe xist. Mijo ew serîka jî bi berîka sisiyan hingaft. Xaneyê dît ko berberî bi Mijo ra tewş e û berikên wî vala naçin; bi berdana cihê xwe bîndestî qebûl kir.

Piştî ko Xan hate mal, jîna wî Xaneyê herçîya qewimî jê ra got û perûkirîna (xelatîkirin) Mijo jê xwest. Xanê Bidlîsê ne jî wan mezinan bû ko di girtîna rûmeta mîrên hêja da bi şûn da bimaya. Sibetîrê Hemedoyê îrho tevî peyayên wî vexwande mala xwe û jê ra xirêfeke (ziyafet) bi emt çêkir û hemî mezin û rîspiyên Bidlîsê jî anîne ser. Liştî xwarînê, di dema xatîrxwazîyê da, şûrekî pir fî hêja danî ber Hemedo û Mijo jî jî serî heyanî lîngan nuh kir û tîfîngeke zîvhîlî jî dayê.

Erê, wê dema ko kurdan qedir û rûmeta mîran û mîranîyê holê digirtin, sed peyayên wekî Mijo bera ordîya serdarê Rom Hêlîz paşa didan.

OSMAN SEBRÎ

YOHANES GÜTENBERG

(YOHANNES GUTENBERG)

1400 — 1468

Beriya niho di bin vê sernamê de me çê li du mirovên mezin kirin. Pastör (Hawar: 53) û Yûng Simpson (Hawar: 56). Ev her du camêrên ha her du ji bijîşk bûn, her diwan ji bi dermankirina canê mirovan mijûl bûne û bi keşifên xwe bi nilyonan mirov ji mirinê xelas kirine.

Em dikin îro qala kaşîfêkî din bikin. Ev kaşîf ne bijîşk bû. Bi dermankirina canê mirovan mijûl ne bûye. Lê keşîfa wî dîsan bi qasî yêr ên din mezin û bîhecimiyet e. Kaşîfêkî din heke canê mirovan derman kiriye wî kaşîfî giyanê mirovan derman kiriye û ew ji nezaniyê, ji mirina manewî xelas kiriye.

Ji xwe keşîfa wî camerî ne biwa îro te ne dikarî vê kovarê û kovar û kitêbine dîj bixwîni.

Kaşîfê me, yê ko em îro dixwazin qala wî bikin kaşîfê çapê Yohanes Gutenberg e


Xet û nivîsandin liştine kevin in. Lê heta wextê Yohanes Gutenbergê kitêbên çapê yêr ko îro di destên xelkê de kêmbêha bûne nîn bûn.

Însanên pêşin piştî ko peyivîn û mexsedên hev li zimanê devkî seh kirin; zimanê nivîskî hate bîra wan da ko gava ji hev dûr in mexseda xwe ji hev re bi nivîsandinê bidin zanîn. Ji bona vê vekê ji bi resimkirina şikilên dest pê kirin û bi rê ve ew tekûz kirin gihandin şikilê ko em îro nas dikin, şikilê elfabeyê. Pê meklûb, kitêb û her lişt nivîsandin.

Belê kitêb ji dinivîsandin; kitêbine mezin jî. Lê kêr kesên ji wan fêde digirt. Ji ber ko nivîstên wan kitêban bi dest û li ber esil dîhatin nivîsandin. Çelek caran yêr ko bi pere li ber dinivîsandin mirovine kêmezanî û bi ji lewre di her nivîstê de xeletine nû çêdibûn. Vî hali heta wextê Gutenberg dom kir.

Beriya Gutenberg çînyan texlîtek çap saz kiri bûn. Lê ne çapa îro ko em nas dikin. Çînyan li ser depên texte bi xetê adetî dinivîsandin; ew dikolan û paşê ew li ser kaxezê bi dest çap dikirin.

Yohanes Gutenberg di sala 1400î de li Elmanyayê di Maynsê de ji diya xwe bûye. Yohanes keti bû sinhelê û cem yekî, bi navê Kuster, hînfî zîvîngeriye dibû. Rojêkê Kuster



şagirtên xwe biri bûn gerê û ew di çolê de digerdandin. Gerevanî di rex daristanekê de bihîna xwe didan. Kuster ji şagirtên xwe re navên wan li ser daran da kolan û ji wan xetan herfên ji hev veqetandî dane çêkirin. Kuster ev lişt ji şagirtên xwe re bê-mexsed, bi tenê ji bo wextborandinê da bû çêkirin. Lê welê dixuye ko Gutenberg fikira çêkirina herfên ji hev veqetandî ji vê leyistina me'sûm girtiye.

Gutenberg di sala 1434an de dest bi çêkirina herfan kir û di nav pênc salan de işê xwe bire serî û di dora Strasbûrgê, di dîreke xerabe de û dizîka çapxaneyek siwar kir û bi şev tê de dixebitî û kitabî çap dikirin.

Gutenberg di nav wan pênc salan de ji lîpan pêve mirekêba çapê, merdane û sendûqên herfan jî çêkiri bûn. Di destpêkê de Gutenberg kitêbên ko çap dikirin, wek kitêbên destnivîsî difirotin û jê kareke mezin dikir. Welê dikir ji ber ko ji dexs û teesiba xelkê ditirsî.


Lê gelek ne borî xelk bi işê Gutenberg hesiyan. Gutenberg nema dikarî bû li Strasbûrgê bisekine. Tîpên xwe dane hev û bi ber hacetên xwe re guhaste Maynsê.

Gutenberg li Maynsê ji xwe re du heval peyda kirin; Fawist û Şofer. Fawist, nema-ze bi pere arikariya wî dikir.

Li Maynsê Gutenberg digel hevalbendên xwe dest bi xebe- teke zor kiri bû. Lê xebeta wî diket eksa keşan. Çap bi keri keşan ne dihat. Keşe diîrsiyar ko bi vî awayî kitêb wê zehf û erzan bibin û herkes wê bika- re bixwîne û zanînen ko heta hingê xweserî xwe dihesibandin wê bibin tevafî am û di enca- mê de keşe wê bêqedir bibin.

Ji milê din şemaseyin he- bûn ko libernivîsandina kitê- ban ji xwe re kiri bûn sinhet. Ew sinhet jî wê ji dest biçûa û kesad wê biketa bazara keşe şemasan.

Li wî wextî incileke dest- nivîs bi 50 zêrên inglîzî dihatê firotin. Incila ko Gutenberg û hevalên wî çap dikirin bi şeş zêran difirotin. Keşe rabûn û gilih li Fawist kirin û gotin ko bûye şirikê şeytên. Çapkeran kitêb bi mirekeba sor çap dikirin. Keşan digot, Fawist xwe firotiye şeytên; şeytên jî xwîna xwe da-yê. Ev mirekeba sor, mirekeba çapê xwîna şeytên e.



(2)

Ji milê din keşan digot; ev ne emelê insa- nan e. Em sûreteki incilê di nav çend mehan de dinivîsin. Çawan dibê ko ew wî sûretî di nav çend rojan de çap dikin. Divê tiliya şeytên tê hebe.

Lê li dawî zora keşan çû û xebeta Gü- tenberg gîla serî.

∴

Gutenberg piştî ko çapa xwe bi liştên piçûk ceriband di sala 1450î de kitêba-miqedes, bi zimanê latîni çap kir. Ew incil gelek bi qedir û qîmet e. Di sala 1882 an de niştişteke wê di Londrê de bi 1600 zêrên inglîzî hatiye firotin.

Yohanes Gutenberg piştî ko ev xizmeta me- zin ji insanîyetê re kir di sala 1468an û li




(3)

24ê Sibatê çû rehmeta Xwedê.

Gutenberg gava dest bi çapkîrîne kir bivê nevé hacedan wî gelek hoveber (ibtidai) bûn. Kaşif tipên veqetandî rêz dikirin, ew bi hev re girêdandan û dixistin ser hesinekî hilû û bi destên xwe kaxez lê dişidand, merdaneyek di ser re digêrand. Wek proveyên ko îro bi destan derdixinin.

Liştre makîna çapê hate peyda kirin. Makîna pêşîn jî bi destan digêrandin. Di sala 1814an de çapxana rojnama inglîzî (Teymîs) ew makîne bi qeweta hilmê da gerandin. Îro ev makîne jî wek makîneyên din bi elektrîkê têtê gerandin û wê texlîtine gelêr hene.

Îro sinheta çapê gelek pêş ve çûye lê esas ne guhêriye. Esas hevedûdanîna tipên veqetandî ye. Lê jî bona vê yekê jî awayîne tével hene. Texlîtek heye jê re lînotîpî dibêjin. Di lînotîpîyê de herwekî klîşa [1] şanî dide rêzker li ber aletekê wek tilîniyîsê rûdine û bêt ko destên xwe bide tîpan wan rêz dike.




Piştê ew tip dibin rûpel diçin makîne (Klîşe 2). Mirovekî bi tenê li ber makîne disekine û li çapê miqate dibe. Piştî çapê heke tiştê çapkîrî rojnameyek e, pelên rojname didin emelan, ew wan rêz dikin (klîşe 3) ditewînin û dikin pakêt.

Ev îş tev de di nav çend saetan de çêdibin û bi milyonan nixse li dinyayê belav dibin. Lawikên 10-12 salî wan pakêtan dikin desîgîrekê de (klîşe 4) û rojname digelbînin xwendevanan.

Ev her çar klîşeyên li tevgera rojnameke inglîzî ya ko li Londrê derîtê şanî didin. Ne gerk e ew bibêjin ko Ronahî ne xwediyê vê teşkilatê ye.

Herçî (klîşa 5) xerîtekê şanî dide. Çap îro ew çend pêş ve çûye ko ne bi tenê li ser kaxezê lê li ser her texlîtî caw, çerm û qîmaşan resim çin û neqîşan çap dikin.



REŞBELEK⁽¹⁾

— 3 —

JI ETA⁽²⁾ CEMŞID RE

Sinemxan! Wê rojê gava min tu dibirî dibistanê bi rê ve te ji min re bi fransîzî strand û got: *Jaurais un voyage à faire* Min dil heye ez herim *En parlant de l'Alasca* Da bibînim Panama *Pour aller voir le Panama* Rêk' xwe naxim b'Alaska *Sans passer par Kanada* Derbas nabim j' Keneda *Au lieu de courir sur terre* Behir dike min bibê *L'océan me portera.* Çire bidim dar devî.

Piştî ko te xwendina xwe dedand, te ji min pirsî: Bavo di Hawar an Ronahiye de ji bo zoroyên kurdmancan tişteki bolê beye? Jê re bi fransîzî « Géographie-cexrafye » dibêjin.

Min, bêl ko ez bidim eqilê xwe, li te vegerand û got: Belê heye, ma çawan nîne.

Ji xwe em gihasti bûn dibistanê. Me xatir ji hev xwest û em ji hev veqetiyân.

Min ev tişt, ji xwe ji bir rakirî bû. Lê êvarê, gava tu vegehiyayî mal, tête bira te, tu hati defterxana min û te ji min re got:

— Bavo, ji kerema xwe, ji min re cexrafya bi kurdmançî bixwîne.

Ez bêgav ma bûm. Ji bo dixweşiya te min Hawarek kire destên xwe û min ji te re, jê çirokin xwendin. Ev çirok di Hawarê de nîn bûn. Min ew bi hilketina şihra ko herî nîvro te ji min re xwendî bû, li hev siwar dikir û ji te re dixwend.

Nizanim çawan bû, piştî çend rojan çirokên ko min ji te re lûngê gotî bûn, hatin bira min; min ew hinek edilandin, ser û guhên wan çêkirin û ji wan derseke cexrafyayê pêk anî.

Ez wê dersê iro çap dikim. Heke careke din te ji min cexrafya bi kurdmançî xwest, nema cih li min teng dibe. Heke Xwedê hez kir ezê ji te re dersine din jî binivînim.

DERSEKE CEXRAFYAYÊ

ZOZANÊN WANÊ:

Koçerên mîran gava ji zozanan vedigerin, tiştên ko di çûn û hatina xwe de ditîne ji bajarîyan re gilî dikin. Koçerêkî bi navê kerevon digot: Em "gihastîne heta gola Wanê. Gola Wanê goleke e mezin e, heçko behrek e, Tê de giravên hene, di ser yekê de hin avahî jî têne ditin. Di navbera gundên perê avê de filûqe dişxulin, hin keştî jî hene. Masiyên golê hûr in lê tamdar in. Ji me pê ve çend eşîrên din jî hati bûn warên Wanê; ji nav şikakan. Di vegeerê de me rîya xwe bi Miksê xist. Miks bajarekî kiçik lê spehî ye. Isal vegera me bi derengî ket, di Herekolê de girê nîskîn çarika xwe a spî li xwe wer anî bû. Dêra

[1] Reşbeleka zarokan a pêşîn di hejmara Hawarê a 44an û a didowan ji di hejmara 48an de ye.

[2] Et bi mana xweha mezin e. Herwekî « kek » bi mana birayê mezin e. Dibêjin: etik û metikên wê hatine.

Rebenê-ker di bin berfê de hêj bi'ntir xuya dikir.

DEHBÛYÊN EFRÎQAYÊ:

Par Hevind çû bû Efrîqayê. Di vegera xwe de tiştine ecêb digotin. Berî her tiştî digot welatê Efrîqayê gelek germ e, ne ji xelkê zozanan re ye. Tu dibê qey ezmanê wan ji ezmanê me nizimtir e. Ji lewre germiya rojê xutir e; û tê de veytûnin hene, şev û roj pêde vêdikevin. Xelkê cih reşik in, cilan li xwe nakin, bêcil bi rê ve diçin, ji xwe pêxwas in, hema bermaleke kin berdidin ber zikê xwe. Xaniyên wan textlîtek koxik in. Xaniyên xwe ji qamîş û ji her textlît zilan çêdikin. Darên wan ên biber hene, lê tev de xurme û moz in. Fêkiyên me ên têrav û têrgoşt di wan welatan de nînin.

Tiştê ko kêfa min jê re hat nêçira wan e. Her textlît dehbe cem wan peyda dibin, fîl, heştirga, şêr, piling, şîp, kezal, evor, meymûn, hespê avê, kerkidan, kerkulan h.p. Filên wan ên kedî hene li wan siwar dibin û diçin nêçira şêr û pilingan. Piraniya erdê wan rast e, ne kaş, ne gir in hema yekmeydan û qûm e.

WELATÊ LAPONAN:

Lezgin pêrar ji welatê xwe derket û bi dinyayê ketî bû. Ji hingê ve di dinyayê de digere.

Lezgin di gera xwe de gehiştîye beta Laponyayê. Laponya ji me gelekî dûr e, di ser Rûsyê re ye; ber bi bakur ve di dawîya dinyayê de ye. Vê paşiyê Lezgin ji brayê xwe re kaxezek nivîsand û tê de wêfê welatê laponan daye û gotiye: « Niho ez di welatê berf û qeşayê de me. Di vî erdê de ax yekcar naxuye, herçî çiya tev de qeşa ne, berfa ko li wan dibare gelek najo bi qeşayê ve dibe û deqerise. Xelkê vî welatî di qeşayê de dijîn; cilên wan postên dehan in, hacetên mala wan jî çerm û hestiyên masiyan in. Xwarina wan jî tev de ji goştê masî û teyran û heywanine din in. Ji xwe cotkarî çî ye pê nizanin. Çemê wan qeşayeke dirêj û bêpîvan e. Cem wan textlîtek gakovî heye ko wek ga û dewarên me ên din bi kêrî wan tî. Ew gakovî taxokên wan dikîşînin, barê wan hiltînin. Textlîtek seyekî wan heye; gelek bipirç û bilep in. Ev se jî wek gakoviyên wan li taxokan têne girêdan. Hîrçên wan spî ne. Di behra wan de masîne ecêb hene, cenawirên behrê ne. Li Zivistanê şeveke wan dest pê dike û bi mehan ve dajo. Di wan şevên dirêj de spîtahiya berf û qeşayê roj û hêva wan e.

BAJARÊN EMERİKAYÊ:

Ev çend sal in Tacdîn li Emerikayê; di bajarê Nûyorkê de ye. Bi salêdana Tacdîn Nûyork bajarêkî gelekî mezin e. Nizingî bîst milyon insan lê hene. Xaniyên wî bîst sîh tebeş in. Kûçeyên wî dirêj û fireh in. Kûçeyên hene ko di ser hev re ne. Di hinan re peyar di hinên din re timobil û trimway diçin. Vapor di çemekî re digehin heta zikê bajarê. Di vî bajarî de reşik zehf in. Lê têkîlî xelkê gewr nabin. Tax û tanga wan cihê ne. Hîn qehwe hene ko reşik nikarin bikevîn ê; ew qehwe ji wan re bend e. Xelk di kûçê û kolanan de wek lehikê diherikin.

Di vî welatî de xelkê biyanî zehf in; kurd manc jî hene. Piraniya kurdmanan di Dîtroiyidê de ne. Di wî bajarî de fabrikeyên timobilan pir in, kurd manc di wan de dixebitin. Qehweke kurdmanan jî heye, xwediyê wî bi

xwe kurd manc e. Kurd manc gava karê xwe diçe dînin di vê qehwê de digehin hev û xerberên welêt jî hev dipirsin.

Zaronol Tiştên ko kerevon. Hevînd, Lezgîn û Tacdîn ji me re didin zanîn tiştine spehî û bîmeraq in. Ev her sê camêr di dinyayê de geriyane û di rûyê erdê de gelek tişt ditine: welat, bajar, gund, çiya behr, çem, dest, gelî h.p.

Pe ê Lezgîn, kerevon, Hevînd û Tacdîn wesfê dinyayê, wesfê tiştên dinyayê didin û bi vî awayî me hînî cexrafayê dikin. Bi rastî cexrafya zanîna tiştên rûyê erdê û ezmanan e.

Gava mirov digere û dinyayê dibîne an tiştên ko mirovên geriyayî li ser dinyayê nivisandine dixwîne bînî cexrafayê dibe. Lê ji ber ko herkes nikare bigere û her derên dinyayê bi çavên xwe bibîne an çîrokên mirovên geriyayî tev de bixwîne; ji bo hînbûna cexrafayê kitêbin hatine çêkirin. Mirov ji zarotiya xwe ve wan kitêban dixwîne û hînî cexrafayê dibe. Ev kitêboka ha ji me re hin tiştên cexrafayê bi kurtî bide zanîn.

XULASE

Cexrafya ji me re tiştên rûyê erdê û yê ezmanan dide zanîn.

Mirov bi çend awan dikare hînî cexrafayê bibe:

1 — Bi dîtina bin birên erdê, bi çavên xwe. Ji bona vê yekê jî divêt mirov bikeve dinyayê û tê de bigere.

2 — Bi xwendina kitêb û seyahetnameyên ko mirovên geriyayî nivisandine.


3 — Bi xwendina kitêbên cexrafayê yê ko ji bo zarokên dibistanê hatine nivisandin; wek kitêba ko di destên me de ye û em îro tê de dixwînin.

WEZÎFE


1 — Xulasa jorîn carekê binivîsin.

2 — Hilkişin ser çîhekî bilind; gir, asêgeha gund an bane xaniyê xwe û li dora xwe temaşa bikin. Wesfê tiştên ko di dorhêlê de dibînin binivîsin.

BAVÊ CEMŞÎD



TANGINE SOVÛTÎ DI KÛÇEYÊN BAJAREKÎ DE



TANGINE BRÎTANÎ DI ÊRÎŞÊ DE

İ G İ L

ÇAWAN BİNAV BÜYE GOTİNĒN İNGİLİZ ÇU ELEMANAN

Par noqaveke elemanı di Behira-spi de balafir-hilgira ingilizi İgil bin av kiri bû. Vê paşiyê zabiteki elemanı di radyowa Berlîne de ji guhdarên xwe re binavbûna İgilê qise kiriye. Ew zabit bi xwe di noqava ko İgil xeriqandi hû de hazir hû.

Di pey zabite elemanı re zabiteki ingilizi di radyowa Londrê de ev mesele bi xwe ji guhdarên xwe re gilî kiriye. Herçi zabite ingilizi di dema binavbûnê de li ser İgilê wezîfe didit.

Kovareke emêrikanî gotinên her du zabitan dane ber hev û bi awayê jêrîni belav kirine.

ZABITÊ BRITANÎ:

Zirehpûşa Nelson da bû pêşiyê. Nelsonê rûyê behirê wek meqesekê dibiri, kefeş pêlan li her du keviyên wê hol dibûn û zirehpûş herwekî behir tev de milkê wê biwa, welê bi ezemet û heşmet qesta pêş dikir. Emfralê stolê bi xwe li ser Nelsonê bû. Di pey wê re krewzor û di dora wan de torpiyor û bertorpiyor û motorbotên torpîlavêj dihatin. Ez bi xwe di İgilê de bûm. Herçi vaporên barkêş di orta van cenkeştîyan de bûn.

Beriya ko em terka Cebeltariqê bidin çû bûn derê û me neşideyine wetenî strandî bûn.

ZABITÊ ELEMANÎ:

Herçi noqavên elemanı yê Behira-spi hebûn tev de emirê jêrîni girti bûn: « Armanca we balafirhilgira britanî İgil e. » Wek her kumandarê noqavê kumandarê noqava me ji dixwest ko ev şeref jê re be.

Me dizanî bû ko çarnikarên me mirin e. Em di behireke welê de bûn ko neyar lê, bê hed û hisab wargeh hebûn.

ZABITÊ BRITANÎ:

Sefera me ne seferê rahet bû. Me dizanî ko balafirên dijmin qeste keşif dikirin û noqav û balafirên dirêjî wî dikirin. Ma beriya me hindik heval di vê reyê de telef bû bûn?.. Digel vê hindê manewiyeta me xurt û qewîn bû.

ZABITÊ ELEMANÎ:

Herçend me nîzîngî li qestê dikir ewçend di noqavê de beyecan bêtir dibû. Berf ko em di nav sêncâ torpiyoran re derbas bibin kumandar şûbeyek konyak bera devê xwe da.

Gonê kumandar gubêrî, madê xwe kir. Lê piştî ko em ji sêncâ torpiyoran derbas bûn, bihîna xwe da û rûyê wî kenî. Herçi cenkeştîyên dijmin, nemaze İgil keti bû bin hikimê derbê.

ZABITÊ BRITANÎ:

Dinya zelal, behir sekinî bû. Heşnahiya ezmên dida rûyê behirê. Min işê xwe di kebîna kumandarê de temam kiri bû û ez derketi bûm banê keştîyê. Min xwe da ber siha baskê balafirêkê û ez vezeliyam. Çend hevalan ji xwe gihandine min. Hinan qelem û defterên xwe derêxistin û ji jinên xwe re mektûb dinivisandin.

ZABITÊ ELEMANÎ:

Kumandar bêf ko çavên xwe ji ber dûrbînê bikişîne gote me: « Min di emirê xwe de tucar ewçend alên ingilizi bi hev re ne ditine »

Kumandar bîsteke din li ber dûrbînê sekinî. Paşê jê geriya û kasek şerab vexwar. Şopîne vên û qerarê li rûyê wî xuya dikirin. Kumandar devê dûrbînê kişande ber min. İgil keti bû daîra endextê. Ji xwe her tişt hazir bû. Kumandar emir da: « agir!... » Torpîlê berê xwe da bû balafirhilgirê û diçû. Bombeyên binavîni ji di dora me de dîteşîyan. Lê çi xem... piştî ko em gihastine armanca xwe, êdî mirin ji me re şêrin bû.

ZABITÊ İNGİLİZÎ:

Ez li ber baskê balafirê vezeli, min temaşa behir û ezmên dikir. Ji nişkekê ve hevaleki me rûyê behirê şanî min da û got: « Ka binêre tişteke ber bi me ve tê! ». Belê tişteke ber bi me ve dihat û ew tişt torpîlek bû. Min dil kir hevalan lê hisyar bikim. Dengê min di teqînê de wînda bû û ez ketim erdê.

ZABITÊ ELEMANÎ:

İgil çederê du de tînan li ber mirinê sekinî û paşê xwe xwîl kir. Balafirhilgir bin av dibû. Noqava me jê bi dîr diket. Min dixwest em hinekî din ji bimana û binavbûna deryevanan ji biditana. Em ji hawirê bombeyên binavîni ji derketi bûn. Ji kêfa me re payan ne dihatê dîtin. Bi şefeqê ve me elam da serfermandariyê.

ZABITÊ İNGİLİZÎ:

Bi tenê 24 zabit û deryevanên me xerîqî bûn. Torpiyor û motorbotan em ji mirinê xelas kiri bûn. 930 peya em veşerîyan Cebeltariqê ».

CEMİLÊ TACDO

QEWETINE FRANSA ŞEREVANÎ



De Gol piştî şikestinê Franse vejand. Ji ro bi hinerweriya xwe ji fransîzên Efrîqa-bakûr havileke mezin kir. Piştî ko ev her du sergezav gihane hev Franse ji nû ve bû xwediya



ordûke xurt. Stol ji welê. Di nav stolên hevalbendan de ya fransîzan firo a siseyan e. Klîşeyên me hin qewetên fransîzî şanî didin; yê bej û hewayê.

N E Ç İ R

« Ji axayê min ê delal, xêxê »
« nêçîrvanan Lezjîn axa ra »

Li welatê kurdan nêçîr û nêçîrvanî tiştêkî welê ye ko her kurd pê dizane. Çawan kurd bi cengçûyî û şerkerî hatine nasîn, welê ji bi nêçîrvaniya xwe e dilgeş in. Li Kurdistanê nêçîr û nêçîrvanî li goreyî cih û eşîran tê guhartin. Nêçîra ko ez dixwazim çêli wê bikim, herçiya li nav eşîra me Mirdês pê emel dikin û dizanin e. Heye ko li cihine din awane nêçîrê ên din jî hebîn ko min ne dîtî be û ne jî bi-histi be; lê herçiya dinivîsim, nêçîra ko min dîtîye û tiştêkî jê dizanim. Li nik me di navbera rawir, dirende û firende da heft texlîf nêçîr hene ko hinekê wan bi çend çîştan dibin.

NÊÇÎRA HIRÇAN

Nêçîra van celeb direndeyan bi sê çîştan dibe. Çîştê pêşin kêm nêçîrvan dikarin pê rabin ko jê ra dilekî xurt dixwaze. Nêçîrvanê vê nêçîrê, ji bo destê xwe ê çepê lepîkeke kulavî pir zexim tevî singekî hesinî fî duserî û dunukul dide çêkirin. Xençera xwe bi werfseki va jî dibe û tevî hevalekî diçe ser devê kunhirçê. Serîkî weris li piştê xwe girêdide û serê din dide dest hevalê xwe û dibêjê: heke heya niv saetê ez ne hatim cendekê min bikişîne.

Piştî vê gotina han xwe berdide kunhirçê. Kunhirç gelekî kûr û daketina wê e dijwar e. Nêçîrvan, hêdî hêdî pêda diçe; dema digehe dawiyê, borîn bi hirçê dikeve û dirêjî nêçîrvan dike. Gava hirç xwe digehinê, nêçîrvan destê çepê ko lepikirî û singhesin tê da derbasî devê

hirçê dike. Hirç bê dilovanî destê ko keftî dêv gez dike. Di wê gezkirinê da ye ko xwelî bi hirçê dibe. Her du seriyên sing ên dunukul di çen û ezmanî devê wê da cit dibin. Ji ber ko her du seriyên singe dunukul in nema bi dertên. Nêçîrvan, piştî ko bi vî awayî xwe ji devê hirçê diparêze; bê ko kêsê bide destên wê, bi destê rastê xençera xwe di ser û binê parxanan da bi lez çend caran dadîçikîne. Heke nêçîrvan î xençerhingêv be, bi du xençeran perda dil diçirine û davêje erdê. Ji xwe gava birîna hirçê ne ji dil be, bi sed xençerî jî namire. Dema hirç dikeve, nêçîrvan werisê bi piştê xwe va vedike û pê lingê hirçê girêdide û welê dikişîne derê kunê. Di vî awayê nêçîrê da li nav Mirdês Mehmedê Silêman axa î jêhatî bû.


Çîştê dudûyan: Vî awayê nêçîrê, nêçîrvan dîdevaniya kunhirçê dikin. Çi gava şopa lingên hirçê an tersê wê ê nuh li dora kunê dîtin, sê-çar nêçîrvan tev tîn û di dorhêla devê kunê da xwe vedîşêrin. Piştî roava ko tariyê erd hilçînî; ji bo çêreyê hirç bi derdikeve. Gava jî derê kunê bi derket, hemî bi hev ra tîngên xwe pê da vala dikin. Heke birin ne xedar bin hirçê direve û diflîte.

Çîştê sîsiyan: Ev awayê nêçîrê di mehên gulan û heziranê da dibe. Piştî ko berf li çiyê radibe û giyanermik di kortan da hişîn dibe, hirç piştî roava û berî birbangê, du danan jî wî giyanermikî diçêre. Ji bo ko nêçîrvan bikari bin derba xwe bihingêvin, di hîveronan da diçin vê nêçîrê. Nêçîrvanên jêhatî pir caran jî vê nêçîrê destvala venagerin.

NÊÇÎRA KEFTARAN

Heke keftar jî birê direndan be jî, li cem me bi wî çavî lê nanibêrin. Ev rawirê leşxwer bi qasî ko jî direndan bête jimartin ne î jêhatî ye. Bi tenê xelkê Sûriyê ew jî xistine nava direndan û zarokên xwe pê dikin xew. Heke min va benda han li welatê kurdan binivîsina, teqez min dê ew jî birê rovi û çeqelan bilhesibandana. Lê jî ber ko fro di Sûriyê da rudinim, divê hinekî hurmeta şûra xelkê cih bikim. Ji bo xatirê vî xelkî bila keftar jî dirende be.

Nêçîra keftaran, li hemî hêlên Kurdistanê bi awakî ye. Ew jî ê ko temayîya kavilê



TANGINE BRITANÎ LI SER KELEKAN SIWARKIRÎ
LI ÇEMEKÎ DERBAS DIBIN

keftêr dike, kêr û benê xwe digire, bê ko hesaban jê bike dikeve kuna wî. Dema keftar nêçîrvên dibîne, ji tirsan diranên xwe li hev dixîne û şeçeşeq jê lê. Hînga nêçîrvan jê ra lawikan dibêje û heke def pê ra hebe li defê jî dide. Li ber dengbêjiya nêçîrvên, keftar weke keran guhan bi xwe da digire û nêçîrvan jî her du eşkan bi kêrê diçelêşe û serkî bèn têra dike û zexm girêdide. Paşê serê bèn ê mayî digire û dertê derve û hînga dikişîne. Gava kişande derve û çav bi roniyê ket, nema li ber xwe dide; wekî keran li pê nêçîrvan diçe. Hînga nêçîrvan digire û tîne nava gund. Piştî ko serkî raveyî xelkê dike, keviyekî li sêrî dide û dikuje.

Carekê min yek jî keftarên girtî diti bû. Bêtirî ko kovîti nîşan bidana, şermok xweya bû. Heke ez bêjim, rûmeta çovkî di serçavên wî da tîne bû, teqez min zilim lê ne kiriyê. Nêçîra keftaran karê gewendan e. Heke bê gewendan jî hinekên din hebin, teqez ew jî ji gewendan ne e dûr in. Min dil hebû çendekan jî lawikên ko nêçîrvan jî keftêr ra dibêjin binivîsim. Lê paşê hate bîra min ko sazband di pişt keftaran rabin û bêjin: keftar ne direndeyekî ewçend î tirsok e; lê jî ber ko mela saz pê ra pir e, jî xwe diçe û nema dibîne ko eşkên wî tîne qelaştin.

NÊÇÎRA KOVIYAN

Nêçîra van celeb rawiran bi du çîştan dibê. Yek, çend nêçîrvanên jêhatî diçin gomên wan û di goman da dikujin. Gomên pezkoviyân, her gav di eniyên zinarên mezin û asê da dibê ko ne rê û ne jî xaçerê, pê nakevin. Ji xwe kovî di çûyîna rûyê zinaran da gelekî jêhatî ne. Dema nêçîrvan diçin diyarê zinarê ko gom tê da, nêçîrvanê şanpaz di rûyê zinêr ra dadikeve gomê û koviyên tê da direvîne. Hînga ên li diyêr tîfingên xwe pê da vala dikin. Ji ber ko kovî gelekî sivik in û zû li ber çavên nêçîrvanan wenda dibin, nêçîrvanê pir ê sivik û bi desthîlanîn, jî dû berikan zêdetir nikare bavêjê. Hin caran, nêçîrvanê ko di eniya zinêr ra xwe berdide goma koviyân bi xweşî li hevalan venagere. An lingê wî dişemite, an jî di nivê rê da kovî xwe lê diqelibînin û di bilindiya 800-1000 gazi da dikeve xarê ko perçê wî ê mezin guh dimîne.

Çîştê duduyan, gava berfa kepek dibare nêçîrvan bi çiyê dikevin û şopê digerin. Gava bi ser rêçên wan va bûn, li pê diçin heya dibînin. Hînga nêçîrvan û jêhatîbûna xwe; yekî, duduyan, sisiyan jî dikarin bikujin. Goştê koviyân payzê, berî ko nêrî diçe nav keriyân xweş tê xwarin. Ji ber ko di vê demê da gelekî çelaw dibin.



Jî BERGEHÊN ENIYA ROHELÊ: Eskerîne rûsî di ser çemêkî re pîrekê saz dikin. Di ser van pîran re piyade, siwari, topçî û timobil jî derbas didin.

NÊÇIRA ROVIYAN

Nêçira van celeb rawiran bi tenê ji bo kaviên wan tete kirin ko du awa ne. Yek, di dora gundau da feq lê tê venandin ko vê nêçîrê gewende û dûman dikin. Awayê duduyan, bi seyên nêçîrê û tajijan tene girtin ko min ji ev nêçîr kiriye.

NÊÇIRA KÊVROŞKAN

Ev nêçîr bi çar çîştan dibe. Ê pêşin bi tajijan ko awayê kirina vê nêçîrê ji her kesî ra nas e û ne hewceyî salixdanê ye.

Ji vê nêçîrê ra, ji agahiya segman pirtir xurtiya tajijan divê. Min pênc salau ev nêçîr kiriye.

Ê duduyan, li erdê dibe ko her nêçîrvanêk bi kêrî wî awayê nêçîrê nayê. Ev celeb nêçîrvan gelekî bi bînayî ne û li erdê dibînin. Gava nêçîrvan kêvroşk li erdê dît, hêdî hêdî di dorê ra doş dibe, heya nîzingiyê lê dike. Dema nîzingî lê kir, bê rawestîna lîfingê berdidê.

Ê sîsiyan, piştî rakirina benderan, kêvroşk bi şev tèn û li ser benderan hewên di nav kês û efarê da hildiçînin. Nêçîrvanê vê nêçîrê bi roj diçin ser benderê û kozika xwe çêdikin; bi roava ra tê da rûdînin. Gava bi şev kêvroşk tê ser benderê bi lîfingê lêdidin.

Ê çaran, qemelax e ko di berf barînan da ev celeb nêçîr dibe. Dema du sê bost berf dibare, berf ko berf xwe bigire û hişk bibe, çend nêçîrvan tev da diçin. Çi kêvroşkên ji pêş wan rabin naflîtî. Ji ber ko lingên kêvroşk kin in û heya bin zik bi berfê da terin xar. Heke bi holbûnê hi qasî du sê sed gaz bireve jî, zû diveste û tete girtin.

Li cihên mayî, anê li deştan di hin cihnan da bi teyran jî nêçîra kêvroşkên dikin. Lê di vê nêçîrê da, ev celeb teyr bi serê xwe nikarin kêvroşk bigirin; bi tenê arikariya tajijan dikin. Ev arikariya han ew e ko gava kêvroşk radibe, nêçîrvan teyr û tajijan bi hev ra berdidin. Bê şik teyr berf tajijan xwe digehîne. Di dema gihêştinê da, ji ber ko nikare bigire an rake, perên xwe li çavên kêvroşk diêxe û ji tirsan kêvroşk li ser piştê xwe davêje erdê û tajî digehêpe.

Çiqas ko teyrên xurt, ên ko kêvroşkên û hin ji wan mezintir rakin jî hene; lê ev celeb


teyr bi kêrî nêçîrvanên nayên. Ji hêlekê, ewçend e mezin in ko ranahine ser destan; jî bêla din, ewqas e kovî ne ko kedî nabin. Di nava teyran da ê xurtir û dirende ev in. Ji van, li welatê me, teyrêrêş û dûbirang hene. Hinek jî kurdan bi teyrêrêş ra terlan jî dibêjin. Ji ber xurtî û zexmîyê, kurd wî padîşahê teyran dizanin.

NÊÇIRA MASIYAN

Nêçîra masiyan li nik kurdên berav pîr çîşt in. Lê herçiyên ko li cem me pê dixebitin çar in. Ê yekê, tor e ko ev awayê han jî hemî kesan ra nas e. Ji lewra dî wî wari da peyivîne ez zêde dibînim.

Ê duduyan, çengel e ko ev celeb nêçîr karê zarok û biçûkên ko newêrin xwe bidin nav avê.

Ê sîsiyan, bi destan girtinê ko ev celeb nêçîr li nik berçemiyên gelekî bi rewac e. Vê nêçîra han xortên şampaz dikin. Di rojên havîn û paizê da birek xort digehên hev û diçin ber çem. Kijan cihê ko fireh û kûrayî hindik e di wir da xwe berdidine çem. Ev masîvanên han, her yek kirasekî an derpeyekî li ser xwe dihêlin û di rex hev ra bi nava çem da dimeşin. Herçî masiyên heyî li ber wan direvin û xwe davêjin keviya çem bin keviran û inikan (kuu û şargehên masiyan). Hînga masîvan xwe noqî avê dikin û yek bi yek, dudu bi dudu bi derdixin. Carina jî masiyên li pêş xwe li keviyên tenik asê dikin û hînga di dorhêlê da rûdînin. Bi wî awayî hêdî hêdî qûnxuşkî berve hev tèn. Gava cih li masiyan teng dibe, dixwazin xwe di nav lingên masîvanan da



TANGÊN KO JI EMERÎKÊ TÊN DADIXIN BENDEREKE WELATÊN ROHELATÊ NÎZING.

veşerîn. Hînga, nêçîrvan destê xwe li ser stoye wan datînin û digirin.

Ê çaran, avbirin e. Ev çîşîtê han bi birîna ava çeman dibe. Pir çaran zivistanê dema av pir dibe û di çem hilnayê, di rex çem da rêne nuh vedike. Havînê gava av hindik dibe, vedigere halê berê. Hînga masîvan diçin, û pêşiya avê digirin û li riya nuh siwar dikin. Gava av li ser riya kevin hate birin, masî cih cih di pengavan da û hinek ji li giharê dimînin. Wê gavê masîvan bi destan pê dikevin û hemîyan digirin.

Herç berferatî, nêçîra wan bi piranî dîsa di devê çeman da dibe. Ew cihên ko tê da çem dikevîne ser Ferêt.

Bi navê metranê tişteki wekî rîman heye ko berferatî pê masîyan dikujin. Metran pişk wekî rîmê ye, bi tenê serê wê î dunukul e. Gava masîvan davêje mîsî, ko li kîjan cihî keve nema bidertê. Bi dawîya metranê va benê heye ko serîkî wî benî bi piştê masîrvan va girêdayî ye. Metran wek cîrdan tê avêtin. Dema li mîsî ket û pê da cit bû, masîvan serê bînê ko bi piştê xwe va dikişîne û mîsî digire.

Di çemên me da sê çîşît masî peyda dibin ko ev in: ferxe, şawût û gamasî. Masîyên çeman pir mezin nabin; lê goştê wan gelekî xweş e. Di çemên me da kêm masî bi dirêjîya gazekê hene. Lê di Ferêt da heya bi pênc-şeş gazan masî hatine dîtin.

NÊÇÎRA KEWAN

Nêçîra kewan, di welatê kurdan da bi kitrimî belav bûye; lê nemaze li du eihan 'gelekî pês va çûye, qezayên Bêsnî û Gextê. Xelkê van her du qezayên Kurdistanê zîvar û dewlemend, biçûk û mezin vê nêçîra han dikin. Ev nêçîr bi şeş çîşîlan dibe; lê gava nêçîra kewan têtê gotin, nêçîra ko kewan li ber kewan digirin an dikujin tê bîra mirov. Berê, emê vê nêçîrê ji xwandevanên xwe ra salix bidin û paşê vegirin ser her pênc çîşîtan mayf.

Ev nêçîra han me goti bû li ber kewan dibe ko sê celebî. Dudûyên wan, nêçîra marî û çatiyê bi tîfîngê, nêçîra bestî bi dafan dibe.

1 — Nêçîra çatiyê: Çalî bi gîhandina du kewan tê pê. Ev kewana bi biçûkî têne girtin û xwedî kirin. Dema yeksalî dibin dudûyên wan di qufîkan da bi hev va girêdidin; di çiloreşan da pê diçin nêçîrê. Ev nêçîr di serê giran, bestan û devê newalan da dibe. Nêçîrvan diçe, kewên xwe li ser hijekê an di nav keviran da vedigere, bi xwe di rex wan da kozîkekê çêdike û tê da rûdine. Çi gava kewên wî bixvînin, kewên çolê bi dengê wan ra tèn û dirêjî

ser çatiyê dikin. Hînga nêçîrvan bi tîfîngê kewên çolê dikuje. Ev nêçîra han di bîrbanga sibê û serêvaran da dibe.

Nêçîra mariyê: Nari navê mîkewê ye. Dema mela biharê a paşin kew dibin zo û mîkew hêkan dikin û li 'ser rûdînin, 'kewên nêr bi tenê dimînin ko bi wan ra margîros tê gotin. Kewê margîrosî bê mîkew xwe ranagire. Rojê pê da dibe tiqetiqa wî. Çi gava dengê mîkewê dikeve guhên wî bê xweragirtin bi koranî tê. Di wê demê da nêçîrvanê ko mîkewa wî heye diçe wek nêçîra çatiyê bi tîfîngê kewê margîrosî di tuje.

Nêçîra bestî: Bestî bi kewê girêdanê ra tê gotin. Her kewek bi kêrî girêdanê nayê. Ev



JI BÎRÊN ŞERÊ EFRIQAYÊ: Serê Efriqayê bûye
bîrên Serê Efriqayê h

celeb nêçîr carina bi kewekî (anê tenê bi bestî) û carna jî bi du kewan dibe. Bi kewê duyêyan ra serdar tê gotin. Berê nêçîrvan be. ti girêdide û li dorhêlê dafan direşîne, gava serdar hebe, wî jî li cihêkî bilind datîne. Çi dema kewên nêçîrê bixwînin, kewên çolê tîn û rast dirêjî bestî dikin. Lirên wan berî ko bigehê bestî dikevin dafan. Hinekên wan jî rast bi firekê li ser bestî vedinin ko şerê kewan di wir da dest pê dike. Carcaran şer ewçend di nava kewan da xurt dibe ko bestî bi kewê çolê digire û bernade. Qewimiye ko nêçîrvan kewê çolê di dev bestî da girtiye.

Ji bo nêçîra dafan û tîfingê kewê gewr (kewên çiyayê Evdilezîzê) e bi nav û deng in.

Dema kewê nêçîrê pir qenc dibe, qelenê wî heya bi hêstîrekê, hespekî hêja ye.

2 — Nêçîra torê: Herwekî tora masiyan heye, jî bo nêçîra kewan jî celebek tor heye. Ev torên han perçek cawî çarkoşe ye ko bi dûtê rojnê çîna li ser çêdikin û bi ser du darîkên çerprast diêxin. Nêçîrvan dema kewan li cihê dibîne tora xwe vedigire, dide pêşiya xwe û di talda wê da her ve kewan diçe. Ji ber ko kew nêçîrvan nabînin, dikin çîştêçîşt û nafirin. Wekî direndekî bibînin, heya negihê wan jê narevin. Gava nêçîrvan nîzik dibe, devê tîfingê di kumikî nîveka torê ra dike û davêjê. Ji vê nêçîra han ra nêçîrvanê sivik û şan-paz divê.

3 — Nêçîra kaniyan: Kew li ser kaniyan jî pir têne kuştin. Dema paiz tê û avên hişkeliyan dimiçiqin, serêvaran xwe berdîtin ser kaniyên nependî. Hin nêçîrvan, kozîkên xwe li ser van kaniyan çêdikin û gelek kewan dikujin. Dema vê nêçîrê jî mehekê pirtir najo.

4 — Qemelax: Gava berf dikeve, berî ko kew jî xwe ra cihê banî û çêrê bibîne, gundî bi destî va derdikevin qemelaxa kewan. Di berfê da jî birçîna kew jî firekê zêde nikare bîfre. Ji piranî û nermiya berfê bi lîngan jî nikare bireve, lînga qemelaxan wan bi destan digirin ko jî vî awayê nêçîrê ra jî qemelax tete gotin.

5 — Sokin: Di barîna berfê da hemî kew cihên xwe berdîdin û dadîkên destê, her çeman û av û çîrvan, da ko di reşiyê da bikari bin biçêrin. Gava dibe bihar û berf li çiyê dihele, kew berê xwe didin cih û warên xwe. Her refek bi sedan dilîrin.

Nêçîra sokinê di her cihê da nabe. Kozîkên vê nêçîrê nayêne giharîn. Heke kozîk baş û nêçîrvan jî î jêhati be, rojê çel-pencî kewî dikuje. Dema vê nêçîrê bi tenê heft-deh roj in. Kozîkin sokinan hene ko bi qelenê jinekê tene guhartin. Ew jî wekî erd û zevîyan jî milkan tîn hesêb.

6 — Nêçîra bi teyran: Gava em çelî nêçîra teyran dikin, her kes dîzane ko nêçîrvan teyrê xwe dibe û dema kewan dibîne berdide wan û digire. Lê pir hindik mirov hene ko çîştên van teyran, awayê girtin û



çîrok. Piştî vî şerî sondixwarîyan zeferîne dîtin xistine destên xwe. Lê jî wînda ne bûne. Klîşa jorîn jî wî şerî lihenxistineke lîngan şanî dide.

bixwedikirina wan biza-
ne. Ji ber ko min bi
xwe teyrê neçîrê bi xwe-
di kirine çê û xerab ez
hinekî agahî vê yekê
me. Ji lewra min divê
vê hêla ko ji xwende-
vanan ra nenas e bidin
zanîn.

Teyrên ko neçîra
kewan dikin pênc çîşîl
in. Teyrêreş, hulîlik,
şahîn, sipir û doxan. Ji
van her pênc çîşîtan, her
dûyên pêşin, yanê teyrê-
reş û hulîlik kedî nabin
û bi kêrî neçîrvanan
nayên. Lê her sê çîşîtên
mayî kedî dibin û teyr-
rîne neçîrvan in.

Ev teyrên han jî, bi
çîşîtek tor têne girtin.
Ev torana di kozikîne
xweser da têne ve-
girtin. Kozikên teyran gelekî biha têne firotin
ko yek hêjayî qelenê jinekê ye. Xwediyên van
kozikan di rojên bi mij û dûman da diçin û
torê li ser dîwarên kozikê vedigirin. Mirîşkekê
di bin torê da datînin û benekî bi lingê mi-
rîşkê va girêdidin û serê bèn bi dest xwe di-
kin. Dema mij û dûman dikeve dinê û teyrên
han jî kêfan radibin fir û gerê, neçîrvanê teyr-
ran hîdî hîdî serê benê ko bi dest da ye kaş
dike û mirîşk di cihê xwe da vedipirtike.
Gava teyr mirîşkê dibîne; di jor da xwe berdi-
de ser û dikeve torê. Bi vî awayî neçîrvan
diçe teyr digire û her du çavan didirû û tîne
mak. Ev teyrên han, li goreyî cînsên xwe
tên frotin.

Şahîn, ko kêman caran tê girtin bihayê wî
sî zêrên zer e. Tevî ko teyrêkî biçûk e, tu
neçîr xwe jê xelas nake. Ev teyr bi kêrî neçîra
qulingan jî tê. Dema quling ji çîyan dadikevin
deştan û gava vedigerin çîyan, neçîrvan teyrê
xwe bera refê wan dide. Çaxa şahîn refê qul-
ingan dibîne, di jêr va wekî fîrekê, fîk hol dibe,
heya bi serhêla refê dikeve. Hînga, berî hemîyan
rêberê refê dikuje. Gava rêberê qulingan kete xar,
êdî ên mayî nema dizanin kû da herin û li banî
ref li dora xwe doş dibe. Hînga şahîn wekî nişan-
darê jêhatî yek bi yek di serê qulingan da lê-
dixê û diêxe jêr. Heya qulingek li banî bimîne,
şahîn danakeve. Ên ko bi şahîn neçîra qul-
ingan kirine dizanin ko ev teyrê biçûk çî bela



KOMANDOSÊN BRITANÎ DI HENGAMA TALÎMÊ DE DIKIN DAKEVIN BEJÊ

ye. Herçî refên kewan in, ne bi awayê refên
qulingan, lê dîsa şerpeze dibin. Gava kewê
pêşin digire, ên mayî xwe berdidin erdê nav
devî û keviran. Hînga segman tevî seyên xwe
wan li erdê digirin. Kewê ko dengê gujîna
perê teyr keti be guh heya du saetan diqutife
hev û nikare bireve.

Sipir: piştî şahîn teyrê çeleng û neçîrvantîr
ev e. Lê sipir, bê kew û kevokan bi kêrî tu ne-
çîrên mayî nayê. Di gava berdana neçîrê da ew
jî kewê pêşin digire û yên mayî jî segmanan
ra dihele. Bihayê vî teyrî bîst zêrên zer in.

Doxan: bi qasî şahîn û sipir ne fî neçîrvan e. Ji
ber ko çav nade kewê pêşin û carina di nivê refê
da û pir caran kewê paşin digire. Ji lewra refê
ko teyr di ser ra ne firîye bi tevayî naqefîle û
difilite. Bi hayê doxan jî deh zêran bêtir in.

Awayê xwedikirin û daxistina teyran a
neçîrê jî hewceyî wêsteke mezin e. Ji ber ko
benda me pir dirêj bû min ne xwast ko xwan-
devanan kiz bikim. Heke rojekê kês di min
keve dê di bin navê (xwedikirin û daxistina
teyrên neçîrê) da benedike xweser jî axayê
xwe ra binivîsim.

Ji van celeb neçîrên me nivîsî pê va jî,
dirende, rawir û fîrende têne kuştin; lê neçîra
wan ne e xweser e. Ji lewra min ne xwast
wan jî çîşîtên neçîrê bihejmêrim.

OSMAN SEBRÎ

ÊŞÎRA ZIRIKAN

Zirikan li Kurdistanana bakur dibe pênc kerî. Zirikanê welatê Serhedê, li bakurê ke' a Xînusê û di navbera Hezaromê de ye. Jê re Tekmana jorin dibêjin. Tekmana jorin nehya Medragê ye.

Ew bir (25) gund in û panzde gomên banekefî yanî cibê pez û cot hene. Li vir kara xwê heye, jê re « Kara-spi » dibêjin. Li nivroyê Daşkesanê, bi saetekê pêtrola gazê heye.

Tekmana jêrin: Nahya wê Soylemez e. Ev jî girêdayî Xînusê ye. 30 gund û 15 gom in.

Zirikanê Gogsê: Nehya wê Gogsê ye, li bakurê rohelatê Xînusê. Mezin û serdarê wan mala « qulaxsî » ye. Keremê Qulaxasî di şerê serxwebûnê de gava çû îranê eceman ew û 29 peyayên din kuştin.

PERGAL Û ADET Û HATINÊN WAN:

Hatîn pez û zad û hesp in. Pezê serhedî ê sor bi nav û deng e. Dawa mî û beranan jî be ko hilneqelîn qayîş dikin. Keriyên firrotinê di Behira-reş de derbasî Stenbolê dikin. Rûnê Hezaromê tevaya Kurdistan û Anadolîyê têr dike. Berê dihat Şamê jî.

Hesp: Li Serhedê axilê hespan wek pezê kovî timî li mêrgan diçêrin û dizên. Heya ko tacir ji Diyarbêkirê û hin derên din tên kirîne. Hêj nû derin ser, û dor li wan digirin û li nav gundan diqelibînin. Hin bi hin digirin, tinî frotinê digel canûyan.

ZAD Û GENIM:

Olçek heya (20-25) davêje. Sala ko paîz xêr zû bikeve pê re nagihin kuta bikin, guşiyên genim dixin xaniyan. Nanê wan gelekî tamdar e.

PERGALA WAN:

Eşîrtî ye. Rajêrê serdarê xwe ne, timî heweskarê şer û pevçûnê ne. Tucaran jî romîyan re bindestî ne kişandine û xwe aza dîine. Ji ber ko romîyan nikarî bû wan bin sî bikin, bi sed dek û berger bû bûn hemîdî. Lê nizanî bûn çî ye; di mala xwe de maşê kaptênan dixwarin. Hînen din emirê xwe bi firarî dibihartin. Piraniya stranên wan şerê romîyan e.

ADETÊN WAN:

Mêr bi şal û şapik, kefî û kolos û piştên ecemî ne. Jin bi şahr û kofî, fistan û xeftan, zêr û kember in.

Stranên kurdî pirê wan jî Serhedê ne. Bê xwe reş û dilanê dizanin. Keç û xort di destên bev de dilîzin. Keç û xortên Serhedê bejîndirêj û çavreş in. Li wî welatî qiz û xort di 12 salan de balix dibin.

ZIRIKANÊ DIYARBEKÊ AN ENTAXÊ:

Rohelat û roava ji Pasîrê heya Hênê, nivro deşta Diyarbêkirê ye. Drêjahî ji Pasîrê heya Hênê (60) kilomêtir in. Pebnayî ji Karazê heya Bîrçelînê (40) kilomêtir in. Tê de heye sed gund. Çardorê wê eşîrên jêrin in:

Rohelat: Badîkan, Xiyân, Silvân
Roava: Têrkan û eşîra Mêribê (zaza ne)
Bakur. Eşîrên zaz. Ji rohelat heya bigîhe roava, bi rêzê ve: Kavar, Mestan, Botiyan, Tawis, Seywan.

Nivro: Zirikanê-Hezro û deşta Diyarbêkirê.

Di erdê vê eşîrê, di nivro û bakur de du çiyayên dirêj û bê dawî hene. Navbera her du çiyân navdeşteke bi çot û cebar e û hewa wê gelekî xweş e.

Hatînen wan ceh, genim, kuncî, pembû, nok, nîsk, garîsên gewr û zer û stenbolî, kartol, fasûlî, riz, hevirmîş. Pezê wan bi piranî bizin in.

Eşîr di tîfîngê de pir xasûg yanî mahir in. Hema her xort nêçîrvan û blûrvan e. Merovê reşkal çel safî nabe ko çend sal mehkûmî an zîndan ne dîtî be. Ji siwarî û amancan zehf hez dikin. Wergirtina wan jî wek ên din e. Bi tenê mêr şerwalê diyarbêkirî li xwe dikin.

Çiyayên vir gelekî bi dar û şkeft û newal û banî û tev kanî ne.

Her tewir fireke û heywanên kovî li vir hene. Nemaze pezkovî, beraz hema wek pez in.

Çiyayên vir ji hevkefî û livel in. Di tevayîya welêt de fîdayî li vir kom dibin. Lewre cîhê şer e û her xwarin lê peyda dibe. Di Zivistanê de digel berfa pîr merov dikare lê bidebire. Hîngî lat û zinar û şkeft zehf in. Em bi xwe sê salan tê de derkeftî mane.

Di nav vê eşîrê de du bajar hene: Licê û Hênê. Ev her duyan jî zirikan eşîr nahesibînin. Navê wan bi bajarê wan ve ne. Navê kevnare welatê Entaxê digotin ê. Ji ber ko niha Entax bûye gund û Licê bûye qeza welatê Licê dibêjin.

Mezînekî xweser tê de ninê; rispî dibêjin. Berê Sevdlî begê Licê mezinê wan zirikan bû. Piştî hatina Evdîrehman paşayê romî, mîr jî bû rajêrê rom.

Gundê min bi xwe di navbera Licê û Hênê de gundekî bi av û beşçe ye. Serkaniya Dîclê jî bakurê gundê me dertê; jî bin çiyayê Bîrçelînê. Kara xwê jî di ber de ye.

ZIRIKANÊN HEZRO:

Zirikanên Hezro li nivroyê rohelatê zirikanê Entaxê ne û her du bi hev ve ne. Bi tenê çiyayê Dêrtopan di nav wan de ye.

Rohelat Silvan e. Di navbera wan de çemê Sela-
tê heye. Pišta wan çîyan û nivro deşta Diyar-
bekirê ye. Welatekî şîreh û cihê zad û bixwe-
dikirina pez û dewêr e. Çîyayên wî tev de
rez û feki ne. Deşta wan tev de medrebên bi-
rincê ne. Devên çeman mexelên gamêşan in.
Pezê wan hemî mihên gewr û çavreş in.

Pêncî gund hene. Bi carekê eşîr in. Rajêrê
mala Receb begî ne. Maleke zehf mezin û kêr-
hafî ye. Hezro bi xwe nahye ye. Ji Hezroyê
ber bi nivro deşta Diyarbekirê ye.

PERGALA DEŞTÊ.

Di deştê de eşîreke xwenau nîne. Tevayi-
ya gundan yên xelkê Diyarbekirê ne. Bi piranî
gundên mala Cemil paşa ne. Ên din her çend
gund yên hinan in.

CEXRAFYA VÎ WELATÊ.

Herwekî me got bakur çîya û nivro çîya
ye. Ev her du çîya rohelat û roava ve bê

belket dirêj in. Ji ber vê yekê navekî xweser
lê ne hatiye kirin.

Çîyayê bakur tiştê ko min diye ji çîyayê
Talorikê, geliyê Gûzan û qezma Mûşê ber bi
roavê tê çîyayê Kavare û Birçelîn, kaniya
Dicle, derbasî çîyayê Nêribê û Erxenî û Maden
û kêzina binê Narpêtê û Kemirxan ber bi
pira Hîzol û Ferat û Meletyê. Qenc nayete
bîra min, lê bawer bikin çîyayê Hekîmxanê jî
pê ve ye.

Çîyayê Nivro: Rohelat ji pira Batamanê, yanî
pênc saet rohelatê Ferqînê dertê û bi roava
ve dîdirêj dibe, ji pira Batmanê tê çîyayê
pišta Farqînê. Jê re dibêjin çîyayê Narikê an
Miqûrê û Derê-kur neqebeke gelekî asê ye. Ev
çîya tê lixubên Zirk û Silvan û tê çîyayê Dêr-
topanê, bakurê Hezroyê û jê tê Dedaş û Eyn-
darê. Çîyayê Mehmediyan dikeve çemê Enbarê
û çîyayê Têrkhan û çîyayê Basrafê, nivroyê

Pîranê û çîyayê Egil û Erxenî
û pira Qelenderan. Dîsa tevî
çîyayê me got yê bakur dibe
yanî çîyayê Manê.

Erdê wê navdeştêk e. Gun-
dên avî gelek in. Gundên bi
aş û medreb Sarim, Girê Dad-
mê, Sîsê, Dabilo, Xwêlin,
Comelaş, Hênê, Licê, Serdê.

Ji tevan çaviyên Hênê û
Serdê mezin in. Ji qawin û
fêkiyên van her du qeseban li
Kurdîstana jor bi nav û deng in.


Çemê Enberê, serçaviya
wê jî Hênê û Serdê ye. Ev
çem çîyayê Miro diqetîne û
dikeve deşta Diyarbekirê. Bê-
qeder mederbên birincê li ber
vê avê hene.

MESELA GAWESTIYAN.

Bi vê hêncetê min jî xwest
çend pîrsan li ser mesela gawesti-
yan bibêjim.

Mesela gawestiyan di Kurdîsta-
nê de pîrseke dirist e. Lêbelê ne
bi tenê bi vî awayî bûne kerî.
Hin gawestiyayê koçê ne. Lê hi-
nên din rajêriya romiyan qebûl
ne kiriyê û li ber wan rabûne. Bi
setma leşkerekî pir ji hev de ke-
tine; bûne fermaulû. An di dirê-
jahiya zemanan de zêde bûne û ji
hev cihê bûne. Her kurd li ba
xwe an di eşîr an di malbata xwe
de dizane ko jî malekê kevnare
xelkê wê malê bi rêva bûne
deh mal.

Zirikanê jêr û jor di rex hev
de dijîn. Ev zêdahiyên hev in. Ên
dûr gawestî ne. **HESEN HIŞYAR**



BALAFIRGEHEK JI BALAFIRGEHÊN INGİLİSTANÊ

LAMPEDŪZA

Ordiwên sondixwariyan piştî ko Efrîqa bakur ji eskerên mihwerê safî kirin, bi bombarana hewayî girava Pantelaryê û di pey wê re du giravên din ên piçûk zemt kirin; tev de giravine talyanî. Di nav wan de giravê heye jê re Lampedûza dibêjin. Di heqê Lampedûzayê de malûmatin ketine destên me. Em wan di jêr de berpeyî xwendevanên xwe dikin:

Lampedûza di nivroyê Sicilyayê de, lê jê bêtir nizingî erdê Efrîqayê, Tûnisê ye.

Lampedûza milkê yekî maltayî bû û tê

de çend mal ji xelkê Maltayê dijîn. Piştê girav kete destên mîr Cûlyo Tomas, dûkê Palêrmê.

Li 25ê Hizêrana sala 1800î Dûk Lempedûza firote təcirekî malteyî, bi navê Salvo Gat. Ji hingê ve təcirê maltayî dest bi avakirina giravê kir; ji Maltayê cotkarî anîn û hîmên du dêran jî danî.

Piştî mîdekî birayên Karlo Kêzrop ji girava Gozoyê hatine Lempedûzê û xwe gihandine Salvo Gat û pev re ji avakirina giravê re xebitîn.

Di sala 1810an de yekî inglîz bi navê

Elêksardî Fernandez birekî Lapedûzayê kirî. Li ser vê yekê hikûmeta inglîz jî bo hefadiya giravê hin esker şandine Lempedûzê. Ev esker heta sala 1811an di giravê de man û di wê salê de jê kişiyên û haki-miyeta giravê jî nû ve ket destên Gat û hevalên wî. Lê ala inglîzî li giravê ma.

Di sala 1816 de çalê Napoliyê cenkeştîyek şande giravê û xwest ko hikûm, bexê destên xwe. Xelkê giravê pê qail ne bûn û cenkeştî bi şûn de vegeriya.

Di sala 1813an de û li 11ê Îlonê vê carê çalê Îtalyayê li ser du vaporan 400 esker şandine giravê. Kumandar di gel çend zabitan dakete bejê û xwest ko hakimê giravê Gat bibîne. Gat û jina xwe Glor-ma û çend gundî çûn pêşiya kumandêr û pê re axaftin.

Kumandarê talyanî jî wan re da zanîn ko hikûmeta wî dixwaze giravê asê bike û wê bike warekî eskerî. Gat û kumandar tev de çûn qesira Gat, kumandar fermana çalê xwe xwend û piştî mizakerekê li hev hatin û girav kete bin hikûmê talyanan. Ji qesira Gat bandêra brîtanî daxistin û li şûna wê aleke talyanî rakirin.

Piştî 100 salî ala inglîzî bi destê balafirvanekî brîtanî vegeriya Lempedûzê.

EVDIREHMANÊ ROJKÎ



NEXWÊŞNÊRÊN RŪSÎ DI ENIYÊ SER DE



TANGEKE EMÊRİKÂNÎ DAYE KAŞEKÎ

ŞÊXÊ BARZAN ÇAWAN FIRANDIN?!..


Îro li nav kurdên nivro gava şexê Barzan tete gotin, şex Ehmedê ko bi Xudanê Barzan hatiye nasin tê bîra mirov. Ev şexê ko hatiye firandin ne Xudanê Barzan şex Ehmed; bavê wî şex Mihemed e. Der heqê Xudanê Barzan da jî, di hejmara pê vê da, ezê zanîna xwe binivîsim.

Ev çîroka ko dixwazime bêjim, ne tişteki xeyalî ye; lê tişteki qewimî û rast e. Berê, min ev çîrok jî devê şexê Garisî şex Eydirehman bihîst. Paşê min dût û dirêj pirsî, dawîya ko min xwe gihandê, gotina şexê Garisî ê rehmetî bi tevayî rast bi derket.

Şex Mihemedê Barzan yek jî şexên terîqê bû. Ji wan şexên ko nizanin şexîti û mirîdîti çî ye; bi tenê ji nezaniya millet destkewî dibin

û xwe di bin navê şexîtiyê da li ser serê kur dên reben dikin mezin û rîya debareke şahane jî xwe ra, rîya mezinahiya cihê ko tê da jî ji kurdên xwe ra pêk tinin. Lê bi ser vê yeka han da; şex Mihemed ne mirovekî beradayî bû. Tegez jî gelek şexan qencîr û çaktîr bû. Qe ne wek şexên mayî di rîya bêemirîya Xwedê da pêş da ne diçû. Heke gunehêkî wî hebû, bê ko qeweteke manewî li cem hebe, xwe xwedî manewiyet da bû zanin û di qeza Zîbarê da gelek mirov bi mirîdî li serê xwe civandin bûn. Ji xwe ev gunehê han bû ko bû bû sebeba firandina wî.

Di serê babiliska bîstan da "li qeza Zîbarê şex Mihemedê Barzan di nav eşrên Mizûrî, Şerwan û Berojîyan da navêkî baş biri bû. Xelkê wî, ewçend jê hez dikirin ko di rîya şex da û jî bo daxwazên wî mirin, bextiyariyeke mezin dizanîn. Ji dilpaqîjiya xelkê wî pêva, dilçakî û rûnermîya şex jî ev hezkirina



BENDERA TÛNISE:

Roja ko genêral De Gol gihastîye Tûnisê balafirên fransîzî di şer benderê re li rîyane û balina serekê Fransa Şerevanî şahînet kirine.

han roj bi roj zêde dikirin. Her roj piştî nimêja êvarê, şêx şîretên dîni li mirîdên xwe dikirin û diwariya roja pişdawiye û agirê dûjehê ji diêxist bira wan.

Şêx, rojekê ji rojan di nava van şîretan da, çêla rabûna cenabê Mehdî dike. Di vê navê da, ji mirîdên sere yek pirsra nav û rûçikên Mehdî û tevî dema rabûna wî ji şêx dike. Şêx bersiva mirîdê sere, holê dide:

— Mehdî, piştî pêxember pêyayê Xwedê ê qencir e. Navê wî Mihemed, milên wî ji

ên hemî kesan dirêjtir û hinarokên rûyê wî nûr jê dibarin. Çawan ko şûr wî nabire tîfing jî pê da naçe. Dema rabûna wî, wehareng e gelekî nîzik e. Heye ko fro hati be dinê û riya roja ko Xwedê jê ra ferman kirî dipêye..

Ilînga yek ji mirîdan radibe ser xwe û dipirse:

— Qurbanî bi awayê ko me ji şêx bihîstî, Decal jî tevî Mehdî radibe û kerê wî gelekî f beza ye; rojê riya salekê dikare here. Ma gelo, cenabê Mehdî çilo li ber vî zalimê han xilas dibe? l..

Bê şik, dema şêx ji mirîdên xwe ra çêla Decal û kerê wî ê beza kiri bû, awayê li pêş wî xelas bûna Mehdî ne hati bû birê. Lê niha mirîdekî ev yeka han jê dipirsî û jî vê pirsê ra jî bersivêk diviya bû. Nizanîn ne ji rûçikên şexan e. Gava şêx dît, çavên hemî guhdaran çûne ser wî û bersivêkê jê hevî dikin; bê raman dibêje:

— Difire.. difire kurê min difire..

Di tu kitêban da çêla firina Mehdî tine; lê ji bo ko şêx xwe nezan rave neke holê goti bû û mirîdan jî bawer kiri bû. Lê nizam, Xwedê jî ev derewa han ji şêx qebûl dikir an na.. Vê yekê emê di dongiya şêx da bibînin. Piştî ko şêx şîretên xwe dike, li mizgeftê bi derdikeve û diçe diwanê.

Ûn ko mala şêxê Barzan dîtine dizanîn ko cihê diwana şêx çiqas f bilind e. Tayê binî mizgeft û yê dudûyan xaneqe (tekiye) û yê sisiyan diwan e.



BOMBAYÊ Î BALAFIRVAN DI BALAFIRGEHEKE WELATÊN BOHELATÊ NIZING DE

Gava şêx ji mizgeftê diçe diwanê, mirîd di nav xwe da li ser şîreta şêx a wê rojê (rûçikên Mehdî) dipeyivin. Dixwazin bizanin, ka ev rûçikên han bi kê dikevin. Ji ber ko rûçikên şêx goşî, hemî bi şêx diketin, hinek ji mirîdan dibêjin ko: hebe, linebe şêxê me Mehdî bi xwe ye. Hinekên wan jî dibêjin: ma kînga şêx rastî ji me veşartîye ko fro jî veşêre; heke ew Mehdî bûya wê ji me ra bigota. Li ser vê gotinê birê pêşin dibêje:

— Ma nayê bîra we ko şêx got: « dema rabûna wî gelekî nîzik e. Heye ko fro hati be dinê û riya roja ko Xwedê jê ra ferman kiriye dipê ». Erê şêx, Mehdî bi xwe ye; lê riya fermana Xwedê dipê.

Birê dudûyan dîsa bi gotina xwe digire ko şêx ne Mehdî ye. Li ser vê dikevin gewriya hev. Ji her du seriyân yek nikare ê din bîne ser gotina xwe. Ilînga yekî rîsipî jî mirîdan radibe û dibêje her du biran:

— Ma cihê ko e jil hebe, hewceye ko hûn holê zikên hev diêşînin. Ma nayê bîra we ko şêx got: tîfing bi Mehdî da naçe. Werin emê heriu diwanê û Bestek tîfing berdine şêx, heke Mehdî be, berik tê naçin.

Va e jilmendê Barzan nafikire ko heke şêx ne Mehdî, be dê bimire. Ev yeka han nayê bîra mirîdên her du biran jî. Gotina hemiyân li ser vê tevdirê dibe yek û şêş peya tîfingên xwe radikin û diçin diwanê. Di nişka va devê her şêş tîfingên didin pisîra şêx û tiliyên xwe davêjin lingên tîfingên.

Bi dengên tîfîngan û rabûna dû ra, şêx dizane ko evana bi bêbextî wî dikujin. Ew jî dide xwe û direve. Mirîd wî di devê derî da digirin ko hemî berik li cilan ketine û bi cên ne ketine. Li ser vê tecrîba han êdî şika wan namîne ko şêx Mehdî ye.

Lê hinekên mirîdan dîsa naxwazin bi vê yekê bawer bibin. Li ser vê, di navbera wan û ên mayî (anê piraniya ko bi Mehdîtiya şêx bawer bûne) da qirên dibe. Hinga ew eqilmendê ko rîya tîfîng - berdana şêx bi ber

mirîdan xîstî bû, dikeve navbera wan û dibêje:

— Ma ev gotinên we hewceyî qirênê ne? Ma nayê bîra we ko şêx got: Mehdî dikare bîfire? Werin emê herin biceribînin..

Ev gotina han bi serê hemîyan dikeve û tev terin nik şêx û daxwaza xwe holê jê ra dibêjin:

— Qurban! piraniya me bawer in ko şêx Mehdî ye. Lê hinekên bê-îman di me da hene ko bi vê yekê bawer nabine. Me divê şêx vê şika han di dilê wan da bi derxîne.

— Ma ez çawan dikarim vê şikê di dilê wan da bi derxim û kê jî we ra gotiye ko ez Mehdî me?

— Qurban, dilê me hemîyan dibêje tu Mehdî yî. Ma şêx nego'iye ko dilê çel misilmanî li ser çî liştî bibe yek, ew tişt rast e û nabe derew. Herçî şika di dilê hin mirîdan da heye tuê bi firîne jê biderxî.

— Kuro ma hûn ehmeqin, ez çawan dikarim bîfirim?!

Hinga eqilmendê Barzan, ew mirîdê ko berê rîya tecrîba tîfîngê sanî hevalên xwe daye dibêje:

— Gelfî mirîdan! Ji ber ko dema rabûna Mehdî hin ne hatiye, şêx xwe eşkere nakiye. Lê em dikarin biceribînin. Werin emê dest û lingên şêx bigirin û li ser xaneqê bavêjin jêr. Hinga wê bi kotekî bîfire.

Hin gotina eqilmendê Barzan ne qediye ko mirîd bi dest û lingên şêx digirin û bê ko guh bidin qîr û zariyên wî rebenî, li ser xaneqê davêjin.

Şêx Mihemedê ko cendekê wî î zexim bû, bi selameti nagehê hewşê. Her du dest û lingek, sto û pişt bi şeş cihan dişkên û şêx bi rasti dibe Mehdî. Piştî ko me got, pişt û stoyê şêx jî şikestî bûn, êdî ne hewce ye ko em bêjin roja dûtirê canê xwe sîparte ruhîstîf û cendekê xwe jî sîparte gorê. Hingê ev şêx Ehmed, ê ko bi navê Xudane Barzan batiye nasin î şeş safî bû. OSMAN SEBRÎ



TANGÊN BRÎTANÎ DI ENIYA BÎRMANYAYÊ DE



TOPEKE INGILIZÎ YA 40 Î DI ŞARGEHÊ DE

GIRAVA JINAN Û GIRAVA MÉRAN

« Adetên bav û bapiran »
« Kerik xweştir in ji hêjfran »

Belê medhelokê holê gotiye; lê carina nevi û neyîçirk rabûne û ew adet xerab kirine. Ji xwe adetin hene divêt bêne xerab kirin; wek adeta her du giravên Pesîfikê.

Beriya niho bi pêncî salî, wextê ko mibe-gîrên ewropayî û emêrikanî li giravên Pesîfikê ên gir û hûr belav bûne; tê de qewmîne xerîb û adetine xerîb diitine.

Di Pesîfikê de li rex hev, du girav hebûn; yek ji a din hinek mezintir. Ev her du girav bi heft kilometiran ji hev dûr bûn.

Di van her du giravan de qewmîck dijî û li gora adetêke kevin jin û mêrên wî qewmî ji hev cida diman. Herçî mêr di girava mezin de; heçî jin di girava piçûk de dijîn. Belê adetê welê diviya bû.

Icar di girava mêran de gava çaxê zîwaza xortekî dihat; hevalên wî jê re cejînek çêdikirin; ew dibirin perê behîrê û ew bi helehîpê tavêtin behîrê. Xortê delal bi melevaniyê xwe digihand girava jinan. Girava jinan bi zinarine bilind û asê dorgirtî bû. Lê bi tenê çîhekî, nizim û qulêr hebû. Xort di wê qulê re hildkişîyan giravê, ji xwe re keçikek

dibijartin û digel wê û dîsan bi melevaniyê vedigeriyan girava xwe.

Jinîk di girava mêran de hetanî ko ji cilan radibûn dima. Dema digihaşte wî half û nema zaro tanîn ew vedigerandin girava jinan. Herçî jinên stewr ji salekê bêtir di girava mêran de ne diman. Mêrên wan ew vedigerandin girava jinan û ji xwe re keçikeye din dibijartin.

Herçî zaro law di girava mêran de diman. Keçîk gava bi ser lingan diketin û ji şîr dihatin vekirin, bavên wan ew dibirin girava jinan.

Vi lalî bi vî rengî dom kir heta roja ko ji nav wî qewmî xortek bi navê Arwa rabû.

Arwa piştî ko gihaste emîrê zîwacê û hevalên wî ew avêtin avê û bi melevaniyê çû girava jinan, li şûna ko ji xwe re keçikeyê bibijêre û vegere girava xwe; di nav pîrekan de rûnişt û bi wan re axaft. Arwa digote wan:

— Ma hon çawan qafil dibin ko holê bi tena xwe bijîn û li hêviyê bîmînin da ko yek ji me bê û yekê ji we bineqîne, ji xwe re bibe û piştî çend salan wê dîsan vegerîne bavêje girava wê. Ma ji we re ne heyf e.

Gotinên Arwa diketin serê jinan. Rabûn destên xwe dan destê wî û qula ko mirov tê re diket giravê bi kevîran girtin û hûnandin.

Heftetek ketî bû navê û Arwa venegeriya bû girava xwe. Xelkê girava mêran rabûn xwe kar kirin; li şûngan sîwar bûn û herê xwe dan girava jinan.

Gava gihastine qula giravê çî bibînin. Qul hûnandî ye û Arwa digel jinên xwe — belê tev de bû bûn jinên wî, ji xwe heye ko Arwa ev liştî ji bo vê yekê kiri bû — li ser asêgehê sekinî ye û amadeyî cengê ye.

Mêran kir û ne kir jê re tu derman ne dîtin. Carekê, didowan caran ceribandin lê tu hawil jê ne kirin.

Sih, çil sal ketin navê mibeşîr gihastine her du giravan. Di girava mêran de ji hin pîr û kokim û cend mirovên nexweş pêvc tukes ne dîtin. Girava jinan şên bû bû. Jin û mêr tev de bi şahî û kêfxweşî dijîn. Xelkê giravê zehif bû bû; ji dene gelêr lê tev de ji ha-veki; tev de ji Arwayê asê.

EVDILEZÎZ METWAR



Jina merêşal Çenkeysek, serêkê Çîna şerevanî, li rex mêrê xwe ji bo felata welatê xwe xebuteke zor dixebite. Bavû Çenkeysek wê paşiyê çû bû Emêrikê. Resimê jorin li Nuyorke hatiye gortin.

DİROKA JINA NAPOLYON

« Ji welatparêzan mezintir û bi rûmetir nîne, bê wan kesên ko di rîya welêt da lebatine xwe wenda kirine ».
Napolyon

1

GIRAVA KORSİKAYÊ

Korsîka di roavayê peravên Îtaliya da giraveke navîn e. Erdê vê giravê tev da çiya û bi darên şebelûtan xemilandî ye. Xelkê tê da wekî xelkên hin çîyan ji mêran û mêraniyê gelek hez dikin. Ji mêraniyê pê va xelkê vê giravê bi rûmet, camêrî û şerûtiya xwe ji bi nav û deng in. Yeke din ji, xelkê vê giravê wekî me kurdan ji bo standina tolê meraqêke ecêb li cem heye. Ev meraqê han ko li nik wan ke tiye hikmê adetekê jê ra « vandêta » anê tolstandin dibêjin. Çi kesê korsîkî ko tolek li ser hebe, çavpehnîyê bike û tola xwe nestîne di, nav xelkê xwe da bê rûmet tê nasîn.

Korsîka, di berê da her di bin destên millet û hikûmetên dorhêlê da bûye. Lê hercar vî xelkê mêrxas bi temamî serê xwe ji hikûmeta serdest ra daneaniye; her bi çavêki neyar li zorbazên ser xwe nêrine. Ev girav di pêşiyên babilîska hejdebana da ketî bû destên hikûmeta Jenwayê. Çi ças ko korsîkiyan ne dixwestin serên xwe ji wan hikûmetên zorbaz ra deynin ji; ji ber ko adeta « vandêta » tolgirtinê di nav wan da gelekî pêş da çû bû û neyariyeke mezin di nav wan da anî bû pê, nema dikarî bûn vegerine ser zokerên ser welatê xwe û her bi hev û din lehiya bûn. Di nivê babilîska hejdebana da paşin da, bi navê Paskal Paolî mezinekî giravê herçî malmezînen korsîkayê li dora xwe civandin û xwest ko hikûmeta Jenwayê di giravê da bi derxîne. Ji ber ko ev hikûmeta han pîr û qels ketî bû, tevgera Paolî hinekî haviî didan. Lê gava hikûmeta Jenwayê dît ko hîdî hîdî xelkê Korsîkayê xwe ji bin destê wê bi derdixin, di sala 1768 an da girav frote hikûmeta Franseyê.

Piştî ko civata Paolî serekî dirêj li pêş hikûmeta Jenwayê ling da bû ber xwe û di nava korsîkiyan da yekîtiyek anî bû pê, bextê reş ew êxisti bûn bin destê hikûmeteke ciwan û xurt. Lê vê yeka han rehên Paolî û civata



wî sist ne kir; her ko çû dilê wan zeximtir û ji bo serxwebûna giravê xebata wan pirtir kir. Hingê, bavê bokeyê vê kitêbê Napolyon, Karlo Bonapart jî di vê civa'ê han da sekretêr bû ko tevî jina xwe a ciwan û çeleng di vî warî da xebatine zor kiri bûn.

MALBATA BONAPART

BAVÊ NAPOLYON

Malbata Bonapart ji reheke malbateke talyanî e bi kok û binyat bû ko ji demekî dirêj va di girava Korsîkayê da bi cih bû bûn. Ev malbata han, bi hemî rûçikên çak ên ko korsîkî pê hati bûn nasîn, di pêşiya xelkên giravê da bûn. Lê bi mal û dewlemendiya xwe hinekî bî şûn da ketî hûn. Herçî bavê Napolyon (Karlo Bonapart) ji bo ko mal û dewlemendiya xwe bigehîne wî navê malbatê ê mezin; xwe ji tu deverên dijwar û serguzêştan bi şûn da ne didan. Lê tu caran bext arîkariya wî ne dikir û ne digehêşte daxwaza xwe. Di vê rê da ewçend pêş da çû ko serguzêştan ko pê ra bûyî bextreşîya zivariyê li ser malbatê zêde kir.

Karlo Bonapart hîn nû pê dikir sala nozdehan ko gehadeta avokatîyê ji unîversîteya Bizayê stand û di wê salê da bi keçeke panzde

sali ra zewicf. Ew keça ko bi xweşikî û çelengiya xwe di nav jinên Korsîkayê da e yekta bû, û ji bo standina wê, xortan xwe di ber hev ra dikirin. Lê Karloyê şareza û jêhafî bi ber hemiyar xist û ji xwe ra bir.

Gava Paolî deng li xelkê giravê kir ko serê xwe ji Fransyê ra danînin û herwekî demên hikmê Jenwayê bi heft destan rahêlin benê serxwebûna giravê, hingê Karlo Bonapart tevî jina xwe a ciwan û çeleng di pêşya welatparêzan da, li ser piştê hespên xwe şerê vî zorkerê nuh dikirin. Tevî vê camêriya ko xelkê giravê rave dikirin, dongiya korsîkiyan bîr birin ne dijar bû. Di bavîna sala 1769an da zora wan çû, Paskal Paolî tevî giregîrên civatê derbasî nav Îtaliya bûn û li wir çûne nav Îngiltireyê.

Karlo tevî serek Paolî û giregîrên civatê di girava Korsîkayê da bi der ne ket. Wî qenc dîzanî bû ko bi derketinê nikare ji ho giravê tiştêkî pêk bîne; piştî bi derketina hevalan, berê xwe da hikûmeta Fransyê û hêviya lihevhatinê jê kir. Hakîmê giravê ê fransîz ev kesa han di xwe va derbaz ne kir, rahişte destê Karlo Bonapart û jê ra qedreke mezin girt. Ji xwe, ji mezinan Karlo bi tenê ma bû; bi rahiştina destê wî dikari bû herê xelkê giravê bi tevayî ber ve hikûmeta Fransyê

bade û Paolî û civata wî bi wan bide ji bîr kirin. Ma di nava civatê da ji Paolî bi şûn da ne Kar'lo bû?.. Herçiya bixwasta dikari bû têxe serê xelkê giravê. Bi vê ramanê hû ko hakîmê giravê li nik sera qerale Fransyê, Karlo nimî-nendeyê malmezînin Korsîkayê rave kir. Dergehê bext ji bo Karloyê jêhafî vebû bû. Heke mirinê lê ne lezanda, tegez wê xwe bigehanda cihê bilind û birûmetir. Ew cihê ko kurên tu malmezînan xwe ne gihadinê. Lê hîn di nivê xortaniyê da, berî ko bigehê çelî li bajarê Monpêlyiyê bi nexweşiya sertanê mir, herwekî kurê wî Napolyon jî paşê pê çû.

Piştî wê bi du mehan Napolyon li paytexta giravê, bajarê Ejaksîyoyê hate dinê (15 Tebax 1769) ko ji wî mezintir bi navê Jozêf kurekî Karlo î din hehû. Karlo gelekî ji kurê xwe Napolyon hez dikir û rûnêrmi şanî dida. Wî bi bînariya bavitiyê herza mezinatiya giravê jê dikir; lê nizanî bû ko ew kur, wê bibe mezinê hemî Ewropayê û sebebê gihartina rê û rêzikên rûyê cihanê.


DIYA NAPOLYON:

Lêtsiya Ramolîna (diya Napolyon) ji malbatên Korsîkê a kevintir û bi nav û dengtir bû. Ev malbat di dîroka Korsîkê da bi xurtiya şingî û piraniya jîrên xwe e nas bû. Bavê Lêtsiya, berî mêrkirina wê bi demekî dirêj miri hû; lê ev yeka han ji bo gihandin û erbiya wê ne bû bû manîek. Bavmariyê wê ê siwêsrî ew li ser bingehine çak gihandi bû ko tégîhêştin, bîr birin, nasî û zanî jî kiri bûn hevalê çelengiya wê a yekta.

Lêtsiya daylan, hîn sala çardehan kuta ne kiri bû ko di her alî va xortên giravê berê xwe da bûnê û hêviya zewacê jê dikirin. Lê Karlo yê ko bi jîrî û şarezaiya xwe di pêşya xortên Korsîkê da dihatê xweya kirin, pêşî ji hemî herberên xwe stand û di sala 1764an da bi Lêtsiyayê ra zewicf.

Karlo û Lêtsiya bîst salan, bi hev ra jîneke berxurdar ajotin û heşt zarok (pênc kur û sê keç) bi pê wan ketin ko Napolyon, Kurê wan ê dudûyan bû.

Gava Karlo mir tu hatîneke heja ji Lêtsiyayê û biçûkên we ra ne hişt. Bi tenê milkek jê ma bû ko salê hezar — hezar û pênc sed freng bi ser diket. Bê şik wê hatina hindik tîra ve mala pirkefçî ne dikir. Ji bo vê yekê bû ko Lêtsiya tevî zarokên xwe ji Ejaksîyoyê bi derket çû gund û xwe avête bin perên tiyê xwe Lûsyar. Lê felekê ew piştmerê han jî ji wan ra pir dît. Tu ne çû Lûsyar jî bi mirîneke bê dem, dest ji Lêtsiya û biçûkên wê kir û kesî



BALAFIREKE EMÊRIKANI DI DESTEGAHÊ DE

ko pišta xwe pêde ji wan ra nehîşt. Di wî warê han da, Napolyon li sirgûnê ev xêz nivîsîne:

« Mamê min î li ser nivîna mirinê û li ber hilma dawiyê bû ko gazî me kir. Em xûşk û hilma, tevî diya xwe li dor nivîna wî rûniştin. Piştî ko dia ji me ra kirin, gotê birayê min Jozêf: (tu mezintir û birbirê birayên xwe î; lê divê ji bir nekî ko Napolyon serekê malê ye). Bi van gotinan ra bû ko hilma wî a paşîn, di nav zarîn û hêstirên me da ji qefsingê bi der ket.

Di pê mirina mamê min ra, diya min xwe bê pişt û bazik dît. Êdî bê ko zendên xwe vemale û her tişî bi xwe bigerîne, jê ra tu çare, nema. Ev yeka han, ji jineke weke diya min ra, ne tişteki dijwar bû. Gav hat sekinî, hemî tişt girte ser xwe û ji malxoyekî jêhatî çêtir pê rabû.

Ma jineke welê li kû tê ditin ko çavên wê ên durbîn ji kireke me e biçûk ra biyanî ne diman. Çi tiştê kirêt di nefsa me a zaroyîn da xweya bibûya, bi eqilmendiyeke ecêb, ew tişt di hindav da bi derdixist. Ne dilîşt ko tişteki pîs di serê me da cih bigire, bê ramanên zirav û bilind. Gava bidîta, em yek bi qasî mûyekî ji gotina wê bi dertên, nema xwe radigirt. Çi kireke bê rê ji me bi derketa, çiqas biçûk bûya jî, çavên xwe jê ra ne digirtin. Tevî ko zivariyê bê dilovanî bazikên xwe di ser me ra vegirti bûn, wê serê xwe ji ber tu dijwariyan nizim ne kir û ne westî. Bi dilekî xurt û bêhneke fere sînga xwe da ber hemî dijwariyan û li ber tehlî û der û kulên jinê weke şerekê rawestî. Di van hemî fedakariyan da kama wê ev bû: biçûkên xwe bi canekî paqij û ramaneke bilind bigehîne.

Bi wê ra, xurtî û dilhişkiya mêran, canziravî û dilovaniya jinan hebû. »

Ev e, salixdana Napolyon, der heqê diya wî da.. Ev dê bû ko ji Napolyon pê va, hemî kurên wê bûn melik û keçên wê bûn melike. Bê şivîşk kurên ko di himbêza diyeke holê da mezin bibin, teqez dê çavên wan li pêşiyê û para wan, mezinatî be.

Lêtsiya Ramolîna heya dawiya emrê xwe, qenc hînî zimanê fransîzî ne bû. Mirov dikare bêje ko tişteki ji rûçikên xwe ne gubart. Yek jê, piştî ko kurê wê Napolyon bû împerator, dergehê dewlemendiya xwe jê ra vekir; jê ra meaşekî mezin girêda, lê van kirên han tişteki ji tevdîra wê ne gubart. Her wekî rojên teng Lêtsiyayê mesrefê xwe bi pîvan dikir û ne dixwast wan rojên teng ji bir bike. Ji bo vê çavtengiyê bû ko fransîzan xwe pir nîzîkî wê ne dikirin.

BIÇÛKIYA NAPOLYON

Piştî ko em li ser korsikayê û xelkê wê çiçekî peyivîn, divê hinekî jî serpilki biniçtin in dîroka giravê a babilîska hevdehan. Ev babilîska han, ji bo xelkê korsikayê hema bi tevayî e tişî şer û xûnrêtin e. Ew şerên ko di navbera civata Paolî û hikûmetên zorker da dibûn. Ji ber ko Napolyon di nava van şeran da hati bû dinê, di himbêza diya xwe da guhdarê çirokên şerên serxwebûnê bû. Pir caran bav û diyên wî, west û dijiwariya ko di van şeran da dîtî bûn, çawan li çiyân û baniyan derbeder geriya bûn, ev giştik bi zarekî dilsoj bi guhên Napolyon da digotin. Bi vê yekê bû ko çêla van şerên han, ji kitêba miqedes pirtir di guhên Napolyonê biçûk da cih girti bû. Ji ber vê bû ko dema deh salî bû, di leyiz û tevgerên xwe ên zarotî da jî, bê awa û rêzanên şer ji tu tiştî kêfxweş ne dibû. Çi listika ew di nav da bûya, herhial bêhna tevdîrên şer jê dihat, an bi awakî welê dida xweya kirin.

Bavê wî ko pir jê hez dikir, li ser wê meraqa han, jê ra topeke tûncîni e kiçik da bû çêkirin. Bi çav Napolyonê biçûk, di dinê da tişteki ji wê topa wî çaktir, dengêki dengê wê xweştir tine bû. Hele dema topa xwe agir dikir û kilorên di wek ewrên kiçik ji devê wê dikişîn û li rûyê ezmên belav dibûn; wî zarokê biçûk ji kêfan hemî dinya di bin lingên xwe ra didît

Di wî emrê hanê kiçik da dilê Napolyon bi du tiştan pir geş dibûn. Yek ji wan: agirkirina tapê; tiştê dudûyan, dema bi tena xwe diçû ber behrê û di qefayê ko firo bi şikefta Napolyon bi nav bûye da temaşa pêlên behrê kirin.

Ew pêlên ko di dawiya emrê wî da li girava Sant-Hêlanê bê hêreya wan tişteki di dest da nema bûl.. Cara paşîn, ne wekî biçûkiya xwe şop û hêviya mezinatiyê di nav pêlên behrê da didît; lê di nav wan da, rûyê feleka bêbext tevî kirêtiya xwe dihatê ber çavên wî. Bi wî rûyê ko dema çira bêxt li ser serê mirov vedimire, di rengêki tarî û dilxênq da dixewine û dil û ziravên boke û mêrxasan dibizdîne.

Erê, ew behra ko Napolyonê biçûk hêviyên xwe ên pêşende di nav pêlên wî da didît; paşê ji Napolyonê mezin, împeratorê fransêyê ra bû bû hesargeheke herhe. Hesargeheke welê ko rojên xwe ên bedbext di sirgûniyê da, bi hêrekirinâ wan borandin.

OSMAN SEBRÎ

HINEK JÎ HENEK

NAVEKÎ NAS:

Nivîsevanek çû bû ba gerîmendê rojnamekê û jê xwesti ko bendên wî di rojnama xwe de belav bike.

Gerînende: Em bi tenê nivîsarên wan nivîsevanan belav dikin ko navên wan bi xwendevanên nas e.

Nivîsevan: Heke şertê te bi tenê ev e, rahat e. Navê min li her derê nas e.

— Navê te çi ye?

— Navê min Mihemê e.

XEBERA TE YE:

Jinik — (jî mêrê xwe re)
Min ji ya deya xwe bikira min tu ne dikirî.

Mêrik — Xebera te ye. Lê min nizanî bû ko deya te evçend ji min hez dikir û li rahiya min digeriya.

SENEDE NE MEKTÛB:

Gundiyeke li yekî xwende digeriya. Rastî efendîkî hat û jê pirsî:

— Tu dizanî bixwînî?

Efendî: Ma çawan nizanîm.
Gundî rabû kaxezek dayê.

Efendî kaxez vekir û dest bi xwendinê kir: Piştî pirsiyariya hal û xatir...

Gundî: Efendî tu şaş î. Tiştê ko di destê te de ye senede ye, ne mektûb e.

Efendî: Te çire ji berê de ne got. Te bîgotî min ji xelet ne dixwend.

EHMEDÊ KER:

Di gundekî de zilamek hebû; navê wî Ehmed, leqeba wî ker bû. Jê re Ehmedê ker digotin. Jina mêrikî jî wê leqebê gelek aciz dibû. Jinekê, rabû, gote mêrê xwe:

— Filankes, berxekî serjê bike, mixtar, kefxwê û giregir biezimîne û wê leqeba kirêt bide guhartin.

Mêrik mîna jinekê got kir. Mêvanan piştî xwarin û vexwarinê gote xwediye malê:

— Me leqeba te guhart, me leqeba dehsîk li te kir. Ji niho û pê de emê ji te re Ehmedê dehsîk bibijîm.

Mêrik bi kêf û xweşî baz da aliyê malê û gote jina xwe:

— Hîrmet, mizgîniya min bi te, navê min guhart ne, ji niho û pê de ez Ehmedê dehsîk im.

Jinikê bi xêd lê vegerand:

— Ji dil tu ker î. Ma tu nizanî ko dehsîk gava mezin dibe, dibe ker.

TELÊGRAF:

Zilamekî təcîr jî bo îşê xwe torka mala xwe da bû û di gund û bajaran de digeriya. Vegera mêrikî bi derengî ket. Jina wî bəriya wî kir; rabû tiştek hêncet girt û jê re telêgrafeke şand da ko zû vegere mal.

Mêrik gava telêgraf stand li hespê xwe siwar bû û berê xwe da mal. Hesp bi rê ve dileyîst, xwe hol dikir û kêfxweşî şanî dida. Xirîk bi ken gote hespê xwe:

— Malava, telêgraf ne ji te re, lê ji min re ye.



BOMBA BALAFIREKÊ DIKEVE ERDÊ



HÊSIRINE JAPONÎ DI FILÔQEKE EMÊRIKÂNÎ DE

BI SER

KELEHË DE GIRTIN

Û PË LI PIRA WË KIRINE

Di hejmarâ Ronahiyê a 16 an de me çêl li keleha Ewropayê û girtiyê wê kir tê de got ko ev keleh jî wek hemî kelehên din dê bikeve. Îro.. sibe... du-sibe....

Li 12 Tirmehê, roja Duşembê, bi sariya sibê ve sondixwariyan bi ser kelehê de girt û eskerên inglîzî, emêrikanî û kenedî daketin girava Sicilyayê.

Sicilye di nivroyê Ewropayê û di Behira spi de girava mezintir e. Sicilye birekî Îtalyayê ye. Ji xwe berê qraliyeteke biserxwe bû.

Îtalya di nivroyê Ewropayê de, di şikilê çizmêkê de, nivgiravek e. Sicilye li roavê û di bin pozê çizmê re ye. Di navhera Îtalyê û Sicilyayê de avtenga Misinê heye. Di bin deran de fîrehiya avtengê çar kilômêtir in. Bi peyari û bi meşeya adetî îşê saetekê.

Bi vî wesfî Sicilye di nivro de pira keleha Ewropayê ye. Belê, li wextê berê gava kelehek çêdikirin, xendekek li dora wê dikolan û pirek berdan ser.

Heke Ewropa kelehek e, pira wê Sicilya ye û îro sondxwariyan pê li pirê kiriye û li ser wê êrişvanî û kelehvanî şerê hev dikin. Welê dixuye ko li Sicilyayê çend firçeyên elemanî ne, biwan pir ji mêj ve ketî bû destên sondixwariyan.

Belê eskerên talyanî ewçend li ber xwe nadin û gava hinek zor giha wan zûka teslîm dibin. Hitler li vî hali gelek aciz e. Dibêjin ko ji bo vê yekê rêberê elemanan hatiye Îtalyayê û bi darî Mûsolînî ketiye, gazind jê kirine û goti-yê:

— Malava ev çi hal e, eskerên te qet li ber xwe nadin, hema direvin û gava kês bi wan ket diçel zabî û kumandarên xwe û bi hezaran teslîm dibin.

Mûsolînî yê ko bi heft zar û zimanan dizane qet li ber xwe ne ket, hi elemanî welê bersiva Hitler da ko ew mat kir. Mûsolînî gotiye:

— Malava ez hûme hevalbendê te û min soza xwe da te ko ez bikevim şer û ez li ser soza xwe sekinî me. Lê tu caran min ji te re ne gotî bû ko eskerên min narevin an teslîm nabin. Herkesî awayê şerê wî heye. Eskerên te bila sebeb û wek keran xwe didin kuştin. Yê min xwe ji mirinê diparêzin da ko di wextê teng de bi kêr bîn.

Dema ko Hitler û Mûsolînî di vê şexaliyê

de ne sondixwariyan hin bi hin Sicilyayê vedigirin û nîzîngî li pozê çizmê dikin.

Herçî rohelatê kelehê îsal di vê eniyê de, elemanan yekcar kê m kiriye.

Elemanan ji xwe re kiriye adet hersal ber bi dawiya Biharê dirêjî ûrisan dikin û li Zivistanê bilîna xwe didin.

Ji xwe elemanan li 22ê Hizêxana sala 1941ê dirêjî ûrisan kiri bû. Di sala 1942an de êrişa Biharê bi qederê heftekê bi şûn de ma û li 29-30 Hizêranê dest pê kir.

Di êrişa 1941ê de armanca elemanan Mosko bû. Herçend elemanan mîzeferiyetine mezin xistî bin jî destên xwe, ne gîaştin armanca xwe û ji her deriyên Moskoyê bi şûn de vegehiyan.

Di êrişa 1942an de elemanan petrolên Bakûyê ji xwe re kiri bûn armanc. Bi qasî par nebe ji di vê salê de jî, elemanan nemaze di destpêkê de hin miwefeqiyet xistine destên xwe.

Li 4ê Tirmehê, di nivroyê Stalîngradê de ordiwên Tîmoşenko şikestin. Li 11ê mehê elemanan rêhesina ko ordiwên bakur û nivro bi hev re girêdida birin. Li 17ê mehê elemanan de t bi mîhasera Stalîngradê kir û di bakur roavê de da ser baskê ûrisan ê çepê. Von Kleyst bi ordiwên xwe ve dirêjî çiyayên Qevqasê kir da ko di serê wan çiyayê de xwe higehîne von Meynsteyn.

Li 5ê Tebaxê von Bok di Kollenîkofoyê re li çemê Don derbas bû. Li 9ê mehê von Kleyst zora xwe da mîntîqa petrolên Meykopê. Li 10ê mehê qewetên elemanî bi dirêjahiya boriyên petrolê ve, ji Meykopê heta Derya Qezwînê istihkamên rûsî xistî bûn destên xwe. Von Kleyst zora xwe dida Grosniyê; Von Meynsteyn berê xwe da bû bendera Novrosiskê. Herçî Stalîngrad ji bakur-roavê û ji nivro-roavê zor digiha-yê.

Li 2ê Îlonê baskê ordiwa von Bok ê çepê derbasî çemê Volgê bû û li 7ê mehê Novrosisk ket destên elemanan. ûrisan qewetên von Bok di pêşiya Stalîngradê de sekinandin. Tîmoşenko rabû berhicûmê zor da baskê von Bok ê çepê û ne hişt ko qewetên Meynsteyn yê ko dirêjî Batûm û Toapseyê dikir ber bi pêş herin.

Li 4ê Çiriya-pêşin von Bok bi qewetên bej û hewayî li Stalîngradê şidand. Lê ûrisan pê da erdê Stalîngrad ji xwe re kir wargêh û itîsala elemanan di navbera çemên Don û Volgê de birî û paşiya ordiwên elemanî di roavayê

behira Azovê de xiste xeterê. Ūrisan ji Meykopê pève petrolên Qevqasê xelas kiri bûn.

Ber bi dawiya Çiriya-paşûn elemanan zor-dida Mozdokê. Qewetên rûsî di nivroyê Donez de, ji Seretov û Esterxanê rabûn berhicûmê û elemanan bi şûn de vegevandî. Elemanên ko di Stalingradê ma bûn jêslîm bûn. Ūrisan Qevqas ji elemanan paqij kirin; ji nivgirava Tamanê pève. Ūrisan Rostov, Xerkov, bi şûn de vegevandî û nîzîngî li Diniyepetrovskê kirin. Di qada bakur de ji Rijêv, Vilikilûkî û Viyazma ji elemanan paqij kirin û zor dan Smolenskê.

Elemanan piştî ko erd û bajarên Qevqasê tev de ji dest dan xwe ji nû ve kar kirin û dirêjî Xarkovê kirin û ew bi şûn de vegevandî. Xurtiya sermayê tevgera her du aliyên sekînan; her du aliyên jî xwe dane xebatê û xwe ji bo Biharê kar dikirin.

Bihara 1943an hat, mêrg heşîn bûn, dar bişkivîn. Lê êrişa elemanan ne dihat. Xelk di hêviyê de ma; heta 5ê Tirmehê.

Li 5ê Tirmehê sala 1943an êrişa elemanan a mezîn di navbera Kursk û Orelê de dest pê kir. Êrişa tang û qewetên mîkanîkî. Radyo û

telêgrafan digot di vî şerî de heta niho evçend tang ne ketine pêsberê hev û bera hev dane. Vê êrişa mezîn gelek dom ne kir. Di rojên pêşîn de elemanan çend bost erd xistî bin destên xwe ji Ūris rabûn berhicûmê; ew erd bi şûn de vegevandî û pêş de çûn, erdine nû xistine destên xwe.

Ji 5ê mehê heta 7ê Tirmekê Ūrisan 1271 tangên elemanî şkenandin. Niho weziyet yekcar guheriya. Ūris dirêjî dikin, eleman di midafêhê de. Yanî êrişa elemanan vê salê ji çend rojan bêtir ne ajot. Li gora nûçeyên dawîn Ūris evçend pêş ve çûne ko gihastine hilma bajarê Orelê.

Armanca şerî a pêşîn bê şik şer e. Lê armanca wê a paşîn silh e, aşî ye. Şerevanî cehda xwe dikin rojkê berî rojkê zora dijminê xwe bibin, wî teslîm bigirin û ji nû ve aşiyê deynin.

Bi me be, ji roja ko ji ber deriyên Moskoyê vegeyriyane elemanan ev şer wînda kiriye. Lê zora wan ne çûye, li ber xwe dan, îro jî didin û hêj dikarin bidin. Ma heta kengê?

Di vê babetê de awayê dîtîne ne yek e.

Ûlin dibêjin ko elemanan heta dawiyê li ber xwe bidin. Hîtlêr bi xwe jî di vê fikirê de ye.

Lê dîsa bi me be, ne welê ye. Eleman beriya dawiyê bi gelekî wê çekên xwe deynin. Ordiwa elemanan wek berfa ko dikeve ber tavikên Tirmehê, ji nişkekê ve wê ji hev de bikeve û wê bihele.

Me qala talyanan ne kir, ji ber ko dostên me ên saz-bend û tenbûrvan bîf elemanan ji mêj ve çekên xwe danî bûn.

Piştî ko me ev bend nivîsand û da rêz kirin; li 26ê mehê radyowan da zanîn ko Mûsolînî îstîfa kiriye, merêşal Badogliyo ketiye şûnê û qral bûye serfermandarê ordiwên talyanî. Îstîfa Mûsolînî, îstîfa talyanan ji herbê ye. Bivê nevê bi vê îstîfayê çih li elemanan hêj bêtir teng bûye. Gelo Hîtlêr wê kengê îstîfa bike?...

RONAHÎ



Genêral De Gol û Genêral Ketrû cenkeştike frensa şerevanî teftîş dikin

RÊ JI BER WINDA

Di heyamê biçûkiya xwe de ez hîni xwendina dersên şerîetê bîm. Min zehmetî pir dit leta ez mezin bûm.

Di ditina xwe adûrebin de min digot ezê mezinahiya emrê xwe derkevim mamosteki mezin û bi kêrî ol û dinyê bêm. Min nizani bû ko ezê bibim melayê gundeki, kîxiwek, mixtarekî nezan, rê jî ber wînda. Rîşmeke jî nezanîya xwe wê têxe serê min û wê min bizivirine bi aliyê riyên xwar de. Û hege ez çî gotar an zamistîkê bidîme ber wan, wê riyên xwe jê bigubêrin.

Belê min şevêkê wextê ko civat digere di nav gotinên xwe de gotinek li ser olê got; û di pey re min li ser kurdî û li ser kurdparêziyê got.

Hinekî jî gotina xwe ezê li vî rûpellê bêm. Min got: Geli kurdên delal, hon nanêrin kurd tim dil û reben in; tevgera wan maye bi destê biyanîyan.

Gotin: Ma em çawan bikin seydayê delal!

Min got: Hevalliya kurdên zana bikin; hez jî mîlet û welatê xwe bikin. Çawa ko pêxemberê me gotiye: « Hezkirina mîlet û welat jî îmanê ye »

Wan li min vegeand: Xwedê zane seyda fikira te Cegerxwîn.

He mî jî digotin: Tu jî rîya seydatîya xwe derketîyt. Şêx û mela li Amûdê pir bene; tucar ev gotin jî kesî re ne gotine, Tiştê ko em jî şêxên Amûdê dibînin; ew dibêjin



DI PERAVÊN BEHIRA ŞEŞ DE NOBETDAREKÎ ÛRIS

çûye ser ya

« kurd » hevalên Cegerxwîn in û kurdmancên ko li dû olê dimeşin kovarên latîni naxwînin.

Eve nezani. Çawan dost û neyarên xwe jî hev nadin ali.

M. BEŞÎR HESENÎ

Amûdê, Gîrbêjîng: 20/6/1943

HEJMARA HAWARÊ A 562N LI 15Ê TÎRMEHÊ BELAY BÛYE. LÊ BİGERÎN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

Tefsîra Quranê. Yûng Simpson. Şeytanqûnî. Diwana Melê. Mêşhingivî. Keça Şîrê.

Kitêba Totê reb. Memozina Xanî.

Kiriyariya Ronahiye

Ji bo Sûriyê Pênc lîreyên sûrî — Ji bo welatên din lîreki jîngiltz

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Mir Celadet Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 18
ÇARŞEMB
1 ÎLON 1943

RONAHÎ

ANNÉE 2
NUMERO 18
MERCREDI
1 SEPTEMBRE 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

JI BİRËN SEFERA SICILYAYÊ



*Ingilîz û emêrikaniyan sefera Sicilyayê di nav 43 rojan de
temam kirin û girav vegirtin. Klişa me eskerine emêrikani şani
dide; yê ko dikevin gundeki giravê.*

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Séro û Pîvaz	Çirokbej
Çawan Çente dizin	Lawût
Biserhatî	Cemilê Tacdo
Hevalê Çak	Osman Sebrî
Rahbe	Bişarê Segman
Reqê Avê	Dilawer Çarpîne
Nêçîr	Osman Sebrî
Pîra Torê	Cegerxwîn
Hey Kurd	Cegerxwîn
Xiyal	M. E. Bolî
Şêr û Mişk û Rovî	Brahîmê Isa
Napolyon	Osman Sebrî
Hîndîk Rîndîk	Xeberguhêz
Qertel û Kûsî	Mihyeddîn Pehlêwî
Hînek ji Hînek	Yarîker
Berazekî Londrê	Ronahî
Kurdmançîno	Xebatdarê Welat
Xarkov	Nêrevan
Elemanye û Rohelat	V. Hûrban

ÇIROKA KURDMANÇÎ:

SÊRO Û PÎVAZ

Dibêjin ko carekê du zilam brayê hev bûn. Navê yekî Sêro û yê ê di Pîvaz bû.

Rojekê Pîvaz gote Sêro:

— Bira, min divêt ez biçim xulamiyê; tu çi dibêjî?

Sêro got: Tu bi dilê xwe yî, lê tu ji ya min biki naçî, tu nikarî xulamiyê, biki, tebiyetê te ne xweş e

Pîvaz got: nabit ezê biçim

Sêro got: bila be, tu bi dilê xwe yî Sibehî Pîvaz rabû çû, bû mehvanê keşekî. Keşe got-ê: Pîvaz tu li çi digerihi

Pîvaz got: Ez ji bo xwe li xulamîkê digerihi

Keşe got. were bibe xulamê min

Pîvaz got: qenc e, sala min bi çi ye?

Keşe got: qewlê min û te ne bi sala ye, belkî qewlê min û te heta pepûk bixwîni, ezê hevqas bidim te. Bi wî şertê ko heçî ji min û te bienirî emê zolekî çerm ji piştla stoyê wî rakin, heta ser dûvka wî.

Pîvaz got: qenc e.

Sibehî rabûn ji xew, keşe got Pîvaz: Here cot, seyê min li kû rûnişt li wê derê cot bike, êvarê barek darên bêtovil digel xwe bîne. Ezê taştîya te rêkim

Dema Pîvaz çû çolê, seyê keşe çû

geriha li ser berekî mexel hat. Pîvaz gayê xwe girêda, li ser tehtê cot kir. Dema taştê, keşe taştê da keça xwe û got-ê:

— Bêje Pîvaz bila nan neşkênî, tokê mast ji neşkênî, fehit nekê têr bixwî. Êvarê dema hat mal bila ga li derî de neêxî mal de, diwar ji xirab nekê

Keça keşe çû nik Pîvaz, herwekî bavê wê got-ê; ewê jî welê got Pîvaz.

Pîvaz enirî nan ne xwar, ma heta êvarê. Êvarê hat, got keşe:

— Mala te neava, ezê biçim mala xwe

Keşe got-ê: ma tu enirî

Sêro got: erê ez enirîm

Keşe got Pîvaz: Me qewlê xwe kirîye, ezê zolekî çerm ji piştla te vekim Keşe rabû zolekî çerm ji piştla Pîvaz vekir.

Pîvaz tevli wê xwîne çû nik Sêro.

Sêro got: bira te li ser min lazîm kir ez biçim heyfa te

Sibehî Sêro rabû berê xwe da mala keşe, bû mehvanê wî.

Sêro bû xulamê keşe. Keşe tiştên gotî Pîvaz welê gote Sêro jî. Sêro jî qebûl kirin. Sibehî Sêro rabû çû cot. Se ji bi xwe re bir. Se dişa çû li ser tehtekê mexel hat. Sêro dest avêt berekî li bin guhê seyê keşe da, kuşt; çû li erdeki xweş cot kir. Dema taştê, keça keşe taştîya Sêro anî wek got-î Pîvaz, welê got Sêro jî.

Sêro got, qenc e. Sêro rabû ji nava nau xwar dora wî ne şand, binê dizîkê qul kir tokê wî ne şand. Dema têr xwar, binê keşkê ji qul kir. Keşik ve-geriha hat, got babê xwe.

Dema bû êvar Sêro rabû nîr û halet şkandin, li kerê kirin, anîn mal.

Dema Sêro hat piştla xanî her du ga jî şerjêkirin, qet qet kirin li kulekê re avêtin, û hat nik keşe.

Keşe got Xwedê qeweta te bidit, kant seyê min

Sêro got: Min seyê te kuşt, min keça te ji xirab kir, min nîr û hatet ji şkênandin, min gayên te ji şerjê kirin, qet qet kirin li kulekê re avêtin, ma tu enirî?



JI WEXTÊ XWEŞIYÊ

Polonye wek piraniya dewletên Ewropayê, firo di bin lingên eskerên neyar de dinale. Ev welat îris û elemanan bi hev re vegirti bû. Hingê îris û eleman hevalbendên hev bûn; piştê bûn neyarên hev. Polonye firo bûye xerabezarek. Ev her du klîşe şenahiya wî, welatî di wextê aşiyê de, şanî didin. Keçikin direqîsin, hinên din di rîzika rêçezanan de dimeşin.

Keşe got: ne xêr ez ne enerlme.

Keşe û jina xwe li hev şewirtin, gotin: emê firo kadê ji xwe re çêki, esîdekê çêki, emê birevîn, Sêro bihilî xew da.

Pêkanîna xwe kirin, kada xwe, esîda xwe kirin ciwalkî û danîn wê derê.

Dema keşe û jina xwe nivistin Sêro rabû tiştên he ji ciwal derêxistin û xwe kir ciwêl de. Beri sibehê keşe rabû ciwal hilgirt, jina wî kete pêş, çûn. Nîzîkî sibehê mîza Sêro hat, di ciwêl de mîst.

Keşe got jina xwe: keçe esîda te çiças têr-dihîn e.

Jinkê got: Wê bîma ji Sêro re, min hemî êxist esîdê.

Dema çûn nîzîkî gundekî seh hatin wa, keşe got jina xwe.

— Xwezî Sêro li hir bûya, da seh ji me vekirana.

Sêro got: Mamê keşe min dane ezê se ji we vekim. Keşe Sêro danî.

Dişa keşe û jina xwe li hev şewirin go emê biçî şev li ser pirê razî. Jinkê got keşe: tu li nav de raze, ezê li rexê te ê rastê razim, bila Sêro li rexê çepê



razê. Dema bibit nivê şevê emê rabî Sêro bavêjin avê, jê rahet bibin.

Dema bû nivê şevê Sêro çû cihê keşe, keşe anî cihê xwe, demekê ma û ba kir jinkê

— Rabe em Sêro bavêjin avê

Jinik rabû destên keşe girtin, Sêro lingên wî girtin, avêtin avê. Keşe li avê de çû, Sêro jina keşe ji ji bo xwê anî. Heyfa birayê xwe ji ji erdê rakir.

Çîrok çû destê dê û babê me çûn bihuştê.

ÇAWAN

ÇENTË WÊZIRË ELEMANÛ DIZÎN

Her wekî xwandevaran dîzanin, Fenlenda hevalbenda Elemanan e; lê di navbera wê û Emêrika da şer nîne. Ji lewre ev her du millet bi nav hev da diçin û tîn.

Di sala 942an da bijîşkekî emêrikanî giha bû Helsinkiyê, paytexta Fenlendayê. Pir ne ajoti bû ko jin û keça wî a çeleng jî di pa ra xwe gîhandi bûnê. Di nava çend mehan da, bi jêhatî bûnê navekî ecêb bi pê bijîşk Rêntîrî ket û li ber derê wî nexweşan rê ne didane hev.

Jina bijîşk a zana tevi keça xwe a çeleng jî di rîya qenci û comerdîyê da navkî mezin jî xwe ra birin. Van her du jinan (dê û keç)rojê pê da xestexane û şargehên belengazan ziyaret dikirin û bi destelî comerd û xêrxwaz arîkariyê

wan dikirin. Navê xêrxwaziya wan ewçend belav bû ko di bangeh û cihên tevayî da bê pesna wan tu gotin tine bû.

Gêstapo, daîra polîsa elemanî edî nema dikari bûn guhên xwe ji bihistina pesnên derbêg emêrikanîyan da vekirî bihêlin. Serekî paqotîniya bijîşk Rêntîrî kirin. Gava dîtî ev yeka han fêde nêke, rabûn li Elmanyayê bijîşkekî welê anîn; lê Rêntîrî serdestiya xwe parast, ji ber ko bi nexweşan ra fî comerd bû.

Di pêşiya sala 943 an da ko bi çi ramanê bû, wezîrê elemanî hat xaniyek di rexê bijîşk Rêntîrî da girt. Piştî vê biçend rojan, sê ne xweşên emêrikanî hatin nik bijîşk Rêntîrî giliyê nexweşiyê kevin dikirin. Bijîşk jî, ji wan her sê mirovan ra sê ode raxistin û dest bi derman kirina wan kir.

Piştî vê bi heftêkê rojnameyên Fenlendî nivîsîn ko: ji bo danzanîna hin tiştan wezîrê elemanî dê bi balafîrekê biçê Berlinê.

Lê wezîrê elemanî ne çû Berlinê ji ber ko hûyerek lê qewimî; çentê ko rapor û ewraq tê da bûn hati bû dizîn. Xaniyê bijîşk Rêntîrî di dîwêr da hati bû vekirin û derbasî xaniyê wezîr bû bûn, bi tenê ew çente biri bûn.

Dem a Gêstapo dora xaniyê bijîşk girt û velo kir, ne nexweş, ne jî bijîşk û keç û jina wî ne hatin dîtin.


Gava emêrikanîyan ev nûçeyên han belav kirin; hînga xelkê zanf ko di çehntê wezîrê elemanî da çi hebûn ye. Newyork-Teymîs digot: « Ji fro pê ve nema Eleman zad didin Fenlenda. Ji bo dilxweşiya Fenleudiyan Eleman dixwazî nîşanekê bidin marşal Manêrhaym ».

Ev bû xehata ko bijîşk Rêntîrî ji bo welat û welatîyên xwe kir.

Ji xwe şerê mezin di navbera mirovên jîr da dibe; lê ne di qada şer da...




TOFEK JI XELKÊ HAWAYÊ DI BIN BANDËRA EMËRIKANÎ DA



KUMIRËN TOZ DIXIN HEVÎR Û WAN DIXIN ŞIKILÊ KERPIÇAN U DIŞEWITINÛN

LAWÛT



Piştî ko her du general De Grol û Jiro gihane hev û yekîtîya erden kîşwerê Fransayê anîn pê; Franse ji nû ve, rexma ko welatê mader vegerti ye, dest bi xurtbûnê kirîye Heçl fransîz û heçl xelkê welatên ko di bin bandera fransîzî de dijîn, tof bi tof diçin lalîmgahan û hîni eskerîyê dîbin. Fransîz tro ordûke ji 300000 peyayî lihevkeî saz dikin; da ko di êrîşa mezîn de bi hevalbendên xwe re dakevîn beja Ewropayê û welatê xwe bi destên xwe xelas bikin.

BISERHATIYA

NOQAVEKE BRITANI

Kumandarê noqava britani «Tako» Kaptan Pî ji rojnamevanekî îngilîzî re, biserhatike noqava xwe qise kiriye û gotiye:

Em di behira Êgê de bûn. Ji Etîné, payî-textê Yewnanistanê, bi çend milan dūr. Ez bi xwe li ber dūrehîné bûm. Çi rojeke geş û xweş. Di xwerûbûna heşinahiya xwe de, behir û ezman dikirin ji hev derkevin. Li ezmên ne ewrek, li behirê ne pêlek....

Perav bê dū û dūman, lat û zinaran, ji me ve, yeko yeko û zelal xuya dikir. Zemanên borî, rojên ko em bi filûqan derdiketin seyranê, dihatin bîra min.

Ez di van texmînan de bûm ko di her dūrehîné re perçak dūman derbas bû. Di pey re min dengê motorê kir; balafrek... Hêshal di van doran de faporqesfeyek hebû.

Gelek ne borî vaporeke barkêş xuya kir. Du balafir û vaporeke çekirî ew dihemandin. Vapor ber bi me ve dihat; di navbera me de pênc mil ma bûn. Min emirê xwe da ko noqavê daxin binê avê. Noqav binav dibû û herkes

çû ser karê xwe. Vapor di nîzîngî me re derbas bû. Keştiya mihafîz li paş bû. Deryavan di ser pîra keştiyê re ferîqet diçûn û dihatin. Ne dihate bîra wan ko dijminê wan xwe kar kiriye û dike li wan xîne. Me torpîdên xwe berdan. Yek li orta vaporê keti bû. Dîdevanê me bi şahî û bi dengê bilind got: « Torpîdên me rîya xwe şaş nakin ».

Pîştî ko me torpîdên xwe berdan û hingafte vaporê em ji wê derê bi dūr ketin. Vapora mihafîz ewê bera me bidaya. Me çend teqîn jî bihistî hûn. Min ji mihendisî pîrsî heke me hingafte makîneyên vaporê. Mihendis digot tu dengê makînan nayîn; divêt makîge sekinî bin.

Qederê bist deqîqan ketin navê. Di vê çendê de me tu deng seh ne kir. Ma vapora mihafîz çî dikir. Gelo xwe kar dikir û deryavanê vapora ko me lîxistî bû, jî rûyê avê didan hev.

Em di van texmînan de bûn ko mihendisî em li dengê perwanê hişyar kirin. Di ser me re vaporekê xwe tev dida. Pîştî çend deqîqan bombeyine binavî di dora me de diteqîyan. Perçeyine bomban jî dihingafîtin qalîkê noqavê. Vaporê yanzdeh bombe berda bûn dora me.

Di nav wan de bombeyine bi sê tonan giran jî hebûn.

Dijmin etlahî da û makîneyên xwe vemirandin. Bi vî awayî dixwest çihê me bi temamî seh bike û bombeyên xwe bihingivîne me. Etlahiyê midellî dom kir. Vaporê makîneyên xwe jî nû ve şixulandin û dest bi avêtina bomban kir. Çend bombeyên din jî avêtine me. Bi teqîna her bombayê noqava me dihejîba û bi ser xwe de diçû û dihat. Di vê navê de dîdevanê me ji min pîrsî heke vapora ko me bin av kir du dîrek û 'bixêriyek an bixêriyek û dîrek hebûn.

Ma wextê vê pîrsiyariyê bû. Min bi erin lê vegerand û got: Du dîrek û bixêrike wê hebûn.

Dengê perwana vapora mihafîz nema dihate bihistin. Em derketin rûyê avê. Vapor ji me bi dūr keti bû. Lê xuya dikir ko hêj li me digeriya.



EMELEYINE INGHÎZÎ YÊN KOMIRA KEVIRÎN

HEVALÊ ÇAK

Di serê meha Tebaxê û şeva yekşembê da hevalê çak, xortê gelparêz Ehmedê Baravî piştî nexweşiya du salan çû rehma Xwedê..

Ehmed, ji xortên kurdên Şamê ên gelparêz yek bû. Di sala 938an da, gava ez ji sirgûnê vegeftim û li Şamê rûniştim; min Ehmed tevî şeş xortan nasî bû. Gava bi navê welat û welatîniyê min deng li xortên taxê kir, Ehmed jî di nav her şeş xortên mayî da gubê xwe da min û bi dilekî paqij û xurt berê xwe da rîya xebata welêt. Piştî ko yekitiya xortan hate pê, di warê welatîniyê da xebata Ehmed ji a hevalên wî ne kêmtir bû. Lê di warên rastî û dilçakiyê da rehmêtî xwe da bû gorê pêşin.

Di dinê da, wî armanc û hêviyêke bi tenê hebû ko ew jî; rojekê welatê xwe aza û gelê xwe serdest bibîne. Di vê rê da herçiya ji Ehmed bihata xwestin bi camêrî dikir; çawan herçiya jê hati bû xwestin jî kirî bû. Lê felekê ro bi serê Ehmed ne xist û di sala 941an da sîngjara malkanbax destê xwe ê xwînrêj dirêjî kezeha Ehmed kir.

Li her vê bobelata han em destgîrêdayî ne man û herçiya kirin diviya bû me kir; ew destê merxur di hinavê hevalê xwe da bi derxist. Me ji xwe ra dizanf ko êdî Ehmed ji nexweşiya han filitî û wê di nav me da bimîne û rojekê jî rojan bigehe armanc û daxwaza xwe. Lê gava daxwaza Xwedê bi tişteki tîne be, nabe û herçiya ko wî xwastiye jî dê bibe. Bendewariya hevalan û nêrina bijîşkînan Ehmed

Me sê rojên xwe di wan doran de derbas kirin. Roja siseyan vapore me digel çend vaporên din ên çekirî bi ser me de vegeiriya. Em noqî avê bûn. Heye ko dijmin em dîtî bûn. Ji ber ko rojê pê de bi bombeyîne hînavîn noqaya me hejandin. Me şev jî di binê behîrê de derbas kir da ko em dijminê xwe bikarin bixapînin.

Dotira rojê ji kêmaniya hewayê êdî em aciz dibûn. Tukesî ne xeber dida, ne jî xwe tev dida. Ji ber ko bi tevdan û xeberdanê me hewa hêj bêtir kêmtir dikir. Di ser me re dengê perwaneyên vaporan nema dihate bihîstan. Me

ji pencên mirinê kuta ne kir. Herwekî sîngjarê rîka Ehmed kiri be dilê xwe ko vê carê destê xwe ê malkambax dirêjî hestiyên wî kir.

Dema bijîşkînan xwestin destê wî ê nexweş bibirin, Ehmed qail ne bû û got: « mirovekî bê dest bi kêrî xebata welêt naye. Gava ezê ji xebata welatê xwe bê par bimînim, mirin jî min ra baştîre ». Bê birîna dêst jî xweş bûn ne inikûn bû. Dawî, di serê Tebaxê da canê xwe siparte Xudayê comerd.



EHMEDÊ BARAVÎ

Ehmed di şeva mirina xwe da sê wesiyet kiri bûn. A pêşîn xwesti bû ko ez serê wî girêdim û cendekê wî daxim gorê. A duduyan ko ala kurdi deynin ser cendekê wî. A sîsiyan ko ez li ser kêla gora wî bi zîmanê kurdi sê hevde xweşxwan binivîsim. Her du daxwazên pêşîn di roja mirinê da me bi cih anîn. A paşîn jî ev e li ser rûpelê Ronahiyê dinivîsim. Ko Xwedê hez bike, dê li ser kêla gora hevalê rast û hêja Ehmedê Baravî binivîsim. Heke Xwedê Ehmed ne gîhande daxwaza wî; dikare hevalên wî bigehîne.

Nivîsana ser kêla gorê ev e:
 « Me armanc azahî bû her »
 « Di wê rê dani can û ser »
 « Beri bigehêne daxwazê »
 « Felekê gote min: razê »
 « Bê dem ez çûme goristan »
 « Bijin her Kurd û Kurdistan »

Xortê gelparêz Ehmed, kurê Mistefayê Baravî li vir radizê; rehma Xwedê lê be.

OSMAN SEBRÎ

dûrebîna xwe xiste rûyê behîrê û li dora xwe temaşa kir. Tu şopa dijmin xuya ne dikir. Me da rû û hewa pak tenefsî kir. Em jî nû ve vegeiriya bûn jiyînê.

Sê rojên din ên nû ketine navê. Em rastî vaporeke barkêş e piçûk hatin. Ne hêjayî torpîdê bû. Lê hevalan gelek li ber min da. Me jê re torpîdek şand û hingafte orta vaporê. Binavbûna wê gelek ne ajot. Di vê navê de şeş balafîrên dijmin jî hejê berê xwe da bûn behîrê.

Dinya tarî dibû; me berê xwe da bendereke bêterf.

CEMILÊ TACDO

RAHBE

Navê wê Honorya bû. Di bajarê Ravnayê û di sala 417an de ji diya xwe bû bû. Valanlhyos birayê wê ê mezin bû. Bavê wan imperator Konstansê III û diya wan imperatoriçe Plasîda bû.

Hêj di ciwaniya xwe de bi evîne ket û zabitêk ji serbendên qesira bavê xwe heband; hebandineke kûr û dijwar. Lê diya wê a nefis-mezin li xwe danetani ko keça wê zabiteki ji zabitên qesirê bike.

Ma Plasîda çawan qîma xwe biauiya ko Honorya bibe jina zabiteki adeti. Di bin hikimê Romayê de kişwerine bêhejmar hebûn. Her kişwerê melîkek û mirekin hebûn. Diya bû ko Honorya biba jina mireki wan kişweran. Heke stêrka wê geş hilata ew mîr rojekê dibû melik û Honorya dibû melike.

Lê Honorya hez dikir; hezkirin zehmet, evîn xurt e. Di ber çavên keçikê de evîn di ser her tiştî re bû. Dilê wê qail ne dibû ko ji bo rajêriya tacekê li evina xwe asê bibe.

Dê û brayê wê çî dixwestin. Ji xwe re ji nav melik û xudantacan li mîrekî bigere, ne?... Belê... bila be.

Honoryê qerara xwe da û ji xwe re mîrekî

lacidar peyda kir. Bi vê bijartinê kêmastke mezin wê bigihaşt malbata wê. Ji xwe wê ji ev dixwest, da ko heyfa xwe ji dê û birayê xwe hilîne; ji wan her du zilamên ko keti bûn navbera wê û evîna wê. Honaryayê ji xwe re Etile bijarti bû.

Etile ew hikimdarê zalim û wehşt bû ko gava welatek vedigirt ji xwina mirovên ko şerjêdikirin çem didan herikaudin û bi fexr û ken digote xelkê dora xwe: Dera ko hespê min pê lê dike giya nema lê şin dibin.

Etile piştî ko Kestenteniye safî kir berê xwe da imperatoriya romanî ya roavê.

Ma diya wê, ji Honoryê re ne goti bû ko ji xwe re ji nav mîr û melîkan mîrekî bibijêre. Etile, ma jê meztir hikimdar hebû. Etile dinya vegerti bû; mîr û melîkên dinyayê xulamtiya wî dikirin.

Honoryê rabû ji Etile re nameye nivîsand û digel hingustilekê ew şande hikimdarê xwîn-rêj. Di nama xwe de, xwe pêşkêşt wî dikir û digot ko dixwaze bihe jina wî.

Piştî ko qasidê Honoryê bi rê ket diya wê pê hesiya; eniri. Da eqilê xwe, qerara xwe da. Ewê keça xwe ji dinyayê nependî bikira. Hebû ko bi vî awayî evina xwe ji bîr bikira.

Di şeveke tarî de mewkibeke Imperatori ji Ravnayê bi rê diket. Erebeke depdepe; li pêş



DI SALONA NESTEXANEKE INGILIZI DE DÊ û DIYÊN AYENDÊ

û paş û di her du aliyên wê de siwarine zirehpûş. Di erebê de Plasîda û Honorye rûniştî bûn. Imperatoriçe keça xwe dibir dêrê.

Erebê da hevrazê û qedereki çû; heta gihaste ber deriyê avahike bilind, wek kelehekekê. Ev dêra tarîkên dinyayê bû. Imperatoriçe keça xwe tê de hepis kir û vegeriya qesirê.

Honorye kete belgihê rahban û li ber qedera xwe a reş stoyê xwe xwar kir.

Qasid gihaste qerargaha Etile û bi darî ket; name û hingustil ber pê kirin. Etile lê vegerand û got:

— Navê mîra Honorye bi guhê me ve bûye. Dibêjin ko mîra romanî çeleng û spehî ye. J ber hikîmdarê xwînrejê ve jê re bibêje: « Melîk Etlîle, xezeba Xwedê li rûyê erdê, hakimê kişwer û welatan, qesabê serê mîran, jina ko ew b xwe dixwaze, ji xwe re tine. Ne hewce ye ko mîrekên romanî nefsa xwe jê re pêşkêş bikin. Etlîle jina ko dixwaze bikeve paşîla wî heke di qesîran de peyda ne kir; heye ko wê di koxîtan de peyda bike. Di pêşîya leşkerê xwe de emê di ser sûrehên Ravnayê re derbas bibin û textê imperatorên romanî hilweşînin. Û heke me mire Honorye ne eciband emê jê re bibêjin ko xwe bigelîne navmalîyên me. Te seh kir?... Niho here.... »



CINDIKI EMERIKANI DI GUNDEKI SICILYAYÊ DE ESKERINE TALYANI TESLÎM DIGIRE

Rahbeke pîr, di dêrê de, berê xwe da habîsa Honoryê û di dehlîzan re, hêdî û bê deng diçû. Gava gihaşte ber deriyê mîrekê destmala xwe derêxist, hêstir ji çavên xwe malîştin û li derî da.

Honorye rabû ser xwe, hêstirên çavên xwe ziwa kirin û derî vekir. Rahbê got-ê: Qasîdek ji Ravnayê hatiye û dixwaze mîrekê bibîne.

Honorye serê xwe hejand û Rahbê qasîd derbas kîre hundîr.

— Lûsyos tu kengê hati?

— Ev bûne sê roj ezbenî.

Qasîd Lûsyos tiştê ko Etlîle gotî bû-yê gote mîra xwe. Honoryê deng ne kir. Piştî bihînekê jê pîrsî:

— Li Ravnayê çi heye, çi nîne?

— Xwe kar dikin, şer nîzing bûye. Herçî diya te li ser înadê xwe ye.

— Û ew... çawan e?

— Kî?

— Ew.. ma li Ravnayê jê pêve kes heye ko ez pê bendewar bibim....

— Mîreka min, peyayê ko tu dibêjî, yê ko te hejî wî dikir, nema di nav zîndîyan de ye.

— Kuştîne?...

— Nîzanim, kuştîne an wî xwe kuştîye. Tiştê ez dizanim nema di jiyîna de ye.

— Belê kuştîne... ji rikê min ve ew kuştîne..

Honorye rabû; ji piyan sekîni. Çavên wê ên ji hêstîran nermbûyî ji nişkêkê ve bi hişkahiya hesînekî hişk bûne û pêtin jê çûn. Honoryê gote qasîd:

— Vegere Ravnayê û ji diya min re bibêje ko bi vê kirê hisên dilê min kuştîne; ez nema ji dêrê derdikevim. Û careke din here nik Etlîle û jê re bibêje; keça ko dixwaze bibe jina te, ewê ji te re nivê imperatoriya Romayê bi xwe re bîne. Bila bişîne pey dê û birayê min û min

bixwaze; pê re ji nivê imperatoriye. Ji wan nayê ko daxwaza Etlîle bi şûn de vegerînin.

Heyetek ji ba Etlîle hati bû Ravnayê. Heyetê ji Valantînyos re nameyek anî bû. Etlîle xweha împerator, Honorye dixwest; pê re ji nivê imperatoriye.

Valantînyos daxwaza Etlîle bi şûn de avêt. Diya împerator, Plasîdê — ji xwe îşê hikûmetê ewê digêrand — fermîdarên Romayê gihandîne hev û leşker berê xwe da sînoran; bû şer.

Çend sal ketin navê. Honoryê di dêrê de di nav rahîban de îbadeta Xwedê dikir; dê û birayê wê di qadên şer de cehda xwe dikirin ko li ber eskerên Etlîle bisekinin.

Di rasta Ketalonyayê de Etlîle şîkest. Hemî Ewropayê got ko dînya ji bela wî xelas bûye. Leşkerê wî ji sînorên imperatoriya Romayê bi dûr ket.

Zemanekî dirêj kete navê. Ewropayê pêjna peyayê ko digot « ez li rûyê erdê xezeba Xwedê me » ne kir.

Valantînyos ji îşê zîwaca xweha xwe bi Etlîle re ji bîr kirî bû. Honorye di dîra tarîkên dînyayê de roj digîhandin şevan, şev digîbandin rojan.

Rojekê ji tixûbên imperatoriye qasîdin, bi hawarl gihaştîne Ravnayê.

REQË AVË

Beri çendekë du balafirvanën britani keti bûn behirë. Di ser behirë re li wan da bûn. Lë balafirvan dema dike-tin; filûqa kewçûk ya ko di balafirë de bû; bi xwe re biri bûn û ew nepixandî bûn.

Balafirvan di filûqë de rû-niştî, li dûrabiya behirë dini-hêrtin û li hêviya vaporekë diman. Vaporek wê hiboriya û ew xelas bikirina.

Ji nişkekê ve filûqe hejîya. Qey tiştêki di bin re dehf dida filûqë. Balafirvanan texmîna noqavekê kiri bû. Digotî, heye ko noqavek li binê behirë ye û dike derkeve rû. Zûka bi çend derbên bêran ji wê derê bi dût ketin. Lë filûqe ji nû ve hejîya. Ma noqavê di bin re dîda pey wan. Ji xwe wê carê filûqe welê hejîya ko qey wê ji cih rabiwa û bi hewa biketa.

Lë piştî bibinekê filûqe

dani û di rex wê re serê cenawirekî xuya kir. Serikî gir, stoki dirêj û çavine çilmisî. Wi tebaya midekî li balafirvanan temaşaya kir û noqî avê bû.

Hert tişt di hate bîra balafirvanan. Cenawirê behirê, yê ko peyaki an golikekî bê ko bicû dadiqurlîne... marê behirê... yê bi 10-15 gazan dirêj...

Bivê nevê tirs giha bû balafirvanan. Ew di van texmîna de bûn ko wi tebaya ji nû ve xuya kir... noqî avê bû... çend carên din xwe şani da.

Balafirvan hêj nû ji mirinê xelas bû bûn. Gelo ji nû ve da bûn rîya hat-nehatê. Qerara xwe dan ko li ber xwe bidin.

Di binê filûqë de werisekî dirêj hebû. Balafirvanan ew xiste destên xwe û gava serê wi tebaya ji nû ve xuya kir, bi weris bera wi dan. Teba noqî avê bû weris ji lî destên wan semilî û bi lez çû; qey yekî ew ji behirê dikişand. Dawiyê wertsê dirêj nema çû û sekini.

Balafirvanan serê xwe rakir û li dora xwe nihêrt. Çi bibinin, vaporeke ingiltzî e piçûk li nizingî wan sekiniye. Vapora hate rex filûqë û balafirvan hilkişiyân ser.

Balafirvanan gava ji kap-tanê vapore re biserhatiya xwe piçûk li nizingî wan sekiniye. Vapora hate rex filûqë û balafirvan hilkişiyân ser.

Belê balafirvanan gava bi weris li reqê avê da bûn req weris kiri bû devê xwe û çû bû heta nizingî vapore û li rex wê da bû rû. Xelkê vapore gava reqek, di devê wi de weris ditin li xwe hişyar bûn û dora xwe teftîş kirin û filûqa balafirvanan ditin.

Kaptan gote balafirvanan: Herwekî min ji we re gotiye ew teba reqê behirê ye û di van behiran de gelek ji van heywanan tene ditin. Heywanine bêzezer in; lë carina henekan dikin û pê xelkê ditirsînin.

DILAWER ÇARPÎNE

Etîlê, ji nû ve, berda bû tixûbên imperatoriyê; pêşdarên wi çesta Ravnayê dikirin.

Valantinyos fermandar gibandine hev û şewireke giran dani; esker şandine tixûban. Etîle dihat ji bona ko Honoriyê bibe. Dê û bira qerara xwe dan. Ewê Honoriyê bi yekî re bîzewicandina. Bi vi awayî Etîle bigihişt Ravnayê ji Honoriyê ne dibû jina wi.

Ji nedimên qesirê mirovekî sere bijartî bûn; wê bihiwa mêrê Honoriyê.

Honoriyê ji dêrê derêxistin. Giregîrên welê vexwendin; daweta Honoriyê wê şahînet bikirana. Valantinyos da zanin ko dost û hevalê wi fermandar Vlyanos wê bibe mêrê Honoriyê û wê bibe melikê kişwerekî Romayê.

Honoriyê bê dilê xwe bû jina Vlyanos.

Şahînetla dawetê hêj xelas ne bû bû ko qasidek ji tixûban hat. Etîle miri bû.

Şahi bi xelkê Romayê ket. Daweta Honoriyê duta şahînet kirin. Honoriyê bi xwe di şinê de bû.

Etîle keçeke qranên Germanistanê anî bû. Di şeva dawetê de Etîle serxweş keti bû. Keçikê

ji yekî din hez dikir. Etîle mest û bêhiş û bêf ko cilên xwe ji xwe bike keti bû textê ziwacê. Keça qranê Germanistanê gava li mêrê xwe ê bêhiş fedkiri, xencera wi ket ber çavên wê. Keçikê xencer ji kalafî kişand û ew di sinğa Etîlê ra kir. Etîle nema hişyar bû. Şahi bi Ewropayê ket.

Honoriyê bi mêrê xwe re nikari bû bijî. Piştî kuştina Etîlê, birayê wê ji nema zor dida-yê. Honoriyê terka mêrê xwe da û vege-rîya dêrê. Qewilî li rahban kir û got: Ez ji wek we rahbek im; ji niho û pêde min bi awaki din bi nav mekin. Ji min re ji bi tenê Rabbe dihêjin.

Honoriyê di dêrê de çiqaş emir kir, kest pê nizanî.

Împerator Valantinyos beriya xweha xwe û di sala 455an de mir.

Di gortistana wê dêrê de kêlek heye, kêleke sadê û rahat. Li ser kêlê ev gotî nîvîsandî ye: RAHBE.

Dihok: 24 Tîrmeh 1943 BÎŞARÊ SEGMAN

NÊÇÎR

« Ji axayê min ê delal, şexê »
« nêçirwanan Lezgin axa ra »

— 2 —

Di hejmara Ronahiyê a 16an da min bendek li ser nêçîrê, nêçîra ko di welatê me da dibe, nivîsî bû. Ji ber ko bend pir dirêj bû bû, min hin nêçîr serpillî nivîsîn û nêçîra teyran ji hêlek hiştî bû. Herwekî di dawîya bendê da min ji xwandevanên Ronahiyê ra gotî bû, ev e ez awayê xwedî kirin û daxistîna teyrên nêçîrê ji bi bendeke xweser berpeyî wan dikim.

Yek ji di benda berî vê da min nêçîra kêvroşkan yekar serpillî nivîsî bû. Ji ber ko her kes agahî vê nêçîra han e, min ne xwastî bû bi dirêjkirina wê xwandevanên delal kiz bikim. Lê paşê, xwediyê Ronahiyê di vî warî da gazînd li min kir. Li ser daxwaza wî jî, di dawîya bendê da ezê careke din vegerim ser nêçîra kêvroşkan.

XWEDIKIRIN Û DAXISTINA TEYRAN:

Di benda berî vê da me gotî bû ko dema teyran bi torê digirin, her du çavên wan didirûn. Qesda wan ji çavdirûtinê, ji bo heya hînî dengê mirov bûne ko netirsîn. Piştî ko teyr çavdirûtî û pergirêdayî digehê destê nêçîrvanê xwe; herî her tiştî jê ra sê tiştan pêk tîne:

1 — Kostek, ji çermekî nerm û delal têtê çêkirin ko dikeve her du lingên teyr û ji bo pê girtinê dûvikek pê va ye. Ev dûvik ji bo pê girtina nêçîrvan e. Di serê dûvik da xelemek heye ko benekî xurt û sê-çar gazan dirêj ji pê va dikin.

2 — Venîstek, ji sê daran têtê çêkirin ko wekî

kursiyekê ye. Çi gava kostek êxistin lingên teyr, li ser venîstekê datînin û benê bi kostekê va bi venîstekê va girêdidin; da ko nefire.

3 — Lepik, ev jî ji çermekî xurt têtê çêkirin, da ko nêçîrvan têxe destê xwe û teyr rake ser. Ji ber ko rojê du-sê caran gerandina teyr divê, bê lepik rakirina wî ne mîkûn e; di roja pêşin da pêkanîna lepikê hewce ye.

Piştî ko ev her sê tiştên ban pêk hatin, deh rojan teyr çavdirûtî dimîne û rojê du-sê caran tê gerandin. Rojê du caran jî jê ra goştê mirîşkan têtê dayîn; lê bi şertê ko têr nebe. Di roja pêşin da heya ko qenc dadikeve nêçîrê, têrkirina têr ne dirîst e. Teyr çîqas qels û jar bikeve, ewçend zû dadikeve nêçîrê. Teyrê xurt û qelew, kêman caran dadikevin nêçîrê û pir caran di çaxa daxistinê da direvin.

Gava roja dehan hat, çavên teyr di nav komek peya da vedikin. Ji ber ko di vê demê da hînî deng û pêjna mirovan bûye, nema ditirse û hovîtîyan şanfî dide. Ji vê bi şûn da, wî hînî seyên nêçîrê dikin. Êdî çî gava bibin gerê, divê se jî bi nêçîrvan ra bin.

Heftekê jî ko holê derbas bû, benê bi kostekê va bi qasî bîst gazan dirêj dikin. Êdî jî wê rojê pê va nema wekî berê goşt tavêjîn nav lingên wî. Divê nêçîrvan dûrî venîstekê bisekine û goşt rîvêyî bike û « hay » ke. Bi haykirinê ra li nêçîrvan dinêre û goşt dibîne. Hînga bi firekê ra li ser destê nêçîrvan vedîne û goşt dixwe.

Piştî ko deh rojên xwe jî bolê derbas kirin û hinekî çêtir aşîne bû, bi navê « gurê » benekî du sedesê sed gaz dirêj çêdikin ko daketîna teyr hîngê dest pê dike. Gava dixwazî teyr li ser gurê berdin, divê li nava gund bi derkevin û herin cilhekî dûz. Vê carê li

şûna lepikêkê dudu divên. Ji ber ko her seriyekî gurê mirovek pê digire, wê gavê, benê ko bi xeleka kostekê va vedikin û serê gurê di nava xelemekê ra derbas dikin.

Dema mirovê hember hay dike, teyr bervê dinirê, goşt di dest da dibîne û difire diçe goşt. Bi vî awayî her du mirovên ko bi seriyên gurê girtî, her yek çar-pênc caran gaziye dike û piştî ko du nikul goşt bidê, ê mayî jê didize. Ev kira ban her roj du caran di demên taştê û sîva teyr da çêdibin.

Roja pêşin li ser gurê, car



SSS HAWÛZÊRÊ VAPORAN YA BÊHRIYA ÊMÊRÎKANÎ SSS

caran teyr revê dixwaze. Lê gava nikare xwe ji gurê xilas bike, êdî revê ji bir dike û dixwaze zikê xwe holê têr bike. Çiqasa roj bi nav da terin teyr ewçend aşine û hin dibe. Bi vê rêzika han kifjan teyrê çetin be, di hist rojan da li ser gurê fêr dibe. Çi gava di firinê da têr xwe berda biniya gurê; hînga nêçîrwan bawer dibe ko teyrê wî kedî bûye. Ji vê xwe berdana teyr a bin gurê ye, ko bi hînkirina teyr a nêçîrê ra daxistin dibêjin. Anê daketina teyr a bin gurê.

Çi gava teyr qenc di bin gurê ra firî, sê-çar rojan ji dîsa du mirov, lê bê gur, wî hay dikin û şiv û taşteya wî didinê. Paşê hînga dikarin bibin nêçîrê.

TULE-BÛNA* TEYRAN:

Her sal di çilê Havînê da teyrên nêçîrê pûrta xwe diweşînin ko bi vê ra «tûle» dibêjin. Tûle-bûn nîzikî sê mehan dûm dike. Çil rojên pêşîn pûrtê diweşîne û çil rojên dawiyê pûrt pê tê. Di vê midetê da, teyr pir qels bibe û hewceyî xizmetekî mezin e.

Di meha Biharê a dawiyê da divê nêçîrwan di odeya ko dike teyr bi xwedî bike da hin qesil (hêşinayî) biçîne. Gava ket serê Havînê, pûrta teyr rengê xwe digihare, pirçazkî dibe û dest bi weşînê dike. Hînga divê nêçîrwan kostekê ji lingên têr bi derxe û berde nava odê. Herwekî di hêleke odê da qesil heye; li du hêlên din yekê teşte av û yekê ji hin axa paqij datînin û derî li ser dadidin. Rojê carê divê qesil bête avdan, ava teşte bête giharîn û ax bête tevdan. Teyr ji her roj sê-çar caran di qesilê da diçêre, di teştê avê da xwe dişo û di axê de vedigevize. Di vê mideta han da kêman caran ji teyr ra goşt tê dayîn. Piştî sê mehên pûrteke nuh pê tê û vedigere halê berê. Teyrê ko Havînê ev tiştên han jê ra pêk neyên, pûrta wî pir kirêt diweşe û kirêt hişîn tê û nema bi kêrê nêçîrê tê; ji ber ko perên wî xar û belovaca hişîn tîn û bi kêrî firina xurt naye.

Nêçîrwanê teyrê nêçîrê, her sê mehên xwe ên Havînê bi tevayî di xizmeta teyr da dibore. Ji bo vê ye ko her kes nikare wan bi xwedî bike û ên ko bi xwedî dikin ji jê ra xulamekî xweser digirin da ko dirêjîya salê pê mijûl bibe.

NÊÇÎRA KÊVROŞKAN:

Ji ber ko di benda berî vê da min nêçîra kêvroşkan serpillkî nivîsî bû; li ser daxwaza xwediyê Ronahiyê careke din em vegerîn vî warî. Nêçîra kêvroşkan bi tajiyan gelekî e xweş e. Ji ber ko çar-pênc salan min ev nêçîr kiriye; pir û hindik agahiya min jê heye.

Ên ko ev nêçîr ne kiri bin, welê dizanin ko

ev nêçîr ne hweceyî zanînê ye. Bi tenê kêvroşk girtin karê tajiyan e. Lê a rast ew e ko di nêçîra han da agahi û serwestiya nêçîrwan du par û xurtî û jêhatî hûna tajiyan pareke nêçîrê ji xwe digire. Ew tajiye ko di destê nêçîrwanekî nezan da rojê du kêvroşkan hikare bigire, teqez di destê nêçîrwanê serwest da pênc-şeş heban digire. Zanîn û serwestiya nêçîrwan di warên han da ye.

1 — Berî her tiştî cihê ko kêvroşk tê da vedîşîre çak nas dike û berî ko birinê taji bigîşkê jê ra kêvroşk radike.

2 — Merasê xweş digire; da ko kêvroşk



DI QADA SIŪLYAYÊ DE: ESKERÊN

dûr baz nedin. Kêvroşkên ko dûr baz dîn pir caran li pêş tajiyan wenda dibin.

3 — Kêvroşkê xurt an qels [1] ji cihê wî dizane û tajiye xwe bera ê xurt nade.

4 — Heke ji tajişkî pirtir bi nêçîrvan ra hebin, yekî li bilindcihan dihêle. Ji ber ko her du lîngên kêvroşkan ên pêşin ji ên paşin pir kintir in, her dem çavê wî li bilindcihan e; çima ko li ber kaşan pir xurt direve. Gava nêçîrvan tajiyeke xwe li gazê dihêle, heya kêvroşk digehê gazê qenc diweste. Hînga ew tajiye vehêfî bi gengazî nêçîra xwe digire.

Di vê nêçîra han da awayê xwedîkirina

tajiyan jî hewceyî hinek zanîn, an bala xwe danê ye. Ev xwedîkirina han jî bi pêkanîna çar tiştan dibe:

1 — Xwarin, di heftê da qe ne çar caran şîranî û çar caran jî avsir (ji rûn an ava goşt û nan û sirê çêdibe) dayin.

2 — Ji bo nermhiştina piştê taji cileke berkulav û germ li piştê şidandin.

3 — Heftê du caran piştê taji bi ava germ û sawûnê şuştin û qenc mistdan.

4 — Ji bo parastina birinê taji, her gav girêdayî hiştin.

Ji bo vê ye ko her pênc mehên nêçîrê

(mehek paiz, sê meh zivistan û mehek bihar) nêçîrvanê serwest tajiye xwe girêdayî dihêle. Bi tenê rojê sê caran digirine.

AWAYÊ NÊÇÎRÊ:

Nêçîra kêvroşkan bi tajiyan; awayê çaktir, bi girtina merasê dibe. Meras, [di rex] hev ra meşîna nêçîrvanan ra, tê gotin. Dema nêçîrvan degehên cihê nêçîrê, wekî kevanekî an hîva nuh nîvgovendekê digirin û di erdê bi guman da diçin û tên. Di pêş û rex xwe da çî hij, dirî û tûpên ko bibînin kevîr dikin. Divê navhera her du peyan sê-çar gaz hebin. Gava fireyîya navhera peyan jî vê pirtir be, pir mikûn e ko kêvroşk ranebe.

Heke taji yek be, meras jî li goreyî wê kin tê girtin û taji dixin nîveka merasê. Na gava taji dudu bin, her yekî didin heleke merasê. Heke taji jî dudûyan pirtir bin ên mayî diêxin nîveka merasê. Lê her hal tajiyan qenc didin peran û ên qels diêxin nîvekê. Merasa ko çak bête girtin, tê



INGLIZÎ PIŞTÎ, ŞEREKÎ SINGOYÊ KETÎNE ÇEPERÊN DIJMIN

PİRA TORÊ

Hilkişi me çime jorê her du rex min bend û rez
Min di pîrek lê ji tarê ker di ber da lê bi lez
Hate nîzik rojbîzêrek da û wek min dil bi xem
Pîrebî bû por-sîpi bû laqî-reş bû rû gewez
Min ji pîrê xweş dipîrsî: ey metê tu j'kû ve tê ?!
Go ji Sêrtê digme Bêrtê, xûniya ronî me ez
Xan û eywan kirne wêran mêr û jin ser jê kirin.
Min go pîrê qey tu kurdî? çûye tilyên xwe bi gez
— Betkî benda rez bi guh bit dengê xwec pir hilmeke
Pir ditirsim ez ji derbê singûyê romê teres.
— Min diyot: axa û beg; wê go: kurê miu guh medê
Ew şivan in sermîyan in dane gurgan colê pez
Min kurek tenha heye, ew şandî bajêr medresê,
Wê du sê pîrs bo me gotî pê hetandî cerg û bez,
Gotî dayê em dixwînin wek Cegerxûn gotiye;
Zû bixwînin hev bibînin, biçne Kurdistan bi lez.
CEGERXWÎN

da kévrosk dûr nareve. Heke kévrosk dûr
nereve, tajiye çak di niv kîlometrê û hîn hin-
diktir da digire.

Kévrosk ko bi çavpehnî û teresiyê hatine
nasîn, carcaran ranabin. Qewimiyê ko nêçîrvan
pê li serê wî kiriye û di bin lingê xwe da
girtiye. Ji bo wê di girtina merasê da divê nê-
çîrvan gelekî serwest be ko kévrosk bi şûn
xwe da nehêle û jê derbas nebe.

SOWA (CINS) TAJIYAN:

Sowa tajiyan jî wek ên hespan gelek in; lê
ne bi nav û binyat in. Ji bo naskirinê, sowa
hespan bi navê xwediyên ko li cem hatine
nasîn; lê ji bona tajiyan tişteki holê ne fikirî-
ne. Bi tenê, ên ko taji pir bi xwedî kirîne
dizanin; an bîr dibin ko wek hespan, an mîna
seyên mayî tajiyan jî sowên wan jî hev cida
ne. Herwekî me li jor gotî, çîma ko ji her
sowekê ra navek ne hatiye xweya kirin, di
vir da emê nikari bin sowên wan jî hev ve-
qelînin. Lê di vî warî da di destê me da
delîlek heye ko ji tajiyan çak cewrên çak, ji
ên békêr jî cewrên békêr dadikevin.

Ji bona zanîna çakiya taji kî çend nîşan hene
ko nêçîrvan tajiye çak ji ê békêr bi der diêxe.
Serf: tajiye çak bêvîldirêj û qocê sêrt tuj
û bilind dibe.

Pîsîr: pîstra fere û daketî nîşana xurtî û
revê ye.

Pîşt: kîjan taji mûfirken piştê zêdetir bin
ewçend beza dibe.

Bi van nîşanên han ji nêçîrvanekî ra mi-
kûn e ko tajiye jêbatî ji ê békêr binase. Piştî
ko me benda xwe hinde dirêj kir, heke me
xwêndevan hinekî serwest kiri bin ew jî baş e.

OSMAN SEBRÎ

[1] Kévroskên qiracan, nemaze ên ko di ber
kaşên bi çeqeq da bi cih dibin gelekî e beza û
xurt in. Ev celeb kevrosk e piştbişin in. Kévroskên
kepir û çiyane ewçend e xurt in û sorik dibin.

HEY KURD

Ser ji xew rake binêre ro ji bircê da der e
Guh bidêre çarkenarên te bi halan û ser e
Zani be'ey' millet im ev dem ne'ya razan û xew
Ev dema gurmên û ceng û top û tîp û leşker e
Sed wekî Guhderz û Ristem wan bi te deng
[da cihan

Ma ne şerm e ko di fro mayî bê mîr û ser e
Pir nexweş f ev du sed sal bû li te jana zirav
Şex û axa bûne mîqrob ketne laşê ley zer e
Dijminê meztir ji van bê xwendin û nazanî ye
Korf û nayektî û bê bextî zanim sê ser e.
Ev welatê wek bîhuşt bû, bûye zîndan gor û

[teng
Dil û gerden-xwar f tek da bê şîbak'û pencere
Ev çî ye ey millet im bê dost û dijmin bê jimar
Rêçika ko şex û axa dane ber te, tê mere.

Şex ne dilxwazê te ye, lê rençberê navê xwe ye.
Tekyexana wî di wê tê da hebin çend kerker e
Ew bi xwe parsê dikin kengê Xwedê ev gotiye?
Ma kîramet tîzbî ye, yan top û tang û qumbere?
Naniyê axa mezin her dem di ser gundan bilind
Lîs û hêlîna dizayê wek şikeftan sê der e.

Ma ne hes ey millet im van rîp û xapan ber-
[de zû
Ev rîya rust û dirist e, bes Cegerxwîn rêber e.

CEGERXWÎN

XIYAL

Ey bîra hon çend şîrîn in ber dilê boti gelek
Çû ji dest me ev welat û Şernex û Birca-belek
Deşt û zozan û çiya ew mane bê nêçîr û rav
Dešta Dêrgul tu binêr Gever û ser re çirav
Deşt û zozan bi tixwîb in, bi Gever paşê Şîkêr
Qedre vê axê bizanin me'den e tev de bi zêr
Xewl û rewşa vê Çiravê, Kaniya-reş warê Mîr
Xwezka ez tê de şivan ham, min bixwara nan
[û şîr

Ser ber û ferşan dibînim şîklê nîsk û cew,
[genim.

Ev welatek pir ecêb e, ez ji kêfan dikenim
Ger bi sê mangên Biharê, lê bimîni ta Pehîz
Ma çî ye Lêman-û Monblan[1] zêdetir sed car
[eztz

Ê nedîti çî dizanî em ji çî behsê dikîm
Her tenê em pê dizanin lewre hinde dîkûl in
Botiyê békês erê hevî heye êdî bîji
Piştî van xewin û xiyalan/te ne ma eql û mejî.

M. E. BOTÎ

(1) Gol û çiyayine Swîçrê.

ŞÊR Û MIŞK Û ROVÎ

Carekê şêr li roviyekî rast hat ko hirmêk di devê wî de ye. Çaxa çavê wî li hirmiyê ket; ji rovi re got: Seyda ev çi ye tu dixwî?

— Ezbenî, hirmê ye

— Hirmê çi ye seyda?

— Hirmê bi daran ve çêdibin; tişteki şêrin û xweş e.

— Li kû peyda didin ezbenî?

— Va ye, li serê vî çiyayî, bêjimar û pir in. Te divê em herin şanî te bidim.

— De fermû seyda em herin

Her diwân dane rê û çûn; li hirmiyekê rast hatin. Qurmê wê stûr û serê wê bilind; hirmê lê xuya dikin. Şêrê dilbijok dey li rovi kir û got:

— Seyda, çawa lêne xwarê?

— Ezbenî em rovi dûvê xwe lédixin û diweşnin, zû zû...

Şêr dûvê xwe dawêşand-ê û lêda. Lê tu kêr pê ne kir. Li rovi zivirî û got:

— Ezhenî ka nawêşin.

Wî lê vegerand û got: Ezbenî xurtiya we şêran di nav milên we de ye, pišta xwe bidi-yê û bihejinî.

Piştî ko şêr pišta xwe da-yê li seyda

vegeriya û got: Ka nakevin ezbenî.

Rovî çavê wî li fen û fûtan bû. Jê re got: Ezê te bi darê ve girêdim, da tu kari bî darê bihejinî.

Şêr got: min girêde.

Roviyê çeleng û sivik hinek roviyên dewaran anîn û li bêjina şêr û darê, ji qirikê heta neynûkan gerand û lê hişt heya, danê êvarê. Rovî tiliya xwe lê da; di ko hişk bûye û tîngî jê tê. Dey lê kir û got:

— De xwe veweşîne û bihejinê.

Çawa şêr xwe veweşad, parsivên wî gihan hev. Şêr li rovi vegerand û got:

— Rovî mal-wêran, zû min veke; lê ez mirim.

Rovî lê vegerand û got: De bimire sehê pîs. Ji berê de me şêr bi daran ve girêdane; da yekî di weke te bi vî çiyayî nekeví.

Rovî wilo got, da rê û çû. Çend rojan şêrê xwîn-xwar û merkuji bi darê ve girêdayî ma. Paşê mişkê li biniya nigê wî çû û hat. Şêr li biniya xwe nerî û got, ev kî ye. Gidiyano, bê tu min venakî, ez mirim.

Mişk serê xwe rakir û got: Paşa kê wilo li te kiriyê. Dilê min li te dişewitê. Lê ji herê de hon mezin û serek hevalên pîs û qeşmeran in. Ne em bin, herdem rovi û teba wê wilo li we bikin.

Şêrê girêdayî û gerdexwar nikare dengê xwe bikê û tişteki lê vegerînê. Bi tenê bi lavlav û dilek jê hevî dikir û digot:

— Ezbenî, de ka min berde, paşê emê ji xwe re bipeyivin.

Mişkê guhpan û bilind serê xwe rakir; çû û hat, bi diranan serikî duhêlan jêkir û li darê zivirî.


Piştî ko şêr ji vî derdi filitî li xwe û li mişkê bi paye û tîrek dinêrî û çav lê sor dibûn. Şêr tif xwe dikê û di dilê xwe de dibêjê; Tift li vî welatî be ko rovi miro-mirovan girêdidê û mişk mirovan berdîdê.

Şêr dil-nexweş û serberjêr da rê çû... her çû.

Dibêjin ji wê çaxê de şêr di welatê me de ne mane.

Amûdê: 29,7,943

BRAHÎMÊ ÎSA



ŞAGIRTÊN DIBISTANEKE LONDRE

DİROKA JINA NAPOLYON

« Gava welatek bîndest bû,
Ji welatîyê bi rûnet ra bi-
tenê riyek dimîne: Di rîya
serxwehûn û azadîyê da
mirin ».

Napolyon

— 2 —

JINA DIBISTANÊ:

Bi qasî ko dtroknivîsan der he-
qê jina Napolyon a tevayî da pir
û hindik zanîneke têr gîhandine ber
destê me; di aliyê jîna wî a dibî-
stanê va gelekî bi şûn da mane.
Gava ez dtroknivîson dibêjim, bi
tenê qesda wan camêrên ko nivîsa-
rên wan gîhane me dikim; anê dtro-
knivîs, an nivîsananê rohelata ni-
zim. Heyeko dtroknivîsên Ewropa-
yê, nemaze ên frensîzan ev aliyê
han jî bi temamî nîvîsî bûn, lê mi-
xabin ko jî neagahiya me a zim-
nê wan, em jî nivîsana vê hêla
dtroka serdarê freng bê par kirin.
Ji bo vê ye ko em, di vî warî da
bi nivîsana vî tiştê hindik bes dikin.

Gava Napolyon pê kîre sala
şêşan, bavê wî, ew li Ejaksiyoyê
êxîste dibîstanekê destpêkî (îbtîdai) da ko
tê da pêşiyên xwandinê û nivîsandinê hîn bibe.
Tevî biçûkiya xwe, Napolyon bi sergermî û
şerûtiya xwe di nav hevalan da xweya bû bû.
Hîngê bi ser û pêça xwe gelekî f di hevdaketî
bû. Pîr caran bi rê diçû, gorê wî dadiketî
ser rûyê pêlavê û di xwe ra ne didî ko
hilkîşîne. Bi carekê nizantî bû, an hez ne dikir
ko wekî hevalan ser û sekeyê xwe girêde û
xwe dûzan bibe. Tevî yekê han jî gelekî jî xwe
f razî û kes di ser xwe ra nedizani; an ne
dixwest bi vê yekê han bawer be.

Dibêjin di vê dibîstana han a biçûk da
keçeke heft-heft salî hebû ko Napolyon
pîr mela xwe dabû-ê. Di demên vehîsinê
(tenefîs) da, Napolyonê her biçûk destê xwe
diêxist destê keçikê û pê ra digert. Bi vî halê
dîtevdaketî hevaliya wî bi keçikê ra, hevalên
wî pê dikenandin û dikirin armanca tewz û
tinazên wan. Napolyon jî van tewzên çavnebar,
gelekî kîz dibû; lê herwekî nabîniye, di xwe va
derbas dikirin. Çi gava tinazker xam dikirin û
bi peyiv û axaftinê dilehiyan; hîngê xwîna wî
a korsîkî di rehan da germ dibû û bê ko
dawiyê birame an pîraniya wan bişkîre, wekî
birûskê xwe davête ser wan. Bi destsivikiyeke



ecêb, bi kolman û pinan welê li herçar hêlan
dixist ko ên pêş xwe mat û şaş dihiştin û
direvandîn. Paşê bi dilgîrî vedigert cem hevala
xwe û disa destê xwe diêxîste destê wê û jî
nû va digert. Bi vî awayî firseke ecêb xistî
bû zikê berber an çavnebarên xwe. Ev bi kêr-
hatîna û şerûti li alîkî û hezkirîna dengê topa
kiçîk û listîka wî a bi zarokan ra ko bêhna
rê û rêzanên leşkerî jê dihatin li aliyê din,
ramana êxîstîna Napolyon a dibîstana herbiyê
da ber bavê wî.

Piştî ko Napolyon dibîstana destpêkî a
Ejaksiyoyê kuta kir jî bo ko bikarî be here di-
bîstana herbiyê diviya bû hinekî zîmanê fran-
sîzî bin bibe. Ji bo vê yekê bavê wî, ew tevî
birayê wî Jozefê êxîste dibîstana Otûnê ko
çend mehan tê da bîngelê zîmanê fransîzî
fêr bibîr, da ko bikarî bin di dibîstana nuh da
bi hevalên xwe ên pêşende ra bixwînin.

DIBISTANA BRYAN A HERBIYÊ:

Hîngê li nav Fransyê diwazde dihîstanên
herbiyê ên destpêkî hebûn ko ev dibîstana
Bryanê yek jî van diwazdehan bû. Her sal jî
sefên van her dibîstanekê ê dawiyê sê zarok-
kên bi kêrhattîrî dibijartin û dişandin dibî-
stana Parisê a herbiyê; jî bo ko tê da zabî

bi derkevin. Şagirdên dibistana Briyenê jî wek dibistanên herbiyê ên mayî hemî jî zarokên malmезinan bûn. Wê çaxê hemî malmезinan zarokên xwe bê dibistanên herbiyê ne diêxistin ên din. Bi çav wan bijîşkî, avokatî, mihendîstî karê wan kesan bû ko nizanin bikujin û bimirin. Di demeke holê da û bi aqilê han, gava kurê malmезinan bi berikên tijî, gurî û oflazî di dibistana Briyenê da dixwandin, kurê avokat Karlo Bonapart Napolyon hi berika xwe a vala hat kete nav ve koma torinan. Ew torînen ko dema xwe bi listik û henekan dihorandin û bi nav û ritbeyên bav û malbatên xwe bi ser hev da gurî û oflazî dikirin, Napolyon di nav xwe da tişteki békêr, reben û qeşmer diditin. Heke li şûna Napolyon zarokêkî din bûya, teqez dê xwe di nav wan torînen dewlemend û serbilind da pir biçûk bidîta. Lê Napolyon bi vê yeka han sernizim ne bû. Ji xwe serbilindî û oflazîya hevalên wî a vala bû ko canê wî ê gewherfeşan jî vê herêtiya han hişyar kir û ramana bêbîhatiya malbatan li ser kuran di wê demê da êxiste dilê wî. Di vê dibistanê da jî ber peya malbatî û dewlemendiyê Napolyon pir tehlî jî hevalên xwe dîtî bûn ko di rojên xurtî û serbilindîya xwe da bi tenê rûmeta jêhatî bûn û bikêrhatinê digirt.

Napolyon salên xwe ên pêşin di dibistana Briyenê da holê bi biyanî û dûrî hevalan

derbas kirin. Ew hevalên ko di nîzfkayîya wan da xwe biçûk û şermisar didît. Gava di nav wan hevalên gûr û qiros da jî xwe ra hogirek ne dît; bi carekê xwe avête himbêza kitêbên xwe û gelekî jê destkewtî bû. Destkewtîneke welê ko hi her awayî xwandinê bi ser hevalên xwe ket û nema riya xwe di ser ra girtinê jî wan ra vekirî hişt.


Lê vê bi tenê mayîna han û xebata xurt a ko di geliyên wê da dikir, şopeke kûr û dûr li ser cendekê Napolyon hişt û dirêjîya emrê xwe jê safî ne bû. Her pênc salên ko di dibistana Briyenê da derbas kirin û êş, derd û kulên ko bi hevalîya kurên malmезinan ra dîtin, jî ber vê yekê westa ko gihande xwe hejra wî gelekî qels û kin hişt; çima ko hin cendekê wî xwe ne girtî bû.

Di dibistanê da sê dersan bi carekê serê Napolyon girtî bû. Hîsab, tarîx û cixrafîya. Di darsa hîsêb da jî biçûkiyê va jêhatî bûneke ecêb nîşan da bû ko bi zîrekîya di vê darsê da hezkirina mamostayên xwe kar kiri bû. Ji bo vê, pir caran mainostan Napolyanê kîçik vedixwandin ser sifra xwe û dilê wî geş dikirin.

Pîştî vê darsê, kêfa wî jî cixrafîyê ra dihat; her wekî di biçûkiya xwe da ew karê mezin (serekiya hemî Ewropayê) da be her çavên xwe, her û her xerîte hîn dikirin. Heye ko Napolyon jî mamostan çêtir xerîte jî ber dizanin.

Hele xwendina kitêbên dirokê (tarîx) mijûliya wî a her dem bû. Wî dixwast jî van kitêban rabûn û ketina mîletan hîn bibe û ka peyayên mezin çawan bi mîrani û jêhatî bûna xwe gihane cihên bilintir. Dixwast vê zanî be, heya rojekê ko mezin bû dê çilo xwe bigehîne nav û dengê peyayên dirokê û navê xwê di serhêla navên hemîyan da bide nivîsin.

Sala 1784an hat, Napolyon di sêfê dibistana Briyenê ê paşin da bû. Wê salê zivistanê sar hat û berfeke mezin ket. Pêşî û



KÎMYAXANEYÊN INGILISTANÊ JÎ JI BO ZEFERÊ DIXEBITIN

dorhêlên dibistanê ji berfê û bîsoyên wê hati bûn por kirin. Şagirtan nema dikari bûn bi lîstikên xwe ên adêf rabin. Ji ber vê bêhna hemiyan teng bû. Wê gavê tiştek bate bira Napolyon ko ji wê berfê kelehekê ava ke, dorhêlê wê bi bedeneke berfin rake û di ber wê bedenê da ji kozik û çeperan çêbike. Paşê şagirtan bike du biran. Birek di kelehe da bimîne ji bo parastinê, birê din ji bo standinê ji der da dirêjê bike. Vê ramana Napolyon li nik mezinan cih girt û emra çêkirina kelehe, beden û çeperên wê spartinê.

Li ser vê ramanê, holê bi vî awayî, di rojekê da hemî şagirtên dibistanê ketî bûn bin destê Napolyon. Ew wekî ferfendarekî kevin û ceribî kete nava hevalan û kelehe, beden û çeper bi wan dane çêkirin. Ew hevalên ko herî çend salan bi çavekî kiçik li Napolyon dinêrin, fro bê gotin di bin destê wî da dixebîfin. Bi şarezayîya Napolyon kelehe, beden û çeperên di dorê da ewçend xweş çê bû bûn ko xelkê bajêr dihatin û bi çavîne ecêbmayî li wan diwarên berfin ên delal dinêrin. Di wî emirê biçûk da, vê kira han ji mirovên dûrbîn ra didane zanin ko Napolyon dê bibe peyaki mezin.

Şer dest pê kir lê Napolyon ne kete nav her du hêlan yekê. Wî ji bo xwe di nav her du hêlan da ji kar dît. Herwekî hevalên xwe kiri bûn du biran û yek êxistî bû nav kelehe û çeperan; ê din li der ji bo êrişê hiştî bû. Berê serekiya êrişvaniyan dikir, gava didît halê mîdaftan xirab dibe, hinga derbasî nav wan dibû û ji bo parastina kelehe û çeperan nav di wan didan û serekiya wan dikir. Holê ji alîkî derbasî ê din dibû, heya ko şerê han du heftan ajot. Di vê dema han da ewçend zanayî û jêhatî bûn rave kir ko hemî temaşeker ecêbmayî hiştin. Di gerandina van şerên gogê berfê da ji bo bicihanîna gotin û fermanên xwe ewqas serhişkî rave dikir ko rojekê zabiteki di cihanîna fermaneke wî da hinekî dudilî kiri bû. Hingê bê ko Napolyon bêje ev lîstike, bi gogeke zexm ew di erdê ra kir û birîneke welê di eniya zabîta da vekir



TELEFONA SEHRAYÊ

ko heya camêr î sax bû şopa wê birnê li ser çavên wî ma.

Divê em ji bîr nekin ko ev şagirtê han ê ko di lîstika gogên berfê da zabîta bû û bi destê Napolyon bi birnî bû bû, piştî derketina di dibistanê da gelekî zîvar û desteng bû. Di wî deraxî da Napolyon jî bû bû împêrator. Gava camêr ji bo destengiya xwe çareyek ne dît berê xwe da hevalê xwe ê dibistanê Napolyon û xwest bi darî wî keve. Dema berdevîkan haya Napolyon kir; berê navê wî di ser hev neanî û gote wan: herin qenc serwest bibin. Piştî ko berdevik serwestî rastiye bû, vegerî nik Napolyon û gotê « ezhenî, di eniya camêr da birîneke mezin heye ko dibêje ew birnî bi destê împêrator bûye ». Hinga bi bîra Napolyon ket û bi rûyekî li ken got: « erê, ew birnî xweş tê bira min; derbaskin bila bête nik min. » Hinga mêrik derbasî cem kirin û daxwaza hevalê xwe ê kevin bi cih anî.

OSMAN SEBRÎ

HINDIK RINDIK

JAMA DÈRÈ:

Eskerekî mecerî bi navê Stéfani Javonî di eniya şerê ûris de ker û lal bû bû. Stéfani midekî dirêj li rex topekê disekinî û topê pê-de agir dikir.

Bijîşkan kir û ne kir ji Stéfani re tu derman peyda ne kirin. Izin dan Stéfani û ew şandin gundê wî. Rojekê Stéfani di ber dèrekê re derbas dibû. Jama dèrê bi xurtî lédida. Bi dengê jamê guh û zimanê Stéfani vebûn û mîrik vejeriya halê xwe ê berê.

MÎREKÊN RES-NEHAŞ:

Ji rojnama fransîzî (Le Jûr-Le Jour) ya Ko li Bêrûtê dertê. (8 Hîzêran 1943)

Di çiyayên Betrûnê de mîrine xurt hebûn. Li gora gotina wan ji kurdên eyûbî dadiketin. Lê piştê ewçend qels ketine ko tekilî xelkê bûne û ketine xizaniyê. Îro hin ji wan cot-kariyê dikin; hinên din daran dibirin; hin ji parsê dikin. Digel vê hindê guhdarê necabeta xwe ne û pê fîtxar dikin. Keçên xwe nadin mirovên adetî, bi xwe jî keçên xelkê nayînin.

Gava parsê dikin ji bi tenê ji mfr. û şexan dixwazin.

Heke yekî bê pîrsa « Mfr » silav li wan kir an banî wan kir, lê venagerînin. Îro di gundekî Betrûnê de dijîn. Ji ber ko navê wan ê kevin hatiye ji bîr kirin navê gundê wan li wan dikin û dibêjine wan mîrên Re's-Nehaş.

INTIQAMA MEYMÛNAN:

Wek her dehbê, meymûn ji heke cih lê teng ne bû dirêjî mirovan nakin. Lê gava dirêjî wan dikin zererine mezin digehînin wan. Bi rastî di nav meymûnan de cîsinine welê hene ko bi zexmî û xurtiya bedena xwe gelekî serdestî me ne. Lê ew jî bifa sebeb bela xwe nadin însanan.

Di Efrîqayê de memûrên mistemlikan gelek caran dîline ko kerîne meymûnan dirêjî gundekî kirine û gund xistine xerabiyê. Lakin hercar tehqîqatê daye zanîn ko sûc yê gundiyan bûye.

Vê paşiyê di mistemlekeke ingilîzî, Pêrêvên-zêr de meymûnên şempanze avêtine ser gundekî û ew xerab kirine. Li gora rapora memûrê ko çûye tehqîqatê mesele bi awayê jêrin çêhaye.

Berî du salan di vî gundî de jinikekê cewî anf bûn. Li gora adetên reşikên wî welatî cewî tiştêkî çift e. Ji lewre rabûn yek ji Peresto re qurban kirin.

Piştî midekî bavê cewiyan di rêlê de şempanzekî nûza girtî bû û ew biri bû nik kurê xwe, li şûna kurê ko ji Peresto re qurban kiri bûn. Kurê reşik û kurê şempanze di nav çend rojan de bû bûn dostên hev û bi hev re, wek biran dijîn.

Rojekê, gundikî tîrek berda sînga şempanzê û ew kuşt. Ji wê rojê ve şempanzeyên rêlê neyartî bi gundiyan re ajotin. Lê ne hate zanîn şempanzeyên rêlê çawan bi kuştina şempanzeyê gund besiyan.

Dawiyê şempanze li gund wer hatin û ew di bin mibaserê de hiştin. Bi awakî ko kesî ne dikarî ji gund derkeve. Şevêkê dirêjî gund kirin, ketin xaniyan, tiştên ko diketin destên



DI LONDRE DE XWARINXANEKE HER WE

HINEK JI HENEK

XANIM Û XADIM:

Xanim (ji xadima xwe re) Ez naxwazim ko destgirtiyê te hero bê û li ber deriyê me bisekine

Xadim — Belê xanim ez ji pê hesiyam û ji lewre şevêdi min ew bire oda xwe.

LAWIK Î ŞAŞ E:

Yek diçe û di kazînokê de rûdine. Lawikê xizmetkar tê û jê dipirse:

— Mîrza çi emir dike.

Mêrik: Kasek şerab.

Lawik diçe û ji mişterî re kasek şerab tîne û wê datîne ser masê. Dema dike vegere mişterî banî wî dike û dibêje: — Heke te li şûna şerabê kasek bire ji min re anî xem heyê?

Lawik: Tu xem nîne...

Lawik şerabê dihe û li şûnê kasek bire tîne. Mêrik bîra xwe vedixwe û bêf ko heqê wê bide, dide rê û diçe. Lawik dide pey û dibêje:

— Mîrza te heqê birayê ne da...

Mêrik: Belê min ne da, ji ber ko te ew ji min re li şûna şerabê anî

Lawik: Te heqê şerabê ji ne da..

Mêrik: Ma min şerab vexwariye ko ez heqê wê bidim.

Lawik (hinekî dide eqilê xwe û dibêje) Belê xebera te ye; lê şerab bi 75 qîrûşan, bire bi pêncî qîrûşî ye.

Mêrik: Hingî min ji te 25 qîrûş divêtin.

Lawik. (dîsa dide eqilê xwe û dibêje) Belê ev jî rast e.

Lawik cizdanê xwe derdixîne û ji mêrik re 25 qîrûşan jî dide.

ÇIROKA BERAZEKÎ LONDRÊ



Xelkê Ewropayê, herwekî em berxan bi xwedî û dermale dikin, ew jî kntîkên berazan di hewş û bexçeyên malên xwe de bi xweyî dikin. Di wextê bombaranê Londrê de digel mirovan gelek heywan ji hatine kuştin. Lê çiroka vî berazê londrayî yê ko jî ber eskerên agirkuj dike bireve xerib e. Di wextê bombaranê de eskerên agirkuj û peyayên fedayî digûn û mirovên ko di bin kevirên xaniyên hilweşiyayî de diman xelas dikirin. Rojekê eskerine agirkuj dema ko kevir û stûnên xanîkî hileweşiyayî radikirin dengêkî xeniqî kirin û xwe li cihê ko deng jê dihat lezandin. Digotin qey dengê peyayekî ye. Lê gava kevir rakirin çi bibînin, berazekî fêris û tu-tişt-pênehatî ye li wî sekînî ye. Eskeran beraz ji nav keviran derêxist; bi guhên wî girtin û ber bi qişlê ajotin.

KURDMANCINO

Kurdmancino hon kom bibin
Da xelk bêjin bizane kurd
De'wa heqê xwe hon bikin
Da kes nebêt bêzar e kuşd
De'wê biken bi qanûnê
Mêran bik'jin birêjin xunê
Mirin çêtir ji vê jinê
Sed aferin mêranê kurd
Kurdên çiya heke der bin
Wekî şeran weko ber bin
Pêşya yekî sed çeper bin
Bo şer wekî sindane kurd
Kurdên mezin gelek caran
Wan bêzaran, wan bêkaran
Kore dibin j'bo dinaran
Bû dil b'her kovane kurd
Zengîn e kurd, wek mêr biket
Belengazan ew têr biket
Cergê feqîr wek şer biket
Ew car e, wek siltan e kurd
Geli Botan û Hekarî
Digel soran û Zêbarî
Îş ken roj û şevê tarî
Ev bo me ye hemiyan e'kurd
Kurd bendar dest serdestî
L'pêşsuxir şikestî
Mirin ho xwe îş Xudê xwestî
Sêfil bi sergirdan e kurd
Heqê xwe bin bi topizî
Hon têrk biken şolêt xizî
Zango çima tu êciz î
Nê bêser û bê xwedan e kurd.
MIRZANGO BELBEŞINI
XEBATDARÊ WELAT

XARKOV

Di meha Tebaxê de sondxwarî bi du zeferên mezin şa bûne. Sefera Sicilyayê xelas bû û girav bi temami ket destên qewetên inglîzî û emêrikani û li 23ê Tebaxê elemanan da zanin ko Lajarê Xarkovê tala kirine. Di pey elemanan re ûrîsan elam da û got ko eskerên Sovyêtîstanê bi hiçûmeke cebri Xarkov vegirtîye. Sovyêtîstanê ev zefer şabînet

kir û Stalin bi emirnamekê pesnê eskerên xwe da. Bi vegirtina Xarkovê ûrîsan careke din şanî xurtiya xwe da. Bi Misin û Xarkovê keleha Ewropayê careke din hejlîla.

Bi vegirtina Xarkovê ûrîsan di eniya rohelê de serdestilke mezin xistiye destên xwe. Xarkov rasterî rasta Ukranyayê ye. Yê ko Xarkov di destên wî de ye dikare neyarê xwe biêşîne û bi rahetî dirêj wî bike.

Ev cara dido- wan e ko ûrîs Xarkovê distînin. Di sala 1941ê da elemanan ew piş- ti şerîne xwin- dar zeut kiri bû. Eleman qederê şanzdeh mehan tê de man. Di Siba- ta sala 1942an de ûrîsan Xarkov bi şûn de vege- rand û eleman jê derê- xistin. Lê elema- nân ji ber ehe- miyeta Xarkovê zûka xwe kar kir û piştî çend rojan avêtin ser bajêr û ûrîs jê derêxistin. Vê carê eleman 23 heftan di Xarkovê de man û li 23ê Tebaxê jê kişiyân. Ji ber ko ûrîs lê wer dihatin û dikirin bajêr mi- hasere bikin.

Xarkov ji ehe- miyata xwe a eskerî pêve mer- kezeke sinahî ye. Piraniya tangên Sovyêtîstanê di fabrikeyên Xar- kovê de dihatin çêkirin. Beriya şerî di fabrikeyên Xarkovê de 900000 emele dixebitîn. Ji tangên pê ve li Xarkovê bala- fir li çêdikirin. Ûrîs bi vegertina Xarkovê ne ma ne. Di 1943an de pê dîdin êrdê û jhero pêş ve di- çin. Gelo eleman careke din ewê biceribînin Xar- kovê bistînin?

Herwekî me berê ji gotî hû di şerê rohelê de roj bi roj eleman kêrîm kêrî zêde dikin.



KEPORAL MORIS DÛ FRETAY — LE CAPORAL MAURICE DU FRETAY

Keportal bi maua onbaşî ye. Keportal Moris balafirvan bû. Piştî ko Fransa şikest û elemanan ew vegirt Moris ji kete destên dijmin. Moris dixwest xwe bigehnte De. Gol; lê rê pê ne diket. Moris di yek wextî de arkinist bû. Rabû ji xwe re balafirek çêkir, lê siwar bû û xwe gînanê Inglîlê. Hikumeta qralî ew bi nişaneke mezin mikafat kir. Hevalên Moris ew rakirine ser milên xwe.

ELEMANYE Û ROHELAT

L'ALLEMAGNE ET L'EST

Par le Colonel V. Hurban, ambassadeur de Tchecoslovaquie aux Etats-Unis

Çekosllovakye ji dewletên Ewropa navîn e. Erdê vê dewletê beriya şerê 1914-1918an wilayetine Nemse û Elmanyayê bûn. Piştî wî şerî Çekosllovakye wek Polonyayê bû dewleteke biserxwe. Hitler piştî konferansa Münixê destê xwe dirêji Çekosllovakayê kir. Çekosllovakye xudan ordû bû û gava talûke nizing bû karê xwe kir ko dest bibe xwe. Lê piştre, gawajordiyên elemanî di tixûbên wê de heşidîn dest hilnani û elemanan ew welat bê teq û req vegirt û ew kirin di wilayatên xwe. Lê piştî ko şer dest pê kir, Çekosllovakau ji di Londrê de hikûmetek saz kir û ji çekosllovakên derveyî welêt esker dane hev, ew di welatên rohelatê nizing de talim kirin û di şerê Efrîqayê de pardariya cidalê kirin.

Kulnêl V. Hûrban di Weşingtonê de sefirê Çekosllovakayê ye. Vê paşiyê Hûrban di klûbeke jinan de gotarek daye. Kulnêl di destpêkê de gotiye « Tiştên ko ezê bibêjim ne bi tenê fikira min; lê ew di yek wextî de fikira hikûmeta min in ji ». Ji wî awirî ve gotara kulnêl biehemiyyete.

Kulnêl di gotara xwe de qala wî şerî, nîzama Ewropa a nû, di vê nîzama de rewşa welatê xwe û cezakirina elemanan kiriyê.

Ji gotara kulnêl emê nemaze tiştên ko di

heqê welatê xwe, dewletên Ewropa navîn û Ewropa nîvro-rohelê de gotine ber peyî xwendevanên xwe bikin.

Kulnêl dibêje: Çekosllovakau çavên xwe nemaze berdaye Ewropa navîn û Ewropa nîvro-rohelê. Di van erdan de ji sed milyonf bêtir rûniştiman dijîn û lê qewm û militeine gelêr hene. Ev miletên han di dewletên mezînan ji hev dikin; yanî dikevin navbera wan: Rûsyê û Elmanyê.

Elmanyê divêt cezayê xwe bibîne û ev dewlet hetanî ko cezayê xwe bikişîne di sazkarîna nîzama Ewropa navîn de nikare bibe xudan ray û gotin.

Lî gora fikirên ko heta niho hatine eşkere kirin ji bo dewletên Ewropayê ên piçûk hevkarîke hêj himbiztir tête pêşnihad kirin. Jê re şikilîne tével « mixtelîf » dibînin; mîsalan ditînin. Wek dewletên emêrikanî ên yekbûyî, lê her dewlet di karên xwe ên hundirîn de biserxwêtir. An tifaqêke eskerî. An bi tenê hevkarîyêke peran û gumrikan. Hin dibêjin ko hemî dewletên ewropayî ên piçûk ji Baltiqê heta Behira spî divêt di yek tifaqê de bigihin hev. Hin dibêjin divêt sê tof bêne saz kirin: dewletên bakur-roava, dewletên cemê Tûnê, dewletên Balqanê. Hinên din ji du tofan pêşnihad dikin: dewletên bakur, dewletên nîvro.

Lê mesele bi hêmanîne din hejî zehmetir dibe.

Îro Çekosllovakye, Polonye, Yûgoslavye û Yewnanistan hevalbendên sondxwariyan in. Herçî Mecaristan, Romanya, Bixaristan rajêrên mihwêrê ne. Nemse di bin nîrê elemanan, Welatê ernewîtan di bin hikîmê talyanan de ye. Tirkîye hêj bêteref e.

Ev hêmanên ha şanî me didin ko helkîrîna van meseelan çiqas dişwar e. Digel vê hindê divêt her millet ji xwe re helekê peyda bike û nîzîngiyê li miletekf bike.

Me ev tişt bi Polonyayê ceriband. Ji xwe ev tiştekf gelek tebfî ye. Bûyerên salên 1938-1939an şanî dane ko di navbera van her du miletan de yeqêdiriyek (yek-qederiyek) heye. Piştî sala 1920an di vê riyê de ev her du millet qederekf pêş ev çû bûn. Lê siyaseta kulnêl



Di wî şerî de herwekî eteman ji wîrisan tîşin japon ji ber çîniyan di zehmetêke giran de ne. Çîni diçin welatine biyanî û hîni fenîne nû dibin. Klîşa me balafrwanîne çîni şanî dide. Ev balafrwan di Emêrikê de hîni sinheta xwe bûne.

Bek, wezîrxariyê Polonyê ev xebat pûç kir.

Di sala 1940f de ji nû ve her du dewlet ketin mizakerê û bi hev re beyanamekê belav kirin. Di wê beyanamê de digotin: « Polonye û Çekoslovakye ji ber îştiraka menfeheta xwe ji niho de didin zanin ko ji van her du dewletan re piştî xelasbûna şerî hevkarîke gelek himbiz divêtin. Dîsan ev her du dewletên ha, xwe amade didin zanin da ko piştî şerî û wek dewletine biserxwe bikevin civateke siyasî û fîqîsadî ya ko di Ewropayê de wê bête danîn û ya ko dê bibe hîmê nîzama Ewropa navîn ». Lê ji hingê ve mişkilatîne nû serî dane. [1]

Sefîrê çekoslovak bi gotîna xwe a paşîn îşaret li gelşa ko ketiye navbera ûris û polonîyan, dike.

Sefîr gotîna xwe pêş ve tajo û dibêje: Îro awayê dîtina çekoslovakîyan bi awayê jêrîn dikare bête xulase kirin. Çekoslovakye hergav xwazekarê hevkarîya Polonyayê ye. Çekoslovakye tucaran nikare bikeve tifaqêke ko ew di elêhê Rûsyayê de hatiye saz kirin. Tu şik tê de nîne ko tifaqêke çek û polonîyan divêt bi raya dewletên Ewropayê ên mezin, yê rohelê û roavê, bête danin.

Yanî Çekoslovakye dixwaze bi dewletên Ewropa navîn re, hevkarîyê bike. Ev hevkarî bêt Sovyêtîstan û raya dewletên roavê nikare

[1] Mexseda sefir ji wan mişkilatan minasebetên rûs û polonî ne. Ji ber kuşîna zabîtinê polonî hikûmeta polonî ya ko li Londrê rûdine qutbiriya xwe ji ûrisan kiri bû.



TOPEKE JAPONÎ E EÛRIS YA KO DI GIRAVÊN SİLÊMAN DE KEIÎYE DESTÊN EMÛRÎKANIYAN

here serî. Lê pêve ji bo Çekoslovakîyayê tu çare nîne.

Tiştê ko ez dibêjim ne bi tenê ji çekoslovakîyan re, lê ji hemî dewletên Ewropayê ên piçûk re divêt bête tetbîq kirin. Mesela dewletên Ewropayê ên piçûk ancax bi lihevhatîneke xwerû ewropayî dikare bête safî kirin. Ev ji gava rohelat rastî roavê têt û pê re gotîna xwe yek dike diçe serî.

Ev dewletên ha jî bi tenê bi hevkarî û lihevhatîneke rastîn dikarin rahet û di aşiyê de bijîn. Ji bona vê yekê jî, ji wan dewletan re divêt ji îstîqalên xwe fedakarîna bikin. Çekoslovakye ji bona ko bikare xwe bigehîne wê armanca bilind ji wê fedakarîyê re amade ye ».

HEJMARA HAWARÊ A 57AN LI 15Ê TEBAXÊ BELAV BÛYE. LÊ BIGERIN Û TÊ DE BIXWÎNIN:

Tefsîra Quranê. Şeytanqûnî. Diwana Melê. Gulistan. Memozîna Xanî. Ya Reb. Sefera Sicilyayê Hêviya Nuh. Ez û Yar. Çeteyên Rûsî. Feryad. Panama.

Kiriyariya Ronahiye

Ji bo Sûriyê Pênc lireyên sûrî — Ji bo welatên din litrekî ingilîzî

Xwedî û gerîneendeyê berrisîyar : Mir Celadet Alî Bedîr-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 19

IN
1 ÇIRIYA-PÊŞIN 1943

RONAHI

ANNÉE 2
NUMERO 19

VENDREDI
1 OCTOBRE 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON: 12-29

DÛKA KENTE



Dûkê Kentê birayê qralê Ingilistanê bû. Dûk gava diçû Eyslandê ji bo teftîşa yekînekên britanî balafrî wî bi rê ve ket û dûk mir. Baniwa han dûka kentê Jina wî ye. Ji ber spebitî û ziraviya tewr û tevgera wê me rûpelê kovara xwe ê pêşin bi resmê we xemiland.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARE DE

Jin ji hene	Çirokbêj
Xanim tu Dizani	Cegerxwîn
Lê ne bê Tiling	Melayê Sozê
Berdiliya Mihokê	Osman Sebrî
Dilber	Cegerxwîn
Yek ji hêmanên cengê	Hesenê Mistê
Zêrên belîrê	Qadirê Ferînan
Hinek ji Henek	Yariker
Napolyon	Osman Sebrî
Reşbelek	Bavê Cemşîd
Êzdî û Ola wan	Osman Sebrî
Keç	Cegerxwîn
Kirasê Bextiyariyê	Evdileziz Metwar
Keçika Kibrîtlirôş	Bişarê Seginan
Pîrsa Îtalyayê	Nêrewan
Mizgîni	Destgîr
Pîsiyariya Gulavêjê	Ronahî

ÇIROKA KURDMANCI:

JIN JI HENE

JINKOK JI HENE^[1]

Carekê hebiye padişêk. Emir da ko kes li bajêr de ji mexribê pê ve çira vêketî nehîle. Rokê nihêrî ko di qesrekê de çira vêketî ye. Go wezîrê xwe:

— Haydê em herin binihêrîn ew kî ye?

Lêxistin çûn ber qesrê. Tê da qîz û xortek rûniştî wî. Merif heves dike ko li wan binihêre. Ew qîz û xortê han bi dor radikevin. Weqta ko dora xortê tê keçik serê xwe dide ser çoka wî; xortê ji xwe ra bi porê wê dilîze; noheta keçkê da jî wer dike.

Padişa zivirî, jî wezîrê xwe ra got:

— Gelo kes heye ko dilê wan jî hevdu sar bike.

Wezîr go: Belê, îtbarî (bawerî) bi pîreka nabe

Padişa go: Ti dikarî pîrekekê peyda bikî ko dilê wan jî hevdu sar bike. Wezîr got, belê.

Lêxistin çûn cihê xwe. Wezîr rabû pîrekeke heştê heştê salî di ko daîm karê wê ew e, got:

— Ti herî filan qesrê, tê da keç û xortek heye, ti dilê keçkê jî xort sar bikî, belkî xort hikuje were padişê bistîne.

Pîrê lêxist û çû. Çû cem keçkê. Weqta ko çav bi keçkê ket rûniştî û gîriya, keçkê go:

— Ti çima digirî dayê.

Go: lawo dilê min bi halê te şewitî. Ancax ti liyaqetî wek padişa yî. Heyfa te ko ti jina vî xortê han î.

Keçkê hilda û jê ro go:

— Lê ez çawa bikim

Pîrê go: Êvarê ko xort hat, nobeta wî hat û raket, kêrekê bigir, li ser dilê wî xe, serê wî jêke. Padişa bê her pacê, serê wî jê ra bavêje, padişa te bistîne.

Bû êvar, pîrê çû cem wezîr go:

— Min şixul qedand, get nesekinin, herin ber pacê, keçik serê xortê jêke, ji we ra bavêje. Wezîr çû jî padişa ra wiha go. Padişa go, haydê em biçin ber qesrê.

Çûn ber qesrê û li ber şibakê sekinîn. Nobeta xortê hat, serê xwe kir ser çoka keçkê û raket. Keçkê kêrekê lêxist û xortê kuşt. Serê wî jêkir, di qesrê de avêt cem padişê. Padişê serî hilanî û çû.

Ji kerba xewa wî ne hat; heta bû sibe. Sibê şand keçik anî, da xeniqandin. Bîna wî pir teng bû, zivirî jî wezîrê xwe re go:

— Madam ko pîrek ewha bêbext in, ez va diçim ser behrê, çil royî nayim. Ez emr didim te ko pîrek di bajarê mi da ji heftê salî heta heft salî ko ti gîştî, jêkî serê wa, heta pîreka mi û xwe jî.

Padişa lêxist û çû. Wezîr da eqelê xwe ko ez berî ko pîrekê xwe nekujim dilê mi naşewite. Ezê pîrekê xwe bikujim, paşê ê wan jî bikujim. Şûrê xwe hilanî û ber bi mala xwe lezand; gîbîşt hundirê malê ewil lêxist jina xwe kuşt. Dor hat ser diya wî. Diya wî revî û ket pişt bavê wî. Bavê wî zivirî û jê ra got:

— Lawo Xwedê xêr ke, ti dîn buyî!

Go: na ez dîn ne bûme; emrê padişah e.

Rûnişt û mesala xwe jî serî heta binî jî bavê xwe ra got.

Bavê wî go: madam ewha ye, bise heta ko padişa bê, ezê jê ra pîrsekê bibêjim, eger ko qebûl ne kir, bira te jî ji boyî min bikuje.

Sekinî heta ko padişa vegeyriya. Padişa hat û nihêrî ko kes ne hatiye kuştin. Go « ez bigîjim ciyê xwe ezê serê wezîr lêxim ». Padişa bat ciyê xwe rûnişt û şand dû wezîr û go:

— Min emir kir ko tu pîreka nebîlî bajarê min de, ez hatim min nihêrî ko te kes ne kuştîye, ezê jî boyî wan serê te jêkim.

Wezîr hilanî û jê ra got:

— Eger ko ti emir bikî pîrseke min heye ezê ji te ra bêjim

— Belê bibêje

— Bavê min ne hişt ez kesî bikujim. Heta min pîreka xwe jî kuşt, bavê min wezîrê bavê te ye. Min bexatirîya wî ne kir. Bavê min go, « padişa hat pîrseke min heye ezê jê ra bêjim eger ko qebûl ne kir, bira wê çaxê te bikuje ji dêla wan va ».

Padişa şand dû bavê wî û anî. Bavê wî

[1] Ev çirok yekî serhedî gotiye; jî eşîra cîbran.

hat; padişa hêz da ser xwe û ji ber wî rabû. Wezîrê kal go:

— Padişayê min ez xort bûm, emrê min bîst û di sal bûn. Karê min daîm neçîr û seydbû. Ez pir jî pehlewaneke baş bûm. Hesp, gurz û şûrê min mikemel bûn. Rokê ez li diharekê bûm, riyek di ber min re dihat û diçû. Mi jî xwe da bû ser rê û lê dinihêrt. Mi di siwarek hat; hespê wî reş, cilê wî reş gurz û şûrê wî jî reş. Sazê wî devê wî da ye, nigê xwe avêtiye ser sûyê (stoyê) hespê xwe û li sazê xwe dixê û di ber mi ra derbas bû, Deyn ne kir û ne şexilt, ne sebaxêrê di mi da, ez dilê xwe da pir qehirîm, mi go: « ez filanke bim ew bê sebaxêrê di ber mi ra derbas bibe ». Min gurzê xwe hilanî û di destê xwe da ediland. Mi jî par ra serî da ser, mi nêzikî lê kir û mi tu deng lê ne kir; ez jî par ra ghiştim-ê û min gurzek lêxist. Ne deyn kir, ne li mi zivirî, li sazê xwe xist û çû. Ez car din jî par ra ghiştim-ê, mi gurzek di lêxist. Li mi zivirî destek xwe avête mi, ez hilanîm, li bi (bin) hêta xwe danîm. Hespê mi jî avêt yerdaxa xwe. Pir, hindik, ez di bin hêta wî da mam. Mi pir kir qêrîn û fîzar. Mi go: « Ji boyî Xwedê, ez di bin hêta te da mirim, tiwê min berdî ezê ji te ra bibim xulam, heta tu sax bî ez terka te êdî nakim ». Ez hilanîm û dam ser hespê mi, gurz û şûrê mi da destê mi, go: « Ez kû da diçim tu bide dû min, ji îşê min xeber nedî, xeber bidî ezê te bikujim ».

Ew çû mi da dû, nivê şevê em ghiştin ber qesrekê; ew peya bû, serê hespê xwe da destê min, hilanî û ji min ra go:

— Kuro ezê herim vê qesrê, ege heya du saeta ez hatim, ez hatim. Ez ne hatim, hespê min, bi terkiya min, xurca mi tijê zêr e; hilîn û ji xwe ra be, here.

Mi di dest avêt heqîba xwe, baqek singê hesinî jê deranî û da ber qesrê. Yeko yeko ew kutan, pê da hilkişiya û çû. Pir çû, hindik çû, mi di di qesrê da bû fîzar û gazî. Qederê saetekê dewam kir wilo. Paşê mi di go: « bigre » Weqta ko avêt mi girt, mi lê nihêrî ko beft serê merîfan in. Ew bi xwe jî qesrê da peyayî erdê bû û ji mi ra go:

— Kuro siwar be, van seriya bigir ber xwe.

Siwar bû û da pêşiya mi. Em çûn; li me bû sibe. Em çûn ser tîrbeke nû. Ew peya bû û tîrb veda, heya gihand ser merzel û devê xwe xist tîrbê û kir gazî, go: « Mi heyfa te stand, mi heyfa te stand » û zivirî ji mi ra go: « tîrbekê

ji mi ra vede » mi jî ji tîrsa, jê ra veda. Mi di şûrê xwe deranî û kir ko xwe bikuje.

Qêrîn jî min hat û mi xwe avête ser dest û tiwê nigê wî. Mi go: « Ji boyî Xwedê tiwê mesela xwe ji mi ra bibêji ». Hilanî û ji mi ra go: « ez qîzek in, ev tîrba han mêrê min bû, ev heft seriyê han pismamê mi bûn, dilê wa bi mi da hebû, mi ew ne distandin, rabûn lê-xistin mêrê min kuştin. Mi jî wehd kir ko heya ez heyfa wî nestînim ezê wilo li dinyayê bigerim. Mi firo heyfa wî bi destê xwe hilanî, ez jî xwe bikujim, ko di pey wî ra tu mîra nekim » û xwe kuşt.

Padişayê min jin jî hene, jinkok jî hene. Di nav bajarê te da nêzikî niv lek jin hene. Qenc jî tê da hene, xirab jî tê da hene.

Padişa jî rabû, wezîrê xwe ew kir.

XANIM TU DIZANÎ

Canan te cihan girî seraser bi ciwanî
Roja di cihanî
Min di ji serayê bi xweşî tê bi giranî
Zû perde hilanî
Gava ko me di ser me tewand ber nigê yarê
Sermest û xumarê
Lingê xwe ji nêv qundereyê wê ne deranî
Ser çavê me danî
Lingê te ji bo derd û birnê me re derman
Zanim bi xwe Luqman
Nafîz⁽¹⁾ bi xwe destê xwe li ser canê me danî
Derdê me nizanî
Bawer bike ser ta bi piyan derd û birin im
Ferhad û Şîrin im
Şîrê ko li dil da bi wan ebrûyê kemanî
Ey pertewî canî
Cama ji lebê le'le te ez firo dinuşim
Bawer be bêhûş im
Miffî me, Zeradeşt û ji nik Mizdik û Manî
Fetwa me deranî
Îro di evîna te wekî Ristemê Zal im
Çendan ko dinalim
Barê ko me bilgirtî zanim ne hesanî
Kî bit ne tiwanî
Dilber bo dixwazî hik, jî min tu bi xencer
Ez dê xwe bidim ber
Lê ger te divêtin nemirim ez bi xizanî
Wer rûne li banî
Canan tu dizanî bi xwe em bûne Cegerxwîn
Her şev bi xwe digrîn
Çavên me dirêjtî ji xwe dest Dicle û kanî
Xanim tu dizanî,
CEGERXWÎN

(1) Bijişk Ehmed Nafîz beg.

LÊ NE BÊ TIFING

Zilamek heb, hero diçû mizgeftê û piştî nimêje gub dida we'z û şîrêtên xetîb. Xetîb gelek caran digot: Heçî zêrek da feqîran Xwedê jê re heftê zêrî didit.

Carekê, du caran, mêrik qerara xwe da ji ya xetîb bike. Zêrekî wî hebû, veşarti bû nik jina xwe. Rabû hal û hewal gote jina xwe, û bi zor zêr jê stand û ew da feqîran.

Çend roj ketin navê. Xwedê heftê zêrêrên ko xetîb digotin ne dan-ê. Mêrik xudan zar û zêç, sal ji xerab hati bû. Kuflet bê zad man. Mêrik rabişte tînga xwe û çû nêçîrê tişteki bikuje û bike nefeqa kufletê xwe.

Bi çiyê ket, gelek geriya tişteki peyda ne kir. Rastî darekê het; kanîke zelal ji li ber e. Hilkişiya ser darê û li hevîyê ma. Dinya ye, te dit koviye di ber re borî. Mideyek derbas bû, rêwingiyek hat û li bin darê rûnişt.

Rewingî hebanê xwe danî û jê nanek derxist û ew kire çar perçe û li ser her perçe navek nivisand: Xwedê, Mihemed, Elî, Cebrail.

Mêrik midekî li wan her çar perçan temaşa kir û paşê berê xwe da Elî û got-ê:

— Ya Elî, şêrê Xuda, mêr di ser te re çênebûne. Te dizanî ko pêxemberî ji te re bû. Cibril xwe şaş kir û ew gihandê Mihemed. Wijdana te çawan qebûl kir ko tiştê ko Xwedê rêkiri bû te Mihemed ji te bistîne û tu lê ranebî. Wele tu ne hêja yî, ezê te bixwin.

Mêrik pariyê ko li ser Elî nivisandi bû kir devê xwe û xwar. Vê carê berê xwe da Mihemed û got:

— Ya Mihemed, xelkê gelek qedirê te girt. Tevî ko tu dawîya hemîyan de hatî ji te re gotîne fexra pêşyan. Wijdana te çawan qebûl kir, tiştê ko ji xelkê re ye tu wî bibî û wî bikî malê xwe, ma ji te re ne fehêt e. Wele tu jî ne hêja yî; ezê te jî bixwim.

Mêrik Mihemed jî xwar û berê xwe da Cebrail û got-ê:

— Ey milyaketê Xwedê ji te re gotîne qasidê emîn. Ma emanet holê ye? Ma te ne dizanî ko pêxemberî ji Elî re ye. Te xiyaret

kir; te ew gihandê Mihemed. Tu jî mistehqî ceza yî; ezê te jî bixwim.


Mêrik rabû Cadrafl jî xwar û berê xwe da Xwedê û got-ê:

— Ma te bi xwe ne gotiye ko tu bi her tiştî dizanî û bi her tiştî dikarî; li her derê hazir û nazir î. Te çawan hişt ko...

Nêçîrvanê ser darê gava ev xeber bihistin, di dilê xwe de got, mêrik dike Xwedê jî bixwe; ezê paşê heftê zêrêrên xwe ji kê bistînim. Tînga xwe lê rast kir û pê ve danî. Mêrik di cih de mir. Nêçîrvanê me daket û hebanê mêrik tev da. Tê de heftê zêrî ditin. Pere kirin bêrika xwe û hate mal. Qiseta xwe ji jina xwe re got û pere dan-ê. Şahî bi kuflet ket.

Şîbetirê mêrikê me çû mizgeftê. Xetîb disan digot: « Heçî zêrek da feqîran Xwedê heftê zêrî didiyê ».

Mêrik rabû ser xwe û gote xetîb: Efendî bisekine, gotina te rast, lê nîvco ye. Belê dide; lê ne bê tîfing. MELAYÊ ŞOZE



ARTISTINE ÎNGİLİZÎ YÊN KO BÛNE ESKER Û ÎRO DI ORDIWÊ DE JI HEVALÊN XWE RE DILEYIZIN

BERDILIYA MIHOKË

Dema Rom bû serdest di şerê mezin
 Ne hîştin bi Kurdan biçûk, kal û jin
 Bû mehşer nîveka welatê jorin
 Ji rûkî hewar bû bi zarîn û şîn
 Gelek teng bû bû erd ji xelkên di şer
 Ji ber ko mabûn bê serek û rêber
 Çekhilgir gihêştin şikêr û çuyan
 Şîrpîna lajangana çîrîna diyan
 Keç û bûk, pîrejin di destên neyar
 Çi haho û zarî eman û hewar
 Biçûkek hebû ê axayê wî cî
 Roman bav û dê kuşt hiliştin sêwî
 Mihok f biçûk bû lê pir jîr û şeng
 Veşart xwe di kuncêk bê awaz û deng
 Dema lê bû êvar bi derket ji günd
 Berî da kirê sor û qûça bilind
 Êvar bû şeva reş û teng û tarî
 Barana bayê reş bi ser da barî
 Direvî dilê wî digotê; birû,
 Xelasi divêtin Mihokê de zû:
 Mebêje rê dijwar çî ba û bager.
 Dê îşev biminî bê serpî li der.
 Gelek çû ne dît tu avahî û ban
 Ji wesfîn û serman bi derxist ziman
 Xwe avêt qefakî biçûk pişt li ba
 Heya lê sibe bû di tu avahî dîma
 Wê rojê li wir ma bê xwarin û tî
 Êvar bû xwe berda nava rê meşî
 Nihêrî karwanek dimîne li pêş,
 Got; hebî hebîtin yekî dil bi êş
 Serpîkî bide min hinek nan û dan,
 Nikarim kuta binî ji nîrinê bê wan.
 Serekî xwe ragirt li pêş û li paş
 Dawî çû gote wan: êvara we xweş.
 Rabû yek ji wana Mihok girt anî
 Eba xwe tê wer da li nik xwe danî
 Çi binhêr biçûkek lewend û çeleng
 Hilmîştî û zîrek di rewşa pileng
 Lê pir pir f westî qutîfî di hev
 Sinixê birçî bûn û sermayê tev
 Dêm û lev ji serman bûne reş û mor
 Ji lingên pêxas da dirîj xwîna sor
 Serekî welê ma li pêşî agir
 Jê pîrsîn: ji kû yî; çawan hatî vir?!.
 Gote wan: revok im ji destê neyar,
 Malkambax bûme him ji canî bêzar;
 Ji min çûn bav û dê û qesra belek,
 Ji hesp û dewaran, pezê sor gelêk;
 Niha jî du roj in tî, birçî, tazî!
 Bêbav mam biçûk im nezan û sêwî.
 Nizanim biçim kû bibanim di nav.
 Nê min yar û hevrê, nê serpî dirav..
 Bi renc û dijwarî ghamê vî cî
 Gelo hûn nabitin li min kes xwedî?.

DÎLBER

Dîlber me di di pencerê jê ra me zû temane kir
 Roj bû ji birçê dayê rê min ji xwe ra temaşê kir
 Hatin temaşayê gelek, dîlber bi çavên reşbelek
 Ez rakirim birca felek dîsa li min delata kir
 Wê nazika rind û delal da min qebale dêm û xal
 Fîrset me di hati mecal palê me bê qeyale kir
 Min secdê bir xalên di qer, min di li dor eswed-hecer
 Eilî û Osman û Emer, Mihemed û Elhabekir
 Eswed-hecer çavên belek hacî li dorê lek bi lek
 Hatin tewafê pir gelek wek min kesî eda ne kir
 Ez çûm tewafa wan rûyan sêr dane taqê ebrûyan
 Wan bir ji min rûh û rowan cama dilan sed pare kir
 Sed perçe kir cama dil e zanî Cegerxwîn dikul e
 Go hemnişînê bilbil e wê zalima xedare kir.

CEGERXWÎN

Di nava çavên wî dileystin çirûsk
 Di peyvên wî da xweş xweya bûn birûsk
 Dibhîştin ji devê Mihokê bi ar
 Bela ser welatî, zînata neyar

Serekê di karwan dilovan û pîr
 Bi nava bû di xelkên welêt da bi şîr
 Çîroka Milokê kezêb jê disot
 Ji cihê xwe rabû çû cem wî û got:
 — Min nînin tu zarok biçûkê delal
 Bi Xwedê û Mishef vî nanê helal,
 Ji îro bi şûn da tu yî lawê min
 Ji bona te gorî çî malbat û jin..
 Nebe tu netirsî li nik min bîmîn,
 Heya ko mezin bî xudan jîr û vîn..
 Divê tu bibîrî bi roj û bi şev,
 Ko kurdmanc û Rom her neyar in bo hev..
 Peritand ji min can vî enrê dirêj
 Avêtin ji dest xwe çek û şîr ji méj,
 An ne qet hêja bû wê zilma neyar
 Bikêşin, çî şerm e hezar car hezar!!
 Lê hêj tu biçûkî sibê xort û şeng
 Ji bo te welatek qada şer û ceng
 Heke baş camêr bî mérékî di çê
 Dê hildî wê gavê tola bav û dê.
 Van peyvyan hinav ji biçûkî dirot
 Di dest da li kalê zivirand û got:
 — Xweya ye bavê me ne nasim te ez,
 Dibêjî vî peyvya sibê tu bi lez..
 Çawan ez ditirsim Xwedê min heyel
 Ev giştîk ji bona welatê me ye..
 Niho bes divê min vî canê bê xêr,
 Bihêvîşim bo evdê heya bûme mêr..
 Xwedê f cormead e dinyake bi dûm,
 Dê her bo wê tolê didanan bisûm;
 Eger me ne bit jî di dinyayê bext,
 Dê werger ji neyar teqez tac û text..
 Dê hînga vemalim van çêplên zirav
 Pê hildim tola xwe ji Roma bêbav...

OSMAN SEBRÎ

Y E K

Ji HÊMANÊN VÊ CENGÊ GUHÊRÎNA BA Û HAWAYÊ

Naskirina guhêrbariya ba û hewayê di vê cengê de wek çekine din, wek tang û balafirê bi keri şerevaniyan têt.

Felakiyat û minecimî fenine kevin in. Li wextê berê mineciman li stêrkau dinihêrtin û siûda mirovên mezin digotin. Di kurdmanciya me de, nemaze şivan li ba û li reugê ezmên hûr dibûn û digotin: bayê xêrbê tê baran dê bibare.... baran hebe ji, hêj dâr e, heta sibe dinya seht ye....

Lê îro ev fen gelek pêş de çûye. Jê re aletin wek dûrebîn û hewapîvan çêbûne. Zilamine pispor di cihine bilind de, wek kehelan, rûdinin û bi guhêrbariya ba û hewayê mijîl dibin û didin zanîn: Mesela li roja Sêşembe li Medegaskarê baran dê bibare, li roja Çarşembê li Bûrmayê bakt xurt wê hebe, li roja Pêncşembê dinya di Mûrmanskê de wê sahl bibe; lê mij wê havêje girava Eyslandê.



CEJINEKE BALAFIRVANAN: Tu şik tê de nine ko di vî şerî de gelek caran balafir ji çekên din çêtir bi keri hatine û di hin deravan de ketine şûna topçiyê jî. Li Ingilistanê geh geh jî bo balafirvaniyê cejinina saz dikin û pê qedirê balafirvanan digirin. Klişî me cejineke welê şanî dide. Xelkê Londrê qesta wê cejinê kirine û guhdariya xelbê ko li ser balafirvaniyê dipeyive û ebemiyeta wê dide zanin, dikin.

Îcar pisporên ko di wan stasyonan de rûniştî ne van tiştan saet bi saet jî serfermandariya ordiwa xwe re didin zanîn. Serfermandar jî li gora van xeberan planên xwe diedilînin.

Serfermandariya elemanî di vî şerî de gelek gulî daye vê fenê û jê fêdene mezin ditine; nemaze gava zîrehpûşên Şarnhost û Gnayzenaw di kenala Manşê re derbas kirine.

Her du zîrehpûşên elemanî piştî şerê behîrê bêgav ma bûn û xwe li Etlantîkê, di bendera fransîz Brêstê de veşartî bûn û nikarî bûn veşartin wargehê xwe. Ji ber ko diviya bû di behîra Manşê a teng re derbas bibin. Li Manşê şev û roj stol û balafirên ingilîzî nobet digirtin. Digel vê hindê çawan derbas bûne û xwe gilandine bendera elemanî? Tev de xêra fena ba û hewanasiyê.

Serfermandarê stola elemanî, emîral Rîder, jî stasyona ko di bin emîrê wî de kar dikir, xwest ko jê re tiştên jêrîn şanî bide:

Rojeke welê, nişke xurt avêtî be behîra Manşê û pê bînahtî şikestî be. Di yek wextî de divêt li ezmên sermaka welê hebe ko baskên balafirên pê biqerîsin. Ev hal divêt ewçend dom bike hetanî ko zîrehpûşên me bikarin di bin perda mijê de li behîra Manşê derbas bibin.

Îcar pisporê hewasînas gava emîrê emîral girtî planê xwe çêkir û dest bi xebatê kir. Heçî rûznameyên hewayî jî yên pênc salan û hir ve hene hemî tev dan û li xeriteyên hewayî yên wan salan jî hûr bûn. Dawiyê hewasînas hate qerarekê û zanî hewa ko emîral dixwest bi piranî di meha Sibatê de li Manşê çêdibe, kenal di bin mijê de winda dibe û çav çawan nabin. Disa li gora tecrîbeyên pênc salên paşîn bapûk jî heriya nivê Sibatê li kenalê dide û hewa tê de dicemide. Herçî pûk jî ji bakurê Etantîkê radibe û di nav du rojan an di

nav du roj û daneki de digehe Mansê.

Piştî ko ev tişt ji hate zanin rabûn li bakurê Ellantikê dideva nek danin da ko ji wan re rabûna pûkê elam bide.

Li 9ê mehê pûk ji bakurê Ellantikê rabû û herê xwe da Mansê. Li 11ê mehê emîral Rîder emir da zirehpûşên xwe ko bi rê bikevin û qesta welêt bikin.

Şarnhorst û Gnayzenaw bi şev bi rê ketin û sibetirê gihastine Mansê. Telêgrafan dida zanin ko mijê avêtîye Mansê, dinya berf û baran, sermake xurt li kenalê fermanferma ye.

Ingilîz pê hesiya bûn. Ji bejê zirehpûş ne dihatine ditin. Herçî balafirên ko qesta wan dikir, ji ber xurtiya sermayê baskên wan diqerisî û beriya ko bigehin armancê redigeriyan wargehê xwe.

Heta niho heriya çar pênc salan guhêrbariya hewayê bi tenê berî 24an 36 sactan dibate seh kirin. Lê di van salên paşin de ev fen ewçend pêş ve çûye ko guhêrbariya hewayê berî midelî dirêj tête seh kirin. Bi vî awayî erkanherbiye ji vî fenê fêdene mezin digirin. Tecriban şani daye ko hewa, berî midelî dirêj di tayên ezmen ên jorin de dest bi guhêrînê dike û ev ji tevgera pêlên bayî xuya dike. Ev guhêrîn ji li gora salê bi yek awa û nizamê tête pê.

Herweki me got elemanan ji vî fenê di vî şerî de gelek fêde ditine.

Di şerê Polonyayê de dinya-alem li sîûda elemanan ecêbmayî dima. Meha Îlonê di

Polonyayê de mela baranê ye. Diviya bû baranê xurt bihatana, leht rabûwana û ji heriyê di gelek deran de wasitêyên gulastînê biteqînîyana. Lê tişteki welê çênebû. Hewaşinasên elemanî ji herê de diti bûn ko baranê sala 1939an di Polonyayê de wê şûn de bikevin.

Disan di şerê Nojvêjê de gava eskerên elemanî li Baltîqê derbas dibûn mijêke xurt lê hebû. Lê ber bi dawîya Nîsavê mij rabû bû, dinya zelal bû bû. Cenkeştîyên ingilîzî nikarî bûn li peravên Norvêjê nizing bibin.

Di şerê ûris de gelo hewaşinasên elemanî xapiya bûn. Çawan ne diti bûn ko di sala 1941ê de Zivistan di Rûsyayê de wê zû dest pê bike û wê gelek xurt bibe.

Piştî hate zanin ko yên ko xapiya bûn ne hewaşinas lê erkanherbiye bû. Erkanherbiya elemanî bawer dikir ko zora ûrisan zûka, beriya hatina Zivistanê wê biçe.

Îro di hemî ordiwên dinyayê de hewaşinas bi erkanherbiyê re dixebitin. Herçî Emêrîke, di vî fenê de di nav emêrîkaniyan de mîcer Êrveng Krig seyda ye. Krig ji bo hewaşinasîyê stasyonêk daye çêkirin. Jê pêve Krig di ûnîvêrsîta Kelfornîyayê de dersên vî fenê dibêje.

Di sala 1930î de Krig di ûnîvêrsîta Kelfornîyayê de dersên hewaşinasîyê digertin. Mamosîyê wi Gûtenberg ew hîni vî fenê kivi bû. Gûtenberg di şerê 1914-18an de di erkanherbiya elemanî de pisporê hewaşinasîyê bû.

Di sala 1934an de Krig rabû çû Norvêj û Elmanyayê; her du welatên ko di hewaşinasîyê de ji hemîyan bêtir pêş ve çûne. Krig di wan welatan de qedere çend salan xebitî; tiştîne nû bîn bûn û vejeriya Emêrîkê.

Krig gava vejeriya Emêrîkê, miesiseyek dant û dest bi xebatê kir. Berî herkesî şirketên sînemayê jê fêde ditin. Ewan şirketan gava li çolê filim çêkirina Krig ji wan guhêrbariya hewayê dida zanin; wan ji li gora wê tevdirên xwe diditin. Di nav mişteriyên Krig de lêcîrên zad û penbû ji hebûn.

Îro Krig bûye pisporê ordîwa emêrîkani û di xizmeta erkanherbiyê de dixebite û xêra kehanetên Krig erkanherbiye berî heftekê dizane hewa wê çawan bibe ». HESENÊ MISTÊ



LI GÎNA-NÛ TANGEKE EMÊRÎKANÎ DIKE BI SER JAPONAN DE BIGIRE

ZÈRÈN

KO JI BIN BEHIRÈ DERÈXISTINE

Li 19è Hizêrana sala 1940i, bi sariya sibehê ve vaporeke ewistrali bi navê « Niyagara » ji bendereke nûzelandî rabû bû û berê xwe da bû Kenedê. Li vaporê bareki giranbeha hebû; deh milyon dolarên zer; 8000 kilo zêrê lûlekiri. Zêr kiri bûn sendûqan û sandûq xisti bûn enbara vaporê a jêrin; enbareke hesinin.

Niyagara ji peravê hêj 40 kilometirî bi dûr ne keti bû ko li torpileke elemanî qelîbî û berhewa bû. Heşt ton zêr bin av bû bû.

Zêr yê banqa Ewistraliyayê bûn. Di navbera banqê û emiraliyê de mixabere çêbûn. Emêriliyê dida zanin ko kûrabiya cihê ko Niyagara lê binav bûye 450 pè ne.

Heta niho xewas di behirê de ne gihaştine wê kûrabiye. Ji milê din noqavên elemanî her û her di wan doran de têne ditin. Ji lewre emeliyeta xelaskirne wê biketa her dişwariyine mezin. Lê banqê ji zêrên xwe ne digeriya; nikarî bû bigere. Bi tenê ewê li hêviya wexilîne çêtir himaya.

Lê pisporine vi îşt di Ewistraliyayê de giha bûn hev û li tevdirêkê digeriyan. Di nav wan de xewasekî bi nav û deng hebû, jê re Conston digotin. Qederê hist salan di vê sinhetê de xebitî bû û bi vên û sebat û şehrabiya xwe deng da bû. Hevalek yê conston hebû, jê re kepitên Wilyems digotin. Wilyems emrê wi hêj nû geşti bû hejdehan ko ji mala bavê xwe revî bû û bû bû deryavan û bi rêva gihaştî bû keptaniyê.

Conston û Wilyems rind dîzanin ko dere-xistina zêrê Niyagarê îşeki gelek zehmet e. Lê kiri bûn eqilê xwe ko vi îşt bibin seri. Dawiyê qerara xwe dan û bi dari midirê banqê ketin. Midir bê qeyd û şert pêşnihada Conston û Wilyems qebûl kir.

Vê carê ji mişkilateke din da rû, ditina vaporekê. Ji ber ko her texlît vapor, mezin piçûk, di xizmeta emêriliyê de bûn. Dawiyê vaporeke piçûk û kevin, çilsall, ya ko bi kêri emêriliyê ne dihat peyda kirin. Vaporeke qerade, bi navê « Kleymor ».

Li 7ê kanûna-paşin sala 1941ê Kleymorê berê xwe da cihê ko Niyagara lê bin av bû bû.

Bi adeti xewas kirasekî welê li xwe dikin ko ji çerm û hesin çekiri ye û bi horikê ji rûyê behirê hewayê distîne. Lê Wilyems û Conston ji bo binavbûna xewasan odeyek da

HINEK JÎ HENEK

SIWAR BE:

Yek hebû gelek li ber tayê têşiha. Diktor derzî li hêtên wî dixistin. Rojekê mêrik ji cem diktor vegeriya mal û gote jina xwe:

— Hîrmet, ji ber êşa derziyan nema dikarim rûnim.

Jina wî lê vegerand û got: Camêr heke tu nikarî rûni, siwar be....

BEHAYÊ HEJMARAN:

Têcîrekî êvarê deftera xwe anî bû mal û hisabên xwe çêdikirin

Wî têcîrî kurîkek hebû. Kurik diçû dibistanê û keti bû sê sefa pêncan. Têcîr dema ko hisabên xwe çêdikirin ji kurê xwe pirsî:

— Pênc caran heşt dikin çend?

Kurikî got: çel û pênc

Têcîr: Sibhanelah, hejmar ji beha bûne. Beriya şerî dikirin çel...

bûn çekirin. Wê odê, bi pîloqîne stûr camkiri, çardeh pencere hebûn û sê çar zilam di vê odê de bi cih dibûn û xêra lêgzojênê qederê çar saetan dikari bûn tê de bînin. Di odê de telefon jî hebûn. Bi vi awayî peyayên ko wê biketana biwê behirê dikari bûn, bi vaporê re mixaberê bikin.

Ode daxistin binê behirê. Lê bi rê ve torpilek bi odê ve bû. Kirin ne kirin jê xelas ne bûn. Elam dan emiraliyê. Emirabiye jî wan re vaporine torpilçin rêkirin. Vaporan torpila ko bi odê ve bû bû û hinên din yên ko li dorê bûn rakirin.

Li 31ê Kanûna-paşin xewasan Niyagara peyda kiri bû; di kûrabiya 450 peyan. Vaporê li ser teniştê pal da hû û di nav heriyê de teqîni bû.

Êdî diviya bû oda poladî ya ko zêr tê de bû vekin. Ode bi dînyamîtê de bişkênandana û welê jî kirin. Dinamîtî xistine dora oda poladî û agir bi dinamîtê xistin. Teqînek çêbû. Li rûyê behirê Kleymor hejiha. Conston daket binê behirê û dit ko oda poladîni siqêştîye û qûlêr bûye. Conston gava vegeriya rûyê behirê bi şahlîke mezin gole hevalên xwe, me zêr xelas kirine, û jî nû ve daketin bîni û devê qulê fireh kirin.

Xewasan kirasên xwe li xwe kirin û ji odê derketin û sendûqên zêran bi werisên ko ji wan re dahelandî bûn ve girêdan.

Xewasan sendûq li vaporê bar kirin û vegeriyan Ewistalyayê. Xelkê zêr ji zikê erdê derdixistin. Wan zêr ji biniya behirê derêxistin.

QADIRÊ FERMAN

DÎROKA

JINA NAPOLYON

« Çi gava dilovani dike ne qenciye
bi ser wetêt û welatîyan da bine,
divê mirov dergehên dil û gûhên
xwe ji wê hejeyê ra veneke ».
Napolyon

— 3 —

DIBISTANA PARISÊ A HERBIYÊ:

Di sala 1784an da Napolyon ji di nav wan şagirtên ko ji bo dibistana Parisê a herbiyê hati bûne bijartin da bû. Napolyon di wê rojê da gîha bû daxwaza xwe. Lê şagirtên vê dibistanê, ji ên dibistana Briyenê hin quretir û serkeştir bûn. Di vê dibistanê da her şagirtêki xulamêk hebû ko hespên wan timar, çekên wan zêt û solên wan paqij dikirin. Ji vê pê va, dema xwe bi xwarina tiştên xweş û raketina ser nivlên çak derbas dikirin. Li pêş vi halê han, Napolyon mat û destgîrêdayî nema. Berî her tiştî ji bo neqenciya vê nizamê raporeke xurt da, gerandekiya dibistanê. Di wê raporê da dibêje: « zabîten ko di bin vê nizama han da bigelên, bi kêri şer û kuşlînê nayên. Yekî ko dixwaze tekeve jina leşkeriyê, divê hîni her hişkî û dijwariyê bibe. Her şagirtêki herbiyê divê bi xwe li hespê xwe binêre û bi destê xwe çekên xwe paqij bike. Di rabûn û rûniştinê da xwe hewceyî kesî nebîne û ji kar û xebata destê xwe hez bike. Ev pey-ya û qurosiya han, zabîten biçûk ji leşker bi dûr diêxe ko karê wan ê bi rasti hewceyî nîzik bûna leşker e ».

Napolyon di dibistana Parisê da ji wekî a Briyenê mela xwe da xwandin û xebatê û ji hemî hevalan bi dûr ket, da ko xwe ji ber nêrina hevalên qure bide alî.

Ji dest vala bûna bêrtkê û kevniya cilan, Napolyon gelekî i dilkul bû. Piştî ko gihêste rojên fireh ji bo vê dema dibistanê û halê xwe ê belengaz goliye: « Ew derd û kul bûn ko xweşiya xortaniyê ji min revandin û berî wextê sergirani ji min ra çêkirin... »

Her wekî van derd û kulên han têra Napolyon ne kiri bîn ko piştî ketina dibistana Parisê bi salekê (1785) nûçeya mirina havê xwe ji bilhist. Ew bavê ko piştî derketina ji dibistanê, dê jê ra bibûya arîkarê mezintir. Di vî warî da reşbeleka ko ji mamê xwe Lûsyar ra nivîsiye holê qedandiyê:



« ... Sed mixabin.. her kireke rehmetî ji me ra didane zaniin ko di xortaniya me da ji dê bibûya piştîmêr û arîkarê me ê mezintir. Lê Xwedê ne xwest ko wi ji me ra biltêle. Herçiya Xwedê xwastiye, çare nîne wê bibe. Bi tenê şalê sebrekê bide me ».

Ji diya xwe ra ji ev reşbelek hinarti bû:
« Diya min a delall xwe ragire û bilma xwe fireh bigire; iro ji bo me, ji wê pê va çare nîne. Ji iro bi şûn da, em dê hin pirtir bala xwe bidine te û birewerên qenciya te bin. Heke em di vê yekê da pêk hatin û me hinekî şûna rehmetî tişê kir, ew ji ji bo me hextiyariyek e ».

Herwekî Napolyon mezinatiya xwe a pêşende di rûpelê xeybê da xwandî be, bi baweriyêke xurt dinîçandê. Awayê ko pê xwe da bû xwandina dersan ji wek kesên ko xwe ji tiştên mezîna ra kar dikin bû. Di demên teng û dijwariyê da sebreke welê ecêb nişan didan ko li pêş wê girêkên kortir vedibûn.

Qewmî carekê mamostoyê besêb mes'ele-yeke gelekî dijwar da sefê ko Napolyon i lê da bû; da ko ji bo derxistina wê zaniin û jêhalî bûna wan biceribîne. Napolyon ji bo çêkirina vê mes'elê se rojan di oda xwe da bi derneket. Dawî çêkir. Herçiya hevalên wi

bihistine ev bûye ko Napolyon çekir. Lê bir ne dibirin ko ew çekirin çiqası biha li ser wi bûye mal. Şevên ko tê da xelk têra dilê xwe radiketin, wi dirêjîya wan şevan bi raman û hin bûnê ji xwe derbas dikirin. Nizanîna tişteki biçûk bi şevan xew ji çavên wi direvandin. Nizanîna an nikanîna tişteki ew bêhemd diensand. Bi çav wi kirin û hin bûna hertîstî mikûn bû; lê jê ra westeke hêjayî wê diviya bû. Bi vê ramana han bû ko piştî mezin bûna xwe digot: « divê hêjeya (nabe) di ferhenga fransîzi da hête hilanin». Gava bi vê raman û bawerîya han dixebiti û digehêste daxwazên xwe; xelkê digot: bextê wi î çak e. Tevî ko xelkê ew bi jirî û birewerîyê salix didan, ew bi xwe di vi wari da dibêje:

« Ez tu caran ji xebat û ramanê vala namînim. Heke di bûyina çî tiştî da xelk min pêkhatî û rê li ber dibîne, ji wê ye ko berî destpêkirîna kîjan kari be, ez qenej difikirim û herçiya jê bê, didim ber çavên xwe. Bila neyê hira kesî ko herçiya ew dikim an dibêjim havilên jirî, an bext in. Bi tenê ew havilên ramanê dîr û dirêj in.. Ez her dem î di nav

xebatê da me; çî li ser nê û xwarinê, çî di diwan û civanan da. Bi şevan ew hişyar dibim da ko xebatekê bikim ».

Disa ji gotinên wi ên şopewer ko gotiye: « Di dibistanê da min demên xwe ên listikê bi xebatê diborandin. Min şevên xwe bi hûkirîna tiştên zêdeyî dersan derbas dikirin. Ji ber ko çavên min bar ne dibûn, di fîrqa min da kes li pêş min hebe ».

Ji xwe ev hezkirîna wi a xebatê bû ko berî demê ew gilhande serê bilindchihên mezinatiyê. Yek jê, gava li dibistana Briyenê ji bo herbiya Parisê hate bijartin, ji her biçûkiya emirê wi, hin mamostan xwast Napolyon bi şûn da bihêlin. Lê hingê şevaliye Du Kralyo bi vê ramanê qatl ne bû û got:

« Çiqas ev şagirtê han du sê salan ji emirê qanûnî biçûktir e jî, jirî û jêhati bûna

QEDIRÊ KITÊBAN Û XWENDINÊ



Bi her hêncetê em gata xwendin û nivisandinê dikin. Ji ber ko em dibînin pêşveçûna dîngayê bi tenê bi xwendin û nivisandinê ye. Di welatên rojhelatê nîzing de ji me kurdan pêve tu miletê bindest nîne. Çîve? Ji ber ko em di xwendin û nivisandinê de ji hemîyan kêmlir in. Fedkirin wê klîşeyê. Ingilîz ji eskerên ko di enîyan de şer dikin kitêban rêdikin.

wi lişt ko ez wi têxim nav bijartîyan. Ez ne malbata wi dinasim û ne ji vê yekê ji bo dilxweşiya kesî dikim. Lê, agirê ko di canê wi da dibînim tişteki ecêb e; bi tenê divê yek hebe ko wi agirî vêxe ».

Bi vi awayî kîjan destê ko Napolyon di ber ra derbas bû, jê ra jimareke baş danî; pir û hindik hêviyek pê girêda.

Di sala 1787 an da Napolyon bi ritba milazîm sanî û karê topavêjîyê ji dibistana herbiya ya Parisê bi derket ko hingê î hejde sall bû. Niha divê em bidîne ser şopa vi zabitê biçûk, ê ko di demekî hindik da hefsarê hemî Ewropayê êxiste destê xwe û di hindav da hejand. Hejandineke welê ko pê tac û text, rê û rêzan ser û bin kirin!.. Em binêrin ka ew şop dê me bigehîne kîjan derê.

OSMAN SEBRÎ

REŞBELEK

— 4 —

JI ETA CEMŞID RE

Şevêdi Sinemxan Ronahiya 17an bi destî ve hate nik min û gote min:

— Bavo ev Ronahî gelek spehî ye.

— Ma çîre ev gelek spehî ye; ma ên din kirêt in?

— No bava ên din ne kirêt in; lê di vê Ronahiyê de reşbeleka min, reşbeleka Eta Cemşid heye; ji lewre ev gelek spehî ye. Min ji te divê di her hejmara Ronahiyê de ji bona min reşbeletekê binivîsinî.

— Çênabe keça min, xwendevan jê aciz dibin

— Xwendevan kî ne?

— Xwendevan ew Kurdmanc in ko Ronahiyê dixwînin

— Hesen axa ne kurdmanc e?

— Belê kurdmanc e, û xwendevanê me ye.

— Naye bîra te, vê paşiyê gava hatî bû Şamê ji te re digot, reşbeleka zarokan ya ko, çêl li zozanan dikir, gelek spehî ye. Ji gotina Hesen axa dixuye ko xwendevan jê aetiz nabin, ji bervajî ve pê kêfxweş dibin.

— Ez çî reşbelekê ji te re di Ronahiyê de belav bikin?

— Carekê te tiştek nivîsand û ji min re xwend, navê wî « Kitêba Sinemxanê » ye, wê reşbelekê ji min re bide çap kirin.

Min got, haş e, û Sinemxan ji min geriya.

Gotina Sinemxanê rast e. Ji gramêra ko di Hawarê de belav dikim pêve min gramêreke kiçik, ji bo zarokan nivîsandiyê û navê « Kitêba Sinemxanê » lê kiriyê.

Ji bo kêfxweşiya Sinemxanê ez dibaçû wê kitêbê di van stûnan de belav dikim. Me hevî ji Xwedê heye ko rojek dê bê emê wê kitêbê bi xwe dê bikarin çap bikin.

KITÊBA SINEMXANÊ

- « Ji sêdeqeyên heja yek ji ew e ko »
- « mirov hîni tiştekî qenc bike û »
- « mirovêkî di hîni wî tiştî bike. »
- « Hedîsa Cenabê pêxember »

JI XWENDEVANAN RE:

Gava hon çavên xwe li sernama wê kitêbê bigerînin heye ko bibêjin, ev kitêb ji bo zarokan e. Ji xwe welê ye. Bi tenê tiştek heye, gelo zarok kî ne? Heye ko em tev de hêj zarok in. Di babêta xwendinê de mêr û zaro bûn ne bi salan e. Di nav me de gelek mirovên sere hene ko di rîya xwendin û nivîsandinê de zaro têne hesabandin.

Li wextê berê, me mêr û zarobûn bi hilgirtina tîfîngê ji hev vediqetand.

Ji bo karekî, gava qala yekî dikirin û heke ew bi kêrî wî kari ne dihat û di nav êla xwe de zaro dihate hesabandin, digotin: « Hêj tîfîng hilnegirtî ». Disan gava yekî qala tiştekî horî dikir û tarix ne dihat bîra wî digot: « Hîngê

min hêj nû tîfîng hilgirtî bû » an « Hêj tîfîng ne da bûn destên min ».

Bi vi awayî mêr ji zarokan vetiqetandin, yanî heçî ko dest bi hilgirtina tîfîngê dikir, ji zarotiyê xelas dibû; dibû mêr û diket civata mêran û di odê de, di nav mêran de rûdinişt û carina ji lêkili axaftinê dibû.

Lê iro, di dinya me de, di dinya ko jê re medenî dibêjin, ne welê ye. Mêr û zarobûn bi xwendin û nivîsandinê ji hev têne veqetandin. Mêrê ko ne xwendiyê, emrê wî bigele şêstiyî ji ew zaro ye.

Berê, gava ji yekî re digotin « hêj cahil e » nexsed ne ew bû ko ne xwendiyê. [Lê bi vê gotinê dixwestin bibêjin hêj zaro ye.

Lê cahilê iro dikare hefa dawîya emrê xwe ji cahil bîmine. Ji her ko iro dermanê cehaletê ne emrê mirov, lê xwendin û nivîsandina wî ye. Yanî iro li şûna hilgirtina tîfîngê qala hilgirtina qelemê dikin.

Ji vi awirî ve heke iro em tev de ne zaro bin jî, bi piranî divê em zaro bêne hesabandin. Ji lewre ev kitêb nemaze ji zarokan re, lê bi fevayî jî hemî kurdan re ye. Divê êdî kurd ji bir bibin ko welat ne bi kêf û siyasetê filan û behvan dewletê, lê bi xwendin û zanistiyê xelas dibê.

Bi vê hêncetê ezê disan bibêjim ko wezîfa miletperwerên me a pêşî hînbûn û hînkirin e. Di vê rîyê de herkes bi awakî dikare arîkariya vi miletê bextreş û bedbext bike.

Berî çend salan hikûmeta Bexdayê qeymeqamekî kurdmanc rêkirtî bû Zaxoyê. Qeymeqam gava gîba Zaxoyê dit ko zaroyên kurdmancan naçin dibîstanê. Qeymeqam şîret li havê zarokan kirin. Lê tu havil ji wan şîretan çênebû. Qeymeqamê jir û miletperwer ji daira nîfûsê û ji dibîstanê du liste dane çêkirin. Gava yekî zaxoyî ji bo îşekî diçû balê, qeymeqam li listan dînihêrt û heke zaroyên xwediyê îş ne li dibîstanê bûn, îş wî çenedikir, ew dibir û tanî hetanî ko mêrik zaroyên xwe dixistin dibîstanê.

Bi vi awayî û bi rêva zaxoyîyan zarokên xwe hinartin dibîstanê. Ev awayek e. Heke mirov dit kir û da eqêl xwe jê re awa zehf in.

Em vegerin ser Kitêba Sinemxanê. Ev kitêb bi awakî sade û sivik qala gramêrê dike. Digel vê sadegiyê, xwendevanên me tê de hin bêjeyan bibînin ko ew bi wan ne nas in. Çîre? Ma xwendevanên me bi kurdmanci nizanin? Bivê

nevê ew bi kurdmanci dizanin, û rind pê dizanin. Lê wan heta niho gramêra kurdmanci ne xwendiyê. Ji xwe heta niho gramêra Kurdmanci nîn bû ko ew bikarin wê bixwinin û hîni bejeyên wê bibin.

Di warê zanistiyê de her tişt holê ye. Mesela Radyo. Beriya ko em Radyowê bihinin û bi karê wê bihesin, ma me dizani bû Radyo çi ye û ji çi tiştî re Radyo dibêjin? No..


Bejeyên Gramêrê ji welê ne. Divêt em bixebitin, xwe biwestinin û hîni wan bibin.

Heke min got, fro ti şûna hilgirtina lîfîngê qala hilgirtina qelemê dikin; ez bêvi ji xwendevanên xwe dikim gotinên min xelet seh nekî. Jê mexted ne terikandina lîfîngê ye. Tîfîng hinde qelemê, qelem ji hinde lîfîngê ji me re divêtin. Ji xwe me du dest hene. Heke me bi destekî lîfîng hilgirt, em dikarin bi destê din qelemê hilgirin. Ji xwe destê bi tenê deng jê nayê.

Herçî ez, wek diyariyê, çapliyê di ser qelmeke zêrheli re digirim.

D Î B A Ç E

Sinemxan hero êvarê gava ji dibistanê vedigere, têtê mal, diçe destên bavê xwe û tiştê ko wê rojê di dibistanê de elimiyê ji bavê xwe re dibêje.



BALAFIREKE BRITANÎ XWE KARÎ ÊRÎŞÊ DIKE

Rojekê Sinemxan ji adetê der şa û kêfxweş vegeriya mal. Destên xwe li hev xistin û ji bavê xwe re got:

— Bavo tu zani, iro ez ji herê zana û xwendatir in. Mamoste derseke nû daye me. Di vê dersê de tiştin hene ko me ew heta niho ne dizanin.

Belê bavo hetanî iro me dixwend û me dinivisand bêî ko em bizanin çîre bi vi awayî dixwinin û dinivisnin. Carina di xwendin û nivisandinê de me xelet dikirin. Ez dibêjim xelet, ji ber ko mamoste welê digot; an ne hingê min ne dizanî kîjan rast, kîjan xelet e. Bi vi awayî û carina bêî ko ez pê bizanim min rast dixwend û rast dinivisand.

Belê mamoste digot ev xelet e, û ew rast dîkir. Qewî li me dîkir û digot: « Careke din holê menivisnin, herwekî ez şanî we didim welê binivisnin ». Xeletên me ên rastkiri deh panzdeh caran ji me re dida nivisandin û heke me disan di wan gotinan de xelet bikirana hingê em ceza dîkirin. Lê tucaran ji me re ne digot çîre ev rast e, û a din xelet e.

Lê iro ev tişt ji me re gotin û em pê gelek kêfxweş bûn. Êdî em dizanin ji rastxwendin û ji rastnivisandinê re isûl û qeydeyin hene û ew gelek spehî ne, lê herekes bi wan nizane. Mesela gava em « av » dibêjin devê me bi temamî vedihe û gava em « ev » dibêjin devê xwe bi nivî vedikin. Disan em « ava sar » û « nanê germ » dibêjin. Ji ber ko av mî û nan nêr e. Ev ne tu tişt in. Tiştine welê hene ko bi tenê mirovên xwenda û yên ko gramêra zimanê xwe xwendine pê dizanin.

Ji xwe mamoste digot, gramêr qeydeyên rastaxaftin û rastnivisandina zmên şanî me dide.

Em bi wan qeydan ve diçin û bi vi awayî rast dixwinin û rast dinivisnin.

Bavê wê jê pirsî û got:

— Ka bêje min ev tiştên nû çi ne; da ez ji hîni wan bibim.

Sinemxan çû çenteyê xwe anî, jê kitêbeke nû derêxist, dani ser masa bavê xwe û bi kêfxweşî lê de xwend.

Bavê wê lê guhdar dibû.

Zarona hou jî guhdariya wê bikin û hîni giramêra zimanê xwe bibin. **BAVÊ CEMŞÎD**

ÊZDÎ

Û OLA WAN

— Ji Mîrza Tawûspîrîz re —

Tevî ko der heqê êzdiyan da heya niha çend kitêbok hatine nivisandin jî, a rast kesî xwe negihandiye rastiye; jî ber ko rastî jî ber sebebêkê wenda bûye. Ew sebeb jî heya îro hez nekirina êzdiyan a jî xwandin û nivisandinê ra ye. Gava ez bi têxistiyên van kitêbokan qalliya xwe nînim, ne ew e ko zanîna xwe a di vî warî da bi navê rastiye berpeyî xwandinan dikim!...

Na, ev yek ne hatiye bîra min û nayê jî. Bi tenê di vî warî da a ko tê bîra min ev e ko êzdî kurdine xwerû ne û ola wan a fro, jî averûya gelek olan bi hevketiye û hatiye pê.


Ji ber vê ye ko dema em bawerî û rê û rêzanên ola êzdiyan didine ber çavên xwe, bi riheftî tê da şopên olên Zerdeşt, Mûsa, Îsa û Mihemed tev dibînin.

Ev ola ko ji oline tével jî xwe re bawerî û peyayên mezin girtine, hêjayî pirsineke durr û kurrê ko ev yekê han, jî yekî wekî min û xwediyan wan kitêbokan ra pêkhatin gelekî dijwar e.

Heke dirok nivîsên eraban di navbera babilîskên 7 û 15 an da bi tiştên holê mijûl bûbûna; mikûn bû ko fro tiştêk jî ola êzdiyan zanîn ne dijwar bûna. Lê mixabin ko di dema me gotî da dirok nivîsan bi tenê bala xwe da bûn pesna melîkên dor an ser xwe û bes!.. Ji ber vê ye ko fro bi hûr bûna ola êzdiyan a nehattî nivîsîn, rastî jî hev bi derxistin bi qasî vejandina miriyan dijwar bûye.

Heya niha li ser vê yekê han ez bi gelek êzdî û nemazê bi sê şexên wan ra mijûl bûm e Heywax ko di warê baweriyê da gotinên duduyan hev û din ne girtin e. Her wekî di ayên nivêjan ên ko şex Heyder jî me ra gotine, gava min jî şex Xidir ra xwandin, her wekî ez jê ra tiştêkî biyanî bixwînim; qîma xwe pê ne dianî. Dema min ên jî devê şex Xidir bihîstî jî şex Xelef ra xwandin, bi carê kenê xwe pê kir. Tew Îsmail beg rehmetî bi awakî din gotî bûne min.

Dema mirov taveliya gotinên van her çar mezinên êzdiyan dide ber hev, jê ev rastî tê gihare: « ol û bawerîya êzdiyan jî dest nehatina



BALAFIRGEHEKE BRÎTANÎ DI GIRAVA SICÎLYÊ DE

nivîsanê ewçend gewherê xwe ê bingehîn wenda kiriye ko bi ger û hûr bûneke serpillkî binafî û rastiya wê bi dest xwe xistin, di jwariyeke di hikmê ne bûnê da ye »

Ji ber vê yekê, bi belav kirina herçiya ko min di heqê êzdiyan û ola wan da jî devê şex Xidir nivîsî, mikûn e ko bikarî bîm fikrekê bidime xwandinê xwe.

Di serê havîna 1940î da ez çû bûm Hlesîçê. Ilingê şex Xidir û şex Xelef jî li ber hikûmeta Iraqê revî bûn û hati bûn wir. Di nav şanzde rojên ko min li Hlesîçê derbas kirî da pirtirî diwazde caran û şex Xidir ra û sê-çar caran jî bi şex Xelef ra rûniştî hûm. Di van rûniştinên ko bi danan dajotin da, hê pirsîn û nivîsandina der heqê êzdiyan û ola wan da me kar û xebatek nîn bû. Tevî vê xwe westandina han, tiştê ko me hêjayî nivîsandinê ditiye jî xebata saetekê pê va tiştik nîne. Ew jî ramana ko me li jor dayî zanîn dide mirov û bes. Di pîrên van civinên caran û şex Xidir da şairê me ê delal Cegerxwîn jî dilate dîtin. Rojekê piştî belav bûna civinê di rê da min jî Cegerxwîn ev pîrs kir:

— Seyda! ev bûn şeş heft civîn ko tu jî bi me ra rûdim. Ma gelo jî ola êzdiyan çî dikeve serê te?

Seyda bi nêrineke manidar û rûkî bi ken li min vegevand û got:

— Ne tiştêk. Berî ko ez van şexan bibînim, min dizanî ko ola êzdiyan jî wek olên mayî li ser bingehêkî hatiye danîn. Lê niha min zanî ko jî torta oline tével pê va ne tiştêk e.

Heke tu f serwext f, teqez te bfr biriye ko gotinên van şexan ên duh û fro nabine yekl.

Min bersiva gotinên seyda bi kenekî sivik da û dawiya gotinê birî. Erê gotina seyda rast bû. Ev gotin li ser ola ko salixdana wê me ji devê her du şexan û hempayên wan dibihistin bû. Lê ola êzdiyan a bingehî, bê şik ne di halê fro ê bê ser û ber da bû.

Ji bingehên ola êzdiyan herçiya nivîsan diviya bû, bê sê tiştan, min hemî nivîstn ko ew her sê tişt ev in: 1 — Diayên penc wext nivêj. 2 — Dia mehr birinê. 3 — Telqina ko li ser gora miriyan dixwinin. Sebebê ne nivîsandina van her sê tiştan ev bû ko di vî warî da gotina du şexan ne bûye yek. Li goreyî ko min zaniye; di pêşiyê da her wekî me li jor gofî; ji ber ne nivîsanê, diayên bingehî wenda bûne an hêline wan jê hatine guhartin. Bê şik dema kuran ji devê bavên hin kiriye kêm û zêde gelekî tê da çêbûye.

IXTIYARÊ MERGEHÊ

Di ola êzdiyan da İxtiyarê Mergehê wek xelîfê misilmanan û papasê filehan e. Ev camêr di rex newala Laşê da li gundê Êsiyayê rûdine û rezanên ola êzdiyan digerine. Di dema qewimîna şolên mezin da İxtiyarê Mergehê xwediyê gotina dawiyê ye û herçiya ew bêje dê welê be. Her êzdiyê ko derf ola xwe tişteki bike, İxtiyarê Mergehê wî heram dike. Gava gunehkar here ber destê wî tobe bike, dikare piştî hin dêlîndêz û merasim wî kesî helal bike.

Êzdiyek bi kirina sê tiştan heram dibe:

A — Hek ji malbatên İxtiyar, mîr, şexan û pîran bi yekê ra zîneyê bike.

B — Bi blyaniyan ra zîneyê bike.

C — Bi dilê xwe oleke din bihewîne.

Kesê ko ji van her sê gunehên mezin yekî bike bi fermana İxtiyar û belavkirina pîran heram dibe. Kîjan gunehkarê ko ev cezayê han jê ra bête dayin kesê êzdi jê direve. Reveke welê ko ne dikarin pê ra bîdin û bistînin, ne herin mala wî û ne jî wî bibêlin mala xwe. Çi kesê ko mirovê herambûyî

bihewîne ew jî heram dibe.

Na heke gunehkar ne xwediyê wê kirê bû û begunehiya wî xweya bike, dê hînga here cem İxtiyarê Mergehê û tobe bike. Gava İxtiyar qîma xwe bi begunehiya wî anî û toba wî qebûl kir, hînga destûra şuştina wî jî gunehan tê dayin. Wê gavê yekê, gunehkar dibe û di avên Zîmzim û Kaniya-Sipî da dişo û di piştî ra tê sicada İxtiyar maç dîke û bi vî awayî jî gunehan tê şuştin û paqij dibe.

BIJARTINA İXTIYAR

İxtiyar di nav malbatên şexan da tête bijartin; lê divê xwediyê sir û kerem be.


İxtiyar heya tişteki bê rê neke jî İxtiyarî nayête derxistin. Çi gava beryîtkê bike hemî serekên êzdiyan digehêne hev, wî jî Mergehê bi derdixin û jî malbata şex yekî din dibijêrin. İxtiyar divê nezewice; na gava jin bike rûmeta wî gelekî kêm dibe, lê jî jinêkê pirtir nikare bîne.

Heke di malbatên şexan da yekî jê ra sir û kerem çê be dikare xwe eşkere bike û bibe xelîfê İxtiyar. Çi dema İxtiyar bimîro ew dikare secadê İxtiyariyê bigire dest xwe û kesî tekîlî wî nabe.

MERGEHÊ

Mergehe, di newala Laşê da navê cihêkî ye ko hemî avahiyan êzdiyan ên miqedes jî wirin.

Ev avahiyan han bi navên mirovên mezin hatine çêkirin. Ji bo gotina xwe a jor der heqê ola êzdiyan a fro da, min navê hin avahiyan nivîst. Ji van navan xweya dîke ko êzdiyan



TANGEKE BRITANI DIKEVE GUNDEKÎ TALYANÎ

ola xwe a kevin ji bîr kirine û dest avêtine peyayên olên din. Navên hin avahiyan ev in:

« Derê melek Ferxedin, mixara şêx Mend, quba melek şêx Husên, avaniya Sicadin, quba şêx Şems, avaniya Nasredin, avaniya Şerefedin Mehdî, avaniya şêxo Bekir, avaniya mîr Hesen Memî (serekê pîran), avaniya şêx Mihemed Reşa, avaniya Amadin, avaniya Şehsiwar, avaniya Xidir û Îlyas, avaniya şêx Xidirê Şemsan, avaniya şêx Nalê Şemsan, avaniya şêx Hesenê Şemsan, avaniya şêx Hevîndê Şemsan, avaniya şêx Tokilê Şemsan, avaniya Babadinê Şemsan, avaniya Hesnalek (pîr) avaniya Xatûna Fexra, avaniya Îsibiya, avaniya şêx Mişelî (gava ev şêx ji yekî dilxweş neibe wî dişelîne), avaniya şêx Bedir, avaniya Mûsê Sor, avaniya şêx Îbrahîmê Xîtmî, avaniya şêx îndîrîsê xeyat; avaniya Habûb Necar, avaniya pîrê Kur, avaniya Hicala mominan, avaniya pîr xelîfê Sî, avaniya Alî, avaniya pîr Balî, avaniya pîr Bûtari, avaniya şêx Zendin, avaniya şêx Şeva, avaniya Simatîlê Enzeli, avaniya şêx Evdlîqadirê Rehmanî, avaniya Mihemed Xuristanî, avaniya Hec Elî, avaniya Hec Receb, avaniya şêx Romî, avaniya Çêl mîra, avaniya Bîlêlê Ebês, avaniya şêx Heme, avaniya şêx Deqê Mîra(1)... Ji van pê va ji gelek avahî hene ko ji ber pîranî û bê fêde bûnê me ne xwest hemiyan binivîsin.

Ji van avahiyan han pê va di mergeheyê da bi navê Berê-reş ê mieleq, Zimzim, Kaf û kaniya sipî çar ziyaretgeh hene ko bê dîtina van heca mêrê êzdî tekûz nabe(2).

1 — Berê-reş ê mieleq, ev berê han di pencereyêke avahiya ava Zimzimê da bi dar da kirî ye. Her êzdiyê dixwaze heca xwe tekûz bike, divê destê xwe di berê-reş bide ko ev, ji şertên hecê yek e.

2 — Zimzim: navê goleke avê ye ko di şikefta Kafê da bi der têt; bi qasî du dest av jê diherike.

3 — Mixar: ji şikefta ser ava Zimzimê ra tete gotin.

4 — Kaniya-sipî: ev ava han deh gazan di nîvroyê ava Zimzimê da bi dertê. Heciyên êzdiyan xwe di vê da ji dişon ko ev şuştin ji ji şertên heca wan in. Li ber vê avê sê h-wz hene ko yek ji bo mîran, yek ji bo tawan û yê din, ji bo keçan e. Ji van her sê biran kes xwe di hewzê ê din da naşo.

CELSA MÎR

Celsa mîr, di nav hemî avahiyan miqedes da a mezintir û bi rûmetir e. Riya vî cihî di şikefta Zimzimê da dadikeve û bi riyeke binerdin digebê. Ev riya binerdin sêsed gaz dirêj dibe; piştî wê mirov derê sê şikeftên di zik hev da derbas dike û hînga digelê Celsa mîr. Di vê şikefta han da, ji zêr an madenekî wekî wî û bi bilindiya mirovekî textek hatiye çêkirin. Her çar lingên text li çar kursiyan hatine siwar kirin û li dor hêla text, ji bo her çar pêxemberên (3) xudan kitêb çar sindirûk û di pişt wan va ji, ji bo gevretirên ola êzdî bîst sindirûk hatine danîn ko ev bîst sindirûk bi diwarên ên şikeftê va hatine nûsikandin. Her sindirûkek ji van bi perdeke rengîn hatiye por kirin.

Doraliyan text bi heft zincên (şiv) zêrinî hatine girtin. Serê her zincê ji van, bi çargo-yên (gog) zêrinî hatine xemilandin ko her goyek bi qasî partiqalekê e mezin e.

Li ser baweriya êzdiyan, salê sê şevên bi tenê Tawîs melek tevî pêxember û gewreyên olê di Celsa mîr da dicivin û rê û rezanên dinê digerin.

Herçî fermanên Xwedê ne, Tawîs melek di van civnan da dibêje pêxemberan û gewreyan. Dema Tawîs



BALAFIR Û CENKEŞTIYÊN BRÎTANÎ DIRÊJÎ PERAVÊN NORVÊJÊ DIKIN

KEÇ

Şeva qedrê li min rawşen dikir şewq û şemala keç
 Li min xanî dibû gulşen bi wê husa û cemala keç
 Berî d'îyîne çî Bîstên bâm bi d'îyîne dia kirin
 | wek Mem
 Helandim ez firaqa keç vejandim ez wîsala keç
 Dixweşxwanê cihangir bûm li ser textê saxen mîr
 | bûm
 Şeva d'îyîne kirin lalo ji hiş xistim peyala keç
 Me di lê ez neşem bêjim ji pesnê dilberê mûyek
 Dîzanim bes şehî xob û perizad e delala keç
 Ne bûye nabilin carek di semta me'reda rindan
 Bi dîtarê bi nazîlarê bi xwinxwarê hevala keç
 Li her masa sedef rûniştî du mîhwer bûne yek dîsa
 Ji meydanê ketim carek bi tenha ma xeyala keç
 Şikandim leşkerê fîrsat welatê dil gîba dilber
 Cegerxwîn ma di benda dil digel fikir û mîtala keç
 CEGERXWÎN

melek ne hazîr be, her kes li ser sindirûka
 xwe rûdîne. Lê gava tê û li ser textê xwe
 vedîne; ên mayî ji ser sindirûkan peya
 dibin û li ser sicadan rûdinin. Di van hatinên
 xwe da Tawîs melek di şiklê teyrê Tawîs da
 xweya dibe. Ji wê ye ko êzdî rûmeta wî teyrî
 pîr digirin û mîrik bi wî bi nav dikin.

Her sê şevên ko Tawîs melek dadîkeve erdê
 û tê Celsa mîr rûdîne ev in:

1 — Şeva çarşemba pêşin ko dikeve
 serê salê.

2 — Şeva îda serê çileyê havînê.

3 — Şeva îda serê çileyê zivistanê.

Herçî êzdiyên olparêz di van her du îdan
 da jî rojîyê digirin.

LEYLETIL — QEDIR

Di wê şevê da, hemî êzdiyên ko dixwazin
 ji xêra wê şevê destkewtî bibin tevî zar û zêçên
 xwe di dorhêlên avahiyên miqedes da dicivin
 û heya sibê di bin ezmen da îbadetê dikin. Li
 ser baweriya êzdiyan, di dûşa newala Laleş da
 li ezmen kaniyek heye û di ber wê kaniyê da jî
 dareke mezin heye ko tilahyên wê berjêr û
 rehên wê berjorin. Di wê şevê da Tawîs melek di
 şiklê teyrêki da tê ser wê kaniyê û perên xwe
 di avê dadîke û bi ser wan kesên ko îbadet
 dikine da radiweşîne. Çi êzdiyê ko ji wê ava
 han çilkek wekî xwenavê were ser, edî ew rûyê
 dûjehê nabûne. Sîbelira wê şevê jî dibe cejna
 ko jê ra (îda şêx Şemis) dibêjin.

OSMAN SEBRÎ

(dûmahîk heye)

(1) Di nav avahiyên han da gelek bi navên peya-
 yên ola Mihemed an kesên ko li nik xelkê wê
 olê xweyî rûmet in hatine çêkirin. Xidir, Îlyas,
 Evdîlqadirê rehmanî (geylanî), Bîlêlê ebeş (Bîlêlê
 Hebeş), Habûbê neçar, Indirîsê xeyat, Çêl mîran
 (ereb in) ji van kesan in. Ev peyayên ko di efsa-
 neyên ola Mihemed da cihêkî çak girtine; êzdiyan
 ew jî xwe ra kirine mal û di Mergêhê da ji wan
 ra yek avanî çêkirine. Ji wê xweya ye ko ola
 êzdiyan jî her nexwandinê çîqas gewherê xwe
 wenda kiriye û keliye bin darê ola Mihemed.

(2) Berê-Reş û Zemzem dîsa du fiştên ko di heca
 îslaman da şertê hecê ne. Êzdiyan [ev jî ji xwe ra
 çêkirine.

(3) Her çar pêxemberên xudan kitêb Mûsa, Dawid,
 Îsa û Mihemed in. Ola êzdiyan ya ko ji ola zerdest
 dakeliye û îro jî xwe oleke serxwe dizane; nîzanim
 çawan di ola xwe îda cih daye van her çar pê-
 xemberên xweyî olê!.



Jî BERGEHÊN ŞERÊ TALYAYÊ: Piyadeyên inglîzî di pey tangan re qesta pêş dikin.

KIRASË BEXTIYARIYË

« Di vë dinyayê, de tukes bêxem nabit. »
 « Heke yekî bêxem peyda bû ew ne benî-adem e »
 « Sadiyê Şirazi. »

Dibêjin, carekê padişahê hebû û hikim li nivê dinyayê dikir. Ji Hindê û Çînê heta bi çiyayê Dafê. Padişah bi jameke giran ket. Di welêt de tu bijîşk ne man ko ne hatine ser. Lê ji derdê padişah re tu derman ne hate dftin.

Saxlûx dan û gotin ko di perê dinyayê de pisporekî mezin heye. Bikare, ew dikare padişah derman bike. Berdevk çûn û ew hekm anin. Hekim padişah seh kir û got: Padişahê cihanê, nexweşiya te ne tu tişt e. Dermanê wê jî hêsanî ye. Divêt tu kirasê mirovekî bextiyar li xwe biki. Ko te ew li xwe kir, tiwê di cih da sax bibi.

Şahi bi welêt ket. Digotin hekimê ferzane li ser nexweşiya padişah vebûye. Hekim jî da rê û çû welatê xwe. Edî diviya bû kirasê mirovekî bextiyar peyda bikin.

Şewrek danin. Ma ji wezîrê padişah bextiyartir heye. Qesta wezîr kirin û kirasê wî jê xwestin.

Wezîr li wan ecêhmayî ma û got: Bi min be hon şaş in. Bextiyarî li kû, ez li kû. Ma hon nizanin ko şûrekî di ser serê min re hilawistî ye û ew bi benekî zirav ve girêdayî ye. Ben hergav dikare 'biqete û sûr di canê min re bibe. Ma jî min bextrestir heye. Ji ber temakarî û eşqa mezinahiyê min ev paye ne bi çar, lê bi çardeh destan girtiye. Û jî tîrsa ko padişah min ezil bike bi şev jî xew nakeve çavên min. Ji milê din ez didime eqilê xwe, heke rojekê padişah jî min enîrî û heke ez ne kuştim ezê çî îş û çî cah jî xwe re peyda bikim. Ev e halê min. An ne bi minetdarîke mezin ez bi vê xizmeta melîkê xwe radibûm.

Jê gerîyan û çûn ba qazî; mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Qazî jî li wan ecêhmayî ma û got:

— Kê saxlûxa min daye we. Halê ko ez lê de me, Xwedê tu kesî nekit wî halî. Şevê pêde ez didim eqilê xwe û texmînan dikim. Gelo ezê daw û doza xelkê çawan safî bikim. Wijdana min bi vê endîşeyê hergav bêaram e. Ma bextiyarî û balrahetî ev e.

Ji wî jî gerîyan û çûn cem təcîrekî mezin û dewlemend; kirasê wî jê xwestin. Təcîrê dewlemend gote wan:

— Xwezî û sed xwezî ez ew mirov biwam yê ko hon lê digerin. Belê min gelekmal heye. Ez hero dixebitim, xwe dikujim ko wî zêde bikim. Ji aliye din hero jî tîrsa xesarê texmînan dikim. Bi şev karwanên min yên ko li çolê ne, vaporên min yên ko di behîrê de ne tene bira min, û xew li min diçe. Gelo dizan li karwên an qursanan^[1] li vaporeke min xistiye? Halê min û mal û dewlemendiya min bi vî terzî ye.

Jê jî gerîyan û çûn cem memûrekî hikûmetê; qiseta xwe jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Memûrê reben got:

— Sed hemd û spas ji Yezdan û ji padişahê cihanê re. Ez di saya wî de digel kuffetê xwe sitirî me. Min mîaşekî hindik heye. zarowên min zehf in. Ez deyindar bûme. Şev û roj xema wan dixwim. Heke ez jî wezîfa xwe hatime rakirin, an jî nişkekê ve mirim ewê çî bibin. Di kûçê û kolanan de sefil û sergirdan bimînin.

Berdevkên padişahê jê jî gerîyan û dan eqilê xwe; ma kî heye? Ji gundiyan pêve kes ne ma bû. Çûn nik gundîkî; mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Gundî li wan vege-rand û got:

— Ma we kengê gundîkî bextiyar dîtiye ko ez jî bextiyar bibim. Ez li kû, bextiyarî li kû? Ji qemçûr û wergûyê piştê me duta bûye. Çavên me li ezmanan e. Gelo baran lê an naye. Sala ko baran hat, te dît kulliyên liştek ne hişt. Heke salek xerab hat te dît me deyin kir. Heta deh salan em nikarin jê xelas bibin. Ma ez hêj çî bêjim....

Berdevkên padişahê jê jî gerîyan û bi dinyayê ketin; li mirovekî bextiyar gerîyan. Lê di tu deran de ew ne dftin. Dawiyê vege-rîyan çesira melîk.

Rojekê di diwanxanê de rûniştî bûn. Ji kûçê dengê seh kirin. Yekî bi şahî û kêfxweşî distrand. Daketin kûçê. Mêrik derwêşek bû; rût û tazi, ebakî pîspankîrî lê... Nizîngî lê kirin, mesele jê re gotin û kirasê wî jê xwestin. Derwêş kenî û li wan vege-rand:

— Belê ez mirovekî bextiyar in. Ji ber ko min kiras nîne. Heke min kirasê hebîwa, ma ez kengê bextiyar dibûm?

EV DILEZÎZ METWAR

[1] Qursan, dizên ko di behîrê de digerin û vaporan tazi dikin.



KEÇIKA KIBRÏTFIROŞ

Çiqas sar bû... şevine hişkesaliyê... Pêrf dadiket, pê re jî tariya şevê. Şeva salê a paşin bû. Sibetirê sersal...

Di vê şeva sar de keçikeke piçûk di nav kuçe û kolanan de digeriya... pêxwas û serkot. Gava terka mala xwe da, şeşalin bi pê bûn; lê bi kêrî wê ne hatin. Ew pêlavine diya wê bûn. Pêlavine kevin û lê fireh. Gava keçikê, bi lez, ji ber erebekê xwe dida alî ew winda kiri bûn. Keçik li wan geriya, lê ew peyda ne kirin. Sêwlekekî fereke wan peyda kir û ew ji erdê hilanî. Lê temaşa kir, kenî û got: Gava ji min re zaro çêbûn ezê ji wan re bi vê şe-qalê landikekê çêkim.

Keçika kibritfiroş bi peyên xwe ên werinî û morbûyî, di nav berfê de diçû; li rizqê xwe digeriya. Di berwanga wê de pakêtine kibritan hebûn û eblîkek bi destî ve bû. Lê bû bû şev û hej tiştekan ne firoti bû. Birçî bû, diranên wê dirikrikîn, ji xurtiya sermayê rûyê wê diqermiçî.

Kuliyên berfê diketin ser keziyên wê ên şeh û di pora wê a gungilî û hûrgurpik re diçûn. Lê tê de ne diheliyan; û li ser diqer-risîn. Heçko xwîna keçikê jî cemidî bû.

Ji pencereyên xaniyan ronîke şîne li kû-çan diherikî û bihîna qazên braşî, şîva şeva sersalê li hewayê belav dibû. Belê şeva sersalê bû.

Keçikê dida eqilê xwe, nizanî bû çî bikira. Vegere mal. Ne wêrî bû. Hej tiştekan ne firoti bû. Çawan destvala wê vegeriya mal. Ma ji bavê xwe re wê çî bigota. Dizanî bo ko bavê wê dê jê bipirsiya, te çiqas firotin. Gava jê re bigota, min tiştekan ne firoti, kalo dê li wê bidaya.

Bi van raman û texmînan keçik ket navbera du xaniyan û xwe bi talda xanikî bilind girt. Heçko ew der talde bû û xurtiya sermê lê dişkiya. Ma xaniyê wan ji derve jî talda wî xaniyê mezin û depdepe germtir bû?

Ma xaniyê wan çî bû. Koxikek, ji her derê qulêr. Qulên koxikê bi ka û kincikan girti bûn. Lê bayê kanûnan tê re dihat û carîna ew ji qulan derdixistin, tavêtin erdê û baranê jî bi xwe re dixistê hundirê koxikê.

Keçikê li destên xwe ên bêgoştî û terikî dinihêrt. Hestiyokên destên wê di çermê wê re xuya dikirin. Qey çerm jî ser de keti bû.

Tiştekan hate bira keçikê. Kibrîtekan vexist a di rivîniya wê de xwe germ bikira çî dibû? Ne wêrî bû... Lê piştî mîdekî bêfî ko bide eqilê xwe kibritêkan ji qûfîkê kişand û ew li

tenîşt a elbikê şîdand... xirç... Çî ronahiye geş... çî germîke şêrin. Destên xwe ên qerisî li pêta kibritê gerand. Di germiya wê kibritê de canê wê ê mirî qey vejiya.



tenîşt a elbikê şîdand... xirç... Çî ronahiye geş... çî germîke şêrin. Destên xwe ên qerisî li pêta kibritê gerand. Di germiya wê kibritê de canê wê ê mirî qey vejiya.

Sehwirin diditin. Digot qey li ber sobeke çînî û li ser doşekan rûniştiye. Çiqas lê germ bû bû. Kir ko lingên xwe jî bêxe ber wê sobê; wan jî germ bike. Lê sobe ji nişkekê ve winda bû. Kibrît vemirî bû. Li destên xwe nihêrt. Tiştekan di nav tiliyên wê de reş dikir... bizotê kibritê.

Keçikê kibritekan din vexist. Diwarê xaniyê mezin di ber ronahiya wê de qey bû bû pîpoqek. Bînahiya mirov tê re diçû; digihaştê heta

Li Ewropayê ne bi tenê hacelên cengê mîkanîkî ne. Mîkanîk jî mîj ve gîhaştiye cotkariyê jî; herwekî klîza me şanî dide.

saloneke biheşmet. Di orta salonê de maseke xwarinê xuya dikir. Li ser masê, di nav lengerîke isfehanî de qazekî braştî hebû; kêr li piştê wê daçikandî bûn. Niho wê hihatana, bi kêrê ew perçe bikirina û li mêvanan lêk vekirana. Lê welê ne bû. Qaz xwe jî masê zer kir, daketê erdê û berê xwe da keçikê....

Kibrît vemirî. Di pêşiya keçikê de jî diwarekî stûr pêve tu tiştê ne ma bû.

Keçikê kibrîteke din vexist. Nihêrtinên keçikê dîsan di diwêr re çûn. Ma ne şeva sersalê bû, Qirdikek çekiri bûn û li dorê diyariyên danî bûn. Bi sedan fînd veketi bûn. Çi temaşeke cazibebar. Keçikê kir, komdestên xwe dirêji wan bike..... Kibrît vemirî, diwarê stûr ket ber çavên Keçikê. Bi tenê fînd bi hewa dikeitin û qesta ezmên dikirin. Gava digihaştin-ê dibûn stêrk.


Yek jî wan stêrkan ket û wek stêrkeke pekok li sînga ezmên xeteke ser kişand û wînda bû. Keçikê got: yek dimire.

Belê dapîra wê jê re digot, « Gava stêrkek dikeve, canekî ber bi Xwedê dibe ». Ax ew dapîra delal, mirova tekane, ya ko jê re qenc bû. Heyhat stêrka wê jî keti bû.

Keçikê kibrîteke din vexist û ew da ber diwêr. Vê carê çi bibîne?... Dapîra xwe. Keçikê xwe avête himbêza wê, da ber qîran û got: « Dapîra min! dadika min, min zûka bi xwe re bibe. Ez dizanim, heke kibrît vemirî, ez te jî, wek soba çînî, qazê braştî û qirdikê sersalê, te dapîra xwe jî dê diwînda bikim ».

Keçikê pey hev kibrîtên elbikê hemî vexistin; ko dapîra xwe wînda nekit. Dapîra xwe tucaran evçend spelî û dilovan ne dîtî bû.

Di ronahiya pêtên kibrîtê de dapîrê neviya xwe kir himbêza xwe; her du, bi perwaza milyaketan ber bi ezmanê jorin îrin. Ewçend bi hewa ketin ko nema bi serma û birçîliyê dibesiyar. Gibaştî bûn nik Xwedê.



Berê hesp li cem ne getek beha û bihîmet bûn. Xwedî meraq li hespine qenc, û esil digeriyau, ew bixwevulî dikirin û gê ko hespekî wî l esil hebû pê îstixar dikir. Lê piştî ko timobil duketine xelkê gêtir meyla xwe da timobilan û jî hespên esil re ewçend rexbel ne ma. Lê li Ewropayê, ti wê dera ko timobil ji cem me bi getekî zehfîr in, bi derketina timobilan hesp qimeta xwe kêm ne kirine. Li wê derê carina hespek jî qimeta timobileke çak bi getekî behalîr lête firofin. Nemaze ingilîz getek çuh didin hespan. Di Ingilistanê de salê carekê bezeke hespan gêdibe ko jê re « Derbî » dibêjin. Hespên Ko dikevin wê bezê bi hezaran zêr lêne û firofin kirin. Klîşa me hespine « Derbî » şanî dide gêu ko di talimê de.

Sibetirê emeleyên belediyê gava kûçe û kolan reş dikirin di navbera du xaniyan de keçikêk dîtin. Keçik li erdê rûniştî bû; hinarikên wê sor dikirin, kenekî zîvariyê di ser lûvên wê re diqeliqî. Keçik mirî bû; jî sermayê qufîlî... di şeva sersalê de emirê Xwedê kiri bû.

Dema ko tavika roja sersalê dida cendekê wê ê hûr, xelk lê dicivayan û ew seh dikirin.

Di nav tiliyên wê de darikê kibrîteke vemirî reş dikir. Elbikeke vala li rex cendekê keçikê bû. Xelkê digot: « Dixwest xwe bi kibrîtê germ bike, lê..... »

Lê ew tiştên spelî, yên ko keçikê şevêdî dîtî bûn, ne dihatê bîra tukesî. Dîsan kesî ne dizanî, çawan û bi çi awayî, di himbêza dapîra xwe de pê li roja salê a pêşin kiri bû.

Dihok: 8 Îlon 1943

BIŞARÊ SEGMAN

PIRSA İTALYAYE

Li 8ê İlonê ber bi êvarê radyowan dida zanin: « İtalya bê qeyd û şert teslim bûye ».

Xelkê ji hev dipirsi: Gelo çawan bûye? Di İtalyayê de heyqas eskerên elemani hene; gelo eleman wê çi bikin?


Sibeterê radyowan bi ser ve zêde dikir û digot: Mitarekak di navbera sondxwarî û talyanan de hatiye imza kirin, lê ev mitareke-name niho nayête belav kirin.

Ji milê din Eyzenhaver û emtral Kenîngam beyanin belav dikirin û digotin: Ji xelkê İtalyayê re, çi esker çi sivil, divêtin elemanan ji welatê xwe derinin û arîkariya sondxwariyan bikin. Herçî vaporên talyani, yên şer û yên ticaretê, divêt xwe bigehinin benderên sondxwariyan.

Disan radyowan digot, eskerên talyani û elemani di İtalya, Balqan û di giravên behîra Êgê (Dodêkanês) de li hev dixin.

Siwanvaniyên elemani daketine birca ko lê Mûsolîni mehpûs bû û ew revandin, birin cem Hitler.

Jİ AVAHİYÊN KEVNARE



Resimê jorin şani dèreke Ingilistanê dide. Ev dera ha romanîyan ava kiriye. Dèreke gelek bi sinhet û bi qîmet e.

Eskerên talyani di rex eskerên sondxwariyan de şerê elemanan dikin. Ma talyan bûne hevalên sondxwariyan û ketine nav miletên yekbûyi, yanî miletên ko şerê nazîsm û faşîzmê dikin?..

..

Herwekt xwendevanên me dizanin sondxwariyan ji bo vegirtina keleha Ewropayê berf her derê dirêjî İtalyayê kiriye. Ji ber ko ev der birca keleha a qelstir e û di fena cengê de mirov li cihê neyarê xwe ê qels digere.

Li 10ê Tirmehê sondxwarî daketin girava Sicilyayê û bê zehmet pêş ve çûn. Ji ber ko eskerên talyani an direvin, an teslim dibûn. Di nav çend rojan de sondxwariyan nivê giravê vegirt.

Di vê navê de Hitler hate İtalyayê û her du serekên mîlherê bi dari hev ketin. Dibêjin ko Mûsolîni ji Hitler esker xwestin. Lê Hitler digot, li gora plana erkanherbiyê divêt nivroyê İtalyayê bête vala kirin û şerê rastin di xeta Poyê de bête kirin.

Hitler û Mûsolîni li ser vê planê bû bûn yek. Lê gava Mûsolîni ev plan berpeyî meclisa faşîstan kir; lebatên meclîsê bi pirani ev plan qebûl ne kirin.

Li ser vê yekê û li 25ê Tirmehê Mûsolîni rabû û çû cem qral û jê selahiyetine hêj meztir xwestin. Bi Mûsolîni re eskerên wî ên xas hebûn; Esker li heyşa qesirê man û Mûsolîni derket jor û ket hafa qralê İtalyayê û mesele jê re dâr û dirêj got û gava jê selahiyetine mezin xwestin qral lê vegeraud û got:

— Ji selahiyetine mezin re hewce ne maye. Min hikûmet sipartiyê merêşal Badogliyo.

Mûsolîni li qral vegeraud û got: Ez bêt tac û ordiwê jî dikarim miletê talyanan xelas bikim.

Mûsolîni qala ordiwê jî kiri bû. Ji ber ko keti bû navbera wî û serdarên ordiwê jî.

Cava Mûsolîni li cem qral bû, eskerên wî yên ko li heyşê ma bûn girti bûn û jî qesirê

bi dâr xisti bûn. Mûsolînî wextê daket hewşê timobîla xwe jî peyda ne kir. Li şûna wê timobîleke girtî, derî jî par re, timobîleke xestexanê hebû. Dûçê banî şiforê xwe kir. Li şûna şifor kulnêlek ber pê çû û gote Mûsolînî.

— Bide pey min û li wê timobîlê siwar be.

Mûsolînî xwest ko ji ya kulnêl neke û li ber xwe da. Lê eskerên kulnêl lê gihane hev, ew girêdan û kirin timobîlê û ew birin giravekê û li serê du sê rojan cihê wî diguhartin; heta roja ko Hitler ew da revandin.

Li gora ko Mûsolînî di radyowê de gotiye Badogliyo dixwest wî teslimî inglîz û emêrikanîyan bike. Ji lêwre cihê wî diguhart û ew dixist nzingî mintiqeyên ko sondxwarî lê nzingê dibûn.

Wextê ko Mûsolînî destgirêdayî bi rê ve diçû Badogliyo hikûmeta xwe saz û dest bi karê xwe dikir.

Dinya-alemê digot, Îtalye wê silh bibê. Welê jî diviya bû.

Lê Badogliyo derew bi aliyê vê gotinê ve da; beyanamak belav kir û got; Îtalye li ser soza xwe ye û heta dawiyê di rex e. emanan de şerê neyarî wê bike.

Lê rastî piştê hate seh kirin. Cral û Badogliyo bû bûn yek û tevdira Mûsolînî jî kar kiri bûn: Mûsolînî jî serê kar êxistin, bi sondxwariyan re lihevhatin, û bibin hevalê wan û heke rê pê ket şerê elemanan kirin.

Piştî ketina Mûsolînî bi çend rojan du sefirên talyanî di welatine bêteref de xwe gihandî bûn sefirên inglîzî û jî wan re goti bûn ko Îtalye di pêrişaniyê de ye û nimînendekî Badogliyo di van rojan de wê xwe bigehîne nimînendekî Ingilîstanê û jê li ser navê hikûmeta xwe şertên mitarekê wê daxwaz bike.

Bi rastî ber bi l'ê Tebaxê ve generalekî talyanî wê ko ji bo îşekî diçû Portûgalê riya xwe bi Madridê xist û bi darî sefirê Ingilîstanê Sôr Samoel Hûr ket û sibetirê çû Lisbonê û sefirê Ingilîstanê yê wê derê, Sôr Ronald Çampel, jî dit.



Segmanin hilkişiyane ser û bi tîngên xwe dikin bera dijmin bîdîn

Genêralê talyanî — navê wî ne hat eşkere kirin — nimînendeyê Badogliyo î resmî bû. Genêralê talyanî jî sefirên Ingilîstanê re da zanîn ko roja ko eskerên sondxwariyan daketin beja Îtalyayê eskerên talyanî di rex wan de wê şerê elemanan bikin; yanî talyan wê bibin hevalbendê sondxwariyan û neyarê elemanan.

Pi Kurdmançiya reş genêralê talyanî digot, em bûne hevalê elemanan em şikestin. Niho em dixwazin bi we re bibin û bi we re elemanî ko dişkên bişkênînin. Bi wî awayî heye ko di talyanê de para me jî hebe.

Sefirên Ingilîstanê elam da Londrê; I ondrê Weşington serwest kir. Ji milê din xeber gihandî genêral Eyzenhawer û hikûmeta Sovyêlistanê.

Hikûmetên Ingilîstan û Emêrikê bi hev şewirin û bi wasita sefirê Lizbonê jî genêralê talyanî re dane zanîn ko ji bo mitarekê divê Îtalye bê qeyd û şert teslim bibê. Şertên din piştî teslimê dikarin bêne mizakere kirin.

Genêralê talyanî jî ber ko jî xwe ber nikarî bû li sondxwariyan veqerîne rabû berê vwe da Romayê da ko pîrsa xwe bi hikûmeta xwe bixe.

Ji genêralê talyanî re esasek da bûn zanîn: talyan jî bo şikestina elemanan herçend bixebitin, sondxwarî di heqê wan de ewçend

qenc bibin. Mitarkename wê veşarti binaya heta roja ko Eyzenhawer ew eşkere bikira. Dilê sondxwariyan hebû mitarekê piştî ko eskerên wan daketana Napoliyê eşkere bikin.

Genêralê talyanî bi rê keti bû; lê ji ber ko ji ker ve diçû, bi rê ve diewiqî. Herçî qral û Badogîyo di Romê de sebra wan ne dihat. Bi endîşa ko genêralê pêşîn ne gihâştiye armacê, rabûn genêralekî din bi rê xistin. Hikûmeta talyanî ji bona ko sondxwarî jê ewlê bibin rabû bi genêralê diwim regênêralekî îngilîzî jî şand. Genêral bi navê Karlton de Wiyart û li cem talyanan hêsir bû.

Her du genêral, ê talyanî û ê îngilîzî piştî ko genêralê talyanî ê pê in bi rê keti bû gihâştin Lisbonê. Genêralê îngilîzî çû Londrê, ê talyanî jî vejeriya mal ji ber ko pê re tişteki nû nîn bû.

Herçî ordiwa talyanî di Sicilyayê de bi derewan — ji xwe hergav holê kir — çerê xwe dikir.

Di vê navê de genêralekî talyanî hate Sicilyayê û ji sondxwariyan re cihabê hikûmeta xwe ani. Hikûmetî Romayê jî her emîrê sondxwariyan re hazir bû û her şert qebûl dikirin. Bi tenê Badogîyo digot, beriya ko eskerine boş bikevin Îtalyayê nikare mitarekê eşkere bike; ji ber tîrsa elemanan.

Qasidê talyanî vejeriya Romayê û hikûmeta xwe li ser şertên mitarekê serxetî kirin. Piştî 21 saetan Badogîyo bi telegrafê da zanîn ko şert jê ve qebûl in û nîmînandeyek bi rê ketiye da ko mitarekenamê îmza bike.

Li 3ê Îlonê talyan û sondxwariyan di Sicilyê de mitareke îmza kirin; lê kes pê ne hesandin. Dîsan di wê rojê de eskerên sondxwariyan daketî erdê Îtalyayê. Eskerên talyanî hin derewin, hin teslîm dibûn; elemanan li ber xwe dida.



JI BERGEHÊN ŞERÊ ÎTALYAYÊ

Sondxwariyan di nivroyê Îtalyayê de hin erd û bajar xistin destên xwe.

Li 8ê Îlonê piştî nivro di saet çar û nîvan de îlan kirin ko Îtalye çêkên xwe danîne û bi sondxwariyan re mitarekeyek îmza kiriye; lê mitarekename pêşdetir dê bête îlan kirin. Bi tenê digotin ko talyan bê qeyd û şert teslîm hûne.

Ev nûçe di dinyayê de wek bombekê teqîya. Bivê nevē eleman ji tevçera talyanan diketin şikê. Lê talyanan heta dawiyê jî wan re digot, tişteki welê nîne, em hevalên hev in, heta talyan em di rex we de şerê demokratîtan bikin.

Lê welê dixuye ko elemanan ewçend baweriya xwe bi gotinên talyanan ne tanîn û ji bo vegirtina Îtalyayê tevdirin didîtin

Piştî xebera mitarekê bi 12 saetan yanî li 9ê Îlonê, serê sibê di saet siseyan de ordiwa emêrikanî a pîncan dadiket erdê Napoliyê.

Şerêki radyowan dest pê kiri bû. Radyowên hevalbendan digote eskerên talyanî, li elemanan xînbûn û xwe li eskerên me teslîm bikin. Herçî radyowên elemanî, wan jî digot teslîmî

eskerên elemanî bibin. Eskerên talyanî jî ya her diwan jî ne kir, li dora xwe nihêrt, yê ko nîzing bû xwe teslîmî wî kir. Bi vî awayî hin ketin destên inglîznan, hin jî destên elemanan. Di hin deran de jî, talyanan dest bire xwe û şerê elemanan kir. Di Dêkadonêsê de 7000 eleman, 70 000 talyan hebun. Talyan rabûne elemanan; lê gelek ne ajot, çekên xwe danîn û teslîm bûm. Di Yûgoslavya de xelkê eskerên talyanî jî çek kirin û îro bi wan çekan şerê elemanan dikin.

Heta 13ê mehê mitarekename ne hate eşkêre kirin. Lê jî 11ê mehê ve tiştin jê xuya kirin. Stola talyanî bi temamî hat û di benderên Malte û Cebaltariqê de teslîmî hevalbendan bû.

Li 13ê mehê mitarekename hate belav kirin. Li gora vî mitarekenamê Îtalye bê qeyd û gert teslîm dibû. Herçî stol, balafr û çekên din jî hevalbendan re dihatin teslîm kirin. Ji talyanan re diviya bû ko arîkariya hevalbendan bikin da ko rojekê berî rojekê elemanan jî Îtalyayê derînin.

Di vî navê de elemanan eskerine nû tanîn Îtalyayê û dest datanîn ser erdê talyanan. Ji aliyê din Hitler li hevalê xwe Mûsolînî digeriya. Rojekê radyowan da zanîn ko elemanan Mûsolînî revandiyen.

Welê dixuye ko Mûsolînî li serê çiyakî bilind û di qesîrê de girtî bû. Pêşûstên elemanî li nîzingî qesîrê peya bûne û dirêjî mihafîzan kirine. Mihafîzên talyanî zûka jî dest hilanînê ketine û çekên xwe danîn. Di vî navê de Mûsolînî jî penceerê xwe şanî da. Zabitê pêşûstîstan bi îşaretê jê re da zanîn ko divê xwe bide paş; jî ber ko li qesîrê mihafîzine din hebûn û hebû ko di penceran re agir bikin.

Piştî ko Mûsolînî xwe jî penceerê da paş penceerêke din vebû û jê kumandarê mihafîzan xuya kir. Elemanan mitralyoz lê rast kirin. Kumandarê talyanî destên xwe rakir û wek eskerên xwe ew jî teslîm bû. Mûsolînî daket jêr li balafrê siwar bû û çû Elmanyayê.

Elemanan berda Romayê û Rome xiste destên xwe. Qral û Badoglyo jî Romayê revîn, çûn nîvro, erdekî talyanî yê ko di bin hikîmê hevalbendan de ye. Mûsolînî vegehiya Romayê û jî nû ve hikûmetek teşkîl kir.

Badoglyo di radyowan de dipeyive, nav di xelkê xwe dide û dibêje wan ko arîkariya hevalbendan bikin û bera elemanan bidin.

Mûsolînî jî dikare jî nû ve esker bide hev û arîkariya Hitler bike.

MIZGÎNÎ JÎ BO ÇAPA KURDI

*Riyaset bê siyasel genc e
Ema genci bê derban.*

*Siyaset bê riyaset renc e
Ema renci bê derman.*

H. QADIRÊ KOYÎ

Mizgîniya me bo çapa kurdî, bi derketina kovara Niştîmanê. Kovara Niştîmanê kovareke kurdî ye, bi tipên erebî derdikevit, li Lehîcanê (mîntîqa mukriyan—Îran) li bin destê gelek xortên heja.

Ev e hejmara Niştîmanê a êkê bi diyari çû bo Gulavêj, Hawar û Ronahiyê. Da ko dest pê bikin pêk ve bi xebatê bo azaliya kurd û Kurdistanê; li vî wextê ko hemî milletên dinyayê bo serbestiyê dinêrin û demokrati şerî bo diket. Lê nabî em jê bêbehr bin.

DESTGÎR

RONAHÎ — Hejmara Niştîmanê a pêşîn gihaştîye destên me. Ji her tiştî bêtir kêfa me jî vî yekê ra hat ko di erdê Kurdistanê ko di bin hikîmê Îranê de ye jî zîmanê me têtê nivisandin û çap kirin. Bi vî awayî di Iraq, Îran, Sûriyê û Sovyetîstanê de digete çapê. Niho bi tenê welatek dimîne ko kurdên wî jî vî nimetê mehrûm in. Me hêvî jî Xwedê heye ko ew jî zûka bigihin bi nimetê.

Niştîman bi zarê Mukriyê û bi tipên erebî ye. Di vî hejmara Niştîmanê de tiştên jêrin hene:

Amanci ême — Tema' — Pêk kewin ta ser kewin — Mecer Son der heq be kurd çî elê — Serkewtin be zor û kew niye — Beşî edebî — Şairî be naw û bang — Cigare çûn êkêşrê — Kurd û isbetelîman — Kurdistan mali kurd e — Pelamarekeyî ew sali eleman le Rûsya.

Di rîpelê Niştîmanê a paşîn de xwedî dibêje ko ev nivîstî jî ber ko ketiye ber lezê ewçend çênehû, lê hejmara tê wê jê tekûztir bibe. Welê jî divêtin; em jî holê lêvî dikin.

Lê li gora ko jî me re hatiye gotin Niştîmana ko niho bi tipên erebî dertê heta çendekî din ewê bi tipên me ên kurdî derkevit. Ev mizgînî jî me re bi qasî mizgîniya derketina Niştîmanê heja ye. Ji xwe jê re delêletên hene. Di ser serê sername Niştîmanê re tavek, tava ala me heye. Di nav daira lavê de du tipên kurdî tîne dîtin Ev tip bi mana (Jina Kurdistanê) ne û destpêka bi kar xistina tipên me ye.

Xwedê jî Niştîmanê re emirekî dirêj bide û hevalên wî zêde bike.

Herçî hevalbend, piştî ko ordiya emêrkani di Salêrnê de çend rojên xerab dîtin, didin pêş û ber bi bakur ve diçin.

NÊREVAN

PIRSIYARIYA GULAVÊJÊ

ZMANÊ KURDÎ BI ÇI AWAYÎ DIVÊT BÊTÊ NIVISANDIN
BI TÎPÊN SAMÎ AN BI TÎPÊN LATÎNÎ

Gulavêj, kovara kurdî a heja ya ko li Beşdayê bi zarê soranî bi der têt, di hejmarê xwe a 9an, sal-4, meha Îlonê de tiştê jortn ji xwendevanên xwe dipirse û bi nîzgaht ve dibêje:

Ziman mihenga eqliyeta millet e. Ev miheng eqliyeta millet şanî me dide. Pêşketin an paşvemayîna mileteki, bi hêsanî, ji zimanê wî dikare bête zanîn.

Heke me got ko zimanê kurdî tro bi her awayî ji zimanên din ên mezin ne zêde be ji, ji wan ne kêmtr e; em ewle ne ko ji rastiye bi dûr nakivin. Bi tenê heta niho hal û wextî ne hiştiye ko em guh bidin zimanê xwe û ji bo nivisandina wî jê re tipine gerek bibijêrin.

Herçend bê şivîşk be ji ko ji nivisandina zimanê me re tipên latînî ji tipên erebî bi gelekî çêtir in û ew tip lê tèn; hêj di nav xwendevanên me de mirovin hene ko di girtina vê reya taze de dudilîyê dikin. Ji lewre û ji bo rakirina vê dudilîyê em vî tiştî ji

xwendevanên xwe dipirsin.

Em ji xwendevanên xwe hêvî dikin di vê babetê de rayên xwe ji me re bidin zanîn. Ji bo nivisandina zimanê kurdî kijan tipan di ser re digirin; erebî an latînî.

Tiştê ko Gulavêjê gotiye ev e. Bert her tiştî em wê ji ber vê fikira mezin û bingehîn piroz dikin û ji Yezdanê pak hêvî dikin ko di vê reya xelaskariyê de wê payedar bike û vî karê mezin bibe serî.

Me di vê babetê de bêtir binivisanda; lê ji ber ko Gulavêj bi derengî gihaste destên me û Ronahî ji tevay bû bû, me bi van gotinan bes kir. Herçî ray û fikira me di esera me de xuya ye.

Adresa Gulavêjê:

GELAWÊJ

Xan Esterabadi hejmar — 14



Cada Semoel — Beşda Iraq

مجلة گلاوژ الكوردية

خان استرابادی رقم ۱۴ - جادة سمبول بغداد - عراق

Çtroka bêgotin:

EN ROUTE



Kiryariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc lireyên sûrî — Ji bo welatên din lirekî ingilzî

Xwedî û gerinendeyê herpirsiyar : Celadet Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 20

DUŞEMB
1 ÇIRIYA-PAŞIN 1943


RONAHI

ANNEE 2
NUMERO 20

LUNDI
1 NOVEMBRE 1943


SUPPLEMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON: 12-29



LI BEJ Û LI BEHRÊ

Ser herçend dom dîke
şerevanî ji li gora mehetê
çek û aletine nû saz dîkin.
Herçi hevalbend ji bo dake-
tina bejê hero wasîteke nû
bi kar diêxin. Sondxwarî ji
mîlwerê bêtir kewçedari
wan masitan in. Ji ber ko
neyarê wan xwe di bejê, di
keleha Ewropayê de asê
kiriye. Ew di rîya behrê re
lên û dirêji keleşê dîkin.
Ew di vaporan de ne û divêl
dakevin bejê. Jê re flûge
diwêtin. Di şerê Italyayê de
sondxwarîyan flûgene nû
fistînat kirine. Ew timobil in,
dolabên wan hene. Di behrê
de flûge ne, herweki resmên
ne şanî dîtin. Li bejê flûge
disan dibin timobil.



ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943

DI VÊ HEJMARÊ DE

Weyna rovi li rovi	Çirokbêj
Leylê	Cegerxwîn
Dil	Bêkes
Peynana İswîçriyan	Ronahî
Bîrbîrî	Ronahî
Zozan	Osman Sebrî
Jî min ve	Lawikê Tiloyî
Kês gerek wenda nebe	Sibhiyê Diyarbekrî
Çend Gazînd	Osman Sebrî
Jîn û Mêr	Silêmanê Ferho
Napolyon	Osman Sebrî
Terlan	Osman Sebrî
Zaravayê Cizirê	Evdilkerimê M. Sadiq
Xebat	Jandar Mirzengo
Ezdi û Ola wan	Osman Sebrî
Diz û Dûvê kerê	Dilawer Çerçipe
Nimêja mişkan	H. Hîşyar
Fermana Gur	Sibhiyê Diyarbekrî
Canan	Gegerxwîn
Hindik Rîndik	Xebergûhêz
Yên ko xelas bûne	Smainê Serhedî

ÇIROKA KURDMANCI

WEYNA ROVÎ LI ROVÎ

Gundekî xerabe hebû; tê de dikeke û tajik hebûn. Carekê dik çû ser diwerekî ji diwêrê xirbe û bang da. Rovik nêziqî wî hebû, dengê dik kir, hema ji cih telbeyî xirbe kir û li ber diwêr sekini, û gote dik:

— *Mixtar, were min qona x bike. Dik jê re go: Hema li pişt diwêr bifitile gîzîr li wîr e, ewê te qona x bike.*

Kêfa rovi ji hqî, ewê go belki li pişt diwêr nûrişk hene. Tu nabê li pişt diwêr tajî ji xwe re razayê. Wextê ko rovi giha cem têji halo mejiyand. Gava melekmo tê wî li wîr pal daye. Çaxê uajî çav li rovi ket, hema dirêji wî kir û rovi baz da û tajî kele ser piştê wî. Ha li wîr ha li wîr, rovi kele qulekê, mejiyand gava rovi dikî din di qulê de ye. Yê ko di qulê de bû gote ê din: ha bira çî bela te ye ev bihnefsîk li te ketiye. Ê di go: Mepîrs çî li min qewimî, desbrakê min heye, rabû kurê xwe şande pey min, ez ezîmanîm. Kurê wî ji xort e û bîr e, li min henek kirin, ez ji ji aciz-bûna xwe hatim û ketim vê qulê, da ko ez bihnekê rihetîga xwe bistînim û ez ji wî kurê bitir xelas bibim.

Roviyê qulê go: Ma tu destûra min nadi ko ez ji dêla te ve herim, tu li wîr bihna xwe bidî.

— *Ma çî ferq heye hema tu here*

LEYLÊ

Di baxan dilber in sorgul weki bilbil dikim meylê
Sehergahan dinalim ez eman Leylê eman Leylê
Tu Leylî, ez weki Mecnûn sitembexşî li min gerdûn
Xemên dil Dicle û Ceyhûn felek her lê felek her lê..
Bi nişani bi şîrani tu Latê rind û xûban î
Li te pîroz be kîtanî bi bejin û keysem û şelê
Tu şîrîn î şeker-amîz biki her dem weki paiz
Tu şîrîn î li cem Perwîz me dil Ferhad û sed kêlê.
Li ser textê evîndara mesîha ye ji derdan ra
Cegerxwîn bû ji dildara te pîrsek lê nekir qey lê!.

CEGÊRXWÎN

JI KOVARA GELAWÊJÊ:

DIL

Dil ke zor mesrûr e emro, arezûy izhar eka
Hez le fîncanî şerabî dest û peucey yar eka.

Dil geş û wek gul weha ye, derd û azarî ne ma
Talibî wiskiyî şerab e, hez le ûd û tar eka.

Dil necatî bo le tengî kewte bezîm û rezme we
Aşiqî seyr û sefa ye meylî naw gulzar eka.

Dil ewende mest û keyl e, şit e hiç hûştî niye
Wa le reqa ye, xerik e alemî bîzar eka

Dil be neş'ew bezmî mil-liyet şukîr bo jayewe
Şayîye-m seyran e, bezm e, pîr bedem hawar eka

Dil be awatî geyişî û lawî kurdi dêke wa
Yek dil û yekdem xerik e, mil letî hûşyar eka.

Dil le kîne xaliye bê gerde saf e wek bilor
Sed tif û lanet le çawey xainî seksâr eka.

Dil elê « Bêkes » heta key lafî mil-liyet bedem
Hewl û tîkûşîn e tenya qewmî tu rizgar eka
Ger be rastî bête pêşew des le des yek ken hemû
Ki ye ew sa ye hiqûqî qewmî kur inkar eka.

Yekterîlan xoş biwî ta negbetî ber tan beda
« Dûdîlî » em qewme dil û sûk û bedrefîtar eka.

BÊKES

Roviyê gawr ji qulê derket û li dora xwe mejiyand, ka kurê birê rovi li kû ye. Carekê ewî çav li tajî kir û ber pê çû. Ji wî we ye ko ew kurê destûbîrayê roviyê din e. Ū gava tajî çav li rovi ket, hem dirêji wî kir û xwe li bîr çengê wî da. Rovi xwe ji ber çend kir û go:

— *De heneka meke lot...*

Tajî serekî din lêda û xwe li bin çengê wî da û ew yekele eşand.

Rovi go: Weleh camêr goli bû ev xort gelekî bitir e, tê mi bawer ne kir.

Tajî serekî din lêda, rovi li erdê dirêj kir û kete ser zîkê wî heta ko rovi tamam bû. Rovi hêj dîgo, de heneka meke lo.

ÇIROKBÊJ

PEYNAMA ÎSWÎÇRIYAN

Ji seydayê me ê mezin Cegerxwîné dibixwîn re. Bi hêviya ko vê peymanê ji me re bêxe nezma xwe a xurt û şêrin.

Îswîçre dewleteke ewropayî ye; dewleteke piçûk, lê di nav dewlîtime mezin wek Franse, Elmanyê û Talyayê de dewleteke biserxwe

Heta sala 1291ê xelkê îswîçerê ji hev belav û li 22 kantonan lêk vedibûn. Em bibêjin 22 eşir, wek eşirên me, eşirên Kurdistanê, çiyayî, mêr û şerûdî. Lê ji hev belav û hero diketin bin nîrê dewleteke din.

Li 1ê Tebaxa sala 1291ê serekên wan her 22 eşiran gihane hev, destên hev girtin, sond xwarin ko mezinahiya tukesî di ser xwe re qebûl nekin; bi xwe bibin mezinê xwe; misteqil û biserxwe bijîn. Ji wê rojê ve îswîçre, welatê wan her 22 eşiran misteqil e. Ji hingê ve 652 sal ketine navê.

Eve sond û peymana îswîçriyan:

Me divêt em bibin miletekî yekbûyî, miletekî biran û li ber tu taluke û felaketê ji hev nebin.

Em dixwazin aza bibin; herwekî bavên me aza bûn. Li şûna ko em di hêsîriyê de bijîn, mirin ji me re çêtir e.

Me divêt em îman û ewlehiya xwe bêxin ba Yezdanê bilind û ji xurtiya mirovan netirsîn.

Belê ji wê rojê ve îswîçre aza, misteqil û biserxwe ye. Di dora wê de dewlîtime mezin hene. Lê tukesî ne weri tada wê bikit. Ji her ko dizanin ko îswîçriyan sond xwariye ko mezinahiya tukesî di ser xwe re qebûl nekin û ji xurtiya mirovan netirsîn.

Miletê ko vê sondê dixwe nabe hindest; ew her serdest e.

Miletê ko vê sondê dixwe nagiri lê digirine.

Miletê ko vê sondê dixwe nabe zelil; ew her qedîrgiran e.

Miletê ko vê sondê dixwe ji ber neyaran naêşe, neyaren xwe diêşine.

Belê, miletê ko vê sondê dixwe natirse, lê ew neyaren xwe ditirsîne.

BÎRBIRÎ

HEKE TE NIZANÎ LI
RÛPELÊ ZAN BINÊRE

1 — Du kur û du bav çûne nêçira werdekan. Heryekî werdekek kuşt û tukes destvala veneçeriya. Lê bi xwe re bi tenê sê werdek anin. Çawan?...

2 — Bavek digel du kurên xwe gîltaştiye perê çemekî. Dixwazin li avê berbas bibin. Li ber çem şextûreyek heye. Şextûre ji 200 rîtilî bêtir bari nikare bilgire. Bav bi xwe 200 litir e, heryek ji zarokan 100 rîtil e. Ewê çawan derbas bibin?

3 — Heke sê pising di sê deqîqan de sê mişkan dikujin, sed pising sed mişkî di nav çend deqîqan de dikujin?

4 — Gelo mirov dikare xweha biya xwe nehir bike?

5 — Mirek hebû; dil dikir berdevkê xwe ji cem xwe derxîne. Lê dixwest vî îşî bêxe rîzika şerîletê. Bani qaziyê xwe kir û got-ê: Ve ne du perçe kaxez, min li ser yekê « Binîne » û li ser a din « Here » nivisandiyê. Berdevkê min bila çikita xwe bikişînit, li gora kaxeza ko wê bikişîne an wê binîne an wê here. Mîr li ser her du kaxezan jî « Here » nivisandi bû. Berdevkê kete hafa mîr, qazî li kaxezekê nihêrt û berdevk ma. Berdevkê çawan bi doka mirê xwe karî?

JÎ ŞÎRÊN ZAROKAN :

ZO ZAN

Zozanên me bilind in
Tev bi zevî û gund in
Di wan hene avên sar
Jê kêm nabin ber û dar
Raxerê wan gulçêk
Teyr û tû tê lek bi lek
Havînan em diçin wan
Tevî koç û pez û gan
Derbas dikin rojên germ
Li ser wê nefela nerm
Dilîzin her direvin
Heyanî koç dakevin
Dema çiya dibin sar
Paiz diibe em tén xar.

OSMAN SEBRÎ

JI MIN VE^{*}

TIŞTÊN DINYAYÊ

1— Meriv ji bo du tiştan hatiye dinyayê, yek jê şeref û namûs e, ê didowan malê dinyayê. Yê ko li şeref û namûsê bigere gerek pir ji malê dinyayê hez neke. Çiko namûs û malê dinyayê neyarên hev in û ê ko ji malê dinyayê pir hez dike divê pir bala xwe nedê şeref û namûsê. Bi vî hawî dikare malê dinyayê bide hev dî. Îcar qenc 'bizanin jin di dinyayê de ji bo van her du tiştan e û ev her du tişt tev de li dinyayê nayêne girtin. Kesê ko ev her du tişt tev de girtine yan digirin, ileh kêmasî di heqê yekî ji van her diwan kirine ko hinek ji her diwan gihandine hev du. Na xwe bi temamî heqê van her du tiştan tev de nayêne dan û eda kirin.

2— Dan û standin bi mirivê ehmeq re meke, heke lê biki ji tê dilşikestî ji cem wî mirovî rabi.

3— Pirsê ji yekî meke ko ev pîrs ji eglê wî mestir be.

4— Tiştê ko ji taqeta meriv mestir be; li merivan mekin.

5— Tu caran derewan meke, heke derew ji ziv bin, rastî ji almaz e.

6— Siyaset ne derewe, weke ko me nas kirîye. Heke siyaseta carinan te hewce bike tu derewan biki, li dost û hevat û merivên xwe derewan meke da ko di rojê teng û larî de pişta xwe nedin te.

7— Ger tu zana û gihîştî bi, kar û tevgera xwe mede destê jina xwe.

8— Gava Xwedê bide meriv divê ko meriv li ser wê danê bisekine.

9— Heger ji meriv re ji ti hev bê, ê ko kari be bigerine zana jê re te gotin.

10— Gava ko dilê te li hineka bi neyartî xera bibe, galqala mê ji man re bêje, gotinê nêr mede rûyê dijminê xwe, qe ne ko tu kari bi mededa tebbirê ji xwe re bibîni.

11— Meriv li halê ê bin xwe nenêre, bi halê xwe razi nabe.

12— Heke tu qedrê xwe diqirî: tiştê nexweş ji xelkê re mebeje da ko li te venegerînin.

13— Mirivê simbêl pir xelb e, hebiki mejî vala ye.

14— Sê payên qenciye, bi neqenciye, li xwediyê xwe vedigere.

15— Kesê ko ji sefxerê hez bike nezan e.

LAWIKÊ TILOYÎ

KÊS

GEREK WENDA NEBE

Min ev bend ji bo hemî kurdan nivîsan-diye, ji boyî her kesê ko dibêje ez kurd im, û xwîna kurdmancan di reh û tamarên wî de digere, çi biçûk, çi mezîn, çi jin, çi mêr; û nemaze, ez golinên xwe berpêşî çavên zana û miletperwer û xebatkarên kurdîyê dikim. Gelfi kurdan! Ne hewceyî gotinê ye ko ez bibêjim bê'ev çend sedsalin digerin û diqulipin û miletê kurdî di vê paşvemayîne de û li pey xelkê sekinî ye, ev dema rebeniyê a bê pivan her yek ji me dirêjahiya wê dizanî, û sebeba xwe ne ji hextreşiyê ye, ne ji ji çepgera çerxa felekê ye — herwekî seydayê me Cegerxwîn carina dibêje — lê belê sebeba xwe nezanî û qisûrî û bêbextiya me kurdan ji hev û du re, em di vê bindestiya xelkê de hiştin, herwekî hatiye gotin: Bi xwe kiro, li xwe kiro...

Qisûrî ji ev e, ko em xwe nalivînin, eger em ji bav û bapîran de heyatî fro bixebitîyana, bê sik emê bigehê; tana tiştêkî, û ewê çareyek biketa dest, çima ko, mefer çi ewê ko dest biçîne, dê dev bixwe... lê efsûs, ji mejî ve em xwe tev nadin.

Gelfi kurdan! Ji me nas e, û em dizanin, ko zehf kêş li me wenda bûne, û a dawîn û mezîn ew bû ko di taliya şerê mezîn di sala 1911-18an de bû; ew ji çû, gelekî medîn dî. Lê fro roj, em li her fersenda mezîntir in, û miletê kurd ji rojên kevin û borî hişyartir e. Gerek vê carê kêş li me neqete, û vana bendên Atlantîqê, û gotinên serekên dinyayê û şivanên azahiya mîletan, para her fersenda mezîntir in, — weke me — di serbestiyê de eşkere dikin.

Lê ne şerî e ko em destgîrêdayî rûnin û li hêviya ko serekên dinyayê ji me re bibêjin: kurdino, fermû werin daxwazên xwe bibin — û li herhalî ji, tukes vê dawetê ji me re rênake — gerek em hişyar bin, û bi xebateke zor rabin da em xwe ji alemê re xweyî bikin, û west ji gelekî teng û buha ye ko dil-sariyê qet qebûl nake, herwekî metheloka erebî gotiye:

« Dem sûreke e, heke te ew ne birî, ewê te bibire. »

Di destdanîna vî şerî de, û gava masa aşî û azahiyê bête gerandin, û giranmêrên hevalbendan li dorê top bibin, gerek û her gerek e ko dengê me kurdan di guhên wan de be, û şandiyarê me ji di nava wan de be.

SIBHIYÊ DIYARBEKRÎ

ÇEND GAZIND

Iro bûne çarde sal ko zimanê me kurdan bi tîpîne xweser têye nivîsîn. Ala vê tevgera çak û berxudar, cara pêşin di rûpelên kovara kurdî Hawarê da, bi destê xwediyê wê hate hildan. Erê çiqas ko ji berê da zimanê me bi tîpên ereban hatiye nivîsîn jî, vê yeka han rewşeke şerxwe ne da bû zimên. Lê van tîpên xweser zimanê me di tenganiya ko tê da bû da bi derxist û jî axaftiyên wî ra rîya gengaziyê vekir. Têvî vê yekê, ez dinêrim ko hinek jî kurdên xwanda, nemaze gelparêzên wan, bi xwandin û nivîsandina zimanê xwe ra bendewariyeke heja rave nakinel.. Pirauiya van kesan, tevî ko xwandin û nivîsandina zimên di pêşiya hevîyên qewmî da dihejmêrin, hemî nivîsanên xwe bi zimanên biyaniyan dikin. Berikên kîjanî jî wan velo bikî, reşbelek û defternotên wan bi zimanên tirkî û erebî ne. Ji ber ko xwe li ser nivîsandina zimanê xwe ne ceribandine û daxwaza wan a di vî warî da, jî şnorê axaftinê bi der neketiye. Bi min, ev şermeke mezin el...

Li çend cihan bi guhên min ketiye ko hin jî bilindxwadayên me, bi têxistiyên kovarên me qîma xwe nînine. Pîr mikûn e ko têxistiyên kavaran ne ewçend heja, an tîra mehceta xwandevanan nekin. Lê nayê bîra min ko rojekê jî rojan, rûpelên kovarên me bi nivîsanên van mîrzayên jî xwe razî hate xemilandin û xwandevan jî havîla mîjûyên wan destkewtî bûn. Dîsa kes nikare bêje ko nivîsanên wan gîhane gerandeka kovaran û belav ne bûn!..



MYONÊN KO GENÎMÊ ME DIBIN MÎRAYÊ

Gava jî van celeb mîrzan têtê pîrsîn: Ma gelo hûn jî bo çî nanivîsîn?!.. Ji vê pîrsê ra li nik wan bersiv nîne. A rast ew e ko hîn nîzanin bi zimanê xwe binivîsîn!.. Bi vê nîzanîne, nîzam hewceye ko mirov bi zanfna hevalan a hindik qîma xwe nîne?!.. Qet şik jî min ra çênabe ko ev mîrzayên han kurdine zana ne. Lê bi tenê zimanê xwe, ew zimanê ko nivîsandina wî jî pêşiya hevîyên welatfîniyê dihesibînin, nîzanine binivîsîn û bes!.. dema sebebê vê nezanîne jî wan têtê pîrsîn, dibêjin: — Gelek mixabin ko me zimanê xwe di dibîstane da ne xwand.

Di dayîna vê bersivê da, jî bîra dikin ko hevalên wan jî di xwandina zimanê kurdî da ewekî wan in. Bi tenê hevalên wan bi pîr nivîsanê hîn bûne û ew bi şûn da mane. Dîsa jî bîra dikine ko hin heval hîn axaftin û nivîsandinê bûn û iro di pêşiya nivîsevanên zimanê kurdî da tîne jimartin. Lê wan hevalan jî bo hîn bûna zimanê xwe rîya vebûna tu dibîstanan ne pan; xebitîn û hîn bûn.

Qet jî bîra min naçe ko rojekê tevî çend hevalan em li ser zimên dipeyivîn. Ji bo pîrseke min hinekî hilmeyî seydayê me Hemze efendî kir. Xweya wê seyda jî tîkîfîya min gelekî kiz bû ko bi zaravayekî hişk gote min:

— Heyran, xebata zimên û zanistî bi te nakeve. Tu here tîfînga xwe bigire destê xwe, da ko kes wê jî te ra pîr ne bîne, jî ber ko karê te ew e.

Wê gavê min bersiva seydayê xwe ê giram holê da bû:

— Ez xulam, gotina te rast e û karê min

berî qelemê tîfîng e[1].

Lê gava min hûn hevalbendên qelemê di rîya zimanê xwe da durrî qelemê dîtîn, jî neçarî min dest avête wê jî. Çi gava hûnên ko xwe xwedî qelemê dizanin li qelemên xwe vegerîn, ez dîsa xwediyê tîfînga xwe me. Şerma mezin ew e ko we qelem bi lawikan ên wekî min hiştiye. A rast jî ev e, çihê ko xweyî-qelem hebin, hevaliya

[1] Bila guhên hevalên ko min bi (ezî-enaniyet) ê itîham dikin biçîngin; ev le min dîsa çêla xwe kir!..

nezanên wekî min bi qelemê ra bêriyî ye. Lê kêmaniya ko di vê yekê da were ne ji min ra ye. Ew kêmanî ji wan kesan ra ye ko karê xwe, li erdê bê xwedî û li hêviya nezanên wekî min dihêlin.

Yeka din heye ko ew jî carcaran guhên me nivîsevanên kurd diêşine. Ji ber ko zimanê me di dewreya civandinê da ye, roj naçe ko em hin bêjeyên nub peyda nekin. Di destketina van celeb bêjeyan da, em bê etlahî wan di nav nivîsarên xwe da berpeyî xwande vanan dikin. Hin hevalên li ser zaravayê welatê xwe dilgerm hene; gava van bêjeyên biyanî zaravayê xwe dibinin, bi neheqî dest diêxin

gewriya me û dibêjin:

— Van bêjeyên han, nivîsevanên me ji ber xwe bi derdixn û pê zimanê me xerab dikin.

Ev celeb camêr bîr nabin ko bêjeya han di zaravayê eşira wan da tine bûye; lê ji zaravayê eşireke din hatiye girtin. Zimanê kurmançî ko ji Meraşê heya bi gola Ūrmiyê nîzika hezar eşîrî pê dipeyve, jê ra ewçend zaravayên nêzîkî hev heye. Çiqas ko xelkên van eşîran ji hev serwest dibin jî, hin bêjeyên wan ji êk din ra biyanî dimînin. Ji bo vê ye ko gava em bêjene neasî hin hevalan bi dest xwe diêxin û dinivîsînin, hînga me bi gotina jorin ftham dikin; heçko em wan jî ber xwe bi derdiêxin.

Di nav kurdmancan da ê ko pirtirî hemiyan bi civandina bêjeyên kurdî mijûl bûye, xwediyê Hawarê, ji bo zimanê kurdî misaleke gelekî xweş anî bû ko nivîsandina wê hêja dibînim. Xwediyê Hawarê dibêje: « Zimanê kurdî, wek ko çiwalek ka di nava deriyê da birijînî. Çawan ber hebek ji wê kayê bi ber pelan dikeve bi hêlekê da dihere, bêjeyên zimanê me jî her binek bi eşîrekê ra bi hêleke Kurdistanê da çûne. Karê me xwande vanên kurd ew e ko em wan bicivînin û bidin ber hev».

Ez vê gotina han gelekî bi cih dibînim çima ko ez bi civandina bêjayan hinekî mijûl bûme. Ji vê pê va ez di nav pir eşîrên kurdmanç da jî mame. Li ser gotina me a jor heke em ji her eşîrekê ra zaravakî bihesibînin ez jî van zaravayên kurdmançî ên nîzîkî hev bi qasî du sed hebî dizanim ko hin bêjeyên di zaravayê eşîrekê da xelkê eşira din nîzane.

Pişti ko min gotina jorin kir, ez qet înkâr nakim ko di vê dewreya civandina zimanê kurdî da em hemî jî yek bêjeyên nuh jî nik xwe çêdikin. Heke ev yeka han carina dibe; teqez jî ber zerûretê ye. Ji ber ko em naxwazin bêjeyên zimanên biyanî têxin zimanê xwe Dawî ev hevalên ko ez gazindan lê dikim heke di van her du warên han da hinekî çavên xwe vekin dikarin gelekî xizmeta milletê xwe bikin.

OSMAN SEBRÎ



DI ŞERÊ ÎTALVAYÊ DE TOPÇIYÊN SÊNÉGALÎ

JIN Û MÉR Û ÇIROKA MAREKÎ FÉRIS

Yekî ji memûrên Hindistanê ê mezin rojekê ziyafetek da bû û nasên xwe ezimandi bûn şivê. Oda xwarinê saloneke mezin, erdê wê mermer, deriyên wê pîpoq bûn û li şehnişinekê vedibûn.

Vexwendî ji zabîf, memûr, jinên wan û ji zanakî emêrikanî bi hev diketin.

Xanimêkê bi zabiteki re qala xurtiya jin û mêran dikirin. Heryek li ser gotina xwe disekin.

Xanimê digot: Ew zemanê ko jin ji mişkan ditirsyan û ji ber direviyan boriye.

Zabîfî qîma xwe pê ne dîant û digot; jin gava dikevin deravekî teng hema didin ber qîran. Lê herçî mêr bi xurtiya asabên xwe li xwe dibin hakim û xwe ker dikin.

Xelkê mayn ji bi vê cedelê bendewar dibûn û tékilî dikirin. Bi tenê zanayê emêrikanî bi tişteki din mijûl dibû. Wî li xwediya malê dinihêrt û çavên xwe jê banedidan.

Xwediya malê, ji nişkekê ve rûyê wê qermiçî, bi çavên xwe dida pey tişteki; tişteki welê ko tukestî bala xwe ne da bû-yê. Jinikê îşaret li xulamekî xwe kir, hêdika tişteki gote guhê wî. Xulam çû û tasek tiji şîr anî û ew danî ser şehnişinê.

Zanayê emêrikanî ev tişt hemî diti bûn; lê

hêj ne dizant mesele çî ye. Lê gava çav bi tase tiji şîr kir; mar hate bira wî. Nas e ko mar xwe li bihina şîr digirin. Zana çavên xwe li çarnikarên odê gerand; tu tişt ne dît. Nebe ko 'li bin masê be. Heke hebe diviya bû li wê derê, biwa.

Zanayê emêrikanî kir ko haziran lê agah bike. Lê paşê da eqilê xwe, lieke ji wan re bigota ko di bin masê de marekê heye, ewê tev de rabiwan, bi hev biketan, mar wê bitirsîya û di xirocirê de wê bi hinan ve bidaya. Li ser vê yekê zana gote wan:

— Ez dikim heta sêsedî bijmêrtim. Di vê navê de divêt herkes di cihê xwe de bêt ko xwe tev bide, wek heykelekê rûne. Heçî xwe tev de ezê jê 50 rûpi ceza bistînim.

Şexalî hate birin, her kes di cihê xwe de wek heykelekê disekin; zana dihejmart. Gava got 280 qîrîn bi odê ket, marekî fêris yekî kobra şîpana deriyê şehnişinê derbas bû bû û xwe gihandi bû tase şîr. Xulaman deriyên pîpoq lê girti bûn.

Xwediye malê gote zabîf: Te dît mêreki dawa te îsbat kir û şanî me hemiyan da ko mêr li her talûkê xwe sist nakin û li xwe hakim dibin.

Zanayê emêrikanî berê xwe da xwediya malê û got-ê: Xanim te çawan mar di bin masê da dît û ew şîr da anîn.

Xwediya malê kenî û got: Mar di ber lingên min re şeliha bû ».



BERGEHEK JI GUNDEKÎ FRANSE Ê XERABÛYÎ

Bisertahiya marê kobra û xurtiya jîna ingilîzî û zanayê emêrikanî ya ko min di kovata emêrikanî de xwendîye ev e. Lê min ji tişteki holê bihiştîye. Ez dikim wî bibêjim.



Carekê ez li Hewramê bûm. Me li çolê taştê dixwar. Em li erdê rûniştî bûn. Xiltek, cerdonek, tişteki welê di nav lingên me re borî. Hinekan xwe tev da. Şexekî ereban i pir ji di nav me de bû. Şexê ereban li xelkê ko xwe tev da bûn nihêrt û bi ken gote me:

SKODA

Skoda di dinyayê de bi nav û deng e. Skoda bajareki Çêkoslovakya-yê ye. Tê de ji wextê nemsewiyan fabrikeyên çek û posatan hene.

Elemanan beriya şerî bi mîdeki hindik Çêkoslovakye vegirti bû û ew welat kiri bû du wilayetên xwe.

Elemanan fabrikeyên Skodê edilandin û tê de bi raheti her texlî ale-tên cengê çêdikirin. Lê piştî ko hevalbendan serdestiya ezmanan xiste destên xwe ew raheti ne ma. Îro balafirên britanî digehin heta wê derê û wan fabrikan didin ber bombeyên xwe. Klîşa jorîn birek ji wan fabrikan şanî dide. Resim bi roj hatiye girtin. Herçî a jêrîn birekî din şanî dide. Ev resim bi şev hatiye girtin.



— Li wextê berê, di wextê siltanan de, mîlserîfek hati bû Hewranê; ji mîrêkên kurdan, Bedrî paşa digotin ê; kurê Bedir-Xan begî. Me şêxên ereban çend kon vegirti bûn û me mîlserîf ezimandi bû taştê. Ji sê sed siwari bêtir peya giha bûn hev.

Dinya Havin e û wek îro em li çolê ne. Me sifere ji li erdê raxisti bû. Dema taştîyê, me hew dit Bedrî paşa kevçiyê xwe kire destê xwe ê çepê; destê xwe ê rastê xiste bêrika pantorê xwe û tê de qey tiştêk diguvaşt. Paşa bi destê çepê xwar û gava taştê

xelas bû banî xulamê xwe kir û lingê xwe ê rastê li ber wî dirêj kir. Xulam xwe dabeland û ji nav devlingê paşê marekî mirî derêxist.

Me paşê zani ko li dema taştîyê marek keti bû nav devlingê paşê û şêlita bû jor heta navranê. Paşa ji bêt ko xwe tev bide destê xwe avêtî bû bêrika xwe, serê mar girt û ew di nav destê xwe de guvaştî bû. Mar bêt ko bikare bi paşê ve bide mirî bû. Gava min xilt dit ev çirok hate bira min ».

SILEMANÊ FERHO

DİROKA

JÎNA NAPOLYON

« Bêjeva dostaniyê golîneke »
« pûç û vîna ye »
Napolyon

— 4 —

SERXWERABÛNA FRANSIJAN:

Di sala ko Napolyon ji dibistanê bi derket da (1787) li welatê Franseyê çirûskên serxwerabûnekê xweya dikirin. Serxwerabûneke welê ko hemî rê û rêzikên welêt ser û bin kirin; pê ra êu hemî Ewropayê... Hingê di welatê Franseyê da sê birxelk hebûn ko torin, olvau û cewêlek. Bar û dayîna hikûmetê li ser piştê vi birê paşin hati bû danin. Tevî ko nivê erdê Franseyê di dest torin û olvanan da bû ji, qirûşek dayin ne didane hikûmetê. Bi ser vê yekê da herçî gundiyan di nav erd û gundên xwe da, ji xwe ra belaş, bi suxre didane xebitandin.

Herçî memûriyetên hikûmetê disa bi dest van her du birên han va hati bûn berdan û birê sisiyan jê bê par ma bû. Herweki ev yeka han ne bes bûye, bi ser da keşti ji vi birê bextereş nikari bû karê bav û kalê xwe berde û rahêle kareki din; an bi keça ko dilê wi bigire ra bizewice, hêrgiz bi dilxaza mezîne ko di bav û kalan da ketiye bin destan.

Ev derd û kul, zîlm û zinatên han ewçend keti bûn ser hev ko di qefsinga kesên xweyî-rûmet û xtret hilnehat û teqîya. Hingê nivtsevan û feylesofên wex Rûso, Monteskiyo û Voltêr bi nivîsanên xwe ên agirfeşan dirêji rê û rêzikên kevnare dikirin. Ew rê û rêzikên ko piraniya xelkên Fransayê existî bûn nav lepên torin û olvanan. Nivîsarên van camêrên han hinde şopa toleke ecêb di canê vi birê reben û belengaz da hişti bû ko bi çaveki geleki neçak li dewlemendan dînihêrin. Bi çaveki welê ko dixwastin cezayê zînata bav û kalên wan ji di çavên wan ra bi derxinin. Ji bona vê yeka han ji çav da bûn rojeke nizik.

Gava xezîna hikûmetê vala bû û peyayên wê ên herpirsiyar nikari bûn şolê wê saz bikin; wezîreki xwest ko torin ji wekl cewêlekan dayîne bidin. Li ser vê torinan rû dane ser melik heya ko ew wezîr li ser kar avêtin. Disa wezîreki din xwest ko şandiyên millet ji tevî hikûmetê ji çareyêke vi derdi bigerin, ew ji ji ser kar dane avêtin. Ji vi derdê han ra



dermanek diviya bû. Neditîna wi dermanî dê bolbelateke mezin biêxista nav welatê Franseyê. Heke torinan xwe bidana ber dayînen hikûmetê, teqez ew serxwerabûn ne dibûn û mal û canên wan bi tevayî tê ne diçûn. Ne ji derdê heyî ra li dermaneki digerin û ne ji xwe didane ber dayîna hikûmetê û qorê wekhevîyê. Herweki milletê fransîz û vîna wi ne hesibînin. Lê pir ne ajot ko şelpên wê vîna xurt, bi şelnaqîne jinkuj û malkambax ra tev ditin.

Wê gavê melikê Franseyê Lwiyê şanzdehan miroveki dilqenc û fêlçak bû. Lê wekl hemî dilçakan î sist û bêkêr bû. Herweki bav û kalên me kurdan gotine « çoyê sist li eniya xwedîyan dikeve » melikê Franseyê ji serê xwe cezayê wê sistiyê da.

Êdlî xelkê Franseyê bû bûn du biran. Torin û olvanan xwe dabûn dora melik û çav da bûn mêtîna xwîna cewêlekan. Herçî cewêlek, bi agirê ko ji nivîsarên wê demê dilên xwe dagirtî bûn û rîya hatîna roja xwe dipan.

Melîk bi carekê li alîkî ne dima; geh guhdariya torinan û geh ji a cewêlekan dikirin. Ev dudîliya ko ji melîk bi derdiket, dilê birê sisiyan xurt dikir û tîrsa wan direvand. Herçî

mêlke Mari Antiwanêt, bi bêsinçtî û dest-belav bûna xwe çawan ko malkambaxiyeke ecêb bi ser xelkên welêt da ani bû; welê ji suhin û rûmeta melik li ber çavan sivik û belbi tîne kiri bû.

Hingê li dorhêla melik hin mirovên ne qenc û beradayî hebûn. Hergav dixwestin melik ji a çak û qenc bi şûn da bidin. Tu ya qenc nema ko melik dixwest bike, hêrgiz wan xwe davête ber û nedihîştin.

Paşê bi wê ji bes ne kirin ko dest avêtine a ji wê mezintir. Di vê yeka han da melike Mari Antiwanêtê pir arîkariya wan dikirin. Rabûn êxistine serê melik ko xelkê Parisê dixwazin dirêji qesra melik bikin. Ji ber ko melik î tirsok û dilçak bû ev derewa han zû bawer kir û ji bo parastina qesrê leşker kişande ber dergelên bajarê Parisê. Xelkê bajêr ji ev yeka bi awakî din zanin. Ji xwe kesên ko pife bêvila wan dikirin ji hebûn. Dizanin ko latîna leşker a nîzika Parisê ji bo tirsandina çavên xelkê bajêr e. Heya hinêkan digotin ko dê topan hilkişînin ser piştê hepsa Bastilê heya ko avalhiyên bajêr bi ser xwedîyan da hilweşînin.

Li ser vê bû ko rîka di dilê xelkê da mezin bû û bi zîrt û halanan hevidin sergerm kirin û di 14 Tirmehê 1789 an da li pêşberî Bastilê civin û tu nema dirêjê kirin. Dergelê vê hepsa kevnare bi zor vekirin, hemî pandiyên wê kuştin û bextereşên ko tê da bi carekê berdand. Gava piştî vê kira han tu xurtî ji hikûmetê ne din, bi carekê devce bûn û peyayekî hikûmetê di kû da ditin kuştin û nema hebabê kesî kirin.

Li êrdimên mayî ji xelkê dane ser rîya bajariyên Parisê û qesrên torînan talan kirin, şewitandin û rûniştimanên wan kuştin, Parisiyan ji bi dev avêtine wargehê melik daxwazên xwe pêş da birin. Digotin: divê melik ji Vêrsayê bi derkeve û di Parisê da rûne, heya ko nikari be tişteki der heqê xelkên wê da bike. Edî ji wê rojê û vir da her tişt li Fransyê, nemaze li Parisê li ser kêf û vênâ mîlet dimeşin. Ne suhiya melik û ne ji rûmeta torînan, bi carekê nema bû.

Ji ber vê bû ko melike Mari Antiwanêt ne dixwest bê dilê xwe di Parisê da wek dilan bindestiya pêxwasan bimîne. Ji bo ko nekeve ber destan, her gav mêrê xwe dihêvot; da ko tevî zarokên xwe birevin Nemsayê cemî brayê wê imperator Lêopold. Ji xwe hemî torînen revoke berî wê demê xwe gilhandi bûn Nemsayê û li hêviya kêsekê diman. Ramana melikê ji ev yeka

han bû. Wê dixwest bi arîkariya brayê xwe û torînen fransîzan serên serxwerabûyan bişkêne û dâvikê wan bibire. Lê bextereşiya malbata melik, an bextçakiya cewelekan melikê Fransyê ne gilhandi Nemsayê û li rê êxiste destê pêxasan. Hinga melik tevî ên pê ra bi he-nek û qeşnerîyan li qesra wî vegevandin. Lê ne mîna melikeki, her wekî xînzekî lê dinêrin.

Herçi wekilên mîlet in, di Îlona sala 1791 an da rîzaneke nuh.berpeyî melik kirin ko ji goreyî vê rîzanê hikim ji mîlet tê û di destê mîlet da ye. Melik, ji neçarî qebûl kir û sond xwar ko bêbextiyê bi vê rîzanê re nake. Bi vî awayî hikim ji destê mirovine cerîbî bi derket û kete destine xeşîm û nezan. Ne durrî eqil bû ko di pêşiya vê yekê da gels, tevloki, zinat, bêbavî û bêriyî çê bibin; lê paşê dê her qenc bibûna.

Berî her tiştî, a ko welatê Fransyê ji hikûmeta xwe a nuh ditî, bi hikûmeta Nemsayê ra têketîna şer bû. Ew ji jî ber tîrsa fransîzan a ji imperator Lêopold brayê Mari Antiwanêt bû. Wê demê herçi mihacîrên fransîz ên ko rîzana nuh qebûl ne dikirin direvin Nemsayê di siya serê imperatorê wê da rûdiniştin. Gava mîletê fransîz ev tiştê han ji imperator Lêopold ditin di Nisana sala 1792 an da bi Nemsayê ra ketîna şer. Lê gelê fransîz bi vê yeka han ne sekîni. Bi ser da xwast ko melik, hemî fransîzen revîne derî welêt xînzî bide nasî û fermana idama wan bi derxe. Di pêşiyê da melik ne xwast qerareke holê bêrê bide. Çaxa fransîzan dudiliya melik ditin, êrişeke mezin birin qesra wî. Di 20 Hizêrana sala 1792an da sî hezar pêxas dirêji qesra Twilêrî kirin û rûmeta melik şikandin. Ewçend ko dilê mirov ji kirên wan ên kirêl li hev diket. Heya yekî, kumê xwe ê sor bi ser serê rimekî xist û dirêji destê melik kir. Li ber vê kira han, melik ew kumê qirêj girt û da serê xwe; liêreker ji bi vî halê han diketin.

Demâ qelsiya melik di vê yeka han da xweya bû êdî nema tîrsa kesî ji wan qesrên bilind û xelkên tê da ma. Ew kesên ko bi sergermiya pêxasan meraqên xwe bi cih dianin, ji nuh va tovê rikê diêxistin dilê xelkê û agîreki xurt berdandanê. Pir ne çû ko di 10 Tebaxa 1792 an da carekê din dirêjî qesra melik kirin. Pandiyên melik li ber lingên pêxasan nikari bûn xwe bigirtana û qesir bi dev wan va berdand. Hinga koma pêxasan malbata melik tevî kesên mêldarên wê tev avêtine hepsê.

Vê kira han li der û hundirê welêt şopeke

ecêb neqenc hişti bû. Li hêlekê hevalbendên melikiyê rakiri bûn ser lîngan û li hêla din herçî hikûmetên Ewropayê ên melikî kirin bûn neyarê miletê fransîz ê ko ji bo xwe serbestî dixwast. Hîngê hemî melik ji xelkên xwe ditirsîn ko bidin ser şopa gelê fransîz.

Ji milê din leşkerê Franseyê ê nuh di şerên pêşîn da li pêş Nemsewîyan direvî. Ew leşkerê ko ji nîzama û întizamê bê par, bi ser da bê fermandar û zabîti [ji ber ko pirên fermandar û zabîtan ji benda melik bûn] nikari bû li ber leşkerê Nemsayê ê pêkhatî xwe ragire. Heya ev leşkerê han tîketa nîzama û întizamê diviya bû çend şeranan bireve. Lê fransîzan sebebê reva xwe ji tiştêkî din dizanîn. An dixwastin bi tiştine din çavên neyarên xwe ên der û hundir bişkênînin û pîsiya revê bi vî awayî li ser xwe rakin. Ji bo vê bû ko dest avêtin çavtirsandina doraliyên xwe.

Berî hemî tiştî kesên ko ji rêzana nuh ra ne rast bûn; bi hevalbendiya melik û nermaliya wî hatî bûn nasîn hemî kuştin ko bi vî ra (Kuştara Îlonê) hate gotin. Çima ko ev kuştin di meha Îlon 1792an ba bû bû.

Van kirin û kuştinên han li ser ramana tevayiyê şopeke neçak dihişt. Rojne diçûn ko ji bo wêlat û gelê fransîz neyarine nuh çar dikirin. Ên ko hikûmet girti bûn dest xwe qet nedixwastin ko vî rastiya han bîr bibin. Wan her çav dabûn melik. Bi çav wan sebebê hemî bobelatên han melik bû. Gava ew ji giharê

biderketa nema tu xirabî digîştatin fransîzan û Franseyê. Qey ko Xwedê dixwest Lwiyê şanzdehan di ber gunehên bav û kalên wî va ceza bike ko xelkê ev xirabiyan han di hefîna wî da didîtin.

Heke mirov baş biramiya, ramana xelkê Franseyê a wê hîngê di cih da bû. Hemi hikûmetên dorhêlê ko dixwastin destê xwe dirêjî wêlat û şolê Franseyê bikin, hemî bi navên parastina melik û melikîtiyê bû. Heke fransîzan bi rastî dixwastin xwe ji van tîkiliyên derveyîn û bê mana bifilîtînin bi carekê xwe ji melik xelas kirin diviya bû ko wan ji wêlê kir. Li ser daxwaza hinek neyarên melikiyê, melikê Franseyê Lwiyê şanzdehan birine ber mehkemê û piştî mihakemeyeke kurt tevî jina wî melikê şandine ber giyotînê (meşneqe) û kuştin.

Piştî kuştina melik awayê hikim kirin cimhûriyet. Di vî hikûmeta han da hefsarê hikim ketê destê hîzbê çiyayîyan ên mitetirif ko serêkên wan Marê, Danton û Robîspiyer bûn. Di pê kuştina melik ra, serêkên hîzbê cimhûriyetê ewçend sûrê zîlm û zînatê şikulandin ko herwekî rişandina xwîne di wêlatê Franseyê da êrzan bû be, her roj bi sedan bêguneh dajotine ber giyotînê. Çi kesê ko jê şikeke biçûk dikirin bê eman dikuştin. Ev kuştin ewqas pêş da çû ko gava bajarên Marsilya, Liyon, Tûlon û Orléanê serên xwe li ber zilma hikûmetê hildan; êdî nema di ber ra digîhandin

ko bi giyotînê bikujîn, hema xelk bi dehan davêtine cemê Ron. Dema hinekan ji bo vî awayê kuştinê ji wan dipirsîn, bi vî bersiva kurt xwe xilas dikirin: « Bila cendek di ser rûyê avê ra herin bajarê Tûlonê; da ko xelkê wê zani be cezayê asiyan ji destê hikûmeta cimhûriyetê çî ye ».

Ji hêlekê vî zînatê han çavên xelkê tirsandin û ji hêla din, hikûmetê peyayên ko destên wan çî bigirtana hemî ji bo eskeriyê girti bûn. Êdî kesên ko serên xwe li pêş hikûmetê hildana tine bûn, an di hikmê tinebûnê da bûn. Ev yeka han bû ko piştî hikûmetê girêdayî û destê wê berdayî hêla bû.

OSMAN SEBRÎ



BALAFIRÊN EMÊRIKÂNÎ DI WELATÊ ÇÎNÊ DE

CONÎ Û CIMÊMA



Çirokeke îngilîzî ye. Kitêbxana Hawarê ew wergerande kurdmanciyê. Kitêbeke biçûk, lê xweşkok e. Tê de 23 sûretên spehî û ca-zibedur hene. Behayê wê jî bo Sûriyê 75 qirûşên sûrî û jî bo derve 3 şilîneû îngilîzî ye. Wê jî xwediyê Hawarê bixwazîn û perê jê re bi postê rêkin. Li sûna perê pûlêû postê jî dikarin bêne rêkin.

TERLAN

— Ji qisêlên ibretamîz —

Dibêjin rojekê jî rojan padîşabek hebû û di nav milên wî da kulek hati bû. Gelek hekim û bijîşk anîn ser; lê nikari bûn jê ra dermaneki çar bikin. Bi tenê bijîşkeki hindi dermanê kula padîşê nas kir û got-ê: Ez dermanê vê kulê dizanim, lê çar kirina wî gelekî dijwar e.

Dema padîşê navê dermên jê pirsî, bijîşkeki hindi got: Bi navê terlan padîşahê teyran heye, heke bi dest keve serê wî dermanê kula te ye.

Li ser vê gotinê padîşê gazi wezirê xwe kir û pirsî cih, war û şargêhên padîşahê teyran terlan jê kir. Wezirê eqilmend çend roj destûr xwast û hemî segman û neçîrvan anîne cem xwe û jî wan pirsî. Di nav neçîrvanan da kaleki saldide hebû. Kali cih û warên terlan jî wezir ra holê salix da:

— Ezxulam, cih û warê teyrê terlan, li Serhedan çîyayê Bringolê ye. Her paiz bert da- ketina quling bi heftêkê tevi wezirê xwe jî çîyan dadikeve û berê xwe dide germiyanan. Heke neçîrvanîne jêhati di filan geli da lê bipên mîkûn e ko bibînin û bîkujin.

Piştî ko wezir ber tişt zanî, çû bi ser û ber gote padîşê. Ji ber ko kêsa ditîna terlan jî salê carek bû, padîşê ne xwast ko di xwe va derbas bike û tevi wezirê xwe çûne wî geli. Di serê geli û bilindciheki da qîlaçeya xwe çêkîrin û laşê du sê pezan avêtîne dorhêlê.

Roja sîsiyan terlan tevi wezirê xwe baz di ser qîlaçeya padîşê ra difiriyan. West û birçî



bûnê da bû dilê terlan ko gote baz: Em geleki westin û birçî bûn. Divê em dakevin vî gelî û jî van laşên han têr bixwin; an ne firin bi me nabe.

Baz bi camêri li padîşahê xwe vegerand:

— Şahê min, divê ez berê dakevim, heke neçirvan tine bûn tu hînga were. Na ko di rojêke holê da ez bi kêrî te ne hatim, ev wezîriya ha jî bo çi?!..

Baz xwe berda jêr. Dema nîzikayî jî laşan kir, padîşê û wezîr bi hev ra tirên xwe berdan-ê

û kuştin. Gava terlan mîrina wezîrê xwe dit, daneket û jî mirinê filîtî.

Sala dudduyan jî wekî sala pêşin padîşah û wezîr latin û di qilaçey serê gell da veşirîn. Dema terlan hat û borî dîsa wezîrê wî ne hişt ko dakeve; jî ber ko wezîr sipîr bû. Erê terlan filîtî, lê sipîr jî da ser şopa baz, hate kuştin û bû goriya wacib.

Sala sîsiyan devê padîşah û wezîr vala ne çû. Terlan dakete ser laşan û lier duyan bi hev ra tirên xwe berdan-ê û kuştin.

Pîştî ko terlan kuştin û vegerin mal, padîşê jî wezîrê xwe pîrsî û got:

— Wezîrê min, jî bo çi her du salên pêşin me nikarî bû terlan bîkûştana û çîma tsal hate kuştin?

— Ezbenî, sala pêşin wezîrê wî baz bû. Gava hatine dûşa me û laş ditin, terlan xwast ko xwe berde xwarê; lê baz ne hişt. Xîreta wî qebûl ne kir, çihê ko ew bebe padîşahê wî dakeve; ew bixwe hat û me ew kuşt.

Sala dudduyan sînciyê terlan hînêki hate guhartin û jî qenciye pirtîr mîla neqenciye kir. Jî ber vê yeka han baz li dora wî revin. Wê salê sipîrek jî xwe ra kir wezîr. Lê sipîr jî ne teyreki békêr e; dema hatin dûşa me, wî jî wekî baz ue hişt ko terlan dakeve, bi xwe daket û hate kuştin.

Sala sîsiyan, sînciyê terlan bi carekê hate guhartin. Ewçend bêsiñçî bû ka hemî teyrên camêr û neçirvan terka wî dan. Jî ber vê yeka han qijik jî xwe ra kire wezîr. Gava hatine dûşa me û terlan xwast ko xwe herde ser laşan; hê ko qijik wekî wezîrê berî xwe bêje: Ezbenî divê ez berê dakevim; got, ezbenî bide pêş... Terlan li pêş û qijik li pê heya gihane nîziki me. Hînga me her duyan bi hev ra tirên xwe berdan-ê, me ew kuştin û qijikê hevalê xwarinê jî çû ko jî xwe ra terlanekî din biblne; da ko jê ra bibe wezîr ».



ZARAVAYÊ CIZÎRÊ

Ziman bi gelemperî bi zaran lêk vedibin. Di yek zimani de yek caran du sê zar peyda dibin. Ev zar carina ji hev gelekî bi ferq in. Ewçend ko gramêra wan ji hev cida ye. Digel vê hindê ew zarên yek zimani têne hesabandin. Wek zarên zimanê me.

Ji xwe zar bi mana gotinê ye. Ma em bi xwe nabêjin « Ev zar ji devê min derneketiye » an « Filankes çî mirovekî zarxweş e ».

Di zimanê me de sê zarên bingehîn hene: zarê kurdmanci, zarê dumilî û zarê soranî. Herçî zar di nav xwe de bi zaravan lewa dibin. Ferqa zaravan ne ewçend mezin e. Ev ferq tucaran nagehe heta gramêrê. Ferq di hêjan û di awayê gotin û bilêvkirinê de ye.

Di senifandina zimanê nivîskî de zaravayek nikare bibe bingehê isulê nivîsandinê. Lê di pêkanîna zimanê nivîskî de her zarava bi hemanên xwe ên rast û xwerû-hilanî hevkarîyê dilke û bi kêr tê.

Ji lewre ji bo sehkirina zimên li zaravayên wî zimani hûr dibin û wan zaravan herwekî ji devên xwedîyan derfêten tesnîd dikin. Me ji dil heye em ji bidin pey vê qeydê.

Zarava, nemaze li gora xelkê eşiran û yê bajaran bi ferq in. Ji milê din hewêrkeyên (mlntiqe) cem, deşt û çîyan ferqine mezin dixin navbera zaravan.

Îro em nûmûneyekê ji zaravayê bajarê Gîzîrê (Cizra Botan) belav dikin. Ev bîserhatî ji me re Mirza Evdîlkerîmê Mela Sadiq gotiye.

Bêşik, me ev zarava ji devê tukesî, ji yê Mr. Evdîlkerîm çêtir nikarî bû bigirta. Bi tenê di vê xebata me de tiştekî gelek zîz û hezîn heye. Gava me ev bîserhatî dinivîsand, me digot, hingê Resûl axa xeylî be jî, vê carê gava vê çîrokê bixwîne ewê bikene. Lê felekek ew ken ne kir nesibê lîvên wî.

Resûl axa ber bi nivê Honê bi qezakê emîrê Xwedê kir. Resûl ji nîşekî welê bû ku nûmûndeyên wî di nav me de kêm bûne. Xwedê rehma xwe lê erzani bike.

Di 1919ê de heyva Kanûna ewil bî. Kurê Eliyê Remo Evdîlkerîm rêkir cem Osman efendi; bêne silha min û Resûl axa bikin. Lewre Resûl axa li kurê Eliyê Remo şidandi bî û eşîrên wî ji ji ber ve digirtin.

Osman efendi rabî, ez û kurê Tahir axa hacî Naîf; go herin mala Resûl axa, wan li rûyên hev bixin; fedkirin çî di naf wa de heye; wa li hevdû binin.

Rojek baran, piştî nîvro, saet dido, em çar siwar ji Cizîrê derketin ser rîya Finikê; me berê xwe da çîyayê Bota.

Em wê şevê mayîn li mala Evdîlkerîmê Mihemed, axayê batîya. Sibehtî em rabûn; baran tîhet, du xulam axê dan me, rê nîşa me bikin.

Em ketin ser rê, di neqeba jêliya re bi hewa ketin. Em piştî eşayê gihan Tilê, mala Resûl axa. Xulam bezîn, dewarên me girtin. Resûl axa derket; em çûn serên hevdû; kêfxweşî me da hev.

Bi navê koçkê du odên wî hebîn. Yek kiçîk, yek mezin. Ya mezin belkî pêncih mîrê tê de hebîn. Ya piçûk ji mehvanên ezîz re bî. Derf vekir; odeyek rayexistî, sobe tê de heye. Em rûniştin: pîrs û mîrs me ji hevdû kirin. Em mane hişyar heta demek yê şevê bori. Havalê mi hacî Naîf di xew re çû bî. Resûl axa ba kir xulama; cihnivînan me danîn û got min:

— Xwalo, eger xewa te nayêt, ev e zilamek li cem min heye, çîrokên qenc dibêjî û serhatiyên baş dizanî. Eger te divêt bila ji te re hina bêjî; heta di xew re herî.

Mistoyê hemikan (navê çîrokvan) li bin serê mi rûnişt; got mi, eger tu bextî ji mi re ji axê bistîni serhatiyên baş li cem mi hene; ezê ji te re bêjim. Ax a dengê wî seh kir got-ê, bêje bext ji te re ye. Mistoyê hemikan go:

« Emrê mi sîh sal tê hebî. Sibehek ya Sibate ez gelek zû rabim. Min kewên xwe hilanîn; ez çûm kêwa. Mi şevdestek baş dît û mi kewên xwe di mesilê de danîn. Ewrek reş û tarî bî û nûka dibî sibehek. Pêşkên baranê jî tîhetin. Mi ribat ji rekehtî deranî, mi singê wî di erdê re kir; tezkê wî danî. Ribat baz da ser tezkî, xwe du cara vevêşand.

Mi ew hişt li cihê wî, mi kewê celab bi serê çîloki ve kir. Mi xwe ji her dîka dîrê xist; hêdî hêdî, heta ez gîham devîkê. Mi xwe di deviyê de veşart, guhê min li ser kewên min in. Dengê ribatî dihat, ji celabî re digot:

— Guhê tê lê bit, fekire milê çiyê, heçî rêwingiyên borîn salûxên wa ji mi re hilde; d'ez bizanim xelkê kû ne.

Di wê navê de bi dengêkî hêdîka celabî ji ribatî re digot:

— E' karwanî dibtnim xwe ç' çiyê berdan. Ribatî got-ê: Cilên wan çî ne, rengên wan çawan in?

Celabî bi dengêkî nivîz car-dî go: Ew bi xwe gir û bilind in; şal û şapik li ber wan e, bi kum û keşiyên eskûdarî ne û di lingên wa de çarx in, xencer di ser xeta re girêdane, hemî bi hev re tîn; yek di pey yekî naçin.

Ribatî: Serê xwe vala neşîne ew şernexî ne, çenda ko hij hev ji nakin lê tucara hevdû jî bernadin. Dengê xwe neke bila reya xwe biborin.

Mi didanên xwe ji ribatî re çirikandin, min go çawa ev ref berda bê şer. Mi hingê zanfî ribatê min teyrê xwe li bayê sahiyê bernadit; ji lewre ribatê mi mîrî bî, ji mîra[1] îş çiyayê Qereçoxê bî, ji kewên sohrik bî. Eşîra mîra bê ray û tevdir tucara tu şera nakin. Ber lingên xwe nebînin, lingên xwe navêjin.

Bî xutxuta ribatî, mi zanfî disa tiştina ji celabî re dibêjît. Û her du bi hev re netirîn. Bêhnek horî dengê celabî hat min. Ji ribatî re digo:

— Karwanek dî dixuyêt, lê ne se' rê tèn, xwe ji kuçkî tavêjin kuçkî dî, bi nivê tîfinga girtine, kirasên dirêj li ber wan e, hin serût in, hin keffî li ser serê wa hene. Singê wa rût in, heryekî dî rextê wa de ş' sê çar pakêta zêdetir nînin.

Dengê ribatî hat, bi nizmî û sistî ji celabî re digot, dengê xwe "neke ef kincên xwîne ne, ef şilit in[2] tu serêşiyê ji me re çeneke, wa berde, bila reya xwe biçin.

Îskên xêdê hatin min, mi' destên xwe li dora xwe peland kuçkek biketa destên mi de ez li nav guhê vî ribatî evqa bi aqil bidim. Dengê celabî ez sekinandim, car-dî. Ji ribatî re digo: Karwanek dî dixuyê.

Ribatî go, saxluxê wa mi divê.

Celabî got: Mêr in, temam in; bi şal û şapik in; ew jî bi kum û kefiyên eskûdarî ne, di ser rexta re xencer û debance girêdane, li hevdu disekin in bê mişewret bi rê ve naçin, pîrsê jî hev dikin û wele diçin.

Ribatî xwe veweşand û bi dengê niviz ji celabî re go, dengê xwe hilnede, wa jî berde bila reya xwe biçin ji lewre ew dêrşewî ne.

Mi xwe kar kir ez rabim, neçîra xwe bikim ribat û celabê xwe. Ez hingî ji wa herdû hesabdaran xeyidim. Lê mi dî dengê celabî cardî hat şî ribatî re digo: Karwanek wê tê, birek mîrên temam in, milê wa hildayî ne, kutik li ber wan e, derpiyê wa spî ne û dirêj in; guliyê wa bilûkirî ne; heryek jî wa keffî di stoyê wî de girêdayî ye, dido dido bi hev re ne.

Mi dît, ribat li ser tezikê xwe' rabî ser neynûkên xwe; xwe vewşand û ji celabî re got:

[1] Mîra çoxsor in. Çoxsor ev eşîr in: Mîra, di-dêra, garisa, sohra.

[2] Ji Cizirê şimal û şerqê Diçlê hatiwa, teya, xêrika, mûsareşa, kiça ji wa eşîra re şilit dibêjin. Axayê batûya reisê wa ye.

X E B A T

Hindê em hene her dêxebitîn
Roj û şevê çet natebitîn
Dinya mezin e her dê we bitîn
Heqê me Kurda het-ta neçitîn.

Kurno; hon rabin çeka helgirin
Herwekî şeran piştâ yekî bigirin
B'zora destên xwe heqî wergirin
Da di vî wextî Kurdistan neçitîn.

Qewmê Kurdî da her bijittin
Alayê xwe hilden ser dar çiçqînin
Xortên kurd li bîr bilînin
Da nav mil-lela kurd nemerin.
ÇIYAYÊ ŞINGALÊ JANDAR MÎRZENGO

— Ba ke wa û paşê guhê xwe bide min û wa.

Qîrîn bi celabî ket; ew dengê bi şewt bi wî çiyayî êxist, we dikir qeqeq, mi divî e' rabim li ber vî dengê xweş bireqisim. Peşken baranê hê tehtin, roj jî hê derneketi bî. Ribat jî netirî bî, guhdariya dengê celabî dikir. Ji qîra celabê min deng bi çiyê ket; ef karwanê vê paşiyê li celabê min vegerandin; pev re dan ber qîra û bi ser ribatî de qulibîn. Dema nîzikî ribatî bîn deng ji ribat hat: go celabî, ji niha pêde tu binetire, şerê wa jî mi re bihêle, û qupên bi ribatî ket.

Ribatî qijînin didan, e' di nav deviya xwe da ji dengê wî ditirsîham û bi şer. Heçî nîzikî ribatî dibî wî singek lê dida û tavêt nav dafa de. Ji wî karwanê paşî dido ne filitîn, hemî di nav dawa wer hatin. E' bezîm-e mi tûrikê xwe teji kir ş'wa kewî ».

Çîroka Mistoyê hemikan xelas bî bî. Mi dît Misto livênê dikêşî serê xwe, divê razî, Resûl axa jî guhdarî me dikir. Mi ji Misto pîrsî, ev eşîra paşî kî bî?

Misto serê xwe ş'livînê hilanî; fedkirî Resûl axa razaye an hişyar e. Resûl hişyar bî û got-e:

— Xeberê xwalê min e, ev eşîr kî bîn, te ş'me re ne go:

Misto go: Ne te bext daye min?

Resûl axa got: Erê Misto mi bex' daye te.

Misto go: Ezbenî ew eşîr jîla bîn.

Resûl axa dey ne kir, bihnekê ma, rabî çû razî, lê mi dizanî ji Misto xeyidiye. Lê çî bikî bext da bi-yê.

Roja paştîr me Resûl û Evdîlkerîm li rûyên hev êxistin, ew li hev hatin; em jî vegezan mal.

EZDÎ Û OLA WAN

— Ji Mirza Tawûsparêz re —

— 2 —

SÊX Şêxên êzdiyan xwe kurên şêx Hadî dizanin. Mezinatiya ola êzdiyan di destên wan da ye. Riya bawerî, nîmêj, rojî û dêlindêzan ji şêxan tèn hîn kirin. Di wan çend rojên ko min şêx Xidir dîtî da, min sê-çar caran pîrsa reha malbata şêxan kirî bû. Min diyiya bû ez bizanim, ka di bavê çendan da digehê şêx Hadî. Di her sê-çar caran da ji di bavê bîst û sisîyan da gîhandî bûye. Lê di binavkirina bavan da pîr xwe şaş dikir. Jê xweya bû ko di dayîna van nawan da ne gelek î serwest e. Nemaze cara paşîn şêx Xelef jî î li wir bû. Min dît di binavkirina bavan da gotinên wan ne yek bûn û her dûyan qîma xwe bi gotinên hev ne dianîn. Piştî nivîsîna gotina şêx Xidir, min xwest ji devê şêx Xelef jî î binivîsim; lê wî a ber dilê min bîr bir û ne got. Gava min rû da ser, xwe bi vê gotinê ji min xilas kir:

— Gotina şêx Xidir welê ye û dirîst e.

Li ser gotina şêx Xidir be, reha wî di jêr va holê digehê şêx Hadî:

Şêx Xidir, şêx Eto, şêx Cindî, şêx Reş, şêx Sar, şêx Hleydo, şêx Husên, şêx Reş, şêx Hesen, şêx Simaîl, şêx Yas, şêx Sar, şêx Eto, şêx Yas, şêx Çayîd, Mir Mihê, Qulê Reş, şêx Meş'el, şêx Mend, şêx Bedir, şêx Adîn, Melek Ferxedin, Êzîdê Nemîr û şêx Hadî.

Êzîdê Nemîr bi navên sîtiya Zin û sîtiya Ereb du jin hebûn e ko Melek Ferxedin û şêx Şems ji a pêşîn, şêx Secadin û şêx Nesredîn jî ji a paşîn hatino dinê. Di pê şêx Hadî ra, ev her du kurên sîtiya Zin ji gewretirên ola êzdiyan tène jimartin.

Êzdiyên ko fro bi rêzaneke eşîrî dijîn, di bin hikmê şêxan da ne. Her çend eşîr ji wan, bi şêxekî va girêdayî ne ko dayînekê didîne. Her şêx di nav xelkê xwe da xwediyê girêdan û berdanê ye. Ji xwe di diyaneta êzdiyan da piştî Îxtiyarê Mergehê şêx tê. Ji ber vê yekê bêdîliya şêx kirin ne nişkûn e.

PÎR Di ola êzdiyan da piştî şêxan pîr tèn. Pîr di reha binatî da ji malbata şêx in, anê ji kurên şêx Hadî ne. Lê di parvakerîna kar û xebatên olê da hinek şêx û hinek jî pîr hatine nasîn. Herçî pîr in di bin destên şêxan da ne û di nav xelkê da arîkar û şûngirtê şêx tèn zanîn.

Pîrîtî ji wek şêxîtiyê ji bavî digehê kur û yek ji pîran nikare derî malbatê jin bike. Pîrek nikare keça' êzdiyekî bixwaze, an keça xwe bidê. Ji pîrekî ra keça pîrekî diyê.

Herçî debara pîran, li ser dayîna ko xelkê eşîrê dide şêxan e. Ji vê dayîna han dudu ê şêx û yek ji a pîr e.

FEQÎRÎ Di ola êzdiyan da piştî pîr, feqîr tê. Lê feqîrîtî wek şêxîfî û pîrtiyê ji bavê nagehê kur. Her mirîdê ko di ber destê şêx û Îxtiyar da xîzmeta ola êzdi bike dibe feqîr.

Karê feqîran di nav êzdiyan da digerin û der heqê ola wan şîretan li wan dikin. Debara wan bi parsê ye.

Ji bo feqîran cîlîne xweser hene. Nemaze di van cîlan da li xwe kirina xirqe şert e. Bi çav êzdiyan xirqe cilekî miqedes e. Ê ko xirqe li xwe bike (kî dibe dilê wî ye) mîrekî bikuje jî êzdi nikarin destên xwe dirêjî wî bikin. Bi êzdiyan be, êzdi xirqe ji xwe kiriye û daye feqîr. Ji ber vê, bêrûmetiya xirqe bêrûmetiye êzdi tê hesêb.

KOÇEK Koçekîfî, ji şêx, pîr, feqîr û mirîdan ko kîjan bibe xweyî keramet dikare haya Îxtiyarê Mergehê bike. Gava ji Îxtiyar ra bide xweya kirin ko xweyî keramet e, hînga dibe koçek.

Çîqas ko karê koçek di nav êzdiyan da hindik e jî qedra wî gelekî mezin e. Karê koçekan, her gav ji pêşendeyê nûçeyan didin û nexweşan bi dian xweş dikin; an bi axa avahiyeke miqedes teberikê salixî nexweşan didin. Hemberê van dian an salixana teberikê sedeqeyekê digirin ko riya debara wan di wê da ye.

MÎR Mîr mezinê hemî êzdiyan e. Çawan ko her eşîrêkê serekek heye, mîr mezinê wan hemî serekan e. Her êzdi salê tişteki xweya dayîn dide mîr. Ji bo civandina vê dayîne bereffkokine xweser hene.

Berê êzdi di gotina mîrên xwe da bi der ne diketin. Lê paşê, piştî ko mîran piştî xwe dane hikûmetê û mezinatiya xwe bi arîkariya wê kirin; di çav êzdiyan da ketin û rûmeta wan kêmbû.

Li ser gotina şêx Xidir be, koka mîrên êzdiyan bi navê Xelo ji xulamekî şêx Hadî dadikeve. Dibêjin Xelo mirovekî jîr û jêhatî bûye. Di saxiya şêx Hadî da dilê wî pîr ji xwe xweş kiriye. Gava mirinê şêx Hadî Xelo kiriye şûngirtê (wekîl) xwe. Bi vî awayî Xelo hefsarê mezinatiya êzdiyan girtîye dest xwe û kurên wî jî bûne mîr. (Dûmahîk heye)

OSMAN SEBRÎ

DIZ

Û DÛVÊ KERÊ

Câms Barton nivîsevanekî emêrkanî yê ko di welatên rohelatê nizing de geriyaye; di kîtebeke xwe de çiroka jê-rîn qise kiriye û gotiye:

Bi qefleki ereban re min berê xwe da bû Beşdaye. Di qeflê de not hêştir û nozdeh peya hebûn; tev de di bin emirê şêxê ereban de bûn. Ji şêx re digotin Mehmed kurê Mûsa. Di qeflê de şêx xudan girtin û berdan bû. Kir û gotinên wî qanûn û nizam bûn.

Bi min re heştê zêrên zer hebûn. Min ew kiri bûn cizdanekî de. Bi şev min cizdanê xwe dikir bin serê xwe û serê sibê gava ez hişyar dibûm; min destê xwe lê digeland û dizanî ko tu tişt pê ne hatiye.

Roja nehan, serê sibê gava ez hişyar bûm, min dit ko cizdanê min ne di cihê xwe de ye. Minê çi bikira, min berê xwe da şêx û got-ê: ya Mehmed kurê Mûsa, ev heşt roj in ez mêvanê te me û ji tegelek razî me.

Şêx li min vegerand û got: Mêvandarî adeta me ye, em pê îftixar dikin.

Min lê vegerand û got-ê: Tişteke li min qewimiye divê ez wî ji te re bibêjim. Û min mesela xwe jê re got.

Şêx got, emê îro di wî wari de bimînin, çend kerên me hene solên wan ketine, divê hêne sol kirin. Heta êvarê jî ezê pereyê te peyda bikim.

Şêx da rê û çû; ji ber çavan winda bû. Li wextê taştîyê vegeyîya, ket konê xwe û gote xelkê, bila kes neyit nik min. Heta wextê firavîne tê de ma û gava jê derket banî xelkê xwe kir û nan xwarin. Şêx cilên xwe ên nû li xwe

MASIVANÊ DER HOLKÊ



Herçi masivan bi adeti di keviyên cem û golan de rûdinin û masiyan digirin. Masivanine talyani hene ko di rojên sar de ji xwe re holikekê çêdikin; tê de rûdinin û masiyan digirin. Wek wî kaloyê bi sibil.

kiri bûn. Piştî firavîne şêx peyayên xwe dane hev, îşaret li min kir û gote wan:

— Îro ev camêrê ha mêvanê me ye. Pereyê wî hatiye dizin. Kê ew pere dizî. Di vê beriyê de ma ji me pê ve kes heye. Diz ji me û di nav me de ye. Ma mirov kengê diziya mêvanê xwe dike. Lê ezê wî dizî peyda bikim û serê wî jêkin.

Di konê min de kera min a gewr heye. Nizane bi zimane me xeber bide. Lê ewê ji me re diz eşkera bike. Niho hon yeko yeko bikevîyên konê min û dâvê kerê bigirin û bikişînin. Wextê ko diz destê xwe bidî-yê ker wê bizire.

Yekî lez da xwe ket konê şêx; midekî tê de ma, ker ne zirî, mêrikê me bi girani û qure jê derket. Peya li pey hev diziketî kon û jê vedigeriyan. Ez jî li hêviya zirina kerê bûm, Heke ker ne ziriya

pereyên min çû bûn. Min peya dihejmartin; bû bûn panzdeh. Sê peya ma bûn; ker bi wan ne ziriya minê çi bikira. Peyayê nozdehan jî ket kont û jê derket... Ker dîsan ne ziriya. Tu hâl di min de ne ma bû. Mehmed kurê Mûsa pê hesiya û lêdika gote min: « Tu ferîqet be, her tişt weke min xwestiye welê ye ».

Herçi ez, min di dilê xwe de digot, çi fêde ker ne ziriya, zêrên min çûn.

Şêx peyayê xwe xistin rêzekê û gote wan milên xwe ber hi pêş û rast dirêj bikin. Hemiyan jî ya şêx kir. Şêx dihate peşîya her peyayî, serê xwe dixiste navbera her du destên wî û midekî disekinî. Gava hate pêşîya ê dwazdehan û hinek sekini, bi dengê bilind got-ê: « Hey kelb kurê kelbê; kûçikê heram, dizê bênamûs, zû here peran bîne ».

NIMEJA

MİŞKAN Û EFIWA NEYARAN

Herweki bi agahiya teva-
yiyê ye, mişk û pising neyarên
hev in. Pisingek nexweş e,
nikare nêçira mişkan bike.
Hew dibine mişkek tê cem wi.
Pisingê da bala xwe, wî tenê
bixwe, têr nabe. Bi dekan got-ê:
— Mişko, ji babeliskan ve

heya ana di nav me û we de
neyartiyêke xwîndar heye û bi
hezaran me hon kuştine û iro
halê min dibîni. Berê min li
dergehê Xuda ye. Tiştên ko
çûn befêde ye û yê pêşiya
me mêzîna gunehan e. Hêvi
dikim tu ba gelek mişkên hûr
û gir biki, da bèn em hevavû
helal bikin.

Mişkê bi tenê çû gazi gelek
mişkan kir û hatin ba pisingê
û pisikê ji wan re got:

— Geli mişkan li hire nabe,
divê em herin mizgevtê û ez
îmam, hon li pey min, du
gamet nimêjê bikin û paşê
hevavû helal bikin.


Mişkan tev de, da pê pisin-
gê û çûn mizgevtê ko tenêr e.

Tevayiya mişkan der-
basî hundirê tenûrê bûn
û mihraba wan qula
agir û ariyê ye. Îmam
pising, ket devê qulê û
nema cihên kutbûnê
heye. Pisingê yeko yeko
mişk bi çetelên pencên
xwe daqultandin û çira
mişkên nezan anin.

Dibêjin, di van ro-
jan de neyaran bi hên-
ceta cejinekê efwek û
nimêja tenûrê hazir
kiriye. Em sofîyine
kevin û bêdestmêj in.
Yên bidestmêj dikarin
herin wê mizgevtê.

H. HÎŞYAR

Amûde: 20/8/943



CEJINEKE DERYAVANÊN FRANSA ŞEREVANÎ


— Mêrik lê venegerand, hema
çû, kevirek rakir, erd kola,
çizdanê min derêxist, anî û
da min.

Bi dîtina cizdanê xwe ez
gelek kêfxweş bûm. Lê ji
min re bû bû meraq şex çawan
diz nas kiri bû. Ker ji ne
zirîya bû.

Roja paşîr gava me da rê,
min jê pirsî. Şex gote min:

— Min dona, pûnkê di
dûvê kerê da bû. Bivê nevê
herkesi destê xwe da bû dûvê
kerê, ji diz pêve; ji tîrsa ko
ker bizire. Gava min destên wan
bihin kirin ji destên peyayê
donzdehan bihîna pûnkê ne
dehat. Bi wi awayî min diz
nas kir ».

DILAWER ÇARPINE



Filûqce daketinê: Esker ji vaporan li van filûqan siwar
bidin û pê digihin heta bejê.

FERMANA GUR

Carekê gurek hebû. Di çîyan da rûniştî bû, halê wî zehf perîşan laşê wî gelekî jar bû bû; ji ber ko di serê çiyê da tu tiştê heja ko bixwe peyda ne dikir.

Demekî di vi hall de sekini. Dikir ko, ji nêzan bê hêl biketa, û bimiraya. Rojekê hate bîra wî ko ji çiyê bête xwarê, û daket deştê. Dît waye gurekî qelew, canê wî di postê wî hilnayê, û pûrta dûvê wî weke ferşa topekê sekiniye, silav lê kir, gurê deştê lê vegerand û got-ê:

Te xêr e birayê gur, tu di vê belengaziya han de yî?

Wî got: Qe mepirse geli bira, ez ji bêxêriya çiyê li ber pencên mirinê mame, ka tu çawan î?

Gurê deştê gotê: Weleh, herwekî te ditiye, kêf kêfa min e, û van rezên li ber çavên te bi tevayî li ser hisabê min in, ji ber ko bi min re fermanek ji rezvanan heye, çî gava ez bixwazim dikarim bi serbestî têkevim nava rezan û zikê xwe têr dagirim.

Gurê jar, jî ê bedew û xurt re got: Birayê pak û dilovan, tu qebûl nakî, tu min bi hevalê xwe biki, û zikê min jî têr biki? go çawan na, kerem bike were, û çûn bi nav rezekî ketin.

Xwediyê rez jî, bê qeder jî wî gurtî dilrêş bû bû, û wê rojê du seyên fêris jî bo zêftkirina wî li ber holika xwe girêda bûn. Çî gava çav li guran kir, her dû se bera wan da.

Gurê deştê lez da xwe û baz da, ê din birçî û qels bû taqeta wî jî revê re nîn bû. Se gihêştin-ê û lê dan.

Gurê jar jî ber lepen wan direvî û gazî havalê xwe dikir û ban dikirê: Hevalo, ez di helaketê de me, zû fermana xwe eşkere bike û şanî eskerên rezvani bike.

Gurê xurt zor dida bezê û digot: kuro, bi de dû min, ev hikûmet bi zimanê fermana min nizane.

SIBHIYÊ DIYARBEKRI

CAN'AN

Cani canan me li balan diye bawer tu ew î Te cîhan girtî bi dîndara xwe nazik bedew î Bendewarên te bitin sed Key û pensed Emewî Mûyekî ez jî te nadim bi Rebia Edewî Li dinê her te bibînim ne heval û ne hewî.


Nazik û xûb û perizad e, şehînsahi key û beg Awirên tirê key û her du birû mahî felek Te li ser dêmê gulîn biskê siyah kir'ne helek Te cîhan girtî seraser bi du çavên di helek Dê jî difra te cîhan tev bitewî, ger netewî.

Rû-perî şeng û bedew naz û çeleng'şûx û şepal Bend û dilên di evîna te du sed Ristem û Zal Kuştîyên tirê dn çavên te Riza xan û Kemal Kî heye ser ne tewîni jî te ra her meh û sal Çî Misilman û Yezidî, çî Fireng û Elewî.

Nav û dengê te gihan çerx û felek bûne bilav Taci Kesra te li ser daniye tev zêr û dirav Pişt û kember te girêdane li bejna xwe zirav Tu li bejna xwe dibarinî hero misk û gulav Ji xwe şebnem diweşînim kî shehergeh dîrewî

Te jî min sine kirî kêlek û amancî evîn Ne jî derbê te jî ber kerbê te ez ketme nivîn Me jî ber derd û xeman dîkûl î, şadî revîn Me xem û derd û elem êş û "keder tev da civîn Mirxê davê te Cegerxwîn jî xwe bê hurz û xewî
CEGERXWÎN

.....



STOL Û BALAFIRÊN BEHRÎ DI HÊVKARIYÊ DE

.....

HINDIK RINDIK

MEYMÛNÊ XELASKAR:

Di nivroyê Ingilîstanê, di hewêrka Korşamê de, agir bi çiftlikê keti bû. Dinya şev û xelk nivisti bûn. Şewatê ji jêrê avahiyê dest pê kiri bû û avêtî bû jor. Xelkê bi kotekî canên xwe xelas dikirin û hinan jî xwe di penceran re tavêtin.

Di wê çiftlikê de şempanzeyekî kedikirî (meymûnekî mezin) hebû. Herkesî ew jî bîr rakirî bû. Lê şempanze ji nişkekê ve di ber pencerekê re xuya kir. Zarokê heştalî jî bi destî ve bû. Ew zarok kurê xulamekî bû û di

alkî avahiyê de di nav pêtên êgir de ma bû û treke xwe ne didit. Meymûn piştî ko zarok di pencerê re dahşand vegeyriya nav şewatê û zarokêkî din anî. Ew, birayê ê pêşin bû.

Şempanze di çiftlikê de bi wan her du zarokan re dilehist û hejî wan dikir. Gava agir bi avahiya çiftlikê ket meymûn çû bû hawara hevalên xwe.

KÊÇEK BERBERÎ ŞÊREKÎ:

Mehkema Bostonê vê paşiyê bi dawake xerîb mijûl bûye.

Xwediyê canbaxanekê digel dehbeyên xwe (wek şer, piling, gur, rovi h.p.) ji welatekî din hati bû Bostonê (Emêrike) û gava derbasî tixûb dibû, li gora qanûnê gumrika dehbeyên xwe da bû. Bi xwediyê canbaxanê re kêçine talimkirî hene û ew jî marifetan çêdikin. Gumrikçiyan ji mêrik gumrika kêçan xwestin. Mêrik qail ne bû û îş çû mehke. Mehkeme dûr û dirêj li dawê hûr bû, heçî qanûn û nizam hene, çavên xwe lê gerand; di heqê kêçan de tu madeke xweser peyda ne kir. Li ser vê yekê mehkeme rabû kêç ji xistin, tarifa dehban û xwediyê canbaxanê ji bo kêçan xwe bi qasî şêrên xwe gumrik danî.

LING AN SERÎ:

Di paşiya babelîska nozdehan de gundiyan ewropayî gava radizan li şûna serê xwe lingên xwe dikirin ser balgih û digotin bi roj ling ji serî bêtir diwestin.

XERTÛMÊ FÎLAN:

Li gora zanayan tebtetşinas di xertûmê filan de 40000 warsele (ede) hene. Ji lewre fîl bi xertûmê xwe dikare giraniya tonekê hilîne û mirovekî heta çil gavî wer bike. Carekê filek û qetarekî şimendiferê li hev ketin. Çend wagonên qetare jî rê derketin. Herçî fîl di bin wagonan de pelixî.

ŞEHREZAHÎ:

Balafrîne bîtanî di ser bajarekî Çekoslovakayê re fîrîn û hin beyaname avêtin bajêr. Elemanan ew beyaname zûka dane hev û gotin ehaliyan heçî ew beyaneme peyda kirine divêt wan binin kumandariyê, an ne bi cezayê kuştinê de bêne ceza kirin.

Bivê nevê ehaliyan hin ji wan beyanaman peyda kiri bûn. Lê şûna ko wan bibin û rast bi rast teslîmî kumandariyê bikin; ew bi diwaran ve zeliqandin û li rex wan bi elemanî nivisandin: «Yê ko beyanameyî wek vê beyanamê peyda kirin divêt wan zûka bigehîne



ESKERINE FRANSIZÎ EN REŞ DI ŞERÊ SICILYAYÊ DE

YÊN KO XELAS BÛNE

Li 21ê Tebaxê bû. Vapora inglîzî « Englo-sekson » berê xwe da bû Emêrika-nîvro. Parê vapore komir bû. Vapor ji giravên Asorê 500 mîlî bi dûr ketî bû.

Ewrine reş rûyê ezmên girtî bûn. Şeveke reş û tarî bû. Vapore berê xwe da nîvro-roavê. Çar derbên pey hev, wek derbeke bi tenê, di tariya şevê de teqîyan. Vapor di cihê xwe de hejiha. Jê bi çarek mîlê dûr, sehwişkê xuya dikir. Sehwişkê agir dikir.

Bi torpîla pêşîn peyayên ko li aliye rastê bûn, hemî berhewa bû bûn. Agir bi flûqeyan û bi telêgrafa bêtêl jî ketî bû.

Du deryavan li ber birca keptan sekîni, li flûqan dinihêrtin. Hêj yek hebû ko agir pê ne ketî bû. Deryavan lê siwar bûn û pê daketin berbirê. Siseyên din jî bi werisan xwe dahelandin; ew jî li flûqê siwar bûn. Piştî bihinekê du deryavanên din jî xwe gihandine wan. Di flûqê de bû bûn sê peya.

Filûqê xwe jî ber gera perwanê xelas kir û qederê sed mêtirî nîzingî noqavê bû.

Ronahikeyê dirêj, wek zîmanekî sor, jî noqavê dirêjî vapore dibû. Noqavê top û mîtral-yozên xwe li vapore girêda bûn. Noqavê nemaze dihingafte birca bêtêlê. Vapor li qûna xwe rûniştî bû, pozê wê bi hewa diket. Êdî vapore wek stûneke reş û sor xuya dikir. Lê gelek ne borî stûn noqî avê bû; noqav jî jî ber çavan wînda bû.

Ji 40 deryavanên Englo-seksonê bi tenê heft peya flitî bûn û di flûqê de li hêviya ronahiya rojê bûn. Roj li wan helat. Çarnikarên xwe dîtî; di behireke bîpîvan de bûn.

kumandariya elemanî; an ne wê bête ceza kirin ».

Bi vî awayî xelkê bajêr beyanama inglîzîzan xwendin.

NAZÎ Û MACIK:

Mêrl Obêrn — arîsteke sinêmayê — di xestexaneke Londrê de digeriya û kêfxweşî dida nexweş û birîndaran. Mêrl li ber birîndarekî sekîni û jê pirsî: Te naziyek kuştîye?

Birîndar: Belê

Mêrlê: Bi kîjîk destî?

Birîndar: Bi destê rastê

Mêrlê destê birîndarê rastê maç kir û berê xwe da birîndarê rex û jê pirsî: Te jî naziyek kuştî?

Birîndar: Belê min kuşt, lê ne bi destê xwe, lêbelê bi devê xwe.... XEBERGUHÊZ

Di nav wan de zabîtek hebû, bi navê Dîmf. Dîmfî di kumandare flûqê û berî her tiştî li birîndaran hûr bû. Birîna Blêçer, eskerê bêtêlê ê siseyan jî yê hemîyan xedartir bû. Perçak gule peyê wî ê çapê pelixandî bû. Zabîti bi arîkariya mihendîsê siseyan birîna Blêçer paqîj kir, girêda û ew bire serê flûqê.

Topçî Rîçard di hêta xwe a rastê de birîni bû bû. Perçak gule li ejnûya Morgan — aşbaz — ketî bû. Herçî Robert Tabîskot gule li movîka enîşka wî ketî bû. Destekî Wîdkom, gava li flûqê siwar dibû, ketî bû navbera vapor û flûqê û herîsî bû.

Di nav heft peyayên xelasbûyî de pênc birîndar hebûn.

Zabîti piştî ko birînen peyayên xwe girêdan berê keştiya xwe a 18 pê dirêj, da giravên Lêwardê, jî cihê flûqê 2800 mîlî dûr.

Lê ba û herkên avê berê flûqê li gora kêfa xwe badidan û didan hindavine din.

Mixdarek av jî ketî bû hundirê flûqê. Yê ko dikarî bûn xwe tev. Bidin, av jê vala kirin û hêlekan vegirtin. Li zadê xwe hûr bûn. Di nav flûqê de qederê 18 qutî goştê qelî, yanzdeh elbik şîrê hişkbiyî û sih û du rîtil peqşîmat hebûn. Di fiçiyekê de jî çederê pênc galonan av hebû (galonek pênc kîlo ye).

Ew tiştên ha tev de ji bo rojke welê di flûqê de hebûn. Ji qezajetîyan[1] bi tenê eskerê bêtêlê rîtilek flîti û kitebeke piçûk, tê de hin ayetên incîlê, jî vapore xelas kiri bûn û digel xwe anî bûn. Çend pelên rûznamekê jî pê re bûn. Pelên kitêb û rûzname kirin kaxeza cigarê.

Bi tenê zabîti jî xwe re çend pel kaxez hiştî bûn da ko li ser wan, roj bi roj, biserialiya qezajetîyan binivîsîne.

Êvarê li saet şeşan, zabîti xwarin da peyayên xwe, jî her yekî re peqşîmatek. Herçî av, bi tenê sibehî gava roj helat, hinek jê vexwarin. Li ava xwe hinek şîrê girtî kirî bûn û nîv peqşîmat jî pê re xwarî bûn.

Heta roja yekşembê ba jî par re dihat û flûqê ber bi armançê ve tajot. Lê li roja yekşembê ba sekîni. Dinya jî germ bû. Filûqê jî bê hindav û armauc diçelîçî. Ji germê devên deryavanan bi hev ve zeliqî bûn û peqşîmat hêl ko şîl bikin nikarî bûn bixwarana.

Blêçer û Morgan jî ber birînen xwe bêhal ketî bûn. Lingên wan werimî bûn. Benên birînen wan hinek sist kirin. Birînen wan edap girtî bûn û bihineke kirêti jî wan dihat.

Êvarê zabîti hinek av da peyayên xwe û gote wan, îro yekşemb e, honê goştî bixwin.

Zabîti qûtiya goştî vedikir û peyayên wî bi

[1]Qezajenti: mirovê ko qezayek, tifaqek lê qewimiye.

xwaheş lê temaşa dikirin. Zabit ji heryekt re çeniyek da. Deryavanan bi tîrsa ko wê zû xelas bibe goştê xwe hêdi hêdi dixwarin.

Lê roja din û a ditir qezajentiyan ezabekî mezin ditîne. Rojê canê wan dişewitand. Qey di veytûnê de rûniştî bûn. Xweh didan; xwehdanê bi çermê wan ve dibû û mesameyên wan digirtin. Serê sibehê zabit hinek av da wan. Ew av di devên wan ên hişkbûyî de wek mirekeba ser kaxeza ziwangê winda dibû.

Ën sax li hevalên xwe ên birîndar ava behirê dikirin. Bi xwe diketin behirê. Bi vî awayî hebû ko hinek tilna germê bişkiya.

Roja heftan bû. Zabit ji bo dilçewîniya peyayên xwe tevdirêk dtî bû. Rabû peşkek avêt. Li ser heft perçe kaxez navên heft rojan, ji 19ê Ilonê heta 25ê Ilonê nivsandin û ew kaxez kirin nav kumê eskerê bêtêlê û aşbaz çitîk dertanin. Îcar di nav van heft rojan de an rasfî vaporekê bihatana an ewê bigihaştana bejê. Û heçî ko çitîka reş deraniya ji hevalê xwe ê karkirî re para xwe ya avê wê bidaya.

Zabit peşk welê tenzîm kiri bû ko tukesî xesar ne kir. Diviya bû di nav van heft rojan de an bigihaştana bejê an rasfî vaporekê bihatana. Qezajentî ewçend bawerîya xwe bi peşkê anin ko ezabê ko tê de bûn ji bir kirin û wê şevê tev de di xwe re çûn.

Roja din bakî xurt ji par re dihat û flûqe xweş dimeşand. Mixdarek ava behirê ji ketî bû nav flûqê. Ba ji hinek xurt bû bû. Lê qezajentî ewçend ewlehiya xwe bi peşkê anî bûn ko nema guh didan bêrahetiyê. Ji wan ve ew şev di deryayê de şeva wan a paşîn bû.

Halê Blêçer gelek guhêrî bû. Bi tayê keti bû û ji pesnan diştexilî. Dida ber qîran, dijûn dikirin û carina ji dikenî.

Dane eqilê xwe, ji Blêçer re ji birîna lingê wî pê ve tu tevdir nîn bû. Bivirek bi wan re hebû; lê bivirekî kuh. Blêçer qîma xwe anî bû ko lingê wî bibirin. Blêçer lingê xwe li ber zabitê xwe dirêj kir; zabit ji bivirê xwe rakir. Lê dema ko dikir lêxe destê wî li hevalê wî ne gerîya; bivir danî rex xwe û gote Blêçer: « Hevalo, biltûna xwe fireh bike, herhal emê rasfî hinan bên; hingê dihtorek dikare te benc bike û lingê te bibire ».

Blêçer kenî û çavên xwe girtin. Û gava jê re para wî ji avê dan; gote hevalên xwe. Vê avê bidin hinên din, yên ko ji min bêtir hewcedar in.

Blêçer sibehî li saet heştan emirê Xwedê kir. Hevalên wî li cendekê wî li li hevûdin dinihêrtin û ne dixwestin bawer bikin ko Blêçer miriye. Ma hevqas zû. çawan mîfî bû. Belê Blêçer miri bû û nema dikarî bû di nav

zindiyan de bimîne. Hevalên wî ew avêtin avê û hetanf ko pêlan ew ji ber çawan winda kir lê temaşa kirin.

Roja yanzdehan zabit bi xwe bi bihranekê ket. Gonê wî guhêrî wek leymûnê bû zer û vereşîya. Di defternota wî de ev bûn xêzikên jêrin; « Herçî zadê me; dlvét me du galon av, çend elbik fêki hebin... »

Li çarê Ilonê zabit yekcar ji taqetê ket; nema karî bû xwe tev bidaya. West bû bû nîvro qezajentiyan ava ko di binê galonê de ma bû vexwarin û bi çavîne zîz li hev nihêrtin. Di vê navê de û ji nişkekê ve flûqê xwe li ser milekî xwîl kiri bû. Rîçard wek perçak tuxe ji flûqê şemifî, bihinekê li ruyê avê sekinî û paşê winda. bû. Barê flûqê sivik bû dî. Tê de pênc zelam ma bûn.

Du rojên din ketine navê. Tihîne zor dida wan. Tu delêletên baranê xuya ne dikirin. Zabit hêz da xwe û bi dengêkî niziv gote hevalên xwe « Ezê xwe bavêjim avê kî bi min re têt? ».

Mihendisê sisiyan got: « Ez ». Zabit çavên xwe li hevalên xwe ên din gerand. Heryekî serê xwe dikir ber xwe û deng ne dikir. Mihendis got: « Deqîqekê ez dikim bixwim û vexwim ». Mihendis tasa xwe ji ava behirê tijî kir û vexwar. Peqsimatek jî di ava behirê kir, û ew ji xwar.

Zabit hingustila xwe ji tiliya xwe kişand, ew da Vidkom û got-ê: « Heke tu xelas bûyî vê hingustilê bide diya min ». Bi ser ve zêde kir « Berê xwe bidin roavê ». Dengê gumenekê bi avê ket û her du zîlam tê de winda bûn.

Di flûqê de hej hinek peqsimat hebû. Lê bê av ne'dihate xwarin. Morgan yekcar behal keti bû û ji pesnan diştexilî. Herçî Tabiskot û Widkom bi zor bêr tev didan û flûqe dimesandin.

Sibetirê gava hişyar bûn Morgan ji cihê xwe rabû, gote hevalên xwe: « Ezê herim, ji vê kaniyê avê vexwim » û qesta pêş kir. Piştî du gavan Morgan jî di nav pelên behirê de winda bû.

Westê nîvro tihîne ewçend zor da bû Tabiskot ko xwe daheland û hinek ava bihirê vexwar. Piştî bihinekê bi zikêşîne giran ket binê flûqê û tê de vedigevizî. Gelek ne borî Vidkom jî da pey, êşeke giran bi wî jî keti bû. Her diwan li rex hev di binê flûqê de wek teyrîna birîndar xwe hiltavêtin. Heta roavê di vî halî de man. Piştî ko roj çû ava û tilna germê şikiya hinek li ber xwe dtin. Roja din gava roj hilat bi eşîne hej girantir ketin. Tabiskot gote hevalê xwe: « Ezê xwe bavêjim behirê; tu jî wek min bikî? ». Vidkom serê xwe dihejand û digot belê.

BERSIVÈN

(PIRSIYARIYÈN RUPELÈ 3an)

1 — *Yên ko çû bûn nêçirê sê peyan bûn: bapîr, bav û nevi. Ma bapîr ji ne bavê kurê xwe ye. Di vî awayî bav ji dido, kur ji dido ne.*

2 — *Di destê pêşin de her du kur bi hev re derbas dibin. Kurek li wî wîlt dimîne; kurê din şexlûrê vedigerîne vî mîlt. Vê carê bav bi tena xwe siwar dibe û diçeke mîltê din. Kurê ko li wî mîltî ma bû vedigere û birayê xwe ditîne.*

3 — *Dîsa di sê deqîqan de. Ji ber ko her pising mişka xwe di sê deqîqan de dikujit. Pising çiqas zêde bin ji wext zêde nabit.*

4 — *Madam jînik bi ye, mêrê wê miriye. Ma miri dikarin jinan binin.*

5 — *Berdeokê jîr kaxezek hilanî û ew çirand. Qazî li kaxeza mayî nihêrî lê de « here » nivîsandî bû. Qazî hikimê xwe da ko di kaxeza çirandî de « bimîne » nivîsandî bû.*

Vidkom daket avê lê hi flûqê ve hilawistî ma. Herçî Tabiskot xwe avête behirê û ji flûqê çar pênc gavan bi dût ket. Gava ketin behirê bi sariya avê hinek rih bi wan hati bû. Tabiskot banî hevalê xwe dikir û digot: « De were »

Can li Vidkom ji nû ve şîrîn bû bû; dest jê ne dibû. Vidkom li flûqê hilawistî, li Tabiskot dinihêrt. Tabiskot digot: « Tu çîre flûqê naqulipînî û nayî nik min » û dikir ko xwe bigehîne hevalê xwe û wî jî bi xwe re bikişîne biniya behirê. Lê nema karî bû melevaniyê bike. Herçî Vidkom destên xwe ji flûqê ne dikir û bêdeng serê xwe dihejand.

Dawiyê Tabiskot xwe gihande serê bêrê û ew gîrt. Tabiskot li hevalê xwe bi çavine xezebnak dinihêrt. Digot qey bêbextî lê kiriye. Belê Tabiskot dixwest noqî avê bibe û xwe bigehîne hevalan; lê ne bi tenê. Diviya bû ko Vidkom jî pê re biçîwa.

Vidkom terka laliyê da û gote hevalê xwê: « Xêretê bide xwe, xwe bigehîne flûqê, em careke din bidin eqilê xwe ».

Tabiskot hêz da xwe, gihaşte flûqê û her du heval ji nû ve li gemiya xwe siwar bûn. Wek zarokê ko piştî xeydê li hev tîn, bi şermî li hev difedkirin. Tabiskot gote hevalê xwê: « Ma em çîre kunyaka bi me re vena-xwîn? ». Şûşa kunyakê vekirin û hinek jê vexwarin. Gelek ne ajot elkolê tesira xwe şanî da. Her du jî dikenîn û bi dengine xerîb distrandin. Digotî qey di kazînoke Londrê de rûniştî ne. Hinekê din jî vexwarin û di xew re çûn.

Şev çû bû nivê şevê. Gnmegumên ezmanan ew hişyar kirin. Baraneke xurt dihat. Gelek

ne borî hundirê flûqê ji ava baranê tişî bû. Qezajentiyana tasên xwe dadgirtin û bera ser xwe di dan. Av di rex erzîna wan re diherikî û diket singên wan. Ji şahiyê da bûn ber qîran û wek heywanan diorîn. Piştî ko tîr vexwarin galonên xwe jî tişî kirin.

Piştî ko tîr vexwarin hêj nû bi birçîtiya xwe hesiyân û dan peqsîmatan. Piştî ko tîr xwarin, hinek rih bi wan hat û Vidkom gote hevalê xwê: « Min dizanî bû ko emê ji wî deravê teng xelas bibin; ji lewre gava em ketin behirê min ji te re got, were em vegerin flûqê. Tiwê bibinî emê xwe bigehînin selametê ».

Ev bû bûn 23 roj ko Tabiskot û Vidkom di orta behirê de digeriyan. Şeş rojan pey hev bakî qenc dihat û flûqê ber bi armancê ve tajot. Her du hevalan tîr xwar û vexwari bûn. Nûka titin hate bîra wan. Sibîlên xwe ji titîna ko di binê elbikê do ma bû dagirtin û kêf kirin.

Lê germê hêj bêtir li wan dişidand û hewa ritûbel bû. Li 18ê Îlonê ava wan ji nû ve qediya. Lê vê carê hewqas li ber ne diketin; elimî bûn û imîd di dilê wan de xurt bû bû. Baran ji nû ve hat. Têra xwe vexwarin û firaxên xwe jî dagirtin. Lê êdî peqsîmat xelas dihû.

Li 25ê Îlonê ava wan ji nû ve xelas bû û di tûrikî de ji hin perçeyên peqsîmatan pê ve tu tişt ne ma bû.

Herçî baran qut ne dibû. Têr av vedixwarin, lê xwarin bi dest ne diket. Rojekê, ji nişkekê ve tişteke li hêlekanê ket. Çi bibînin, masikî firolek di hundirê flûqê de bû. Masî kirin du perçe û ew digel dasiyan xwarin. Di pey wî re li rûyê behirê tiştine wek giya dîtin. Ew dane hev û li wan hûr bûn. Kevzên behirê bûn û di nav wan de heywanîne wek kevcalan hebûn. Qezajentiyana ew jî xwarin.

Gihaştî bûn 9ê Çiriya-paşîn. Rojeke baranê bû; vaporek dîtin. Vapor ancax bi yek kilome-tirê ji wan dût bû. Kirasên xwe deranfîn û ew lê hejandin; kirin ne kirin vaporek ew ne dîtin û di riya xwe de çû. Xwe ewçend tev da bûn ko ketin binê flûqê û dilê wan borî.

Çar rojên din keti bûn navê. Di nivê şevê de bi dengê behirê hişyar bûn. Behir rabû bû, pêline mezin di dora flûqê de bi hewa diketin û hundirê flûqê ji avê tişî dikirin. Hebû ko bin av biwana. Dane tasên xwe û av ji flûqê vala dikirin. Heta sibehî bi wî karî bûn. Roja din jî fûrtine ne sekinî. Piştî du rojan behirê danî û her du hevalan bi şahî li hev dinihêrtin û dikenfîn. Qey ji hev re digotin, me ev jî derbas kir.

Heft rojên din keti bûn navê. Şevokê ji Tabiskot re welê hat ko* masiyekî di nav filûqê de xwe tev dida. Tabiskot midekî lê geriya û gote hevalê xwe « min masî peyda kir ». Vidkom ji serê filûqê xwe dahelandi bû behirê û bi tiştêkî din mijûl dibû. Tabiskot careke din got, min masî peyda kir. Vidkom dişan lê vevegerand. Tabiskot ber*pe*çû. Vidkom jê re got: ev e bej. Tabiskot lê vegevand, bej ne bej ezê masiyê xwe bixwin, û masî kire çêmf. Belê gihastî bûn bejê.

Piştî nivro radyowê digot:

« Ji deryavanên vapura Anglosaksonê Tabiskot û Vidkom. yên ko xelas bûne, piştî

ko 70 rojî li behirê man, şevêdîn gihastîne giravên Behamayê. Reşikekî ew ditin û ew birin nik hakimê giravê. Her du ji bêhal û bê taqet in ».

Helkê giravê ji qezajentiyan re şahîneteke mezin çêkirin û ew birin xestexanê. Tabiskot û Vidkom midekî dirêj li xestexanê man hetanî ko hinek çebûn.

Vidkom çû Kenadayê û li vapura « Siyamîz Prîns » siwar bû da ko vegere welatê xwe.

Li 28ê Sibatê şirketa vapore dida zanîn ko « Siyamîz » hatiye torpil kirin û ji peyayên tê de tukes xelas ne bûye ».

SMAÎNÊ SERHEDÎ



Di eniya rohetê de ûrisan eleman şênandiyê û zêferîne mezin xistîne destên xwe. Lê ûris bi sebat û mîraniyê gihastîne wê neticê. Urîs xebateke zor xebitîne. Klîşa forin ji birên Lêningradê ye. Gava Lêningrad di bin mîhaserê de bû, emele ji alîkî di fabrikan de dixebitîn, ji aliyê din xwe hînî seymaniyê dikirin.

Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc lireyên sûrî — Ji bo welatên din lirekî inglîzî

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Celadet Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 2
HEJMAR 21

ÇARŞEMB
1 KANÛNA-PÊŞIN 1943

RONAHI


ANNEE 2
NUMÉRO 21

MERCREDI
1 DECEMBRE 1943

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON: 12-29

HAKIMÊ HINDISTANÊ



Hindistan di taca kişwerê Ingilistanê de gewherê behatir e. Karê Hindistanê hakimeki ingilizi digerinê û jê re naib melik dibêjin, yanî wekilê qral. Îro hakimê dîndistanê merêşal Wêwel e. Hakim di qesreke depdepe de bi xulam û nedim û berdeukan ve dijît. Mihafizên qesirê eskerine hindî ne; herweki klîşu me rave dike.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1943


DI VÊ HEJMARÊ DE

Pesna Dîlberê	Cegerxwîn
Cihû û Kurê Têcir	Çirokbêj
Napolyon	Osman Sebrî
Şîna Jinekê	Osman Sebrî
Ji Min ve	Lawikê Tiloyî
Hîrç û Şivan	Jandar Mirzengo
Tiştên Kevin	Ronahî
Torpîl, xwe kar bikin	Cemilê Tacdo
Keça Klêopatré	Bişarê Segman
Şehînsaba Cihan	Cegerxwîn
Êzdi û Ola wan	Osman Sebrî
Tiştên Libnanê	Nêrevan

PESNA DÎLBERÊ

Me di bû dîlberêk nazik sehergahan xweyanî bû
Kitan û perde û çarîk ji ber dêman hilanî bû
Hilanî perde û poşî gumaş û etles û pûşî
Ji le'an şerbetek nûşî ji rengê zeferanî bû
Gerandî şerbetek meyxweş ji şîra safî bû bê xîş
Kesê nûşî ne ma lê hiş di kasa kamiranî bû
Ji wê kasê ji wê tasê ko nûşî min li ser masê
Me hiş çû girtî weswasê ji hikmê «lenteranî» bû
Ji hikmê duriya yarî di dil da pêtiya arî
Di vê hesnê weki dari birûsk û şe'şemî bû
Birûsk û pût û lm'ian e disojit her ten û can e
Welê dil rengê perwane li dorê helqe danî bû
Li dorê hat xweş refî li dil an tîriya leffî
Birin kir dil dixîftî ji wan birhên kemanî bû
Çi ebrû wê çezeli rengê di henda rû wekî pengê
Semaî xet û orjeng e û an jî neqşê manî bû
Cegerxwîn bû kurdê torî ji eşqa dîlbera horî
Şekerxend û gulîsorî yeqîn mirxê zemanî bû

CEGERXWÎN



BOMBAVÊJEKE EMÊRIKANÎ JI TÎPEKÎ NÛ

ÇIROKA KURDMANCI

CIHÛ Û KURÊ TÊCÎR

Têcîrek hebû, pîr bû bû. Banî kurê xwe kir û got-ê: « Kurê min ez pîr bûme, ezê bimirim, piştî mîrîna min dîvê tu herî cem wî têcîrê cihû, nasê min, ewê şani te bide lu bi kûjan awayî bixebîti »

Gelek ne ajot têcîr mîr. Kurik çû cem wî têcîrê cihû. Perê xwe jî bi xwe re bir. Derbas bû cem cihû, silav lê kir û rûnişt, cihû jî wî pîrsî, sebêba hatîna wî.

Kurik go: « Ez kurê şîlankes im, tu xweş bavê min çû -rehmetê, bavê min qewitti li nûn kiri bû go ez bêm cem te, da ko tu şîxul û emelê ticaretê şani min bidî » Cihû go: « Te pere bi xwe re anî » kurik go: « belê » Cihû got-ê « Nexwe here bi hemî perê xwe dîvê roviya bikire û bibe bajarê Cizîrê, lê fêdeke mezin bibîni ».

Kurik da rê û çû, cihû jî kêfxweşiyê dikent. Ji xwe ê cihû dixwazê kurik bixapîne, perê wî bê fêde bide wînda kirin.

Kurik çû bi timamê perê xwe dîvê roviyan kirin û çû bajarê Cizîrê, di xanekê de danî. Kes dîvê roviya nakirê, xerçiya wî namîne, nikarê heqê xanê bidê. Xançî her kêlî tê û jê heq dixwazê.

Kurikê reben derket derve û li ber dîwarekî rûnişt û girt. Hakîmê bajêr derbas bû, di kurikêki pîrnîsî, reben rûniştîye, digirt. Hêkim jê pîrsî: « Ji bo çî digirtî? » Kurik lê vegevand û got: « Halê min zehmet e, qet mepirse » Hêkim carke di jê pîrsî û zor lê kir. Kurik rasti go, ê cihû çî şîrel lê kir û ew êxiste kûjan belayê.

Hêkim seh kir îş çî ye. Çû mal û şand pey kurik, dîvê ko bi çerxîkî kiriye bila bi pênc çeraxîyan bifroşe.

Kurik li gotîna hêkim ecêbmayî ma, kant kiriyar, lê dey ne kir.

Sibelîr hakim rabû delal berda nav bajêr: Heçî çihwên Cizîrê hene dîvê pênc dîvê rovi bi serê xwe ve kin, heçî dîvê rovi bi serê xwe ve ne kiriye mîr wê serê wa jêkê.

Cihû tev de rabûn, xwe dan xana ko kurik lê peya bûye, dîvê roviya hemî kirin, yek jî pê re ne hiştin.

Bi wî awayî kurik dîvê roviya bi temamî fîrot û bi fêdeke mezin. Lê swînd xwar ko careke din bi cihîwa ne şewîre.

DÎROKA

JÎNA NAPOLYON

« Sîyaseta diristîr û çaktîr rastî »
« û gengozî ye. Ên ko bi rustîyê »
« ne bawer in xîstredde ne ».
Napolyon

— 5 —

DI NAVBERA FRANÇA Û KÛRSİKAYÊ DA

Cihêkî ko holê tê da tiştên mezin dibûn û Napolyon î tê da bû, diviya bû ew jî bi para xwe hin kir rabe. Kirin welê ko bi mezinatiya ruhê wî ketana.

Piştî ko Napolyon di dibistana herbiya Parisê da bi derketî bû; bi ritba milazimtiyê şandi bûn sîrqa Lafêr a ko li bajarê Valansê dima. Wê hingê bavê wî û herçî nasên bavê ên ko piştî xwe bidanayê niiri bûn. Ji ho pêşvebirina ritba xwe di leşkeriyê da kesî mezin û xweyî nîfûs jî nas ne dikir. Hingê meaşê wî mehekî jî sê zêr û nîvan zêdetir ne bû. Heke qîma xwe bi vê yek bianiya û şolê xwe serberdayî bihişt, diviya bû şêş salan bimîne ko bibe milazim ewel û piştî wê bi şêş salan jî bibe yûzbaşî. Bi vî halê han xwê ne digihand ritbeke çak dê bajotana teqaidê ko meaşê wî têra xwarina wî nekira. Yan ramanên han pêşendeyek tarî tanî ber çavên wî ko çav berda kêsên heja heya ko jê destkewtî bibe. Di ber ra jî bala xwê da xwendinê ko ji bo karên mezin, zanîne bî xwe ra bibîne. Ji xwe berikên wî ên vala di vê yekê da jê ra dibûn arîkar û rê nedidan çavdana kêfê.

Wê çaxê kitêbên ko ramana serxwerabûnê didane xelkê li her hêleke Franseyê belav bû bûn. Napolyon piraniya van kitêbên han dixwandin. Lê mela li ser kitêbên tarîx û feylesofên nû ên wek Voltêr û Rîso diman. Vê xwendina han ewçend zanîna Napolyon pêş da bir ko paşê gava beyanat jî leşkerê xwe belav dikir; dilê nivîsevan û edîbên mezin pê diman. Herçî agirê ko ji nivîsanên wî diçûn, ew bi tenê ji ruhê wî ê agirfeşan bi 'derdiketin. Agirêkî welê ko mîna birûsê şopa xwe di ruhên xwandevan û guhdaran da dihişt.

Ji xwendina kitêbê wan feylesof û nivîsevanan şopeke din di ruhê Napolyon da ma bû ko ne ji keşeyan hez dikir û ne jî bawerî ola Mesîh bû. Wî her bawerî bi Xudanê erd û ezmanan hebû.

Napolyon serekî xortoniya xwe di nav



fransîzan da ma, lê hej wan ne dikir. Hin jî wek korsîkiyên mayî difikirî û bi çavê zorke-ran li fransîzan dinêrin. Wî her çav da bû serxwebûna korsîkayê û serê xwe di wê rê da diwestand. Heta carekê xwest ko dîroka korsîkayê binivîse. Li ser gotina hin dîroknî-vîs an be hinek jê nivîsî jî. Lê paşê hin bûyer fikra Napolyon guhartin û ew kirin fransîzekî ji fransîzan pir xîretkêştir. Ew bûyer ev bûn ko piştî serxwerabûna fransîzan, rê û rêzanên hikûmetê li Franseyê û Korsîkayê tev rabûn. Korsîka ko berê koliya(1) Franseyê bû, piştî serxwerabûnê kirin wîlayetêke Franseyê û bi wî çavî li xelkê wê hate nihêrtin. Heye ko jî vê pê va jî sebebîne din hebin û hebûne.

Lê qederê, herwekî daxwaza Napolyon ne kir û ne xwast ko ew serdar bibe mezinê Korsîkayê bi tenê; jê ra textê Ewropayê ê mezintir-pêkanî û taca împeratoriya Franseyê da serê wî.

Piştî vê taca ko qederê jî Napolyon ra pêk tanî, heke dawiya wê bi dîlî ne gihandî bûna girava Sant-Helênê mirov dikari bû bigota, Xwedê nivê bextê dinê daye Napolyon. Ji ber ko wî çav da bû mezinatiya giraveke

(1) Koli bi mîna mistêmerê têt. Kurd bi rê-zanên eşîrî dibêjin îlan eşîr koliya îlan axayî ye.

wekî Korsikayê; bû mezinê hemî Ewropayê. Lê tehlîyên Sent-Hêlênê bi qasî ko xweşîya wê mezinatîyê bi xwedîyan bidana jî bîrkîrîn e dijwar bûn.

ÇÛYÎNÊN KORSİKAYÊ Û ROJÊN RES

Piştî ko demekî dirêj firqa Napolyon li Valansayê ma, jî ber çêbûna hin tevlokî betariya wî şandine bajarê Lionê. Hingê heft sal bûn ko Napolyon jî welatê xwe Korsikayê bi der ketî bû. Ji van heft salên han hinek di dibistanê da û hinek jî di leşkerîyê da derbas kirî bûn. Êdî bêriya welêt û xelkê malê zora wî dibir.

Di sala 1787an da jî bo çuyîna Korsikayê destûr xwest û jê ra hat dayîn.

Demâ Napolyon çû mal û halê wan dît gelekî heznî bû. Piştî mirîna bav û apê tevgera malê di stoyê dayîkê da ma bû. Bi hatinek pir hindik xwedîkirîna wî zar û zêçî ne karekî hêsanî bû. Ji her vê yekê destengî di nav mala

Bonapart da gîha bû pêpîlinga dawiyê. Cihê ko Napolyon bi wê çuyîn û dîtîne kêfxweş bibûna, di kulfî vegeerî bû Fransayê.

Di vegeerê da firqa xwe li bajarê Oksonê dîtî bû. Ji bo ko bikare çend peran jî meaşê xwe bi hevxe, heya mîkûn bû xwarîna xwe kêmkî dikir. Lê geda wî a jar ew dijwariya han ne kişandî bû ko pir ne çû bi nexweşîya kêmxwîniyê ket. Heya ko bijîşkê firqeyê jî mirîna wî fîrsî.

Nexweşiyê pê ra dirêj kir; welê ko nema dikarî bû du mehan li ser hev, bê ko di nivnê keve bi karê xwe rabe. Di sala 1790an da careke din jî bo çuyîna Korsikayê destûr xwest. Vê carê, heya jî nexweşiyê xelas bû li mal ma.

Di vegeera Frauseyê da firqa wî hîn li Oksonê diman. Ji bo ko barê mesrefê diya xwe hinekî sivîk bike vê carê brayê xwe Lwî jî bi xwe ra birî bû. Di vê demê da destengîya ko Napolyon jî her hindikiya debarê dîtîye, kêmkî mirov dikarin bikêşin. Ew meaşê ko têra mirovekî bikira; wî pê xwe û brayê xwe tev bi xwedî dikir.

Di nav vê destengiyê da Napolyon xwe bi ber pêlên yasê ne xist. Wî demên xwe ên vala hinek bi hinkîrîn û xwendîndayîna brayê xwe û hin jî bi nivîsaran derbas dikir. Ew nivîsaran ko didane belavker (naşîr) an û bi bihayê wan kêmasiyên debara xwe tikûz dikir.

Dawî di sala 1791an da bû milazîmê ewel û şandine firqeya çaran, bajarê Valansayê. Ew bajarê ko cara pêşîn çû bûyê û tevî brayê xwe Lwî di a di oda xwe a berê da rûniştî bû. Erê bi vê rabûna ritbê heke hebekî meaşê wî zêde bû bû jî, teqez bi rihetî têra du mirovan ne dikir. Napolyon herçiya ko jî wî meaşê nuh digîhande hev dida kitêbxanan, da ko tê da bikarî be têr kitabîna bixwîne û jî havîla qelemên hemî fransîzên xweyî ramanê bê par ne mine.

ŞAGIRTINE KÊMBRÎÇÊ



Kêmbriç ne bi teuê di Ingîlistanê tê di hemî dinyayê de ûnîvêrsîteke bi nav û deng e. Di Kêmbriçê de her textîlîlîm û fên lêne xwendin. Lê birekî şagirtên vê dibistanê tro hîni balafirvaniyê dibin. Wek yên ko di kîtşa me de lêne dîtin.

ŞINA JINEKÊ LI ŞER GORA BIRHO

« Ji Bîrên rojên kevîn »

Îşev di mecala razanê da keserên felata welêt, kûfîn û zarînen dîliyê û bêkesiya me kurdan, wek tevazan ji dilê min va diyar bûn. Di nav ax û waxên bêfêde da li ser tenîştê çep û rast vediliqîtm; min çî dikir qet rîya xewê bi çavên min ne diket.

Di nava nivînan da, derd û kulan wekî teyrên bilatexur dirêjî kiloxê min dikirin. Jînenîgariya min, dilî û biserhatiyên mîlet û bindestîya welêt, her yekê bi awakî ez diêşandim. Qey ko Xwedê ne dixwast rihetîya can û cendek bide min...

Wekî hezrîngên xewê pêlek bayê xurt di dev û bêvilên min ra avêt. Min min bêhna xwe ne girtî bû ko erd bê awa hejîya. Hejîneke welê ko avahiya ez tê, çîyayên pêşber, derya, ezman, stêrk tev da serekî dirêj hejîyan. Li ber vê hejînê erd wekî girekî xweliyê hilweşîya. Bi vê hilweşînê ra ez jî wekî kevirê ko ji avahiyên hilweşîyayî dipengîze, tot bûm û çûm...

Pîştî demekî, dirêj ez li eredkî ne nas rawestîm. Canê min wek kulêv tevîzî bû û nema diêşîyan. Ez hinekî welê bê tevger


vezeliyayî û mat mam. Min dida bala xwe û digot: gelo ev çî bû, çî li min qewimî û li kê derê dimînim?!

Hêdî hêdî bi civandina vênê ez rabûm ser xwe, serekî min li dorhêla xwe hêre kir; ez di navbera du çîyan da dimam. Çîqas ko min ew der ne dîtî bû jî, li ser salixdana xelkê wî cihî ez tê gihêştîm ko ew her du çîya, her du Ararat in.

Hiv gelekî bilind bû bû, her tişt bi hemdê xwe diyar bû. Ez pîr î minêkar bûm ko herim ser Ararata mezin. Lê ji ber ko dijwariya wî ber bi çav bû, min berê xwe da Ararata biçûk, wargehê şerkerên kurd...

Ûn ko îro dîlîne dizanîn ko Ararata biçûk ketiye çî hali... Her zinar û deviyek, komek hestiyê şerkeran di sersiyên xwe da vedişêrin. Nemaze di kûntarên çiyê da mirov şopa yekî-çiyêke dil bi şewat di van komikên hestîyan da dibîne. Serê yekî li ser parsoyê ê din, lûlîkên ê sisîyan di nav mûfîrkên piştê ê çaran da, ew yekî bi awakî ibretamîz şanî mirov didan. Wan hestiyên ko bi bîrafî hev û din himbêz kiri bûn çîqas dilê min zîz kirin û derd û kul anîn bîra min!. Ma gelo tu bê jî me kurdan yekî-î, her dê piştî mirîne bihatana pê? An Xwedê ev tiştê çak di xweşiyê da ne kiri bû para me?!

Di nav belekiyên berfê ra lez û bez î du



ESKERINE FRANSA ŞEREVANÎ DERDIKEVIN ERDÊ KORSİKAYÊ

sé héhnan gihastim seré çiyé. Min doraliyén xwe çav kirin, xweş diyar bûn. Min gelek dil hebû ez gora Birho bibînim û herim dîtina wê.

Di aliyê rojhelat û nivro da qûnçeke nû-çêkirî ji wergerandina kevîran xweya bû. Ji wê pê va, tiştêkî din ko şopa goran pê keta tine bû. Di jor da min xwe ber da û dakişim ser qûnçê. Di nivroyê min da dengê lêhêlêla jinekê hat. Carcaran nalînên zarokêkî ên dil bi şewat ew lêhêlêl dibîrin. Ew jî bi rev her ve qûnçê diçûn; yek û dudû kete pêş min. Min balâ xwe dayê, jineke serqot, pêxas, porhinc, pot li ser zivir zivirî, çelîyekî biçûk li ber himbêza wê kûr dinalîn.

Nêrîna wê hêreyê (menzere) dil û hinav ji mirov dipertand. Hele ez bi carekê mat ma bûm; min di dilê xwe da digot, ma gelo tu bê ev jinik jî bi vê hejîna erdê ra pengizî û di vir ra bi derketî?!. Li ser vê ramanê hindlk ma ko ez deng lê bikim û jê bipîrsim. Paşê ez ji ramana xwe vegeirîm û bê deng li pê çûm.

Wê herî min xwe gihandê qûnçê; bi gihêştinê ra dengê qûrîn û zarîneke dil soj bi ser ket. Welê bi awakî zîz û kezexur dest bi şinê kir û lorand ko kevîr li ber dihêlin. Hele nalînên biçûk di nav şinê da hlnav jî min perçe dikirin. Pê da pê da dest û çong jî min sist dibûn. Halekî welê li min qewimî ko nema min dizanî ez heme. Gava wê dest bi şinê kir navbera min û gora Birho çêh-pazde gav ne ma bûn. Gotinên jinikê bê dijwarî di guh û dilê min da cih digirtin. Pêşya şinê holê bi ser xist:

*Rabe de rabe Birho de rabe,
Bo çî Aravat te hişt xerabel..
Îro disa hat Roma bê eman
Gund şewitandî nê hişt xwedî can
Geliyê Zilan sotin wek xijî
Pê ra şewitn çar kurên min jî
Dema ko Rom li me vemîlîkî
Keçek min ma bû ew jî hurîkî
Bes gedek maye singo lê dane
Mirtin û maytî Xwedê dîzane
Rabe binêre li gedekê min
Hene çend birtn li cendekê min
Mêrên me kuştîn bêbav neyaran
Em tev revîyan li şîna waran
Bi serên me va ne ma têlek por
Şîna tajangan tev da bûn reş nor
Keç û bûk ne man bê namûs kirin
Herçî ko çak bûn ji xwe re birin
Me namûs ne ma çû di talanê
Şermende ne em li pêş çihawê
Bêhnek rihêlî jî bo me ulne
Her gav li ser me holê qûrîn e
Nema me xwedî tola me rake*

*Roman bikuje welêt ava ke
Piştî tu mirî welat ker û tal
Bî hêlekê ma Ferzendê^[1] delal
Bêbext felekê ne da te hêwan
Da bixebitî wek şer û dêwan
Hergav li ser kir dengê te dihat
Destên welalî dibîne kelat
Îro dinêrim kelatên kurdan
Ji bo neyaran gengaz û hêsan
Vedibîne wek xanên bê derî
Tê da nabinî west û dijwarî
Ko tu dimît Xelkê me Zilan
Bila ji te ra bibîna qurban
Cihan dizane ko tu çî can bû
Piştîmêrê kurdarşêrê yezdan bû
Ez sondê dixwim bi wê vena te
Kurdanc nabinî yekî mîna te
Bo namûsa min diwê tu rabî
Du salên din jî gorê cida bî
Dengê lîfingan qet nayê jî kir
Piştî tu mirî kes ne ma li wir
Dawid^[2] bi tenê wer maye dilkerb
De rabe bigre lîfinga şesderb
Carê neyaran vegijjîtne
Şirê diya wan di poz ra bine
Tevî Xelikan^[3] êrişê berdê
Tola namûsê mêhle li erdê
Rabe bilve gor ne çiyê te
Lawanê kurdan dest û piyê te.*

Dema gihaste vir, herwekî vecinîqê deng jê hate birin û bi ser biçûkê xwe da xar bû nihêrî, destê xwe da ser dil; bi dengêkî hîn xurtir qûrîn bi ser ket û got:

— Aha .. aha, ew jî mir; ew jî çû .. Êdî tu tiştê ko min bi jinê va grêbide nema. Namûs çû, mêr çû, keç çû, çar kur şewitîn; bi tenê di dest min da ev çêlî, ev gedê ma bû, niha jî ew çû.. Qey ko Yezdan jî rû ji me kurdan badaye û bûye arîkarê neyar... Em qels û reben, neyar xurt û zexîn, bext rû ji me bada û Birho jî ranabe... Çû.. çû.. tola namûsa me jî .. em .. em wê jî nabînin ! ..

Di vê demê da nema gotinên wê xweş dihatin bihîstin. Bi heyecaneke ecêb cendekê biçûk rakir û li ber şewla hîvê jî bo cara paşîn lê nihêrt. Bi tevgereke tertîlî da ser dilê xwe û guvaşt; kûfîneke bê awa bi ser kek. Hînga cendekê biçûk di ber gorê Birho ra dirêj kir

[1] Wê gavê hîn Ferzende ne mirî bû; lê bi guleyekî topa ecman birîneke mezin lê bû bû. Heya hinêkan digot, lingekî wî jê bûye.

[2] Nêvê kurê Birho ê mezin e. Piştî mirîna bavê xwe gelek şer di rîya welêt da kirin. Ji malbata Birho ew bi tenê maye.

[3] Navê eşîra Birho ye ko ev eşîr bavêk jî bavên eşîra Celalîga* a bi nav û deng e.

û dîsa şîna xwe holê bi ser xist:

*Binhêr ew ji mir ez mame bê fer
Li ser namûsê biçûk ji da der
Hinde kulên reş û derd û kivan
Namûs e ko xortî bîspêrin jinan
Dil hene ko pê jehrê bi cî kin?!,
Mêrxasên kurdan bila fedî kin
Wekî Xelikan nakirê xîret
Holê ji lewre em bûn eşaret
Madem tu naçî di hewara min
Ji nihê pê va mirin para min
Niva jî Xwedê min navê jiyîn
Piştî mirinê tola xwe diyîn
Namûs û kur çûn bes maye ev can
Wî jî ji bona te bikim qurban.*

Bi kuta bûna şînê ra guliyên xwe çep û rast li stoyê xwe pêçan, carê duduyan p-1 pel li dora xwe nihêrî û ev gotin kirin:

— Hê canê bê rûmet! bi dest min da tu bi tenê mayî; min te ji navê. .

Bi vê gotinê ra bi her du destan guliyên xwe kişandin. Xwedê, çî dengêkî ecêb ji gewriyê dihat. Min da xwe ko herim nehêlim; lê çokên min rikrikîn û tevger ji min ne dihat. Du sê caran min xwe deverû ber vê kil da; lê bê fêde bû. Min guh dayê hîn ew dengê kirêtê jê dihat: Di nav wê vişnê da gotinên ko ez te gihêstîm ev bûn:

— Tola namûsê . . namûsa min . . min . .

Piştî du deqîcan pêjna dengê jinikê vemirî. Dereng dereng çokên min hatine ber min û rabûm çûm ser her du cendekan û gora Bîrbo. Berî her tiştî min dest avêt nebza jinikê; lê ji mêj va can da bû. Min biçûkê wê hil da û lê

nihêrî, birfina du singoyan di rex hev da li ser çîçikê wî ê rastê hebû. Pirtalên li ser cendek di xwinê da wekî reqemeşkan lişk bû bûn. Piçek xwîna ter di bêvîla wî ra xwe berda bû ser dev û lêvan û hîn nuh qeşmax girtî bû. Gûn lê zer û zipilî bû bû. Lêvên wî hinekî ji hev bi dûr ketî bûn û diranan wekî mirariyan xweya dikir. Gava mirov lê hûr dibû, ji xwe ra digot; belbî cendekê vî gedeyî ji bi vê qe-dera malkambax û vî halê nedî û ne binayî dikenel...

Ma gelo ev çî zînat bû?!.. he em giştik gunehkar; lê vî biçûkê du sal û nîvî çî kiri bû ko Yezdan sînga wî da bû. Ber singoya neyar?! An ew cezayê gûnehên ko bav û kalên wî kiri bûn dihatê pêşîya wî?.. Ma seza ye ko yek cezayê kirên ên din bikîşîne?.. Ma cihê wê yekê di rê û rezanên Xwedê da heye?!. .

Bersiva van pîrsên han gelekî hêsan e. Divê cihê vê yeka han di rê û rezanên Xwedê da hebe. Mafir mîrasa ked û zebata bav û kalan ji me ra dimîniye; ji bo çî ein ji mîrasa kirên wan ên kirêt û bêrê bê par binînin. Teqez ev jî ji edaleta Xwedê ye. Ma gelo kî dikare bêje ko «best» ne havîla kirên bav û kalan e û di kirasê rasthatinê da tê pêşîya kur û neviyan?!.. Lê ne hewce ye ko ez di vî warî da xwe bi ber pêlên lehiya felsefeyêke nuh bixînim. Bi tenê dikarin bêjim ko heke bav û kalên wî gedeyî berî daketîna boblatê di riya welatê xwe da xebitî bûna, fro ew gede bi wî halê han ne dimir.

Li ber nehêrkên holê mirov nizane bi awakî dîrsit bifikire. Di halletên holê da her

car atîfe li ser eqil hikim dike. Di wê lingê da li min jî welê hat. Her ko min li pêş xwe li wan her du cendekan nihêrî û hevdeyên şînê û xwe kuştîna jinikê hate ber çavên min, her wekî selek xişor bi ser dil û hinavên min wer be. Pêl û gurik li dil radibûn û di dev û kepyê min va bi der diket..

Çî bikim, tiştêk ji destê min ne dihat. Xwedê, wê gavê mêraniya di dilê Ferzende da ne dida min ko dest bavêjim darê lîngê û piştîmêriya tola jinik û biçûkê wê bikim!. A ko jî destê min bihata giliyê vê zînata nedî û nebinayî bi Xwedê da kirin bû. Di wê demê



TANGEKE EMÛRÎKÂNÎ DI KÛÇÛYÊN BAJARÊKÎ TALYANÎ DE

da destekî min di bin stoyê biçûk da û destê
din li ser çavên jinikê; wan çavên ko ne
dixwastin bê dîtina tola xwe di hev kevin, min
berê xwe da ezmên û ev gazind ji Xwedê
kirin:

*Yezdan ev çi zînat e? bi ser me da dibare!..
Heke bi a te nebe neyar veya nikare
Mê çi kir ko te holê ji derê xwe avêlin
Di nav kira neyaran xwastina te diyar e!..*

*Ma heja ye vî qewmî her gav tu nas dikirin,
Di rîya sermanên te rojê hezar dimirin..
Îro ji bi vî halî namûs û biçûkên wan
Bidî destê neyaran paymal bikin bigurin?!..*

*He binhêre ji biçûk nivîstî maye bê jin!
Tu bê kîjan dihovî qefsing jê kirye birin!..
Seza bû ko ev berzik te êxîste vî halt?!..
Ji dev lêye bîna şîr di kepo ra lêye xwin!..*

*Daytka wî a bi namûs te da destê neyaran,
Namûs û kur û mêr çûn tev da ti çûna waran...
Qudsîyata namûsê ne te raueyî me kir;
Çawan tu qail bûyî va ne bûye tuçaran?!..*

Di wê gavê da dengêkî xurt gazindên min
birn û ev gotin kirin:

— Ho xort! ji bo çi beradayî gazindan dikî?..
Xwedê çawan neyaren we afirandine, hûn jî
welê afirandin. Li nik wî hûn hemf yek in. Lê
dinê qada xebatê ye; heke hûn xwe kefî û
nizim dibînin, tegez ew jî dest necamêriya
we ye. Bixebitîn û paşê bazgûrî Xwedê bibin;
heke daxwaza we ne da hînga gazindan bikin..

Min ne xwest ez van pîrsan bê bersiv bi-
hêlim; min got:

— Kes heqê xebatê nikare inkar bike. Lê
em giliyê zilm û zînatê dikin. Ma seza ye ko
zînantker (zalim) bê ceza bimînin?..

— Naminin; lê ne îro...

— Ma halê me dê îro çawa be?

— Ma nayê bîra te ko bav û kalên we kur-
dan gotine: « bi gur be ko tu guraxwarî nebî ».

Min got: ev yeka han jê ra demekî dirêj diyê.

Wî got: ne ewçend dirêj; lê berê xwe bide
çiyê, tuyê her tişîf bizanî.

Min berê xwe da Ararata mezin. Li ber
şewla lîvê her der bi hemdê xwe diyar bû.
Di nava bistekê da diwazde caran berf barî.
Paşê birek gurê pişîhişin di çiyê da daketin
û bi nav welêt da çûn.

Min jî da xwe ko li şopa wan guran herin
welêt; lê ez hişyar bûm.

Ez ji cihê xwe pir bi dûr keti bûm û
dîkan bang didan; hîn ew gotin li ser zimanê
min digerfîn: « bi gur be ko tu guraxwarî nebî »

Eka 9-6-933

OSMAN SEBRÎ

JI MIN VE

TIŞTÊN DINYAYÊ

16 — Jîna qenc bihîşt e. Pîreka ko ne di
fikira meriv da be dijeh e.

17 — Dinya û qehpik xwehêu ayîtuê ue. Kî
li ber wan bisekine, ew di wan da xweya dike.

18 — Merivê ko malê xwe jî şerefa xwe
mezintir bigire hêvîya qenciye jê meke.

19 — Merivê ko li xwe miqate nebe nikare
li tu kesî miqate be.

20 — Kesê ko ji kevan bişegide ji wan kertir e.

21 — Dost ji xwe ra zû şemeke û dostê
xwe zû bermede.

22 — Gotina paşin mebeje, heya negihê
paşiyê.

23 — Rih dibe bost, ji dostaniya merivê
dijmîn ra ne qerar e ne soz.

24 — Merivê ne ji cîns û welatê te be jê ra
me be pir ko li ser te derbas be. Ko li ser te
derbas bû û çû tu hevw leyî bîra wî.

25 — Ji dostê xwe ra baş be, heya bibe
xirab jê dûr be.

26 — Ji neyarê xwe ra neyar be, heya bibe
qenc jê ra qenc be.

27 — Sistiya ne di cihê xwe da ew dibe tîrs.

28 — Qenci bi merivê bênamûs wendayî
dere.

29 — Wacib e wek din xwendina keşan bertî
kuran; çiko diyên welat ew in. Jîn û mîrîna
welat di zanin û nezaniya wan da ye.

30 — Gava ko meriv bi xelkê nikari be,
meriv bi xwe dikare.

31 — Kesî xizan û dewlemend tine. Xizani
û dewlemendi ji eqilê meriv e.

32 — Dora te di peyivê da neyê mepeyive.

33 — Gotin û şîretên heja mestroşê
biyaniyan.

34 — Kesê ko bi kêra mîlet û welatê xwe
neyê bi kêri tu kesî nayê. Eger zirûret hewce
bike ji merivê wîlo ra wan wekî pîrekê ji bo
di ser ra derbesbûnê îstîmal bike.

35 — Merivê ko ji xwe ra nexebite û ji
xelkê ra bixebite para wî paşî poşmanî ye.
Hefsarê siyaset û tevgeran kêni emirê çel salî
medin destê kesî.

36 — Gotin û şîretan bibihise welê e qenc
ji xwe ra jê bibijere û yê din berde.

37 — Perê te hebin, bê wan mere çolê.

38 — Çek û silehên te hebin û heke bêne -
hilgirtin bê wan mere çolê.

LAWIKÊ TILOYÎ

HIRÇ Û ŞIVAN

Digotin şivanêk hebû; pezê xwe ve mijûl dibû, bi çêrandina wan. Dilber, dilnazik bû ligel êleta xwe. Rojek hate rastî suxir şikestiyeki ango « hirçê ».

Hirça me ji şivani hind dixwest ruxse û binde cara didizin: Gisk, kavir û pezê belengaz dixwar. Şivani her canwar, hêwanê bê xêr didayê da bikel kar; qilêk jê re bidoze da hirça xwe pê bikuje, ne xêr hirça me tama gote şivani:

H — Ho şivano, deng ji te dano, dê te kim nano....

Ş — Çima?... Ey hirça gewir?....

H — Çima, ez birçi me. Mi divê beran, an dê bin dojmin...

Ş — Bra mi ev beran heye bi lenê, arkarê min e, pêşiya terşî diçe, terş bê wi nameşe....

Nê emûda wi ne hat, şivan tengav bû got:

Ş — Wî pezê he ji xwe re bixwe, ta subê dey an dê bine dost an dojmin.

Hirça me ev bir û dawirand. Şivan ji herî bi xebat e, hevalek ji xwe re ani, hine zengil pê ve kir, xwe hêla deştêk wek deştê Rûsiya sor mesele. Hirç hejiya hat û peyivî:

H — Ha; ka ew ehid yaro?...

Ş — Wey ser çavan tu hati, te kû e?...

H — Mi kû e... ez bî irsî me, şivanê zexim.

Ş — Gelek çak e yanî ez û tu dê ehidê qetinin....

H — Çire?... Mi çu nevê, lê beranî bes.

Ş — Ha; birêne wêra ha (hevalê şivan kir toz û zewran, ew deşt hemî kir mijeh û reştin).

H — Ew çî ye?... Toza han herwekî dixuye egidêk tê aliyê me de...

Ş — Panê tu nizani ew kt ye?... Ew kurê mîr Zevan e, divêlin şîrê hirçan e, li wî çend sal derman e...

H — Ey şivanê delal tu mi veşêre, da nekevme tê re « tê de », bime mirin ê mir e...

Ş — Lê were qeydî nake, hevalin herî çak e, dê sond xwem çu li vir nake... (Hirç çu têrêkê de li xwe girêda û axivî:

H — Ev têr e, lê keleh e, der nîne bo çu rûh e...

Ş — Ho keko were; hirç çu kelehê, çu têrê de.... (Heval dûman betal kir, qesta şivani ew kir, gotê kani ev şikestî suxir.) şivani gote dostî:

Ş — Were ji mi re dar bine, lepên te bigerine, bikevin ser kelehê xirawîne.... (Herdu hevalbend kelin ser têrê, hirça xwe perçiqandin, wek perçiqandina Hitler dikelela xwe a şehin « xeyali » bi destên Rûs û Hevalbendan....

JANDAR MÎRZENGO



CENKEŞTIYÊN FRANSA ŞEREVANÎ GIHAŞTINE GIRAVA KORSİKAYÊ

TIŞTINE KEVIN
LÊ HERDEM TAZE Û HÊJA

Temistoklîs cindiyê Elinê ê bi nav û deng, rojekê gote kurê xwe ê biçik:

— Lawo, di welatê Yewnanistanê de ji te xurtir peya nabinim.

Lawik li golîna bavê xwe heyirî, lê vege-
rand û got:

— Ma çawan bavo, ez hêj zarok im, ez li kû, xurtî li kû?

Bav: Eline xurtiyê li hemî Yewnanistanê dike. Ez xurtiyê li Elinê dikim. Diya te xurtiyê li min dike. Tu ji xurtiyê li diya xwe dike.

Entigonas, fermanbarekî Skender î bijarte, çû bû serdana kurê xwe ê nexweş. Bav, li ber deriyê kurê xwe rasti keçikeke delal hat. Gava kel hundir kurê wî got-ê:

— Bavo, nexweşiya min çû.

Bav lê vege-
rand û got: Belê kurê min, li ber derî em rasti hev hatin. Gava ez dihatim ew diçû.

Du fermanbarekî Yewnanistana kevin, Harmodyas û Ifikratis di civatekê de mijûl dibûn. Harmodyas ji malbateke mezin, Ifikratis kurê xelkê bû. Harmodyas tavê ser esilê Ifikratis û tinaz pê dikirin. Li dawiyê Ifikratis gole Harmodyas:

— Mezinahiya min bi min dest pê dike, mezinahiya te, di te de temam dibe.

Şagirtê Sokrat hekîm jê pirsi: kijan çêlir e, mirov bizewice an bêkar bimîne?

Sokrat: Tu kijanî jî biki, paşî poşmani ye.

Romanî, yekî jî hekîmên Yewnanistana kevin, jina xwe berda bû. Xelkê wî jê gazind dikirin û digotin: Ma jinik ne spehî bû, ne binamûs bû, çî qisûra wê hebû?

Romanî soleke xwe derêxist, şanî wan da û got: Ma ev sol ne spehî ye, ne çêleng e, ma tu qisûra wê heye.

Hemiyân got: Spehî ye û tu qisûra wê nîne.

Romanî got: Lêbelê ev sol li min teng e û dera ko li lingê min dide hon nabinim.

Rojekê Konficyûs, hekîm û pêzemberê Çînê, digel şagirtêkî xwe di çiyê de digeriyan. Rasti jinekê hatin: jinik li ber tîrbekê rûniştî bû û bi kelogirî digiriya. Şagirt nizingî li jinikê kir û got-ê:

— Te xêr e hirmel, tu çire holê digiri

Jinikê got: Ez li kurê xwe digirim, dehbân ew kîştîye. Beriya wî dehbân bavê wî û xwezûrê min jî dirandî bûn.

Konficyûs: Hingê hon çire terkî vî derê nakin û naçin bajarêkî?

Jinikê: Ji ber ko li hire tu hikûmeta zalim nîne.

Konficyûs gole şagirtê xwe: Tu dibini hikûmetên zalim jî dehbân jî xerabtir in.



SERGEVAZÊ FRANSA ŞEREVANÎ DE GOL DI GIRAVA KORSİKAYÊ DE

TORPİL

XWE KAR BIKIN

Sisil Brawn, rojnamevanê emê-rikanî, yê ko di binavbûna zirehpûşên Ingilîzî « Rîpûls » û « Prîns of Wils » de hazîr bûye biserhatiya jêrn nivîsandîye û gotiye:

Li 8ê Sibata sala 1941ê me terka Sengaporê da bû. Meê bela xwe bîdaya vaporqesleyên japonî yê n ko diçûn Melayoyê.

Rîpûls û Prîns of Wils rojê pê de bêf ko bêne dftin bi rê ve çû bûn. Ber bi êvarê me di nav ewiran de çend balafirên japonî diti bûn. Diviya bû wan jî em dfti biwan. Ji lewre şevê pê de em li hêviya hicûmê man. Lê wan xwe şanî ne da.

Ji xwe ez li ser vaporeke welê bûm ko binavbûna wê ne dibate bîrê. Rîpûls 32000 ton mezin bû. Lê 1200 deryavan hebûn. Di pêşiya me de Prîns of Wils hebû. Ew jî bi qasî Rîpûlê xurt û mezin. Di dora me de jî bertorpiyorin hebûn.

Roja din bi şefeqê ve deryavanan xwe karî şer dikirin. Bi şev ne hati bin jî hebû ko bi rojê bihatana. Berî nîvro

saet yanzdeh bû. Telêfona gemiyê dida zanûn « dijminî xuya kir, herkes li şergeha xwe ». Balafirên japonî wek libên tiz-bihê, li pey hev dihatin.

Top û mîtralyozên Rîpûls û Prîns of Wils devên xwe da bûn ezmenê û agir diweşandin. Neh balafirên japonî di ser serê me re difiriyan û bombeyên xwe berdidane me. Di dora me de behir difûriya û stûniye spî radibûn. Topçiyên me topên xwe dadigirtin, dîkênî û jî hev re digotin: « Bi Xwedê bomboyên xwe xweş tavêjin ». Ji dengê topan guhên me ewçend têşihan ko me digot emê ker bibin. Di vê navê de min dengê bihîst. Wî dengî digot: « Em hatine hingastin ». Bombe li paşiya gemiyê keti bû. Çend peya hati bûn kuştin. Hin jî birîn bû bûn,

Saet bû bû 11,20. Hingasti bûn Prîns of Wils jî. Zirehpûş jî rêveçûnê keti bû; tiştê li makînan qewimî bû. Balafir jî me geriyân. Me cixare berdan û li bidûr-ketina wan temaşa dikir.

Gelek ne borî, balafirine din xuya kir; balafirine torpîlavêj. Bêparwa dadiketin û di dora agirê topan de wek pîristanikan difiriyan û dikirin ko kêşê li me bûnin. Yekî li rex min digot: « Ka fedkire wan zeran — yanî japon — çawan dirêjî me dikin.


Topên me lev de agir dikirin. Zirehpûşa bi 32 000 ton mezin jî vê reqînê wek gemîke adeki dihejiya. Li devên top û mîtralyozan ava sarî digerandin. Ji her ko sincirî bûn. Topçiyên ciwan bi eşq û şewq topên xwe dadigirtin û agir dikirin.

Yekê jî balafirên japonî jî sêsed gavî torpîlek berda me. Mîtralyozvanên me baskekî wê birîn. Lê balafira dijminî di vê navê de mîtralyoza xwe li me reşandi bû. Ji min bi çend gavan dûr sê topçî ketin erdê. Berikên mîtralyozê li wan keti bûn Balafireke din ewçend nizim bû bû ko di bilindahiya zirehpûşê de difûriya û bi mîtralyoza xwe bera me dida. Bi carekê ew balafir ket behîrê, noqî bû; dîsan derket û herwekî tiştêk lê ne qewimî be bi firê kel û bilind bû.

Ev çîşa ba jî heta saet (11,51) dom dir. Ji nû ve hin xesar gihasti bûn Rîpûlsê. Deryavaneke digot zabitekî: « Ev japonî xortine mêr in. Ev hicûma ha di emrê xwe de çênebûye. Nakeve serê min jê xeternaktir hicûm hebe ».

Saet bû bû dwanzdeh. Refekî din hat. Hemî jî balafirên torpîlavêj. Japoniyân vê carê jî her carê bêtir nizingî li me dikirin. Me digot qey dilê wan heye bûn û bi balafirên xwe deynin ser gemiyan. Ji pêş û paş, jî rast û çêpê dirêjî me dikirin. Torpîlên xwe berdidan û mîtralyoz li me direşandin. Êdî gub ne didan agirê topên me; di her devên

BALAFIREKE NEXWEŞHILGIR



Klişa me balafireke nexweşhilgir şanî dide. Ev balafirên ha birindarên giran jî qada şer diguhêzînin xestexanan. Ev sûretê ha balafirekê jî vi celebî şanî dide ya ko birindarên qada şerê Talyanê diguhêzîne bajaran.

çopan re diborln. Hin diketin behirê, di nav avê de winda dibûn. Lê ên din xem ne dixwarin, dirêjtî ne dikirin, ecêb çêdikirin. Bi hingaftineke temam, higaftine Rîpûlsê. Torpil li paşiya zirehpûşê, ji çihê ko ez lê bûm bist gavan dîr, ket. Te digot qey vapor gava bi hemî qeweta xwe diç û li diwarekî qelibî bû. Ez jicîhê xwe rabûm û qedere çar gavan bi dîr ketim. Deng bi boriyên telêfônê keti bû: « Torpil, xwe kar bikin; piştên canxelas binepixinîn ». Gelek ne borî japonan hingaftê milê vaporê ê sepê jî. Emirekî din di nav boriyên telêfônê re geriya: « Xwe bidin pira paşin.... »

Herkesî herê xwe da bû wê pirê bêî ko yek dehî bide yekî. Deryavanekî xort lez dida xwe û dikir ji hevalên xwe derkeve. Zabitekî bi nermî got-ê: « Hêdî be kurê min, em tev de di riyekê de diçin û armanca me yek e ».

Em di ber topekê re derbas bûn; du kuştî li ber bûn. Çar deryavanan hevaleyê xwe fî birîndar, linggikestî, girti bû û ew tavêtin behirê da ko bikare bi melevaniyê xwe bigebîne gemiyekê. Zirehpûşê xwe xwîl kiri bû û noqî dibû. Ez gihasti bûm pirê. Li rûyê behirê qedere pînc sed serî xwe tev didan. Hinên din xwe ji pirê tavêtin behirê. Min çavên xwe li dorê gerand. Japoniyên hingaftî bû « Prîns of Wils » jî. Agir bi keştiyê keti bû, ew jî bin av dibû. Deryavanên wê jî xwe tavêtin behirê.

Hin deryavanan, xwe ji çûna gemiyê avêti bûn avê. Perwane hêj digeriya, qedere d'wanzdeh zelum di nav baskên perwanê de telef bûn. Êdî min jî dikir ez xwe berdim avê. Lê gava min dona ko rûyê behirê girti bû didî ez jê ditirsiyam. Ezê çawan biketama tê de û min

ew mazût daxwara. Dawiyê min xwe berda û tifafek ji wê donê di qirika min re derbas bû. Min xwe jî zirehpûşê bi dîr dixist. Dengê hate min « Tu selamet î, apo ». Min lê vegerand û got: « Belê ». Lê disan min don daqurtand.

Di navbera min û bertorpiyore de hêj niv kilômêtir hebû. Li rex min yekî digot: « Gerzînek bi lingê min de hatin ». Min serê xwe lê bada. Mêrik bin av bû çû. Min zabitek dît di nav behirê de piştê hin deryavanan dinepîxandin da ko bikarin li rûyê avê bisekinin û xwe bigehînin bertorpiyorekê.

Ev bû bû saetek ko min di behirê de keftelêft dikirin û li ber xwe dida. Ez gihasti bûm qayixekê. Deryavanên tê

de ez kişandim û ez birim nav xwe. Di nav wan de yekî ewçend dona mazûtê daxwari bû ko bi tesîra wê mir. Ew avêtin avê û li şûnê yekî din anin ser qayixê.


Piştî saet û nîvekê em gihasti bûn bertorpiyore. Weris ji me re dahelandin û em hilkişiyên ser gemiyê. Kumandarê « Prîns of Wils » winda bû bû. Tenent, kumandarê Rîpûlsê, di nav necatdîtîyan de bû. Min li zabite ko di deryayê de piştê deryavanan dinepîxand pirsî. Lê geriyên, zabite qehreman di nav pêlên behirê de winda bû bû.

Ji her du zirehpaşên fêris, li rûyê avê bi tenê xetine dona mazûtê ina bûn.

CÊMÎLÊ TACDO



Eskerine ordîwa heştan a inglîzî ketine bajarekî talyanî û di nav kûçê û kolanan de şerê elemanan dikin.



Guleyine topên behri ên dîravêj. Van gulên di ser gurgûrokan de dibin heta perê behirê û li cenkeştîyan bar dikir.

ÇIROKA TARIXI:

KEÇA KLËOPATRË

Klëopatré, di pey mirina Mark Antonyo re, mar berda bû ser xwe û çavên xwe li dinya gewrik noqandi bûn[1].

Klëopatré di pey xwe re, ji bavine tével çend zaro hişti bûn. Di nav wan de sê zarok hebûn ko ji pişta Mark Antonyo bûn. Alêksandr Îlyos, Klëopatré Selîni û Filadelf. Her sê zakok ji bextreş û bêsiûd bûn. Herwekî methelokê gotiye: « Rav harsim dixwe, diranên kur dîsekibûn ».

Stërka Antonyo çû bû ava. Ev fermana-rê mezin di qadên şer û siyasetê de şikesti bû. Nikari bû li ber burayê xwe Oktavyo bisekîniya. Antonyo qurbana evîna Klëopatré bû bû û di kûçeke Skenderiyê de xwe kuşti bû. Xulamêkî wê ji Klëopatré re di nav selikek hejîr de marek anî bû. Mar xwîna melîkê mêtî bû û jehra xwe li rayên wê rijandi bû.

Berî Milada Îsa pêxemher bi 12 salan Oktavyo terka Misirê dida. Oktavyo qeslekî hêsrînan da bû pêş xwe. Di nav wan de zarokên Klëopatré ji hebûn; zarokên ji bavine tével.

Îlyos (roj) Selîni (heyv) ev her du hevalcew deh salî bûn. Filadelf ji wan piçûktir bû.

Oktavyo ev her sê zarok sipartine xweha xwe Oktavyayê, jîna Antonyo. Oktavya jîna Antonyo bû. Lê Antonyo piştî ko keti bû dava evîna Klëopatré ew berda bû. Oktavyo digote xweha xwe ko van zarokan bi rêzîka Romayê bi xwedî bike da ko rojekê bi kêrî wê bûn.

Herçî Aleksandr Îlyos û Filadelf gelek emîr ne kirin. Piştî çend salan mirin. Klëopatré Selîni bi tena xwe ma.

Romayê tac kiri bû serê Oktavyo û bi navê Ewgustos ew kiri bû imperatorê rohelat û roavê. Imperator Ewgustos dixwest di heyamê wî de dewleteke nû bête çêkirin û li textê wê melîk û melikeke welê rûnin ko Romayê ew bi şîr û rêzîka xwe bi xwedî kirine.

Hingê li Romayê mirek hebû. Mîr Kobayê efrîqî, kurê Kobayê pêşin melîkê Nomêdyayê. Imperator Jülüyûs bavê wî şkenandi bû û welatê wî li kîşwerê Romayê zêde kiri bû.

Mîr Coba di Romayê de terbiyeke latîni girti bû û ji qeyserê wê re, wek yekî romayî, serî datani.

[1] Di hejmarên Hawarê ên 50 û 51ê de du çirokên tarixî hene « Klëopatré » û « Şûya dîlax ». Ev çiroka ha bi hin niqtan bi wan çirokan ve girêdayî ye.

Ewgustos, Coba bi navê Coba diwim kire melîkê Morîtanyayê. Coba jî rabû li payitextê milîkê xwe navê Qeyseriyê kir. Coba bi vî awayî ji qeyserê xwe re minetdariya xwe şanî dida.

Imperator dixwest jê re jîneke welê bide ko ew jî wek wî bi şîrê Romayê hati be bi xwedî kirin. Ewgustos, Selîni da Coba. Selîni jî wek diya xwe bû bû melike.

Ewgustos, wextê Selîni dikir bi rê bikeve gotê: « Keça min navê rojê li birayê te ne hat. Min hevî ji xwedê heyê navê heyvê li te bêt û wek heyvekê li milîkê xwe geş bibî ».

Selîni wek diya xwe çû Efrîqayê.

Coba ji bo şênî û avahiya milîkê xwe xebateke zor dixebitî. Tîstên ko li Romayê bin bû bûn, ew tişt li wetatê bav û kalên xwe tethîq dikirin. Di wextê wî de Morîtanya di rîya şaristaniyê de tîfafekî mezin pêş ve çû. Coba jî welatê xwe re dixebitî û rûyê xwe li Romayê spî dikir.

Lê Klëopatré Selîni bedbest bû. Mêrê wê xwe ewçend da bû xebata welêt ko wextê wî ne dima xwe hinek jî bide hezkirina jîna xwe.

Selîni di wê tenahî û xerîbiyê de texnîfan dikir, xwe û mêrê xwe datanî ber hev û digihaşte vê encamê: Bi xwe kî bû; keça Antonyo, keça Klëopatrayê. Di rayên wê de xwîna Romayê û xwîna Yewnanistanê a esil û petî digeriya. Coba kî bû? Ji efrîqayê yekî morîtani.

Coba, ji van tiştan bêxeber, ji avahî û spehitiya welatê xwe re dixebitî. L'ayitextê xwe bi kûçeyên lîreh û mezin, bi heykelên şeh û neqîşkirî dixemilandin. Melîk û melike hero hej bêlîr ji hev dûr diketin û herkes bi serê xwe, bi mirov û berdevekin xwe ve dijî.

Selîni di welatê Morîtanyayê de ji mêrê xwe cihe, xwedîya heqîne xweser bû. Ji ber ko Klëopatra Selîni ji esilê romanî bû. Herçî mêrê wê bi terbiye û rêzîkê bû bû rajêrê Romayê. Heqên ko xweserî Selîniyê bûn ew heq mêrê wê jî lê venasî bûn.

Li gora van heqan Selîni dikarî bû sûretê xwe li ser polên Morîtanyayê bide çap kirin, şikilê xwe li ser heykel û qesirên welêt bide neqîşandin. Disan, heke bixwesta dikarî bû emîrê xwe bide ordiwê û tîkili xurtiya melîk jî bibe.

Klëopatré Selîni jî gelek caran ev heq bi kar dixistin.

— Lûna were, ez welê dibînim ko nîzingî gorinê bûme. Îşev di sînga min de tengiyek heyê, bîhîna min li ber min diçîkîhe.

ŞEHİNŞAHA CIHAN

Dilbera min dil ji min bir şad û bendan kir

[xeder

Xişm û şahan heq rewaye lew ne kêşa min sudem.
Ki li min xişmê dikin carek heye rehmê bikê
Lew ji karê padişahan xişm e geh liif û kerem
Dilbera min bes ne şah e; lê şehinşahi cihan
Padişahê textê Kurdistan û Iran û Ecem
Min sibê dî ew ji bircê hate eywan û sera
Tebl û sazana da niwazan şadiman û pir heşem
Nagihan ez çûm bi ser da merheba guft û kent
Go: li ser çavên me hatî ey melayê mihteşem.
Min digel wê kir telef-tif ta ji min kir pirs û hâl
Go: Cegerxwîn dil ciwa ye? min digo: derd

[û elem.

CEGERXWÎN

Cendekê jina wî. Gava can terka ten dida
kenek li ser lêvên wê hiştî bû.

Cendekê Lûnayê. Jehrê da bû rûyê keçikê
û ew xisti bû rengêkî reş.

Coba li ber cendekê jina xwe sekinî û gote
berdevk û cêriyên qesirê:

— Melikê di bexçê qesirê de veşêrin û çil
rojî şîna wê girebidin.

Coba destê jina xwe kirê destên xwe û
got: Te di dinyayê de tu rahetî ne dîtîye. Ji
niho û pê de perestoyên Romayê te bisitirinin.
Xwedê ji kurê me « Betlemiyos » û keça me
« Drozilê » re jiyîneke çêtir hez bikît.

Coba dikir ko derkeve, dengêkî jê pirsî:

— Lûna, enê Lûnayê li kû veşêrin?...

Coba: Li rex xanima wê, heyvê ji heyvê
veneqetînin....

Dîhok: 25 Çiriya-pêşîn 1943

BIŞARÊ SEGMAN

Lûnayê xwe avêt lingên xanima xwe û
got-ê: Xanima min tu çire holê dibêji, tu hêj
ciwan û spehî yî. Ayende (istiqbal) li te bi
ken dinihêre û banî te dike.

— Bawer nakim Lûna, qedere xwest ko
ronabiya birayê min Îlyos-rojê zû vemire. Şew-
qa hêva min jî nakeve serê min ko dom bike.

Hêstirên ber du heyvan Selînî û Lûnayê,
di qesira Coba diwemîn, di sikûna şevê de bi
hev re herikîn. Selînê gote Lûnayê:

— Lûna, ev nav li te kirine ji ber ko tu di
şeva ko ez ji diya xwe bûme welidiyî. Navên
me di yek manayê de. Nisbet bal diya min
ve navekî yewnanî li min kirin « Selînî » û
nisbet bi aşiqê diya min ve navekî romanî li
te kirin « Lûna ». Mana her diwan jî heyv e.
Heyv şevên tarî bi ronî dike. Lê bawer bike
ji heyva yewnanî re ne nesib e ko bibe hey-
veke çardeşevî. Belê daxwaza qesyer Ewgustos
naçe serf. Lê min ji Xwedê hêvî ye ho heyva
romanî her geştir bibe û xwe û dora xwe bi
ronî hîke. Belê Lûna.


Lûna lingên xanima xwe ramîsan, ew bi
hêstirên çavên xwe şil kirin û got:

— Xanima min, ma tu nizanî ko bavê min
ê misrî, yê ko di nav hejîran de marek bîrî bû
xanima xwe, herwekî di jiyînê de, di mirinê
de jî jê veneqetiya. Ma ez kengê terka te didim.

— Hingê enê xwe bigehînin diya min
Klêopatrê, melika hisn û cemaletê û kurê wê Roj.

Roja din qirîn bi qesirê keti bû. Xeber
gibandine melik Coba ko jina wî Klêopatre
Selînî emirê Xwedê kiriye.

Melîk terka cîvata xwe da û qesta oda jina
xwe kir. Cendekê li peş wî bû... No du
cendek...



Di Behira-spi de yekinekêne stola inglîzî. Ev yekinekên ha di perawan de digerin û riyên
dijmîn yên irtibat û neqliyatê bombaran dikin û bi vî awayî xesarine mezî digehinin neyar.

EZDÎ Û OLA WAN

— Ji Mirza Tawûsperêz re —

— 3 —

ÊŞÎRÊN ÊZDIYAN:

Êşîrên êzdiyan wek eşîrên kurdan ên mayî heytî û yekîtîya xwe ne parastine. Êşîrek tine ko ne bûye çend bavên û dîsa eşîrek nîne ko bavek an hêlek jê, ji ber sebebên ko em dê li jêr bêjin di Êzîdxanê[1] an ola êzdiyan da bi derneketî be. Heke em du-sê gundên êzdiyên Kurdaşê û çend gundên li Kurdistanê bakur jê biderxin, hemî eşîrên êzdiyan li Îraqê û di êrdimên (menteqê) Şengalê û Şêxanê da dimînin.

Berî sê sed sahtê êzdî ji îro gelekî pirtir bûn. Çi gava Êzdî di Êzîdxanê da bi derketîne û li Kurdistanê belav bûne; gelek bavên pir eşîran bin bi tevayî û hinek ji bi malbatî bûne îslam.

Di dema xîlafeta Osmanîyan da hikûmeta tirk ji bo qelîhandîna reha ola êzdiyan pir caran bi leşkerîne mezin û xurt bi ser êzdiyan da girti bû. Her carekê, ji van caran, çawan ko bi sedan êzdî dihatin kuştin; hin eşîr û bavên gelek eşîran ji Êzîdxanê berdidan û li nav Kurdistanê belav dibûn. Tirk tîkîlî van eşîrên derketî ne dibûn. Wan dizanî ko herçî eşîrên di Êzîdxanê da bi derkevin û bi nav eşîrên îslam da herin; demekî dûr najo dê îslam bibin. Dawî jî her wekî wan texmîn kirî bi derketî. Ji van bav û eşîrên ko ji Êzîdxaneyê bi derketî ji sedî heştê bûne îslam. Dinan, Delikan û Gevozan ji van eşîran in.

Eşîrên ko îro di Êzîdxanê da mane, bûne gelek bavên. Ji van ên Şengalê dîsa hinekî rewşa xwe a eşîrtîyê parastine. Lê herçî eşîrên êrdîma Şêxan, ew rewş jî wenda kirine ko bi tenê navê eşîran maye. Ji ber vê yekê hemî eşîrên êrdîma Şêxan e bê serek û rasterê bi mîrê êzdiyan va e girêdayî ne. Navên eşîrên êrdîma Şêxan ev in:

Hekarî, Xelarî, Mamûsî, Tirkan, Qaidî, Domilî, Hiraqî, Xiskan, Şêx Xidirî, Şariyan, Sînan, Girêpanî, Dinayî, Başîlî, Beîzanî û Hekîman.

Ji van eşîrên han Hekarî bi tenê di rewşa eşîrtîyê da maye ko ew jî di navbera şêx Xidir û şêx Wezîr da hatiye par va kirin. Tevayîya vê eşîrê hezar û sed mal e.

Herçî eşîrên Şengalê, herwekî me li jor gotîye, tevî ko bûne pir bavên jî rewşa xwe a eşîrtîyê parastine û xwedî serek in. Ji van eşîran Qirani 1200 mal e; mezinê wan şêx Xidir

Êzîdxane ji êrdê ko êzdî tê da rûdînin ra tê gotin. Lê gava kurd Êzîdxane dibêjin qesda wan Şengal e.

e. Feqîran 300 mal e; serekê wan Xwedêda ye. Korkoran 250 mal e; serekê wan Eliyê Golo ye. Hibaban 750 mal e, serekên wan Etoyê Elî bi Xidirê Salih va ne. Delikan 300 mal e; serekê wan Miradê Evdê ye. Mendikan 600 mal e, lê bûne sê havan; ji van Keleşî bi Qasimê Meto va, Ezoyî bi Qasimê Hîsên va û Şenwanî bi Xelefê Hîesen Reş va halîne girêdan. Elifîran 250 male, serekê wan Hesen xelef e. Mirkan 500 mal e, serekê wan Idebê Eiso ye.


Dinayî 1300 mal e ko bi navên Bekiran û Aldexî du bav jê veqetîne. Bekiran 300 mal e; serekê wan Cerdoyê Mehmûd e. Aldexî 700 mal e; serekê wan Hîesenê Hîaşûr e. Lê herçiyên ko bi navê Dinan tene salixdan 300 mal e; serekê wan Hîesenê Elo ye. Ūsîfan 500mal e; serekê wan Xelefê Eto ye. Mala Xaltî 700 mal e; serekê wan Brahmî Qulo ye. Mûsqoran 1000 mal e, serekên wan Hîesenê Berces û Evdelê Reşo ne. Heskayî bi navên Ciwanî û Xurkarî bûne du bavên. Ciwanî 250 mal e; serekê wan Xidirê Hîesûm e. Xurkarî 750 mal e; mezinê wan şêx Xelef e. Hewerî 100 mal e; mezinê wan şêx Xelef e. Îlelîqî 400 mal e; serekê wan Miradê Brahmîko ye. Cefrî 300 mal e; serekê wan Miradê Osman e. Simoqî 800 mal e; bûye du bavên. Ji van Helîçermîkî 300 mal e; serekê wan Hemo Mîshîm e û Mehmûdî 500 mal e; serekê wan Smailê Ehmed e. Çelikan 150 mal e; serekê wan Simoyê Fatimê ye.

Ji van eşîrên Şengalê, çiqas ko Feqîran hindik hatine nîşandan jî; hemî eşîrên Şengalê bi çavê mezinatîyê li serekê wan ê Kevin Hemoyê Şero dinêrin. Piştî mirîna Hemo, kurê wî Xwedêda cihê bavê xwe wenda ne kiriye.

— kuta bû —

OSMAN SEBRÎ

SERBANÊ BALAFIRHILGIREKÊ



Klîşa me serbanê vaporeke balafirhîlgîr ji tîpên nû şaitî dide. Balafîrekê xwe kar kirîye û dike bi heva bikeve.

Di meha borî de li welatê Libnanê tiştine girane çêbûne. Xwendevanên me ev tişt, kit kit, di rojnaman de xwendine an di radyowê de bihistine. Emê wan tiştan, di vê stûnê de, bi rêzê ve û digel biserveçûna wan berpeyî xwendevanên xwe bikin.

Di destûra Libnanê de madeyin hebûn ko li gora hikûmeta Libnanê ew made û istîqlal bi hev ne diketin.

Li 6ê Çiriya-paşin hikûmeta Libnanê ji bo edilandina wan madan peşnihadek qedimandê Parlemanê. Li ser vê yekê civata fransîzan ya azahiyê rabû û li 7ê Çiriyê beyanamak belav kir. Civatê di beyanamê de dida zanîn ko Libnan destûra xwe bi tena xwe nikare biguherîne, ji ber ko ew destûr hikûmetên Libnan û Fransayê bi hev re çêkirine; ji lewra ji edilandina wê re raya Fransê jî divê. Ji ber vê yekê divê Libnan û Fransê di vê babetê de bikevin mizakerê û bîr qerarekê.

Dema ev beyanname gihastê destên hikûmeta Libnanê, vê hikûmetê di cih de beyanamak belav kir û tê de da zanîn ko hikûmeta Libnanê hikûmeteke misteqil e û edilandina destûrê bi tenê heq û selahiyeta wê ye û tu kes nikare têkiliyê pê bike.

Ji milê din serekcîmhûr, serekwezîr û serekê parlemana Libnanê gihane hev û qerar dane ko meclîs li 8ê Çiriyê dest bi edilandina destûrê bikir.

Mr. Hêlô, nîmîndeyê Fransê, yê ko hingê li Cezairê bû bi telêgrafê ji hikûmeta Libnanê daxwaz kir ko edilandina destûrê hînekî bi şûnd de bilîlin. Hikûmeta Libnanê gulî ne da wê daxwazê, ji ber vajî ve lez da xwe û li 8ê Çiriyê parلمانê destûr li gora ko hikûmetê peşnihad kiri bû tadil kir.

Di vê navê de Mr. Hêlô ji Cezairê vegeriya û li 11ê mehê beriya rojê, li saat sîseyan serekcîmhûr, serekwezîr û hin wezîrên Libnanê dane girtin, parleman û jiyîna destûrê da sekinandin û bi mersûmekê Mr. Emil Êdê serekdewlet û serekhikûmet tayîn kir û tadila destûrê nelê daye hesabandin.

TIŞTÊN KO DI LIBNANÊ DE ÇÊBÛ NE

Bajarên Bêrût, Seyda û Trablîsê dikanên xwe girtin û dest bi nimayîşan kirin; hin lêxistin jî çêbûn. Dikan qedere 15 rojan girtî man.

Ingilîz û emêrikanîyan kêfa xwe ji vî işî re ne anîn; rabûn ji civata fransîzan ya azahiyê re noteyin rêkirin. Wan her du hikûmetan di noteyên xwe de ev iş protêsto dikirin û ji fransîzan daxwaz dikirin ko tevdirên Mr. Hêlô bêne rakirin.

Li ser vê yekê Civata fransîzan ya Cezairê rabû ji bo saffî kirina meselê genêral Ketrû rêkire Bêrûtê. Ji milê din Mr. Kêzî wezîrê Brîtanîyayê di welatên rohelatê nîzing de jî hate Bêrûtê.

Ketrû, Kêzî, Spîrs û nîmîndeyê Emêrikayê gihane hev û li ser mesela Libnanê peyivîn. Ketrû dixwest mesela Libnanê wek xilafêke Libnan-fransîzî bihesibîne û welê saffî bike. Lê herçî ingilîz û emêrikanî wek meseleke navbera dewletan lê nihêrtin. Ingilîzan digot em di sala 1941ê de ji istîqlala Libnanê re keffîl bûne, ji me re divê em berevaniya wê bikin. Emêrikanî jî di vê fikirê de bûn.

Genêral Ketrû li 20ê mehê rapora xwe rêkir Cezairê û civata fransîzî li ser wê raporê qerar da û emir kir ko serekcîmhûr vegere şûna xwe û herçî serekwezîr û wezîr bêne berdan.

Lê serekcîmhûr Şêx Bişara Xûrî ev qerar qebûl ne kir. Serekcîmhûr digot ez bî hikûmeta xwe venagerim şûna xwe. Li ser vê yekê Mr. Şatêno, mersûmek derêxist û mersûma Hêlô ji ortê rakir.

Piştî derketina vê mersûmê serekcîmhûr digel serekwezîr û wezîrên xwe vegeeriyay seraya Bêrûtê û ji nû ve rûniştin cihê xwe.

Lê hêj xilaf saffî ne bûye. Fransîz hêj di vê fikirê de ne ko tadila destûra Libnanê nelê ye. Ji milê din pîrsa miahedê heye; miaheda fransîzan digel Libnan û Sûriyayê.

Genêral Ketrû çûye Cezairê. Piştî vegera wî heye ko mesela miahedê û meselayên din bêne mizakere kirin.

NÊREVAN

Kiriariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc fireyên sûrî — Ji bo welatên din firekî ingilîzî

Xwedî û gerîndeyê berpîrsiyar : Celadet Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriya
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 3
HEJMAR 22

ŞEMBİ
KANÛNA-PAŞİN 1944

RONAHI

ANNEE 3
NUMÉRO 22

SAMEDI
1 JANVIER 1944

SUPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON: 12-29

QEZAQINE RÛSÍ



Qezaqên rûsî siwariyîne giran in. Ev siwariyên ha hetanî tro carina bi rimhan dirêjî dijminan dikin û bera wan didin. Kliya me dido ji wan qezaqan şani dide.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1944

DI VÊ HEJMARÊ DE

Çûk û Pîrê	Çîrokbêj
Sewilê Sofî	Çîrokbêj
Di vî Şerî de	Nêrevan
Cebraîl	Qadirê Ferman
Ji Edebiyata Farisî	Farisixwîn
Napolyon	Osman Sebrî
Mêrik î Dîn e	Xelilê Genco
Çîn	Dr. Loynêl Caylez
Jinan Kêmxwarin	Pîrbêj
Hindik Rindik	Xeberguhêz
Nêçîreke Pilingan	Dilawer Çarpîne
Skoçland	Ronahtî
Masiyê Braştî	Efsanbêj

ÇÛK Û PÎRÊ

Dibêjin ko pîrek hebû, çû ser tenûrê da ko nan lêxê, piş kîre agirê tenûrê, agir pê ne ket. Di gava çûkek hal û got-ê: « Pîrê heke agirê te pênavê, stîrk di lingê min de heye, derêxe û deyne ser çavê êgir, we pêkevê ». Pîrê stîrî ji lingê çûkê derêxist û danî ser êgir, agir pêket. Pîrê nanê xwe lêxist, çûk ber bi wê ve hat û got: « Ez stîriyê xwe dixwazim ». Pîrê gote çûkê: « Ezê ji te re piştik stîrî û qirş bînim » Çûkê go: « Na xwe ez heft nan dixwazim ji bedêla stîriyê xwe ».

Pîrê heft nan dane çûkê. Çûk nanê xwe bir û çû. Di, gava şivanek koda şîr li ber e, û bê nan dixwê, ji ber ko bi wî re nan ne bû. Vêca çûkê gote şivan: « Kuro, bi min re heft nan hene, cîrnek paqij bike emê vî nani tê de hûr bikin û şîr bêxin ser û emê bi hev re bixwin. Şivan rabû weke çûk got-ê kir û bi hev re xwarin. Piştî ko xwarin çûk gote şivên: « Min heqê nanê xwe divê » Şivên go: « Ma te çi divê? » Çûk got: « Min heft beran û berxek divê, heqê nanê min ». Dawî şivên heft beran û berxek dane çûk.

Çûk ew bîvîn û çû, heta giha gundekî, di dawelêk li wê derê heye. Lê ji bo dawelê dik û mîrîşk digurandin, neperûşkê şêr. Vêca çûk gote wan: « Ezê heft beran û berxeki bidîme we tiştine holê hûrîk megurînin, şerm e ». Vêca rabûn her heft beran û berx gurandin. Piştî ko gurandin çûk go: « Min heqê xwe divê ». Gotin wi « Ne te dane me ji bo ko em ji dawelê re bigurînin, ji bo çi em heq bidînin ».

Tali çûk, bûk ji nav lepê wa revand û bi çolê de çû. Gava di şivanek wi li wê derê ye,

ÇIROKA KURDMANCI:

SEWILÊ SOFÎ

Sofîk hebû; sewilê xwe bir û çû serê kaniyê, da ko destmêj bigirê. Vêca sewilê xwe dani bin latekê û çû ko destê xwe bişo. Vegeriha cem sewilê xwe, di lat bi ser sewilê wî de ketiye, sewil şikestiye. Sofî gote latê: Çima te sewilê min şikand?

Latê go: na xwe, çima giya di bin min de şin dibe?

Sofî gote giyê: Ji bo çi tu di bin latê de şin dibî.

Giyê go: na xwe, ji bo çi pez min dixwin?

Sofî gote peza: ji bo çi hon giyê dixwin?

Peza go: na xwe ji bo çi gur têne me?

Sofî gote gura: çima hon têne peza?

Gura go: na xwe çima se têne me?

Sofî gote sa: çima hon têne gur?

Seya go: çima kebanî me têr nan nakin?

Kebaniya go: naxwe, çima mişk hebana me qul dikin?

Sofî gote mişka: çima hon hebana qul dikin?

Mişka go: na xwe, çima kitik têne me?

Sofî gote kitika: çima hon mişka dikujin?

Kitika go: em mişka dikujin û di dora mala xwe de çiva didine xwe.

Sofî dev ji van berda û perçeyê sewilê xwe dane hev.

çûk gote şivên: « Bilûra xwe nadî min, ezê vê bûkê bidîme te? » Şivên go: « Belê » û bilûr da yê û bûka xwe bir.

Çûk rahişte bilûrê û çû serê latekê sekint û go: « Çîrî, wirt, min stîrk da bi heft nan, û qurseki da bi heft beran û berxeki, û min heft beran û berxek da bi bûkekê, û min bûk da bi bilûrekê û tali ez li ser latekê û kes nte serê min hûr kê.

Şivên rahişte keviyekî û li serê çûk da şikest: çûk mir. Şivan bilûra xwe jê vegerand.

DI VÎ ŞERÎ DE XEBATA JINÊN SOVYËTISTANÊ

Jinên Soyêtîstanê di vî şerî de xebateke zor dixebitin. Kovar û rojname hero qala qehremaniya jinên Sovyêtîstanê dikin.

Heval Eydîrehman Siltanof, sekretêrê sefaretê Sovyêtîstanê ya Misirê ji kovareke Misirê re qala xebata jinên welatên ûris kiriye û gotiye:

Ûris ji vî şerî re şerê welêt dibêjin. Herkes jin û mêr, kal û ciwan hemî pardariya vê cîhadê dikin. Herwekî hon dizanin elemanan bajarên me xerab kirine. Ji avakirina wan re jin ji mêran bêtir dixebitin. Piştî xelaskirina Stalîngradê komek jin çû bûn-ê. Xelkê gote wan, hon hatine çî, ma hon nabînin ko di bajêr de avahlyek ne maye ko hon bikarin tê de rûnin.

Jinan li wan vegevand û got: Em ne ji bo rûniştinê lê ji bo avakirinê hatine.

Gava ji hikûmet an ji fabrîkêkê re peya divêtin jin di ser mêran re digirin. Ji ber ko ew di xebatê de bikêrhatfir in.

Ji milê din jin xweyiyên her heqê civakî û siyasî ne. Dibin qazî, dîktor, evkat, sefir, mamoste, nîmînende h. p...

Bivê nevé tète bîrê, jinên ko di hikûmet an di fabrîkan de dixebitin gava zaro dîtin çî dikin. Hikûmetê jê re tevdrîn gerek dîtine. Ji jina avis re berî zayînê bi mehekê rixset didin. Piştî zayînê jî meheke din rixseta wê beye. Di van her du mehan de jinik li mal rûdine lê miasê xwe bi temamî dibe.

Heke jinikê tu kesê wê nine ko li zaro miqate bibe jinikê hero sibê gava diçe xebata xwe zarokê xwe dibe « mala zarokan » û li wê derê dihile. Mala zarokan teşkilateke hikûmetê ye. Evarê gava ji xebatê vedigere mal zarokê xwe bi xwe re dîtine. Heta ko zarok dibe bi salekê an bi sal û nîvekê; yanî hetanî ko ji şîr tete vekirin. Ji hingê û pê ve jinik zarokê xwe dibe « Bexçê zarokan ». Ev jî teşkilateke hikûmetê ye. Zaro tê de bi hevûdin re dileyizin.

Di ziwacê de mêr xwediyê malê ye û debar li ser wî ye. Kêm caran jin ji mêrê xwe tete berdan. Lê heke bate berdan zaro bi dê re dimînin û ji miasê mîrik seykek ji bo nefeqê tete birin.

Heç jinên ko şer zaro hene hikûmet jî wan re miasêkî xweser dide û jin vî miasî heta mirinê dibin. Yê ko bevalcewan dîtin jî wan re ji aliyê hikûmetê û ji aliyê ehaliyan mikafatek heyê » EYDIREHMAN SILTANOF

CEBRAİL NEMERD Û DEXSOK

Lî wextê berê du mirovên kêm hebûn, bû bûn hevalên hev; yekî nemerd, yekî dexsok. Ê nemerd ewçend timakar bû ko ne dixwar ne jî vedixwar hema dida hev. Ê dexsok jî jî qenciya ko diglhaşte xelkê ewçend digehîrî ko dikir bîmîrê

Rojeke Havînê her du heval li goîê bi rê ve diçûn; rastî pîreki halin. Wî pîrî hevalî bi wan re kir heta ko gihaştine serê duriyanekê. Pîr sekîni û gol: Ez Cebraîl im, di hîre de ez dikim jî we vegetim. Min divê ez qenckê bi we bikim. Îcar bila yek jî we jî min tişteki bizawazil, ezê wî tiştî bidim-ê, û jî wî re ko tişteke ne xwestiye duqatê tiştê ko hevalê wî xwestiye bidim.

Ê timakar di dîtê xwe de digot: « Ez dîzanim jê tişteki mezin bizawazim. Lê bila berî ewilî hevalê wî bizawazit da ko ez bikarim jê du caran bêtir bistînim ».

Ê dexsok dlogt: « Heke min jê tişteke xwest duqatê wî wê bighehe hqapê min ».



Tangine Emêrikani Berdane Tangine Elemani û Ew Xerab Kirine.

.....

Bi vî awayî her diwan jî qiwa xwe ne tanî beriya ê din daxwaza xwe eşkere bikin. Midekî ker û lal sekînin. Dawî ê timakar, yê ko jî hevalê xwe xurtir bû, rabû li hevalê xwe xist û got-ê: « Kuro biştxevile, ev firsendek e, tu dikarî dewlemend bibî ».

Ê dexsok gote hevalê xwe; Baq e,

ezê biştxevitim, lê ez dîtîsim tiwê li dawiyê poşman bibî. Û berê xwe da Cebraîl û got-ê: « Bila çavêkî min kor bibit ».

Cebraîl li ser gotina xwe sekîni, dexsok bi çavêkî hişt û ê timakar jî her du çawan kor kir.

QADIRÊ FERMAN

JI EDEBIYATA FARISI

— Ji seydayê delal
Mirza Evdilhadi re —

Seyda!

Te berê xwe da oxurê, piştî xwe da felekê; te qesta mala Xwedê kir.

Oxura te li xêrê bit. Xwedê te bi selamet bigehine Mekê, bi kum û destmala xwe a gir, li Erefatê li ber berê reş bisekinî. Yezdan te bi saxî û xweşî vegefnit mal. Em ji te re bibêjin tu bi xêr hati seyda hacî Evdilhadi.

Li Şanê te ji min re gotî bû, te carekê tiştin ji edebiyata farisî tercime kirî bûn; ew geleg speltî bûn. Çire hergav tiştine farisî ji me re tercime naki?

Ji bo bichanîna daxwaza te, ve ne min tişline farisî wergerandine kurdmançiyê. Xwedê bikil tu bi wan kefexweş bibî.

— [JI GULISTANA SADIYÊ ŞÎRAZÎ] —

Yek hebû çavê wî lêşîha, Çû nik beytarekî û got-ê, min derman hîke. Beytar ji dermanê ko dikir çavên çarpeyan di çavê wî kir. Mêrik kor bû; çû şerîctê. Qazî got: Tu sûcê beytar nîne; mêrik bi xwe ker ne biwa ne diçû balê.

Mexsed ji vê gotinê ew e ko heke mirov karine mezin siparte mirovên necerîbandî dawî poşmanî ye. Cem eqîlmandan mirovine welê eqîlsivik têne hesêb.

Ma kengê eqîlmend karine mezin dispêre pespayan.

Yên ko besîrê çêdikin ma kengê dizanin di karxana hevrişim de bixebitin.

[JI DÎWANA HAFIZÊ ŞÎRAZÎ]


Ey mirovên xudandil û dilovan, dilê min ji dest diçit. Ez bi vî derdi derdemend im ko, pê re tiştên ko di dilê min de veşartî ne ew wê eşkere [bibin.

Em di keşliyê de rûniştî ne, ey ba bide xwe û keştiya me bajo. Hejê ko cardî em rûyê nasê [xwe bibîtin.

Ew deh rojên ko em di dînyayê de diborînin ne tu tişt in; hemî çîrok û efsane ne. Guh bide û vî wextê kurt ji qencîya dost û yaran re [firsendekê bijmêrine.

Şevêdi, di civata gul û şerabê de bilbil çî xweş dîxwend û digot: Şeraba spêdê binîn, hon ji [şerabawirîno werin, lê bigehin hev.

Li neynika Skender binêre, ew peyateke şerabê [ye. Em ji te re halê mîlkê Dara şanî dide.



DÛKA KENTÊ DIGEL KEÇ Û KURÊ XWE

Ey xudan îhsan û keramet, ji bo şikirdariya selameta xwe, carekê li derwêşê feqîr bi xweşî [û qencîyê çav dêr.

Bîstehiya her du dînyan (dînya û axiret) di van her du gotinan de ye: Bi dostan re xweşî, [bi dijminan re midara.

Di tanga çaknaviyê de rê ne dane me. Heke te [ev ne ecîband, were geza û qedere biguhêrine.

Ew tişlê tehlil (şerab) ko sofi navê wî kirîye diya xebasetan, ew li nek me ji maçkirîna [hinarikên keçikan şîrîntir e.

Di heyamên tengiyê de xwe bide mestê û vê xwarinê. Ji ber ko ew kîmyaya hestiyê, parse- [kan dîke qarûn.

Wek fundê serhişk mebe, tu nabînî ew ji xêretê xwe dişofit. Fedikire dilberê, mermer di mîsta [wê de wek mûmê dihelit.

Bedewên parisi, yên ko jiyînê dibexşînin ve ne. [Meygero, here mîzgîniyê bide pirên parisi.

Ew xîrçeqê wey lê rijandî. Hafîz bi hemlê xwe li xwe ne kirîye. Ey şêxê daw û damen-pak [me ji te diwêl tu li me negirî.

DÎROKA

JINA NAPOLYON

« Di dinê da her tişt ji heçina »
« xurtî û mezinatiya Xweşê ra »
« şahiçek e ».

Napolyon

— 6 —

VEGERA KORSİKAYÊ

Di Îlona 17.1an da Napolyon ji bo sê mehan careke din destûra çûyîna welatê xwe Korsîkayê xwast û tevî brayê xwe çû. Ev sê mehên han wekî adeta xwe di nav kitêban da derbas kir. Her wekî xwe ji bo kirên mezin pêk tanîn; rojê pê da karê wî rakirin danîna xerîtan û çêkirina meselên hîsabî bû.

Sê mehên destûrê kuta bûn, Napolyon hîn ji Korsîkayê ne çû bû û ne dixwast here. Xweya bû ko di vê dema han da fikira xwe guartiyê. Qey ko hezkirina serxwebûna Korsîkayê dîsa jî nuh va di dilê wî da cih girti bû. Di nava van her sê mehên han da, bi serek Paolî û hevalên wî ra pîr da û standî bû. Ew hemî yar û hevalên bavê wî bûn. Çi gava bi darî wan camêran diket, çîroka serxwebûna giravê, xebatên ko di wê rê da bûne pêşî û paşîya peyîva wan bû. Di nava wan peyivan da pîr caran navê bavê wî û fedakariyên ko di rîya welêt da kirine derbas dibûn. Ne mikûn bû ko ev axaftin xwîna Napolyon bi kel nexin û şopine kûr û bi cih tê da nehêlin.

Êdî wî qerara xwe da bû; nema vedigerî Franseyê. Heke leşkerî bû li Korsîkayê jî hebû. Di nav leşkerekî holê kiçik da hîn çêtir dikari bû xwe bide naskirin... Li ser vê ramanê kete leşkerê giravê û Paolî ew kir kumandanê firçeke dixwestiyân (gunilî). Piştî vê kira han nema dikari bû here Franseyê; ji ber ko çanûna leşkerî di şolên holê da cezane mezin didan zabîtên leşkerberdayî.

Napolyon serekî di nav leşkerê giravê da ma û bi serek Paolî ra da û stand. Bi jîrî û jêhatî bûna xwe hezkirina hemîyan, memaze a Paolî girte ser xwe. Heya ko Paskal Paolî der heqê wî gotiye: « Ew î ji havinê bokeyên kevin e û wekî peyayên ko Plûtarxos salîxa wan daye ». Rast jî serek Paolî mernasekî ecêb bû û ne fîşax bû.

Lê tevî ko heya wê gavê hezkirina Paolî di dilê Napolyon da roj bi roj zêde dibû; piştî ko kete nav leşkerê korsîkayê, hin tiştî dilê wî jî serek Paolî şikand û tew bi carekê lê sar



kir. Wî di tevgerên Paolî da tiliya inglîzian didît. Cihê ko dixwastin ji fransîzan bişlîtin, wê têketana bin destên inglîzianî..

Ev yeka han li Napolyon xweş ne dihat. Matir ko dê serxwebûn tine bûya, bi her awayî Fransîz ji inglîzian çêtir didît. Qene rê û rêzan, ol û adêten fransîzan pirtirî inglîzian nizikî ên korsîkiyan bûn...

Li ser vê yeka han dilê Napolyon li Paolî ma; lê piştî ko dev jê derbas bû. Ji ber ko vegera Franseyê jê ra ne mikûn bû. Di vî devî da bû ko nuçeyekê héviya Napolyon vejand û dê bikari bîna vegeriya Franseyê. « Hikûmeta Franseyê bi Nemsayê ra keti bû şer ». Di demêke holê da te;ez li hûkûmet hewceyî hemî zabîtan bû. Di deverên wanî da li gnehên kevin, nemaze holê biçûk, ne di hate nihêrin. Rîya Franseyê jê ra vebû bû. Bi vî awayî dikari bû ji Paolî xelas be. Ew Paolîyê ko di biçûkiya xwe da jê hez dikir û dixwast rojekê ji rojan mîna wî bibe; niha jî dixwast jê bireve.. kî zane, heye ko bavê Napolyon Karlo Bonapart jî di dawîya hevaliya xwe da ji ber sebebîne héja dev ji Paolî berda û pê ra bi der neket. Piştî panzde salan jî kurê wî rû ji Paolî ba didan û xwe davête himbêza hikûmeta Franseyê.

Napolyon di texmîna xwe da ne xapiya bû.

Dema gîha Parisê di Gulana sala 1791an da reşbelekek berpeyî wezîrceng kir û jê xwast ko wî vegerîne leşkeriyê. Di dawiya tebaxê da. bi ritba sersemeriyê (yûzbaşî) vegerandin firqa wî.

Di nava van sê mehên ko li Parisê li benda bersiva reşbeleka xwe ma bû da, destengiya ko Napolyon dîtiye tişteki ecêb e. Tevî ko destê xwe digirt û mesrefên zêde ne dikir, di nav du mehan da bê pere ma. Ji neçarî saeta xwe firo; lê bi tiştên holê berikên vala tije ne dibûn. Ne xweya bû ko wezîrceng dê kînga bersiva reşbeleka wî bide. Ji bo ko ne keve

dafa birçbûnê tişteki hati bû bîra wî; sîmsariya xaniyan.. Dîxwast bi deyin çend xaniyan kirê bike û wan bi bil-aktî bilintir bi kirê bide; heye ko bi wê karê debara wî bibe. I ê xwe-diyên xaniyan bi zabiteki holê zîvar bawer ne bû bûn. Xwedê kir ko bersiva reşbeleka wî hîn pir ne ajot. Çiqas ko des:engî kişand jî, ji bo nanê gewriya xwe hewceyî minetan ne bû.


Dema ko Napolyon li Parisê di vê destengiya han da bû; diya wî jî li Korsikayê ew tehlî dikîşandin. Heçko zîvariyê ne dixwest dev ji zarokên Karlo Bonapart berde. Lê her

tişteki jê ra dawiyek heye; teqez dê rojekê dawiya van destengiyên jî bihatana.


Hîngê li Franseyê tevgera serxwerabûnê gîha bû dewreya paşîn anê kêr bi bêtî sekîni bû. Ji ber ko leşkerê Franseyê jî ber ê Nemsayê direvîn û xelkê ev sûcê han dîxist stoyê melîk. Gava serxwerabûyan di 20ê Tîrmeha 1792an da dirêjî qesra Twfleriyê kirin, derê oda melîk şikandin û kumê sor dane serê wî; Napolyon f li Parisê bû. Di dehe Tebaxa wê salê da gava ajotin sera melîk û bi zor li ser têxtî danîn û êxistin hepsê, dîsa Napolyon f hazir bû; lê ev liştên han qet lê xweş ne hati bûn. Dawî, tevî ko ew hevalê fikreke cimhûrî bû jî, ne dixwest ko pêxas têkili tiştên girs û hûr bibin û daxwazên xwe bi destê zorê bi hikûmetê bidin kirin.

BERDANA KORSİKÊ

Me derketina serek Paoli ji Korsikê tevî sebebên wê berê di cihê wê da gotî bû. Piştî serxwerabûnê, gava hikûmeta Franseyê a nuh bingehên serbestî û wekhevîyê li nav xelkê belav kir; serek Paoli ê ko jî çend salan da li Inglistanê dima piştî danstandinê bi hikûmeta nuh ra vegeî Franseyê. Hikûmetê rûmeteke mezîni ji Paoli ra girt û ew kir hakimê girava Korsikayê û koumandarê hemî leşkerê wê.



Tangeke emêrikani, ji tîpê Serman, di qada şerê Italgayê de dirêjtî elemanan dîke




Zîrehpûşeke ingilîzî, di şerê Italgayê de xwe daye baskekî xelên elemanî û jî dûr ve gîtiyên xwe lê dibarinê

Pişîf vê yekê bû ko gava Napolyon hati bû giravê û ne xwestî bû vegere Franseyê. Lê paşê dema tiliya îngilîzan di hemî tevgerên Paolî da dît, ji kira xwe peşman bû û dev ji hezkirina Paolî berda. Li ser vê bû ko gava kês dît vegerî Franseyê û bi yuzbaşîfî kete leşkeriyê.

Di vê hatina Franseyê da pir ne ajot ko gelek tiştên mezin bûn. Di bajarên Liyon, Versay, Werems û Orléanê da kuştarine ecêb çê bûn. Her kesê ko bêhna hevaliya melikiyê jê dihat hate kuştin ko ev di dîroka Franseyê da bi navê « kuştara Îlonê » e bi nav û deng e. Di vê kuştara han da herçî peyayên ola Mesih jî têra xwe hati bûn kuştin û ên mayî bi der da revî bûn. Ji lewre hemî dêr û dibistanên di bin destên wan da hati bûn dadan û şagirtên wan, keç û kur li derva ma bûn. Di nav şagirtên keçin da, xweha Napolyon Elîza jî jî dêra San-Sîrê hati bû bîdêrxistin. Ji bo wê, bi lez destûra xwe stand û Elîza bir Korsîkayê. Gava Napolyon giha Korsîkayê navbera wî û serek Paolî li hev ket û ji kotekî tevî xelkê mala xwe girav berda û hate Franseyê.

Di rojên vegera Napolyon da bû ko careke din Paolî dixwest xwe ji hikûmeta Franseyê qut bike û serxwebûna giravê jî cihanê ra bide zanîn. Malbata Bonapart di vê yeka han da, wek berê ne bû bûn hevalê Paolî. Bi vê kira han bi carekê di çav heval û hogirên Paolî da bi derketî bûn. Li ser vê yekê serek Paolî fermana zarokên hevalê xwe ê kevin Karlo bi derxist û xwîna wan da rijandin.



JI ŞATOYÊN ÎNGİLÎSTANÊ YEKE KEVNARE

Herçî Napolyon, peyayên Paolî bi rê va dor lê girtin; lê Napolyon bi jîriya xwe ew xapandin û ji nav lepên wan filitî. Lê diya wî Lêtsiya, piştî vê yekê sibekê, xêrxwazekî haya wê kir ko cotkar û pexasên Paolî têne ko dirêjî mal û zarokên wê bikin; bema da xwe bi destên zarokên xwe girt û bi çolê ket. Ev malbat çend rojan holê bê cih û war li ber saxa (sahil) deryayê ma; heya ko Napolyon jî wan ra çareke bi derketina giravê peyda bike. Di nivê şeveke tarî da Napolyon ew êxistine Kelekeke (zewreq) servekirî û di nav pêlên deryayê ên wekî çîyan da berê wan da erdê Franseyê û îskela Marsilyayê.

Ma dihat bira kê ko ev zarokê mihacir, keç û kur, diçin ko bibin melîk û melikêyên Ewropayê?! kes kira Xwedê nîzane ..

MALBATA BONAPART LI FRANSEYÊ

Dema malbata Bonapart giha îskela Marsilyayê, bê ko bikarin jî xwe ra poxanekî (mesken) peyda bikin, xwarina wan a rojekê tine bû. Hingê diya Napolyon berê xwe da daîra belediyê, da ko rîyeke debarê jêra çar bikin. Dilê xelkê belediyê bi wê şewitî û jê ra arîkarî kirin.

Di nav kesên ko bi Lêtsiya Ramolino ra arîkarî kirin, təcîrê sabûnê Mr. Kîlarî bi awakî camêrî destê arîkariya xwe dirêjî malbata Bonapart kir. Demekî dirêj ne ajot ko nasî û dostaniyeke çak di navbera her du malan da hate pê û du sal bi ser da ne çû bûn ko Jozêf Bonapart bi keça wî təcîrî ra zewicî. Heta

Napolyon jî çav da bû duşka brayê xwe; lê keçikê kêfa xwe jî wî zabîtê jar û qirç ra ne anî bû.

Heçî biçûkê biran Losyan, xortekî jîr û sergerm bû. Bi vê sergermiya han ketî bû nav serxwerabûyan û bi gotarên agirfeşan jî xwe ra cilî çekirî bû. Di demekî wêlê da ko ke f Napolyon nas nedikir û nikarî bû arîkariya malê bike. Losyan di nîzîkî Marsilyayê da bi xêra wê sergermî û hevaliyê karekî baş dîtî bû û malbat pê bi xwedî dikir.

MËRIK Î DÎN E

Hêj nû zewicî bûn û gelek heji hev dikirin. Bi timobilê digeriyan. Gihaştî bûn Nyûenglandê. Mërik timobit bi lez tajot. Timobil li dareke kevnare ket û sekîni. Tu tişt bi mërik ne hatî bû. Lê jina wî bi birineke xedar bîrîn bû bû. Dilê jînikê jî bîr ve çû bû û xwîn jî serî dihat.

Ew der xelaseka bajêr bû. Tûkesî bi rê ve xuya ne dikir. Li rast û çepê çend xanî hebûn. Mërik li ber deriyê yekî lewha diktoran dîtî bû. Rahişte jîna xwe û berê xwe da wî xaniyî, xanikî kevin. Li derî da. Yekî bejinbilînd, geur bi por û riha wî ketî, derî vekir.

Mërik di dilê xwe digot, kes li mal nîne, diktor bi xwe derî jî me re vekir. Ji xwe ew diktor û li mal bi tena xwe bû.

Diktor li jînikê hûr bû û gote mêrê wê: Qehsê serî şikestiyê, hestî daye mejî. Jê re emeliyat divêtin; emeliyateke dişwar. Heje ko çêbibe. Lê tu dibînî ez bi tena xwe me, kes nîne ko arikariya min bike. Divêt tu li ber destê min bixebîlî.

Mërik bîvê nêvê pê qûn ani. Nikarî bû bi awakî din bikira; jînik wê bîmiriya. Lê ode di halekt ecêb de bû: her tişt tevî hev. Tu dibêji qey jî mejî ve tûkes ne ketî bû-yê.

Jînik benc kirin û diktor dest bi emeliyatê kir. Li ber emeliyatê dilê mërik diborî û dikir

ko bikeve erdê. Diktor pê hesiya û gote mërik: Êdt ez dikarim bi tena xwe jî bixebîtim. Heke dixwazî derveke derve.

Mërik derket derve. Di liwanê de diçû wi serî û vedigeriya wî serî. Ji nişkêkê ve sê peyayên bi çek, bi heryekî re şejderbek, lê peyda bûn û dikirin bikevîn oda emeliyatê. Mërik rê li wan girt û bi laulavê gole wan: « Ez di bextê we de me, mihletê bidin-ê heta ko emeliyeta jîna min biqedîne. Peryê min jî ji we re ».

Yekî got: Jî te ve em kî ne?

Mërik: Ma hon ne diz in?

Wî yekî (bi ken) got: No em ne diz in. Em pasvanên bîmaristanê ne. Mirovê ko jîna te emeliyat dike dînekî har e. Ew bîne du saet ko jî bîmaristanê reviyaye. Em hatine wî bigirin.

Her çar bi hev şewirîn û qerara xwe dan ko heta dawiya emeliyatê li hêviyê bîmînin û piştî emeliyatê wi bigirin.

Mërik jî pasvanan zanî ko mirovê din diktorekî bi nav û deng bû. Lê piştî jî ber zêdahîya xebatê din bûye û ketiye bîmaristanê.

Yekî jî pasvanan digote mërik: Ez dibêjim diktor emeliyata xwe wê bibe serî. Jî ber ko dihinê welê gava bi sinheta xwe mijûl dibin jî bo wî demî eqilê wan vedigere serî.

Her çaran di pencerê re li diktor dînhêrlin. Dema ko diktor emeliyeta xwe gîhande dawiyê û serê nexweşa xwe girêda pasvan lê der bûn. Diktor kir ko li ber xwe bide, lê wan ew zemt kir û bîrîn bîmaristanê û jî bo jînikê diktorekî din şandin.

Piştî çend rojan mërik jîna xwe bire Nyûyorkê û ew kire xestexaneke mezin. Diktorekî xestexanê li jînikê hûr bû û gote wêrê wê:

— Jîna te wê çilîbe û wê vegere halê xwe ê berê. Lê tiştek heye ko ez te dernayînim. Ene liyuta ko jî jîna te re çêkirine işkî zehmet e û wê emeliyatê bi tenê diktorekî heye ko dizane çêke; ew jî dîn bûye û iro di bîmaristana Nyûenglandê de ye.

Mërik kenî û got: Ewî diktorekî bi xwe çêkir.



BERGEHEK JI GUNDEKÎ INGILÎSTANÊ

ÇİN

Û TARİXA MEDENİYETA WÊ

DR. LYONËL CAYLEZ

Çin, çina paşemayî di tarîxa medeniyetê de xudan cihêki bîlind e. Gava Ewropa îro, di weşetê de bû xelkê Çînê ti ser kaxçê dîwîsansandin. Lê piştîre Çîn di xew re çû, Ewropa hişyar bû. Der heqê tarîxa medeniyeta Çînê benêde çarîbedar bi çavê me ket. Xawen Dr. Lyonël Caylez e. Me ew bend ti jêr ji xwendevanên xwe re wergerandê Kurdmanciyê.

Di heqê çîniyan de gelek çîrok û efsane hene. Lê li gora tarîxê çînî îro ji 4000 salî bêtir in ko di mîntîqa çemê zer de bi cih bûne. Dîbêjin ko çînî ji cibine din yê Asyayê, ji roavê an ji merkezê, hatine welatê ko îro tê de ne. Lê jê re tu delîl û birhan nînin.

Di pêşiyê de çînî bi tenê bi colkariyê mijûl dibûn. Piştîre dest avêtine hin fen û zanistiyê. Wek çêkirina porslawê, yanî fêrûr, çêkirina dermanan ji giyan û tiştin ji felekiyatê.

Piştî mîdekî bi madenê tunc xebitî û jê firaxin çêkirin û li ser wan firaxan nivîsarînin nivîsandin. Ji eserên kevin yê ko ketine dest dixuye ko di sedsalên 15 û şanjdolan beriya mîlada İsa de, çînî di vî sinhetê de lîfîfakî pêş ve çû bûn. Hin qalîkên kîso, hatine dîtin ko li ser wan pîrsiyarîne kahînanu hebûn.

Ev medeniyet di wextê malbata mîrekên

Şang de çêbûye. Lê bi temamî nayête zanîn tixûbên dewleta vî malbatê çî bûn. Lê herhal ne tişteki mezin bû. Payitxetê vî dewletê di nîzingî bajarê ko îro jê re « Keyfînc » dîbêjin de bû. Navên hin melîkên vî malbatê li ser hestîyan nivîsandî hatine dîtin.

Bi texmîn di sedsala 12 an de beriya (m. î.) (Mîlada İsa) dewleta malbata « Ço » ya ko li aliyê roavê rabû bû dirêjî dewleta malbata « Şang » kir û li dawiyê zora wê bîr.

Ev hakimên ha jî eslekî dîn û di medeniyetê de ji mîletên ko xistî bûn bîn destên xwe paşvetir bûn. Ji lewre medeniyeta Çînê mîdekî dirêj sekîni û xelk ji nû ve vejerîyan hoveberiyê.

Nîzama welêt istîbîdad û aristokrasi bû. Lê piştî hatina malbata nû nîzama jî hate guhartin. Hikûmeta nû torînen welêt bi çend biran lewa kirin û welat bi wilayet û qezam lêk vekirin. Ew wilayet ne weke hev, hin piçûk hin mezin, lê tev de bi melîk ve girêdayî bûn û melîk bi her awayî hikim li wan dikir. Ev nîzama nû li welêt hat û di destpêkê de bi saya melîkê pêşin mîr « Koçwîkû » çû serî.

Lê mîrên din yê ko di pey « Koçwîkû » re hati bûn ne di dereca wî de bûn. Dest bi israf û zîlmê kirin. Walî û mîteselîman serî hildan û li melîk rabûn. Ji milê dînan qebîleyîne wehşî yê ko li tixûban bûn, wan jî dest bi xerabiyê kir.

Di sala 842an de (b. m. î.) « Feriya Mîlada İsa » xelk li melîk rabûn û ew danîn.

Lê piştîre melîkîne dîn ji malbata « Çaw », melîkîne eqîlwend hatin û kîrê welêt jî nû ve saz kirin. Lê wê heyamê de nîfûza waliyan zêde bû bû û wilayeten mezin ên piçûk li ser xwe zêde dikirin.

Lê piştî mîdekî nîfûza wilayetan ewçend mezin bû ko nema guh didan merkezê. Vê heyamê qederekî dom kir û welatê Çînê bê dewleteke yekbûyî ma. Li gora eserên ko gîhaştine destên me jî vî fasîlê re fasîla « Bihar û Paîzê » dîbêjin. Vî fasîlê



Goleke bîdestçêkîrî. Gola ko kîşa me şanî dîde di İngîlistanê de ye. Ev gol di sala 1730î de kolane û av berdane.

ji sala 722an (b. f.) «beriya İsa» heta mirina Konfiçyüs, sala 479an (b. f.) dom kiriyê.

Di vê fasilê de hakimîne wilayetan rabûn û xurtiya merkezê xistin destên xwe. Di nav wan hakimanan de nemaze hakimên wilayetên Çi, Sûng, Ça, Ço hatine nas kirin.

Konfiçyüs bi xwe ji xelkê wilayeta «Lo» yê bû, di dora Şantonga İro de. Kofiçyüs mamoste bû, dursa exlaq û felsefê digot. Konfiçyüs tēkilî siyasetê ne bû bû û qala diyanetê jî ne kiri bû. Bi tenê dixwest xelk ji ibadeta rih, nemaze rihên bav û pêşiyên biparêze. Lê ev adet hetanî İro jî li welatê Çînê heye. Ji milê din Konfiçyüs digot divêt mirov ibadeta xwe li ezmanan bike. Bi vî awayî bi nizingahî ve ibadeta Xwedê qest dikir.

Li Çînê nizam û rêzika kalînan gelek pêş ve çû bû. Vê nizamê ibadeta rihan dîza. Çîniyan ibadeta rihên miriyên xwe dikir û bavîni wek kaniya her qenciye nas dikirin.

Pend û şîretên Konfiçyüs ewçend guhdar peyda ne dikirin. Ji ber ko hakim û melikên wî wextî dixwestin bi her awayî di ber çavên xelkê de bêne teqdîs kirin. Tesîra nizamên Konfiçyüs ançax piştî şkestina zorkeriyê xuya dikir û fêkiyên xwe didan.

Melikên malbata Çaw, piştî Konfiçyüs jî qederê 200 salî hikim kirin. Lê hikimekî bê nizam û di nav sûrçê de. Serekên eşîran ên xurt li hikûmetê asê dibûn, şer dikirin. Şerîne welê ko carîna qebileyîn bi temamî wînda dibûn.

Lê liştê ko seza ye mirov lê ecêbmayî bûnîne ew e ko piraniya zana û hînermendên Çînê di vê heyama sûrçê de jiyî bûn û eserên xwe nivîsandî bûn; herwekî Konfiçyüs. Jê pê ve jî herçî zanayên ko di wî wextî de peyda bû bûn nikarî bûn tesîr li xelkê bikin. Bi tenê rezerya ko di wî heyamî de hati bû danîn û digotin-ê nezerya Taw, piştî mîdekî tesîreke mezin li ser jiyîna Çînê kir.

Welê dixuye ko di sedsalê 13an de (b. f.) nizama zorkeriyê ya ko malbata Çaw d ni lû hati bû qelandin. Lê meseleke mîhim hebû. Ji wa î wilayetên berxwe niho kîjan wilayetê serdestiya hemîyan de bikira. Di nav wan hemî wilayetan de jî hemîyan xurtir wilayeta Çîna roavê bû, ew jî di halekî nîv-ve'şî de bû.

Şer wilayetên din gihane hev, gotina xwe kirin yek da ko li ber wilayeta Çînê bisekinin û nehîlin ko ew wilayet bibe hakimê wan. Lê wilayeta Çînê berberî xiste navbera wilayetên din, ew berdan hev û yeko yeko zora wan bir û dest danî ser hemîyan.

Di sala 246an de (b. f.) ji vê malbatê la-wikekî sêzdehsalî bû melîk û piştî ko 25 salan hikim kir, bû imperatorê hemî welatê Çînê, Çîna yekbûyî. Lê ev jî hakimekî mistebid bû, lê welat xistî bû nîzama û inzîbatê.

Wî melîkî di siyaseta xwe de niqteyên jêrîn dan ber çavê xwe û ew bi cih anîn:

1 — *Neyartia mezheba Konfiçyüs û şaqirtên wê mezhebê kirin.*

2 — *Nîzama ko welat bi wilayetine serxwe tēk ve dikirin rakir û jî her wilayetê re jî merkezê waliyên sivil û eskerî tayîn kirin. Ew walî di her kart de bi merkezê ve girêdayî û bi tenê li ber melîk berpisiyar bûn.*

3 — *Di nav xelkê de zîlanin hebûn ko kitêbên zana û feylesofên heyamên borî xwendî bûn, wan pê digirtî û nîzama melîk tenqîd dikirin. Melîk rabû hemî kitêb, jî kitêbên lîb, colkartî û kahiniyê pê ve, şewitandin.*

4 — *Di tîxûbên Çînê de qebileyîn weşî wek Hesgûngê hebûn ko jî selameliya Çînê re talûke bûn. Melîk rabû kelehen tîxûba bi diwarîne stûr gîhandin hev û benda ko bi benda Çînê bi nav û deng e anî pê. Ji bo çêkirina vê bendê jî meh-kûm û hêstran bi sed hezaran peya xebitîn. Dirêjahiya bendê 1500 mil e û ew bend jî bakurê Kansûyê digehê xelîca Lyatsûngê.*

5 — *Kêl û qesên welêt hemî kirin wek hev. Isilê xwendin û nivîsandinê gîhande şikilekî sade û ew di nav xelkê de belav kir.*

Herçend piraniya nizamên vî melîkî qenc û jî welêt re bi kêr bûn, jî ber ko çî tetbîqkirina wan de melîk dida wasiteweyê sextî û hişk xelk jê tēşîhan. Ji lewre bi mirîna wî re di welêt de sûrçê destê pê kir. (b. f. 210) Gundiyek bi navê «Lînbang» jî xelkê wilayeteke nîvro li hikûmetê rabû, bû şer. Gundî zora hikûmetê bir, hikim xiste destê xwe û malbata «Han» danî.

Hikimraniya malbata «Han» bi hin fasileyan qederê 40) salî dom kir. Mirov dikare bibêje ko nîzaman Çînê ên siyasî û civakî, jî bo mîdekî dirêj, di wextê vê malbatê de hatine danîn. Di wextê vê malbatê de jî carîna hakimên wilayetan bi istîbadê hikim dikirin lê vê kirdêyê, herwekî di wextê malhaba «Çaw» de, nîfûza merkezê kême ne dikir.

Disan di wextê vê malbatê de fen û zanistiyê jî nu ve dest bi şînbûnê kirin û mezheba Konfiçyüs bû mezheba hikûmetê a resmî. Li ser vê yekê gîregîr û unalmezîn bi neqenciya zîtmê hesiyân û xwe li ber wîjdana xwe berpisiyar hesabandin. Di nav xelkê de jî fikira istîqlalê şîn dibû. Ji xwe herçî gundiye

çini hergav ji istiqalata gund û beledê xwe re xweşker bûn; di wextê melikên zorker de jî.

Di wextê Împerator « Wo » de nifûza Hesyûngan jî hate şikestin û heyama wî midexî dom kir. Tixubên împêratoriye fîreh bûn.

Di sala 25an (p. f.) (piştî Îsa) malbata (Han) dest bi kişwerkişayiyê kir. Di hin emirê fermendar Banço de ordîwek çû heta Xurasanê. Nimînendeyek rêkirin Romayê. Lê nimînende piştî ko gihaste xelca faris jê vegeriya Çînê.

Edî qala qebileyên Hesyûng ne dikirin. Ordûne bi nizam zora wan biri bûn. Dibêjin ko qebileyên weşî yên ko di bin fermendariya Eftlê de dirêjî Ewropayê kirine, jî wî esilî bûn.

Malbata Han bi wî awayî hikim dikir û Çîn pêş ve diçû. Lê di vê navê de yek jî meyardarên nezeriya « Taw » rabû û got ko pê re qeweta sêhîre heye. Terefdarin jê re çêbûn û li hikûmetê asê bûn. Serxwerabiyan li serê xwe xavikine spî dipêçandin

Li ser vê yekê Çîn ketiye anarşiyê, yanî bêqanûniyê. Şerine mezin çêbûn û welatê Çînê bi sê hikûmetên mezin lêk ve bûn. Heçî qebileyên bakur-roavê jî vî fîrsendê îstifade kirin, serî hildan dirêjî bajaran kirin û li Çînê şanzdeh hikûmet peyda bûn û welatê Çînê cardî kete anarşiyê heta wextê ko li bakur teteran û li nîvro malbateke Çînî hikûmetin danîn.

Di wî heyamî de Ewrope di tarîtiya nezaniyê de pîyan bû. Herçî Çîn rexma ko qebileyê weşî bela xwe didan-ê, xwe jî weşî diparast. Di wî wextî de mîbesîrine mezheba Bûda ketî bûn Çînê û bûdehî[1] di nav çîniyan de belav dikirin. Jê pê ve xelkê Çînê jî bo peyda kirina kitêbên vî mezhebê ên mîqedes diçûn Hindistanê û bi wî awayî bi medeniyeta Hindistanê re jî aşînahî peyda dikirin. Ji milê din çîniyan îslûmê çêkirina kaxezê jî dîtî

[1] Bûdehî jî mezheba « Bûda » re dibêjin. Ev mezheb piştî mezheba Brahma di Hindistanê de hatiye rû û piştî derbasî Çînê bûye.



bûn. Xêra kaxezê medeniyet jî êrişa weşîyan diparistîn.

Çîniyan kaxez di sala 100ê miladê de de peyda kiri bû. Herçî ewropayîyan piştî wî bi hezar salî kaxez çêkiri bûn.

Di sîya kaxezê de jî nivîsandîne pê ve resamî jî pêş ve çû bû. Teswîrên resamê meşhûr Long-Mîn yên ko li ser kevîran kolayî bûn li ber digertî û nivîştî wan zêde dikirin.

Di heqê Çînê de dibêjin ko Çîn wek behîreke tîreh e û heçî çem û lehiyên ko lê diherikin hemî wek wê şor dibin. Xêra vî qabiliyetê Çînê heçî hêmanên biyanî, (insîrîn ecnebî) ew daqurtandîne û beriya sedsala şaşan yekîtiya xwe a nijadî anî wicûdê. Ev yekîti di heyamê malbata Syû de hatiye pê.

Di heyamê vî malbatê de jê pê ve îslahatîne mezin jî hatine çêkirin, wek kolana cowetî avê yên ko cotkariya welêt pêş ve diherin. Lê jî vî îslahatê re pere diviya bû. Ji lewre wêrgûne giran li xelkê hati bûn ferz kirin. Ji ber van wêrgûyan xelk li hikûmetê asê bûn û di sala 618an de malbateke nû bi navê (Tang) rabû ser textê Çînê.

Qehremanê vî hereketê (Lîşyemîn) bû ko piştî mirina wî leqeba (Tay-Tsûng) lê kirin. Tay-Tsûng di nav fermendar û sergevazên Çînê de yekî bijarete ye. Di zemanê wî de di hundîrê welêt de îslahatîne mezin çêbûne. Fen û zanistî gelekî pêş ve çûn. Herçî siyaseta xaricî, di vî warî de jî Çînê xurtîke mezin şanî da. Tixubên

imperatoriyê ji Pesifîkê gihastin heta gola Xwarzen.

Di wî heyamî de li Çînê û ji vê malbatê hakimîne mezin û hêja rabûne; wek imperatora «Wo» ya ko qedere 50 salî hikim kiriye û imperator Heswan Tsung yê ko qesira wî bû bû sêpîla şair û hinermendana.

Hingê çîni di fen û medeniyetê de raserî hemî mîletên dinyayê bûn. Lê yekî ji berdevkên imperator, yekî teler, bi çend hevalan ve xef û şewir kir û li hikûmetê rabû. Serxwerabî hin bi hin zêde bûn û derbeke xurt li malbata Tang dan. Bi milyonan mirov hatine kuştin û vê sûreşê qedere 150 salî dom kir. Xelkê Tîbetê dirêjî paytextê kir. Ji milê din qebileyên wehşî yên ko li tixûban dijîn ew jî rabûn. Ilakimên wilayetan jî bêbextî li merkezê kirin û di sala 956an de ev malbata han yekcar xerab bû.

Di wextê vê malbatê de her textî fen û hiner di welatê Çînê de pêş ve çû bûn. Ji milê din dîsan di heyamê malbata Tang de fena çapê ya ko bûdehiyan ji bo çapkirina kitêbên xwe ên miqedes ceribandî bû, çû serî. Dîsan di heyamê vê malbatê de isûlê imtihan û misabeqê hate danin. Ji bo memuriyetên hikûmetê xelk ji cihine dûr dihatin merkezê û di ketin imtihan û misabeqan.

Pişta van sûreşan welatê Çînê cardî ji hev de ket û di nav 50 salî de pênc malbatan

lê hikim kir. Lê hikimê her malbatê miderkurt dom dikir û hikimê wê li erdekî sêncikirî girtî dima. Di vê navê de li aliye bakur dijîmekî nû xwe kar dikir.

Wextê malbata Sung cil girtî bû qebîleke tongizan bi navê Xetay di nivroyê benda mezin de mixdarek erd xisti bû destên xwe û hikûmetê nikarî bû ew jê biderêxista.

Ji xwe di sedsala yanzdehan de çînyan di nivroyê çemê zer û di dora paytextê xwe de li hev civiya bûn hev û ne dikarin berevaniya welatê xwe bikirana, heta roja ko firsend bi dest wan ket. Ji mongolan qebîleke din hebû; jê re digotin Notçin. Ev her du qebîle bi hev nexweş bûn û bi hev re neyartî tajotin.

Lê gava wan û çînyan li hev da; çînyan nikarî bû zora wan bibira. Ji bervajî ve çîni şikestin û ji Xetay re hêj bêtir erd terk kirin, ji paytextê xwe rabûn û bajarê Hang-Çawê ji xwe re kirin paytext û bi neyaran re mi-ahedeke silhê çekirin û xvêkî dane wan. Digel vê hindê di heyamê Sung de medeniyeta Çînê weke xwe ma. Herçî fen û şîir ne wek di heyamê Tang de bû. Lê di tarîx, felsefê û di zanistiyên siyasî de biserveketineke mezin hate pê. Di sala 1069an de imperator li ser pêşniyada misteşar Wanguşê hin îslahatên daxilî qebûl kirin. Lê xelkê kevinendîş, yanî yên ko bi fikirîne kevîn emel dikirin, li van

îslahatan rabûn û di jiyîna imperator de ew îslahat edim kirin.

Di sedsala 13an de mongolan her û her dirêjî Asyayê dikirin. Çînyan digot ko xêra tecrîbeyên ko bi Xetay re kiri bûn ewê bi mongolan bikari bin. Lê îcar halê Çînê jî wextê Xetayê xirabtir bû bû. Neviyê Cengîzخان Qobelay ne bi tenê bakurê welêt, lê li nivro, erdê Sung jî vegirt û bi vî awayî di tarîxê de ji bo cara pêşîn Çîn bi temamî ket bin hikimê biyanîyan.

Seyahê venedikî Marko Polo di xatiratên xwe de qala timperatoriya Qobelay kiriye û tiştine spehî gotine. Lê Marko Polo tiştin ko çînyan dest pê kiri bû û mongolan biri bû serî tev de bi aliye mongolan ve daye û ew tişt wek eserên wan şanî dane.



JINÊN INGİLİZÎ DI XIZMETA WELÊT DE

Mixdaré mongolan yèn ko Çin vegirtli bûn li gora nifûsa çiniyan gelek hindik bû û karê hikûmetê rexma wicûda vegertiyaran dîsan bi piranî bi destên çiniyan dihate gerandin. Ji lewre qenc ne hatiye zanîn hikimê malbata « Ywan » çiqaşî dom kiriye. Lê tiştê bêşik ew e ko heta rahûna Çoywanşang çini di welatê xwe de bindest bûn.

Bi rabûna Çoywanşang malhateke nû bi navê Mîng rabû ser text. Vê malbatê ji roja pêşin de esasek danî. Li gora wî esasî ji Çinê re diviya bû qutbiriya xwe ji xelkê xerib bike û tixûbên xwe ji biyaniyan re bigire. Belê, çiniyan li tarîxa xwe dînihêrt û didîl heçî belayên ko hati bûn serê wan bi destên biyaniyan pêk hati bûn. Vî halî qedere 200 salî heta peyda bûna mibeşiran dom kir û bûyerên wî heyamî ji xelkê re nenas mane.

Mongolên ko ji Çinê hati bûn bi der kirin, gelek caran ceribandine ko imperatoriya xwe ji nû ve saz bikin. Lê li her carê şikestin û di wextê imperator (Çengsû) de welatê wan bi xwe hate vegirtin: lê vê vegirtinê gelekî dom ne kir. Ev imperator bû ko payitextê xwe guhaste Pekingê û avête ser welatê Anamê û di riya behirê re heyetîn şandin girava Sêlanê û welatine din, di Pesifikê de. Dîsa di wextê vî imperatorî de û bi emirê wî ferhengeke edebiyatê hate saz kirin. Di wî heyamî de edebiyata çini di temaşa û çiroknivîsiyê de tîfalekî pêş ve çû bû. Çiniyan ev tişt ji mongolan digirtin.

Lê ev malbat jî bi ber bêexlaqîya giregiran hin bi hin mehiw dibû. Qursanên[1] japonî tavêtin peravan û di Koreyê de şerîn çêdibûn. Vî halî heta sala 1516an bi vî awayî dom kir. Di wê salê de vaporeke portigalî gihaste bendera Kantonê û portigaliyan tê de miesiseyine ticarî danîn. Bi vî awayî Çinê bi ewropayîyan re dest bi dan û standinê kir.

Di pey portigaliyan re spaniyan di giravên Filipînê de mistemlikeyek danî. Holendiyan jî birekî girava Formozê vegirtin. Ji milê din mibeşirên ko diketin Çinê jî diyanetê pê ve medeniyet jî belav dikirin.

Lê dîsan şûreşan di Çinê de dest pê dikir. Mançûkiyan di bin fermandariya sergevazê xwe Norhatço de destên xwe dirêjî tixûbên bakur-roavê dikirin. Di vê navê de xelkê Çinê bi hev ketî bûn û herberf bi hev re dikirin. Mançûkiyan jî vê firsendê îstifade kir û berda

Pekingê, payitextê welêt, çiniyan gelek li her xwe da. Lê li dawiyê zora wan çû û mançûkiyan welat vegirt. Di wî heyamî de û bi saya imperatorew Kanghesî û Çinlong Çin gihaste aşî û refabeke welê ko di dirêjahiya tarîxê de ew ne dîti bûn.

Vî heyamî qedere 60 salî dom kir û li Çinê her textî sinhet û zanîn pêş ve çûn. Edalet li welêt de bi cil bû, wêrgüyên giran hatine rakirin û xelkê bihîna xwe da.

Di sedsala 18an de gava Ewrope di şerên Napolyon de pûyan dibû, nifûsa Çinê li xwe zêde dikir û dibû sê gat.

Dîsan di wî heyamî de bû ko çiniyan jî bo cara pêşin şerê ewropayîyan kir. Şerê pêşin bi ingilîzan re çêbû. Ingilîz jî şertên ko çiniyan jî bo ticarêta danî bûn aciz bûn. Rabûn du caran heyetîn rekirîne Çinê da ko bi van meselan mijûl bibin û jê re helekê peyda bikin. Lê teşebîsa her du heyetan jî peşilî; bû şer. Li dawiya şerî de ingilîzan Honkong vegirt, çiniyan benderên Çinê jî ticarêta Ewropayê re vekirin û Çin bi tezmîna-teke giran mehkûm bû.

Piştê şerêki din jî çêbû. Vê carê ingilîz û fransîzan pev re dirêjî Çinê kirin û Peking zent kirin.

Di pey wê re li Çinê şerêki daxilî çêbû ko jê re serxwerabûna Taybing gotine. Ev serxwerabûn bi destên çiniyên ko bû bûn meslîhî hate pê. Vê serxwerabûnê berê xwe da bû malbata hikimdar. Ev serxwerabûn di wextê imperatorîçê « Tsûhîsî » de çêbû bû. Piştî ko bi milyonan peya baline kuştin serxwerabûn bi arfikariya biyaniyan hate temirandin.

Di pey vê serxwerabûnê re japonan dirêjî Çinê kir û bû şer. Piştî vî şerî jî esyanêki din çêbû û serxwerabiyan dirêjî sefaretxaneyên biyanî kirin û taxa ewropayîyan mihasere kirin. Ewropayîyan Çin cirîm kir û jê tezmînateke mezin standin.

Herçî malbata mançû jî piştî vê esyanê mehiw bû û Çin bû cimhûriyet û di sala 1912an de Dr. « Sûnyatsin » bû serêcimhûrê Çinê.

Lê Çinê dîsa rahetî ne dît. Japonan bela xwe da bû-yê. Japonan piştî ko Mençûrî jî Çinê stand di sala 1937an da dirêjî wê kir û peravên wê tev de vegirtin. Lê jêneral Çankaygek li pêşiya japonan sekinî û şerê wan kir. Ji roja ko japonan dirêjî Emerîkayê kir Çin jî kete sefa hevalbendan û digel wan şerê japonan dikit.

[1] Qursan, nijdeyanên behirê. Yèn ko bi rê ve gemiyan dişêlinin an tavêjin peravan.

JINA KÊMXWARIN

Zilamek hebû, ne gelek dewlemend bû, lê têr nan dîxwar. Lê çiqûz û destgirtî bû. Destê wî li pereyê wî ne diçû.

Mêrik dîxwest jin bikît. Lê li ber mesrefa jinikê diket. Diçû cem camêran û digot: Min divêt ez bîzewicim. Lê ez mîrovekî feqîr im; min pere nîne. Ji min re jinikeke kêmxwarin û kêmesref divêtin.

Xelkê digot, keçika ko tu dibêjt nik me peyda nabit.

Di wî bajari de keçikeke şehrâza hebû, bi mesela mêrikî hesiya bû. Keçikê gole bavê xwe, heke mêrik qesta me kir ez qîma xwe pê tuim; tu hema herê bike.

Keçikê bi ser de hin şîret ji li bavê xwe kirin da ko bizanît li mêrik vegertnît. Bav, jê piçûktîr çend keçên din jî hebûn.

Rojekê, zilamê çiqûz qesta mala keçikê kir û mesele ji bawî re got.

Bavê keçikê got-ê: Keçên min tev de kêmxwarin in. Nemaze a mezin bi hewayê dijît, tu girarê naxwît.

Mêrik kêfxweş bû, keçik mehir kir û berê xwe dan bajarekî din, da ko çend rojên xwe tê de bibortin. Ango çûne meha lîngwînî.

Jin û mêr li otelekê peya bûn. Wextên şiv û taşiyê mêrik diçû derve di dikanîne beqalan de bi pereki hindik têr dîxwar. Li jina xwe ne dipirsî. Ma jinik bi hewayê ne diji...

Herçî jinikê piştî ko mêrê wê diçû sîkê, banî lawikê otelê dîkir û ji xwe re firaxîne bijarê û giran dida anin; wê jî têr dîxwar.

Piştî çend rajan qeraca xwe dan ko vegerîn mal. Mêrik hesabê xwe xwest. Jê re hesab anin; hesabekî dîr û dirêj. Tê de jî bo hero heqê sê danên xwarinê hebûn.

Mêrik li kaxezê nihêrt û gote otelê:

— Heyran, ev çi hesab e. Min kengê di otelê de xwariye?

Otelçî: Belê rast e. Te ne xwariye, lê xanimê xwariye.

Mêrik çû nik jina xwe, jê pirsî û got: Hîrmel ev çi bazar e?

Jinikê got: Belê - di mala bavê xwe de ez bi hewayê dijîm. Lê ji roja ko ez hatime nik te ez qul bûme, nema hewa di min de disekîne. Ji lewre ez girarê dîxwim.

Mêrik ji jinikê hez kiri bû. Hinekî da eqilê xwe, lê deng ne kir û bi rêva dev jî nemerdîyê berda.

PIR BÊJ

HINDIK RINDIK

GIYAYÊ KO DIKUXE — Heia niho gelek caran hate bihîstin ko giyayin hene ko goştî dixwîn; kullîkin hene dikenin; hinên din digirin. Lê giyayê ko dikuxe me ne dizanf.

Ji berê de di kitêbên giyanêstî de me ditiye ko giyayine goştxwer hene. Wan gîyan pel an kullîkine di şkilê fîncanê de hene, Devên wan kullîkan vekirî ne. Mêş, moz an textîtek ji wan heywanan dikevit nav fîncanên wan gîyan û devê fîncanê tete girtin, Giya avêke bidemûş berdide û heywawê ko ketî-yê di vê avê de dihele û bi wî awayî giya wî dixwe.

Disan kullîkin hene gava vedibin lêvên wan wek lêvên mirovên ko dikenin jî hev dibin û diçemin. Hinên din jî pelên xwe wek rûyê mirovên ko digirî dijermiçînin.


Lê vê paşiyê di welatên germ de giyakî welê hatiye dîtin ko dikuxe, Gava mirov tozekê li ser pelên wî giyakî direştne pekpekokin lê çêdibin. Ev pekpekok, piştî û hêdika diteqin û gava diteqin jî wan dengekî welê dertê ko dimîne kuxika xenêkok. Reşikên wan welatan toza birincî bi wî giyayî wer dikin û pê wî didin kuxandin.

JIADETÊN XERÎB — Dibêjin ko teterên.

Asya navîn gava dixwazin yekî biezmînin şivê an taştê, diçin mala mêrik û bêt ko jê re tiştêkî bibêjin gulêkî wî dikîşînin.

Di hemî tiyatroyên dinyayê de adetek heye. Heke temaşagerêk di orta temaşê de dixwaze derkeve derve vîtiyek — kertek — didin-ê. Di vegerê de wê vîtikê li ber derf şanf dide û dikave hundir. Welê dixuye ko di tiyatroyên Japonî de adeteke din heye. Heke temaşagerêk dixwaze derkeve derve kefa destê wî bi morekê şeqil dikin û di vegerê de li kefa destê wî dîniherin. Ji ber ko li Japonayê tiyatroyê saetan ve tajan. Heke ko mêrik derkeve vîtikê bide yekî din û wî yekî belaş bexe tiyatroyê.

Lê heke wê ko derketiye derve destên xwe şwîştin û şeqil jê çû, hingê wê çi bike? Ewê bîlêteke din bistîne.



Piyadeyîne inglîzî xwe dane ber hêşu tangekê û qesta neyar dikin.

NEÇÏREKE PILINGAN

Zabitek fransiz wextê ko fransiz nû li Hindistanê çû bûn digel mirekt Hindistanê çû bû nêçira pilingan. Wî zabitî qala wê nêçfrê kiriye û gotiye:

Ez nikarim ji we re bidim zanîn roja ko mehracê ez ezimandim nêçfreke pilingan ez çiqas kêfxweş bû bûm. Ma kî ji tiştekî holê kêfxweş nabit.

Ji sê çar mehan de di dora erdên mehrece de du piling peyda bû bûn, me û nêr, û gelek xerabî tê de kiri bûn. Emê biçîwan nêçira wan. Wan pilingan ji dewaran pê ve du zarokên hindî jî kuştî bûn.

Piling di daristaneke bi teqan de disekinîn; cemekî şeylo jî di daristanê re diborî.

Bi mehracê re gelek xulam û çend filên fêris hebûn; filên ko gelek caran ev nêçîr kiri bûn. Xulam tev de li filan siwar bû bûn, ji sisiyan pê ve, yên ko bi me re dê bimana.

Plana mehracê ev bû: Hêlevanî wê bike-tana daristanê û piling bi ser me de bajotana. Mehracê bi xwe jî li filekî siwar bû bû; dixwest ko ez jî pê re siwar bibim. Lê min ji xwe re çêtir dît 'ko digel hespê xwe li biwara dehan bisekinim.

Hêlevanî digel filên xwe qor girtin, daristan li xwe ba dan, li me zivirîn û dehbe bi ser me de xira dikirin. Ez ji hespê xwe peya bû bûm. Min hespê xwe ji xwe re kiri bû talde, tişngîdîst li hêviyê dimam. Xulamekî serê hespê min digirt.

Min digot qey gelekî dom kiriye. Ji ber ko me tiştek ne dibihîst, ne jî tiştek didît. Rojê germ jî bilind bû bû û qehfê serê me digewitand. Min çavên xwe li dorê gerand tu tişt nîn bû ko min xwe bidaya ber siha wî.

Ez di van texmînan de bûm ko min dengê hêlevaniyan kir. Min çavên xwe vekirin û guhên xwe hel kirin. Nema bi germiya rojê dihesiyam. Piştî bihinekê tevger dest pê kir. Delhebeyn jî teqanê radiibûn û ji ber hêlevaniyan baz didan. Lê kesî guh ne dida wan. Herkes li hêviya pilingan bû. Îcar deng û pejin bêtir dibûn. Min digot edî nzing bûye. Keriyek meymûn jî daristanê derket û li darine perekende belav bû. Tîmsahek jî ji teqanê derket û xwe berda çem. Marekî fêris dişêliha û xwe li darekê dipêçand.

Hêj mar îşê xwe temam ne kiri bû. Ez çî bibînim, her du pilingan xuya kir. Ê nêr da bû pîşiyê. Filan jî nzingî li wan kiri bû û didan pey. Qîrîn bi hêlevaniyan keti bû. Pilingan piştî ko li pêş û paşê xwe nihêrlin, berê xwe dane min. Dilê min hiltavêt, bi

SKOÇLAND



Yek ji eyaletên Ingilistanê ên tével Skoçland e. Skoçland dikeve bakurê Ingilistanê. Skoçland welatekî çiyayî e, xelkê wê hişk û şerûdî ne. Hetanî îro di nav wande rêzikên eşiran hene. Xelk diçûn ber pez û qimaşên wan ên hiirî di hemî dinyayê de bi nav û deng in. Xelk di çejîn û şahinetan de cilên xwe ên mili wendigirin û pê ifîtkar dikin. Herçî mûsiqîya wan a mili, wek ya me, textîtek dahol û zirne ye. Dostê me ê delal û hêja kulhêl Ellinston jî wî welatê çiyayî û eşîrwarî ye. Ji xwe heye ko ji lewre dostê me dike. Klîşa me yekî skoç bi cilên xwe ên mili şanî dide.

teptepa dilê xwe dihesiyam. Lê ez li xwe hakim bûm.

Pilingan dudilî ne kir. Ê nêr bera min da. Bi derbekê hespê min û xulamê ko ew digirt avêlin erdê û qesta min kir. Min tînga xwe lê rast kiri bû û nişana xwe girti bû. Di navbera me de du gav ne ma bûn. Ez li ser çong û nîvektî rûniştî, min agir kir. Orîn bi pilingî ket û li erdê pehin bû. Min hingafte bû dilê wî.

Di tînga min de hêj berikek hebû. A me dirêjtî min dikir. Lê min ne dizanî gelo minê wê jî holê bi rahelî bikariya bikuştî. Aylimek jî ser piştî filan çû. A me jî ket erdê, çermê wê bû bû bêjîng ».

DILAWER ÇARPINE

MASIYÊ BRAŞTÎ

Melika Misirê Klêopatre, di gelê aşiqê xwe Mark Antonî, carina diçû masîvaniyê. Klêopatre di masîvaniyê de gelek destbikêr bû; her gav selika xwe ji masîyan liji dikir.

Herçî Antonî, genêralê romani, her gav destvala vedigeriya û gelek diqehiri. Antonî rabû xewusek peyda kir, gelek perç dan-ê; çih û roj ji jê re bi nav kirin.

Xewas di roja xwe de bi selikê masî çû û noqi avê bû. Antonyo û Klêopatre hatin, nehkên xwe berdan avê. Carê ko Antonyo nehkê xwe berdida xewas masîyek pê ve dikir.


Wê rojê Antonyo selika xwe ji masîyan teji kir û kêfxweş bû. Heçî Klêopatre li vi îşî hinekî heyrî ma bû. Lê melîka jir zûka deka aşiqê xwe bîr bîr.

Pişlî çend rojan dişa çûn masîyan. Dema gihastin qeraxa avê Antonyo nehkê xwe berda avê. Nehk giran bû bû. Antonyo di dilê xwe de diyo, mîrikê min ve carê masîkî jêris pê ve kiriyê; û bi kêfxweşî dikişand.

Lê çî bibînin, bi nehkê Antonyo ve masîkî di firnê de şorkiri hebû. Antonyo ji şerman wek masiyê xwe sor bû bû.

Betê, Klêopatre pişlî ko bi deka aşiqê xwe hesiya bû xewusekî din peyda kiri bû û masîkî braştî da bû-yê da ko bi nehkê Antonyo ve bike. Wi ji welê kiri bû.

EFSANEBÊJ



Li Ewropayê gelek guh didin bixwedikirina her texlî heywanan, çî pez çî dewarên ştûr. Bi vi awayî carina pezekî wan dihehe sed kiloyî. Dûvên wan



pezan dibirin û xurtiyê didin bedena wan. Herçî ga ew ji digehîa 800-1000 kiloyî; ji devehên me meztir û girantir. Klîşeyên me du conegayên Ingilîstanê şani didin.

Kiryariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê Pênc lîreyên sûrî — Ji bo welatên din lîreki ingilîzi

Xwedî û gerinendeyê herpirsiyar : Celadet Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye
 Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 3
HEJMAR 23

1944
SIBAT-ADAR


RONAHÎ

ANNEE 3
NUMÉRO 23

1944
FEVRIER-MARS

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON: 12-29



*Eskerine xaça sor darûbesteke birindaran di tehtan re dadîxin rastê.
Li rastê erebeyên birindaran wan dibin û digehinin xestexaneyên gerok.*

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1944

DI VÊ HEJMARÊ DE

Nêçira Kewan	Evdirehman Eli Yûnis
Fenên Dêw	Çirokbêj
Xezel	Nalî
Şeva Gayê Zer	Evdilkerim Mela-Sadiq
Dayin	Bişarê Segman
Memê Alan	Evdilmesliş Wezir
Selahedin	Osman Sebri
Bo Agadari	Gulavêj
Dengi Gitliyi Taze	Ronahi
Kudistan	Exbar-el-Herb
Lehistika Şetrencê	Cemilê Tacdo
Gula Min	Cegerxwin
Napolyon	Osman Sebri
Rewhanî û biyanî	Hesen Hişyar
Cêwikên Siyami	Smaînê Serhedi
Merşal Lûksenbûrg	Qadirê Ferman

DÎBACA

NÊÇÎRA KEWAN [1]

Carek ji cara, Xişoyê Soso û Kaloyê Remezan
Çûn û geriyau li ferxê kewan.
Ji xwe re girtin du ferx ji ber mêrkewan.
Pêşt xwedikiriina wan li sindik û kulf.
Li dû wê bi genim û tehlî.
Hate meya Kanûn, berfê dîwar sîn
Kewgirvan eba kişandîu serê xwe û li halê xwe û
[kewê xwe wer bûn.

Hal meha Sibat; terqên ji qefesa hat;
Rebat qomqomî, celab sekini.
Bi xêr hat, meha Nisan,
Vedan xwezê bû dîsan.
Şahi ket mala xwey-kewan
Mêkew çûn ser heka û ribat ketne lîsan.
Rabû ser xwe Xişoyê Soso, gazî kir Kaloyê Remezan;
Go rabe em herin vedana kewan.
Şevdesta emê bavêjin ciyêkî kûr.
Kew bêne me wek ga û baqir,
Emê jê tiji kin cenb û tûr.
Rojdestan emê bavêjin kaşa,
Kew bêne wek ker û wehşa,
Emê bikîşinin bi cenb û lûsa.
Hêvara bavêje cihê bêndera,
Tû godarî bike li girê û şera,
Emê tiji bikin cenb û fera.
Şevdestek avêtin ciyêkî kûr
Rebat sekini celab tîmîni.
Pire-kew derket ser keviri.
Kir şarşar, qurequr, go cy celabê bêzar,
Carek ji cara, min tu ne di ji ser darê hati xwar,
Hero seo, ez bi te re nakûn tu bazar.
Ka ribatê te ê tal û nikûl-xwar.
Ribatî go here dêla, dêla, dêlayê
Tu jin î, xebertana min bi te re nayê,
Sejê mêrê te xwe xistiye bin deviyê deng jê nayê.
Ez ribat im, ribatê gumre me,
Şevdest û rojdest, bi xwe ewle me;
Restemê zal ez bi xwe me.
Pire-mêkewê go, ey ribatê qut, qop û tal,

[1] Li ciyê me ew mirovê ko kewgirvan e gerek vê dibacê bizane; an-ne ne kewgirvan e.

ÇIROKA KURDMANCI.

FENÊN DÊW

Di zemanê berê de merivekî kor hebû. Kurekî xwe ê dehsalî hebû. Li parsê digeriya. Rojkê ji gundan dîhat. Di newalekê de, li ber zinarekî rûnişt. Keserek kişand. Di zinar da, derî hebû. Dêwekî serê xwe biderxist; ji mêrik re go: Tu li çi digerî?

Mêrik şaş bû; go min lawê xwe anî ko tu bi xwendin bidî.

Dêw go: Saleke di vê çaxê were kurê xwe bere.

Derî hate girtin; mêrik çû mal. Salkê li mal rûnişt. Sala xwe bû tamam, ewê were lawê xwe bere.

Jinikên dêw dido bûn. Yek rind; yek pîs. A rind ji lawik ra go: Sibe da dêw ê banî te ke; ji te bipirse; jinên

Ji mî re hene, çil ferxê par û çil ê pêrar.
Hemî nikûl-sor û celebdar.
Bêne te, wê pûrtika te, ji serê te binin xwar.
Bîla bi te nehese û dengê te sa neke mêrê min ê
[dijwar.

Ribatî go, Ez ribat im, ribatê qut im,
Bi çakûkî û kelpedana ji ser ferşê kozikê nalebitim.
Ez ji ser û lêxistinê re pir bi emliyet im.
Mêrê wê navê wê Kormenseb e.
Kormenseb ji xew rabû, got jina xwe ê çî deng e tê?
Jinikê go, ev Gulbarin e, kewê Xişoyê Soso ye,
Hatiye cihê me, fort û pesna dike.
Kormenseb deng li zarowê xwe kir û go:
— Min divê hou Gulbarin ji mî re bi şkelê piyê wî
[ve bigirin, nekujin bi saxî binin cem min;
Ev çî bê-aqil e ko hatiye warê min.
Bi carek şiqên bi ferxên wî ket û firin,
Pire-mêkew, dîlê wê, qerar ne da, ew jî çû.
Dema gihîştin ber dafa û bi carê aliqin,
Pire-mêkewê gote aferin Gulbarin.
Kewê Xişoyê Soso ê xwinxwar!
Ji min re berde du ferxên par.
Ko min û kalikê mêrê min,
Wa bibin zozana û pazê binin xwar.
Gulbarin go, girtin bi min e, lê berdan bi Xişoyê
[Soso û Kaloyê Remezanê bêtebîet,
Îro sê ro, bi cinobet, ne kiriye tu lîmêj û tu taet.
Dibêjin Xişo bi zmanê keua de bû bîl zana,
Rabû ji rehma xwe du heb berda.

EVDIREHMAN ELÎ YÛNIS

Me hêvî ji axê heye ko piştî vê dibacê, ji me re nêçîrên welatê Sasonê, herwekî devkî û bi awayê xwe ê şêrin qise kiriye, bend bend di Ronahiyê de binivîsit.

Kes nizane, beye ko dûr-nîzing digel axayê defal em li ber wan kozik û çeperan fûnin û nêçîra ko axê ji me re qise kirine bi destên xwe bikin.

min ktjan rind e. Tu bëje ez nizanım, ktja ko bi te rind e, ew rind e. Ewë ji te bîpirse, te ilmë min hın kir, hın ne kir. Tu bibëj ez hın ne bım. Ewë bibëje eyh e, sibe havë te é were, ezë jë şerm hikim.

Dëw jë pirst, lawik got-é: Wexta ko te ders dida min, ez hın dibım. Wexta ko tu ji cem min radibıyı, mi xwe ji btr dikir. Ez niha tışteki nizanım.

Bû sibe, bavë lëwik hal. Ew li ber zinar sekini, destë xwe lëxist. Deri vebû, dëw destë lawik girt, teslmi bav kir. Bav lawikë xwe girt, çû mal.

Lawik ji bavë xwe re got: Ezë işev bi hespekî rind bim. Sibe min bibe mezadë. Ewë sed zëri bi te din. Peryë xwe bigire, hevsarë min mede kesî, btne mal.

Bû sibe, hav rabû, di ko hespekî rind di xani de hatiye girëdan. Hevsarë wi girt, çû mezadë. Xelk gişk halin. Sed zër të dan. Bav peryë xwe girt, hevsar, ji ji serî jëkir; hal mal.

Ber ve évarë lawik hate mal go, bavo te peryë xwe girt. Bav go herë. Lawik go, ezë işev bi deveki spî bim. Min bibe mezadë, ewë bist zëran di min din. Peryë min bigire, hevsarë min jëke, btne mal.

Bû sibe. Bav rabû, di ko devakî spî hatiye girëdayin. Hevsarë wi girt, bire mezadë. Xelk gişk hatin. Bist zër të dan.

Dëw di mala xwe de go, insanë wî zemanî emel pë nabe. Dibe ko wî lawikî ilmë min hın kiriye; di nav xelkë de eşker bike.

Dëw rabû, xwe tebdilî qiyafet kir, hate mezadë. Di mezadë de, deveh nas kir. Çû bi bavë lëwik re bazar kir. Go, tu vî devayî bi çi didi. Extiyër go, ez bi bist zëran didim. Dëw bist zërë wî dan-é. Hevsar ji dest girt.

Extiyër go, ez hevsarë xwe nadim. Dëw go, mala min ve li vir e. Li şûna hevsar da zërekî din dasyë. Hevsar ji dest girt û çû.

Lawik zani ko paşî xerab e. Çawan kir ne bû. Çû heta ber zinar. Wexta ko

X E Z E L

*Zilft bi qedet dake perişan e, bitaw e.
Emro le min î şeste alîz û be daw e.
Bo çi ne girim sed kere tim dil deşkêti
Mey boç ne rişê şîşe le sed çîge şikawe.
Omwîki dirêjim be xeyali serî zilfet
Sewda û perişan im û sewdayeki xaw e.
Herçende ke rût im be Xuda mailî rût-im
Bê bergiyê il-let ke heliw mail be hetaw e.
Her coge û cêgaye ke wa sûr û siwêr bê
Çîgi çûşê giryanî min e, xwê-nerijawe.
Bê faide ye men'i min êsta ke le giryan
Bo aşiqî bêcare zû em awe rijawe.
Sûzi dilime baisî ta û kul û giryan
Malûm e ke agir sebebi çûşê aw e.
Manî niyetî qewetî teswiri biroşî to
Em qewse be destî miteneq-qîş ne kişawe.
Nalî wekî zilfet ke mittî berî pêt e
Têkî meşkêne be cefa meyxere law e.*

N A L I

dëw çû hundir. Lawik serë xwe da serdera derî da. Hevsar di serî da jëbû. Lawik li xwe xwend, bû kevok, ket hewa.

Dëw di ko lawik firî: wî ji li xwe xwend, bû bazez kete pey. Lëwik di ko xelas nabe. Bexçeki mezin di; hewzek di ortë de ye. Di dorhëla wî hewzi ra paşaler rûniştine. Lëwik li xwe xwend, bû guleke sor, kete orta hewzi.

Dëw ji li xwe xwend bû mitirbek, saz bi piyë wî ve; hal temena kir, bi edeb rûnişt, sazë xwe lëxist.

Xulameki ew gul girt, da paşayë mezin. Paşa ji destë xwe kir bërîka xwe, pere hidexista ko bi mitirb bida.

Milirb go, ez pera naxwazim; bira paşa wê gulë bide min, ji min re, bes e.

Paşayë mezin ew gul da mitirb. Lëwik di ko iş xerab bûye. Li xwe xwend, bû garisë zer, rijiya erdë.

Dëw ji li xwe xwend bû qurkek bi deh çelîkên xwe ve û garis ji erdê dineqandin. Lawik li xwe xwend bû roviyek, qurk ji xwar, çelî ji xwarin.

Lawik disa bû merî. Paşaler lê ecêbmayî man; gotin ev çi iş e? Lëwik ji wan ra qise kir û mesele got.

Ji hingê va dëw insana hın fenê xwe nakin.

ŞEVA GAYË ZER

Şev û rojek Kanûn ma bi. Pîrek hebi bi çar kura ve; gayektî wa 1 zer hebi, jiyîna wa bi wî gayî bi. Êvara Kanûna-Paşin xelas bi bi. Babê pîr derket ji derve, temaşeyek li ezmana kir, hat hundir got zarokên xwe:

Lawên min ez vê şevê xirab dibînim, rabin gayê zer şerjê kin, agiri xweş bikin sitilê kuç kin.

Zarên wî gotin-ê: babo jiyîna me li ser milê vî gayî ye, emê çawan dil bidî vî gayî şerjê biki.

Babê wan got: Wek min ji we re goli ez vê

şevê gelek xedar dibînim; şerjêkirina gayt wê rihê me hemiyan xelas bikil.

Li ser vê yekê ga şerjê kirin, agir xweş, sitil kuç kirin. Ji êvarê pê de berfê lê kir, berfe ke boş û ecêb.

Demek yê şevê pîrê aqil rabî derket ji derve, nêri berfê wê serban teji kirin, kefenek spi avêti ser dinyayê. Hema hat lawektî ji yê xwe hişyar kir û heslik têr goşt û germ da destê wî, go derabe lawê min berfmalê hilîne, here serê banî, berfê bavêjê.

Kuriki ew goştê germ bi dest xwe girt, berfmal hilani çû serê bën, fekirî ji gazê bêtir wê berf

barî. Berfa li -ser banî hemî malîşt û vegeyîya ber agirtî û li cem sitila goşt rûnişt. Demek dî çû: pîrê hişyar carekê derket fekirî wê berf dibarî, lê barîneke ecêb. Cardî heslik ji yê goştê gayî da dest lawê xwe ê çûn û berfmal da dest û got-ê, rabe kurê min le.e serê banî. Wî ji wek kirayê xwe ew le.fu gezek dî bari, malîşt û lat xwar.

Bi vî awayî babê pîr her saelê kurek yê xwe ji xew radikir û qelîk goştê germ dida dest û rêdikir serê bën, berf ji ser banî dimalîştin, heta li wa bi sibe.

Sibehtî nêrin di wî gundî de ji wa pê re tukes ne maye, kemi mayin di bin berfê de, çerkan bi ser wa de halin xwar, di bin wê berfa ecêb de hemî çuyin. Fîngê pîrê hişyar û aqil got lawên xwe: L'evre dît, wek mî ji we re gotî ev şev û rojek kanûn çîqa gelike. Gayê zer ne stêleh bi, jiyîna me li ser milê wî bi. Lê tro ewî gayî rihê me her pênca û bi diya we ya pîr ve xelas kir.

Evdilkerim MELA-SADIQ



BERGEHIN JI ŞAGIRT Û DIBISTANÊN GUNDÊN INGILÎSTANÊ

DAYÏN

Li wextê berê, di heyamên kevin de mirêk hebû. Mîrekî ciwan, çeleng, xudanbext û bi destê xwe mêr. Mîr Tacîn digotin-ê. Mîr welatekî mezin û fîreh, erdekî bijûn û dewlemend hebû. Mîr ew welat bi qeweta şûrê xwe vegirti bû û disan bi şûrê xwe berevaniya xelk û erdê xwe dikir.

Neyaran serî hilda bû. Ji mîr re diviya bû li xwe biqewimanda û biçîwa şerê wan. Mîr berê xwe da bû erdine bêpîvan, welatine dût. Di paş xwe re jin û kurê xwe ê şirmêj Hevind, yê ko hêj di landikê de bû hişti bûn.

Heyveke çardeşevî li çûna leşkerên mîr temaşa dikir. Mîr da bû pêşiyê; mîrxas û şûrkêşên wî hespên xwe di dora mîrê xwe de dibezandin. Ji banê qesirê jina mîr ko navê wê Heyvê bû bi çavine zelûl li qeslê dinihêrt û lêvên xwe hêdîka dilivandin; qey diayek dixwend.

Heyvê kêrî kiri bû; hetanf ko nivê sevê di ser xwe ve derbas ne dikir xwe şanî ne dida. Siwerekî birindar, rimh û şûrê wî şikestî bi xar hati bû û li ber deriyê birçê sekîni bû. Derî jê re vekirin. Qasidekî ne î xêrê bû. Mîr û leşkerê xwe keti bûn deravekî teng. Heft rimh di canê mîr re çû bûn. Bi a heftan re mîr ji hespê xwe bêrih keti bû erdê; eskerên wî ji hev de keti bûn. Neyar boş bûn. Bi piraniya xwe ew şkênandi bûn.

Jinmîr pê hesandin. Berdevk di dora dergûşê de li hev gihane hev. Mîrê ko li ser textê bavê xwe rûništa hêj yanzdeh-mehî bû. Ji diya wî pê ve tu dostê rastin jê re nîn bû. Ma dê, diya reben wê çi bikira. Herçî mirov û pismamên mîrê şirmêj wê hemiyar çavên xwe berdaya textê seltênê. Mamekî Hevind hebû jê re digotin mîr Şem. Ji herkesî bêtir ji mamê wî dîtirsiyar. Belê mîrê rehmetî birayek hebû ko ne ji diya wî lê ji reşikê bû. Di heqê mîrê şirmêj de mam ji herkesî bêtir xeternak bû. Mîr Şem mirovekî dilhişk û xwînxwar bû. Jê ve mîrîti, mezinahî, mirovatî ji dirhavan pê ve ne tu tişt bûn. Gava pere û gewherên ko di xezna mîrîyê de bûn dihatin bîrê, çavê wî ji wan madenan bêtir diçirîsin û agir diweşandin.

Mîr Şem di serê çiyê de qesirek hebû; tê de digel diz û nijdevanan wekî gurekî dijî û



BERGEHEK JI KÛÇEYÊN ŞANGHAYÊ

çavên wî her li şikarê bûn. Ev e jê re şikarek. Mîrekî yanzde-mehî, xwediye welatekî mezin, xudanê xezneyên giranbeha; lê ji her tiştî bêxêber di landikê de nivisti û her û her li çiçikên dayîna xwe digeriha.

Di rex landîka Hevind de landikeke din xuya dikir. Ew landîka kurê dayîne, landîka kurê Heyzebûna çêrî bû. Belê mîr Hevind û kurê çêriyê di şevêkê di şeveke Havînê de ji diyên xwe bû bûn. Dergûşa kurê çêriyê a darîn anî bûn tenişt landîka pismîr a zêrhelî û her du zarokan pismîr û xulamkole ji yek gulani şîr dimêtin. Êvara, gava jinmîr dihat û li kurê xwe temaşa dikir û ew dida himbêza xwe ji bo xatirê lawê xwe kurê çêriyê, xulamkolê xwe jî maç dikir.

Herçî çêriyê li her du zarokan bi yek mîhîrvanî û dilovaniyê dinihêrt. Ji xwe yek kurê wê bû; ê din wê bibiwa mîr û melîkê wê. Rojên ko şîrê wê kêrî dihat kurê xwe birçî dihişt, pismîr têr dida mêtin û di dilê xwe de digot: divêt mîr ji peyayên xwe xurtir bit.

Dayîn Heyzebûn di mala mîr de ji diya xwe bû bû. Ewçend bi axayên xwe ve girêdayî bû ko ew hêstirin jê re bû bû ol û diyane-tek; jê re perestîş dikir.

Wextê mîr di keviya çemê mezin de hate kuştin Heyzebûn ewçend giriya bû ko jinmîr bi xwe hêstirên xwe dimaliştin û li ber dilê çêriyê dida.

Heyzebûnê ibadeta mezhebeke kevnare dikir. Li gora wî mezhebî mirov piştî mirinê, di cih de vedijîya diçû ezmanan û di piştî ewran re kar û xebata xwe pêş ve dibir. Ji lewre Heyzebûnê digot ko mîr Tacîn hilkişiyaye ezmanan û li wê derê hikimî eşîr û

welatan dike. Ji xwe birek ji peyayên wî ma pê re ne mirî bûn. Wan û hespê wî tev de xwe gihandî bûn mîrê xwe. Herçî berdevk û şûrkêşên mayîn jî hin bi hin wê bimiriya û wan jî xwe bigihandana mîr Tacîn. Vêca mîr di ezmanan de kişwerê xwe bi temamî wek li rûyê erdê dê saz bikira. Heyzebûnê welê digot.

Ma rojekê ewê bi xwe jî ne çîwa ezmanan û dîsa xulamtiya mîrê xwe dê ne kira. Digel vê hindê gava mîrê şîrmêj dikir himbêza xwe û şîr dida-yê bi çavine zelûl lê dinihêrt û direciff û digot «Xwedê vî jî me re bihîle; heta ko bi bejinê bi ser çama şûrekî bikeve; kî dizane çî talûkene nenas li ser rîya wî xwe veşartine» û digiri.

..

Ji roja ko siwarê birîndar xebera mirina mîr Tacîn anî bû sûrehên qesirê asê û pasvanên wê zêde kiri bûn. Hero jî tevdirine nû didîtin; talûke jî hin bi hin nîzingtir dibû. Mîrê bêjî û nijdevanên wî jî çiyê daketi bûn deştê, li ser rîya xwe her tiştî xerab dikirin û berê xwe didan paytextê welêt, qesira mîr. Lêbelê xelkê qesirê digel her tevdirê ve qey sehiw girti bû. Li qesirê nema inzibateke nêr hebû. Ma teşî kengê dikare bikeve şûna şûr. Li qesirê jinikekê hikim li jinan dikir. Ji milê din torinên welêt yên ko bi mîr re girêdayî bûn ew jî di wî şerê mezin de pê re mirî bûn.



Keçên Ingilistanê herwekî di fabrikan, di zevîyan de jî dîxebitîn.

Xelkê qesirê, di pêşîya hemliyan dê dîya mîrê piçûk, hero her saet li hêviya felaketekê bûn. Bi tenê dayîn, Heyzebûna sadiq ne ditlîsiya. Gava mîrê xwe ê şîrmêj dikir himbêza xwe jê ve welê bû ko milên wî jî mîrê wê re sûrehine stîwar in û di nav wan sûrehan de tu tiştî nikare dest bidît wî.

..

Sevekê, ji şevine adettî reş û tarîlîr, dayîn keli bû navbera her du landîkan û dikir ko binive. Ji nişkekê ve, jî dûr ve dengek seh kir; wek şingîniya şûr û xenceran, şingîniya şûrên ko bera hev didan. Deng bêjî dûr bû, jî xelaska beşxan dihate bihîstin.


Dayînê xwe li mêzerê peçand, rabû ser ejnûyên xwe û guh dida. Êdî pêjîna lîngan dikir; nalîna didan pey hev... carîna tiştek wek barekî giran dikete erdê.

Heyzebûnê da xwe, rabû ser xwe û derî vekir. Di lîwanê de peyayine biçek di ber ronahiya fanosekê de dimeşîyan û gesta oda mîr dikirin. Hertiştî xuya dikir. Bêjî bi ser qesirê de girti bû, zora pasvanan çû bû; nîho dikirin mîrê wî birevînin û wî bikujin.

Dayînê derî li xwe glit, li landîkan zivirî û bêl ko bide eqilê xwe rahişte mîrê şîrmêj û ew avêt nav landîka kurê xwe û lê de veşart. Herçî kurê xwe, ew jî kirê himbêza xwe, çend caran ew maç kir û xulamkole kire nav landîka mîrê xwe a zêrhelf.

Di vê navê de derî vebû, mirovekî bejinbilind, hewranikî reş lê, digel çend mirovên din ên biçek kete odê û berê xwe da landîka mîr, lihêf rakir bi derbeke hişk zarok jê deranî, destekî xwe danî ser devê wî û ew kire bin çengê xwe. Îşê wan temam bû bû; hemî di lîwanê re veşerîyan beşxê û di tariya şevê de wînda bûn.

Mîr di landîka xulamkolê de dinivist; dayîn jî piyan sekînî bi çavine heyirî li dora xwe dinihêrt; qey tiştêkî jîbîrkirî dixwest binê bîra xwe.



Esekerên britani di talimê de. Ev eskerên ha xwe kar dikin ji bo eniya didawan. Xwe, hini daketina bejê dikin; beja Ewropa roavê.

Pêjin bi qesirê keti bû. Xelkê qesirê bi şeb-xûnê hesiya bû. Çira û xetîrek vêxisti bûn; ji her aliyê qesirê rarprega lîngan dihate bihîstin. Jînmîr, nivlazi û digel nedimeyên xwe li dayî-nê der bû û xwe li landika zêrheli daheland. Gava ew wala dît qîrnek jê çû û jînmîr bêhiş ket erdê.

Di vê navê de di liwanê de reprega lîngan xurt bû bû. Serhengê qesirê digel segmanên xwe li diya mîr digeriya. Serheng digel segmanên xwe da bû pey bêjî û beriya ko terka bajêr bidin xwe gihandi bû wî û li hev xisti bûn. Segmanên qesirê bêjî û peyayên wî tev de kuştî bûn û cendekê mîrê bêjî kaş kiri bûn hela ber deriyê qesirê.

Belê segmanan bêjî kuştî bû, lê wî jî beriya ko bîmîrê di bin hewraniyê xwe de mîrê welêt ê şîrmêj xeniqandi bû. Cendekê wî ê hûr li hewraniyê mamê wî pêçandi li ber deriyê odê bû.

Jînmîr bi reprega lîngên segmanan hişyar bû bû, çavê wê bi xelkê dorê ve zelat dibûn. Dayîn rabû ji landika darîn zarokê derêxist û ew da destên jînmîrê. Herkesî ew nas kir; mîr flevind bi xwe bû. Ma bêjî ew ne xeniqandi bû?...

Dayînê bi çend gotinan biserhatî ji haziran re da zanîn. Li cendekê li-ber-derî hûr bûn. Ew kurê dayînê bû. Jînmîr kete himbêza dayînê û bi maçikine germ ew maç dikir.

Qîrnek ji xelkê rabû; herkesî digot, divêt dayîn bête xelat kirin. Ma behayê mîr hebû? Kalek rabû û got, emê dayînê bibin xelna mîrekan, bila bi destê xwe xelatê xwe bibijîrit.

Jînmîrê destê dayînê girt û berê xwe da xeznan. Torin û segmanan bi heycaneke xerîb dane pey. Dergehên giran û hesinîn bi

dengêkî rizihayî hêdî hêdî û bi heşmet'û dep-depe vedibûn. Hundirê xeznê tarî bû; reş dikir. Di wê tarîtiyê de, wek çavên delhebeyên ko di reşa şevê de diçirîsin, niqleyine hûr û girs diteyisîn.

Xulaman qerase ji pişt penceran rakirin û depên hesinîn li hundir ba dan. Tirfijine tavê ketin hundirê xeznê. Niho ew niqleyên reş eşkere bû bûn; ristikiue lûlu, gerdeniyên almas, guhtarine yaqût û ziberced, qevdine şûrine zêrheli, navlûyên şexxaneyên giranbeha, kumzîchine bi neqş û xemil... û her liştên kevin, giranbeha û nadîde...

Ilekesî li dayînê dinîhêrt. Gelo ewê çî bîst-landa. Heyzebûn di orta xeznê de sekîni, çavên xwe berda bûn ber xwe û ne diqeliqî. Piştî bihmekê çavên xwe rakirin û di pencerê re li ezmanan fedikîrî. Roj hêj nû hildihat û li singa ezmenê pîntine sor û penbe belav dikirin. Belê kurê wî ê delal niho di pišta wan ewran de bû. Taştê nîzing bû bû, herhal lawik birçî bû û li guhanên diya xwe digeriha. Ma ne diviya bû ko xwe bilezanda û biçîwa nik kurê xwe û şîrê wî bidaya...

Dayînê destekî xwe rakir û ber bi pêş çû. Dilê herkesî tavêt, gelo wê çî bîstanda? Kîjan gewherê giranbeha. Heyzebûnê dudilî ne kir, hema rahişte qevda xencerekê; xencereke kevin û biqîmet; xencereke zimridqevd; yadigara pê-şîyan; hêja bû eyaletekê. Dayînê çavên xwe li xelkê gerandin ew li ser jînmîrê sekinandin û liêdika got: Mîrê min gîhaştê selametê, niho divêt ez herim kurê xwe bimêjînim.....

Û xencer di dilê xwe re kir.

Dihok: 2 Kanûna-paşîn 1944

BIŞARÊ SEGMAN

MEMÊ ALAN

Me kurdan edebiyateke nivîskî, ji çend klasîkan pê ve, hesêbî nîne. Lê me edebiyateke xelkê e welê heye ko ew li nîk kêmbî mîletan peyda dibê. Ji vê edebiyatê re folklor dibêjin.

Belê folklorê kurdan ewçend mezin û fîrehan e ko em pê dikarin îftixar bikin û di nav xelkê de serfiraz bigerin.

Di folklorê me de, bêşik şaheser Memê-Alan e. Memê-Alan malê mîletekî ewropayî biwa Xwedê dizane di heqê wê de heta niho çend cild kitêbî dibatîne nivîsandin. Me kurdan ewçend guh ne da-yê, ji şair û rêberê me ê mezin Ehmedê Xanî pê ve. Belê Xanî herî sê sed salî bi qîmeta vê destançîrokê hesiya û rabû li ser himê Memê-Alan kitêba xwe a mezin û abadin Mem-û-Zîn anî wicûdê. Bi gotinên din Memê-Alan bi navekî din bi nav kir û jê re Mem û Zîn got û ferqin xîste navbera çîrokîya xelkê û esera xwe.

Ji xwe herwekî nas e, Xanî bi hênceta çîrokê deng li mîletê xwe kir û dil kir ko wî li nijad û qewmîyeta wî hişyar bikit.

Ji hingê ve ji 300 salî bêtir wext di ser me ve çûnc. Kesî guh ne da Memê-Alan, heta roja ko kurdîzanê heja û bilindpaye Mr. « Roger Lescot » ew digel tercîmeke fransîzî gihande çapê(1).

Herwekî me got, ev destançîrok di plêt Xanî re bû xudanê du nayan: Memê-Alan û Mem û Zîn.

Herçî Memê-Alan, li gora hewêrkeyan guhartoyîne gelêr bene. Xanî hin tişt li Memozîna xwe zêde kirine û ji milê din tiştine din ji kitêba xwe bi der hiştine.

Vê paşiyê çavê me di kovareke erebî (2) de bi bendeke ket. Yekî bi navê Evdîlmesîh Wezir di

wê kovarê de û di heqê Memê-Alan de nivîsarek belav kîkiye. Mr. Evdîlmesîh herwekî bi xwe ji dibêje mêrdîni ye û Memê-Alan di zarotîya xwe de bîhîstîye. Benda Mr. Evdîlmesîh heja ye. Evdîlmesîh qedir û qîmeta Memê-Alan herwekî sezayî wê ye gelek bilind girtîye. Mr. Evdîlmesîh xeman dixwe ko ev çîroka heja ne hatî ye wergerandin zîmanîne din û li dînya alemê belav ne bûye. Welê dixuye ko Mr. Evdîlmesîh tercîma Mr. « Lescot » ne ditiye.

Mr. Evdîlmesîh piştî ko wêfê destançîrokê dide xulaseke çîrokê ji

[1] Institut français de Damas. Collection de textes orientaux. Tome I. Roger Lescot. Textes kurdes. Deuxième partie. Memê-Alan. Beyrouth. 1942.

[2] El-risale we El-risawye: Qahire. 12 Çîrîya-pêşîn 1942. Snt 10. Hejmar 484.

dibêje. Çîrokîya Mr. Evdîlmesîh ji guhartayên ko em nas dikin xêlî biferq e. An Mr. Evdîlmesîh bi zemanî ve esilê çîrokê ji bîr kirîye an çîrokbêjê wî jê re welê gotîye. Herhal ev minho ji bona me guhartoyeke nû ye. Em gelek spasen ji Mr. Evdîlmesîh re dikin.

Mr. Evdîlmesîh sernama benda xwe kirîye « Mem û Zîn » Sermama Xanî û ne ya xelkê. Heye ko çîrokbêjê wî, ev jî jê re welê gotîye. Ev e nivîsara Mr. Evdîlmesîh. C. A. B.

MEM Û ZIN

TEMAŞEKE KURDÎ E ABADÎN

Mem û Zîn navê çîrokeke strandî e kurdî abadin e. Vê çîrokê kurd û hin nekurd(1) jî, di Iraq û di welatên ko kurd îê de dijîn, wek Sûriye, Tirkîye û Iranê, distrinin.

Hej di bîra min de ye, li Mêrdînê di şevên Zivîstanê ên sar de, em zaro digel dê û bav û nasên xwe yên ko ji bo vê yekê dihatin, di dora tenûrê de, em digihan hev û ker û lal me guhdariya dengbêj dikir. Dengbêjê ko bi dengê xwe ê zela û tebtî ji me re Mem û Zîn digot.

Dengbêj gava bihîna xwe dida, çîrok ji me re bi erebî qise dikir(2). Stran û çîrokê heta derengîya şevê dom dikir. Piştî stranê em dinivîstîn û me di xewna xwe de evîniya her du aşîyan a tehlî ya ko bi nîrîna her dûwan temam dibû, didîl.

[1] Ein tururan rastî wan ne hatine.

[2] Divê ev adet xweserî Mêrdînê bil; an dengbêj bi xwe ne î kurdmanç bû.



Mêr di qada şerî de ne, jin dikin bi karê wan rabîn. Belê jin bezînê hewarê lê mêr ne ketîne kewarê. Ev jinên ha keç û jinên masfvanan in; toran saz dikin da ko herin masfvanîyê.

Nik dilê min çîroka Mem û Zînê bi hêjabûna xwe ji çîrokên Yewnanîstana kevin ne kêmtir e.

Mem û Zîn yek ji çîrokên kurdî ye. Hinên din wek « Derwêjê Evdê » « Çiyayê Mazi » « Felîtê Quto » hene ko qe. ne halîne belav kirin. Bi tenê Mem û Zîn bi zimanê kurdî ketiye çapê û hatiye belav kirin. Ev cara pêştin e ko xulaseke Mem û Zînê bi zimanekî din tete belav kirin.

Min di kitêba « Elf leyle û leyle - Hezar û şevêkê » de çîrokeke piçûk dîtiye ko dimîne Mem û Zînê. Nik dilê min yê ko çîrokên « Hezar û şevêkê » dane hev ew çîrok ji Mem û Zînê girtiye. Hingê ji Mem û Zîn di nav kurdan de dihate gotin.

Min hêvî ji Xwedê heye ko rojekê şairekî ereb l mezin an yekî biyanî wê çîrokê bêxe şikilê temaşayê an qestê û herwekî şairê inglîzî « Fîç Jêrard » ji bo çarînen Xeyam kiriye, nav û dengê wê bêxe dinyayê ».

ÇÎROK

Li wextê berê di welatê Kurdistanê, di bajarêkî ava û çarnîkarên wî bi çîyan dorgirtî de, mîreklî ciwan bi navê Mem hikimî dikir. Mîr bi pakiya esil û nijad, bi merdî û mîranî û bi lewendîya xwe deng da bû.

Mem ezeb bû û qet ne tanî bîra xwe ko jin bikir. Ji ber ko di welatê xwe de tu dotmîreke çelengya ko jê re bi ber awayî biba hinkuf ne didit.

Rojekê wezîrên wî jê re qala ziwacê kirin. Mîr li wan venegerand û xwe ker kir. Wextê civata wî belav bû mîr çû nav cihan da ko rakewe. Mîr texmîn dikirin. Belê diviya bû jin bikira da ko warê wî kor nemînit. Mîr di van texmînan de bû ko di xew re çû û xewnek dît.

Mîr di xewna xwe de xwe gihandi bû bajarê Cizîrê — Cizîra Botan — Cizîra ko li keviya Dîclê bû û bi darî Stiya Zîn, keça Mîrê Cizîrê keti bû. Mem û Zîn şevê pêde li rex hev man û bi şeraba evîne a safî serxweş bûn; qerara xwe dan hevûndin bistînin. Mem Zînê ji birayên wê Çeko, Heso û Qerertacdin de bixwesta. Ji ber ko bavê Zînê, Mîr çû bû rehmête.

Mem û Zînê hingustilên xwe ji pev guhartî bûn. Memî hingustîla xwe bi tiliya Zînê ve, Zînê jî ya xwe bi tiliya Memî ve kiri bû. Piştî guhartina hingustilan Mem û Zîn xwe li textekî dirêj kirin. Memî şûrê xwe danî navbera xwe û Zînê da ko beriya mehirê tu tiştê neşerî di navbera wan de neqewimit.


Mem bi xwendinên teyran yên ko sira bê digihandin guhên wî, hişyar bû û gote xwe:

JIN DI ESKERİYÊ DE

Kişiya milê çepê balafirke behri e fêris şauî dide. Yên ko di dora balafirê de ne û pê mijûl dibin tev de jin in. Ev jinên ta piştî

ko balafir vedigere bendere wê testim digirin, paqij dikin, depuyên wê ji banzîne dadigirin û li her liştên wê miqate dibin. Bi gotînen din balafirê di texlîl sîwar heve; ên şeravanî û ên neşerevanî. Sîwarên wê ên ne şeravanî jin in. Lê ev poyayên neşerevanî jî, carîna û gava dijîmî bi ser balafirgêhê de digire, dikevin bin barana bombe û gudan.

Belê di vi şerî de jinên ewropayî jî her şerên berê bêtir têkîlî şerî dibin. Herçî em kurd divêt em li wan ecebmayî nemînin. Ji ber ko jinên me ji qal - û - bela de di şeran de jî arîkariya me dikin; li rex me rûdinin, lişingên me dadigirin û heke me sîst kir nav di me didin û dibêjin:.... kitana serê min li serê te....



« Çi xewneke şîrîn bû; xwezî ez ji vê xewne hişyar ne biwan ». Û gava çavê wî bi tiliyên wî ketin; bala xwe da û dît ko hingustîla tiliya wî ne ya wî ye. Hîskerhatiya şevê bi temamî hate bîra wî. Hingustîl di çavê xwe re kir û li ser wê navê sîtiya Zîn xweud. Hingê zanî ko xewna şevê ne xewneke adetî lê heqîçet bû. Heqî sûretê sîtiya Zîn terka xiyala wî ne dida.

Ji milê din sîtiya Zîn di qerasha çemê Dielê de gava ji xewê hişyar dibû wê jî digot ko şevêdin xewneke şîrîn dîtiye. Lê wextê çavê bi hingustîla xwe kir ewê jî zanî ko tiştê şevêdin ne xewin lê rastî bû. Sûretê Memî jî li xiyala wê hati bû neqîş kirin.

Di rastiyê de jî tiştê ko li Mem û Zîn qewimî bû ne xewin bû. Şeva ko Mem bi wezîrên xwe ve qala zivacê kiri bû periyân Mem xisti bûn xewneke giran; Zîn jî nivinandin û ew anîn nik Memî. Bi vî awayî Mem û Zîn heta fecara sibê li cem hev man. Bi spêdê ve periyân ew cardî nivinandin û Zîn vegerandin bajarê Cizîrê.

Mem gava bi xwe hesiya sond xwar ko ji

keça mîrê Cizîrê, sîtiya Zîn pêve tukesî nakit. Li ser vê qerarê Mem rabû rext û bostê xwe girêda, li hespê xwe siwar bû û bêi ko xelkê xwe pê bihesine, ji bajêr derket û berê xwe da Cizîrê. Ewê Zîna ko şevêdî periyân anî bû rextê xelkê wî nişan bikira.

Piştî sefereke dûr û dirêj Mem gihaste bajarê Cizîrê û bû mêvanê her sê birayên sîtiya Zîn. Wan jî qedirekî mezin jê re girt.


Zîn bi hatina Mem hesiya bû. Zînê jî bo dîtina Memî her fedakarî da bûn her çavên xwe u di tu tevdîrê de teqîş ne dikir. Dawiyê gihaste miradê xwe û ji ker ve diçû ba Mem. Belê wextê ko birayên wê diçûn nêçîrê Memî tiştêk behane dikir û li qesirê demê. Zîn dihat qesira birayên xwe û digiha Mem.

Di qesirê de bi navê Beko-Awan wezîrek hebû. Beko mirovekî dexsok û fesedkar bû. Beko jî Memî hez ne kiri bû û lê bi kîf bû bû. Li firsendekê digeriya ko xirabiyê pê bikit. Beko bi evîna Mem û Zînê hesiya bû. Li ser vê yekê rabû li nik her sê biran fesadî kir û qiseta xweha wan gel Memî digote wan. Lê her sê biran ewçend guh ne didan-ê.

Di sa rojekê Mem bi hên-ceta nexweşiyê ne çû nêçîrê û li qesirê ma û Zîn jî hate balê. Mem û Zînê di şexaliya evînê de xwe ji bir kiri bûn. Her sê bîra digel Beko jî nêçîrê vejeriya bûn û berê xwe da bûn dîwana ko Mem lê rûniştî bû. Mem gava ew jî dûr ve dîtîu ebayê xwe ê fireh vekir û Zîn di bin wî de veşart. Lê kezîke Zînê jî derve ma bû. Gava her sê mîrên Cizîrê ketin hundir Mem bi hên-ceta nexweşiyê xwe jî ber wan ve ranebû. Herçî kezîya jî derve mayî jî Beko pêve tukesî ew ne dîti bû. Beko nîzingî li birayê mezin Çeko kir û li guhê wî pispisand:

— Ev mêvan çî mirovekî kanc e (qebe û kemedeb). Ji ber we nîrekan ve ranebû û di cihê xwe de rûniştî ma. Heçko hon xulamên wî an kesine adetî biwan.

Çeko lê vegerand û got: Tu jî çî mirovekî kêr û fesad î, heke ji ber me ve ranebûye ne ji ber qurteyê lê ji ber



Şerevaniyên wextê berê xwe di nav kum û kiras-zirhan de vedîşartin; yê tro xwe didin ber talda diwarên tanga ên pola.


nexweşiyê ye.

Peko: Belê ne-rabûna wî ne ji ber quretîyê ye. Lê ne ji ber nexweşiyê ye jî. Ez sebeheke din dibînim ko nahilê mîrê mêvan rabit.

Peko ev got û keziya Zînê ya ko ji derveyî ebaşî ma bû qanî Çeko da. Çeko Zîn ji diwanê çewirand û Mem da hebis kirin. Mem avêtin zîndaneke welê ko di çil pêpîngî re mirov tê de diçû xwar.

Mem çil rojî di zîndanê de dimînit. Zîn jî di vê navê de dikit ko birayên xwe qanî bikit. Ji wan re meselê dibêje, ko Mem destgirtîyê wê ye û hatiye wê jî birayên wê bixwazê. Dawiyê Zîn fesadên Beko pûç dîke û Mem jî birayên xwe re dida eîw kirin.

Roja ko Mem dikir ji zîndanê derkeve Zîn ciline spehî li xwe dîke, xwe dixemilîne, û digel çil keçên keçîn yên ko ji nav bajêr bihartine, qesta zîdana Memî dîke. Gava digehe serê derincê, Zîn deng lê dîke, Mem lê dinêre û wê di wê bedewî û spelîtîyê de dibîne. Zîn di difê xwe de dibêje ko Mem jê û ji birayên wê enirîye. Zîn cardî deng lê dîke û dibêje. «Memo, heke ji ber tiştê ko çêbûye tu ji min enirî, ve ne çil keçên bedew yekê jî xwe re bineqîne». Van gotinan wek brûskêkê li Memî didin. Mem di dilê xwe de digot qey Zîn nema wî dixwazîtin û jê kerixîye.



Topîne îngilîzî en nû. Yên ko di qada şerî İtalyayê de bi kar hatine êxistin.



ZADÊ ZEVIYÊN İNGİLİSTANÊ BI KEMYONAN TÊQE AŞAN

Dilopek xwîn di difîna Memî de têtin û Mem bêrih dîkevîtin erdê.

Zîn digel mewkîba xwe vedigere û şîna Memî girêdide. Ji xwe gelekê neborit ew jî emîrê Xwedê dîke û li gora wesiyata wê li rex Memî tete veartin.

Pîştî çil rojî her sê bira Çeko, Heso û Qeretaçdîn, Beko jî digel wan, dişan derketi bûn neçirê. Di wextê neçirê de hespên neçirvanan di ser erdê ko Mem lê veşarti bû re derbas dibûn. Lîngê hespê Çeko kete kortalekê. Çeko li kortalê nihêrt. Ew tirba Memî bû, Zîn li rex bû; her diwan hevûdin himbêz kiri bû. Beko gote mîr:

— Ma tu nabîni pîstî mirinê jî dev jî xebaseta xwe bernedane.

Çeko li Beko hate vezebê, şûrê xwe kişand li tirba Memî dâr lê di wî erdê de veşartin. Xwedê mirovên ko xebîsên wek te jî hev kirine di axiretê de digehîne hev.

Beko ji hespê xwe de bêrih ket û cendekê wî jî tirba Memî dâr lê di wî erdê de veşartin. Pîstî mîdeki her sê biran tirba her du aşiqan ziyaret kir. Di ser tirbên wan re gul û çiçekîne spehî bişkivî bûn. Di nav wan de stîriyek hebû. Ew, ji dilopeke xwîna Beko ya ko keti bû wê derê çar bû bû.

Helatî iro tirba wan ziyaretgah e.

Bexda:

EVDILMESÎH WEZÎR

DÎROKA JÎNA SELAHEDÎN

1



ÇEND PIRS

Ji mēj va dilate bira min ko tişteki ji dîroka jîna ser-arê Kurd siltan Selahedîne Eyubî binivîsim; lê mixabin ko zanîta mi tîra bîchihaîra vê daxwaza hêja ne dikir. Erê çiqas ko mir di dîrokan tîrk û ereban da li ser gîhan, rabûn, mezînaî û hîkîndariya vî kurdê gewrê gelek tişt xwandine jî, teqez (milheqç) ev zanî ji daxwazêke holê ra ne dibûn bîngeheki xurt. Ji vê pê va hergav min divê tîxin'guhên xwendevanên xwe ko ez ne peyayê qelên û zanîne me. Heye ko ji bê nîrweliya kurdên zana, an ji şewata dilê xwe; lê herhal jî neçari ez bûme rêwiye vê rê. Ew rîya ko rêwiyan weki min nahewîr.

Dawî ji baxê çak, min di vî warî da bi navê (Jîna Selahedîne Eyubî) kitêbeke xweser dit ko lê da jîna Selahedîn bi kurtî hatiye nivîsin. Kitêb, bi navê Dr. Ehmed Bêl; yekî misrî nivîsiye; lê pir kurt. Dema çavên xwendevan di dawîya kitêbê da bi navên kaniyên ko tîxistiyên kitêbê vî hatîne standîr dîkeve, tî bira wî ko dê dîroka şerîne xurt û bi hingehing bixwîne. Lê gava bi nav rûpelan da diçe, ji şeran navên wan bi tenê dibîne; herweki Selahedîn di wan şeran da ne westî be. Dawî tişteki ko serê xwendevan germ bike tî da

nîne. Tevî vê yekê tînebûna kitêbeke çêtir di vî warî da, hişt ko ez wê biguhêzîme zîmanê me.

Heya îro di vî warî da ne-nivîsîna dîrokeke xweser û hêja ji bo jîna vî peyayê rohelê ê yekta, bê şik ji dîroknivîsên îslaman ra kêmiyeke mezin e. Heke ereban ji siltanê xwe (ew siltanê ko ol û welatê wan parast) ra ev qedir ne girtî bin jî; divê zanayên gelê kurd ji serderê xwe ê wek çirayê (1) ra vê yekê bikin.

Di gulastîna kitêbê da heya ko nikûn be emê rîya kintir bigirin, ji ber ko hin qirênên (mînaqeseyên) bê fêde ez nanivîsim. Bi tenê qesda min xulaseya dîroka jîna Selahedîn e.

Herçî not anê şerh, min nivîsîne û xwediyê wê herpirsiyariyê me.

SELAHEDÎN GEL Û EŞÎRA WÎ

Kurd ne tîrk û ne jî ereb in; ew qewmekî ji reha ari ne. Heye ko ji tîveliya ereb û farisan gîha bin hev[2].

Kurd di zemanên berê da li ser çîyan jîyîneke hedewî dijîn û di navbera welatên faris û Asîya biçûk da rûdîniştin. Ev gel bi esebiyeta qewmî, rêbirî û talankerî, comerdî, mîranî, parastîna şerêfê û hezkirîna şeran weki erebên cahîliyê bûn. Di wan rûçikên (sîfat) han da jinên wan, ji mîrên xwe ne bi şûn da bûn. Heya ko pir jin di nav kurdan da bi daxistin û gerandîna şeran bi nav û deng bûne. Dema ev xurtî û şerûdî ji kurdan hate dîin, hemî mîrekan dorê dixwastîn piştî xwe bi hevalî û arîkariya wan û leşkerê xwe jî bi mîrxasên wan zexim û melfî bikin. Çi kesê ko kurd jê ra bîbûna dest û arîkar, ew serdest û serfraz dibûn. Tevî vê xurtîya han qewmekî dîrî medeniyetê bûn, lê ecêb e serhişk û tu caran bîndestîya biyaniyan qebûl ne dikirin[3]. Bi tenê rajêrî ji mezinê xwe ra dikirin ko her qebîleyên wan di gerandîna şol û tevdirên xwe da e mîna hikûmeteke xweser bûn. Çiqas ko qebîleyên wan gelek bûn jî; lê hemîyan ol (î) û zîman yek bû.

Bi hikmê jîna bedawetê aşîqên ser' estî û serxwebûnê bûn. Herçî zîmanê wan franî û gelek î nizîkî farîsiyê ye.

(1) Ji her ko çîra ne bin xwe lê dora xwe ronî dîke. Ma xwest Selahedîn teşbîhî wê bikin û welê bûn.

(2) Hevoka paşîn a pîşîn bi birin dîke. Ev ji qelsiya bawîriya Dr. Bêl a der heqê zanîna wî da ye. Çawan kurdan ari dizane û paşê dixwaze hêleke wan bigelîne nîjadine dîn?!. Xweya ye camêr di bin te'sîra hîu dîroknivîsên ereb da maye. Ew dîroknivîsên ko çavîya Nîl gîhandîne qubeyeke zimridîn...

(3) Xwazi bi wan kurdên camêr û bi rûmet.

Hinek dîrokniwîs gotine ko gava welatê kurdan bi hikûmeta Farisan va girêdayî bû, hercar serê xwe li ber hikûmetê hildidan û bê-dîliya melikên farisan dikirin. Dema ketin bin destê osmaniyan jî di sa sîreta xwe ne guhartin û ji serxwerabûnan bi şûn da ne man.

Dayîn (deribe) li nik kurdan bi destê mixtaran tete civandin. Xelkê her gundî dayfna xwe dide mixtar û ew jî dide mîr. Pîr caran hin qebîle li mîran radibûn û gava pê nikari bûn ji cih bi derdiketin. Bi vî awayî bûne gelek eşîran û pîrên wan wekî ereb û tirkmanan bi koçeriyê girtin û bûne xweyî pez û dewar.

Kurd di pir rê û rîzîkên xwe da ji tirkmanan vedîqetin. Herwekî kurd qelenê keçên xwe digirin; lê tirkman bi ser da didin zawayên xwe. Tirkman bi kok û binyata xwe dilgîr nabin; herçî kurd di vî warî da ji her qewmî pirtir vê yekê diparêzin.

Kurd mirovine rûgewir û bejin-navîn in. Dîrokniwîs li ser navê gelê kurd ne bûne yek. Maltebrûn di kitêba xwe a bi navê (cixrafiya inûmî) da dibêje: « Li çiyayên Zaşros û Nîgotîs da hin qewmên hov hene ko bi nav û dengîrê wan gelê Kurî ye. Kîsênofon ji wan ra, Kardûx; Plûterxos Gordwîn; Îmînmîr Qîlîn, Kîrdawîn û herç xweyî ce'rafîyên dawiyê jî Kurd gotine.

Dîrokniwîsê hêja Cercî Zeydan di kitêba xwe a (Tebe'at el umem) da dibêje: « Kurd miletekî kevnar e, di dîroka kevin da bi navê Kardûx hatine navandin ». Ji nizikiya van navan a ji hev ra, xweya dike ko ji bo navê gelê kurd tu fîxtîlaf di navbera dîrokniwîsan da tine bûye. Heye ko ferqa di navbera zawayên (lehce) kurdan da ev ferq êstîziye

nava binavkirina dîrokniwîsan. Na gava mirov lê hûr dibe, qenc xweya dike ko koka van navan yek e û hemî vedigerin bêjeyekê; herwekî di zaravayên zîmanê erebî da jî ferqîne holê hene.

Li ser navê kurdan jî gelek gotin bûne. Hinekan gotiye ko kurd bi mana gur e[1]. Ji ber ko di welatê wan da gur pîr bûne xelkê wî welatî holê hatine navandin. Herçî zana û dîrokniwîs li ser vê bûne yek ko kurd arî ne. Ev gel di berê da li çiyayê Hordebanê û di navbera Mîdiya û Armeniya da rûdîniştin[2]. Paşê di navbera Dicle û Ferat da bi cih bûn ko bi vî erdî ra Kurdistana hate gotin, anê welatê kurdan. Kurd mirovine hov bûn û di nav rê û deviyan da dijîn. Debara wan li ser xwedîkirina pez û dewaran bû. Pişî ko bi tirkên hov ra dan û standin, ji wan hinî dilhişkî û şerûdiyê bûn.

Tevî ko kurd wekî bedewiyan dijiyan jî, di sa hin sinhet dizanîn. Gelekî mîla xwe didan xwedîkirina bizînen hîtîk, cil û cawên pemboyî, rîsîn û evîrşimîn jî çêdikirin. Bêf van çêkirina tiştên çermîn û sileh jî hinekî dizanîn ko ev sinhetên han jî melcetên bedawetê bûn. Hlewcebûnê ev tiştên han bi wan dane hin kirin, herwekî xelkên Sûdan û Efrîka navîn[3].

Ji eşîreke vî miletî a mezintir û bi rûmetir Selahedîn Üsîf kurê Necmedîn Eyûb kurê Şadî kurê Merwan hate pê. Hinekên dîrokniwîsan ji bo ko kok û reha malbata Selahedîn bi malbateke mezin va girêdin, ji Merwanê

(1) Ev mana han ne maneyeke kevnar, lê maneyeke nuh e. Ji bo tirkandîna kurdan tirkên kemalist ev mana jî navê kurd ra dîtî bûn. Heye ko Dr. Bêlî di bin te'sîra wê manayê da ma he. Heke ne welê bûya, tevî ko dibêje « li ser navê kurd gelek gotin bûne » bê vê gotina han tiştêkî nabêje.

Erê li ser mana navê kurd gelek gotin bûne; lê piraniya van nava li ser bêjeya (pahlawan) dibe yek, anê kurd bi mana pahlawan e.

(2) Dr. Bêlî nizaniye ko Mêdî jî birek ji kurdan bûn. Ev dera han jî pîr kesan ra veşartî maye. Lê ne xwastine bizanîn ko Mêdî çî bûne û bi kû da çûn.

(3) Dr. Bêlî bi vê teşbîha han geleki zîlm li kurdan kiriye. Kurd tu caran nîna Sûdaniyan û Efrîkiyan nayêne hesibandin. Dema ko pêşveçûna sinhet li ser qenciya hesin bû, hingê hesinê kurdan di cîbanê da bi nav û deng bû.



DI GIRAVÊN SÎLÊMAN DE TOPÇIYÊN EMÊRIKÂNÎ

BO AGADARI

« Govarî Ronahî » û roj-nameyî « Roja-Nû » bi zîwanî kurdî Botan le wîlatî Sûriye û Libnan dereçîn. Pêwîst e le hemû kurdêkî xwîngerrî xoy le ronahî em dû çiruyê bêbeş neka. Aboneyî salaney rojnamekê (2) dinar e, hêy govarekêş dinarek e. Etemî xol bikeyê be aboneyan be nau-nîşanî xware we dawayan bike:

Beşda. Kultiyetilhiqûq. Cenabê Reşîd Baccelan ».

Gelawêj: Îmare 11. Salî 4.

Me ji kovara Gulavêjê gelek minet e ko kovar û roj-nameyên me di nav kurdên Iraqê de propegandê kirine û bi vî awayî şanî hevdugir-tiweke nijadîn daye. Bi tenê

di agahdariya Gulavêjê de gotinek heyê ko emê li ser wê hinekî bisekinin.

Belê Gulavêjê gotiye: « bi zimanî kurdî Botan ». Celo ji gotina « kurdîya Botan » mexsed çî ye? Bê şik mexsed kurdîya ko di cihê Botan de pê tete axaltin e.

Ji mîletê me re « kurd » dibêjin û wek her mîletî ew jî bi zimanekî xweser, daxêve û ji wî zimanî re jî « kurdî » dibêjin. Çî mîlet çî ziman her du jî arî ne. Herçî ziman di nav zimanên arî de ji şaxa îranî, jî birê hîndo ewropayî ye.

Disan di zimanê me kurdîyê de herwekî di gelek zimanên pêşvekeftî de tete dîtin; zarîn liene. Yanî zimanê

me di bin tesîra gelek hêmanan (insîr) de bi zarên lêk ve bûye. Ew zar jî çî bîngehî de sîsê ne; zarê bakûr zarê nîvro û zarê dumlîlî. L'erçî zarê bakur jê re kurdmançî dibêjin. Yê ko bi dî mîlî taxêvin ew-çend têkîlî kurdên kurdmançî-zîman in ko ji wan re sêne û tixûb danîn dişwar e. Herçî zarê nîvro zîmanê kurdên welatjêrî ye. Heye ko lorî û hewremanî jî li gora ba-tûra (bînye) xwe bikevin nav vî zarî. Welatjorî jî vî zarî re û bi tevayî zîmanê soran dibêjin.

Em bèn ser gotina « Kur-diya Botan ». Botan wek Soran, Şêrwan, Behdînan welatekî Kurdîstanê ye û ew der li wextê berê mîrîtiyek bû; mîreki lê hikim dikir. Di wî

kalê Selahedîn ra Merwanê Emewî ye gotine[1]. Nîzam ko jî bo çî gotinên holê bê mana dibêjin. Ne şert e ko mezinatî jî bav û kalan bigehê kur û neviyan. Dîrok jî me ra xweş dide zarîn ko piraniya mezin û fatîhan jî malbatên nexweya rabûnc. Ji lewre ne hewce ye em guh bidin gotinên holê.

Îbin Xeldûn di dîroka xwe da koka Selahedîn di bavê hevdehan da digehîne Of el Hemîrî.

Dîroknivîs Stanlî - Lînpol li ser Şadiyê kurê Merwan dibêje; « Ji kalê Selahedîn Şadî ra tarîxek nîne. Bi tenê a ko der heqê wî hatiye zarîn ew e ko Şadî dostê Behrûzê Egriki ê canecan bû. Ev Behrûz evdek bû li Dwênê dima. Paşê kete xîzmeta hikûmeta Selçoqî û tê da bilînd bû, heya gîha merkezeke mezin. Mamosteyî jî ji şehzadeyên Selçoqîyan ra kir ».

Pişti ko Behrûz li Dwênê direve diçe nik siltan Mes'ûdê kurê Melekşah û di xîzmeta siltan da digehê payene bilînd, hînga ew jî diştîne pê dostê xwe ê canecan Şadiyê kurê Merwan tîne cem xwe û serekî li wir dihêle. Gava siltanê selçoqî, Behrûz bi mîhafîzî dişîne

Beşdayê, dîsa Şadî jî xwe naqetîne û tevî kurên wî bi xwe ra dibe. Paşê bi gotina Behrûz siltan, Şadiyê kurê Merwan li Tikrîtê dike wali, heya li wir diçe rehma Xwedê. Piştî mirîna Şadî, Behrûz kurê wî ê mezin Necmedîn Eyûb li şûna wî dike wali. Îro jî qubeya gora Şadiyê kurê Merwanê kurd li Tikrîtê heyê û jî xelkê wê ra nas e.

A ko mirov dikare tete bigehê, Şadî li Eddenkan[1] serekê qewmê xwe bûye; lê ne mîr û ne jî siltan. Tevayîya dîroknivîsan li ser nenasîya bavê Merwan bûne yek.

« Dairê - mearîf el Bîstanî » di bin bêjeya Eyûbiyan ra dibêjê: « Malbateke kurd e ko Mîsîr û Şam vekirîye û bi navê dewleta Eyûbî hatîye nasîn. Ev malbat jî malmezînen kurdan û qebîleya Rewadî û bavê Heziyan in. Bavê vî malbatê Necmedîn Eyûb tevî birayê xwe Esededîn Şêrgûh kurên Şadî li welatê Azerbaycanê û bajarê Dwênê hatine dinê. Ew bi bavê xwe ra hatine Beşdayê û ketine xîzmata mîhafîzê wê Mîcahîdedîn Behrûz ».

Ji van gotinên han mirov dikare qenc jî hev bi derxîne ko koka Selahedîn li kû hatiye û çî bûye.

(dûmahik heyê)

OSMAN SEBRÎ

(1) Navbera Merwanê kalê Selahedîn û Merwanê Emewî pirtirî çar sed sal heyê. Ên ko xwestine vî gotîna vala lêxin guhên xelkê teqez bîra vî ferqa mezin ne birine.

(1) Eddenkan, di rex bajarê Dwênê da li Azerbaycanê dimîne.

welatî de ji bîstan bêtir eşîr dijîn û ji wan eşîran re eşîrên Botan dibêjin. Cihê Botan di welatê jorîn de ye û ji lewre xelkê wî bi zarê bakur yanî bi kurdmançî taxêvin.

Herçî zar, ew jî bi zaravan li hev vedibin. Ji zaravan re tixûb nîne. Carina ew ne jî bajarekî beta bajarekî, lê jî gundekî heta bi gundekî din ferqina şanî didin.

Şam, Heleb, Bêrût sê bajarên Sûriyê ne û di wan her sê bajarên de jî bi erebî bi erebîke ko em jê re sûrî bibêjin xeber didin. Gava sê peya, şamiyek, helebiyek û bêrûtîyek bi darî hev dikevin û dipeyivin mirov tavil dizane ko yek î şamî ye, ê din helebî ye û ê sîseyan bêrûtî ye. Ji ber ko heryekî zaravakî xweser heye û hin dangan weke hev bi lêv nakin.

Pîştî vê ravekê (fzah) em cardî jî xwe bipîrsin ma « Kurdiya Potan » çi ye? Zimanê xelkê Botan kurdî ye, zarê wan kurdmançî ye û wan zaravakî xweser heye. Ji lewre botî di nav kurdine de din jî zimanê xwe kifş dibin ko botî ne.

Herçî zimanê kovar û rojnameyên Sûriyê: Ew kovar û rojname bi zarê kurdmançî tîn e nivîsandin û nivîsevanên wan dixebitin ko zimanekî yekbûyî bînin pê. Ji lewre guh nadin zaravayên xwe û jî ber vajî ve wî bi şûn de dibîlin û berê xwe didin zimanekî ayendê î gelemper (inûmî) û di vê xebatê de jî pîrsên zarine din jî dixwazin fêlemend bibin.

Botîtiya wan kovar û rojname di xwediyên wan de ye.

Belê xwediyên wan kovar û rojname bi xwe botî ne. Lê ew jî di nivîsarên xwe

DENGÎ GÎTIYÎ TAZE

Heta niho posta Iraqê jî me re « Jin » û kovara kurdî a heja « Gulavêj » tanîn û em bi wan şa dikirin. Îcar vê postê çavên me bi kovareke nû bi rûf kirin: DENGÎ GÎTIYÎ TAZE. Gîfî bi mana dinyayê ye. Bi kurdmaciya me: Dengê gîtiya taze yanî Dengê dinya nû.

Kovara me a nû bi her awayî heja û sezayî her pesn û şikranê ye. Dengê gîtiya taze, kovareke mezin û biresim e. Her rûpelê wê bi qasî du rûpelên Ronahiye ne û hejmarê wê a sîseyan — ya ko gîhaştê destên me — jî 48 rûpel û sih klîşeyên çeleng hatiye pê.

Ev kovar sefartxana britanî ya Bexdayê bi xwe derêxistiye û ev tişt li ser kovarê hatiye nivîsandin. Ev kovar jî aliyê îngilîzan jî keurdan re diyarîfê mezin û giranbêha ye. Me jî li kûnmeta qralî gelek minet e û em spasên xwe ên bêpîvan pêşkêşî wê dikin û jî kovara me a nû re jiyîneke dirêj û kamiran hevî dikin. Ev e rûpelê kovarê ê pêşîn, bi tîpên me ên kurdî:

DENGÎ GÎTIYÎ TAZE

KOWARÊKÎ MANGANE YE, LE LAYEN BEŞÎ PEYWENDÎ GEŞTI-YEWE, LE BALYOZXANEYÎ BRÎTANÎ DA LE BENDA DEREHÊNÎ.

T A W E R Û K

1 — Pença rasti tir le barey britanyayî gewre we	Tewfiq Welhî
9 — Qezay dize kewt le Güze	Tewfiq Welhî
13 — Wîrd bûnwey cihan le dijwariyekani cihan	Şêx Hesen Me'rûf
15 — Dêmanet be xêr	Şêx Ehmed Xenî
16 — Al, şewe, maman	Kake Reşîd
17 — Geştike le xurtikani britani	Kake Reşîd
18 — Sür Con Malkolem	Hiznî Mikriyani
23 — Şihrekî Rencûrî — Şihrekî Mirza Maref	
24 — Şerkewtinî Çerçil	Ehmed Şikrî
25 — Piyawêk le deway tîfenge we	Şîrzad
30 — Lawendenewey Zin	Tewfiq Welhî
32 — Şibrekanî Melikalkelanî Siue	Tewfiq Welhî
33 — Mister İdin siyasîyekî rast e	Evdîlqadir Heşmet
37 — Pîspor, aza, şaraza	Tewfiq Welhî
39 — Sê piyawî aza	Hiznî Mikriyani
42 — Destûrî zimanî kurdî	Tewfiq Welhî
45 — Nêwîşkî qewmewayî siyasî û spayî mangî	Tewfiq Welhî
48 — Haçî Elmed	Tewfiq Welhî

Ji milê din di hejmarê Gulvaja meha Kanûna-paşîn de mijde û spasek heye. Welê dixuye Gulavêj jî aliyê kaxezê ve, heta niho di tengiyê de bû. Vê paşiyê nimînenekî britanî bi navê Mr. Greys rabû û kaxeza Gulavêjê zêde kiriyê. Em jî bi gulavêjê re jî Mr. Greys re spanan dikin.

de zaravayê xwe tucaran eşkere nakin. Eşkere bikirina diviya bû li şûna (rabû û çêbû) (rabî û çêbî) bînivîsandana.

me a heja û girani re dikin ko ew rê xistiye her me û bi vê hêncetê me çelî zar û zimanê kovar û rojnameyên xwe kir.

Em gelek spanan jî kovara

RONAHÎ

Xelk ji welatê Kurdistanê ê çiyayîn û spehi tiştine hindik dizanin. Ji ber ko siûda vi welatî di

neşriyata te kêm e. Di heqê wi de kêm tişt hatine nivîsandin û wesfê wi ne hatiye hildan.

Herçi teşkilata siyasi, di vi warî de ji siûda vi welatî dîsan ne ewçend qenc e. Kurdên ko mişdarê wan di navbera heşt u neh milyonan de ye, welatê wan ê çiyayîn û ségoşe di navbeyna Tirkîye, Îran û Iraqê de hatiye lêk vekirin. Birekî kurdan di Sûriyê de û êline piçûk di deverine din de dijîn. Li Iraqê qedere derê milyonekê ne.

Kurd ji nijadê arî ne. Wesfine wan en xweser hene. Zimanê wan dimine farisîyê; lê ew bi tu awayî nakeve nizingî erebiyê.

Kurd bi mêranîyê tene wesif-dan û di nav milletên dinyayê de, bi bastûra (binîye) bedena xwe milletê qewintir tene hesêb û bi xwe ji pê iftixar dikin.

Rûyê erdê Kurdistana Iraqê bi qasî Skoçlandê ye. Tê de bergehîne welê hene ko çav kêm caran bi tiştan ji wan spehitir dikevin. Çiyayîne rût hene ko bilîndiya wan digehe heta 12000 peyî. Ji serê wan çîyan lehî û robarin dadikevin newal û navdeştine bijûn yê n ko ji rêl û darteaman tijî ne.

Kurd di wan navdeştên bijûn û di lêf û pesarên çîyan ên nizim de riz, ceh, genim û her texlîl fêkiyan diçînin; wek pirtîqal, xox, hejir, zeytûn û alûçan.

Hin gund û bajarên Kurdistanê bi spehîtiya bergehên xwe dikevin ber çavan. Rewandiz li ser pehnava çiyakî hatiye ava kirin. Amediya ko bi qub û mînareyên xwe nas e, li ser girekî bi çend hezar peyan bilind hatiye danin.

[1] Exbar-el-herb kovareke propagandê e inglîzî ye. Ev kovar li Misirê û bi zimanê erebî dertê. Kovarê bi vê bendê ve çend bergehên Kurdistana Iraqê ên spehî ji belav kirine.

KURDISTAN

EXBAR-EL-HERB — 29 KANÛNA-PAŞÎN

1944. HEJMAR 53 [1]

Bajar dikeve rasert navdşteke dirêj ya ko digehe heta çiyayên Iranê. Ev bajar dimine beledên efsa-

newt yê n ko kitêbên qedim wesfên wan dane. Herçi Akire, Pencewîn, Koysen-çaq bajarine kiçik lê dilrîba û cazîbdar in. Di Kurdistana Iraqê de bajarê mezintir Silêmaniye ye.

Di şûfa kurdan de berî her tiştî çiyayî û qewibûna wan dikeve ber çavan. Kurd mirovine bi tehenîl û xudan himet in, bikevin ber kîjan dişwariyê ji ji heq dertên. Hetanî iro cilên xwe ên nijadin werdigirin. Destmala ke mezim li serê xwe wer tinin, çakê û şerwaline fireh li xwe dikin. Cawê cilên wan qimaşekî gij e û wi qimaşî di malên xwe de ew bi xwe çêdikin. Rengê wan qimaşan bi piranî vekirî ne. Kurd ji rengên vekirî hez dikin. Piştê bi xwe ve dikin. Herçi ûçikên wan qedere du yardan dirêj in û wextê wan li zendên xwe dipêçin ew wek şaşikina dixweyin.

Li Iraqê kurd di ziman û girêdana xwe de serbest in. Bi gotinên din heqîne wan en mili û nijadin hatine nas kirin. Bi vê yekê ji cinsiyeta iraqî jî fêdemend dibin.

Ji niho de alikî ayenda (misteqbel) Kurdistanê xuya dike. Belê Kurdistan di welatên rohelatê nizing de wê bibe Iswîçra şerqê. Daira rêhesinên Iraqê bi hevkarîya wezaretê nafîê û hêvotina qeymeqamê textê Iraqê di çiyayên Kurdistanê de dest bi çêkirina otêl û mêvanxanan kirine.



LEHİSTIKA ŞETRENCÊ

Mireki Hindîstanê hebû; dilîşkî û zorker. Gelek zîlm li xelkê xwe dikir. Xelkê dora wî dil kirin bi pend û şiretan mirê zorker binin ser rê. Tu havil jê ne kirin. Ji beravajî ve, mir heşîgên ko lê şiret dikirin bi awakî li wan dihate xezebê û ew dikuştin.

Di nav berdevkên mir de yekî zana, çeknas hebû. Rabû lêhîstika şetrencê îcad kir û lehîstik berpeyî mirê xwe kir. Mir gelekî kêfa xwe jê re anî.

Mir mirovekî jîr bû. Piştî ko hînî şetrencê bû; hûr lê meyzîand û zanî mexsedeke berdevkê wî ê jîr lê heye.

Mir li qada şetrencê temaşa dikir, dîda eqilê xwe û didit ko herçend şah mezînê hemîyan e, nikare dirêjî neyaran bike û li ber xwe bide. Peygûnê dora wî berdevdan neyaran û jê re herevanî dikirin û wextê ko peyagûn wî dihatin kuştin şah diket destên dijmanan û dibû hêstir.

Mir jî wî haşî îbret girt, rêveçûna xwe bi xelkê xwe re guhart û bû melîkekî adil û dilovan.

Mir dixwest berdevkê xwe mikafal bike. Bani wî kir û got-ê: Tiştê ko devê te digire jî min bixwaze.

Berdevk got: Ezbênî piştî sawîja te min ji te divê li gora xanên qada şetrencê genim bîdî min. Ezbîsê xwe dîzanim.

Mir kenî û got-ê: Ji zêran, ji zîvan tiştêkî bixwaze.

Berdevk pê da erdê û got: Ezbênî ew hesî min e.

Mir gol belê û berdevk rêkâr nik hisabdaran.

Berdevkê jîr genimek danî xanê pêşin û gol, du lajê wî deymî xana diwemîn û bi wî awajî herin beta xana şîan.

Utsabdaran piştî çend xanan bi çelêmê hisob dikirin; jî ber ko genim nema di xanan de bi eih dibûn. Dawîgê gihastîne hejmareke wêlê ko ew mixdar genim di hemî Hindîstanê de peyda ne dibû.

Berdevkê jîr, bi wî awajî, derseke din ji da mirê geor.

GEMİLÊ TACDO

GULA MIN

Min di gulek nûnî bîşkivî
Mizgîn li dil bûye bilhar
Bilbil digel gul axivî
Dil nû ji xew bûye şiyar.

Gava min mizgîn daye dil
Tê da nema ne derd û kul
Habû ji xew hat pêşî gul
Pêçane xwe lê çar xumar.

Sed afezîn bo xwî dilî
Eriş bire dêmê gulî
Çarik li gerden herbîll
Hatîn sema dêm û bihar.

Bisk û guhar hatin sema
Epri li ser zilfa ne ma
Dilber li ber min her we ma
Xani li min bû dost û yar.


Sed ah ji wan çavên di res
Biskêr siyah dêmê di ges
Wan golînên şîrin û xweç
Şerbet ji lêvan min vexwar.

Şerbet ji lêvan min mijî
Heta ko dil jê bû tijî
Qet agirê dil nakuji
Pêti li dil da bû hewar.

Min dêm û gerdan gez kirin
Talanê wan xalan birin
Destan memik talan kirin
Maçan ji her der bê jimar.

CEGERXWÎN

QAYIXÊN QEWÇÛK



Carina em di danezanên şerevaniyan de dixwînin ko çend balafirên wan di şerekî hewayî de ketine behirê lê hin balafirvan hatine xelas kirin. Ma gelo ew balafirvan çawan têne xelas kirin. Bivê nevê ew bi melevaniyê nikarin xwe bigelînin qeraxan, bi tenê heke şer di ser perevan re çêbûye û ew bi xwe jî ketine nîzingî bejê. Lê heke ketine cihina jî bejê dûr hingê çi dikin?

Tiştê ko dikin ev e: Di her balafirê de qayixêke qewçûk heye. Wextê balafir hate hingaftin an agir pê ket siwarên wê, qayixê dinepixinin, berdidin behirê, bi xwe jî bi peraşûtan dadikevin û li qayixa qewçûk siwar dibin; herwekî klîşa jorin şani dide. Piştê balafirine behrî behirê seh dikin û heke ew dîtin dadikevin û qezajentî xelas dikin. Carina vapor jî diçin hawara qezajentiyên. Di qayixa ko klîşa me şani dide de sê peya hene; yek î birindar e.

DÎROKA JINA NAPOLYON

« Çi gava Ingiliz û Fransiz »
« lîbîn çek de serleştiyê li »
« diwê lîkîn ».
« Napolyon »

— 7 —

BIRÊ DIDÛYAN

SERÊ PÊŞIN « HESARA TÛLONÊ »

Dema gelê Fransiz rabû ser lîngan û serxwerabûyan her malmezînan û peyayên din dan, bê revê tiştekan li her wan nema û hemî derbasî erdên hikûmetên dorhelê bûn. Ji ber ko împêratorê Nemsayê Lêopold, biraziyê melika Fransyê Mari Antiwanêt bû, pîraniya revokan derbasî Nemsayê dibûn û li wir neyariya serxwerabûyan dikirin. Di birê herî vî da me da bû zanîn ko ev yeka han di navbera Franse û Nemsayê da bû bû sebeba şerêki mezin û heya serên melîk û melîkeyê jî di we rê da çû bûn.

Berî pêşin leşkerê Fransyê li pêş neyaran revî û heya nemsewîyan xwe gihandine nîzîka Parîsê. Lê paşê fransîzan namûseke çak rave kirin û welatê xwe jî neyaran paqij kirin. Vêcar leşkerê franseyê ê ko devce bû bû ne dixwest dev jî neyaran berde; heya nivê Ewropayê rapeyî wan kir. Li ser vê xurtiya kô leşker rave kirî, hikûmeta Fransyê beyanek li nav Ewropayê belav kir ko: hikûmeta Fransyê a nuh bergav dikare di hewara serbestixwazan biçe. Di vî warî da fermandarên leşkeriyê ko arîkariya hemî miletên ko rêwîyên vê rê ne bikin.

Li ser vê beyana han berî hemî hikûmetan Belçîk û Sawa xwe dane ser Cîmhûriyeta Fransyê. Bi vê yeka han bû ko sersiya tîrsê xwe avête dilê hikûmeta Îngilîz û serekwezîr Wîlyam Pîl xwe avête pêş. Îngilîzan qenc dîzanî ko heke agirê serxwerabûnê di Fransyê da venecîre, teqez dê gelek fîrelî bibe. Ew miletên ewropayî ko di bin nîrê zînata (zîlm) melîkiyê da bê eman mane dê wek Belçîka û Sawayê xwe bidine ser fransîzan û an bibin hevalbendên wan. Ji bo girtina pêşiya vê yekê dîtina hin hevalbend diviya bû. Hemî melîkên Ewropayê di vê rê da ji Wîlyam Pîl ne bi şûnda bûn; lê jî wan ne dihat. Herçî serekwezîrê Îngilîzan bi hikmê merkeza hikûmeta xwe di Ewropayê da, dikarî bû vê yekê



saz bike. Bi vê ramanê bû ko li ser destên sefirên Îngilîz dengê xwe gihande hemî hikûmetên Ewropayê. Berî hemî hikûmetan Îspanya guhdariya vî dengî kir û jî bo vekuştina agirê serxwerabûnê bû hevalê Îngilîzan.

Hîngê welatê Fransyê bi tevayî ne di destê serxwerabûyan da bû. Herçî xelkên xêrxwazê melîkiyê bi nîvroşê welêt da revî bûn û li bajarê Tûlonê hikûmetek çêkirî bûn ko ew hikûmet bi navê kurê melîkê kuştî, Lêwîsê hevdehan digêrandin. Kîjan Fransîzê jî ber zînata serxwerabûyan bireviya diçû bi wê hikûmetê disekinî. Hikûmeta Parîsê a nuh heya wê hîngê ewçend bala xwe ne da bû wê koma asiyan û bi şandina hin leşker, li ser wan tîr dikarî.

Dema Wîlyam Pîl dît ko xêrxwazên melîkiyê di bajarê Tûlonê da bi navê Lwîsê hevdehan hikûmetek anîne pê û li pêş hikûmeta serxwerabûyan ling didine ber xwe; jê ra lêviyeke baş çêbû. Bi arîkariyeke çak dikarî bû wê hikûmeta kiçîk li Tûlonê vejîne û xurt bike. Li ser vê ramanê hikûmetên Îngilîz û Îspanya gotina xwe kirin yek û destê arîkariya xwe dirêjî hikûmeta Tûlonê kirin. Di tebaxa 1791an da stolên wan her du

hikûmetan gîhaştin fskela Tûloné û bi leşker, xwarin, çek û posatan arîkariya asiyan kirin. Bi vê yekê hêviya îngilîzan xurt bû ko dê bikaribin agirê serxwerabûnê di welatê Franseyê da vemirînin.

Di wê demê da bû ko bextê hikûmeta cimhûriyeta Franseyê keti bû mîzîna qedere. Heke hevalbendan zor bikira, dê hikûmeteke melîkî di bin melikiya malbata Bourbon (navê malbata melîkên Franseyê) da vegeiriya Franseyê û ew xwîna ko gelê Fransîz di riya serbestî û wekhevîyê da çar salan rîjandî dê li tinê biçûya û dîsa welat tîketa bin dest malmezînan û peyayên dîn.


Lê herçî qeder, ji bo gelê Fransîz ji daxwaza Wîlyam Pîl, comertir bi derket ko di wê dema dijwar da xelaskarek gîhand. Xelaskarekî welê ko ew terma (kabûs) daketi ser sînga gelê Fransîz rakir.

Hîngê, ji mêj va leşkerê hikûmeta serxwerabûyan dor li bajarê Tûlonê girti bû. Lê ji ber ko îngilîzan tevî hevalbendê xwe di deryayê ra arîkariya asiyan dikirin; ev dor-girtina han bîfêde diman. Çîma ko leşker, xwarin, çek û posat ji hewceyê pirtir jê ra tanîn û kelehên dora bajarê jî hemî xurt kiri bûn. Bi vî awayî aslî teng ne dibûn û gazînda tu kêmasîyan ne dikirin. Herçî hikûmeta serxwerabûyan, anê cimhûriyet, jî vî domkirîna han gelekî dilteng bû bû û heye ko hêviya wê jî ji serdestîyê qels dibû. Lê bûyîneke ne di hesêb] da ew hêviya qels vejand, bajarê Tûlone êxiste

destê cimhûriyetê û erdê Franseyê jî tovê neyarên der û hundir paqij kir.

Di meha îlona 1793an da emîr da bûn sersemer (yûzbaşî) Napolyon ko here ser-
 23

ŞERÊ ÎTALYAYÊ



Şerê Îtalyayê hêj dom dike û ordîvên hevalbandan ber bi Romayê diçin. Lê ji ber nexweşiya hewayê, berf û baran û sermayê ordîva îngilîzan a heştan û ya emêrikaniyan a pêncan hêdika lêbelê bi xurtî pêş ve diçin. Di vê seferê de hevalbendan çek û aletine nû bi kar êxistîne. Klîşa me topeke emêrikani bîmotor û eskerîne ko dadîkevin bejê şanî didin.

Tûlonê diket. Ji rasthatîneke çak, qumandare topavêjan berî rojekê bi birîneke xedar birfîdar bû bû û nema dikarî karê xwe bike. Di wê demê da hatîna Napolyon ev kêmasîya han tîje kir û li wir hate sekinandin; heya qumandarê topavêjan rihet dibe û tê ser karê xwe.

Gava Napolyon bala xwe da karê ko jê ra hatiye sipartin, gelek kêmiyên mezin tê da ditin. Berê topan da bûn nava bajêr; lê guleyên wan xwe ne digihandin nivê rê. Napolyon rêzika qumandarê bajêr xwe ne eciband. Berê topan bi carekê guhazte kelehên dor bajêr; çî gava ew standin ko topan li ser wan keleşan saz bike û pê cengkeştîyên di îşkelê da birevîne. Bi vî awayî bajêr ji asiyan û welêt jî ji neyaran paqij bike.

Îngilîz jî di hêla xwe va li vê yeka han kang (xafil) ne ma bûn. Dema lingên wan bi erdê Tûlonê keti bû, berî her tiştî keleh bi topan xurt kiri bûn. Xurtîyeke welê ko her leşkerekî nikari bû ew keleş vekirana. Lê bextê ko hercar jî îngilîzan ra dibû arikar, qey ko ve carê rû jî wan diguhast, ko neyarekf wekî Napolyon î jîr, jêhatî û serhişk diêxiste pêşberî wan.

Napolyon jî di aliyê xwe va dijwariya karê ko girti bû ser xwe bîr dibir. Lê dilê wî ê mezin ne dixwast li ber ta dijwariyan qels bimîne; jî ber ko bêjeya « nikarinê » di ferhengê

sersemere korsikayî da tine bû. Çiqas kar û xebat li ber wî diwar dibûn; dilê wî ewçend zexim û vena wî hinde xurt dibûn. Bi tenê di pekanîna vî karê han da ew hewceyî tiştekî bû ko ew jî selahiyet; anê di kar û xebatê da ew serbest hiştin. Di enîyeke ko leşkerekî mezin tê da û li ser wî leşkerî du sê general hebûn, bêşik dengê sersemereki nedihate bihistin û bi rê û rezana ko wî danîna ne dihate emel kirin. Tevî vê yeka herbiçav, Napolyon jî ne zabitê ko jî bo dilxweşiya mezinên xwe dev ji zanîna xwe a rast berda.

Di roja pêşin da gotinên sersemere Napolyon û serleşkerê wê eniyê genêral Karto li ser tevdîra şer ne bû bûn yek. Napolyon xiteya mezinên xwe


ne dieciband û jî bo vekirina Tûlonê xi yeke xweser didane ber wan. Qumandarê serleşkerê Kartoyê ko xwe dinexwast û jî wê pê va tiştek ne dizanî; ne dixwast zanatî an şêrazatîya zabitê topavêjê ê bîst û çar salî li ser xwe qebûl bike. Heya rojekê li ser vê tevdîra han di civîna qumandaran da qirêneke biçûk bû bû. Napolyon tevdîra xwe bi ser û ber jî wan ra digot. Hinekane jî haziran mêldariya wî dikirin. Lê « no » gotina genêral Karto pêşiya her tiştî digirt. Hîngê jina genêral gote mêrê xwe: « Dev jî vî xortî berde. Ez dibînim, di tevdîra şer da ew jî te gelekî zana û jêhatîtir e. Bihêle, çawan jê ra xweş e bila welê bike. Tali çiya baş bibe dê jî te ra serbilindî bête zanin ».

Gotinên holê tiştek jî tevdîra genêral Karto ne diguhart. Di wê demê da bû ko jî şandi-yên milet (naîh seib) Xasparan bi rasthatin çû bû qerargaha leşker û qirêna di navbera Napolyon û genêral Karto da bihîstî bû. Gava şandi Xasparan jî mêldariya Napolyon dike

edî nema Karto serhişkiyê dike, bê gotin tevdîra Napolyon qebûl dike û destê wî didê(1). Di wê wextê da bû ko genêral Karto xwastin Parîsê û genêral Dûgomyê li şûna wî bû serleşker. Herçî Dûgomyê jî arîkarê wî genêral Dutayl ne wekî Karto dexsok û nezan bûn. Wan jî Napolyon ra qedireke welê mezin digirtin ko tucaran ew qedir jî bindestên xwe ra ne girti bûn.

Piştî ko jî bo tevdîra şer destê Napolyon jê ra hate dayîn, berê du sed top guhaste keleşa ko di roavayê bajêr da îngilîzan xort kiri bû. Xurtîyeke welê ko navê wê kiri bûn « Çebel Tariqa biçûk ». Şer bi awakî nuh dest pê kiri

(1) Destê wî didê, anê wî di kira wî da serbest dihêle.



Qranê Îngilistanê tacîdar Corc. Qran alaya şagirtên ûnivêrsîtê teftîş dike.

REWHAÎ Û BIYANÎ JI ME KURDAN ÇI DIXWAZIN? . .

Rewhaniyên me û hin biyaniyên ko di nav gelê kurd da pir caran digindirin û dikevin nav rîya me, bi hin kirdeyên gelêrî, piçûk û mezin me divarqilînin û digivêşin. Gelek caran dijwariyê li me û xebata me dikin. Nîho û berê jî em birîndarê ramanan kirine û dikin. Em bi zîmanekî tevayî jî wan ra dibêjin û hevî dikin ko ew dilreşî di nav me û wan da hevaneke tirş negire û nehe « tîrba sîpî û marê qut »...

Perî vê çend pêştevayên wiha hatine belav kirin. Lê mexabin tûkesî pax û perwa pê ne kiriye. Lewre serî jî guh nayê dagirtin; lê çav-dîtin perda dil tenik dike. Dilê me kurdên welatî, ne ji bo berberiyê, lê ji bo azadiya xwe û parastina ayê cîran û nejadên ko di nav me de ne. Heye ko ew dibêjin: Kurdistan darê xv e

bigire emê roj bi roj kêmbiha û bê pergal bimînin; lewre van serhişkiyan dikin.

Mexabin ev xiyalên ha nayêne bîra me. Deftera stemkariyê ne ketiye çapa hegê me û ev saxsazî nakeve ber xana zimanê me. Nemaze van xêzên reş em li qedera xwe dinivîsin. Hingî me jarî û bindestî diye; zorkerî û çavsooriyê li tu nejad û geli nakin. Tu kes nikare neyartiya doza me bike, bi tenê bi dilxweşî û camêrî em dibin. Xûyê kurd mîna şer e. Gava serdestî hevalê xwe ne dilovan û nerm in û benga dikevin tengî û bindestiyê zirz û sert dibin.

Bila tu kes ji destdirêjiya me netirse; em he şînas in. Tarîx dilovaniya me berçav dike. Çawan ko lawê Mi'efe, dibêje: « Medî û franîyan çîranên xwe ji dest Rom û frengan kuta dikirin, bê ko wan bêxin Lin siya xwe, bi azadarî ew dipan. Ji ber wî jî me ra digotin: (ebna el ekrad). Piştî îslamiyê jî me re

gotin mewalî, bi mana ebîd an kedî tê gotin. Bo çî bêjim, li ber kêlên mezeran pesin nabe. Ji xwe bi rasî dilovaniyê em kelin. Tu kes çasî me jî welatê xwe hez nake. Ji bindestî û namûs û dîn me terk dida û mihacir dibûn. Gelo xeynî kurd kê leçeba mihacir wek qerpal bi stoyê xwe da kiriye. Heke me jî wek hevalên xwe bikirana di sala 1918an de em jî ji bin siya çeçel, tajiyên çavzer kutah bibana.

Çawa ko Cizerî gotiye:

Mislê goyê bê ser û pa
Mane li ber der û şeka.
Cizîr: 10, 1, 1944

HESÊN HÎŞYAR



BERGEHEK JI COTKARIYA WELATÊ INGİLİSTANÊ

bû. Napolyon bi dil û can xwe da bûyê. Xwedayîneke welê ko di mecala berika tîngê da li pêş neyaran di nav leşkerê xwe da bi siwarî diçû û dihat. Du-sê hesp di bin wî da hatine kuştin; tevî wê jî a xwe ne dima. Her ko hespek di bin da dihate kuştin, wî xwe hîn pirtir nîzikî neyaran dikir. Heya rojekê

ewçend nîzikî neyaran bû ko bi serberzekî (neferekî) ingilîz va bi destelepê rabîştine hev û di binhêla çokê da birfîneke mezin lê bû; tu nema ko ji bo wê birfîne lingekî wî bihata jêkirin. « ðumahîk beye »

OSMAN SEBRÎ

CĒWIKĒN

SIYAMĪ ĒN BI HEV-VE

Gelek jin hene ko cēwikan dītinin. Iinan ji di zikekē de sē, çar zaro anīne, heryek bi serē xwe. Lē cēwikan siyamī yēn ko em iro dīxwazin qala wan bikin; cēwikine bi hev-ve bûn; bedenine cihē lē bi hev ve zeliçī.

Çirok kevin e; heye ko piraniya xwende-
vanēn me pē dizanin. Lē vē paşiyē me di kovareke emērikanī ū di heqē van cēwikan de tefsilatine nū dītine. Em dītin wan berpeyi xwende-
vanēn xwe bikin.

Cēwinkēn siyamī di sala 1811ē de di gundekī Siyamē de, nizingī l'ankokē, ji diya xwe bûne.[1] Bavē wan i çini, diya wan bi nivī siyamī bû. Lē ji ber ko di Siyamē de bûne, bi navē cēwikan siyamī deng dane. Navē yekī Çang ū yē ē din İng bû.

Birayēn cēwik bi hev re radibûn, rûdiniş-
tin ū radiketin. Bi tenē İng ji birayē xwe bi qasī tilikē dirējtir bû. Ji lewre ji Çang re soline bi piştpehniyine ji yēn birayē wī bi tilikē bilintir çedikirin da ko bikarin bi hev re bi rē ve biçin.

Birayēn cēwik di gundē xwe de mirişk bi xwedī dikirin ū hēk difirotin. Gava yekī dest bi gotinekē dikir ē din dikarī bû wē gotinē tamam bike.

Çang ū İng bû bûn 18salī. Rojekē, vapo-
reke emērikanī di bendereke Siyamē de lenger avēt. Keptan birayēn cēwik dītin, ew qanī kirin ū bi xwe re birin Emērikayē, bajarē Bostonē. Ji Emērikē jī ew birin İngilterē. Xelk li wan ecēbmayī diman; diktōr li wan bûr dibûn; digotin xerībeke xilqetē ne.

Rexma ko bi hev ve zeliqī bûn bi her karī radibûn. Qederē 10 kilōmētiran bi rē ve diçûn, mēlevanī dikirin; çend çaran çûn neçirē jī. Gava radizan rüyē xwe didan hev ū bēf ko ko hevûdin hişyar bikin ji alifk diqulipin aliye din.

Şelīteke goştin, qederē deh sentimētiran dirēj, dora wī qederē 20 sentimētiran, ew bi hev re digirtin. Diktōran di heqē wē şelītē de gelek tişt gotin ū texmīn kirin. Lē beriya mirina wan nikarī bûn bihatana qerarekē. Piştī mirina wan gava bedena wan qelaştin hingē zanin ko heke şelīt di jiyina wan de bibirana her du jī wē bimiriya. Wextē ko derziyek di orta selīta goşt re dikirin her du cēwik pev



Eskerēn ordiwa heştan dadikevin beja İtalyayē,
re pē dihesiyan. Lē heke derzī di aliye rastē bikirana hingē bi tenē cēwikē aliye rastē pē pihesiya. Li milē çepē jī welē bû.

Di zarotiya xwe de bi xuriyē keti bûn. Di rojekē de nexweş bû bûn ū di rojekē de sax bûn. Wextē mezin bûn yekī şerab vedixwar ū serxweş diket. Yē ko venedixwar şeraba birayē wī lē kar ne dikir; weke xwe dima ū li birayē xwe ē serxweş temaşa dikir.

Cēwikan siyamī cardī jī İngilterē vegeriyan Emērikayē. Gelek pere da bûn hev. Lē rêberē wan pere bi xwe re bir ū revī ū cēwik li erdē hiştin. Lē birayēn cēwik di midekī kurt de qederē 60,000 riyalī pere dane hev ū ne ketin teŋiyē.

Li İngilterē tişteki ecēb li wan qewimī bû. Dilē keçikekē bi navē Sofya ū ji maleke qenc bi wan keti bû. Keçikē ew her du birayēn bi hev ve mirovekī bi tenē dihesiband ū dil dikir bi wī mirovī bizewice. Lē diktōran digot ko ew ne mirovekī bi tenē ne; heryek bi serē xwe mērek e. Ji lewre keçikē ew ziawc bikira wē bibiwa jina du mēran, jina du biran. Ji ber wē yekē Sofya jī wē ziawcē geriya.

Di rastiyē de mirovine bi ser xwe bûn. Herwekī me got yekī şerab vedixwar, serxweş diket, ē din pē ne dihesiya. Gava bi getrencē dileyistin di lehīstikē de hergav ne

[1] Ji welatē Siyamē re iro Teyland dibējin.

di yek fikrê de bûn. Di sala 1847an de gava serekimhûrê Emêrikê dihate bijartin heryekî dengê xwe da bû namzedekî din.

Dawiyê her du bira zewicîn û heryekî ji xwe re jinek anî. Belê di sala 1843an de Çang û Îng di wilayeta Karolînê de birayên cewik du keç, xwehênhev, nas û ji wan hez kiri bûn; Edelayîd û Sarêan, keçên Yîts. Keçikan jî ji wan hez kiri bû. Edelayîd bû jina Çang, Sarêan jî jina Îng.

Lê cewikan bi jinbrayên xwe ne dikirin. Rabûn jî hev qederê niv saetê dûr du xanî çêkirin. Her kebanî di xanikî û sê rojan di xaniyê din de diman.

Piştî ziwacê qederê sih salî emir kirin û jî wan re 22 zaro çêbûn. Îng heft kûr, pênc keç, hebûn. Ji Çang re jî heft keç û sê kur çêbû bûn. Tev de zarowine lihevhatî û jîr. Ji keç û kurekî pêve, yên ko ker û lal bûn.

Cewikan bi colkariyê mijûl bibûn û digel

zar û zêç têr nan dixwarin. Di sala 1874an û li 23ê Kanûna-paşîn di nav du saetan de, li pey hev mirin. Dibêjin ko Çang şerab vexwari bû û di derengiya şevê de, di bin baraneke xurt de vegeriya bû mal. Welê dixuye bi rê ve serma hilanî bû. Li ber destê sibehê Çang hişyar bû bû. Eşek bi sînga wî ketî bû, Çang jî nav cihan rabû û li ser kursikî rûnişt. Destê xwe kiri bû sînga xwe û dinalf. Îng dixwest rakeve. Pev re dan û standin. Dawiyê Îng birayê xwe kişaude nav cihan û raketin.

Piştî du saetan Îng hişyar bû û jî kurê xwe pirsî: « Mamê te Çang çawan e? »

Kurê wî lê vegerand û got: Canê wî sar bûye, bawer bike miriye.

Îng dest bi girî kir û gote jina xwe: « Êdî ez jî ezê bimirin ». Piştî du saetan Îng jî, yê ko jî tu tiştî ne têşiha, ew jî mir.

Kelaşên wan di tibiya Fîladelîfayê de kelaşîn û teşrîh kirin. Çang jî her sekta dil mirî bû. Herçî Îng tu nexwesî lê xuya


ne dikir; di viya bû jî tirsan mirî be. Teşrîhê da zanî ko heke di jiyîna wan de şelîta goşt bibirana her du jî di cih de wê bimirana.

Smainê Serhedî



Eskertîn
brîtani têtên
bi derzî gên
ko eleannan
vegirtî bûn
dibirin û qes-
ta pêş dikin.

Stoî he-
valbendan di
Pesifikê de
bertidîn gir-
vên ko japo-
nên ew di
destpêka şerî
de bi nişke-
gaviyê vegirtî
bûn.



MERÊŞAL LÛKSENBÛRG

Di sala 1692an de bû. Merêşal Lûksenbûrg bi heftê hezar fransîzi re şerê îngilîz û holendiyan dikir. Ew di bin fermadariya Gwiyom Doranj de bûn.

Gwiyom neyarekt xurt û hêja bû. Merêşal bert bi rojekê ji sedî bêtir casûs berda bûn dora qerargaha neyarê xwe. Yek ji wan hati bû girtin. Zabitên Gwiyom zor dan-ê û jê re raporeke lihevsiwarkiri dane nivîsandin û ew şandin qerargaha merêşal.



Merêşal li gora wê raporê eskerên xwe xisti bûn rêza cengê. Gwiyom yê ko rêzika dijminê xwe dizani bi spêdê ve li baskeki wî t qels da û ew şkênanê. Merêşalê pîr, reşma nexweşiya xwe, siwar bû, rêzika xwe guhart li dijmin vegeriya û piştî sê hicûman ew şkênanê.

Gwiyom ji vê şkestinê gelek qehirî bû. Rojekê gote xelkê: Ezê zora wî qoşî kengê bibim.

Merêşal gava ev bihtst got: Ma ji kû dizane ko ez qoşî im; tucaran wî ez ji par re ne dîtîme.



QAYIXÊN KEWÇÛK



Di rûpelê 17 an de bi vê sernanê nivîsar û klîşeyek heye. Klîşeyên jorin ji xelaskirina balafirvanên qezajentî şani didin.

A pênîn: Balafreke bejê li rûyê behirê û di nav qayîxeke kewçûk de dalafirvanekî qezajentî ditiye û bi bêtêlê elam daye motorbotekê; motorbot ji hatiye hawara qezajentî.

A didowan: Ev klîşe motorbokeke xaça sor şani dide. Ev motorbot di behira Maşê de ye. Di vê motorbotê de bêtêlek, derman, xwarin, cî û tiştine din yê ko ji qezajentiyan re divêtin hene. Qezajentî piştî ko xwe ji balafirê lavêjin û li qayîxa kewçûk siwar dibin heke rastî van vaporên xaça sor tî, li wan siwar dibin û bi bêtêlê elam didin merkeze. Heke birçî ne dixwin vedixwin; birîndar xwe derman ji dikin. Di vê navê de hawara wan têt û qezajentî vedigerin bejê.

Kiriyariya Ronahiye

Ji bo Sûriyê 10 lireyên sûri — Ji bo welatên din lirekî îngilîzî û nîv

Xwedî û gerinendeyê berrpirsiyar : Celadet Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye
Directeur Propriétaire: Djéladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 3
HEJMAR 24
NÎSNAN 1944

RONAHÎ

ANNEE 3
NUMÉRO 24
AVRIL 1944

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON: 12—29



Di rêleke Îngilistanê de, herweki li nik me, komir çêdikin. Lê ev komir ne ji bo, di menqelê de, şewitandinê ye. Vê komirê di madeyên teqandinê û maskên gazan de bi kar têxin.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1944

DI VÊ HEJMARÊ DE

Quling û Rovî	Çirokbêj
Cegerxwîn	Hîsênê Emîn
Jin û mêr	Emoyê Cilînî
Mam Hîrç	Sebrî Bradîm
Napolyon	Osman Sebrî
Dr. Rweylot	Bişarê Segman
Gula Kirasdirihayî	M. Xidir Mizûrî
Selahedîn	Osman Sebrî
General an Çawîş	Hesênê Mistê
Hindik Rîndik	Xeberguhêz
Dengê Xortan	Hîsênê Emîn
Zîman	Osman Sebrî
Qertel û Silêman	Ronahî
Nîjad	T. Ilho Bêduhî
Hînek ji henek	Yarîker
Gazind û hêvî	Dilkulê Doskî

CEGERXWÎN

*Cegerxwîn tu pîr xwenda yî, ji ritba alîma yî
Cegerxwîn kir welenparêz, tû şairê kurda yî.
Bî şîhrên xwe te hişyar kir, gelek xortê di razayî,
Bî xêret û himêta te, hin jê bûne fedayî.*

*Tu şairkî pîr hêja yî, qiyametê tê tonek zêr
Tu laîq î l'oxûra te, xwîn birêjin hezar mêr.
Çi b'kine tro, mayî bêden, êdi ne j'te ne ma xêr
Çi qewimî ji mitala tev de mane ser-berjêr.*

*Ji nav mela tu rabûyî, ewil şaşik te qetand
Bî şîhrên xwe eşqa mîllî, meqamê baş te sitand.
Şohreta x're li imûmê, Kurdistanê te gerand,
Sed mixabin û heyy tro, te dengê xwe vemirand.*

*Te dîn berda ji ber eşqa xwe î mîllî te terk da,
Ji ber gotin û galgalê, şêx û mela te rîk da.
Piştî vena bî xebata ji bo kurda tê şewq da.
Ez dilirsim ev jî berda, vê ji min re meraq da.*

*Ser hîlne ey Cegerxwîn, xew bî kêrî te nayê.
Rabe ser xwe, qîra bide derkeve ji tenhayê.
Îrşad bike li nav kurda, ser kêşa bû nerayê;
Ma laîq e xelk bibêjin, Cegerxwîn çu fenayê.*

*Bî vê şîhrê ji xwendewan re guman çênêbê go Cegerxwîn wefat
bûye; şikîr ew sax û rihet e. Ev jî ber go vê pêlê mijûl e;
bêden, bîxebat maye, ji bona îqaza wî ye.*

Qetrani: 9/1/1944

HISÊNÊ EMÎN

ÇIROKA KURDMANCI:

QULING Û ROVÎ

*Carekê qulingek û roviyek bûn dostên hev.
Rovî gote quling; were mala min, mehvani.
Quling go, baş e, û çû mala rovî.*

*Rovî rabû taştê ji quling re çêkir. Taştiya
rovî hewdel bû, yanî ard di nêv avê de kelan-
di bû. Rovî hewdel anî vala kir ser tehteke
pehîn. Rovî gote quling; kerem bike taştê. Qu-
ling çû li ser tehtë, hewdel digel rovî xwar. Rovî
gelek xwar. Quling nikart bû bixwîl. Rovî gote
quling, bira rabe em biçî li welenê mi bigeriht, da
tu cihê mi bibîni. Quling rabû digel rovî çû li
cihê wî gerihan. Cihê rovî hemî dirî bûn, stîrî
bûn, dar bûn. Pirtikên quling hemû bi wan di-
riya ve man. Quling êdî nikarî bîfrit. Bi şev
derdiket, diçêrî, heta pirtikên
wî wek berê hatin, temam bûn.*

*Rojekê quling rabû çû
cem rovî û got ê: bira vêca
tu were em biçî mala min
mehvani »*

*Rovî rabû digel quling çû.
Quling ji rabû hinek nok di
nêv avê da pehtin. Quling gote
rovî: « dê bira kerem bike bix-
we. » Rovî çû ser tehtë bî zîma-
nê xwe alast, zîmanê wî şewîl.
Quling bî nikilê xwe nok hemî
ber hev kirin, xwarin. Quling
gote rovî: ey bira tu jî were
em biçî cihê min bibîni. Rovî
gote quling, baş e em biçî bige-
rî. Quling gote rovî were li ser
pišta mi rûne. Rovî çû li ser
pišta quling rûnişt. Quling fîrî,
xwe bilind kir, deweranek da
xwe, xwe gelek bilind kir.
Paşê gote rovî: tu gelek dinyayê
dibîni? Rovî gotê: « Belê
ez temain dinyayê dibînim. »
Quling deweranek di da xwe
û dîsa ji rovî pîrs kir, go:
tu gelek dinyayê dibîni? Rovî
go: ez nivka dinyayê dibînim.
Quling deweranekê di da xwe
û ji rovî pîrsî: tu dinyayê çaw-
wan dibîni? Rovî go: Ez he-
nîya gayê beş dibînim.*

*Quling gote rovî: Bira mîlê
min ê rastê qerimî, xwe bide*

ser milê min ê çepê.

Rovî xwe da ser milê çepê, quling milê xwe ji ber nizam kir, rovî ket. Rovî dihate xwar û dia dikir dîgo: ya rebî cihki nerm, ya rebî cihki nerm

Zarokên gundekî çû bûn ber karikên xwe; ew diçêrandin. Dîtin rovî ji jor ve têt, dikevit. Zaro tirsihan revîn, kulavê xwe li cih de hiştin. Bi hes kirîna Xwedê rovî ket ser kulav. Rovî kulav avêle ser pişta xwe, çû.

Rovî rastî hirçekê hat. Hirçê got ê: «mam rovî te ev kulav ji kû aniye?» Rovî go: Min bi xwe çêkiriye, fîlehên Ozimê jî, wek min nizanîn kulava çêkin.

Hirçê got: Mam rovî ez hêvî dikim tu yekî ji min re jî çêki

Rovî go: Baş e, lê belê divêt tu du bizinên qelew ji min re bînî, derê kuna min da, ez hîriya wa ji te re bikim kulav.

Hirçê du nêrt ji pezê ko çera girtin, kuştin, laşê wa ji rovî re anîn, arî rovî kir û nêri êxistin kûna rovî de.

Pişta deh rojka hirçê rovî dît û got ê: Mamê rovî te kulavê min temam kiriye.

Rovî go: Min hîrt şîştiye lê hêj ziwa ne bûye


Hirç çû heta çend rojka, paşê dîsa rovî dît û got: «Ha man rovî hêj kulav temam ne bûye?»

Rovî go min jeniye lê hêj çênekiriye.

Bi vî awayî midêkê hirç û rovî hevûdi gerandin.

Paşê dîsa rojekê hirçê qesta rovî kir ko jê pirsîyariya kulavê xwe bikil.

Rovî çû ket kûna xwe û li hirçê vegerand: Heçî ko bawer dikin ko ji rovî êrmişatî çêdibin divêt gelek li hevîya kulavê xwe bimînin.



Di sala 1925an de şagirtên Kênbriçê ji xwe re şirçeke balafirvaniyê çêkiri bûn û di wextên xwe ên vala de hînî balafirvaniyê dibûn. Wextê bû şer ew şagirtên ha bi talîmeke hindik bûne balafarvanine şerêvanî û daketin; hêj rastir, hilkişiyana qada şer. Klîşa me didoman ji wan şagirtan şanî dide.



Herkes dizane ko madenên hêja di zikê erdê de veşartî ne. Mihendisîne pispor wan keşif dikin; erd qul dikin, di zikê erdê de zêrzemînan çêdikin digehin cewhera maden. Herwekî klîşa me şanî dide emele di wan zêrzemînan de dixêbitin.

JIN Û MÊR

MÊRÊ KO BI JINA XWE RE NAN NAXWE

Mirza Emoyê Cilîni, xwendevanekî me î heja vê paşiyê hati bû Şamê. Rojekê Mr. Emo ez ziyaret kiri bûm. Wextê Emo li nik min bû Çemşîd ji min re du şûşe anîn û got: « yadê dibêje, ji kerema xwe vê şûşa piçûk ji a mezîna dagirtî ». Min kovikeke kaxez çêkir û ji diya Çemşîd re şûşe dagirtî. Min bala xwe da û dit ko Emo ev tişt ne ecîbandî bû û li min bi çavine heyîrî dî-nîhêrt. Min, bi ken, gote «Emo: Emo ji mêrê ko ji jina xwe re şûşan dadigire çi xêr çêdibe ». Emo kenî, lê li min veğerand. Piştî gawekê Mr. Emo çiroka jêrin gote min û fikira xwe di vî îştî de pêşkêre kir.

C. A. B.

Zilamek hebû, ji deşta Diyarbekirê, ji Gundê Rêbûlê; herî şêst heftê salî. Navê wî Mihemed bû.

Ûxelayî li deşta Diyarbekirê çêbû. Rabû ew zilam û pîreka xwe bi hev şewirin, gotin, li welatê me giranî çêbûye û li welatê beriya Mêrdînê erzantî heye; ka em herine karekî bikin ji xwe re, idarekê bibinin.

Zilam şûr û mirtalê xwe hilanî, pîreka jî lihêf û palasa xwe li pişta xwe kirin; bi rê ketin hatin welatê Mêrdînê, ser kaniya Emer axa.

Mêrik ji pîreka xwe re got, ka em rûnîa nanê xwe bixwin. Gava ku rûniştin, mêrik rûnişt ser kaniyê û jinik dûrî wî rûnişt û pişta xwe dayê û nanê xwe dixwar.

Di pişt re ditin, pênc şeş zilamê eşqîya ji bo diziyê û xerabiyê di ser wan re bûn. Wan xwe bi xwe ji hev re got, vaye zilamek û pîrekek hatine ser kaniyê rûniştine û nanê xwe dixwin. Ka em herin şûr û mirtalê wî jê bistinin û wî tazi bikin.

Yekî ji wan zilaman gote hevalê xwe, ya meriv em nikarin vî merivî tazi bikin. Hevalên wî jê pirsin, çire? Wî gote hevalê xwe, hon wî nabînin çawan rûniştîye ser kaniyê û nanê xwe dixwe û pîreka wî çûyê dûrî wî û pişta xwe dayî-yê; ew jî nanê xwe dixwe. Ew zilamê ko bi pîreka xwe re nan naxwe ew zilam tu cara nayê pis kirin.

Ewan zilaman xebera hevalê xwe ne kirin, rabûn halin ser meriv, wî û jina wî tazi bikin.

Piştî mêrik li wan û berê jinikê li wan bû û mêrik ew ne diditin. Gava jinikê ew ditin, ji mêrê xwe re got: Vaye pênc şeş zilamê xerab hatin; wê me tazi bikin.

Mêrik gote: Bira bèn; heta ez têr nanê xwe bixwim. Gava têr nanê xwe xwar û devê xwe paqij kir, simbelê xwe bada, rahişte şûr û mirtalê xwe û ha dizau kir û gote wan: Ez ne ew meriv in ku hon mi tazi bikin û şûr û mirtalê mi ji mi bistinin.

Ewa merîva gote hevdû, Ev zilam ne zilamekî xirab e; em herin wî tazi bikin û hevdû bikujin qezake mezîna wê çêbibê.

Rabûn bani wî kirin, bext dan hevdû û çûn cem wî zilamî û bûn brakê hevdû.

Mexsed zilamê ko bi pîreka xwe re nan bixwê tu xêr jê çênabê.

EMOYÊ CILÎNÎ

Ronahî — Ji çiroka Mirza Emo dixuye ko Mihemedê rêbûltî mîrekê qenc bû; ji ber ko bi jina xwe re nan ne dixwar. Lê di sa ji çiroka Mr. Emo xuya dike ko ew mîrê qenc yê ko bi jina xwe re nan ne dixwar pîrsa xwe bi jina xwe dixist û pê dişewri. Yê ko dişewire divê carîna ji ji ya şewirdara xwe ji bikî.



Zilamek hebû, li gundê Zédika. Rabû çû çiyayê Cûdt, neçîrê. Koviyeq kuşt; lê bû meçîrib. Çû şikeftêkê, ji xwe re hinek ji goştê xwe biraşt û xwar; tiwînga xwe kir biu serê xwe û raza.

Hîrçêkê pêjna wî kir û hat hundirê şikeftê. Hêdt, hîrçê rahişt tiwînga wî û li tehtë da; hûr-hûrî kir. Rahişt destê mêrik, ew hişyar kir û bire xiste kuna gi hîrç tê de disekint. Hîrçê jê re da zanin gi mêrik here cem.

Mêrik, salekê li cem hîrçê di qulê de ma. Du çêli ji hîrçê re çêbûn; yek nêr, yek mê. Weke insan bûn; lê xwerî bi pîrç bûn.

Rojekê, hîrç çû bû çolê û derê kunê li zilamê xwe ne girtî bû. Mêrik rewiya hat gundê xwe, Zédika. Hîrç hat kunê; nerî zilamê wê ne li wir e. Raû, her dû zarokê xwe hilgirtin û li ser şopa mêrik meşîya û hat gund.

Zilamê wê li ser banê camiyê rûniştî bû. Zarokê gund gotin va ye hîrçek hat. Zilamê wê got, herç; cêstê bid-ê kuşîna min li ser e. Hîrç hat ser banê camiyê, sê cara tif kir riwê zilâm û çêliyê nêr da wî û a mê ji rwe re hişt û pir.

Kurik mezin bû, bû zilam. Rojekê du xulam hatin; du sîfre xwarin li ser destê wan e. Mam-hîrç ji li devê dert sekint bû; rahişt her du sîfre ji destê xulamê girt; her du ji xwarin. Mam-hîrç di pê re pîrst; gotin ew xwarin yên koçgirê (pehewan) mîr bûn.

SERPÊHATI
MAM—HÎRÇ

Goçgirê mîr, li cem mîr giliyê xwe kirin, gotin xulamê şîva me ne anîne, em ji birçîna kuştin. Mîr şande dût xulamê, pîrst ji wan, çîma goçgirê bê xwarin mane. Xulama got, me şîva wa anî bû, lê Mam-hîrç ji destê me girt û şîva her diwan ji xwar. Mam-hîrç xulamê axê Zédika bû.

Mîr delat hildêra nav bajêr go, bêje sibe seyran e, emê herin Çemê çîhiwa. Mîr gote Mam-hîrç: Eger tu pehewan î, tu kari be bi her du pehewanê mi, ezê li gor dilê te bidim te. Tu nîkari be ezê te û axê te bikujim.

Mam-hîrç go, mi qebûl e; her du pehewan, heryek bi destêki girt û her du ji dan erdê û kuştin.

Mîr go te çî divê? Mam-hîrç go, mi erdê Zerberistê divê; ji bo gi wextê em bèn Ciztrê bi evarê re, emê li wir dênin; da gi tukes zilm û ta li me nekin.

Niha nebtîyê Mam-hîrç li Zédika, li deşta Silopiya hene. Sebri bi xwe ji Rehaniyê, ji deşta Silopiya ye. Îro li Amûdê feqe ye.

15/1/1944

SEBRÎ BRAHÎM

RONAHÎ — Herwekî bi xwe gotiye Sebrî silopî ye, lê welê dixuye li beriyê mezin bûye û zarê xwe ê bîngêhin hilnaniye; lê yê beriyê ji bi temamî ne girtiye. Ji lewre bi zarekî levlîhev û navin dibêje û dinivîsîne. Herçî çirok heke xelkê Silopiyan jê enirine bîla gazidên xwe, ne ji me lê ji hem-sehriyê xwe bikin.



ESKERÊN ORDIWA HEŞTAN DI BAJAREKÎ TALYANÎ DE. BAJARÊ KO PIŞTÎ ŞERINE NO VEGERTINE.

DÎROKA

JÎNA NAPOLYON

— 8 —

Dûmahika hejmara 23an

Gava îngilîzan guhartina awayê ger û xiteya qumandarê topan dît, bir birin ko di kû da lê ketine. Wan jî bi topên heyî bê dilovanî guleyên topan bi ser Napolyon û leşkerê wî da barandin. Agirê topan ê ko îngilîzan bi ser leşkerê fransîz da dibarand ewçend î xurt bû ko zebaniyên dûjehê nikari bûn xwe li ber ragirin. Di wargehê topavêjan da bihustek erd ne hiştin ko çend gule tê da bi cih ne kirin. Vî agirê xurt û bê dilovanî, tirsê xist dilê topavêjên Napolyon û hinek jê revîn. Napolyon tirsî ko ên mayî jî bidin ser şopa hevalên xwe, hînga hilkişî ser lûleya topekê û li topavêjan holê kire qîr:

« Çi qewimî! qey tirsê gîha dilê topavêjên me!.. »

Bi vê gotinê topavêjên mayî dil girtin û ên revî bi çûn da vegeerîn ser karê xwe. Dema her kes vegeerî cihê xwe, bê ko ên revî fihêtkar bike, bi dengêkî bilind gote wan:

« Ez î bawer bûm ko birek ji çêliyên Fransyê di ber destê min da dixebitin ». »

Hîn bi vê gotinê jî tîr ne kir; ji bo ko bi carekê riya revê ji wan bistîne got:

« Bila yekî nivîsyan bê, da ko emirekî binivîse »

Di nav topavêjan da serberzek bi derket û çû li pêşberê wî rawestî û gotê hinivîse:

« Ji niha û pê da navê vê hetarya han, hetariya mîrxasan e ». »

Hîn serberzê bêjeya dawiyê ne qedandi bû ko guleyêke topê li pêşberê wî û Napolyon li erdê ket û bêrek ax bi ser kaxeza ko dinivîsîn kir. Serberzê camêr bê ko bitertile bi rûkî biken dibêje: « Spas ji Xwedê ral bi vê guleya han em ji westîna zihakirina nivîsanê xilas kirin ». »

Ev gotina han gelekî ji kêfa Napolyon hat. Pêşdetir ji bîr ne kir ko wî serberzê bike zabî, Ew serberzê ko navê wî Jûno bû, beya dawiya emîr bi Napolyon ra ma; heya bû marşal û dük.

Piştî ko Napolyon bi gotinên xwe ên canvejin leşkerê xwe dihêvotin (hêvotin, teşwîq)



û sergerm dikirin; bi du sed top agirê dûjeheke birastî bi ser serê neyarên xwe da dirijand û xwe diêxiste xeterê. Dawî saeta êrişê hat; ew êrişê ko dixwast pê pergala leşkerê îngilîz belav bike û wan di Cebel-Tariqa biçûk da biderxîne.

Di nivê şeva kanûna pêşin 1793 an da, di nav gurmîna ewran, şîrqîna birûskan û gujîna baraneke xurt da Napolyon şareta êrişê da. Du saet bi ser da ne çûn ko heşt hezar gule avête nivêka Cebel Tariqa biçûk û axa wê kelehê ser û bin kir. Lê Îngilîz, herwekî bi xwînsariya xwe hatine nasîn, di bin wî agirî da çav didan taliya êrişê. Çiqas topek xirabe dibûn yeke din diêxistin şûnê.

Çend saetan şer holê herve xurtiyê çû. Leşkerê Fransîz di tariya şevê û nava gurmîna topan da xwe gihandine ber devê topên Îngilîzan. Hinde bê dilovanî xwe davetin ser neyarên ko wekî perê daran radiweşîn. Çiqas dimirin, Napolyon ewçaş din diêxist şûna wan û her pêş da kut dikirin. Çal û çeperên Îngilîzan ji cendekên fransîzan tije bûn û dîsa bayê êrişê sist ne bû. Dawî Îngilîzan dest li ber xwe berdand û di bin tariya şevê da bi sedan kuştî û birîndar li pê xwe hiştin û ji kelehê bi

derketin. Hîn ew bi temami ne kişiya bûn ko leşkerê Napolyon di nav qorên dijmin ra xwe gîhandine bilindcihên kelehê û ala sêrengîn tê daçikandin. Hînga Napolyon zivirî ser gênerâl Dûgomiye û gotê: « Ezbenî êdî here di nivîna xwe da bi dilekî rihet razê û binive. Herçî Tûlon kete destê me ».

Yek ji nivîsevanên îngilîzan bi navê Skot der heqê wî şerî dibêje: Di nav wê şeva tariya ko tê da bi hezaran leşker can didan û rûyê qada şer bi xwîne dihate avdan, di nav ax û enîn, xwîn û hêstiran da stêrka bextê Napolyon çirîsîl ..

Bi girtina fransîzan a Cebel-Tariqa biçûk şer ne qediya bû. Vêcar Napolyon berê topên xwe bi carekê guhazti bûn ser avahiyên Tûlonê. Heke berê topên fransîzan bi tenê agirên xwe bi ser serên neyaran da dirijandin; vê carê topên îngilîzan ên ko keti bûn dest ji berî da bûn bajêr û wek lanetê mirin û malkambaxî bi ser xelkê bajêr da dibarandin. Dema bû sibe û tirijên rojê xwe berdane erdê, di nav rê, kûçe û kolanan bajêr da nêbrekeke (nêbrek, menzere) kirêt dikete ber çavên mirov. Gavek erd tîne bû ko cendekek dudu, an peng-xwînî tê da ne ketana ber çavên nêreवान. Çi taxa ko rîya guleyên topan pê keti bû, tê da bi çend cihan şewat radibû. Xelkê bajêr


ne dîzanîn ko rastî çî belayê hatine.

Piştî ko îngilîzan keleh berdan û Napolyon berê hemî topan guhaste ser bajêr, xelk hemî wek pezê ko gur di nav keve ji xaniyan bi der keti bûn. Wê hîngê bû ko di kûçe û kolanan da bi guleyên topan ber hewa dibûn. Şewatê jî rê ne dida ko veşerî poxanên xwe. Xelkê bajêr mezin, biçûk tev da çû bûn saxa deryayê û bêviya felata xwe di stûla Ingilîz da didîtin.

Piştî ko ro helat, Napolyon berê bemî topan guhaste ser stolê. Ji Cebel-Tariqa biçûk fesala avêtina stûlê gelekî e xweş bû. Dema emîralê stûlê lord Haw dît ala sêrengîn li ser kelehê pêl didiye, wî zanî ko bajarê Tûlonê kete destê fransîzan. Êdî li ber guleyên topên Napolyon rawestîn bê fêde bû. Hebû ko bi ser da çend perçe cenkeştî ji bidana der û dilê Napolyon hîn xweştir bibûya.. Ji bo ko ev yeka han nebe, emîral zûka emir da stûlê û lenger hildan ko bi rê kevin.

Gava xelkê bajêr dît stûl bi rê dikeve, di her hêlekê va berê xwe danê; da ko ji leşkerê Napolyon bifiliitîn. Lê stûla sondxwariyan bê leşkerê ko hilda ser piştî xwe nikari bû ji bîst hezarî pirtir rakirana. Ên mayî di nav lepên leşkerê cîmhûriyetê da hiştin.

Gênêral Dûgomiye bi Napolyon va gelekî



(1) Di çemê Teymîs de masivani. Teymîs çemêkî Ingilîstanê ye. Bi wî çemî Londre digehe behîra Manşê.
(2) Vaporeke barkêş bi 10500 tonî, mezin ji destagaheke emêrikanî dadikeve behîrê.

xwe westand ko leşker neheqiyê li xelkê bajêr neke. Lê di wî warî da kesî nikari hû pêşiya leşkerê serxwerabûyan higirtana. Hîn bêhna serxwerabûnê di rîya tolê da bi temamî ji leşkerê cimhûriyetê dihat û di vê rîya han da tu gotin û emiran ew ji daxwaza wan a kirêt bi şûn da ne didan. Ew kesên ko ji ber şewat û guleyên topan fîlîf bûn jî bi singoyên leşkerê cimhûriyê gihane kuştîyên şer.

Piştî şerê Tûlonê Napolyon gelekî kete çav genêral Dûgomiye û qet ji xwe ne diqetand. Der heqê wî raporeke gelekî çak da hikûmetê û piştî ko hemî qencyên wî lê da jimartin, jê ra dayîna ritba mîrîwa (genêral) jî xwest. Genêral rapora xwe bi vê hevokê temam kir:

« Vi xorîf pêş da bidin û dilxweş bikin. Na gava we ne kir, ewê bi xwe bi pêş keve ».

Hikûmetê li ser pesin û salixdana Dûgomiye Napolyon kir genêral û şandine nav leşkerê Îtilyayê, bin destê genêral Dûmerbiyon.

Berî ko Napolyon bibe genêral, rojekê tevî genêral Dûgomiye çû bû Marsilyayê û milên wan di hev da digeriyan. Hinekan jî nasên genêral ev kira han pir bê fesal diti bûn. Çîma ko di irfa leşkerî da ne dirist e ko yûzbaşiyek



PIŞTÎ BOMBARANÊ BERGEHÊ BAJAREKÎ TALYANÎ

bi destê generalê xwe bigire û pê ra bigere. Nemaze zabitekî bîst û çar salî l.

Hînga' yekî ji wan nasan bi tewiz gote genêral: « Ev zabitok kî ye û di kû da kete destê te ? l. » Wê çaxê genêral bi dilekî xurt li nasê xwe veqerand û got: « Navê wî zabîfî Napolyon Bonapart e. Ew di hesara Tûlonê da kete dest min ko vegirtina Tûlonê her bi zanin û mêraniya wî hate pê. Rojek dê were ko hûnê bibînin ev zabitok dê ji peyayên me ên mezin bîdengtir be ».

Napolyon jî ev qenciya Dûgomiye ji bîr ne kir. Heya dema mirina xwe jî navê wî tevî navê xêrxwazanê xîstî wesi-yeta xwe û hinek jî mîrasa xwe jê ra veqetand. Herçî şandî Xasparan e, Napolyon ew hîn pirtîr teqdir kiriye û der heqê wî da ev gotin kiriye: « Dergehê rîya pêşveçûnê di hesara Tûlonê da Xasparan li min vekir ». Napolyon ew peya bû ko kirên kesî, çî çê, çî xirab, jî bîr ne dikirin.

OSMAN SEBRÎ



Êskerên hevalbendan di cihina Îtalyayê, ên çiyayî, de çek û posatên xwe di pişta nêstiran de diguhêstînin. Ewe qeşeyek di gundekî bombaronkiri de.

DR. RWEYLOT

Min bala xwe da ù dit ko hetani iro di Ronahiyê de her texlit nivisar belaw bûne; ji bilî çirokên polisi. Heye ko xwediyê Ronahiyê ne ewçend meylidarê van nivisaran e. Lê bi min be, divê çirokên polisi ji di Ronahiyê de cihêki xwe peyda bikî. Ji wan çirokan re ji xwendevan hene. Ji milê din pêşvegiina zimanê me bi nivisandina her texlit nivisar lêne pê. Çirokên polisi ji awakî nivisandinê şani didin.

Ji lewre me dil kir ko wî awayî ji di zimanê xwe de biceribînin. Ji xwe ev awa ji hemîyan siviktir û hêsantir e. Xwendevanê ko dixwaze bêt ko xwe biwestine wextê xwe derbas bike bi vê nivisarê kêfxweş dibê. Ji xwe meylidarên van nivisaran, çirokine holê di zimanê din de dixwinin. Bîla carekê van çirokan bi Kurdmancî ji bixwinin.

Çiroka ko em dixwazin berpeji xwendevanên xwe bikin biserhatiyêke Şerlok Holmes e. Şerlok Holmes poliseki inglîzî i siri bû. Biserhatiyên wî di her zimanê alemê de haline belaw kirin. Divê piraniya xwendevanên me navê Holmes bihisti bin û hin biserhatiyên wî ji xwendî bin.

Şerlok Holmes heval û berdestiyêk hebû; di gotinê Wetsin. Ev çirok Wetsin bi xwe qise kiriye û gotiye:

B. S.

Meheke Nisanê bû. Bi spêdê ve ez hişyar bû bûm. Şerlok Holmes li hêla serê textê min sekinî bû û li min dinihêrt. Gava min Şerlok Holmes li ber serê xwe dit, min da xwe û ez li ser piştê xwe rabûm. Jê re ne adet bû zû hişyar be; heta derengiya rojê radiket. Diviya bû tiştêki mihim qewimî biwa.

Holmes gote min: Ez gelek esefnak im ko min tu di vî wextî de hişyar kirî. Lê min nikarî bû bi awakî din bikira.

Ez kenîm û min got: Ma çi li me qewimî; agir bi xaniyê me ket?...

Holmes: Xanimeke ciwan çesta me kiriye. Wêlê dixuye ko gelek xemxwar e û misbetin lê qewimîne. Di oda mêvandan de rûniştiye. Min dil kir ko em bi hev re guhdariya wê xanimê bikin.

Min da xwe, ez rabûm û di çend deqîçan de min cilên xwe wergirtin û bi Holmes re bi darî xanimê kelim. Holmes got-ê:

— Roja te xweş banû; tu bi xêr hatî. Ez Şerlok Holmes im; ev jî hevalê min ê ezîz Wetsin e. Tu dikarî her tiştî ji pêş wî be bibêji. Lê te xêr e, ez dibînim ko tu direciff, gelo te sar e; em agir dadin.

Baniwê got: Ne ji ber sermayê ez direciffim — Lê ji ber çi ?

— Ji ber tirsê...

Baniwê rûyê xwe bi tûleke reş girti bû û heta hingê ew ji her rûyê xwe ranekiri bû.

Wextê ew rakir me zanî ko mêvana me jini-keke sîh salî bû û ji niho de spî bi pora wê ketî bû û ji qermîçekên rûyê wê xuya dikir ko jînik di heycaneke mezin de bû.

Holmes got-ê: Xanim xwe ewçend aciz meke; Xwedê kerîm e, şalê ezê derimanê derdê te bibînim.

Jînikê got: Mirza tu nizanî ez di çi halî de me; tiştê ko hate serê min ne hate serê tukesî. Heke te ez ji tariya ko ez lê de pûyan im, derêxistim, şalê ezê bikarim ji bin barê te rabim. Îro bi min re tu tişt nîne. Di vî çendê de ez dikim bizewicim, hingê min pere dê hebit.

Holmes: Min ji te tu tişt navê. Heke min îşê te safî kir, emelê min bi xwe mikafata min e. Bi tenê min ji te divêt tu îşê xwe ji min re digel her kit-kîtê bidî zanîn; qenc bidî eqilê xwe û tu tiştî ji bîr neki.

Jînikê: Navê min Hêlên Stonêr e. Ez digel zirbavê xwe dijîm. Zirbavê min ji malbateke kevin e; ji malbata Rweylot. Ji xwe ji wê malbatê, jê pê ve kes ne maye.

Holmes serê xwe hejand û got: Ev nav ji min re ne î nenas e.

Jînikê: Ev malbat yek ji malbatên Ingilteyê ên dewlementir bû. Lê niho tu tiştê wan ne maye; ji çend donim erd û qesrekê pê ve. Qesireke kevinare; berî du sed û hin salan hate awa kirin. Lê ew jî di bin barê rehneke giran de ye. Qesir di eyaleta Sariyê di Stokmoranê de ye. Di wextê bavê zirbavê min de hêj çend pere hebûn. Wî ew jî xwarin û gava dit ko ji kurê wî re tiştêk ne maye rabû ew xiste dibistana tibiyê û ew kire dîktor. Piştî mirina bavê wî zirbavê min rabû çû Hindistanê û li wêjê derê bi bijîşkiyê mijûl bû. Rojêkê li xulamê xwe ê hindî hate xezebê; li wî xist û mêrik mir. Zirbavê min nîdekî dirêj li hepsê ma û jê vegeriya Ingilteyê.

Dr. Rweylot gava li Hindistanê bû diya min, biya genêral Stonêr, ji xwe re anî bû. Hingê ez û xweha xwe Cûlya; em her du jî du-salî bûn. Diya me em çewîk anî bûn. Piştî vegera me a Ingilteyê bi çend salan diya me emîrê Xwedê kir. Zirbavê me em birin Stokmoranê û em digel wî di qesira pêşiyên wî de diman.

Diya me hemî malê xwe ji mêrê xwe re hiştî bû. Bi şertê ko li me binêre û wextê ko em bi ewicîn ji hereyêkê re çaryeka wî bidê. Hatina malên diya min li salê digihaşte hezar zêrên inglîzî. Debara me û ya zirbavê me pê çêdibû û me tengî ne dikişand. Lê zirbavê me, hero xulqê xwe hêj bêtir teng dikir. Ji xwe xelkê malbata wî tev de welê bûn. Ewçend

bi kerb û xezeb bûn ko xelkê ji wan re digot dînin. Herçî zirbavê me piştî ko saline dirêj di germa Hindistanê de derbas kirin yekcar bû bû esebî. Rojê pê de derî li xwe digirt û bi tena xwe di oda xwe de rûdinişt, bi gundiyan re şer dikir; hetanî îro jî holê ye.

Dr. Rweyloz gelek hej heywanên Hindistanê kiri bûn. Bi xwe re şîp û meymûnek anîn û ew berdan erdê qesirê. Gundî ji wan aciz in; lê çî bikin, nikarin dengê xwe bikin; jî Dr. ditirsin.

Me metek hebû; di bajarê Ilaroyê de rûdinişt. Zirbavê me destûra

me dida û em carina diçûn ziyareta wê. Xweha min di mala meta min de rasî zabiteki behriyê hat û hevûdin hebandin; nîşau bûn, lê beriya roja dawetê bi du heftan tişteki ecêb li me qewimî.

Di qesira zirbavê me, di qata jêrîn de sê ode hene. Di yekê de Dr. di a din ez rûdinişt. Di a siseyan de xweha min rûdinişt. Ev her sê ode jî ji hev cihê, yanî ne qulêrî hev in. Deriyên wan tev de li liwanekê vedibin. Di wê şeva çift de zirbavê me zûka vekîşîya oda xwe û derî li xwe-girt. Lê me dizanî ko ne çû bû raketinê. Ji ber ko dûtê tilîna ya ko zirbavê me dikî and xweha min ewçend aciz kiri bû ko Cûlya hate nik min û mîdekî em bi hev re mijûl bûn.

Saet bû bû yanzdeh; xweha min dikir vegere oda xwe. Gava gihaste ber derî li min zivirî û pirsî: Ka bêje min Ilêlên, di van çend şevan de te dengê zîlanekî yê ko difikand ne bilistîye

Min lê vegerand û got: No

Xweha min: Berî çend şevan, li ber destê sibê, li saet siseyan min fikandinek bihist. Min bala xwe da; lê min nizanî jî oda rex an ji bexçê dihat. Te ne bihist?

Min: Min qet tu tişt ne bihist. Kî zane heye ko dengê çînan bû.

Li ser vê gotinê em her du jî kenîn û



Deryavanine britani hint mixabera bi alan dibîn.

Cûlya çû oda xwe. Min jî derî li xwe girt.

Şerlok Holmes got banû Stonêrê: We hergav derî li xwe digirt?

Stonêrê: Belê, min jî we re ne gotî bû ko Dr. Rweyloz şîp û meymûnek hebû û ew serbest digeriyan.

Holmes: Heq di destên we de ye.

Stonêrê: Şeveke reş û tarî bû, bakî xurt hebû û baran dibarî. Ji nişkekê ve min dengê bihist; dengê xweha min bû. Ez rabûm ser xwe û derketim liwanê. Di liwanê de fikandinek wek fikandina ko xweha min wesfê wê da bû, bi g lê min ve bû. Di pey wê re dengêkî din, wek şingîniya zencîrekê di hate bihistin; qey yekî tişteki hesinîn da bû erdê. Di vê navê de min dengêkî din seh kir. Mifte di killta deriyê xweha min de digeriya. Min xwe da derî; ez ketim hundir. Xweha min li ber selûna derî bû. Xwe gihandi bû wê derê, mifte di nav killtê de gerandi bû û hew. Belê li ber derî ketî bû erdê. Min kir ko ez wê rakim. Wek mirovê ko bi tayê ketî be, direcifî û nema dikarî bû jî piyan bisekere. Dixwest tişteki bibêje; lê zimanê wê ne digeriya. Bi tenê ev her du pirs ji devên wê derketin: « Şelsteke belek » Çend caran bi destên xwe oda diktor şanî da. Min kir ko ez herim û zirbavê xwe binim. Ilêj min gavek ve avetî bû ko ew jî derî ve da. Çend dilop kunyak xistin devê

xweha min û şande pey bişşk. Lê heyhat...

Holmes şexaliya wê birî û jê pirsî: Tu ji xwe ewle yî ko te dengêkî fikandinê û yê zencîrê bihîstî?

Banû Stonêr: Mistentîq jî ev tişt ji min pirsî bû, Belê ez dibêjim ko min ew deng bihîstî. Lê ez ji kû zanim heye ko ji ber ba û şîrinê ez şaş im

Holmes: Cilên xweha te lê bûn?

Stonêr: No, cil ji xwe kiri bûn û kirasê şevê wergirti bû. Di destê wê ê rastê de kibîrîteke şewitî û di destê wê ê çepê de elbîka kîrbîrtê hebû.

Holmes: Jê dixuye ko gava lê çewimî li elbîka kibîrtê geriya û kibîrîtek pexîstîye. Mistentîq gihaste çî qerar û neticê?

Stonêr: Mistentîq di tehqîqata xwe de kûr lêxist, Lê sebêba mirîna xweha min dernexist. Li ser şehdebûna min zanî ko deriyê odê girti bû. Herçî pencere ew jî bi qerasên giran ji par re girti bûn. Ji canê xweha min xuya dikir ko tu kesî jî dest ne da bû-yê.

Holmes: Îşê jehrê?..

Stonêr: Tebîb canê wê qelaşt, lê hûr bû, lê tu şopî jehrê xuya ne kir.

Holmes: Yanî sebêba mirîna wê bi tu awayî ne hate seh kirin.

Stonêr: Belê, ne hate seh kirin

Holmes: Kerem ke, çîroka xwe bibe serî.

Stonêr: Ev bûne du sal ko xweha min çû rehmeta Xwedê. Piştî mirîna xweha min jiyîn li min yekcar tehlil bû bû. Di tenabiyê de ez gelek aciz dibûm. Vê paşiyê dostekî me bi navê Persî Êrmîtag ji min pirsî heke ez dixwazim bibim jina wî. Em wî camêrî jî mêj ve nas dikin. Min qîm pê anî; zirbavê min jî herê kir.

Perî du rojan zirbavê min di qesirê de bin tamîr dane çêkirin. Di vê navê de diwarekî oda min çeqitî, ez bêgav mam û min guhast oda xweha xwe a rehmetî û ez di textê wê de dinivîstîm.

Şevêdî, li ber destê sibê, ez bi fikandinêkê hişyar bûm, pişk ew fikandîna ko mirîna xweha min elam da bû. Ez rabûm, min çîra vê-xîst, di nav odê de geriyam; lê min tiştêk ne dît. Ko li min bû sibe, min da xwe û ez hatim nik te.

Holmes: Te gelek qenc kir, got û bihinekê damayî ma; dida eqilê xwe. Piştî gaweêkê gote keçîkê: Divê fro em herin Stokoranê û bêt ko zirbavê te bi me bihese em wan odan bibînin.

Stonêr: Ji xwe dilê zirbavê min hebû ko fro dakeve bajêr. Honê bi rahefî bikarin bi îşê xwe mijûl bibin.

Holmes: Baş e, emê tev de herin Stokoranê. Tiwê bi xwe çî bikî?

Stonêr: Hemî ez hatime bajêr. Min îşên min hene, ezê wan pêk binim û bi trêna nîvro ezê vegerim gund.

Banû Stonêr rabû, rûyê xwe bi fîzara xwe a stûr girt; xatîr ji haziran xwest û bi rê ket.

Holmes ji hevalê xwe pirsî: Çi dikeve serê te Wetsin, ez dibînim, îşekî kûr û xeternak e.

Wetsin: Belê îşekî kûr û zehmet e, her der girti, dengêkî fikandinê, zencîrêk dikeve erdê.

Em di vê şexaliyê de bûn ko derî ji nig-kekeve vebû û zilamekî bejinbilind li me der bû. Piştî ko çavên xwe li me gerand, bi dengêkî hişk gote me: Kî ji we Holmes'ê?

Holmes lê vegerand: Şerlok Holmes ez bi xwe me. Lê min cenabê te nas ne kir.

Zilamê bejinbilind: Ez Dr. Rweylot im, ji Stokoranê.

Holmes: Niho me hevdû nas kir, kerem bike rûne

Rweylot: Min navê ez rûnim, ka ji min re bibêje; zirkeça min niho ji bîre derket. Belê min da bû pey. Ji bo yî çî halî bû nik te û ji te re çî got?

Holmes: (bi xwînsariyê) Ecêb, dinya sar e, di vî çaxî de ev serma ne dihate bîrê.

Rweylot: (bi kerb) Tu dixwazî ji min xelas bibê: Ez te nas dikim û dizanim tu çî melûn î.

Holmes (bi ken) Çi mirovekî xwe;-sihbetî. Digel wê hindê heke bi hemtê xwe ji cem min derkelî ji te re çêtir e.

Dr: No beriya ko tiştê ko min niyet kirîye ez ji te re bibêjim, min ew ji te re ne got, naçim. Hay ji xwe heval û xwe têkilî îşê min meke. Ez mirovekî xeternak im; qenc li min binêre.

Dr Rweylot rotikê hesinî yê ko li ber tişkê bû girt û ew tewand û gote Holmes «Care-ke din ji te re dibêjim, te hay ji xwe hebe...» hesin avête tişkê û terka me da, çû.

Holmes, gote min: Çi mirovekî zirav e. Herçend ez bi qasî wî bilind û bi dest û lep nehim ji xwezi kûlmên min biceribandana; herhal hîfî ti-tekî dibû. Lê bi hatîna xwe nav di me da, emê çêtir bixebitin. Niho em herin oda xwarinê, xwirîniya xwe bişkênînin; ezê jê herim civata bişşkan.

Wextê Holmes vegeriya bû mal saet, jî bû bû yek. Holmes gote hevalê xwe Wetsin:

— Min wesiyetnama jinîkê dît. Li gora wesiyetnamê piştî ziwaca keçikan ji Dr. Rwey-
lot re salê ji 500 zêrî bêtir; tiştêk namîne; ev jî tîra wî nake. Êdî îşê me ne li hire lê li

Stokmorané ye. Hür-mürén me bide hev; em bi rê bikevin. Heke te şejderba xwe ji bi xwe re anî min ji te gelek minet e.

Em li trêné siwar bûn û gava em gihâştin gund, em li otêla gund a tekane peya bûn û piştî ko me bihna xwe da, otêlçî ji me re erebeyek anî; em lê siwar bûn û me berê xwe da qesra Dr. Rweylo. Ein qederê di sé kilomêtiran bi rê ve çûn. Ji dût ve di nav darau de qesrekê xuya kir. Erebeçî ew şanî me da û got: Eve, qesira Dr. Rweylo.

Holmes gote erebeçî, em dixwazin hinekî ji bi peyarî herin, û em ji erebê peya bûn û me da nav zeviyan. Gava me nîzingî li qesirê kir çavên me bi banû Stonêrê ketin. Li hêviya me bû. Stonêrê gava em diin ber bi me ve hat û bi ken gote me:

— Ez bê sebîr li hêviya we bûm. Dr. Rweylo çûye bajêr û bəriya êvarê venagere.

Holmes: Em pê dizanin û bi dîtina wî ji şerêfîyab bûn.

Holmes tiştê ko bi me reçebû bû, bi çend gotinan, ji banû Stonêrê re da zanîn. Gonê Stonêrê guhêrî û bi dengêkî heyecanamîz got: Xwedê min ji şerê wî hisitirîne.

Holmes: Divêt em lezê bidin xwe û odeyên ko te wesfê wan dane me divêt em bibînin.

Em ketin hundirê qesirê; qesireke kevn re û bi depdepe. Holmes li derî û penceran û

li her derên qesirê hûr dibû. Em gihâştî bûn liwana ko deriyên her sê odan lê vedibûn. Holmes li wan nihêrt, oda pêşin şanî wê da û gote Stonêrê:

— Ev oda te ye, a navîn oda xweha te a rehmetî, a siseyan jî oda Dr. e, ne we ye?

Stonêrê: Belê we ye; bi tenê ez niho di oda xweha xwe de radikevim, ji ber ko di oda min de tamirat hene. Lê nizanîm jî wan tamiratan re hewce hebû. An ev tamirat hêncet in da ko çendakê ez di oda xweha xwe de rakevim.

Holmes: Belê ev gotin di cihê xwe de ye; heye ko...

Em ji nû ve derketin derve. Holmes gote Stonêrê: Niho min ji te divêt tu herî oda xwe, penceran bigirî û qerasan bîdî ber.

Stonêrê welê kir. Holmes bi her awayî ceriband; pencere ne dihatin vekirin. Holmes bi pertavsoja xwe jî li wan hûr bû; lê jê jî tu netîce ne xiste destên xwe.

Em vegeyriyan hundirê qesirê û ketin oda ko banû Stonêr fro tê de radiket, oda ko xweha wê tê de miri bû. Odeke piçûk; banê wê ne ewçend bilind. Di kuncikekê de dola-beke cilan, di alikî din de textekî teng, du qenefeyên heyzeran û li erdê mehfûrek. Tekberên odê hemî ev bûn. Holmes bi diqeteke mezin çavên xwe li her tişt û li her milên odê digerland. Holmes werisê ko li rex textî



ESKERINE INGILÎZÎ SIWARÎ VAPORAN DIBIN Û BERÊ XWE DIDIN ÎTALYAYÊ

GULA KIRASDIRIHAYÎ

Mir im! Min Ronahi xwend; re got: « Çi xeydiye? ». Gulê hejmarê (22) sala (3). Min xwe dit heçwekî ez di beheştê de. Di beheştê min de hezar rez û cinik û bağ wên hene, hemî rez û bağ û cinik ji gulên û rihanên û fêqî di pir in. Demê ez heftme bağê « Hindik Rîndik » bêna nêrgîz û helal û bineşan dîtê min geş kir.

Lê demê ez tê de digeriham guh didim, nalnakê wê téd ji dâr. Dinêrim gulesoreke wa digirt û dinallî. Min jê re got: « Gula delal tu boy çi dikey girt? » Gulê ji min re got: « Na xwe, çima Ronahiye kirasê dirihayî kir ber min û ez şandim nav dinê? » Min jê

re got: « Çi xeydiye? ». Gulê got: « Çewa velkê biyani wê min bibinin û wê lomey mim bikin ». Min got gulê: « Di kû d-rê de kirasê te dirihaye ». Gulê got « Tu ê dibini » Berê xwe didim dibînim xeberguhêzê delal gotiye:

(Ji berê de di kitêbên giyanasiyê de me ditiye ko giyayine goştxwer hene; wan giyan pel an kullikine di şukilê fincanê de hene. Devên wan kullikan vekirî ne.. h. p.)

Min di ki êbên giyanasiyê de ditiye ko ev giyayên goşt-xwer belg wên hene wek fincanan Ne ko kullik hene, wek gotina xeberguhêz. Ingilîs jê

re dibêjin « Pitcher plant » teşkilekê din ji wan hene jê re dibêjin « Nepenthis » êk din jê re dibêjin « Drosera ». Ev xefkên meş û mozan in. Bi erebî jê ra dibêjin « Qanisetul-heşerat ». Di eslên xwe de belk in; kullikên giyanê cuda nin.

Dûmahtkê min gote gulesora xwe: «Nêke girt ez dê bêjim Ronahiye da kirasê te nû bikî ». Gulê got: « Ne, ez dê her kim girt, heta kirasê min nû dibît ».

Hûvî dikim kirasê gulê nû bikin da nekit girt.

M. XIDIR MIZÛRÎ

Ronahi—Me ji Mirza Xidir Mizûrî gelek minet e ko ev xelê ji me re rast kir. Lê em gazindan ji Xeberguhêzê pir dikin ko liştên ji zanîna xwe der bê ko seh bike dimoîsine û belaw dike.

bû şanî da û gote banû Stonêrê.

— Xuya ye, ev werisê zengilekî ye. Zengil bi xwe li kû ye?

Stonêrê: Di oda xadimê de.

Holmes: Lê welê dixuye ko zengil nû hatiye danîn. Ji ber ko li gora tekberên odê ên din weris di rengekî nû de xuya dike.

Stonêrê: Belê xebera te ye; ev bûne du sal ko zengil hatiye danîn.

Holmes: Li ser daxwaza xweha te.

Stonêrê: No, ji ber ko tucaran min ne ditiye ko xweha min pê emel kiri be.

Holmes bi çavên xwe da pey werisê ko di dîwêrê re bi hewa diket û di kulekekê re derbas dibû. Paşê serê werisê girt û ew kişand. Holmes li rûyên haziran nihêrt û got:

— Ecêb bi vî werisî ve tu zingil ne girêdayî ye. Weris di kulekê de bi xelekê ve girêdayî ye.

Stonêrê: Me çawan heta niho bala xwe ne da bû-yê?...

Holmes: Belê di vî odê de liştine xerîb hene. Mesela heke ev kulek ji bo guhartina hewa odê hatiye çekirin diviya bo di dîwarê ko dide beçê de bihata çekirin; ne ko di dîwarê ko dide odeke din...

Stonêrê: Ji xwe ev kulek ji vî paşiyê hate çekirin, berê nîn bû. Westê ko di odê de tamîratin çekirin...

Holmes: Tamîratine ecêb, zengilekî derewîn,

kulekeke hewayê ya ko nade hewayê. Niho divêt em li odeyên din hûr bibin.

Em derbasî oda Dr. Rweylot bûn. Odeke mezîn; lê bi sadegî raxistî. Textek; li ser refekê kitêbine tevlihev, gelekê wan kitêbine ilmî. Qenefeyek, çend kursî, maseke girover, dolabeke hesinîn. F'olresli tekberên odê hûr bû. Holmes bi destê xwe li dolabê da û got: Ma tê de çi heye?

— Kaxezên zirbawê min

— Pisingek tê de nebi!

— Çi fikireke xerîb..

— Ka fedkire hire

Holmes rahiştê misînê ko li ser dolabê bû û ew pêş me kir. Di misînê de şîr hebû.

Stonêrê: Li cem me tu pising nînin. Lê herwekî min ji we re gotî bû, me şîp û meymûnek heye

Holmes: Belê te ji me re gotî bû. Ji xwe şîp ji pisingê hinek meztir e. Lê şîrê ko di vî misînê diçe nakeve serê min ko tîra wî bike. Nemaze lişteke heye, ez dixwazim lê hûr bibim.

Holmes li ber kursî sekinî, li ser telikan rûnişt, kursî û di pey re qenefê seb kir. Wextê îşê xwe tamam kir, şelstek bi destî ve rabû û gote haziran:

— Ev şelstî, zolek çerm e, pê seyan girêdidin. Lê ecêb çîre ev holê li hev herbiliye û bûye girêk girêk,

Holmes hinêk sekînî, qey tişteke dida eqilê xwe. Piştê, heçko bi tenê ji nefsa xwe re bigota, mirmirî û got: Mirovê ko jîrî û zanîna xwe di rîya xerabiyê de bi kar têxe jê xeternaktir kes nîne.

Em tev de ji qesirê derketin û di ser çimênên mêrgê re digeriyan. Holmes gote banû Stonêrê: Divêt tu qenc guh bidî gîtinên min û bi şîretên min ve biçl.

Stonêrê: Ez di bin emirê de me.

Holmes: Divêt ez û hevalê xwe, emê şeva xwe di oda te de biborînin.


Stonêrê, hinek heyîrî lê nîbert û got: Ez hati bûm nik te da tu ji min re sîra mirîna xweha min ke, if bikî. Di vê babetê de te tişteke ne gote min.

Holmes: Ji ber ko delêletên wê hêj bi temamî ne ketine destên min

Stonêrê: Tu dixwazî ko hon îşev di oda min de binînin. Honê tê de çi bikî?

Holmes: Emê li wî dengê ko tu aciz kirî hûr bibin. Wextê zîrbavê te hat bi hêneca ko serê te lê, e, divêt tu jê xatir bixwazî û herî oda ko berê tu tê de radiketî û li zîrbavê xwe guhdar bibî. Wextê ko wî ji xwe karî nivîstinê kir çîra xwe bidî ber pencerê û bi wî awayî elam bidî me ko Dr. Rweylot xwe kişandiye oda xwe. Em îşê xwe dizanin. Edfî divêt em ji hev veqetin. Heke Dr. Rweylot em bi hev re dîtî îşê me ji serî heta binî xerab dibê. Bi xatîrê te û şîretên min ji bîr meke.

Em vegeriya bûn otêlê û me li rîya Dr. Rweylot dipan. Hingûraşevê dadiket, Dr. hat, li erebêkê siwar bû û berê xwe da qesirê. Min û Holmes me li ser îşê xwe xeber dida. Belê, di navbera her du odan da çulek, werîsekî daliqandî û jinika ko di textê xwe de raketiye ji nişkekê ve dimire. Me ev hemî digihandin



TRIMBÊLEKE ORDIWA HEŞTAN DI NAV LEHIYÊ DE BI RÊ VE DIÇE



Ordîwa emêrikantî a penceca di bin berf û baranê de qesta Romayê dike.

hev lê em ne digihastin netîcekekê.

Em li mêrga qesirê bûn û me guhdariya îşaretê dikir. Saet bû bû yanzdel. Di pence-reke qesirê de çîrayekê xuya kir. Holmes gote min, ev e îşaret, ji oda navîn têt.

Me mêrg çedandi bû û em ketî bûn navê daran. Ji nişkekê ve tişteki xwe ji daran avêt erdê, di nav gîyan de meşiya û di tariya şevê di winda bû. Min gote Holmes: Te dît?...

Holmes bi ken gote min: Xelkê vê qesirê tebayine ecêb in; ew meymûn bû.

Min di dilê xwe de digot, ka şîp li kû ye,

nebe ko xwe bavêje ser me. Em gihasti bûn ber pencera ko çira lê bû. Holmes çira rakir û ket hundir. Min da pey.

Holmes pencere girt, çira danî ser masê, nizingî li min kir û hêdika; ote min: dengêki piçûk îşê me tev de xerab dike. Divêt em çirê jî vemirnin da ko di kulekê re ronahiya oda rex xwe bikarin bibînin.

Ode weke xwe bû, tu tişt lê ne hati bû guhartin. Holmes li ser text rûnişt, ez jî li ser qenefê rûniştim. Min şejderba xwe danî bû rex xwe. Holmes rotikek bi xwe re anî bû. Wî jî ew kire tenişt a xwe. Piştî ko me cihên xwe girtin Holmes çira vemirad.

Di sikûn û bédengiya şevê de mirov sehiv digirt. Çend caran me dengê teyrina kir. Carekê pencereke me ji der ve hate xirnişandin. Ew sîp bi xwe bû, ji xwe re digeriya. Ji dûr ve dengê saeta dêrê dihate bihîstin. Saetê dwanzde, yek, dido lêxislin. Em hêj di cihê xwe de rûniştî bûn.

Ji nişkekê ve di kulekê de pêtekê xuya kir û piştî bihnekê winda bû. Di pey wê pêtê me tişteki bihînkir; wek bihna dona zêtê an madenê ko dihate germ kirin. Bê şik yekî di oda rex da qendîlek vêxistî bû. Herçî bihin hin bi hin zêde dibû. Min dengê seh kir; wek dengê ko ji bilbilika minê ko av tê de dikele derlêt. Di vê navê de Holmes jî ji cih rabû, kibrîtek pêxist û bi rotikê xwe çend caran li werisê ko

di kulekê re dadiket odê, xist. Holmes bi hê yecan gote min: Te dit Wetsin; te dit.

Min tişteki ne dîtî bû. Çavên min yên ko hîni tariyê bû bûn bi kibrîta ko Holmes vêxistî bû ji nû ve şevsra bû bûn. Ji lewre tevayê ko Holmes li wî dixist, min nikarî bû ew bidîta. Bi tenê min dengê fikandinekê dibihîst. Holmes kibrîteke din vêxist û çavên xwe berda qula ko hewa oda me digihande oda Dr. Rweylot. Gonê Holmes zer bû bû; levên wî jî kerban direcifin. Di pey re me qirîneke ecêb bihîst. Qirîneke êş û xezabê. Min di emirê xwe de tişteki welê ne bihîstî bû. Min ji Holmes pirsî: Ev çi ye?


Holmes: Yanî her tişt qediyaye. Xwedê bike li ser xêrê bit. Rahaêje şejderba xwe em herin oda Dr. Rweylot.

Holmes çira vêxist û ew hilgirt, ez jî şejderb bidest, me berê xwe da oda Dr. Rweylot. Holmes du caran li derî da; tukesî li me vene-gerdan. Holmes derî vekir û em ketin hundir.

Menzera odê hewilnak bû. Li ser masê qendîlek hebû; şewça xwe dida dolaba vekirî. Dr. Rweylot li ber masê, li ser kursî rûniştî bû; her du milên xwe berda bûn kêlekên xwe; serê wî ketî bû paş, çavên wî ber bi bîst bûn. Li ser ejnûyên wî şelîta çerm ya ko me bi roj dîtî bû xuya dikir. Di dora serê dîktor de şelîteke zer bi deqine reş hebû. Şelîte qey li serê dîktor dişidand. Holmes gote min: Ev e şelîta belek.

Ez gavekê qedimim. Şelîta ko xwe li dora serê dîktor pêçandi bû, xwe tev da. Di nav pora dîktor de marekî ecêb hebû; niho xwe tev dida. Stoyê mar werimî bû. Holmes gote min: Ev marekî teqanan e. Ji marên Hindistanê xeternaktir. Piştî ko pê ve da, ew ji mirî lê hêj rih pê heye. Em wî vegerfînin cihê wî û banû Stonêrê bibin cihekî bi-emniyet.

Holmes rahişt, zolê ko li ser ejnûyên mirî bû û ew avête stoyê mar û pê mar rakir û ew danî nav dolabê, dolab girt. Şingniyek jî dolabê hat.



Di hewşa dibistaneke inglîzî de şagîel temrînine riyazî dîkin.

Belê Dr. Rweylot' bi vî awayî, bi pëvedana marê xwe mirî bû, Banû Stonêr jî gihaştî bû selamete. Lê hin tişt hene ko ji xwendevanan re bi temamî ne eşkere ne. Emê wan ji devê Şerlok Holmes bi xwe bibihîsin. Roja dîtir Holmes gote min:

— Bêşik te her tişt seh kirine. Li gora wesiyeta dê keçikan piştî ziwacê para xwe ji Dr. dê bîstandana. Wextê ko Cûlyayê kir bizewice Rweylot rabû qulek di navbera oda xwe û oda Cûlyayê de da çêkir û bihênceta zengil di wê qulê re werîsek jî bi ser textê keçikê daxist.

Rweylot bi saya şîr marê xwe ji xwe re kedî kiri bû û wextê banî wi dikir mar dibate cem. Li ser kursî min şopa lîngan dîtî bû. Rweylot hildikişîya ser kursî û marê xwe di qulê re berdida ser werîs. Mar di werîs re dadiket jêr û gava vedigeriya nik xwediyê xwe ewî şîr dida-yê. Lê carê ko dadiket bi yekî ve ne dida. Ji ber ko herwekî Cûlyayê, Hêlênê jî fikandîna mêr carekê du caran bihîstî bû, Cûlyayê gava Hêlên ew li ber derî û bêhiş li erdê dîtî bû ji xweha xwe re gotî bû « Şelîta belek » Tukesî mana vê gotinê ne dizanî. Lê niho em dizanin, « şelîta belek » marê belek bû. Cûlyayê, gava mar pê ve da ew dîtî dî. Dengê zencîrê jî dengê girtina deriyê dolaba hesinî e, ma te de şik heye.



Heçî Hêlên; piştî ko wê ji qerara xwe da ko bizewice zirbavê wê d

oda wê de hin tamîrat behane kirin û ew anî oda xweha wê da ko bikare di qulê re mar berde ser wê. Carekê ceriband, mar bi keçikê ve ne da. Keçik hat û em serwest kirin. Şevê dî Dr. dîsan mar di qulê re daxiste odê. Lê herwekî tu dizanî, min li serê mêr xîst, mar bi şûn de vejeriya û ji berêga xwe bi xwediyê xwe, bi Dr. Rweylot ve da û xwe li serê wî pêçand.

Heke ji mirîna Dr. Rweylot berpîrsiyarek hebe; ew jî ez im.

Dihok. 12 Adar 1944

BIŞARE SEGMAN



Xelkê Îngîlistanê ji bo karkirina wî şerî tev de seferber in; çî jin çî mêr. Ev in keçikine ciwan û jinine pîr bi karine ko li wan ne adet bû radibin.

DÛROKA JÛNA SELAHEDÛN

— 2 —



SELAHEDÛN Û ROJËN WÛ ÈN PËŞÛN

Siltan Selaheddinê ko ji hemî padişahên İslaman xurtir, jêhatitir û bi nav û dengtir bû; ji vê qebilê û wê malbatê daket. Ûsif Se'aheddin kurê Eyûb Necmedin di sala 532 h. (1137 m.) da li keleha Tikritê hatiye dinê. l'ercî meha ko tê da bûye ne hatiye zanin.

Bûyîna Selaheddin, rastî roja barkirina malbatê ji keleha Tikritê hatiye. Berî bûyînê bi çendakî mamê wî Şêrguh zabitekî kelehê dikuje. Li ser vê Micahiddin Behrûz Necmedin Eyûb tevî birayê wî Şêrguh ji kelehê bi derdêxe. Selaheddinê yekrojî bi rê va her digirî. Ji lewre bavê wî gelekî kiz (aciz) dibe. Heya carekê dixwaze bikuje; da ko jê bifilite. Lê peyayê wî, ê ko bi navê Katibê Nesranî hatiye nasîn û heya Beelbek, Şam û Misrê bi malbatê ra çûye, nahêle û dibêje: « Bihêle, heye ko Xwedê wî bike mirovekî mezîn. Ew î biçûk û bêguneh e, ma çî dizane ko tu derdimend bûye ». Piştî ko Selaheddin li Misirê bû siltan, Katibê Nesranî ev gotina ko li ser rîya mihaciriyê goti bû bavê wî, di meclîsekê da jê ra goti bû.

Dema ko Necmedin Eyûb ji aliye Behrûz va mihafîzê Tikritê bû, Emadeddin Zengî bavê Nûredin Zengî bi leşkerê xwe va di sala 520 h. da di gaziya Siltan Mee'ûd da çû bû ser xelife Mîsterşid ê Ebasi; lê ji ber leşkerê xelife şikiya bû. Di vegeerê da, neyar da bû ser şopê û rîya wî bi Tikritê ketî bû. Heke wê gavê Necmedin dergehê kelehê jê ra venekira teqez dêgelkî şerpeze bibûna. Hingê rihê Emadeddin û leşkerê wî di destê Necmedin Eyûb da ma bû. Lê Necmedin ne ew mêr bû ko yekî Emadeddin Zengî di nav lepên neyarên wî da bihişt. Bi her awayî xwe da ber barê Emadeddin, dergehê kelehê jê ra vekir û leşkerê wî bi mîvandari heward. Piştî ko rûmeteke mezin ji xwediyê Mûsilê ra girt, jê ra li ser Dicle pirek saz kir û tevî leşkerê wî derbasî aliye din kir. Ev arikariya han bû ko himê mezinatiya malbata Eyûb danî.

Gava Micahiddin Behrûz Necmedin tevî birayê wî Şêrguh ji keleha Tikritê bi derxiste, berê xwe dane Emadeddin; ê ko qenciya wan li ser hebû. Çaxa gihan nik Emadeddin Zengî, wî jî qedireke mezin ji wan ra girt û gelek erd û milk da wan. Bi vê yekê Zengî ji xelkê ra da zanin ko ne mirovekî qencbîr e.

Serekî, Necmedin û Şêrguh bi serfirazî li cem Emadeddin jin û di nav leşkerê wî da ketine pir şeran û gelek mîraniyên ecêb rave kirin. Di sala 534 h. (1239 m.) da bajarê Beelbekê jî kete destê Emadeddin. Ji ber xebat, camêrî û mîraniya ko her du biran rave kirî va Emadeddin rabû Necmedin Eyûb kir mihafîzê wê keleha heja. Ew keleba ko dergehê welatê Şamê dihate zanin.

Demekî pir neçû Emadeddin Zengî çû rehma xwedê û kurên wî li ser parva kirina milkê bavê xwe ketine hev. Hinga xelkê Şamê ev kesa han ji xwe ra baş dîtîn û xwestin ko bajarê Beelbekê dîsa biêxin destê xwe. Ev daxwaz li serdestê şandiyekî şihandine gulên Necmedin. Ji ber ko wî xwedê kurên Emadeddin li ser parva kirina welatên di bin hikmê bavê xwe da ketî bûn gewriya hev û bi tu awayî ne dikari bûn arikariya Necmedin bikirana. Wî ji ji bo vê yekê ne xwest xwe bi şamiyan tehil bike û bibe neyarê wan. Li ser vê hemberê daxwaza wan, deh gundên çak li dora Şamê û çesirek jîdî nava bajarê da ji bo rûniştina xwe xwest. Şamiyan ev daxwaz qebûl kirin û Necmedin Eyûb tevî mala xwe û kurê xwe Selaheddin Ûsif hate Şamê û birayê wî Esededdin Şêrguh ma di xizmeta Nûredin Zengî kerê Emadeddin.

Çaxa Necmedin hate Şamê bi gundên ko keti bûn dest tîr ne kir û kete leşkeriya Eybik


kurê Toxtekfn. Di demeki welê ko her gav welatê Şamê li ber êrişên xaçparêzan di-heziyan ji mêranî û rêgeriya qumandarekî wekî Necmedîn kes têr ne dibûn. Gava gîlha bû Şamê Eybik ew xisti bû rêza qumandarên mezin. Jirî û jêhatî bûna Necmedîn, pir zû ew nîzîkî Eybik kiri bû. Şerek di ser Şamê ra ne diborî ko Necmedîn gavek ber ve bilindiyê ne avêta. Paşê çaxa serleşkerê Şamê Enar mir ji Necmedîn hêjatir kes di nav qumandarên Şamê da nîn bû ko Eybik ew kir serleşker.

Di wexta ko Necmedîn Eyûb bû bû serleşkerê Şamê; birayê wî Şêrguh ji xwe gîhandî bû serleşkeriya Mehmûd Nûredîn Zengî xwediyê Helebê. Heya wê lîngê, Nûredîn çiqas caran dixwast destê xwe dirêjî Şamê bike; serleşkerê wî Enar li pêş xwe didît. Vê carê Enar li gîharê çû bû û emeg-darekî wekî Necmedîn keti bû şûnê. Êdî ne mîkûn bû ko şerê kûrê Emadedîn Zengî bike; nemaze serleşkerê Nûredîn, birayê Necmedîn Esededîn Şêrkûh bû.

Di sala 547 h (1154 m.) da leşkerê Nûredîn Zengî di bin serdariya Esadedîn Şêrgûh da çû ser Şamê. Necmedîn, ne dixwast bi birayê xwe ra û ne ji bi leşkerê kurê qencikerê xwe ra şer bikira. Di nava şeş rojan da gotîna xwe bi qumandar û mezinên bajêr va kir yek û bê şer dergelê Şamê ji leşkerê Nûredîn ra vekir.

Li ser vê merkeza her du bir m di çav Nûredîn da pir mezin bû. Şêrgûhê mêrxas di sa serleşker ma û Necmedînê jir û eqilmend ji bû hakimê bajarê Şamê. 'Iya kurê wî Selahedin çû Misirê, bû Siltan û şande pê; Necmedîn hakimê Şamê ma bû ko emê pêsdatir di cilê wê da bêtin.

Selahedin hin salên biçûkiya xwe li Beelbekê derbas kirin ko diroknişan der heqê van salan da tiştêk ne gotiye. Stanlî Linpol di wî warî da bi texmîn ev gotin kirine: « A ko bête



(1) Destegahên emêrikani hero cenkeşline nû dadixin behirê û stola xwe pê xurt dikin. Ev in çav bertorpiyor.
(2) Pişgahê ordiwa heştan di utroyê Italyayê de.

bîra mirov, ev e ko Selahedin ji wekî kurên mîr û hakimê wê demê herhal ji her kirira quranê, xwandin, nivisandin, gramêr, şîir û hedîs hin kiri be ».

Di kilêba tebe jat-el-şafiyye da der heqê biçûkiya Selahedin da bi tenê ev çend bêje bene: « Wî hedîs ji Hafîz kurê eblî Tahîr Seleff, Eblî Tahîr kurê Of, Şêx Qutbedînê Nişabûrî û Evidilâh kurê Ber-el-Nehwî bihîst ». Ji navên van mamosteyan xweya dike ko Necmedîn gelekî bala xwe daye xwandin û terbiyeya kurê xwe; ew kurê ko di wexta bûyîne da xwastî bû bavêje, an bîkuje l.

Herç li ser rojên xortaniya Selahedîn ko li Şamê derbas bûne; anê ji roja ko hatiye Şamê û heya cara pêşîn bi mamê xwe Şêrguh ra çûye şerê Misirê, dirokniwîsên îslaman tişteke ne gotine. Lê ên roavayê di sa tişteki serpillki gotine. Di vi warî da dibêjin: « Hergav ew -Selahedîn- diçû diwana Nûredîn û je ra qedira kurê hakimeki hebû. Hîngê xorteki jîr, bi edeb, sergiran û dîndar bû. Ewçend rûçik (sîfat) û sinçiyên (exlaq) çak li nik wî hebûn ko Nûredîn jê ra rûmeteke xweser digirtin ».

Tevî ko wê hîngê hemî mîrekên Sûriyayê çav da bûn nêçira direndeyan û xwedî kirina teyran, ew -Selahedîn- weki havê xwe tewîttî û sergiran dîma. Rabûn û rûniştineke wî tine bû ko dûrî eqil bûna. Erê çiqas ko Selahedîn ji nêçir û nêçirvaniyê hez ne dikir jî, mela wî gelekî li "siwariyê" hebû. Nemaze li ser pişta hespê bi lîstîna hûliyê⁽¹⁾ kes ne barê wî bû. Ji xwe gava Nûredîn dixwast bi hûlî bilîze bê Selahedîn kes ne dida pêş xwe.

Hin dirokniwîs ji jiyîna selahedîn a xortaniyê ecêbmayî dimînin ko di rex mameki weki Şêrguh, sergerm û jêhatî da pir sergiran û eqilmend mezin bûye. Ew Şêrguhê ko çavên xwe ji zîlan ne diparast; ji vê pê va heke ne ji bîrbiriya Necmedîn bûna pir caran xwe diêxist berberiya meikê xwe Nûredîn Zengî l..

Di vi warî da zanayên rovayê dibêjin: «Piraniya "fitûhatên Nûredîn li ser destê Şêrguh bû bûn û ne hatiye bihistin ko Selahedîn ketiye wan şeran yekî. Heke bi mamê xwe ra keti bûna wan şeran, herhal dirokniwîsên îslaman dê jê ra nivîsandi bûna ». Lê a rast ewe ko Selahedîn xwe tev ne daye, heya dema ko Şêrguh dirêji Misirê kiriye. Wê çaxê wî rêzana jîna xwe guhartiye û dest avêtîye şûr. Û roja ko dest avêtîye qevdê şûr, xurti û hinermendîyeke welê nîşan daye ko himê mezinatiya xwe wê gavê bi wê xurtiyê daniye. Ew him bû ko Selahedîn kir merraxwirê dewleta Zengî, siltanê pêşende û bokeyê îslaman...

(1) Hûlî, awayek lîstîke ko lîzbaz li ser pişta hespan bi daran li gogekê dixin û dîltzin. Ji bo vê lîstîkê siwariyêke xurt û bi hiner divê. Mixabin ko weki hemî kêfan ev lîstîk ji fro li nav kurdan ne maye.



Balafrên britani terka werçhê xwe didin û diçin bombarana Elmanyayê.

Hinek dirokniwîsên roavayê ji sergiranîya xortaniya Selahedîn holê tefsîr kirine:

Ji bo ko welatê miqedes û gora Îsa ji destê îslaman xelas bike, Xwedê bi destê papa Pitris Ewropa rakire ser lîngan û bi ser rohelatê da şand. Wî leşkerê ewropayî welatê miqedes vekir û tê de hikûmetine xurt anîn pê. Lê gava Xwedê ji bîr kirin û dest avêtîne zînat û bê reyyîye; ew zînat ko mirovati fihêtkar dikir, hînga Xwedê Selahedîn bi rihê xwe xurt kir û şande ser wan. Da ko serê wan bişkîne û cezayê wan bidê...

Ev camêrên han bi vê yekê dixwazin bidin zanîn ko Selahedîn di pêşiya xortaniya xwe da ne peyayekî berbiçav bûye. Lê ji bo dayîna cezayê xaçparêzan Xwedê ew xurtî dayê!. Di vi warî da hîn gelek gotinên din ji kirine ko me heweçyî nivîsanê ne dit.

Îbin Şedad di kitêba (newadir-el-silaniye) da holê gotiye: Selahedîn li Beelbek û Şamê di himbêza havê xwe da mezin bû û hemî rûçik û sinçiyên qenc jê hîn kirin; heya ko şopa mezinatiyê jê xweya kir. Gava Nûredîn Zengî Selahedîn holê jîr, sergiran û eqilmend dit; nîziki xwe kir û pir rû dayê. Çaxa bi ser bîst salê ket, Nûredîn, Şêrguh şande şerê Misirê. Wî ji Selahedîn bê dilê xwe êxiste nav qumandaren nijadê û bi xwe ra bir. Lê dema Selahedîn di rê û rêzanên ger û şeran da jîr û eqilmend dit, edî bê haya wî tişteke ne kir û di her kirekê da pê diçewirî.

« düm hîk heye » OSMAN SEBRÎ

Core Lêt rojnamevanekî emêrikani yê ko di şerê Elemeynê de hazir bûye, biserhatiya jêrin qise kiriyê û gotiye: Tîrmeha sala 1942an bû.

Firqa ewistraltî a nehan di entiya Elemeynê de girê Telisê bi şûn de vegerandi bû.

Di wî giri de ewistraliyan gelek hêsr girti bûn; gelekê wan hêsriran, eskerine talyanî bûn. Li ser sermilê zabîtên talyanî stêrîne ezêrhelî û li ser yê berzabitan stêrîne zivîn,

GENÊRALÊ EMÊRIKANÎ
AN ÇAWÎŞÊ TALYANÎ

diçirîsin. Ewistraliyan, dev bi ken, ew tajotin ber bi xetên me.

Bi min re genêralê emêrikani Frank Mêlbûrn hebû. Weşingtonê ew ji bo didevaniya şerê Elemeynê rêkirî bû.

Me sibeha xwe di çeperekê û di bin bombarana şûtikan de

derbas kiri bû. Ji min pê ve kesti ne dizani ko hevalê min genêralek e. Ji ber ko hingê di qada şerê Efrîqa bakur de cil û nişanên ordiwa emêrikani hêj ne hatî bûn nas kirim.

Min bi xwe gelek caran ajotina hêstran dîtî bû. Ji lewre min xwe da bû ber sihekê û hevalê xwe ê genêral bi tena xwe hiştî bû. Genêral Mêlbûrn temaşa qeslektî hêstrên talyanî dikir. Qederê du sed peya bûn. Onbaşiktî ewistraltî ew tajotin û hêsr di ber genêral re diborîn.


Onbaşiyê ewistraltî gava eskereki biyani û li ser sermelên wî du stêrkên zivîn dîtin, bawer kir ko ew çawişektî talyanî ye û ji rêzê derketiye. Bi rastî jî li ser sermilên çawişên talyanî jî stêrkine zivîn hebûn.

Onbaşiyê ewistraltî dudilî ne kir, pehinek li qana genêral da, stêrkên wî jî ser epolêtan jêkirin û got-ê: « De here nav hevalên xwe ».


Heta ko min xwe gihandi bû onbaşî ewi bi pehnan genêral xisti bû nav qeslê hêstran. Min onbaşî serwexî kir. Genêral digot, xem nake ew jî biserhatiyek e. Onbaşî stêrkên wî lê vedigerandin. Genêral digot, no kurê min, bila ji te re bin, ew jî yadigarek in.

Wextê eşayê em di xwarinxana zabitan de rûniştî bûn. Onbaşiyê ewistraltî şefqa wî a girs û fireh bi destî ve, ji derî ve da û li ber genêral sekini û got-ê: « Ev in ji te re çend yadigar genêralê min » û şefqa da ber genêralê emêrikantî.

Onbaşî şefqa xwe ji stêrkên çawîş û onbaşiyên Mûsolînî lijtî kiri bûn. Min cotek ji wan girtin û ew bi epolêtên genêral ve kirin. Stêrkên talyanî gelek lê hali bûn ».



CINDÛKÎ EMÊRIKANÎ DI ŞERÊ EFRÎQAYÊ DE
BEDEWÎKÎ EREB DERMAN DIKE



ÇEKINE EMÊRIKANÎ DI EWISTRALYAYÊ DE

HINDIK RINDIK

ESANSYON — Esansyon di Pesifika nîvro de giraveke hûr e. Rûyê erdê giravê 84 kilomêtir çargoşe ye. Drêjahî delî û nîv, pehnahiya wê 8 kilomêtir in. Ev girav di sala 1501ê de seyahekî portigalî keşîf kiriye. Piştî sê sed salî îngilizan girav vegirtî û tê de stasyoneke hêtelê çêkir. Heta destpêka vî şerî girava Esansyonê wek çerekonekê bû û tê de çederê 72 îngilîzan dijîn.

Lê piştî ko vî şerî dest pê kir giravê ehemiyeteke mezin girt. Ji ber ko di navbera Emêrika nîvro û Efrîka bakur de stasyoneke balafirana e. Emêrikaniyan tê de balafirgeheke mezin çêkir û hin esker ji danîn.

Girav zinarek e. Emêrikaniyan tê de rêke bi du kilomêtiran dirêj çêkirin. Îro di giravê de ji qîşlan pêve çar xestexane, sê sînema û otêlek heye.

Hero balafirin datînin giravê, hinên din jê radibin.

Di giravê de bi hezar eskerî ve kulnêrek heye. Vê paşiyê merkezê dil kir ko ji xestexana giravê re çend nexweşnerên jin bişîne. Kulnêr qîma xwe pê ne anî û ji merkezê re da zanin ko eskerên wî bi her awayî jî halê xwe razî ne; bi tenê ji bêjîniyê gazîndan dikin. Ji lwe ra an ji her eskerê re jînekê bişînin, an bi şandina çend jinên nexweşnêr îşê wî xerab nekin.

Merkezê, jî ya kulnêr kir û tu jin ne şandine giravê.

SIRHETA TEYRAN — Sedsala bîstan, sedsala makînê û sirhetê ye. Di sirhetê de balafir jî hemî aletên din derketine û hero li xwe zêde dikin. Di saetekê de 500,600,700 kilomêtirî difirin.

Ma gelo teyr, yên ko balafrên bican in balafrên Xwedê ne di sirhetê de çawan in? Di nav teyran de jî hin hene ko di sirhetê de ecêb in. Yên ko me zanî ev in: Kote'r di saetê de 76 kilomêtiran, boran 10) k. cylo 112 k. hacîreşk 241, hacîreşken baskdirêj di saetê de 316 kilomêtiran difirin.

MIROVÊ DINYAYÊ Æ DIRÊJTIR — Her tiştê xerîb li Emêrikê peyda dibe. Lê mirovê dinyayê Æ dirêjtir ne li wê derê ye. Li gora ko hate zanîn mirovê dinyayê Æ dirêjtir di girava Eyslandê de ye; navê wî Con Pêterson e û bêjina wî 2 mêtir û 52 sentîm in û bi 160 kiflwan giran e.

Pêterson heşt birayên din hene, lê ew hemî di bejineke adetî de ne. Con bi xwe jî hetanî ko bû 13 salî bejina wî adetî bû. Lê



*Vê dedalê bi bûirê, gelo kêma zêde kiriye.
Bila xwendevan lê hikim bikin.*

DENGÊ XORTAN

Xortê kurd im, gurçik pola, dil-paqij im
Ji boy weten, ji boy welat, dihalişim
Riya rohin, xebat û ceng, armanca me
Namûs, merdî, xîretkêşî, nişanê me
Rêça me ye, ol û namûs, guh nadin mal
Me derza xwe, sitandîye, ji Rîstemê Zal
Em çavê xwe, nanegênin, ji ber gula
Em didin ber, her zehmetê, sînga pola
Li her derê, serbilind in, em egit in
Di cengê de, ji nav xelkê, em rebit in
Kurd gelek in, belav bûne, em sed kerf
Îlemî mîrxas, hemî cindî, li her derê
Me sondxwarî, ji xelkê re, ser nadeyin
Ji boy welat, xwîna xwey sor, em birjênin
Lîra herê, ersê Xwedê, dengê xortê
Qîra bidin, da seh bikin, bangê xorta.
Qetranî: 21,12,943 HISÊNÊ EMÎN

piştê û jî nişkekê ve bi hewa ket. Ji bo destek cil ji Con re heft gaz qîmaş divêtin. Gava diçe otêlekê du textan jî serî ve digehînin hev da ko mîrikê me bikare xwe lê dirêj bike.

Pêterson artist e. Bi çûcekî, bejinbostekî 50 sentîmetirî dirêj ve di tiyatroke zarokan de dixebite.

ZIMAN

Q nivsandina wî

Heke dîrok der heqê çêbûna û ji hev veqetîna zimanan da nikari be tişteki rast û dirîst bide dest me jî; lê herhal jî bo dem û awayê nivsandinê, gelek tişt ji me ra daye zanîn.

Çiqas ko ziman berî dewreya nivsandinê heye jî, ne tişteki pir î hêja ye; wekî dareke hişk bê gulî û tila, ber û fêki. Lê gava kete warê nivsandinê, hêdî hêdî tila lê dikevin û pelk digire; paşê bi ber û fêki jî dibe.

Heye ko hinek bêjin: ma gelo zimanê me ê ko wekî dareke hişk e, di çend salan da hişîn bibe?.. Tevî ko em di babilîskalezê da ne jî, dema em zimanê xwe bi zimanên ko ketine warê nivsandinê va bidin ber hev; divê em sed salî pir ne binin. Ji ber ko ziman jî bo miletan her tişt e.

Berî ko ziman têkevin warê nivsandinê sê koçan (merheleyan) derbas dikin; piştî ko dikevin wî warî jî dîsa sê koçan didin paş xwe. Çiqas ko ev her şeş koçan han dudu bi dudu jî hevîn jî, di awayê danîna xwe da, e paşpê ne. Herwekî gava ziman nuh bûye wasîteya fehîmkirinê û hevok jê çêbûne, di koça pêşin da çîrok pê hatine gotin. Piştî vê, dema hineki bêje pir bûne û ziman pêş da çûye, gihaye koça duduyan ko meselok jê çar bûne. Ji ber ko pirên meselokan bi qafiyê dibin û hewceyî gelek bêjeyên yekdeng û yekbêjin, di koça pêşin da zimên têra wan ne dikir. Bi vî awayê peyîvê ra ereb secî dibêjin; yanî gotinên bê wezin û bi qafiyê. Paşê çaxa koka zimên gihaye guraniyê (kematê) û secî li gubê xelkê xweş

hatiye û xwestine hîn pirtir bi pêş kevin xweşxwan (şîr) jî gotine. Ji vê gotina me tê zanîn ko di pişîya zimên da berê çîrok, piştî wan meselok û hîn paşê jî xweşxwan hatine gotin.

Lê gava ziman ketine warê nivsandinê, paşpê di van koçan ra derbas bûye. Yanî berê xweşxwan, paşê meselok, hîn di koça paşin da çîrok (nesr) hatine nivîsîn. Heke em zimanê ereban ê ko di singa dîrokê da gihaye warê nivsandinê bidin ber çavên xwe, bê dijwariyê de vê rastiyê bibînin. Ji ber ko di çêbûn û bin gihê da henîf ziman bi qanûnekê va e girêdayî ne, ne hewceye em çêla zimanekî din bikin. Kesên ko dewreyên zimanan derbaskirî xwendine gotina min navêjin.

Ji van gotinên jorîn me xwest bidin zanîn ko di warê nivsandinê da koça zimên a paşin çîrok, yanî nesir e. Ez bala xwe didim gelek nivîsevanên me vê yeka han bîra nabîne: herwekî berê min jî ne dizanî. Lê gava min ev rastî bîra bir, bi carekê ez vegerim ser nesirê.

Bila qet neyê bîra kesî ko bi van gotinan ez dixwazim bihayê xweşxwanê bişkênînim. Gava xweşxwan bi devê şair bête gotin, her hêja ye. Lê dema bi devê miteşair be, ne tu tişt e; heye ko qeşmerî be jî...

Gelek xortên me ên Kurd hene ko gava mirov bêje wan: Divê tu çak bixebitî da ko hînî nivsandina zimanê xwe bibî. Heçko tişteki kirêt bihistî be, ditengijî û dibêje, ma ez zimanê bav û kalên xwe jî nizanin? qey jî vê ra jî hîn bûn divê? l...

Gava vê bersiva bêrê dide, bîr nabe ko kurên henîf miletan bi zimanên bav û kalên xwe dizanin, lê bit enê jî bo ko hînî awayê nivsandina wî zimanî bibin deh-panzde salan di dibistanan da bi wî zimanî dixwînin. Ew xelkên ko zimanê wan gihaye dewreya kematê, jî bo hîn bûna awayê nivsandinê hewceyî xwandina deh panzde salan dibîne. Ma gelo jî me kurdên ko zimanê me hîn nuh ketiyê warê nivsandinê ra çand sal divên ko em hîn bibin?.. Heke em ûne bûna dibistanên kurdî jî bidin ber çavên xwe, divê dijwariya hîn bûna vê yekê duta bibê.

Heye ko hin xwendevan vê teqdîra min bi zêdeyî (mibalexê) bibînin. Heke jî bo

Heye ko hin xwendevan vê teqdîra min bi zêdeyî (mibalexê) bibînin. Heke jî bo



ESKERINE ORDİWA HİŞTAN BIHİNA XWE DIDIN

pêsendeyê di teqdîra min da zêdeyî tine be jî bi bo îro, nemaze di demeke me e bolê bê dibistan da, bê şik kes nikare deh salan bi hînbûna zimên mijûl bibe. Ji bo îro, mikûn e ko her kurdekî xwandî da di nava sê salan da tişteki çak ji awayê nivîsandina zimanê xwe hîn bibê : lê li ser rêzana jêrin:

Sala pêşîn bi xwandin û nivîsandina nivîsarên⁽¹⁾ kurdî derbas bike, sala duduyan bi nivîsandina çîrok û meselokan, a sîsyan bi guhartina bend û kitêbên biyaniyan. Bi vî awayî mikûn e ko kurdekî xwendî di demekî nîzik da hînî awaê nivîsandina zimanê xwe bibe. Di guhartin anê tercime-kirinê da mirov him awayê nivîsandina zimanê xwe hîn dibê, him jî bi kêrî tikûziya zimên têt ko emê wê li jêr bêjin.

Na gava em bi carekê lingê xwe bavêjin warê paşin û dest bi nivîsandina tiştine mezîn bikin, wek şagirtê ko berî xwandina elîfbayê dest bavêje kitêbên felsefê. Ev bîrêtiya hane ko hêjmara nivîsevanên hêja di Sûriyê da ji tiliyên destekî pirtir ne kirîye.

Yeka din jî heye ko ji zimanê me ra kêmanîyek tete zanin. Divê her kurdê xwenda çav bide tikûzkirina vê yekê.

Di zimên da, heke ji bêjeyan hevok û jî hevokan însa çêdibe jî; ew însa, bê tabîr û îstîlah, wek nanê garîsî hevdi nagire. Piraniya tabîr û îstîlahan di warê nivîsandinê da di-kevin zimên. Her wekî bi kils û çîmentoyê dîwar lê dibin û bi wan kevir bi hev va dinûsîkin: tabîr û îstîlah jî wekî bêje û hevokan bi hev va girê didin û diêxin qalîbekî spehî.

Me li jor gotî bû ko heya ziman nekeye warê nivîsandinê, tabîr û îstîlah têt da pir nabin. Berî vê dewreyê ên ko ketî bin nav zimên, mikûn e ko em di çîrokan da bibînin. Ji bo tikûz kirina zimên di destê me da, jî mîrasa bav û kalan, jî çîroka pê va tişteki nîn e.

QERTEL Û SILÊMAN

Rojekê Silêman pêxember bant teyrên dinyayê

kir û ji wan pîrst: « Kê di nav we de bêtir emir kirîye? » Teyran lê vegeand û got: « Di keheha Xwîné de qertelek heye, ewî jî me hemîyan bêtir emir kirîye ». Silêman gote teyran: « Herin wî qertelî jî min re binin ».

Teyrek çû û ji wî qertelî re got: « Hezretê Silêman te dixwaze ». Qertel çû balê, Silêman jê pîrst: « Te çend salan emir kirîye. » Qertel got: « Min sê sed salan emir kirîye. » Silêman jê pîrst: « Gelo kes heye ko ji te bêtir emir kirî be? » Qertel got: « Belê di keheha Xeyberê de qertelek heye, bi emir jî min mestir e, pirê ine qertalan hemîyan e. »

Silêman şande pey wî qertelî. Qertelê Xeyberê hate ba Silêman û jê re got ko çar sed salî emir kirîye. Silêman jê pîrst: « Di dinyayê de te çi ditiye û çi ket serê te? »

Qertelê Xeyberê got: « Di cîvaniya xwe de, rojekê ez bi hewa kelîm û gelek bilind firigam. Dinya di ber çavên min de bû bû wek hêkekî. Min xwe di ser behîrê re te-zand. Min dil ko di nav behîra spt de tişteki diçirise. Min xwe jî jor de berda xwar. Ew tişt qesîrek bû; kevirêkî qesîrê zêr e, û e diin ziv e. Min danî û ez li ser banê qesîrê rûniştim. Mirovekî pîr jê derket, hêştirêk anî û danî ber min. Çend rojan min mijûliya xwe pê kir, hêştir xwar û ez vegeyîam mal.

Ez du sed salî mam û disan çûm û li ser banê wê qesîrê veniştim. Kato çû bû rehmetê. Kurê wî bi der hat, jî min re kehrikek anî. Min ew xwar û ez jê vegeyîam.

Sed salên din kelîm navê. Min disan qesta qesîrê kir û ez çam-ê. Kurik jî enrê Xwedê kirî bû. Nevtikî kalo hebû. Lawik gava çav bi min kir rahişte lişnga xwe û kir ko min bikuje. Min da xwe û ez revim. Ya hezretê Silêman, tiştê ko di dinyayê de min ditiye ew e. Tama mirovan jî dinyayê ne maye ».

Heke jî çîrokan pê va di destê me da çend nivîsarên edîben kevin hebî jî, tabîr û îstîlahên têt da erebî ne.

Tabîr û îstîlahên nub, heye ko em bikarin di rîya guhartina (tercime kirin) kitêbên biyanî da têxin zimanê xwe. Bi çav min, xortên me ên ko zimanên biyanî dîzanin, xweş dikarin di vî warî da bi kêrî zimanê xwe bînin. Nemaze ên ko bi zimanên îngilîzî û fransîzî dîzanin.

OSMAN SEBRÎ

⁽¹⁾ Nivîsar, bi mana kitêb, kovak û rojnameyên ko bi zimanekî tene nivîsîn û çapkirine (eser).

(حذفه المراقب)

Berwari: 5/2/1944

T. ILHO BÊDUHÎ

(حذفه المراقب)


HINEK JÎ HENEK

HÎTLER Û MÛSOLÎNÎ — Zilamek hebû; Xwedê hema keç didan-ê. Carekê jîna wî cewik anîn; her du jî kur. Ji kêfa mêrik re payan ne dihate dîtin. Stêrka mihwerê jî hêj diçirisi. Mêrik rabû navê yekî kir Hitler, navê ê din kire Mûsolînî.

Hevalên wî pê hesiya bûn û dihatin piroziyê. Yekî, ji bavê cewikan pirsî: Ma hou Hitler û Mûsolînî çawan ji hev ferq dikin.

Bav lê vegerand û got: Gelek rahet e, em li kumatekê dinihêrin û dizanin. Yê ko bi xwe de riliye ew Mûsolînî ye.

Sansorê Ev Nivîsar Rakiriyê



STOLA HEVALBENDAN DI PERAVÊN ÎTALYAYÊ DE, STOL Û ORDÛ HEVKERIYÊ DIKIN.

Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê 10⁰⁰ lireyên sari — Ji bo welatên din lirekî îngilzi ñ ntv

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar : Celadet Ali Bedir-Khan. Şam—Sûriyê
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan, Damas—Syrie

SAL 3
HEJMAR 25
GULAN 1944

RONAHÎ

ANNEE 3
NUMÉRO 25
MAI 1944

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON: 12-29

FÎLÊ ŞEREVANÎ



Bivê nêvê însanê pêşin her û her bi peyari bi rê ve diçû û barê xwe ji di piştê xwe de diguhast. Piştê gava heywan kedi kirin, lê siwar bûn û bar ji lê kirin. Bi zemanan ve erebe, qaxiz, vapor, rêhesin, trînbêl û balafir ji çekirin. Îro di wasitêyên guhastiwê de gelek gûh didin sirhetê. Li bejê wasitêyine welê dîtine ko di saetê de ji sedî heta du sed kîlômêtir bi rê ve diçin. Di ezmanan de ji teyran bi gelekî derketine. Digel vê hindê însanan nikariya ji heywanên xwe ên kêmwêş bigeriyana. Ev fîlê ha di Hindistanê de lebatekî ordiwê ye.

ÇAPXANA TEREQIYÊ
ŞAM — 1944

DI VÊ HEJMARÊ DE

Wezîrê eqilmend	Çirokbêj
Neçîra Kewan	Evdîrêhman Elî Yûnis
Mirovê bêsimbêl	Xelilê Genco
Napolyon	Osman Sebrî
Boxoçêf	Bişarê Segman
Marşa Tîpan	Hisênê Emin
Zêdehiya Jinan	Ronaht
Çend Têderxistek	Hesen Hişyar
Emeliyata li koxikê	Dilawer Çarpine
Selahedîn	Osman Sebrî
Pêncî Milyon Ga	Silêmanê Ferho

Giroka Kurdmançî:

Wezîrê Eqilmend

Kurikekî sêwî ji gundê xwe ê biçûk derket û ber bi bajarê hakimê welatê xwe ve çû. Kurik giha bajêr; yekser çû ber deriyê mala hêkim da ko ji xwe re nan bixwazê. Hêkim bi xwe çav lê kir û qenc li wî meyizand, di kurikekî hêja ye. Hêkim ba kire wî, got ê; kuro were vî mîsnê ha bide min. Kurik go: ez mîsn nadim te, lê divê tu mîsn bidî min.

Lê hêkim çend cara got ê: Kuro were mîsn bide min, kurik her û her digo divê ko tu bidî min,

Talî hêkim emir da eskerê xwe û gote wan, vî kurikî ji vê derê derêxin û berdin wî, bila biçê devereke dûr, ji bajêr derkevê. Eskera berdane kurik û kurik bi nav bajêr de baz da, xwe çend roja vinda kir.

Piştê xve kire mirovekî eqilmend û di xwe fikirî ko çi karî bikê . . . tiştê hate bîra wî. Xwe bike hakimê zarokê bajêr. Zarok li xwe dane hev û ji wan re hin tişt gotin, kêfa zaroka zehf pê hat. Bi vî awayî kurikê sêwî hikmê xwe di nav zarokan de kir, weke hikmê hakim û mezina û bêş ji wan distand, her hêv bi hêv. Piştê di hin ji zarokan bêşa xwe nadin. Ji wan re meşneqeke darî çêkir û go: heçf ko bêşa xwe nedê ezê wî bixeniqînim, bi vî werisê daliqandî, bi va her sê dara de.

Bû taliya hêvê; hemîwa bêşa xwe dan, yekî bi tenê bêşa xwe ne da. Kurikê hakim ba kire wî û go: çima te bêşa xwe ne da.

Kurik go: ez nadim. Kurikê hakim gote timamê zaroka, kuro wî bigirin û weris bixin stoyê wî bila bixeniqe. Zarok ji xwe bê emriya wî nakin; weris êxistin stoyê wî û şidan-din; kurik çend cara xwe lebitand, lê bê êde, talî reben mir.

Xwediyê kurik hatin û ji zaroka pirsîn, kê kurê me kuştiye?

Zaroka go: kurikê we, hakim wî kuşt. Esker ji hatin, pirsîn û kurikê hakim girtin û birin ber destê hakimê xwe û mesele bi timamî ji hêkim re gotin

Hêkim gote celêd: Serê wî jêke, berf ko finazkine di derêxê

Vêca kurik go: Emir heye ez biştexilim

Hêkim go: tê çi bêjî? . . .

Kurik go: heke te ji zilamekî carê du cara, sê cara bêş xwest û wî go ez nadim ma tu wî nakujî

Hêkim go: belê

Kurik lê vegerand û go: Ez jî hingê hakimê zaroka bûm û min bêşa xwe ji wa distand û yek ji wa li ber mi asê bû, bêş ne da; mi jî ew bi dar ve kir

Hakim gelekî fikirî; dît ko zarokêkî eqilmend e, divê ko wi nekujê; rabû hêkim gote kurik: Tê bibî sayisê min. Kurik go: belê bi ser û çavê xwe, mi ji te qebûl e.

Vêca kurik her û her êmê hespê hêkim dida, hêsp tîmar dikir: dora wî dimalîst.

Lê du wezîrê hêkim hebûn. Her du wezîr jî zehf ji wî kurkî dienitandin û dixwestin rojkê berf rojkê ji wî kurkî xelas bibin; berf ko helakê bîne serê wan. Ji ber ko kurik gelekî gehraza bû û hêkim jê hez dikir.

Wezîrê milê rastê rabû gote keça xwe: Min divê ko tu biçî tşev cem sayisê hespê hêkim û jê re xwarineke xweş bibî û bêjî wî, heke te hespê hêkim kuşt ezê te li xwe mehr kim, bila xwarinê jî bixwê

Keçikê xwarin bir û çû. Bihurte cem kurikê sayis. Odeke reş û tarî, bêçira. Keçê slav li kurik kir û xwarin da ber û go: min ev xwarina xweş ji te re aniye da ko tu bixwî.

Kurik dest bi xwarina xwe kir û xwar. Piştî ko xelas kir ke; kê got ê: ez hatime cem te ji boyî tşekî, min divê tu vî hespî bigurînf da ko ez te li xwe mehîr kim.

Kurik gelekî di xwe fikirî û go: Hêkim gote min, te hesp ji birçîna gurand; ez ne birçf me, heke go ji nebûnê te gurand, her tişt hene, pere zehf in; hakim dikare yeke min bîne, bi Xwedê ez vî tşî nakim.

Keçikê kir ne kir, kur k çîma xwe ne anî. Talî keçik vegeriha cem bavê xwe û jê re weke ko bû go. Wezîr di bê fêde ye, rabû gote wezîrê milê çepê. Wezîrê milê çepê jî keça xwe şand, disan kurik hesp ne gurand.

Careke din wezîrê milê rastê keça xwe

şand. İcar kurik sist
bù ù qîma xwe anî,
heşp gurand ù keçik di
cih de li xwe mehr kir.
Sibe hakim pê hesiya,
şande pey kurik ù got ê:
Te çîre hesp gurand;
ezê serê te jêkim.

Kurik tiştê ko pê
re hù ji hêkim re qise
kir ù go: cara sisiya mi
xwe ne glîr, min hesp
gurand ù keçik di cih
de min li xwe mehr kir.

Hakim kêlikê fikîrî,
piştîre şand pey her du
wezîrê xwe, serê wa
jêkirin ù ew kurik kire
wezîrê xwe yê milê
rastê ù yekî di jî anî
kire wezîrê xwe yê milê
çepê.

Carkê hakim ù her
du wezîrê xwe bi şev
di nav bajêr de digeri-
han. Çûn mala keçikeye


zehrê spehî ù xwanedan, ji maleke mezin. Ji
ber ko wê keçkê ji mej ve ji hêkim re şandi
bù ko ew ù her du wezîrê xwe ko li cem wê
dawetlî ne.

Hakim ù her du wezîrê xwe derbasî
mala keçkê bûn. Vêca pêşî hakim derbas bù
cem wê; di gava keçik li piştî perdê rûniştî ù
mersefke mezin danî ortê, berxekî dagirtî ù
sorkirtî tê de.

Keçik gote hêkim: Kerem ke ser şivê.
Hakim rûnişt, xwar ù çend şexalî bi keçkê
re peyivî; xatîr ji keçkê xwest ù çû da wezî-
rê wî rûnîn. Hêkim wezîrê xwe yê milê çepê
pêşî şand. Ji xwe ew wezîr zehrê ehmeq bû,
hat silav li keçkê kir ù hema rûnişt ù rahi-
şte xwarinê, berx bi temamî xwar ù vegeyîya
cem hêkim.

İcar wezîrê milê rastê ket mezela keçkê;
di ko keçik li piştî perdê ye, silav lê kir, hal
ù xatîr jê pirsî ù sekînî. Keçkê go kerem ke
ser şivê. Jê re jî danî bûn berxekî heşandî.
Wezîr rûnişt, rahişt, serf jêkir, her çar pê jî
jêkirin, ù hemû dane piştî mersefê, ù şiva
xwe xwar. Piştî ko xwar keçkê go, ez hevî
dikim tu neçî. Ji ber ko ewê, tiştê ko wezîr
kiri bù dîtî bù.

Talî keçkê got ê; kerem ke tu jî were
piştî perdê.



*Bergehê ji bajarekî talyanî. Balaştrîne hevalbendan yê nê kesfê di
ser bajêr re firîyane ù ew sûret ji jor de girtine.*

Wezîr derbas bù, di keçikeye spehî rûniş-
tiye ser textê xwe. Wezîr yekser çû di rex
wê de rûnişt; ken ù benekê xwe bi hev re
kirin ù gelektî bi hev re man, heta îşê xwe
qedandin. Ji ber ko keçkê dîtî bù wezîr çî
kiriye ù mana wê jî seh kiri bù. Ji xwe
mana wê ew e ko serê wî jêbe, lingê wî jê-
bin, tucara veşartiyê dilê xwe ji kesî re nabê-
je. Wezîr piştî ko dilê xwe li cem keçkê rehet
kir; jê xatîr xwest ù çû cem hêkim.

Hakim zehrê aciz bù bù; hingî li benda wî
ma bù. Rabû hahim jê pirsî ù go: Ez çûme
cem keçkê, kêlikê mam ù derketim, wezîrê
milê çepê çû ew jî wilo: ti çûyî wextekî
bêqeder zehrê mayî, rastiyê bêje te çî kir?
Wezîr go: qet, weke we kir, mi jî kir, mi tiş-
tekî din ne kir.

Hêkim kir ù ne kir ko wezîrê wî rastiyê
bihêje: wezîr ne go. Hakim rabû berda wî ù
ew jî bajêr derêxist.

Midekî halo ma. Lê hêkim dîsan xwest
wezîrê xwe ê berdayî vegeyîne ù jê bizanê
wê şevê çî kiriye. Hêkim ji xwe re digo ez
nizanim bi kû de çû; lê ezê bi awakî zani
bim. Robû ji eskerê xwe re go herin ji mi re
şivikne bîka bînin. Bi bara şivikine bîka anîn
ù rabûn her şivik ji bin ù jî serf jêkirin. Vêca
serê şivika ji binî xuya ne dibû. Ji esker ne

gotin, herin van şivan li xelkê belav bikin û bêjin wan ye ko bikare serê şivkê ji bîni ji hêkim re kifş bike ewê ji hêkim pêşkêşeke mezin bibe.

Timamê xalkê li wa şivka meyazandin, lê ji hev derne-xistin kujan serî ye, kujan binî ye.

Wezîrê ko hêkim berda bû wî, ew kurikê eqilmend çû bû mala camêrekî, rûniştî bû. Vêca xwediyê malê jî, eskara şivek da bûn ê. Ew zilam jî hate mal û li şivkê meyazand, lê nas ne kir.

Wezîrê veşartî got ê: tu li çi demeyizênî. Mêrik rabû hal û hewal jê re gotin. Kurik go, here ji min re teştêk av bîne, rahet e. Mêrik rabû jê re teştêk av anî û danî her. Wezîr şiv avêt teştê avê, rexek çû bîni, rexek li banî ma. Wezîr go: rexê ko hin av bihe bîni ye û rexê ko ser av bibe serî ye. Here ji hêkim re bibêje û pêşkêşa xwe jê bistîne.

Ew zilam çû cem hêkim û di hey tu kesî nikarî bû ser û hinê şivkê şanî hîde. Mêrik teştêk xwest û marîfeta xwe anî ortê. Hêkim xweş seh kir ko ev îş wezîrê wî çêkirîye. Hêkim gote mêrik: rastiyê bêje min, kê ev şîret li te kirîye?


Mêrik mikur hat û got: Ji mêj ve yekî ji her dewletê haz ba bû û hati bû mala min, ewî ev şîret li min kirîye.

Li ser emrê hêkim ew zilam çû û wezîr ji hêkim re anî, pêşkêşa xwe bir û çû mal. Vêca hêkim gote wezîrê xwe: Divê tu ji min re rastiyê bibêji, wê şevê li cem keçkê te çi kir?

Wezîr mikur ne dihat. Hêkim lê dişidand, lê wezîr her û her digo: Mi tiştêk ne kirîye, mi şiva xwe xwar û ez vegeyriyam cem te.

Hêkim dît hê fêde ye; emrî celadê xwe kir ko sibe wezîrê wî ji pêl temamê xelkê ve bixeniqîne.

Bû sibe, hakim li ser gotina xwe sekinî. Cardî ji kurik pirsî. Kurik dîsan got, min tiştêk



Kelekên dakelinê. Ev vaporek piçûk dikarin gelek nîzîngiyê li bejê bikin. Ewçend ko esker dikarin jê peya bibin behîrê û bi peyari xwe bigihinin bejê. Ev tişt hemî hazîriya hevalbendan e ji bo eniya didowan.



Ji bergehên şerê Pesifikê. Eskerine nûçelandî dadikevin giravekê emêrikani ya ko japoniyani di destpêka şerî de zent kirî bû.

ne kirîye. Rabûn dar û weris danîn, wezîr birin rastê, ji pêl xelkê ve bi dar ve bikin. Xelk li dora meşneqê kom bûn.

Ji nişkêkê ve ew keçik ji nav xelkê bi der ket û hat nêzikî wezîr û lê sekînî, hinarêk li erdê da; libê hinarê li erdê bela bûn. Kurik mana wê seh kir, heke ji hêkim re tiştê ko wê şevê li cem keçkê kir; bihêje keçik naxeyide.

Vêca kurik berê xwe da hêkim û destûr xwest ko bistexile. Hêkim emir da; weris ji stoyê wî kirin, kurik çû ba hêkim û her tişt jê re gotin.

Hakim gelek kêfxweş bû, kurik ewîw kir û ji nû ve ew kire wezîrê xwe yê milê rastê.

ÇIROKBÊJ

NÊÇIRA KEWAN

Gava em nêçira dibêjin ev pirs ji temamê nêçira teyran û heywanên kovî re tê gotin. Lê gava ko em nêçira kewan dibêjin divêt guhdarên me wer bizanin ko ev ji temamiya nêçirvaniya kewan re tê gotin. Heke em kewgîrvanî an kew-vedanî dibêjin, qenc tê sa kirin ko mexsed vedana ribat û celab e.

Ribat û celab du navên erebî ne. Gelo ev du nav ji kû ketine an hatine nav kurdman-can. Ez vê nizanim.

Lê min pir kewedanî an kewgîrvanî di deştan û di çiyân de kirîye. Di hin deveran de, ji devê mirovên kal heştê not salî, min bi xwe bihîstîye ko digotin an dipirsîn, gelo ev kew qoç e an yê ser dar û devîyan e. Hin caran jî dihat gotin ko kewê te qoç e an yê ser daran e. Û hin mirovan jî digot ko kewê min qoçê kozikan e, ne yê ser dar û devîyan e[1]

Ji van pirsên kevnare tê zanîn ko beriya hatîna van pirsên erebî, navê ribat « qoç » û yê celab « serdar » bû. Niha bi xwe jî di hin deverên Kurdistanê bakur de ji mîrên qenc re dibêjin ko flankes qoçê kozikan e

Herçî gotina « qoç » kurdên hin deveran jê re « qûç » dibêjin. Lê bi sakirîna piranî « qoç » e û yê hindîk « qûç » dibêjin. Bi min jî « qoç » e.

Ein bèn ser mesela nêçira kewan. Di aliyê Kurdistanê bakur de bi, çend awayî nêçira kewan dibe.

KEW-VEDANÎ. Di navbeyna her du kanûnan de divê ko kewgîrvan kewên xwe qenc bi xwedî bikin. Emê kewan jî ev in: genim, tehlî, giyayê şîn û pîvaz. Rojê çarkê genim û çar pênc caran şînatî divêt b'îdin kew. Rojê du caran jî li ber rojê an li ber agir divêt kew bêxin gevizikê. Gevizik axa bi girzik an bi sêlik e.

[1] Ji van her du gotinan re navine kurdmançî hene. Herwekî axê gotîye jî jêlab re « serdar » û jî ribat re « bestî » dibêjin. Ji xwe Mr. Osman Sebrî di bendeke xwe de ev welê bi nav kirine.

RONAHÎ: H.17—R. 16, 17.

Heyanî ko Sibat biqede çav û nikulên kewan sor dibin û av ji pozê wan tê. Wê çaxê edî wextê vedana kewê nêr e.


Heema ko zîp qediya û çend roj Adar çû wê kewgîrvan kewên xwe hilfin û bi çol û çiyân bikevin û kewan vedin; heyanî nivê Gulanê. Piştî ewê dest bi vedana mêkewan an mariyan ji bikin. Kurd hin dibên mêkew hin dibên marî; her du jî yek in. Mêkewê jî vedin heya nivê Hîzêranê.

VEDANA KEWAN: Kewgîrvan diçe li ciyekî mitik an pozik kozîkêkê çêdike; dorhêla kozîkê bi hejikan an bi giya asê dike û li çar alî davan vedide; binê kozîkê jî kevir dike. Ji bona ko kewê tazî yanî ribat bi çêre û gevizikê mijûl nebe.

Nêçîrvan kewek li ser kevirên kozîkê tazî dike û yek an dido di ser kozîkê re. Heke dar an devî an poncîkek hebe wê celab an serdar deyne ser wî ciyê bilind û rekevan qefesa wan qene veşêre; da ko kewên kovî ji rikew an qeşesan netirsîn.

Kewgîrvan wê here di şargeha xwe de

ŞARNHORST



Şarnhorst zirhepşêke e emani bû. Zirhepşêke xurt, bi (26,000) tonî mezîn. Şarnhorst diqel zirhepşêke di Gnezenau, carekî di behira Manşê di ber peravên Îngîlistanê re derbas bû bûn. Stol û balafirvaniya britanî pê hesiya bûn û dirêji wan kiri bû. Rojêke mij û dûmanê bû. Zirhepşên etemani di bin sitara mijê de ji neyarên xwe xelas bûn û xwe gihandin bandereke etemani. Xelkê Îngîlistanê jî vî îşî getek xeyidî bûn. Lê li 26. 12 1913 stola britanî Şarnhorst di Behira-bakur de qefalt û ew bin av kir. Klîşa me Şarnhorstê di benderekê de lengerandaz şanî dide.

xwe biveşêre. Dema ko nêre-
kew tê û məkewê wî pê re ye,
mêkew jî dixwaze dirêjî ribatî
bike. Lê nêrekew li wê dixê,
wê bi şûn de vedigerine û
nahêle ko bikeve şer.

Dema ko celaban dest bi
xwendinê kir kewê kovî jî wê
cewab bide; yanî ew jî wê
bixwîne. Gava ko kovî nêzik
bû edî şer dikeve ser ribat;
heya ko kewê kovî di dehfan
de belîqe. Pişre wê xweyî
rabe û kewên xwe jî dehfan
derfne û hinek jî ribat re dfl
bike; heye ko ribat çend niku-
lan lêxe. Lê pir kewên qenc
hene ko li hêsrî û dflan naxin.

Vedana məkewan jî nivê Gulanê dest pê
dike. Dema ko məkew bûn qebik û çûn ser
hêkan nêrekew bi çol û çîyan dikevin û li
kû dengê məkewê hês dikin hema jî cî qesda
wê derê dikin; xwe digihinin məkewan heya
ko belîqin an xweyî bi tîfingê lêbide [1].

Mêkew heke dido bin ew jî wek kewê
nêr tén vedan. Yek di kozikê de tazî dibe û
yekî li ser celab dimîne. Û heke yek be wê
li ser darekî an poncekî deynin û li dora wê
dehfan vedin.

NÊÇÎRA SERÊ KANIYAN: Piştî nivê Hizêranê
ko vedana məkewan jî qediya, heyani meha
Îlonê hin caran ji bona girtina ferxik an kewî-
kên wan xelk diçin dor kaniyan û ji xwe re
kewikan digirin û bi xwedî dikin.

Ji meha Îlonê bi awayê jêrin disa dest
bi nêçîra kewan dibe; heya ko av nekeve li
ber kanî û avzêman. Çiyê ko av hindik be,
holikan çêdikin û xwe tê de vedişêvin. Dema
ko kew li vexwarina avê kom dibin, bi tîfîng-
gên saçilame li wan dixin. Hecar bi derbekê
ji yekî heyani dehan kew têne kuştin.

ÇARIK: Piştî ko baran ket wê bi çarikan
nêçîr bikin. Çarik çar gaz caw e. Çar gaz caw,
du ber bi hev ve bidrûn û bi rengê reş, sor,
zer û şîn, tevî hev, reng bikin. Lê cihê cihê,
rengê têkîlî rengine din nebe. Wê çarîkê
bi ser du zilên nehîv ve bikin; li gorf

(1) Herçî sebaba vedana nêrekew, wî çaxî dema
fiska kewan e. Nêrekew gelek bi xêret dibin û
naxwazin ko nêrekewine din nizingî mariya wan
bibin. Ji lewre wextê dengê bestî dikin berê xwe
dixin wî û şerê wî dikin. (Ronabî)



*Eskerine hevalbendan, nemace britani dadikevin beja
Italyayê. Jê dikin herin qada şer.*

bilindahiya bejina xwedî. Û pê herin heya ko
kew wê bibînin.

Dema ko kew çav bi çarîkê dikevin hema
cixda-cixdî dikin û jî cî qesda çarîkê dikin. Bi
tîfîngê li wan dixin û bera wan didin.

*Ji Çîriya dawî heya meha Sibatê bi çend
awayên din jî nêçîra kewan tê kirin.*

HÊLE: Dema hêla roja hêlê wê zilam
kom bibin û bi ciyên devça û devnewal ve
herin û herçî xweyî-tîfîng xwe bidin pozikan
an mitikan. Ên bêçek wê kewan bifirînin.
Herçî ko li mitikan deynin ên xweyî-tîfîng li
wan bidin û yên devnewalan wê bêçek ji xwe
re bigirin.

Kew jî du sê sîran hêtir nikarin bifirîn.
Dema ko kew li pozikan datîne; wê nêçîrvan
çend dangan bistrê, heya ko kew xwe veşêrin.
Strana wan jî ev e. « Hêr-hêro. hêr-hero,
delalo, delalo, nikûlso, celebardo... » û sê
caran jî dê bikuxin: « Îh... îh... îh... ».
Kew hema di bin poncikan de xwe vedişêrin.

TAMIK: Ka û genim di nav hev de li ciyê
beroj direşmin û welê dihîlin. Kew tén
dixwin û hîni wî tamikî dibin. Pişre
xweyî digê û holika xwe çêdike [1] û tê de
rûdine. Kew bi ref tén, nêçîrvan gava kew
pir bûn wan bi tîfîngê dikuje. Refê ko hîni
tamikî bûye heta ko jê kewek bimîne ji tami-
kî venabe.

Nêçîrvan dikare kewên ko têne tamikî bi

[3] Bi me bit roja ko tamik têtê reşandin holik
ji divêtê bête çêkirin da ko kew hîni wê jî bibin û
pişre jê netirsîn. R.

toré ji bigire. Toreke masfvanan li hev dipé-
çin û di nava kaya tamik de vedişerin. Dema
ko kew tén û dikevin nav kayê toré bi ser
wan re dikişinin. Benê toré di holikê de ye.

Pişti vê nêçirvan terin ciyê ko mêrg an
çîman; berfa wî paqij dikin û holik an şarga
xwe di berfê de çêdikin û li benda kewê
xwe diminin. Kew dema ko çav bi reşahiye
dikevin qesta wê dikin. Nêçirvan bi tîfingê
wan dikujin.

TEPIK: Tepik çaleke devgirtî ye. Du dep,
heryek ji bostekî dirêjtir û bi qasî çar tiliyên
bi hev ve pehin. Li her du aliyên depa
darikine ne pir qalind û serî kolayî datnin,
ji bo ko depik jê neflitin û bi her du aliyên
ve du benê mû girêdidin. Çala tepikê jî bi
qasî sê bostan kûr dikin. Tepikan bi qasî deh
gavan jî hev dûr datnin. Navbeya wan bi
hejikên daran û deviyên sénc dikin; li serê
tepiken xwe jî pûşê çilo û pelên çilo datnin.
Dema ko kew tê tu tiştî nabîne xwe davêje
ser pelên çilo û dikeve çalê. Tepik jî Çiriya
dawî heta dehê Adare têne vedan.

NÊÇÎRA BER LÎSAN: Di her du mehên ka-
nûnan de nêçirvan diçin ber lîsên kewan û
nêçîra xwe dikin. Nêçirvan bi ro terin û li
ciyê ko kew bi şev tê de lîs dibin agah di-
bin û şarge jî xwe re çêdikin û lê rûdinin.

Dema ko niv saet roj ma wê kew qesta
lîsê xwe bikin û bèn. Dema tén ciyên xwe,

cot cot li cem hev tén, marî û nêrekew li ba
hev diminin. Wextê tén nêçirvan bi tîfingê
wê lêbide.

EBORA KEWAN: Li salê carekê kew jî
deştê qesta zozanan dikin û paizan jê vedige-
rin deştê. Ji bîstê Sibatê çûna wan dest pê
dike. Kew jî vê tarixê ve jî deştê radibin û
berê xwe didin zozanan, heta nivê Adare.
Hingê jî nêçîra wan dikin

Nêçirvan di ciyên sirûm û kepiwên bilind
de çeper û meterisên xwe çêdikin û li hatina
kewan çavnêrî dikin. Dema ko kew jî jêr ve
derdikewin û qesta sirûm û kepiwan dikin divê
nêçirvan pir destçeleng û sivik be; hema zû
lêbide. Ji ber ko kew pir nasekinin, zû difirin.

Wextê em li welêt bûn û me ev nêçir
dikir, xelkê meterisên xwe heyantî bîst zêran
difirotin, firotimeke milkane.


Ev in awayên nêçirê yên ko di welatê
me de pê emel dikin. Niho emê hin rêzik û
qeydeyên vê nêçirê bibêjin.

Vedana kewê nêr: Şevdest li ciyên ketayî
û nizim; rojdest li ciyên pal û pozik divêt
bêne vedan.

Heçî mêkew divêt li cihên bilind bêne
vedan. Da ko li çar aliyên wî deng here.

Tepik jî li ciyên pal, beroj û kewçêr divêt
bêne vedan.

EVDIREHMAN ELÎ YÛNIS



Britaniyan texlîtek balaşîr hene jê re dibêjin « mûskîtos »; balaşîrne hûr û sivik,
balaşîrine keşîf û nêçîrvaniyê. Ev in çend « mûskîtos ». Mihendis û emele di hola
Fabrikê de perçeyên wan li hev siwar dikin.

MIROVË

KO SIMBËLËN XWE DI MEZADË DE FIRÛTINE

« Ji kovara Isnegué ya ko li Misihê derêê hute girtin »

Emîral Horti serekê derlela Mecaristanê bi xurtliya vên û mîraniya xwe deng daye. Di sala 1917an de deryavanên keştiya ko Horti kumandanê wê bû esyan kiri bû; esyaneke bolşevîkî. Deryavanan ji nav xwe sê peya bijarti bûn û ew rêkiri bûn nik kumandanê keştiyê; jê dixwestin ko xwe ji kumandariyê deyne û teslimî wan bibe. Ev her sê peya hilkîşiya bûn pîra jorin, cihê kumandan û daxwaza deryavanan jê re didan zanîn. Horti bêt ko li wan vegerîne li heryekê kullmek da û her sê avêtin behîrê.

Deryavanan gava ev mîrani û bê perwayî dîtî, bizdihan, gotin qey kumandar bi çek e, û herkes çû ser îşê xwe; serxwarabûn ji wek fînda ko ba li wê xine, tesliya.

Dîsan di wê salê de di bendera Kataroyê de eskeran esyan kiri bû. Keştiya Horti di wê benderê de bû; lê bi Horti re ew qewet nîn bû ko bikare bera aseyan bide. Serxwarabî ji 7000î bêrtir bûn. Lê Horti nemerdi ne kir ya-werê xwe bi xwe re bir, li qayîxekê siwar bû û gîta bejê kir.

Serxwarabî di qeraxê de li hêniya wî bûn. Wextê qayîxê nîzîngî kir serxwarabiyan digot: « Vi terst bikujin, bikujin vi terst... » Horti nê da sîstiyê, ji qayîxê peya bû; bî gavîne giran ber bi deryavanan ve çû û gote wan: Deryavanîno teslim bibin; çend alayên siwari bi xar

lêne me. Hon bi wan nikarin, honê hemî bîla sebeb telef bibin. Lê heke we ji niho de çekên xwe dant û xwe siparte min ez soza xwe didim we ko nahilim siwart we bişînin.

Eskeran bawer kir; teslim bûn, siwariyên ko Hertî dijotin hêj di rê de û ne gihastîne benderê. Horti piştî lehqîqatekê ji hêvolkeran (mişewîq) 700 peya dan ber lîfîngan.

Nikola Horti di sala 1868an de ji diya xwe bûye; tro 76-salt ye Bavê wî xudan gund û col, lê ne ewçend dewlemênd bû. Bi tenê mala Horti di Mecaristanê de maleke kevin e; bi esnêla xwe fexûr e. Horti gava'pê li çardehan kir ketê dibistana behriyê û jê zabîr derket. Hikûmetê ew çande sefaretê Stenbolê. Hortiyê ciwan û delal wextê gihaste Stenbolê simbelên xwe berda. Zabîrê xort simbelên xwe bi kozmetîkê bi xwedî dikir, ba dida û serên wan digihande biniya çavên xwe.

Rojekê li Stenbolê jî bo civateke xêrt pere dîdan hev. Nîminendeyên dewletên ecnebî tişteki xwe î eziz tavêlin mezadê û hasîla mezadê ji civatê re dîdan. Horti ji nişkekê ve rabû û gote hezîran, min simbelên xwe avêtine mezadê. Herkes lê ecêbmajî ma bû.

Li simbelê Horti zêde kirin heta ko gihandin sed zêrî. Simbel bi sed zêrî li ser keça konstlê Emîrîkê ma. Keçikê simbel di cih de dixwestin. Rabûn berberek anî; simbelên Horti rakirin û teslimî keçikê kirin.

Înperator Franswa Jorêf ev çîrok bihtîst; gelek kefa xwe jê re anî. Rabû, Horti anî

Xwendevanên me wê bibêjin Rona-hî bûye kulu-loqa balafiran Belê hege ko ew gotin rast be. Lê çarêka şerê îro balafir e. Ji lewre ji me re carîna gelek klîşeyên balafiran lèn. En klîşe klîşeyêke brîtanî ye. Hoste mitral-yozan li başkên balafîreke bombavêj siwar dikin.



vigané à ji xwe re kire yawer.

Wextê şerê 1914-1918an çêbû Hortî xwest ko here şer. Imperator ev kire kumandane zirehpûşa « Navara ». Di bin emirê Hortî de sê keştiyên din jî hebûn. Hortî sê salan di Adriyatîkê de geriya; bêt ko bikare rasti dijminan bêt. Axir rojê rastî stoleke talyani hat; jî 27 keştiyan bihevketî. Hortî dirêjtî stolê kir û bi bêtelê elam da kumandare talyani ko stoleke mecercî e mezin li ser şopa wî ye. Kumandane talyani bawer kir û jî ber Hortî baz da. Deng bi Hortî ket. Ev stol jî wek alayiyên siwari hêjtêl. Hortî jî bû serfermandarê stolê.

Şer qediya bû. Nemse û Mecercî şikestî bûn. Ji Hortî re diwiya bû ko stola xwe teslimî Yûgoslavyayê bikira. Fermandarê şikestî qim pê unî bû. Ji tenê keştiya ko lê siwar dibû û ya ko ala wî hildigirt ne dixwest jî dest bide. Emiral rabû gole yûgoslavan ko dike mîlkên xwe di Mecercîstanê de bistose û wê keştiyê bikirê. Hortî jî bo wê yekê berê xwe da welatê xwe.


Wextê Hortî gihaste Mecarîstanê xelkê bi boşevtkiyê girtî bû û li hikûmelê rabû bûn. Hortî veqerîya nitroyê welêt. Eskerên fransîzî jî ji balqanan gesta Mecarîstanê kiri bûn û diçûn şerê boşevîkan bikin. Hortî û fransîz li hev hatin. Hortî li hespekî spi î esil siwar bû; di uav bajarên Mecarîstanê de digerîya, propogenda çêdikir û jî meyildarên xwe re çek belav dikirin. Şexshe çêbû ko li pey Hortî niv milyon esker heye.

Boşevîk pê bawer bûn. Wextê ko Hortî, siwarê hesp-spî bi mûstiqê û depdepe di kûçeyan re derbas dibû xelkê dida pey û boşevtkî vedimirtî. Mewkîba Hortî roj bi roj mestir dibû û berê xwe dida Peştê, payîtextê Mecarîstanê.

Hortî bi wê mewkîb û sefxerê wek kumandarekî mîzefser, lê bêt ko berikek berda be, keke Peştê. Xelkê Peştê sehîw girî bû. Lê wextê dîtî ko ew niv-milyon esker nayê dest pê



Xortên çîni piştî ko di welatê xwe de talimîne îbtidai dibînin; diçûn Emêrîkayê û hîni fenîne eskerî dibin û jê vedigerin welatê xwe û şerê japonan dikin. Ev e zabîtekî emêrîkanî dersa şagîrtên çîni yê balafirvanîyê dibêje.



Di hewşeke fabrikeke Kenadayê de topîne nû di hizûriya mîhendîs û zabîtan de dikin biceribînin.

kirin xwe li serxwercabînê kar bikin. Şevêkê peyayîz Hortî li bajêr belav bûn û jî miretibên esyanê qederê 1000 peyayî di malên wan de kuştin. Xelk bizdihan û nema qala serxwercabînê kirin.

Qral Şarl revîya bû. Parlemana mecercî gîha bû hev da ko qeymeqamekî qral bibijîre. Namzedê xurîtr kont Aponî bû. Meclîs gîha bû hev, genêrulek bi her destî ve şejderbek, rabû û gole nimûnendan: Yê ko narwaze Hortî bibijîre bila jî piyan bisekine.

Kestî xwe teo ne da; herkes di çihê xwe de rûniştî ma û Hortî bi gektîliya dangan bû qeymeqamê qral.

Qral jî wêj ve emirê Xwedê kirige lê Hortî hêj bi navê « qeymqamê qral » serekdewletê Mecarîstanêyê.

XELÎLÊ GENCO

DÎROKA

JÎNA NAPOLYON

— 9 —

HEVALBENDIYA PÊŞÎN

Me di fêslên berî vê da gotî bû ko serekwezîrê Îngilîz Wilyam Pît, jî bo vekuştina agirê serxwerabûnê di nav sinorên welatê Franseyê da, ça wan xebitî bû û li hevalbendan gerîya bû. Ji ber ko Îspanya li ser sinorê Franseyê diman, diviya bû têkeve vê bevalbendiya han. Heke nikari bûya ew agir vekuştana jî, qene xelkê xwe bi serxwerabûyan ra dikir dijmin ko ew jî ji bo hikûmeteke melîkî hêviyek bû. Herçî Holandê piştî ko fransîzan destê xwe dane ser welatê Belçîk, bi tenê jî bo parastina welatê xwe ketî bû govenda hevalbendan. Ji xwe Nems û Prûsyayê jî bo doza xwîna Marî Antwanêt şerê Franseyê dikirin.

Bi van sebeban, çarmedorî welatê Franseyê hevalbend jî îngilîzan ra çar bûn û jî her alî va neyaran dirêjî erdê Franseyê dikirin.

Leşkerê Franseyê ko serekî bi nav Ewropayê da çû bû, li ber êrişên hevalbendan bi şûn da vedigerîn.

Di nav qumandarên fransîzan ên ko li ber dijmin dişkestin da, bi navê Dûmûriyê genêralek hebû ko jî hizbê Jîrûndîyan bû. Gava Dûmûriyê li pêş Nemsawîyan şikest wî dizanî ko para qumandarên şikestî li nik hikûmeta serxwerabûyan çî ye. Ji lewre ne xwest serê xwe bide destê celad û revî nav neyaran.

Li ser vê revê hikûmetê hevalên wî ên hîzbî girtin û avêtine hepsê. Lê piraniya wan xwe ne dan dest; revî li nava Franseyê belav bûn û xelk li hikûmeta Parisê hêvotin (teşwîq kirin). Ew bûn ko li bajarên Marsîliya, Tûlon, Bordo û Liyonê xelk bi xwe ra rakirî bûn ser lîngan û ne dixwastin hikûmeta Parisê binasin.

Piştî ko di nava Franseyê de hinde neyar jî bo hikûmeta serxwerabûyan çar bûn, hevalbendên ko heya hîngê bi tenê vekuştina agirê serxwerabûnê dixwastin: vê çarê çav dane parvakirina welatê Franseyê !..

Li ser vê îngilîzan û nemsawîyan destên xwe dane ser Kondê û Valansînê, Prûsiyayê erdê ko berê fransîzan jê biri bûn vegeandin



û Îspaniya jî di çiyayê Brans da zora fransîzan birin. Bi ser van da îngilîzan di deryayê ra hesareke ecêb dane ser îskeleyên hemî perawan, ne dibîşt ko tiştê jî derva here nav welêt.

Li ber van hingên (derbe) han hikûmeta Parisê mecbûr bû ko rastiye bide ber çavên xelkê û bêje: « welat ketiye talûkê ». Ji ber vê, divê hikim di destê komeke biçûk da be ko bikari be welêt biparêze. Bi vê hincetê, hikim dane destê komeke biçûk ko jê ra digotin « koma emnilawê ». Vê koma han di meha hizêrana 1793 an da heya dawiya tîrmeha 1794 an li welatê Franseyê hikim kir ko bi vê çaxê ra (dema tîrsandinê) hatiye gotin. Ji ber ko di ceza kirina xelkê da pir zînat kirine. Heya wê derê ko jî çî kesî ketine şikê, bê dilovanî kuştine.

Tevî zînatê mezin a ko dikir, vê koma han welat bi hin tevdir jî talûkê fîlîtanîye ko ew tevdir ev in: Berî her tiştî bi çêkirina hin qanûnên dererê çavên neyaren cimbûriyetê şikand, heya ko bikari be bi dilekî rihet berê xwe bide neyaren derî welêt. Berê hemî milet bi leşkerî guharte neyaren derva. Welê ko hemî xort şandine qada şer; qertemêr jî bo çêkirina

çek û silehan ajotine karxaneyan; herçî jin ji bo dirûtin û vegirtina çadiran, nexweşnerî û çekirina xwarinê xebitandin. Kal jî di kuçê û kolanan da ji bo ko bi zirt û halanan dilê xelkê xurt bikin hiştin.

Êdî kesî bê kar û xebat ne ma bû. Her kesî dizanin ko bi karê ko jê ra hatiye sipartin dê welêt bifilite. Ji lewre herkesî di tala xwe ra xfreteke ecêb rave dikir.

Koma emnîlamê bi vê dilbîşkiya han nava welêt ji xinîzan û sinorê welêt jî ji neyran paqij kir. Herçî bajarên ko hikûmeta Parîsê ne dinasin, yek piştî ê din vegirtin; heya ko ê paşîn Tûlûn her wekî meberê gotî bû bi destê Napolyon hate vegirtin.

Welatparezên franîzan ji her alî mîna şeran sînga xwe da bûn neyar û talûkeya ko çavê wan tirsandi bû xîret û mêraniya wan zêde dikir. Heke Tûlûn jî neyarenê derve ra bû bû pîngazê û çavê wan tirsandi bû jî; zabitê korsîkî Bonapartê kiçik ew jî êxisti bû dest leşkerê cîmhûriyetê û bi carekê welat safî kiri bûn.

Leşkerê hevalbendan bi carekê jî sinorên welêt bi dûr xistin û herçiya ji Fransyê çû bû bi şûn da vegerandin. Bi ser da Holanda jî vekirin. Bîna sala 1794an ne qediya bû ko Fransya nuh destê xwe danî ser Belçîka, Holanda, Nîs, Sawa û peravên Rînê roava. Li ser vê ravekirina xurtiya han, Prûsya jî nav hevalbendan bi derket û Îspaniya da pê. Li giharê bê Îngilîz û Nemsayê kes nema.

Çiqas ko hevalbend di hev da keti bûn û bê Îngilîz û Nemsayê jî fransîzan ra neyar ne ma bûn jî; bi xurtî û mezinatiya stola xwe Îngilîz ne neyarekî biçûk bû. Tevî ko di deriyayê ra hesarekê xurt da bû ser welatê fransîzan, dikari bû hergav dirêjî peravên wê bike; an neyarenê derve di deriyayê ra derbasî hundirê welêt bike. Ji xwe peravên Fransyê bi qasî ko xwe li ber êrîşine holê bigirta ne hati bûn xurt kirin.




Gravê Îngilîstanê tacîdar Core V namzedine zabitan di ber çavên xwe re diborine. Ev namzedên ha dîr-nîzingê dê xwe bigehînin qada şer.

Ji bo xurt kirina van peravan, nemaze ên nîvro, hikûmetê bokeyê Tûlonê genêral Bonapart verêkiri bû. Napolyon herwekî di şer da jêhatibûneke ecêb nîşan da bû, di vî karê ko sipartî bûnê da jî jirî û zanatiyeke seza rave kiri bû. Li ser peravên nîvro kunek nema ko Napolyon ev ne girt, girek ne hişt ko hêviya neyar jê gut nekir. Piştî ko ew êrdim (menteqe) kir sê xetên şer û di hemî cihan da top daçikandin, qîşte giştik saz kirin û di heşq wan peravan da herçiya zanî hewce bû hîn kir û jî hikûmetê ra da zanîn, vegeerî bajarê Nîsê ser firqa xwe.

Hingê hikûmeta Fransyê ev leşkerê han ji bo şerê leşkerê Nemsayê pêk anî bû. Ew leşkerê ko hemî deştên Îtalyayê êxisti bûn dest xwe û dixwastin bi arîkariya leşkerê Bêdmînt dirêjî sinorê Fransyê bikin. Gava Napolyon giha bû Nîsê, leşkerê fransîzan di nav çeperan da jî hêviya êrişê nemsewîyan dîfî bû. Ev yeka han bi serê wî ne keti bû. Li ser zanîna ko di nav çend roja da êxisti bû dest xwe, li nik xwe xiteyeke êrişê çekir û da serleşkerê xwe.

Ev serleşkerê han mirovekî çak û camêr bû. Bê ko dudilîyê bike xiteya Napolyon a heja qebûl kir û bi xwe li ser wê meşî. Hin sê hefte di ser batina Napoloyon a Nîsê ra ne borî bûn ko leşkerê fransîzan dirêjî

Bendereke bonbarankiri: Klîşa me bendereke bombaran kiri şani dide. balfirên hevalbendan piştî ko ew bender bombaran kirine, dotira rojê, bi ser wê de çûne û ji for de ev sûret girtine. Xerabiya bombaranê xweş lê xuya dike; nemezê vapora ko ketiye ser kêleka xwe .



nemsawîyan kiri bû. Li ber vê êrişê han a di nişka va leşkerê Bédmînt revî û hemî xwarin, çek û posatên xwe ji fransîzan ra hişt. Bi vî awayî leşkerê Fransyê hemî gavan û derbendên ko di roava ra dikevin çiyayê Alpê êxistin dest xwe û ji tîrsa êrişê nemsawîyan a nişkekê va filitî.

Di pê vê serdestiya ko bi hayîla mejûyê Napolyon hate pê ra, çend roj ne çûn ko li ser bêbextiya hinek xêrnexwaz hate girtin.

Ev tiştêki ber bi çave ko çî dema çirayek nuh vêkeve heke hinek dilxweş bibin, teqez gelek jî didexisin. Herwekî wan neyarên Napolyon ên dexsok ji hingê va bilindiya stêrka bextê wî bîr dibirin. Berî ko mezin bibe dixwastin çîra bextê wî vemirînin. Gava hikûmetê berî vî şerê han ew şandî bû xurt-kirina peravan, ji bo sileh û cebirxaneyê li Marsîlyayê hepisxaneyê kevin ji nuh va ava kiri bû. Neyarên Napolyon ava kirina vê hepisxanê jê ra dikirin sûcekî û digotin: Ew dixwaze Bastîleke nuh ava bike. Di wexteke ko Robîspiyêr hemî dêr kiri bûn hepisxane da, ma hewce bû ko genêralekî wekî Napolyon î nenas û ciwan Bastîlan ava ke ?!.. Ji xwe hikûmeta wê çaxê bê ko maqûliya tiştêki biramiyana li ser bêbextiyêke biçûk pir mirovên mezin bi dar ve dikirin. Mirovekî bextê

wî gelekî ne î çak bûna nikari bû serê xwe ji ber kêra celat xilas bikira. Vî bextê çak di demeke welê heja da serê xwe li Napolyon rakir. Birayê Robîspiyêr dest avête genêralê ciwan û bi wê arîkariyê dengê Napolyon hate bihîstin û ji mirinê filitî.

Ilingê Robîspiyêrê biçûk xwest ko Napolyon li Nîsê rakin Parîsê û bikin qumandarê leşkerê paytextê; lê genêralê ciwan qîma xwe bi vê ne anî û dişa vegeftî ser firçeya xwe a li çiyayê Alpê, peşberê neyar.

BEXTÊ RÊŞ

Napolyon hi qebûl ne kirina hevaliya Robîspiyêr ji xwe ra qenc kiri bû. Vî serekê dilhişk ewçend bi zînat li fransîzan hikim dikirin ko kesên jîr bi dûma hikmê wî ne bawer bûn. Bi tenê arîkariya birayê vî serekî, der heqê berdana Napolyon da, dergehê belan jê ra vekiri bû. Ji xwe gava bext reş bû sebeb ji ber lingên mirov çar dibin. Heye ko qedere ev rûpelê reş êxisti bû nav rojên ciwanîya genêralê korsîkî. Perê ket hepsê, paşê meaşê wî birin û di pê wê ra bi carekê navê wî ji destera qumandanan hate derxistin ko wî bê xwe kuştinê rîyeke felatê li pêş xwe ne didit. . .

OSMAN SEBRÎ

BOŒOÇËF

AN PËTROYË SISEYAN

Imperatora ûrisan a bi nav û deng Elizabêl emirê Xwedê kiri bû. Pêtroÿê siseyan, neviyê Pêtroÿê didowan rûnişti bû ser textê çarilîyê.

Pêtroÿê siseyan ne ew mêr bû ko li ser textê çaran rûništa. Lê rêzika seltenetê ew heq da bû-yê. Pêtro mirovekî çels, hê ven û frade bû. Jina wî « Ênhalet-Zerbest » jinikeke bi sen û çiv bû. Di rayên wê de xwîneke bi liêrs û tima digeriya. Ewê Pêtro bêf ko jê hez bike, ji bo razikirina Elizabêtê; kiri bû.

Pişti ko Ênhalt bi navê Katêrinê bû jina Pêtro ji bo ayendê xeyaline mezin ji xwe re çêdikirin. Piştî mirina Elizabêtê ewê bi awakî ji mêrê xwe de xelas biwa û bibiwa imperatora kişwerekî mezin.

Pêtroÿê siseyan li ser textê pêşiyên xwe rûnişti bû. Pêtro li ser textê heykelek bû; dolaba hikûmetê Katêrinê digerland. Sal û nivek ketiştûn navê. Pêtro xwe da bû îş û nûşû vexwarinê. Serxweş diket û wextê xwe di himbêza dostika xwe, kontês Voronzov de derbas dikir.

Pêtro rojekê gelek serxweş bû bû. Ji pêş wî

ve qala jina wî dikirin û digotin ko imperatorê ji halê imperator ne razî ye. Pêtro bi erin gote xelkê dora xwe: Heke ew ji min ne razî ye, dermanê wê li cem min hazîr e; ezê bi guliyên wê bigirim, wê havejim zîndaneke Sî-bêryayê û kontês Voronzovê li sûna wê bi-kim imperatorê.

Linekan imperatorê Katêrinê li ser gotinên imperator serxwest kiri bûn. Katêrinê dida eqilê xwe û digot ko diviya bû êdî îşê xwe bilezanda. Hebû ko imperator wextê serxweş dibû di he,ê wê de emirek bidaya peyayên xwe û ew wîndî bikira. Katêrinê jî aşîqek hebû, yekî zabit, digotin-ê Crîgorî Orlof.

Şevêkê, Katêrinê digel aşîqê xwe di xewgela xwe de bû. Imperatorê rabû ser piştî xwe û gote aşîqê xwe: Orlof, divê sibe tu herî çîşla eskerên xas û wan ji bo îşê me kar bikî. Piştî ko imperator digel dostika xwe li ber masa şerabê rûnişt, ezê ji qesirê derkevim; tu ji hêviyê bîminî he-tanî ko imperator bi lemamî serxweş bibe. Wextê te dîtî imanê wî geriya tiwê, vê kaxezê jê re bidî inza kirin.


Katêrinê kaxezek da Orlof. Di wê kaxezê de imperator vedinasî ko terka tac û textê xwe dida.

Sibitirê wextê imperator rabû emîr kir

ko sîfra şerabê deynin. Sîfre danî, Pêtro digel dostika xwe li ber rûnişt. Fatêrinê ji di salona vexwarinê de bû. Imperator berê xwe da jina xwe û got-ê: Te xêr e, ez dibînim ko te dîsan madê xwe kirîye; gonê te zer bûye. Ma tu dexisî? Mihletê bide min ezê îşê te jî saz bikim.

Katêrinê tehdida ko di gotinên imperator de veşartî bû seh kir. Lê deng ne kir û ji salonê derket. Belê gonê Katêrinê zer bû. Lê ne ji ber dexsê; lêbelê ji ber îşê ko da bû pêş xwe. Ma hêsani bû; dikir ko çarê ûrisan bi dekê bêxe erdê û li şûna wî rûne.

Katêrinê çû oda xwe; destek cilên zabitên rûsî



Ji wextê ko wî şerî dest pê kirîye ji ber ko m'ê çûne enîyan jin di gelek liştan de bi karê wan radibin. Klîsû me di tîrojaya emlobîsekê şani dide. Mîfetîşekî polisê bi ken û bi ziravî jê re latîmatîn dide, an xeleteke wê rast dîke. Heke di tîroj mîrek biwa geto mîfetîş dîsan wê holê bikenîya.

li ber xwe kir û berê xwe da qışla eskerên xas. Orlof her tişt pêk anî bû. Ji xwe birayê wî bi xwe zabitekî eskerên xas bû. Westê Katêrîna kete hewşa qîşlê; eskerîni derketin pêşiya wê û sê caran bang dan: Her bijî Katêrîna didowan, împêratora ûrisan...

Di wê demê de bû ko Orlof kaxeza ko Katêrînê da bû-yê ji împêrator ber dida imza kirin. Împêrator bêt ko bixwîne; an bêt ko seh bike li kaxeze nihêrt û imza kir. Westê imza dikir destê wî direcefi; an ji serxweşiyê an tiştê ko serê wî bîr ne dibir, destê wî bîr dibir ji lewre Pêtro kaxeza da zabîti û got: Ewê, min ji te re imza kir, lê careke din ji bo imzakerîna kaxeza di xelwetê de min teiz mezin.

Orlof karê girt, ew xiste bêrîta xwe û gote împêrator: Hikimraniya Pêtroyê sîseyan teman bûye; ewê here dereke din.

Peyayên Orlof yêna ko li ber derî bûn gava ew gotin bihistin ketin hundir, Pêtro girêdan û berê wî dan menfayê.


Westê împêratorê girtî terka qesirê dida, zabitekî bê rib û simbêl, li hespekî boz siwarbûyî, dikete hewşa qesirê. Xelkê xwe gihandi bû dora wî zabîti; didan ber qîran û digotin: Her bijî Katêrîna didowan, împêratora ûrisan...

Bi wî awayî Katêrîna bû împêratora Rûsyayê. Gelek ne borî hate bihistin ko Pêtro di menfayê de emirê Xwedê kiriye. Hinan got ko hirayê Orlof ew di menfayê de kuştîye.

∴

Deh sal keti hûn navê. Katêrîna ferman ferma hû; herkesî Pêtroyê sîseyan ji bîr rakirî bû. Li nişkekê ve xeberek gîhaşte Katêrîna didowan: « Di mintîqa Ûralê de zilamek peyda bûye, dibêje ez Pêtroyê sîseyan im ».

Mêrik ji hepisxanê baz da bû; gelek dima Pêtroyê sîseyan. Lê xelkê digot, ma Pêtro ne mirîye. Polîsan ew girt û ji nû ve avête hepsê. Lê mêrik reya xwe peyda kir cardî ji hepsê baz da û vê carê çû çiyayên Ûralê û xwe tê de veşart.



Çiroka beqekê. Sûret bi xwe, bêt nivîsar, çirokê qise dike.

Miletê ûris yê ko ji Seltaneta Katêrînê heyameke aş û rahetiyê hevî dikir, xeyalî-kestî bû bû. Gundîyan ji zilma gîregeran gazînd dikirin; ew wek berê di lêşîryê de bûn; tu tişt di halê wan de ne guhêrî bû. Ji aliyê din hin tobnên welêt hebûn ko ji Katêrînê ne razî bûn; dizîka xef û şewîr dikirin.

Mêrikê ko ji hepsê revî bû û di çîyan de xwe veşartî bû, wek mehdîkî banî xelkê dikir. Xelkê ji hêdî hêdî guh didan-ê. Digotin ko di welêt de wê serxwerabûnek çêbibe û hikim wê bête guhartin. Katêrînê ev tişt dibihistin. Katêrînê emîr da polîsên xwe ko li mirovên bişîbhe guhdar bibin. Polîsan yek ji miretîban girt û bi zorê ew da mikur hatin. Xelkê gava ev tişt dît zanî ko îş xerab e, Gelek peya xwe dane çiyê.

Rojêke Havîna sala 1773an bû. Di çiyayê Ûralê de qerebalîxek hate ditin. Xelkê xwe gihandi bûn dora siwarekî, yê ko cilnê kesk li ber bûn. Senceqdarê wî jî aleke spî bi xaçê-ke sor hildigirt. Mezinên ko di dora wî de bûn beyanameyek saz kirin û dan-ê da ko imza bike. Mêrik qehûl ne kir û got ko beriya ko bigelhe Moskooyê tu tiştî imza nake. Lê sebaba rastîn ne ew bû; mêrik nîzanî hû binivîsanda. Ev Pêtroyê sîseyan bû ko ji hepsê revîya bû.

Ew ordîwa ecêb hero meztîr dibû û pêş ve diçû. Di Yetskayê de qezazaqan li wan xist. Mêrik bi talan û bi helalkirina jinan û bi şerabê eskerên nîzamî jî qanî kirin. Digel eskerên nîzamî yêna ko gîha hûn ordîwa wî

revokeyê hepsê gihasti bû mintîqa Orênbûrgê. Xelk derdiketin pêşiya wî, jama dêran lédixistin û bang didan, her bijî Pétroyê siseyan....

Heçî imîdşikestî, ji hikûmetê nerazî û hepsiyên ko dihatin berdan digihaştin ordiwa Pétroyê siseyan. Beriya ko bigehin bajarê Orênbûrgê rastî kelehekê hattin. Kelehvaniyan li her xwe da; bû şer. Dawiyê Pétroyê siseyan keleh zemt kir; zabitên tê de hemî kuştin, jinên wan ji zahitên xwe re lêk vekirin. Ji xwe re bi tenê du jin hiştin.

Pétroyê siseyan êdî gihasti bû ber sûrêhên Orênbûrgê. Di kelehe de 5000 esker û 100 top hebûn. Di ordiwa ko lê wer hati bû de qedere sed hezar peya hebûn. Kelehê piştî ko şeş mehan li ber xwe da ket destên Pétroyê siseyan. Êdî Pétro bû bû xwediyê welatekî mezin.

Çavên Pétroyê derewîn bi keçikeye delal ketî bû; yeke qezaq. Pétro rabû ew mehir kir û ew împeratorîçe îlan kir. Lê herçî qapatme, ew jî pê re bûn.

Ji Katêrîné re êdî tu rahetî ne me bû. Pétroyê derewîn, ew ji Pétroyê rastîn bêtir aciz dikir. Katêrîn rabû ordûke mezin saz kir û ew di bin fermandariya jeneralî Biblikof de rêkire ser Pétroyê derewîn. Biblikof kir ne kir Pétro zemt ne kir. Biblikof dida pey eskerên Pétro; ew tajotin heta cihine dûr û digot qey zora wan çûye. Lê ew eskerê ko ji hev belav dihûn, dibûn çete û ji par û di baskan re li eskerên Biblikof dixistin.

Katêrîné dît ko Biblikof ne mêrê vî işî ye; rabû fermandar guhart û li sûna wî yekî din tayîn kir. Lê wî jî nikarî bû bi karê xwe rabiwa. Heçî Pétro bi şikestina van her du jeneralên Katêrîné hêj xurtir bû bû. Lê rasthatîneke xerîb işê wî xerab kir. Pétro keti bû bajarê Qazanê û ordiwa xwe a mîzefer teftîş dikir. Ji nişkekê ve ji nav xelkê jinîkek derket, berê xwe da Pétro û bi qîr got-ê:

— Boxoçêf, Boxoçêf ...

Jinîkê digote xelkê: Ev mêrê min Boxoçêf e. Berê xwe dida Pétro û digot-ê: Boxoçêf, tu çuyî kû; ez û zarowên xwe tazî û hirçî hiştin...

Eskerêkî milê jinîkê girt, ki;and û da alf û got-ê: Ma tu dîn î, ev împerator Pétroyê siseyan e.

Jinîkê: Kîjan împerator. Ev, mêrê min Boxoçêf e. Ez ne î dîn in, hon dîn in.

Deng jî tukesî ne dihat. Herçî împerator Pétroyê siseyan, li ser hespê xwe wek heykelekî sekinî bû û xwêh dida. Ma çi bigota, jina wî bû.

Ji şagirtên dilbistanê re

Marşa Tîpan

Em şagirt in, em dixwînin, A. B. C.
Nivîsandin, ew ji me re, armanc e.
Tipên me tev sî û yek in Ç. D. E.
Xweşî ev e, bi zimanê Kûrdmanc e.

Ê. F. G. H. him rihet e, him şêrin.
Î. I. J. K. xweş dixwînim bi qîrîn.
L. M. N. O. hê mayine hinên din.
Geli Kurdan, werin tev de bixwînin.

P. Q. R. S. Ş. T. Û. U. tu meyze.
V. W. X. ne, ez şaş nakim yek levze.
Heşt dengdêr in, heçî dengdar bîst û sé.
Riya ronî dibistan e ma Y. Z..

Qetranî 20/12/943

HISÊNÊ EMÎN

~~~~~

Lê împeratorê derewîn dîsan bû xwediyê îrada xwe û got ko ev jinîk jina Boxoçêf e. Boxoçêf yek jî peyayên wî bû, keti bû destên polîsên Katêrîné û polîsan ew kuştî bû. Jinîk şaş bû bû; ji ber ko Boxoçêf dima împerator. Împeratorê derewîn piştî ko ev çîrok xelas kir, emir da ko biya Boxoçêf bigehfînin aliyê malê.

Lê xelkê baweriya xwe bi vê çîrokê ne anî bû. Ji milê din xelk jî talan û şerabxwe-riyê jî westiya bûn. Dixwestin êdî bigehin netîceke. Boxoçêf an Pétroyê derewîn jî piştî mesela jina xwe gelek kêmkirî bû. Ji ya xelkê kir û eskerên xwe kire du bir. Birek şande ser Moskoyê, birê din jî ser Pêtrêsbûrgê.

Katêrîné vê carê jeneralî Sovorov şandi bû ser împeratorê derewîn. Boxoçêf li ber jeneralî Sovorov pey hev dişikest. Di şerêkî de jina wî a qevqasî hêsr ket. Peyayên Boxoçêf jî hin bi hin terka wî didan. Ji xwe êdî herkes dîzanî ko ew ne împerator l'etroyê siseyan e.

Dawiyê peyayên wî ew girtin û teslîmî Sovorov kirin. Sovorov ew kire qefesekê de û di nav kûçeyên Mosko û Pêtrêsbûrgê de gerand. Sovorov jê re digot, ma te ne dixwest ko tu bikevî Mosko û Pêtrêsbûrgê.

Wextê Boxoçêf anîn hafa Katêrîné û celad dikir serê wî jêke, mêrik digote xelkê dora xwe: Ez împerator dimirim. BIŞARÊ SEGMAN

Dihok: 15 Nisan 1944

## ZÊDEHIYA JINAN

Ma ev ji derdek e, bi me ne derd, lê ji ber vajî ve nîmetek e. Lê ji bo xelkê Emêrikayê û ji bo hin welatên Ewropayê derdek e; derdeki mezin e, û pişporine civaki ji vî derdi re li dermanekî digerin. Biwê nêvê di dawiya vî şerî de ev derd wê hêj mezinîtir bibe. Mêr hero di qadên şer de lêne kuştin.

Li gora statîstîkeke ko beriya vî şerî hate belav kirin di Emêrikê de serê sedî (17) jin ji mîran bêtir bûn û ev nisbet hero mestir dibû. Pişpor li sebebên geriyên û sebebên jêrin jê re ditin:

Hikûmetê mihacerata mîran bend kirîye; yanî nahîle ko xelkê xerîb weke berê herin Emêrikayê, ji xwe re xebatekê peyda bikin û tê de çih bibin. Ji zaroyên şîrmêj yên ko beriya ko bibin yeksalî dimirin, kurik ji keçikan di sedî de (25) bêtir in.

Ev lişt li Ewropayê ji heye. Di welatê Swêçê de yê ko ji mêj ve ne keliye şer zêdehiya jinan, an kêmbûna mîran derdeki mezin e.

Piştî şerê 1914-1918an di hemî dewletên şerewani de mîxêdarê mîran gelekî kêmtir bû. Li gora statîstîkên resmî li welatê Ūris jin di sedî de (32) li Polonyayê (38) li Ingîllere (23) zêde bû bûn. Herçî Franse, Îtalge û Elmange; di van welatan de ev zêdehi di navbera (21) û (22) an de bû.

Di vî şerî de telefiyatên şerewaniyan ji niho de ji şerê bori bêtir in. Heta roja ko şer temam bibe, roj bi roj, ev telefiyat wê zêde bibin. Ji lewre ji niho de pişporên civaki bi vî meselê mijûl in û ji vî derdi re li dermanekî digerin.

Em nîzanin ewê çî dermanê peyda bikin. Lê tiştê ko tete birê û ji hemîyan rahetir e, ew e ko xelkê Ewrope û Emêrikê ji wek me, li gora taqeta xwe, li şûna yekê, ji xwe re çend jinan binin.

Tevdîreke din, adeta beriya pêxember e, yanî veşartina keçikan e. Lê nakeve serê me ko iro hin hebin û qitna xwe pê binin.

Ji xwe erebên cahiliyê çire keçên xwe zindî vedîşartin, Herhal ji ber ko hingê ji keç ji kuran bêtir bû bûn û piştî ko herçeki yek distand nîzani bân ji ên mayîtin çî biktrana û ji lewre ew vedîşartin.


Westê Mihemed (S.E.) hat ji vî adeta hov û kirêl re li dermanekî geriya û gote xelkê li şûna ko hon kegan zindî veşêrin, berdin bîla mezin bibin û hela çar jinan ji xwe re mehir bikin.

Ma gerekê ko Mihemedekî din bê û vî dermanê zêdehiya jinan ji xelkên Ewrope û Emêrikayê re şani bide. Ev e, em ji wan re bibêjin.

Piştî ko me xêzikên jorin nivîsandine ajansan ji Weşingtonê nûçeyek daye zanîn. Li gora wê nûçê nûçesa « Galûp » ji xelkê ev pîrsiyartî pîrsî: « Geto kîjan çêtir e, jîncin di navbera 21 û 25 salan de wek mîran bibin esker û herin qada şer an hemî jinên ko jê xebat lêt û wextên wan ên vala heye, di paşeniyê û di xizmetine neşerani de bêne xebitandin ».

Xelkê Emêrtîkê, di sedî de 76 di raya pêşin de ne. Yanî jin ji mîna mîran herin qada şer. Gelo yên ko di vî fikirê de ne, nebe ko bixwazin bi vî awayî mîxêdarê jinan kêmtir bikin.

RONAHÎ



Balafrvaniya emêrikani. Emêrika bûye mexzena çek û posatên hevalbendan. Balafrka ko klîşa me şanî dide balafrêke emêrikani û ji tipekî nû ye. Ev balafr ref bi ref tene Ingîllere û jê diçin Berlîne û bijarine din ên neyar û wan bombaran dîkin.

## ÇEND

### TÊDERXISTEK

Gula xwendevanan, birayê xuyîn,  
mîrza Osman Sebrî!

Ezbenî, van çend lêderxistekun ji  
bona geşbûna dilê te, bi  
dîyarî ji kekê xwe ê dilîn  
re, pêş-kêş dikim. Heke  
zeman destlûra bersîfê nede  
ji, daxwaz û bersîfa min  
di hêltîna dilê me de ye.  
Ileke divayê çapê ji nebe,  
bûa di lîsa serî û çupa  
heçê me de be.

Di warê gelperestî  
Rîya dûr û pîr dirêj  
Bi hezaran zîvarî  
Belengazî û jarî  
Destpêka wî ji çi ye?

Postê kûzê reş û mar  
Ew şikefta hîrçê sor

Natorê rez û bestan  
Asêgehê daristan

Nêçîrvanên bi taji  
Hawîrdorên wî tji  
Ka rêçgerin li kû ye?

Ez û tu em bûn mêvan  
Li mala pîrê cîha n  
Wargehê mar û teyran  
Te go, kalo dijwar e  
Dilxwaz û çak heval e  
Şargeha te li kû ye?

Govê pezê nav daran  
Qesab girtin sed beran

Gîha nîne berf pîr e  
Bîhara wan bakur e.

Şîvan dibê we xêr e  
Bihar tîmî li jêr e

Ez û şîvan wek kê ye?



Pîştî tav û baranan  
Gava gul tîn eywanan

Her tîn destên xamegîr  
Dişîtin pê beg û mîr

Pîrsa me û te çi ye  
Dilxwaza te li kû ye.

HESEN HÎŞYAR

## SPITFAYÊR



Spîtfayêr tîpekî balafîrên bîtanî ye. Spîtfayêr bi mana  
agirweşan e. Ev balafîrên ha hûr lê xurt û çeleng in.  
Di her baskekî wan de topeke piçûk û du mîrtraloyz  
hene. Van balafîran, wextê ko elemanan dirêjî Londrê  
dikir û carina şev û rojê pê de li payitextê Înglîs-  
tanê dixistin, xizmetîne mezin dîline û bera balafîrên  
elemanî dane.

# EMELIYATA

KO DI KOXIKÉ DE HATE ÇEKIRIN

Dr. Frîdrik Lomis ji peyaki Emîrikê î bi nav û deng e. Hin kitêbên wî li ser tibê hene ko gelek heja û meşûr in. Lê Dr. Lomis hetanî ko bûye Dr. gelek teq û req dîtine. Dr. Lomis ji biserhatiyên xwe ên gelêr yek qise kiriye û gotiye:

Ji piçûkahiya xwe ve min dixwest ez bibim tebib. Ez ketim dibistana tibiyê jî. Lê piştî salekê ez bêgav mam; min terka dibistanê da û ez çûm Elaskayê. Li wê derê ez di kanên zêr de bixabitim û pê debara min dibû.

Min ji bo salekê terka dibistanê da bû. Lê qederê xwest ko ez sê salan di kanên zêr de biminim.

Şeveke fortinê bû; pêlên behirê tavêtin ser tehtên peravan. Ji nişkekê ve li ber deriyê koxika min du zilam peyda bûn. Rewingiyên çayîxeke bi hêlekan bûn. Fortinê qayix avêti bû ser tehtan û ew şêkandî bû.

Ev her du zilam jê xelas bûn. Min ji mêvanên xwe re hinek xwarin pêk ani û cihên wan li erdê çêkir. Di koxika minde tiştê ko mirov jê re text an qenefê bigota peyda ne dibû.

Piştî şivê me xwe li erdê dirêj kiri bû û me sibilên xwe dikişandin. Yekî ji mêvanên min saeta xwe derêxist û lê nihêrt. Ez çî bibinim; bi saetê ve nişaneke civata dibistanên bilind. Ez li xwe heyirî ma bûm; min nema

dikarî bû ez xwe ragirim. Min ji xwediye nişanê pirsî. Ewî gote min:

— Min ji ûnîvêrsîta Harvartê diktora felsefê standiye. Herçî hevalê min ew jî diktore ûnîvêrsîta Yêlê ye. Îro jî seydayê yewnaniya kivin e.

Herçî ez rojê pê de di kanê de xebitî bûm. Cilên min gemar, rûyê min reş, riha min jî dirêj bû bû. Min di dilê xwe de digot heke wan jî bizaniya ko min jî kêm û zêde tiştik xwendiye, ew jî wê li min ecêbmayî bimana. Min çavên xwe li banê odê zelal kir û hêdika tiştê ji odîsê [1] xwend.

Herwekî min texmîn kiri bû welê jî bû. Mêvanên min jî li min ecêbmayî man û ji min pirsîn ko ji çend salan de min terka dibistanê daye. Ji şêrman min gote wan ko ev deh sal in di kanê de dixebetim, lê min tiştêkî heja bi dest ne xistiye. Em kenûn û di xew re çûn.

Dotira rojê min ji wan seh kir ko tatila wan hebû û li şûna ko tatlîa xwe di bajaran de biborînin jî xwe qayîxek peyda kiri re bûn û perav perav digeriyan.

Min ew birin kana ko ez tê de dixebitim; li kana min temaşa kirin. Evarê em dîsa di koxikê de rûniştî bûn û me bi kêf û şahî xeber dida. Min dinya ko berf sê salan terikandi bû di axaftina wan de peyda dikir û pê kêfxweş dibûm.

Ji şevê midêyek çû bû. Me dît ko li deriyê koxikê didin. Me derf vekir; zilamek destên wî li ber çavên wî kete hundir. Zilamekî perîşan û westîhayî. Mêrik bi çend pirsan mesela xwe ji me re got. Ew jî di kanekê de dixebitî; ji ya min bi panzdeh kilomêtiran dût. Dwanzdeh qepson di destên wî de teqîya bûn û avêti bûn çavên wî. Mêrik bihîsti bû ko di koxika min de tebibek heye. Ji lewre qesta min kiri bû.

Minê çî bikira, min nikarî bû jê re bigota

[1] Odîsê esera şairê Yewnaniyana kevin Omîros e.



Selefek ji siwarên eskerên Fasê. Ev siwarên ha di ordîwa fransîzî de bi mêraniya xwe deng dane.

ko ez tebtb im, Min jê re rastî got. Reben wek mirovê ko hêviya dawîn jî winda dike di cihê xwe de cemidî ma û midekî deng ne kir. Min dida eqilê xwe û di dilê xwe de digot, di çentê dermanan de yê ko min bi xwe re ji bajêr anî bû sûşeke kokayînê hebû û di bin sûşê de hînek jê ma bû. Bi zemanî ve ewçend tîr bû bû ko te digot qey merbemek e. Lê çî xem, bi ava germ dîsan ew dibû ron û benc dikir.

Mêrikê min qey tiştê ko min di dilê xwe de digot xwendî bû. Serê xwe rakir û gote min: « Ma tu nikarî tiştêkî biki, dibêjin ko . . . »

Belê rast bû, jê re gotî bûn ko carina ez birnên hevalan derman dikim. Lê ne ko emeliyata çavan çêkim. Digel vê hindê, ma min nikarî bû biceribanda. Ez rabûm, min vapor vexist, misfnek av keland, kokayîn ron kir, dilopjmarê stfloyê şîst û pê çend dilop kokayîn di çavên mêrik kirin. Mêrik hinek bihna xawe da. Bi min re pertavsojek hebû. Ez pê li ser tehtan li toza zêr digeriyam. Min çermên çavên mêrik ji hev kirin û li wan hûr bûn. Çend perçeyên qepsonan di çavekî mêrik re bû bûn. Min mûçinga xwe anî û ew jî derêxistin. Min çavên mêrik bi borîkê jî şuştin; penbû danî ser û ew girêdan. Mêrik xwe li erdê dfrêj kir û di xew re çû.

Piştî sê rojan min çavên mêrik vekirin. Çavên mêrik çêbû bûn. Me ceridak da destên wî. Mêrik xwend û gote min: « Diktor binahiya min vegeyriyê ».

Roja postê hatî bû. Her sê hevalên min xwe kar kirin, ji min xatir xwestin û berê xwe dan bajêr. Profêsoorê yewnaniya kevin gote min:

— Qenciya ko me ji te ditiye em tucaran ji bîr nakin. Tu mirovekî bi heyf î. Heke felekê li te geriyaye nabe ko tu xurtiya vena xwe winda biki û bidî sistiyê. Divêt tu xwe bişidîni û vegeri ser xwendin û zanistiyê

Mêvanên min çûn; ez û xemên xwe bi



Masiyanine britanî di çemê Teymis de masiyan digirin. Dibêjin ko masî ji ber bombeyên ko dikevin behirê xwe didin devên çeman.

hev re man. Hundirê serê min wek stflokê kuçkîrî dikeliya. Emeliyata ko min di çavê mêrik de çêkîrî bû; tiştên xêrxwahane yên ko profesorê yewnaniya kevin gotî bûn min di serê min de bi can dibûn û ji min re tiştine bivên digotîn, nav di min didan.

Rojê pê de min ev tişt da bûn eqilê xwe. Roja din wextê ez hişyar bûm; min hûr-mûrên xwe dan hev û min berê xwe da merkeza nahyê. Merkezê ji koxika min qedere 70 kîlometrî dûr bû. Wextê ez gihastim-ê rast bi rast min qesta çapxanê kir. Dilê min hebû di rojnama na hiyê de îlanekê bidim belav kirin û ji xwe re li xebatekê bigerim.

Emelê rêzker gote min ko mivisevanê rojnamê nexweş e û ji lewre ev çend rojin rojnama dernakevit. Wextê ez li ûniversîtê bûn çendakê di rojnama ûniversîtê de min nivisevanî kiri bû. Min gote mêrik ko ez dikarim rojnama wî derînim. Mêrik bi kêfxweşî herê kir; min jî tavil dest bi xebatê kir

Piştî çend rojan min li cem şirketa elêktrîkê jî xebat dî. Min hisûbdariya şirketê dikir û li ser tilnivîsê jî dinivîsand. Ez salekê li merkeza nahyê jî mam û jê vegeyriya Mişiganê û min jî nû ve dest bi xwendinê kir. Ez ketî bûm sêfa dibistana tîbiyê a didowan.

Min çar salên din di tîbiyê de xwend û ez gihastim miradê xwe, ez bûm bijîşk.

Hetanî fro yadigareke wî mirovê ko min perçeyên qepsonan jî çavê wî derêxisti bûn, bi min re ye. Li ser beltê tîfika min bêşûseke lûncin heye. Wî mirovî ew bêşûs bi destên xwe çêkiri bû û ew jî min re kiri bû diyarî. Gava ez lê dinihêrim, di dilê xwe de ji xwe re dibêjim: Hikmeta Xwedê, ji bo xelaskirina çavê wî Xwedê ew zîlam rêkiri bû koxika min û piştî emeliyata wî ez jî rêkiri bûm merkeza nahyê û ez jî bi wî awayî jî jiyîneke kêr xelas kiri bûm.

#### DILAWER ÇARPÎNE

Wextê min bisertatiya Dr. Frîdrîk Lomis ya ko Mirza Çarpîne jî bo Ronahiyê wergerandiye kurd mawciyê xwend, biserhatike min jî hate bira min. Bi vê hêncetê ez jî dikim wê biserhatiyê berpeyî xwendevanên xwe bikin.

Di sala 1917an de bû. Hingê ez di ordiwa tirkan de zabîb bûm. Em di nivroyê gola Ûrmiyê de şargeb bû bûn. Rojekê mîfrîzekî dijmin bi ser me de girt. Me li hev xist. Di hin deran de me û dijmin bi singoyan bera hev da bû.

Wextê em jî hev vebûn, min li kuştî û birindaran dipirsi. Ji du kuştî û çend birindarên sivik pê ve birindareke xeternak hebû. Kuştî jî xwe kuştî ne dermanên wan nîne. Herçî birindrên sivik îşê wan ne zehmet bû. Lê îşê birindarê giran dişwar bû.

Di qada şer de ez û bolika xwe em bi tena xwe bûn. Ji merkezan dûr û bi me re tu dîktor jî nîn bû. Birindarê giran yekî çawiş bû; digotin-ê Ûsîf çawiş. Tirtireyek bû, bejinbilind, bi gewde û bi dest û lep. Simbêlên xwe ên reş ha dida û ew li pişt guhên xwe wer tanis.

Ûsîf mérékî qenc bû; di şeran de namûs dikir. Ez gelek li ber talaş wî ketim. Ûsîf li ser piştî xwe li erdê dirêj bû bû û kûr dinalî. Singoyê jî newqekê avêtî bû heta bi nemqekê û zikê wî

çirandî bû. Hinek jî rûdiyên wî jî zikê wî der bû bûn û di berzikê wî re gihaştî bûn erdê. Devê birinê qederê du bostan dirêj bû. Ûsîf bi çavine zelul li min dinihêrt; qey jî min meded dixwest. Di vê gola Xwedê de destgirê wî ma ne ez bûm?..

Min da eqilê xwe mérék hemîn wê binira. Ma ne çêtir bû ez ê ne i dîktor min carekê biceribanda ko ez çawişê xwe xelas bikim. Min dudilî ne kir; jî kaniya rex, min salilek ava zelal da anîn; min rûdiyên ko gihaştî bûn axê şîştin û ew vegerandin zikê birindar. Min bala xwe da singoyê tu rûdî ne çirandî bû. Ev tişteki qenc bû.

Min çend neferên xurt û giran anîn û ew li ser sermil û ejnûyên Ûsîf rûniştandin. Di pêşira çakêti min de derzike mezin û pê ve takî stûr hebû. Min rahişte derziya xwe û li zikê Ûsîf xwar bûm; keviyên çermê zikê wî anîn hev û min bala xwe da cihên ko xwin jê dihat ji derve biminin; û zikê mérék jî serî heta serî pihêt dirût. Ne gerek e ez ji we re bibêjin ko mérék têşiha û ji qirika wî mîna dengê gayê ko bêdîka şerjê bikin, dengêki reş û tari derdiket.


Piştî ko min emeliyat temam kir hinek tentûrdiyot li penbûki kir û li devê bicinê geraud û penbûyê mayîn jî danî ser birinê. Min kirasê xwe jî çirand û pê zikê birindarê xwe girêda.

Halê Ûsîf roj bi roj ber bi xêrê bû. Piştî heyvekê em gihaştî bûn Tevrişê. Me Ûsîf şani dîktoran da. Dîktoran jê re got: Di emeliyatê de tu qisûrî nîne; bi tenê ji ber ko kêlên dirûtîne ne rast bûn di ser zikê te de xetere xwar û vajî dê bimîne.

Ûsîf hate destên min û bi ken gote dîktoran: Ev jî yadigara yûzabaşiyê min.....

Niho ez didim eqilê xwe û dibînim; tiştê ko min kiriyê jî yê ko Frîdrîk Lomis kiri bû zêde nebe jî ne kêmtir e. Bi ferqa ko ew piştî emeliyatê bûye dîktor, ez bûme serserîki dinyayê; bê mal û menal û war.

C. A. B.



● Talûka noqavan herçend weke berê ne ma be jî, stola nevatbendan bi her tevdrê dîke, wan kêzzerer bike. Klîşa me vaporeke piçûk şani dide ya ko bi vaporeşfan re diçe û bera noqavan dide.

# DIROKA JÛNA (1) SELÂHEDÛN

3



## DI babelfska dwanzdan da dewleta Ebâsiyan

Ji ber ko diroka jina Selâhedîn bi diroka islaman va e girêdayî ye, nemaze di demeke qels bûna dewleta Ebasiyan da dest pê dike, di vî wari da serpilki nîvisana tiştêkî jî vê dirokê, xwandevanan çêtir serwest dike. Piştî vî fêslê kiçik, bivê nevê çêla hin sebebên serên xaçparêzan kirin jî ne li tinê ye.

Islamiyet wekî dareke mezîn di bin ezmanê rohelatê da şîn û bilînd bû bû. Lê berî ko dema rizîna wî bêl, jî ber hin sebeb belkêu wê weşîn û gelek tîla jî jê ketin. Heke riya me bi golîna van sebebên nakeve jî, em dikarin qels bûna dewleta ebasiyan jî wan sebebên bizanin.

(1) Di hejmarê berî vê (25) rûpel 19 stûn 2 xêz 4 an de xeleteke çapê bi carekê mana bêjeyê guhartiye. Ji lewre me xwast xwandevanan serwest bikin. Di bêjeyê (papas) da tîpa (S) ketiye li şûna (papas Pitris) papa pitris maye. Qesda me jî papas keşe ye. Ji vî keşeyî ra Erebb « Bitris Nasir », Fransîz « Pierre l'Ermil » û em jî de « keşe Pitris » bêjin. Me jî xwandevanan hêvî ye li me negirin û vê xeletê di hejmarên xwe da saz bikin.

Gava xwediyê dîne îslamê Mihemed (S. S.) jî dinê çû giha Xudayê xwe, hevalên wî li ser xilafetê ketî bûn hev. Hinekane dixwast jî malbata pêxember kurman û zavayê wî bikin xelife; hinekane jî dixwast bi benê şewirê bigirin. Dawî ên paşîn zora ên pêşîn hin û Ebûbekir li ser kavilê xilafetê rûnişt. Piştî ko Ebûbekir mela dubaviyê di nav hevalê xwe da dit, gava mirinê şûna xwe siparte Emer; wî jî Osman kiri bû xelîfeyê xwe.

Di dema Xelîfê sisiyan Osman kurê Efan da agirê dubaviyê di nav islaman de xurt bû û dawî bi kuştina xelîfê raweti. Gava xelîfê Medîne û mezînen Qurêşîyan Eli kirin xelîfê, pîsmanê xelîfeyê Mirî Meawiye qîma xwe bi vê yekê ne ani û şerê Eli kir. Çiqa ko Meawiye piştî gelek şer xilafet jî Eli stand û kurê wî Yezid hin kurên Eli kuştin jî, nikari bûn fikira xilafetê jî di û singa wan bi derxin. Çi cihê kurên Eli pê da çûn, her jî xwe ra heval, arîkar û xêrxwaz diin û pê şerê Emewîyan kirin.

Gava koda Emewîyan tije bû û di ser ra rijî, bi navê malbata pêxember Ebasiyan xilafet girtine dest xwe. Lê wan jî Emewîyan pirtir neyariya kurên Eli kir. Kurên Eli dev jî heqê xwe ê xilafetê bernedan û xwe ne siparlîne Ebasiyan. Piştî ko serêkî dirêj di welatên islaman da li pê vê dozê gelek xwin jî xwe û hevalbendên xwe dane rijandin, duri merkeza xilafetê, li Merakîşê jî xwe ra hikûmetek anî pê. Çiqa ko ev hikûmeta hau e duri merkeza xilafeta Ebasiyan bû jî, ne dixwastin wê bi rihetî bihêlin Dema xilafeta Ebasiyan berî da qelsbûnê, vê hikûmeta Elewîyan a li Merakîşê destê xwe da ser Mîsrê û bi navê xilafeta Falîmiyan bingehê hikûmeta xwe danin.

Herî xilafeta Ebasiyan, piştî memûn, jî dest bêkeriya xelîfan roj bi roj berve kelsiyê diçû, jî hêlekê di riya leşkeriyê ra hemî cih û meqamên mezîn di dewletê da ketin destê tirkan; ew tirkên ko bê civandina mal û zorkeriyê tiştêkî li her dilê wan tine bû. Ji hêla din, gava xelîfeyan xizmetekî çak jî yekî diditin dikirin walî; ew walî bi mîras digehiştê kurên wan ko paşê nema xelîfê dinasin. Bi vî awayî heke di wexta Harûn Reşîd da li Erîqayê dewleta Benî Exleb hatî bû pê piştî şerê Emin û Me'mûn jî li Xurasanê dewleta Tahîriyê riç berdane erdê. Piştî van, li her alî walî û mirekan di cihên xwe da çav dane çêkirina hikûmetê û amretan.

Heke Mî'tesim jî ba girtina pêşiya vê

ye kê leşkerê xwe ji xalanên xwe tirkan anî bû pê jî, bê ko tirk pêşiya nerindiyê bigirin û himê xîlafetê xurt bikin, berî rojekê li xirab bûna wê lezandine. Van tirkên han çiqas ko bi xwarziyê xwe Mi tesim ra bêbe-xî ne kirine jî, teqez bi kur û neviyên wî ra rast ne meşine. Ji ber ko hêdî şolê dewletê girtin dest xwe û bê navekî tiştek ji xelfe ra ne lûştin.

Dema waliyan, her kesî di talâ xwe ra serî hildidan û doza serxwebûna êrdima xwe dikirin, serdar û serleşkerên tirk li Bêxdayê bi kuştin û talankirina xelîfan û hev û din behna xwe dertanîn. Bi vî awayî suhna xelîfan û xîlafetê revî û bû berdan-berdan.

Mirovekî ko heya berî rojekê ne tiştek bû sibetirê dibû her tişt. Baweriya kesî ne ma bû. Tima û dilbihewesên mezinatiyê di ser serî û cendekên hev ra xwe digîhandin daxwazên xwe. Serekî dirêj qumandarên leşker xelfe, xîlafet, islam û islemiyet di nav lepên hev da belçiqandin. Heya ko Benî Biwêh zora hemiyarê birin û serkî hikim di dest xwe da girtin.

Paşê tirkên Selçoqî hikim ji Benî Biwêh standin û ji welatê farisan heya derya sipî êxistin bin destê xwe. Ji mirina Mi tesim û heya wê hingê, yanê ji du sed salî de, hinde welatê islaman di bin destê hikûmetekê da ne ma bû. Ji ber ko welatê di bin hikimê xîlafeta Ebasiyan da bû bû pir hikûmet û emaretan. Bê navekî xelfe te'streke biçûk li ser kesî tine bû. Bi tenê navê wî di xilban da tevî navê mîr an serekhikûmet dihate xwandin. Ordiya xelfe a Bêxdayê jî herwekî me li jor goli bû, û bi kuştin û talan-kirina xelfî, wezîr û serdaran wexta xwe derbas dikirin.

Hikmê dewleta selçoqîyan bi sinorê ko me li jor goli bû ne ma. Piştî ko navbera deryayên Xezir û Sipî êxistine dest xwe, berê xwe dane welatê Ereban jî. Tu ne çû Şam girtin û dixwastin dest bavêjin Misrê, merkeza xîlafeta Fatimiyar jî.

Di wê demê da bû ko Selahedîn di nav leşkerê padîşahê Selçoqîyan ê dawiyê Nûredîn Zengî da li Şamê rabû û li Misrê bû siltan. Paşê hemî welatê di bin destê Selçoqî û Fatimiyar da girte bin destê xwe û dawiya şerê xaçparêzan bi dest xwe xist.

Çawan ko Selahedîn bi destê zorê xaçparêz di welatê rohelatê da bi derxistin; bi qencî û dadewerî, zanîn û bireweriyê jî di dîroka Cihanê da cihekî çak û bilind ji xwe ra pêk anî.

OSMAN SEBRÎ



Mr. Çorçilê zabit. Mr. Çorçil bi zabitîyê dest bi jîgîna xwe kiri bû. Serekwezîrê İngilistanê di ciwanîya xwe de getek hej biserhatîyan dikir û jî biserhatikê dida pey biserhatîyêke din. Çorçil gava zabit bû di alaya Hîsaran a çawan de wezîfe didit. Serekwezîr carina alaya xwe zîyaret dikir. Di klîşa forî de Çorçil di nav eskerên wê atayîyê de xuya dike. Her du jî bi kêf xuya dikin; çî esker çî serekwezîr.



Hemedê Keştiyêkê, beriya ko bixêrî û slûndên wê lê bêne siwar kirin. Keştiyê di vî halî da dixîa behirê û paşê kilkitên wê lê siwar dikin.



## PÊNÇI MÏLYON GA Û MÏLYON Û NÏVEK MIROV

Belê heyamek hebû li Emêrikê 50 milyon gayên kovi dijin. Hingê xelkê Emêrikê ji milyon û nêvek peya dibate pê. Nijadê spî yê ko ji Ewropayê çû bû Emêrikê rêhesin û avahiyên medeniyetê ên din ji hej çênekiri bûn.

Xelkê goştê wan gan ê tamdar herve dixwarin, ji kevelên wan ji xwe re cil çêdikirin. Xêra keriyên wan di çemên kûr û fireh de, yên ko didan avê bihârên tenik peyda dikirin û tê re erebeyên xwe diborandin.

Gayê Emêrikê ê kovi heywanekî, fêris û xurt e. Ji simên wî heta piştê wî şeş pê bilind û qedere 10-12 peyan dirêj e. Ji 1800 heta 2400 kiloyî giran e. Kloçên wî ne ewçend dirêj, lê gelekî xurt in. Di navbera her du qloçan de enlke wî e fireh heye. Ev enî jê re gurz û mirtaleki giranbeha ye. Qloçên wî hewqas zexm in ko pê dikare erdine hişk biqelêşe û lê de bigevize. Pî qloçên xwe dikare bera kerikî gura bide û hespekî digel siwarê wî rake û bibe heta sed mêtirî û paşê wan bavêje erdê. Nemaze çêleka wî wextê golikê wê pê re ye şerêkî welê welşiyane dike ko tu dehbe di welşetê de jê nikare derkeve. Di pêşiya wê de çî hebe bê perwa zergî nav çavên wî dike.

Wextê nijadê spî gihaste Emêrikayê mîxdarê van gan pêncî milyon hebû. Kulnêl Doç yê ko hingê di heyabanên Emêrikê de digeriya; di xaliralên xwe de dibêje ko carekê rastî garaneke welê hati bû ko dirêjahiya wê dagihaşte 30 kilomêtirî. Wextê

di çemê Misûrî de garanek ga li avê derbas dibû, vaporên ko lê de dişuxulîn bi rojan ve li hêviya dawîya garanê diman.


Ev gayên ha ji xelkê Emêrikayê re hatineke mezin bûn. Lê qedrê wan ne dizanîn. Gelek îsraf dikirin; seyyaka goştê wan ji ne dixwarin. Mirovîn hebûn, gayek ji bo zimanê wî dikuştin. Ziman dixwarin, goştê mayîn guran dixwar. Carina ji ew bi tenê ji bo çermên wan dikuştin; goşt yekcar tavêtin.

Di sala 1810 an de ew ajotî bûn ber bi çemê Misisipî û di rêlên roavê de lişteki hindik ma bû. Lê garana wan şopine welê hiştî bûn ko ew pişk rê bûn. Gelek bajar di xelaseka wan şopan da hati bûn ava kirin. Ji ber ko wan şopan şûna rê digirtin û bi kerî xelkê bajêr dihatin.

Lê wextê dest bi çêkirina rêhesinan kirin hingê di navbera gan û xelkê de şerêkî no çêbû. Gan stûnên telêgrafan bi qloçên xwe radikirin, diketin pêşiya trenê, bi xwe dihatin perçiqandin, lê tren ji rê derdixistin. Qey dizanin ko ev eserên medenî wê qira wan bînin.

Midirê rêhsinên Pesifikê ji bo kuştina van gan peyayîne xweser girti bûn û mehê 500 dolar mîaş dida wan. Emeleyên rêhesinan ji têr goşt dixwarin. Ji midirên xetê kulnêl Kodi di rojekê de 69 ga kuştî bûn. Wî kulnêlî bi xwe di hejdel mehan de 4280 ga kuştî bûn û ji lewre jê re gotî bûn qesabê gan.

Êdi xuya dikir ko dawîya wan siltanên heywanan dê bihata. Herçi dera ko nijadê spî lê peya dibû gayên binecî jê bar dikirin, diçûn deverine nependî. Lê dawîya milnêçirên ko ji Ewropayê gesta Emêrikayê dikirin, ne dihat û ro bi ro di



TANGEN BRÏTANÎ RÊZ BÛNE, BERÊ XWE DANE QADA ŞER

Emèriké de erdên nependi kêm dibûn. Şelitine hesinû, rêhesinê dîda pey garanên gan.

Di sala 1865 an de hate zanin ko ji wî 50 milyoni bi tenê 15 milyon gayên kovî ma bûn. Di wê salê de milyonek ga hati bûn kuştin. Di sala 1872 an de êdî ji çend garanên pê ve tiştêk ne ma bû. Di sala 1883 an de di wilayeta Montanayê de hêj geranek! mezin hebû; 10000 serî. Avexwarina wê garanê eşkere bû. Segman bi şev şargelî dibûn û gava ga dihatin ser avê ew dikuştin. Ji wê garanê gayek ji ne fîlîtiye.

Herçend ga kêm dibûn ewçend çermên wan beha dibû. Kojeke welê hat ko ji bo mêvanekî eziz li galkî digeriyan ko peyda bikin û goştê wî jê re hidin xwarin. Di wê heyamê de dük Alêksîs mirekêkî ûris, ji bo neçîrê çû bûn Emèrikayê. Hikûmet çend selef esker derêxistin heta ko çend ga peyda kirin, bi ser mir de xira kirin û ew jê re dan kuştin.

Êdî di beyarên Emèrikê de li şûna wan gayên fêris ko lotik didane xwe û dirêji trênan dikirin zevine spi dihatin dîtin. Ew spitahlî hestiyên wan bûn. Erdine welê hebûn ko heta cihê ko

binahiya mirov diçe ji hestiyên ga spi dikirin. Pê şekir diqesirandin û gemara ko ji ber dima dikirin xuşkî (zibil). Gelek mihacîrên ko li Emèrikê bi ci dibûn birekî heqê erdê xwe bi hatina wan hestiyên didan. Carekê ticarekî di yek seferê de 3000 erebe hestî li vaporekê bar kiri bû.

Hetanî iro xelkê Emèrikê ji şop û cendekên wan gan fêdemend dibin. Yên ko iro didin beyabanine emèrikani ên kose cendekên wan ji xwe re dikin ardû. Dîsa xêra van cendekên xwe digehînin kantîne nependi û nenas.

Lê gava gayên kovî li Emèrikê kêm bûn, û tiştêkî nadîde dihatin hesêb; hin hebûn ko dixwestin bendî qelandina wan bibin. Di wê babetê de çend caran di parlemanê de mizakere ji çûbûn. Lê serek-cimhûr Grant qanûna ko di wê babetê de çekirî bûn imza ne kir. Gihaştê dereceke welê ko êdî ga nema dihatine dîtin, yekcar qeliha bûn.

Yekî bi navê Wang Kwit rabû û çar golik, dido mê dido nêr, di mala xwe de bi xwedî kirin. Ji wan çar golikan hêdî hêdî warê gayên kovî şin bû. Ji milê din kulanêl Çarl Gundêt ji, li ser

## WEKILÊ

### kovara me li Iraqê

Wekilê kovara me û herçî neşriyatên kitêbxana Hawarê, ji bo Iraqê Mîrza Mihemed Ernmeşanî ye; di fîdadiya Mûsilê de mamos-tayê kîmyayê.

Em ji xwendevanên xwe yê Iraqê hêvî dikin ji bo her tiştê ko bi neşriyatên me elaqedar e bila miraceetî Mr. Ernmeşanî bikin.

---

hêviya jina xwe çend golik hilanî bûn.

Di sala 1905 an de di wilayeta Montanayê de civatek ji bo parastina gayên kovî hate danin. Hin ga ji ji Elaskayê anîn. Bi vî awayî gayên kovî boş bûn. Lê çî boş bûn. Wextê nijadê spi pê li Emèrikê kiri bûn (50,000,000) bûn. Iro qedere (5000) i hene. Civat li wan miqate dibe. Golikên ko ne ewçend gerek in difroşin beççeyên heywanan û hinan ji didin hindiyên sor, xelkê Emèrikê ê kevin. Li cem wan ew ga heywanekî miqedes e.

SILÊMANÊ FERHO



### Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê 10 lireyên sûrî — Ji bo welatên din lirekî ingiltzî û niv

Xwedî û gerinendeyê herpirsiyar : Celadet Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye

Directeur Propriétaire: Djéladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 3  
EHJMAR 26

1944

HIZÊRAN - TÎRMEH

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR


TELÉFON: 12-29

ANNEE 3  
NUMÉRO 26

1944

JUIN - JUILLET

# RONAHÎ



*Perwaneyên vaporan bi rêhesinê ji fabrikê diguhêsinin benderê.*

ÇAPXANA TEREQIYÊ  
ŞAM — 1944

## DI VÊ HEJMARÊ DE

|                       |                     |
|-----------------------|---------------------|
| Eliyê Bi-tenê         | Çirokbêj            |
| Hisênê Emîn           | Cegerxwîn           |
| Nêçîra Hirç û koviyan | Evdirehman Elî Ünîs |
| Bîher                 | .....               |
| Hinek ji Henek        | Yarîker             |
| Mirovê bi pênc navan  | Qadirê Ferman       |
| Selahedîn             | Osman Sebrî         |
| Ji ber sendûqê        | Smaînê Serhedî      |
| Napolyon              | Osman Sebrî         |
| Hindik Rindik         | Xeberguhêz          |
| Jinên Esker           | Silêmanê Ferho      |
| Reya Taze             | Qedri-Can           |
| Zozan                 | Jandar Mirzango     |
| Frengî                | Smaînê Serhedî      |
| Bêzar Bûm             | Bekir Omer Yehya    |
| Kûsî û rovî           | H. Hişyar           |
| Balafr                | Xwediyê Ronahiyê    |
| Mirî û pasvan         | Xelilê Genco        |
| Serbestî              | Dilkulê Doskî       |

Çîroka Kurdmancî:

### Eliyê Bitenê

*Ev çîrok ji me re torîna mala Eleedin begî, keça Heccî Mûsa begê rehmetî, Qemer xanîmê gotîye. Xwedê wê bi zarowên wê re berxurdan bikît.*

Eliyê Bi tenê mêrekî cesûr bû. Li halê dinyayê dimihêrt û digot; heya ez dinyayê ava nekim nazwîcim. Da rê û çû, ket dinyayê da bibîne çî heye, çî nîne.

Pir çû hindik çû; rojekê giha welatekî. Xani lê hene lê insan tê de nînin. Xelkê terka xaniyê xwe daye û bi çolê ketine. Golek jî di wî welatê de heye. Li golê ejdiharek heye, derdikeve xelkê dixwe. Du sêka dixwe ên mayî direvin.

Eliyê Bitenê li ber wê golê rûdine. Ejdi-har destê sibê derdikeve. Elî wî dukuje.

Elî radibe li serê çiyê agirekî mezin vêdî-xîne. Nelk agir dibîne û têne ser. Dibînin ko ejdihar kuştine. kirine perçe perçe.

Elî gote wan êdî netirsîn, min ejdihar kuştîye, werin di welatê xwe de rûnin. Xelk hatin û di welatê xwe de rûniştin. Elî çû. Deng bi Eliyê bitenê ket.

Elî bi rê de dimeşe; dît du xort vane tên. Go, xortino hon bi kû da derin. Wan go, em navê Eliyê bitenê bihîstîye, em lê digerin.

Go, hon Eliyê Bitenê bibînin honê çî bikin. Gotin, emê bibin birayê wî. Go, ez im Eliyê bitenê. Bûn brayê wî û bi hev ra mîşyan. Yek ji wan xewas, ê din sternas e.

Pir çûn, hindik çûn gibaştin gundekî. Aşayek tê de heye; pir giran e, pir zengîn e. Marekî mezin di xaniyê wî de ye; ji tîrsa

wî nikare rakeve. Kes jî nikare wî bikujê.

Axa bihîst Eliyê Bitenê hatiye gundê wî, şand anî ba xwe, Go, îsal salek e, ez têr xew nakim. Îşev li cem min be ez hinekî rakevim.

Elî go bila be, rabû êvarê birakî xwe şand balê. Ji êvarê de li bendê ma heya xewa wî bat. Birayê din çû balê. Ew jî hat Elî bi xwe çû balê. Elî sekinî heta destê sibê. Axa û jina xwe di nav ciba de raketî ne.

Nihêrî mar ji dîwar derket; şûrê xwe avêtê, mar bû du perçe. Çaxê mar kuşt dilopeke xwîna wî pejiqî eniya axê. Elî go, heye ko gava hişyar bû bitirse. Dil kir wê xwînê bi serê şûrê xwe hilînê. Axa çavê xwe vekir dît, Elî şûrê xwê hilaniye û li ser serê wî sekinîye. Go, dilê wî ketiye jina min, dike min bikujê.

Elî mar avêti bû bin text. Axa ew ne dît, gote Elî, tu here, birayê xwe ji min re bişîne.

Ji birayê wî re go, birayê we xafn e, hon nikarin wî bikujîn? Hon çiqasî mal bixwazin, bidime we.

Gotin, hetanî ko ew hişyar e, em nikarin wî bikujîn, lê gava raket em dikarin wî biku-jîn. Lê mîna aşayê ko kûçikê xwe kuşt û poşman bû em ditirsîn tu jî poşman bibî.

Axa go, dê hikayeta kûçikê axê ji min re bibêjin.

Gotin: Aşayek hebû; kûçikek bixwedî dikir. Kûçik cem axê gelek bi qîmet bû. Rojekê axa çû nêçîrê. Du sê xizmetkar jî pê ra. Axa ti bû; go xizmetkaran herin ji min re avê peyda bikin. Çûn, avek, ji dûr dîtin û jê re anîn. Axa dema dikir avê vexwe kûçik li tasê xist û av rijand.

Axê go, herin ji min ra disa ji vê avê bînin. Xizmetkar çûn av anîn. Kûçik disa lêxist û av rijand. Axa hingî qehîrî, lêxist kûçik kuşt, çaxê kuşt li ber ket.

Go xizmetkaran, de min bibin wê avê pêş min bikin. We ev av ji kû anî.

Çûn ser awê. Axa nihêrî li avê heywanekî mirî heye û genî bûye. Dona wî heliyaye û avêtiye ser avê. Av jêbr e. Yek jê vexwe wê bimire. Axa poşman bû, lê çî fêde ».

Axa gote wan, baş e, hon li cem min bin, salekê bila Elî here. Ew man Eliyê bi tenê bi tena xwe çû.

Elî pir çû hindik çû gibaşte gundekî. Roj jî, rojêke Înê ye. Gund vala ye, herkes bihurîyê mala xwe û derî li xwe girtiye. Elî çû li deriyan kuta û ji xwedîyan pîrsî, go ev çî

halê we ye. Xelkê got, niha yek wê bê û wê derkeve minarê û bang bide. Dengê wî hewqas qebe û bilind e ko ew deng bi guhê kê ket ewê di cih da wê ker bibe.

Eli deng ne kir; çû li her deriyê minarê û li bendê sekini. Gava mêrik hat û dikir hilkişê ser minarê hema bi singa wî girt û got ê: Tu bi kû da terî?

Mêrik lê vegerand û got: Ev der ne ciyê wî ye ko em herin nava hev, ciyê gulaşê hemama lari ye.

Mêrik ji her deriyê minarê vegriya bi aliki de çû; Eli jî li deriyên xelkê da û gote wan, deriyê xwe vekin, mela çû, tu talûke jî îte maye. Bi tenê hemama tari pêş min bikin.

Xelkê hemam şani da. Eli berê xwe da hemamê. Ji dâr ve dâ û dûmanekê xuya dikir; dûyekî reş û tarî, qey jî kana qirê derdiket. Mîrov ne diwêrî nizingî wê bibe. Eli ber pê çû û ket hundirê hemamê. Di nav hemamê de tu av nîne, hema hilmek e, radibe û dike tari. Eli go, vaye ez hatim, ka tu kanî?

Mêrik di nav dûmanê de xuya kir; çûn nava hev, gulaş girtin. Midikê hevûdin gerandin; dikirin ko kês li hev binin. Dawiyê Eli mêrik avêt erdê, şurê xwe kişand ko serê wî jêke. Mêrik bext xwest û pêsiira xwe vekir û got: Eli binê ez qîz im.

Eli çi bibîne, sînga çizkê ye, ne kêm ne zêde; hema ji ser rabû û got-ê: Ji min re tewbe bike ko ji niha û pê de tu xirabiya xelkê nekî. Keçikê tewbe kir û çû.

Xelkê gund jî sedeqa serê Eli re qurban serjê dikirin.

Eli jî wî gundî jî rabû û dîsa bi çolê ket. Pir çû hindik çû gihaste mêrgêkê. Ciyekî çayîr û çîman, gul, nêrgîz û lale û her çêşit çiçek tê de ne. Di nav wan re riyek dibore, şopê dewar û insanan lê hene; lê tûkestê destê xwe ne daye giya an gulekê. Eli di dilê xwe de digot, «divêt di vî îşt de hikmetek hebê, ka ez binêrim çi ye» Eli li ser wê mêrgê rûnişt û li bendê ma.

Karwanekî bazirganan jê ve xuya kir. Karwanvaniyan serê hespên xwe girti bûn; li hespên xwe didan û ne dihîştin ko devê xwe bidin giya û kulîlkan. Eli ber pê çû û got: Rêwinino bisekinîn.

Karwanvani sekinîn. Eli gote wan: Ma hon çîre wisa dikin; dewarên xwe vekin, hespên xwe biçêrin, hon jî rahet binin; sibe bi riya xwe de herin. Ma çi li we qewimiyê?

Wan go: Ji bo Xwedê, em di bextê de

ne, berde em herin. Tu nizanî heke me ew vekirin çi ecêb li serê me digere. Heke me hespê xwe berda û giyayek jî wê solinê hate qetandin wextê em digelîn qeraxa behirê; em tu tiştî nabînin, hema te dit hespê me pey hev dikevin avê û tê de winda dibin. Ev mêrgeke çift e; dibê seyrangeha keçê periyân e.

Eli go, li Xwedê û li min, hema hon rûnîn û xwe vekin, ez Eliyê Bitenê me.

Gava wisa bîlîstînin ehlê karwên hespên xwe vekirin û rûniştin. Bû sibe bazirgana bar kir; Eli jî pê re. Gava gihastin golê Eli gote wan, ji min re hespekî bigirin û çermê wî bikin eyar.

Bazirgana eyarek çêkerin, dan Eli, xatir ji hev westînin û di riya xwe de çûn. Eli pif kirê eyarê xwe, ew berda avê, lê siwar bû û çû. Pir çû, lûndik çû gihaste qeraxa din. Di koşkek e, dora wê bax in, bejçe ne. Eyarê xwe di nav gulbinan de veşart û ket hundirê koşkê. Koşkeke mezin, bist, sî ode tê de hene. Heryek bi rengêkî raxistî, balgihine etlas û qedife. Oda mezinê malê jî xuya ye. Tê de kulinekê heye; Eli ket-ê û xwe veşart.

Midreyek hortî, kevokînin hatin, danînin penceran, pûrtên xwe jî xwe kirin, bûn pişkî insan. Ew keçperî bûn.

Xanima wan hat, di oda xwe de rûnişt. Ên mayin çêriyên wê ne. Ew jî latîni di dora wê de sekinîn; jî xanima xwe re gotin: Ya xanima me, ciyê ko em diçûn-ê û me lê seyran dikir jî destê me çûye.

Xanimê got: Ma çîre?

Çêriyan; Elikt bi tenê heye, bi nav û deng e, hemî cihên xerab çêdike û dixwaze zilmê jî dinyayê hilîne. Di dinyayê de gelek tişt çêkirine. Eli rabû hespê bazirganan berda ser mêrga me.

Xanimê go: Xwezka mi jî ew Eli bidîta, ka çi mêr e, çi pehlewan e?

Eli kulîn vekir, dereket û got: Va me...

Xanimê gava Eli dit, dil pê ket. Got-ê: Ya Eliyê Bitenê tiwê hergav holê bi tenê bimîni, ez û tu va em dibin dido. Min tu qebûl kirî tu bibî mêrê min. Tu jî min qebûl dikî ez bibim jina te.

Eli go: Li ser serê min xanim. Lê mela-yek divêt ko mara me bibire.

Yekê jî çêriyan kurkê xwe li xwe kir fîrî çû heta bajarekî Frengistanê. Dit mela-yek hilkişiyaye ser minarê bang dide. Hema mela hilgirt anî ba xanima xwe. Mela mara wan birl. Mistek zêr dan-ê û mela vegerandin bajarê wî.

Mela wextê bang dida qederê saetekê li ser minarê disekini û digot, heye ko disa werin min bînin û mistek zêr bidin min.

Mela çend rojan li bendê sekini, gava di kes ne hatiye; rabû elam da qralê Frengistanê. Mela çiroka xwe gote qral û wêsfê Esmaperiyê da-yê.

Qral, ji nedi ve kete eşqa Esmaperiyê. Delal berda nav bajêr û got: Pira ko ji min re Esmaperi ani ezê bav, bira an kurê wi bikim wezîr.

Pireke şeytan rabû çû ba qral û got ê: Heke te lawê min kire wezîr ez dikarim Esmaperiyê ji te re binim. Min ji te eyarek micewher ji divêt.

Tiştê ko pirê dixwest dan ê. Pir rabû micewher kirin eyareki, lê siwar bû û berê we da koşka Esmaperiyê.

Pir çû, hindik çû, rojekê gihaşte koşkê. Nihêri çî koşkê, beşçeyek li ber e. Eyarê xwe di nav deviyekê de veşart; laçikeke spi li serê xwe kir, tizbîhek girt destê xwe û ket hundirê koşkê. Pirê gote çerîyan: Qizê min ez pîreke xerîb im. Fortinê qayîxa min bin av kir, ez ketim bextê we û Xwedê. Ez ji welateki dûr im; min bikin mêvana xwe.

Çerîyan, gote xanimê. Xanimê go: Hetani ko Eliyê Bitenê ne hati bû cem me tukesi qesta me ne kir. Ev çendi û çend sal in me tu mêvan ne hewandiye. Ki zane ev pir çîre hatiye. Ji lingê wê bigirin û bavêjin avê.

Di vê navê de Eli hat û bi mesela pirê hesiya. Rabû gote Esmaperiyê: Ma çî xem e, bila bîmine, ewê çî bike, qet nebe ji me re çiroka dibêjê.

Pir bû mêvana wan û ji wan re çirok digotin.

Eli hero li eyarê xwe siwar dibû, dikete behirê û ji xwe re nêçir dikir; carina masî ji digirtin. Eûdi pir bû bû ji malê. Wextê Eli diçû nêçirê bi xanimê re rûdinişt û her tişt digotinê. Rojekê got ê: Xanima min ji min zêde ye, lê ezê bibêjim. Ez dibînim tu gelek hejî mêrê xwe diki û hejî nizanî qeweta wi di çî de ye. Îşê dinyayê belû nabe; te dit rojekê kete tengsiyê; tiwê çawan arikariya wi biki?

Ev gotin ket serê Esmaperiyê. Êvarê wextê ko Eli hate mal jina wi jê pirsî. Eli gote jina xwe: Qeweta min di şûrê min de ye. Heke şûrê mi avêtin avê ez dimirin.

Eli sibe rabû disa çû nêçirê; Esmaperiyê ji gote pirê ko qeweta mêrê wi di şûrê wi de ye. Eli nivrokî ji nêçirê vegeziya, laştê xwar û raket; westiya bû.

Pirê rabû gote Esmaperiyê: Xanima min, mêrê te raketiya; tu ji rabe em dakevin beşçê, tu ji hinek bîhna xwe derîni, li wan gul û çiçeka temaşa biki.

Esmaperiyê gote: «Min tizbîhna xwe ji bir kiriye» û vegeziya koşkê; hilkişiya jor oda xanimê, rahişte şûrê Eli û ji pincerê de avête avê.

Wextê vegeziya beşçê Esmaperi li ber gulana sekini bû û li wan temaşa dikir. Pirê digot. «Ev gul mina te ye, ew mina Eli ye». Bi vi awayî gihaştin deviyê ko eyar lê veşarti bû.

Pir ji nişkekê ve wek hespeki vecinîqî ji ber deviyê xwe da paş û gote Esmaperiyê: Ev çî ye xanima min.

Esmaperiyê xwe da pêş; li deviyê xwar bû. Devê eyar vekiri bû û micewherê tê de xuya dikirin. Esmaperiyê destê xwe dirêj kir û rahişte cewaliran. Pirê ji par re deht da û Esmaperi xiste nav eyar; devê eyar girt, berda avê û lê siwar bû.

Pir çû, hindik çû gihaşte erdê qralê Frengistanê. Esker li qeraxê rêz bû bûn û li rîya pirê dipan. Şahi bi welêt ket, lawê pirê bû wezîr.

Esmaperi ket odekê a gote berdevkên qral, heke berî çil rojî qral bi ser wê de çû ewê xwe bikuje.

..

Çerî nêrin wext dereng bûye, Eli ji xew hişyar nabe. Esmaperi ji çî beşçê venegeriyaye. Çûn lê gerîyan, ne ew e, ne ji pir e. Nihêrin kurkê Esmaperiyê di cihê xwe de ye. Gotin, heywax nema kare vegere.

Birayê Eli ê stêranas bergav li stêrka Eli dinihêrt û dizani ko Eli di xweşiyê de ye. Rojekê di ko stêrka wi vedimire. Rabû gote birayê xwe ê xewas: Bira, stêrka Eli dike vemire, de rabe em herin lê bigerin, ka çî lê qewimiyê.

Rabûn bi rê ketin, pir çûn, hindik çûn gihaştin mêrğa ko bazirgana hespê xwe lê diçêrandin. Mesele ji wan re gotin, saxlûxa Eli dan. Bazirgana îş nas kir; her tişt gotin birayê Eli. Hespê ji wan re gurandin kirin eyar. Her du bira lê siwar bûn, ketin behirê, gihaştin koşka periya.

Nihêrin Eli dirêj bûye, raketiya, bîhna wi li ber wi çikiyaye, wek miriyau e. Çerîyan got ko ev 15-20 roj in ko Eli di vi hali de ye. Mesela pirê ji ji wan re gotin. Li şûrê wi gerîyan; wextê kalau vala ditin zanîn ko xiyaneti tê de heye û şûr avêtine avê. Eyarek dona genekê anîn, li rûyê behirê reşandin.

Žiké behiré bû bû wek neynûkeké; her hiştên té de xuya dikirin. Xewas ket biné behiré û şûr derantî.

Wextê şûr li kalan vegerandin, rih bi Eli ket. Eli hişyar bû; pev şa bûn, gili û gazîndê xwe ji hev re gotin. Xwarin, vexwarin; xwe şiştin, veşiştin û wextê bû sibe, herê xwe dan oxurê, pišta xwe dan felekê; li eyarê xwe siwar bûn û ketin behirê.

Pir çûn, hindik çûn gihastin welatê qralê Frengistanê. Bajareki mezin û bi depdepe. Li rex bajêr xaniyek dilin, xaniki piçûk, wek xaniyê pirê. Ji deri ve dan, silav li pirê kirin û gotin: Yadê cihê mêrvana heye?

Pirê go: Xwelî li serê min, mal mala mêvana ye; rûyê salê reş be.

Çend pere dane destê pirê. Pir çû ji wan re zad anin. Xwarin vexwarin; cardî kêfxweşi dan pirê û jê pirsin, ka di welatê we de çi heye çi nîne.

Pirê mesela Esmâ-periyê ji wan re qise kir û got ko ji wi çil rojî sih ro çûne; dehên din mane, qral dike bikeve gerdekê.

Eli gote pirê: Yadê tu rabe here cem qral, jê re bibêje ma tu çire delh rowê din li bendê biminî. Îzna min bide ez herim cem Esmâ-periyê, hema îşev emê daweta te bikin.

## HISÊNÊ EMÎN<sup>[1]</sup>

*Hîsênê Emîn, emîné welat  
Şihra te xweş e, mîzqîn û berat  
Ez westiya bûm, ji rê derketim  
Lingê min têla, xewa min dihat,  
Ez rakell bûm, xew pir şêrin e;  
Îro Bihar e, ne maye Sibat.  
Te dey li min kir ji xew qevistim;  
Serê xwe hilda, roja me hilat.  
Tana xwe daye çiyayên bilind;  
Tev tê xemilîn, çi dest û çi lat.  
Rengê zêrînî xwe berda welêt  
Sor û zer mane bajar û kelat  
Pir bi min xweş tê, dengê te ê ziz  
Qêrtina piling, qebqeba ribat.  
Ey xortê hêja- mîzqîn im li te  
Xweş ber girtiye bêxçeyê xebat.  
Damarên tehlî hêj tê de mane  
Qet şêrin nabî bê ceng û civat.  
Hîsênê Emîn, emîné welat.  
Te ne hişt razim, xewa min dihat.  
Cegerxwîn dilkul seydayê xortan.  
Rîya me dîr e, warê me welat.*

CEGERXWÎN

[1] Hîsênê Emîn di hejmarê Ronahiye û 2tan de ji seyda gazînd dikirin. Ev şihir ji wê qazîndê re berstveke şêrin e.

Rabûn destmalek tije sêv kirin; Êlî sêvek kola gustilê xwe tê de veşart.

Pirê rahişte destmalê û çû serayê. Dergêvana ew ne hişt ko bikeve hundir. Pirê da ber qira, qral pê hesiya û pir anî cem xwe. Pirê qiseta xwe gote qral. Oral go, ma çawa mi navê, bila be. Ji xwe pîrekê ew ji min re anî, heye ko pîreke din daweta me wê bilezîne.

Pirê birin li ber deriyê oda xanimê. Periyê gava navê pirê bihist din bû, go: ji xwe ev tişt hemî hatine serê min, bi destê pirê. Disa pirê, pîreke din.

Axir pirê ew qanî kir; periyê deriyê oda xwe hi nivî vekir. Pirê destmala sêva wer kire odê. Gustilê Eli ji nav sêvê pekiya. Esmâ-periyê her tişt zanî. Rabû gote pirê: Here bêje qral min qîma xwe anî îşev daweta me ye. Lê şertekî min heye. Piştî dawetê divêt herkes vegere mala xwe û sê şeva û sê roja kes ji mala dernakeve.

Pirê baz da mîzgîni da qral; xelata xwe bir, vegeyira ba Eli. Qral rabû delal berda nav bajêr. Delal bang dida digot; îşev daweta qral e, piştî dawetê divêt herkes vegere mala xwe û sê rojan dernekeve derve. Ji lewra bila herkes ji niho de ji bo sê roja paşroja xwe pêk bine; çarşî; dikan di wan sê rojan de wê girtî biminin.

Xelk tev de çûn daweta qral. Dahol û zirna lêxist, jin û mêr ketin govendê. Eli û her du birayên xwe cilên pîreka li xwe kirin; bûne keçe pirê û digel diya xwe ew jî çûn daweta qral.

Nivê şevê, dawet belav bû, herkes çû mala xwe, bûk û zava bi tena xwe man. Eli bi birayê xwe ve, xwe di kulnê de veşarti bû.

Qral gote Esmâ-periyê: Te çire sih rojî ez di ezabî de hiştim. Ji roja pêşin da me daweta xwe bikira ne çêtir bû. Ma hemin tu ne ji min re yi. De rabe xanima delal em herin rakevin.

Xanimê kir ko ne bihlstiyê û rûyê xwe jê bada. Vê carê qral hinek madê xwe kir û disa got: Ez dibinim, tu guh nadî min. Tu hêj li benda Eli yi. Eli li kû, tu li kû?

Wextê wilo go, Eli ji kulînê derket û go: Va me. ...

Qral gava çav bi Eliyê Bitenê kir hema ji tîrsa mir. Esmâ-perî û her sê bira terka serayê dan; pir jî bi xwe re birin, li eyarê xwe siwar bûn û vegevin koşka periyân. Eli du kepperî dan birayê xwe, wan jî daweta xwe kir.

Min çîroka xwe go ji te re; te ji ew xist çêbika xwe re.

## NÊÇIRA HIRÇ Û PEZKOVIYAN

Ezê bi nêçira pezkoviyana dest pê bikim. Pezkovi jî du celeb hene: mî û bizin. Lê mî ne wek miyên kedî bi dîv in. Dîvê wan destek pehn e. Mî di çiyayên asê de peyda nabin.

Kurmanc bi awayên jêrîn nêçira pezkoviyana dikin.

Dema ko berf çiyana digire nêçirvan helekana jî dar çêdikin û bi piyên xwe ve girêdidin - jî ber ko di berfê de nexewirin - û bi dîvê çexera pezkoviyana diçin; heya ko wan di terezînek an zinarekî de asê dikin û wan bi tîflîngê dikujin.

Awakî din jî nêçira xwêrêjê ye. Li ciyê ko pir çûn û hatina pezkoviyana heye, li wan çiyana wan dirêşînin. Dema ko pezkovi wê xwê dibînin û dixwin êdî heya dawîya wan neqede jê venabin.

Di vê de meseleyek heye. Dibêjin Mihemed hegê nêçirvan xwêrêjek hebû; tim diçû

ber û pezkoviyana dikuşt. Demekê hikûmeta tirk Mihemed beg qedere sê salan jî çihê Botan dîr kir. Dema çû, Mîr li fîlihê xwe tenbî kir û got: «Heya ko ez bêm an bimirim tu bi pezê min ê kovi heftêyê carekê xwê bidî û bê xwê nehêlî û çî dema ko pez hat ser xwê gazî ke û bêje; Mîr pezê te hat ser xwê» û piştî re here mal.

Piştî çend salan mîr veşerîya. Ne çû mal, çû di çepera xwe de rûnişt. Ew roj jî dema xwêrêjê ye. Fileh hat û xwê reşand, jî xwê-rejê bi dîr ket û pez hat ser xwê. File jî hingî aciz bûye gazî kir «Mîr pez hat» û pê re dijûn da. Mîr jî çepera xwe li nêriyêkî da û kuşt; got fîlehê xwe, were hilîne.

Filehê reben di çî de apore bû û got; Mîr hema min bikuje.

Mîr go, te çî dijûn da dîsa bêje.

File got, min ev dijûn daye, hema min bikuje.

Mîr: Min tu efû kir, jî ber ko ev çend sal in, te bi ya min kiriyê û pîrsa min bi çî aniyê.

..

Awakî din jî, nêçirvan bi şev zû radîbin û diçin, di şergehên xwê de rûdînin û diqelîzin; qenc dihesîsînin ka pezkovi li kîjan gend yanî li şergehê sekinîne. Dema ko wan dibînin xwê bi zîkxwîşkî dikuşînin û lêdidin.

Nêçira dema gera wan di dawîya Çirîya paşîn de ye. Nêrî deng li pez dike. Wê demê êdî çaxê gerandîna pez e. Hin derqel û dever hene ko jî bo sekinandîna nêriyan, di kubara sibê de, ciyekî êşkere ye. Nêçirvan wê herin û di berîya şevqê de li wir biqelîzin. Bi panzde deqîqan berîya sewgurê wê nêrî bê ser kevirekî bilind û banî pez bike.

Di vî warî de, Omerê Ezêr, jî çîra modkan, jî bavê mala



*Ev camêrên ha çî dikin?... dîtçijin... dixebitin... Mirovên ko di vê klîşê de tene dîlan eskerine sere ne, jî wan re mîhaftîzên welêt dibêjin. Ew naçin qada şer, di bajarana de dimînin û bi her awayî arikariya şeravanîyan dikin. Lê wextên xwe ên vala bêtişê naborînin. Ew hemî xûdan-sinhel in. Îro fabrikeyên Îngîlistanê tev de çek û aletên cengê çêdikin. Tu fabrike ne maye ko jî zarokan re lehistokan çêkî. Ev camêrên ha bi texteyên xaniyên bombarankirî jî zarokan re lehistokan çêdikirin.*



Egdo, ji gundê Délekê, pirsên jêrîn ji min re gotine.

Di ciyê Şêrwan de çiyayek bi navê Sîser heye. Bi rasti jî si serî di wî çiyayî de hene. Li wir ciyek heye, jê re deriyê Sêsarê tê gotin. Di wî derî de salê zêdeyî si çil nêriyên fêris tîn kuştin.

Di ciyê me de dibêjin ko nêrî çend weqî bez bide, ewçend ritil goşt dide. Pir caran hatiye gotin ko nêriyên Sêsarê beyanî sê ritil bez ji nava wan derêxistine.

Omerê Ezêr nêçîrvanekî bi nav û deng bû. Dema ko ez gibaştim wî, emrê wî çû bû heştê not salan û tim karê wî nêçîra her heywanên kovî bû.

Omer digot herçî nêriyên Sîser û Dozeliyan, piraniya wan bi qiloçên xwe tîn xesandin. Ji ber ko stiroyên wan pir dirêj dibin û li rehên batiyên wan jî paş ve dikevin û rehên wan diqusînin û êdî tîn xesandin.

Di hin zinar û terezinan de pezkovî dikevin qul û şikeftan û ji xwe re dikin meşel û ziveng.

Dema ko nêçîrvan diçin wan ciyan ji xwe jî berê de ci nas kirine û ji reyekê an du reyan pê ve naçin wan. Hema, rê bi zilamên bi çek asê dikin û heke mikûn be wê yek ji wan here şikeftê û pez rake. Heke çûna rê ne mikûn be, wê bi tîngan lêxin heya ko pez jî ci rabe.

Pir caran heye ko pez radibe û rê nakeve dest. Nêrî, hema di wan zinarên ko bi hezar mêtîrî bilind xwe davêjin jêr û heke zinar pir bilind be piraniya wan jî kêr dibe û heke zinar ne pir bilind be hin têne kuştin û hin difilîtin.

Lê pir caran hêj nêçîrvan nagihê şikeftê pez pêjna wî dike, ji ci radibe û di rîya xwe de li nêçîrvan diqelibe û nêçîrvan bi gori serê xwendevanan dibe.

**NÊÇÎRA PEZÊ MÊŞÎNÎ** — Nêçîra pezê mêtîni yanî mî, ew jî wek nêçîra pezê din tê kirin. Lê mî pir bi hev re digerin, wek kolekê. Dema ko nêçîrvan li wan rast tîn û bi tîngan bera wan din. Ew hema li hev dizivirin û li hev du dibin kom. Heke nêçîrvan pir tivignuş be, pir jî wan dikuje.

Hêlevanî jî heye. Dema ko hêlê bête gotin jî wê pirsê wer dixwiye ko nêçîrvan pir ber hev dibin û diçin nêçîrê.

Ewê qederê çil pencî xort bigehin hev û di ciyê de helav bibin. Herçî tivignuşî û tivignên

## BIHAR

Beheşte geştî deşt le Bihara  
Le sayew neşey serwe çinara.

Kizey nêsimela kûşî sewze

Gul etri tika li mêrguzara,

Ser teweqî çiya ba aget awe

Şerme berawird bû negaxara.

Sewzeyê atife be neşeyî giya;

Ro be pê kenen wa li guftara.

Eli Newrûze rojê azadî

S' aike zalim kira be dara.

Benaz û lence be bawe erer,

Şibhi şemale le zulfi yara.

Xwini gûlale ti kawe fîmro

Hem bû şinewe hem bûk û tara.

Dilopi awe le tûşî tawêr

La seyrê zini dide bêzara.

Heryek dilope abite roje

Le eksê roje yek hezare.

Awazi bilbil le bû geşey da

Le ser peli çil wa le çîrara.

Ter pûşe sewzi newî resûle

Fermêzki şewnim wa le gulzara.

Lawoz û sise nêrgizi şehle

Le bo guli bax wa le hawara.

Bê reng û zerda be ezret gula

Giyani der çûyi wa le azara.

Peri hilweri dûre dildari

Wa le şinewe guryan û zara.

Nesrin û wina mixek û rehan

Dest be hel perki le baxê sara.

Kase ke ase le bûni sew bûn

Nasik û nerme reng rengî xara.

Le naw da meni sewzi çiyadex

Eşairant wa le hawara.

Be bê xiyali qesr û moştge

Ejin be xoşt le bin dewara.

genc wê di serê şikêr, rizde, zinar û seriyên bilind de bisekinin û peyayên din wê di çewrik, kortik, şip, şiqêf, newal û mesîlan de bigerin. Dema pez rabû ewên rûniştî wê lêxin.

**NÊÇÎRA HIRÇAN** — Li Kurdîstana bakur nêçîra hirçan bi awayên jêrîn çêdibe.

Eşîrek li rohelatê Sasûn û Motkan heye; jê re eşîra dimbilan tê gotin. Di beriya çil

## HINEK JÎ HENEK

*Ji Piyan Bisekine:* Zilamek hebû; biri bûn ko wî bi dar ve bikin. Kursiyek danî bûn ser masekê, da ko meh-kûm li ser kursî jî piyan bisekine û weris bi stoyê wî ve

bikin.

Mehkûm wextê derket ser masê, hema çû û li ser kursî rûnişt. Celad bi erin got-ê: — Camêr rûmene, hillîqî ser kursî û jî piyan bisekine.

Mehkûm: Li min negirin, ev cara pêşin e ko min bi dar

ve dikin. Ji lewre ez bi isplên wê nizanîm.


### LOYD CORCÊ ŞEŞAN:

Loyd Corc serekwezîrê Ingîlîstane yê herê, rojekê bi timobilê derketi bû gerê. Corc ji bajêr bi dûr keti bû; banzîna wî qediya bû û lê bû bû êvar.

Di wê çolê de qesirek hebû. Serekwezîr di dilê xwe digot, qey ew qesira lordekî ye. Ewê, şeva ywe lê biboranda. Loyd Corc li deriyê qesirê da. Xa-dimekî derf vekir, Loyd Corc mesela xwe jê re da zanîn û got ko dike wê şevê bibe mêvanê qesirê.

Xadîm: Tiwê li kû derê bimînî, te got qey ev der mêvanxane ye. Ev der îfmarxane ye; çihê dinan e.

Loyd Corc: Ez çawan bikim camêr, banzîna min



*Ji Qada Şerê Hindîstanê*

salf de serekê eşîrê Fermanê Şênî bû. Min bi xwe Ferman axa dîtiye.

Ferman pir mirovekî bi goşt û gewde bû. Ji her awayî qalîn û zexim bû. Li salê zêdehî bîst hirçan ji qulên wan derdixist.

Ferman axa digot, deranîna hirçan ji qulan tişteki pir hêsanî ye. Zivistanan hirç ji qula xwe dernakevin û tim lepên xwe dadilêsin. Ji her ko xwarina wan ew e û ax e; pir jar dibin.

Dema ko mirov diçe paşîya qulê û hinç pêjna mirovan dike, hema dibe limelima devê wê, lê deng nake. Bi her du gowên wê digirin û ji qulê dertêxin.

Heke hinek xwe tev bide jî wê di ciyekî kevirên girûz an di ciyekî gocar û xerxûle de dikişînin. Ji ber ko ji pê û lepên xwe pir aciz e; ji ber alastîne pir taze û nazik bûne.

Çi dema ko derêxistin an di cî de dikujiin an girêdidin û tînin mal; ji bo kêfa zarokan.

Ferman axa digot: Rojekê min tîvinga xwe hilanî û ez bi dehl û rêlan de, çûm nêçîra dehan. Ji nişka ve min dît hirçek xwîya bû. Min tîving jî milê xwe anî xwar ko ez lêxim. Min dît hirç bi awakî zarezar û hêvî, ber bi min ve tê. Ez sekinîm û min temaşa wê kir. Hema qedêrê deh mêtiran nîzîgî min bû û ji min re dest kir û dageriya. Ez li dû çûm. Min dît di latekê de serê xwe hilda û bi lez

li min zivîrî.

Hema min tîvinga xwe da mil û serê xwe di latê ve derêxist. Va ye gurek li ser çêliyên wê ne û wan dixwe. Min li gur da. Gur ket erdê, hirçê danî serê wî û bi keviran pelaxî. Hirç ket pêşîya min û disan dest kir, ez li dû çûm. Hirç çû ber dareke mezin; kevir li darê xist û gowê xwe da ser. Paşê ji darê hinek dûr bû û ji min re dest kir. Ez çûm ber darê. Dar tîjî mêşhingivîn e. Niho jî li cem me mal sed kewarmêş ji wan mêşhingivan hene.

### EVDIREHMAN ELÎ ÛNIS

ÇEND PIRSÊN KURMANCEJÎ: Sirûm û silûm yek in. Hin kurmanc dibêin sirûm e hin dibêin silûm. Di pehnavên çîyan de hin e hene ko her du aliyên wî newal an mesil in, navbeyna wan sirûm diimîne.

Apore — Ji mirovê şaş û bê ser û ber re tê gotin.

Bêvêrî — Ji bêhêvî re tê gotin.

Ji pîran re zemberî jî dibêjin.

Ji kijûlê xaniyan re evnate jî dibêjin.

Hin kurmanc ji daristanan re îqar dibêjin.

Ji xaniyan re axban dibêjin û ew xaniyên ko bi yek ta kêran çêdibin jî wî re zîncî dibêjin.

Êrdek ji heywanê tazî re dibêjin.

Ji koç û çlan re obe jî tê gotin.

Hesîsandîin û çesîsandîin, her du jî celebê keşf û teftîşê ne.

Ji giyayê xurniban re kurd kawîr dibêjin.

Ji gumgumok û marmazîkan re kelangîrk û keko-keko jî tê gotin.

E. E. Û.

ne maye; çi hebe ezê îşev li hire bim. Tu dizanî ez kî me; ez serekwezîrê berê Loyd Corc im.

Xadim kenî û got: Kerem bike were; ji xwe li cem me pênc zêlam liene ko dibêjin em Loyd Corc in, tiwê bibîê şeşan.

A MESTIR—Du xanim di tramwayê de rûniştî bûn. Wextê bilêtçî hat, bilêtan bibire, her diwan xwe lezand û pere dan bilêtçî. Heryekê dixwest heqê bilêta hevala xwe bidit. Bilêtçî dikir ne dikir tukesî pereyê xwe bi şûn de ne digirt.

Bilêtçî bi ken gote wan: Ji kerema xwe bila heryek ji min re salên xwe bêjit, ezê heqê bilêtan ji a mezin bistînim.

Wextê bilêtçî holê got, her diwan lez da xwe û pere ji destê bilêtçî girtin.

## MIROVÊ

### ko pênc navên wî hebûn

Vê paşiyê polisa Şiliyê (1) dest danî ser zilamekî, bi navê «Ramon Delavjo». Ramon li ser hisabê mihwerê dixebitî û casûsî dikir.

Ramon di sala 1942an de bi pesaportêke spanî hatî bû Şiliyê. Mêrik xudan sinhet bû. Di fena teswîrê de hin tişt dizanin. Di wextekî kurt de deng pê kel. Ramon zûka ji xwe re nas û dost peyda kirî bûn. Hêdî hêdî ketî bû hela bi civata zabitên mezin, sefir û weziran jî.

Piştî mîdeki bi Ramon re jinikeke genimî û spehî hate ditin. Ramon digote xelkê ko ew jinik dotmama wî ye.

Lê piştî mîdeki pîsman û dotmami jî hev veqetiyân. Herkesî bi

awakt ev veqetandin tefstir kir.

Rojekê, jinikeke spehî hate nik midîrê polisa Santiyagoyê(2). Jinikê xwe da nas kirin; navê wê Marya Delmaso bû. Jinik jî Brézilyayê hati bû Şiliyê. Li wê derê û li Şiliyê jî jinikê di bin emîrê yekî, bi navê «Fritç von Şloben» de jî elemanan re casûsî dikir.

Jinikê gava resimê von Şloben şant midîrê poltsê da midîr di cih de mêrik nas kir. Ew misewîrê ko digot jî Spanayê hatige, bi xwe bû.

Lê çîre jinika ko misewîr digot dotmama min e ew da bû dest. Marya delal ne dotmama Şloben lê dostika wî bû. Marya gelek hejî wî dikir û jî bo xatîrê wê casûsî dikir. Lê Şloben di Santiyagoyê de jinikeke din hebandî bû. Wextê Marya pê hesiya, dexist û dil kir ko heysê jê bistîne û ew da dest.

Poltsa Şiliyê dest danî ser Şloben û dest bi tehqîqatê kir. Tehqîqatê da zanin ko Şloben di vî şert de di welatên Franse, Spanyê û Brézilyayê de li ser hisabê hikûmeta xwe casûsî kirige û çar caran navê xwe guharîye. Bi vî awayî û bi yê xwe bû bû xwediyê pênc navan: Lê ziyanela ko bi dostika xwe kir her tiştên wî dane der û Şloben kete hepsê.

Hewayê bi sêvekê Adem jî bihuştê derxistî bû; Marya delal jî ji ber ko Şloben nema sêwên wê dizwarin ew xiste hepsê.

### QADIRÊ FERMA

[1] Şilî cimhûriyeteke Emêrika nûvro ye.

[2] Payitextê Şiliyê.



Bergehek ji xebata tersxaneyên Îngilîstanê. Îngilîz û emêrikani di tersxaneyên xwe de xebateke zor dixebitin. Ji alîkî cenkeştîyan jî aliyê din vaporinge barkêş çêdikin. Ji ber ko çi esker çi çek û posat ji cihine dâr têne qada şerê Ewropayê.

# DÛROKA JÛNA SELAHEDÛN

4



## ŒERË XAÇPAREZAN

Ji bo Œerë xaçparëzan biçûk û mezîn, hêja û bêrê gelek sebeb hatine nişandan. Ji ber ko daxistina van Œeran bi destê papa hatiye pê, bi tenê sebebên ko xwe digehinin papa emê bidin ber çavên xwandevanan.

Di babeliskên navîn da halê Ewropayê gelekî bi şûn da ma bû. Çiqas ko teesiba dînî gelek bû jî, xelkê ji dîn tiştek ne dizanîn. Her tişt bi navê dîn dibûn: lê dîn ji wan tiştan fêdûr bû, wekî halê îslaman ê doh, an îro jî. Wê gavê hefsarê dîn di destê papa û keşeyan da; yê xelkê jî di destên began, mirek û qiralan da bû. Heke ên pêşîn bi navê dîn xwîna xelkê dimêtin û miqederata wan girti bûn dest xwe, ên paşîn bi destê zorê xwe digilhandine wê yekê. Liingê li Ewropayê, van her du qiwetên han (peyayên dîn û ên zorê) ji ber dubendiye berf dabûn çelsiyê. Ji vî xelkê han ra dawîyeke malkambax ji çavine durbîn ne dihate veşartin.

Peyayên dîn bi navên katolik û ortodoks bû bûn du bendan. Katolikan xwe bi dera Romayê digirtin ko mezîne wan papa bû. Herçî ortodoksan xwe bi dera rohelatê

va girêda bûn ko mezinatiya vê derê bi dest imperatorê Qustantaniyê da bû. Ev dubendiya ko berf îslamiyetê di nav mesihîyan da bati bû pê, di babeliskên navîn da giha bû warekî bê hevî ko xelkên van her du mezhebzan bi çavekî neyarîti li hev dinêrin.

Herçî peyayên zorê, (beg û mirek û qiral), wek eŒîrên me kurdan berf sî salî, ji Œer û lêdan, kuştin û talankirinê pê va tiştek jî jinê ne dizanîn. Heke di hemî Ewropayê da du qiral ji hev ra yar ne ma bûn, tegez ji mirekên di bin destê qiralekî da jî, duduyên ji hev xweŒ tîne bûn. Ji xwe xelkê di her destên wan da, wek miletên di bin destê osmanîyan da, mîna keriyên dewar nezan û ji hemî heqên insanî bê par bûn.

Di wî deraxî da bû ko piştî qels bûna xîlafeta Ebasîyan, hikûmeta Selçoqîyan sînorê xwe ê roavayê gihandi bû ber paytexta imperatoriya rohe at Qustantaniyê û ew tehdid dikir. Çiqas ko berf wê demê Emewî û Ebasîyan jî xwe gihandi bûn wî sînorî û heya çav da bûn vekirina Stanbolê jî, lê hiingê bi qasî wê demê dubavî di navbera mesihîyan da xurt ne bû bû û çavê qeyser ne tirsîya bû. Ji bo ko bikaribûna xwe li ber hiingên Selçoqîyan bigirtana, li pêŒ imperatorê Qustantaniyê rîyeke bi tenê hebû ko ew jî yek bûna her du dêran, dêrên rohelat û roava. Li ser vê, imperator ji papa ra nivîsî û arîkariya wî xwast.

Erê, papa kêseke holê di xwe va derbas ne dikir; lê xelkê Ewropayê ko ji hev ra bû bûn neyar jî zû zû ne dibûn destekî. Wê gavê hin hicacên mesihîyan ko çû bûn Qudsê bi destê hin îslaman hati bûn kuştin. Heye ko îslaman ehda ko pêxemberê wan dabû mesihîyan ji bîra kiri bûn. Papa jî vê kira îslaman a berê destkewfî bû. Li ser destê keşeyê bi nav û deng keşe Pîtris bi navê dîn û vekirina erdê miqedes, xelkê Ewropayê li îslaman hêvot. Heke bi vê hincetê berê Œehsiwarên Ewropayê bidana erdê miqedes, êdî tu tirsî imperatorê Qustantaniyê ne dîman. Selçoqî jî tevî îslamê dîn wê tîketana derdê parastina erdê miqedes da biketana.

Keşe Pîtris ko di nav xelkê Ewropayê da bi zanîn, jîrî, jêhatî bûn û xweŒpeyviya xwe hati bû nasîn, di vê rê da bû destê papa. Ji bo ko di nav qiral û mirekên mesihîyan da yekîtiyekê bîne pê, herçiya ko îslaman ne kiri bû jî, wî ew diêxiste derê wan û pê gunehê wan mezintir nişan didan. Ji bo pêkanîna vê yekîtiyê herçiya ko mikûn bû kir. Ji xwe merkeza papa a di nav mesihîyan da gubê

xelkê bê dijwartî ji gotinên keşe Pitris ra vedikir.

Papa ji bo pêkanîna vê daxwaza xwe a mezin, tenê bi hêvotina vî keşeyê fêris têr ne dikir. Çi gava kês diketê guhên mesîhiyan bi şîretên xwe ên dilsîj tîjî dikir û agirê rik û tolê ji nuh va di sînga wan da vêdixist. Ji xelkê ra dida zanîn ko çî kesê ji bo xilas kirina erdê miqedes ji destê îslaman here şer, dê hemî gunehên wî efû bike.

Di vî warî da gotinên ko papa kirine û gotarên ko gotine gelekî. Bi tenê ji bo serwextkirina xwandevanan emê çend hevokan ji wan gotoran derbasî vir bikin:

« Gelfî mesîhiyan! heya îro we bê sebebî hev ra şer dikir. Hişyar bin, îro ji bo we tiya şerêkî bi rastî vedibe. Berê we bi şerên xwe serêrî hevdi dîçûnd, îro herin wî şerî di rîya xelas kirina welatê miqedes da bi îslaman ra bikin.

« Hûnê ko heya vê demê rêwiyên rîya neqenc bûn û we bê fesadî û xirabiyê tiştekek ne dikir, divê hûn dest bavêjin benê dîn û hemî heyîna xwe di wê rê da bidin xebitan-din; da ko hikarî bin bigehin xêra Xwedê.

« Heke hûn serdest bûn, dê bibin xwediyê welatê rohelat û xêratên wî. Na gava hûn bîndest bibin û li rex gora Mesîh bimirin, teqez Xwedê we ji bîra nake û her yek ji we dê bigehe merteba welîyan.

« Eve, roja ko hûn mîraniya xwe bidin nişandan. Cihê ko hûn hevdi bikujin, herin destên xwe bi xwîna îslamên kafîr bişon... »

Dema papa dibîne ko gotinên wî cih girtin û guhdar bi girfî kirin, hînga destê xwe vedigîre û dibêje:

« Sîpas ji Xwedê ra, ew kesên ko berê leşkerê şeytên bûn niha bûn leşkerê Xwedê. Gelfî guhadaran! gava Xuda Îsa arikariyê ji we dixwaze, bi şûn da me îtîqîn û li mala xwe rûmenin. Bê mesîhiyên ko li erdê miqedes zelû û bîndest bûne tişteki me ramîn û bê navê Qudisê û giriya wê tişteki me bihîsin. Qenc binin bîra xwe ko Mesîh gotiye: ( Çî kesê ji min pirtir ji dê û bavên xwe hez bike ew ne fîjî min e. Lê ê ko ji bo min bav û dê, jin û zarok, mal û welatê xwe biterikîne dê bigehê xêrat û ceneta Xwedê )... »

Herçî beg û mîrek û qiral, tevî ko bi girêkeke xurt bi dîn va ne e girêdayî bûn jî, şîretên papa şopek mezin li ser wan hiştî bû. Ev şopa han ne ji mîldariya wan a ji papa ra û ne ji jî minêkariya çûyîna gaziya Mesîh û mesîhiyan bû. Lê ji bo şerîne nuh û vekîrîna welatîne ava û fîreh dikarî bûn jî sergermiya xelkên xwe destkewî bibûna. Bi vî awayî

şerê ko îslaman çend caran xwastî bû tîxin nîveka Ewropayê, wan dê bixista nîveka welatê îslaman û erdê miqedes. Piştî ko dîne îslamê rabû bû, çend caran dirêjî Ewropayê kiri bûn!.. Ma ne lazim bû ko şehsiwarên Mesîh jî carê ji bo parastina gora wî, dirêjî m'xasên Mihemed bikin?. Ev yeka han ji ramanêke dîni pirtir sergermiyêke mîranî bû; diviya bû bikirana û kirin jî...

Bi van û hin sebebên dîn bû ko hemî dilbihewesên şer tevî dîndarên sergerm, bi fît û hêvotina papa, di bin serkejiya gelek qiral û mîrekan da berê xwe dane Asiyayê; da ko di rîya gora Mesîh da şerê îslaman bikin.

Sîltan Melîkşahê Selçûqî çû rehma Xwedê u peyayên malbata wî, wek ên hemî malbatên sîltan û melîkên wê çaxê, li ser parva-kirina welêt keti bûn gewriya hev û qels bû bûn. Ji xwe hikûmeta îslaman a ko bikarî bûna welat jî êrişeke holê mezin biparastana bû bû pir kerîyan û dev aveti bûn hinavên hev. Di wê demê da bû ko cerdê xaçparêzan ê mezin gîha Asiyayê û tê da lîngê xwe bi cih kir. Bi şelpa pêşîn ra çar bajarên çak xistine dest xwe ko ev in: Rîha, Entakiya, Terablûs û Qudîs.

Di gava standina wan bajaran da heke dora wan xurt kiri bûna û bi xelkê bîndest û binecî ra bû bûna yar, heye ko hemî erdê di navbera wan bajaran da bi rihefî vekirana û her tê da binana. Lê çavê hemî serêkên xaçparêzan li qiraliya Qudisê bû û destê leşkerê wan ji a kêr û ne qenc qut ne dibûn. Roj tîne bû ko bi kirên xwe ên kirêt can û dilê bîndestiyên xwe ne şewitandana. Ji bel van sebebên sîba xwe ne ramîyan û bajarên vekirî, xurt ne kirin. Gava Emadedîne Zengî di sala 1144 an da dirêjî Rîhayê kir, di vekirîna wê da dijwartî ne dît. Piştî ve kirîna Rîhayê ser hêla xaçparêzan keti bû destê îslaman û hêla bakûr jî wan hatî bû standin.

Piştî Emadedîn, kurê wî Mehmûd Nûredîn Zengî jî, berê Heleb û paşê Şam vekir û bi ser welatê xwe va berdan. Serêkî dirêj ne çû ko bi destên Şergub û biraziya wî Selahedîn Misir jî ji dest Fatîmiyan bi derket ko nîvro-royê erdê miqedes jî kete dest neyarên xaçparêzan. Tevayîya Sûriyayê û hinek jî ji Felestîne kete dest Nûredîn Zengî (û hikûmeta mesîhiyan a Qudisê kete nav hesareke tebîî. Di dema sîltaneta Selahedîn da piştî gelek şerên xwînrêj zora xaçparêzan çû û di sala 1193 an da bi tifaqa Rîçarê dişer Selahedîn pinikekî biçûk jî doraliyê Qudisê jî mesîhiyan ra hişt û dawîya mayî jî Felestîne bi ser welatê xwe va berda.

Piştî mirina Selahedîn bi demekî dirêj, di sa xaçparêz rabûn ser lîngan û xwestin erdê ko Selahedîn ji wan standî bi şûn da vegerînin. Lê êdî Ewropa bi şandina leşker û gaziyên westî bû. Piştî ko heviya vekirina welatîne nuh ne çû serî, nema kesî dixwast ji bo dilxweşiya papa, an gora Mesîh here bimire. Nemaze neyariya Selahedîn a bi rûmet rika îslaman di dilê Ewropiyan da bi derxisti bû. Xaçparêzên di erdê miqedes da bi tenê ji ne dikarin xwe li ber xellfeyên Selahedîn bigirin. Dema çav dane vekirina erdê dora xwe, di sala 1291 an da Melîk el Eşref bi carekê erdê miqedes vekir û riça xaçparêzan jê hilkişand.

Erdê, çiqas ko [Selahedîn bi jîrî û jêhatî bûn, mêranî û himeteke nadiide îslamên di hev da ketî kirin yek û serê xaçparêzên di erdê miqedes da nizim kir ji; gelek-kêmasiyên ko di wan da bi derketî rîya li pêş Selahedîn rast, zendên wî xurt û şûrê wî tûj kirin. Berî her tiştî mirekên li Ewropayê bi der diketin û berên xwe didan erdê miqedes; gotina wan li ser mezinatiyê ne dibû yek ko bi vê yekê qels diketin.

A dudiyar, leşkerê ko bi van mirekan ra dihat, piraniya wan ne peyayên şer û rûmetê; lê sêwlek û pêxasên bê kur û xebat bûn. Ev celeb mirov hatî bûn ko li Asiyayê bîrikên xwe ên vala dagirin, ne ji şehsiwarên (şevaliyê) ewropiyan bûn. Ji ber vê yekê rê û rêzanên şerevaniyan ne dizanîn û herçiya jê dihatin bi xelkên bindest û binecî dikirin. Bi vê, rikeke mezin êxistin dilê bineciyan ko di her cihî da arîkar ji bo Selahedîn peyda dibûn.



Lokomotivê ji tîpekî nû. Ev lokomotivê welê hatiye çêkirin ko ba reya wê nabirî û sirhetê wê kêûn nakit.

A sisiyan, serekên xaçparêzan di gerandina rê û doliwa welêt da pir xwe bi dest jinên xwe va berda bûn. Vê yekê ji hilweşîna himê ko bi xwîna serkerên mesîhiyan hati bû ava kirin pir lezand.

Erdêki ko mezin û gerfendeyên wî ji hev ra ne rast bin û her gav bin lîngên hev bikolin, pir ecêb e ko bindest nebe. Ji vê pêva, ew sêwlek û pêxasên ko di nav leşkerên xaçparêzan da ewçend zilm û zînat li xelkên bindest û binecî dikirin ko mesîhiyên bi rasti ji ber van kiran va fihêtkar dibûn. Ma çawan îslamên ko dibûn armanca wê zînatê malkambax dê ne bûna destekî û şerê van neyarên din û welêt ne kirana? 1..

Di vî warî da kitêba (tarîx el mierixîn) dibêje: «Heke dirokniyê û nivîsevanan ji bel benkêşî û terefdariyê çavên xwe ji kirên xaçparêzan ên bêrê ra ne girtana û her tişt rasterê binivîsandana, diwiya bû bigotana: Rezîliyên ko xaçparêzan di erdê miqedes da dikirin, sebebê wenda kirina welatê ko vekirî bûn».

Çiqas ko xelkê Ewropayê di vê rê da gelek xwîn rijand û pir mal da der û dawî ji erdê miqedes bi derketin ji; ev şerên han ji bo wî xelkî hê fêde ne man. Bê şik tîkiliya xelkê Ewropayê bi îslaman ra gelek tişt bi wan dane bûn kirin. Heke ne ew şerana bûna, pir mikûn bû ko heya fro ji Ewropayê nikari bûna xwe ji teesiba dînî bifilitandana û hinde pêş da biçûyana... Dawiya rijandina vê xwînê bû ko xelkê Ewropayê hîdî hîdî gîhande serbestiya ramanê. Ew serbestiya ko di babeliska bîstan da Ewropa kir qiblegaha cihanê.

Pir ecêb e, ev şerên ko papa ji bo xurt kirina nifûza xwe daxisti bûn, dawî bûn sebebê şikestina nifûza wî. Cihê ko dixwast ortodoksan ji gîharê rake û berê aîema mesîhiyan bide dera Romayê bi tenê; piştî van şeran çawan xelkê vebûn û mezheba protistan ji bi derket ko bi çeman xwîn di navhera xelkê Ewropayê da hate rijandin û du parên xelkê dane pê mezheba Lûter û şagirtên wî.

OSMAN SEBRÎ

## JI BER SENDÜQA XANIMÉ

*Ji cerîda emêrikanî «New-yok Herald Tribune»  
hatîye wergerandin.*

Di nizingî nivgîrîva Îtalyayê de, li hem-berê Napoliyê giraveke piçûk û netu heye. Lê di vî şerî de wê giravê hin ehemiyet girti bûn. Talyanan tê de tersxaneke lezbotan danî bû[1].


Wextê talyan teslim bûn, eleman ketin giravê tersxane û heçî avahiyên fabrike; leşem kirin û têlên teqandinê, di bin behîrê re gi-bandin beja pêşmîqebil. Da ko heke inglîz û emêrikanî ketin ê, giravê berhewa bikin. Tê de çend nobetdar û ji bo ko talyan bêbextiyê nekin, emîralek talyanî jî digel jîna wî hiştin.

Sondxwarî pê hesiya bûn. Rojekê behriya sondxwariyan emîrek girti bû. Li gora wî emîrî lezbotê emêrikanî çend kumandosên britanî, dizika bibirana giravê û wan têlên leşeman dê bibirana. Bivê nevé nobetdarên elemanî dê bikuştana û emîralê talyanî jî digel jîna wî wê xelas bikirana.

Lezbotê di cihêkî nependî de lenger avêtî bû. Peyayên kumandos xwe ne dilezandin. Piştî roavê hatin û ketin lezbotê. Pênc zilam bûn; her pênc jî bejinkurt û bêfesal, diman hemalên ko li ber deriyên stasyonên rêhesinê disekin. Hêdî hêdî dimeşîyan, westiyayî xuya dikirin, qey lingên wan ne dihate ber wan. Kirasine singvekirî û pantorine kurt li wan bûn. Herçî silehên wan jî şejderbine kevnare û ji kêrîne fêris dihatin pê.

Te digot qey ji nêzan xelas bû bûn. Rûniştin ne rûniştin hema çend tasên çayê bi qetîne nan bi ser xwe de kirin.

Wextê ko دنیا bi temamî bû tarî lezbot bi rê ket. Dengê motoran bi aletîne xweser



Bombavêjêke britanî di warghê de ji bomban bar dikin.

ker kiri bûn. Li ser pirâ lezbotê, qayîxa qew-çûk ya ko kumandos lê siwar biwana, nepi-xandî, hâzîr xuya dikir, topçî li ber topên xwe rûniştî bûn.

Beriya nivê şeyê bi hindikî, qeretûxa gi-ravê xuya kir. Lezbotê nîzingî lê kir û sekîni. Kumandos hilkişîyan ser pîra vaporê. Keptan gote wan: Honê têlan bibirin, nobetdaran bikujin û heke ji we hat, emîral û jîna wî jî bi xwe re binin. Ji bo vî îşî çiqas wext ji we re divêtin.

Serekê kumandosan got: Îşê saetekê

Keptan: Ma ne gelek e?

Kumandos: Ne jî ber birîna têlan û kuştina nobetdaran; lê ji ber jîna emîrêl. Jinik nizane ko em tèn, heta hûr-mûrên xwe bide hev...

Li ser van gotinan, kumandosan qayîxa xwe daxistin behîrê, lê siwar bûn û berê xwe dan giravê.

Keptan û deryavan bi dûrebûnan li giravê hûr dibûn. Giravê tarî dikir. Di midyê saetekê de tu deng jê ne hat û tu ronahî jî lê xuya ne kir.

Saet temam bû; kumandosan xuya ne kir. Ji giravê jî tu deng ne dihat. Ma kumandos hati bûn girtin. Welê biwa diviya bû dengê tîfîng û şejderban bibata bihistin. Ma dibe ko li ber xwe nedin...

Keptan çavên wî li saetê, ev tişt texmîn dikirin. Ji wextê binavkirî 75 deqîqe borî bûn. Li rûyê behîrê tiştêkî reş kir. Gelo ew kî bûn; dost, dijmin. Topçîyan xwe da topên xwe. Deng li wan kirin. Kumandos bi xwe bûn. Jinikeke hûr û emîralekî ji-xwe-hejkirî bi ûnîformeke zêrheli bi wan re bûn.

Jinik û emîral û sisê ji kumandosan hilkişîyan ser vaporê, serek û kumandosekî jî nû ve berê xwe dan giravê.

Kaptan pirsî: We îşê xwe bire serî?

— Belê, li şûna heft, heşt nobetdar hebûn.

— We tu hêsîr ne girtin?

— No...

Kaptan li kêrên tazî nihêrt; sor dikirin.

Kaptan dîsan pirsî: Ma çîre ev her du vegirîyan giravê.

— Sendüqa xanimê gelekî mezin bû. Sendüqeke kevin û giran; di qayixê de bi me re bi cih ne dibû...».

SMAINÊ SERHEDÎ

[1] Lezbot qayixine bi motor in û li behîrê gelek bi lez diçin.

# DI ROKA

## JINA NAPOLYON

— 10 —

### HEPSA NAPOLYON

Di wê demê da hin büyerên ko li Parisê bû bûn her tişt ser û bin kirin. Berî wê hingê Robîspiyêr, Mara û Dantûn bi hev ra li Parisê hikim dikirin. Ji ber ko hikmê van her sê mirovan bi tirs û çavşikênandin, zilm û zinat ji sinorê eqil û qanûnê bi derketi bû; fransizan bi tewiz ji wî bikmî ra digotin « hikmê sê Xudanan ». Gava xwîn ket çavên her sê Xudanan, bi kuştina xelkê têr ne kirin û dest avêtine hev ji. Berê Robîspiyêr bi arîkariya Dantûn Mara kuşt û paşê hevalê xwe Dantûn ji êxiste pê wi û bi tenê ma. Fransizên ko ji bo cimhûriyetê ewçend xwîna xwe erzan kiri bû hefsarê hikim di destê zalimekî wekî Robîspiyêr bi tenê da ne dihiştin. Ji xwe ev Xudane ko bi tenê li ser liikim ma bû, her ji bo mayîna xwe ji berê pir pirtir xwîn dirijand. Paşê xelkê Parisê lê rabûn ew jî kuştin û xwe ji kêra celat xilas kirin. Xelk ji bi serê Robîspiyêr tenê ne sekinî û çiqas hevalên wî hehûn girtin avêtine hepsê û hîdi hîdi şandine ber kêra celat. Napolyon û birayê xwe Lûsyan jî di wê navê da hati bûn girtin û keti bûn hepsê.

Bi tiştên holê rihê Napolyon ê xurt qels ne dibû. Dengê xwe dighande hikûmeta nû û xebatên xwe ên di rîya welêt da dane ber çavên wê, (çi çare, di demeke holê ko dengê kêra celat dengê tu kesane didan bihiştin da, ên ko bi hevaliya Robîspiyêr hati bûn nasin, an salîkdan bê piştmer û arîkar jî mirinê ne dihiştin. Di wê gavê da yar û piştmerê Napolyon genêral Jûno dest avête kelek û wî a binav û rast kir. Jûno jî pêş hikûmetê û xelkê da zanin ko Napolyon rojekê ji rojan ne hevalê Robîspiyêr bû û gava xwestin ji xwe ra bikin arîkar û binin Parisê jî, qebûl ne kir. Li ser vê şehdeyîya han, piştî ko tiştêk di nav ewraqên Napolyon da ne ditin berdan û dişa vegefî ser firqa xwe û şerê Nemsayê.

Gava Napolyon giha eniya şer û ser firqa xwe, xwest ji hikûmetê ra bide zanin ko bi berdana wî qenebî li xwe kirîye. Ji lewre çaxa ghaştê nav leşker dirêjî nemsewîyan kir, ew jî çeperên wan rakirin û serdestî wan bû. Ev serdestî bû ko rîya ajotîna ser destên Îtalya



bakur ji leşkerê Franseyê ra vekir.

Hingê hikûmeta Parisê bi qasî ko xebata xebatkerane teqdîr bikira ne e dûrbîn bû. Cihê ko di ber mêraniya Napolyon va dilê wî geş bikira, rabû ji eniya Îtalya şande êrdima Lavandê; da ko şerê serxwerabûyan bike. Napolyonê ko topavêj bû, diviya bû li pêş neyarekî xurt şer bike, ne bi çetayên beradayî ra. Ji wê pêva xurtiya ko li pêş çeteyan rave bikira jê ra ne dibû navekî çak. Lê gava serdestî neyaran bibûya, hemî xelkê Franseyê dê bibihîsta. Li ser vê ramanê ev karê ko hikûmetê sipartiyê qebûl ne kir û bi bihaneya nexweşiyê terka karê xwe ê nuh da û çû mala xwe. Hikûmetê jî ji ber vê serhişkiya wî va meaşê wî birî û nedayê. Bi vi awayî zvariyê ji nuh va himbêza xwe ji malbata Bonapart ra vekir.

### *Bi derxistina Napolyon Ji leşkeriyê*

Di wê demê da koma hikûmetê hat guhartin û komeke nuh hate ser hikim. Vê yekê hevîyekê êxiste dilê Napolyon, ji bo ko careke din vegefinin ser karê wî, berê xwe da Parisê. Lê hevîya ko kirî vala bi der ket û daxwaza wî ne hate cih. Di wî deraxî da, ji bo pêkânina leşkerêkî nîzami çak siltanê tirkan hin qumandarên jêhatî ji hikûmeta Franseyê



xwasti bû. Gava Napolyon ji xebata welatê xwe bêhevî bû, xwest ko here welatê, rohelatê, heye ko li wir ji xwe ra navekî çak bikira û himê serbilindiyekê ji xwe ra danîna. Vêcar ji bo vê daxwaznameyek berpêyî hikûmetê kir. Ji ber ko heryekî bixwasta biçe Tirkîyê diviya bû hikûmet li dosiyeya wî binêre. Di vê navê da li dosiyeya Napolyon jî hati bû nihêrtin. Dosiya wî genêralê biçûk ji mixalefet û serhişkiyan tije bû. Çiqas car bi destûr çû bû Korsikayê, bi qasî rojên destûrê jî zêde bi ser va ma bû. Dawiya paşîn karê ko jê ra hati bû dayîn qebûl ne kiri bû. Herwekî ne xwasti be serê xwe ji rêzanên leşkeriyê ra nizim bike, tev bê nizamî û serhişkî bû. Heçko hikûmetê ji nuh va ev kêmasî didîtin, bê ko bişînin Tirkîyê, navê wî jî ji deftera qumandaran bi derxistin.

Piştî ko Napolyon hate Parîsê û serekî dirêj di nav bera hevî û diltengiyê da derbas kir, dawî ji her tiştî bê imîd di cihê xwe da rûnişt. Di vê demê da tengiya ko Napolyon dîtiye nayê bira tu kesî. Ji bo ko xwandevar serwest bibin divê em gulî bidin gotina wî. Gava li girava Sent-Hêlêne bû ji bevalên dora xwe ra çiroka van rojên reş holê gotiye:

« Hîngê ez wekî hemî kesên ko zîvarî bêhna wan diçikîne û rîya ramanê li ber wenda dike, jîn li stoyê min bû bû barekî giran. Bi ser da reşbelekek ji diya min hat, çêla belengazî û destengiya xwe dikir. Tevî ko meaşê min hati bû birîn, di berfka min da jî ji riyalekî pê va tiştî ne ma bû. Êdî hêviya min ji her tiştî hate birîn. Lingên min bê hemd ez berve çem dajotim. Çiqas ko bi çav min, xwe kuştin ne camêrî bû jî, min nema

dikari bû kirasê bextereşî û zîvariye li ser cendekê xwe bihişt. Her min di swast xwe bavêjim avê û ji hemî derd û kulan biflîtim. Di navbera min û vê kirê da tu neşma bû ko hew min dît yekî di pa ra ez himbêz kirim û navê min hilda. Min berê xwe dayê ko hevalekî min ê dibistanê ye. Ev heval ji kurên malmezînan fransîzan bû û tevî hemî xortên malmezînan welat berda bû; lê carcaran ji bo dîtina diya xwe a pîr dihat Parîsê.

Herwekî wî huvalî fêla ( niyet ) di dilê min da li ser çavê min xwandi be, bi dilgermî jî min pirsî:

— Çi li te qewimiye? . . Tu li min mêze nakî, herwekî tu bi dîtina min ne î dilxweş î . . Tu wekî dinan li mirov dinihêriye; wek ên ko dixwazin xwe bikuşînin! . .

Heçko a di dilê min da zani be; êdî min jî rastî jê veneşart û halê xwe û destengiya ko tevî malbata xwe ketimê giştîk jê ra got. Hin gotina min dawî ne bati bû ko camêr kembera xwe vekir da min û got:

— Eve şêş bezar riyal ji te ra. Îro ez ne hewceyî wan im; pê kêmasiyên xwe û malbatê pêk bîne.

Bi wan peran ez û malbat ji tengiyê derketin. Pir neçû dawiya destengiyê hat. Ew hevalê camêr careke din min ne dît. Dema ez bûm împerator û kêsa vegevandina qenciya wî kete min, hînga min şande pê wî û anî cem xwe. Bi zor min şêst hezar riyal pê da qebûl kirin, ew û birayê wî jî xistin yek wezîfeyên bilind.

OSMAN SEBRÎ



Di qada şerê Italyayê de balafirên elemanî ên xerabûyî. Li dûtê batafîrekê xaça Hitler a serîbadayî xuya dike.

## HINDIK RINDIK

**ZIMANÉ ÇIVIKAN:** Mihemed Evdilminhim, gundki sùdanî, xwediye deh zarokan, terka gundê xwe da bû û çû bu çolê; di bin daran re holikek çêkiri bû û tê de dijî. Mihemed bi tenê zarowên xwe ên piçûk bi xwe re biri bûn; en mezin li gund ma bûn.

Mihemed mirovekî bêmad û mirûzdayî bû; bi zarowên xwe re xeber ne dida. Bi roj di çolê de digeriya, êvarê qûtê zarowên xwe tanî, dida wan û di xêw re diçû. Li ser darên ko bi ser holikê de diketin- bi hezaran çivik hebûn.

Mihemed û zarokên wî qederê sê salan li wê derê man. Mihemed rojekê bala xwe da û dît ko zarokên wî di nav hev de bi zimanekî xerib xeber didin. Mêrik zarokên xwe hilanin û hate bajêr. Li zarokan hûr bûn û dîtin ko zarok hîfî zîmanê çivikên dehlê bûne û pê xeber didin û wextê tiştêkî dirêj dixwazin bibêjin, mîna wan çivikan dixwînin.

**YANZDEH KÎLO SÊV:** Di Floridê de, bajarekî Emêrikayê, li ber dafra ko tê de eskerên behrî dinivîsandin, zarokekî bûr û bê dest û lep sekinî bû. Yekî şermok; qey ne diwêrî bikeve hundir. Dawiyê da xwe û ket hafa çawişê ko esker dinivîsandin.

Çawiş gava çav pê kir, jê pirsî: Te xêr e, xortê qenc, li hire çî îşê te ye?

Xort: Ez dixwazim bibin deryavan

Çawiş: Tu çend salî yî?

Xort: Hevdeh salî

Çawiş: Te beriya niho jî miraceet kiri bû?

Xort: Belê, lê hingê gotine min ko wezna min yanzdeh kîlo kêm e.

Çawiş: Û niho?

Xort: Niho min ew yanzdeh kîlo temam kirine

Çawiş: Hingê baş e, em dikarin te qebûl bikin; lê diktor ne li hire ye, divêt tu sibe werî.

Xort berê xwe da derî, bi gavine giran jê derket û di liwanê de sekinî. Çawişê ko bi çavên xwe da bû pey, deng lê kir û jê pirsî: Heke tiştêkî din jî heye bêje...

Xort hinekî sekinî û got «Ma ez hero dikarin yanzdeh kîlo sêv bixwim» û terka dafrê da.

**ÎŞÊ MÎÇANIYÊ:** Fridrixê mezin, qralê Prûsyayê dikir ne dikir bodca hukûmeta wî pêk ne dihat; yanî mesref ji hatinan derdiketin.

Qral rabû giregir û eqilmendên welêt ezimandin taştêkê û gava li ber masa xwarinê rûniştin mesele gotê wan. Qral digot: Ma çawan dibe, me wêrgû bi gilekî zêde kirine; digel vê hindê hatin tu caran nagehin mesrefê.


Heryek bi awakî li mesele hûr dibû û rayek eşkere dikir. Lê dilê qral li wan gotinan rûnedinişt.

Dinya Havîn bû; li ber mêvanan, dijî nav piyanina de qeşa hebû. Li dawiya sifrê jî kalek rûniştî bû. Ew kal rabû perçak qeşa kir destê xwe û ew da ciranê xwe û jê re got ko wê qeşasê bigelîne qral. Naziran qeşa destêda kirin heta ko ew gihandin qral.

Qeşa bi qasî gwîzekê bû, lê hetanî ko giha destê qral bû bû hinde bindeqekê. Qral bi wî awayî zanî îş çî ye.

XEBERGUHÊZ

*Ji bergelên qada şerê Îtalyayê. Balafirvanincor-dîwa heştan balafrîne elcmanî yên ko li rex hev xistine ardê ji xwe re kirine talde û çadîra xwe li ber vegirtine.*



## JINËN ESKER

Herwekî xwendevanên me  
dizanin jin di vî şerî de gelek  
aîrkariya şerevaniyan dikin û  
xizmetine eskerî dibînin. Gelek  
caran jin wezîfene nîzingî xeta  
êgir jî li ser xwe digirin. Jinên  
ûrîs di şerê çetan de rast  
bi rast dibin çete û bera

elemanan didin.

Vê paşiyê wextê sondxwarî  
daketin beja Fransê di nav kuş-  
tiyên elemanan de kezîzereke  
bîst û şeş-salfî dîtin. Keçik di  
ritba bînbaşî de bû û li ber  
destên wê tabûrek piyade hebû.  
Li gora ko hêsrân gotiye keçik  
di mêraniyê de jî gelekî mêran  
derdiket.

Lê hêj yekînekine eskerî jî  
jinan bihevketî ne hatine dîtin.

Li gora kovareke emêri-  
kanî li wextê berê, yekînekeke  
welê di nav reşikên Efrîqa  
navîn de peyda bûye.

Fransîzan di Efrîqa navîn  
de mistemlikeyek heye; jê re  
Dahomî dibêjin. Di sala 1894  
an de fransîzan avêtî bû ser wî

## REYA TAZE

*Ew perdeya reş-tartî,  
Ko jî şevên reş diyarî,  
Min..... jî rûyê xwe kişand..  
li ber çavê xwe çirand..  
û avêt.....*

*Avêt paş sed çiyayî..  
Nava hezar deryayî..  
Min, gemara guhê xwe bi zemzemeke nuh şuşt;  
Û mîqrobên çavê xwe bi dermanekî nuh kuşt!...*

*Ew zingara di mejî,  
ko mejyê min dimijî  
Min..... bi kêrê xeriland..  
û bi agir şewitand..  
û paqij kir....*

*Paqij kir jê serê xwe  
Min avêt jî derê xwe  
Bi çavekî bê perde, bi guhektî bê gemar;  
Didin ser rêke taze, bi mejikî bê ziugar...*

*Ew kufka tîfêlî,  
ko di dil da diçêrî,  
Min..... jî kokê de rakir..  
hêlîna wê xera kir..  
û belav kir...*

*Li rojên derbas bûyî, ti rastiyan kevnare;  
li hevalên ne hemrah, cara paşin selav kir.*

*Min ew pelên rizyayî, jî deftera xwe çirand,  
Di rûpelekî nû de, ayetên taze civand.*

*Êdî..... bi dîtina xwe,  
û bi bîhîstîna xwe..  
Bi vîna xwe û bi mejî  
bi rêve-çûna xwe jî*

*Ez bûm insanekî nû, piwesteşê olek nû,  
Û di bajarê dil de min ava kir holek nû...*

Şam: 25-5-944

QEDRÎ-CAN

## ZOZAN

Zozana bi roj û reng,  
Çar-goşê çemin bi xeng.  
Bîlbîla reşbelek gorî te  
Erzê xav M'kur e bendehê te;  
Rez û bax xemilan Wan.

Kurdîstana bi mam û xal  
Gorîstana bi bav û kal  
Pepûka gewr ser lê xwan  
Gellî û dol deng jê vedan  
Rez û bax xemilan Wan....

Tu nizani çî ezab im, çî sebat  
Çen helame jî bo axa welat  
Wanparêş im, bendehê ew zîlmedes,  
Wan; tu çî dikey, ey bêkes  
Rez û bax xemilan Wan...

Ax û nalînka jî bo te her dikêşim  
Stran û memiyani ber xwe dibêjim.  
Çeşme bû royar bi rondîkê şûr.  
Dilperiti, ez nêzing im, lê tu dûr  
Rez û bax xemilan Wan....

Wan tu bîna min î, di her dem  
Dar û bax, bi dor te bîr dikem  
Mûjêlan tê, mîna ew dar û bax e;  
Brû, Sêber li te hişar û sax e.  
Rez û bax xemilan Wan...

Ey brû, çend tu reş e supêr î  
Te ku e tu ketî di nêv gêrî  
Telîna bîra me ew dikator  
Girtî ye heq her dem bi zîkazor  
Rez û bax xemilan Wan....

Kuro Jandar betal ke tu hûzin  
Evan hevalan, heqî nakujin  
Zango, de bêje wext ne bor ben  
Rez î tîfaqê yek bi deng hon biken  
Rez û bax xemilan Wan....

Qenc û kanc, dê we binin  
Gola bi civcîva ew bizîn  
Şûn-bav û pir em dê bibînin  
Miraza kurd û jandar ez dê bîhînim,  
Rez û bax xemilan Wan...

JANDAR MÎRZANGO

## ÇORÇIL û Eyzenhaver

Eniya didowan vobû, lingên estîyên hevalbendan di beja Fransayê de erd girt. Bi vê hêncelê navên du mirovên mezin di hemî dîngayê ae lêle gotin: Çorçil, Eyzenhaver.

Eyzenhaver seîfemandarê leşkerên hevalbendan e. Çorçil, serkewezîrê Ingîlistanê ye. Çorçil ew zîlanê heja ye ko wextê Ingîllere bi tena xwe çerê elemanan dikir û di gelek deran, de dişkest her û her di got: Emê elemanan bişkênînin û emê wan rojekê bê qeyd û şert teslim bigirin.

Welê dixuye ko ew roj êdî ne dîr e.

welatî. Melik Nehrîn, mezinê welêt, dest biri bû xwe û li ber xwe dida. Di bin emrê melik de firqeyek esker hebû, xwerû jin. Tu mêr di wê firqê de peyda ne dibû.

Ew firqê di sala 1792an de hati bû danîn û ji eskerên wê firqê re jinên melik digotin. Di wê salê de melik Nehrîn şerê melîkekî cîran dikir. Cih li melik teng bû hû; diviya bû xwe bide paş. Lê ne dixwest ko dijmin pê bihese. Melik rabû li ser xeta şer bi çekine bêkêr çend jin hiştin da ko dijmin bilehiwînin; hetanî ko eskerên melik bikevin şargehine nû.

Piştî ko eskerên Nehrîn kişiyan dijmin dirêjî kir. Eskerên jin li şûna ko mîdekî dijmin bilehiwînin û paşê xwe bidin paş; ji dil li her xwe dan û dijmin şkenandin.

Li ser vê mîwefeqiyetê melik Nehrîn di ordîwa xwe de firqeyek eskerên jin saz kir. Eskerên wê firqê ji keçên ko ji mala xwe hati bûn bi der kirin, ji jinên ko ji mîrên xwe hati bûn herdan dihate pê. Ev jinên ha piştî ko dibûn esker nema dizewicîn. Ji lewre ji wan re «jinên melik» digotin.

SILÊMANÊ FERHO





## FRENGÎ

### Û KRISTOF KOLOMB

Herweki nas e, frengî (siftlis) ji dinya nû (Em'irke) hatiye dinya kevin (Ewrope, Asye, Efrîqe).

Belê Kristof Kolomb waxlê ji dinya kevin re dinyake nû diyari kir pê re nexweşike xedar jî, jê re anî.

Di sala 1492an de gemiyên Kolomb ji peravên Ewropê rabû bûn û berê xwe da bûn roavê. Piştî çêud mehan gemî gihastî bûn peravên beja nû. Xelk derkeli bûn pêşiya wan mirovên ko ji dinyake din dihatin. Yê ko hati bûn pêrgiya peyayên Kolombos bi tenê mêr bûn. Wan mêran jinên xwe di koitkên xwe de veşartî hiştî bûn û ew şanî mêvanên xwe ne da bûn.

Mêvanên ewropayî jê re tevdîr dîtin û dizika ntzingî wan jinan bûn. Lê deryavanên Kolombos ji wan jinan nexweşike xedar vegirti bûn. Nexweşiya ko tro jê re frengî dibêjin.

Hin deryavanên Kristof Kolomb li erdê nû ma bûn; ên mayîn vejeriya bûn Spanyayê, bi şan û şerefeke mezin.

Xelkê Spanyayê ew qehreman dikirin ser piştî xwe, ew di kûçan de digêrandin û zefera wan şahînel dikirin. Jinên Spanyayê, wek jinên erdê nû xwe ji wan deryavanan venedişartî. Ji bervajî ve ew bi xwe li wan dergeriyan, ntzingî wan dibûn û mikafata zefera wan ji goştê canê xwe didan. Ma jina rastin ji mêrê qehreman bêtir ji kê dikare hez bike?.....

Lê gelek ne bori jinên spenyolî ên mêrd û nanda bi nexweşiya erdê nû ketin. Belê waxlê ko mirovê dinya kevin pê li dinya nû dikir, nexweşiya dinya nû jî pê li erdê dinya

## BÊZAR BÛM

Bêzarbûm le dro û delesey ew pyawaney ke xoyan be serkirde dezanin, be nawî niştî-manperwerî û guft û goy şî:in hezaran des-xero deken, le pênav bergewendî xoyam be hezaran uemam le naw deben, be hoy em û emewe xoyan, xoyan pêdegeyênin û encamişyan bo komel wekû nebûn be waye.

Bêzarbûm lewaney zor qise deken û biçyan le bara niye û rexmêş lew kesane deşrin ke deyanewê xizmetî komel biken.

Bêzarbûm lew kesaney ke tozêk lapoy zanistyan ber çaw kewlîwe, xoyan be zana dezanin ca rêga le hemû ştek deşrin goya le dinya agadarin.

Bêzarbûm lewaney ke xelik gunahbar deken be şitî xirap, keçî xoyan xawenî ew xirapanen.

Bêzarbûm lew komeley ke rêgey pêş kewtin û serkewtin deşrin. Ca bo ewey yêkik le nawyan dernekewê û be paki nawî bilaw nebêtewe hezar piropogandey le tek deken.

Bêzarbûm lew kesaney her roje rengêyan

heye û le her şiwênêka be rengêk xoyan den-wênin her wiha le her encomenêkişda nawêk le xoyan denên.

Bêzar bûm le waney baweryan be—dest le kîlawî xot bigrew ba neyba—heye ke debê piyaw bo ewey biji waz le hemû şeref û rêz û paki bënë.

Bêzar bûm çünke çawim be gelê kes kewî daway serbestû pakû kar giştî deken belam xoyanin napak we xoyanin duşmîni serbestiw rastî we her xoyanişin le pêşey niyawettî bê beşin.

Bêzarbûm lew kesaney xoyan be genc dezanin û hiç ferêkiyan be ser gêtîyewe da niye, zûrna bo ew kesane lê deden ke xônî xizm û kes û birakanyan denjin be xoyan nazarin.

Bêzarbûm le hemû ştek cige le negorant rastî nebê, em rastiya ke:

Kelk bide be komelî, bixone, fêrt xelk bike,

Rastî ser rast be, diro le gel xelk meke,

Pak be pisi le işda meke,

Dilî xawên bê ewî bo xot dewê bo hawrêka- [niştî,


To wa, minîş wa, ewaniş wa debîn.

BEKIR OMER YEHYA

kevin dikir, diket paşla jinên spanyolî û jê li vê dinyayê belaw dibû.

Di sala 1945an de ji Spanyayê pêve ew nexweşî di bajarê talyant Napoliyê de ji peyda bû. Hin qehremanên hemla Kristof Kolomb daketi bûn wi bajarî. Hingê jê re nexweşiya spenyolî digotin.

Pişî du salan nexweşiya spenyolî gihaste Parisê û jê li dinya alemê belaw bû, û navê frengiyê lê kirin. Di sala 1530î de jê re «sifîlîs» gotin. Lê dermanê wê anca di sala 1905an de hate peyda kirin.



Vaporeke barkêş tmobiline zirelîpûş dadixe beja İtalyayê

Welê dîxuye ko ne bi tenê deryawan lê Kristof Kolomb bi xwe ji bi vê nexweşiyê ketî bû.

Di sala 1494an de wextê ko Kristof Kolomb ji bo cara didowan diçû dinya nû, bi rê ve, gelek caran bi tayê diket, wek take tifoyê. Lê piştê welê texmîn kirin ko ew tayine

frengiyê bûn. Di sefera xwe a sîseyan de Kolombos gelek ji ber vê nexweşiyê êşîha bû. Nexweşiyê avêli bû mejiyê wi, nexweş ji persnan diştexilî. Kristof keke hepsê ji.

Wextê hinek çebû; dîsan çû seferê; lê vê carê falûce bû û welê vegeriya mal û emîrê

Xwedê kir.

Dinya ko ewt keşîf kirî bû li şûna ko bi navê wi bi nav bikin rabûn ew nisbet bi navê yekî təcîr, bi navê Emêrîko ve kirin û navê dinya nû bû Emêrtîke, li şûna ko, bibe Kolombe.

SMAÎNÊ SERHEDÎ

ÇIROK:

## KÛSÎ Û ROVÎ

Li gora ko teba hemenbaş in û timî hevîndû dibinin; carekê kûsî û roviyek bûn destebrakên hev. Kûsî ji rovi pîrsî, çend fenên te hene.

Rovî got: Hezar rîp û xap û fenên min hene; lê kûsî çend fenên te hene?

Kûsî got: Sê fenên min hene û bes.

Rovî got: Qenc e, emê hevaltiya hev û nêçîrê bikin.

Bi vê peymamê her du çûn benda rezeki, da ko dakevin nav rez û tîri bixwin. Lê sêncê rez bilind û neqeb tê tune bûn. Li dorê çûn û hatin. Kuneke kûr û kaş ditin. Ji ber ko kêsa kûsî li cihê kaş nayê, dora rovi bû. Gava rovi ket nivê kunê dav pê ve teqîya û kete lingê rovi.

Kûsî got: Mamê rovi çi bi te hat, te digot bezar fenên min hene, ka fenên te?

Rovî got: Bi şingîna davê fen ji bîra min çûn. Ez ketim bextê te, brakê kûsî ta ji min re dermanekî peyda bike.

Kûsî got: Rovî, tu xwe bavêje mirinê. Gava xwedî hat wê bêje, weyla mîratê, tu çawa mîror bûyî? Ewê te ji davê derxê û çeng bike dera ha. Tu rabe û baz de.

Herwekî kûsî got, rovi welê kir û xelas bû.

Çend şev borin; disa gotin, xwediyê rez nema davê li wir dixê û çûn devê wê kunê. Disa rovi xwe rada qulê û dav pê ve teqîya.

Kûsî got: Rovî te digot, ez xwediyê hezar fenî me, bi fenekî tenê xwe ji davê derxe.

Rovî got: Bawer be, benga li min teng tê, tu fen nayêne bîra min. Ez ketim bextê te.

Kûsî got: Îcar mirin fêde nake; lê tiştêkî din heye. Di gund de roviyê mala axê heye. Sibê gava xwedî hat, hema

tu bike kûzle kûzt û dêla xwe bihejine û serê xwe bêxe nav her du jenûyên wî. Ewê bêje qey roviyê axê ye. Ji tirsan wê zû lingê te derxê û te bike himbêza xwe û bine derê rez û berde, bêt ko axa zanî be û wî talan bike.

Rovî pendên kûsî di guhê xwe de bi cî kirin û sibê wextê xwedî hat, çawa kûsî gotî bû, welê kir û xelas bû.

Piştî çend şevan disa çûn dora rez, îcar qulek di bin diwêr de, dewsa ava Zivistanê ditin. Vêca dora kûsî hat. Kûsî hat û derbasî nivî bû. Bi her du lîngan ve kete davê û got: Mamê rovi ketim bextê te, zarokên min hûr in; tu min kuta ki.

Rovî got: Heke ji min batana, minê xwe xelas kirana.

Êdî dav teqîya bû, rovi bêtîrs pê li piştî kûsî kir û çû nav rez.

Kûsî got: Mamê rovi ji min re jî tîri bine.

Rovî got: Emrê te hema îşev e, tu çi ji tîri bikî?

Rovî tîr tîri xwar, ba kûsî kir û got ê: Kûsî, cihê çêliyên xwe ji min re bêje, belkî ez wan biparêzim.

Kûsî zanî ko dilê rovi heye here çêliyên wî bixwe. Kûsî gote rovi: Were ezê cihê çêliyên xwe goyê te de bibêjim.

Gava rovi goyê xwe anl ber devê kûsî, hişk dev li goyê rovi kir û serê xwe kişande qalîk. Rovî kir û ne kir çare tune; heya li wan bû sibe.

Mêrik hat. Çi bibîne. Goyê rovi di devê kûsî û kûsî di davê de ye. Hema giha rovi, ew serjê-kir; kûsî ji davê derxist û bera bin mewa da û got:

— Weyla kûsiyê pehin, mala te ava; te ji min re ev rovi girt, rez rezê te ye, hema bixwe.

H. HIŞYAR



# BALAFIR

## di bombavêjêke bîtanî de

Di 11ê Galanê de emê siwarî balafirê bibiwan. Ji mêj ve min dixwest, ez ji wek çertlekî bi hewa kevîm û ji jor de temaşa dînya gewrik bikim. Lê heta niho tu firsend ne ketî bû destên min.

Zabîte çapê ê bîtanî kulnêr Marsak (Wing Commander Marsack) ev daxwaza min bi cih anî. Min jê gelek minet e.

Bi hênceta heşt balafirên ko Sûriyê ji ordîwa Bîrîtanya mezin re kirî bûn kulnêr Marsak rojnamevanê Şamê ezînamdî bûn taştêkê. Emê jê biçîwana Mezê û li bombavêjêkê siwar biwana.

Kulnêr Marsak û miawîne wi keplên Priungil (Captain Pringle) di salonên Oryaî-Palazê de mêvanên xwe bi gotînine xweş û bi rûne bi ken dihewandin.

Mêvan, yanî rojnamevan, hin bi hin û pey hev dihatin. Bivê nevê şexalî li ser balafir û li ser siwarbûna wê bû. Hinan digot; emrê me çûye pêncîhî, ji niho û pê de ev tecribe ji me re ne gerek e. Hinên din kêfa xwe jê re tanî. Kulnêl Marsak li min dinihêrt û bi ken digot; ez dizanim tiwê herbal siwar bibî. Wextê min jê dipirsî, tu ji kû dizanî? Digote min, ma tu ne kundî?... Xebera wî bû.

Piştî taştê em li timobîtan siwar bûn û gibaştin balafirgeba Mezê. Bombavêjêke kevna-re, wek hêştîngayekî, ji piyan sekînî bû û di bin tirêjên tavê de qey kayîna xwe tanî. Xwedê dizane wê mekîna ha di vî şerî de çi teq û req dîtine, çend caran ji mirinê xelas bûye?... Lê niho, piştî wan biserbatîyan, wek zabîtekî, teqawîl yê ko di defterxanan de rûniştî, ji şerevanîyê ketî, peyayîne wek me yên ko bîna barûtê û teqîna top û tîfîngan ji bîr kirîna an yekcar ne dît û ne bihistîne, hildigire û di ser erdine ko jê bera wê nadin re digerîne.

Ez di van texmînan de bûn ko kulnêr digel heft peyayên din navê min jî xwend. Ez ber pê çûm û em li balafirê siwar bûn. Derî pihê li me girtin.

Di her aliyên balafirê de rûniştekin hebûn. Çare-çar em li wan rûniştin û balafir hêdî hêdî bi rê ket. Gava mirov di penceran re li derve dinihêrt, digot qey li heywanekî ling-dilind, li hêştîrekî siwar bûye. Lê gelek



ne borî hêştirê me lez da xwe û ji hespekî kihêl jî derket, bû çertelek.

Qertela me hêz da xwe. Wextê me di penceran re nihêrt, ji nişî ekêve me dît ko em jî erdê bi dîr ketine. Qertela me bi firê ketî bû û berê xwe da bû ezîmên.

Êdî lîngên me ji erdê bû bûn; em difîriyan. Wextê em bi firê ketin du tişt hatine bîra min! Xwedê û Seyda Cegerxwîn.

Belê, berî her tiştî Xwedê hate bîr min. Tu mezheb û diyaneta cihanê ne gotiye Xwedê li kû ye. Digel wê hindê perestî, karên hemî dîn û mezheban gava Xwedê lînin bîra xwe û jê re diayê dikin; berê xwe didin ezmanan û destên xwe lê vedikin. Lê heta niho tûkesî ew, ne di ezmanan, ne jî di cihine din de peyda kirine. Ji ber ko cih û mala Xwedê nîne, ew bê şîkil û qalûb e; di her derê de hazîr e; bi eserên xwe, xwe dide zanin û nas kirin. Ji lewre min jî çavên xwe ji ezmanan vegerande wijdana bîrbîriya xwe.

Belê Cegerxwîn jî hate bîra min û min dil kir ko ew jî bi min re biwa û ji balafirê temaşa dinyayê bikira. Cegerxwîn beyraneke balafirê ye. Yên ko şîhrên wî dixwînin dizanin ko Cegerxwîn çav li mîletê xwe ê paşvemayî didêre, û hema çala balafirê dike. Tu dibêjtî qey dil dike mîletê xwe lê siwar bike û di saetêkê de dûrahiya meh û salan bi şûn de bibêle û wî bigêhîne rêza mîletên peşveketî, rêza mîletên ko di ezmanan de difîrin û Seyda dibêje:

*Ey sûxtêyê bê nav û deng,*

*Dijmî li ser balafir e.*

*Ev leşker û top û tîfeng,*

*Seyda ew e, ê mahîr e.*



## M I R I Y Ê

### KO PASVANÊ XWE KUŞTIYE

DI ROJNAMEYÊN MISIRÊ DE, HATIYE XWENDIN

Di xestexaneke Qahirê de nexweşek hebû; gelek caran dilê wî dibort û qedereki bêhiş di- ma. Dikloron derman didan-e, derzi li wî dixis- tin û hişê wî dihate serî. Şevêkê, nexweş disan hişkêling ket, kirin ne kirin, hişê wî lê vene- geriya. Lê hûr bûn, mêrik miri bû. Emir dan nexweşnêran ko wî bibin oda cemdi da ko şibe

bête teşrîh kirin (1).

Nexweşnêran piştî ko mirî ji cilan kirin, birin oda cemdi û xistin nav miriyan. Piştî mideki pasvanê li ber deriyê oda cemdi deng- in bihistin. Pasvan derî vekir û li hundir nihêrt, çi bibînit; yek ji miriyan rabûye ser xwe û gesta derî dikil. Tirseke welê giha pas- vanî ko zmanê wî nema geriya Pasvan digol yek ji miriyan şeytanqûnî bûye û gesta wî dikil. Herçi miriyê ko rabû bû ser xwe û rih pê keli bû, wextê xwe di nav miriyan de dîli bû ew bi xwe ji tirsî bû û dikir ji nav miriyan derkeve û xwe bigehine zindiyan.

Pasvan ji ber mirîki baz dida. Mirî ji ji ûrsa meriyên din dida ber qiran û dikel pey pasvan. Qerebalaxek di xes- texanê de çêbû bû. Memûrên xestexanê xwe digihandin mîri û pasvan.

Mesele eşkere bû bû, nexweşê ko hergav dilê wî dibort wê şevê ji bi dilborinê keti bû. Lê wextê ew birin oda cemdi bi tesira sermayê hişê wî hati bû serî û gava xwe di nav miriyan de dîli bû tirsîya bû û dikir ko ji nav wan der- keve. Herçi pasvanê ko nizant bû iş çî ye, bawer kiri bû ko miriyek şeytanqûnî bûye û ji ber baz da bû.

Nexweş vegeriya qexûşa xwe; lê herçi pasvanê ko ji tirsan zirava wî qetiha bû piştî bist û çar saetan emirê Xwedê kir.

### XELÎLÊ GENCO

(1) Nemaze di welatên germ de miriyên ko hêj mideki di xestexanê de de bimînin, dikin odeke bi geşa an elektrîkê sarkirt da ko bihin bi wan nekeve.



Ji qada şerê Hindistanê. Tersîdgaheke brîtanî.

Belê hemî şîhrên Cegerxwîn yên ko tê de pîrsa balafirê heye dihatin bîra min û min ew ji ker ve dixwendin.

Ji nişkêkê ve min dît, em nîzingî reşahiyê dibûn. Min li derve nihêrt, no reşahî nîzingî nîe bû bû. Em di ser çiyayê Qesyûnê re difûriyan. Bê hemtê min welat; çiyayên welêt hatin bîra min. Ma çi dibû, balafirvan şaş

biwa, berê balafirê bidaya bakur û ez highan- dama Kurdistanê.

Ma kengê?... Ew balafirvanê ko gelek caran di ser bajarine çîra-vevirandî re fîriyaye û tê de armanca xwe dîtiye û li wê xistiye; kengê şas dibû..... Em vegeriya bûn Mezê.

### XWEDIYÊ RONAHIYÊ

# SERBESTÎ

bo çî hemî kes hej serbestiyê dikên?

Serbestî êkemin ronahî ye ko welatî ron diket. Êkemin stêr e li esmanê jîyanê geş diket. Êkemin dar e ko li jêr sîbera wê gel (milet) pal didet. Êkemin gencê welatî ye ko stowê neyaran dixînlit û şkênit.

Jiyar ew jiyar e ya bi serbestî hemî kes heş serbestiyê biken. Belê serbestî ne diyariyek e Xudê didete gelê nivîstî û bi xew. Gel divêt li dûv serbestiyê bigeryêt, serbestî li dûv wî nageryêt. «Tênt li dûv avê digeryêt».

Serbestiyê xûn-rêtin û gorikirina mal û cana bo divêt «Heta zehmetê ne bini lezetê na. bini». Gelekê heyin tam û lezet û xoşî û fat-dêt serbestiyê nizanin. Nizanin ko gelê serbest weko maleke mezin e, çû fesad û xayn û biyanî tê da nîne. Kurê malê ê mestîr û têgehîştîlîr rêberê matêye ko qral e. Evêt di ji hemî xûşk û biraê wî ne û her êk li dûv zîrekî û têgehîştîna xwe şolekî malê dadiket. Ji miwezeftî hela rênçberî hemî dê riha xwe gorê êk û du ken û heçiya pê xoş bibin qiralê wa dê wê bo ket.

Gelê serbest dê bi ezman û tîpên xwe xûnîn; heinî kes dê fêl binê. Çînkî bi sanahî ev fêlbûna nivîstîna ezmanê xwe ji hemî kes dizanin, nîratê bab û baptrên xwe ê giranbaha berze naken ko ew ezman û tîp in. Gelê serbest dê behsê bab û bapir û mêrçak û binwêjê (şair) xwe ket û xînlî. Dê bibin sîbera ala êkî bin ko wergirtiye ji bab û baptrên e.

Hukmeta serbest dê kanêl welatê xwe întederê ew û gelê xwe dê pê heyi bin. Hukmeta mirovî dê bo mirovî gelek debistana û xestê û rêka veket. Dê biraê mirovî ko hakimê mirovî hikim ket û dê bi ezmanê mirovî ligel mirovî axiwi. Hukmeta serbest dê xwe westînlî bo xoşkirina halê colgar û rençberê xwe.

Gelê jin û xoşî bivên di dinyayê da divêt serbestiya welatê wî bibit. Paştî ewa di bi xwe dê bin. Çînkî jîna di welatî neserbest da ne çu jin e. Mana jîne ne saxî û mal û eyal e.

# WEKILÊ

kovara me li Iraqê

Wekilê kovara me û herçî neşriyatên kitêbxana Hawarê, ji bo Iraqê Mirza Mihemed Ermeşani ye; di îdadiya Mûsilê de mamostayê kimyayê.

Em ji xwendevanên xwe yên Iraqê hêvî dikin ji bo her tiştê ko bi neşriyatên me elaqedar e bila miraceetî Mr. Ermeşani bikin.

## AGAHADRÎ

Em ji xwendevanên xwe hêvî dikin adrêsa xvediyê kovarê bi tenê bi awayê jêrin binivîsinin da ko kaxezên wan zû bigebin destên xwedî.

جلادت عالي بدرخان

مهاجرین — دمشق الشام

Mana jîne jiyara li nav welatê xwe ê serbest e; ne getandîna bi çavsort ye li bin tep û mistê zelkî.

Ma jiyar e, jiyara xulamê bi jin û eyal li nav maleke mezin? Ma weko xulam bizanî ev mal û selleneta axayê wî ya wî ye û bi xurtiyê jêstandî, ferz e bi dûv jîna bi xulamê û jin û eyalê bigeryêt. Yan birênite reyêke ko malê xwe ji axayê xwe bistînlî û paştî li dûv mal û eyala bigeryêt.

Gelî mîletê neserbest, gelî Kurdan eger hewe ji serbestî bivêt harikariya hevalbendan biken bo şkandîna nazîyan; neyarêl hemî kesan, neyarêl serbestiyê. Hon bi xwe dê serbestiyê binin. Çînkî hevalbend dîmokrati ne û dîmokrati zilî û îstîmar û rezaletê geblî naket. Ev mebedekt nazî ye; ne î dîmokrati ye û heçweko bil velîvîna mirovî jî pê divêt. Çînkî hevalbend nabêjine mirovî divê îla tu serbest bî.

DILKULÊ DOSKÎ

## Kiriyariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê 10 lireyên sûrî — Ji bo welatên din lirekî ingilîzî û niv

Xwedî û gerindeyê herpirsiyar : Celadet Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 3  
HEJMAR 27

1944

TEBAX-ILON

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

# RONAHÎ

ANNEE 3  
NUMÉRO 27

1944

AOÛT-SEPTEMBRE

TELÉFON:

Ya Malê : 12—29 Ya Çapxanê : 32—10



ÇAPXANA TEREQIYÊ  
ŞAM — 1944

## DI VÊ HEJMARÊ DE

|                       |                   |
|-----------------------|-------------------|
| Rovî û Guri           | Çirokbêj          |
| Ziyareta Melikê Misrê | Smainê Serhedî    |
| Balaştra Bêbalaşvan   | Ronahî            |
| Miriyê li ber Masê    | Evdirehmanê Rojki |
| Keleha Xursê          | Cemilê Haco       |
| Vegirtina Ewropayê    | Rîder Deycest     |
| Mezinê Êlê Elo bî     | Ferhadê Xerzî     |
| Selahedîn             | Osman Sebrî       |
| Diyarî                | X. Bamernî        |
| Dîwan                 | Cegerxwîn         |
| Xebatkerê Hawarê      | Xwediyê Ronahiyê  |

Çiroka Kurdancî:

## ROVÎ Û GURÎ

Rojekê rovi birçî bû bû, digeriha di çolê de. Hingê dit gurikî ji nişkê ve rovi girt, rovi hemdê Xuda kir, kenî. Guri got: «ev şixulek ecêb e, ez te bixwim, tu bikenî, tu hemdê Xuda biki.»

Rovî go: «Ez hêvî dikim tu dirêj neki tu zûka min bixwî, da ez bigêm miradê xwe.

Ji bo guri bû meraq, go: «tu bêji min ev çi halê te ye» Rovî got ê: Dema lawaniya min de, min zehf gunehên kiçik û mezin kirine, mi ji mela pirsî, gotin; tu neçî hecê, mala Xwedê tewaf neki ev gunehên ha ji ser te ranabin. Mela dibêjin dema mirov ji dil berê xwe bidit hecê, ji sêlûna deriyê mala xwe derkevê li kû derê bimirî ji heca wî qebûl dibit. Vêca eger tu niha min bixwî wê heca min qebûl bibit, ezê rûsipî biçim pêşberê Xwedê. Emrê min ji boriye; xweşî û nexweşî ji min gelek ditine.

Wextê we go dilê guri nazik bû şewitî gote rovi: «tu ji dil diçî hecê» rovi go: «belê» Guri go: «Weki niha ez digel te bême hecê tu min digel xwe bibi. Rovî got: «Ezê te digel xwe bibim, ezê xizmeta te ji bikim, ji hire heta wê derê».

Guri ket pêş, rovi ket pey, berê

xwe dan hecê. Wext ji bihar bi, rasta mêrgekê hatin; hêstirek wê ximxima wê ye; giyayî dixwit. Dema hêstirê guri dil, bû firihîna wî, rovi got hêstirê: «Bê edebê, ew mezinêk yê heywana ye, berê xwe daye mala Xwedê» Hêstirê got: «ji dil», Rovî got «belê» got: «hon mi ji nabin, ezê xulamiyê ji hewe re bikim. Rovî got: «belê».

Hêstir ji digel wan çû. Wext ji Bihar e. Hêstir têr av û giyayê Biharê dixwit. Guri tobedar e, tu pezî naxwê, zeif bû, jar bû. Rojekê got rovi «ez idare nakim ji nêza». Rovî got ê: berê me li mala Xwedê ye; guneh bi kêrî me nayê, lê belê em hêstirê bêxî bi rêza şerîetê». guri go, «qonc e».

Rovî got hêstirê «wiha te qenc e, şev û roj tu av û giyayî dixwî û vedixwî, ev camêrê ha birçî diminê, ev ne camerî ye; ne layiqî mezinahiyê ye.» Hêstirê go: «tu çi dibêji, te çi divêt?» Rovî got: «emê salên xwe hisab bikin, heçî kiçiktir emê bixwin» Hêstirê got: «qenc e».

Her sê rûniştin, guri got rovi: «tu bêje tu çend saltî yî». Rovî got: «Cihê tu lê sekini bi ji me zêde ye em mijûl bibin» guri got: «ez nizanin, lê belê diya min ji bo min gotiye sala Midyat ava bûye wê salê Xwedê tu dayî».

Dema guri we got rovi her du destên xwe li serê xwe da; giri, go: «Te birûnê min axivadîn, wê selê du kurên min mirin, sinbêla avêtî bû serê lêva, her du ji min jin ji wan re anî bin» guri got: «tu çiqa mezin î» Rovî got: «dey neke, ez ji bê erzi heta niha mame sax».

Gotin hêstirê tu ji bêje «Hêstirê di di dilê xwe de got, ev şewra xwarina min e, çiqa hêstir zehf emir bike bist salan diminê, emrê wan ji seda ji boriye».

Hêstirê got: «ez nizanim salên min çend in, lê belê diya min ji min re gotiye wextê mi tu sol kiri li ser sola

## ZIYARETA MELÎKÊ MISRÊ

Siltaneke Misrê li ber qesra xwe ziyaretek da bû ava kirin. Siltan emir kiri bû ko peyayên ko di ber ziyaretê re bihoriyana diviya bû lê rawestiyana û li ber wê dia bikirana. Herçî dia ne kira wê bihata kuştin. Lê beriya mirinê mehkûm wê bikariya du tiştan daxwaz bike û ew du tişt wê bihatana bi cih anîn. Bi tenê du tişt jê awarte (îstisna) kiri bûn; xwestina ewfa xwe û rabûna ser textê siltan. Du nobetdar jî li ber ziyaretê danî bûn.

Rojekê solbendekî nexwende ji ber ko nizanî bû bixwîne guh ne da lewha ko siltan li ser deriyê ziyaretê da bû hilawistin û bêtî ko dia bike di ber re boî. Nobetdaran ew girt û bir nîk siltan.

Mêrik got ko ne f xwende ye, li ber geriya, kir û ne kir siltan dev jê berneda. Ji mêrik re gotin ko du tiştan dikare daxwaz bike. Mêrik da eqlê xwe û got:

— Berî her tiştî jî zarokên min re deh hezar dînar bişînin.

Di cih de siwerek bi rê kirin û ji mala wî re deh hezar dînar rêkirin.

Stolbend got: Herçî daxwaza min a didowan ev e ko ezê beriyê ko bimirim li heryekî we bi çokî stûr sê derban lêxim, yek e sivik yek e navîn, yek jî e xurt. Ji ber ko melik mezinê me hemiyan e, ezê ji melik dest pê bikin.

Melik li vî işî ecêbmayî, li wezîrên xwe

nihêrt, wezîr pev şewîrîn. Jê re tu devdîr ne dîtîn. Qanûnê diviya bû ko du daxwazên mehkûm, ji ewfa û ji rûniştina ser text pêve, bihatana cih. Bi mehkûm re dan û standin. Jê re gotin ko cend hezar dînarên din bişînin mala wî. Mêrik jî şertê xwe ne geriya û li ser gotina xwe sekinî

Melik bégav ma, ji textê xwe daket û li ber mehkûmê xwe sekinî. Solbend derbeke welê da melik ko melik ket erdê û midekî bêhiş ma.

Wextê hişê wî hate serî û melik rabû ser xwe ji mehkûm pirsî:

— Ev kijan derb bû, a sivik, a navîn an a xurt.

Melkûm got: Ez bi xwe jî nizanîm ev kijan derb e; wextê min derba didowan li melik da hingê melik bi xwe wê bikare derba sivik û giran jî hev ferq bike.

Melik gava ev bihîst di dilê xwe de got, heke derba li min xistî a sivik e, ezê bi a navîn bimirim, lê heke derba li min xistî a navîn bû, bi a xurt nizanîm wê çî jî min bibe.

Li ser van ramanan melik berê xwe da mihaftên ziyaretê û gote wan:

— Sebavîno! Ma kê jî we re gotiye ko vî camêrî li ber ziyaretê dia ne kiriye. Ewî di-ake welê kûr kiriye ko we ew bir ne biriye. De herin jî vir virkerino, ezê hisabê van vîran bi we re bibînim.

Li ser vê yekê melik mehkûm da berdan û ew deh hezar dînar jî jê ne standin. Ji milê din melik çend emele dan anîn û ziyaret da xerab kirin.

SMAÎNÊ SERHEDÎ



te ya lingê rasle mi emrê te nivisiye.» Guri got rovi: «rabe bixwîne» Rovi rabi ser xwe, jê dûr sekinî, hêstirê lingê xwe bilind kir. Rovi nêrî, vegehiha hat cem guri got: «Serê te xweş, wê salê her du kurên min mirin, çavên min tarî bîne, ez qenc nabînim».

Guri got ev şîxûlê min e, min zehf xwendiyê. Rabi ser xwe ba hêstirê ve çû:

Hêstirê lingê xwe kêşa heta guri taze nêzik bû, çîqa qeweta hêstirê hebi, pehinek danî guri; li nav

beyna her du birhên wi da, her du çavên wi derketin, mejiyê wi li guhê wi re derêxist.

Wextê rovi welê dit kent û giri. Hêstirê go rovi «ne şîna te mirov dizanê, ne şahiya te». Rovi got, «Xwedê zane wekî tê bira min ko guri berê xwe da mala Xwedê giriye mi jê re têt, wekî xwendina wi têt bira mi, teres te kengê li Medresa sor de xwendî bi, véca kenê min tê, Xwedê hela te da te.

Çîrok çû deştê dê û babê me çûn bihuştê.

**BALAFIRA BĒBALAFIRVAN**  
*an*  
**BOMBA FIROLEK**

Piştî ko lingên eskerên hevalhendan di beja Ewropayê de erd girt û fesana dîwarê Etlantikê wek sehwi-rekî belav hû; elemanan heçko sileheke nû keşif kir: balafira bē balafirvan.

Di dora vê sileha nû de elemanan, nemaze ji bo miletê xwe propagandeke mezin çêkir. Belê, nemaze ev propagande ji bo elemanan dihate çêkirin. Ji ber ko manewiyeta miletê elemanan ji zani ko ev dişikest. Çawan ne şikesta; ûris gihastine tixûbên Eleman yayê, ingliz û emêrikaniyan berê xwe daye Parisê.

Hîtlêr dixwest bi vê sileha nû dilqewîniyê bide miletê xwe. Lê gelek ne ajot bi alemê re elemanan ji zani ko ev sileh ne welê ye ko bikare di nav çend rojan de Londrê xerab bike.

Ji xwe tiştê ko elemanan jê re balafira bēbalafirvan gotiye ji bombeke firolek pê ve ne tu tişt e. Bi mekînekê wê herdidin hewayê; bombe di ezmanan re ber hi armancê eve diçe û wextê digelhe ser serê wê, dikeve erdê û diteqe. Bê şik gelek caran dikeve cihine ji armancê bi gelekî dūr.




Kelişeyên rex, wê bomhê an balafirê şanî didin. Balafirvanekî britanî daye pey, li wê xistiye û ev sûret girtine.

(1) Balafir ber bi armancê ve dişire. Roniya ko di bin bedenê re di xuyê texlîtek fanos e. Bi wê fanosê re balafir ji wargehî tete idare kirin.

(2) Balafirvanê britanî bi mîtralyozê agir pê xistiye.

(3) Bomba firolek ji rêveçûnê ketiye û dişewite.

(4) Agir gihastiyê madeyên teqandinê û bombe di hewayê de teqiyaye.



## MIRIYË KO LI BER MASË RÛDINIŞT

Ji kovara  
emêrikani  
Bîd. Deycest  
batîye  
wergemandin

Beriya niho bi sil û pênc salan Çarlêz Karnî û Stêfên Stêlo, du mentûrên kedastryê hilkişîya bûn çiyaki Keliforniyayê û bi karê xwe mijûl dibûn. Wext ji dawîya Îtonê bû. Her du heval gihastî bûn hilindeiban û dikirin berê xwe bidin reya vegeê. Ji sibehê ve ewrine spi di dîrahîya ezmanan de xuya dikir. Wext ji bû bû esir. Ji nişkekê ve pûkek li wan rabû. Çavên wan nema diditin. Dikirin ne dikirin reya xwe peyda ne dikirin.

Stêlo yê ko ji hevalê xwe zexmlîr û bi gewdetir bû, destê Karnî girti bû û ew bi xwe re kaş dikir. Karnî zûka westiya bû; lingên wî nema dihatin ber wî. Karnî digote hevalê xwe; ji min bigere, ez nema dikarin. Lê Stêlo dev ji hevalê xwe bernedida. Stêlo ji nişkekê ve gir kir û gote hevalê xwe:

— Vene, têlên telêgrafê. Bivê nevê ev têl ew in ko kadastryê Bîharê, ew ji bajêr avêline heta koxa serê çiyê. Divêt em berê xwe bidin jor û hilkişin.

Lê, herçi Karnî digot, ez ji te hêvî dikim, ji min bigere, Xwedê zane kox li kû ye...

Stêlo jê ne digeriya, ew bi xwe re kaş dikir û hildikişî. Roj çû bû ava, tariya şevê


daketi bû, lê dinya di bin spitahiya herfê de qey bi ronî bû. Nizingî saetekê hilkişîyan. Gihastî bûn ber deriyê koxikê. Stêlo bi lugekî xwe derî vekir û hevalê xwe rakîşande hundir. Di koxikê de êzing zehf bû; li ser beltên koxikê hînek zûd ji hebû. Di dawîya koxikê de sixurek yê ko ji ber pûkê baz da bû, melâl melâl li halê xwe digirti. Stêlo da şejderba xwe û sixur kuşt.

Karnî bi tayeke giran keti bû. Germiya wî Xwedê dizane rabû bû lieta çend derecan. Stêlo hevalê xwe hilgirt û ew xiste nivînê. Karnî şevê pê de ji pesnan şexilî

Wextê hû sibe; Karnî hînek li ber xwe dit; germiya wî ji daketi bû. Di koxikê de cihazeke telêgrafê hebû. Karnî lê xebitî û îşaretin dane bajêr.

Talêgafxana bajêr li îşaretên dayî, berçend ew hînek tevli hev bin ji, hişyar bû bû. Belê ji wan îşaretan hati bû zanû ko di koxika serê çiyê de, du zelum, ji ber pûkê girti mane û yek ji wan nexweş e û li gora salûxdanê, mîrik bi sellicanê ketiye.

Berfê etlahî ne dida; pê de dibari. Telêgrafxana bajêr ji wan qul ne dibû; dida ber dilê wan. Lê piştî bist û çar saetan êdî îşaretên wan tiştîne bêmaua didan zanû. Di telêgrafeke xwe de digotin; dehsê û cenawir li koxê wer hatine, dirîji me dikin; di dora



Cenkeştine britanî stola talganî a teslîm biyî dane pêşîya xwe û wê dibin bendereke xwe.

kozikê de milyaketên baskspî difîrin û ji me re dîkenin.

Merkezê dizanî ko qezajenti ketine hezeyanê, sehwaran dibinin û ji pesnan dişte-xilin.

Stêlo hevalê xwe ji ber masê radikir û ew dixiste nivînê. Roja siseyan Karnî dîsan ji nav cihan rabû û li ber masê rûnişt. Dixwest bi bajêr re bide bistine. Heyhat, pûkê têl xerab kiri bûn; êdi tu zindî, ji dûr ve ji, bi wan ne dihesiya.

Dinya li wan bû êvar. Stêlo hevalê xwe kire nivînê û derket hewşê da ko êzingan bîne. Wextê vegeriya, hevalê xwe li ber masê, destên wî li ser cihaza telêgrafê peyda kir. Karnî ne di heyecanê de bû. Qermeçekên rûyên wî ên vegirtî, xwe sist kiri bûn, bi raheti li hevalê xwe dinihêrt. Karnî gote hevalê xwe:

— Stêlo ez rahet bûm; ez li ber xwe didim; dikim bimirim. Héviyek ya min ji te heye, tu min zindî veneşêrî. Heye ko dilê min bibore. Li min miqate be; min zindî veneşêre.

Li gora tiştên ko Stêlo di rûznama xwe de nivîsandiyê; dotira rojê êvarkî wextê Stêlo bi goştê sixurê mayî şiv çêdikir Karnî ji ber sifrê ratû bû û keti bû nav cihan. Stêlo li hevalê xwe hûr bû. Karnî miri bû, rih pê ne ma bû. Canê wî cemidî û lişx bû bû.

Stêlo midekî ma, çareke din hevalê xwe seh kir, Karnî miri bû. Stêlo rahişte berêkê, derket derve û di nav herfê de gornek kola û hevalê xwe tê de veşart û nimêja wî ji kir.

Wê şevê xew li stêlo herimî; heta sibê xwe di nav cihan de tev da. Wextê dinya zelal bû; çû êzing ani da ko agir dade. Wextê ji ber tîfikê li masê zivirt çî bibînit. Karnî li ber masê rûniştiye, bêî ko xwe tev bide û baxêve lê dinihêre.

Stêlo midekî temaşa hevalê xwe kir; derket derve û rojê pê de, berf tev da û li qûteki, li giyakî geriya. Esirki wextê vegeriya kokikê disan hevalê xwe li ber masê rûnişti dît. Çavên zwe firikandin, cardî li masê fedkiri;



*Polîsên eskertî vaporen bêteref seh dîkin.*

belê Karnî li ber masê rûnişti bû. Stêlo hevalê xwe hilanî, ew bire nav herfê û ji nû ve veşart; vegeriya kokikê, diolpên şerabê yên ko di cewdik de ma bûn vexwar û ket nav cihan.

Sibeli wextê Stêlo rabû çî bibîne. Hevalê wî disa ji gorinê vegeriya bû û li ber masê rûnişti bû.

Stêlo biserhatiya kokikê, heta vê derê nivîsandi bû û hew.

Gava pûk sekini çar peya ji bajêr derketi bûn û berê xwe da bûn kokikê: du memûrên rêlan, memûrê telêgrafê yê ko bi wan re mixabere kiri bû û diktorek;

Diktor da pêşiyê û ketin hundirê kokê. Stêlo û Karnî her du li ber masê rûnişti bûn. Serê her diwan ji bi berikine şejderbê qulkirî bûn. Ji brîna Stêlo mixderek xwin hati bû û lê cemidî bû. Herçî Karnî ji berîna wî dilopek ji xwin ne hati bû.

Piştî ko rûznama Stêlo xwendin, diktor gote hevalên xwe:



## KELEHA XURSÊ

AN ŞERÊ ELÎ HAMANÊ DIGEL MİRÊ BOTAN

*Mîrek rabû, di dewra xwe de bi girant.*

*Şah Mihemed begê çardeh eştrên Bota hilani.*

*Li ser keleha Xursê, li ser mala Elî Hamanê*

[dani.

*Şah Mihemed begê go, Xwedê fermanê li me*

[nekê li banê bani.

*Ezê yekê binime serê mala Elî Hamanê, ko*

[xwedê nauî serê tu insani.

*Tali mihemed begê go, ez zanim hon xursî ne,*

[hon şex mal in, diwanzdeh rihspî ne.

*Hêj we şûrê mîreka li ser serê xwe ne dine.*

*Elî Hamanê go, ya mirê Bota keleha Xursê di*

[ber da çem e;

*Dengê tivingê Bota te kir ko bi çardeh eştra*

[va bi ser me da leme, lem e.

*Ya hakimê Bota hon hakimê me ne, em kole-*

[bendê pêlavê we ne.



—Nilho her tişt eşkere bû. Stêlo piştî ko hevalê xwe sê caran veşart û disan ew li ber masê dit, rabû derbek li serê hevalê xwe derbek ji li serê xwe da û mir. Ji ber ko hevalê wî berî çar rojan miri bû jê xwin ne hat.

Bi tenê tiştê heye ko ne kifş e. Karnî piştî mirîna xwe çawan ji gornê vedigeriya, dihet hundir û li ber masê rûdinişt. Ev ji kifş e. Karnî bi xwe ne dibat; Stêfo di tenahiya koxê de bi heziyanê diket; dinivist, di xew de bi ling dibû, diçû; hevalê xwe ji nav berfê derdixist, tani koxikê, li ber masê rûdinand û wextê hişyar dibû li hatîna wî ecêbmayî dima û ew ji nû ve vedişart.»

### EVDIREHMANÊ ROJKÎ

Bi xwendina benda ko Mr. Rojkî ji bo Ronahiye wergerandiye kurdanciye mesela Dêra Rebenê ker hatê bira min. Ev mesele ji min re rehmetî Resûl axa gotiye. C. A. B.

«Dêra rebenê ker li Herekolê ji hemî dera bilintir e. Wextê mir Miheme de, tê de, xanik çekirine ji bona ceribandîne. Xwarin û ava di mirova danine tê de. Di zilam Zifîstanê hiştine tê de, heta Biharê. Biharê, hatî zozana; nêrine yek ji wan zilama miriye, yek maye.

Ewê mayî ker bûye. Ji bona vî qasî navê wê danine Dêra-rebenê-ker.»

*Mîrê Bota go, ya Elî Hamanê çima tê yeke*

[pak kê

*Weki hon kolebendê me ne, çima îsal heft sal*

[in tu xerc û xeracê keleha xursê nadê.

*Elî Hamanê ba kir go, de we ye;*

*Ma te pîrs ji bav û kala ne kir ko mala Elî*

[Hamanê ji berê da şûrkêşê we ye.

*Mîr go, keleha xursê keleheke bi ban e;*

*Mi pîrs ji bav û kala kikiye, mala Elî Ha-*

[manê axa ne.

*Belê ez zanim, hon ji berê da şûrkêşê mîrê*

[Bota ne.

*Elî Hamanê go ya hakimê Bota, li min û vê*

[lewarê,

*Weki tu zanî em şûrkêşê we ne, tu çima xerc*

[û xeracê ji me dixwazê.

*Mîr go, dinya li min germ e, Havîn e;*

*Belê ez zanim, hon şûrkêşê me ne, lê di dewra*

[min de tu hesabê min li cem we nine.

*Elî Hamanê gole mîrê Bota, li min geriyaye*

[bayê vê felekê,

*Ji roja ko ziryeta we peyda bû li dinyayê,*

*Tucara xerc û berc ji me ne standiye bi kolekê.*

*Mîrê min, em xursî ne, şex mal in, diwanzdeh*

[rihspî ne.

*Tucara me şûrê mîreka bi kotekî li ser serê*

[xwe ne dine.

*Ji roja ko em rabûne, em eşîreke bêserî ne.*

*Mîrê Bota ba kire Elî Hamanê go, çima tu*

[we nakê;

*Weki hon şûrkêşê me ne, çima tu weke Bota*

[hikmê me qebûl nakê?

*Ma tu nîzani ko tu xerc û xeracê keleha Xursê*

[nedî,

*Êdi Mihemed beg vê yekê ji te qebûl nakê.*

*Elî Hemanê go, mîrê min bi aniya te ez welê*

[nakim;

*Bi aniya mîrê Bota kim, ez ji vî hikmê ha*

[qebûl nakim.

*Mîrê Bota ba kir go, Elî Hamanê, sibe ye, tavê*

[ti min û te veda.

*Heke tu xerc û bercê keleha Xursê nedî, ezê*

[keleha Xursê hilweştim bi ser

[hûr û girê we da.

*Hê nû, Elî Hamanê ba kir go, ez, Elî me, Eliyê*

[gut im.

*Bi şevê bi heft qaliba berika dibirim û bi rojê*

[bi heft coniya dermên dikutim.

*Bi aniya mîrê Bota êdî ez ji ber eskerê Bota*

[nalêbitim.

De hingé hê nû, cîndiyê Bota li xwe kirin po-  
[stê pîlînga;

Mîr dengé xwe kir li çardeh eşîrê Bota, bû  
[gurmêna lîvînga.

Mîrê Bota, tu di dewra xwe de hakimekt giran î.  
Hê nû, Eli Hamanê dengé xwe li her çardeh

[peyayê Eli Hamanê hilanî.  
Keleha Xursê, keleheke bi bender'e.

Mîrê Bota bi cîndiyê Bota ve, hefl sala li ser  
[Eli Hamanê kire şer e.

Keleha Xursê, keleheke li der kaniyê.

Piştl hefl sala mala Eli Hamanê kete êsîrt û  
[rêziliyê.

Eli Hamanê go, ez li bexlê mîrê xwe me, mîr  
[bide me rîya xwîniyê.

Mîr gote Eli Hamanê, ez we nakim.

Te gelek ji cîndiyê Bota kuştine, ez li rû awa-  
[yê te bernadim.

Keleha xursê, keleheke li nû bani.

Cîndiyê Bota, li Bota gihane hev, şewra xwe  
[danî.

Mîr go, geli cîndiya, ma çawa baş e?

Cîndiya go, bejna hakimê me ji darê gez e;

Ev îsal, hefl sul in, li ser mala Eli Hamanê me  
[kir şer, bi lez û bez e.

Mala Eli Memanê, maleke hevnare ye;

Ko mîr rê bidê Eli Hamanê, ev qenciya mîrê  
[me ye.

Mîr go, geli cîndiyê Bota ez we nakim;

Heta ko ez sê berikê delûziqûmê di Eli wer  
[nekim, ez xwîniyîya wî qebûl nakim.

Eli Hamanê go, Keleha xursê bi zûr e;

Heke mîr ji me re bidê ra û destûr e,

Min gotina mîrê xwe qebûl e.

Keleha Xursê bi vî sint.

Eli Hamanê rabû, xwe kire armenc û li ser  
[sûra kelehé ji mîrê Bota re sekînt

Eli Hamanê go, mîrê Bota de we ye, rebê  
[izetê li ser şehde ye.

Emrê mîrê Bota ye êdi delûziqûmê çêke, destûra  
[mîrê me ye.

Keleha Xursê, li derê çayê.

Mîrê Bota li ber Eli Hamanê rûnişt û derba  
[pêşi berda-yê.

Eli Hamanê ba kir go, ya mîrê mî li min û  
[vê yekê.

Bi aniya mîrê xwe kim derba te ji aliyê rastê  
[ve kete kêlekê.

Mîr gote Eli, keleha Xursê keleheke bi navder e,  
Hêj du berik mane, ji min û te re.

Keleha xursê keleheke bi tû we.


Mîr li ber Eli Hamanê rûnişt û avêliyê derba  
[dîdiwa.

Eli Hamanê go, mîrê min keleha Xursê keleheke  
[di ber palê da,

Sibe ye tavê li me da.

Ez bi aniya mîrê xwe kim berikê delûziqûmê  
[va ye ji aliyê çepê ve kele diwarê

[qesrê ber çokê da.



Bertorpiyoreke britanî a nû. Tersaneyên Îngilistanê van bertorpiyoran bi desteyan dadixin behîrê. Ev bertorpiyer piçûk lê gelek bi sirhet in. Bi (1190) tonî mezin in.

Mir ba kir go keheha Xursê li der kaniya.  
Elt Hamanê ji min û te re, maye derba sisiya.  
Keleha Xursê keheheke bi ferx û kevok e.  
Mir li ber Elt ranişt û berikê delûziqumê lê

[kire zok e.  
Disa Xwedê Eli xelas kir, berik Eli ne girt,  
[kele diwarê qesrê, nava her du çoka.

Mir go, Elt Hamanê de here, bextê min û bavê  
[min ji te re.

Rabe bi destê eştrê xwe bigre, ji ber me xwini  
[be û here.

Mirê Bota rabû bi girani, eskerê Bota ji ser  
[keleha Xursê hilani.

Mir go, min ji aliyê xwe kir sê derbê mirinê,  
[min avêtin lê Xwedê jê re nani.

Elt Hamanê rabû, dilivê û dilêzênê, qedere  
[Xwedê dihelênê.

Bi destê eştra keleha Xursê digrê û xwini dibê,  
[diçê gundê Kertewênê.

Kertewên gundek ji yê Hevêrka ye; dikevê raserî Nisêbinê. Piştî çend salan Eli Hamanê gelekî şepirze bû. Rojekê gote zarowên xwe, rabin emê herin mir bikujin, ma ji vê bêtir de çi bêt serê me.

Zarowên wî ev gotin qebûl kirin û çûn. Piştî ko xwe gihandin oda ko mir tê da radizê; nêrî gava mir razaye. Eli rabû rahişte qelûna mir û kîsikê wî hilanî û qelûna xwe a pîsik û kîsikê xwe e ji toşilê benika dagirtî di cihê wan de danî. Rahişte du berika û du derb derman li ber balgihê mir danin; û gote zarowên xwe, rabin bilivin em herin, fê me ev bû.

Eli her çû. Sibê mir rabû nêrî û li kîsik û qelûn û derb û bera; fikirî û go, hebê nebe ev îşê ha îşê Eli Hamanê ye û dixwiye ko Eli gelekî tengazar bûye. Hema rabû deng li xulaman kir go, zû li Eli Hamanê bigerin, bê ka li kû û çî bû ye.

Xulam bi pîrsa kelin, Eli li Kertewênê dîtin. Hema di cih da vegehan û ji mir re gotin. Mir go de zû dewara bibin û mala wî bînin. Heta xwîlam çûn pey mala wî, nêrîn gava Eli piştî wan ne xweş ketiye û miriye. Zarowên wî vegarihane cem mirê xwe.

Hêj tirba Eli Hamanê li serê girê Kertewênê ava ye. CEMILÊ HACO

Tiştê ko min bi xwe bihiştiye Eli Hamanê digel zarowên xwe vegeriya bû ba mir û mîdekî jî li cem ma bû. Lê beriya ko binirê wesiye kirî bû ko di Kertewênê de bête veşartin. Ji ber ko Kortewênê jê re bû bû weteke didowan. Ji lewre cendekê wî birin Kertewênê û lê veşartin.

C. A. B.

## VEGIRTINA EWROPAYÊ

Ji RİDER DEYCEST

Belê îro inglîz û emêrikanî digel hevalbendên xwe ên din beja Ewropayê ji nû ve vedigirin. Hitler piştî şikestina Fransê Ewrope vegirti bû û ew ji xwe re kirî bû kehehek. Lê herweki me berî du salan ji gotiye Hitler ne hakimê kelehê lê girtiyê wê bû. Rojekê neyarên wî pê li erdê kelehê bikirana. Ji gê Hizêranê ve neyarên wî pê li erdê keheha wî kirine û ordiwa Hitler li her hezîmela xwe a qetî ye.

Çend mixabirên kovara emêrikanî Rîder Deycest yên ko hevaltîya ordiwen ko ji aliyê roavê de dirêji keleka Ewropayê kirine, dikin, di heqê vê seferê de û di kovara xwe de hin bendan belav dikin. Dilê me heye em wan bendan hin bi hin wergerînin kurdmançiyê û di kovara xwe de belav bikin.

HAZIRÎ— Berî çar salan wextê ko cindiyê britanî ê paşin dikir ji Dûnkerkê li vapore siwar bibe û terka beja Ewropayê bide, Çorçil, serekwezîrê Britanyayê banî çend zabitan kiri bû û ji wan daxwaz kiri bû ko jê re planeke vegeerê, plana vegeerê inglîzan li beja Ewropayê pêk binin.

Wan zabitan di cih de dest bi xebatê kirî bû û plana xwe çêdikir. Heta Îlona sala 1942 an li Ewropayê vegeer di halê planeke de ma bû. Lê wextê Rûzwelt û Çorçil di Efrîqa dakur de li hev gihane hev edf plan bû bû rastiyekek, Lê herçî cihê daketîne yanî Normandi, ancax di Tebaxa sala 1943an de hate bi nav kirin. Ev jî di Kenadê, di bajarê Kebekê de çêbû bû.

Herçî wextê hicûmê beriya niho, yanî beriya hicûmê bi heşt mehan bi nav kirin. Hicûm di navbera 15ê Gulan û 15ê Hizêranê de wê çêbiwa. Di Çiriya sala 1943 an a pêşin de gava Rûzwelt tarîxa hicûmê ji merêşal Stalin re da zanûn wî jî miwafiqet û tarîxa hicûma ordiwa sor ji hevalbendan re eşkere kir.

Di Kanûna sala 1944an a paşin de wextê genêral Eyzenhawer gihaste Londrê, piştî eskerên heşidandî û çêken komkiri seh kirin ji bo hicûmê hefta ko li siseyê Hizêranê dest pê dibe û li dehan teman dibê ixtiyar kir. Herçî roja hicûmê bi xwe beriya hicûmê bi çend rojan wê bihata tayîn kirin.

Beriya hefta hicûmê bi sî çil rojî qeragaha serfermandariyê ji Londrê hate guhastin perawan, nizingî benderên ko esker jê siwarî vaporan bibiwanan.

Qerargah li nav bîstanekî di xanîne kev-  
nare de bati bû saz kirin. Sobayên ko bi  
melevaniyê derbasî behira Manşê dibûn hero  
di peravên Normandiye de sûretine nû digirtin.

Beriya hefta hicûmê bi du mehan balafiran  
dest bi lëxistina rêhesin û pîran kirin; nemaze  
pîr û rêhesinên ko digihandin Normandiye.  
Heta 6ê Kanûna-paşin 82 merkezên rêhesinan  
hati bûn hingivandin. Li ser vê yekê elema-  
nan miwaseleyên xwe di reyine dûr re temîn  
dikirin.

Ji bo xapandina dijmin, balafiran heke  
bombeyok tavêt ser armanca rastin, didowên  
din tavêtin arinancine din.

Beriya hicûmê bi çend rojan dest bi  
paqijkirina behira Manşê kirin. Di bin hima-  
yeta torpiyoyê û balafiran de voperên lexemçin  
ji behirê lexemên ko elemanan danî bûn  
radikirin. Bi şev balafiran lexem bera devên  
benderên ko lezbotên elemanî tê de radiketin,  
didan. Da ko ew bi roj nikarin jê derkevin û  
dirêjî torpilçinan bikin.

Di işê keşfê de carina eleman bi xwe bi  
kêrî sondxwariyan dihatin. Beriya hicûmê bi  
çend rojan elemanan bi zora şejderbê masiva-  
nine frensizî rëkiri bûn peravên Îngilîstanê  
da ko wan peravan keşif bikin û li ser tevdi-  
rên Îngilîzan elemanan serwest bikin. Lê tevdi-  
ra elemanan ne çû serî. Masivanên frensizî li şûna  
ko vegerin cem elemanan li cem Îngilîzan man  
û tevdi-rên ko elemanan di peravên frensizî de  
dît; bûn ji Îngilîzan re gotin. Di nav wan de tişt-  
in hebûn ko Îngilîzan hêj pê ne dizanîn.

Ji 29ê Adarê ve eskeran berê xwe dida  
benderên siwarbûnê. Qederê 2 00 trênan xwe tev  
didan û ew esker digel çekên wan diguhastin  
peravan. Di qerargaha serfermandariyê de  
xerîteke mezin hebû; li ser wê xerîtê cih û  
hereketa eskeran roj bi roj, saet bi saet di hate  
îşaret kirin. Bi vî awayî sefermandar bergav  
dikarî bizane yekînekên hicûmê li kû derê ne.

Edî Eyzenhawer roja hicûmê bi nav kiri  
bû. Roja Duşembê 5ê Hizêranê.

Li siseyê mehê Çorçil digel merêşal Smats  
hati bû nik serfermandar. Di nav ştealiyê  
de Çorçil ji Eyzenhawer re goti bû ko dilê  
wî heye roja hicûmê bi xwe, bi eskerên pêşin  
re derbasî beja Fransayê bibe.

Eyzenha-er hewqas guh ne da bû vê  
gotinê. Serfermandar bawer dikir ko serek-  
weşîr henekan dike. Lê wextê ko Çorçil ev  
gotin çend caran tekarar kir Eyzenhawer jê  
re da zanîn ko ev tişt talûkeke mezin e û bi  
hatin-kuştina wî îş dikare tevî hev dibe.



*Heştine elemanî, çav giro dayî bi hêstirgahan  
re lene ajotin*

Di vê navê de zengilê tel fona Eyzenhawer  
lëxist. Qralê Îngilî tanê bi xwe di telefônê  
de xeber dida Qral bi niyeta Çorçil hesandi  
bûn. Qral bi Çorçil re axivî û jê re da zanîn  
ko jê re divêt ji wê niyet bigere. Çorçil ji  
welê kir.

Eyzenhawer roja Sebte çavê şewrek  
danî. Çar kes wê pardariya şewrê bikirana.  
Montî, êr-merêşal Artûr Tîder, emîral Bertram  
Ramzey û êr-merêşal Traferd.

Ji derve hewa xweş xuya dikir. Lê diviya  
bû pîsporana ev xweşî tekid bikira. Bani zabi-  
tên stêrnas kirin, du Îngilî û yekî emêrikani.  
Her seyan pev re digotin ko ha her bi guhêr-  
bariyê ye û ne her bi xêrê ye.

Li sê rojan, pîsporana bi tifaqa ko sibe,  
roja Sebte, bigelin hev, şewr belav bû. Dotira  
rojê yanî li 4ê Hizêranê wextê gihane hev  
pîsporana di gotina xwe de pê da erdê. Li

ser vè yeké qerar dan ko hicûmê 24 saetan bi şûn de bihêlin.

Ji xwe ba yekcar biguhêriya û fortine rabiwa diviya bû hicûm bi ro'an ve bi şûn de bimîne heta meheke dîn heta héva nû a çardeşevî.

Li 4ê Hizêranê évarê Çorçil û Smats cardî hati bûn qerargaha Eyzenhawer. Piştî bihnekê genêral De-Gol jî xwe gihandi bû wan. Ştexalî li ser wextê hicûmê bû. Piştî ko ew çûn Eyzenhawer banî erkanherbên xwe kir; bi wan şewirî û pîrsa xwe bi pîrsorên felekî jî xist. Pîsporên digot ko hewa ber bi qencyê ve diçit. Li ser vè yekê jî hev belav bûn û dotira rojê, serê sibehê li saet pêncan şewreke din danîn.

Di wê şewrê de Mongomerî; Malorî; emîral Ramzey û erkanherbên wan hazir bûn. Pîsporên felekî pê dan erdê û gotin ko ba ber bi çêbûnê ye.

Li ser vè yekê Eyzenhawer gote hevalên xwe: Her tişt hazir e. Heke me îşê xwe bi şûn de hişt balafirên elemanî wê pervan keşif bikin û bizanin ko me tedarika xwe kiriye û dikin bi ser wan de biçin. Êdî hicûm nabe nişkegavî. Ji milê dîn dijmîn bi balafirên xwe wê dirêjî vapor û qayixên ko esker lê siwar in; bike. Ew jî ne sed in, ne hezar; ne jî du hezar in. Ji mihafeza wan re bêqeder çekên hewayî divêtin. Û heke; jî bervajî ve

hewa ber bi neqencbûnê çû; hingê wê gerek bibe emê eskeran vegerînin bejê û wan bişlînin wargehên wan. Ma şik heye ko bi vî karî manewiyeta eskeran wê bête şkêrandin.

Eyzenhawer berê xwe da emîral Ramzey û got ê: Ka fikra te çi ye?

Ramzey got: Min divêt ez raya qertelê ezmanan bizanim.

Merêsalê çekên hewayî: Ez amade me, bi raya pîsporên hewayî ve herim.

Emîral got: Madam çekên hewayî dikarin bi firê bikevin stol jî wê bikare pê ve here.

Eyzenhawer rahû ser lîngan û bi beşûgî got: Hingê oxura we li xêrê be; Xwedê îşê me bibe serî.

Civat belav bû. Herkes çû ser karê xwe. Ji dema hicûmê re jî rojekê kêmîr ma bû. Eyzenhawer rojê pê de di nav eskeran de digeriya, bi gotinê çak ew kêfxweyî dikirin.

Wextê Eyzenhawer gihaste balafigeha firqeyên ko bi balafirên dê bihatana guhastin û beriya ko eskerên din pê li peravan bikirina wê daketana orta dijmîn, genêralan jê re digot ko heke di hicûma pêşin de lîngên eskerên ko di rîya behirê re biçûna; erd ne girta ew firqeyên bijarte wê mehiw biwana. Eyzenhawer jî pê dizanî; lê diviya bû ev talûke û fedekarî bidana ber çavan.

Di vè navê de eskerên wan firqan diketin planoran; yanî balafirên bê-moter. Li wan bû



Ji qada şerê Hindîstanê: Tengeke brîtanî ber bi eniyê ve.

bù şev û dinya jî xwe ker kiri bù.

..

6ê Hizêranê serê sibehê; saet bù bù heft. Xebera pêşin gihastî bù qerargaba serfermandar. Qewetên ko di ezmanan re hati bûn guhastin danî bûn erdê Fransayê û eskerên ko di rîya behirê re çû bûn pê li peravan kiri bûn. Wextê ev xeber gihandin Eyzenhawer, serfermandar got: «ez çiqas kêfxweş im».

Emîral Ramzey dida zanîn ko stol bi xesarine hindik gihastî bù armanca xwe. Ramzey dijminê xwe xapandi bù. Beriya hicûmê bi çend saetan stolek rêkiri bù ber bi behira bakur. Betariyên elemanî yê peravan topên xwe lê girêda bûn. Di vê navê de stola hicûmê bi selamet nizingî li peravên Normandiyê dikir.

Piştî du saetan ji peravên Fransê îşareta pêşin hati bù. Tê de digotin ko dijmin qeflê hicûmê e pêşin avêtiye behirê. Di qerargahê de heyecanek rabû bù. Ji nû ve pirsîn. Di îşaretê de xeletek hebû. Qeflê pêşin mihafizên peravan bi şûn de avêti bûn. Bi vê rastakirinê madê herkesî jî nû ve çebû.

Piştî 48 saetan lingên eskerên sondxwariyan di beja Ewropayê de erd girti bù. Eskerên inglîz û emêrikanî derbasi behira Manşê bù bûn.

Beriya niho qralê Spanyayê Filip û di pey wî re Napolyon ev tişt ceribandi bûn;

xwesti bûn ji Ewropayê derbasî Ingiliterê bibin. Lê teşebisa her diwan jî ne çû bù serî. Hitler jî ev plan çêkiri bù; lê ne wêri bù ew biceribanda. Anglosaksonan jî bervaşî ve ev ceribandin û miwefeq bûn. Neyarên wan nikarî bûn bihtana nik wan; lê ew çûn nik neyarên xwe.

BI STOLÊ RE — Roja hicûmê bù. Êdî di navhera vaporen ko em lê bûn û peravên Fransayê tişteki hindik ma bù. Em di hindava Şêrbûrgê de bûn. Ji nişkekê ve zengilê sekînadîne lêxist; mekîne tev de sekînin. Di bin tava heyvê de her tişt ker û bêdeng bù. Di dora me de sehwrîne vaporen xuya dikirin. Em li hêviya derba topên elemanî a pêşin bûn.

Kumandarê keştiyê çavên xwe li xerîtê gerand û got: Em gihastine.

Zabîte mixabirê serê xwe xurand û got: Tu tişt naxuye. Bizaniyana ko em li hire ne beta niho bera me didan.

Reisê erkanherbiyê got: Nik dilê min bi me hesiyane; lê xwe ker dikin da ko me bêxin devê topên xwe û ji nişkekê ve li me xînin. Nakeve serê min ko siûda me ewçend baş be ko bêî ko em xwe bi wan bihesînin gihastî bin van deran.

Reisê erkanherbiyê şaş bù; em ketî bûn ber pozê wan lê hêj dijmin bi me ne hesiya bù. Vaporen qayix dadixistin behirê û jê herkesî berê xwe dida armanca ko ji berê de jê re hati bù bi nav kirin.

Stolên hicûmê du yekînek tanîn pê, yeke emêrikanî û yeke britanî. A emêrikanî di bin ferdandariya emîral lîen - Kîr, a britanî jî di bin ferdandariya emîral Filip Fiyân de bù.

Qederê pênc hezar vaporen girs û hûr yê ko ji benderine İnglîstanê e têvel rabû bûn berê xwe da bûn peravên Fransayê û di Manşê re derbas dibûn.

Saet bù bù didowê sibehê. Zabîtekî mixaberê got: Balafir in.

Zabîtekî ciwan pirsî: Neyar?..

Kumandar lê vege-  
rand û got: No, balafirên  
me, ên eskergehêz.



Balafir deh bi deh, sî bi sî, pêncî bi pêncî h.p. derbas dibûn diçûn. Ewê daketana erdê dijmin.


Ji xwe hêj çarek saet ne keti bû navê ko eskerên wan balafirên pê li erdê kiri bûn. Lê beriya wan paraşûtîst daketi bûn û bi bombeyên destan erd ji wan re paqij kiri bûn. Digel vê çendê eskerên di ezmanan re guhastî heta ko gihastî bûn erdê, kêm û zêde, hin xesar diti bûn.

Ji aliyê din fedayine inglîzî û emêrikanî di qeraxê re xwe gihandi bûn betariyên peravan û dirêji wan dikirin. Betarike elemanî e mezin di zêrzemîneke çimêntokirî de veşartî bû. Serê zêrzemînê bi çimênto welê hati bû asê kirin ko ne guleyên cenkeştîyan, ne ji bombeyên balafirên lê kar ne dikirin. Dido ji fedayîyan timobîleke elemanî xisti bûn destên xwe, lê siwar bû bûn û berê xwe da bûn wê zêrzemînê. Fedayîyan bi elemanî bang dida û digot: Hicûm dest pê kiriye.

Nobtedaran bi zena ko yên ko hang didin qasidine elemanî ne; deriyê zêrzemînê vekirin. Fedayîyan bombeyên xwe lê wer kirin; derî nema dihate girtin.

Saet bû bû sisê, bombavêjên me di ser me re dibêrîn û bombeyên xwe berdidan ser tabiyeyên dijmin yên peravan. Deriyên dojhê li wan vebû bûn. Betariyên dijmin agirê xwe li wan diweşandin. Carîna guleyek li balafire! ê diket û balafir heta ko digihaste erdê dibû perengekî sor.

Di dora me de qayixên daketinê di şikilê çexêzina de digihan hev û rêwingiyên xwe siwar dikirin. Esker di pîrên vaporan de kom kom li hêviyê diman. Her û her dengêki holê dihate bihîstin: Koma 5an li merkeza 4an h.p. Behîr rabû rabû. Pêlan qayix wek kifkaran hol dikirin û bi gazan ve ji hev dûr dixistin.



Topîne navlûdirêj lê çaplûr



Carîna piyade ji bi lifing an li nêzîkê jê balafirên didin.

Saet bû bû (5,40). Cenkeştîyan devên topên xwe bi betariyên dijmin ve girêda bûn. Di dora me de girs û hûr 80 cenkeştî hehûn. Di wî heştê cenkeştîyî de qederê 6.80 top hehûn. Di nav deh deqîqan de wî 80 keştîyî du bezar ton gule berda bûn ser betariyên dijmin Êdî bi dûreb nan ji tu tişt ne dihate dîtîn. Perav di bin dû û dûmanê de wînda bû bûn. Lê cenkeştîyan bêt ko armancên xwe bibînin nişana xwe li wan digirt. Ji ber ko çihên betariyên dijmin di ser xerîleyine xweser de

nîşankirî bûn.


Balafrîne kesfê di ser tabeyên dijmin re difiryan û bi bêtelê endexta toçiyên me rast dikirin û tabiyeyên hingeftî û xerabkirî ji stolê re didan zanîn. Zabitên li ser xeritan li ber wan tabiyên îsareteke sor datanî; yanî ev tabiyê hatiye herifandin.

Qrayixên daketîne, tejlî esker, di pêşiya wan de lezbotin, di nav wî dû û dûman û agirî de qesta qeraxan dikir û her qayixê bi rêberiya lezbotê barê xwe di bejê dadikir.

Eskerên ko di van qayixan de bûn, tev de fadaî bûn. Ji wan re diviya bû mîtralîyoz û topên hûr yê kor rast bi rast di peravan de hatî bûn cih kirin ker bikin û ji ordiwê re rênâ vekin.

Wextê ew qayix û di pey wan re tangên li kelean siwavkirî gihaxtin bejê û xwe di qûma peravê de teqinandin, dinya pişk bû bû mehşer. Tangan ji ser kelean agir dikir; piyadeyên fedaî bi bombe û îmatîkên sivik xwe tavêtin nav têlên biderzî û diketin nav çeper û kewarên mîtralîyozan. Kes li kesî ne dizivirî; hemiyân qesta pêş dikir.

Lingên eskerên me erd girtî bû û Emîral Ramzey li ser soza xwe ma bû û wada xwe anî bû cih. Ma emîral ji Eyzenhawer re ne gotî bû: Cihê ko hon dixwazin lê peya bibin, ezê we li wê derê peya bikim.



Rojnamevanekî emêrikanî yê ko li ser cenkeştî-yeke emêrikanî hû gotiye:

Tiştê pêşin yê ko me ji Normandiye dtiye guleyên topên berbalafr bûn. Belê dijmin ji beja Normandiye bera balafrên me dida yê ko eskerên me diguhastin û dikirin wan berdin orta wan. Ev balafrên ha pey hev di ser serê me re diborîn û barên xwe di erdê Normandiye dadikirin.

Piştî ko cenkeştî û balafran li tabyên peravan xistin em li qayixan siwar bûn û me berê xwe da bejê. Qayixa me di ser pelên behirê re wek qalîkekî gwtzan hildihat, dadiket, di bin bombeyên balafran û di nav cenkeştîyên ko agir dikirin re derbas dibû diçû. Vaporên dora me barên xwe yê ji esker û techîzatan bihevketî, dikirin ko vala bikin. Guleyên cenkeştîyên me di ser serê me re diborîn, bombeyên balafrên neyar diketin dora me. Vaporên torpîlçîn da bûn pêşiya me û li torpîlên aware digeriyan.

Bombeyek li torpîlçînekê ket; lêketîneke tekûz. Torpîlçîn ji hev de ketî bû; bin av dibû. Mazota tê de wek xwîna miroveki birîndar jê diçû û li rûyê avê belav dibû. Bi teqîna bombê çend peya zer bû bûn û ji cihê teqandî bi dûr ketî bûn. Me xwe gihandê wan. Tev de mirî bûn. Milazim Con Trêbson digot: «Ji miriyau bigerin, li zindiyan bigerin». Trêbson qedere şaş peyayên zindî ji avê derêxistî bûn.

Elemanan hemî qirax ji lexeman tijî kiri bûn. Piştî 24 saetan mîfrîza me a lexemçîn ji piyadeyan re di nav lexeman re reyîn vekirî bûn. Di wî îşî de 17 peya birîndar bû bûn; yek ji hati bû kuştin.

Esirkî me pê li bejê kiri bû. La danî bû. Qeraxê pê de dûmaneke reş radibû û wextê bilind dibû, di sînga zemên de wek ewirine tarî xuya dikir. (Ih cih balafrên hingaftî wek tewbine qimaş dişewitîn Mirov li kû binihêrta dû û dûman û agir didî. Qey Normandi bi xwe dişewitî.



Dawiya eskeran ne dihat; pey hev ji qayixan dadiketin, midekî di avê de diçûn û digihaştin bejê û gesta pêş dikirin; hetanî ko li wan dihate agir kirin. Hingê kemîn dibûn û şerê xwe dikirin. Hêsrîne elemanî jî dest bi hatinê kiri bûn.

Pişti midekî em rastî xelkê jî dihatin. Berî herkesî ez rastî çend gundiyan hatim. Mirovine bisihet û qewîn bûn. Min jî wan pirsî heke jî wê bonbaranê aciz ne dibûn. Wan li min vegerand û got: «Li ber tiştên ko elemanan bi me dikir ev ne tu tişt e».

Wextê ez vegeyriyam peravê min dît ko hêsrîne nû anîne. Hêsrî li ber bebirê sekîni bûn û li hêviya vaporan bûn da ko derbasî Îngilistanê bibin. Di nav wan de zabitêk hebû. Wî zabitî li vaporên ko li ber peravê sekîni bûn temaşa dikir û serê xwe dihejand. Qey di dilê xwe de digot, ma emê çawan bi van kari bin.


Bi şev di vaporeke birîndaran de ez vedigeriyam Îngilistanê. Yûzbaşiyekî lingsîkestî hebû; yekî peraqûtîşt, ewî gote min:

—Wextê ez gihastim erdê, lingê min şikest. Di talimê de min du sal derbas kirin. Piştî wan taliman, çî bêsiûdî,.... ez bigehim qada şer û bêtî ko şer bikim jê vegeyrim. Belê wextê ez gihastim erdê li kortalekê gêr bûm û lingê min şikest. Elemanan tîfîngên xwe li min girêdan, lê ez ne hingivandim. Ez di biniya kortalê de li hêviyê dimam, min gorina xwe peyda kiri bû. Min dît ko elemanek gihastiye serê kortalê û li min digere. Min di dilê xwe de digot, ma bi elemanî çawan dibêjin «ez teslîn im». Lê parê min fikira xwe guhart, min dest bire xwe û bera wî da. Mêrik bê rih ket. Dilê min hinek rahet bû bû. Min digot, qet nebit min jî yek kuşt.

Zabitêkî behriyê digot: Li paşîya ketiyê xistî bûn. Bi derba gulê xortek ber bi ezmanan hol bû bû. Min ew di ezmen de didît, wê gokekê wer dibû. Wextê daket behrê deryavanan ew derêxist û anî ser pira vaporê. Li tenê lingekî wî şikestî bû.

Balafrvanekî digot: Ez ketî bûm piştî xelên elemanî. Min berê xwe de bû tabiyan Rastî fransîzekî hatin. Mêrik ewçend şerab bi min da vexwarin ko ez serxweş ketim. Bi wê serxweşiyê ez li xelên elemanî derbas bûm û gihastim xelên me.

Biserhatiyên wan bezar û sed hezar eskerên ko daketine peravên Fransê bêne nivîsandin jî wan bi kitêbxanan ve kitêb tene pê.



## MÉZINÉ ÈLÈ ELO BÌ WÈ ÎŞÈ ÈLÈ ÇILO BÌ

Tira êş û jana neçeyitiyê kezeba Çeko hingaft; agir bi dilê wi xist, ax û av û giya û rez û pez tev berdan, terkiserê welat bû.

Wisa piştpehniya xwe da welat ko nav û dengê welat bi goyê xwe ji seh ne dikir. Meh û sal bi ser Çeko de derbas dibûn. Çeko bi bîndar û zar û ziç bû hû.

Êş û jana dilê Çeko û heskirina welat li hevûdû bi şûr û mirtalan bûn. Derdê bêkesî û neçeyitiya ji destê necamêran di nava van melî û salê ko Çeko borandi bû arikariya heskirina welat kir û Çeko bi zar û ziç ve ber bi welat ve dane vegerandin.

Gava ko Çeko niziki li welat kir ji nedi ve dostê wi ê kevin Çelxo rasti wi hat. Piştî ko kêfxweşî di hev de dan, mijûli dirêj bû. Çeko pîrsa welat û îş û karê welat kir. Go, bira gula te geş e. Min hivi heye îşê we ji xweş e.

Çelxo lê zivîrand, go: Heçî bê-rêtiya wekî ko gava hon li welat bûn ne maye. Herkes kar û îşê xwe dike. Kes tékili kesî nabê. Çawa

we divê wisa ye. Çi dirêj bikim mt û gur bi hev re diçêri.

Çeko wisa dêna xwe dida wan xebera; av ji devê wi ber jêr dibû. Di nava xwe de difikîst û dîgo, êdî ez, pîr ne ma digêjim welat û zozanê qulingo, bi diyarê Kosor û Belanûxa bikevim. Dîsa wekî dîsa serê xwe hildim bi nav van dehl û deviyê bêserî hikevim. Têr ava sar û saxlem vexwim; xwe li ser vi ket û nefel û helizî bigevizînim. Herwekî berê herim nêçira wan kûviyan, postê rovi û qû-zeyan bikim rêz. Zar û zîçê mi jî, ji xwe re ji derdê necamêra xilas bibin. Lêbelê çawa çêbû devê Çeko ji nedi ve bi stowektî şikestî pîrsa mezinê êlê kir û go: Gelo, mezinê êlê kî ye?

Çelxo di wî de pariyektî sekîni û hêdî bi ezmanekî peltek go: Bira mezinê êlê Elo ye.

Wekî hon heft cer ava sar li Çeko bikin Çeko wisa tevîzi û go:

— Sed xwezî bi kefandîz; û bi dilektî sar î şikestî berê xwe bi paş ve zivîrand heya piyê wî ax û av girt çû.

Go: Lawo, heke mezinê êlê Elo bî, wê îşê êlê çilo bî.

FERHADÊ XERZÎ



Di hewşa fabrikeye Îngîlistanê de guleyên topên navîn.

# DİROKA JINA NAPOLYON

— 11 —

(Ez nikarim bi kesê qumar-  
baz bawer bibim. Çi gava  
min biîst ko yek bi qumar  
diltze, ez bi carekê hevîyar  
xwe jê dibîrim).

Napolyon

## HALÊ HIKÛMETÊ

Li welatê Franseyê giharina hikim, wek gemiya ko di nav deryayê da dikeve ber pelên bayî, jê ra qerarek tine bû. Çi awayê hikim dihate danîn, herhal hinekên xelkê qima xwe pê ne dianîn. Kîjan kom an hikûmet salekê li ser hikim ne diman; hevgiz dihate guhartin. Guhartinê wêlê ko şopine malkambax di canê milet, rê û doliwên welêt da diltîştin. Herçi koma bihata ser hikim, hinek ji xelkên xelêt dikuştin û gelek ji ji xwe ra kirin neyar. Çi gava ew kom li ser hikim biçûya, hikûmeta piştî wê peya û xêrxwazên hikûmeta herî xwe digirtin. Ev celeb girtî dema ji kêra Celad difilitin, ew yek ji kerema Xwedê dizanin.

Ji bo xelkê Frunseyê êdî bawerî ne ma bû. Welat wekî xelesa ser avê rojê bi alîki da xar dibû û ber ve binav-bûnê diçû. Gava melik kuştin, piraniya xelkê melîki ji welêt bi derketin; ên mayî ji di nava welêt da neyariya hikûmeta nûh dikirin. Dema Danton hate kuştin, hevalên wî ji wekî melikiyan neyariya hikûmeta nûh kirin. Pir ne çû hevalên Mara û Robîspiyêr ji xwe dane ser neyarên hikûmetê. Êdî nema yar û neyar ji hev xweya dibûn. Ên ko herî rojekê çav da bûn rîjandina xwîna hev, sibetirê wek biran, şerê yarên duh dikirin.

Di demeke holê da bû ko xelk ji Robîspiyêr filitî û hikim ket destê mirovên xêrxwaz û camêr.

Bi koma van mirovan ra «Kongre» hate gotin. Piraniya xelkê hevî dikirin ko li ser destê kongrê hikûmeteke çak û dilovan were pê û zilim û zinata di nav welêt da hinekî sivik bibê.

Kongre bê etlahî xebitî, da ko ji hikûmeta nûh ra rêznameyêke qenc pêk bine. Lê danîna rêznameyêke holê dest halê xêrnexwazan ne didan. Wan dixwast awa şêlû zelal nebe, da ko bikarin herê xelkê nezan wekî daxwaza xwe badin. Gava rêznameyêke çak bihata pê, pêşiya



hemî nerindiyar dihate girtin. Ji her vê yekê gelac û teslokana ne dixwastin lişteki holê çêbe. Bi vê ramanê bû ko herkesî di tala xwe ra xelk radikir ser lingan. Ji xwe destengiya di nav welêt da, hêkariya pale û pêxasan, gelekî arîkariya vexwandina nerindan dikir. Piştî ko dilê xelkê agir kirin, bi navê xelkê Parisê veqerandina nîzama sala (1793) an xwaslîn. Ew nîzama ko hikim dida destê komekê û lebatên wê komê bi tevayiya dengên milet dihatin bijartin. Qanûnên ko wê komê danîna ji heya tevayiya milet erê ne gota pê emel ne dibû.

Ew nîzama ko di demeke lihevketî da û ji bel hin meqsedên siyasî hati bû çêkirin, tu car bi gengazî ne dihate meşandin. Maua vê nîzama înan, tîkiliya hemî fransîzan ji hikim ra bû ko her carê ji bo standina dengên, di-  
vîdiya bû li ser û binê welêt xwîn birîjiya û fesadî bihîşya!..

Kongrê dixwast hin bendên wê nîzamê biguhêre, da ko meşandina wê hinekî hêsan bibê. Ji bo vê yekê ji komek da xweya kirin. Dema xêrnexwazan ev dit, xelkê ko dit û guhên wan jehrandî bûn hêvotin, bi garanek pale û pêxas dirêji avahiya kongrê kirin û

ketin hndir. Wan dixwast bi çavtirsandinê daxwaza xwe bibin serî. Lê koma kongrê tewiti bi derket; ji viridiqan ne tirsî û li ser ramana xwe ma.

Piştî ko xêrnexwaz tevî pêxas û sêwelekên ko li dora xwe civandi di avahiya kongrê da bi derketin û ji hev belav bûn, kongrê xwast di destên nerind û gunehkaran da lêde;

da ko careke din li kerê şeytên siwar nebin û tiştên holê nekin. Li ser vê ramanê bû ko li welatê Franseyê hikmê irfî danin, genêral Pişgiro kirin hakimê eskert; da ko dûvê gelac û fesadiyê di ber da bibire. Bi vê bû ko çar mirov ji serokên xêrnexwazan ji welêt bi der xistin, nefî kirin û ji ên mayî ji gelek avêtin hepsan û agirê fesadiyê temirandin.

#### JI QADA ŞERÊ ÎTALYAYÊ



Eskerên hevalbendan piştî vegirtina Romayê ber bi bakur diçin û gund û bajaran ji elemanan paqîj dikin.

Dema serxwerabiyân dit ko koma kongrê bi viridîqan ne tirsî û serê çav dane devê tîfîngê. Wan ji xwe ra digot; ew daxwaza ko bi viridîqan ne kete dest, hemî dê devê tîfîngê bibê. Ji ho vê yekê tevdira xwe pêk anin û sibehî, di bistê gulana 1795an da dirêji avahiya kongrê kirin û ketin hundir. Wan dixwast bi destê zorê daxwaza xwe bi serokê kongrê bidin qebûl kirin. Lê serok, mirovekî dilxurt, serhişk û tewiti bû. Tevî qrên û zirtelîra wan, xwe sist ne kir û bersiveke rast ne da dest wan.

Di wê naberê da yekî ji lebatên kongrê xwast ko wan pêxasên zorbaz ji serok bi dûr xê; lê bi guleya sêwelekeki hate kuştin. Herwekî dixwastin çavê serok bi zîrandîna cendekê lebatê kuştî bitirsinin; bi kêr û xenceran zîtirî zîtirî kirin û heya kûçe û kolanan rakişandin. Sêwelek kêman çaran li ber zilmê serî radikin; lê gava serî hildan, dibin zalim û zinatkerên mezintir!.. Di van serxwerabûnan da ji liştine welê dikirin qo rûyê mirov ji şerman diêfî.

Piştî ko kongrê şexsaetan di bin lingê serxwerabûyan da bê rûmet ma, leşkerê hikûmetê xwe gihande ser û bi devê tîfîngan ew ji avahiyê bi derxistin.

Li ser vê han kongrê xwast tola rûmeta xwe ji gelac û nerindan bistine; da ko careke din kes tiştêki holê

dererê neke. Bi vê ramanê bû ko hemî serekên serxwerabûyan girtin û pirên wan şandin ber kêra celad. Herçi heval û arkarên wan tev da ji çek û posatan kirin. Bi vi awayî hinekî dinê li serê koma kongrê fireh bû. Ebdî dikarin bi dilekî rihet ji bo cimhûriyeta nuh nîzameke baş binin pê.

Bi ntzama ko kongirê çêdikir, riya tevdan û gelaciyê li ber neqencan dihate girtin û her tişt di destê hikûmetê da dima. Ev yek bû ko yekitiyek di navbera hemî xêrnexwazên Cimhûriyetê da ani pê û bi carekê ew rakirin ser lîngan.

Heke ev nîzama bimeşiya edî dawiya hemî tevdanan dibat. Ji bo neyarên Cimhûriyetê pêşiya vi tiştî girtin diviya bû; heke bi mirina hemîyan bûya jil.. Ji lewre zûka çil hezar peya ji xelkê Parisê gihan hev û di bin serekîya mezinên çavkiri da xwastin disa dirêjî avahiya kongrê bikin. Vê carê ne wekî hercar bi avêlîna keviran û qireqirê dê tîr bikirina û vegertina mala xwe. Lê vê carê, bi top û lîfing, saz û awaz êrişeke pêkhati bû; wek leşkerê ko diçe qada şerl..

Gava kongrê tevdîra vê tevgera han bihist, zûka pênc hezar serberz (neler) ji leşkerê nîzamiyê dane bin destê genêral Mîno û vemirandina vê serxwerabûnê siaprtine wi. Genêral Mîno mirovekî qels û nermik bû. Dema pêşdarên serxwerabûyan tê va bi derketin û dît ko bi her awayî ji leşkerên hikûmetê pirtir û xurtir in; bê ko qerê wan bike, heya seraya Tûyêriyê (avahiya kongirê) li pêş wan bi şûn da vekîşî.

Erê çiqas ko wê rojê tu şer ne bû ji, heya tariya şevê, leşkerê Mîno tevi koma kongrê dorgirtî man. **OSMAN SEBRÎ**

*Eskerên ko ji wan re kumandos dibêjin piştî talimîne dişwar di xizmetîne bîchevmet de lêne bi kar êxistin. Klîşa me eskerîne kumandoe şanî dide.*



## DIYARÎ

### Bo plsporê kurdî, xwediyê Ronahiyê

Mîlet ew erde ko sinorên diyar hebin û mirovên wi wekî êk bin û nisbeteke sabit û bo yektîri bixebitin; heval, dost, xûn û jinên hev in.

Divê mirov mîlet bipê. Çinkû eger berê xwe bideyne gelek delîl heyin ko welatî em hemî yêl doyin. Ev e, bo te delikek ji yên îlmî. Birayên delal, demê cotyar diçît tovê xwe bi axê ra diçînit ev tov bi nav axê da rihên dihopêt. Piştî çend demekî mezin dibit.

Ew bi çi mezin dibê? Ew mezin dibit bi qeweta riha dilê wi erdî heta dibit dan. Paşê piştî gehîştina vi ziraetê he cotyarê xebatker dê bi dilki xweş xebitit ev xwarine dê bibe qewet, xûn, hestî û goşt. Ev goştên he dê sefyên dê hêzek şchwani jê çêbit. Bi kemela edebî ev cotyarî dê çite ser cihê jina xwe û çend demekî ew jin dê minit. Paşê dê Xwedê xelalekê detê jinikê. Dê zaroyê xwe bi şîrê memikên xwe peyawir ket.

Xortên delal, hon ji bir nekin, şîrê vê jinika he, ew ji her ji hêza erdî ye. Çinkû ew ji wê xwarinê dixwet ya ko babê zarokî xwariye. Pişt çend mîdekî ev zaro ji dê dest bi vê xwarinê biket, wek bab û diya xwe.

Vêca diyar bû ko ev xort mezin bûye bi hêza vê axê û welat bû sebebê inandina wi û me hemû mirovên li ser dinyayê.

Ey xort, axa, şêx û zoranên delal, hon hikmî li mejikên xwe biken, ka wacib di welat de çi ye? **X. BAMERNÎ**

Ji Diwana Cegerxwin:

## HEY FELEK

— Pêşkêşî Diya Fezro —

Hey felek, felek, hey zalim felek,  
Ka ew Kurdistan, ka bircên belek.  
Min navê cenet, ji te bê minet;  
Serbest û aza, va çûm cehenem.

Te mal ne da me, ka hec û zekat;  
Min ji te navê ev sewm û selat.  
Bendên qanûnan tev da çirandin,  
Ka soza te wek isbet-el-imem.

Ev hezar sal in, l'em kirne ebîd,  
Te em xapandî bi wad û weid.  
Qet ji min pê ve kes te nas nake,  
Bavê te tirk e, dayka te ecem.

Her çar kenarê me bûne neyar,  
Berê me li te qirin û hewar.  
Dengê me naki; bo çi deyn naki?  
Bextê te ev e, ey çerxa alem.

Welatê me ye, xweş e Kurdistan,  
Zozan û deşt e, tev bağ û bistan.  
Qenc e, xerab e, welatê me ye;  
Bi me pir xweş e, wek baxê irem.

Me tê de kuştin, egîd û gernas,  
Me tê de hiştin, fêris û mêrxas.  
Ser bextê te bê, ma em ne mêr in;  
Nayê bira te, Gulderz û Ristem.

Ka Ebû-Mislim, Şêrkûh û Merwan,  
Ka Selahedin, kani Kerim-xan  
Ka ew begler û ew mir û paşan;  
Ka Bedir-Xan û ka kurên Ristem.

Ma ne hêja ye, em herdem ba kîn,  
Ax û xewliyê bi ser xwe dakin.

Yan bibne dewlet; yan bêne kuştin;  
Yan dilxweş bimrin, yan dil bi matem.

Dermanê me ye xwendin û zanîn,  
Xortên xwendevan, têk de cegerxwin,  
Her bijin, bijin xortên nûhali,  
Her bijî, bijî Kurdistan herdem.

## EY DEWLEMENDÊ SERBILIND

Ey dewlemendê serbilind,  
Ma te çîman ser daye xew.  
Pir mal û zêr û milk û gund,  
Bo çi dixwi her nan û dew.(1)


Carek li Ewropa binêr,  
Herçî xudan milyonê zer;  
Gava ko tê roja welat,  
Zêran didin merdane ew.

Raye li te îro xebat,  
Ew jî digel te ho welat;  
Çêkin dibistan û civat,  
Zarok bixwinin roj û şev.

Îro xebat karê te ye,  
Lewra ko şans yarê te ye;  
Herkes di bin barê te ye,  
Peyvên te rast, yê min derew.

Disa ceger min bûye xwin,  
Din çû ji dest min, mame dîn;  
Bo min welat şêrin û zîn,  
Her şev li ser qirên û tew.

[1] Seyda! medhelokê gotiye: «Nan û dew taştîya bi derew, nav û mast taştîya bi rast, nan û şîr taştîya mir». Ez dizanim, te ji ber kalyê gotiye, lê «nam û dew» ne xwarina dewlewdan e; ew qûtê min û te ye. Ez gelek hejî dewî dikim, niza-nim tu pê re çawan î? C. A. B.



## BÊBEXTÎ

Şevək ya Zivistanê bû. Di pesarên Sipanê Xelatê de berf qerisi û bû bû kurşe. Berfê di bin reşikan de dikire xirçe-xirç û deng dida. Di bêlanekê rêlê de zilamek sekini bû û guh dida dora xwe. Ma di vê şevê de derketi bû nêçirê, rîya cenawireki dîpa.... Belê zilam bi çek bû; tîfîngek xisti bû bin çengê xwe û carina lê dinihert.

Ew, Çeçanê Bûbo, nêçirvaneki serdeste bû. Lê wê şevê li nêçirreke çarpê ne digeriya. Çeçan hêdika diçû; carina disekini, li dora xwe, li erdê xwe temaşa dikir. Gilhaştî bû tixûbên erdê xwe. Niho li ser wî birê erdê xwe dimeşiya ko jî sê nîşan de di navbera mala Bûbo û mala Siyehpûş de bi gels û dehwa bû. Lê Çeçan zora Serxanê Siyehpûş birî bû û erd jî xwe re tapo kiri bû.

Mala Bûbo û ya Siyehpûş gelek peya ji hev kuştî bûn; gelek xwîn di zikên hev de hebûn. Çeçan erd jî xwe re tapo kiri bû; lê Serxan hêj berberî pê dikir. Çeçan mêreki qenc bû; lê gelek hesabê neyarê xwe dikir. Dixwest wê bêxe rêzika şerîetê û welê bikuje.

Peyayên Çeçan li ser tixûbên erdê wî kemîn bû bûn. Hebû ko hinan dil bikira ko di tariya şevê de derbastî erdê wî bibin.

Çeçan da bû rêlê û jî peyayên xwe bi dūr keti bû. Di nav daran re diçû û jî xwe re

texmîn dikirin. Xwezi îşev li ser erdê xwe rastî Serxanê bihata; bikelana pêşberê hev û hew. Xwedê kerim bû. Ma Çeçan di mêrani û segmaniyê de jî Serxanê kengê kêmîr derketi bû. Çeçan ev tişt texmîn dikirin û her bi pêş diçû.

Ji eşayê re bakî xurt rabû bû. Bayî çiqilên daran dihejandin û berfa li wan li erdê dibarandin. Çeçan car-caran dixapiya û digot qey pêjina lîngan kiriye. Paşê dizani ko bê ew xapandiye.

Çeçan wextê bedena dareke keynare li xwe ba da; kete her pozê zilameki. Zilameki pişk wek wî, bi çek û şidihayi. Ew zilam Serxan bi xwe bû. Ma Çeçan jî ev tişt ne dixwest, Xwedê miradê wî birî bû serî.

Her yekî dest birî bû tîfînga xwe. Dîlê heryekî bi eşq û hewesa kuştinê hiltavêt. Her du jî di yek fikir û ramanê de bûn. Ma hêi ko zîrtê xwe bidin, jî hevûdin re tiştêki bibêjin, wek camêran hevûdin bigerînin çawan bera hev bidana.

Wê çi bigotina? Ma wextê gotinê bû. Her diwan jî niyeta hev dizani. Avdîn..., kuştin... jî hev safî bûn.

Çeçan û Serxan di van mitalan de bûn ko dengêki ezmanan ew ker û bêhiş kirin. Brûstekê li dara ko her du neyar li ber bûn, da û dar kire çend perçe.

Çeçan û Serxan di bin qetên darê de bêhiş, nixumandi ma bûn. Darê Çeçan li erdê rast kiri bû û destê wî ê çepê di bin piştê wî de herisandi bû. Her çî Serxan di bin şax û çiqilan de veşarti ma bû. Bi tenê serî û lîngan heta ejuyan xuya dikirin. Ji her diwan jî xwîn diçû, lê ne mirî bûn, birindar bû bûn. Tîfîngên her diwan jî şikestî bûn. Her du neyar gelek nîzîngî hev keti bûn. Destê Çeçan ê serbes', digihaştê Serxan.

Çeçan wextê bi xwe hesiya û di xwe anî der destê xwe li ser serê xwe gerand û di dilê xwe de got; ez hêj ne mirime ezê Serxanê bikujim, û çavên xwe li Serxanê ba da. Serxan



*Birek ji storiyên fîsî di qada şerê Îtalyayê de*

ji bihiş bû bû. Ramana Serxên a pêşin ji ew bû ko xwe bi ling bike û neyarê xwe bikuje. Lê jê ji ne hat. Serxên bi ken gote neyarê xwe:

— Wey tu ne mirî, hêj sax î. Min digot qey te cezayê xwe ditiye. Digel vê hindê, (Çeçan hinek sekini, dîsan kenî û pêş ve çû) belê Çeçan kete çala ko li neyarê xwe kola; çala ko li ser erdê dizl kola....

Serxên: Heye ko ez ketime çalekê. Lê ew çal di erdê min de ye. Wextê peyayên min wê bèn ewê te wek dizekî di erdeki biyani de peyda bikin.

Çeçên: Belê li ser erdeki welê ko tu dizê wî yî, te ew ji me dizi.

Serxên midekî xweker kir û paşê got:

— Te digot ko peyayên te wê bèn û me ji bin daran derînin. Yê min ji li pey min in. Ewê xwe bilezînin û beriya yê te bigehin me. Ewê min ji bin wan şax û çiqilan derînin; lê tiwê di bin wan de bimîni, heta ko rih terka bedena te bide. Sibe ezê peyan bistînim mala te da ko xatirê xelkê te bistînin; serdana miriyan tiştêkî miqedes e.

Çeçên: Ferz e tu dibêji ko peyayên te beriya yê min xwe bigehînin me. Wextê min terka wan da; min ji wan re got ko terka şopa min nedin û ji dûr ve didevaniya min bikin. Heye ko niho peyayên min bi diyarê me ketine ji....

Serxên: Bila bèn, hema min bi ling bikin, tu û peyayên xwe, ez bi tena xwe; lieta dawiyê emê serê hev bikin.

Her diwan dizani ko peyayên wan ne dikari bûn zûka li ser wan vebin û kesi ne dizani yê kê beriya yê e din wê bihatana. Lê ji qehran ji rikên hev ve welê digotin.


Midekî dirêj xwe ker kirin. Di wê navê de Çeçan li xwe xebitî û ji bêrika xwe şûşeyek derêxist. Di wê şûşê de çayêke darçin û qurnefilê hebû. Çeçên çend qurtik jê vexwarin. Xwina wî di rayên wî de geriya û ji nû ve rih pê hat. Çeçên gote Serxên:

— Ka ji te re, vê şûşê bigire û ji vê çayê çend qurtikan vexwe. Tiwê pê çêbiht.

Serxên bi kin lê nihêrt û got: Ji destê neyarê xwe ne çayê, ava heyatê ji venaxwim; tu vexwe ji te re bi kerafî be.

Çeçan li neyarê xwe dinihêrt, dida eqilê xwe. Neyarê wî mérékî qene bû; jê bêtir têşiha, lê deng ne dikir, ne dida ber sistiyê. Bi van mitalan dilê Çeçên nerm dibû; li ber neyarê xwe diket. Çeçên hilani, gote Serxên:

— Cîranol heke peyayên te beriya yê



*Pollisîne eskerî vaporan velo dikin*

min hatin tu min dixwazi bike. Herç ez min fikra xwe guhartiye. Heke peyayên min beriya yê te hatin; madam tu di erdê min de yî; tu mêvanê min î. Divê berî pêşin li te fedkirin, te ji bin daran rakin û birinên te derman bikin. Niho di bin giraniya vê dara ko pê li min dike didim eqilê xwe û ehmeqiya me dibînim. Ji bo axeke ko nesiba jê ji çalekê ne bêtir e ev sê niş in ko em pev çûne, me hevûdin kuştine. Serxano, were em ji vê gelşê bigerin û wek cîranine qenc bibin dost û hevalên hev.

Serxên di cih de lê venegerand, bihnekê ma û paşê got:

— Belê, sibe heke em ditine ko li ser hespên xwe û li rex hev ji gundê xwe diçin bajêr, ewê çiqasî li me ecêbmayî bimînin. Ewê bibêjin yek ji mala Bûbo û yek ji mala Siyehpûş çawan bûne hevalên hev û bi hev re bi rê ve diçin. Wextê wê bibînin ko em wek cîranine qenc bi ser hev de diçin û rojine îdan bi hev re şahînet dikin ewê bibêjin felekê fetlek daye jor. Ji xwe, cîranê qenc,



heke em xwe bi xweli hev ne hatin, ma' kes heye ko bikare me li hev bine. Belê, ma pêşyan ne gotiye ko xwîn bi xwîné nayête şîştin, xwîn bi avê tête şîştin. Ev berfa ko daran em lê şidandine çi aveke sar e. Ma kîjan agir heye ko pê venemire, kîjan xwîn heye ko pê neyête şîştin.

Her diwan ji, xwe ker kiri bû. Her du ji di yek texmîné de bûn. Heryekî di dilê xwe de digot; xwezi peyayên min beriya yên hevalê min bihatana û min rûyê xwe ji cîranê xwe re spi bikira.

Ba hinek danî bû. Çeçên gote Serxên:

— Me bani peyayên xwe bikira, heye ko deng here wan; ba hinek danî.

Serxên got: Nakeve serê min ko di rêlê de deng bikare here dût. Herhal peyayên me di keminê de ne û em dizanin ew di çi niyetê de ne û li hêviya kê ne. Digel vê hindê em dikarin biceribînin.

Çend caran bani kesan kirin. Ji dengê wan pê ve tukestî li wan venegerand. Hinekî sekinin û disa bang kirin. Çeçên digot, ez dengina dikim. Serxên digot, dengê bê ye.

Çeçên serê xwe hineki hilda û li dorê nihêrt. Ji neşkekê ve got: Ve ne, tén.

Serxên pirsî: Çend in?

Çeçên: Heşt nehek hene.

Serxên: Hingê ne yên min in. Yên min heft peya bûn. Gelo yên te ne?

Çeçên deng ne kir. Çavên xwe li selwirên ko dihatin zêl kir û ji wan baneda.

Serxên pirsî: Ma kî ne?



Di nîzîngî Londrê de bazarek di bin çadîran de.



Di şiyayên Skoçlandê de çadêreke kevnare.

Çeçên hêdika got: Gur in....

∴

Sibetir peyayên wan di yek wextî de gîhaştin cihê ko axayên wau li berfê teqînî bûn. Li ser berfê rêçine dehan û şopîne xwîné xwiya dikirin. Ji tîfîngên şikestî, qetên cilan û ji kiloxên serîyan pê ve tu tişt ne dtin.

Dihok: 15 Tirmeh 1944. BIŞARÊ SEGMAN

# XEBATKERÊ

## HAWARÊ EVDILEZIZ GERM

Berî çend rojan şexalîya jêrin di navbera min û Xebatkerê kovarên me, Evdileziz Germ de çêbû:

**Evdileziz:** Min divêt ez ji te lişteki bipîrsim, destûr heye.

**Min:** Ma çawan nîne, kerem bike bipîrse.

**Evdil:** Van nivisarên ko tu dinivîstîni û ez rêz dikim ki dixwinin.

**Min:** Kurdmanc dixwînin. Kurdmancên Îraq, Iran û Sûriyê.

**Evdil:** Belê ez pê dizanim. Wextê min adrês çap kirin, min lê de navine bi me nenas û xerîb dîtine. Wek Mîzgeft, Serê Kaniyê, Dihok, Bamrenti, Brîjkan, Kirmanşah. h.p. Ev çi nav in.

**Min:** Ev navine gund û bajarine kurdî ne.

**Evdil:** Xwezt min ew û xelkê wan bidîtina.

**Min:** Ne xwe, tu çîre naçî û wan nabîni?

**Evdil:** Ji xwe min jî ev diviya bû; lê zmanê min ne digeriya. Ji aliyê din dîtirsim ji vi tîti re wê gelek mesref bivêtin.

**Min:** Hema tu xwe bigehîne nav, kudan û hev. Wextê tu gehîştî nav wan ewê te bihewînin, qedrê te jî bizanin û herçî artkarî divêtin ewê ji te re bikin da ko tu bikarî di nav gund û bajarên wan de bigert. Ji xwe ji kurdên Cizrê tu hinekan nas dîkt. Heçiyên ko tu nas naki ew jî, wextê wê nivisarê bizwîthin wê bizanin tu kt yt. Hingê ew jî destê xwe bidine te.

Em li serê vê gotinê man. Evdileziz çû vîza Iraqê bibe. Ji ber ko dilê wî hebû here Iraqê û jê derbasî Cizrê bibê. Lê ji ber ko vîza Iraqê bi dest ne ket programê xwe guhart û rast bi rast berê xwe da Cizrê.

Evdileziz wextê hal û ji min xatir xwest, ji mi pîrst, heke min ji Cizrê lişteki divêt.

Min got ê: Ez saxiya xelkê wê dixwazim. Gelek silavan li heval û hogiran bike û ji Seyda Cegerxwîn re bibêje ko ez her ti hewîya diwana wi me. Di wan rojan de çapkîrîna diwana wi ji mîletê me re xîzmet û fêdeke mezin e.

Xwendevanên delalî Evdileziz xortekî emîn û saxlem e; heçiyên ko bixwazin dikarin ebona kovarê ji bidin-ê.

**XWEDIYÊ RONAHIYÊ**



ESKERÊN BRÎTANÎ DI PERAVÊN NORMANDIYÊ DE

### Kiryariya Ronahiyê

Ji bo Sûriyê 10 lîreyên sûrî — Ji bo welatên din lirekî inglîzî û niv

Xwedî û gerîndeyê berpîrsiyar: Celadet Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 4  
HEJMAR 28

1945  
ADAR

# RONAHÎ

ANNÉE 4  
NUMÉRO 28

1945  
MARS

SUPPLÉMENT ILLUSTRÉ DE LA REVUE KURDE HAWAR

TELÉFON:  
Ya Malê : 12-29 Ya Çapxanê : 32-10



ÇAPXANA TEREQIYÊ  
ŞAM — 1945

## DI VÊ HEJMARÊ 7E

|                       |                |
|-----------------------|----------------|
| Kiso û kiroşk         | Çirokbêj       |
| Bi kurtî jîna min     | Cegerxwîn      |
| Perçeyên canê mirovan | Bijîşkê Miran  |
| Qewraşa genêral       | Silêmanê Ferho |
| Nêçira Berazan        | Qedri Can      |
| Parîs                 | Silêmanê Ferho |
| Selahedin             | Osmay Sebri    |
| Napolyon              | Osman Sebri    |
| Katêrîn               | Bişarê Segman  |
| Ji lawan ra           | Ilhan Nûri     |
| Riya Ezmanan          | Pisporê Eskeri |
| Hindik Rindik         | Xeberguhêz     |
| Çira Zanînê           | Herekol Azizan |
| Hinek ji Henek        | Yarîker        |
| Inqilaba sor a mezin  | Q. Can         |

Çiroka kurdmanci:

## KISO Û KIROŞK

*Carekê ktso û kiroşkê şert kirin golin; kî berî giha sîtan girî ê mayî ewê sîtan tiştî bid ê. Rabûn her diwa wilo tîfaq kirin.*

*Kiroşkê go, ez bi lingê xwe ewle me, çî çaxê ko mi xwest ezê bigihim cihê nişandayi. Lê kî hema çawa, li hev hatin, ewî da rê û çû cihê ko gotî bûn.*

*Axir kiso bi meşa xwe a hêdî giha cihê malûm û kiroşk li wir çêrî û li wir av ve-xwar û li dera ha raza.*

*Ji ber ko kiroşk, bi lingê xwe ewle bû bi vi awayî xwe jî bir kir. Carekê bi xwe hesiya, gava bûye çvar, hema da xwe û ber bi cihê ko li ser şert kirî bûn bezi û çû, dit gava kiso li wir pal daye. Kiroşk poşman bû lê îş qedîha bû. Kiso ew bi şert bir.*

## MIZGÎN

### DÎWANÂ CEGERXWÎN KETE ÇAPÊ

Kilêbxana Hawarê, vê paşiyê dîwana şairê me ê milî seyda Cegerxwîn xisliye çî pê. Her-çend çap bi xwe rûyê çapkeran spî neke jî dîwan bi xwe rûyê miletê kurd spî û rûmeta wî bilind dike.

Behayê wê pînc lireyên sûrî ye.\*Heq bi postê jî xwediyê Hawarê re rêkîn û dîwanê jê bixwazin.

## Bi kurtî Jîna min

Sala hezar û nehsêd û sê ez hatim dinyayê, Bi navê sîtan Şexmûs ez çêbûme jî dayê. Heta bûm sêzde salî li gundê me y Hesarê, Jîna xwe min diborand paşê jî wê me da rê. Bavê min ê risipî xwedî mirov û rûmet, Ne mrovekî malgenî bi namûs û bî xîret. Ji tengasî, neçarî me ew gundê xwe berda, Hatin Amûda rengî, bavê min zû emir da. Diya min a helengaz pîncî salî dîlowan, Salek piştî bavê min ew jî li wî bû mêvan. Birayê min ê nivmele jî alema rohanî, Rast û dirist çî bêjî ew tiştêkî nizanî, Wî pîreka xwe anî bê wijdan û bê mijî, Bi gotinên xwe ên çors, ew min bê derb dîkujî. Xweşka min a xwendewar bê insaf û bê wijdan, Ez reviyam hatim cem wê jî ez kirme şivan. Geh li vir û geh li wê, min ezabek mezin xwar, Ya El-lah û ya Xwedê paşê bûme xwendewar. Jîna min ya kevnare îdî heşt sala hin bi hin. Tev xweşî û zanebûn heft heşt sala hin bi hin. Min dest bi kurdîyê kir peyda kirim çend mirîd, Bi xweşxwan û reşbelek xesma piştî Şex Seid. Paşê çûme Iraqê jî wê ez çûme Îran, Heçî kesê bidîma jî min dimane heyran. Berî sala rehmetî bi çar salan dîlberîn, Di şîrê de navê xwe min datanî cegerxwîn. Min îcaza xwe sîland bi serbestî mêranî, Ji nû keça xalê xwe jî Hesara xwe anî. Bûm melayê Hasda jor cibepoş û ser bi şaş, Ji nû rîya rast û xweş bû ser jor û rêl û kaş. Min bi dûvê dinê girt, vîna wê keş dilê min, Barê gund û ê kulfet, hemî ket ser milê min. Paşê hate bîra min ko ez bibim xwedî gund, Dilê min jî gote min gelek haş û gelek rind. Min jî axa Cizîrê du gund girtin kul û xem, Navê yekî Çêlek bû, êdî me kir Cehen-nem. Di nav me de ne ma bûn ne axa û ne kêxwe, Elo Çelo kum bi qul, min tev kirin wekî xwe. Roja me gund ava kir kete rastê mixtarî, Gundên me bûn berberî dijminahî, neyarî. Tevan girtin darên xwe bûne weke gurên har, Ji wî bextê min ê reş kurê Potê bû mixtar. Sermîyanê wî derew li ser wî bû berberî, Wek Dûçeyê talyanî paşê wî jî bi xwe de rî. Xwedî mal û xwedî gund li bergilê bû siwar, Rê jê xiste mala xwe Tiro paşê bû etar. Piştî ilmê xwe ê pir bûm Dodoyê qulingvan, Bûm hevalê kum bi qul kurê Potê sermîyan. Ev cihana xapînok heta me jê xwe nas kir, Çî b'kim fêde ne maye emrê xwe min xelas kir. Çima rastî dibêjim li nav dîna bûme dîn, Heta bîmrîm jî nû ve, xelk ê bêjin Cegerxwîn.

## PERÇEYÊN CANÊ MIROVAN

piştî şerê 1914-1918an sinhelê çêkirina dest û lingên sinhi, bi gotineke gelemper çêkirina lebatên ( iziv ) sinhi gelek ber li pêş çû hû. Ji mirovên seqet re yên ko dest an lingekî wan di şeran de hati bû birin an şkênanandin, ji pola, hesin û textê, dest û lingine welê çêdikirin ko ew mirov bi wan lebatên deskut ( sinhi ) ne bi tenê diçûn, dihatin; dixwarin, vedixwarin, lê li gora destxelên xwe bi îşê xwe ji mijûl dibûn, dixebitîn û bi keda destên xwe dijîn. Hesinger bi destekî sinhi hesin dikuta, xerat bi destekî hesinî dep û texte dibirin h. p.

Ji aliye din ji yên ko ji çavekî dibûn re çavekî pîpoq çêdikirin. Mirov bi wî çavî ne didî; bi tenê kortika çav pê di-hate dagirtin û tenasiba rû yek-

car xerab ne dibû. Carinê ji ji yekî difinbirî re ji goştê milê wî difnek çêdikirin. Perçak goşt ji milê wî dibirin û bi dişina wî ve dikirin. Di vê emeliyate de milê birindar çend rojan bi serî ve girêdayî dima. Heta ko goştê birî di dişinê de cih dibû û xwîna ko tete dişinê di vî perçê goşt de digeriya.

Lê iro, tebabeta şerê iro diceribîne ji lebatên mirovên mirî istifade bike û wan lebatan deyne şûna lebatên seqetan yên ko çav dest an lebatekî xwe î din di şerî de winda kiriye.

Berî çend mehanî di Nûyorkê de emeliyateke welê çêbû ko xelk tev de lê ecêlmayî man. Jinikek hebû; wê jinikê ji beriya deh salan de çavên xwe winda kiribûn. Diktor reşikên çavên jinka

kor bi reşikê çavên mirovekî mirî guhartin. Bi vê emeliyate jinka kor sax bû û gihaste binahiya xwe.

Li gora pisporên emêrikanî, ji niho û pê de tebabet wê bikare lebatên miriyan bi kar bixe û wan deyne şûna lebatên mirovine din. Dihêjû ko ew lebat ji bedenên miriyan bêne jêkirin û di mexzeneyên cemidî de dê bêne hilanin. Ji niho de xestexaneke Nûyorkê ji bo hilanina çavên miriyan mexzenekê çêdike.

Ji aliye din diktorên rûsî di di vî warî de xebateke zor dixebitin. Ji bo guhartina lebatên mirovan li ser heywanan tecrîbena çêdikin. Di mîsesa Gorgi de, rabûn zikê beqina vekirin û dilên wan beqan bi dilên beqine din guhartin. Beqên dilgohartî bi mehan ve emir kirine.

Diktorên rûsî di eniya rohelê de ji koman cendekan xelkine mezin bi dest xistine. Xwîna wan cendekan girtine û ew xwîn di şîşan de hilanîne.

Bi vî awayî li şûna ko li mirovên ko dixwazin xwîna xwe bidin nexweş û birindaran bigerin, xwîna miriyan li nexweş û birindaran şîringe dikin. Ji aliye din diktorên rûsî hestiyên kuştîyan ji ji wan dikin û wan ji birindaran hestîşikestî re siwar dikin. Bi gotinên din perçeyên canê mirovan yên ko nema bi kêr tên wek perçeyên timobîlan yên ko şikestî ne, bi perçeyên din diguhêrin. Bi tenê perçeyên timobîlan di fabriqan de lêne çêkirin. Lê herçî perçeyên canên mirovan ji bedena mirovekî din divêt bêne girtin. Ji her ko fabrika perçeyên canê mirovan li cem Xwedê ye.

Diktorên rûsî û emêrikanî di vî warî de gelek tecrîban çêdikin. Ra û damarên mirî û kuştîyan li mirovên zindî diteimînin. Bi gotinekê diktorên zana dixwazin perçeyên bedena mirî û kuştîyan di mexzenan de wek perçeyên timobîlan hilînin û wextê ko ji yekî re gerek bû perçekî jê bigirin û li mirove nexweş an birindar biteimînin.

Ev îş iro di dewra tecrîbê de ye. Serî ji ji van tecrîban re çavekî misalid e. Ji her ko hero ji ezaran kuştî dikevin destên mirovan û diktor dikarin bi wan kuştîyan her tecrîbê bikin.

Bêşik, ev tecrîbeyên ha, piştî şerî, fêkiyên xwe ên gihastî dê bidin.

BÛŞKÊ MİRAN

3



## Qewraşa Genéral

Yek ji bajarên rûst yên ko di vî şeri de deng dane; bê şik Smolensk e. Di Bihara sala 1941ê de elemanan Smolensk vegirti bû û jê dirêjt Moskoyê kiri bûn.

Wextê eleman nîzingî bajêr bû bûn, hakimê bajêr ê eskerî genéral Yasû bû. Serfermandarê eniyê jt merêşal Timošenko bû. Timošenko bant Yasû kiri bû da ko jê re ji bo midafea bajêr talimatina bidit. Genéral çû bû qerargaha merêşal û jê bi talimelên gerek vegeriya bû Smolenskê.

Wextê genéral vegeriya, kevaniya wî jê re da bû zanin ko ji bo îşên malê keçikeye polonî peyda kiri bû. Kevaniyê wêşê keçikê da bû; genéral jt qim pê anî bû.

Dotira rojê genéral eskerên xwe wê teftîş bikira. Genéral bant çeriya polonî kir û çakête xwe da-yê, da ko jê re bikewîne. Piştî nîvro genéral çû bû nik erkanherbên xwe da ko ji qerargaha merêşal Timošenko anî bû, ji wan re bide zanin. Wextê genéral li planê geriya û ew peyda ne kir; hate bîra wî ko plan di bêrika çakête ko jt bo kewandinê da bû keçikê de maye. Di cih de bant keçikê kir û çakê jê xwest. Keçikê çakêti anî, genéral bêrik seh kirin; plan ne lê de bû. Genéral bi kerb û xezeb li rûyê keçikê nihêrt. Keçikê xwe tev ne da û ne lebitt ji. Bi xwîneke sar gote genéral:

— Min gelek bala xwe da ûtkirina çakêti. Ez welê hévt dikim ko genéral ji min razî ye.

Genéral qir kir û gote keçikê: Di bêrika çakête min de kaxezek hebû; zû bêje te çî jê kir. Bi tenê gotina rastiyê dîkare te ji mirinê xelas bike.

Keçikê dîsan bi xwînsaryê lê veqerand û got: Min ne adet e ko ez bêrikên xelkê tev bidim. Ji lewre kaxeza ko cenabê genéral dibêje min ne dîtiye.

Genéral emrî zabîten xwe kir, keçika polonî seh bikin. Zabîtan keçik çend caran seh kir; lê bi ser wê de tiştek peyda ne kirin.

Genéral bant kevaniya xwe kir, mesele jê re got û ew digel keçikê di odekê de bi tenê kir da ko kevaniya ji nû ve keçikê hûr û kûr seh bikit. Gelek ne bori qîrîn bi wê odê ket. Genéral û zabîten xwe derî vekirin û ketin hundîr. Kevaniya li erdê dirêj bû bû; ji dîfna wê xwîn dihal; keçik jt berê xwe da bû derî û dikir

ko bîrewe. Teqîna şejderbekê hate bihtstin; keçik li ber sêlûna derî keti bû erdê. Genéral ew kuştî bû.

Genéral beriya veşartina keçikê ji polîsa sîrî di heqê keçikê de raporek xwest. Piştî şeq saetan polîse rapora xwe berpeyî genéral kir. Keçik ne polonî lê romani bû. Beriya ko elemanan dirêji Rûsyayê bikin bi du mehan keçik hati bû Smolenskê û di kazînoke Smolenskê de reqasî dikir. Ji ber ko keçikê bi awakt neqaniyê cînsiyeta rûstî girti bû, polîse da bû pey û lê hûr dibû.

Ji aliyê din raporek dida zanin ko keçik piştî ko keti bû xîzmeta genéral ji qutbîriya xwe ji kazînoyê ne kiri bû û du caran qesta wê kiri bû.

Genéral emir da ko cendekê keçikê li ser hesabê belediyê di gornîstana biyaniyan de veşêrin. Herçî rojnâme-yên bajêr mesela keçika polonî nîvisandin û dane zanin ko plana ko keçikê diht bû nema bi dest ket.

Piştî nivê şevê pasvanên gornîstanê ji nav tîrban dengîn bihtstin. Qey hinan erd dikola. Pasvanên gornîstanê çar peya bûn. Her çar derketin û kesî nav gorinan. Şeveke heyperonê bû. Sê peya û jînekê hêdika tîrba qewraşa genéral dikolan; derbek lêdixistin, bîhneki dîsekinin û li dora xwe dinihêrtin.

Pasvan pêşwîrîn û elam dan kerekona taxê. Polîsan dor li gornîstanê girt û berê xwe da tîrba keçikê. Peyqayên ko tîrba dikolan wextê bi halîna polîsan hesiyan dane şejderbên xwe û agir kirin. Polîsan li wan veqerand; bû şer. Piştî ko qedere niv saetê li hev xistin polîs û pasvanan ew girtin.

Di tehqîqatê de jînek mikur hal û her tişt gotin. Jînek bi xwe xweha qewraşa genéral bû; her sê zilamên din ji litwanî bûn û tev de li ser hesabê Elmanyayê dîxebitîn û casûsî dikirin.

Jînekê digot: Me di cerîdan de xwendî bû ko xweha min plan dîzi bû û genéral ew kuştî bû, lê plan nikari bûn peyda bikirana. Min û hevalên xwe me dîzani ko xweha min kaxezîne welê bi qîmet di cîhekî welê de vedîşere ko nayêle bira tukesi. Ji lewre me dixwest em çendekê xweha min derînin û di cîhê bi me nêş de kaxezê peyda bikin.

Li ser vê yekê genéral emir da û çendekê keçikê kelaştin. Plan di quleke welê de hate dîtin ko Xwedê ew qula germ ji bo karekî din astrandiyê.

SILÊMANÊ FERHO

## NĒÇIRA BERAZAN

Em di rê ên bi devî û bi kelem re diçûn; di gelek newalên kûr, di pir zinarên bilind, di hevraz û hevjerên dûr û dirêj re derbas dibûn.. ez û du hevalên xwe bûn. Sehên me bi me re, tişingên me li milê me, rextên me li pişt me bûn. Destên me bi lepik, lingên me bi goreyên risinî û bi pêlavên xurt nixumî, bedena me bi çekên tekûz girêdayî bû. Zivistan û çele bû. Em diçûn çayê mancêlê, nêçira berazan.

Ev ne cara pêşîn bû; gelek carê din em bû bûn rêwiyên vê reyê. Nêçira berazan, ji me re bû bû meraq û serguzeştêk.. me, ji vê serguzeştê heweseke derûnî distend.

Bi roj, em dimeşiyar, bi şev jî em di şikeftande diman. Piştî sê rojan, me nêzikî li armanca xwe kiri bû.. ber bi êvarê bû.. dinya pir sar bû.. em gelek westiya bûn.. lê me nêzikî li şikefta «govê» kiri bû.. gava em bigihîştina şikeftê me zû ji xwe re agirek dadaya, xwe germ û rehet bikira...

Em, gihîştin ber şikeftê. Lê mixabin şikeft, ji bextê me re, hilweşiya bû. Di wî ciyê de tu şikeftê din tu ne bûn.. em, nikarî bûn, bi şûnde jî vegerin; di şevreşê de, di wan rûlên bi kevir-kuç de bi rêveçûn ne mimkîn bû.. tebayên kûvî û derende jî bê heb gelek bûn. Çar ne çar.. me xwe da ber

latekê; cî pir teng bû, têra hewfna me û sehên me ne dikir. Bi dişwarî me xwe bi cî kir û me agirek dada.

Piştî şivê bayekî reş dest pê kir.. peşkên baranê hatin.. her ke çû ba bêtir, baran zêdetir bû. Agirê me vedimiri, canê me şil dibû.. em, ji serma diqefllin. Selên me jî, diricifin, teriyên xwe dikirin nav lingên xwe, berên xwe her jor ve dikirin, û kûr, kûr di zûriyan. Xuya bû, inzara encameke xerab di dan me.

Herke çû, şev, reş û tarî, ba û baran bêtir dibû. Tenê gava birûskan vedidan, me kanî bû ber xwe bidîta... Em ditirsîyan ku tebayên kûvî bi ser me de bigirin û me şerpeze bikin.

Nivê şevê ba kem bû baran sekinî.. ewrên reş perçe perçe belav dibûn.. li cî ciyan histêrkan xuya dikirin.. xwîn û taqet li me vedigeriya. Lê qederek derbas ne bû, li şûna ewrên reş, ewrên spî û bilind çêbûn; bê gûman ewrên berfê bûn.


Bi destê sibê re lepe-lepe berf hate xwar, dinya ronî dibû; me kanî bû ber xwe bidîta.. Me xwest ko em, bêlan «merhele» kê bi şûn da vegerin, û berî felaketekê em xwe bigihînin şikeftêkê. Em li rabûnê bûn, keriyek beraz li me der bûn.. ew berazên ko berê quncik-quncik jî ber me direviyan, vécâr har bû bûn û xwe dirêjî me dikirin.

Me, her sê hevalan piştên xwe dan bev û me berê tişingê xwe bi wan ve kirin. Sehên me jî, ji me re dibûn siper; mîna pilingan dajolin ser wan. Cengek mezin û no di nav me de çêbû.. berikê me diqediya lê hejmarê berazan, çiças dibatin kuştin jî, bêtir dibûn; kerî, kerî dihatin gazî û hewara hevalên xwe. Berf pède dibariya.. bager û pûkek ecêb çêbû bû, nîva ne tenê beraz, ji her çêşîdî kûviyên derende xuya dikirin.. Wan jî bi çavekî birçî, dirêjî me û sehên me dikirin. Êdî, berikên me qediyar. Vécâr, me



singuyên xwe bi ser tîfingê xwe ve kirin. Qederekî bi dest-lepê ji me li ber xwe da. Paş vê tabê taqet di me ne ma; em her yek li ciyê xwe ketin. Berê her sê kûçikê me hatin kuştin.. paşê her du hevalê min. Kûviyan, cendekê wan, bi erdê re dikişan, û dibirin. Ez keti bûm kortalekê.. berf li ser min tije bû bû.. ji ber çavên kûviyan wenda bû bûm. Her ko diçû berf, li ser min bêtir, barê min girantir dibû; min nikarî bû xwe tev bilivanda. Lê vêcar min ne sar bû; mîna di nav kurkekî de bim, canê min germ dibû.. bîna min diçikiya.. di nav kefenekî spî û tebîî de, hêdî-hêdî dimirim.. hêvî û çara xelasê ne ma bû. Gava meriv li ber candayînê be, hemî ser-hatin û serencamê meriv mîna şiritên sinemayê li ber çavên meriv derbas dibin, Di wî halî de gelek tişt dihatin bîra min.. mafir ev dengê ahengdar, ku herî bîst û çend salan gava ez biçûk bûm min, tim dibihîst: «Elahî heq... Mewlayî heq... Rizayî heq...»

Ev dengê derwêşekî cil-kesk bû; hersal, du-sê caran, û her carê ji nişkave xuya dikir. Beju-dirêj, esmer, ri-sor hû.. elbê wî kesk, kum û xavika wî kesk bû.. tizbiyek kesk û balagîr di hustiyê wî, keş-kûlek ji gwişê hindê li milê wî, çilakekî dirêj û ser-hesin di destê wî de bû.. kûçe, kûçe digeriya û bi dengê xwê ê ahengdar ban dikir: «Elahî heq... Mewlayî heq... Rizayî heq...» Her kesî, jê re zarokên xwe dianîn.. wî jî, destê xwe î pîrozî di ser serê wan re digêrand.. Mala her kesî mala wî bû; li her cî kanî bû raketa, li her cî kanî bû bixwara. Pîra min bi xwe pir xatirê wî dizanî bû; pere û xwarin ji wî dirîx ne dikir. Wî jî, destê xwe li ser serê min digêrand, bi dizî tiştêk dixwend û pîf dikir dora min.



*Di perawan de tevgera komandosên.*



*Eskerên hevalbendan ji vaporan dadikevin beju Ewropayê.*

Gelekan, ji wî re, digotin:  
«Xalê xizir e.. ji nişkave xuya û ji nişkave wenda dibe.. di rojekê de kane dinê hemî bigere...»

Di bin tebeqeyên berfê, de, hilma min diçikiya, xwêdanêke germ ji laşê min biderdiket. Hingî birê wisan dihatin heqê min û berge «menzere»yên welê dihatin ber çavê min.



Ez, di nav muhîteki dindar de, xwedî û mezin bû bûm, baweriya min bebû ku ew derwêşê cil-kesk, ew xocê xizir bê fmdada min û min ji mirinê xelas bike.. ew derwêşê xwedî keramet û xwedî mûcîzeku di rojekê de kanî bû li dinê gişî bigere, kanî bû di wê tengayiyê de bê hewara miridê xwe î kevin.

Ez di vê hêviyê de bûm, dengê ji hatif hate gubê min, digot:

«Metirse, ez hatim», min li jor nêri; tebeqên herfê ji dilîna min re manî ne dibûn.. min di, ji jor ve murxekî gir, guş, guş difire û ber bi min da dikeve.. paşê li ber min venişt.

Min, bi hêviya xocê xizir dilê xwe vejandi bû; min digot qey derwêşê min î cil kesk û keşkûlbi dest e.. mixabin murxekî per-dirêj, sîng bi pirt, û ser girover û ser mezin bû..

Hingî hêviya min şkest; bê guman ev murxekî berale «cenaze» yan bû.. berî ez bimirim, bîna min hilaniye û hatiye cendekê

min bixwe. Lê murxê gewre, murxê pirheybet ne ji wan murxên beratn bû; pençê xwe î polayî, bi dilovanî, li ser serê min gerand û ez avêtîm ser basikê xwe î hesinî û ez ber bi ezmanan şrandim. Êdî tîrsa min ji mirinê ne ma bû; bi çavekî jîndar û bi dilekî azad min li dinê dinêrî..


Gava min çavê xwe vekir, min xwe li ser basikê tu murxan ne dil. Ez, li mala xwe, di nav nivîna xwe de bûn. Tixtorekî cil-spl serê min bilind dikir û bi kevçîki derman bera qirika min dida.. li rast û çep du sê merivê min bi tîrs li min dinêrîn.. hêsir ji çavê wan diherikîn.

Tixtor dikeniya û digot:

— Êdî, metirsîn.. nexweşê me kefen çirand..

Heşê min, hêdî, hêdî dîhat serê min.. ez ji bîst rojîde nexweş bûm.. nexweşiya min tifoseke giran û bê eman bû....

QEDRÎ-CAN



Tang û piyadeyên firqeke britanî ketine nîzama şer û berê xwe dane asêgehên ajîmin.

# PARÏS

DI NAV DU HEZAR SALAN DE BIYANIYAN  
JI 2o CARAN BÊTIR PARÏS VEGIRTIYE.

Parîs, bajarê abadin, bajarê çira û ronahiyê bi destên zarowên xwe hate xelas kirin. Beriya ko ordiwên sondxwariyan bigelhin Parîsê, xelkê payitextê sileh bi dest li vegertiyan rabûn û ew ji bajarê xwê derêxistin. Bi vê hêncetê me dil kir vê bendê berpeyî xwendevanên xwe bikin.

Belê di nav 2000 salan de biyaniyan ji 20 caran bêtir Parîs vegirtiye. Lê xelkê Parîsê tucaran bajarê, xwe di bin lîngan de ne hişt û hercar bi awakî biyanî ji bajarê xwe derêxistin.

Beriya M. Î. (milada Îsa) bi 52 salan qeyser Yûlyûs dirêjî bajarê golan kir û piştî şerekî no û dirêj Lotîs (navê Parîsê ê kevin) zemt kir.

Di dawiya sedsala (qerîn) sêzdehan de împerator Diyoklîsan welatê golan qedimande melîka Konstans Klor û Lotîs jê re kire payitext.

Di orta sedsala çaran de împeratore romanî Jûlyan ew vegirt. Di sala 365 an de melîk Valentîyan Parîs jê stand.

Di sala 451 ê de eskerên Eftîla gîhaştin sûrêhên Parîsê. Piştî 40 salî melîkê freng Klovis Parîs vegirt.

Di orta sedsala nêhan de fatihê Normandiyê Lûdbrûg sê caran dirêjî Parîsê kir. Qral Şarl yê ko bi Şarlê keçel deng da bû, bifidyeke giran Parîs ji destê normandiyan xelas kir. Lê piştî salekê normandiyan cardî dirêjî Parîsê kir, ketin bajarê xelk talan kirin û qesir şewitandin.

Di sala 885 an de qebîleyê Normandiyê e din dirêjî Parîsê kirin û bajarê qederê sê mehan mîhasere kirin. Piştî wê bi deh salan

qralê Germanîstanê Oton kete Parîsê.

Li 9ê Çiriya-paşîn sala 1357 an ingilîz ketin Parîsê û bajar talan kirine. Di sala 1361 de ordiwên Edward, qralê Îngilîstanê gîhaştin dora Parîsê û gundên dorê talan kirin.

Di sedsala panzdehan de li Fransê şerekî ehli çêbû bû. Ingilîzan bi de te bîrekî girt û li 24ê Gulanê sala 1418an, cardî ketin Parîsê.

Di sala 1420 an de melîka Îzayo deriyên bajarê ji Hanriyê pênçan, qralê Îngilîstanê, re vekirin. Hanri keça qralê Fransayê ji xwe re anî û bi vî awayî bû war sê textê Fransê. Ji xwe bavê keçikê yanî qralê Fransê dîn bû. Heta zemanê Hanriyê şeşan, kurê Hanriyê pênçan hikmê Ingilîzan di Fransayê de dom kir.

Di wextê Hanriyê şeşan de qedîsa Jandark rabû, peya dan dora xwe û dirêjî ingilîzên ko li Eransê bi cih bûn kir. Bû şer û di sala 1436an de fransîz di bin emrê Şarl Danjû de ketin Parîsê.

Di Gulana sala 1588an de eskerên Hanriyê sîseyan, bi qesta derêxistana terefdarên mala Gîz ji bajarê, Parîs mîhasere kir. Piştî salekê qral di zikê Parîsê de hate kuştin. Di vê navê de eskerên Hanri de Navar, Parîs mîhasere kiri be jî piştê jê kişîyan.

Di sedsala 19an de Parîs sê caran hate vegirtin. Di sala 1814an û li 31ê Adarê ordiwên Nemse, Prûsyê û Rûsyayê ketin Parîsê. Piştî şerê Watêrloyê, yanî piştî şikistina Napolyon, sal 1815. Ingilîzan Parîs vegirt. Di sala 1871an de, di wextê Bismarkê de prûsiyan Parîs zemt kir. Lê ji ber ko fransîzan tezmîna nata ko ji wan hati bû xwestin di cih de dan eleman gelek tê de ne man û jê vekîşîyan.

Vê carê li 14ê Hîzêrana sala 1940î ordiwên Hitler ketin-ê û qederê çar salan tê de nîanc.

SILÊMANÊ FERHO

Qayix a ko di klîşê de tete dîtin, dîmîne kele-kên u e. U ferqa ko q u me ji germên pezan, ev ji hesin in



# DIROKA JINA SELAHEDİN

— 5 —



## DEWLETA SELÇOQIYAN

Ji ber təkiliya hin hadîseyên tarîxî ji jîna Selahedîn ra, me tişteki ji halê dewleta ebasîyan û keliyek ji ji şerên xaçparezau nivîsî bû. Ji ber ko dewrana dewleta Selçoqîyan dikeve pêşîya hikmê Selahedîn, divê em hinekî, qene serpilki, li ser halê dewleta selçoqîyan ji bipeyivin.

Herweki me di festên berf vî da halê xelîfeyên ebasîyan gotî bû, hingê hikim keli bû destên qumandaren tirk. Dawiya-xurtiya serleşkeran û qelsiya xelîfeyan hikûmeta selçoqîyan anî bû pê. Ew dewleta ko ji sînorê Efxanîstanê heya derya sîpî xistî bû bin destê xwe di welatê rohelatê da, nemaze ji bo îslaman, qiweteke çak û xurt dihate nasîn. Ev welatê durr û dirêj di bin hikmê melîkê selçoqîyan ê bi nav û deng Melîkşah û wezirê wî ê jîr û jêhatî Nîzam-el-milk da bû.

Nîzam-el-milk bi zanîna û durrbîniya xwe ew welatê mezin weki hingulîskêkê di tiliya xwe da digerrand. Dema wezirê eqilmend dît ko dewleta Selçoqî li ser milên leşker û zabîtên kole û cemeke-xwer [bi meaş] rabûye, ji bo di pev da nekelîna wê pir tevdîrên baş danîn.

Pişta ko destê ereb û farîsan ji hikim bi durr xist, ji hêlekê hîmê hikim li ser rastî û daweriyê danî; û li hêla din dilê qumandaran bi malbata Melîkşah va girêda. Çi qumandarekî ko bi karekî çak radibûn jê ra serdariya kelehekê an bajarekî didan; ko vê yekê hezkirîna xebat û vekirîna welatan dixiste dilê wan. Bê şik dawîya vê yekê digehêste parve bûna welêtî di navbera mîr, qumandar û serdaran da. Nîzam-el-Milk va yeka han ji bîr dibir û riya veqetîne, anê parvekirina welêt, li pêş dilbihewesên vê yekê bi hin tevdîr digirt. Berî her tiştî tu mîr an serdar ji bo demekî dirêj li ser keleh an wîlayetêkê nedihîştin. Ji vê pê va berî demê tu walî û serdaran nikarî bû dayîn bicivanda. Bi ser van tevdîrên han da her gav nîminende û gubbelên wî di nav welêt da kêni ne dibûn û ji gunehêkî biçûk ra çavên xwe ne digirtin. Çi serdar an mîrekî ji rastiya wî diketin şikê, zûka haya Nîzam-el-Milk dikirin û wî ji ew serdar li cihê tê da radikir û dişand cihêkî din.

Lê mixabîna ko ev tevdîrên han bi Nîzam-el-Milk ra çûn. Herçiyên hatin cihê wezirê zîrek û eqilmend bihayê van tevdîran nezanîn û mîrek û serdar di cihên wan da hiştin. Mayîna mezinan demekî dirêj li ser keleh û bajaran destê wan û piştî wan xezim kir. Heya çû bi warekî welê rawestî ko wan ji di bin destên xwe da mîrek û walî datanîn û dayîn û xwîk didan civandin. Çiqas ko bi vî awayî hikmê selçoqîyan demekî dirêj durr kir jî, vê nîzama ban gelek hêviyên serxwebûnê dixist dilê waliyan.

Heya ko siltanên Selçoqîyan e xurt bûn hemî waliyan jê ra serf datanîn. Gava bi xurt bûna waliyan qels bûn, serê ben ji destê wan filîfî û ew tiştê ko bav û kalên wan bi sed sala anî bûn pê di demeke nîzik da berî da hilweşîne.

Dergehê malkambaxiyê di nav vê dewleta mezin da bi destê serek û qumandaran ve bû pêşiyê bi berberiyê dest pê kir. Her serek an qumandarekî çav da heqê heval an berberê xwe. Bi vê gelek gelş û qirên ketin nav welêt û tîrsa hikûmetê ji dilê xelkê bi derket. Riya dizî û keleşiyê li ber neqencan vebû. Ew serek û qumandaran ko berê di destên neqencan da lédidan, bûn hêvotker û piştmerên wan. Her yekî ji wan dixwast li dora xwe heval û bendewaran bicivîne. Di vê rê da jî berberiyêke kirêt keti bû nav wan. Ev yek bû ko rihetî di welêt da ne hişt û kes ji can û malê xwe ne bawer bû. Halê welêt piş û



nîzam tîkîro bû, ticaret vemîrî,  
neçarî û bêlengazîyê jî nû va  
serî hîlda û di her aliyê welêt  
da, wek cendekê pîrbîrîn, avzê-  
mên fesadî û gelacîyê vebûn.

Çiqas ko di nav van lihev-  
ketinan da carcaran yek yek  
destên xurt bi derdiketin û  
serekî hefsarê welêt di dest  
xwe da digirtin jî, bi çûyîna  
wan destan dîsa halê welêt  
vedigerî ser dûzana berê, heye  
ko hîn xirabtir dibûn. Ji van  
destan ê xurtir destê Nûredîn  
Zengî bû ko paşîya siltanên  
selçoqîyan bû; heye ko çaktirê  
wan jî tê zanîn.

Nûredîn jî wek siltanên  
berî xwe ên ko di nav wan  
li hevketinan da rabûbû, kesên  
zana, mêrxas û jêhatî li dora  
xwe civandin û pê merkeza  
xwe xurt kir. Di demeke ko  
kesên jîr û jêhatî, mêrxas û  
camêr, rast û xweyî rûmet,  
zana û siya li erdê ne diman,  
ne mikûn bû ko kurên Şadiyê  
kurd jî wê keyse bê par bîma-  
na. Ji xwe Eyûb û Şêrguh jî  
demeke dirêj da ketî bûn  
xîzmeta Nûredîn û xwe gihandi  
bûn payeyên bilintir. Tu şew-  
reke Nûredîn ne dibûn ko  
Necmedîn Eyûb û Esededîn  
Şêrguh ne di nav da bûna... an  
ne gerinendeyê wê kitê bûna.

Bi vî awayî bû ko kurê  
Eyûb Ūsîf Selahedîn lê west  
û dijwarî di sera û dîwanên  
padîşahan da çavê xwe vekir  
û bi rabûn û rûniştina zanayên  
dora wan rîya jîne û mezînatîyê  
nasî. Herwekî destê jîna Xwedê  
ew biçûkê ko li rîya mîhacîrî-  
yê hate dinê û bavê wî dixwest  
bavêlana, jî bo mezînatîya  
welatekî fîreh û dirêj digihand.  
Ji hêlekê bav û mamên mêrx-  
sas, di rex wan da govenda  
zana û eqilmendan, jî hêla din  
danîşwerî û hogîriya siltan û  
wezîran mîrê biçûk Selahedîn  
kiri bû mîrovekî mezîn; an jî  
bo mezînatîyê pêk tanîn.

OSMAN SEBRÎ



# DÎROKA

## JÎNA NAPOLYON

« Mêrê ko hesarê tevgera xwe »  
« bi dest jina xwe ve berde, bi »  
« çav min i kêmbîla ye, »  
Napolyon

— 12 —

### BEXTÊ ÇAK

Hîngê Napolyon Bonapartê ko berê genêral bû, wê gavê bê kar û xebat li kûçê û kolanên Parisê digeri, hemî bi çavên xwe didîtin û agir bi hinavê wî diket. Wî qenc dizanf ko heke serxwerabû serdest bibin dê şûreş û berdaberddanoke mezin lêkove nay wêlêt, Sîsiya leşkerê genêral Mîno jî, ne ji elametên xêrê bû. Ew sistî bû ko hêla serxwerabûyan giran dida xweya kirin.

Gava genêral Mîno tevî leşkerê xwe bi heş lehiya serxwerabûyan bi şûn da herve seraya Twîleriyê vediki, Napolyon jî bi tena xwe li pê wan ketê serayê û tevî guhdaran çû hêreya (temaşê) qirênên (mînaqesê) kongirê.

Evar bû, tariya şevê bazikên xwe bi reş di ser bajarê Parisê ra vegirtin. Serxwerabû jî, piştî ko bi vekişîna leşkerê hikûmetê dilgêş bûn, hîdî hîdî ji hev balav bûn û her kes çû mala xwe. Qenc bawer bû bûn ko gava sibetirê tişing bête teqandin, leşker dest nabe xwe û lepekurt jê nayê. Hînga kongirê dê qîma xwe bi daxwazên wan bînc.

Napolyon heya saet yanzdehên şevê guhdariya qirênên koma kongirê kir. Hîngê hemî lehatan ji ezla genêral Mîno re qerar da bû û parastîna kongirê jî sipartin hevalê xwe Baras. Baras ne mirovekî esker bû, lê geleki i jîr û jehalî bû. Wî mezinatî û giraniya barê ser stoyê xwe bîr dibir û dixwest li ser xwe rake. Demî di nav guhdaran da çav bi Napolyon ket, vegerî ser hevalên xwe û gotê wan:

— Peyayê ko bikari be kongirê biparêze ez dinasim. Ew zahîrê korsikiyê ko min ji Tûlonê nasî bû. Ha fêvê di nav guhdaran da. Hon dikarin pê bawer bibin.

Piraniya lebatên kongirê Napolyon ne dinasim. En ko navê wî bi vegirtina Tûlonê ra bibîstî bûn, mîna dêwekî zexim di/anîn. Lê gava serekê kongirê xwast wî bibîne û hate



pêşberî wan, dîtin ko peyaki qels û kiçik, û çavên mirov nagire. Serekê kongirê jê pirst û gotê:

— Ma tu dikarî parastina kongirê bigirî ser xwe.

Napolyon lê vegerand û got: — Erê.

— Giraniya barê ko tu hildigirîye ser xwe ma tu bîr dibî ?

— Erê, ez bi temami bîr dibim. Adeta min e, çi tiştê ez li xwe bigirim herhal dibim serî. Lê şertekî min heye, divê hûn qebûl bikin. Ew jî ko kes tekilî tevger û levdîra min nebe û ez di kirên xwe da fî serbest bim.

Kongirê serbestiya ko Napolyon xwastî dayê. Wî jî zûka di qîşleyên rex Parisê da pêncî top anî li dor aliye avahiya kongirê (seraya Twîleriyê) daçikand û berên wan da kûçê û kolanên ko digehan serayê. Heya sibê Napolyon ling di bin xwe va nekir û her cihê topan saz dikir û leşker diêxiste deverên hewce. Bi birbanga sibê ra avahiya kongirê jî kelehekê xurtî û zeximtir bû bû. Çarûnedorên wê, ji devên top û tişingên reş dikir.

Sibê zû, serxwerabû hatin wargehê berf rojekê. Wî cihê ko leşkerê genêral Mîno ajotî

bûnê. Û bawer bûn ko wê dîsa Mfnoyê sist li pêş xwe bibînin. Lê ne dizanîn ko genêralê kiçik Bonapart dirêjîya şevê kara xwe kirîye û li benda wan dimîne.

Piştî rojhelat çil hezar peya ji serxwera- bûyan di dorhêla serayê de gîhane hev û dixwastin dirêjî pînc hezar serberzê (Nefer) Napolyon bikin. Gelekî hêvîkar bûn ko wekî roja berî wê çavê leşker bitirsînin û bi teqan- dina çend tîfîngan hemîyan ji çekan bikin. Dema gumrehê serxwera bûyan halan di hev didan û hîdî hîdî berve devê topan diçûn, Napolyon qel xwe tev ne dida û dixwast hîn pirtir nîzing bibin û tîfîngan berê ew biteqînin.

Gava serxwera bûyan tu tevger û aridû ji leşker ne ditin, bê perwa dirêjî kirin û çend tîfîng ji berdanê. Hînga Napolyon agirê top û tîfîngên leşkerê xwe bi carekê berda pêsîran wan. Agirêkî welê ko li ber wî xwe ragirtin ne karê tu kesî bû. Serxwera bûyan çiqas di- xwastin ling bi ber xwe din ji, bi mirinê ra pevçûn ne tişteki hêsantî ye. Piştî saetekê ji wî çil hezarî çar mirov li pêşberî leşkerê hikûmetê ne ma. Napolyon bi vê ji tîr ne kir û leşkerê xwe li ser wan ne klîand û heya nava xani- yan rapeyî wan kir. Heya êvarê piraniya çekên serxwera bûyan ji dest wan bider îst û paşê bi serdestiyeke bê hemta vegerî avahiya kongirê. Li wir hemî lebatên kongirê hatin pîrgîna wî û jê ra rûmeteke mezin girtin.

Sibetirê ji millet ra dane zanîn ko genêralê kiçik Nopolyon cimhûriyet parast.


Herwekî dema çîniîna havîla hemî kirên Napolyon hati be; her kesî kirên wî ên çak dianîn bîra xwe û digotîn. Heçko Napolyonê îro ne ê dul bûl. Ew genêralê ko ji leşkeriyê hate avêtin, bê kar û xebat, rewş û rûmet di kûçe û kolanên Parîsê da digerin mirovekî din bûl. An, xebatên ko di rîya felat û serfiraziya Franseyê da li Tolonê û çiyayên Alpê kirî, hîn nûh di xelkê û hikûmetê va dixewînin. Mirov dikare bêje ko çîra Napolyon hîn nûh vêdiket û şewla wê xwe dida xelkê Fransyê.

Li ser vê kira Napolyon yarê wî Baras kete hikûmeta gerîndeyan ko ji pînc lebatan hate pê û genêral Bonapart ji kirin serleşkerê hundirê welêt. Ev karê nûh, karekî mezin, bi rûmet û pîrmeaş bû. Napolyon bi carekê ji jîna zîvarî û belengaziyê fîlîfî û kete jîneke çak û fireh. Bû xweyî qesir û avahî, berdevik û xulam, hesp û erebe. Dema mezinên welêt bihatana jmartin, êdî navê wî ji di rêza wan da dihate xwandin.

Gava rê li ber Napolyon vebû û bext berê xwe dayê, berî her tiştî diya wî hate bîrê. Xwast ko dê û birayên wî ji wî we serfiaziyê destkewtî bibin. Piştî demekî kurt çû Marsîl- yayê nik dê, bîra û xwişkên xwe; da ko bex- tiyariya xwe bi wan ra parve bike. Di wê rojê da Napolyon xwe ji gotîna xwe kir xwedî. Ew gotinên ko piştî mirîna bavê xwe ji diya xwe ra nivîsî bûn hemî anîn çih. Hîngê, di dawîya reşbelekê da digot:

«Dayika delal; bihna xwe bigire û dest bide ser dilê xwe. Halê ko îro em tê da ne ji, xwe ragirtinê divê. Ji îro bi şûn da emê bala xwe bidin te û qenciyan te bîr bibin. Gava me kari bû hinekî arîkariya te bikin, emê bi wê yekê xwe pîr bextiyar bizanin».

Çawan ko Napolyon di her kar û warî da bi gotinên xwe rabûye; ji bo dê û birayên xwe jî bi gotinên xwe rabû û ewrên zîvarî û belengaziyê ên malkambax nema li ser banê malbata Bonapart rawesîfîn.



# KATËRËN

ÇIROKA IMPERATORA RÛSYAYË A BI NAV Û DENG

— 1 —

*Nivisevan: S. A. Moreskwi  
Wergerevan: Bişarê Segman*

— Genêralê min, tu qwitên me ne mane.

— Pyêr; ev gotin ne rast e.

— Sed mixabin ko rast e. Bawer bike ji bo sibe tu xwarina me nîne.

— Heke ji bo sibe qwitê me lebiwa me ew dikir qûtê du rojan û me du rojên din pê derbas dikirin.

— Genêralê min, nakeve serê min ko ev tişt ji me re miqeder be. Di nav bajêr de xelk ji nêzan dimirin. Herçî esker ji kêmzadiyê gilî dikin.

— Ma gelo ez jî gilî dikim?

— No ez benî.

— Ma çire ew jî wek min nakin.

— Lê . . . .

— Dostê min ê ezîz, qedera Litwanyayê di nav destên me de ye. Heke Maryênbürg ket ûris dê mizefer bibin. Ji lewre her roja miqawemetê di dilê me de imida zefere vedijîne.

— Genêralê min destûr heye ko ez bi dilekî vekirî biştexilim. Tiştê ko ez dixwazim ji genêralê xwe re bibêjim, hêj ew tişt ji devê min derneketiye û bi guhê tukesi ve ne bûye. Lê ev tişt rastî bi xwe ye.

— De bêje heyran, ez guhdariya te dikim.

— Divêt tu bi xwe jî bizanî genêralê min ko êdî tu îmkana miqawemetê ne maye,

— Ma çawan ev gotin ji devê zabîteki litwanî dertê.

— Belê . . . . Lê divêt em bizanin ko dij. min li me wer hatiye; em ketine bin mihaserê. Dijmin ji me bêtir û çekên wan jî xurtir in. Di vî halê de em nikarin rabin berhîcûmê; Eskerên me ên nizami di nav bajêr de ne. Herçî çeteyên ko di çolê de digerin me tu hêvî ji wan nîne. Di destên me de bi tenê firça serheng Vladmîr Osboviç maye, ya ko ji destên îrisan filitiye. Ew jî bi tena xwe nikare bera dijmin bide.

— Belê Pyêr, heq di destên te de ye û her tiştê ko tu dibêji rast e.

— Tu hêvî nîne ko ji derve arîkariya me bikin û ji me re erzaq bişînin.

— Lê em dikarin ji xwedê hêvî bikin.

— Belê em dikarin hêvî bikin. Lê nakeve serê min ko Xwedê bi planên eskerî jî mijûl bibe.

— Lê dikare ji me re fikirine welê bidit ko em bi wan fikiran bikarin ji vî deravê teng derkevin.

— Heye ko em bikarin du rojên d'in ji miqawemetê bikin.

Genêral hinekî xwe ker kir û paşê gote reisê erkanherbiya xwe: Hingê di jiyina min de du rojên din mane. Ez tucaran xwe teslimî dijmin nakim. Êdî tu dikarî herî Pyêr.

Piştî çend deqîqan milazimekî ciwan keti bû qerargaha genêral. Nobetdaran jê re serf dibirin û pûte lédixistin. Milazim li deriyê oda genêral da û piştî ko jî hundir de destûr dan milazim derî vekirî û ket hundir. Milazim pate lëxistû ji piyan sekini û got:

— Roja te xweş bavê m'in.

— Ya te jî kurê min. Gelo bi te re çî xeber hene.

— Xeberine neqenc.

— Ji wan gotinan mexseda te çi ye?

— Mexseda min, halê ko em tê de ne. Em nema dikarin li her vî half bisekinin. Xelk û esker tev de di newmîdiyê de ne; nema dikarin tehemil bikin.

— Tiştên ko tu dibêji ez bi wan hemiyan dizanim. Di destê me de ji teslim bûnê pê ve tu çare ne maye, ne we ye?

Genêral kelliê damayî ma; paşê serê xwe hilda û got: Lê halên newmîdiyê gelek caran ji minovan re fikirine neadeti îlham dikin.

— Ma tu çare heye ko em bikarin ji wê mihaserê xelas bibin.

— No, em jî ûrisan kêmîr in, peyayên me newmîd û westiyayî ne. Em nikarin wan ji bo rûmeteke xeyalî wek pezan bidin şerjêkirin.

— Hingê . . .

— Hingê . . . . Ji me re rêke bi tenê heye. Lê tiştê ko ez didim eqilê xwe ne îşe eskerekî adeti ye. Jê re mîreki qenc û weletparêz divêtin. Mîreki welê ko bikare bêperwa xwe bike qurbana welatê xwe. Belê mirovekî welê dikare me xelas bike.

Lawik serê xwe hilda, singa xwe da ber û got: Ji bo xelasiya welêt peyayê ko tu dibêji ez im.

— Heyhat kurê min, tu bi kêrî vî îşî nayî. Jê re peyaki welê divêtin ko ûris wî nas nakin. Heke me bikariya fermandarê ordiwa rûsî ji ser rîya xwe hîlînin hingê ji me re mimkin dibû ko em xetên mihaserê bikelişînin û bi carekê û digel ordiwa xwe derkevin derveyî çemberê.

— Ma tu dibêji ko pê ûris xwe bidin paş.

— No, lê wextê ûris fermandarê xwe-winda bikin berdiberdan wê bikeve nav wan,

ewê xwe şaş bikin. Em ji, emê ji vê firsendê fîstîfade bikin, emê xetên wê bikeleşînin û derkevin derve. Di wextê şer de ji ordiwêkê re ne hêsanî ye ko ji xwe re fermanbarekî peyda bike.

— Ma çawan yekî litwanî bikeve ordûgaha rûsî û xwe bigehîne fermanbarê wê. Beriya ko bigehe fermanbar ew bi xwe wê bête girtin.

— Bêle wî bigirin jî, beriya ko wê heps bikin wê bibin nik fermanbar da ko ew jê di heqê me de pîrsan bike.

— Welê be jî wextê wê bibin hafa fermanbar wê hêxin bin mihafaza hin çêker û zabitin. Ji milê din zabit wî seh bikin û çekên wî jî jê bistinin.

— Be'ê rast e, lê heke jinîkekê ev îş girte ser xwe,

— Jinîkekê, . . . ma jinîk bi çî hêncetê wê derbasî xetên dijmin bibê.

— Ma dîtina sebebên jî liqêk e. Heye ko jinîk çûye nav xetên dijmin da ko di nav hêşîran de li mîr an li destgirtiyê xwe bigere.

— Lê jinîka ko ji bo vê yekê dê biçe nav dijmin, bikeve jî hafa fermanbar nikare xwe pê re bi tenê bike, bi wî re di xelwetê de bimîne.

— Ji lewre jî me re jinîkeke welê divêtin ko ne bi tenê welatparêz û fîdakar bit lê divê di yek wextî de spehî jî bit. Da ko Mençîkof bi xwe dil bike pê re bi tenê bimîne.

— Bi vî awayî wê bikare wî bikuje....

— Belê, wê bikare. Divê di Maryênbürgê de keçîkeke spehî çesûr û welatparêz bête peyda kirin. Ev jî ne îşekî hêsanî ye. Dijmin casûsên xwe xistine hetu ber pozên me.

— Ez jinîkeke welê nas dikim.

— Ew kî ye?

— Katêrîn.... xwedîya kantîna firqa piyadan adîdowan. Keçîkeke bedew, welatparêz ya ko tucaran nabe xayîna welatê xwê.

— Ji min re qala mîraniya wê kirine; lê min keçîk bi xwe ne dîtiye, heke tu jê ewle yî.

Lawîk li bavê xwe vegeard û got: Ev çend roj in firqa piyadayan xêra navtêdana Katêrînê ji piyan sekîniye. Jê pêve kes nîne ko bikare vî îşî bibe serî.

— Bila be kurê min, ez jî rastiya hikmên te ewle me; bişîne pey keçîkê

..

— Katêrînê ! . . . vodka, vodka . . .

Eskerên ko li ber deriyê kantîna Katêrînê sekinî bûn bi vî awayî bang didan û jê vodka dixwestin.

Keçîkê bi ken digote wan: Zarono, ka

perê . . .

— Tu pere bi me re nînin.

Eskeran digot: Katêrîn, divê tu ji me re bidî, divê em vexwin. Em birçîtiya xwe bi tenê bi şerabê dikarin bixapînin. Wextê em mîzefer bibin emê heq bidin.

— Bêşik, bêşik emê mîzefer bibin.

Di vê navê de yekî bi dengêkî bilind got: Katêrîn ma Maryênbürg ne hejayî şuşak vodka ye?

Katêrînê berê xwe da wî xortê ko ev tişt gotî hû û got: Li ser bextê min xebera te ye îvan, tev de li siheta min vexwin.

Katêrînê xwe dahelande sendûqekê û jê sûşeyek derêxist û gote eskeran: Ji xwe jê pêve ne maye jî.

Îvan jî par re li hundirê sendûqê dînihêrt. Katêrînê lê vegeziya û got: Ma tu fehêt nakî; ma kengê min derew li we kiriye.

— Li min megîre Katêrîn, heq di destê te de ye; min qisûr kir.

— Ez di te naborim ehmeq.

Katêrînê dengê xwe birî û berê xwe da zabitê ko ketî bû hundirê kantînê. Ew zabit Fêdor bû. Fêdor got:

— Divê jin bizanin carina derewan jî bikin. Ma çî li we qewemiye.

— Tu tişt nîne, min bi van qehremanan re yarî dikir.

— Nizanîm, lê gelo wext wextê yariyê ye.

— Ma ne çêtir e ko em bi rûne bi ken herin pêşiya mirinê.

— Heye ko welê ye. Lezê bide xwe û îşê wan camêran biqedîne; min divê ez bi te re bigîxêlîm.

Esker jî piyan disekinî û li hêviyê di-man. Katêrînê şûse da wan; wan jî tiştê tê de zûka daxistin zikên xwe û terka kantînê dan. Di vê navê de guleyek di nîzîngî kantînê de teqîya. Fêdor gote Katêrînê:

— Ūris dixwazin me bibîdihînin. Lê nakeve serê min ko îşev bikarin rabin hicûmê.

Katêrînê lê vegeard û got: Ma çî fêrq heye, ha îro, ha sibe.

— Ne Katêrînê holê mebeje.

— Ez li pêş xelkê ve nabêjimdzanim ko pê manewîyata wan dişkê. Lê herçî tu kurê serfermandar, jî xwe ber dizanî ko saetên Maryênbürgê hêjmartî ne. Ancax micîzeyek dikare me xelas bike.

Keçîkê wextê ev tişt gotin du hêstirên germ di ser hînarîkên wê re herîkîn.

Fêdor got:

— Sed heyf û mixabin ya Katêrîn . . . Ma



em nikarin ji bajarê xwe re tevdîreke xelaskar peyda bikin.

— Ez di vê riyê de canê xwe didim.

— Ez jî, lê tu tişt ji min nayê; jê re jinikek divêtin.

— Ev e, ez ....

— Belê, ez jî li te fikirîm.

— Min ji te gelek minet e; bêje min çi divêt ko ez bikim.

— Îşkêî dişwar e ya Katêrîn, ditirsim ko ji bo milên jinikekê barekî girah be.

— Ez ji tu tiştî xwe nadim paş û ji tukesî natirsim.

— Jiyîna te bikeve talûke jî .... te qenc daye eqilê xwe.

— Ne hewce ye ko ez bidim eqilê xwe. Ma çi qîmata jiyîna min heye; ma min mirov hene min mêr an destgirtî heye; ma di vê dinyayê de çiyê min heye? Tucaran jî ne hate bîra min ko ez ji bedewiya xwe îstifade bikim. Ez xîzmeta van eskeran dikim; lê bi min be ez jî bo îşkêî din hatîme dinyayê. Belê bi tenê di xîzmeta welatê xwe de ez dikarim bi kêr bêm û pê bibim jinikeke din.

— Hingê .... tiwê bikarî herî û bikevî nav xetên dijmin.

— Bêşik ....

— Ū heke hewce bû zilamekî jî bikujî?

— Ji xwe beriya niho jî min zilamek ku tiye. Hêj piçûk bûm, yekî dixwest min

birevîne, min ew kuştî. Bêje çi divêt ko ez bikim.

— Bi min re were, bavê min ewê her tiştî ji te re bibêje.

— Kêlkê li hêviya min bimîne, ez batim.

Wextê Fêdor derkete derve. Katêrîn pora xwe edlend û hinek podre li rûyê xwe gerand û da pey Fêdor. Di pey wî re bi gawîne eskerî dişeşiya. Guleyên dijmin li pey hev diketin bajêr. Qey dijmin bi halê wan hesiya bû û dixwest lezê bide xwe û suetekê berî saetkê bajêr bêxe destên xwe.

Gihaştî bûn qerargaha serfermandar. Fêdor Katêrîn ji bavê xwe re da nas kirin. Genêral keçik da rûniştandin û ji kurê xwe re got ko wan bi tenê bihîle. Genêaal gote Katêrînê:

— Te dil heye, tu canê xwe ji bo Lîtwanyayê feda bikî?

— Min hergav dil hebû; lê heta niho tu kesî ev tişt jî min ne xwestî bû.

— Ne xwe, heke min ew jî te xwest ....

Katêrînê şexaliya genêral birî û got: Ko ez bikevîm nav xetên dijmin û zilamekî bikujim ....

— Kê ev tişt jî te re got?

— Milazim Fêdor.

— Belê rast e; navê mirovê ko tu bikujî jî jî te re gotine.

— No, ew tişt ne gotin. Lê ev ne tu xem e; ûris hemî weke hev in.

Genêral li ber vê xwînsariyê hişmetkar ma bû. Hinek sekîna û got: Ew mirov, fermandarê ordîwa rûsî genêral Mençikof e.

— B. Xwedê li min xweş e, berî hinên din ez wî zilamî bikujim.

— Lê divêt tu bizanî ko bi vî îşî tiwê t rka jiyîne bidî.

— Herwekî min jî kurê te re jî got, ne tu xem e.

— Heye ko tiştêkî din jî wînda bikî .... namûsa xwe.

— Namûsa xwe.

— Belê, ma tiwê çawan bigelî çadira genêral û pê re xwe bi tenê bikî.

— Madam di pişt re



Jinîne Îngîlistanê di xîzmata welatê xwe de talimîna dibînin.

ezê wî bikujîm, ev jî ne tu xem e.

— Û heke îşev te Mençikof kuşt . . .

— Sibe wê min bidin b. r tîfîngan

— Lê heke me karî bû em te xelas bikin, hingê şan û şerefa din-yayê û malekî mezin wê ji te re bit.

— Tiştên ko tu dibêjî ev hemî di ber çavên min de bê qîmet in.

— Bi kuştina ferman-darê wan ordiwa rûsî wê bikeve berdîberdanê em jî emê ji vê fîrsendê kar bikin û emê rabin berêrîşekê û wan ji we-latê xwe derînin. Bi vî awayî em dikarin bigelin silheke şereftak.

— Ji bo îşeki ev-çend mezin jî min ewle yî.

— Bi temamî.

Katêrîne bi dengê xurt û bi vên got: Bi dilweşîyeke mezin ez vê weşê li ser xwe digirim. Lê ezê bi çî awayî bikevim nav xetên dijmin û xwe bigehînim Mençikof.

— Ev ne tu tişt e. Tivê bi rahetî bigehî heta qerargaha Mençikof. Bi tenê divêt tu tev-dîreke welê pêk binî ko tu bikarî bi gûneral re xelwet bibî. Ji bo vê yekê jî divêt tu ji lîr neki ko tu spehî yî û Mençikof hej delalan dike.


..

Di wê navê de gûneral Mençikof di qerargaha xwe de zabitên xwe ên erkanherb da bûn dora xwe û ji wan re digot:

— Li gora raporên ko mixabîrên me ên sîrî jî min re rekirine, keleha lîtwaniyan a paşûn û asê di van rojan de ji xwe ber wê bikeve destên me. Di kelehê de tu qwîl ne maye: xelk û esker ji nêz û birçînan gihastîne halekî welê ko nema dikarin pê bidin erdê. Ji lewre ji me re divêtin em li şûna ko li hêviya ketina wê bimînin û berî ko keleh ji xwe ber bikeve em wê bistînin û ala qeyser li ser surehên wê daçikînin.

Kulnêrê pîr Orlof got:

— Tiştê ko gûneral dibêje qehremanî ye.



Ji fabrikeyê İngilîstanê: Fabrikeke batafran. Di vê fabrikê de bedena batafran saz dikin û paşê aletên din li wan siwar dikin.

Lê neyarên qeyser zehf in; heye ko em jiyîna eskerên qeyser bê zerûret bexin talûkê. Lîtwaniyên ko tengezûr bûne heye ko gelek li ber xwe bidin û kuştareke mezin di navbera me de çêbibe.

— Belê rast e; lê li gora plana ko min çêkirîye mixdarê eskerên ko divêt em fedâ bikin hindik e. Fîrqa piyadan di bin perda agirê topçîyan de, wê berê xwe bide tabeyên bajêr ên hember. Dijmin heta ko ew nîzingî wî bibin û ji wan re bibin armanceke eşkere bera wan nadin. Di yek wextî de firqeke din ya ko di nav daristanan re û ji ker ve velîlkîşe jor, ji aliyê bakur-rohelê de dirêjî kelehê bikit.

— Ew der cihekî gelek asê ye û tê re çayîn ne hêsanî ye.

— Belê... lê plana min ne welê ye, herî weki tu dizanî. Wextê lîtwanî wê hicûma ko ji du aliyan têt dê bibînin ewê bawer bikin ko hicûma hember hîleyek e û hicûma rastîn ji bakur-rohelê ye. Li ser vê yekê piraniya eskerên xwe wê bişînin bakur-rohelê. Hingê sê firqeyên din wê bidin pey fîrqa pêşîn û di nav saetekê de Maryên bûrg wê bikeve destê me. Xesareke sivik wê bigehe fîrqa pêşîn.

[Dûmahik di rûpelê 20 an de ye]

## JI LAWAN RA

Lawo! Tu dizani çira em hev nabînin; çira axa me reş; esmanê me tarî ye?

Efrîtan pêşiya ronayiyê girtiye.

Lawo, tu dizani çira em nikarin hilmeke rahet bikêşin. Em difetisin, dengê me dernakevê, dest û pê me nalipe. Dêwin li ser sîngên me rûniştine

Çira rûyê min zûr bûye? Rast e, em hev dibînin. Roj derketî, tavê li erdê daye, gul û sosînan her der xemilandiye. Welê eva ronaiya ko ez dibêjim ne ev e. Ev ro ra dixwazim ko li demê ji dewranê li ser kuçên bilind ên Agirî li nav agirê bomb û top û tîfîng û mîtralyozan ji nav birqe-birqe şûr û xencer û rim û nîze li ser rûyê kefenên sipî can bêzaran helatî; li ser xwe xûnên şehîdan ên sor û mîqedes, şehîdên dîn û mil girî. Di pey xwe ra ser sînga hêşinatîya axa Kurdîstanê danî bû. Germiya tijavê toximê

azabî ra li dilê kurdan hêşîn, kezabên neyaran qul qul kiri bû. Xew ji çavên xasîbên heqên kurdan ra heram, xortên kurdancên bêgovang ra kiri bû.

Arê, lawo arê, ewê tavê dibêjim ko tariya grûna dilên kurdan ra rakirî; çavê dîla ra ronaf da bû; toximê kîn û neyartîya hev, ko dijminên me li vê tariya dil da çandî, hev dû ra kuştin didan û ligel xûnên pak kurdên calil û bêxember acur çêdikir; ximên û hisarên koxikên celal û ceberûtên xwe mîhkem û bilind dikirin; xêşkanof!

Lawo! Ew ro ra dibêjim ko bona helandin û hûr hûr kirina zencîrên zîlm û dilê dest û peyên kurd helatî, dema tewafa qebrên şehîdan ên bêkêl, şehîdên dîn û mîlet xwarî erdê bû bû. Li nav çengalên dêw û efrîtan giriftar bûye.

— Babo, meger nikarin eva dêw û efrîtan bikujin, roja kurdan disan ber bi esman kin.

— Lawo, tu zar î, eqelê te

nagihîje; devê birîna dilê min vemeke û xweyê pê wer meke. Hivîya min ji Xwedê heye ko rojek wê were, axa me ji mîna axa cînarên me bi ronî be.


— Babo, meger cînarên me dêw duşline, roja xwe derxistin. Çira kurd naqedînin. Meger wana ji kurd mîrxastir in?

— Ne kurê min, mîrxas nînin; aqil in; li her karî yek in. Civata wan heye, bi hev dişewirin. Ne ko mîrxasî navê nijadê me ye; nîşana me ye. Lê li dinyayê ji kurdan mîrxastir peyda nabin. Dayikên kurd zarê xwe li çîyan û banî, di neval û deştan da tînin. Çawan ko tev xûn tînin dinyayê, dema diçin ji li serî ligel xûna xwe dialin; sor tînin sor diçin. Çavên kurdan da jiyîn û mirin yek e. Mîrên kurd ne bi jiyîne şa, ne bi mirinê xemgîn in. Tenê li nav kevir û kuçên bilind, li nevalên kûr de xuyên hev ra girtine. Ji kuştina hev ra zêr jêhatî ne. Ji ên dîn xwe vedîşerîn; zû zû xwe bernadin, dest bi tîfîng na-

kin. Dema ko kirin, erd û esnan li ser serê neyaran bildiweşînin.

Kurdan mîraniya xwe li deştên Xînûs, Xarpêt, Diyarbekir û li gelbên Darakênê, Dêrsim, Midyat û Botan, li şax û daxên Sîpan û Agiriyê de nîşan daye. Dema dîl bikin pola dihelînin, çîyan dihejin. *Edî ecel û mirin* nikarin peşiya wan bigirin.

Çaxê heft siwar û an de peyayên egîd li erê Kanîkorkê, li rasta Beyazîdê di bin teyroka mîtralyozan da rikêba ser mîfrîzdeke dijmin kirin, merof digo li ehda shehaban de ye, weko



Eliyê reş zilfiqar kêşaye ber xwe daye koma kafiran. Gava nêzik bûn, mîna gur keti be nav pez. Kumandarê firqê top bi timobîla xwe girêda, revand û welê xelas kir.

Dijminan gazind ji bextê xwe û aferin bi mêraniya kurdan dikir.

Rojeke din, heft mêrên boşê ê şemkan rikêba nêzikî çar sed siwar û peyan kir. Wan heft peyan dijmin mîna pez avêli bû pêşiya xwe û dajot. Kumandarê dijmin destûr topçiya xwe da ser wan şêrên nêr guleyan navêje, bi bêbextî nekuje.

Heyf, lawo, ewan şêran bi temanî bi bêbextî hatine girtin û kuştin. Îro rûh wan ê pak li me dinihêrin. Dinihêrin ka bibiştin em hêjayî fedakariya wan in. Dinihêrin ka em dikurin tola wan bigirin, di rîya wan de herin. Beydala azahiya kurdan ya ko wan vekirî bû dîsa li ser şax û dax û Kurdistanê daçiqîn.

Ev jî bi tenê bi mêraniyê çênabe. Ser zantî û pêkanî û girêdana dest û peyê wan dêw û efrîtan jî divêt. Belê jê re esasên jêrin gerek in:

1 — Ji şivan û gavanan heta mîrê mîran divêt kurd bizantî ko brayên hev in; jî da û bîbekî çêbûne. Xûna wan yek, namûsa wan yek, teesiba wan yek e, jîyan û mirina wan yek e.


2 — Zanaî û zor serkaniya xweşiyê ye. Dan-zantî esasê azahiya mîlet e. Yek jê bi xwendinê, ê din bi yekbûnê çêdibe.

3 — Bawerî û îtaeta piçûk jî mezinê xwe ra, şefqet û himayet û mehebete mezin jî piçûkê xwe re.

4 — Navê neyartîya eşîran jî navê kurdan



Jinên Ingilîstanê di bexçeyên dora Londrê de bacanên sor didin hev



Der saû di meydaniyê Londrê de beza hespan çêdibin.

rabe. Bi hikmê şerîeta mihemedî herkes jî kirina xwe mesûl be: bab, bira, pismam, cînar ebeden tev nebe. Teesiba milî şûna teesiba eşîrî bigire.

5 — Hemû mîletê kurd di dora civateke milî de bigehe hev.

Dema ko ev tişt çêbûne berê mîletê kurd her bi esman e. Rûhên bab û bapîrên wan Kiyomers û Temors û Cemşîd û Ferîdûn û Keyqubad û Erdeşîrê babek û Selahedinê eyûbî û Kerîm Xanê Zend şa ye.

Armanç, ciyê bab û kalê kurdan ê kevin û mezinatiya berê peyda kirin û tava kurd di welatê Cemşîd de jî nû ve bi esman xistin e.

Lawo, te seh kir, jî min dibibure, hfvî jî te ye.

IHSAN NÜRÎ

## RIYA EZMANAN

ŞEREVANÏ DI RIYA EZMANAN RE ÇAWAN  
ESKER ÇEK Û POSATÊN XWE DIGUHÊNIN

Di vî şerî de guhastina esker û her texlî çek û aletan bi balafirên û bi pirahî û ji bo cara pêşîn di şerê girava Girtê de çêbû bû.

Elemanan piştî vegertina welatên Balqanan ji Yewnanîstanê xwe di riya ezmanan re zer kiri bûn Girtê. Di riya behirê re nikari bûn biboriyana. Ji ber ko stola inglîzî riya behirên dipa. Hingê herkes li wê niwefeqiyetê ecêbmayî ma bû.

Lê di şerê Normandiyê de wextê hevalbendan berda beja Ewropayê; inglîz û emêrikanî di vî tî de ji elemanan gelekî pêşîr çûn û ji wan derketin.

Inglîz û emêrikanîyan xwe, ji mêj ve kar dikir. Nemaze inglîz ji roja ko Franse şikestî bû û eskerên britanî ji Dûnkerkê vejeriya bûn, Çorçil li tevdirina dîgeriya ji bo ko rojekê vegere Ewropayê.

Li Gê Hizêranê britanî digel emêrikanîyan vegeriya Ewropayê û birekî eskerên xwe di riya ezmanan re guhastine

Dilê me heye di vê bendê de hin tiştan, li ser guhastina eskeran di riya ezmanan re, berpeyî xwendevanên xwe bikin.

Eskerên ko di riya ezmanan re têne guhastin di texlî in:

1— Pêraştîst. Evên ha eskerine xweser in; ji bo vê yekê têne talim kirin û ew esker wextê balafir digehim ser erdê neyar deriyê balafirê vedikin û digel çekên xwe, xwe tavêjin zikê ezmen û xêra siwana vegirtî hêdika dadîkevin erdê.

2— Eskerên di ezmanan re guhastî. Evên ha eskerên adetî ne, li şûna ko bi wasteyîne din bêne guhastin, bi balafirên têne guhastin û piştî ko balafir datinin jê peya dibin. Lê ew ji eskerîne bijartene û wan ji talimîne xweser dîtine. Ji ber ko carina balafira wan datîne ortî neyaran û hela ko hawara wan bê xebe-te zor dîxebitîn.

Ji bo guhastina esker û çekan du celeb balafir hene: yê adetî yanî bimotor. Bi wan çek û eskirine hûndik têne guhastin. Herçî ko ji bo guhastina yekînekan in, tabûr, alayî, firçe h. p., ew balafarinê bê motor in. Balafirên bimotor wan ji par re bi xwe ve girêdidin û di ezmanan de wan kaş dikin. Bi gotinên din balafira bimotor lekomo-tiv e, ên bêmotor ji fergon in.

Û car li gora nizama balafirvaniya britanî teşklata riya ezmanan bi awayê jêrin e.



Ev ji eskerê e. Eskerêkî bi dest û lep û her-bi çav. Ev eskerê hoke dike zimarekî qul bike, dînamitê di wî ke û wî berhewa bike.

Di cihine Îngilîstanê en tével (mixtelîf) de ji bo guhastina eskeran balafargehin hene. Di wan balafirgehan de balafir li gora karê xwe tîk vekevine. Balafirên ko pêraştîstan tavêjin; yê ko balafirên kaş dikin û balafirên bê motor.

Di rex wan balafirgehan de talimgehin hene. Di wan talimgehan de pêraştîst û eskerên ko bi balafirê têne guhastin disekinin. Di cihêki talimgehê de ji balafirvanên balafirên bê-motor yanî fergon, talim dikin.

Ev esker û balafirvan piştî ko yekînek talimê dibînin, digehin hev û pev re menawran çêdikin. Ji wargehê xwe radibin û datinin erdekî din. Bi vî awayî dahatina erdê neyar diceribînin û hîni hevkarîyê dibin.

Wextê hereketê haliye, balafirên fergonêş dikevin pêşiyê: ên bêmotor bi wan ve gtrêdidin. Li ên bêmotor esker siwar bûne û aletên wek motosikl û timobilîne piçûk ji li wan hatine bar kirin. Fergonê bi balafirê ve girêdidin û balafir hêdî hêdî dimeşe, paşê hêz dida xwe, bi hewa dikeve û fergona xwe ji bi xwe re hiltîne. Balafir û fergon wek qeytlarekî trênan di ezmanan de bitind dibin. Bi vî amayî

*Ji her balafirgehê trêna balafiran pey hev ji erdê dibin û di cihêki ezmanan de trêna tev de digehin hev û jê berê xwe didin erdê daketîne.*

*Di navbera pilotê (yê ko diajo) fergonê û yê balafira bimotor têtêfonêk heye. Wextê digehin di ser erdê ko esker dîkin peya bîbin, her du pilotan bi têtêfonê bi hev re xeber didin, û di cihê ko li pilotê fergonê têt balafira bi-motor têla ko fergonê pê girêdayî ye vedike û fergonê bi tena xwe datêl erdê balafira bi motor vedigere wargehê xwe.*


*Ji xwe beriya wan bi çend saetan eskerên peraşûtîst daketîne û ji wan re erd xweş kirine.*

*Bi her eskerî re ji bo danekî an du danan xwarin û têr cebîrxane heye. Herçî pilotên fergon in, heke ji wan hal, zûka vedigerin wargehê xwe, da ko fergoneke din bajon. Lê heke ji wan ne hal ew ji bi şerêvanîyan re pardariya şerî dîkin. Ji wan balafiran re, yanî balafirên bêmotor re planor dibêjin. Niho*

*ko xwendevanên me zanin ew çî tişt e, em ji emê jê re planor bibêjin. Pilot ji hemî diajogên balafiran re têla gotin.*

*Bi wan eskeran re keşe ji hene. Wan keşan du wezîfe hene. Di deravên teng de nav di eskeran didin, li şûna nexweşnêran birinên birtindaran derman dîkin û wextê mirî hebin keşeliya xwe dîkin û dia mirîyan dibêjin.*

*Di pey wan re di planorine din de diktor û dermanker û nexweşnêr tèn. Bi wan re her texlî derman û aletên cerahiyê hene Di cihêki de tavil emeliyatxaneyek saz dîkin û bi emeliyata*



**BERGEHINE QESIR Û AVAHIYÊN SKOÇLANDÊ**

*birindaran mijûl aibin. Ne hevce ye ko em bibêjin ko ev tişt hemî heta erdêki şîreh bikeve dest, di bin barana gule û berikên dijmin de çêdibin.*

*Ev eskerê ko di orta dijmin de ye heta ko di bejê an di behirê re bigehe ordîwa xwe hewara wî di ezmanan re têt. Gelek caran balafir bêt ko deynin ji jor de tiştên gerek ji wan re tavêjîn.*

*Di şerê Normandiyê de hevalbendan bi wî awayî, di rîya ezmanan re, firqeyine tekûz bi her çek û tangên wan ve, guhastine erdê Ewropayê.*

**PISPORÊ ESKERÎ**

— Dûmahik ji rûpelê 16an —

Di wê demê de nobetdarek kete hundir û ji genêral re da zanin ko qasidek ji Pêtrêsbûrgê hatiye. Qasid nameyek (mektûb) ani bû. Mençikof name vekir û gote baziran.

— Mirzano nameke imperatori.

Tev de rabûn, ji piyan sekinin û pate lêxistin. Mençikof nama qeyser xwend. Qeyser ferman dikir ko vegirtina Maryênbûrgê bilezînin. Genêral bi dengêk teji vên û irade gote zabîten xwe:

— Divêt fermana qeyser îşev bête cih.

Lî ser vê gotinê zabitan terka genêral da û hemî çûn ser îşên xwe. Mençikof di çadira xwe de bi tena xwe ma û vekêş tanîn xwe. Ji çend rojan de gelek diwestiya.

Perên şevê ên tarî daketi bûn rûyê dinyayê. Katêrin terka bajêr da bû û keti bû nav xetên ûris. Nobetdarekî rast deng lê kir û got: Ew ki ye?


Katêrinê lê venegeraud; pêş de çû, heta ko rivîniya agirê ko eskeran dada bû jê ve xuya kir. Nobetdar careke din got: Ew ki ye, bisekine, an ne ezê agir bikim.

Katêrinê got: Jinikeke litwanî ... Nobetdar berê lîfinga xwe li singa Katêrinê rast kiri bû. Dikir ko agir bike.

Katêrin di cihê xwe de cemidî ma. Ji xwe re digot: Ev hovê ha dikare min bikuje.

Wi eskerî bani zabîte xwe kir. Zabît digel çend eskeran qedimî. Esker digot: Jinikeke litwanî.

Katêrinê: ma beriya niho we yeke din ne dlîî bû, ehmeqino.



— Ker be... an ne...

— An ne... bi Xwedê tilike xwe bidî min, fermandar beriya ko roj hilê te bi dar ve bike.

Esker wek veciniqî bi xwe de qeliqî û got: Tu ki yi, navê te çi ye?

— Beri her tiştî min bigehine genêral.

— Tu dibêji qey tu îşê genêral nîne hema wê bê pêrgina te.

— Ma ji kû dizani ko ne welê ye?

Mêrik kenî û got: Ji dil tu ceşûr û bi vên î.

Katêrinê bi awakî welê xeber dida ko esker ketine dudiliyê û ji xwe re digotin: Heye ko genêral li lêviya wê ye. Zebîte ko qedimî bû neferek şand ba yawerê genêral da ko jê re bide zanin ko jinikeke litwanî hatiye heta xetên rûsî.

Neserê ko çû bû qerargahê piştî midekl vegehiya û got ko divêt jinika litwanî bibin qerargahê. Zabît gote eskeran: we jînik velo kiriyê.

Eskeran got, no, me ew seh ne kiriyê.

Katêrinê: Ez qebûl nakin ko ev wehsiyên ha destên xwe bidine min û min velo bikin. Heke zabîten rûsî ji jinan ditirsin hingê ezê xencera piçûk ya ko bi min re ye, bidime te û wextê yên me dirêji we bikin tu dikari pê berevaniya canê xwe biki.

Zabît li mêraniya jînikê ecêbnayî ma bû. Dev ji velo kirina-wê berda û gote jînikê.

— Herhal, te mextsedek heyê.

— Min ji eskerên te re gotî bû; ez dixwazin genêral Mençikof bibinin.

— Nakeve serê min ko wextê genêral hebe te qebûl bike, digel vê hindê ezê carekê biceribînim.

Zabît li hespê xwe siwar bû û berê xwe da çadira genêral. Wextê zabît kete çadira genêral Mençikof jê pirst:

— Te xêr e Eleksiyêf,

— Tiştêk nîne, jinikeke litwanî,

— Jinikeke litwanî, ji kû te û çi dixwaze?

Bi xwe hatiye heta xetên me û dixwaze genêral bibine.

Çawan e, spêhi ye?

Bêlê spêhi ye, lê jinikeke xurt û bi vên.

Ku wê ji min re bine; heyê ko bikare min bikenine.

(Dûmahik Heye)

# HINDIK RINDIK

**40,000 KÎLOMÊTIR** — Herweki xwendevanên me dizanin elemanan birekî Sovyêtistanê fî mezin vegirtî bû. Lê ordiwan Sovyêtistanê ên qehreman, dijmîn bi şûn de vegevand û erdê xwe jî her lepên wî xelas kir. Ew erd xerabe bû bû, pîraniya xelkê wî jê derketî bû. Nibo xelk lê vegeyriyane û bi arîkariya hikûmetê erdê xwe ava dikin. Hikûmet jî wan xelkan re pez û dewar jî peyda dike.

Welatê ûrisan welatekî bêqeder mezin e; digehe perê dinyayê. Hikûmetê jî her derên welêt jî milyonek serî hêtir pez û dewarên stûr dane hev. Ev pez û dewar li erdên xerabebûyî bihatana lewa kirin. Ji guhastina wan re 90000 fergon û qedere 1000 lekomotif diviya bû. Qederê mehekê jî rêhesinên welêt pê bihatana mijûl kirin.

Hikûmetê teşkilatek anî pê û di 23 reyên xweser re ew pez û dewar di bejê re ajotin cihên gerek. 25000 şivan li wan keriyên guhdar dibûn. Di 880 deran de beytarxaneyin hatî bûn saz kirin. Di wan beytarxanan de heywanên nexweş dihatin derman kirin.

Bi vî awayî ew heywanên ha yên ko jî milyonekî hêtir bûn ne bi tenê bi selamet gihastin cihên xwe, lê bi rê ve li xwe zêde kirine jî. Ev e xurtiya teşkilatê.

**RAHBE** — Beriya ko sondxwarî pê li beja Ewropayê bikin balafirvanekî britanî ketî bû erdê Belçîkayê, nîzingî dêrekê. Eleman pê ne hesiya bûn; rahbeke dêrê balafirvan dîtî bû. Rahbê balafirvan anî dêrê, jê re destek cilên rahban da wergirtin. Mêrik rojê çend caran rih û simbêlên xwe kur dikirin û bê deng di nav raûban de digeriya.

Du meh ketî bûn navê. Rojekê nî rîkê me di liwaneke dêrê de rastî rahbeke ciwan û spehî hat. Rahbe bi tena xwe bû. Mêrikê me neimerdî ne kir, hema baz da û jî paş re rahbe liimbêz kir û dikir ko wê maç hike. Rahbe lê zivirî kulmek li bin erziwa wî xist û bi dengêkî stûr got-ê:

— Tu dîbi ne pîr hatî, jî nîho de bi xwe nikarî; ez jî roja serê Fransayê de li bîre me.

**EMRÊ HIN HEYWANAN** — Masiyîn hene qederê 150 salî emir dikin. Kîlik 10, se 11 û herçî hesp heca 25 salan dijmîn. Hît 200 û fil qederê 300 salî dikarin emir bikin.

## Çira Zanîne

*Li wextê berê miletek hebû, mileteki mîr û ciwanmîr, lê nezan. Ew milet ketî bû bin deştên miletine din. Mileten serdest zilm û sitemkarî lê dikirin. Milete bindest jî heynta xwe bêxeber, di bin nîrê miletên serdest de hero belengaztir dibû. Lê milete jî her tiştî bê hay, bi belengaziya xwe jî ne dihesiya.*

*Rojekê, pîrek jî nav wî milete bindest rabû. Pîr li halê milete xwe temaşa kir; li ser nexweşiya wî vebû. Kal rabû, elfabeyek çêkir û milet da xwendin. Wî pîr li xelkê xwe pend û şîret dikirin û digot:*

— Zarono, li zimanê xwe miqate bin, pîhê pê bigirin, hînt xwendin û mîwîsandîne bibin; qedrê zmanê xwe bizanin. Mileteki dîl yê ko zmanê xwe wînda ne kiriye dimîne wî hepsiye ko miqata zîdana wî di destê wî de ye.

*Belê, zimanê we heynta we ye. Hon bi tenê bi zîwanê xwe jî miletine din tîne ferq kirin. Û rojekê honê xêra wî jî hêstiriyê xelas bîbin.*

*Mîlet jî ya pîr kir, hînt xwendin û nivîsandîne bû. Xêra zanîne li her tiştên dinyayê hişyar bû; bi heynta xwe hesiya.*

*Belê, mîlet zanî ko heca hingê di zîdana nezaniyê a tari de pûyan dibû. Çira zanîne dora mîlet bi ront kir. Mîlet her tiştî dîtîn.*

*Zorkeran di tariyê de li wî dixistin, mîlet ço ne didit. Lê gava zanîne hawîr bi ront kir, mîlet çoyê zilmê di ser xwe re dît, ew girtî û ew şkenand; berê xwe da deriyê zîdanê û jê derket. Ji ber ko, herweki pîr gotî bû, mîfle pê re bû.*

*Weyl jî wî milete re ko zimanê xwe wînda kiriye.* **HEREKOL AZÎZAN**

## HINEK JÎ HENEK

Pîrejinek di kûçeke Londrê de bi rê ve diçû. Guregur bi ezmanan ketin. J'nik tirsîha û li zêzêmenêkê geriya, da ko xwe tê de vé.êre. Yekî got-ê:

— Xanîm matirse, ev ne guregurên Hîtler, lê yên Xwedê ne.

Dibêjîn ko rojekê rojnamevanekî bîyanî jî serekwezîrê Mecarîstanê pîrast:

— Mela hikûmeta we jî kê re çêtir hoya, jî elemanan re an jî sondxwariyan re?

Serekwezîr lê vegevand û got: Herçî ez û birekî wezîrên min em mældarên elemanan in. Herçî ez û birekî wezîrên min ên dînan em mældariya sondxwariyan dikin.



## INQILABA SOR A MEZIN

— Em cengê naxwazînî.

— Me Qeyser navê!

— Her bijî koma millet...

Di meha marta 1917 de bû; bi herzaran pale û xelkê Petrêsbürgê girûh-girûh, di kuçeyan de digeriyan û ew pirsên jorîn bi hev re û bi yek dengî digotin...

Qeyser û malbata wî û zadeganan, ji paş pencereyan, li van komên rênçber, pale û cîwelekan dinêrîn, qeh-qeh dikeniyân û digotin:

— Zûrîna van seyan em gēj kirin..

Bi rastî ji Qeyser û zadegan gēj bû bûn. Lê ne gējbûneke tebiî, gējbûneke siyasî bû.. Ruyê wan, heke bi sextekarî dikeniya, dilê wan bi rastî digiriyan, taya mirinê bi qirika wan girti bû, text û bextê wan dihejiyan.

Ev hal ne tenê di kuçên Petrêsbürgê de çêdibû; li welatê Ûris, li her cî qewimî bû.. Pale, rênçber û cîwelekan azadî û serbestî dixwestin.

Mîna her derê, li Ûristanê jî millet tebeqe tebeqe bûn: Zadegan, bajarî, gundî, pale, rênçber, cîwelek..... Bajarî (bûrjawzî) tebeqeyên navîn, zadegan tebeqeya serdest, pale, rênçber û cîwelek bîndest bûn. Zadegan bi keda wan dijiyan, bi keda wan zewq û sefa derbas dikirin, her çêşîd cewr û cefa li rênçber û paleyan dikirin.

Di babîtska nozdan de cara pêşîn, Karl Maks derket meydanê û ev nîzama civakî.. nîzama tebeqeyan [a tewş qebûl ne kir, û fikrên xwe ên marksî pêş ve ajot..

Karl Maks, digot «însan e, xwîna ku di damarê wan de digere, giş sor e.. kes xwediyê xwîna kesk nîne û heqê tu kesî tune bi keda xelkê bijî, û ew kes bi xwe bê kar û bê emel be..»

Înqilaba Fransa a mezîn (1789) jî, li ser bîngeheki wîsan çêbûye û ji wê rojê ve, pozê zadeganîyê hatiye şkandin û her kesî lezeta azadî û serhestiyê tam û fam kiriye.

Mizgînbelav «mibeşîr» ê fikrên marksî û qehreman û fermandarê înqilaba bolsêwîki «Lenîn», navê wî ê rastî «Vladmîr Îlîts İlyanof» e. Di sala (1870) de, li (Sînbîrsk) ê hatiye dinê. Ji roja ku bîr biriyê, fedaiyê azadî û insanîyetê bûye û di vê rê de bi şev, bi roj, mejiyê xwe, bi dest û lepên xwe xebitîye.

Înqilaba (1917) an ku di Ûristanê de

çêbûye, ne înqilabeke ji nîşkave bû, ne jî mûcîzeyek bû. Na ew, berê dara ku «Lenîn» jî sî safî ve çandî bû.. Zadê tovê ku Lenîn ji salan ve li zeviyên Ûristanê belav kiri bû.. Di zemanê ku nîrê Qeyser hustiyê wî û hevalên wî ba dida.

Lenîn hêj hevde safî bû ji darîllîndûna Qazanê hate qewitandin. Çîma ku têkîllî nîmayîşên sewrewî bû bû. Di wê salê de birayê wî ê mezîn «Aleksandîr» jî hate bi dar ve kirin.

Lenîn, pir jî xwendinê hez dikir, nema-ze pir bala xwe dida kitêb û fikrên Karl Maks û jî wan fikrên civakî hîn bû cara pêşîn kitêba xwe a bi navê «Mesela gundiyan» nivîstî û ji sala 1893 ve li Petrêsbürgê dest bi karê xwe î fermandarî kir.. Berê xwe da siyaseta îştirakîyê û berî her tiştî xwest ku karê paleyan rêz û xêz bike.. di navbera sala 1894-1898 de, partiyek îştirakî demoqrati çêkir û fikira înqilabê, bere-bere, belav kir. Rojnameyek bê izin jî derdixist. Paşê hate girtin û nefiyê Sîbîriyayê bû.. hetanî sala 1900 li wir ma. Li wir jî ji xebata xwe ne dima.

Pîşt ku jî menfayê vegeriya teva du hevalên xwe «Martof» û «Tobrişon» jî Ûristanê derketin û çûn, li mehçerê teva «Blîxonof» û «Aklorê» û «Fîra Zasolîts» rojnameyek bi navê «îskera» — yanî pîrîsk — derxistin. Paşê çûne, Brüksêlê. Li wir jî bewn ne kete wan, rahûn çûn Londrê dubîrî «îxtîlaf» ket navbera civata «îşkera», bûne du partî. Bolşewîk û Menşewîk!.. Lenîn serêk bolşewîka ma; bi navê «Briyod» yanî ber bi pêş rojnameyek derxist. Di (1905) de Lenîn vegeriya Ûristanê. Di wê salê de li Ûristanê hemî fikir û nezariyên înqilabê ketin meydana emelî. Di meha çelêyê pêşîn de li Moskoyê, di bin fermandariya civata sovîyêtan îxtîlaleke miseleh çêbû; deh rojan xwe li ber leşkerên qeyser ragirtin û pê re şer kirin. Menşewîka ev îxtîlala bi xwîn û agir ne dixwestin; wan jî hevaltiya qeyser û bûrjwan dikirin.

Di sala (1907) de, Lenîn, dişa mecbûr bû, ji Ûristanê bi derket. Sala (1912) de, Lenîn jî xaliya-sînorê Ûristanê-dest bi cidale kir. Gava cenga mezîn di sala 1911 çêbû, îsarêten îxtîlale bêtir xuya kirin û Petrêsbürg dida veçiqandin.

Di sala (1917) de îxtîlala îştirakî li Ûristanê, di bin fermandariya partîya bolşewîki li Lenîn de xuya kir. Eya serê diroka wergerandina zadegan û sermayedaran, serê diroka heq û راستiyê, serê diroka azadî û serbestiyê..

Di meha Adara wê salê de, paleyên Petrêsbûrgê girêv. û nimayîş çêkirin, li kuçeyan bi sed hezaran digeriyan û digotin:  
«Em qeyser naxwazin... Em azadiyê dixwazin... Her bijî koma millet!...»

Di serê meha martê de agirê îxtilalê gurtir bû; qozak û leşkerên ku qeyser dişandin ser nimayîşkaran, teva wan dibûn û bi wan re, li polisên qeyser dixistin.. Êdî, reyek li her qeyser ma bû: ji textê xwe fêrîn daketin!

Bi daketina qeyser, derbeke mezin li iqtisad û idareyên pê cengê û li rûyê zadeganan ket. Ixtilala Martê, tenê bi destê gundî û leşkeran çêbû... piştî heşt mehan ixtilala çiriya paşîn dest pê kir. Vêcar li her ci bolşevîk serdest bûn... di bin serdariya Lenîn de hikûmetek bolşevîkî çêbû. Hingî bajari «Bûrjwazî» an jî, di bin serdariya prens Lifof û Mîlikof de hikûmetek çêkiri bûn. Di Nîsanê de, Lenîn programa xwe ya jî deh madeyan belav kir. Ev program, mîna bombeyêkê teqîya. Di piştî re ixtilala çiriya paşîn dest pê kir. Di îlonê de Lenîn, dixwest dawîya her tiştî bîne. Lê di meha çiriya pêşîn de, her tiştî saff û paqij kir. Imperatoriya ûrîsa xûnxwar û xedar hilweşiya, li dewsa wê yekîti û biratiya milletên sovyetî çêbû...

Di nav heşt mehan de nav û dengê fermandariya Lenîn bi ezmanan ket. Di salên paşîn de. wacibên Lenîn bêtir û mezintir

bûn. Lê mixabin mirinê ew jî wan bê par kir.


Piştî Lenîn, Stalîn bû fermandar û serêkê welatên sovyetîyan. Ev merivê polayf roj bi roj welatê sovyetîyan kire bihuşt, jî milletên wê derê re, her çeşîd refah û bextiyarî bexş kir û dike. Îro li Ûrîstanê, herkes, li gorî xebat û karê xwe, digêje mirazê xwe... herkes azad û serbest e. Yek nikare li ê din cewr û cefayê hîke û yek nikare hîke dî xebata ê din bijî. Mezinafî û biçûkî bi hav û kalan nayê qlyas kirin, tenê bi xebat û têgîştinê.

Di nav milletên sovyetî de yekîtiyek û girêdanek yekta heye. Milletên biçûk û mezîni di hiqûqên qewmî û dînî de qandî hev in. Her millet bi zmanê xwe dipeyive, dixwîne û dinivîse..

Kes nikare dîn û qewmîyeta ê din tehqîr bike, jî bona wê cezayên mezin têne dayîn.

Li welatê sovyetî de çend gundên kurd jî hene. Ew jî, ji her heqê xwe ên qewmî û dînî istifade dikin. Di her gundê kurd de dibistan û kolxozê kurdî hene, rojnameyek bi navê «Rîya teze» li wir derdikeve. Em bi dilxweştî dibihîzin, darilmîlîmîn û lîseyek, encimenek zanîstiyê jî hene. Libatên vê encimene, salê, bi sedan û jî her çeşîdî kitêbên kurdî dinivîstin û didin çap kirin. Daxwaza me, jî bona wan ev e: Her tim peşveçûn û serfrazî!

Q. CAN



### Kiriyariya Ronahiye

Ji bo Sûriyê 15 lîreyên sûrî. — Ji bo welatên din du lîreyên îngilîzî

Xwêdî û gerîndeyê herpî-iyar : Celadet Ali Bedîr-Xan, Şam—Sûriyê  
Directeur Propriétaire: Djeladet Aali Bedir-Khan, Damas—Syrie

**INSTITUT KURDE DE PARIS**  
**ENTRÉE N°**

